MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

PARASTINA KURDÊN DI NAVA PENCÊ QIRKIRINA ÇANDÎ DE

PIRSGIRÊKA KURD Û ÇARESERIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

ABDULLAH **OCALAN**

Werger: Rêşad Sorgul

Redekte: Luqman Guldivê

MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK

Pirtûka Pêncemîn: PIRSGIRÊKA KURD Û ÇARESERIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

Parastina Kurdên Di Nav Pencê Qirkirina Çandî De

NAVEROK

DAXUYANÎ

PÊŞGOTIN

DESTPÊK

Beşa Yekemîn: ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ û TEORÎK

A- ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ

1- Çand

2- Ziman

3- Şaristanî

4- Desthilatdarî

5- Rêveberî

6- Polîtîka

7- Exlaq

8- Huqûq

9- Demokrasî

10- Ekonomî

11- Asîmîlasyon

12- Qirkirin

B- ÇARÇOVEYA TEORÎK

1- Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî

2- Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk

3- Neteweya Demokratîk

4- Sosyalîzm û Kapîtalîzm

5- Hevjiyana Azad

Beşa Duyem: RASTIYA KURD

A- BI KURTÎ PÊKHATINA DÎROKÎ YA RASTIYA KURD

1- Weke Hebûn û Heyîn Kurd

2- Hebûna Kurdan û Rêûresm

3- Hebûna Kurdan û Rêûresma Îslamî

4- Çanda Îslamê û Têkiliyên Ereb-Kurd-Tirk

5- Di Rastiya Kurd De Tesîrlihevkirina Ermenî-Suryanî-Cihû

6- Çanda Rojhilata Navîn û Hegemonya Modernîteya Kapîtalîst

7- Di Çanda Rojhilata Navîn de Jihevdûrketin û cihêbûna Desthilatdarî û Civakê

B- DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE RASTIYA KURD

1- Di Rastiya Kurd De Dayiknîştiman

2- Di Rastiya Kurd De Şaxê Neteweyî

a- Nasnameya Kurd a Hemdem a Di Bin Hegemonya Yekdestdariya Sermaye û Desthilatdariya Tirk û Hevgirtiyên Wan De

b- Li Başûrê Kurdistanê Nasnameya Kurd a Hemdem

c- Li Rojhilatê Kurdistanê Nasnameya Neteweyî ya Kurd

3- Şaxê Civakî yê Rastiya Kurd

4- Şaxê Ekonomîk ê Rastiya Kurd

5- Şaxê Çandî yê Rastiya Kurd

Beşa Sêyemîn: DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE PIRSGIRÊKA KURD û TEVGERA KURD

A- BI AWAYEKÎ DÎROKÎ QONAXÊN PIRSGIRÊKA KURD û REWŞA WÊ YA NIHA

B- DÎROKA TEVGERA KURD

C- TEVGERÊN KURD ÊN HEMDEM

Beşa Çaremîn: TEVGERA PKK’Ê û ŞERÊ GEL Ê ŞOREŞGERÎ

A- PKK û ÎDEOLOJIYA DEWLETDARIYA NETEWE

1- Rast Danasîna Şertên Dinya Salên 1970’yan

2- Pêxîrtengiya Sosyalîzma Pêkhatî û Gavavêtina Şoreşgerî

3- PKK û Îdeolojiya Netewe-Dewletparêz

4- Bi Awayekî Rast Nîşandana Şerê Ruh û Serwextbûnê yê Demekê

B- TECRÛBEYA PKK’Ê YA ŞERÊ GEL Ê ŞOREŞGERÎ û ENCAMÊN WÊ

1- Şerê Gel ê Şoreşgerî, Tesfiyekarî û Xiyanet

2- Şerê Gel ê Şoreşgerî û Îttîfaq

3- Tecrûbeya Şerê Gel ê Şoreşgerî û Neteweya Demokratîk

4- Li Dijî Şerê Gel ê Şoreşgerî Şerên NATO yên Gladîo

C- LI CEM KURDAN ŞERÊ ŞOREŞGERÎ û AFIRANDINA MÎLÎTANAN

Beşa Pêncemîn: DI SOSYALÎZMA ZANISTÎ DE PÊXÎRTENGÎ, KOMPLOYA MEZIN û VEGUHERÎNA PKK'Ê

A- PÊXÎRTENGIYA SOSYALÎZMA ZANISTÎ

B- KOMPLOYA MEZIN A GLADÎO

1- Derketina Ji Sûrî

2- Pêvajoya Îmraliyê

C- DI PKK'Ê DE VEGUHERÎNA RADÎKAL

1- Ezmûna KADEK û KONGRA GEL û Veguherîna PKK'ê

2- Mane û Girîngiya Tesfiyekariya 2002-2004'an

Beşa Şeşemîn: PKK, KCK û NETEWEYA DEMOKRATÎK

A- PKK û JIYANA NETEWEYA DEMOKRATÎK

1- Di Dema Nû De Nasnameya PKK'ê û Maneya Wê

2- Cihê PKK'ê Di Jiyana Neteweya Demokratîk De

B- KCK û ÇARESERIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

1- Di Komara Tirkiyê De Destguhertina Desthilatdariya Hegemonîk

2- Cihûtî, Têkiliya Tirk-Îsraîl û Pirsgirêka Kurd

3- Di Têkiliyên Kurd-Tirk De Pirsgirêka Desthilatdarî û Dewletê

4- Aştî, Çareseriya Demokratîk û Avakirina Neteweya Demokratîk

C- KCK û ŞAXÊN NETEWEBÛYÎNA DEMOKRATÎK

1- Di Neteweya Demokratîk De Ferdê Azad-Welatî û Jiyana Komin a Demokratîk

2- Di Neteweya Demokratîk De Jiyana Polîtîk û Xweseriya Demokratîk

3- Neteweya Demokratîk û Jiyana Civakî

4- Di Neteweya Demokratîk De Hevjiyana Azad

5- Neteweya Demokratîk û Xweseriya Ekonomîk

6- Avahiya Huqûqê ya Neteweya Demokratîk

7- Çanda Neteweya Demokratîk

8- Sîstema Xweparastinê ya Neteweya Demokratîk

9- Dîplomasiya Neteweya Demokratîk

10- Mirov Çawa Bibe Şopger û Lêgerê Çareseriya Neteweya Demokratîk

Beşa Heftemîn: PÊXÎRTENGIYA ROJHILATA NAVÎN û ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

A- HÛNANDINA KOMARA TIRKIYÊ

B- HÛNANDINA DEWLETÊN NETEWE YÊN EREB û ÎSRAÎLÊ

C- DEWLETDARIYA NETEWEYA ŞÎÎ YA ÎRANÊ û ROLA WÊ YA LI ROJHILATA NAVÎN

D- LI IRAQ, AFGANISTAN û PAKISTANÊ JIHEVDEKETINA DEWLETA NETEWE û JI BER ŞÊWEYÊ AVABÛNÊ ASÊMAYÎNA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST

E- LI ROJHILATA NAVÎN TEWAZUNA DEWLETA NETEWE û PIRSGIRÊKA KURD

F- LI ROJHILATA NAVÎN ŞERÊN MODERNÎTEYÊ û ENCAMÊN MUHTEMEL

1- Çarenûsa Modernîteya Kapîtalîst a Li Rojhilata Navîn

2- Di Pêxîrtengiya Rojhilata Navîn De Çareseriya Modernîteya Demokratîk

G- LI ROJHILATA NAVÎN ŞOREŞA ZÊHNIYETÊ

ENCAM

GOTINA DAWÎ

LI SER JIYANA MIN A Li GIRTÎGEHA GIRAVA ÎMRALIYÊ

JI SEROKATIYA DADGEHA MAFÊ MIROVAN A EWRÛPAYÊ RE

**DAXUYANÎ**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di bin navê “Manîfestoya Civaka Demokratîk” de parêznameyeke ji pênc cildan amade kir û ev cilda pêncemîn û dawî ye ku ji we xwendevanan re tê pêşkêşkirin. Ji ber ku li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê bi temamî bi biryareke siyasî ji nû ve dadgehkirin hat redkirin ev parêzname bi armanca doza îtîrazê li DMME’yê ji bo dadgeheke jor hatiye amade kirin. Di vê çarçoveyê de muxateb dadgeha li Strasbûrgê ye. Li gorî pîvanên huqûqê yên pozîtîvîst statuya Tirkiyê di vir de ji bo danûstendina nivîsan navbeynkarî ye, û rola wê bi vê bi sînor e. Dema ku dewleta Tirk ji vî sînorî bibihure, eşkere ye ku yek ji mafên bingehîn ên Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan daye mirovên girtî ango mafê xweparastinê hatiye binpêkirin. Dîsa di danûstendinên nivîsan de divê li Tirkiyê serokatiya dadgeheke neteweyî bi dadgeha pêwendîdar re têkildar be. Dadgeha em behsa wê dikin, parêznameya ji Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê re dişîne belkî karibe bixe ber lêpirsînê, lê ji bilî aliyên wê yên teknîkî lêkolînekê bide kirin wê demê ji sînorên xwe yên erkê bihuriye. Serokatiya dadgeha navbeynkariyê dike, nikare naveroka parêznameyê bixe ber lêpirsînê, di vê mijarê de nikare weke saziyeke biryarê dide, tevbigere. Eger vê bike, ev tê wê maneyê ku dikeve qada Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê. Ya divê bike ew e ku bi lez parêznameyê ji saziya pêwendîdar re bişîne.

Bêguman di doza li DMME’yê de ya pêk tê huqûq nîne, berjewendiyên ekonomîk û siyasî yên hêzên komploger in. Jixwe li gorî Rêber Apo gotî, huqûq siyasetek e ku bi pîvanên demdirêj û saziyan ve hatiye girêdan. Siyaseta dewletparêz jî balansa berjewendiyên qirêj diparêze, li ber çavan digire û li ser vî bingehî dimeşe yan jî dide meşandin. Di vê biryara DMME’yê de ev siyaset diyarker bûye. Heman bêhuqûqîtiyê di helwesta AKP’ê de xwe nîşan daye. Hukûmeta AKP’ê ya ku pîvan û rêzikên neteweyî û navneteweyî binpê kirin, ev parêzname bi mehan di destê xwe de girt, ji aliyê pisporên xwe ve lêkola û piştî ku tevdîrên xwe girtin ji DMME’yê re şand. Ji vê jî sosrettir, metna parêznameyê ya ji DMME’yê re hat şandin ne destnivîs e, sûret û fotokopiyeke xirab û hîç girîngî pê nehatiye dayîn, hatiye şandin. Girîngî pê nedane, ji ber ku gelek rûpel di wê rewşê de ne, nayên xwendin. Hinek beşên destnivîsê di fotokopiyê de derneketine. Herweha herî kêm rûpelekî parêznameyê kêm bû ku di encama gelek hewldanan de piştî bi mehan hat stendin.

Rayedarên DMME’yê jî bi heman awayî nêzîk bûne ango ew jî bi heman bêhuqûqî û bêehemiyetiyê nêzîk bûne. Ji ber ku wan jî hîç fikar nekirine û parêzname bi awayekî kêm û weke fotokopî qebûl kirine. Mirov dikare vê rewşê bi tenê bi gotinekê îfade bike û bibêje, ev

sosreteke huqûqî ye. Rewşa ku em behsa wê dikin, bêguman nîşan dide ku dadgeriya li DMME'yê ji formalîteyeke besît wêdetir tiştekî din nîne û ya rastî bi vê xuya dibe ku biryar ji mêj ve hatiye dayîn. Saziyeke dadgeriyê ya evqasî bêhuqûq û bêehemiyet nêzî mijarê bibe, bêguman wê ne bi kêra dozê bê, wê li dijî dozê be. Rêber Apo ji her kesî zêdetir haya wî ji vê rastiyê heye û lewma bawer dike ku mafê xweparastinê yê ku pîroz e, heta dawiyê bi kar bîne. Ew hewl dide bi giştî li dijî şaristaniyê û bi taybetî jî li dijî sîstema kapîtalîst a DMME'yê jî parçeyekî wê ye, nirxên şaristaniya demokratîk û jiyana civakî biparêze ku ji her alî ve sîstema kapîtalîst a qirkirinê ew xistine qebrê. Mijara bingehîn a vê parêznameyê ew e, rûyê rast ê vê sîstema ku ji serî ve 'her tiştê hişk dihelîne' û li dijî pîroziyan hemûyan şerekî xeternak ê tinekirinê dimeşîne, li pêş çavan raxe û xwedî li nirxên azadîxwazî û wekhevîxwaziyê yên demokratîk derkeve.

Rojavaya kapîtalîst ji aliyê DYE û NY'yê ve tê temsîlkirin. Dewleta Tirk jî endamekî wê ye. Helwesta wan a xemsar li dijî gelê Kurd û Rêbertiya wî, hêzê dide dewleta Tirk. Lewma di polîtîkayên xwe yên hem li dijî Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd û hem jî li dijî Rêberê Gelê Kurd de bi awayekî kêfî tevdigere û xwe di vê mijarê de bi temamî azad his dike. Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê destûr da Rêber Apo li Tirkiyê bê dadgehkirin ku ev bi serê xwe komedî bû, û ji nû ve dadgehkirin jî red kir. Vê yekê jî kir ku Hukûmeta AKP'ê Rêber Apo weke rehîn bigire. Çawa ku tê zanîn, kesê rehîn ew kes e ku ji bo wî/wê pîvanên huqûqê pêk nayên anîn û her cure rêbaza êşkencê li ser tê meşandin. Kesê rehîn e, ji garantiya mafê jiyanê bêpar e, mafê wî yê jiyanê misoger nîne. Rehîngirtina mirovekî karekî gangasterî an jî eşqiyayî ye. Dema mirov di vê çarçoveyê de li nêzîkatiya ji bo Rêber Apo binêre, mirov ê bibîne nêzîkatiya Emerîkayê ya demekê bi gotinên 'dewleta eşqiya' dianî ziman li gorî dewleta Tirk e. Lê ji ber ku ev 'eşqiya' qereqola wan a pêş a li Rojhilata Navîn e, çavên xwe li kirinên wê yên li derveyî mirovatiyê digirin.

Çawa ku me berê jî diyarkiribû, pirr eşkere ye ku bi komployê hatiye girtin. Lê belê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê di vê çarçoveyê de ranehişt mijarê, ji ber vê yekê jî bi rastiyan ve girêdayî nema û biryareke adil û durist neda, ev jî hêmanekî girîng ê lihevkirina di navbera Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkiyê de ye. Di biryara bi vî rengî ya DMME'yê de helwesta Ingilîstanê diyarker bû. Çawa ku Rêber Apo jî anîbû ziman, nexasim endamê DMME'yê yê Ingilîz ji bo biryareke rast dernekeve gelekî hewl da û "ji ya xwe nehat xwarê û îddîa kir ku doz li gorî pêvajoya huqûqa navneteweyî ye û gotinên xwe yên di vî warî de jî dane qebûlkirin." Yekîtiya Ewrûpayê ji bo Tirkiyê zêdetir bi xwe ve girê bide, bi awayekî pragmatîk nêzî PKK'ê û Tevgera Azadiyê ya Kurd dibe û ev rastî jî tê zanîn. Heman Yekîtiya Ewrûpayê mîna di polîtîkayên xwe yên Kurd ên ji rêûresmê de, di mijara Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de jî bêperwa çoyê xwe nîşan daye. Yekîtiya Ewrûpayê rêzik û pîvanên xwe yên bi kêra Rêber Apo bên jî pêk neanîne û xwe ji vê dûr girtiye. Dewleta Tirk der barê Rêber Apo de huqûqa xwe binpê kiriye û DMME jî li

hemberî vê xemsar maye. Li devera ku huqûq bi zanebûn bêdeng bimîne, berjewendiyên kirêt, zilm, zordarî û êşkence heye.

Li aliyê din, polîtîkayên Îmraliyê yên ku dewleta Tirk bi tena serê xwe pêk tîne, hene. Rêber Apo ji van polîtîkayan re dibêje Polîtîkayên Millî yên Îmraliyê. Diviyabû mafê Rêber Apo hebûya karibe parêznameya xwe di şert û mercên nehênî de bike ango diviyabû di hevdîtinên wî yên bi parêzeran re karmendekî dewletê amade nebûya û bi tevahî deng qeyd nekirana. Ev mînakeke balkêş e ku pê huqûq tê binpêkirin, lê DMME'yê dengê xwe li hemberî vê jî nekiriye û bi vê helwesta xwe ji 'dewleteke din a eşqiya re' rê vekiriye. Di çarçoveya hunerekî din ê Polîtîkayên Millî yên Îmraliyê de hema hema bi temamî parêzerên Rêber Apo hatine girtin. Bi van girtinan mafê xweparastinê tê desteserkirin û di heman demê de dibe derbeke xedar a ku li doza hînê li DMME'yê dewam dike, dikeve. Ev duwanzdeh sal in ku ev doz dewam dike, lê timî nikare dewam bike ji ber ku gelek caran hatiye qutkirin. Di çarçoveya girtina parêzeran de jixwe parêzerên li DMME'yê parastinê bikin nemane. Ev rewşa ku di dema rejîma Naziyan de jî tinebû, mînakeke balkêş e ku karekterê îmhaker û înkarker ê rejîma li Tirkiyê nîşan dide.

Şert û mercên li Îmraliyê bi serê xwe şert û mercên giran ên tecrîdê ne. Lê tevî vê yekê, Hukûmeta AKP'ê di çarçoveya Polîtîkayên Millî yên Îmraliyê de ev şert û merc girantir kirine û li cezayê hucreyê di nava hucreyê de, ji 27'ê Tîrmeha 2011'an ve pêvajoyeke nû ya tecrîdê daye destpêkirin. Ji wê demê ve, parêzeran nikarîbûye hevdîtinekê jî pêk bînin. Tevî ku doza li DMME'yê dewam dike, hema hema tevahiya parêzeran hatine girtin û hevdîtina bi Rêber Apo re tê astengkirin. Ev hemû baş nîşan didin ka ev polîtîkayên em behsa wan dikin têne çi maneyê. Ji bo astengkirina hevdîtinan hewcedarî bi qanûnê jî nehatiye dîtin û bi temamî weke teserufeke Hukûmeta AKP'ê ketiye rojevê. Ji vî alî ve, helwest siyasî ye, û armanc tesfiyekirina Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd e. DMME û CPT di vê mijarê de bi rola sê meymûnan rabûne. Dîsa Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ku li hemberî bûyereke piçûk bangawaziyê ji bo çalakiyên lezgîn dike, di mijara tecrîdkirina Rêber Apo de hîç gaveke piçûk jî neavêt.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di bin navê Manîfestoya Civaka Demokratî de pênc cild parêzname nivîsîn. Desthilatdariya AKP'ê li dijî Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd şerekî topyekûn ê tinekirinê dest pê kir û di vê de bandora cilda pêncan a bi sernavê **Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk** heye. Ji ber ku parêzname di danasîn û çareseriya pirsgirêka Kurd de pêşniyarên girîng û zelal dike; Hukûmeta AKP'ê bûye xwedî fikar ku ev parêzname hem li ser gelê Kurd hem jî li ser raya giştî ya Tirkiyê bandoreke mezin bike. Lewma şaş nîne ku mirov bibêje, Hukûmeta AKP'ê bi fikar rabûye û şerê topyekûn li dijî Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd daye destpêkirin. Bi tena serê xwe ev rastî piştrast dike ku ti projeya çareseriyê ya Hukûmeta AKP'ê ji bo pirsgirêka Kurd tineye û siyaseta tinekirin û înkarê ya rêûresmê bi awayekî berfireh dewam dike.

Ji ber ku parêznameya di destê me de çareseriya pirsgirêka Kurd pirr eşkere, zelal û şefaf destnîşan dike, bêyî ku em redekteya wê ji Rêber Apo re pêşkêş bikin me xwest em tavilê bi raya giştî û gel re parve bikin. Lewma em neçar man demekê berî demekê bidin çapkirinê. Di rewşeke normal de diviyabû beşên kêm û xwendina wan zehmet bihatana temamkirin; piştî temamkirina redeksiyonê diviyabû careke din ji Rêber Apo re bihata pêşkêşkirin an jî bi kêmanî der barê cihên kêm de jê hin pirs bihatana kirin û piştî sererastkirinan bihata çapkirin. Lê çawa ku gelê Kurdistanê û raya giştî baş dizanin, dewleta AKP'ê bi şerekî topyekûn berê xwe da gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd, herweha tevî êşkenceyeke derûnî û tecrîdeke şidandî hema hema tevahiya parêzerên Rêber Apo girtin û hevdîtinan jî bi awayekî kêfî asteng dikin. Lewma derfet û îmkanên hevdîtinê bi Rêber Apo re nemane. Lewma me hevokên baş nehatin xwendin li gorî hevoka beriya wê û piştî wê bi awayekî maneyê xira neke temam kirin. Hinek cihên vala hebûn ew jî li gorî naverokê hatin temamkirin. Eger di demên pêş de şert û merc çêbibin ango hevdîtin bi Rêber Apo re bibin, em ê van kêmasiyan temam bikin û ji nû ve pirtûkê çap bikin. Lê dîsa jî em bawer dikin ku ji bo bi awayekî giştî parêzname bê fêhmkirin kêmasiyên heyî asteng nînin. Lewma bi vî awayî çapkirina parêznameyê wê kêrhatî be û em weke erk û wezîfeyeke xwe ya girîng dibînin ku demekê berî demekê ji raya giştî û gelê xwe re pêşkêş bikin.

Bi rêz û hurmet....

**16.03.2012**

**DESTEYA REDEKSIYONÊ**

## PIRSGIRÊKA KURD û ÇARESERIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK

### Parastina Kurdên Di Nav Pencê Qirkirina Çandî De

### PÊŞGOTIN

Hegemonya kapîtalîst a li Rojavayê Ewrûpayê hilat, pêşengiya sîstema şaristaniya navendî ya bi koka xwe Rojhilata Navîn xist destê xwe û tevî ku rê li ber felaketên mezin vekir jî hewl da ji nû ve xwe li ser çanda Rojhilata Navîn ava bike. Li ser çanda zêhnî û çanda maddî xebatên hegemonîk meşandin. Bi vê xebatê çandên civakî yên hezarê salan anîn ber tesfiyekirinê. Wê ev yek jî bi saziyên xwe yên sîxur kir. Di serê van saziyan de dewletokên netewe tên. Di bin hegemonya van dewletokan de timûtim tevkujî, mêtingerî, asîmîlasyon, qirkirin û entegrasyona bi darê zorê meşandin. Di dîroka dused salên dawî yên Rojhilata Navîn de nakokiyên binyewî jî hatin bikaranîn û ev saziyên hegemonîk hatin avakirin. Mixabin kes hê jî li serwextbûna van saziyan jî nafikire. Modernîteya kapîtalîst ne bi tenê di şêwazê fikra oryantalîzmê de, li ser tevahiya jiyanê hatiye ferzkirin. Mirov dikare vê bi analîzên berfireh û bi metafora di nava ‘qefesa hesinî’ de rave bike.

Mînak, mîrateyên çandên otantîk ên hezarê salan ên gelên Asûrî, Ermenî, Îon û Gurciyan hema bêje bûne malê muzeyan. Rola modernîteya kapîtalîst a di vê rewşê de li rexnekirinê jî nehatiye vekirin, tevkujî û qirkirinên bi serê wan de hatine anîn li ber fikra diyalektîk jî nehatine rohnîkirin. Jixwe desthilatdariyên bi koka xwe Ereb, Fars û Tirk ên serdest ku xwe weke dewletên netewe ava kirine, li ser çandên civakî yên bi xwe jî weke makîneyeke qirkirinê fonksiyonel bûne û ev jî ji wan rastiyan e ku di tariyê de hatiye hiştin. Kengî destpêkir dewleta netewe ji hev de ket û maskeya wê ket xwarê, ne bi tenê li cografya mêtingehî, li cografya hêza sereke ya hegemonîk jî têra xwe eşkere bûye ku ev saziya li ser navê ‘civak-neteweyên homojen’ tevdigere li gorî karektera wê ya ‘qanûna kara herî zêde’ bi xwe di rengê avahiyeke totalîter-faşîst de ye.

Ev Levîathanê nûkirî yê modernîteya kapîtalîst, der barê Kurdan bi xwe de dikeve şûf û kirasên qet nayên dîtin, her cure dualîteyan ava dike û qirkirina çandî ya her diçe zêde dibe di bin navê ‘pêşketinê’ de ferz dike. Bêguman di sîstema şaristaniya navendî ya bi koka xwe Rojhilata Navîn de sedemên bingehîn ên qirkirina çandî ya Kurd hene; bi tenê mirov nikare bi modernîteya

kapîtalîst ve girê bide. Lê mirov heta rola dused salên dawî yên hegemonya modern a bi koka xwe Ewrûpaya Rojava li herêmê zelal neke, mirov ne dikare rastiya Kurd, ne jî rewşa wê ya bûye kangren ango pirsgirêka Kurd bike têgîn û teorîze bike. Mirov dikare têkiliya Elîta faşîst a 'Tirkên Spî' bi tenê bi rastiya Tirk a li ser bermahiyên rêûresma împaratoriya Osmanî çêbû di warê desthilatdargiriyeke teng de deyne û ev elîta faşîst ji Tirkîtiyê wêdetir ji her cure nexweşên desthilatdariyê yên bê milliyet ava bûye, gelê Tirk jî di navê de li ser tevahiya çandên Rojhilata Navîn weke makîneyeke qirkirinê dixebite. Di vê de, di serî de Ingilîstan, Elmanya, Franse û hêzên din ên sereke yên hegemonîk ên Ewrûpayê xwedî berpirsiyariya diyarker in. Kengî qirkirina Ermeniyan gelek caran dikeve rojevê, bi hêsanî mirov dikare rave bike ku ev Faşîzma Spî ya Tirk weke destik hatiye bikaranîn, lê hêzên hegemonîk ên behsa wan tê kirin xwe nadin ber berpirsiyariya xwe ya di vê mijarê de û guneh hemûyî dixin stûyê Tirkan. Hemin mirov dikare vê jî weke berevajîkirineke bi zanîn rave bike.

Mirov dikare vê rastiyê eşkeretir di qirkirina çandî ya Kurd de bibîne û zelal bike. Ez ê di vê beşa dawî ya parêznameyên xwe de ku ji Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê re pêşkêş dikim, hewl bidim vê rastiyê zelal bikim. Dadgehkirina min a li Girava Îmraliyê, ya rastî li ser navê sîstema dewleta netewe ya Ewrûpayê bi Komara Tirkiyê hatiye kirin. Ango dadgehkirineke bi hêza dewleta Tirk nehatiye kirin. Di vê de rola elîta desthilatdariya Tirk ji taşeroniyê pêve tiştek nîne. Bêguman ev roleke welê ye ku kirêt e, û hişê mirov tevlîhev dike. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov rastiya wê bi duristî îfade bike. Zora desthilatdariyê ya li ser şexsê min û dekûdolabên huqûqî bi israr naxwazên qebûl bikin û bibînin. Bi operasyoneke Gladîo (NATO'ya Veşartî) ya gelekî sergirtî û veşartî ez kirim êsîr. Ev bi awayekî eşkere dihat wê maneyê ku huqûqa gerdûnî û huqûqa Yekîtiya Ewrûpayê dihat binpêkirin. Xusûseke bi vî awayî jî li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê DMME ku divê adil be û di bin berpirsiyariya Konseya Ewrûpayê de ye, dixwazin li dijî min bigihînin encamê. Wer lê hatiye ku di nava ji dusedî zêdetir dozên di heman statuyê yên 'jinûve dadgehkirinê' de bi tenê ya der barê şexsê min de bêyî ku fedî bikin û wijdanê wan biêşe Konseya Ewrûpayê bi Dewleta Tirk re bi awayekî sosret li hev kiriye û qaşo 'li ser dosyayê' gihiştine encamê û li DMME vegerandine. Bi vî awayî qebûl dikin ku beşa herî girîng a dozê temam kirine. Dadgeriya dewleta Tirk bi tevahî pîvanên huqûqa gerdûnî binpê dike û li dijî hukmên qanûnan ên li alî min in, xalên taybet çêkirine. Ev biryar û kirinên wê yên li derveyî huqûqê li benda hukmê DMME'yê ne. Ev duwanzdeh sal in ku bi vî awayî dimeşe. Ev statuya înfazê li ser ti hukimxwarî nayê meşandin. Ev rewşa min, hem bi pîvanên huqûqa dadgeriya Tirk û hem jî bi ya DMME'yê re li hev nake. Ev rewşa neadil û bi ti huqûqê re li hev nake, nîşan dide ku komploya navneteweyî ya li dora dozê di warê huqûqî de tê meşandin û ev jî piştrast dike ku Gladîo hê jî li ser kar e.

Bi vî awayî ji bo ku qirkirina çandî ya Kurd di doza şexsê min de eşkere nebe, dixwazin kirasekî huqûqî li komploya domdar e, bikin. Dixwazin rastiya qirkirina çandî ya li ser Kurdan înkar bikin

û berjewendiyên hegemonya kapîtalîst a Rojava weke dused salên dawiyê dewam bikin. Min parêznameya xwe ya dawî bi awayekî berfireh amade kir. Sedemê wê ew e, min xwest ew lîstika mezin a neo-lîberal a hegemonya kapîtalîst a global di serî de li ser tevahiya gelên Rojhilata Navîn û li ser tevahiya gelên dinyayê hewl dide bilîze hindik be jî deşîfre bikim û maskeya wê ji rûyê wê bînim xwarê. Bêguman di vê de desteka herî mezin min ji rewşenbîrên Ewrûpayî girtiye ku di xurtkirina têgîna heqîqetê de keda wan mezin e. Herweha têkoşînên azadî, sosyalîzm û demokrasiyê yên gelên Ewrûpayê bi fedekariyeke mezin meşandine herî kêm bi qasî tevgerên wan ên entelektuelî hêja ne. Jixwe têgihiştina gerdûnî ya di cewherê parêznameya min de heye, yekîtiya têkoşîna demokrasî, azadî û sosyalîzmê ya rewşenbîr û gelan a bê hev nabin, eşkere nîşan dide. Rêbaza min a bingehîn xwe disipêre têkiliya taybet-gerdûnî ya yekparebûnê.

Ez ji parêznameyên xwe destketiyeke huqûqî napêm. Wan kesên ji wan weha ye gelekî şareza ne, û li hemberî min jî xwedî helwestekê ne ku mîna hovekî, barbarekî berê terbiye dikin, ji vê helwestê jî bêhtir a kirêt û rezîl ew e, bawer dikin ku wê di şexsê min de gelekî, gelê Kurd terbiye bikin. Ez bi vê parêznameyê ne bi tenê vê helwesta wan a bi qasî ku rezîl e, ewqasî zalime jî eşkere dikim, di heman demê de rûyê rastî yê vê sîstema rezîl a pîvanên wê bi ti pîvanên exlaqî yên mirovatiyê re li hev nake û yên xwediyên wê nîşan dide. Ev sîstem û xwediyên wê ne xwediyê rûyekî xwediyê hezar rûyî û ji vê jî wêdetir bêrûtiya rûyan in. Bi vê parêznameyê dixwazim vê rastiyê eşkere bikim. Parêznameyên min di serî de li cografya Anatolya û Mezopotamyayê li ser tevahiya çandên xwecihî yên li cografya Rojhilata Navîn ji sedî sed xwedî bandoreke bi hêz in. Bi vê bandorê çandên xwecihî xwe weke heqîqetekê îfade dikin û bi polîtîkayê xwe azad dikin. Ez yeqîn dikim ku bi van parêznameyên min ji qonaxên çanda mirovatiyê yeka din li dawiyê hatiye hiştin û li ser navê azadî, demokrasî û sosyalîzmê stûneke sereke ango kevirekî çarqozî yê quncikê hatiye danîn û derî li jiyana rastî ya mirovî heta ser piştê hatiye vekirin.

**DESTPÊK**

Eger mirov rabe pirsgirêka Kurd bi rewşa heyî bide naskirin berevajî texmînan gelekî zehmet e. Ji ber ku tevî aliyê wê yê xwecihî yê xweser statuya wê ya gelekî gerdûnî rewşê tevlîhev dike. Gundê Cibinê pênc kîlometir ji gundê me dûr bû. Ez her roj bi peyatî diçûm dihatim dibistana seretayî ya li Gundê Cibinê. Ji bo min pirsgirêka Kurd di wan deman de dest pê kir. Pirsgirêk ji zehmetiyên fizîkî wêdetir çandî bûn. Tirkî zimanekî biyanî û xerîb bû. Di wê demê de cara pêşî dest pê kir, min xwe gelekî piçûk û bêqîmet dît, ji zimanê dayikê Kurdî dûr ketim û min xwe li zimanê xwedî bi îmtiyaz li Tirkî girt. Ez yeqîn dikim ku min dixwest piçûkdîtin û xwepiçûk û bêqîmetdîtina his dikir nîşanî malbata xwe bidim û sûravka vê di serê wan de derxim. Hê jî tê bîra min, xwedîderketina mirîşkê ya li çîçikên wê bala min kişandibû û min ev nîşanî diya xwe dabû. Herhal ev jî ji nakokiya di warê ziman de bû. Kurdîtiya di şexsê malbata min de jî dibû sedem ku ez Kurdîtiyê piçûk û bêqîmet bibînim û ez xwe di nava wê de wisa his bikim. Civaka gelekî nikare bi zimanê xwe binivîsîne û nikare zimanê xwe bi kar bîne heq kiriye piçûk û bê qîmet bê dîtin! Vê diyardeyê bivênevê wê di ruhê min ê zarok de birînên xedar vekirana. Dîsa hê jî tê bîra min, Kurdîtî êdî weke 'dûvikek' bi min ve bûbû û wê kêliyeke bi tenê jî ez rehet nehiştama. Jixwe li derdorê jî gotina 'Kurdê bi dûvik' êdî dihat bihîstin. Ev ji bo min derba duyemîn bû min dixwar.

Ez divê bi bîr bixim ku mekanîzmayên parastinê dualî çêdibûn. Ji bo nûneriya çanda rêûresmê min xwe li dîn digirt û min bi xwe re li derdora deh zarokên dibistana seretayî dibirin û di rê de ji wan re 'îmamtî' dikir. Mirov dikare vê yekê, eşkere weke reaksiyoneke ciddî manedar bike. Ev helwesta min bi heman awayî heta sinifa dawî ya lîseyê dewam kir. Li dijî rêûresma laîk a fermî, ez di pozîsyona dîndarekî hişk de bûm. Ev rewşeke balkêş û xweser bû. Helwesteke parastin û reaksiyonîk bû. Min li derdora sîûsê sûretên Quranê ji ber kiribûn û ev ji bo min mîna sîleheke xweparastinê bû. Hêja ye ku mirov li ser vê rewşa min a sergirtî raweste. Ji ber ku reaksiyona min a pêşî li dijî Kurdîtiyê ye. Li dijî kompleksa xwepiçûkdîtinê sîleha min a duyemîn a herî bi tesîr ew bû, ez timî diviyabû bibim yekemînê sinifê. Ez heta sinifa dawî ya zanîngehê her tim xwendekarekî berbiçav ê mamosteyan bûm û ji vê jî hîç paşve nemam. Ev jî xwenîşandaneke jiberkirî bû; mekanîzmayeke parastinî û reaksiyonîk bû. Mîna ku min dixwest vê îspat bikim: Min hem dixwest piçûkdîtina di warê Kurdîtiyê de ji holê rakim, hem jî nîşan bidim ku ez bi hêsanî teslîm nabim. Ev her tim wisa bû û di vê mijarê de serketî bûm.

Aliyê dînê ji rêûresmê yê xwenîşandanê gelekî bi hêz e. Min xwe ji vê sofîtiya Îslamê dûr kir û bi pirtûka **Alfabeya Sosyalîzmê** xwe avêt dînê laîk sosyalîzmê. Min bi vî kirasî di sinifa dawî ya lîseyê de dest bi vê mirîdiya nû kir. Guhertin di şikil de bû. Ba û hewaya min a mumîntiyê dewam dikir. Ya rastî, salên 1970'î li dinyayê û Tirkiyê ew sal in ku gavên mezin ên guhertinê têne avêtin. Derzên pêşî li pîroziyên modernîteya kapîtalîzmê dikevin. Xwelihevrakişandina kapîtalîzm-sosyalîzmê ya di van salan de xuya dikir bi xwe jihevcudabûneke cîddî îfade nedikir, min bi xwe jî ev weke jihevcudabûneke kûr nedîtibû. Guhertin bi giranî di warê retorîkê de bû. Belkî jî ev rewşa em behsa wê dikin li Tirkiyê ji bo min aliyekî wê yê çarenûsa min biguhere hebû; hisên Kurdîtiyê yên çavkaniya xwe piçûkdîtin û tercîha sosyalîzmê ya weke serîrakirinê xuya dikir, derxistibû holê. Kurdîtî diviyabû ne fedî bikira û ne jî bitirsiya ji bo xwe bi sosyalîzmê nîşan bide. Rewşê ev yek ferz dikir. Min jî wisa kir. Bi vê rewşê re sempatiya min a ji bo komeke çepgir û bi bizdonekî be jî pêbûna min a bi milliyetgiriya Kurd a bi sosyalîzmê bûyî pêvajoyeke manedar dida destpêkirin. Bi vê lezê, komên heyî ez tatmîn nekirim, lewma her ku çû min komeke serbixwe ava kir. Piştre PKK û zêde neçû ezmûnên ARGK û ERNKê û herî dawî jî min pêvajo bi KCKê re rojane kir û ev hemû encama vî ruhî ne ku ez behsa wî dikim. Bi rewşa berbiçav ji bo pirsgirêka Kurd bidim fêhmkirin li derdora çil salî, eger mirov dema sergirtî ya dibistana seretayî û navîn jî lê zêde bike maratoneke pêncî salî derbas bû. Di serî de dê û bav û – ez neçar im bi awayekî dilêşane bibêjim –qaşo bi tevahî mezinên me divê hay ji rewşa rûhî ya zarokên xwe hebin û divê ruhên wan ji sedî sed bi civakbûneke rast têr bikin ku zarok mecbûrî bezên marotonê yên pirr zêde bi êş û bi hêrs ên bi vî rengî neyên hiştin!

Dewlet û civak der barê pirsgirêka Kurd a gelekî berbiçav bûye û derketiye holê de êdî bi heman aktualîteyê li benda çareseriyê ne. Derd cihê xwe dît, niha çareseriyeke têkûz û durist ferz dike. Bi awayê xuya dike, pirsgirêka Kurd weke encama ruhê zarokekî rûmeta wî hatiye şikandin û di nava şert û mercên kêm de çavên xwe vekiriye derketiye holê û ya rastî bi rewşa heyî bi temamî gerdûnî bûye. Pirsgirêk heta di pozîsyona gerdûnî de be, bivênevê mirov ê di çarçoveya gerdûnî de li çareseriyê bigere. Ji bo vê jî divê mirov xwedî zêhniyeteke gerdûnî be. Fîlozofê Elman ê mezin F. Hegel ku hê kes jê nebihuriye, di serê salên 1800'î de ber bi felsefeya gerdûnîbûnê ve çû û ev ne xweber bû, ev yek ji nêz ve bi şertên demê re têkildar bû. Prenstiyên Elman rê li ber pirsgirêka Elman vekiribûn. Bi dagirkeriya Napolyon re ev pirsgirêk ket rewşekê mirov yekcar nikarîbû ji navê derkeve. Ji lewra diviyabû pirsa Elman serê pêşî di warê fikrê de bihata çareserkirin. Rastiya xwe li cem Hegel jî nîşan dayî ev e. Ji wê demê ve, ango ji salên 1800'î ve li derdora dused salî derbas bûne. Piştî evqas sal ji bo parêznameya min a mezin a pêşî bi navê **'Ji Dewleta Rahib a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk Ve'** hatibû gotin bi gavavêtina mezin a felsefî **'Fenomenolojiya'** Hegel re xwedî xisletên wekhev e. Min dema ev gotin bihîstibû ez matmayî mabûm. Herçiqasî gelekî bi sînor be jî min cara pêşî destpêkiribû Hegel fêhm dikir. Diviyabû min jî xwe li gerdûnîtiyê rakişanda. Jixwe ya li ser min dihat ferzkirin û komploya navneteweyî ya bi xwelihevrakişandinên li ser Kurdistanê heman tişt bû, dişibiya Elmanya wê

demê û balkêş e, rê li ber çareseriyeke bi heman rengî vedikir. Gelê Kurd û Kurdistan belkî jî welat û gelê herî kevin ên dinyayê bûn ku pêk hatibûn û herî zêde ew ji xwe hatibûn dizîn û ew bi wan dabûn jibîrkirin. Hêzên hegemonîk û hempayên wan ên hema bêjin bi rola xwedayên bi hêz ên hemdem ên bêmaske radibûn, li ser vî gelî û welatê wî tesarufeke ti pîvan û rêzikê nas nake, dikirin. Ya gelekî zêde diqewimî û dikirin biqewime, qirkirineke çandî ya sergirtîbû.

Ummetparêziya Îslamê, lîberalîzm û kozmopolîtîzma kapîtalîzmê tevî enternasyonalîzma sosyalîzma pêkhatî Kurd û Kurdistanê weke bûyer û diyardeyên bêhêvî û car caran ji vê jî wêdetir bi awayekî mat û vemirî hewl didin bi bîr bixin û mirov vê jî bi tenê dikare bi rastiya qirkirina sergirtî îfade bike. Parêznameyên min jî her diçe weke sê xelekan kûr dibin û ev jî bi vê rastiyê re têkildar e. Di salên 1975’an de cara pêşî bi katibtiya hevrêyê xwe yê bawermend û esilzade Mehmed Xeyrî Dûrmûş min terîfa pirsgirêkê di pêşnûmeya pêşî de nivîsandibû û min nikarîbû ji analîzeke klasîk a emperyalîzm û mêtingeriyê bibihurim. Ya rastî, ya min kiribû danehev û berhevkirineke çor û hişkeber bû. Paşê axaftinên min ên ji bo komên pêşî yên propagandayê jî li ser heman xetê bi heman awayî kûrtir bûn. Krîza sosylîzma pêkhatî, bêguman xeta heyî dixist tengasiyê. Lê hegemonya lîberal a li ser dinya zêhniyetê hatibû avakirin –rewşên çepgir û rastgir jî di navê de- gelekî zehmet bû jê bibihurim û derbas bibim. Ji vê zehmetiyê min dikarîbû bi şerê rûmet û anorê yê li Girava Îmraliyê min li dijî komploya navneteweyî (Gladîo NATO) kirî bibihurim. Jixwe wisa jî bû. Mirov dikare sê xelekên pêşî yên parêznameyên min weke qonaxa derbasbûnê şîrove bike û pênc cild parêznameyên min jî bi awayê dawî weke xwegihandina gerdûnîtiyê destnîşan bike.

Hin têgîn û teoriyên di beşên berê de min hewl dabû rave bikim di **Beşa Pêşî** ya vê cilda dawî de hewl didim bi awayekî xweserî Kurd û Kurdistanê bi rêkûpêk û bi awayekî berbiçav pêşkêş bikim. Herçiqasî weke dubare xuya bike jî bi awayekî bêhtir were fêhmkirin û bi awayekî xweserî pirsgirêkê, çand, şaristanî, hegemonya, desthilatdarî, polîtîka, çîn, netewe, mêtingerî, asîmîlasyon û qirkirin, di şertên modernîteya kapîtalîst de têgînên dewlet, civak, demokrasî û sosyalîzmê têne şîrovekirin û heta cih bi cih hewl didim ji nû ve terîf bikim. Dema ez vê dikim, rastiya civaka dîrokî timî li ber çavan digirim. Bi vî awayî mirov dikare pirsgirêk û rastiya Kurd bi têgihiştineke zelaltir bixe rojevê û çareserkirina wê hêsan dibe. Ez dema behsa hêsankirinê dikim, nexasim mebesta min jê serwextbûna li rastiya qirkirina çandî ya sergirtî û çareseriya modernîteya kapîtalîst a tineye û ya rastî, zelalkirina rola wê ya di qirkirinê de ye. Di warê serwextbûn û têgihiştina li pirsgirêka Kurd de xusûsa herî zêde dibe sedema tengasiyê, têkiliya wê ya bi xwe bi sîstema hegemonîk re ye. Tevlîheviya pirsgirêkê dike ku em ji bo çareseriyê çarçoveya bingehîn a têgînî û teorîk têkûz deynin. Nexasim gelekî girîng e ku mirov têgînên desthilatdarî, dewlet û rêveberiyê bi hosteyî terîf bike. Herweha serwextbûna li têkilî û cihêbûna ji hev a dewlet û demokrasiyê ji bo derîvekirina li mijarê di rola kilîtê de ye. Eger cihêbûna di navbera desthilatdarî û polîtîkayê de rast neyê terîfkirin, ne demokrasî ne jî

çareseriya demokratîk tê fêhmkirin. Danasîna têgînên çîn, gel û netewe jî di çareseriya pirsgirêkên bi heman rengî de xwedî roleke navgînî ya girîng e. Di bingehê van têgînan hemûyan de têgînên dewlet û civakê bi rola sereke radibin. Ji lewra jî divê berî her tiştî ev têgîn bi awayekî zanistî bêne terîfkirin. Divê mirov li têgînên bi vî rengî yên kategorîk terîfa rast a huqûq û exlaqê jî zêde bike. Têgihiştinên dewlet û demokrasiyê yên sosyalîzma pêkhatî ku xwe weke dijberê modernîteya kapîtalîst nîşan dide, divê rast bêne analîzkirin û ji bo zelalkirina mijarê ev yek girîng e.

**Beşa Duyemîn** çarçoveya têgîn û teoriyên heyî ye. Bi alîkariya beşên berê jî em ê karibin bi awayekî xweser û berbiçav nêzî rastî û pirsgirêka Kurd bibin. Rastiya Kurd, şert û mercên hundir û derve yên bi pirsgirêkê ve bi awayekî berbiçav neyên analîzkirin, pêkanîna çareseriyeke berfireh zor e. Li ber rohniya têgînên çand û şaristaniyê biwesifkirina Kurdan dikare mirov gelekî hîn bike. Ev ji bo gelên din jî helwesteke hewce ye. Nexasim mirov weke hebûneke çandî statuya wan a di tevahiya dîrokê de li hemberî şaristaniyan lêbikole, rêbazek e ku dikare di warê terîfkirina rast a Kurdan û pirsgirêkên wan de têra xwe kêrhatî be. Di navbera statuya jeostratejîk-eşîrî û parastina ji qirkirin û asîmîlasyonê de têkiliyeke xurt heye. Di vir de li şûna helwesteke statîk, mirov nêzîkatiyeke dînamîk û pêvajoyî bike bingeh wê di warê ravekirina mijarê de raveker be. Di warê giranbûna pirsgirêka Kurd de belavbûna dused salên dawî ya hegemonya kapîtalîst li Rojhilata Navîn bi roleke diyarker radibe. Mirov heta berjewendiyên sîstemîk ên modernîteya kapîtalîst ji hev dernexe, nikare li vê pirsgirêka girankirî ya gihiştiye heta bi qirkirina çandî, serwext bibe. Çawa ku em di mînaka qirkirina Ermeniyan de jî dibînin, ev rewş dibe ku fena mirov avê li bêjingê bike yan jî avê bikole, tewş û pûç be. Nexasim mirov heta têgînbûna Faşîzma Tirkê Spî ji her alî ve terîf neke, dibe ku mirov ne têgîna komara li Tirkiyê ne jî ya demokrasiyê fêhm bike. Kengî mirov têgîna Faşîzma Tirkê Spî rave bike, mirov hingê dikare têgînên darbeya eskerî û wesayeta wê yê bi hemû giraniya xwe di rojevê de ne û têgînên her cure rejîmên antî-demokratîk û civaka şîddetê baş fêhm bike. Nexasim analîzkirina milliyetgiriya şoven a zêde û sexte ya di bin vê têgînê de û têkiliya wê ya sîxurî û sazîbûnê bi hêzên hegemonîk re di asta kilîta mijarê de ye. Eger ev têgîn rast were terîfkirin, mirov ê karibe li qirkirinên li Anatolya û Mezopotamyayê rast serwext bibe. Herweha ev Faşîzma Tirkê Spî li pêşiya demokratîkbûna Komarê asteng û kelema bingehîn e.

Di **Beşa Sêyemîn** de ez hewl didim Tevgera neteweyî ya Kurd û têkiliya wê bi dewleta netewe re analîz dikim. Mirov dikare bibêje, faktora herî sereke di giranbûna pirsgirêka Kurd de, ne neteweya Kurd weke diyardeyeke navxweyî û analîzkirina rast a têkiliya dewleta netewe ye, ne jî rast serwextbûna li statuya hebûna neteweyî ya Kurd weke diyardeyeke derve li hemberî diyardeya dewleta netewe ye. Mirov çareseriyeke dewletparêz û milliyetgir weke prensîbeke bivênevê bibîne û di asta nexweşiyekê de têde asê bimîne , hingê ev yek faktora sereke ye ku di kûrbûna çaresernebûnê de bi bandor e. Lê ya rastî, mînaka xweseriyê ya di dîroka Rojhilata

Navîn de gelekî pêk hatiye û di roja me ya îro de nexasim jî tevnên federalîst ên demokratîk ên welatên Ewrûpayê di nava xwe de pêkanîne, tevî rastiya muhafezekar a dewleta netewe jî ji bo pirsgirêka Kurd pakêteke dewlemend a çareseriyê pêşkêş dikin. Rast danasîna têgînên xweseriya demokratîk û siyaseta demokratîk di asta kilîtê de girîng in, ji ber ku ji bo çareseriyê di asta bivênevê de girîng in. Di serdema modernîteya kapîtalîst a dawiyê de ferzkirina nêzîkatiyên dewleta netewe yên ji derve û hundir ve wê ji bilî ku bibe dubarekirina çaresernebûna di pirsgirêka Filistîn-Îsraîlê de û heta weke mînakeke nêzîktir weke di federalîzma dewleta neteweya ya Iraqê de ji kûrkirina çaresernekirinê û wêde rê li ber ti encamên din veneke. Jixwe têkiliya van rêbazan bi berjewendiyên hêzên hegemonîk ên kapîtalîst û hevkarên wan re û di encamê de rola wan a di felaketên rê li ber wan vekirî de eşkere ye. Eger di sedsala 21. de zêhniyeta dewletparêz neyê terikandin û navgînên siyaseta demokratîk neyên xebitandin, pirsgirêka Kurd bi tena serê xwe jî dikare sedsaleke din Rojhilata Navîn li berjwendiyên hêzên hegemonîk ên ji rêûresmê re vekirî bihêle. Berevajiyê vê jî rast e. Pêşketina demokratîkbûna li Rojhilata Navîn û bi awayekî demokratîk çareserkirina tevahiya pirsgirêkên civakî, bi ezmûnên çareseriya demokratîk ên li Kurdistanê dibin. Statuya heyî ya Kurdistanê, dihêle bi neteweyên cîran ên bingehîn ên herêmê re ango bi neteweyên Tirk, Ereb û Fars re, tevî van bi hêmanên hundirîn Ermenî, Suryanî û Tirkmenan re xwedî yekîtiyeke dîrokî ya çarenûsî be, û çareseriya demokratîk a li Kurdistanê dibe ku bi bandoreke domîno li tevan belav bibe. Çareseriya Demokratîk a Kurdistanê çareseriya Demokratîk a Rojhilata Navîn bi xwe re tîne.

Di **Beşên Çaremîn, Pêncemîn û Şeşemîn** de li ser diyardeya PKK'ê disekinim û hûrdikolim. PKK gihiştiye statuyekê ku rojane dikare çareser bike, û herî kêm bi qasî rola xwe ya derxistina holê ya pirsgirêkê, bi statuya xwe ya li ber rewşeke krîtîk radiwest e, girîngiya analîza wê xwe bi giranî ferz dike. Di dîroka PKKê de gelekî girîng e ku têra xwe li pirsgirêka Kurd serwext bûye û ji nêzîkatiyên dewleta netewe bihurî ye, lê bi qasî vê ya girîng ew e, divê tevahiya hêzên siyasî û dewletên Rojhilata Navîn fêhm bikin ku PKK veguheriye avahiyeke çareserkertir. Bi gotina 'terorîst' etîketkirin bi zêdeyî dibe sedema xetimîna çareseriyê û ev gotin zirarê dide xwediyên xwe jî. Modela xweseriya demokratîk a PKK dixwaze bi KCKê berbiçav bike, ne bi tenê ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd û Kurdan, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakên Ereb, Tirk, Îran, Afganistan, Qafqasya û komên din hemûyan ên xwedî heman pirsgirêkan jî modela çareseriyê ye û bi girîngiya manûnemanê radibe.

Di **Beşa Heftemîn** de statuya pirsgirêka Kurd a li gelemperiya Rojhilata Navîn, û bi armanca serwextbûna li vê pirsgirêkê, wê bi bûyerên li herêmê di zikhev de û di nava yekparebûnê de, bi kurtî be jî pêxîrtengiyên roja îro li Rojhilata Navîn û ji bo ji vê pêxîrtengiyê bihurîn derfetên çareseriyê yên teoriya modernîteya demokratîk têne nirxandin. Ji bo vê jî rola hêmanên modernîteya demokratîk di kûrkirina pêxîrtengiyê de tê lêkolîn û li hemberî vê jî ez hewl didim hêza çareseriyê ya hêmanên modernîteya demokratîk pêşkêş bikim.

Di **Beşa Heştemîn** de ku beşa Encamê ye, alîkariya muhtemel a ku Şoreşa Kurdistanê li ya gerdûnî bike, tê nirxandin. Ji bo vê jî li ber rohniya terîfa xwecihî-gerdûnî û taybetî-giştî, encamên herêmî û global ên çareseriya şoreşgerî ya pirsgirêka Kurd di çarçoveya herdu modernîteyên cihê de careke din bi kurtî têne nirxandin û bi vî awayî parêzname bi vê cilda dawî temam dibe.

Min parêznameya xwe cara dawî bi vê naverokê bi bûyerên pratîk di zikhev de pêşkêş kir. Ev rastî, rewşek e ku kêm caran tê dîtin. Ez ê behsa zehmetiyên jiyana xwe li Îmraliyê nekim. Lê hem dewletê û hem jî Tevgera Azadiyê ez neçarî rola rêbertiyê kirim û eşkere ye ku vê yekê tengasiyên min qat bi qat zêdetir kirin. Gelek rewşenbîr xapiyan ku ez li giravekê û di nava dorgirtina dewletê de bi tenê dikarim hevkartiyeke besît bikim. Ji lewra jî gelek şîroveyên şaş û neheq kirin. Heta di nava PKK'ê bi xwe de hinek kes welê şaş fikirîn ku bawer dikirin ez ê bême bêtesîrkirin, lewma nirxên herî hêja yên jiyanê bi awayekî nedîtî bêperwa parçe kirin, mirov dan revandin û kirin ne tiştek û ji vê xwe paşve nedan. Hem jiyana min, hem jî asta têkiliyên min têra xwe eşkere ne. Ez yeqîn dikim ku ez rexneyeke manedar gelekî heq dikim. Eşkere ye ku ne bi tenê yên Komara Tirkiyê, pirsgirêkên giran ên gelek dewletên bi heman rengî yên dewletên netewe yên kapîtalîst li Rojhilata Navîn, em ê nikaribin bi mentiqê hilweşandina dewletê ji wan bibihurin. Jixwe ezmûna Sovyetê li ber çavan e. Çartî hilweşand û li şûna wê rejîma xwe ya dîktator ava kir. Di vê ezmûnê de gelek xisletên mirov jê dersê bigire hene. Ezmûna Çînê jî xwediyê heman modelê ye. Ji bo krîzên herî giran ên hegemonya global a fînansê ya faşîst û herî paşverû dewam bikin, hema bêje bi rola sereke rabûye.

Ez dixwazim vê bibêjim: Ezmûna sosyalîzma pêkhatî varyanteke dewletparêz a paşverûtir a lîberalîzma kapîtalîzmê bû, ji ber ku têra xwe îspat bûye ku bi kêmanî ji bo qutbûna ji modernîteya kapîtalîst şaşiyên bingehîn ên di binyeya wê de nehiştine bernameyên rast ên taktîk û stratejîk bêne pêşdebirin. Lê ev rastî nayê wê maneyê ku têkoşîna ji bo azadî, demokrasî û sosyalîzmê hatiye kirin li ber avê çûye. Berevajî, piştrast kiriye ku li dijî sîstema şaristaniya navendî ya ku çavkaniya hegemonya kapîtalîst e, tevahiya dîrokê ezmûnên demokratîk, azadîxwaz û sosyalîst her hebûn û ezmûnên bi vî rengî di roja îro de jî dikarin xwe weke modernîteya demokratîk cihêwaz bikin û weke alternatîf têxin rojevê. Kapîtalîzma global a fîransê weke di serdema xwe ya herî bi hêz de xuya dike, lê ya rastî nîşan dide ku sîstem di rewşa xwe ya herî qels de ye, nikare dewam bike û xetimî ye. Rawestgeha herî dawî ya modernîteya kapîtalîst gihiştiyê mêtinkariyeke bêsînor, li dervebûna civakê û jiyaneke li derveyî mirovatiyê ya ji hovîtiyê wêdetir e. Sîstema kapîtalîst bi tenê di civakê de rizîn û jihevdeketinê pêşde nabe, rê li ber talana xwezayê jî vedike, ji teorîkbûnê wêdetir diyardeyek e ku rojane bi awayekî pratîk pêk tê. Parêznameya min bi xwe li dijî vê kapîtalîzmê hatiye çêkirin. Jixwe jiyana fizîkî ya li Îmraliyê ji aliyê hêzên hegemonîk ên vê serdemê (NATO-Gladîo Veşartî) bi cih hatiye anîn û bi tevahiya kirêtî, bêexlaqî û bêhuqûqiya xwe li naverastê ye.

Min parêznameya xwe bi nivîskî pêşkêşî Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê DMME kir. Sedema bingehîn a ku ez ber bi vê yekê ve ajotim ew e, ruhê min ê zarokatiyê li hemberî piçûkdîtin û xwemezinkirinên sexte dîsa helwesta xwe ya isyankar di dema xwe ya dereng de be jî bêyî ku tiştek jê kêm bibe nîşan daye, û piştrast kiriye ku dixwaze israra xwe ya mirovmayînê bi şêwe û cewherê civakî yê guncaw dewam bike.

**Beşa Yekemîn: ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ Û TEORÎ**K

Di civaknasiyê de heta teorî û têgînên bingehîn neyên terîfkirin, zehmet e ku şîroveyên manedar bêne pêşdebirin. Civaknasî di mijara xwedanasînê de jî ji fikreke hevpar dûr e. Di her qada her zanistê de krîz hene, lewma di rewşeke welê de xwestina hukmên vebirrî di qada civaknasiyê de hewldaneke manedar nîne. Ya pêdivî pê heye, terîfeke rast a diyardeya civakî ye. Ji bo naskirina civakê ji texmînan jî wêdetir pêdivî bi daneheveke agahiyan a manedar a di asta herî jêr de heye. Mirov çiqasî hewl bide civakê nas bike, mirov bi paradokseke welê re rûbirû dibe nezanîna wî ewçend kûr dibe. Civak di pêşketina ferdê mirov de çiqasî diyarker be, li pêşiya pêşketina wî jî ewqas asteng e. Paradoksa civakî ev e. Komintiya ferdperest a lîberalîzm wê xurt dike û ferdê wê hişk girê dide, bi pîvanên heman rengî berevajî ye, û bi maneyeke taybet ji jiyanê hatiye qewitandin. Mirov bi ferdên bi vî rengî nexweş nikare civakê bide naskirin. Mixabin, mirovatî heta roja me ya îro ji bandora van herdu rewşan xelas nebûye. Bi vê paradoksa civakî mirov çiqasî dikare zanistê bike, ev mijarek e ku têra xwe li guftûgoyê vekiriye. Ji bo zanist were kirin, şertê bingehîn mejî ye. Ew jî bi tenê bi civakê bi ziman dibe û ber bi qonaxeke pêş ve xwe çeng dike, lê çawa ji wê qonaxê bihurî dîsa hebûna civakê pêşiyê lê digire. Bi vî awayî diyardeya heqîqetê têra xwe îzafî dibe. Tam jî di vê nuqteyê de baweriya dogmatîk an jî fikir hişk dibe, û dike ku mejiyê mirov ji ruhberên herî paşvemayî jî bêhtir bêhis û korfêhm bibe. Wexta ku mirov berfirehbûna civaka dogmatîk li ber çavan bigire, îzafiyeta zanistê gelekî xwe dide hiskirin.

Tevî ku ne pêkan e, mirov bi tevahî ji paradoksa civakî bibihure jî dikare hinekî jê bibihure û xwe bigihîne asta zanînê. Di vê rewşê de mirov herî zêde dikare der barê jiyanê de bibe xwedî agahî û zanînê. Jiyan weke xwezaya li xwe serwextbûyî, dikare mirinê bêmane bike. “Şerê zindiyan ê zêdebûnê, xwexwedîkirin û bergiriya wan kengî dikare bisekine an jî bi encam bibe?” Eger em pirseke bi vî rengî bikin, diyar e ku wê bersiva wê ya herî bi zanîn weha be ‘kengî xweza li xwe serwext bibe’. Em ji vê re dikarin ‘gerdûnîtiya dawî’ bibêjin. Herçiqasî hûn bifikirin ku ez ketime nava kirdarîparêziyeke giran jî ez dikarim bibêjim, her tiştê xuya dike, tê zanîn û hiskirin bi mirovê îzafî bi sînor e. Ji lewra xwezayeke bi vî awayî li xwe serwext dibe, cihê guftûgoyê ye ka çiqasî pêkan e ku gerdûnîtiya wê were temsîlkirin. Lê li derveyî ‘mirov ê weke xwezaya li xwe serwextbûyî’ hebûna gerdûnîtiyekê cihê guftûgoyê ye. Li derveyî aqlê mirov ê weke xulaseyeke zindiyên dinyayê ye, gerdûn çiqasî li guftûgoyê vekirîbe, ev aqlê mirov bi xwe jî çiqasî temsîla

gerdûnê dike, dîsa ewqasî li guftûgoyê vekirî ye û mirov dikare bibêje bi vî awayî em dîsa dikevin nava paradoksekê. Lê dora tevahiya çarçoveya heqîqetê bi vê paradoksê hatiye pêçan. Ji vê, encama divê mirov derxe ev e, karekterê îzafî yê zanînê û têkiliya wê ya xurt bi xwezaya civakî re ye. Ji lewra mirov dikare ji krîza di cîhana zanistê de bi mitalekirina li ser xwezaya civakî û têkilîdanîna wê ya estetîk, exlaqî û rast bi Xwezaya Yekemîn û Sêyemîn re bibihure û ew jî dîsa îzafî dibe.

**A- ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ**

Danasîna du têgînên bingehîn çand û şaristanî bi sedema têkiliya wan a bi mijara me re û analîzkirina wan ji bo xwezaya civakî dikare pêşî li me veke û em pê ber xwe bibînin. Mirov dikare têgînên din jî piştre li pey hev terîf bike.

**1- Çand**

Em bi awayekî giştî dikarin çandê weke yekparebûna tevahiya manedan û avahiyên civaka mirov di pêvajoya dîrokî de pêk aniye bidin naskirin. Em avahiyên pêkhatine, weke tevahiya saziyên li veguherînê vekirî ne, didin naskirin û manedanan jî dikarin weke asta naverok an jî manedanê ya bi hev re ya saziyên vediguherin ên dewlemend û cûrbicûr bidin naskirin. Em bi teşbîhekê dikarin baştir bidin naskirin. Mirov avabûnê dikare weke çarçoveya berbiçav a avahiya maddî, maneyê jî weke qanûna wê ya bi fikir, bi his, naveroka berbiçav a çarçoveyê û ya wê dilebitîne diyar bike. Em dikarin bibêjin, em li vir nêzî têgînên Hegel ên ‘xweza’ û ‘geist’ê bûne. Nexasim mirov dikare bibêje maneya Hegel dused sal berê li van têgînan bar kiriye û naveroka danasîna wî ya van têgînan bi pêşketinên zanistî yê piştre dewlemendtir bûye.

Di çarçoveyeke teng de jî têgîna çandê tê terîfkirin. Em li vir hewl didin, çandê zêdetir weke mane, qanûna avahiyê û zindîtiyê diyar bikin. Wexta em behsa civakê dikin, em di çarçoveyeke teng de çandê weke cîhana maneyê ya civakê, qanûna wê ya exlaq, zêhniyet, huner û zanista wê terîf dikin. Di vê çarçoveya teng de saziyên polîtîk, ekonomîk û civakî têne yekkirin û di çarçoveyeke berfireh de danasîna giştî ya çandê tê kirin. Ango li ser vî bingehî weke naverok û sazî maneya xwe hebe, mirov dikare weke hebûn behsa civakê bi xwe bike. Eger bi tenê behsa civaka sazî yan jî manedayî were kirin, têra xwe mirov pê dixape. Civakeke taybet têra xwe gihiştibe asta sazîbûn û manedanê, dikare weke hebûn bibe xwedî nasname û bê binavkirin. Bi tenê behsa civaka manedan an jî sazîbûnê were kirin û di nava civakên bi vî rengî de fikirîna li jiyaneke mirovane, çawa di tevahiya civakên dîrokê de hatiye gotin, wê weke şaşî, jirêderketin, bêexlaqî û kirêtî were qebûlkirin û mehkûmkirin.

Piştî ku civakek ji aliyê sazîbûnê ve were belavkirin, mirov êdî nikare behsa maneya wê û çanda wê ya teng bike. Di rewşeke wisa de sazî weke taseke avê ya tijî ye. Piştî ku tas şikiya, eşkere ye ku mirov nikare behsa avê bike. Eger mirov behs bike jî ew av êdî ne ji bo xwediyê tasê, ji bo

erdên din an jî xwediyên qabên din herikî ye, û bûye hêmaneke jiyanê. Encama jidestdana zêhniyet, estetîk û maneya civakî bêhtir xeternak e. Di rewşeke wisa de mirov dikare behsa rewşa zindiyên serê wan hatine firandin û bi tenê di cihê xwe de diperpitin bike. Civakeke cîhana xwe ya estetîk û zêhniyetê jidestdayî dişibe berateyekê ku ji rizînê re, bi awayekî hovane ji parçebûn û xwarinê re hatiye terikandin. Ango ji bo mirov civakekê weke çand bide naskirin, şert e ku mirov ji sedî sed wê di nava yekparebûna manedan û sazîbûnê de binirxîne. Di vê mijarê de mînaka herî berbiçav rastiya civaka Kurd e ku gelekî dramatîk pêk tê. Ji ber ku hem ji aliyê sazîbûnê, hem jî ji aliyê jidestdana zêhniyet û manedanê ve gelekî hûrhûrî parçe bûye, mirov dikare civaka Kurd weke 'civaka ji aliyê çandî ve hatiye qirkirin' bide naskirin.

**2- Ziman**

Têgîna ziman têkiliya xwe xurt bi têgîna çandê re heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyeke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya zêhniyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zêhnî ya mane û hisê ya serwextbûyî ye, bûyî xwedî îfadeyê. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jiyanê. Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketîbûna jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêşde dibe. Dîsa çiqasî zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin hegemonya zimanên din, ev jî tê wê maneyê, ewqasî hatiye mêtin, qirkirin û asîmîlekirin. Civakên xwediyê vê rastiyê jiyaneke wan a manedar a zêhniyet, exlaq û estetîkê nabe û eşkere ye ku heta ji holê rabin wê weke civakeke nexweş mehkûmê jiyaneke trajîk bimînin. Civakên mane, exlaq û estetîka xwe ji dest bidin, nirxên wan ên civakî jî bi tenê ji bo nirxên mêtinkaran dibin maddeya xam a bikaranînê. Weke encam mirov dikare bibêje; mînak ziman weke li cem Kurdan be, civakeke di vê rewşê de ji aliyê maddî ve wê heta dawiyê xizan bibe û bikeve rewşeke parçeparçebûyî ango gelekî eşkere ye ku ji aliyê mane, exlaq û estetîkê ve wê bi şaşî, xayîn û kirêt bijî û nikaribe ji vê rewşê xilas bibe.

**3- Şaristanî**

Têgîna şaristaniyê zêdetir têgîna çanda giştî ya civaka di qonaxa çîn, bajar û dewletê de terîf dike. Çînbûn, bajarbûn û dewletbûn kategoriyên bingehîn ên civaka şareza ne. Civaka li vir civaka çînbûyî, bajarbûyî û dewletbûyî ye. Pêşdeçûna berbiçav û dîrokî bi xwe re di nava civaka klan û qebîleyên wekhev de diyardeya çînbûnê, li ser civaka gund-cotkariyê bajarbûn û ji nava civaka hiyarerşîk jî dewletbûn pêk anî û ev diyarde şaristaniyê karekterîze dikin. Civaka şareza li têkiliya sîmbiyotîk a di çarçoveya xweza-civakê de zêdekirî, di nava xwezaya civakî de têkiliya hukimraniyê ye ku yekalî pêş dikeve û her diçe weke nakokiyeke dijwar xwe nîşan dide û berbiçav dibe. Di nava civakê de avahî, manedan, exlaq û hisên estetîk ên cuda pêş dixe. Şaristanî ji bo civakê bûyereke erênî yan jî neyênî ye, mijarek e ku gelekî nîqaş li ser tê kirin. Li

gorî kesên dîrok bi çavên serwer û mêtinkaran ava kirine, şaristanî bûyereke mezin a dîrokî ye, û heta dîrok bi xwe ye. Lê li gorî kesên di bin mêtinkarî û zordestiyê de şaristanî felaketeke mezin e, û jidestdana utopya cennetê ye. Ya rast jî ev e. Civakek hûrûkûr xwediyê vê nakokiyê be, li gorî xwezaya civakî wê têde fikir, exlaq û hisên estetîkê cuda bibin. Pêkhatina cîhana mane û saziyên bi nakok û parçebûyî li gorî karektera şaristaniyê ye. Şer herî zêde vê rastiyê îfade dikin. Hebûna çalakiyên civakî yên mîna şer ku di wan de tinekirinên fizîkî gelekî hene, civakeke hûrûkûr hatiye parçekirin dikarin îfade bikin. Parçebûna maneyê jî şerê îdeolojîk îfade dike û ev jî di civaka şareza de bi qasî şerê fizîkî şerekî bi bandor ê hegemonîk e. Civaka şareza aliyên xwe yên cuda yên bi nakok li hêlekê bi şerên îdeolojîk, fizîkî û saziyan nîşan dide, li hêla din jî xwe paşve nadin xwe weke yekparebûna hîmên têkûz ên avahî û maneyên serwer û domdar îfade dikin. Îddîa dikin ku civaka rastî ji wan pêk tê û civak bi vî awayî heye ango dibe heyî. Serdema şaristaniyê di nava xwe de çiqasî kirasên dem û dewranan, kirasên sazî û maneyan li xwe bike jî maneya wê ya bingehîn her weke xwe dimîne.

Di pêşdeçûna civaka şareza de diyardeyeke bingehîn a mirov çavdêriya wê dike ew e, civaka şareza di nava wê civakê de ku têde mezin dibe, wê bi mekanîzmayên mêtinkarî û zorê her diçe dadiqurtîne, dihelîne û bi vê diyardeyê ve girêdayî têkiliya ekolojîk-sîmbiyotîk a bi Xwezaya Yekemîn re dike ku hev berde, hildiweşîne, wê ji xwe re vediguherîne bi tenê çavkaniyê, wê dimije û her diçe diqedîne. Di rewşeke wisa de mijareke rojane dikeve rojevê, ew jî ev pirsgirêk e, gelo civak wê bi nakokiyên hundirîn, yan jî bi nakokiyên ekolojîk ji hev belav bibe. Ya rast jî ew e, eger di şaristaniyê de veguherîneke bi kok û erênî çênebe, di hukimraniya herdu nakokiyan de Xwezayên Yekemîn û Duyemîn wê felaketên mezin bibînin û wê nikaribin ji vê xilas bibin. Dibêjin civak bêyî şaristanî nikarin bijîn, civakên şareza civakên dewlemend û bi hêz in. Nirxandinên bi vî rengî îdeolojîk in, û zêdetir paradîgmaya elîta yekdestdar a tehekumkar û mêtinkar nîşan dide. Asta çînbûn, bajarbûn û dewletbûn gihiştiyê, li gorî tevahiya derdorên zanistê yên bi bandor weke kansêr û penceşêreke civakî (kansêr û penceşêra biyolojîk jî bi vê rastiyê re têkildar e) tê nirxandin. Li ser vê mijarê têra xwe nîşane hene. Çêkirina sîlehên nukleer, hilweşandina hawîrdorê, bêkariya ji ber sîstemê zêde dibe, civaka zêde dixwe, zêdebûna pirr a şêniyan, kansêra biyolojîk, nexweşiyên cinsî û qirkirinên zêde dibin hin ji van nîşaneyên sereke ne. Ji lewra modernîteya-şaristaniya demokratîk a ku wê şaristaniya heyî ya bi kansêr û bi nakok ji karektera wê ya tehekumkar û mêtinkar derxe û veguherîne, her diçe xwe weke alternatîf û rêya rizgariyê ferz dike. Ya rast ew e, divê mirov hilweşîna şaristaniya kevin weke hilweşîna tevahiya şaristaniyê nebîne, weke pêşxistin û serekebûna şaristaniya demokratîk binirxîne. Di vê rewşê de ya girîng ku divê mirov zanibe ew e, çandên civakî bêhtir mayînde ne, di wê hêzê de ne ku dikarin şaristaniyan veguherînin, hem dikarin şaristaniyan cuda bikin û veguherînin, hem jî ji wan tê şaristaniyan ji binî ve veguherînin. Eger di civakekê de şaristanî hilweşe, divê ev weke zirar û ziyanekê neyê dîtin, berevajî, eger ji aliyê manedan û avabûnê ve rê li pêşketina çandê vekiribe, mirov dikare vê hilweşînê heta dawiyê weke pêşketin

û bûyereke erênî qebûl bike, hukim bide. Eger rê li ber veguherîna şaristaniyê vekiribe, mirov dikare vê pêşketin û bûyerê weke rizgariyeke temam û xwegihandina jiyaneke azad şîrove bike.

**4- Desthilatdarî**

Têgîna desthilatdariyê di serê wan têgînan de tê ku herî zêde di warê jihevderxistina rastiya civakî de rê li ber zehmetî, şaşî û nakokiyê vedike û mîna ku ji aliyê naverok û şêweyê ve ji bo neyê naskirin li ber xwe dide. Hakimiyeta di xwezaya wê de xwe di danasîna wê de jî nîşan dide, li hemberî danasîneke bi rastî li ber xwe dide, xwe nade dest. Mîna ku nutr e, lê dest jê nabe û fena diyardeyeke xwedayî xwe dike giştî û bi vî awayî xwe mutleq dike. Mirov dikare desthilatdariya civakî jî bi awayê herî rast weke mêtinkariya zêde ya ekonomîk û potansiyela hêzê (derfetên hêzê) bide naskirin. Desthilatdarî potansiyela hêzê û mêtinkariya mîna genetîkê (mîna DNA'yê) bûye xwedî karektereke kombûyî ya di tevahiya çaviyên civakê yên mejî û avahiyên wê de ye, hêzên civakî yên ev mekanîzmaya desthilatdariyê xistine destê xwe jî bi awayekî berbiçav dewleta dîrokî, elîtên mêtinkar û çînên wan pêk tînin. Gelekî girîng e ku mirov desthilatdariyê timî weke derfeta kanên potansiyela pêkhatinên dewlet û çînan fêhm bike. Kengî potansiyela desthilatdariyê berbiçav dibe, her çi dewlet û elîta hukim lê dike çîna mêtingeh a civakî ya xwe disipêrinê (koledar, feodal, bûrjûwa û hwd.) pêk tînin. Mirov dikare desthilatdariyê hem fizîkî, hem jî weke potansiyela hêzê ya entelektuel jî bifikire. Li ser civakê xwe weke hewcedariyekê, mutleq û domdar ferz dike. Yek ji sedemên din ên girîng ê vê yekê jî ew e, xwe bi pêdiviya rêveberiya xwezayî ya civakî re wekhev dibîne. Kengî desthilatdariyê xwe bi diyardeya rêveberiyê re kir wekhev, hingê xwe dike ku dest jê nebe. Dema ku desthilatdarî ji pêşengiya civakî ya xwezayî hat veqetandin, wê baş were dîtin ku desthilatdarî çawa weke girêkeke kansêrê çiziriye binyeya civakî û lê belav bûye.

Girîng e ku mirov cudahiya di navbera dewlet û desthilatdariyê de jî bibîne. Desthilatdarî li civakê zêdetir belav e, û çiziriye tevahiya çaviyan, lê dewlet nasnameyeke desthilatdariyê ya bêhtir teng û bi pîvanên berbiçav îfade dike. Dewlet şêweyekî desthilatdariyê ye, zêdetir di kontrolê de ye, bi pîvanan ve hatiye girêdan, her diçe huqûqî dibe û di warê xwerewakirinê de nazik tevdigere. Mirov dikare desthilatdariyê weke rewşa hukimraniyeke giştî binirxîne û ji bo rewşa bêdesthilatbûnê jî mirov dikare weke koletiya giştî hukim bide. Şêweyên koletî û desthilatdariyê yên cuda bi xisletên giştî yên dewletê ve girêdayî ne, û ji wê feyza xwe digirin. Mirov dikare li ser wan weke dijberê azadiyê hukim bide. Di civakê de çiqasî potansiyela desthilatdariyê hebe, ewqas jî civak ji azadiyê bêpar dibe. Desthilatdarî çiqasî were kêmkirin, ewqasî rewşa azadiyê pêş dikeve. Divê mirov gelekî hay ji hesreta ji bo desthilatdariyê ya di nava civakê de hebe. Ev hesret û bêrîkirin çiqasî belav be, ewqas jî wê despotokên civakî zêde bibin. Ev jî dikare bi tevahî demokrasiyê biqedîne. Despotî nexweşiyeke desthilatdariyê ye. Kengî li derveyî kontrolê bimîne, çawa di mînaka Hîtler de jî hat dîtin, dikare har bibe û bibe

cinawirekî serî pêre derxistin zehmet be. Despotîzm di dîrokê de ji nava şêweyên rêveberiyê yên keyfî derdikeve û weke girêkên faşîzma civakî bi cih dibe. Di pêvajoyên desthilatdariya kapîtalîzmê de dikare bi lez mezin bibe, li tevahiya çaviyên civakî belav bibe û weke rêveberiya hêza totalîter a civakê bi gewde bibe. Şêwegirtina desthilatdariyê bi awayê dewleta netewe têkiliya xwe bi rejîma kapîtalîst-faşîst heye û rewşa wê ya pêşek îfade dike.

**5- Rêveberî**

Ji bo mirov ku neyêniyên çavkaniya wan têgîna desthilatdariyê ye, û miyopiyên di vî warî de ji holê rake, rast danasîna têgîna rêveberiyê girîng e. Rêveberî jî diyardeyeke weke çandê ye di civakê de domdar e. Eger mirov bi awayekî giştîtir bibêje, di asta gerdûnî de û nexasim di gerdûna biyolojîk de bi kulmozbûna rehên zîro û pêşketina mejî re dişibin hev. Rêveberî birêkûpêkiya di gerdûnê de, rewşa rizgarbûna ji kaosê îfade dike. Di civakê de rewşa pêşketî ya xwezaya xwedî mejiyê nerm ê manedanê, bi xwe re pêşketina erka rêveberiyê tîne. Mirov dikare ji mejiyê civakî re rêveberî bibêje. Di vê rewşê de girîng e ku mirov têgînên xwerêvebirin û rêveberiyên biyanî ji hev derxe. Xwerêvebirin erka di xwezaya xwe ya civakî de bi rêkûpêk û kontrol dike, bi vî awayî domdariya xwe pêk tîne, xwedîkirin û bergiriyê misoger dike. Rêveberiya biyanî xwe weke desthilatdarî ‘xwezayî’ dike û civaka pêwendîdar ji rê derdixe ango serê wê jê dike, bi vî awayî ji xwe re wê civakê dike mêtingeh û dike ku karibe wê rêve bibe. Ji lewra mirov dikare bibêje, ji bo civakekê xwerêvebirin bi qasî manûnemanê girîng e. Civakeke ji xwerêvebirinê mehrûm bibe wê bibe mêtingeh û weke encama vê yekê ya xwezayî wê bi asîmîlasyon û qirkirinê di nava pêvajoyê de bivênevê tine bibe.

Rêveberiyên xerîb û biyaniyê xwe ne, şêweyê desthilatdariyê yê herî zordar û mêtinkar temsîl dikin. Ji lewra ji bo civakekê wezîfeya herî heyatî, exlaqî, zanistî û estetîk ew e, xwe bigihîne hêza xwerêvebirinê. Civakek ku di vê wezîfeyê de bi ser nekeve nikare ji aliyê exlaqî, zanistî û estetîk ve pêş bikeve û pêşketina sazîbûna wê ji aliyê ekonomîk û siyasî ve biqede. Ya girîng ew e, erka rêveberiyê rê nede ku ber bi desthilatdariyê ve biçe, li aliyê din jî heta dawiyê li dijî bêrêveberiyê li ber xwe bide. Divê mirov rêveberiyê neke desthilatdarî û ji vê jî girîngtir, divê mirov cihêwaziyên desthilatdariyê yên rêveberiyê ji destê wê bigire. Desthilatdarî çiqasî antî-civakî be, rêveberî jî ewqasî erkeke civakî ye. Civakî bêyî erk nikare bibe xwedî pêşketina exlaqî, estetîk û zanistî. Di çarçoveyeke teng de çand çênebe, di çarçoveyeke berfireh de pêşketina ekonomîk û siyasî jî nabe. Di rewşeke welê de ya pêk bê, civak wê bi mêtinkarî, asîmîlasyon û qirkirinê biqede.

Rêveberiya desthilatdariyê çiqasî antî-demokratîk be, xwerêvebirin jî ewqasî têkildarî rêveberiya demokratîk e. Rêveberiyên xwerû yên desthilatdariyê çiqasî dijberiya demokrasî û dûrkirina civakê ji rêveberiyê îfade dikin, xwerêveberî jî çiqasî civakê tevlî rêveberiyê bikin ewqasî demokratîkbûnê îfade dikin. Di vê rewşê de mirov dikare demokrasiyê weke tevlîbûna civakê ya

xwerêvebirinê bide naskirin. Xwerêveberî timî têkiliya xwe bi civakê re heye û mirov nikare wan bêtevlîbûnê bifikire, ji ber ku di xwezaya wan de demokrasî heye. Erê demokrasî têgînek e ku para bêhtir mirov ji bo civakên makro yên weke gel û netewe lê difikirin, lê xwerêvebirin erkekê îfade dike ku ji civaka herî piçûk klanê heta bi civaka herî berfireh neteweyê belavbûnê û domdariyê îfade dike. Krîza herî girîng a civaknasiyê yan jî yek ji pirsgirêkên wê yên sereke ew e, nikare berevajîkirin û tevlîheviya li ser rêveberî û desthilatdariyê ji hev derxe. Ev jî bi xwe re tevahiya analîzên li ser avahî û zêhnan, nêzîkatiyên dîrokî di nava kaosê de digire û temenê krîzê dirêj dike. Encam, desthilatdarî civak û hawîrdorê hemûyî dadiqurtîne, demokrasiyê pûç dike mîna qaşilekî dihêle û xwe dixe şûvekî welê xwe bêmane dugêsinî dike. Civaknasî heta têgînên rêveberiyên desthilatdarî û demokrasiyê nexe navenda xwe û wan ji hev dernexe û bi vê ve girêdayî çareseriyê li dîrok û zanistên din belav neke, wê nikaribe ji krîza di qada zanistî de ango ji krîza civakî weke avabûn û manedaneke nû bibihure.

**6- Polîtîka**

Têgîna polîtîkayê jî herî kêm bi qasî têgîna desthilatdariyê diyardeyeke civakî ya têgihiştina wê zehmet temsîl dike. Peyva polîtîkayê bi koka xwe Grekî ye, hem têgîna rêveberiyê hem jî ya desthilatdariyê tîne bîra mirov û tê maneya ‘rêveberiya bajêr’. Lê wexta ku weke diyardeyeke civakî behsa wê bê kirin, mirov dikare wê wisa bide naskirin; civak bi awayekî azad tê rêvebirin û pêşxistin, bi vê re civak dibe xwedî kesayet. Tevî ku diyardeya rêveberiyê di nava xwe de dihewîne jî mirov nikare bi tevahî wê weke rêveberî destnîşan bike. Mirov nikare wê hem bi desthilatdariyê re hem jî bi xwerêvebirinê re wekhev bibîne. Mirov polîtîkayê weke qada azadiya civakê, weke qada afirandinê ya lê pêşxistina mane û îradeyê tê zêdekirin şîrove bike, ev zêdetir nêzî rastiya wê ye. Heta mirov dikare polîtîka û azadiyê wekhev bibîne. Li vir civak hem bi fikir, hem jî bi çalakiyê li xwe û nasnameya xwe serwext dibe, pêşde dibe û xwe diparêze. Dema ku polîtîka bibe erka xwerêvebirinê hingê weke polîtîka demokratîk dibe xwedî nasname, lê dema veguhere rêveberiya desthilatdariyê hingê polîtîka ji rastiya xwe dûr dikeve û dikeve rewşekê ku xwe înkar dike. Qada desthilatdariyê ew qad e ku lê polîtîka tê înkarkirin. Ango, çawa ku lîberalîzm bi israr ferz dike, rêveberiya dewletê polîtîka û rêveberiya polîtîk nîne, berevajî înkara polîtîkayê ye, û tê wê maneyê ku li şûna wê yan rêveberiya keyfî ya desthilatdariyê yan jî îdareya bi pîvan a dewletê cih digire. Ti carî nabe ku mirov îdareya dewletê weke polîtîkayê bide naskirin. Ji ber ku ew bi awayekî desthilatdariya bi pîvan û norm e. Desthilatdarî jî di her rewşê de tê maneya li derve hiştina polîtîkayê.

Di civaknasiyê de yek ji qada têde aloziya têgînan heye, qada têkiliyên desthilatdarî, rêveberî û polîtîkayê ye. Têgîn ewçend di nav hev de û mîna wekhev bin têne bi kar anîn, banê tevahiya civaknasiyê zincîrwarî bi awayekî şaş tê deribandin. Zanista civakî ya îlhama xwe ji îdeolojiya lîberalîzmê digire bi awayekî berfireh di warê tevlîhevkirina mejiyê mirovan de xizmetê dike.

Nexasim ji tevahiya çalakiyên sîstemên tehekumkar re polîtîka dibêje, bermahiyên piçûk ên polîtîkayê yên li ser piyan mane ji nedîtî ve tê; weke rêveberiyên eşîran ên destpêkê, mehelleparêziya teng, demdirêj pêşiya xwe nedîtin, temsîlnekirina berjewendiyên bingehîn ên neteweyî yên hundir û derve, bi nav dike û hukim di heqê wan de dide. Di vê mijarê de têra xwe alozî heye, û mejiyê mirovan tevlîhev e. Tevî ku polîtîka ji mêj ve ji civakê hatiye qewitandin û li şûna wê şîfreyên desthilatdariyê yên bi xiyanetê re wekhev hatine ferzkirin, dîsa jî dikarin bi gewîtî bibêjin di warê polîtîkayê de gelekî pêşketin hene, di polîtîkayê de gihiştine asteke şareza û modern. Lê ya rastî, li qada civakî ya polîtîka lê heye, ya xwedê nirx berjewendiyên heyatî yên civakê ne; xweşhaliya wê û asta pêşketina wê ya manedan û avabûnê ye. Civakên bêpolîtîka yan jî polîtîkayên wan qels, yan wê ji derve ji aliyê desthilatdariyekê ve bêne îmhakirin û bibin mêtingeh an jî ji hundir ve wê ji aliyê elîteke desthilatdariyê û çîneke mêtinkar ve zordestiyê bibînin û bêne mêtin. Qenciya herî mezin a mirov bi civakekê bike ew e, divê mirov asta polîtîk a wê civakê bilind bike. Ji vê jî ya qenctir ew e, divê mirov civakê bigihîne demokrasiyeke 24 saetan dewamî dixebite û bigihîne demokrasiyeke avabûyî û bicihbûyî.

**7- Exlaq**

Mirov dikare exlaq weke şêweyê polîtîkayê yê ji rêûresmê yê dîrokî yê bi sazîbûyî bide naskirin. Polîtîka zêdetir rojane bi roleke bergirî, xwedîkirin û afirîner radibe, exlaq jî bi hêza bi pîvan û bi sazî ya rêûresmê ji civaka heyî re heman xizmetê dike. Mirov dikare exlaq ji bo civakê weke hafiza polîtîk jî qebûl bike. Civakên ji exlaq bûne yan jî ji exlaq mehrûm bûne hafiza xwe ya polîtîk ji dest dane ango hêza wan a pîvan û saziyên ji rêûresmê qelsbûye, ji dest dane. Ev jî tê wê maneyê ku civak ji xweparastinê mehrûm maye, li her cure kirinên ji hundir û derve yên asîmîlasyonîst, mêtinkar û zordestiyê hatiye vekirin. Pêkhateyên dewletan û sîstemên desthilatdariyan timî exlaq dirizînin û li şûna exlaq ji jor ve îradeya xwe ya huqûqî ya yekalî (şêweyê exlaqî yê serdestan) ferz dikin. Sedema bingehîn a vê kirina wan ew e, xwe neçar dibînin ku xwerêvebirin û polîtîkaya civakê hilweşînin û wê ji aliyê avahî û dewamî ve li mêtinkarî û rêveberiya desthilatdariyê vekin. Civakeke bi hêz xwedî li exlaqê xwe derkeve, bi hêsanî stûyê xwe li ber mêtinkariya eşkere û desthilatdariyê xwar nake. Rewşa exlaq a herî neyênî, paşverû û hov ji bo civakekê, ji rêveberî û huqûqê herî pêşketî yê desthilatdarî û dewletan baştir e. Li cihekî civaka exlaqî û polîtîk hebe, li wir desthilatdarî û dewlet tewş in, û dibe barekî giran ku mirov nikarin xwe lê ragirin. Civakek çiqasî polîtîk û exlaqî bibe, ewqasî demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz dibe ango li îstîsmarkariya yekdestdariyên sermaye û elîtên desthilatdariyê tê girtin û dibe têkoşer, li ber xwe dide. Civaknasiya îlhama xwe ji lîberalîzmê digire polîtîkayê weke demagojî dide naskirin. Nexasim partiyên ku prototîpa dewletê ne weke navgînên demagojiyê terîf dike. Ev yek bi tenê xirabiyek û li ser navê zanistê xiyaneteke bi zanistê re nîne, sedema vê bi zanîn rabûna bi rola ji wan re fesilandî û mîsyona wan a xizmetkirina ji yekdestdariyên mêtinkarî û desthilatdariyê ye.

**8- Huqûq**

Tevî hemû têkiliya huqûqê ya bi heq û dadê re fonksiyona wê ya bingehîn ew e, desthilatdariya dewletê bêhtir xurt bike û her biçe qada civakî tengtir bike. Propagandaya huqûqê gelekî tê kirin, lê fonksiyona wê ji ber vê sedemê baş nayê zelalkirin. Li şûna jiyana bi pîvan a domdarî, bergirî û xwedîkirina civakê pêk tîne huqûq tê danîn û bi vî awayî derfetên behsa wan hatin kirin ji destên civakê têne stendin, ji polîtîka û xwerêvebirinê tê mehrûmkirin, bi îdare û huqûqa desthilatdarî û dewletê ya ji jor ve bi awayekî yekalî hatiye amadekirin dor lê tê girtin û li mêtinkarî û zordestiya çînî tê vekirin. Ji ber vê sedemê, têgîna huqûqê jî bi kêmanî bi qasî têgîna desthilatdarî û dewletê şîlo ye, li berevajîkirinê vekiriye û qadek e ku lê mejiyê mirov bi hêsanî tê tevlîhevkirin. Eger di civakekê de huqûq pêşketibe ev yek bêparmayîna civakê ya ji exlaq îfade dike û ev yek nîşan dide ku di wê civakê de şerekî pêşketî yê çînî ango mêtinkarî û zordestî heye. Birêkûpêkirinên huqûqî yên bi detay û hûrşaxî weke ku gelek caran tê gotin ji bo temsîla hêza heq û dadê nîne, berevajî ev yek berjewendiyên yekdestdariyên mêtinkarî û zordestiyê yên bi awayekî sîstematîk hatine şîfrekirin nîşan didin. Nexasim di sîstematîka mêtinkariya kapîtalîst de huqûq derketiye asteke gelekî bilind û ev jî ji xwesteka kara zêde ya sînornenas a sîstemê ye. Em dema ji aliyê dîrokî ve têgîna heq lêbikolin, em ê yekdestdariya desthilatdariyê ya xwe weke qralên xwedê îlankirî bibînin. Li vir têgîna heq hem çalakiya îradî ya yekalî ya monark û milkdariya wî, hem jî xwedatiya wî îfade dike. Têgîna Heq bi ya Xwedê û Ellah re wekhev tê kirin û li gorî wan tê lihevanîn, ev jî vê rastiya em behsa wê dikin îfade dike.

Ji aliyekî din ve, mirov dikare huqûqê weke exlaqê yekdestdariyên mêtinkarî û desthilatdariyê jî binirxîne. Exlaqê ji rêûresmê zêdetir li wî cihê ji ber qada mirov jêre dikare bibêje civak mayî dewam dike, huqûq jî her diçe qadê li civakê teng dike û ji bo desthilatdariya dewletê vediguherîne qada çalakiyên bi rêzik û pîvan. Di modernîteya kapîtalîst de bi çavên seriyan jî nikarî exlaq bibîne, hema bêje tevahiya qadan, hewa û av jî bûne mijara huqûqê û ev jî têgîna huqûqê bêhtir berbiçav û zelal dike. Hukimraniyên şaristaniyên berê desteserkariya wan a civakî gelekî tê rexnekirin û ya rastî ev desteserkariya wan ewqas jî ne mezin bû û wexta mirov wan bi desteserkariya modernîteya kapîtalîst a bi huqûqê hatiye rewakirin bide ber hev, desteserkariya modernîteya kapîtalîst di asteke sînornenas de ye.

Di civaknasiyê de her diçe huqûqê derdixin rêzên jor, ji ber ku pêdiviya wan pê heye bi navê heq neheqiyê, bi navê rastiya civakî derewê û bi navê jiyana bi pîvan jiyana zincîrkirî, veşêrin. Ji ber vê sedemê, huqûq navgîna bingehîn a rewakirina modernîteya kapîtalîst e. Çawa ku di diyardeya desthilatdariyê de jî hat dîtin, di qada huqûqê de jî ya girîng ew e, herçiqasî hatibe huqûqîkirin jî divê mirov karibe aliyê exlaqî bibîne û hewl bide pê aloziyê çareser bike û bi sînor be jî divê mirov zanibe bi exlaqê dawerivandine nava huqûqê civakê biparêze; çawa ku erka

rêveberiya civakî ya dawerivandî nava desthilatdariyê divê mirov paşve bigire, divê mirov ji bo parastin û domdarkirina civakê ji exlaqê dawerivandî nava huqûqê dest nekişîne.

**9- Demokrasî**

Ji ber ku têgîna demokrasiyê gelekî tê bikaranîn û berevajî cewherê wê tê şîrovekirin, rast danasîna wê girîng dibe. Tevî ku demokrasî gelekî tê bikaranîn li ser têgîna wê aloziyek heye. Belê mirov dikare wê bi awayekî teng û fireh bide naskirin. Bi awayekî fireh mirov dikare wisa bide naskirin, xwerêvebirina civakên dewlet û desthilatdarî nas nekirine. Xwerêvebirina klan, qebîle û eşîran di nava vê kategoriyê de cih digire. Bi awayekî teng jî mirov dikare demokrasiyê wisa binirxîne; civakên di wan de tevî diyardeya demokrasiyê diyardeyên dewlet û desthilatdariyê gelekî têne bikaranîn hene, di van civakan de xwerêveberiyên li derveyî rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê dimînin dikevin vê çarçoveyê. Di civakên dewletdar de bi awayekî xwerû ne rêveberiyên demokratîk, ne jî rêveberiyên despotîk dibin. Bêhtir diyardeya rêveberiyên ketine zikhev hene. Ev jî dihêle ku rejîmên hem li rizandina desthilatdariyê û hem jî li ya demokrasiyê vekirî pêk bên. Desthilatdariya dewletê, li gorî xwezaya xwe di têkiliya xwe ya bi dewletê re divê demokrasiyê paşve bixe û bi sînor bike. Hêzên demokrasiyê jî bi awayê nasnekirina dewletê timî dixwazin sînorên xwe berfireh bikin. Pirsgirêk bi xwe ev e, ji ber ku dewlet xwe bi demokrasiyê bi maske dike, û demokrasî jî dixwaze bibe dewlet alozî çêdibe. Di şaristaniya Ewrûpayê de ev alozî bi awayekî sîstematîk hatiye pêşxistin. Di civakên Rojhilatî de cudahiya di navbera xwezaya dewlet û civakê de hê kûrtir e. Desthilatdariya dewletê xwe bi destûra bingehîn bi sînor dike û civak jî bi demokasiya temsîlî tê bisînorkirin, ev jî dihêle ku pevçûnên dijwar ên di navbera herduyan de nerm bibin û derfet çêdibe li rex hevdu bijîn. Ev model ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve hatiye pêşxistin û bi awayekî bingehîn armanca wê nermkirina nakokiyên çînî û rêvebirina wan e. Modernîteya kapîtalîst li aliyekî desthilatdariya dewletê bi şêweyekî zêde û berfireh weke dewleta netewe li ser tevahiya hêzên civakî yên li derveyî xwe dimeşîne, li aliyê din jî ji bo kesên di bin îstîsmar û zordestiya sîstemê de dengê xwe nekin hewl dide wan bi demokrasiya temsîlî ya parlementeriyê razî bike. Diyardeya jêre demokrasiya lîberal tê gotin ev e.

Rizgarkirina demokrasiya civakî ji vê destavêtinê bi pêşxistina xwerêvebiriyên demokratîk pêkan e. Xwerêveberiyên demokratîk divê desthilatdariya dewletê re neyên wekhevkirin, di bin navê gelparêzî û dîktatoriya proleter de neyê berevajîkirin. Eger bi vî awayî were pêşxistin ev model a herî zêde nêzî çareseriya rast e. Bingeh û cihêwaziya xwerêveberiya demokratîk ew e, ne li ser navê gel dewletê ava dike, ne jî dibe movik û pêveke besît a dewletê. Li derveyî vê riyê bi rêbazeke din ji çeloxwarîkirinên çepgir û rastgir ên demokrasiya lîberal bihurîn, zor e. Lîberalîzm çi xwe weke demokrasiya lîberal a klasîk û çi jî weke demokrasiya gel a sosyalîzma pêkhatî nîşan bide, bi awayekî bingehîn hêza rêveberiya wê yekdestdariya dewletê û yekdestdariyên

ekonomîk e. Wezîfeya dikeve ser milê civakê ew e, çawa tevahiya dîrokê li dijî hêzên şaristaniyê kir, di serdema me de jî li dijî hêzên modernîteya kapîtalîst divê hêzên xwe yên modernîteya demokratîk ava bike. Rola dîrokî ya modernîteya demokratîk ew e, armanca xwe hilweşandina dewletê nîne û armanca wê dewletbûn nîne, herweha di nava dewleta heyî de bêyî ku bihele û bibe dûvikê wê yê sivîl xwe li tevahiya qadên civakî ava û manedar dike.

**10- Ekonomî**

Nexasim, ji ber ku hatiye fetîşkirin, gelekî girîng e ku mirov ekonomiyê di nava sînorên destnîşankirî de bide naskirin. Lîberalîzm her tiştî bi ekonomiyê rave dike û bi vî awayî danasînê bêmane dike û her diyardeya berevajî ekonomiyê jî ekonomî dihesibîne. Bi awayekî giştî, mirov dikare ekonomiyê weke çalakiya tedarik û debarê ya pêdiviyên civakê yên maddî û weke îfadeya pîvan û saziyên wê rave bike û di çarçoveyeke tengtir de mirov dikare weke pevguhertina pêdiviyên maddî bi rêya bazarekê bide naskirin. Ekonomiya bazarê ya li şûna nirxa bikaranînê nirxa pevguhertinê esas digire û bi vî awayî danasîna wê tê qebûlkirin, lê rastiyek heye ku divê neyê jibîrkirin, kapîtalîzmê çawa qada demokratîk rizandiye, qada ekonomîk jî kiriye bin destê yekdestdariyên sermaye û dewleta netewe û bi vî awayî pûç kiriye. Ekonomiyê mîna xebateke yekdestdariyên sermayeyê li bazarên di bin banê dewleta netewe de têne avakirin, didin naskirin. Li vir, ekonomî tê înkarkirin, li şûna wê ya ne ekonomî ye, û ya înkara ekonomiyê ye, sîstema kara zêde ya yekdestdariyên bazirganî, pîşesazî û fînansî tê danîn; mîna ku xebata ekonomîk a ezel-ebed ji van yekdestdariyan pêve tiştekî din nîne û bi vî awayî ev sîstem di bin navê zanista ekonomiyê de bi rewakirineke zêde tê pêşkêşkirin. Mirov vê xebatê dikare weke terora ekonomîk jî şîrove bike. Ango civak ji aliyê aborî ve tê hilweşandin, dor li bazarê tê girtin bi tenê dikin qadeke karê, bi navgînên fînansî li qadên bazirganî û pîşesaziyê bi tevahî têkiliyên yekdestdariyên kapîtalîst bi ekonomiyê re ji holê têne rakirin û bi vî awayî bi pereyan bidestxistina pereyan dikin kategoriyeke bingehîn a bidestxistinê û ev jî dibe faleketeke ku di dîrokê de nehatiye dîtin.

Serdema fînans kapîtalê asta herî jor a hilweşîna ekonomî û civakê ye. Em bi cinawirekî wisa har re rûbirû ne ku karekterekî xwe yê antî-civak, antî-mirov û antî-xweza heye; hema bêje nîviyê civakê bêkar kiriye, di bin navê ekonomiya sîlehan de hilberandina amûrên tinekirinê kiriye karekî bingehîn ê ekonomîk, bi tenê armanca xwe kar e, ti têkiliya xwe bi pêdiviyên hewce yên civakê re nîne, hawîrdorê hildiweşîne, bi tevahî çavkaniyên xweza û civakê vediguherîne karê. Li vir a girîng ew e, li rêza pêş qurbanên vê sîstemê jin û ciwan in; keda wan bêkêr dikin û wan neçar dihêlin ku bê ekonomî bimînin. Li hemberî vê, her yek ji begzadeyên CEO'yan (Chief Executive Officer) ku gurên rêveberiya desthilatdariyê ne û ti têkiliya wan bi ekonomiyê re nîne, weke damezrînerên ekonomiyê têne pêşkêşkirin û ev nakokiya bi serê mirov nakeve weke xebateke sereke ya ekonomîk manedar dibe. Yekdestdariyên olîgarşîk ên pirraniya civakê ji

ekonomiyê qut dikin, karê weke ajoya bi tenê dibînin û yekdestdariyên mêtinkariyê yên ti têkiliya wan bi civakê re nîne ava dikin, divê mirov kansêrkirina wan a civakê ya ji desthilatdariya dewletê jî wêdetir e, ekonomîk nehesibîne û di asta manûnemanê de girîng e ku mirov hukim bide ew înkara ekonomiyê ne.

Di serdema me de (serdema modernîteya kapîtalîst) di bin navê zanista ekonomî û polîtîkayê de ji afirandinên mîtolojîk ên Serdema Rahibên Sumeran hezar carî zêdetir berjewendiyên hêzên li derveyî civakê rahibên modern kirine mît û divê mirov fonksiyona wan a rastî baş bide naskirin. Divê mirov şîrketên CEO'yan jî li vê kategoriyê zêde bike. Divê em ji bîr nekin ku dewleta netewe bi awayekî bingehîn ev sîstema zorê ya nîzama rahibên modern e. Li ser navê zanistê yê herî zêde xwe li kapîtalîzmê rakişandiye K. Marks e. Lê ew jî mîna ku zemînekî wî yê rewa hebe, xwestiye vê sîstemê zanistî bike û di vê çarçoveyê de xebata xwe ya Kapîtal kiriye. Lewma hewce ye ku xebata wî ya bi navê Kapîtal ji nû ve were şîrovekirin. Herçiqasî di gelek qadan de hewl daye maskeya wê ji rûyê wê bike jî bi sedema ku kapîtalîzm weke sîstemeke dîrokî ya bivênevê pêşkêş kiriye, di tehlîla dawî de ev sedema bingehîn e ku Marksîzm di nava modernîteyê de bihele. Weke ku li cem Yekîtiya Sovyetê ya sosyalîzma pêkhatî û ezmûna Çînê hat dîtin xizmeta herî mezin ji lîberalîzmê re kirin û bi vî awayî di nava sîstemê de cihê xwe girtin û ev jî ji nêz ve bi vê rastiyê re têkildar e. Sîstema kapîtalîst civaknasiyê weke ekonomî pêşkêş dike û ekonomî jî li cem wê timî înkara ekonomiyê ye. Eger ev analîz di çarçoveya sîstema kapîtalîst de were kirin, di qada zanistî de ev krîz bi xwe ye. Lewma mirov heta ji krîza ekonomîk-polîtîk a ku tevahiya zanista civakî dibe krîzê nebihure, nikare ji krîza li cem tevahiya zanistên giştî yên ku perspektîfa xwe ya sazîbûn (zanîngeh), mejî û felsefî ji dest dane, bibihure. Mirov heta ji krîza zanistî nebihure, zanist ji nû ve xwe di warê sazî û manedanê de ava neke, nikare ji krîza giştî ya civakî û harbûna modernîteya kapîtalîst bibihure.

**11- Asîmîlasyon**

Asîmîlasyon ew çalakî û têkiliya yekalî ye ku di civakên şaristaniyê de yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê li ser komên civakî yên kirine statuya koletiyê pêk tînin, ji bo ku van koman bikin dûvik û movikên xwe, bikartînin. Armanca asîmîlasyonê ew e, ji bo mekanîzma mêtinkarî û desthilatdariyê bi mesrefa herî kêm kole peydakirin e. Koma tê asîmîlekirin, nasnameya wê bi xwe û hêza wê ya berxwedanê tê şikandin, di nava elîtên serdest de ji bo bibin koleyên kêrhatî tê amadekirin. Li vir fonksiyona bingehîn a koleyê tê asîmîlekirin ew e, ji sedî sed divê bişibe efendiyê xwe, ji bo bibe perçik û dûvikê wî her tiştî dike ji bo xwe bide qebûlkirin û bi vî awayî di nava sîstemê de ji xwe re cihekî çêke. Jixwe çareyeke wî ya din jî tineye. Ji bo karibe bijî divê nasnameya xwe ya civakî ya berê tavilê biterikîne û bi awayekî herî baş adepteyî çanda efendiyên xwe bibe û ev yek weke alternatîfa bi tenê jêre hatiye pêşkêşkirin. Civaka hatiye asîmîlekirin, ji formên wisa yên mirovan pêk tê ku herî sernerm in, herî zêde baz didin suxreyan,

û bêwijdan, bêexlaq û bêzêhniyet in, di xulamtiyê de dikevin pêşbaziyê. Ti biryar û çalakiya wî ya bi awayekî azad bike, tineye. Kirine ku bi tevahiya nirxên nasnameya xwe ya civakî re xiyanetê bike. Kirine ku bibe mîna heywanekî di şiklê mirov de û bi tenê li pey ziktêrkirina xwe biçe. Elîta serdest, ji bo ku vê bênasnamebûnê li ser civaka asîmîlasyonê ferz bike du sîlehên bingehîn bi kar tîne: Ya pêşî, zora fizîkî ya berbiçav e. Di serhildan û serîrakirineke wî ya herî piçûk de jî şûrê serbirînê li ba dike. Ya diduyan, bi birçîbûn û bêkariyê re rûbirû dike. Dixwazin vê qanûna ji hesin bi cih bînin: Eger tu di nasnameya xwe ya çandî de israr bikî û nebî xulamekî li gorî efendiyê xwe, yan wê serê te biçe yan jî tu yê birçî bimînî!

Elîta serwer ji bo vê jî mekanîzmeyeke xwe ya bingehîn heye; kî dibe bila bibe, eger bi her çi tiştekî çanda asîmîlekirî re eleqedar bibe û xwe bi vê çandê bike, ji bo ku ev kes di nava civaka fermî de ti îmkanê jiyanê nebîne, bi tevahî rêyên wan ên pêşketina çandê ji aliyê avahî û mejî ve dixetimîne. Çiqasî bi qabîliyet dibe bila bibe, kes, kom û saziyên bi çanda tê asîmîlekirin re têkiliyê datînin û ji bo geşkirina wê dixebitin bi tevahî deriyên dewletê li rûyê wan tê girtin û herweha li qadên civakê yên li derveyî dewletê jî ji bo wan biavêjin derve her cure tevdîrên veşartî yan jî eşkere, hişk an jî nerm têne girtin. Sazî û kesên di destpêkê de bi xwestekeke amatorî li ser çanda tê asîmîlekirin dixebitin bi demê re wê bibînin ne bi tenê derî hemû li rûyê wan têne girtin, eger di ya xwe de israr bikin wê ji aliyê fizîkî ve jî hebûna wan bikeve tehlûkeyê û kengî vê fêhm dikin, yan wê tevlî civaka dewleta netewe ya serdest a asîmîleker bibin an jî wê rêbaza xwe biguherin rizgarî û xelasiyê di kesayeta têkoşer a çalak û rêxistinkirina wê de bibînin. Di tevahî dewletên netewe yên moderníteya kapîtalîst de bêhejmar mînakên bi vî rengî hene. Mekanîzma bi tenê li ser gel û komên etnîk ên bindest nayê meşandin; çînên bindest û komên etnîk ên cuda ên neteweya elîta serdest jî ji asîmîlasyonê para xwe digirin; bi rewşekê re rûbirû dibin, zaravayên xwe yên etnîk û nirxên çanda xwe ya azadmayî ji dest didin.

Li Rojhilata Navîn gelê Kurd ku qurbanê herî mezin ê asîmîlasyonê ye, di vê mijarê de mînakeke balkêş û bi tesîr e. Mirov di Kurdîtiyê de israr bike, di serî de bêkarmayîn divê pêvajoyeke heta bigihîje qirkirinê li ber çav bigire. Ferdekî Kurd çiqasî jêhatî dibe bila bibe, heta her cure polîtîkayên çandê yên dewleta netewe ya serdest bi dilê xwe qebûl neke, li pêşiya pêşketina wî ya sazî û ferdî wê derî hemû yek bi yek bêne girtin. Yan wê teslîmiyeta bi riza dilê xwe hilbijêre û bibîne ku deriyên heta serokkomariyê lê vedibin, yan jî wê teslîm nebe û hay ji xwe hebe ku wexta rêya berxwedan û têkoşînê hilbijêre wê felaket û belayên heta bigihîjin qirkirinê bi serî de bên.

**12- Qirkirin**

Qirkirin weke dewama asîmîlasyonê ye, gel, hindikayî, her cure komên dînî, mezhebî û etnîk ên bi asîmîlasyonê nikaribin bi wan, dixwazin bi rêya fizîkî û çandî wan bi temamî tesfiye bikin û wan têk bibin. Li gorî rewşê ji herdu rêbazan yek tê tercîhkirin. Rêbaza qirkirinê bi awayekî fizîkî

bi giştî bi çanda elîta serdest ango li gorî çanda dewleta netewe bi komên çandî yên di rewşa serdest de têne kirin. Mînaka tîpîk a ji bo vê yekê jenosîdên ji bo çanda Cihû û gelê wê ye. Tevahiya dîrokê Cihû hem di qada maddî de û hem jî di qada çanda manewî de beşên herî bi hêz pêkanîn û ji ber vê, li hewldanên tinekirin û derbên fizîkî yên çandên serdest ên dijber rast hatin, timûtim qirkirinên weke pogrom têne binavkirin bi serê wan de hatin. Rêbaza duyemîn a qirkirinê ceribandinên qirkirinê yên çandî ne, û zêdetir çanda dewleta netewe û elîtên serdest li ser gel, civakên etnîk û komên baweriyê yên qels û pêşneketine tê ferzkirin. Bi qirkirina çandî ya weke mekanîzmaya bingehîn tê xebitandin armanc ew e, di nava çand û zimanê dewleta netewe û elîta serdest de bi tevahî tesfiyekirina van gelan û koman e. Di serî de saziyên perwerdeyê di nava her cure saziyên civakî de ev gel û kom têne hêran û bi vî awayî hewl didin wan tine bikin. Qirkirina çandî li gorî ya fizîkî bêhtir bi êş û jan e, cureyekî qirkirinê ye, dirêj dajo. Encamên rê li ber vedike ji ya fizîkî bi zêdetir felaket in; ji bo gel an jî civakekê felaketa herî mezin e ku di jiyanê de lê rast bê yan jî bi serî de bê. Gel an jî civak neçar têne hiştin hebûn, nasname, hemû hêmanên çanda maddî û manewî yên xwezaya wan pêk tînin biterikînin û ev bi çarmîxkirina demeke dirêj re wekhev e. Li vir, mirov ji bo nirxên çandên li ber qirima qirkirinê ne, nikare behsa jiyanê bike, belkî mirov dikare bibêje, nalenale wan e. Modernîteya kapîtalîst wexta kara herî zêde bi dest dixe, êşa esas a tevahiya gelan, çînên bindest û karkeran bi mêtina nirxên wan ên maddî nade kişandin, ji ber ku bi tevahî nirxên wan ên çandî li çarmîxê dixe êşeke kûr bi wan dide kişandin. Ji bilî çanda fermî ya dewleta netewe, rastiya tevahiya nirxên çandî û maddî yên din candayîna di çarmîxê de ye. Jixwe wekî din, nabe ku mirovatî û hawîrdora ekolojîk bikin çavkanî û biqedînin.

Rewşa Kurdan di warê qirkirina çandî de mînaka herî trajîk û bi tesîr temsîl dike. Dewletên netewe yên serdest li ser nirxên çanda manewî û maddî ya gelê Kurd mekanîzmayeke çarmîxkirinê danîne û gelê Kurd di nava pencên vê mekanîzmayê de dinale. Di serî de nirxên gelê Kurd ên bi kedê hatin bidestxistin, bi tevahî nirxên civakî yên gelê Kurd ên civiyayî, çavkaniyên dewlemend ên binerd û sererdê bi awayekî eşkere talan dikin, yên mayî jî ji îmhayê re dihêlin, bêkar dikin, dirizînin, dikin ku kirêt bibe li rûyan neyê nêrîn û pêre jiyan nebe. Hiştine ku mîna rêyek bi tenê li pêşiya kesê Kurd be: Di nava dewleta netewe de bihele, bi tevahî ji nirxên xwe yên bingehîn biqere! Ji bilî vê rêya jiyanê nîne. Qirkirina çanda Kurdî ya car caran digihîje heta bi qirkirinên fizîkî jî belkî di serê wan mînakên herî trajîk û bi tesîr de ye ku rastiya modernîteya kapîtalîst bi her awayî eşkere nîşan dide.

## B- ÇARÇOVEYA TEORÎK

Tevî ku teoriyên civakî bi awayekî pirrcure û nakok in, ji bo mijara me ya sereke zelal bikin, divê em balê bikişînin ser hinan ji wan û em ê tenê qîma xwe bi van çendan bînin.

Pirrcurebûna civakî gerdûneke berfireh pêk tîne û mirov dikare wan teorîze bike, lê wê zêde ji armanca me re xizmetê neke; dibe ku ev teorîzekirin mijara me ya bingehîn a divê em rohnî bikin bêqîmet û paşguh bike. Di civaknasiyê de xusûsa girîng rohnîkirin û zelalkirina her tiştî nîne, ya girîng, diyarkirin û rohnîkirina pirsgirêk û mijarên heyatî ye. Pirsa herî girîng ev e: Li daristana diyardeyên civakî diyardeyên herî diyarker çi ne? Di vê mijarê de mirov dikare bûyer û kesayetên girîng, ji wan heta bi kesên dewlet û ekonomiyê li pêştir dibînin lîsteyeke dirêj rêz bike. Lê ji bo min hin diyardeyên herî raveker û pêvajoyên avahiya jiyanê girîng in. Lewma ez ê hewl bidim wan li gorî rêzê weke pêşnûme pêşkêş bikim.

### 1- Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî

Di çarçoveya mijara me ya bingehîn de danasîna teorîk a heyatî divê der barê desthilatdariya hegemonîk a navendî de hebe. Teoriya sereke ya karibe rewşa gelekî li ber qirkirinê zelal bike, teoriya desthilatdariya hegemonîk a navendî ye. Ji ber ku me têgîna desthilatdariyê têra xwe da naskirin, gelekî girîng e ku mirov diyar bike, bê ka desthilatdariyê di nava pêşdeçûna dîrokê de çawa civak kiriye nava pencên xwe. Berê pêşî divê mirov karekterê hegemonîk ê desthilatdariyê baş diyar bike. Navendên desthilatdariyê ji roja derketine holê û vir ve di nava xwe de hevrikiyê dikin û her diçe şer dikin. Desthilatdarî di destpêkê de bi şeran hev tine dikin û bi vî awayî hewl didin monolîtîk û yekpare bibin. Piştî demekê tê fêhmkirin ku ev bêkêr û tewş e, herweha ne pêkan e. Lewma ketina bin hegemonya desthilatdariya navendî ya herî bi hêz ji bo navendên din ên desthilatdariyê weke ehwen-î şer ango ji xiraban a herî baş tê qebûlkirin. Herweha tevgerên antî-desthilatdarî yên ji jêr û ji derve timî tên, desthilatdaran neçar dikin ku li bin desthilatdariya hegemonê (domînant, fermandarê sereke) hevpariyê pêre dikin bi awayekî hevgirtî bimînin. Di dîrokê de xwerû desthilatdarî îstîsnayî ne; ya pîvan e, karekterê desthilatdariya hegemonîk e. Desthilatdariya navendî divê bi ekonomiya navendî re bê temamkirin. Desthilatdariya navendî ya xurtbûyî bi navenda ekonomîk a xurtbûyî ya sereke re di nava têkiliyeke xurt de ye. Ekonomiya navendî xwe xelek bi xelek li hawîrdorê belav û sîstematîze dike û vê yekê, divê bi desthilatdariya navendî re di zikhev de pêk bîne û belav bike. Ji ber ku desthilatdariya navendî bi xwe xurtbûyî ye, û potansiyela herî bi hêz a avahiya ekonomîk e, di nava aktualîteya xwe de aboriyê çalak dike û ji navendê ber bi derve belav dibe. Li gorî daneheva sermaye û hatina aborî, navend û hawîrdor timî cih diguherin. Ev rewş pêvajoyên ji wan re pêxîrtengî tê gotin ferz dike.

Naxwe hawîrdor û pêxîrtengî, xisletên bingehîn ên desthilatdariya navendî û ekonomiyê ne ku bêyî wan nabin. Heta sîstem bi berdarî bixebite hewcedarî bi guhertina navendê nîne. Lê çawa ku gelek caran di dîrokê de hatiye dîtin, wexta ku navend her diçe tiral û kurtêlxur dibe, hawîrdoreke berdar ji bandora pêxîrtengiyan keysê lê tîne derkeve holê û gav biavêje ango bi pêkanînên nû yên teknolojîk ekonomiyê serketîtir dike û vê yekê pêk tîne. Teknolojiya nû tê maneya teknîka nû ya eskerî. Di kêliyên wisa yên dîrokî de destguhertinên desthilatdariyê bi pêkhatinên nû yên navend û hawîrdorê bi encam dibin. Hegemonya desthilatdariyê ji nû ve ava dibe. Pêkhatinên desthilatdariya hegemonîk ên bi vî rengî di pêşengiya qewm û xanedanekî nû de derdikevin holê, di dîrokê de timî têne dîtin. Li vir, zêde manedar nîne ku mirov ji ekonomî û desthilatdariyê li ya diyarker bigere. Ti desthilatdariya hegemonîk bêyî navenda ekonomîk nikare bimeşe û ti navenda ekonomîk jî xwe li avakirina desthilatdariya hegemonîk a navendî ranekişîne nikare demdirêj mayînde bibe.

Di dîrokê de diyardeyeke din a girîng bi desthilatdariya hegemonîk a navendî ve girêdayî ew e, ev sîstem xwedî xisleteke wisa ye, bi awayekî zincîrwarî girêdayî ye, û valatiyê qebûl nake, hem ji aliyê zeman û hem ji aliyê mekan ve qutbûn nîne, weke xelekên zincîrekê pêk hatiye. Di xwezaya desthilatdariya hegemonîk de ji aliyê zeman û mekan ve valatî, navberdan nîne. Berevajî ba di ber re naçe. Navber têra xwe tijî û bi hev ve ne. Xelek di zikhev de ne û hişk bi hev ve girêdayî ne. Eger qutbûn û navber pêk bê, heye ku navend hilweşe. Eger demeke dirêj neyê tamîrkirin û valatî neyê tijîkirin, hilweşîn û destguhertin bivênevê wê pêk bê. Divê mirov li desthilatdariyên hegemonîk ên navendî weke rewşeke bi tenê xweserî împaratoriyên mezin nefikire. Hewl didin tevahiya civakê bi têkiliyên desthilatdariya hegemonîk bi hev ve girê bidin. Ji navenda împaratoriya herî mezin heta bi yekeya malbata pêve girêdayî pîvanên hegemonîk ên bi heman rengî ji bo hemûyan dimeşin. Li Romayê împarator çi be, li gund axa û di nava malbatê de jî mêr ew tişt e. Civaka dîrokî bi girêkên hegemonîk ên bi vî awayî hatiye deribandin û eger ji nedîtî ve hatin, mumkîn nîne ku mirov civaka dîrokî fêhm bike. Belkî bi baran agahî û zanîna me hebe, lê wê serwextbûn û têgihiştina me ya diyalektîkî pêk neyê.

Divê desthilatdariya hegemonîk a navendî ne bi tenê bi ekonomiyê, lê bi hegemonya îdeolojîk a ku bi kêmanî bi qasî wê girîng e, bê temamkirin. Hegemonya desthilatdar a bê hegemonya îdeolojîk nabe. Nexasim gavavêtinên mîtolojîk û dînî yên bingehîn di qonaxa şaristaniyê de yan antî-hegemonîk in, yan jî bi kêmanî di demeke kin de bi baskekî desthilatdariyê re dibin yek û bi lez hegemonîk dibin. Nemaze mirov dikare ji pêşketina dînên yekxwedayî bi hegemonya navendî re gelek tiştan hîn bibe. Derketina wan a holê ji sedî sed bi hegemonyayê ve girêdayî ye. Têgîna Xwedê, Ellah yan alternatîfa hegemonê sereke ye, di vê rewşê de dîn muxalif û berxwedêr e, yan jî hegemon bi xwe tê pîrozkirin û wî dikin xweda; di rewşa duyemîn de dîn sîstema hegemonîk a navendî nîşan dide. Ji aliyê têkilî û nakokiyê ve di navbera herduyan de rewşeke pirr pêk tê û li ser şer tê kirin heye. Eger em dîroka dînên yekxwedayî bi desthilatdariya

hegemonîk a navendî re lêbikolin, em dikarin fêhm bikin. Naxwe bi awayekî din dîroka dînan nayê fêhmkirin. Dîrokeke dînan a ji bingehê ekonomîk û desthilatdariyê qut ji gotinên pûç û vala wêdetir tiştekî din nîne. Têkiliya di navbera dîn, xweda, hegemon, desthilatdar û ekonomiyê de ji pêşbînî û yeqîna mirov dikin, zêdetir e. Çawa ku desthilatdariya hegemonîk bi awayekî zincîrwarî dor li zeman û mekan girtine, dîn, xweda, hegemon, desthilatdarî û aboriyê jî di zikhev de dor li dîroka rastî girtine. Civaka dîrokî bi dorgirtinên bi vî rengî, bi awayekî xelekwarî xwe nîşan dide û tê heta roja me ya îro.

Em bi mînakan rewşê berbiçav bikin, ev pêvajo bi qasî tê zanîn ji hegemonê pêşî Qralê Aqadê Sargon ve bi awayekî zincîrwarî û bi awayekî xelekwarî heta roja me tê. Di roja me ya îro de jî ev pêvajo bi hegemonekî weke Împaratoriya Sargonê bi DYE'yê dewam dike û ev rewş di çarçoveya sîstema şaristaniya navendî de weke herikîna çemê sereke û mezin e. Hegemonya Sumer, Aqad, Babîl, Asûr, Hîtît, Mîtanî, Ûrartû, Med, Pers, Skender, Roma, Sasanî, Bîzans, Ereb-Îslam, Tirk-Moxol, Osmanî, Brîtanya û DYE'yê çemê sereke pêk tînin, Împaratoriyên Misr, Elam, Harappa, Çîn, Hind, Rûs, Frank û Germen rûbarokên tên ser vî çemê sereke ne. Eger mirov civaka dîrokî di tevahiya dîroka şaristaniya navendî de bi awayekî berbiçav weke çemê sereke û rûbarokên têne ser sembolîze bike wê bêhtir bi awayekî rastî were fêhmkirin. Bêguman rûbarok û şaxên hê piçûk ên vî çemê sereke û rûbarokên wî yên têne maneya çand û şaristaniyan hene. Ya girîng ew e, divê mirov fêhm bike ku pêşdeçûna dîrokê ji hev qut nîne, hegemonya navendî, ji bilî derbasbûnên di navberê de, hebûna xwe timî bi hêz kiriye û dinya roja me ya îro pêk aniye. Bêguman ev pêkhatin ne yekalî ye. Li aliyê din, hêzên antî-hegemonîk jî ji roja derketina holê ya şaristaniya navendî û vir ve li dijî sîstema wê û hêzên wê yên hegemonîk timî hebûna xwe pêk anîne, qutbê din ê dinyayê ango dinya şaristaniya demokratîk heta bi roja me ya îro anîne. Cewherê esasî yê vê dinyayê demokratîk, exlaqî û polîtîk e; bi konfederasyonên demokratîk ên naqedin timî xwe nû û bi hêz kirine, dinya xwe ya îdeolojîk bi giştî di nava dînan de û bi taybetî jî di nava mezhebekî dînên yekxwedayî de ava kirine û hêzên rastî yên hilberîner ên ekonomiyê ne, û ev rastî ne yên guftûgokirinê ne.

Dîroka dewletên netewe ya taybet ya ku modernîteya kapîtalîst dixwaze wê serwer bike, herçiqasî bixwaze pêşdeçûna dîrokî gerdûnî ya hegemonya navendî bitepisîne jî nikare vê rastiya gerdûnî biguherîne. Dîroka gerdûnî nebe dîroka taybet jî nabe. Ya rastî, dîrok bi hevtemamkirina gerdûnî û taybet pêş dikeve. Dîrokên taybet ên netewe, çîn û xanedanan an jî dîrokên şexsî di çarçoveya dîroka gerdûnî de neyên bi cihkirin nayên fêhmkirin. Modernîteya kapîtalîst dîroka xwe ya lîberal weke 'dawiya dîrokê' îlan dike û bi vî awayî hewl dide hîleya her serdema hegemonîk a klasîk serî lê daye, dubare bike. Her serdema hegemonîk xwe weke ya dawî îlan dike. Lê dîrok dewam dike. Belkî jî ya bi dawî dibe modernîteya kapîtalîst bi xwe ye. Bi serdema kapîtala fînansê ya global, ev sîstem bi xwe ti têkiliya wê bi dîroka berbiçav û civakê re nemaye û bêmane bûye. Ji aliyê şêwe ve jî roj bi roj ji hev de dikeve. Belkî jî di dîrokê de cara

pêşî ye ku sîstema hegemonîk a navendî rezervên xwe qedandine û hêdî hêdî diderize, misêwa bi krîzê re di qirika hev de ne, û bi vî awayî nêzî dawiyê dibe. Bi xwe ji gelek aliyan ve li dawiyê dimîne. Cihê meraq û kakûniyê ye ku wê xwe bi qalibekî zirxî heta kengî biparêze; bi tinehesibandina zeman û mekan wê hebûna xwe bi awayekî şiklî bê dawî bike yan jî xwe biqedîne, ev mijarek e ku hêja ye heqîqeta wê were keşifkirin û were lêkolîn.

**2- Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk**

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî di diyardeya rêveberiya civakî de jihevkirina şêweyên desthilatdarparêz û otonomparêzên demokratîk gelekî girîng e. Heta cudahiyên bi kok ên di navbera paradîgmayên herdu rêveberiyan de neyên jihevkirin û zelalkirin, çareseriyên bêne kirin bivênevê wê bi tevahî bêkêr bin. Rêveberiya civakî bi xwe heta bi awayekî azad neyê diyarkirin, pirsgirêkên din hemû wê di kêliya dawî de di nava bêçareseriya rêveberiyê de asê û pûç bibin, heta wê bi xwe re pirsgirêkan girantir bike. Eger hewce bike ku mirov mînakeke dîrokî bide, mirov dikare behsa ezmûna Sovyetê bike. Bi awayekî desthilatparêz nêzî diyardeya rêveberiyê bûn ev yek di têkçûna ezmûna Sovyetê de bi roleke diyarker rabûye. Di bingehê şoreşên serneketî de heman diyarde veşartî heye. Ev şoreş, yan bi ti awayî nikarîbûne xwe ji têgihiştina rêveberiya desthilatparêz qut bikin û di encama vê de bûne desthilatdar û riziyane, yan jî bi temamî diyardeya rêveberiyê li derve hiştine û bi vî awayî ber bi anarşîzma ferdî ve çûne û bivênevê têkçûn ferz kirine. Desthilatdariya dewletdar û hiyarerşîk destavêtiye diyardeya rêveberiyê û ev çavkaniya pirsgirêkên civakî ye. Heta ku dest neavêjin diyardeya rêveberiyê, wê çeloxwarî û berevajîker nekin, mêtinkarî û zordestî nikare xwe bi sazî bike, û ev diyarde bivênevê yan wê pêk neyên an jî wê demî bin. Rêveberî çiqasî bêne desteserkirin, çerx û mekanîzmayên mêtinkarî û zordestî jî wê li ser civakan ewqasî bê avakirin. Bi vî awayî jî mîna ku devê qutîka Pandorayê vebe, tevahiya diyardeyên civakî wê di nava pirsgirêkan de bixeniqin.

Nîzama civaka xwezayî bi rêveberiya hiyarerşîk xirabû û pirsgirêkên çavkaniya xwe xweza li van zêde bûn, bi vê re jî pirsgirêkên civakî yên navxweyî derdikevin holê. Pirsgirêkên di warê çanda maddî û manewî ya civakê de her diçin girantir dibin. Şerên di navbera klan û qebîleyan de dijwar dibin îşaret bi avahiyeke bi pirsgirêk dikin. Di cîhana zêhnî de têgînên bi nakok ên xwedayî û fikrên mîtolojîk ên derdikevin holê bi xwe pirsgirêkên civakî yên zêde dibin îfade dikin. Em van diyardeyan hemûyan dikarin di civaka Sumer de bi awayekî xurt bibînin. Şerê di navbera xwedayan de, ya rastî pevçûna di navbera xanedanên hiyarerşîk ên mezin dibin û rêveberên bajar-dewletê de li ser berjewendiyan in. Şerên desthilatdariyê yên di navbera salên 5000-3000 B.Z. de li Mezopotamya Jêr û paşê di tevahiya civakên şareza de bê dîtin, wê prototîpa pirsgirêkên civakî ên bi kok li ser bingehê nakokiya bajar-gund (‘barbar’) û lihevnekirinên çînî yên yekdestdariyên mêtinkar pêk bîne. Piştre bi tevahî şêweyên lihevkirinê û

şerên civakî, pevçûnên hundir û derve yên bajar, çîn û dewletê yên derkevin holê, mînakên pêşî yên aştiyê li van deran têne ceribandin.

Tevî ku di nava dem û pêvajoyê de rêveberiya desthilatparêz bi ser ketiye jî civak ti carî ji xwesteka xwe ya xwerêvebirinê negeriyaye û li dijî rêveberiya desthilatdar timî xwesteka xwe ya xwerêvebirinê mezin kiriye. Jixwe di dîrokê de rêveberiyên qebîle û eşîran şêwegirtina herî berfireh a civakan e. Ya ku qebîle û eşîran pêk anî bi xwe, xwerêvebirin e. Li şûna ku li ber rêveberiyên xerîb stûyê xwe xwar bikin, timî tercîh kirine ku bibin civakên koçer ên li çol û çiyan, li qelaç û zozanan. Çi dibe bila bibe ji ya xwe nehatine xwarê; qirkirin jî li ber çavan girtine, lê ji pêdiviya bingehîn a xwezaya civakî mafê xwerêvebirinê negeriyane. Qebîle û eşîr gelekî serwext bûn ku ji xwerêvebirinê bigerin wê nasnameya xwe ji dest bidin û êsîr bikevin. Diyardeya jêre dibêjin berxwedana barbaran li dijî bajaran di bingehê xwe de şerê qebîle û eşîran e ku ji mafê xwerêvebirinê nagerin û bergiriya nasnameya xwe dikin. Mirov bi awayekî berfireh dikare vê diyardeyê heta roja me ya îro bibîne. Di kevalên Sumeran de bi îfadeyên bi bandor û bi awayekî destanwarî qala êrîş û berxwedanên li dijî Sumeran tê kirin ku qebîleyên çolê ango Aramîtan (qebîleyên Proto Ereb) ji Rojava û yên Hûrriyan (Proto Kurd) ji Bakur û Rojhilat bi pêş dixistin.

Pirsgirêka xwerêvebirinê ya komên qebîle û eşîran di pêvajoyên qewm, milliyet an jî gelbûnê de xwe weke demokrasiyê (bi Yewnanî tê maneya ‘xwerêvebirina gel’) bi gewde dike. Divê mirov demokrasiyê bi du xisletên wê bide naskirin: Yekemîn, di naveroka wê de dijbertiya dewletbûn û bi sazîbûna desthilatdariyê ya li ser gel heye. Duyemîn, xwerêvebirina xwe ya ji rêûresmê mayî bêhtir bi xisleta tevlîkirinê gurçûpêç dike, bi vî awayî çanda civîn û guftûgoyê bi sazî dike, prototîpa parlementê pêk tîne û bi vî rengî wê tekûz dike. Xwerêvebirin weke xweseriya demokratîk tevlîbûna hemû yekeyên civakê yên pêwendîdar pêk tîne û bi sazî dike. Di vê mijarê de mînaka dîrokî ya bi bandor û bi belgeyên nivîskî, em di demokrasiya Atînayê de dibînin. Demokrasiya Atînayê bi sedema ku bi temamî ji koletiyê nikaribû bibihure demokrasiyeke temam nayê hesibandin. Lê ji ber ku di mînaka Spartayê de dewletbûnê qebûl nake dewlet nayê hesibandin. Ev mînaka balkêş a ji demokrasiya temam derbasbûna dewletê der barê demokrasiya rastî de îro jî gelek dersên mirov jê bigire hene. Demokrasiya Atînayê ji roja me ya îro re nirxên hiştine hene weke rasterast demokrasî, bi hilbijartinên salane destnîşankirina rêveberiyê û nedana ti xisleteke jor ji bo kesên neqandî, diyardeya rêveberiyê ya di fermana demokrasiyê de, çanda civînan a welatiyan tevlî guftûgoyên polîtîk dike ango wan bi awayekî perwerde dike. Hemin wekî din serhatiya bêhejmar civakên din a nenivîsandî heye û ya wan jî çandeke demokrasiyê ya bi heman rengî ye.

Ezmûn û tecrûbeyên dîrokî yên me hewl da bi kurtî bi mînakan nîşan bidin, bi awayekî berfireh hebûn û cudabûna diyardeya xwerêvebirin û demokrasiyê li pêş çavan radixin. Şêweyekî rêveberiyê ye ku rê nade desthilatdarbûnê, rê li ber pirsgirêkên civakî venake, firsendê nade

derketina holê ya zordestî û mêtinkariyê. Gelekî girîng e ku mirov li dijî hewldanên rizandinê yên rêveberiya desthilatdar van xisletên bingehîn ên demokrasiyê û xweseriya demokratîk timî zelal bike û ji wan negere. Eger mirov demokrasiyê bike kirasê rewakirina desthilatdarî yan jî dewletê, ev xirabiya herî mezin e ku mirov bi demokrasiyê bike. Divê mirov ti carî demokrasiyê bi dewlet û desthilatdariyê re wekhev neke, nebîne. Eger bi vî awayî têgîn bêne tevlîhevkirin hingê ji pirsgirêkên civakî re çareserî nayên peydakirin û heta her biçe wê bikevin ser hev û zêdetir bibin. Demokrasiyên serwextbûna polîtîk û hestyariya exlaqî ya civakî timî li ser piyan zindî û geş dihêlin, ji bo pirsgirêkên desthilatdarî û dewlet dibin sedema çêbûna wan, qadên rastî yên çareseriyê ne. Em rejîmeke din a bi qasî demokrasiyê karibe bêyî şer pirsgirêkan çareser bike nabînin. Lê kengî xweşhalî û aramiya civakê bikeve ber derbên kujer ên dewlet û desthilatdariyê ango tehlûkeyeke bi vî rengî derket holê, demokrasî bi coş şer dikin û bi hêsanî jî têk naçin.

Di serdema modernîteya kapîtalîst de ji bo demokrasiyan û xweseriyên demokratîk tehlûkeya herî mezin ji desthilatdariyên dewleta netewe tên. Pirraniya dewletên netewe yên kirasê demokrasiyê li xwe dikin, navendîbûna herî hişk pêk tînin û bi vî awayî mafê xwerêvebirinê yê civakê bi temamî ji holê radikin. Hegemonya îdeolojîk a lîberal hewl dide vê xisleta dewleta netewe ya dijberî demokrasiyê, weke xisleta ‘serdema demokrasiyê’ bi hîle bide pejirandin û ji aliyê dewleta netewe ve înkara demokrasiyê weke serketina rejîma demokrasiyê tê qebûlkirin. Li hemberî modernîteya kapîtalîst pirsgirêka rastî ya demokrasiyan ew e, divê cudahiya xwe nîşan bidin û dev ji xisleta xwe ya tevlîkirinê û domdar bernedin. Heta hegemonya desthilatdarî û dewletê neyê ferzkirin pirsgirêkeke civakî ya ku demokrasî çareser nekin tineye.

Sosyalîzma pêkhatî hewl da pirsgirêka desthilatdarî û dewletê bi pêkanîna desthilatdarî û dewleteke din çareser bike û ev jî sedema bingehîn a îflasa wê ye. Sosyalîzma pêkhatî qet hesab nekiribû ku desthilatdarî û dewlet sermayeya kombûyî ne, wexta fonksiyonel dibin bi sermaye û kapîtalîzmê bi encam dibin. Di warê teorîk ê vê mijarê de çavkorî bû ye. Dewletdariya netewe ya navendî ji mînakên lîberal ên klasîk qat bi qat mezintir kiriye û yeqîn kiriye ku wê bi vî awayî bigihîje kominîzmê, lê di dawiyê de bi pêkhatina herî hov a kapîtalîzmê re rûbirû bûye. Encama herî girîng a ezmûna sosyalîzma pêkhatî ew e, sosyalîzm bê demokrasî pêk nayê. Di roja me ya îro de pirsgirêkên bi navê civaka sivîl, mafên mirov û hindikayiyan, pirsgirêkên rêveberiyên xwecihî û bi tevahî pirsgirêkên neteweyî yên klasîk gelekî zêde bûne. Ji ber ku dewleta netewe ya navendî xwerêveberî û demokrasî tepisandine, pirsgirêkên behsa wan tê kirin derketine holê. Ji lewra ji bo ev pirsgirêk bêne çareserkirin divê ew zemînê tepisandin û desteserkirina mafan ê dewleta netewe ji holê bê rakirin. Hem karekterê federal ê DYE’yê, hem jî xwebipêşvebirina Yekîtiya Ewrûpayê ber bi aliyekî ve ku pê nirxên demokratîk ên hatine desteserkirin hêdî hêdî be jî ji nû ve li civaka sivîl, ferd, hindikayî û rêveberiyên xwecihî vedigerîne, nîşan didin ku ji taktîk û teoriyên sêsed salî yên dewleta netewe çerx kirine, ji wan vegeriyane. Ji ber ku pêvajoya sêsed

salî bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatibe dîtin rê li ber şeran, talanan, mêtingerî, qirkirin û asîmîlasyonan vekir. Mînaka Yekîtiya Ewrûpayê bi sînor be jî gavek e ku ber bi demokrasiyê ve hatiye avêtin. Çawa ku di modela dewleta netewe de jî hat dîtin, ev modela li demokrasiyê vekirî, îhtîmaleke xurt e, ji aliyê dewlet û gelên dinyayê ve were parvekirin. Lê wer xuya dike ku bi awayekî bingehîn a li parzemînên din ên dinyayê pêş bikeve, demokrasiya radîkal e. Ezmûna Emerîka Latîn, nêzîkatiyên welatên berê yên sosyalîzma pêkhatî, rastiya Hindistan û heta Efrîkayê girîngiya demokratîkbûnê her roja diçe bêhtir nîşan didin û neçar dikin ku pêşketin ber bi vî alî ve pêk bên.

Li herêm û dayika niştiman a şaristaniya navendî kaosa mezin a pêk tê, îflasa dewletdariya netewe û parvekirina desthilatdariyê ji her alî ve û bi temamî eşkere nîşan dide. Vê kaosê maskeyên desthilatdariyên xwe disipêrin hiyarerşiyên rehên wan kûr diçin û dewletên netewe yên Filistîn-Îsraîl, Iraq û Afganistanê anîne xwarê û vebirrî nîşan daye ku ew çavkaniya bingehîn a pirsgirêkan in, û dîsa ji her alî ve li pêş çavan raxistiye ku ew çavkaniya şîddet, teror, şer û tevkujiyê ne. Dewleta netewe û parvekirina desthilatdariyê mîna topeşeqê [bumerangê] vedigere li xwediyên xwe dide û ji bilî vê tiştek jê nayê û ev rastî jî têra xwe piştrast bûye.

Di van şert û mercan de hêza çareserker a demokrasiya radîkal û konfederalîzma demokratîk derdikeve holê. Li ser vê cografyayê şeveqa şaristaniyê avêt û jêre bû dergûş, vê carê jî şeveqa federalîzma demokratîk, demokrasiya rastî û radîkal diavêje û jêre dibe dergûş. Di xwezayê de rêzik û pîvanek heye: Her tişt li ser koka xwe ji nû ve hêşîn dibe. Wer xuya dike ku demokrasî jî wê li ser rehên xwe yên digihîjin şoreşa neolîtîkê bi temamî û bi awayekî serketî wê ji nû ve hêşîn bibe. Ev dergûşa ku hê jî derban ji şaristaniyên hegemonîk ên navendî hemûyan dixwe, pêkan e ku zarokê demokrasiyê xwedî û mezin bike. Ev çiya û erdên ji mêj ve hêza xwerêvebirinê, qabîliyeta civakbûna polîtîk û exlaqî ji dest dane, heye ku careke din, ji derketina ‘Kurtî’yan a dergûşê û meşa wan re şahidiyê bikin. Li çanda Rojhilata Navîn her tişt mîsala kûpên bi ser hev ve kirî ne. Heqîqeta civakî ya li qadekê serketina xwe piştrastkirî, xwedî wê xisletê ye ku bi lez li qadên din belav dibe. Îslam di nava demeke kin a bi qasî sîh salî de bû sîstemeke dinyayê. Pirsgirêkeke piçûk a mîna Filistînê bi salan e ku fena tevahiya herêmê kiribe êsîrê xwe. Demokrasiya rastî ya bi şeveqa Kurdistanê re di dergûşa şaristaniyê de mezinbûyî êdî dikare gav biavêje û xweseriya demokratîk, konfederalîzma demokratîk û îfadeya sîstematîk a van diyardeyan tevan moderniteya demokratîk, weke alternatîfeke li dijî moderniteya kapîtalîst dest pê kiriye bi rolekê radibe. Li dijî sîstema moderniteya kapîtalîst a bi gelek dersên ibretwarî îflasa xwe her roja derbas dibe piştrast dike, moderniteya demokratîk mîna roja hiltê ye.

Di têkiliyên desthilatdarî, dewlet û xweseriya demokratîk de pirsgirêka bingehîn a divê mirov ji hev derxe ew e, divê cudahiyên di navbera xwe de çawa biparêzin û bi rêkûpêk bikin ango wê pirsgirêka aştiya civakî çawa çareser bikin. Em ji mînakên dîrokî û rojane dibînin ku kengî hewl

didin hevdu bi temamî tesfiye bikin, desthilatdariya dewletê vediguhere cinawirê (Levîathan) civakî û pêvajoya kaotîk kûrtir û domdar dibe. Her ceribandina çareseriyê ya di vê çarçoveyê de hê bêhtir bêhnê li civakê diçikîne û wê diqedîne. Ji çaresernebûnê mirovatiyeke bûye mîna moriyan a di bin îdareya mutleq a dewletê û qalibên zêdexwarin-bikaranînê de asêmayî paşve dimîne. Ev rastî bi êrîşên topyekûn a modernîteya kapîtalîst li dijî civakê pêk hatiye. Qelsiyên şoreşgertiya utopîk û ji ber ku nikarîbûye ji desthilatgiriyê bibihure, modernîteya kapîtalîst bêhtir bi hêz bûye.

Çareseriya xweseriya demokratîk bi du cure rêbazan dikare bi van avahiyên dêwane re serî derxe. Rêbazên şoreşger û reformker. Rêbaza şoreşger a bi tevahî xirakirina avahiyên modernîteya kapîtalîst, nexasim desthilatdariya dewlete netewe dike armanc, ji ezmûnên wê yên dîrokî jî diyar bûye ku desthilatdariya dewleta netewe bi hêztir kiriye û bi ser neketiye ku avahiyên wekhevî, azadî û demokratîk ên civakê ava bike. Demokrasiya reformker jî di nava modernîteya serdest de heliyaye, nikarîbûye xwe ji vê aqûbetê rizgar bike. Encama em ji vê bigirin ev e, çi rêbaz were bikaranîn bila were bikaranîn, ya esas ew e, divê mirov alternatîfên entelektuelî û sazîyî yên sîstema modernîteya demokratîk pêşde bibin di rojevê de bihêle û bi cih bîne. Divê mirov karibe texmîn bike ku herdu sîstemên modernîteyê, dibe ku bi sedsalan li cem hev bimînin, û li gorî vê, mirov hem di binyeya dewleta netewe ya taybet de, hem jî di nava sîstema jor-netewan a gerdûnî de çareseriyên destûrî yên demokratîk pêş bixin û bi îhtîmaleke xurt, pêkan e ku ji têkilî û nakokiyên di navbera xwe de bibihurin. Pêşketineke bi vî rengî dikare rabihuriya neyênî bigihîne paşeroja erênî.

**3- Neteweya Demokratîk**

Têkoşîna neteweya bi armanca dewletê û dewleta bi armanca netewe, faktora sereke ya rastiya xwînrij a serdemê ye. Çavkaniya sereke ya pirsgirêkên serdema modernîteyê ew e, netewe bi desthilatdarî û dewletê ve kirin. Em wexta ku pirsgirêkên serdema modernîteyê bi pirsgirêkên çavkaniya xwe dewletên xanedan û dîktator in, bidin ber hev, cudahiya herî mezin a di navbera wan de dewleta netewe ye. Dewleta netewe ya yek ji mijara herî tevlîhev a zanista civakî ye, bi awayê xuya dike, mîna çoyekî bi sêhr pêşkêş dikin ku bi tevahî pirsgirêkên nehemdem û li dijî modernîteyê ne, ji hev derdixe. Lê bi xwe jî pirsgirêka civakî ya ku yek e, dike hezar. Sedema vê yekê jî ew e, wê mekanîzma û çerxa desthilatdariyê heta bi rehên zîro yên civakan belav kiriye. Desthilatdarî bi xwe pirsgirêkan çêdike; ji ber karekterê wê yê potansiyel ê di şêweyê zorê yê sermayeyê de bi rêxistin bûye, weke zordestî û mêtinkarî pirsgirêkên civakî çêdike. Civaka netewe ya homojen armanca dewleta netewe ye, û bi desthilatdariyê welatiyên (qaşo bi huqûqê) wekhev ên sexte yên bi şîddetê barkirî û lihevçêkirî yên ku hemû endamên wan bi birrekê hatine birrîn û mîna diranên şeh kirine wekhev, çêdike. Ev welatî bi gotina qanûnê

wekhev in, lê di her qada jiyanê de weke ferd û hebûneke kolektîf heta tu bêjî ji wekheviyê dûr in.

Modernîteya kapîtalîst wexta xwe weke dewleta netewe bi rêxistin dike, ji rêxistinkirina bi awayê yekdestdariya ekonomîk zêdetir bi roleke zordest û mêtinkar radibe. Marksîzmê û bi giştî sosyolojiyê têkiliya dewleta netewe bi zordestî û mêtinkariyê re baş nedîtine yan jî dewleta netewe weke saziyeke joravahî ya gelekî ji rêzê pêşkêş kirine û ev yek jî kêmasî û berevajîkirineke bingehîn e. Dema ku analîza çîn û sermayeya maddî ji dewleta netewe serbixwe bê kirin, wê weke gotinên gulover ên ji encameke civakî şuştî û muceredkirî yên herî bêtahm û bêber bêne hesibandin. Di binê serneketina sosyalîzma pêkhatî de ev muceredkirin heye; ya rastî di vê serneketina wê de encamên bi vê muceredkirinê ve girêdayî bi bandor bûne.

Netewe weke têgîn, ew şêweyê civakê yê klan, qebîle û eşîrên xizm e ku piştî awayê qewm, gel an jî milliyetê tê, û xwe herî zêde li ser wekhevbûna ziman û çandê karekterîze dike. Ji lewra civakên neteweyî, li gorî civakên qebîle û qewman bêhtir xwedî hecmekî berfireh in, û bêhtir cûrbicûriyan digirin nava xwe, lewma ji komên mirovan ên bi têkiliyên sist bi hev ve girêdayî pêk tên. Civaka neteweyî zêdetir diyardeyeke serdema me ye. Eger mirov wê bi awayekî giştî bide naskirin, mirov dikare bibêje ew koma kesên xwedî zêhniyeteke hevpar in. Ango diyardeyek e ku bi awayekî zêhnî heye. Lewma hebûneke mucered û xeyalî ye. Em ji vê re dikarin neteweya bi çandê terîfkirî jî bibêjin. Ji aliyê civaknasiyê ve danasîna rast jî ev e. Tevî cudahiya çîn, cins, reng, etnîsîte û heta koka cuda ya neteweyî jî kengî bi awayekî giştî cîhana çand û zêhniyeteke hevpar pêk hat, ev yek ji bo netewebûnê qîm dike. Ji bo vê danasîna giştî ya netewe bêhtir sofîstîk bikin têgînên weke neteweya dewletê, neteweya huqûqê, neteweya ekonomiyê û neteweya eskerî (artêş-millet) çêdikin û ev neteweperestok kategoriyên cuda ne, neteweya giştî bi hêz dikin. Mirov dikare ji van re neteweya hêz û zorê jî bibêje. Yek ji armancên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst pêkanîna neteweya bi hêz e. Ji ber ku neteweya bi hêz di warê sermayeyê de dibe xwedî îmtiyaz, dibe xwedî bazara berfireh, derfetên mêtingerî û emperyalîzmê. Lewma gelekî girîng e, divê mirov van neteweyên bi hêzkirî weke modela bi tenê ya netewe nebîne, heta divê mirov wan weke neteweyên şoven ên bi hêz û neteweyên di xizmeta sermayeyê de bibîne. Jixwe ji ber van xisletên xwe çavkaniya pirsgirêkan in. Modela netewe ya ji çandê netewe çêke, lê zordestî û mêtinkariyê bi gem bike û nexwaze, modela netewe ya demokratîk e. Neteweya demokratîk, neteweya herî zêde nêzî wekhevî û azadiyê ye. Li gorî vê danasînê, ji bo civakên lêgerîna wan a azadî û wekheviyê heye, ev têgihiştina netewe ya herî di cih de ye.

Modernîteya kapîtalîst û sosyolojiya ji wê îlhamê digire, li ser kategoriya neteweya demokratîk nasekinin. Ev jî ji şêweyê avabûn û hegemonya wê ya îdeolojîk e. Neteweya demokratîk bi tenê qîma xwe bi hevpariya zêhniyet û çandê nayne, bi tevahî endamên xwe li saziyên xweser ên

demokratîk digihîne hev û rêve dibe. Ev xisleta wê ya diyarker e. Şêwazê rêveberiya demokratîk û xweser ji bo netewebûna demokratîk şertê pêşî ye. Bi vî aliyê xwe alternatîfa dewleta netewe ye. Li şûna rêveberiya dewletê, rêveberiya demokratîk derfetekî mezin ê azadî û wekheviyê ye. Sosyolojiya lîberal, neteweyê yan bi dewleteke avabûyî re yan jî bi tevgerekê re ku armanca wê avakirina dewletê ye, wekhev dibîne. Sosyalîzma pêkhatî jî xwedî lêgerîneke bi vî rengî bû û ev jî hêza îdeolojiya lîberal nîşan dide. Modernîteya alternatîf a neteweya demokratîk modernîteya demokratîk e. Ekonomiya ji yekdestdariyê rizgarbûyî, ekolojiya bi hawîrdorê re lihevkirî, teknolojiya dostê xweza û mirovî, bingehê sazîbûna modernîteya demokratîk e, ango bingehê sazîbûna neteweya demokratîk e.

Ji bo civakên neteweyî weke şertên pêşî diyardeya welatek û bazareke hevpar destnîşan dikin, lê ev weke hêmanên maddî nabe ku weke xisletên diyarker ên netewe bêne hesibandin. Di vî warî de mînak Cihû ne; demeke dirêj timî bêwelat man, lê di dîrokê de timî weke neteweyeke bi hêz li guher û goşeyên dewlemend ên dinyayê jiyan, tevî ku bazareke wan a neteweyî tinebû ji wan hat ku li bazarên dinyayê bibin neteweya tekane ya herî bi hêz. Bêguman welat û bazar ji wan navgînan in ku dewlet-neteweyê bi hêz dikin. Ji bo welat û bazarê şerên herî zêde û xwînrij ên dîrokê hatine kirin. Welat weke milk, bazar jî weke qada karê gelekî bi nirx in. Têgihiştina neteweya demokratîk a welat û bazarê cihê ye. Neteweya demokratîk welat bi nirx û hêja qebûl dike, ji ber ku ji bo çand û zêhniyeta netewe derfeteke mezin e; çand û zêhniyeteke di bîra wê de nebe nîne. Lê divê mirov ji bîr neke ku têgîna welat-niştiman a modernîteya kapîtalîst fetîşe kiriye û xistiye pêşiya civakê bi armanca karê ye. Dîsa girîng e ku mirov welat zêde mezin neke, nenepixîne. Têgihiştina “Her tişt ji bo welat” çavkaniya xwe têgihiştineke neteweya faşîst e. Ya manedartir ew e, mirov her tiştî ji bo civakeke azad û neteweyekî demokratîk bike. Divê mirov vê jî negihîne asta perestinê. Ya esas û bingeh ew e, divê mirov jiyanê bi nirx û qîmet bike. Welat ji bo jiyana ferd û netewe bi tenê navgînek e, naxwe îdeal nîne. Neteweya dewletê li pey pêkanîna civakeke homojen e, lê neteweya demokratîk bi giranî ji kolektîvîteyên cuda pêk tê. Ji ber ku cudatiyan dewlemendî dibîne û qebûl dike. Jixwe jiyan bi xwe bi cudatiyê pêkan e. Dewleta netewe ya ferz dike ku welatiyan bike tek tîp ên mîna ji tornayekê derketine, bi vî aliyê xwe jî bi jiyanê re li hev nake, berevajî ye. Armanca wê ya dawî afirandina mirovên robot e. Bi vê xisleta xwe jî ber bi hîçtî û netiştiyê ve diçe. Welatî û endamê neteweya demokratîk cuda ye û vê cudabûna xwe ji komên cuda digire. Hebûna qebîle û eşîran jî ji bo neteweya demokratîk dewlemendiyek e.

Bêguman ziman bi qasî çandê ji bo netewe ne girîng e, û şertekî mecbûrî jî nîne. Mirov dikarin xwedî zimanên cihê bin û ji yek neteweyî bin. Çawa ku ji her neteweyekî re dewletek hewce nake, ji her neteweyî re jî zimanek an jî devokek hewce nake. Tevî ku pêdivî bi zimanekî neteweyî heye jî şertekî bivênevê nîne. Mirov dikare ziman û zaravayên cuda û cihê ji bo neteweyekî demokratîk dewlemendî bihesibîne. Lê belê dewleta netewe bi awayekî hişk tek

zimanî ferz dike û vê dike bingeh. Pirrzimanî û jixwe pirrzimanên fermî bi hêsanî qebûl nake. Bi vî aliyê xwe hewl dide ji cihêwaziya neteweya serdest sûdê werbigire.

Li cihê ku neteweya demokratîk pêş nekeve û dewleta netewe jî pirsgirêkan çareser neke weke têgihiştin û lihevkirinekê mirov dikare behsa neteweya huqûqê bike. Çareseriya mebest jê welatiyê destûra bingehîn e, ya rastî neteweya huqûqê ye. Li gorî destûra bingehîn, bi welatiyê huqûqî cihêkariya nijad, etnîsîte û milliyetê nayê kirin. Bi xisletên bi vî rengî mirov nabe xwedî maf û heq. Neteweya huqûqê bi vî aliyê xwe kategoriyek e ku bi pêş dikeve. Nexasim neteweyên Ewrûpayê ji neteweyên milliyet ber bi neteweyên huqûqê ve diberidin. Li cem neteweyên demokratîk rêveberiya xweser esas û bingeh e, li cem neteweyên huqûqê jî heq. Li cem dewleta netewe jî rêveberiya desthilatdariyê diyarker e. Tîpa netewe ya herî bi tehlûke sazîbûn û zêhniyeta 'artêş-millet' e. Herçiqasî weke temsîla neteweya bi hêz xuya bike jî bi xwe di navê de jiyan gelekî zor e, timî wezîfeyan ferz dike û di navê de zêhniyetek heye heta bi faşîzmê diçe. Neteweya ekonomîk, kategoriyek e ku nêzî dewleta netewe ye. Ev têgihiştina netewe ya li DYE, Japonya, heta Elmanyayê rola sereke dide ekonomiyê di rabihuriya Ewrûpayê de bi hêztir bû. Herçiqasî xwestin kategoriya neteweya sosyalîst biceribînin jî mirov nikare behsa serketina wê bike. Mînaka vê neteweyê hindik be jî mirov li Kubayê dibîne. Lê ev mînaka neteweyê jî şêweyê sosyalîzma pêkhatî ya dewleta netewe ye; ew şêweyê dewleta netewe ya bi giranî kapîtalîzma dewletê ye ku li şûna dewleta netewe ya bi giranî kapîtalîzma taybet hatiye bicihkirin.

Em dema behsa teoriya netewe bikin, xusûsa divê bi girîngî rexneya wê bê kirin ew e, pîrozkirin û îlahîkirina netewe ye. Modernîteya kapîtalîst li şûna têgihiştinên xweda û dîn ên ji rêûresmê, xwedatiya dewleta netewe bi xwe ava kiriye. Ev xusûs gelekî girîng e. Eger em îdeolojiya milliyetgiriyê weke dînê dewleta netewe şîrove bikin, em dikarin li dewleta netewe bi xwe jî weke xwedayê vî dînî serwext bibin. Dewlet bi xwe di serdema modernîteyê de bi awayekî cewherê têgînên xwedayî yên tevahiya serdema navîn û heta serdema destpêkê bihewîne, hatiye avakirin. Diyardeya jêre 'dewleta laîk' dibêjin, weke dewleta bi tevahî xwedatiyên serdema destpêkê û navîn di nava xwe de hewandibe yan jî cewherê wan xistibe nava xwe hatiye avakirin û bi gewde bûye. Divê mirov di vê babetê de hîç nexape. Em wexta cîla dewlet-neteweya laîk an jî modern jê bibin, ji binê wê dewleta îlahî ya serdema destpêk û navîn derkeve. Di navbera dewlet û xwedatiyê de têkiliyeke xurt heye. Bi heman awayî di navbera monarkê serdema destpêk û navîn ê mezin dibe û têgîna xwedê de têkiliyeke xurt heye. Monark weke şexs, piştî ku serdema navîn bandora xwe namîne bi sazî dibe û vediguhere dewleta netewe, lewma monarkê bûyî xweda cihê xwe ji xwedayê dewleta netewe re dihêle. Ji lewra tevî têgînên pîrozkirî yên welat, netewe û bazarê, bi heman awayî di bingehê pîrozkirina saziyên dewleta netewe de ew hegemonya îdeolojîk heye ku qanûna kara herî zêde ya modernîteya

kapîtalîst gengaz dike. Hegemonya îdeolojîk ev têgînên bi netewe re têkildar çiqasî dînî bike pîvana kara herî zêde jî rewa dike û bi vî awayî dide pêkanîn.

Di serdema me de sembolên dewleta netewe yên weke ‘tek al’, ‘tek ziman’, ‘tek welat’, ‘tek dewlet’, ‘dewleta unîter’ û sloganên wê yên sereke yên bi qasî ku guhên mirovan kerr bikin têne qîrîn, çavên ji rengên cuda yên alan bêzar dibin û wan piçûk dibînin, cîhana zêhniyetê ya monolotîk û seqetkirî, di her xwepêşandanê de şovenîzma neteweyî, nexasim di çalakiyên spor û hunerê de bi awayekî rakin pêdarê rîtualîze dikin, mirov van hemûyan dikare weke îbadetên dînê milliyetperestiyê şîrove bike. Ya rastî, îbadetên serdemên berê jî bi heman fonksiyonê radibin. Li vir, hedefa bingehîn ew e, berjewendiyên desthilatdarî û mêtinkariyê yan bi nepenî yan jî bi pîrozkirinê werin rewakirin û bicihanîn. Eger mirov roja me ya îro der barê dewleta netewe de bi tevahî nêzîkatî û pêkanînên zêde nepixandî û ser meseleyê digirin bi vê paradîgma bingehîn şîrove bike, mirov ê karibe bêhtir li heqîqeta rastiya civakî serwext bibe û wê fêhm bike.

Neteweya demokratîk modeleke neteweyê ye ku herî kêm ev nexweşî li cem wê hene. Rêveberiya xwe pîroz nake. Rêveberî weke diyardeyeke zelal di xizmeta jiyana rojane de ye. Wexta ku pêdiviyên wê bi cih bêne anîn, her kes weke karmendekî dikare bibe rêveber. Rêvebertî bi nirx e, lê pîroz nîne. Serê têgihiştina nasnameya neteweyî vekiriye; mîna mumîntî û endametiyeke dîn a sergirtî nîne. Mirov ji neteweyekî be, ev ne cihêwazî ye, ne jî qusûr û kêmaniyek e. Mirov dikare ji yekê zêdetir bibe endamê neteweyan. Ya rastî, dikare gelek netewetiyên cuda bikevin nava hev. Eger neteweya demokratîk bi neteweya huqûqî re li hev bike, bi hêsanî dikarin bi hev re bijîn. Tevî ku welat, al û ziman hêja ne jî ne pîroz in. Welat, ziman û alên hevpar dikarin di nav hev de, li şûna dijberiyê li ser bingehê dostaniyê bi hev re bin, ev hem pêkan e, hem jî li gorî jiyana civaka dîrokî ye. Diyardeya neteweya demokratîk bi van xisletên xwe hemûyan weke alternatîfa bi hêz a dewletdariya neteweyê ya destikê harkirina şer weke modernîteya demokratîk di dîrokê de ji nû ve cihê xwe digire.

Modela neteweya demokratîk weke modeleke çareserker, têkiliyên civakî yên neteweperestiya dewletê parçeparçe kirine ji nû ve demokratîze dike, li hev tîne, aştiyane û bêhnfireh dike. Kengî dewleta netewe ber bi neteweya demokratîk biberide ev yek ê bi xwe re destketiyên gelekî mezin bîne. Modela neteweya demokratîk beriya her tiştî têgihiştinên civakî yên bi şîddetê barkirî bi serwextbûneke rast a civakî nerm, mirovane û milahîm dike ango mirovî biaqil û hestyar dike, wî dike mirovê xwedî empatî û xweşbîn. Bêguman têkiliyên mêtinkariyê yên şîddet dawerivîne navê bi tevahî ji holê raneke jî dikare têra xwe kêm bike, bi pêkanîna derfet û îmkanên ji bo civakeke azadtir û wekhevtir vê bi cih tîne. Bi tenê ji bo nava xwe xweşbînî û aştiyê pêk nayîne, di heman demê de li dijî neteweyên din ên li derve nêzîkatiyên bi zordestî û mêtinkariyê barkirî vediguherîne berjewendiyên hevpar û sînerjiyê, û bi vî awayî vê mîsyona

xwe pêk tîne. Kengî saziyên neteweyî û navneteweyî li gorî têgihiştina bingehîn a sazîbûn û zêhniyeta neteweya demokratîk ji nû ve hatin avakirin, wê baş were fêhmkirin ku moderníteyeke nû ango moderníteya demokratîk, ne bi teorîk bi encamên pêkanînê jî bi qasî Ronesansekê ye. Alternatîfa moderníteya kapîtalîst moderníteya demokratîk û neteweya demokratîk a di bingehê wê de ye; civaka ekonomîk, ekolojîk û aştiyane ya di hundir û derveyî neteweya demokratîk de deribandî ye.

Di roja me ya îro de li şûna dewleta netewe bi xwe ya nava wê vala yan jî hatiye valakirin, yekîtiyên wê yên herêmî û global û nexasim jî Neteweyên Yekbûyî, divê neteweyên demokratîk ên nû yên bi performansa bilind a xisletên xwe yên pirsgirêkan çareser dikin bêne avakirin. Divê ev yek bi tenê weke neteweya demokratîk a şûna dewleta netewe ya taybet bigire û wê veguherîne neyê dîtin. Ji bo rizgarbûna ji krîza kapîtala fînansê, ev rêya herî rast a polîtîk û exlaqî ye ku modelên herêmî û global di nava hev de pêşde dibe.

**4- Sosyalîzm û Kapîtalîzm**

Li dijî ferdperestiya ku moderníteya kapîtalîst li ser civakê ferz dike, parastina civakbûnê û têkilîdanîna wê bi daxwazên azadî û wekheviyê re îdealên bingehîn ên utopya sosyalîzma klasîk in. Hesreta ji rêûresmê ya ji bo civak, azadî û wekheviyê bi hegemonîkbûna kapîtalîzmê re dijwartir bûye. Her ku hegemonya îdeolojîk a lîberal bi pêş ket, utopyayên civakî jî ketin bin bandora zanistên pêş diketin û xwe sosyalîst îlan kirin. Di serdema nû de hegemonya sîstema şaristaniya navendî dest guhert û ev di encama têkoşîna dirêj a bajarbûna Ewrûpaya Rojava de pêk hat. Hegemonya şaristaniyê ya welatên Îslamî, Çîn û Hindistanê di destê xwe de digirtin bi awayekî bingehîn di sedsala 16. de destpê kir, bi lez dest guhert. Çanda bajêr a Ewrûpaya Rojava bi awayekî serketî çanda navendên şaristaniyê kir malê xwe û di destguhertina hegemonyayê de ev yek bi rola sereke radibe.

Çawa ku tê zanîn, şaristaniya Ewrûpaya Rojava ne bi çanda Xiristiyantiyê û hêza wê ya çareserker, lê ji ber ku nikarîbû bersivê bide pêdiviyên jiyana bajarê nû, li çandên nû geriyaye. Xiristiyantî li hemberî pêşketinên sedsala 16. bi tenê bi reformê dikarîbû xwe dewam bikira. Reforma di dîn de gelekî kêm dikarîbû bersiva pêdiviyên çandî yên şaristaniya bajarê nû bidaya. Netewebûyîna dêrê bi xwe ji dil nebû, guhertineke şêweyî bû. Çavkaniyên bingehîn ên ku pêdiviya çandê pê hebû, Îslama Rojhilata Navîn, şaristaniyên Çîn û Hindistanê bûn. Veguhestinên ji van navendan, di dawiya sedsala 18. de bi şoreşên polîtîk û civakî yên Fransî û ekonomiya Ingilîz bi encam bûne. Hemin bandora gelek faktorên din jî di vê yekê de hene. Herçiqasî keşif û vedîtinan rê li ber nûtiyê vekiribin jî di tehlîla dawî de eşkere bû, eger ji navendên şaristaniyê veguhestina çandî nebûya, destguhertina hegemonyayê jî ne pêkan bû. Bêguman ji Ewrûpayê hat ku bi tevgerên Ronesans, Reform û Rohnîbûnê sentez û nûbûneke mezin pêk bîne. Em di demên berê yên dîrokê de tevgerên bi vî awayî li Kevana Bi Bereket,

Mezopotamya Jêr, Rojhilatê Derya Spî û peravên Egeyê dibînin. Ya rastî, sîstema şaristaniya navendî ya bi rêzê li van navendên dîrokî pêk hatiye, weke xeleka mezin a dawî li peravên Ewrûpaya Rojava rehên xwe berdane. Di vê de şaristaniyên bajêr ên Îtalyayê bi roleke diyarker rabûne.

Di çarçoveya mijara me de girîngiya vê şaristaniya nû, ango modernîteya kapîtalîst ew e, paradîgma nû ya zanistî kiriye bin hegemonya xwe. Zanista nû ya pragmatîk a li şûna dîn, heta li şûna zêhniyeta bi koka xwe felsefî hat danîn, bû nirxeke payeberz û hêja. Şoreşa zanistî ya di dawiya sedsala 18. de li zanîngehan bi pêş ket, şoreşên din ên polîtîk, civakî û ekonomîk temam kirin. Zanistên fizikî yên bi ceribandinê û zanistên têkiliya xwe bi xwezaya civakî re bi awayekî bingehîn ji hev cihê kirin. Di nava wan bi xwe de jî gelek qadên pisporiyê û şaxên zanistî pêkanîn. Hegemonya îdeolojîk a lîberal zêde dereng nema mohra xwe li zanista civakî xist. Encamên erênî yên şoreşan di bin yekdestdariya xwe de kedî kir û bi berjewendiyê xwe re kir ahengekê. Utopya sosyalîst ber bi nîvê sedsala 19. ve bi pêşengiya K. Marks û F. Engels xwe weke sosyalîzma zanistî eşkere kir û ev bi bandora zanistperestiya lîberalîzmê pêk hat. Jixwe K. Marks û F. Engels eşkere anîn ziman ku sosyalîzma wan a zanistî sentezeke felsefeya Elman, polîtîka ekonomiya Ingilîz û sosyalîzma Franseyê ye.

Tevî îdeaya wê ya zanistîbûnê û rexnegiriya wê hemûyî, di serî de sosyalîzmên pêkhatî yên Rûsya û Çînê di gelek ezmûn û ceribandinan de hat dîtin ku ji sosyalîzma zanistî bi temamî nehatiye ji avahiyên çanda maddî ya modernîteya kapîtalîst (saziyên ekonomîk, civakî û polîtîk), ji zêhniyet û cîhana wê ya zanistî bibihure. Kes nikare îddîa bike ku şoreşên sosyalîst bi temamî têkçûne, û hatine pûçkirin. Şoreşên em behsa wan dikin mîrateyeke mezin li pey xwe hiştin û kes nikare înkar bike ku hê jî di jiyana rojane de hêmanek in ku dest ji wan nabe û hêza herî zêde bi hêvî ya cîhana zêhniyetê ne. Lê nikarîbûn cihêwaziya şaristaniya alternatîf û modernîteyê mezin û xurt bikin. Di nava modernîteya kapîtalîst de bi giranî heliyan û nikarîbûn xwe ji vê aqûbetê rizgar bikin. Ev rastî ne qeder û çarenûs bû, îro têra xwe eşkere bûye ku bi wan pirsgirêkan re têkildar e, ku sosyalîzma dema kapîtalîzmê nikarîbû çareser bike.

Bi destpêka pîşesaziya kapîtalîzmê re guftûgoyên der barê civakê de girîng in. Di vê demê de hewl didin utopyayên sosyalîst li ser bingehekî zanistî û xeteke çalakiyê deynin. Lê di binê hemûyan de fikra Rohnîbûnê heye ku ji binî ve ji rabihuriyê qut bûye. Fikra Rohnîbûnê bi awayekî diyalektîkî ji rabihuriyê nebihuriye, ji rabihuriyê ji binî ve qut bûye, lewma bi xurtî tesîr kiriye li pêvajoya dused salên paşê. Bi awayekî rahiştine diyardeyan mîna ku ji nû ve têne avakirin, ti têkiliya wan bi rabihuriyê û rêûresmê re tineye. Û heta her tiştê bi rabihuriyê re têkiliya xwe heye bûye mijara nirxandinên negatîf. Herçiqasî mirov li gorî paradîgmaya nû vê helwestê fêhm bike jî eşkere ye ku wê rastiya civakî berevajî bike û nîşan bide. Bêguman kapasîteya heqîqetê ya fikra Rohnîbûnê bi gelek aliyên xwe (ne bi temamî) di ser serdemên

beriya xwe re ye. Eger wisa nebûya, jixwe nikarîbû serdema nû biafirîne. Lê wexta em dibêjin wisa bû, nayê wê maneyê ku bi temamî heqîqetê di nava xwe de dihewîne. Lê îdeaya tevahiya pêşiyên wê bi vî awayî bû. Çavkaniya pirsgirêkan jî ev îdea ne. Mirov dikare Hegel weke fîlozofê mezin ê fikra Rohnîbûnê, yê ku ew kiriye ber revîzyonê bide naskirin. Dîroka civakî bi awayekî heqê wê bide, felsefeya zanistî jî bi hêzeke ku hê kes nikaribe jê bibihure (ji aliyekî ve) daniye holê.

K. Marks ê ji Hegel girtiye, yeqîn kiriye ku wê karibe bi materyalîzmê ji aliyê bi hêz û zêde îdealîst ê felsefeya Hegel bibihure û di vê de jî têkûz tevgeriyaye. Li vir a pirsgirêk ew e, ji hev cihêkirina îdealîzm û materyalîzmê zêde ne girîng e, ji ber ku ne hatiye fêhmkirin, herdu jî bi xwe xwedî xisletên metafizîka îdealîst in. Yeqîn kirine ku du felsefeyê dijber in. Li vir, Marks ji Hegel zêdetir ji xeta Rohnîbûnê bi tesîr bûye. Marks, rabihurî ji bihurînê jî wêdetir bêhukim hesibandiye yan jî ew weke ku bi tenê siya bûyerekê, ya dîmenekî be nirxandiye. Nikarîbûye îdrak û fêhm bike ku rabihurî bi tevahî giraniya xwe 'niha' ye. Di vê mijarê de bi qasî Hegel bi gurçûpêç nîne. Mirov dikare bibêje, di salên dawî yên temenê xwe de (1880-1883) li vê kêmanî û şaşiyê hayil bûye, hem li girîngiya diyardeya dewletê ya joravahî ye, hem jî li girîngiya civaka kominî ya berê hayil bûye. Eleqeya wî ji bo civaka Rojhilat zêde bûye. Di fikra xwe de hin alî sererast kirine. Lê belê xeta Rohnîbûnê di tevahiya dîroka sosyalîzma pêkhatî de serwerî Marksîzmê bûye. Şaşiya bingehîn a wê demê ev e: Bawer kirine ku ji civaka kapîtalîst bibihurin ango bi temamî di ser kapîtalîzmê re derbas bibin wê karibin civaka nû yan jî kominîzmê pêk bînin û heta di asta zanistî de ev yek weke 'sosyalîzma zanistî' bi nav û nirx kirine.

Di vê nêzîkatiyê bi xwe de jî du şaşiyên bingehîn hene: Ya pêşî, ne di zanistên fizîkî de, ne jî di zanistên biyolojîk de zanist xwedî hukmê vebirrî û ji sedî sed nîne (têkiliya vê yekê bi baweriya zêde ya bi zanistên demê re heye), ev rastiya ku paşê hatiye fêhm kirin nehatiye dîtin ango fêhm nekirine ku mirov nikare bi formulasyonên zanistî yên vebirrî rahêje xwezaya civakî û binirxîne. Xwezaya civakî bi xwe çand e. Bandora zêhniyetê ya di derekê de bi cih nabe her tim li ser heye. Lewma nabe ku mirov pîvanên xwezaya civakî bi yên fizîkî yan jî qanûnên biyolojîk ên Darwînîst re wekhev bibîne û di bingehê şaşiya wan de ev nêzîkatiya zanistî heye. Şaşiya duyemîn, dîrok bi felsefeyê re têkildar e. Nikarîbûne bibînin ku civak bi xwe diyardeyeke dîrokî ye, lê bi awayekî cuda divê weke xwezayeke duyemîn bê nirxandin. Jixwe nexwestine bibînin ku nihaya civakî bi giranî dîroka civakî ye. Fikra rohnîbûnê destûrê nade vê yekê. Ji vê û pêve jî nirxandinên kapîtalîzmê dimînin yên ku lîberalîzmê nava wan vala kiriye û bi fikreke çor a dinyayê hatine kirin. Kapîtalîzm weke civaka serdest, yekane û li gorî dema xwe ya herî pêşketî hatiye hesibandin. Kapîtalîzm ji şêweyekî mêtinkariyê wêdetir bi civaka nû re wekhev hatiye dîtin. Pêkhatina dinya-civakê bi mîlyonan belkî jî bi mîlyaran salî kişandiye. Lê belê rêbazeke îstîsmarê ya weke Kapîtalîzmê ya ku bi rêbazên herî zêde dermirovahî û lewra jî derdinyayî civaka mirovan dişelîne weke rastiya civakê ya bi ser ketiye hatiye hesibandin! Di paradîgmaya

Marksîst de qelsiya bingehîn di vir de ye. Ango faktora bingehîn a bû sedema jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî jî ev bû. Tevgereke sererastkirinê ya xwe bisipêre Marksîzmê yan jî sosyalîzma pêkhatî divê bi vê heqîqetê rabe.

Sosyalîzm di asta têgînê de xwe weke civakparêzî eşkere bike rastir e. Ya şaş têgîna 'civaka kapîtalîst' e, û bi bihurîna ji civakê xwegihandina kominîzmê ye. Beriya her tiştî mirov heta çarçoveya civaka kapîtalîst (divê mirov modelên weke koledar, feodal û hwd. jî li vê zêde bike) baş destnîşan neke, divê têgîna civaka kapîtalîst weke heqîqeteke giştî ya civakî nenirxîne û ji vî şêweyî bigere. Ya herî rast ew e, divê mirov kapîtalîzmê weke nexweşiyeke civakî ya kujer, weke mezinbûna girêkeke civakî ya cureyê kansêrê binirxîne. Civakên ji wan re koledar û feodal tê gotin jî di nav de, tevahiya civakên beriya kapîtalîzmê şêweyên mêtinkariyê yên weke kapîtalîzmê bêexlaqiya herî mezin hesibandine û ew neçar kirine ku xwe di quncikên tarî de veşêre û bi awayekî marjînalbûyî bimîne. Me hewl dabû em serketina hegemonîk a vî cinawirî li ser civakê di cildên berê de ji hev derxin, lewma em li vir qîma xwe pê tînin bi tenê îşaret pê bikin. Rastiya vî mikrobê kurtêlxur û xwînmij ê nexweşiya civakî yê bi vî awayî, mîna 'civaka nû ya herî pêşketî û bi ser ketî' hat nîşandan, vê yekê tevahiya zanistên civakî seqet kiriye. Ji lewra ez dibêjim, kapîtalîzm ji rejîmên rahibên Sumeran ên ku rejîmên xwe yên istismarê dikirin xwedayî, hezar carî zêdetir istismarkar e, û xebatên der barê wê de îdeolojîk in. Ew rejîmeke xwedayên bêmaske ye, ji rejîma rahibên Sumeran hezar carî zêdetir bi pîroztiyê (ya qelp û lihevçêkirî) hatiye cîlakirin û boyaxkirin. Weke heqîqet ti têkiliya wê bi zanista civakî re nîne. Bi tenê têgînên zanistî weke ekonomî, polîtîka bi hosteyî li hev tînin û berevajî dikin û vê jî mîna zanist pêşkêş dikin.

Civak di encama beridîna mîlyonan salî de û weke dewama cîhana zindiyên hê berê, weke berhemê cîhana his û aqilekî balkêş xwezayeke cuda ye. Xwedî yekparebûneke bi vî rengî ye. Gerdûneke panzdeh mîlyar salî ye (dîroka gerdûnê) ku li xwe hayil bûye. Afirandina civakê bi îstîsmariya kapîtalîst ji îdeayeke Firewn û Nemrûdan a afirandina xwedê zêdetir ti nirxekî xwe nîne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, têgîna 'civaka kapîtalîst' têgîneke şapînozkirî ye, û îdeayeke firewnî ye. Ya rast ew e, divê mirov kapîtalîzmê (bi şêweyê kapîtala fînansê hê bêhtir har bûye) weke nexweşiyeke civakî bike têgîn. Fena ku mirov zanisteke tenduristiyê pêş bixe divê behsa zanisteke sosyalîst bike ku hewl bide mirovatiyê ji destê kapîtalîzmê rizgar bike. Nêzîkatiyeke bi vî rengî wê bêhtir exlaqî be (divê wisa be) û mirov ê karibe baştir fêhm bike. Naxwe em ê nikaribin şerên pêncsed salên dawiyê, bombeya atomê, pirr zêdebûna şêniyan û hilweşîna hawîrdorê rave bikin. Hem modernîteya kapîtalîst a lîberal, hem jî varyanta wê sosyalîzma pêkhatî, klan, qebîle, qewm, ummet û heta hebûnên civakî yên xwedî xisletên netewî yên ne dewleta netewe ku weke berhemên civakên paşvemayî dibînin, divê mirov qîmeteke baş bide wan. Ev şêwegirtinên civakî yên cihêreng bûne tev bi nirx in. Li gorî diyalektîkê divê mirov di civaka neteweyî ya herî pêşketî de jî civaka klan, qebîle, eşîr û gelan

pêşketî û yekparebûyî bibîne. Çawa ku elementeke hezar atomî nayê wê maneyê ku atom ji holê rabûye, berevajî tê maneya rewşa atoman a pêşketî û yekparebûyî, cudabûn û cihêrengiyên piştî civaka klan jî mirov dikare bi awayekî bi heman rengî binirxîne û ev dikare mirov bêhtir ber bi heqîqeta civakî ve bibe.

Lewma divê mirov sosyalîzmê weke panjehra kapîtalîzmê bibîne, lê hay jê hebe ku bi tenê ne ev, weke civaka herî pêşketî, yekparebûyî, azad û wekhev ên tevahiya civakên beriya wê binirxîne û mirov nirxandineke bi vî rengî li gorî heqîqeta wê dike. Civak li ser modernîteya kapîtalîst mezin nabe, berevajî divê mirov rewşa bi nexweşî ya vê modernîteyê ya weke 'qefesa hesinî' û bi kirasê 'Levîathanê' ji civaka dîrokî dûr bike û mirov dikare wê li gorî danasîna wê pêk bîne. Sosyalîzm, tevahiya dîroka şaristaniyê bi qasî kapîtalîzmê nebe jî xwe ji bermahiyên yekdestdariyên koledar ên mêtinkarî û zordestiyê yên li ser rastiya civakî têne ferzkirin bişo, hingê wê hem li ser bingehê xwe yê dîrokî bi cih bibe, hem jî bi destketiyên rojane (bi destketiyên dema têkoşîna li dijî kapîtalîzmê de) wê xwe xurt û nû bike.

Eger hûn bala xwe bidinê, em bi vê nêzîkatiya xwe, rêbazên weke civaka berê û civaka nû yan jî binavkirinên civakî yên weke koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst an jî rêbazên li ser xeteke rast pêşdeçûn û kurtebirr bi kar nayînin. Em li ser bingehê pêşdeçûn, yekparebûn, azadbûn û cudabûnên civakî têgînên mîna wekheviyê dikin bingehê nêzîkatiya xwe. Ji vê jî girîngtir, em sosyalîzmê weke rewşeke civakê ya paşerojê piştî şoreşê yan jî beridînê pêk bê, nanirxînin. Jixwe nêzîkatiyeke bi vî rengî bi rastiya jiyanê re ya di xwezaya civakê de heye, li hev nake. Cinsê mirov timî civakî ye. Rabihurî-niha-paşeroj bi jihevkirinê pêk nayên. Hersê rewş jî di zikhev de ne, û bi hev re pêk tên. Kêliya niha bi qasî ku rabihurî ye, ewqasî jî paşeroj e. Li vir, pêdivî bi nêzîkatiyeke rast a felsefî heye. Mirov felsefeya zeman weke rabihuriya bêserî yan jî paşeroja bêdawî binirxîne, zêde manedar nîne. Mirov dikare zeman bi tenê weke pêkhatina hebûnê bide naskirin. Ango pêkhatina her hebûnê zemanê wê ye. Wekî din jî ti zeman tineye. Wexta wisa dibe, zemanê civakê jî dibe pêkhatina wê. Li gorî ku civak jî timî di nava rewşeke pêkhatinê de ye, rabihurî-niha-paşeroj jî di nava hev de ne, mundemiç in, veşartî ne. Lewma fikra pêkhatina civakê bi navberên dirêj li ser xeteke rast a qonax bi qonax şaş e, û wê rê li ber nirxandinên civakî yên nepêkan veke ku mirov nikare ji binî derkeve.

Mirov rastiya civakî timî têrûtijî pêk bîne, wê bi heyecana pêkhatina kêliya di nava tevahiya rabihuriya kombûyî de pêk tê û bi hêviyên bêserûbinî yên paşerojê pêk bîne, ev rastiya jiyanê ya herî nêzî heqîqetê ye. Gelekî girîng e ku mirov pêkanîna şêwazekî bi vî rengî yê jiyanê weke pirsgirêkeke bingehîn a teoriya sosyalîst û pratîka wê bibîne. Ev pêkhatin hem weke pêkhatina rast a heqîqeta civakî û hem jî weke îfadeya wê manedar dibe. Li şûna ku mirov sosyalîzmê bi tenê weke projeyek an jî bernameyeke der barê paşerojê de bibîne, divê mirov wê weke şêwazekî jiyanê yê exlaqî û polîtîk ê xwedî nirxekî estetîk ku kêlî bi kêlî azad û wekhev dike û

edaletê li ber çavan digire, bibîne û bike heqîqet. Sosyalîzm şêwazekî jiyanê ye ku bi zanebûn heqîqetê îfade dike. Divê mirov bi şêwazekî weke yê mumîn û zanyarên mînakên wan gelekî di dîrokê de hatine dîtin rabe, û divê mirov weke mumîn û zanyarên demê bijî. Ferdperestiya lîberalîzmê ku di warê exlaq de piçûkketin û rezîlbûnê îfade dike, azadî nîne, berevajî şêweyekî herî rezîl ê koletiyê ye ku bi serwextbûneke sexte û qelp li ser piyan tê girtin. Sosyalîzm weke antî-lîberalîzmê îdeolojiya jiyanê ye ku mirov azadiyê bi awayekî kolektîf di exlaq û çalakiyê de pêk tînin.

Divê em di nêrîna xwe ya civakî de kapîtalîzmê zêde mezin nekin. Nexasim îddîaya dibêje, di serdema me de li ser şêwazê jiyanê yê demê û rojaneyê emperyalîzm û kapîtalîzm ji sedî sed serwer in, maneyek e ku kapîtalîzm hîç heq nake didiyê; rast jî nîne û pêxapînek e ku gelekî di bin bandora propagandayê de pêk hatiye. Şerekî îdeolojîk e ku xwe disipêre propagandaya tirsê. Ya rast ew e, kapîtalîzm sîstemeke çil heramiyan e, şêlandineke antî-civakî ye ku hewl dide bi faşîzma zordar xwe serwer bike û mehkûm e ku timî weke sîstemeke marjînal bimîne. Çawa ku di heyamên berê de rêveberê despot pîroz dikirin û ew dikirin xweda, mirov li ber wî dibûn evdên hûrik û bejinbohst, di serdema me de jî hegemonyayeke îdeolojîk a kapîtalîzmê heye ku rê li ber heman encaman vedike. Koletî û bejinbohstiyek heye ku vê hegemonyayê wan bi şerên sar û germ mezintir kiriye.

Dîsa şaş e ku mirov sosyalîzmê weke civakeke timî bi şeran û şoreşan tê bidestxistin bibîne. Bêguman wexta şert û merc stewiyan ji bo veguherînên şoreşgerane şer jî pêkan in. Lê sosyalîzm bi tenê şoreş nîne; tevlîbûna demokratîk a civakê ye, û li dijî kapîtalîzmê jiyana bi serwextî û bi çalakî ye. Bi gotina “şoreş dibe, paşê jiyana sosyalîst pêk tê” mirov xwe dixapîne û dikeve nava bendewariyên tewş û badilhewa. Mirov rabihuriyê çiqasî bi serwextî bi hêz pêk bîne û bike niha, mirov ê paşerojê jî ewçend bi hêz û serwextî pêşwazî bike û pêk bîne. Bêguman di tevahiya van pêvajoyan de rêberiyên stratejîk û taktîk hewce dikin. Lê mirov sosyalîzmê weke rewşeke çalak a bi van têgînan were birêvebirin bibîne wê bikeve nava şaşiyên mezin. Sosyalîzma pêkhatî bi awayekî bi vî rengî hat meşandin û birêvebirin. Dema westiya jî li cihê xwe kumişî-merixî û ma. Li dijî dewletdariya netewe û îndustriyalîzma kapîtalîzmê ya dor li civakê girtiye û ew kirine zêdexure û bi qutkirina têkiliyên wê ji hawîrdorê rê li ber hilweşîna wê vekirine, ji her demê zêdetir hewcedarî bi blok, partî û tevgerên sosyalîst ên bi paradîgma giştî ya moderníteya demokratîk radibin û civaka dîrokî esas digirin heye yên ku xwe bi rêveberiya konfederal a hawîrdorparêz, ekonomîk û demokratîk gurçûpêç kirine. Hewce ye ku teoriya sosyalîst bi pêşnûmeyeke bi vî rengî were pêşxistin û pêkanîn. Ev girîng e, û hê vê girîngiya xwe dewam dike. Jixwe ev bi tenê tevgereke pêşeng a rêxistin û serwextbûnê ya li dijî hegemonya kapîtalîst pêşketî nîne, di heman demê de tevgereke rastî ya civakbûnê ye ku tevahiya dîrokê bi heman naverokê lê bi rûyên îdeolojîk-pratîk ên cuda hatiye meşandin. Civaka rastî xwezaya vê tevgerê ye, fonksiyona civakbûna wê bi xwe ye. Li ber serê tevahiya sîstemên şaristaniyê pêk tê,

lê bi awayekî dijberê wan û ewqasî jî sîstematîk pêk tê. Eger mirov zêde li wê serwext nebûne, sedema wê propagandaya îdeolojîk a dijberê wê ye. Heqîqetên civakî sosyalîzm bi xwe ne, û heta civak hebe wê weke şêwazê jiyana rastî dewam bike. Di vê çarçoveyê de dîrok bi tenê dîroka têkoşîna çînan nîne, têkoşîna wekhevî, azadî û parastina civakê li dijî desthilatdarî û dewletê ye. Bi vî awayî, sosyalîzm dibe têkoşîna civakî ya vê dîroka her diçe zanistî dibe.

**5- Hevjiyana Azad**

Mirov heta li têkiliyên di navbera jin û mêran de serwext nebe, ne dikare li ti pirsgirêka civakî bi temamî serwext bibe, ne jî dikare ji hev derxe. Di bingehê pirsgirêkên civakî de pirsgirêk û problematîkên di têkiliyên jin û mêran de hene. Saziya zewacê ya bi awayekî yekalî di civaka hiyarerşîk û civaka şaristaniyê de li ser jinê hat ferzkirin, serweriya mêr pirralî ava kir û bi vê re belkî jî di xwezayê de bi qasî ku ti zindî û ruhberî nedîtî, hîmê saziyeke koletî û hewcebûnê hat danîn ku bi tenê xweserî civaka mirov e. Statuya pêşî ya civakîbûn, çînayetî û netewetiya serdest-bindest, timî li ser vî bingehî ava dibe. Di binê her şer û pevçûnê de jî ev rastî heye. Tişta ku dîroka şaristaniyê û qonaxa wê ya herî dawî modernîteya kapîtalîst herî zêde ser wê girtiye, ew berevajî kiriye û neyênî nîşan daye, rastiya der barê statuya koletiya jinê ya li ser vî bingehî ye. Jina ku di civaka şaristaniyê de bi şeytên re wekhev tê dîtin, di sosyolojiya modernîteyê de kesayeta herî sernerm a konformîzmê û diya zarokan a karkertiya malê ya bêheqdest e.

Diviyabû serwextbûna li tevahiya naverok û şêweyên asta koletiyê ya ku bi hezarê salan bi aqil û destê mêrê mêtinkar û zordest ketiye jiyana jinê, bibûya gava pêşî ya sosyolojiya rastiyan. Ji ber ku şêweyê mêtinkarî û koletiya di vê qadê de prototîpa tevahiya şêwegirtinên mêtinkarî û koletiya civakî ye. Berevajiyê vê jî rast e. Têkoşîna wekhevî û azadiyê û asta destketiyên vê têkoşînê li dijî mêtinkarî û koletiya xistine nava jiyana jinê, bingehê têkoşîna wekhevî û azadiya li dijî mêtinkarî û koletiya di her qada civakî de ye. Têkoşîna azadî û wekheviyê di dîroka şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst de li ser bingehekî rast pêş nakeve û rê li ber serketineke bi hêz venake, sedema bingehîn a vê yekê ew e, zêhniyet û saziyên mêtinkarî û koletiya şêwe danê û xistine nava jiyana jinê baş nehatiye fêhmkirin û têkoşîna li dijî wan weke bingeh nehatiye dîtin. Çawa ku dibêjin, masî ji serî ve genî dibe. Wexta ku bingeh rast û durist neyê danîn, avahiya were lêkirin wê di lerzeke piçûk de xira bibe. Di dîrokê û roja me ya îro de bêhejmar mînakên vê rastiyê hene.

Kengî mirov hewl bide pirsgirêkên civakî çareser bike, divê mirov hûrûkûr li ser diyardeya jinê bifikire, ji bo hewldanên wekhevî û azadiyê jiyana jinê bike çavkanî û ev yek divê hem bingehê rêbaza lêkolînê û hem jî bingehê hewldanên zanistî, exlaqî û estetîk ên hevgirtî be. Rêbazeke lêkolînê ya rastiya jinê bêpar, têkoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nexe navenda xwe, nikare bigihîje heqîqetê, nikare azadî û wekheviyê pêk bîne.

Ji bo jiyaneke rast, ya bingeh ew e, divê mirov beriya her tiştî jinê terîf bike û rola wê ya di nava jiyana civakî de diyar bike. Em vî hukmê xwe ji bo xisletên biyolojîk û statuya civakî ya jinê nadin. Têgîna jinê weke hebûn girîng e. Mirov çiqasî jinê terîf bike, terîfkirina mêr jî ewqasî pêkan dibe. Em bi mêr nikarin dest pê bikin, jiyan û jinê rast terîf bikin. Hebûna xwezayî ya jinê di statuyeke navendîtir de ye. Ji aliyê biyolojîk ve jî ev wisa ye. Civaka serwer a mêr, statuya jinê têra xwe piçûk xistiye û tine hesibandiye, lê ev, ji bo serwextbûna me ya li rastiya jinê divê nebe asteng. Xwezaya jiyanê zêdetir bi jinê re têkildar e. Herçiqasî jin gelekî ji jiyana civakî hatibe dûrkirin jî dîsa ev rastî bi vî rengî ye, û nabe şaşî, berevajî piştrast dike. Ya rastî, zilam bi hêza xwe ya zordar û tineker di şexsê jinê de êrîşî jiyanê dike. Tinekerî û dijminatiya jiyanê ya mêr weke serwerê civakî têkiliya xwe ji nêz ve bi rastiya wî ya civakî re heye.

Em dema vî hukmê xwe gerdûnî bikin, em dikarin dualîteya enerjî-maddeyê ji xwe re bikin bingeh. Enerjî li gorî maddeyê bêhtir bingeh e. Madde bi xwe enerjiya pêkhatî ye. Madde şêweyê bi formbûyî yê hebûn û veşartina enerjiyê ye. Madde bi vê xisleta xwe enerjiyê dixe qefesê û herikîna wê dicemidîne. Her forma maddeyê para xwe ya enerjiyê cuda ye. Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên maddî diyar dike. Enerjiya di form û maddeya jinê de ji enerjiya di maddeya mêr de cuda ye. Enerjiya jin hildigire hem zêde ye, hem jî xisleta enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên maddî bi gewde dibe. Şêwe di tevahiya gerdûnê de weke enerjiya cemidî muhafezekar in. Di civakê de serwerbûna mêr, şêweyê desthilatdariyê ye. Di vê rewşê de enerjiya hildigire bi giranî bûye xwedî form. Enerjiya venaguhere formê gelekî kêm e, û li cem kêm kesayetan pêk tê. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne. Di form û qefesa mêr de neyê girtin wê weke enerjiya jiyanê herikîna xwe dewam bike. Jêhatîbûna manedanê, helbestwarîtî û xweşiktiya jinê ya nehatiye cemidandin û hişkkirin, bi vê rewşa enerjiyê ya giraniya xwe heye, ji nêz ve têkildar e. Ji bo serwextbûna li vê rastiyê divê mirov hûrûkûr li jiyana zindî û ruhberan serwext bibe.

Beridîna jiyaneke ku digihêje heta bi jiyana mirovî heye, ev jiyan dikare qismî were terîfkirin yan jî dive were terîfkirin. Beriya her tiştî divê mirov armanca jiyanê bixe ber lêpirsînê. Em çima hene, em çima dijîn? Jiyan çima xwe dewam dike, xwe xwedî dike û bergiriya xwe dike? Eger mirov bibêje, ji bo jiyanê xwe xwedî dike, bergiriya xwe dike û xwe zêde dike, ev ji bo bersivê têrê nake. Ji van pirsan wêdetir pirs hene, ew jî ev in, em çima zêde dibin, em çima bergiriya xwe dikin. Eger em bersiva 'ji bo jiyanê' bidin, em ê pê li dora singê xwe bizîvirin. Eger mirov li dora singê xwe jî bizîvire ev nabe çare û bersiv. Astên zêhniyetê yên heta destpêka mirov weke şêweyekî enerjiyê bi beridîn û pêşketinê hatine, ji bo diyardeya têgihiştinê hinek nîşaneyên bersivê didin. Beridîna gerdûnê heta bi destpêka mirov hêzeke maneyê ya timî hewl dide bi pêş bikeve nîşan dide. Potansiyela rastî yan jî veşartî ya di gerdûnê de mîna ku timî dixwaze derkeve

holê, fêhm bike û bê fêhmkirin fena li encamekê bigere. Pêdiviya fêhmkirin û hatin fêhmkirinê, ajoya bingehîn a gerdûnê ye. Ji vir û pêve pirsa divê mirov bike, wê der barê fêhmkirin û hatin fêhmkirinê de be. Tişta dixwaze fêhm bike û bê fêhmkirin çi ye? Di Pirtûka Pîroz de "Xwedê dibêje, ez sirrek bûm, ji bo bêm naskirin û zanîn, min gerdûn afirand." Ev hukmê Xwedê der barê xwe de dayî belkî ji bo me bibe bersiv, lê têrê nake. Pêdiviya bi zanîn û naskirinê bi temamî têra danasînê nake. Lê mîna ku hinekî sirra jiyanê eşkere dike.

Danasîna giyanê mutleq (geist) a Hegel jî xwediyê maneyeke bi heman rengî ye. Li cem Hegel jî gerdûn bi giyana mutleq bi zanîn û serwextî li xwe vegeriyaye. Gerdûna dixwaze were naskirin û zanîn, vê yekê bi derbasbûna di qonaxên fizîkî, biyolojîk û civakî re, bi serwextbûna felsefî ya rewşa herî baş a serwextbûnê ye, ango bi giyana mutleq xwe dide naskirin û bi vê razî dibe û bi vî awayî weke gerdûna hatiye naskirin û zanîn serhatiya xwe temam dike. Ev hukmên em behsa wan dikin xwedî heqîqetên gelekî girîng in, û armanca jiyanê bi maneyê re wekhev dikin. Di felsefeya Yewnan de têgîna 'theorîa' jî xwedî maneyeke bi heman rengî ye. Weke encam 'mane' xwedabûna mirova/ê civakî ye. Li vir pirsa girîng ev e: Xwedabûna mirova/ê civakî yan jî hêza 'maneyê' ya bi dest dixe, ma dikare tevahiya maneya di gerdûnê de temsîl an jî îfade bike? Mirov dikare maneya herî zêde ya di civakbûnê de (giyana mutleq a Hegel) bi maneya gerdûnê bi xwe re wekhev bibîne? Ma civak bi xwe jî hebûneke bi kêmasî nîne? Hingê ma wê maneya wê jî kêm nebe?

Lê em bi rewşa xwe ya mirov nikarin bersiva tam a van pirsan bidin. Ji ber ku em bi civakê bi sînorkirî ne. Em nikarin bibin hebûneke jor-civakê. Em bi tenê dikarin pirsan bikin. Şensa me jî ew e, pirsîn jî nîviyê fêhmkirin û manedanê ye. Ango dikare nîşaneyan der barê fêhmkirin û manedanê de (maneya mutleq) bide. Em niha dikarin hukim bidin ku ji bo me gihiştina asta manedanê gelekî girîng e, û em kengî li xwe hayil dibin ku em gelekî nêzî armanca bingehîn a jiyanê ne, hingê em dikarin razî û têr bibin. Em dîsa dikarin hukim bidin ku ji me tê û em muqtedîr in, beşekî mezin ji pirsgirêkên bingehîn ên der barê jiyana manedar de ji hev derxin, bi kêmanî em dikarin bersivên der barê jiyana civakî ya rast, xweşik û adil de bibînin.

Em kengî bi vê perspketîfa felsefîk berê xwe bidin rastiya jinê, em ê bigihîjin wê encamê ku divê têkiliya jiyana manedar bi aliyên jinê yên xweşik, rast û baş bêne pêşxistin. Em bi vî hukmî rabin, nabe ku armanca bingehîn a bi jinê re zêdebûn û pirrbûn be. Ji ber ku zindiyên tekşane yên besît jî haya xwe ji zêdebûnê hene û belkî jî mirov dikare bibêje, jiyanên wan ên yekarmancî li ser vî bingehî hatine şîfrekirin. Lê gerdûn diberide. Beridîna bi pêş dikeve nîşan dide ku tekşane xwe dubeşî parçeyên wekhev dike û ev jî dawiya jiyanê nîne, berevajî bi vê çalakiya dabeşbûna mîlyaran carî ya tekşaneyê jiyan bi lez pirrcure û pirrcuda dibe. Em bi vê jî dizanin ku bersiva piştî wê ya manedar zêdebûn û pirrbûn nîne, guhertin û veguherîne. Ji bo jiyanê zêdebûn navgînek e ku pêdivî pê heye, lê ji bo mirov li jiyanê serwext bibe ti carî têrê nake. Zêdebûn

navgîn e, armanc an jî manedar nîne. Ya rastî, jiyaneke maneya wê bi tenê zêdebûn û pirrrbûn be, jiyaneke gelekî kêm û bi qusûr e. Ma dibe ku rewş li cem tekşaneyê bi vî rengî be, lê belê jiyaneke mirovane bi jinê re bi tenê bi pirrbûn û zêdebûna cinsî ve girêdayî be, ev ne bi tenê kêmbûna maneyê di heman demê de korbûnê jî îfade dike. Li gorî ku bi jinê re mîna amîpan zêdebûn wê çênebe, nabe ku mirov pirrbûna bi jinê re bixe navend û hedefa jiyanê, naxwe ji beridîna mezin a zindiyan mane û dersa pêdivî pê heye nehatiye girtin. Jixwe bi teknolojiya roja me ya îro civaka mirov ji pirsgirêka zêdebûn û pirrbûnê bi temamî bihuriye. Pirsgirêka kêmbûnê ya cinsê mirov tineye, berevajî, her diçe mirov pirr zêde dibin û zêdebûna wan gihiştiye wê astê êdî di dinyayê de hilnayên. Ev pirrbûn û zêdebûn bi serê xwe dibe pirsgirêkeke gelekî mezin. Jixwe bi zindiyê tekşane jî piştrast bûye ku leza zêdebûnê bi asta paşvemayî ve têkildar e, û her zêdehiyek di heman demê de mirinek e. Pirrbûna fizîkî di tevahiya cureyên beridînê de xwedî maneyeke bi vî rengî ye. Hebûna bi mirin, yeqîn dike ku bi xwezêdekirinê wê karibe dewamî bijî, lê bi vê dixape. Xwe bi kopiyê xwe dewamkirin, dikare hewcedariya ewlebûnê û xwesteka tevlîbûna bêdawîbûnê razî û têr bike, lê jiyanê nake rastî û nake heqîqî.

Xulase, felsefeya jiyanê ya xwe disipêre zêdebûna bi jinê re maneyek xwe ya ciddî nîne. Di civaka çînî de diyardeyên weke mîrate û bihêzbûnê mane li jina dizê bar kirine û ev jî maneyeke têkiliya xwe bi mêtinkarî û zordestiyê re heye û ji bo jinê negatîf e. Ango jina gelekî dizê ew jin e ku zû dimire. Eger kêm zayîn yan jî bi giştî pirsgirêka pirrbûna şêniyan li cem cinsê mirov hebe, hingê jiyaneke bi jinê re ya maneya wê gelekî payeberz bi jina hîç nazê re pêkan e. Gelên mêtingeh ên paşvemayî yên nikarîbûne weke civak û ferd xwe bi hêza polîtîk û entelektuel pêşde bibin, pirrzarokanîn dikare ji bo wan weke xweparastinekê qîmeta xwe hebe. Ji bo pêşî li qirkirina xwe bigire, bi anîna gelek zarokan dewamkirina zurriyetê jî rêbazeke bersivdanê ya berxwedanê û dewamkirina hebûnê ye. Lê ev xweparastina wan civakan e ku şensê wan ê jiyaneke azad zêde nîne. Lewma di civakên wisa de ku asta maneyê gelekî ketiye, bi jinê re jiyaneke li ser bingehê rast û estetîk mumkîn nîne. Rastiya civakên heyî yên dinyayê vê yekê piştrast dike. Jiyana bi jinê re di warê bergirî û xwe xwedîkirinê de aliyekî xwe yê xweser nîne. Bergirî û xwe xwedîkirin ji bo her zindî û ruhberî heye. Zêde manedar nîne ku mirov jiyana bê jin an jî bê mêr guftûgo bike. Di tevahiya jiyanên cot û fer de diyardeya nêrtî û mêtiyê heye. Ango pirsgirêk ne bi xwe bi hevjiyanê re, bi maneya wê re ya di civaka mirov de ye.

Civaka mirov şêwazekî jiyanê yê zindî yan jî ruhberekî nîne. Xwedî xisletên wisa ye ku dikare di nava xwe de û li ser xwezayê diyardeya hukimranî û desthilatdariyê pêş bixe. Çawa ku em di desthilatdariya dewleta netewe de dibînin, ji aliyê hejmar û naverokê ve pêkanîna wê ya herî zêde dikare dinya me ya jiyanê veguherîne qebra jiyanê. Li vir rewşa çeloxwarî ji ber civakê ango civaka mêrê serwer pêk tê. Hegemonya mêrê serwer li ser jinê pêk tîne dinya me dixe rewşekê ku dike jiyan lê nebe. Ev encam jî ne bi beridîneke biyolojîk, lê bi desthilatdariya hegemonîk a bi serweriya mêr tê. Ango divê jiyana bi jinê re ji diyardeya desthilatdariya hegemonîk a bi

serweriya mêr rizgar bibe. Jina ku jiyana wê di bin hukimraniyê de derbas dibe, bi zarokanînê mirovatî mîlyonan sal dewam kir, lê bi modernîteya kapîtalîst re ev xisleta wê ya zarokanînê bi awayekî îronîk dawiyê li jiyanê tîne. Jiyan bi jina di bin vê statuya heyî de nîşaneyên dawîhatina li jiyanê nîşan dide. Bêhejmar nîşaneyên vê rastiyê hene. Eger em wan rêz bikin:

**a-** Şênî di vê dinya me de hilnayên û gihiştiye qonaxekê ku hebûna ruhber û zindiyên din jî dixe tehlûkeyê. Jiyaneke bi vî awayî bi wê jinê re ya di vê statuya heyî de, xwezayîbûn û ekolojiya jiyanê her roja derbas dibe bileztir dixe tehlûkeyê.

**b-** Dîsa ev jiyan di nava civakan de û li derveyî wan rê li ber şîddeta desthilatdariyê ya bêsînor vedike. Asta milîtarîzm gihiştiyê vê rastiyê têra xwe piştrast dike.

**c-** Seksualîteya jinê bi awayekî xeternak tê bikaranîn û li ser vê zordestî û mêtinkariyeke xeternak hatiye pêşdebirin. Jiyan bi tevahî ji rê hatiye derxistin, hema bêje bi jirêderketineke cinsî re ya ku xwe bêmane dubare dike, kirine yek.

**d-** Jina di civakê de kirine ne tiştek û pêjna wê nayê, kirine makîneyeke zurriyetê dewam bike, metayeke cinsî û hêza herî erzan a karkirinê. Mîna ku maneyeke wê ya din tine be.

**e-** Mîna ku li ser jinê qirkirineke çandî tê meşandin. Lê bi rola xwe ya seksualîte û dewamkirina zurriyetê weke artêşeke karkerên bêheqdest an jî bi heqdesteke erzan dixebite nirxekê îfade dike. Ji bo karibe xwe ji aliyê fizîkî, exlaqî û manewî ve biparêze ew ji hêza wê mehrûm kirine.

**f-** Di nava van faktoran de civakeke jinê di nav lepê jiyaneke bêmane de biperpitîne û binalîne, ew civak bi tenê dikare nexweş be. Jina bêmane wê civaka wê jî bêmane be.

Mirov dikare van nîşane û îşaretan zêdetir bike. Ev jî dide xuyakirin ku hevjiyana bi jinê re pêdiviya xwe bi awayekî eşkere û bi lez bi veguherîneke bingehîn heye. Bi jina bêparastin û bûye milk hevjiyana azad ne pêkan e. Ji aliyê exlaqî ve jî ev yek ne pêkan e. Ji ber ku kengî exlaq tê tinekirin koletî dikare pêk bê. Hemin em nikarin ji exlaqê hêzên hegemonîk re exlaq bibêjin. Hêza hegemonîk, di vê navberê de mêrtiya hegemonîk bi tenê bi hilweşîna exlaqê civakî re dikare pêk bê. Li gorî ku jiyan bê jin nabe, ji bo rizgarkirina jiyanê rizgariya jinê ferz dibe. Berevajiyê vê rastiyê jî rast e, bê mêr jî jiyan dibe, lê ew jiyan jî bi koletî dibe. Ev vegotina me zêdetir der barê wê jinê de ye ku di nava avahiya civakî de ye. Pirsgirêka jinê di nava cîhana zêhniyetê û têkiliya wê de girîngtir dibe. Heta zêhniyeteke dijberê nîşaneyên neyênî yên der barê jinê de bi awayekî serketî pêk neyê, bi giştî hevaltî (bihevrebûn), bi taybetî jî hevaltiya jiyana azad (bihevrebûna jiyana azad) pêk nayê. Ango weke teza dijber ji bo jiyaneke di asta hevaltiya azad a bi jinê re erkên divê bêne bicihanîn xulase mirov dikare wisa rêz bike:

**a-** Beriya her tiştî pêdivî bi têgîneke hevjiyana ekolojîk heye ku di bingehê wê de pirrbûn û dewamkirina zurriyetê tineye, li gorî îdeala mirovatiyê ya gerdûnî ye, û hebûna zindiyên din jî li ber çavan digire. Asta gerdûnî ya civak gihiştiyê jiyaneke azad bi jinê re ferz dike. Sosyalîzma rastî bi tenê dikare li ser bingehê jiyaneke azad bi jinê re bê avakirin. Ya sosyalîzm divê pêşî bike (ne ya paşî) ew e, divê ji sedî sed jiyana azad bi jinê re bigihîne astekê.

**b-** Ji bo vê jî divê mirov bi awayekî zêhnî û sazî li dijî desthilatdariya hegemonîk a mêrê serwer têbikoşe, û di asta hevaltî û bihevrebûna azad de serketina têkoşîna zêhniyet û sazîbûnê misoger bike. Bêyî vê serketinê mirov nikare hevjiyana azad pêk bîne.

**c-** Jiyana bi jinê re divê ti carî weke cinsiyetparêziyeke ji bo dewamkirina xerîzeya cinsî û temendirêjiyê neyê şîrovekirinê. Çi şaristanî, çi jî modernîteya kapîtalîst jiyana cinsiyetparêz a civakî gihandine asteke xeternak û heta ev jiyana cinsiyetparêz di tevahiya qadên zêhnî û sazî de neyê tesfiyekirin, bicihanîna hevjiyana azad ne pêkan e. Di nava paradîgma û wan saziyan de ku jinê weke diyardeyeke milk û objeyeke cinsî dibînin, jiyan ne bi tenê bêexlaqiyeke mezin e, di heman demê de şêwazê jiyanê yê herî şaş û kirêt e. Di nava van şert û mercan de mînakeke din a diyardeya civakî nîne ku evqasî jinekê yan jî mêrekî piçûk bixîne û birizîne.

**d-** Kengî milkkirina jinê hat redkirin, ji cinsiyetparêziya civakî ya tê bikaranîn bi temamî bê bihurîn, di her asta civakî de wekhevî (li ser bingehê cudatiyê wekhevî) pêk hat, hevjiyana azad bi jinê re pêkan e.

**e-** Kengî jin ji bo dewamkirina zurriyetê nebe amûr, nebe karker an jî bêkar, nebe karkereke erzan an jî bêheqdest, di her qadê de nebe meta bibe kirdar, hevjiyana azad pêre pêkan e.

**f-** Civak bi tenê di van şert û mercan de dikare li gorî hevjiyaneke azad be ango dikare ber bi civaka azad û ya xwedî şertên wekhev biberide.

**g-** Di nava şert û mercên erênî de hevjiyana azad bi jin û mêrên nirxê xwe yê mejî û avabûnê zêdekirî re pêkan e.

Divê mirov ji bîr neke ku şaristaniya hegemonîk û modernîte di berdêla înkara hevjiyana azad de pêk hatine. Ango şertê bivênevê yê eşqa civakî tewazuna hêzê hem a mejî hem jî ya avabûnê di navbera jin û mêr de bê derfet bibe, eşq pêk nayê. Di nava şert û mercên zewacê de ku têkiliyên kolewarî yên civaka kole û jidestdana maneyê kêlî bi kêlî lê tên çêkirin, eşq pêk nayê. Ji ber vê yekê, kengî hevjiyana azad bêîmkan dibe bandora kujer a desthilatdariya hegemonîk û modern çêdibe. Lewma jiyana mirovatiyê ew weke mûcîzeyeke bi heybet qebûl kirî, nirxa xwe ya mûcîzewî û avzûnkirî ji dest dide, nexasim ji bo jinê veguheriye felaketeke bi qehr û xwekuştinê. Divê mirov baş zanibe ku hevjiyana azad bi awayekî civakî hatiye avakirin. Ev jiyan di navbera nêr û mê de pêk nayê; di navbera jinîtî û mêrîtiya civakî ya avakirî de pêk tê. Divê neyê jibîrkirin

ku avabûna hegemonîk herdu cins jî seqet kirine, têkiliya di navbera wan de ji wê bi tesîr bûye û weke têkiliya hegemonîk xwe nîşan daye. Di têkiliya hegemonîk de eşq bi pêş nakeve. Di eşqa mirov de şertê bingehîn ew e, divê herdu alî ango hev-alî xwedî îradeyên azad ên wekhev bin.

Ji ber ku şaristanî û modernîteyê hem bi jiyana îdeolojîk hegemonîk û hem jî bi ya bisazî didin qebûlkirin, tevahiya dîrokê mirov li ser navê eşqê timî di nava paradoksê de dimînin. Gelekî behsa eşqê tê kirin, lê pêk nayê. Wêjeya dinyayê hema bêje ji vegotinên trajîk ên eşqên pêk nayên pêk hatiye. Destanên dibêjin timî jin bûne sedema derketina şeran jî vê rastiyê piştrast dikin. Tevahiya şêweyên hunerî mîna ku mikurhatina li eşqa pêknehatî bin. Di dînan de têkiliyên xweda û xwedawendan, bi awayekî mîna berhemên kevin in ku ji xwestekên xurt ên yekalî yên pêk nehatine çêbûne. Sîstemên şaristaniyan hevjiyan weke qada 'jiyana taybet' pîroz kirine û ev jî hukmek e ku herî zêde heqîqeta civakî berepaş kiriye. Têkiliya di hevjiyanê de xwedî xisletên wisa ye ku ji binî ve bandorê li ser tevahiya têkiliyên civakî û gerdûnî dike. Ya rastî, gelemperî weke taybetî, taybetî jî weke gelemperî were fêhmkirin wê bêhtir li xwezaya civakê were. Têkiliya hevjiyanê xwedî xisletên welê ye ku ji binî ve tesîrê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Durûtiya herî mezin a şaristaniyê ew e, ev têkiliya gerdûnî bi tenê weke têkiliyeke mahrem a dualî û taybet hesibandiye. Yek ji sedemên bingehîn ku hiştiye zanîna sosyolojîk bêqîmet û bêkêr were hesibandin ev e. "Jin mirov an dike fîlozof an jî dîn dike" ev gotina dibêjin a Sokrates e, û gotina gelêrî ya dibêje "Jin mirovî dike wezîr jî, dike rezîl jî", dîsa bi vê gelemperiya rastî re têkildar in. Jixwe ji hev cudakirina qadên civakê weke 'taybet' û 'gelemperî' berevajîkirineke modernîteyê ye. Di civaka rastî de jihevcudakirinên bi vî rengî maneya xwe nînin. Ya rast, şêweyên têkiliyê yên bingehîn û diyarker in.

Li ser navê jiyanê gava pêşî ya em biavêjin nava civaka mirov, divê der barê hevjiyana azad de be. Ti qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî xisleta bingehîn û diyarker nîne. Ekonomî û dewlet weke têkiliya bingehîn têne hesibandin û ev fikreke sabit a sosyolojiya modernîteyê ye. Di encamê de ekonomî jî û dewlet jî navgînên hevjiyanê ne. Nabe ku hevjiyan bikevin xizmeta ekonomî, dewlet û dîn. Berevajî, divê dewlet, dîn û ekonomî bikevin xizmeta hevjiyanê. Lewma ev rewşa berevajî xwe li tevahiya sosyolojiya modernîteyê gerandiye.

Li gorî vê vegotinê hemûyî qada divê pêşî bi zanistî mirov pê dakeve, qada hevjiyanê ye. Mîtolojiya serdema destpêkê ya gelekî hov tê dîtin û dîn timî ji vê qadê dest pê dikin û ev bêsedem nîne, ji ber ku bi heqîqeta civakî re têkildar e. Hevjiyan, nexasim zanista li dora jinê were pêşdebirin, wê bibe gava pêşî ya ber bi sosyolojiya rast ve bê avêtin. Ne bi tenê weke zanist di sosyolojiyê de, divê di tevahiya qadên hunerî û felsefî de gava pêşî di van têkiliyan de bê avêtin. Jixwe hewce nake ku mirov bibêje, dîn û exlaq weke şaxekî felsefeyê divê pêşî di vê qadê de gavê biavêjin. Exlaq û dîn têra xwe bi vê qadê ve xwe girêdane.

Weke encam mirov dikare bibêje, di serdema me de têkçûna hêzên mêtinkar û desthilatdariya hegemonîk herî zêde bi hilweşîna di warê hevjiyanê de xuya dike. Têkiliya jin û mêr ewqasî deklase bûye, maneya xwe ji dest daye, ne bêyî wê dibe ne bi wê dibe ango êdî li ber qedandinê ye. Yên şoreşa destpêkê nesipêrin analîza vê rewşa kaotîk, bêgav wê kaosê dewam bikin. Kesên şexsî yan jî kolektîf gavê diavêjin, eger vê qadê di warê zanistî, felsefî û hunerî de bikin bingeh, bi tenê hingê dikarin ber bi hevjiyana azad ve gava xwe biavêjin. Ev gavên pêşî yên bêne avêtin, weke ku gelek caran yeqîn tê kirin, gavên taybet ên di navbera du kesan de têne avêtin nînin, der barê civaka sosyalîst demokratîk a bê pêkanîn de gavên pêşî yên gerdûnî ne.

Sosyalîstbûn, beriya her tiştî di hevjiyanê de divê bi asta azadiyê re têkildar be. Divê mirov şêwazekî jiyanê bike bingeh, çawa ku pratîkên wê yên dijwar û bi pîvan di destpêka jiyana mîtolojiya kevin û dînî de dihatin dîtin. Kengî mirov karibe ji şêwazên jiyanê yên sîstemên şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst ên mirovan kedî dikin bibihure, hingê dikare hevjiyana sosyalîstwarî ava bike. Ti têkiliya hevjiyanê bi seksualîteya banalîst a sîstemê re, bi lîstika malbatokê re, bi dewamkirina zurriyetê re û tevahiya temenekî bi 'serdanîna ser balgiyekê' re nîne. Nexasim ti eleqeya xwe bi têkiliyên cinsî re tineye ku bi temamî bûne nexweşiyeke rojane. Jixwe li cem ti ruhber û zindiyekî din rojane têkiliya cinsî nîne. Berevajî li cem zindiyên din ev li ser bingehekî demî pêk tê û ev jî piştrast dike ku têkiliya cinsî ya li cem mirovan bi şêwazekî civakî hatiye çêkirin. Di warê têkiliya cinsî de birçîbûn û dîsa di vî warî de sînor derbaskirin, têkiliya xwe bi desthilatdariya hegemonîk û avakirina şêweyê civakî re heye. Cinsiyetparêziya mêr a li ser jinê tê ferzkirin bi tevahiya şêweyên xwe weke desthilatdariyekê xwe diyar dike. Cinsiyetparêziyên bi vî rengî mirovan bextewar nakin, bihêlin bextewarkirin û şadkirinê, berevajî bi temamî çavkaniyeke nexweşî û xemgîniyê, qedandin û mirina zû ne. Binyeya ti jin û mêrî bi têkiliya cinsî ya bi vî rengî re li hev nake. Nexasim cinsiyetparêziya ku kapîtalîzm bi reklamkariya jinê gij dike, bi temamî têkiliya xwe bi hegemonya îdeolojîk re heye û bi vê jî qanûna kara herî zêde misoger dike. Mirov dikare bibêje, ti têkiliya civakî bi qasî cinsiyetparêziyê nikare sîstemê hilgire. Lewma ji bo mirov karibe bibe antî-kapîtalîst divê karibe vî şêwazê jiyanê yê cinsiyetparêz red bike û jê bibihure.

Di têkiliyên hevjiyanê de asta bê pêkanîn çiqasî zanistî, hunerî û felsefî be, ewqasî jî wê gavavêtina jiyana sosyalîst pêkan be. Ji bo sosyalîzmê, beriya her tiştî pêkanîna têkiliyên hevjiyanê, ji aliyê pratîk û prensîb ve nirxek xwe heye, mirov nikare jê bimîne. Ji bilî vî şêwazê têkiliyê, rêyeke din nîne ku mirovî bibe sosyalîzmê. Eger têkiliyên bi vî rengî hebin jî wê neyekser bin û li şaşiyan vekirî bin. Divê mirov têkiliyên hevjiyanê weke têkiliyên di navbera du kesan de fêhm neke. Fêhmkirineke bi vî rengî kêm e. Bêguman têkiliyên dualî yên hevjiyanê dikarin pêk bên, lê bi tenê bi vê yekê bê fêhmkirin rast nîne. Hevjiyan bi hêzeke mezin a manedan, estetîk û exlaqê pêk tê, ji dualîbûnê şuştî ye û bêhtir jiyaneke bi xwe û cewherî ye.

Jin û mêrên bi jiyana sosyalîst ve girêdayî, kengî jiyana azad bi awayekî gerdûnî û kolektîf pêk anîn, dikarin û şensê wan heye bi awayekî taybet jî rast û xweşik bijîn. Mirov dikare di tevahiya tevgerên mezin ên civakî yên dîrokê de vê rastiyê bibîne. Gelekî girîng e ku mirov jiyana taybet bi lîstikên zewacê û ji wê zêdetir neyênî bi şêweyên li derveyî zewacê re tevlîhev neke. Di jiyana fer û taybet de tevahiya potansiyela kolektîf û gerdûnî ya civakî veşartiye. Lê di şêweyên taybet ên kedîkirin û malbatê yên şaristanî û moderníteyê de gerdûnîtî û kolektîfîte têne înkarkirin. Mirov heta nikaribe vê yekê ji hev cuda bike, nikare jiyana azad a taybet a sosyalîstwarî pêk bîne. Di çarçoveya têkiliya sosyalîst de mêr û nexasim jî jin a bi zanistî, estetîk, exlaqî û felsefî rabe dibe xwedî hêzeke mezin a balkêşiyê. Kesayetên jin û mêrên bi vî rengî, li hemberî jiyana civakî têk naçin, berevajî bi hebûna xwe jiyana civakî ya azad ava dikin. Ji ber ku di vê cotbûna feran de bi hev ewlebûn û hurmet serdest e, cih ji nexweşiyên sîstemê yên mîna hesûdî, kaprîs, çilekî, têrnebûn û bêzarkirinê re nîne. Ji ber ku hevdu nakin milk, yek li hemberî yê din bi îdeaya heq (di huqûqa bûrjûwa de ev heye) ranabe. Hêza wan a manedanê ya di weznekê de dikare li cem kesekî/ê yekparebûnê, di yekparebûnê de jî kesekî/ê pêk bîne.

Tevgerên civaka dîrokî bi tenê bi kesayetên wisa manedar bûne, bi ser dikevin. Kesayetên bi vî rengî divê timî weke sosyalîst bêne zanîn, bîranîn û bendewariya wan bê kirin.

Ji bo pêşketina civaka sosyalîst, di warê pêkanîna teoriya hevjiyana azad de hin tecrûbeyên dîrokî hene, girîng in ku mirov wan li ber çav bigire. Xiristiyantiyê di vê babetê de jiyana rahib û rahîbeyan weke şert danîbû pêşiya kadroyên xwe. Di pêşdeçûna şaristaniya Rojava de roleke girîng a vê pêkanînê heye. Xiristiyantiyê neyêniyên civaka cinsiyetparêz bi vê pêkanîna kadroyî gelekî bi sînor kir. Ji ber ku zexta cinsî ya li ser zêhniyeta rûhî gem kiriye di pêşdebirina civakbûnê de bi roleke girîng rabûye. Lê nikarîbûye rê li ber pêşketina diyalektîkî ya hevjiyana azad gengaz dike veke; li hemberî wê weke reaksiyon cinsiyetparêziya civakî ya moderníteya kapîtalîst serî rakiriye. Hevjiyana bi yek kesî re ya milkperestiya modern, rê li ber peydabûna şêwazekî jiyanê yê dijberê çanda rahib û rahîbeyan, seriyekî duyemîn ango duqutbûnê vekiriye. Di bingehê pêxîrtengiya hevjiyana modern a yekhevalî de çanda rahib û rahîbeyan a Xiristiyantiyê heye. Ji bo ji civaka cinsiyetparêz bê bihurîn herdu çand jî xetimî mane. Di binê pêxîrtengiya çanda cinsiyetparêz a civaka Rojava de ev rastî veşartî ye.

Der barê çareseriya mijarê de Îslam jî bi ser neketiye. Berevajî jiyana rahib û rahîbeyan Îslamê jî girîngî bi têrbûna têkiliya cinsî daye û yeqîn kiriye ku wê bi zewaca bi gelek jinan û jinên di statuya cariyeyan de pirsgirêkê çareser bike. Di Îslamê de pêkanîna hareman bi awayekî bi rola kerxaneya taybetîkirî radibe. Ji kerxaneyê cudabûna wê ew e, bi taybetî ji bo hinan e. Bi xwe di navbera herduyan de ti cudahî nîne. Ev pêkanîna cinsiyetparêziya civakî bi roleke diyarker rabûye ku civaka Rojhilat li gorî civaka Rojava paş bikeve. Ji ber ku Xiristiyantiyê cinsiyetparêzî bi gem kir rê li ber moderníteyê vekir, lê ji ber ku Îslamê dilçûna zêde ya cinsiyetparêz teşwîq kir, ji

civaka kevin zêdetir paşve ket û kir ku li hemberî civaka modernîteya Rojava têk biçe. Di têkçûna jin û mêrê Rojhilat li hemberî jin û mêrê Rojava de rola cinsiyetparêziya civakî gelekî girîng e. Ji texmînan wêdetir bandora cinsiyetparêziyê li ser pêşketina civakî heye. Civaka Rojhilat û Rojava gelekî ji hev cuda bûn. Di vê de rola cinsiyetparêziya civakî gelek e. Lewma divê mirov baş li ser vê xalê raweste. Têgihiştina Îslamê ya cinsiyetparêziyê, çi di girankirina kolekirina jinê de, çi jî di desthilatdarkirina mêr de, li gorî şaristaniya Rojava rê li ber encamên zêdetir neyênî vekiriye.

Dema ku mirov pratîka hevjiyana azad pêş bixe, hin xusûsên girîng hene ku divê jin û mêr ji alî û bereyê xwe ve hay ji wan hebin. Jina ku şensê wê ji bo hevjiyana azad heye yan jî dixwaze bibe xwedî vî şensî xusûsên berê pêşî divê guh bidiyê û bi cih bîne, mirov dikare wisa rêz bike:

**a-** Dema ku jin bi mêr re hewl da seksualîteyê parve bike, divê hay ji xwe hebe ev bi tenê tatmînkarî û xwetêrkirineke biyolojîk nîne, divê berê pêşî zanibe ku ev dişibe wê rewşê, mîna ku bi piling re di qefesa wî de razê, bi penceke hêz û desthilatdariyê re rûbirû be. Nexasim rewşa esaretê û birçîbûnê ya piling di qefesê de, dikare bike ku mêr pencên xwe bêhtir bi kujerî bi kar bîne. Divê jin baş pê zanibe kengî bi têkiliya zewacê ya klasîk ket qefesê ew êdî bi hêsanî sax ji wir dernakeve; berdêla vê yan wê bi canê xwe bide yan jî wê bibe mêpilingeke êsîrbûyî. Mêpiling jina bûye mêr temsîl dike, gelekî kirêt û keraxî ye. Têkiliya cinsî ya di navbera mêrê hegemonîk û jina mêroke ya bi temamî teslîmbûyî de di pêkhatina vê kirêtî û rezîliyê de bi rola sereke radibe. Roja mêr jinê ji keçikanî dixin wê rojê serbilind in, di binê vê de tatmîn û têrbûna cinsî (diyardeya biyolojîk) nîne, ji ber ku di vê têkiliyê de têkiliya desthilatdar-kole pêk hatiye mêr serbilind e. Kengî jin ji keçikaniyê tê xistin, ev ji bo wê dibe destpêka koletiyeke bêsînor. Rê li ber hisa efendiyê desthilatdar vedike û ev jî tê wê maneyê ku ji mêraniya xwe piştrast bûye. Paşê ev rêbaz li ser lawikan tê ceribandin. Saziya koletiyê li ser herdu cinsan jî hat pêkanîn. Jin bi qasî mêr li pey têkiliya cinsî naçe û ev jî têkiliya xwe bi saziya koletiyê re heye. Çalakiya têkiliya cinsî ya ku modernîteya kapîtalîst ew bêsînor zêde kiriye, amûrekî koletiyê ye ku bi awayekî herî berfireh li ser cinsê mirov hatiye ferzkirin; bêsînor derfet û îmkan dide desthilatdarî û mêtinkariyê. Gelekî girîng û manedar e ku pirraniya dînan bi guman nêzî vê têkiliyê bûne, ji ber ku kirêt e, mirov dixe, û rê li ber neheqîqetê vedike.

**b-** Jin nebûbe keseke zewacê, divê ji bîr neke ku di her qada civaka mêrê serwer de mêr ê bi psîkolojiya pilingekî her kêlî xwe çeng bike ser nêçîra xwe tevbigere, lewma divê ew jî şêwazê tevgera xwe li gorî vê pêk bîne. Piling kengî firsendê bibîne ango kengî astengekî civakî yê karibe jê bibihure derkeve pêşiyê, wê pencekî xwe biavêje jinê. Mêrê desthilatdar di vê kêliyê de wê ti sedema exlaqî û wijdanî nas neke û wê bixwaze jinê bike nêçîra xwe. Ne sergirtina dînî, ne jî huqûq li pêşiya vê asteng nînin. Divê jin bi vê rewşê zanibe û wisa derkeve qada civakî, ya rastî, garantiyeke xweparastinê nebe divê jin danekeve qadên civakî yên xirûxalî û kes lê tinebe.

**c-** Divê jin ji bîr neke ku hedefa bingehîn a modernîteya kapîtalîst ew e, jinê bike koleyeke modern, nexasim vê jî hem bi rêbazên hişk ên hêza pere û desthilatdariyê îfade dikin, hem jî di serî de wêje bi rêbazên nerm ên hêza hunerê nîşan didin pêk tîne. Modernîte li hemberî jinê, çi bi rêbazên pere û desthilatdariyê, çi jî bi gelek sozên ji bo eşqê dide, di wê pozîsyonê de ye ku ji mêrê civaka berê qatbiqat zêdetir bi hêza êrîşê rabe. Li hemberî hêza xeternak a mêrê serwer pere û desthilatdariyê, gera jinê ya li jiyana azad ji xeyaleke tewş wêdetir ti maneya xwe nîne. Herçiqasî bi tevahî bi duristî û tevgerên xwe yên xweşik nêzîk bibe û li pey hevjiyana azad biçe jî jin li hemberî mêrê modernîteya heyî nikare xwe ji têkçûnê rizgar bike. Ango her rê wê bibe koletiya jinê ya modern.

**d-** Eger jin tevî vê civaka mêrê serwer hemûyî di azadmayînê de israr bike, hingê divê yan xwe li jiyaneke tenêbûna wê mezin an jî li zehmetiyên milîtaniyek e ku her kêliya wê bi têkoşîna sosyalîstiyê tijî derbas dibe, ragire. Tenêtî ji bo rewşên marjînal e. Jiyana sosyalîst jî jiyaneke xwedawendan a di hemtayê çanda xwedawendên berê de ferz dike. Divê neyê jibîrkirin ku yek ji xisletên xwedawendan ew bû ku bi mirovên mêr re nedizewicîn. Lê kengî mêr bû xweda, em ji dîrokê dizanin ku ji xwedawendan zêde tiştek nema. Ya ji jinê re dimîne melekbûn e. Lê jina bûye melek jî jina hinekî hêza xwe ya cins wenda kiriye temsîl dike. Jineke bi vî rengî, di civakê de ji rola qasidbûnê wêdetir ti rola wê namîne. Di mîtolojiyê de fîgura Înanna-Afrodît jineke cudatir e. Rûyekî jinê yê xweşikiya xwe, balkêşiya xwe ya cinsî û hêza xwe ya bedenî hê ji dest nedaye temsîl dike. Înanna-Afrodît weke Xwedawenda Eşqê hêmana hevjiyanê ya lê bigere, ew hêman e ku karibe hevjiyana azad pêre parve bike. Divê baş were fêhmkirin ku bi pirranî hêmanekî bi vî rengî bi tenê nîv-xweda û nîv-mirovekî mêr ê mîna Prometheûs e. Di dîrokê de û di roja me ya îro de ev hêman an jî bi pirranî mêr, mirov bi tenê dikare weke fîgurekê tesewir bike. Bi şerekî dûrî aqilan mirov dikare wî berbiçav bike. Jin heta xwedayên bêmaske yên xwe bi hêzên xeternak ên modernîteya kapîtalîst gurçûpêç kirine têk nebe nikare xwe pêk bîne. Ev berbiçavkirineke zor e, lê bêîmkan nîne. Sosyalîstbûn, hinekî jî berbiçavkirina îmaja Înanna-Afrodît û Prometheûs pêkan e.

Ji bo mêrekî li pey hevjiyana azad diçe, xusûsên berê pêşî divê pêk bîne mirov dikare xulase weha bîne ziman:

**a-** Ev mêr jina derkeve pêşberî wî, divê baş zanibe ku di bin şaristaniya pênc hezar salî û hegemonya wê ya kapîtalîst a pênc sed salî de li her cure şertên koletiyê hatiye gerandin. Çareyeke bi tenê ya vê jinê heye, li hemberî mêrê bûye piling bibe mêpiling. Stratejî û kêlî bi kêlî taktîkên jiyana wê bi tevahî li ser vî bingehî hatine avakirin. Eger em mijarê berevajî bixwînin, ew jî li gorî xwe xwediyê qefesekê ye, li hevalmêrekî digere ji bo bixe hundirê wê. Eger mêr li pey hevjiyaneke azad be, rizgarbûna ji stratejî û taktîkên jineke bi vî rengî herî kêm bi qasî yên jina kole zor in. Jineke bi vî rengî, bi stratejî û taktîkên xwe koletiyê ferz dike, lewma mêrekî

sosyalîst ê li pey hevjiyaneke azad berê pêşî divê li vê qadê têbikoşe û heta li vê qadê bi ser nekeve nikare ji bo têkoşîna civaka sosyalîst gavê biavêje.

**b-** Mêrekî ji bo zewacê givrokî bûbe, divê zanibe ku herî kêm bi qasî jinê ketiye bin bandora saziya koletiyê. Ji bo ev mêr ji bandorên wê yên neyênî bibihure divê di mekanê malê de timî li pey jiyana sosyalîst bibeze. Bi jina kole re jiyan bi koletî dibe, çewt dibe. Ji bo mirov karibe ji çanda mala giştî (kerxaneyê) ya taybetî bûye bibihure, divê mirov karibe bibe xwediyê çanda hevjiyana azad.

**c-** Li dijî çanda cinsiyetparêz a modernîteya kapîtalîst ku mirovan ji rê derdixe, divê mirov timî û bi awayekî serketî bi nefsa xwe re şer bike. Stratejî û taktîkên ji bo teslîmgirtina mêr hatine pêşxistin herî kêm bi qasî êsîrtiya jinê, mêr diqedînin. Divê mirov ji bîr neke ku di moderniteya kapîtalîst de mêr ji aliyekî ve bi tenê weke mêrtiya biyolojîk hatiye nepixandin û zêde mezinkirin, li aliyê din jî ew bi tevahiya çanda wî ya civakî kirine jinkok û pîrek. Mêrê biyolojîk ê zêde cinsiyetparêz ji aliyekî ve dikin piling, li aliyê din jî bi çanda jinkokiyê (jina kolebûyî) wî dikin mîna pisîkekê. Heta ku ev mêrtiya modernîte ferz dike neyê hilweşandin, mirov nikare bibe sosyalîst û nikare ji bo civaka sosyalîst têbikoşe.

**d-** Tevî van hêmanên neyênî gişan jî ji bo hevjiyana azad herî kêm bi qasî têkoşîna jina azad têkoşîna mêrê azad jî divê. Ji bo mêrek azad bibe, divê mirov karibe ji kesayeta mêrê ku civaka mêrê serwer ew kiriye kole, bibihure. Di rastiya me ya civakî de hê jî ariftî heye û divê mirov karibe xwe bigihîne wê mertebeyê. “Mirov weke mêr ji diya xwe nabe, mirov paşê dibe mêr” di çarçoveya vê gotinê de mirov dikare bibêje, mirov weke mêrê şaristaniyê bê dinê jî mirov dikare bibe mêrê azad. Forma mêrtiya Prometheûsî di serdema me de mirov bi tenê dikare bi zanist, felsefe û hunerê modernîteya demokratîk berbiçav bike. Divê mirov bi girîngî fêhm bike ku mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û huner ji bo jiyanê ne, û rola wan a sereke pêkanîna hevserî û hevaltiya azad e, û di vê çarçoveyê de divê mirov wan exlaqî û estetîk bike. Zewacên hemdem ên heyî dewama çanda xanedaniya hiyarerşîk in. Ev çand bi qasî heft hezar salan temenê xwe heye. Li qada vê çandê nirxên bingehîn ên civaka dewletdar têne çêkirin û destavêtinê weke norm û namûsê bi kesayetên mêr û jin didin qebûlkirin. Ji ber ku ev çanda destavêtinê ya bi armanca desthilatdarî û mêtinkariyê li kesayetan bar dikin, eşq pêk nayê, gelek jin û mêr hevdu ber didin û malbat ji hev belav dibin. Li dijî vê çanda destavêtinê, mirov dikare civaka sosyalîst û azad, bi kesayetên kêlî bi kêlî bi felsefe, zanist, etîk û estetîkê têne barkirin, pêk bîne. Eşkere ye ku hevjiyana azad a li ser vî bingehî çêbibe, wê her tim ji bo ferd û civakê rê li ber xweşikî, rastî û qenciyê veke.

Jiyana bi heybet û mûcîzewî ya ku modernîteya kapîtalîst ew hilweşandiye, em dikarin wê bi tenê bi hevjiyana azad, kesayeta wê ya sosyalîst û têkoşîna wê ya civakî bi dest bixin û parve bikin. Ji bo vê jî divê mirov ji zarokatiyê dest pê bike, nexasim jî keçikan bi zêhniyet û saziyên

modernîteya demokratîk perwerde bike, bi têkoşîna civakî ya sosyalîst demokratîk praktîze bike û vê yekê weke şêwazê jiyanê bipejirîne, ji xwe re bike karekter û bi dest bixe.

**Beşa Duyemîn: RASTIYA KURD**

Hebûn û serwextî (şiûr-bîrbirin) pirsgirêka herî bingehîn a felsefeyê ye. Têgîna hebûnê hê jî yek ji têgînên sereke yên felsefeyê ye ku dibe mijara kakûnî û meraqê. Li ber serê vê têgînê cêwiya wê zeman heye. Herdu ji hev cuda nabin. Herçiqasî hebûn bêzeman nebe, zeman jî bêyî hebûn nabe. Zeman bi temamî bi hebûnê re têkildar e. Têkiliya di navbera herduyan de herî zêde bi têgîna bûyînê re heye. Hebûn û zeman ji sedî sed bi bûyînê pêk tên. Zeman di hebûnê de zorê dide bûyînê. Ya rastî, domdariya hebûnê bi bûyîn û qewimînê pêkan e. Em dema behsa hebûna di rewşa bûyîn û qewimînê de dikin zeman derketiye holê. Eger bûyîn hebe, li deverekê du çîçekên cuda hebin, li wir hebûn û zeman heye. Tinebûna bûyîn û qewimînê tê maneya tinebûna hem hebûnê hem jî zemanî. Bûyîn û qewimîn, rewşa hebûnê ya cudabûn û şêwegirtinê ye. Hebûna ne di rewşa bûyînê de ne hebûn e, zemanê tineye.

Rewşa bûyîn û cudabûnê, rewşa serwextbûnê ya xwedî potansiyel e. Cudabûn belkî jî gava pêşî ye ku ber bi serwextbûn û bîrbirinê ve tê avêtin. Kengî hebûn bi zeman re cuda bû, hingê serwextî û bîrbirin gava xwe ya pêşî diavêje. Çiqasî bûyîn, form û şêwe (hemû di heman maneyê de ne) hebin ewqasî jî serwextî û bîrbirin heye. Di çarçoveyeke gerdûnî de serwextî cudatî ye, serwextî jî weke kategorî rewşa giştî ya gerdûnî ya tevahiya serwextbûnên cudabûyî ye. Lê bêdawîbûna di forman de tê wê maneyê serwextbûn û bîrbirin jî bêdawî ne. Çiqasî formên cuda hebin, ewqasî jî serwextbûn û bîrbirinên cuda hene. Têgîna serwextbûnê (giyan) ya li cem Hegel beriya formê tê. Ya rastî, behsa serwextbûn û bîrbirineke bêform û şêwe tê kirin. Hegel, formê ji fizîka xwezayê dide destpêkirin heta bi dewletê dibe. Serwextbûn bi rêya forman xweber (bêform) dixwaze ji bo xwe li xwe serwext bibe. Serwextbûn û bîrbirin bi formên fizîkî, biyolojîk û civakî hem xwe piştrast dike, hem jî xwe nas dike. Serwextbûn û bîrbirina li cem mirov ew serwextbûn û bîrbirinek e ku li xwe hayil dibe. Serwextbûna felsefî rewşa serwextbûnê ya herî pêşketî ye; weke giyana (serwextbûna) li xwe hayilbûyî li rewşa xwe ya pêşî vedigere; lê bi awayekî li xwe hayilbûyî ango weke giyana mutleq. Em ji vê re dikarin serhatiya hebûn û zeman jî bibêjin. Di civakên Rojhilat de mirov zêdetir bi baweriyên dînî û tesewifê gihiştine vî şêweyê fikrê, lê civaka Rojava bi rêya zanist û felsefeyê xwe gihandiyê.

Ji bo mijara me ya girîng ew e, em têkiliya di navbera bûyîn-hebûn-serwextbûnê de zelal bikin û maneyê bidinê. Dema ku mijar Kurd bin, mirov ê karibe ji têgînên hebûn, bûyîn û serwextbûnê (bîrbirinê) gelek tiştan hîn bibe. Eger em Kurdan bi rewşa wan a hebûn, bûyîn û serwextbûnê bidin naskirin, ev yek wê ji bo fêhmkirina mijarê bibe bingeh. Ne dûr, heta beriya demekê, li gorî gelek civak û dewletan hebûna Kurdan cihê guftûgoyê bû. Di van dused salên dawiyê de ji bo piştrastkirin û îspata hebûna Kurdan, di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de, belkî bi qasî

Kurdan ti civak ewqasî li şîddetê rast nehatibe, ji aliyê naverok û şêweyê ve zordestî, înkar û îmha nedîtibe. Li ser Kurdan siyasetên qirkirinê yên fizîkî û çandî hatin meşandin. Li mekanê xwe yê esas (Kurdistan), çi ji aliyê fizîkî ve, çi jî ji aliyê çandî ve (zêhnî) hatin parçekirin û ji bo bêne tinekirin her cure amûrên zorê û îdeolojîk hatin seferberkirin. Mirov dikare bibêje, heta gihişt qirkirina bi destê moderníteya kapîtalîst, ti mekanîzmayên talan û zorê neman ku li ser nehatibin ceribandin. Kurdîtî ji vî alî ve diyardeyek wisa ye ku hemtayê wê nîne. Cihû ji bo qirqirinên xwe têgîna 'bêhemta, nedîtî, yekane' bi îhtîmam bi kar tînin. Ji bo Kurdan jî ne ku bi sedema qirkirina li ser wan meşandine, lê ji ber tevahî kirinên ew ji hebûnê derxistine mirov dikare gotina 'gelê yekane' yan jî 'yekane hebûna civakî ' bi kar bîne di cih de ye.

Di van sîh salên dawiyê de têkoşîna PKK'ê bi awayekî berbiçav meşandiye ji bo Kurdan pirsgirêka hebûnê bû. Bi awayekî ev têkoşîn ji bo zelalkirina pirsa 'Kurd hene yan tine ne', hatiye meşandin. Ji aliyan aliyekî bi awayekî întîharwarî gotiye heye, aliyê din jî gotiye tineye. Ji vê jî wêdetir a mirov ji ber fedî dike ew e, di şêst salên beriya vî sîh salî de entelektueliya Kurd jî bi îspatkirina hebûna Kurd re mijûl bûye. Bêguman ji bo ferd û civakekê guftûgokirina hebûnê rewşeke gelekî bi tehlûke û rezîl îfade dike ku ev jî îşaret bi xeteke zirav a di navbera man û nemanê de ango di navbera jiyan û mirinê de dike. Di dîrokê de ti hebûna civakî neketiye vê rewşê yan jî pirr kêm hebûnên civakî bi hovîtiyeke bi vî rengî re rûbirû bûne. Ti hebûna civakî bi qasî Kurdan nekirine ku ji xwe fedî bike û înkara xwe qebûl bike an jî rewşeke evqasî rezîl bi serê pirr kêm hebûnên civakî de hatiye. Eger mirov bibe Kurd dibe tiştekî mîna bermahiya komeke ku welatê xwe bi xwe tineye, pênc pere nake, bêperetî û ew wekhev e, timî bêkar e, bi her heqdestê dixebite, timî ji bo debarê li ber xwe dide, pêdiviya xwe ya çandî ji bîr dike, ji bo pêdiviyên xwe yên maddî dûrî aqilan hewl dide, li dayikniştimana NAN (li dayikniştimana şoreşa cotkariyê ya neolîtîkê) bê NAN dimîne.

Min behsa trajediya xwe kiribû ka çawa bi dibistana pêşî ya asîmîlasyonê dest pê kir. Dibistana seretayî li şûna zimanê min ê dayikê bi zimenekî din ders dida. Mîna ku ez bi tehlûkeya ji vê dibistanê bê dihesiyam. Bi wê zarokatiyê dixwestin ez dev ji zimanê xwe berdim, ez ji hebûna xwe bigerim. Gelo, ez ê ji hebûna xwe ango Kurdîtiya xwe bigeriyama, wê bikirina jê bigerim? Diyardeya Kurd an jî pirsgirêka Kurd ji bo min bi vî awayî dest pê kiribû. Hebûnek an jî pirseke salên dûrûdirêj bêbersiv di nava dilê min de ez nerehet kirim... Min zimanê xwe ji dest dida û di binê vê de jidestdaneke mezin a hebûnê hebû. Min çi ji dest dida? Ev pirseke pirr zor û zehmet bû ku min bersiva wê bidiya. Kurd bûbû hebûneke bi pirsgirêk ku parastina wê gelekî zor û zehmet bû. Ya diqewimî, ne hebûna min, lê lerz û taya min a li ber qedandinê bû; bersivên bîrbirî û serwextbûyî nebûn, gulokeke pirsgirêkan bû ku her diçû mezin dibû û mirov dîn dikir.

Di serê salên 1975'an de min wisa xîtabî M. Hayrî Dûrmûş dikir, mîna ku min bersiva guloka pirsên min dipelixandin dîtibû. Bersiva pirsan weke pêşnûme hat nivîsîn û devê min vebû.

Eşkere ye ku bersiva min der barê hebûneke pêjna wê xeyal meyal hebû, xwe weke sîhekê weke şopekê dida hiskirin, îdeayeke devkî bû. Min yeqîn dikir ku mirov di pencereya çînî û rizgariya neteweyî ya cîhanê de binêre wê bibe bersiv. Min bersivên gelekî zêde îdealîst didan. Ma ne şablonê heqîqeta nû sosyalîzma pêkhatî bû. Mirov bi elîfbaya wê zanîbûya ya din bi xwe dihat. Bêguman nêzîkatiyeke bi vî rengî li hemberî bandora lîberalîzma alatûrka, faşîzma serkorker û înkarker panjehr bû. Mirov negihanda heqîqetê jî dikarîbû nehişta mirov bi jehrê bikeve. Li dijî qirkirina çandî di şerê hebûnê de ango di şerê man û nemanê de wê bi kêr bihata.

Bi awayekî giştî têkoşîna civakî têkiliya xwe bi lêgerîna heqîqetê heye. Çi têkoşîn dibe bila bibe, wexta bixwaze pirsgirêkeke civakî çareser bike, eger heqîqeta civakî îfade neke nikare bi ser keve. Ji ber ku heqîqeta civakî îzafî ye, gelekî xisletên wê yên kategorîk hene. Têkiliya xwe gelekî bi zeman û mekan re heye. Dema mirov di çarçoveya heqîqetê de binirxîne, PKK'ê hebûna Kurd a li ber tesfiyeyê, ne bi tenê îspat kir, bi giranî wê heyî jî kir. Jixwe bi awayekî klasîk tevgera rizgariya neteweyî nedimeşiya. Ne rewşa hebûnê ya xwe disipartê, ne jî serwextî û bîrbirina heyî têra vê yekê dikir. PKK'ê weke çalakî Kurd kir heyî. Kurdîtiya di sedsala 20. de, Kurdîtiyeke wisa bû, divê berê bibe heyî û paşê bê rizgarkirin. Ya PKK têde bi ser ketibû ew bû, Kurd kiribûn heyî. Eger tiştek pirsgirêka xwe ya hebûnê hebe, berê pêşî divê mirov ne ku wî tiştî rizgar bike, wî bike heyî. Bi temamî rewşa Kurdan ew bû ku diviyabû mirov wan bike hebûn. Têgînên mîna rizgarî, azadî û wekheviyê ji bo hebûnên pirsgirêka xwe ya heyînê çareserkirine maneyekê îfade dikin. Çalakgeriya PKK'ê ji aliyê xwe yê rizgarkeriyê zêdetir, aliyê xwe yê rê li ber heyînê vedike gelekî girîng e. Tevî hemû kêmûkurtiyên xwe yên di warê avahî û serwextbûnê de jî ji sedî sed PKK ji bo Kurdan bike heyîn bi roleke heyatî rabûye. Ev pirs girîng e: Gelo bêyî çalakgeriya PKKê hebûna Kurdan dikarîbû bibûya xwediyê rewşa xwe ya heyî? Zehmet e ku mirov ji vê pirsê re bibêje, erê.

Berî ku em pirsgirêka Kurd û rêyên çareseriyê guftûgo bikin, şert e ku em xwe di mijara hebûnê de zelal bikin. Mebesta me ji zelalkirinê ew e, em di mijara hebûna pêwendîdar de bi heqîqetê re rûbirû bibin û wê nas bikin. Heqîqet jî hedefeke wisa ye ku mirov ji bo wê têkoşîneke mezin nemeşîne nikare xwe bigihîniyê. Heqîqet ne rastî ye, ew rewş e ku mirov li rastiyê serwext dibe û bîra wê dibe. Rastiya bêheqîqet, rastiya razayî ye. Rastiya razayî jî pirsgirêka xwe tineye. Heqîqet ew rewşa rastiyê ye ku ji xewê hatiye hişyarkirin. Rewşa Kurdan a xewê ewqasî kûr û nêzî mirinê bû, eşkere bû ku şerê ji bo heqîqeta wê gelekî tevlîhev û zehmet bûya. Piştî rewşa xwe ya sîhûpênc sal berê, berê xwe didim heqîqeta gelê Kurd (tevî hemû şert û mercên giran ên Girtîgeha Îmraliyê ji arezû û heyecana xwe min tiştek kêm nekirî), ev yek ji rola wan a rohnîker a di dema şeveqa şaristaniyê de gelekî manedar mîna rohniyê dide biharekê. Haya min ji min heye ku ez bi awayekî romantîk li mijarê temaşe dikim. Bi awayekî romantîk nêrîn, bi herhalî ji nêrîna îronîk a heqîqeta bûye xwelî û ti hêviyê nade, bêhtir bang li mirov dike û vedixwîne ew heqîqeta ku hê zîlên teze ye. Heqîqetên der barê rastiya Kurd û pirsgirêka wî de cara pêşî ye ku li pêkhatina hêviyên azadiyê şahidiyê dikin.

**A- BI KURTÎ PÊKHATINA DÎROKÎ YA RASTIYA KURD**

Ez di beşên (cild) berê yên parêznameyên xwe de li nava dîrokê bi pey rastiya Kurd ketibûm. Lewma ji dubarekirinê zêdetir, li qonaxên girîng der barê diyardebûna wê de mirov hinek analîzan bike, bawer dikim wê bêhtir kêrhatî be, û mirov ê pê pêşiya xwe bibîne. Kurdîtî di dîrokê de rastiyeke timî di cihê xwe de sabit û bistbûyî sekinî nîne. Weke her diyardeyeke civakî bi veguherînê hebûna xwe pêşde dibe. Veguherîna di rewşa aniha de berfirehtir û bileztir e. Diyardeya Kurd a roja me ya îro di pêvajoyeke werê re derbas dibe pêdiviya xwe bi ravekirineke berfireh heye. Di rêûresma berê de bi awayekî hunerî xweîfadekirin yek ji şêwazan e ku herî zêde mirovan pêk aniye. Ji vî alî ve Kurdîtiyê bi rêya muzîkê hewl daye xwe bide naskirin. Bi vî awayî, ji bo heqîqeta Kurd muzîk dibe şêwazê herî girîng ê îfadeyê. Di şêwazê zanistî yê piştrastkirî de pêşketinên girîng hene. Hewldan hene ku bi têgînên dîrokî û civakî Kurdîtî bi rêbazên cuda bê ravekirin û piştrastkirin. Xebata akademîsyenan bêhtir di vî warî de ye. Nêzîkatiyên li ser bingehên îdeolojîk bêhtir bi îdealên rizgarîxwaziyê barkirî ne, lê tevî vê, ji bo îfadekirina heqîqetê jî pirr kêrhatî ne.

Bêguman karekterê çînî yê her îdeolojiyê li gorî xwe bi heqîqetekê radibe. Herçiqasî her model bi tena serê xwe hewl bide heqîqetê rave bike jî bi tenê dikare beşekî ji temsîla rastiyê îfade bike. Diyardeya civakî bi xwe zorê dide vê yekê. Mîna tabloyeke sêrengî ye, çawa ku di nava wan de rengekî beloq têrê neke wan îfade bike. Di ravekirina civaka dîrokî de nêzîkatiyên tek modelî di warê temsîla rastiyê de timî kêm in, û mirov ê bi wan bixape. Kengî mirov asta şêwe û maneya tevlîhev a civakan li vê zêde bike, hingê bikaranîna yekpare ya tevahiya rêbazên temsîla parçeyên rastiyê dikin girîng dibe.

Di serdema me de rêbazên zanistî giraniya xwe çêdibin, lewma pêşhukmên dibêjin, rêbazên din nikarin heqîqetê îfade bikin, bi hêz dibin. Lê kaosa zanistî ya pêk tê, eşkere kiriye ku rêbazên xwe sipartiyê bi temamî têrê nakin. Rêbaza zanistî bi xwe kelemekî ciddî ye ku nahêle mirov li heqîqetê serwext bibin û fêhm bikin. Her ku diçe têkiliya rêbaza zanistî bi îdeolojî û desthilatdariya hegemonîk a sîstema şaristaniya Rojava re eşkere dibe. Ji bo hebûn xwe pêk bîne, pêdiviya xwezaya wê ye ku nêzîkatiyên beş û gerdûnî yên der barê heqîqetê de bi hev re bi kar bîne.

**1- Weke Hebûn, Heyîn Kurd**

Mirov rabe bi rêbazên dîrokê yên têne qebûlkirin hewl bide hebûna Kurdan tespît bike û bide naskirin, mirov ê li gelek zor û zehmetiyan rast bê. Dîrokê û cografya lê dimînin bi dijwarî bandor li wan kiriye û ew neçarî marjînalbûnê kirine. Li gorî lêkolînan, pêşiyên mirovên îro Homo Sapîens bi qasî sêsed hezar salên dawî yên dîroka xwe pêşketine û di nava ruhberên din de bûne cinsê serdest. Em dibînin ku ev pêşketin li Kevana Bi Bereket ango li cografya ku dikeve

navenda Kurdistanê ya îro pirranî Kurd lê dimînin, pêk hatiye. Di dîroka bi qasî sê mîlyon salî ya cinsê mirov de qonaxa Homo Sapîens li derketina holê ya zimanê sembolan rast tê. Bi pêşketina zimanê sembolan şoreşa Homo Sapîens ket pêşiyê. Lewma hewce dike ku mirov hê bêhtir hûrûkûr nêzî dîroka li Kevana Bi Bereket bibe. Ev rewş bi lêkolînên der barê genan de jî tê piştrastkirin. Kengî bîst hezar sal berî Serdema Dawî ya Qeşayî bi dawî bû, qeşayê xwe vekişand, Şoreşa Cotkariyê ya Neolîtîk pêkan bû. Herweha kengî hêza fikrê ya Homo Sapîens bi dewlemendiya heywan û nebatan a cografyayê re hevdu temam kir, şoreşa herî bi kok a dîroka mirovatiyê Şoreşa Civaka Gund-Cotkariyê li Kevana Bi Bereket pêk hat û rê li ber pêşketinên mezin vekir.

Şoreşa Gund û Cotkariyê di warê ziman û fikrê de kir ku mirovatî ji qonaxekê derbasî qonaxeke gelekî li pêş bibe û vê yekê jî kir ku şêwegirtineke civakî ya di ti demê de nehatiye dîtin pêk bê. Bi vî awayî grûba ziman û çandê ya serdest a komên Hind-Ewrûpa (Ev navlêkirin şaş e, mirov bibêje Koma ziman û çandê ya Aryen rastir e) pêk hat. Mirov koka Kurdên îro dikare weke şaneya kok a komên Hind-Ewrûpa bide naskirin. Lêkolînên li ser ziman û çanda Kurdan hatine kirin vê rastiyê derdixin holê. Hem cografya wê ya jiyanê, hem jî dîroka wê vê rastiyê bêhtir piştrast dikin. Bermahiyên Girê Navikê li Ûrfayê encama lêkolînên dawî ye, û dîrokeke navend dîn û qebîleyên herî kevin ên 12 hezar salî ye, û mînakeke girîng e ku hêza çanda heyî piştrast dike. Li ti devera dinyayê mînakeke evqasî kevin nehatiye dîtin.

Mirov dema hêza dîn û qebîleyê ya hê jî bi bandor in dinirxîne, eşkere dibîne ku li pişt vê yekê rewşa dîrok û cografyayê diyarker in. Civakek çiqasî demdirêj û hûrûkûr di bin bandora dîrok û cografyayê de mabe, otoktontî û xwecihbûna wê civakê ewqasî bi hêz û mayînde dibe. Bandorên bi hêz û mayînde, dîroka wê civakê ya paşê bê muhafezekar dike. Mirov hê jî xisletên otantîk û xwecihî yên Kurdan dibîne, û di bingehê vê rastiyê de ev bandorên bi hêz û mayînde hene. Bêguman di dema neolîtîkê de hê diyardeya gelbûnê pêk nehatiye. Em li derketina holê ya civaka qebîleyê şahidiyê dikin. Li gorî civaka klanê qebîle pêşketineke mezin a şoreşgerî ye. Ji şoreşa neolîtîkê re mirov dikare şoreşa qebîleyê jî bibêje. Di civaka qebîleyê de cudabûna çand û zimanan, têkiliyên koçberî û cihwarbûnê dest pê kiriye bi pêş dikevin. Navenda dînî ya li Girê Navikê di dema xwe de ji bo qebîleyên bi hezaran salî koçberî û cihwarbûna di nava hev de pêkanîne bi rola Kabeyê rabûye. Bi taybetî li Ûrfayê, bi giştî li cem Kurdan hisa dîn hê jî gelekî xurt e. Di vê de para vê rastiyê ne hindik e. Li Girê Navikê, em hebûna çandeke bi hêz nas dikin ku berî şaristaniya bajêr a Sumeran bi hezaran salî pêk hatiye û dewam kiriye. Li ser kevirên tîk ên mezin, em herfên pêşî û mînakên nivîsê yên beriya hiyeroglîfiyê dibînin. Beriya duwanzdeh hezar salan verotin û niqirandina wan keviran û li ser wan pêkanîna zimanekî sembolî weke hiyeroglîfiyê di warê dîrokî de qonaxeke mezin a xwedî nirx e.

Civaka bajêr a Sumer û Misrê xweber derneketin holê. Çawa ku bi van mînakan jî piştrast dibe, ji sedî sed çavkaniya wan çanda Mezopotamya Jor e. Sefera pêxember Brahîm a muhtemel sêhezarûheftsed sal berê ber bi Misrê ve kirî, delîlekî gelekî girîng e ku nîşan dide çawa diyalektîka dîrokî li Kevana Bi Bereket bi pêş ketiye. Çanda ku kir şaristaniya Sumer û Misrê derkevin holê, ev çanda li kevana çiyayên Toros-Zagrosê ye. Ya girîng hebûna qonaxeke çandê ya gelekî mezin e ku bandora wê di dîroka civakî de hê jî dewam dike. Şopên navenda vê çandê hê jî di nava Kurdan de gelekî tê dîtin û eger ev gel hê jî li ser vê cografyayê weke gelê xwecih ê herî kevin hebûna xwe dewam dike, divê bivênevê mirov pêkhatina rastiya Kurd bisipêre vê çandê. Civaka qebîle li derdora heşt hezar sal berê li cografya Toros-Zagrosê diyar bûye. Ev çandeke wisa otantîk e ku mîna ku xwe li aliyekî bi Kabeya mezin a pêşî, li aliyê din jî bi çanda muzîkê ya gerdûnî ya pêşî, bi dahol, zirne û bilûrê îlan dike. Zirne û bilûr îfadeyên hunerî yê vê çandê ne. Navenda dîn îfadeya wê ya fikrî ye.

Rastiya Kurd hem berhemekî vê qonaxa mezin a dîrokî ye, hem jî nîşaneyên bi hêz li wê rastiyê barkirî ne ku îşaret pê dikin ku ew di vê çandê de çikiyaye û maye. Bi rik e ku weke gelê çanda qebîleyê bimîne û mirov nikare vê bi tenê bi xweparastina wê ya li dijî hêzên şaristaniyê rave bike. Eger çandê bi xwe rehên xwe kûr bernedabin, yan wê bi xwe bibe şaristanî yan jî di nava şaristaniya jêre malovanî kirî de bihele. Em dibînin bi hezaran civakên qebîleyan ên bi vî rengî heliyane. Kurd bi vî aliyê xwe komeke gel in ku mînaka wan tineye. Heqîqeteke sosyolojîk heye; eger civakekê şoreşeke dîrokî bi kok û hûrûkûr pêkanîbe, gelekî zor e ku ew civak di nava xwe de ji duyemîn şoreşeke cuda û mezin re pêşengiyê bike. Ji ber ku şoreşa bi xwe pêk aniye, cîhana wî ya zêhnî û sazî bi temamî dagir kiriye. Şoreşeke din pêdiviya xwe bi zêhniyet û sazîbûneke din heye. Ev şoreş jî bi tenê li gorî çanda bi hêz a navend, di nava duyemîn çanda li hawîrdorê de pêkan e. Daneyên dîrokî hemû nîşan didin ku ne bi tenê şoreşa Homo Sapîens a sêsedhezar salî, şoreşa cotkariyê ya bi qasî çardehhezar salî jî li ser çanda Kurd a bi cihbûyî bandorên mayînde kirine. Nexşeyên genetîk piştrast dikin ku hem cinsê Homo Sapîens, hem jî şoreşa cotkariyê ji vê navenda çandê li hawîrdora xwe û dinyayê belav bûye.

Di gavavêtina qonaxa şaristaniyê de vê cografyayê ne bi tenê di warê danîna hîmê çandî de, her weha di warê naverok û şêwedana şaristaniyê de jî xwedî roleke diyarker e. Şaristaniyên Sumer û Misrê şaristaniyên pêşî yên dîrokî ne, lê li cografya wan a li ser hilat in û mezin bûn ango li Mezopotamya Jêr û Nîla Jêr (Geliyê Nîlê) gelekî berê bingehekî wan ê şaristanî li ser pêk bê, çênebûbû. Şert û mercên wan ji bo jiyana klanekê jî derfet û îmkan nedidan. Ev şaristaniyên pênc hezar sal berê bi pêş ketin, bi tevahî hîmê xwe yê zêhnî û yê saziyan bi saya vê çanda xwedî jiyaneke hezar salan a bi heybet danîn: Çawa ku şaristaniya Ewrûpayê xwe sipart şaristaniya Îslamê û ya Çînê, şaristaniya Emerîkayê jî xwe sipart şaristaniya Ewrûpayê. Hê jî aliyê herî qels ê dîroknasî û civaknasiyê ew e, têra xwe nikarin aliyê teorîk û pratîk ê têkiliya di navbera çand û şaristaniyê de ji hev derxin. Ji ber ku derbasbûna çand û şaristaniyan ji

Mezopotamya Jor ber bi Mezopotamya Jêr û Geliyê Nîlê ji hev nehatine derxistine. Mirov nikare civaknasî û dîroknasiyê bi tenê bi rêbazên analîtîk bike zanist. Dîrok çawa qewimiye bi wî awayî neyê fêhmkirin dîrok, civak jî weke xwe neyên fêhmkirin hingê mirov nikare civaknasiyê bike zanist.

Eger Kurd hê jî hebûna xwe bi karektera xwe ya çandî diparêzin, ev jî ji hêza çanda wan a dîrokî ya xwe disipêrinê tê. Li şûna jiyana şaristaniyê jiyana çandî tercîh kirine û nabe ku ev jî bi paşverûtî û paşvemayîneke sivik were ravekirin. Çanda pê radibin çandeke bajar, çîn û dewletê nîne; çandek e ku di nava xwe de rê nade otorîterbûyîn û çînîbûyînê, berevajî di demokrasiya qebîleyê de israr dike. Ji ber ku Kurd bi çandeke welê demokratîk re têkildar in, bi hêsanî kes nikare wan zevtûrebt bike.

Min ê gelekî paşê fêhm bikira ku jiyana civaka bajarî, çînî û dewletdarî ne fazîlet, lê ketin û serberjêrçûn e. Bêguman têgihiştina netewe ya Rankeyî (Dîroknas Leopold von Ranke, 1795-1886) di serwextbûna me ya li pirsgirêka neteweyî de bandor kir û di vê de bi rola sereke rabû. Em kengî li çi civakeke beş difikirin, em dewletdarî, çînî û neteweyîbûna wê ji xisletên bingehîn ên rastiya wê dihesibînin. Helwestên îdealîst hene ku bi pirranî civakên ne xwediyê van xisletan ji civakan nahesibînin. Bi vî awayî, li yek ji xisletên bingehîn ên fikra dewleta netewe ya Rojavayî xisleta gerdûnî zêde dikin. Em heta tesawirên xwe yên dîrok û civakê ji qalibên neteweparêz û dewletdar ên hegemonya îdeolojîk a navend Rojava rizgar nekin, zehmet e ku em têgihiştineke zanistî bi pêş bixin. Ji bo em bibin neteweya dewletdar em gelekî bi ser zêhniyeta xwe ya dîrokî û civakî de diçin. Ji bo her civakekê avakirina dîrokekê mîna ku bi şertê netewe û dewletbûnê ve tê girêdan. Eger di dîrokê de em nebûbin xwedî xisleteke ‘rêzdar’ (êdî bê ka çi ye) ya netewe û dewletê, em wisa pê dihisin ku me ew şensê xwe ji dest daye ku em civak bêne hesiband. Ev zêhniyeta dewletdar û neteweperest, ji sedî sed weke hêmanê bingehîn ê zêhniyeta tehakum û mêtinkariya modernîteya kapîtalîst bi pêş dikeve û sedema bingehîn a korbûn, kêmmayîn û çeloxwariya di warê zanista dîrok û civakê de ye. Amûrên îdeolojîk û mêtinkar ên hegemonya kapîtalîst di zanistên dîrok û civakê de mirovî serkorî dikin.

Lewma, dema ku em hewl didin qonaxa herî mezin a çanda civakî û dîroka mirovatiyê diyar bikin, em li gorî şert û mercên îro bi têgihiştineke dewletdar û neteweperest nêzîkî wê demê nabin. Em qaliban der barê Kurdîtiyê de pêk nayînin. Em bi pey civak û dîroka gerdûnî ketine. Divê mirov baş pê zanibe eger mirov bi têgihiştina civak û dîroka gerdûnî ve girêdayî nemîne, nikare pê zanibe ka wê civakeke beş di dîrokê de û di pêşketina civakî de bi ku ve girê bide û bi cih bike. Ji lewra xebatên dîrok û civaka beş ên ji dîrok û civaka gerdûnî qut bêne kirin, wê bibin pêşhukmên sûbjektîf û ne tiştekî din. Fikra navenda wê şaristaniya Rojava ye, çima ji dîroka gerdûnî û pêşketina civakî direve û bi giranî xwe bi têgihiştina dîrok û civaka Greko-Romen bi

sînor dike? Eşkere ye ku di vê de berjewendiyên wê yên hegemonîk ên maddî û îdeolojîk diyarker in.

Lê em nakevin vê şaşiya bingehîn: Civakeke niha heye û dijî, çiqasî bêdewlet dibe bila bibe, xisletên wê yên netewe çiqasî kêm bi pêş ketibin bila bi pêş ketibin, ji sedî sed beşekî dîrok û civaka gerdûnî ye. Şaşî ew e, gelek civak ji dîrok û civaka gerdûnî qut têne lêkolîn. Bi vê zêhniyeta antî-zanistî, û li her cure pêşhukman vekirî, mirov nikare li dîrok û civakê serwext bibe. Jixwe yekparebûn bi tenê ne xisletek xwezaya civakî ye, xisleteke bingehîn a xwezaya fizîkî, kîmyewî û biyolojîk e jî.

Divê mirov bi ehemiyet bibêje, tevahiya fikrên marjînal û mustesna yên der barê Kurdan de xwe disipêrin pêşhukmên bi vî rengî yên sûbjektîf. Herçiqasî di roja me ya îro de Kurd li derveyî dîrok û civaka gerdûnî hatibin hiştin jî ew nûnerê civaka qebîleyê ne ku bi bihûrîna ji civaka klan qonaxa destpêkirî û heta bi pêşketina civaka şaristaniyê (civaka bajarî, çînî û dewletdarî) di tevahiya qonaxên dîrok û civaka gerdûnî de bi roleke sereke rabûne. Di avakirin û dewamkirina çanda qebîleyê de bi rola sereke radibe. Şaş e ku mirov qebîleyê weke diyardeyeke civakî ya dema wê derbasbûyî û hemdem nîne bihesibîne. Forma bingehîn a mirovatiyê qebîle ye û ti carî mirov nikare jê bibihure. Dibe ku naverok û şêweyê xwe biguhere, lê ti carî pêkan nîne ku li derveyî diyardeya civakî were hiştin. Formên netewe û klan ên di diyardeya civakî de bi qasî formê qebîleyê dîrokî û gerdûnî nînin. Bêguman formên klan û netewe jî xwedî xisletên gerdûnî ne, lê bi qasî yên qebîleyê bi bandor nînin. Di avakirina civakê de formê bingehîn qebîle ye. Kapîtalîzm jî ji qebîleyê nebihurî ye, bihêlin jêbihurînê, di tehlîla dawî de bi tevahî holdîng û yekdestdariyên kapîtalîst her yek ji wan rêxistinên bi şêweyê qebîleyê ne. Belkî ew qebîleyên civaka cotkarî û koçêriyê nînin û nikarin bibin ew jî. Lê qebîleyên bajarî yên civaka krîz û hilweşînê ne: Qebîleyên hiyarerşîk, dewletdar û mêtinkar in.

Em bi dîroka nivîskî re di têkiliyên bi civaka şareza ya Sumer re timûtim prototîpa Kurdan dibînin. Çavkaniya sereke ya Sumeran xwe disipartiyê proto-Kurd bûn. Ji qewmên çiyayî yên li Bakur û Rojhilat re KURTÎ digotin û ev îfade hê jî tê bikaranîn. Ji xelkên qebîleyan ên li Rojava jî bi giştî AMORÎT digotin. Peyva Kurtî weke gotin tê maneya ‘Qewmê Çiyê’. Dema ku Kurd tê gotin çiyayîbûn îro jî weke xisleteke bingehîn a Kurdan tê bîra mirov. Ya rastî, di navbera Kurtiyên dema Sumeran û Kurdên îro de belkî cudahî bi tenê herfa ‘d’yê ye. Kurdên bi hezar salan bi çanda qebîleyê radibin, hê jî bi giranî Kurdên qebîleyê ne. Rast e, Kurdên bajarî, deştî, yên bi awayê çînî cihêbûne, yên bi dewletê re hevkariyê dikin û dijberê dewletê têra xwe hene. Lê Kurdîtiya qurmê darê pêk tîne, Kurdîtiya xurt bi zuriyeta xwe ve girêdayî ew Kurdîtî ye ku li cem xisletên qebîleya ji rêûresmê bi giranî heye. Kurdîtiya bajarî, çîna serwer û dewletdar, bi awayekî rêûresmî û bi giranî ew Kurdîtiya ji Kurdîtiyê qutbûyî û serî li ber asîmîlasyonê xwarkirî îfade dike. Di Destana Gilgamêş de Enkîdo yê ku Kurtî ye, weke yekemîn kesê bi bajariyan re

hevkartiyê dike, belkî jî weke hevkarê tevahiya bajarî, çînî û desthilatdariyê pêşiyê Kurtiyan e. Hûmbabayê di destanê de bi xwe Kurtiyekî Çiyayî ye. Enkîdo bêbextiyê li Hûmbaba dike û ji bo Gilgamêş wî bikuje mîna ku lavahiyan lê dike û li ber digere. Binêrin çiqasî Kurtiyê hevkar ê roja me ya îro bi dijwarî bi bîra mirov tîne! Xuya ye ku wexta min got cudahiya di navbera wan de bi tenê bi qasî herfa ‘d’yê ye, ez zêde jî neheq nebûm.

Dema mirov li guherîna civakî bifikire, bi gotineke din dema mirov li civaka dîrokî bifikire, gelekî girîng e ku mirov hin şaşiyên bingehîn neke. Yek ji van şaşiyên bingehîn ew e, divê mirov pêşketina civakî yan jî dîrokê bi fikra paradîgmatîk a ‘li ser xeteke rast pêş dikeve’ nenirxîne. Di serdema Rohnîbûnê de ev zêhniyeta felsefî ya bûbû xeteke hegemonîk a îdeolojîk, her cure guhertinê ji ezel heta ebed ango ji serî heta binî weke xeteke rast dibîne. Doh doh bû, îro îro ye! Mîna ku di navbera herduyan de ti têkilî yan jî wekhevî tinebe, şîrove dike. Ev şîroveyeke şaş a pêşketina diyalektîkî ye. Dijberê vê paradîgmayê têgihiştina ‘çerxwarî’ an jî ‘xelekwarî’ ye ku timî xwe dubare dike. Ew wê diyardeya jêre guhertin tê gotin bi tenê weke pirrcarîkirineke domdar dihesibîne. Ev têgihiştinên gelekî dijberê hev xuya dikin bi xwe îdealîst in. Herdu jî versiyonên cuda yên îdeolojiya lîberal in. Têgihiştina pêşketinê ya bêserûbinî ya yekemîn û têgihiştina dubarebûnê ya bêserûbinî ya duyemîn, di bingehê xwe de li ser înkara guhertinê dibin yek.

Ev meseleya herî kevin a felsefe û dînan, heta ya mîtolojiyê bi xetimînê bi encam dibe. Îronîk e, li têkiliya zeman û mekan serwext nebûne. Nikarîbûn bîr bibin ku têkiliya di navbera hebûn û zeman de weke bûyînê ango weke guherînê tezahur dike. Bîrnebirin û serwextnebûna van zêhniyetan bivênevê wan ber bi têgihiştina pêşketina li ser xeteke rast û xelekên dubare domdar ve biriye. Di vê nuqteyê de nûtiya herî girîng a felsefeya diyalektîkê aniye der barê pêşketina gerdûnî bi xwe de ye. Zeman û mekan bi tenê bi bûyînê re pêkan e. Guherîn bi awayekî xwezayî encameke mevcûdiyeta zeman û hebûnê (mekan) ye. Ji bo hebûn û zeman pêk bên guherîn şert e. Guherîn hebûn û zemên piştrast dike. Ya girîngtir ew e, divê mirov naveroka têgîna guherînê ji hev derxe. Ji bo guherîn bibe divê tiştekî neguhere hebe. Guherîn li gorî yê naguhere dibe. Yê naguhere ew tişt e ku timî weke xwe ye. Yê naguhere hebûna eslî ye, weke cewher hebûn e, ew cewher e ku çavkaniya Bûyînê ya her heye û baqî ye. Belkî hinek bibêjin, hûn li vir bi awayekî mîstîk nêzî têgîneke xwedayî dibin. Lê em neçar in ku xwe bigihînin encameke bi vî rengî ya felsefî û ev jî bi zanistê re nelihev nîne. Jixwe mirov bibêje, ji mirov tê ku bi temamî karibe di warê bûyîn, zeman û mekan de bîr bibe û serwext bibe, ev jî metafizîk e. Serwextbûna mirov li mutleqê bi şik û guman e.

Ji lewra xusûseke girîng e ku mirov di zanista dîrok û civakê de guhertinê ne înkar bike ne jî zêde mezin bike. Civaka çandî ji civaka şareza mayîndetir e, cewherê civakê û hebûna wê pêk tîne. Civakek e ku ji aliyê çandî ve bi hêz pêk hatibe, şensê wê heye bi awayekî mayînde dewam bike. Tevî ku dewlet û şaristanî dikevin ber çerxên gelek guhertinan û guhertinên bi lez, çand bi xwe

derfetê didin guhertineke pirr bi sînor. Eger mirov bibêje qet guhertin nabe şaş e. Lê mirov behsa çandên timî diguherin, behsa nirxên bi lez diguherin bike jî bi qasî ya pêşî ango têgihiştina dibêje guhertin qet nabe, şaş e. Modernîte her tiştî di nava kêliyê de bi cih dike û behsa tempoya guhertineke bi heybet dike, ev bi xwe neguherînê îfade dike. Ya rast, jiyanên di nava kêliyê de dubare dibin û guhertinên bi leza herî beza ne pêkan in. Îdeolojiyeke xapînok hatiye avakirin. Ev îdeolojiyên xapînok ên mohra lîberalîzmê li ser wan hene, bi armanca berevajîkirina têgihiştin û fêhmkirina dîrok û civakê ne.

Dema ku mirov li ser diyardeya Kurd û dîrokê raweste, divê mirov van nêzîkatiyên bingehîn ên rêbazê li ber çavan bigire. Mirov rabe hewl bide bi dîrokên neteweyî û dewletdarî li rastiya Kurd serwext bibe, ev ê zêde zordayîn û tengavkirina rastiyê be. Ceribandinên bi vî rengî dîrokên bi zorê ne, lewma zêde têkiliya xwe bi qewmînên diyardeyî re nînin. Bi qasî mîtolojî û destanan jî nikarin rastiyan nîşan bidin. Rêbaza dîroka çandî bêhtir nêzî rastiya diyardeyî ye. Dîroka çandî pêvajoyên modernîte û şaristaniyê digire nava xwe. Lê çanda modernîte û şaristaniyê dîroka çanda gerdûnî nagire nava xwe. Netewe û dewlet ku kategoriyên bingehîn ên dema şaristanî û modernîteyê ne, bi tenê dikarin bibin beşek ji dîroka çandî. Ji ber ku xwedî wê qabîliyetê nînin ku gerdûnîtiya çandî bigirin nava xwe. Kurd di dîroka şaristanî û netewe de zêde cih nagirin, ev nayê wê maneyê ku dîroka wan tineye. Em dema ku di çarçoveya dîroka çandî de nêzî mijarê bibin, em ê bibînin ku Kurd xwedî dîrokeke sereke ya hezar salan in. Xisleta bingehîn a vê çandê ew e, formên qebîle û eşîrê bi xurtî pêk anîne, di ekonomiya cotkarî û heywanxwedîkirinê de bi roleke şoreşgerî rabûye. Çanda li Kevana Bi Bereket di dîroka mirovatiyê de bi çi rolê rabûye, Kurd jî di dîroka çandî ya gelan de bi roleke hemtayê wê rabûne. Di dîrokê de, di dema mezolîtîk û neolîtîkê de (15000-3000 B.Z.) çanda navend e. Ji Çînê heta bi Hindê û heta bi Ewrûpayê tevahiya çandên civaka neolîtîkê xwedî kirine. Em şopên belavbûna çandî hem bi rêbaza genetîk hem jî bi rêbaza etîmolojîk dikarin li van qadan tespît bikin. Bi qasî ku tê tespîtkirin pêşengiya çandeke duwanzdeh hezar salî ya navenda wê Kevana Bi Bereket mewzûbehs e. Di dîroka mirovatiyê de em nabînin ku ti çandê evqasî berfireh û demdirêj ajotiye, weke rojê rohnî, germ û xwedî kiriye. Eger hebin jî rola wan bi sînor û seresere ye.

Şaristaniya Sumeran a hatiye tespîtkirin di salên 3000'î B.Z. de tevî şaristaniyên Misr, Hind û Çînê dest pê kiriye, pêkan nîne ku mirov wan ji kokên wan ên digihîjin Kevana Bi Bereket qut bifikire. Ne bi tenê di pêkhatina şaristaniyên bingehîn de, herweha di dewamkirina wan a hezarê salan de jî guman li ser rola çanda Kevana Bi Bereket nînin. Çawa ku tê zanîn çandên şaristaniyê dikarin bi tenê di atmosfera berdar a çanda neolîtîkê de bi pêş bikevin. Ji wan nayê ku bi serê xwe ji tine xwe ava bikin. Neolîtîka Mezopotamyayê ya li Kevana Bi Bereket hema bêje bi serê xwe bûye dergûşa şaristaniya destpêkê (3000 B.Z.-500 P.Z.). Şaristaniya navenda wê Mezopotamya jî ji şaristaniyên sereke yên dinyayê re ji 3000 B.Z. heta 300 P.Z. bi rola navendê

rabûye. Eger mirov bi hegemonya DYE ya temenê wê hê negihiştiye sed salî bide ber hev, mirov ê cudahiya mezin a di navbera wan de baştir fêhm bike.

Ev rola neolîtîka Kurd girîng e. Sîstema şaristaniya navendî (sîstemeke pênc hezar salî) kok û rehên xwe Mezopotamyayî bûn û sê hezar salan bi rola navendê rabû, ev jî dike ku em baştir li girîngiya çanda neolîtîkê serwext bibin. Eger mirov çandan û şaristaniyan bi navê gelan diyar bike, ev dibe ku zêde mezinkirin û nepixandin be ango dibe ku rêbazeke rast nebe. Lê ya rast ew e ku bi kêmanî mirov dikare behsa rola wan a di qonaxên prototîp de bike. Me dîrok bi tenê bi navê hin împarator û xanedaniyan nas kiriye û ev jî ji bo îfadekirina rastiyê qîm nake. Dîsa bi hin qewmên naskirî binavkirin têrê nake. Jixwe eger mirov neteweyên modernîteyê weke hêza barhilgir a dîrokê bide naskirin, hingê maneya vê pêkanîna berevajîkirina herî mezin a di dîrokê de ye. Kengî em ji zemînên dîrokî yên ku têkiliyê di navbera beş û gerdûnî de danaynin yên ku para bêhtir ji hegemonyayên îdeolojîk mîrate mane, bibihurin, hingê em ê dîrokeke rasttir a mirovî û civakî bibînin. Em bi tenê dikarin bi vê rêbazê dîroka kedkar û gelên bêdîrok hatine hiştin ava bikin.

Di sosyolojiyê de têkiliya demokrasiyê bi dîroka çandî re mijarek e ku zêde nehatiye guftûgokirin. Pîvana rastî ya demokratîkbûnê ne bi şarezetiyê ve, bi dijbertiya wê ve girêdayî ye. Berxwedana civakekê li dijî hêzên şaristaniyê pîvana herî girîng a demokratîk e. Lîberalîzm jî berevajiyê vê îddîa dike. Ji bo demokrasiyê şaristanîbûnê şert dibîne. Di nava çandên şaristanî nebûyî bi xwe de rêûresmeke bi hêz a demokratîk heye. Rêveberiyên ku weke antîteza forma dewletê hene demokratîk in, û bi vê xisleta xwe rêûresmeke bi hêz a demokratîk pêk tînin. Komên eşîr û qebîleyan, cemaetên dînî û mezhebî, gel û neteweyên bêdewlet ên li derveyî bedenên bajaran li dijî çînîbûnê li ber xwe dan û heta roja me ya îro hatin, hêzên demokrasiyê ne. Bi awayekî sîstematîk antî-şaristanî demokratîkbûn e. Marksîzmê û îdeolojiyên lîberal, demokrasî di çarçoveya bajar, çîn û dewletê de kirin têgîn û bi sazî kirin, ev jî berevajîkirineke mezin e. Ew sîstema demokratîk a bikeve çarçoveya bajar, çîn û dewletê hatiye xesandin, naveroka çanda wê hatiye valakirin û bi xistina wê ya bin serweriya bajarê serdest û çîna dewletê tê pûçkirin. Ya rastî, şaristanî sîstemek e ku weke dijberê çanda demokrasiyê pêk tê.

Em dema rewşa çanda Kurd li hemberî şaristaniyan binirxînin, divê em têkiliya diyalektîkî ya me hewl da li jor bidin naskirin timî li ber çavan bigirin. Em dibînin ku li dijî çanda şaristaniya Sumer, Kurtî timî li ber xwe didin. Em vê yekê, nexasim di vegotinên mîtolojîk ên Xwedawenda Çiyê (Nînhûrsag) de dikarin bibînin. Destana Gilgamêş bi xwe têkoşîna Kurtiyan a parastina azadî û hebûna xwe li dijî şaristanîbûna Sumeran îfade dike. Dema şaristanî xwe ber dide nava Kurtiyan bi tenê li berxwedanê rast nayê, hîmên xwe yên zêhniyet û sazîbûnê jî datîne. Çanda şaristaniyê çawa ku bi giştî dibe, bi avabûna bajêr li dewrûbera bazarê civaka neolîtîk dixe bin bandora xwe. Bi awayekî berbiçav em tespît dikin ku ji salên 4300 B.Z. çanda El Ubeyd a bi koka xwe ji

Mezopotamya Jêr bandorê li çanda Mezopotamya Jor dike. Çanda El Ubeyd bi civaka hiyarerşîk a li dora xanedanên bi hêz pêk tê ji çandên berê yên qebîleyan cihê dibe.

Nakokî û têkiliyên çanda qebîleyê ya wekhevîxwaz û çanda hiyarerşîk a dest bi çînîbûnê kir, di pêkhatina Hûrriyan de bi roleke girîng radibe. Hûrrî jî weke Kurtiyan ji heman kokê tên. Mirov dikare peyvên 'Kur' û 'Ûr' yên di Sumerî de weke 'Çiya' û 'Gir' fêhm bike. Civaka li serê gir û çiyayên sîstema Toros-Zagrosê cihwarbûyî, heman komên navê xwe ji herdu peyvan zêdebûyî digirin îfade dike. Çanda xanedaniyê ya bi çanda qebîleyê re di nav hev de bi pêş ket, dibe parçeyekî girîng ê çanda ji rêûresmê ya Kurdan.

Mirov dikare tespît bike ku ji salên 2000'î B.Z. û pêve Hûrrî (Kurtî) li ser rêya şaristaniyê gavên girîng diavêjin û bi Xanedaniya Gûdea li ser bajarên Sumeran (2150-2050) serdestiyê dikin. Em dibînin ku ji salên 1600'î B.Z. ve wan du împaratoriyên cîran û mervên hev bi navê Hîtît li Anatolya Navîn û bi navê Mîtannî li Mezopotamya Jor ava kirin. Çanda Mîtannî û Hîtîtiyan di bin bandora çanda Sumeran de mînaka herî bi hêz û girîng a şaristanîbûna Hûrriyan e ku di dîrokê de cih digire. Em dibînin ku herdu hêz nexasim li dijî hêzên Babîl û Asûr ên bi koka xwe Semîtîk ên li ser çanda Sumer avabûne dibin yek û di sala 1596'an B.Z. de bajarê Babîlê dagir dikin. Di salên 1500-1200 B.Z. de li Rojhilata Navîn weke hêzên şaristaniyê yên herî bi bandor, li ser şaristaniya Misrê jî karîbûne bi bandor bibin. Nasnameya Nefertîtiya navdar a keynika Mîtannî ya weke bûk çû Misrê, piştrast dike ka ev bandor çiqasî bi hêz e. Mirov fêhm dike ku li hemberî hêza Asûran a di salên 1200'î B.Z. de mezin dibe, hêza Hûrriyan a şaristaniyê ji hev belav dibe, li çanda kevin a qebîleyê vedigerin û demeke dirêj bi wê jiyana xwe dewam dikin. Dîsa mirov dikare tespît bike ku bi navê Konfederasyona Naîrî (1200-850 B.Z.; Di zimanê Asûrî de Naîrî tê menaya Gelê Çêm, Gelê Avê) yekîtiyeke sist a qebîleyan pêk tînin. Di van deman de tê dîtin ku berî û piştî avabûnên navendî yên hêzê yên mîna împaratoriyan timî konfederasyonên sist têne avakirin.

Qraltiya Ûrartû ya navdar (850-600 B.Z.) duyemîn mînaka girîng e ku di encama nakokî û têkiliyên çandên ji rêûresmê yên Mezopotamya Jor û Jêr de derketine holê. Di şaristaniyê de ew nexasim bi hunerê hesinkariyê xuya ye. Xelekeke bi hêz a sîstema şaristaniya navendî ye. Heye ku kokên xwe digihîjin Hûrriyan û sentezeke hêmanên çandî yên Ermeniyên wê demê be. Ew hêza bi tenê ye ku dikare li dijî hêza hegemonîk a wê demê Împaratoriya Asûr bisekine, li ser piyan bimîne û car caran Asûran paşve bixe. Di serî de çanda Kurd û Ermeniyan, li ser tevahiya avahî û zêhniyetên çandî yên herêmê xwedî hêzeke bi bandor e. Li Zagrosan piştî berxwedaneke sêsed salî ya li dijî Asûran di sala 612'an B.Z. de Konfederasyona Medan (wer xuya ye ku ev nav jî Asûran li Hûrriyan kiriye) paytexta Asûran Nînova şewitand, hilweşand û bi xwe veguherî împaratoriyekê. Piştî dema împaratoriyê ya kurt ajot, di encama dekûdolabên xanedaniyê de salên 550'î B.Z. împaratorî ket destê qralên ji zurriyeta Hêxamenîşiyên Fars, lê tevî vê jî di nava

împaratoriyê de bandora çanda Medan sereke bû. Nexasim di warê eskerî de bandora wan heye. Bi navê Împaratoriya Persan ji derya Egeyê xwe gihandibû heta bi nava Hindistanê, ji Misrê heta bi Tirkmenistana îro bûbû hêzeke cîhanşumul a tekane. Yek ji xelekên bi hêz ên sîstema şaristaniya navendî bû. Di sala 330'î de heta ket destê Skenderê Mekodonî tevahiya dusedûpêncî salan bi tena serê xwe bû hêzeke hegemonîk a dinyayê û li ser çanda şaristaniyê şopên kûr hiştin. Şaristaniya Med-Pers kir ku şaristaniya Romayê derkeve holê. Piştî fetha Skender qraliyetên weke xelekên navber hatin avakirin, her ku çûn di şerên navbera Sasanî (dewama Persan; 216-650 P.Z.) û Romayîyan (500 B.Z.-500 P.Z.) de bûn hêzên yedek. Du hêzên mezin ên dawî yên serdema antîk Sasanî û Romayiyan nikarîbûn hevdu bi temamî têk bibin, lê ji ber ku hevdu westandin vê yekê rê li ber fetha Îslamî vekir. Ji Hz. Muhammed hat ku çanda qebîleyê ya bi hêz a Nîvgirava Ereb bi çanda Îslamîk re bike yek û bi vê re serdemeke nû ya dîrokê dest pê kir.

Tevahiya bûyerên girîng ên çanda şaristaniya serdema destpêkê ya bi qasî çar hezar salan dewam kir li Mezopotmaya Jor û dewrûbera wê ya nêz qewimîne. Çanda proto Kurdan di vê dema dirêj a duyemîn de erênî yan jî neyênî gelek bûyer dîtine. Mirov bi hêsanî dikare bibêje, di du hezar salên pêşî de Hûrrî, Mîtannî û Hîtîtiyan di çarçoveyeke gerdûnî de bandor kirine. Di pêkhatina çanda Grek û Romayê de û di derketina holê ya çanda Rojava de xeleka sereke ya diyarker çanda Hûrrî-Mîtannî-Hîtît e. Hem afirêneriyên xwe bi xwe, hem mîrateya çandî ya Sumer birin Rojava, gihandin Greko-Romenan û bi vî awayî di dewamkirina bê navber a şaristaniya navendî de bi rola xeleka zêrîn rabûn. Mirov heta rola vê xeleka zêrîn diyar neke, pêkan nîne ku herikîna dîrokê rave bike. Eger bi çanda neolîtîkê ya duwanzdeh hezar salî û çanda şaristaniyê ya du hezar salî xwedî nebûya, bi herhalî me nikarîbû behsa çandeke mirovatiyê ya mohra xwe li îro xistî bikira.

Di du hezar salên pêşî yên civaka şareza de têkiliya Proto Kurdan bi şaristaniyê re gelekî çêbûye. Têkiliyeke dualî mohra xwe li tevahiya bûyeran xistiye. Bi aliyê xwe yê pêşî bi zordestî û mêtinkariya hêmanên çanda şaristaniyê ango bajar, çîn û dewletê re timî ketiye nav şer û pevçûnê. Carnan bi hin pêngavan heta bi dagirkirina navendên zordestî û mêtinkariyê çûne (Fetha Babîlê, hilweşandina Nînovayê), lê wexta hêza wan têrê nekiriye gelek caran vekişiyane serên çiyayên nayên fetihkirin (Çanda Zaza ya ji qûntarên başûrê Zagrosê heta bi Dêrsimê zaravayên wekhev diaxivin bi van bûyeran re ji nêz ve têkildar e) û bi vî awayî bergiriya hebûna xwe kirine û girîng dîtine ku dev ji jiyana azad û serbixwe bernedin. Şopên van çandan hiştine îro jî têra xwe bi bandor in. Beşê jêre Kurdê Çiyê tê gotin qebîleyên bi koka xwe Hûrrî ne ku qederê pênc hezar salan li ser vê xetê jiyane. Koka hin gotinên ji zimanê Hûrrî û gelek peyvên Zazakî digihîjin hev û ev jî vê rastiya em behsa wê dikin têra xwe rave dike. Aliyê duyemîn li ser bingehê têkiliyên bi çanda şaristaniyê re ye. Bi awayekî erênî rahiştine van têkiliyan, nirxandine û ew kirine malê xwe. Di çanda Kurd de ev bandora şaristaniyê xwe bi pêkhatina sazî û

zêhniyetên bajarî, çînî û dewletdar nîşan daye. Çawa ku di gelek mînakan de em dibînin, em li vir jî pîvana “Eger tu nikarî pê, bibe weke wî û wisa wî têk bibe” derdikeve pêşiya me. Ji bo vê, Gûtî, Mîtannî, Hîtît, Ûrartû, Med, Pers û Sasanî mînak in; li dijî hêzên şaristaniyê yên êrîşî wan dikin xwe weke şaristanî ava dikin ango ev şibîna dijberê xwe, têkbirina wî û li ser piyan mayînê îfade dike.

Proto Kurdan di duyemîn qonaxa şaristaniyê ya du hezar salî ya heta bi Îslamiyetê de bajarên xwe ava kirin, çînên xwe yên serwer pêkanîn û dewletên xwe damezrandin. Ev çand zêdetir li qûntara çiyan û li deverên deşt pêk hat û lewma xwedî xisleteke têkel e: Arîstokrasiya rêveber çand û zimanên şaristaniyên dixwest bişibe wan bi kar dianîn û beşên çîna jêr jî çand û zimanên xwe bi kar dianîn. Ev karekterê dualî yê çanda ku di bin bandora giran a cografya Kurdistanê de pêk hat, kêm guherî û hebûna xwe heta roja me ya îro dewam kir. Çi bi şêweyê çanda çiya û deştê ‘dualî cihê bibe’, çi jî weke çanda deşt û bajêr bi dualîteya çînî cihê bibe, ev dualî cihêbûn xisletên wê yên bingehîn ên karekterîstîk in. Tebeqeya jor timî hewl daye bi hêzên mêtinkar ên fetihkar, dagirker û xerîb re pirr baş li hev bike, çanda xwe ya qebîle û gel bêkêr dîtiye, di dereceya duyemîn de bi tenê di têkiliyên navxweyî de gelekî kêm bi kar aniye. Di nava şaristaniyên bi xwe avakirî de yan jî yên di nava wan de cih girtin, hewl nedan çand û zimanê xwe serwer bikin an jî gelekî kêm hewl dan. Ji Gûtiyan heta bi Eyûbiyan ev her wisa ye. Ev zumreya serwer a bajarî û dewletdar, belkî jî bi qasî ku di ti civakê de nebûye li dijî hebûna çandî ya Kurd a ji rêûresmê bi roleke neyînî rabûye. Ji ber ku di nava çand û zimanê xerîban de heliyane berjewendiyên wan ên mezin ên çînî û malbatê pêk hatine û ev jî bêguman di vê rewşa neyînî de diyarker e. Çanda Kurtiyên Çiyê ya deriyên xwe li derve girtine û çanda malbat û qebîleyê ya tebeqeya jêr a bi giranî neguheriye û bi hezarên salan deriyên xwe li derve girtine, bi vî awayî neheliyane gihiştine heta îro. Di navbera van herdu beşên çandê de bi qasî çiyan cudahî heye û ev bûye sedem pirr bi kok weke Kurdîtiya rast û Kurdîtiya sexte ji hev cihê bibin. Di dema modernîteya kapîtalîst de bûrjûwaziyeke Kurd a milliyetgir a pirr bi hêz pêk nehat û di binê vê de ev rastiya dîrokî heye.

Mirov dikare behsa diyardeyeke Proto Kurd a di dema neolîtîk û serdemên destpêkê de bi hêz pêkhatî bike. Rastiyên civakî yên her yek ji wan diyardeyeke dîrokî ne, di van serdeman de nikarin bi temamî xwe cuda bikin û weke gel xwe bi nasname bikin an jî xwe weke rastiyeke qewm îfade bikin. Hê negihiştine vê qonaxê. Ji aliyê qewmîtî yan jî gelbûnê ve, rengê dema neolîtîkê û serdemên destpêkê xwe bi yekîtiyên qebîle, eşîr û xanedanan nîşan didin. Yekîtiyên dînî û mezhebî jî hê bi temamî pêk nehatine. Şêweyên bîrbirin û serwextbûnê yên qebîle, eşîr û xanedaniyê di wê demê de şêweyê herî pêşketî yê civakî yê bîrbirin û serwextbûnê ye. Serdema neolîtîkê serdema bi heybet a qebîleyê ye. Her qebîle bi totemekî tê temsîlkirin. Totem nasnameya qebîleyê ye. Pêkan e ku perestgeha li Girê Navikê ya Ûrfayê navenda dîn-xwedê ya qebîleya herî bi hêz be; li deverê navenda dînî ya hevpar a qebîleyên herî bi hêz be. Mirov

dikare nîşaneyên weke hiyeroglîfê li ser kevirên tîk weke şecereyên her qebîleyekê fêhm bike. Prototîp û mînaka pêşî ya pîramît, zîggûrat û Kabeyê ango prototîp û mînaka pêşî ya malên xwedê û navendên dîn ên du şaristaniyên bingehîn ên serdema destpêkê ango Sumer û Misrê û şaristaniya serdema navîn ango Îslamê ye. Ji ber vê sedemê girîngiya wê ya dîrokî mezin e. Hz. Brahîm ji Ûrfayê dest bi gavavêtinê kir û pêşiyê sê dînên yekxwedayî ye, ev diyardeyeke xweber û ji xwe li hev hatî nîne. Encameke çanda navenda dînî ya li devera Ûrfayê ye ku bi qasî tê tespîtkirin bi kêmanî duwanzdeh hezar sal rabihuriya wê heye. Belkî sîstema perestgeha Girê Navikê bi tenê bi qasî wê dema hatiye tespîtkirin sê hezar salan bi rola Kabeya dînî rabû ye. Mirov dikare behsa heman rola Harranê jî bike. Heye ku hê gelek navendên nehatine keşifkirin hebin. Li Swêregê jî çanda perestgeha li Newala Çorî heta bi beriya yanzdeh hezar salan diçe.

Em dizanin ku her qebîleyeke dema neolîtîkê bi giştî ji xwe re heywanek weke totem hilbijartiye. Lewma dema em dibêjin, totem bi awayekî paşnav û nasnameya qebîleyê ye, bi awayekî em şêweyê pêşî yê bîrbirin û serwextbûna qebîleyê jî nas dikin. Çawa ku dewletên netewe yên îro xwe bi temsîla alan bi nasname dikin, totemên yekîtiya qebîleyan jî heman maneyê îfade dikin. Çawa ku li Neteweyên Yekbûyî bi qasî hejmara alan netewe têne temsîlkirin, totemên li navendên perestgehên dînî jî qebîleyên navdar û bi hêz ên wê demê temsîl dikin. Ew bi xwe ji hev ne cuda ne, cudahiya wan hecm û mezinahiya wan e. Em dizanin, totem xisleteke xwe ya bibe tabû û îbadet jêre bê kirin heye. Bi îbadetkirina ji totemê re qebîle xwe pîroz dike, xwe mezin û bilind dike, ev jî wê xwesteka ji bo jiyaneke ewle û demdirêj îfade dike. Baweriya bi jiyana piştî mirinê, encama girêdana mezin a bi pêşiyan e. Hebûna wan bi pêşiyên wan re yek e. Girêdan û hurmeta wan a ji bo pêşiyên wan, dike ku piştî mirinê bi jiyaneke bêserûbinî bawer bikin. Dînên yekxwedayî yên piştre tên, şêweyên pêşketî yên dîn û xweda yên vê baweriya qebîleyê ne.

Eger mirov çanda neolîtîkê û çanda qebîleyan a serdemên şaristaniyan li devera Ûrfayê ji hev derxe, wê karibe tê derxe ka çima ev çanda panzdehhezar sal temenê wê heye evqas mayînde ye, û dikare li ber xwe bide. Li deverê hê jî hestên dînî bi hêz in, malbat û namûs xurt in, di binê vê de şopên çanda berê ya qebîleyan a bi hêsayî jê naçin hene. Dîsa li herêmê namûs û dozên xwînî pirr bi hêz in ku ev jî encama vê rastiya civaka çandî ye. Qanûnên li nasnameyên civakî hatine kolan û niqirandin, bi hêsanî şop û bandora wan jê naçe.

Cîhana fikir û hestan a hebûna çandî ya qebîleyê rê li ber vedike divê piçûk neyê dîtin. Li ser bîrbirî û serwextiya mirovatiyê hê jî li ser piyan digire şopên kûr ên vê çandê hene. Di çavkaniya tevahiya şêweyên sereke yên bîrbirin û serwextbûnê de ku têne hiskirin û bi huner, zanîn, felsefe, dîn û mîtolojiyê têne ziman, çanda qebîleyê heye. Ti mîtolojî, dîn, felsefe û ekola hunerî nîne ku çanda qebîleyê neyîne ziman û bi hestan îfade bike. Em dema ku li cudahiyên mîtolojîk, dînî, felsefî û hunerî hûrûkûr bikolin, em ê di bingehê her cudahiyê de hebûna qebîleyî bibînin.

Bîrbirin û serwextbûna qewm û neteweyên paşê, xwe disipêre bîrbiriya qebîleyên li ser bingeha yekîtiya pirrqebîleyan pêkhatine. Mînak dînên Brahîmî ne ku em di dîrokê de wan gelekî dibînin; mezheb û terîqetên van dînan li ser bingehê netewebûnê weke milliyetgiriyeke dînî ya herî dawî pêkanîn û di binê vê de jî Qebîleya Ibranî (qebîleya Hz. Brahîm) heye. Hêza potansiyel a rastiya van dîn, mezheb û neteweyan Qebîleya Ibraniyan e ku berî ev dîn, mezheb û netewe derkevin holê, Qebîleya Ibraniyan di navbera şaristaniyên Kevana Bi Bereket û Misrê de diçe û tê. Di bingehê şoreşa Brahîmî de şikandina xwedayên pût ên totemên qebîleyan heye. Pûtên qebîleyan ên li perestgeha navendî hatine komkirin têne şikandin û li şûna wan baweriyeke qebîleyê ya bêhtir bibe tegîn tê bicihkirin. Dînê Îsewî ev yek li ser navê qebîleyên xizan û koleyên hilhilî vegurandiye. Dînê Îslamiyetê yê ku Hz. Muhammed têde bi ser ket, heman tiştî di serî de ji bo cîhana qebîleyên Ereb û ji bo qebîleyên xwedî heman jiyanê yên di navbera Bîzansî û Sasaniyan de asêmayî de kir. Eger qebîleyên xizan û birrê koleyan ê li bextekî xwe biavêjinê digerin nebin Xiristiyantî, eger qebîleyên xizan ên Ereb jî nebin Îslam nikare gav biavêje.

Cemaeta Xiristiyan û ummeta Îslamî civakên bîrbirineke nû ne ku li ser bingehê baweriyeke hevpar a qebîleyan û mirovên aware yên ji qebîleyan qutbûyî, bêkar, kole û eskerên fîrarî pêk hatine. Li vir civakeke nû heye; li ser bingehekî çînî yê pêşketî ye û ji qebîleyê bihurî ye. Lê di van şert û mercên civaka nû de xwe gelekî kêm guheriye û hebûna xwe bi hêz dewam dike. Ya li vir em behsa wê dikin civaka qebîleyê ya ketiye krîzê ye ku li ser bingehekî nû yê civakî û îdeolojîk xwe vediguherîne; çareseriya qebîle di nava xwe de nabîne, hewl dide li derve bibîne di nava çanda bajar, çîn û dewletê de ku li ser înkara demokrasiya qebîleyê mezin dibin.

Di serdema qebîleyan de qebîleyên gewdên wan mezin bûne û hejmara wan zêde bûne ketine krîzê. Di dema krîzê de du têgihiştin diyar dibin: Ya yekê, yên xizan ku bingehê qebîleyê ne, parçe dibin û di azadiya xwe de israr dikin, xanedanên serdest ên hiyarerşiya qebîleyê ji bingehê qebîleyê yên xizan qut dibin, bi gavavêtinên îdeolojîk ên em ji wan re bi giştî dînê şaristaniyê dibêjin, xwe weke civaka dewleta nû bi rêxistin dikin. Çanda qebîleyê li beramberî çanda şaristaniyê têk çûye. Bi vê veguherînê re di zikhev de bajar, çîn û dewlet bi pêş ketine. Çareseriya bingehîn a şaristaniyê ji krîza çanda qebîleyan re dîtiye ev e. Fikra di dîrokê de gelekî hatiye guftûgokirin û Marksîstan jî parve kiriye ew e, ev veguherîn gaveke gelekî mezin e ku ber bi pêş ve hatiye avêtin. Şarezabûn an jî şaristanîbûn timî weke pêşketinê û şêweyê jiyana payeberz hatine hesibandin. Marks û Engels jî bi perspektîfa materyalîzma dîrokî li vê veguherînê nêrîne û bi pîvana, ev bûyereke diviyabû biqewimiya, nêzîk bûne û lewma wan jî ev weke gavavêtineke mezin a ber bi pêş ve ya dîrokê, nirxandine.

Ez vê têgihiştinê rexne dikim. Ya ku di civaka qebîleyê de qewimî, nabe ku weke qonaxeke mecbûrî ya krîzê bê nirxandin. Ya qewimî ew bû; tercîha çînî ya hêmanên hiyarerşîk bû. Ji bo paşvexistina azadî, wekhevî û demokrasiya qebîleyê guhertinek (ez nabêjim pêşketin) hatiye

kirin, û ev bi awayekî îzafî paşketineke mezin e, ji bo mirovatiyê jî gavên berepaş hatine avêtin îfade dike. Ji ber ku dîrok timî bi nêrînên îdeolojîk ên zumreyên serwer hatiye kodkirin, em ji vê guhertinê re pêşketineke mecbûrî, pêşdebir û heta şoreşger dibêjin! Ya rastî ew e, ev gava hatiye avêtin mecbûrî nîne û hewcedarî jî pê tineye; paşverû ye, berepaş e, û dij-şoreşê ye. Ev rûyê din ê dîrokê ye ku qala wî nehatiye kirin. Çanda li dijî xiyaneta elîtên xwe yên xanedanî yên hiyarerşîk timî têkoşiyaye, di avahî û bîrbiriya azadî û wekheviyê de israr dike, hêza rastî ya pêşketin û pêşdeçûnê temsîl dike. Ji aliyê vê çandê ve dîrok bi awayekî sîstematîk û zanistî nehatiye îfadekirin û ev jî dibe ku kêmasiyek be. Lê ev rastî nîşan nade ku dîrokeke bi vî rengî tineye, berevajî nehatiye nivîsandin, hatibe nivîsandin jî hatiye tepisandin û propagandaya wê xurt nehatiye kirin. Krîza şaristaniyê ya zumreyên serwer bi yekdestdariyên îdeolojîk û yekdestdariyên mêtinkariyê pêşde birin nebûye çareserî; xwe timî bi bajarbûn, çînîbûn û desthilatdarîbûna weke girêkeke kansêrê li ser pişta civakê heta roja me ya îro aniye û veguherandiye çavkaniya krîza herî mezin. Ji bo mirovatî bijî, divê li dijî civaka krîzê ya dîrokî, çanda demokrasî, azadî û wekheviya dema qebîleyê li ser bingehê pêşketinên zêhniyet û saziyên tevahiya pêvajoyên şaristaniyan hatine bidestxistin ji nû ve bê pêkanîn. Kengî ev hat kirin mirovatî wê bi ser bikeve.

Mîrateya herî hêja ya Proto Kurdan ji çanda neolîtîk û çanda serdema antîk mayî hebûna wan a çandî ye. Kengî vê hebûna xwe bi serwextbûn û têgihiştina modernîteya demokratîk re kirin yek, wê di rizgarbûna ji krîza îro ya Rojhilata Navîn de, karibin bibin xwediyê pêşketineke li gorî dîrok û nasnameya xwe.

**2- Hebûna Kurdan û Rêûresm**

Di pêkhatina hebûna Kurdan de rêûresma Zerdeştî bi roleke girîng radibe. Ev rêrûresm di navbera dînên yekxwedayî yên Brahîmî û dînên pûtperest (totemîk) de bihura dîrokî ya derbasbûnê ye. Avahiya totemîk a di çanda qebîleyan de têgihiştina serwer a dînî ye, cara pêşî rêûresma Zerdeştiyê ev avahiya totemîk ji perestinê derxist û li ser bingehê exlaqî û têgînî veguherand û lewma rêûresma Zerdeştî şoreşa herî mezin û pêşî ya dînî û exlaqî ye. Dişibe gavavêtina Îslamî ya xwe disipêre qebîleyên Ereb, lê beriya wê derketiye. Armanca wê ew e, ji qebîleyên Proto Kurdan li ser bingehê bawerî û exlaq yekîtiyeke bêhtir li asta jor pêk bîne. Ji krîza civaka qebîleyê re çareseriyeke aliyê wê yê demokratîk xurt bi pêş dixe. Ev sîstema baweriyê di salên 1000’î B.Z. de hebûna xwe berbiçav dike, bi Zerdeşt re sîstemeke bi bandor a civakê bi pêş dixe. Di şoreşa Zerdeşt de ya girîng ew e, cara pêşî ji yekîtiya teng a qebîle û xanedaniyê dibihure, di nava tevahiya qebîleyên Med de nasnameyeke jor a hevpar ava dike. Rahibên bi navê Magî (mirovên zana) hêza bi bandor a civaka nû ne. Zerdeştîtî rê li ber enerjiyeke mezin a civakî vedike. Qebîleyên anîna wan a cem hev gelekî zor û zehmet e, dikare li ser bingehê baweriya hevpar a dînî û exlaqî bîne cem hev û ev serketina wî şoreşeke gelekî

mezin e ku dîrok têra xwe li ser nesekiniye. Tesîra wê ji ya Îslamiyet û Xiristiyantiyê kêmtir nîne. Heta mirov dikare bibêje di pêkhatina rêûresma qebîleya Ibrî de bi rola çavkaniyê rabûye. Di pêkankirina Konfederasyona Medan de şîrêz û çîmentoya bingehîn e. Xanedaniya Pers a Hêxamenîş Konfederasyona Medan a naveroka wê demokratîk bi dekûdolaban xist destê xwe û împaratoriya herî mezin a dîrokê ava kir û têkiliya vê jî bi xwe ji nêz ve bi rêûresma civakî ya Zerdeştî re heye.

Di warê herî zêde bikaranîna çanda qebîleyê ya bi naveroka demokratîk di nava çerxên xwe yên rêveberiyê de, rêûresma împaratoriya Aryen di dîrokê de ya herî jêhatî û hoste ye. Naveroka demokratîk di sîstema şaristaniyê de dihelîne û pesnê xwe dide ku monarkên herî bi hêz ên dîrokê afirandine. Li dijî demokrasiya Atînayê ya li Rojava weke rêûresmeke despotîzma Rojhilat heta roja me ya îro xwe bi hêz û domdar kiriye. Serwextiya felsefî ya ku demokrasiya Atînayê rê li berê vekir, di pêkhatina şaristaniya Rojava de bi rola çavkaniyeke bingehîn rabû, lê rêûresma Zerdeşt a ku despotîzmê li qesrên Persan naveroka wê pûç kir, ne bi tenê li hemberî artêşa Skender têkçû, nikarîbû nehêle daneheva çandî ya civakên Rojhilat jî heba û ziyan nebe: Çawa ku despotîzma Osmanî nikarîbû daneheva mayî ya çanda Îslamî ji şaristaniya Rojava ya kapîtalîst biparêze. Ev rêûresma demokratîk a dîrokî ku li cem Kurdên Êzîdî hema bêje li ber hişkbûnê ye, mijareke girîng a hêjayî lêkolînê ye. Dema ku mirov ji nêz ve çav li Kurdên Êzîdî û Kurdên Elewî bidêre, nexasim temsîla xisletên demokratîk, azad û wekhev ên çanda Zerdeştî wê li cem jinan were dîtin. Tevî ku pirr hatine tepisandin, aliyê wan ên bi xwezayê re bûne yek, wêrekî û eşkere gotin, hêjayî dîtinê ye.

Lêkolînên li ser rastiya çandî ya Kurd a ku heta bi Îslamiyetê bi giranî xisletên xwe yên otantîk parastin, bêne kirin wê bi tenê dîroka Kurdan zelal nekin, wê demên dîroka gerdûnî yên bi hezarên salan dewamkirî jî zelal bikin. Di roja me ya îro de çiqasî kêmreng û bintûte bûbin jî lêkolînên der barê dîroka wan de bêne kirin, wê piştrast bikin ku Kurd di dîroka şaristaniya demokratîk de kevirên çarqozî yên goşeyan in.

**3- Hebûna Kurd û Rêûresma Îslamî**

Ronesansa Îslamî li ser tevahiya çanda qebîle û sîstema şaristaniyê ya Rojhilata Navîn a ji rêûresmê bandoreke veguherîner kiriye. Bi guherînê re di nava xwe de ji bo ji krîza civaka qebîleyê bibihurin ummetgeriya Îslamî, ji derve jî ji bo ji krîza împaratoriya Bîzans û Sasanî bibihurin hewl dane siltantiyeke Îslamî ya bêhtir gerdûnî ava bikin. Bi vî awayî, dixwazin ji du nakokiyên bingehîn hem di asta tekîtî de û hem di asta gerdûnî de bi senteza Îslamî bibihurin û bi sererastkirinên nû yên avahî û îdeolojîk meseleyê ji hev derxin. Di bingehê wê diyardeyê de ku jêre sîstema şaristaniya serdema navîn tê gotin, gavavêtina Îslamî heye. Ji ber vê xisleta wê ya serdema nû rêûresma Îslamê ya seltenet û ummetê di dîrokê de evqas bi bandor bûye. Bi awayekî, bi rola modernîteya kapîtalîst a zû rabûye. Fena qasidekî pêşîhatî yê modernîteya

kapîtalîst ê Ewrûpaya Rojava ye, nola zarokê wê yê jiberçûyî ye. Bêyî hebûna şaristaniya Îslamî, mirov li benda hilatina şaristaniya Ewrûpayê be yan jî lê bifikire şaş e.

Bandora Îslamê li ser çanda qebîleyê ya ji rêûresmê û sîstema şaristaniyê di asta şoreşê de ye. Belkî jî ji krîza bi sedsalan re ya di nava çanda qebîleyê de, bersiva şoreşgerî ya herî bi bandor e. Qebîleyên Ereb ên li Nîvgirava Erebistanê ketibûn nava şerekî bi sedsalan heta bi hezar salan neqede. Di çanda qebîleyan de rizîneke mezin heye. Jin piçûk hatiye xistin, zarokên keç ewqas bêqîmet hatine hesibandin ku bi saxî hatine binaxkirin. Ev çand ji bo pirsgirêkên civaka klasîk çareser bike ji derfet û îmkanan mehrûm e. Bi kurtî, ne dikare bi federasyonên qebîleyan ên ji rêûresmê, ne jî bi avahiyên desthilatdariyê yên koledar ên ji rêûresmê pêşiyê li krîzê bigirin. Pêşniyarên îdeolojîk, polîtîk û pratîk ên Hz. Muhammed weke derman li vê rewşê hatine.

Xisleta bingehîn a şoreşa Muhammedî ew e, bêyî ku ber bi civakeke nû ya di ser civaka qebîleyê re biberide û bêyî ku bikeve bin fermana împaratoriyên Sasanî û Bîzans ên li ber serê wê, culhet kiriye zend û bendên xwe li avakirina sîstemeke nû ya polîtîk a ji herduyan jî bibihure vemale û ji bo vê xwe ehil û erkdar dîtiye. Têgîna Ellah gelekî mezin û bilind kiriye, di binê vê de du diyardeyên şoreşî hene; ango derketina holê ya çanda polîtîk û civakparêziya ummeta Îslamî. Kengî analîza têgîna Ellah bi awayekî zanistî ji aliyê dîrokî û sosyolojîk ve hat kirin û ji hev hat derxistin, girîngiya têkiliya wê bi van herdu diyardeyan re wê eşkere derkeve holê. Nodûneh cureyên maneyê yên li peyva Ellah dikevin, ya rastî, manîfestoya siyasî, civakî û heta ekonomîk tînin ziman. Jixwe weke ‘qasid’ û ‘peyamber’ xwe dide naskirin û ev jî nasnameya nû ya senteza dîrokî û civakî ya li pişt wî, gelekî baş û bi hêz rave dike. Gerdûnîtî, cîhanşumultî, peyamhênerî, serwextî, efûkerî, hişyarkerî û xelatkariya wî ya bi diyariyên cennet û cehennemê ya li têgîna Ellah barkirî weke nasnameya sîstema nû bi fermanî pêşkêş dikin.

**Manîfestoya Kominîst** a K. Marks û F. Engels nivîsandî çi be, Qurana Ellah a tê gotin ji Hz. Muhammed re hatiye jî ew e. Ya yekê bi zanistî Ewrûpayî, ya dudiyan bi dînî û kodên xweserî Rojhilat hatiye beyankirin. Diyardeyên ji wan re civaka sosyalîst û dîktatoriya proleterya tê gotin, li cem Îslamiyetê berdêla wan civaka ummetê û silteya Îslamî ye. Di civaka ummetê de gotinên enternasyonalîzm, azadî û wekheviyê ji gotinên enternasyonalîzm, azadî û wekheviyê yên di civaka sosyalîst de qelstir nînin bi hêztir in, û ji wan sîstematîktir hatine îfadekirin. Dîsa têgihiştina silteya Îslamî, ji têgihiştina dîktatoriya sosyalîst kêmtir sîstematîk nîne. Mîna di sosyalîzma pêkhatî de hewl hatiye dayîn herdu diyarde jî bi sedsalan bi awayekî sîstematîk werin pêşdebirin.

Di dîroka şaristaniyê de dualîteya hatiye serê her şoreşê di şoreşa Îslamî de jî bi awayekî dijwar pêk hatiye. Piştî ku pêk hat bi demeke kin, pirsgirêka bingehîn a guftûgoyê ew bû; gelo wê li ser xeta şoreşa demokratîk an jî li ser xeta dewleta desthilatdar pêk bihata. Ji roja Îslamiyet derket holê û pêve herdu meylan jî xwe bi awayekî bi hêz dane hiskirin. Tebeqeya jor a qebîleyan û

hewesdarên desthilatdariyê hewl dan şoreşê ber bi selteneta Îslamî ve bibin, lê beşên jêr ên qebîleyan û hêmanên kole pirr hewl dan ku Îslamiyetê li ser xeteke demokratîk pêşde bibin. Tebeqeya jor a Qureyşiyan ku qebîleya serdest bû, bi pêşengiya Muawiye, hewl da meşa demokratîk a Îmam Elî ya rêya navîn asteng bike. Piştî wefata Muhammed hersê xelîfeyên pêşî Ebûbekir, Emer û Osman, ji ber nakokiya xwe ya bi Îmam Elî re di qonaxa derbasbûnê de (632-656 P.Z.) xelîfetî li gorî rêzê girtin ser xwe. Di vê demê de rêûresma demokratîk (şabiye) û rêûresma desthilatparêz (silte) di nava xwe de gelekî şer kirine û pev çûne.

Ev şer bi awayekî bû numûneya pêşî ya şerê navxweyî yê Îslamê. Xeta Îmam Elî (Zavayê Hz. Muhammed, ji muslîmên pêşî) weke ku tê bawerkirin çepgiriyeke radîkal, seriyekî tûj an jî demokratîk (şabiye) nîne, şêweyekî mutedîl ê rêya navîn e. Radîkalîzma rastî û demokratîzmê Xaricî temsîl dikin. Xaricî ji beşên herî xizan ên qebîleyan pêk dihatin. Di rewşa tewazunê ya Şerê Siffîn de Elî bi saziya hakimtiyê razî bû û ev jî bû sedem ku hem radîkalên (Xaricî) li pey Elî jê veqetin û mezhebekî nû pêk bînin (cara pêşî mezheb pêk tê), hem jî kir ku Muawiye hesabên desthilatdariyê hê bi hostetî bike. Di encamê de alîgirên desthilatdariyê ji şoreşê bi awayekî serketî derketin. Ev her sê ekolên sereke xwe ji serketina Îslamê heta roja me ya îro bi navên cihêreng û naverokên têgînan anîn, awayekî timî li dora xwe bizîvire tevahiya dîrokê li serê civakên Rojhilata navîn ferz kirin; rê vekirin li ber şerên mezin ên desthilatdariyê, pevçûnên xwînrij ên xanedanan, bihevketinên mezheban û jihevcihêbûna îtîqadan. Encam bû pêkhatina bêhejmar dewletokên desthilatparêz, împaratorî, mezheb û terîqetan. Ji krîza civakî ya qebîleyan a li ser vî bingehî ber bi krîzeke hê girantir a civaka Îslamîk (ummet) ve gav hatibû avêtin. Ber bi roja me ya îro li hemberî hegemonyadariya kapîtalîst a Rojava bi xedarî têk çûye û li Rojhilata Navîn krîzeke civakî ya topyekûn a rojane ya derketina ji binê wê gelekî zor pêk hatiye. Di binê vê de jî rastiya Îslamî ya me îşaret pê kirî heye.

Îslama li ber serê hebûna çanda Kurd derket holê bandoreke dijwar lê kir. Bêhtir jî bi hilweşîneriya Selteneta Îslamê re rûbirû bû. Rejîma xanedantî û siltantiya Emewî weke şêwazê Skender ê fetih û xirakirinê, bi şêwazekî xwînrij bi şerên fethan erdên Kurdan di demeke kin de kir bin silteya xwe. Nemaze fermandarên mîna Hecacê Zalim, tevahiya Kurdên destên wan şûr digirtin kuştin û dest danîn ser koma jin û zarokan. Bi qasî ku em dizanin di dîrokê de mînaka pêşî ya dagirkeriyeke bi vî rengî Kurd pêre rûbirû bûn li bakur û rojhilatê Iraqa (heye ku navê Iraqê ji bajêr dewleta pêşî Ûrûkê tê) îro li qada daristanî û çiyayî pêk tê. Em mijarê ji Destana Gilgamêş hîn dibin. Gilgamêş bi hevkar Enkîdû re sefereke xwînrij pêk tîne. Di seferê de Hûmbabayê tê kuştin weke cinawir tê nîşandan, lê divê mirov wî weke fîgurekî bi rola şefê qebîleyê radibe, bibîne. Helwesta Kurdan li hemberî selteneta Îslamê bi awayekî welê bûye ku rê li ber dualîbûneke kûr vekiriye. Hiyarerşiya eşîrê ya ji rêûresmê, piştî ku Împaratoriya Îran-Sasanî ya pêve girêdayî bûn têkçû û ji hev de ket, pirr dereng neman dilsoziya xwe bi efendiyên xwe yên nû re diyar kirin. Zumreya Kurd a hevkar a ku kengî behsa desthilatdariyê hat kirin li

xulamtiya ji efendiyên dagirker re timî hizirî, bi pêvajoyê re pêşî bi Xanedaniya Emewî re bû yek, her ku çû bi asîmîlasyona bi dilê xwe bûn Ereb.

Çîroka Erebbûnê ya elîtê Kurd ê hevkarê desthilatdariyê têra xwe balkêş e. Ev beşê ku em behsa wî dikin, bi hezarê salan bi împaratoriya Îranê re hevkarî kir û ji aliyê etnîk ve jî xizmê hev bûn. Di vê pêvajoyê de bi giranî hebûna çand û zimanê xwe parastin. Lê Erebbûna vî beşî ya evçend bi lez, ji nêz ve têkiliya xwe bi pêkhatina wî ya çînî re heye. Beriya Erebbûnê serekên Kurdan ên hiyarerşîk ji nêz ve têkiliya wan bi çanda qebîleyê re hebû, mensûbên heman qebîle û eşîrê bûn. Ango çînîbûn qels bû. Berjewendiyên wan ji çînîbûnê zêdetir, dihişt ku di nava qebîle û eşîrê de weke tebeqeya jor a hiyarerşiyê bimînin, ji ber ku ev hewce û kêrhatî didîtin. Li gorî berjewendiyên xwe nedidîtin ku ji têkiliyên çandî yên eşîrê qut bibin weke ferd an jî malbat di nava çanda xanedantiya serdest de bihelin. Di rewşeke bi vî rengî de pêkan bû ku her tiştê xwe ji dest bidin. Li pêşberî wan gelek mînakên dîrokî hebûn ku ev rewşa hanê piştrast dikir. Qebîle û eşîrên Kurd ewqasî hişk bi çanda xwe ve girêdayî bûn ku vê rastiya wan nedihişt bi hêzên derve re bibin yek û asîmîle bibin, yan jî kêm carên îstîsnayî ev yek bûye. Tevî vê yekê, ji aliyê dîrokî ve jî şert û mercên çînîbûnê zêde çênebûne ango çanda bajêr û dewletê kêm dîtine û ji vê jî girîntir, hertim li dijî dagirkeriyên ji derve, fetihkarî û mêtinkariyan têkoşiyane û ev xusûsên me destnîşankirî jî di vê rewşa wan de bi roleke girîng rabûne.

Dema dagirkeriyê ya Xanedaniya Emewî ya Ereb hem ji aliyê dîrokî hem jî ji aliyê civakî ve cuda dibû. Bi silteya Îslamî re tebeqeya jor a qebîleya Ereb bi lez ji tebeqeya jêr a qebîleya xwe qut dibe û vediguhere çîneke serwer a nû. Çînîbûneke kûr pêk dihat. Di dema Emewiyan de arîstokrasiyeke gelekî xurt a Îslam-Ereb pêk hatibû. Di çanda Rojhilata Navîn de cara pêşî têkiliyeke ji ya kole-efendî bihurî û nêzî têkiliya serf-senyor a ku paşê wê li Ewrûpayê pêk bihata, mîna cureyekî têkiliya dualî ya beg-cotkar (mewalî) pêk hat. Li gorî koletiya klasîk têkiliyeke çînî ya mirov karibin xwe lê rabigirin pêk hat û ev jî gavavêtineke herî girîng a silteya Îslamî bû. Nîzameke nû ya çînî yadesthilatdariya Îslamî mewzûbehs bû. Hêza pêşengiya vê dike Xanedaniya Emewî ye. Xanedanên Emewiyan ji bo ji wan re xizmetê bikin di demeke kin de qesrên xwe bi bermahiyên burokrat û hevkarên çînî yên Bîzans û Sasaniyan tijî kirin. Bi tevahî tebeqeyên jor ên çandên fetih dikirin, ev çînîbûna nû ya dîrokî civakî li gorî berjewendiyên xwe di cih de didîtin û li ser bingehê hevkariyê be jî bi lez dibûn arîstokrat. Van kesan bi arîstokrasiya xanedan a serdest re bi rêya zewacê gelek têkilî danîn. Zarokên xwe bi ziman û çanda fermî ya Erebî perwerde kirin. Ji ziman û çanda qebîleya xwe bi lez dûr ketin. Ev rewşa berê ya li hesabê wan nedihat, di nava şertên arîstokrasiya nû ya Îslamîk de heta dawiyê li gorî berjewendiyên wan di cih de bû. Jixwe di dîrokê de mînakên bi vî rengî gelekî pêk hatibûn.

Beriya Erebî bi hezarê salan Aqadî, Aramî û Suryaniya fermî, çand û zimanê hevpar ê împaratoriyên koledar ên klasîk bûn. Bi rola ku Grekî û Latînî li Rojava pê radibûn, ji zû ve

rabûbûn. Erebî cara pêşî bi Îslamiyetê re bû zimanê hevpar ê berfireh ê çanda Rojhilata Navîn. Çanda xanedaniyê jî bi Erebî dihat îfadekirin û li Rojhilata Navîn ji bo tevahiya arîstokrasiya Îslamî dibû çanda jiyana hevbeş. Malbateke arîstokratîk a ji Rojhilata Navîn a mezin dibû tinebû ku koka xwe bi xanedaniyên Ereb ve girênede. Her malbata arîstokratîk a hevkar bi ehimiyeteke mezin koka xwe bi xanedaneke Ereb, nexasim bi Ehlîbeytê ve girêdida. Divê mirov li vî karwanî çîna nû ya esker û ulemayan jî zêde bike. Tevahiya wan jî hîn bûbûn û kiribûn adet ji xwe re ku kokên xwe yên berê înkar bikin û navnasên silaleyên nû li xwe bikin. Çanda Farisî ya hezarê salan jî di nava çand û zimanê Erebî de asîmîle bû û nikarîbû xwe ji vê xelas bike. Jixwe ziman û çandên qelstir pirr bi hêsanî hatine daqurtandin. Kengî girîngiya Aqadiya kevin bi temamî nema, hêza Aramî û Suryanî jî gelekî kêm bû.

Tebeqeya jor a eşîr û qebîleyên Kurdan jî ji vê yekparebûn û asîmîlasyona bi lez para xwe girtin. Meşandina rêûresma kevin a Zerdeştî ji feydeyê zêdetir zirar dida wan. Maneya israra di vê çandê de mumkîn bû jidestdana hebûna wan be. Piştî demeke kin a derbxwarinê, çawa ku di dîrokê de hatiye dîtin, çînên serwer li ser bingehê berjewendiyên xwe bi lez di nava çand û zimanê biyaniyan de dihelin û hebûna xwe bi vî awayî dewam dikin. Pêkhatina çîna serwer li gorî vê ye. Di navbera sedsalên 7. û 10. de tebeqeyeke jor a Kurdên hevkar a gelekî bi hêz a di nava çand û zimanê arîstokratîk a Ereb de heliya û pêre bû yek, pêk hat. Ev beşên em behsa wan dikin, herçiqasî bi şûfê xwe Kurd bêne qebûlkirin jî di warê çand û ziman de her yek ji wan bendeyekî Erebî ne. Van beşan rabûn û rûniştina bi zimanê Erebî weke nîşaneya neqanetî û mezinatiyê dihesibandin û pê serbilind dibûn. Ev beş bûn ku herî zû dev ji ziman û çanda xwe berdabûn. Li Kurdistanê hê jî ji van beşan bermahiyên bi hêz hene.

Arîstokrasiya Kurd a hevkar ku çavên xwe berdaye desthilatdariyê, weke mezheb bi rêûresma Sunnî ve girêdayî ye. Sunnîtî weke mane bi awayekî seresere Îslamîbûna rêûresma tebeqeya jor a hiyarerşiya qebîleyê îfade dike. Îslama Sunnî, Îslama serwer û desthilatparêz e. Bingehekî xwe yê bi hêz ê çînî heye. Begtî û mîregtiyên Kurdan ên serdema navîn bi pirranî Sunnîtî qebûl kirine û ev jî li gorî berjewendiyên wan e; ango ji aliyê têkiliya Îslamê bi heqîqetê re tiştekî îfade nake. Mirov dikare bibêje, awayekî maskeya baweriyê ya wan koman e ku bi kurtêl û desthilatdariya eşkere ya Îslamê re eleqedar dibin. Di bin vê maskeyê de gelek tiştan dikin ku bi exlaq û wijdanê civakî yê dînî re li hev nakin, heta dijberî wan in. Rola maskeyê dane Îslama Sunnî ji bo dekûdolab, zilm û îstîsmara li qesran. Mirov ji mînakên li qesrên Emewî, Abbasî û Osmaniyan dikare di van mijaran de gelek tiştan hîn bibe. Ji begtiyên serdema navîn heta bi bermahiyên wan ên ferdî û malbatî yên roja me ya îro, pirraniya hevkarên Kurd li hemberî hebûna çandî ya Kurd înkarker û bêhurmet bûne û ji pêşdebirina wê xwe dûr kirine, ev bi karektera wan a çînî û avabûna wan a îdeolojîk û desthilatparêz ve girêdayî ye. Şêwazê pêkhatinê yê hebûna çînekê weke avahî û îdeolojîk li ser tevahiya hebûna çanda civakê bandoreke mezin dike. Şêwazê Îslamê di pêkhatina çîna serwer a Ereb, Fars û Tirk de têkiliyên van beşan bi civakên wan re jî

diyar kiriye. Çiqasî hevkartiya wan bi sînor bûye û bûne hêzên bi însiyatîf ên desthilatdariyê, ewqasî li ser çandên xwe yên civakî jî bi aliyên xwe yên erênî û neyênî bandor kirine. Tevî ku asîmîlasyonîstiya wan kêm bûye, li dijî tebeqeyên xwe yên jêr mêtinkarî û zordestiyeke bi bandortir pêk anîne. Ji ber ku serwerên Kurdan zêde hevkar bûne xweş bi ber bayê asîmîlasyonê ketine, lê li ser hebûna civakî ya Kurd serwertiya wan qels bûye. Qelsiya wan a serwertiyê û xisletên wan ên ji asîmîlebûnê re xweş, kiriye ku li hemberî ziman û çanda civakî bêkêr û înkarker bin. Ev meyla wan ber bi roja me ya îro, ji asîmîlasyonê wêdetir wan ber bi hevkartiya di warê qirkirina çandî de biriye. Bi vî awayî bûne tebayên wilo bi kotin û keritandina civaka xwe, xwe xwedî dikin.

Meyla diduyan a li dijî şoreşa Îslamî nêzîkatiya demokratîk e. Kurdan bi tevahî bi yek helwestê Îslam pêşwazî nekirine. Kurdên çiyê û Kurdên deştê, herwisa tebeqeyên jor û jêr jî wekhev nêzîk nebûne. Magiyên dînê Zerdeştî û qebîleyên li hemberî derbên pêşî yên fetha Îslamê teslîm nebûn, çawa ku timî di dîrokê de bûyî, xwe vekişandin nav û serê çiyan û demeke dirêj berxwedana xwe dewam kirin. Ji beşên sereke yên timî û radîkal li ber xwe dan weke Elewî û Zerdeştiyan, yan Îslameke dijberê Îslama Sunnî qebûl kirin an jî bi tevahî Îslam-nebûn tercih kirin. Ji mekanên wan ên li serê çiyan mirov fêhm dike ku Elewîtî çandeke baweriyê ya beşê radîkal e; hebûna xwe ya çand û berxwedana ji rêûresmê diparêze, asîmîlebûnê kufur dihesibîne û bi qasî ku bi hebûna wan a çandî re li hev bike Îslamê qebûl dike. Mirov nikare bibêje Elewîtî bi temamî çanda Îslamê ye. Çandek e ku bi qebîle û çanda eşîra xwe ve gelekî girêdayî ye, bi qasî ku bi çanda wî re li hev bike hinek nirxên Îslamî, ne ji bo kesên din ji bo xwe, asîmîle dikin û dikin malê xwe. Ji lewra mirov dikare fêhm bike ka çawa bi van xisletên xwe dişibin hebûna çand û ziman a Hûrriyên pênchezar salan beriya xwe. Ji ber ku li dijî dagirkeriyên ji derve timî li ber xwe dane û li gorî şertên çiyan bûne xwediyê çandeke jiyanê ya hişk a qebîleyê, encameke bi vî rengî derketiye holê.

Rewşa Zerdeştiyan cudatir e. Wan bêhtir ne qebîleyî, ji aliyê dînî ve li ber xwe daye. Hebûna dînî di ser hebûna qebîleyê re girtine. Bi çend mezhebên cuda karîbûne xwe bigihînin roja me ya îro. Li gorî Kurdên Sunnî zêdetir nirxên xwerû yên Kurdîtiyê temsîl dikin. Tevî ku di dîrokê de gelek hewldanên qirkirinê bi serê wan de hatine jî di baweriya xwe de israr kirine. Tevî ku çavkaniyeke dewlemend a rêûresma Kurd in, bi sedema daneheva wan a pirtûkan hatiye şewitandin û jiyana wan a azad timî hatiye tepisandin, ev çavkaniya dewlemend xizan bûye û gotin li cih be zuha bûye.

Em dibînin ku beşê Kurdan ê li deştê li dijî asîmîlasyonê weke meyleke berxwedanê bi terîqetên tesewifî radibe. Tesewif bi şaxên xwe yên li derveyî dewlet û silteya Îslamî, bi aliyên xwe yên exlaq û wijdanê civakî, serwextbûneke kûrtir a Îslamê (Îslama Batinî) îfade dike. Bi awayekî giştî, civakparêziyeke Îslamî ye ku bi dewletê re nabe yek, ji desthilatdariyê ne xweş e, dixwaze bi

wijdan, serwextî û hestyarî Îslamê pêk bîne. Eger mirov Îslamê weke civakparêz û dewletdar-desthilatdar dabeşî du kategoriyên bingehîn bike, ev yek li gorî rastiya civaka dîrokî di cih de ye. Îslama civakparêz bi tenê bi tesewifê dikare bê bicihanîn, jixwe bi awayekî berfireh rêxistiniya wê ya di çarçoveya terîqetên gelêrî de jî vê rastiyê nîşan dide. Îslama civakparêz bi demokrasiyê re têkildar e. Li dijî Îslama bi lez dibe desthilatdar (mirov dikare ji vê re antî-Îslam jî bibêje), rêxistiniya Îslamî ya civakparêz tesewif e; şêweyekî piştgiriya gel û penageha wî ye. Civaka Îslamê, ne bi Îslama fermî ya desthilatparêz, bi terîqetên tesewifî dikare bê jiyîn. Wekî din jî kategoriya Îslamê ya ferdî heye. Îslama ferdî Îslama mîstîk e; serwextbûna ferd a li xwedatiyê îfade dike. Maneyeke xwe ya diyar heye. Lê Îslama timî bi daxwaza desthilatdariyê radibe ji naveroka xwe ya kûr a civakparêz qut bûye, divê weke Îslama bûye dijberê wê were fêhmkirin.

Di civaka Kurd de ekolên tesewifî bi awayekî kûr û pirr zêde pêk tên. Ev bi xwe nîşan dide ku navbera wan bi desthilatdariyê re xweş nîne. Damezrênerên gelek terîqetên tesewifê bi eslê xwe Kurd in, û ev jî têkiliya xwe bi rastiya wan a civakî re heye. Terîqet bi awayekî rêxistinên xweparastinê yên gel in. Sendîkayên çîna karker li dijî desthilatdariya kapîtalîst bi kîjan rolê radibin, di serdema navîn de bi heman awayî li cem civakên Rojhilata Navîn terîqetên tesewifî jî bi wê rolê radibin. Hem bi rola fikir û baweriyê, hem jî bi rola rêxistinên ekonomîk û rêxistinên parastinê rabûne. Pirrî caran bûne rêxistinên polîtîk û ev veguherînên wan hin caran hatine berevajîkirin û bi vî awayî rê li ber avakirina desthilatdarî û dewletên nû vekirine. Îslama civakî bi kêmanî bi qasî Îslama dewletê bi bandor bûye. Divê mirov Îslama ferdî jî li vê zêde bike. Îslama ferdî, ji Îslama dewletê û Îslama civakî cudatir, weke wijdanekî dînî û şêweyekî dînê şexsî pêk tê. Gelekî zehmet e ku mirov Îslama dewletê weke dîn bihesibîne. Di qadên îdeolojîk, huqûqî û ekonomîk ên dewletê de bi armanca rewakirina karên wê tê bikaranîn. Li vir pirsa girîng ew e, gelo dewletê dîn, yan jî dîn dewlet bi kar aniye. Eger dewlet dîn bi kar bîne, wî dînî nasnameya xwe ji dest daye. Ji ber ku dîn bi xwe timî bi civakê re têkildar e. Tevî ku bikaranîna dîn a dewletê tiştekî cihê ye jî encam heman tişt e. Çerxeke berfireh a rêveberiyê ya mîna dewletê bikeve bin fermana dîn rê li ber tehlûkeyeke mezintir vedike. Bi awayekî faşîzma serdema navîn pêk tê. Eger dîn bi qada civakî bê bisînorkirin û ji tercîha azad a ferd re bê hiştin, ev yek wê bêhtir bi xisletên derketina holê ya dîn re li hev bike.

Mirov dikare bibêje ku di civaka Kurd de dîn li van hersê qadên aktîvîteyê bi rol rabûye. Îslama dewletê yan jî dewleta Îslamê fermanker û antî-demokratîk e. Rewakirina dewletê bi destê dîn û bi destê dîn rewakirina dewletê, sedema bingehîn a muhafezekariya dînî û bêkêrkirina dîn e. Ji ber vê sedema bingehîn e ku Îslam di civaka Kurd de bi bandor e. Bi awayekî li dijî wê xwe bi xwe diparêze. Kurdistan ji gelek terîqetan re malovaniyê dike û ev jî bi awayekî esasî têkiliya xwe bi xweparastinê re heye. Îslama ferdî jî li cem Kurdan li dijî rewşa xurt a bêewlebûnê rê li ber bandoreke moralê vedike. Li Kurdistanê heta bi pêvajoya ku bandorên îdeolojîk ên modernîteya kapîtalîst derketin holê, Îslam bi kêmanî bi qasî çanda etnîk a qebîleyê weke

şêweyekî çanda civakî tesîr kiriye. Di warê pêkhatina têkiliyên civakî yên di ser têkiliyên qebîle û eşîrê re hêmana bingehîn e.

Di serdema navîn a Rojhilata Navîn de ji bo pêkanîna têkiliyên civakî yên di ser qebîle û eşîrê re bandoreke girîng a hersê dînên yekxwedayî çêbûye. Pêşdebirina têkiliyên civakî yên ji qebîle û eşîrê bihurîne, maneyeke mezin a şoreşî îfade dikin. Ev bûyer tê wê maneyê ku civakeke nû derdikeve holê. Ummetên Îslam, Xiristiyan û Cihû rêxistiniyên welê yên civakî ne ku ji rêxistiniyên qebîle û eşîrê bihurîne û bi awayekî berbiçav rastiya derdikeve pêşberî me ya diyardeya gel û milliyet e. Di pêkhatina kategoriyên gel û milliyet de dîn bi rola katalîzator rabûne. Naxwe bi awayekî din bi nasnameyeke jor anîna cem hev a qebîle û eşîran gelekî zor e. Mirov di serxistina vê de nikare rola dînan piçûk bibîne. Gelbûn û milliyetbûn xisletên herî diyarker ên serdema navîn in. Çawa ku serdema nêz bû serdema têde netewe diyar bûn, serdema navîn jî bû serdema têde pêkhatina gel û milliyetan diyar bû. Têgîna milliyet têgînek e ku li gorî têgîna gel zêdetir nêzî dîn e, dike ku qebîle û eşîr di nava dîn de bikevin dereceya duyemîn, xwediyê biryar û gotinê bibin cemaetîn dînî. Gel ew qewm e ku têde giraniya etnîk heye û bi bandora dîn ji qebîle û eşîran pêk tê. Milliyet jî mohra dîn lê heye, û ummeta civakên zimanên wan cihê yên di ser qebîle û eşîran re îfade dike. Ummeteke Îslamê dikare bi gelek milliyetan bê temsîlkirin. Têgîna milliyeteke bi tenê ya Îslamê têgîneke bi zorê çêkirî ye. Ev xusûs ji bo Xiristiyantiyê bêhtir bi vî rengî ye. Di Xiristiyantiyê de milliyetbûnê zû dest pê kiriye. Li cem Cihûyan tevî ku milliyeta esas Cihû ye, kêm be jî milliyetên din jî têne dîtin.

Bi Îslamê re milliyeta esas mezin bû milliyeta Ereb e. Piştî Ereban, Fars jî bi Îslama Şîa weke milliyet diyar bûn. Li rêza sêyemîn Tirk tên û bi sedsala 10. re weke qewm û milliyet diyar bûn. Kurd tevî ku weke milliyeta mezin a çaremîn diyar bûn jî di vê xusûsê de ji sê milliyetên din paşvetir man. Ev jî xusûsek e ku bi dewletbûn û nebûnê re têkildar e. Çawa ku neteweyên Ewrûpayê li dora dewletên kapîtalîst bi hêz bûn û weke neteweya dewlet pêk hatin, dewletbûna ezbetên qebîleyên Ereb, Fars û Tirk jî kiriye ku weke milliyetên mezin bibin xwedî hebûn. Ji ber ku Kurd di dewletbûnê de qels man û tebeqeya jor gelekî asîmîle bû, weke milliyet bê hêz man. Milliyetgiriya dewletê bi tenê ji bo tebeqeya jor girîng e. Ji bo tebeqeyên jêr jî ya girîng ew e, li dora terîqetên tesewifî weke gel şêwe û form bigirin. Dewlet di milliyetbûyînê de, cemaeta tesewifî jî bêhtir di gelbûnê de bi bandor e. Tevî ku rastiya Kurd a milliyeteke navenda wê dewlet pirr qels heye jî li dora terîqetên tesewifî yên bi hêz rastiyeke gelbûnê ya bêhtir demokratîk, azad û wekhev pêk hatiye. Ji lewra divê mirov bibêje, Kurd di dema Îslamê de çi li dora begtiyên bi hêz, çi jî li dora terîqetên tesewifî li ser rêya gelbûn û milliyetbûnê bi temamî paşve nemane. Tevî ku di navbera milliyetbûna tebeqeya jor û gelbûna tebeqeya jêr de cudahî hene jî divê mirov vê yekê jî zêde mezin neke.

Li cem Kurdan bi derketina ji çanda qebîle û eşîrê diyardeya gelbûnê ya pêk tê jêre Kurmanc tê gotin. Tê maneya ‘mirovê Kurd’. Li cem Tirkan Tirkmen, li cem Ereban Bedewî, li cem Îraniyan Ecem bi heman maneyê ne. Herçiqasî Kurmanc xwe bi tevahî ji ta û benên qebîle û eşîrtiyê nekiribe jî kategoriyek e ku ber bi roja me ya îro bi bajarbûna bi lez mezin dibe. Ji ber sedemên cihêreng malbatên ji tevahiya qebîle û eşîrên Kurdan qut dibin li gund û bajarên qelebalix, serbixwe û mezin dibin, hêza bingehîn a gelbûna Kurdan pêk tînin. Bi vî şêwazî Kurd ê weke gel mezin bibin û ber bi netewebûna demokratîk a nû ve biçin, lê bi vê rêveçûnê re tebeqeya jor a eşîrê ji milliyeta qels ber bi millet û netewe ve bi heman lez û xurtiyê gav neavêtiye. Ji ber ku ev tebeqe di pêkanîna netewebûyîna dewletê de bi ser neket, ev ji bo Kurdan bûye şens ku neteweya demokratîk pêk bînin. Di navbera netewebûyîna demokratîk û netewebûyîna dewletê de cudahiyên bingehîn hene. Di beşa pêş de ez ê dûrûdirêj li ser vê mijarê rawestim.

Me hewl da, bi Îslambûnê re di çanda serdema navîn de têkoşîna bûyînê ya çanda Kurd ji aliyên erênî û neyênî ve bi vî awayî diyar bikin, lê divê mirov karekterê dînamîk ê vê pêvajoyê jî destnîşan bike. Gelbûyîn û qewmbûyîn formekî civakî yê bêhtir mezin û bi gewde ye. Bi pêşketina ekonomîk a li dora bazarê re pêkhatina çandeke gel a nû li dora gelbûnê, cemaetên tesewifî û milliyetîbûna tebeqeya jor, bi awayekî giştî weke gelên din Kurd jî anîn ber netewebûnê (milletbûnê).

**4- Çanda Îslamê û Têkiliyên Ereb-Kurd-Tirk**

Têkiliyên Kurd-Ereb-Tirk ên li ser bingehê çanda Îslama serdema navîn bi gewde bûn di pêşketina rastiya Kurd de bi roleke girîng rabûn. Nexasim di dema navbera sedsalên 7. û 11. de, têkiliyên Kurd û Ereban ên di bin bandora çanda Ereb-Îslamê de, li aliyekî pêkhatinên desthilatdarî-dewletê yên bi awayên begtiyan, li aliyê din jî pêkhatinên civaka sivîl ên li ser bingehê terîqetên tesewifî, kirin ku li ser rêya gelbûn, qewmbûn û milliyetbûnê (di navbera van hersê têgînan de pirr kêm cudahî heye) bûyerên girîng bi serê Kurdan de bên. Di sedsalên beriya vê de bûyerên bi heman rengî di têkiliyên Kurd û Farsan de jî hatin dîtin. Me ev têkilî bi awayekî pêşnûme nirxandibûn. Di dewama vê pêvajoyê de têkiliyên Kurd û Tirkan ên bi pêş ketin ji bo herdu gelan nexasim di warê parastina hebûna wan de rê li ber têkiliyên gelekî stratejîk ên girîng vekir.

Li Asya Navîn çi di warê avhewayê de, çi jî di warê şert û mercên civakî de rewşeke neyênî heye û ev dike ku di sedsala 10. de koçberiya ezbetên Tirk a ber bi Rojhilata Navîn bi lez bibe û li welatekî digerin ku karibin dewamî lê bi cih bibin. Herçiqasî li ser erdên Împaratoriya Îranê ya ji rêûresmê cihûwarên li ser bingehê fethê pêk anîbin jî ev zêde mayînde nebûne. Ezbetan hem di nava xwe de, hem jî bi qewmên cîran re timî di warê desthilatdariyê de hevdu dibirin û dianîn.

Şeran rê nedida wan ku karibin devereke mayînde û ewle bibînin. Ji lewra bêhtir ber bi rojava ve meşiyan û neçar man berê xwe bidin erdên Ereb û împaratoriya Bîzansê. Îcar qewmên derdiketin pêşiya wan Ereb, Kurd û Ermenî bûn. Eskerên herî girîng ên devşîrme yên siltanên Ebbasiyên Ereb bi koka xwe Tirk bûn. Bi vê rêbazê bi tenê şerkerên neqane yên Tirk dikaribûn bêne bicihkirin. Jixwe kesên bi vî rengî jî di demeke kin de bi hêsanî dibûn Ereb û têkiliya xwe bi çanda xwe re qut dikirin. Lewma bi awayekî lezgîn ji yekîneyên ezbetan re peydakirina deverên bicihbûnê dibû pirsgirêkeke bingehîn. Li ser erdên Ereb, nexasim li ser erdên ji Iraqa îro heta bi Misrê bi saya jêhatîbûna xwe ya eskerî weke xanedanî û Atabegan gelek begtî ava kiribûn. Lê li hemberî mezinbûna êrîşan van begtiyan bersiva pêdivî pê hebû nedida. Li vir jî diyardeya devşîrmeya eskerî bingeh e, û ezbetên ji bilî van hertim li deverekê digerin û lewma weke koçberan jiyana xwe dewam dikirin. Têkiliya wan a dîrokî bi Kurdan re di dema vê gera wan de pêk hat.

Di sedsalên 11. û 12. de pirsgirêka bingehîn a Kurdan hem weke begtiyan û hem jî weke civaka sivîl ew e, li aliyekî bi siltan û dagirkerên Ereb re di nava têkiliyên tengezar, şer û lihevkirinê de ne, li aliyê din jî li ser xeta dagirkerî û belavbûnê ya Împaratoriya Bîzansê ya rêûresmê ji Romayê girtibû disekinîn û vê jî dikir ku timî tengav bin. Êrîşên qebîleyên bi koka xwe Semîtîk ên rabihuriya wan heta digihîje çanda El Ubeydê (5000-4000 B.Z.) ji Başûr, ji deverên çol, ji Yemenê dihatin sekin çi ye nizanîbûn. Di dema Aqadî, Babîlî û Asûriyan de belavbûna ber bi Bakur ve (ber bi erd û cografya rê li ber têgîna cennetê vekir) bi destekdana împaratoriyê dewam kir û ji sedsala 5. B.Z. pêve bi dagirkeriya Ereb bi lez bû.

Bi Îslamiyetê re Ereb bi dagirkeriya xwe re mîna deryayekê mezin bûn, ber bi nava Ewrûpa, Qafqasya û Asya Navîn ve fena lehiyê herikîn û ji vê jî zirara herî mezin komên rêûresmî yên bi binyada xwe Aryen ên li Bakur û di serê wan de Proto Kurd û Kurdan dît. Kurd piştî berxwedaneke berbiçav bûn misilman, tebeqeya jor a qebîleyên Kurd jî asîmîlasyona Ereb-Îslam qebûl kir, tebeqeya jêr jî civakên sivîl ên tesewifî pêk anîn û çawa ku timî bi awayekî rêûresmî hatiye kirin derketin serê çiyan û xwe vekişandin baniyan û bi vî awayî stratejiya bergiriya hebûna xwe bi pêş xistin. Çawa ku behsa wan tê kirin, bi aliyê erênî û neyênî yê van stratejiyan karîbûn bergiriya hebûna xwe bikin û pêşde bibin. Tebeqeya jor a hevkar, milliyetbûyîneke Sunnî ya aliyê wê yê neyênî xurtir (bi giranî xwe ji milliyeta Ereb hesibandin û kengî jî li hesabê wan hat Kurdîtî bi kar anîn) kir sedema hebûna xwe, tebeqeyên jêr jî li ser bingehê terîqetên tesewifî yên bi karektera civakên sivîl ên aliyê wan ê erênî xurtir (nexasim bi rêya medreseyan) li ser rêya gelbûnê pêşde çûn û bi awayekî girîng bi kêra rastiya Kurd a serdema navîn hatin.

Êrîşên ji Bakur û Rojava bi Skender dest pê kirin, bi Roma û Împaratoriya Bîzansê ya piştî wê hat li ser Îran, Pers, Part û Împaratoriya Sasanî dewam kirin, bi giranî li deverên bingehîn ên komên bi koka xwe Kurd pêk dihatin. Ev êrîşên dîrokî yên ji Bakur, Başûr û Rojava hatin, piştî êrîşên beg

û ezbetên Tirkan bi êrîşên împaratoriyan, împaratoriya Îranê hilweşiya û piştî vê ber bi Rojhilat ve bi hêz bûn û qatbiqat xwe zêde kirin. Bi vî awayî erdên weke cennetê dihatin binavkrin bûn erdên bi lanet. Divê mirov bi girîngî bibêje, li pişt bêşensî û lenatbarîna bi serê Kurdan de dîrokeke evçend bi şerên bêrehm barkirî heye. Çi weke qebîle û eşîr hebûna xwe hebin, çi jî weke qewm bibin hebûn, timî haya Kurdan ji hêzên neyênîker ên derve yên ataxên wan li hundir hebûn. Di nava van şert û mercan de li begtî, siltantî û ezbetên Tirkan rast hatin. Herdu hêz jî xwedî serhatî û şerker bûn. Herçiqasî di têkiliya destpêkê de hinekî şer kiribin jî bêhtir li hev kirine û bûne destê hev. Ji ber ku hewcedariya herdu aliyan jî gelekî bi vê yekê hebû. Eger herdu alî biketana rêya şer, pêkan bû ku herdu alî jî bi awayekî stratejîk têk biçin û bi hev re biqediyana. Mirov fêhm dike ku herdu alî jî di vî warî de serwext bûne.

Ji xanedanên Oxiz-Selçûqiyan ê nasnavê siltantiyê ji xelîfeyê Abbasî girt Siltan Alparslan, ji bo deriyên Anatolyayê veke li Kurdistanê li hevgirtiyan digeriya. Dema xwe ji Şerê Melazgirê yê 1071’ê re amade dikir, bi begtî û eşîrên bi hêz ên Kurd ên wê demê re têkiliyên xwe xweş dikirin. Di encama vê de li hevgirtiyê digeriya li cem Siltantiya Merwanî ya navenda wê li Meyafarqînê (Silîva) dît. Ji cem gelek êşîrên herêmê hêzeke di hemtayê hêzên qebîleya xwe de anî ba hev. Çawa ku tê gotin, Şerê Melazgirê yê li dijî Împaratoriya Bîzansê bi tenê bi hêzên ji ezbetên Tirkan nehatiye kirin, bi kêmanî hêzeke bi qasî ya wan a ji hêzên eşîr û begtiyên Kurdan komkirî di vî şerî de cih girtiye û bi ser ketine. Kengî em Şerê Melazgirê rast analîz bikin, ew ê mentiqê stratejîk ê bingehîn di têkiliyên Kurd û Tirkan de jî bê fêhmkirin. Rewş xulase weha ye: Li dijî êrîşên Roma û Bîzansê yên ji Rojava û ji Bakur, Kurd ji bo pêşxistin û bergiriya hebûna xwe hewcedarê hevgirtiyên bi hêz bûn. Li cem hêzên Ereb-Îslamê ev derfet û îmkan didîtin. Heta ezbetên Tirkan hatin herêmê jî têkiliyên xwe bi hêzên Ereb re pêşde dibirin û bi lez dibûn misilman û yek ji sedema bingehîn a vê yekê jî pêdiviya wan a bi ewlekariyê bû. Hewcedariya ezbetên Tirk bi welatekî hebû, vê jî dikir ku yan bi Kurdan re wê şer bikin û bikevin rewşa hêzeke dagirker, yan jî ev nebe, wê bi wan re hevdu bigirin Împaratoriya Bîzansê bêhtir ber bi Rojava ve dahf bidin û bi vî awayî ji xwe re wargehên nû çêkin.

Herdu alî jî bi vî mentiqê stratejîk ketin Şerê Melazgirê. Ev şer ji sedî sed şerekî hevpar ê Kurd û Tirkan li dijî Împaratoriya Bîzansê bû. Encamên vî şerî eşkere ne: Li ezbetên Tirkan deriyên Anatolyayê vebûne, demeke dîrokî dest pê kiriye. Kurd jî ji hêzeke dîrokî ya bi sedsalan ew timî dahf daye û zor li wan kiriye rizgar bûne. Îslam di vê têkiliyê de bi rola şîrêz û zemqê rabûye. Herçiqasî ev şer di bin perdeya Îslamê de hatibe kirin jî ya rastî, armanca vî şerî ew e, du gelên bi giranî xwedî xisletên qebîle û eşîrê ne, dixwazin bergiriya hebûna xwe bikin û pêşde bibin. Ji bo herdu gelan binketin, hê wê demê dihat wê maneyê ku wê hebûna xwe ji dest bidin û wê paşve bikevin. Dîroka fermî serketina Şerê Melazgirê timî bi mezinahiya Siltanê Tirk ve girêdide û dixwaze rastiya wê bi xwe veşêre. Şerê Melazgirê herî kêm bi qasî Tirkan şerê Kurdan e. Di dîroka fermî de tiştek nehatibe nivîsandin ew nayê wê maneyê ku ew rastî tineye.

Herçiqasî carcaran têkiliya di navbera Kurd û Tirkan de bi şeran xira bûbe jî mentiqê me behsa wî kir heta roja me ya îro hebûna xwe wê dewam bikira. Piştî ku Tirk li nava Anatolyayê bi cih bûn, ev stratejiya nû wê hebûna xwe timî biparasta. Di demên krîtîk ên dîrokê de wê bihata bîra herdu hêzan ku bi hev re tevbigerin wê karibin serketî bibin. Di dema Xanedaniya Eyyûbî ya Kurd de, di dema gelek Begtiyên Anatolyayê û Osmaniyan de ev mentiq wê her li ser kar bûya. Em dema kûrûdûr bi nava dîrokê ve diçin, em ji dema têkiliyên Hîtît û Mîtannî ve (salên 1600 B.Z.) stratejiyên bi vî rengî di navbera hêzên Anatolyayê û Mezopotamyayê de dibînin. Ev yek hem li cem gel û hêzên sivîl û hem jî li cem hêzên desthilatdar di zikhev de pêk tê. Ne tenê li dijî tehlûkeyên ji Rojava tên, li dijî tehlûke û êrîşên ji Rojhilat û Rojava jî tên, ev stratejiya hevpar wê bimeşe. Siltanê Osmanî Selîmê Yekemîn, bi têgihiştineke hevgirtinê ya bi heman rengî li belavbûna Împaratoriya Xanedan a Safewî ya Îranê pêşiyê digire. Di heman deman de (1514-1517) Siltantiya Memlûk a navenda wê Misr a ji Başûr hatî, bi hevgirtina bi pêşengiya Îdrîs-î Bedlîsî pêşî hatiye rawestandin û paşê hatiye hilweşandin. Heman stratejî dema Şerê Rizgariyê yê di salên 1920’an de jî wê li ser kar bûya.

Di şerê Çaldiranê yê sala 1514’an ê li dijî belavbûna Împaratoriya Xanedaniya Safewî ya Îranê de ji yenîçeriyên di artêşa Yawiz Selîm de gelekî bêhtir hêzên begtî û eşîrên Kurdan hebûn. Şer hem ji aliyê deverê ve, hem jî ji aliyê eskerî ve bi hevgirtina Kurd-Osmaniyan (Li Amasyayê di navbera bîstûheşt Begên Kurd û Yawiz Selîm de protokolek hatiye mohrkirin) bi ser ketiye. Dema ku mirov serdestiya Memlûkiyan li Ûrfa-Mêrdîn li ber çavan bigire, mirov ê bibîne Şerê Mercîdabiqê jî (li Bakurê Sûrî li devereke nêzî Helebê) xwedî heman karekterî ye. Gelekî hewce û rast e ku mirov diyar bike ku herdu şer jî weke stratejî di heyîn û serxwebûna Kurdan de bi roleke girîng rabûne. Dîroka şoven timî ser rastiyan girtiye. Ya herî rast, mirov bi giranî şerên li ser cografya Kurdistanê yên di demên Selçûqî, Eyyûbî û Osmaniyan de weke şerên Kurdan li dijî hêzên dagirker binirxîne. Şerê Rizgariya Neteweyî yê salên 1920-1922 jî bi vî rengî ye. Ji van şeran Tirkan li Anatolyayê welatekî mayînde bi dest xistiye, lê Kurd nebûna nikarîbûn cihekî starê jî li Anatolyayê bibînin.

Naveroka têkiliyên Kurdan bi qewm, begtî, siltantî û ezbetên Tirkan re rast neyê fêhmkirin, dîroka heyîna herdu civakan wê rast neyê nivîsandin. Divê mirov baş fêhm bike ku Kurdan bi Tirkan re têkilî danîn, ne ku ji bo hebûna wan bê asîmîlekirin an jî bi zora eskerî bikevin tehlûkeyê, berevajî ji bo bi hev re bergirî û pêşdebirina hebûna xwe bikin ev stratejiya hanê qebûl kirin.

Di zêhniyeta Tirkan a li dîrokê kûrbûyî de jî heman mentiqê stratejîk li ser kar e. Di sedsala dawî de ‘Faşîzma Tirk a Spî’ ku bi awayekî berbiçav tê maneya ajantiya Rojava di bingehê helwesta wê ya li hemberî vî mentiqê stratejîk û înkara meşa wê ya dîrokî de niyet û kirinên xirab ên komplogeriya li dijî herdu çandên civakî heye. Ji roja pêşî ve têkiliyên Kurdan û Tirkan bi vî

mentiqê stratejîk hatin danîn, lê tevî vê yekê, li ser van têkiliyan înkar, îmha, asîmîlasyon û qirkirin tê ferzkirin, ev yek xiyaneta li van herdu çandên civakî ye, û wê encam têkçûna herduyan be.

Di serdema navîn de diyardeya mohra xwe li têkiliyên navbera civakan xistiye dîn e. Dîn di serdema navîn de xwediyê bandorekê ye, çawa ku milliyetgiriya îro xwediyê wê bandorê ye. Lê di rastiya civakî de dîn perdeyeke îdeolojîk e, bi awayekî rastî çanda rêûresmê û ziman hebûnê pêk tînin. Li cem Kurdan ziman û çanda wan a di bin perdeya Îslamê de bi aliyên xwe yên erênî û neyênî guherîna xwe dewam kirine. Diyardeyên qewmbûn û gelbûnê yên di vê serdemê de bêhtir berbiçav bûne, êdî bûne şaxên sereke yên rastiya çandan. Bi zêhniyeta eşîrî û dînî re zêhniyeta qewmî jî bi pêş ketiye.

**5- Di Rastiya Kurd De Tesîrlihevkirina Ermenî-Suryanî-Cihû**

Di rastiya Kurd a serdema navîn de tesîrlihevkirina Xiristiyan, Ermenî, Asûrî û Cihûyan jî bi roleke girîng rabûye. Xiristiyantî berî Îslamê bi şeşsed salan ava bû û ji ber ku dînê fikir û hestan bû, ji destpêkê ve tesîra xwe nîşan da. Di destpêkê de jî bêhtir weke tevgereke xizan û bindestan mezin bû. Di dema derketina holê ya Xiristiyantiyê de li asta herî jor serweriyeke Împaratoriya Romayê li ser herêmê heye. Ji vê serwertiyê herî zêde Helenî, Asûrî û Ermenî, hinekî jî yên bi koka xwe Kurd û Ereb êşê dikişînin. Beşê xizan ê Cihûyan jî çêbûye. Qebîlegeriya Cihûyan êdî ji wan re teng e. Ji ber ku tebeqeya wan a jor bi Romayê re hevkariyê dike, parçebûn bêhtir bi kok e. Hz. Îsa berhemê vê dabeşbûna radîkal e. Weke rêberê dînî yê xizanan derketiye holê. Ya rastî, Îsewîtî duyemîn pêkhatina mezin a dînî ye ku ji Cihûtiyê zêde bûye. Cihû ji ber Pirtûka Pîroz a qebîleya xwe Ahîta Kevin hûrûkûr parçe nebûne. Yên ji wan cihê bûne hindik in. Dînê nû bêhtir li ser kesên bi koka xwe Helen, Ermenî û Asûrî bi bandor bûye. Di sedsala 3. ya mîladî de belavbûna Xiristiyantiyê bi lez bûye. Sedsala 4. sedsala veguherîna mezin e. Hersê gel bi pirranî bûne Xiristiyan. Ji ber ku Xiristiyanbûn dihat maneya qutbûna ji koletiya Romayê bi awayekî jî bi rola milliyetparêziyeke zû rabûye. Ev milliyetparêzî, tevî ku ji neteweperestiya kapîtalîst cihê ye jî xwedî rola proto-neteweperestiyê ye. Ango di navê de tovên kapîtalîzma pêşwext jî hene. Kapîtalîzm di himbêza Xiristiyantiyê de bû hegemonîk û ev xweber nîne. Împaratoriya Romayê di sedsala 4. de bû du beş û di vê de rola Xiristiyantiyê mezin bû. Di pêkhatina Romaya Rojava de ango di pêkhatina Bîzansê de rola Xiristiyantiyê diyarker e. Piştî demeke kin Romaya Rojava jî bûye Xiristiyan. Katolîtîktî û Ortodokstî îfadeya îdeolojîk a vê dabeşbûnê ne. Latînî bûye îfadeya çanda Katolîk, Grekî jî bûye yê Ortodoksan. Ermenî û Suryanî-Kildanî jî (Asûriyên bûne Xiristiyan) dereng nemane mezhebê xwe ava kirine. Dabeşbûnên em behsa wan dikin di çanda Rojhilata Navîn de rê li ber jihevcihêbûnên bi kok vekiriye. Jihevcihêbûna Helen, Ermenî û Suryaniyan bi lez bûye û ev komên navbihurî bûne mîna proto-neteweyên pêşwext çêbûne.

Gelên me behsa wan kir, çi di warê maddî de çi jî di warê manewî de asta wan a entelektuelî ji gelên din, nexasim pirr di ser a Kurd û Ereban re bû. Ji lewra bivênevê cudahiya di navbera wan de wê mezin bibe. Hersê gel jî li Rojhilata Navîn gelên herî kevin ên bi koka xwe bajarî ne. Ji ber ku bi koka xwe bajarîne ev yek wan di warê çandî de serdest dike. Lewma gelekî xwezayî ye ku Kurdên çiyayî yên li Bakur û Erebên çolê yên li Rojava bi serdestiyê re bikevin nakokiyê. Jixwe bi sedema ku Bîzansê ji Helenên Ortodoks, Sasaniyan jî ji Ermenî û Suryaniyên ji mezhebên cuda re malovanî dikirin, nakokiyên heyî zêdetir tevlîhev dibûn. Di sedsala 7. de derketina holê ya Îslamiyetê û bi lez serdestbûna wê li hemberî herdu împaratoriyan û mezhebên bi wan ve girêdayî, hem nakokî zêde kirin hem jî dijwartir kirin. Cihûtî û nakokiyên ji rêûresmê timî bûne destpêkerê kaosê.

Bi Îslamiyetê re cografya Kurd bi temamî di navenda vê tevlîheviya nakokiyan de ye. Jixwe ev cografya wê ji sedsala 11. û pêve bi navê Kurdistanê di lîteraturê de cih bigire. Ereb, Fars, Kurd, Suryanî û Ermeniyan, pirr neçû di nava demeke kin de Tirkan jî li vê qadê hêza xwe nîşan dan. Kurdistan li jortir mîna qada sereke ya şerê di navbera Bîzans û Împaratoriya Îslamê (berê jî Sasanî) de ye. Kurd li Bakur bêhtir bi Ermeniyan re, li Başûr bi Suryaniyan re, li Rojava bi Rûman re û li Rojhilat jî bi Farisan re di nava hev de bûn. Tevî ku pirraniya gel pêk dianîn, bi van gelên cîran re nexasim bi hêza wan a li bajaran re timî di nava têkiliyê de bûn. Kurd weke gelekî şivan û cotkar, Ermenî û Suryanî jî weke bajarî û zenaetkar dibûn xwedî hebûn. Bi vî awayî di navbera wan de dabeşkirineke dîrokî ya kar pêk dihat. Têkiliyên wan ji nakokiyê zêdetir sîmbiyotîk bûn ango herdu aliyan bi têkiliyên xwe hevdu xwedî dikirin. Bêguman divê mirov Cihûyan jî li van têkiliyên bi vî rengî zêde bike. Cihûtî ji roja derket holê ve bi cografya Kurd re ji nêz ve di nava têkiliyê de bû.

Di vê demê de pirraniya Kurdan xwediyê baweriya Zerdeştî ne, lê hindik be jî beşekî Kurdan ê bûye Cihû û Xiristiyan jî heye. Çawa Îslam kete herêmê ev tewazun ji binî ve xira bû. Ereb li Sûrî û Iraqa îro li dijî Suryanî, Cihû û Rûman (di bin perdeya Îslamî de li dijî Xiristiyan û Cihûyan) serdest bûn. Li Misrê jî heman aqûbet bi serê Qiptiyên Xiristiyan de hat. Tirkan li Anatolyayê li dijî Rûm û beşekî Ermeniyan serdestî û pirranî bi dest xistin. Li Kurdistanê jî li hemberî Ermenî û Suryaniyan, Kurdan serdestî û pirranî bi dest xist. Li vir ji navê qewm divê hegemonya tebeqeya jor a qewm bê fêhmkirin. Tevî hemû fetih û şeran, têkiliyên di navbera gelan û tebeqeyên jêr de bi giranî bi dostanî dewam kirine. Kurd bi qewmên Ermenî û Asûrî re di nava hev de mane û bi hev re xwe li gelek hewldanên şaristanî û çandî qewimandine. Hebûna têkiliyên bi vî rengî yên heta salên 2000'î B.Z. diçin, mirov dikare wan di dîrokê de jî tespît bike. Tevî hemû xwelihevrakişandina begtiyên qewman li ser desthilatdariyê û şerên li ser milkan, dîsa jî têkiliyên çandî yên xurt di navbera gelên Ermenî, Kurd, Tirkmen û Suryaniyan de heta serê sedsala 19. dewam kirin. Têkiliyên di navbera wan de bi giranî sîmbiyotîk bûn û hem ji aliyê maddî ve û hem jî ji aliyê manewî-çandî ve pêk hatine. Bûyerên neyênî yên çarenûsa van gelan

biguherînin pêk nehatine. Nakokiyên heyî zêdetir ên tebeqeyên jor ên qewman bûn û li ser bingehê berjewendiyan hatine sorkirin û rê li ber şeran vekirine. Ji cudatiya dînî û mezhebî ya tebeqeyên jêr re hurmet hatiye nîşandan, li pêşiya têkiliyên biratî û dostîtiyê asteng nehatine dîtin. Nivîsandina dîrokê li ser bingehê hegemonya îdeolojîk û hêzê, û propagandakirina wê, nikare ser vê rastiyê bigire û nikare wê ji holê rake.

Li Rojhilata Navîn ber bi dawiya serdema navîn ve, têkiliyên rastiya Kurd bi çanda Îslamê re rê li ber encamên girîng vekirine. Ev têkiliyên bi qasî hezar salî dewam kirin, aliyên wan ên erênî û aliyên wan ên neyênî jî pêk hatine. Aliyê wê yê neyênî, bandora asîmîlasyonîst a çand û zimanê Erebî ye. Bandora Erebî û Erebkirinê bi sedsalan dewam kiriye. Tebeqeya jor a Kurd weke çînekê pêk hatiye û ji çanda gel a Kurd dûr ketiye, di hevkartiya rêûresmî de gelekî pêşde çûye. Ev hevkartiya xwe di sedsala 16. de bi Xanedaniya Osmanî-Tirk re bêhtir pêşde biriye, bi gelên Ermenî û Suryanî re car caran şer kiriye. Weke çîneke hevkar a serwer, li ser tebeqeyên xizan ên qebîle û eşîrê yên ji wan re Kurmanc dihate gotin, mêtinkarî û zordestiya xwe zêde kir. Aliyê erênî jî ew e, Kurd weke qewm û gel di vê demê de cara pêşî bi awayekî fermî vî navê xwe digirin û bi kar tînin, cografya li ser jî êdî bi awayekî fermî bi navê Kurdistanê tê hildan. Xulase, navê welat û gel di vê demê de zelal bûye. Bi zimanê Kurdî berhemên wêjeyî hatine nivîsandin. Di serî de **Dîroka Kurdistanê** ya Şerefxan, **Mem û Zîn** a Ehmedê Xanî û helbestên Feqiyê Teyran gelek berhemên wêjeyî û zanistî yên bi Kurdî hatine nivîsandin ên vê demê ne. Piştî ku qebîle û eşîrên Kurdan hinekî ji hev de ketin û girêdana di nava wan de sist bû, kategoriya Kurmanc pêk hat û li gelek cihûwarên weke gund û bajaran pirraniyan şêniyan ji wan pêk hat. Ji endamên qebîle û eşîran ku stûna sereke ya gelbûnê ne, rewş ber bi pêkhatina kedkarên serbest ên nû Kurmancan ve çû. Li dijî hegemonya yekdestdar a siltan û begtiyan ku li qadên desthilatdarî, ekonomî û îdeolojîk bi neyênî xwe nîşan dida, di serî de terîqetên tesewifî, Elewîtî û Êzîdîtî gelek komên nû yên bikevin kategoriya şêweyek ji şêweyên civaka sivîl pêk hatin. Ev kategorî hemû jî kategoriyên wisa ne ku naveroka wan a demokratîk bi hêz e. Bi kurtî, em dema tên digihîjin serê sedsala 19., em dibînin rastiya Kurd li gorî rastiyên qewm û çandên civakî yên li gelemperiya dinyayê paşvemayî nîne, gelekî ji wan pêşdetir e.

### 6- Çanda Rojhilata Navîn û Hegemonya Modernîteya Kapîtalîst

Kengî çanda Rojhilata Navîn ket bin bandora hegemonya kapîtalîst, li ser rastiyên civakî rê li ber encamên di asta felaketê de vekir. Di mentiqê avakirina hegemonya kapîtalîst de dijbertiya çanda Rojhilata Navîn cihekî girîng digire. Me di beşên berê de anîbû ziman ku çanda dawî ya mezin a Rojhilata Navîn Îslamiyet hem ji Rojava di ser Spanya û Scîlyayê re, hem jî ji Rojhilat di ser Anatolyayê re ji sedsala 8. heta bi sedsala 16. gelekî zêde gef li Ewrûpayê xwarine. Hegemonya kapîtalîst li dijî vê gef û tehlûkeyê hat mezinkirin. Mirov nakokiya Rojhilat-Rojava ya ji rêûresmê jî li vê zêde bike, wê karektera hegemonya Rojava ya nû baş bê fêhmkirin. Çanda

Rojhilata Navîn heta nehata bêtesîrkirin, hegemonya kapîtalîst a Rojava ne pêş diket ne jî mayînde dibû. Di serê sedsala 19. de seferên Napolyon ên Misr û Moskovayê ceribandinên ciddî û pêşî yên pêngava hegemonîk in. Bi têkçûna Napolyon re Împaratoriya Ingilîz a pêşengiya hegemonîk xist destê xwe li ser çanda Rojhilata Navîn hem hegemonya xwe pêşde bir hem jî her ku çû xwe mayînde kir. Ev pêngav ji dema Skender ve, demên Roma û Bîzansê jî di navê de, fetha herî mezin a sîstema şaristaniya Rojava ye ku bi giştî li Rojhilat û bi taybetî jî li Rojhilata Navîn kiriye. Kapîtalîzm bi xwe ji bo ev fetih mumkîn bibe hatiye hegemonîzekirin. Eger em dîrokê rast nexwînin, em nikarin dused salên dawî yên Rojhilata navîn ji hev derxin. Ya pêk hatiye û qewimiye, fetha Osmaniyan, Îraniyan, Cengizxan, bi kurtî ya çi şaristaniyekê nîne. Xwe disipêre sîstema şaristaniya navendî ya ku di warê îdeolojîk, aborî, siyasî û eskerî de ji nû ve bi sazî bûye. Di encama hewldaneke hezar salî de ango ji Sefera Xaçperestan a pêşî ya di sala 1096’an de heta bi Sefera Iraqê ya dawî di sala 2003’an de li ser bingehê avakirina şêwazê kapîtalîst ê Ewrûpaya Rojava bidestxistina sîstema şaristaniya navendî û ji sedsala 16. pêve avakirina hegemonya wê mewzûbehs e.

Rojhilata Navîn fêhm nekiriye ku di dused salên dawî de çava hatiye fetihkirin û ji fêhmkirina vê yekê hê jî dûr e. Pirr eşkere, em dikarin vê yekê ji trajediya Saddam Husên fêhm bikin. Di dused salên dawî de qaşo şerên serxwebûnê, çi li ser navê ji nû ve Îslamgiriyê, çi jî li ser navê milliyetgiriya laîk hatine kirin, ev şer bi xwe şerên pêşdebirina hegemonya kapîtalîst in. Ev rêbaz ango Îslamgirî û milliyegirî her yek ji wan weke versiyonên îdeolojiya oryantalîst hatin pêşdebirin û li ser navê kapîtalîzmê kirin ku ew xwe bi xwe dagir bikin û ji bo vê hatin bikaranîn. Sîstema hegemonîk, ji bilî çend şerên pêşengiya wan kiriye, ya rastî, belavkirina sîstema hegemonîk bi van amûrên îdeolojîk û polîtîk (desthilatdarî) bi destê tebeqeyên elît ên çanda Rojhilata Navîn bi xwe pêk anî û pêşde bir. Ev xusûs gelekî girîng e. Eger ev neyê fêhmkirin, ne pêkan e ku mirov rewşa îro ya Rojhilata Navîn ji hev derxe û çareser bike. Ya ji vê jî rasttir ew e, ew ê herêmê bi projeyên sîstema hegemonîk (Projeya Rojhilata Navîn a Mezin) di nava kaosê de bihêlin, û wê hewl bidin li ser bingehê berjewendiyên sîstemê bi xwe, wê analîz bikin û ji nû ve li hev bînin.

Bûyerên dused salên dawî yên di çarçoveya rastiya Kurd de qewimîn bi tenê em dikarin li ser bingehê van guhertinên herêmî û global ji hev derxin. Di serê sedsala 19. de Împaratoriya Ingilîstanê di ser Başûrê Iraqê re, Çartiya Rûs jî ji Bakur ve her ku çû Kurdistan tengav kirin. Împaratoriya Osmanî ya di nava van herdu hêzan de tengav bûbû jî ji bo li ser piyan bimîne şerê man û nemanê dikir. Hewldanên islahatê yên Selîmê Sêyemîn û Mehmûdê Duyemîn jî ji bo derengxistina hilweşînê bû. Hewldanên destguhertinê yên Waliyê Xanedaniyê yê Misrê M. Elî Paşa (1769-1849) bi tawîzên dan Ingilîstan û Rûsyayê rawestandin. Şerê milliyetan împaratorî ji hev belav dikir û ji bo pêşîgirtina li vê yekê çare di islahat-reforman de hat dîtin û bi vê riyê jî bi sîstema Rojava re dibûn yek. Sened-î Îttîfaq, jiholêrakirina yenîçeriyan, damezrandina artêşa nû,

Fermanên Tanzîmat û Islahatê, îlana Meşrûtiyeta Yekemîn û Duyemîn bi vê armancê bûn. Bi vê re bi temamî bi sîstema hegemonîk a kapîtalîst re bûn yek. Weke encama vê yekê jî çanda Rojhilata Navîn hem ji aliyê maddî ve hem jî ji aliyê manewî ve heta dawiyê li fetih û asîmîlasyona sîstemê vebû. Bi vê armancê, ekola Osmanîparêziyê û nûkirina burokrasiyê pêk anîn. Ji ber ku amûrên desthilatdariyê yên ji rêûresmê bandora xwe ya li ser gel kêm dibûn. Herweha mebest ji vê ew bû, dixwestin hegemonya kapîtalîst xurt bikin. Di bin de yê ev tevn dideriband Ingilîstan bû. Bandora Franse, Elmanya û Rûsyayê jî her ku diçû zêde dibû.

Dema ku mirov tevgerên serxwebûnê û serhildanên di sedsala 19. de analîz bike, divê mirov rewşa nexweş a Împaratoriyê baş fêhm bike û baş zanibe ku rêveberên pratîkî hêzên hegemonîk ên kapîtalîst in. Bi awayê xuya dikir, Împaratorî ji aliyê burokrasî û padîşahên Osmanî ve dihat rêvebirin, lê ev rêvebirin ji destikbûn û serkariyê wêdetir ti maneya xwe tinebû. Di dused salên dawî de ne bi tenê Împaratoriya Osmanî li ser Împaratoriya Îranê jî lîstikvanên rastî hêzên hegemonîk ên sîstemê bûn û yên din bi tenê bi rola fîguran radibûn. Mêtingerî, fetihkarî û dagirkeriya yekser hem pirr bi mesref bûn, hem jî ji bo armancên wan hewce nedikirin. Armancên hegemonîk bi destên fîguranan bi mesrefa herî kêm û bi awayekî mayînde bi cih dihatin anîn. Li dijî vê sîstema nû ya hegemonîk bi tevahî gelan serî rakirin. Etnîsîteya serdest Tirkan jî di nava vê serîrakirinê de cih girt. Ango nerazîbûn û berxwedaneke giştî mewzûbehs bû. Sîstem ji bo bitepisîne û pêşiyê li cihêbûn û qutbûnê bigire rêbazên cûrbicûr peyda kirin. Oryantalîzm, mîsyonerî, islahat, reformîzm ji van rêbazan ên sereke ne. Li van rêbazan meşrûtiyetgirî û milliyetgirî jî zêde kirin. Neteweparêziya dewletê weke encama van rêbazan hemûyan li herêmê dewletên netewe yên piçûk ava kirin û ji nû ve bi ser sîstemê ve kirin. Tevgerên antî-sîstemîk ên li ser bingehê Şoreşa Cotmehê pêk hatin, tevî ku gelek serketinên wan ên girîng çêbûn jî nikarîbûn ji modernîteya kapîtalîst bibihurin û ji ber ku nikarîbûn modernîteyeke nû pêk bînin jî ketin krîzeke kûr. Beşek ji wan bi ser sîstemê ve bûn û yên mayî jî ketin rewşa muxalifên bêbandor.

Rastiya Kurd ji van bûyerên ku me hewl dan wan weke pêşnûmeyekê pêşkêş bikin, bi dijwarî bi tesîr bû. Împaratoriya Osmanî hevgirtina rêûresmî ya bi Kurdan re xira kir û li pey serwertiyeke temam çû, Rûsan jî ji Bakur tebeqeya jor a Ermeniyan bi kar anî û hewl dan bi tesîr bibin. Ingilîstanê ji Başûr Suryanî bikaranîn û bi vê yekê xwest hem li ser Iraqa muhtemel e ava bibe û hem jî li ser Kurdistanê serdestiya xwe pêşde bibe. Bûrjûwaziya Ermenî û Suryanî ya zû bûn kapîtalîst di vê de bi roleke girîng rabûn. Hersê hêzên girîng ji nû ve parvekirina Kurdistanê danîbûn ber xwe. Hêzên hundir ên Kurdan li hemberî van bûyeran hemûyan destvala nesekinîn. Tebeqeya jor wexta ku dît otorîteya wan a rêûresmî ji dest diçe li hin deveran rê li ber serhildanan vekirin. Kurdistan bû qadeke serhildanan ku tevahiya sedsala 19. dewam kir. Li Başûrê Kurdistanê, pêvajoya serhildanan a bi pêşengiya Eşîreta Baban di sala 1806’an de li

herêma Soran dest pê kir, li nava Kurdistanê li Botanê bi Serhildana Bedirxan Beg a di sala 1842'an de gihişt asta herî jor. Bi têkçûna Bedirxan Beg re dema begtiyên klasîk bi dawî dibû.

Li şûna began saziya şêxtiyê hat bicihkirin û ev weke hêza pêşeng a civakî derdiket holê. Serhildana Şêx Ubeydullah a di sala 1878'an de hem li dijî Osmaniyan û hem li dijî Împaratoriya Îranê bi rê ve birî, bi desteka Ingilîstanê da herdu împaratoriyan, hat tepisandin. Serhildanên di sala 1925'an de bi Şêx Seîd dest pê kirin, di sala 1930'î de li Agiriyê û herî dawî li Dêrsimê bi pêşengiya Seyîd Riza di sala 1937-38'an de hatin ceribandin bi têkçûnê bi encam bûn. Li Başûrê Kurdistanê serhildana Şêx Mehmûd Berzencî ya di sala 1920'an de û li Rojhilatê Kurdistanê serhildana bi pêşengiya Simkoyê Şikakî jî bi heman karekterî bûn û aqûbeta wan jî têkçûn bû. Di van têkçûnan de jî Ingilîstan bi rola diyarker rabû. Li Rojhilatê Kurdistanê ezmûna Komara Mahabadê ya di sala 1946'an de û tevgera otonomiyê ya bi pêşengiya Mistefa Barzanî di navbera salên 1960-1975'an de dema xwe ya pêşî bi têkçûnê bi dawî kirin. Ji salên 1975'an heta roja me ya îro demeke nû dest pê kir. Piştî têkçûna serhildanên bi pêşengiya beg, axa û şêxên klasîk di pêvajoya nû de tevgerên neteweyî demokratîk ên bi giranî xwe disipêrin gel û rewşenbîran bandora xwe nîşan dan.

Mirov ji nêz ve li xisletên cuda û wekhev ên dused salên dawî yên rastiya Kurd bi demên dîrokê yên beriya wê re binêre, mirov ê karibe ji wan gelekî hîn bibe. Di serdema neolîtîk a bi heybet de Proto Kurd ava aşê dîroka gerdûnî bûn. Serdema destpêkê di derketina holê û xwedîkirina sîstema şaristaniya navendî de bi rola dergûş û dayikê rabûn. Di serdema navîn de yek ji qewmên bi hêz û pêşeng ên Îslamê û sîstema şaristaniya navendî bûn. Di serdema nû de, di serdema hegemonîk a moderniteya kapîtalîst de, ev rastiya bi heybet, kedkar û wêrek a Rojhilata Navîn hema bêje ket rewşekê bi tinebûnê re rûbirû bû. Ya hatî serê rastiya Kurd ne mîna kabûsê bû, kabûs bi xwe bû. Gotinek heye ji bo qirkirinên li pey hev hatine kirin hatiye bikaranîn: 'felaketên mezin'. Erê felaketên mezin bi serê wan de hatine. Herçiqasî hebûna xwe diparêzin jî ev hebûna wan ne azad e, û di ser pira siratê ya cehennemê re derbas dibe.

Di çar cildên pêşî yên parêznameya xwe de min bi giştî li ser şaristaniyê, bi taybetî jî li ser moderniteya kapîtalîst mitale kirin ku ez karibim ji aliyê sosyolojîk ve van felaketên mezin ên li pey hev hatî, analîz bikim; kabûsa dused salên dawî ji ser rastiya Kurd rakim, ewrên reş û tarî ji hev belav bikim. Di vê serdema felaketên mezin de du çand û gelên kevnare yên tevahiya dîroka şaristaniyê bi Kurdan re di nava hev de mabûn û mohra xwe li binê çandên pêşketî yên herêmê danîbûn, bûn qurbanê qirkirinê û hatin tesfiyekirin. Çanda Helen a Anatolyayê ya sê hezar salî bi temamî hat tesfiyekirin. Kurd bi xwe, bi qirkirina sergirtî û îmhakirina şerê taybet ê li ser bingehê çandê tê meşandin, rûbirû ne. Hêzên weke dewletên netewe yên serdest li ser xwe tên hiştin, gelên Ereb, Fars û Tirk di nava Faşîzma xwe ya Spî-Reş-Kesk de hema bêje helandin. Nexasim min di xebata xwe ya parêznameyê ya bi navê **Sosyolojiya Azadiyê** de hewl da nîşan

bidim ku moderníteya kapîtalîst berpirsê rastî yê vê pêvajoyê ye. Tiştên ez li van xebatan zêde bikim hem gelek in, hem jî kêm in. Li gorî rewşan û li gorî cihê jê li meseleyê tê nêrîn, em hinek aliyan temam bikin.

**a-** Di dused salên dawiyê de hêza hegemonîk a diyarker dewleta netewe û împaratoriya Ingilîstanê ye. Vê împaratoriyê di sêsed salên dawiyê de hêzên mezin ên Ewrûpayê di Parzemîna Ewrûpayê de berda hev û ew bêtesîr kirin, li derve jî bandora wan şikand û li ser rêyên wan ên bazirganiyê û mêtingehên wan serdest bû. Yên mayî jî kirin kontrola xwe. Bi heman rêbazê Emerîka, Rojhilat û Başûr-Rojhilatê Asyayê bi xwe ve girê da. Bû Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava. Çanda Rojhilata Navîn jî di dused salên dawî de bi heman rêbazan parçe kir, dabeşî dewletên netewe yên piçûk kir û ji aliyê ekonomîk û îdeolojîk ve kir bin yekdestdariya xwe. Di dused salên dawî de Împaratoriyên Osmanî û Îranê qaşo nemirin û jiyan. Paşê Ereb, Tirk û Îran dabeşî gelek dewletên netewe yên qaşo serbixwe bûn û bi vê serxwebûnê dewam kirin. Kengî mirov hûrûkûr analîz bike, bi hêsanî dikare bibêje, ji serweriya sîstematîk a sîstema bi tenê ya hegemonîk a li gelemperiya dinyayê belav bûye, beşek li Rojhilata Navîn pêk tê. Ez dema li ser teoriya şaristaniya navendî xebitîm, armanca min eşkerekirina vê rastiyê bû. Lê mejiyên parçeparçebûyî yên hinek kesokan, dikarin li dîrokê weke parçeyên sekan û bêtêkilî bifikirin. Rastî berevajiyê vê yekê ye. Dîroka gerdûnî rastiyek e, û heta roja me ya îro weke xelekan bi hev ve têkildar e, yan jî weke çemekî sereke qut nabe diherike. Herçiqasî weke berê nebe jî weke hêza hegemonîk a sîstema şaristaniya navendî, Ingilîstan rola xwe ya hêza avakirin û domdarkirina sîstemê dewam dike.

Mirov her yek ji dewletên netewe yên li Rojhilata Navîn weke walîtiyên sîstemê binirxîne, ev yek wê me zêdetir nêzî heqîqetên civakî bike. Herçiqasî walîtî bibin komarên serbixwe yan jî qraltî, ev yek wê naveroka wan neguherîne. Kêm serbixwetî, zêde serbixwetî dereweke mezin e. Yên vê rastiyê fêhm nekin, piştî heftê salî jihevdeketina Rûsya Sovyetê, Rêveberiya Faşîzma Spî ya di Komara Tirkiyê de, faşîzma reş a dewletên netewe yên Ereb, faşîzma kesk a li Îran, Pakistan û Afganistanê nikarin fêhm bikin. Erê, nikarin ji hev derxin ku li her devera dinyayê qaşo dewletên bi temamî serbixwe çawa ji nişkê ve hildiweşin, reng diguherin, hêzeke mezin a mîna Çînê çawa dibe hêzeke bingehîn a ku kapîtalîzmê li ser piyan digire.

Li Rojhilata Navîn dewletên netewe bi şoreşan nehatin damezrandin; ji aliyê sîstema hegemonîk ve hatin avakirin. Armanca bingehîn a van dewletan ew e, gelên xwe li ser navê vê sîstemê bi awayekî herî hişk bikin mêtingeh. Di vê çarçoveyê de bi ser jî ketine. Li dinyayê giştî jî heman pêvajo dimeşe. Li Rojhilata Navîn di binê rewşa kaotîk de ya kûr dibe û bi tenê dikarin bi hovîtî bimeşînin, ev rejîmên mêtingeriyê hene. Di serdema dawî ya neo-lîberal a fînans kapîtalê de tiştên diqewimin wexta gelên herêmê bi temamî mehkûmî bêkartiyê dikin, çavkaniyan diqedînin û hawîrdorê têk dibin, em li rastiyê bêhtir serwext dibin. Li gorî tehlîla dawî, beşê ji sedî deh ê

sîstemê yê ku pereyan ji peran bi dest dixe, li ser tevahiya jiyana civakî, ekonomîk û çandî serweriya xwe ava kiriye û ji bo vê serweriya xwe veşêre fanatîzma milliyetgirî û dîndariyê timî di rojevê de digire û ev jî ne pêşdeçûna wan welatan û ne jî serxwebûna wan neteweyan piştrast dike. Gel di dîroka xwe de demên xwe yên herî bi felaket dibînin û bermahiyên herî dawî yên çanda civakî di nava çerxên dewleta netewe de têne helandin. Em di serdema qaşo maf û azadiyên ferdî de ji kirtika dawî ya rûmeta ferd re jî dibêjin bi xatirê te. Em dema têgîna qirkirinê analîz bikin, em dikarin wê bi xwe bêhtir bi awayekî giştî û sîstemîk bibînin. Ji bo qirkirina Cihûyan gotina 'yekane' bi ehemiyet tê parastin. Rastî berevajî vê ye. Di sîstema modernîteya kapîtalîst de qirkirinên 'yekane' tinene. Di her civakê de, di her dewleta netewe de û li cem her gelî pirr an jî kêm qirkirin hene. Li cem hinan ji wan bi awayekî fizîkî tê kirin û bi pirranî jî bi awayekî sergirtî û çandî tê meşandin. Bêdîrok, bêekonomî, bêrêveberî û bêzêhniyet hiştin jî bi kêmanî bi qasî qirkirinên fizîkî û çandî bêrehm û bi bandor in.

Ji bo ku qanûna kara herî zêde ya şêweyê mêtinkariyê yê kapîtalîst bimeşe, divê îndustriyalîzm û fînansa kapîtal bibin yekdestdarî. Ji bo pêkhatina vê yekdestdariyê jî desthilatdariya dewleta netewe divê ya ku armanca wê pêkanîna civaka homojen e, ya ku di bin  hegemonyaya îdeolojiya milliyetgir de heta bi rehên xwe ketibe bin kontrol û çavdêriya amûrên desthilatdariyê. Li ser ekonomiyê yekdestdariya îndustriyel û yekdestdariya fînans kapîtalê li ser bingehê destekdana hev a bi yekdestdariya dewleta netewe re di zikhev de ava dikin. Pêvajo di qada îdeolojîk de bi avakirina yekdestdariya milliyetgiriyê tê temamkirin. Di encamê de civaka homojen a kirine armanca xwe pêk tê. Ev jî tê wê maneyê ku faşîzm bi ser ketiye. Mirov faşîzmê bi tenê weke kirinên Hîtler û Mûssolînî fêhm bike û wan tenê weke diyardeyeke yekane ya faşîzmê bibîne, mirov dikeve dafika îdeolojiya lîberalîzmê. Ji ber ku ev yek ji berevajîkirinên wê yên herî girîng e.

Civaka homojen ew civak e ku qirkirin bi ser de hatiye. Bi homojenkirinê re civak ji dîroka wê ya rastî tê qutkirin, bi hûnandineke îdeolojîk a fîktîf (dînê herî bênaverok, lihevçêkirî) bi tevahî çandên cuda têne tinekirin. Bi vî awayî li ser ekonomiyê qanûna kara herî zêde dimeşe, li ser desthilatdariyê jî yekdestdariya dewleta netewe pêk tê. Bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn a pêk hat ew bû, li dijî hegemonyadariya Elman, Japon û Îtalî, hegemonyadariya Ingilîstan, DYE û Rûsyayê pêk hat; ji du blokên yekdestdar ên hegemonîk yeke din têk dibe. Naxwe weke ku tê îdeakirin, li dijî faşîzmê serketina demokrasiyê nîne. Bloka Elman têk çûye, lê faşîzm weke şêweyekî desthilatdariyê li nava dinyayê ketiye serdema serweriya xwe. Serdema hegemonîk û mezinbûna modernîteya kapîtalîst, serdema fînansa kapîtal a dema nêz (hegemonya piştî salên 1970'î li ser ekonomiyê) û ev jî bi serdema dewleta netewe ya li ser civaka homojenkirî (qirkirin dîtî) temam dibe. Bêguman ev pêvajo wisa li ser xeteke rast nemeşiyaye. Mirov dikare piştî salên 1960'î bi derketina holê ya Yekîtiya Ewrûpayê, piştî salên 1990'î bi jihevdeketina Yekîtiya Sovyetê, bi giştî bi jihevdeketina modernîteya kapîtalîst û bi taybetî jî bi jihevdeketina

dewletdariya netewe ya faşîst girêdayî binirxîne. Serdema jêre postmodernîte tê gotin, ya rastî, jihevdeketina modernîteya kapîtalîst a dema nêz û ketina wê ya kaosê ye. Bi qasî modernîteya kapîtalîst a xwe nûnekirî, pêkan e ku modernîteya demokratîk jî ji vê kaosê bi hêz derkeve. Li vir a ku  wê pêvajoyê diyar bike, hêza çalakî û maneyê ya aliyan a di warê îdeolojîk, polîtîk, exlaqî û hunerî de ye. Di encamê de wê du hêzên heqîqetê bêne beramberî hevdu û têbikoşin, li gorî rewşê yan kaos ê kûr bibe û dewam bike yan jî aliyek ê zora aliyê din bibe, lê têkoşîn ê bi vî awayî salên dûrûdirêj û belkî jî bi sedsalan dewam bike.

**b-** Li ser cografya Anatolya û Mezopotamyayê çi bûyer qewimîn? Di çarçoveya mijara me de û li gorî têkiliya vê pirsê bi mijara me re bersiva wê ya bê dayîn gelekî girîng e. Ji ber ku li ser cografya Anatolyayê û Mezopotamyayê sîstema şaristaniya navendî ya kevin pêk hatibû û li vir bi hezaran salan heyîna xwe dewam kiribû, ji bo hêza hegemonîk a modernîteya kapîtalîst Împaratoriya Ingilîstanê û herweha yên weke hevrikên wê mezin dibûn Elmanya û Rûsyayê jî girîng bû. Ji bo kontrolkirina Rojhilata Navîn, Qefqasya, Asya Navîn û Hindistanê diviyabû ji sedî sed vê cografyayê di bin destê xwe de bigirin. Sedema girîngiya vê cografyayê ya hem dîrokî hem jî rojane ev rastî ye.

Pêkhatinên ji wan re Jon Tirk û Cemiyeta Îttîhad Teraqî tê gotin, ji Tanzîmata sala 1840'î heta roja me ya îro pêkhatinên desthilatdarî û îdelolojiyên milliyetgiriya modern in û bi tenê mirov dikare wan li ser bingehê têkiliyên wan ên bi hesabên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst ve girêdayî rast ji hev derxe. Çawa ku me rave kiribû, Împaratoriyên Osmanî û Îranê yên li ber candayînê bi sedema hesabên tewazunê yên hegemonîk, ne ew hêz in ku dijîn, ketine rewşekê bi tenê bûne pêkhatinên fosîlî yên ku destûr hatiye dayîn bijîn. Ji bo burokrasiyên împaratoriyê li desthilatdariyê bimînin rêya bi tenê ew e, divê xwe bisipêrin hezekê yan jî çend hêzên hegemon û bi vî awayî hebûna xwe dewam bikin. Ji lewra li ser herêmên navbihurî, elîtên nû yên desthilatdariyê yên bi ser Ingilîstan, Elmanya, Rûsya û beşekî jî yên Franseyê ji hev cihê dibin. Bêguman bivênevê wê elîtan modernîteya kapîtalîst teqlîd bikirana. Yên behsa wan tê kirin, şensê wan nemabû bi çanda berê ya împaratoriyê bijîn, ji ber ku çanda modernîteya kapîtalîst ew ji zû ve fetih kiribûn û rêyeke wan a demokratîk di warê gel de jî ne mewzûbehs bû. Ji burokrasiyên hebûna wan li ser desteserkirina çanda gel hatiye avakirin û tebeqeya jor a ew kirine hebûn, ji bilî îstîsnayan, hêviya gavavêtineke demokratîk nedihat kirin. Ev beşên behsa wan tê kirin, ji bilî ku bi ser hêzên nû yên hegemonîk ve bibin, ti şensê wan tinebû. Ya dimîne bê kirin ew e, divê bi rohnîbûna burokrasiyê teqlîda modernîteyê weke xwe bê veguhestin. Çawa ku li gelemperiya dinyayê bû (berê jî piştî Şoreşa Franseyê li Ewrûpayê), burokrasiya Osmanî jî ket vê riyê. Piştî Paşayên Tanzîmatê Osmaniyên Gênc û piştre ji salên 1890'î ve Tevgera Jon Tirk a veguherî Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê li ser vê riyê gavên krîtîk bûn ku hatibûn avêtin. Bi awayekî îdeolojîk veguherîna pêşî weke Osmanîparêziyê dest pê kir û weke Panîslamîzmê dewam kir, bi Tirkparêziyê bi encam bû. Ji Osmanîparêziyê armanc ew bû, ji bermahiyên

împaratoriyê dewleteke netewe bê afirandin û eger welatiyên Xiristiyan xwedî meyla cihêbûnê bin, li ser bingehê PanÎslamîzmê bi pêkhatineke ji gelên Misilman -nexasim Ereb jî di navê de- xwestin împaratoriyê dewam bikin. Piştî ku meyla veqetînê li cem Ereban bi hêz bû, meyla Tirkparêziyê jî derket pêş. Ezmûna Meşrûtiyetê bi dilê Osmaniyên Gênc bû, lê di Meşrûtiyeta Duyemîn de îdeolojiyên Îslamîgir û Tirkparêz bêhtir xwedî giranî bûn.

Zêhniyeta Tirkparêziyê ji sala 1913’an ve heta roja me ya îro, bû îdeolojiya fermî ya dewletê û partiyên ji navendê ve bi ser dewletê ve ne. Di van meylan hemûyan de kêm an jî zêde bandora hêzên hegemonîk heye. Ji vê jî girîngtir, bi awayekî ciddî Masonîk ketine nava wan, çizirîne nava wan. Ji Şoreşa Franseyê ve Masonan destek dane bi tevahî tevgerên ciwan ên laîk netewegir û ev jî bi awayekî hesabpirsîna civakparêziya sivîl a bûrjûwayê ji alîgirên desthilatdariya teolojîk îfade dike. Di pêvajoya bi Tanzîmatê re dest pê dike di hersê ekolan de jî heta dereceya dawiyê bi bandor bûne, di pêkhatina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de û di desthilatdariya wê de elîta rêveber a bingehîn pêk anîne. Di van ekolan de bandora Siyonîzmê jî çêbûye. Siyonîstên di sala 1896’an de xwe bi awayekî fermî weke nûnerên milliyetgiriya bûrjûwa ya Cihû îlan kirin, dixwestin Dewleta Cihû ya Îsraîlê ya berê ya navenda wê Qudis bû, ava bikin û li pey vê diçûn. Ji bo karîbûna vê bikin diviyabû di nava Împaratoriya Osmanî de bi bandor bûna. Ji bo vê jî amûra kêrhatî Cemiyeta Îttîhad û Teraqî bû. Herçiqasî Cemiyetê bi darbeya Çileya 1913’an bi awayekî îdeolojîk di Tirkparêziyê de biryara xwe ya fermî da jî weke naverok xwedî pêkhatineke gelekî tevlîhev a îdeolojîk û polîtîk bû. Li vir Tirkparêziya behsa wê tê kirin xwe nasipêre diyardeyeke sosyolojîk, ji vê zêdetir, ji bilî Tirkan tevlîheviyeke ji hêmanên bermahî yên her cure milliyetan pêkhatî îfade dike. Di serî de artêş, saziyên burokratîk di vê demê de bêhtir hesabên xwe yên siberojê dikin, lewma di vê pêvajoyê de bingehekî çîn an jî etnîk ê vê pêkhatinê tinebû. Ji lewra ev Tirkparêzî di serî de lihevçêkirî, bermahî, tûkil û tertikî bû. Kengî deshilatdarî kir destê xwe, xwest ji xwe re bingehekî civakî amade bike. Hewldan ji burokrasiyê çîneke bûrjûwayê çêkin. Desthilatdariyên komarê ev bername bêhtir pêşde birin û hewldan heta roja me ya îro dewam bikin. Herçiqasî bi pêvajoyê re weke navendgir û ne navendgir dabeş bibin jî prensîbên wan ên îdeolojîk her tim weke xwe man.

Ev elîta îdeolojîk û desthilatdar di derketina xwe ya holê de ne xwedî bingehekî çînî û civakî bû. Lewma bûrjûwaziya wê pêk bianiya bi tenê bi kapîtalîzma dewletê pêkan bû. Kapîtalîzma dewletê ji şêweyên kapîtalîzmê yê ji afirêneriyê herî mehrûm e. Yan wê xwe ji derve xwedî bike yan jî wê li hundir li ser civakê bi teroreke bêrehm nirxê zêde bi dest bixe û bibe hebûn. Hewcedariya bi desteka ji derve ji bo sermayeya Cihû bi nehênî bikeve hundir timî derfet û îmkan xweş kirin. Jixwe, ji Selçûqiyan ve, nexasim ji salên 1550’î ve di dema mezinbûna hegemonya kapîtalîst de Cihû gelekî bi bandor bûn. Piştî ku ji Spanyayê hatin avêtin (1492) milekî wan li Hollanda-Amsterdamê, milê wan ê duyemîn jî li navend Îzmîr-Selanîk-Stenbol xwe bi cih kir. Sermayeya Cihû li Anatolyayê jî timî weke rêûresm hebû. Ji derve û hundir beşê

sermayeyê yê herî rêxistinkirî Cihû bûn. Hesabê vê sermayeyê ji bo peydakirina welatekî ji Cihûyan re berê li ser Rûsya, Polonya, Elmanya, Hollanda û Girava Brîtanyayê zêde bû. Elmanya ji wan welatan bû ku herî zêde hesab li ser dihatin kirin. Di pêkhatina bûrjûwaziyê de rola Cihûyan a îdeolojîk, polîtîk û ekonomîk zêde bû. Ji bo Elmantiya herî îdeal pêşengî kirin. Ji qrêl zêdetir xwe qralparêz hesibandin. Bi vê nêzîkatiyê di pêşdebirina milliyetgiriya Elman de û bi destê dewletê jî di kapîtalîzma wê de bi roleke afirîner rabûn. Li dijî hegemonyadariya Rûsya, Franse û Ingilîstanê hegemonyadariya Elman derxistin pêş. Siyonîzm zêdetir meyla sermayeya bûrjûwaziya Elmanya û Awisturyayê bû. Cihûyên Ingilîstan û Rûsyayê jî çalak bûn. Lê heta bi salên 1918'î, ango heta bi hilweşîna Împaratoriya Elman, bûrjûwaziya Cihû ya Elman her li pêş bû.

Li cem Împaratoriya Osmanî di encama hesabên tewazunê de ku bi Ebdulhemîdê Duyemîn re bi pêş ketin, hewcedariya bi sermayeya dewleta Elman derket pêş. Li ser Îttîhad û Teraqiyê bandora Elman jixwe hebû û ev bi xwe bandora sermayeya Cihû bû. Mirov li vê bandora Masonan û sermayeya Cihû ya xwecihî zêde bike, milliyetgiriya Cihû beriya Siyonîzma Îsraîlê, siyonîzma Anatolya Tirkiyê bi awayekî bi hêz bi cih dike. Di îlankirina Meşrûtiyetê de, di darbeya 1'ê Çileya 1913'an de, di pêvajoya 1919-1922'an a Rizgariya Neteweyî de û di avakirina Komarê de xwediyê rola rastî bûn. Ha bi temamî ji ber van sedeman îdeolojiya Tirkparêziyê ji bo ku xwe bi maske bikin û veşêrin, perdeyeke îdeal bû, bi kar anîn û bi maskeya wê ya dan ber rûyê xwe lîstin. Analîzên bi giştî têne zanîn pêkhatina kapîtalîzma Tirkiyê rave nakin û ji vê gelekî dûr in; nahêlin mirov bûyerên berbiçav rave bikin, bi rolekê radibin ku mirov serkorî dikin û maneyê berevajî dikin. Di kapîtalîzma Elman de sermayeya Cihû di tevahiya amûrên îdeolojîk, çandî û desthilatdariyê de bi bandor bû. Ji tevahiya vê hêza bi bandor û zêde di kapîtalîzma Tirkiyê de nexasim di polîtîkaya wê ya derve de, di avabûna artêşa wê de, di saziyên wê yên îdeolojîk û çandî de bi bandor e, zêde ye, û hukimker e. Li naverastê bûrjûwaziyeke Tirk tineye. Weke Tirkîtiya rastî Tirkmenên xizan, yên têne rêvebirin û girseyên gundiyan hene. Di rola bûrjûwaziya Tirk de bûrjûwaziyek û sermayeyeke Cihû hebû, ya ku ji 'Filmên Yeşîlçamê' yên ji rêzê li ber nedibûn ti tişt. Dema ku mirov li çîroka kesê yekemîn ê bûrjûwaziya komarê Vehbî Koç û holdînga wî binêre, mirov ê karibe tevahiya çîroka bûrjûwaziya Tirkiyê bibîne. Em nabêjin bûrjûwaziya Tirk pêk nehat an jî hîç nebû; em dibêjin, divê mirov binêre ka çawa bi awayekî berbiçav pêk hatiye û di vê çarçoveyê de analîz bike.

Di dema modernîteya kapîtalîst de weke hêza avaker a bingehîn ji hêza sermayeya Cihû kes nikare gumanê bike. Ji hêza wê ya entelektuel û çandî guman nayê kirin. Di heman demê de ji rola pêşeng a rewşenbîr û kedkarên Cihû di îdeolojiya bindestan û tevgerên wan ên piratîk de qet guman nayê kirin. Li vir armanca me ew nîne ku em hisên antî-Semîtîk xurt bikin, em dixwazin pozîsyona civakî-dîrokî ya kapîtalîzmê û tevgerên dijberê wê, rast diyar bikin.

Di sala 1918’an de bi têkçûna Împaratoriya Elman re li Ingilîstan û Hollandayê sermayeya Cihû ya navendîbûyî derket pêş. Ya rastî, ji sedsala 16. ve di têkoşîna hêza hegemonîk a herdu aliyan de (berê Împaratoriya Spanyayê, piştre Împaratoriya Franseyê, herî dawî jî Împaratoriyên Elman, Rûs û Osmanî) ku timî di warê neteweyî de hevrikê hev bûn, di dawiya dawî de Ingilîstan serketî bû. Di vê serketinê de rola sermayeya Cihû gelekî girîng e: Çawa ku rola wê di avakirina mêtingeha berê ya Ingilîstanê DYE’yê de û kirina wê ya hêza hegemonîk de girîng bû. Divê mirov sedemên derketina holê ya Hîtler û Naziyan di vê rastiyê de bibîne. Sermayeya Cihû mîna ketibe dirûvê Elman di avakirina kapîtalîzmeke dewletê ya yekdestdar û şoven de bi roleke stratejîk rabû û ji têkçûna Elmanyayê ya di sala 1918’an de berpirsiyar hat qebûlkirin. Partiya Hîtler ji bûrjûwayên piçûk ên fikirteng û korfêhmî pêk dihat. Îdeolojiya şoven a pê hatibûn mezinkirin, dihişt ku ji Cihûyên bi dirûvê (bi maske) Elman gelekî nefretê bikin. Ev nefret bi qirkirinê bi encam bû. Ji ber ku ji hegemonya Ingilîstanê û damezrandina Rûsya Sovyetê jî wan Cihû berpirsiyar didîtin. Herweha gelek sosyalîstên bi koka xwe Cihû yên mîna Rosa Luxembûrgê di şerê navxweyî de bi rola pêşeng rabûbûn. K. Marks jî bi koka xwe Cihû bû. Dema ku mirov van sedem û faktoran hemûyan bîne cem hev, wê rastiya kapîtalîzmê û qirkirinê baştir bê fêhmkirin.

Rastiyeke din a girîng ku divê mirov li vê mijarê zêde bike, cudahiya di navbera milliyetgiriya (Siyonîzm) Cihû û gerdûngeriya Cihû de ye. Herçiqasî Îsraîl ango milliyetgiriya Cihû di pozîsyoneke bi bandor de be, Cihûyên gerdûngir hem di qada sermayeya navneteweyî de hem jî di bereya kedkaran de timî xwedî bandor bûn. Cihûyên milliyetgir navenda bala wan Îsraîl e, Cihûyên navneteweyî bi rêya şîrketên global bala wan li ser ekonomiya dewleta netewe ya xwecihî û yekdestdariyên desthilatdariyê, li ser pozîsyona wan a bi hêz li van deveran, li ser rola wan a di nava şîrketên navneteweyî, medya û xebatên çandî de ye.

Her çand û îdeolojiya dewleta netewe ya milliyetgir, kêm an jî zêde ne bi tenê rengê vê sermayeyê digire, bi wê bi xwe ve girêdayî ye. Çawa ku destê wê di her yekdestdariya dewleta netewe de heye, di yekdestdariya ekonomîk de destê sermayeya Cihû ya gerdûnî heye: Çawa ku di tevgerên azadîxwazî û wekhevîxwaziyê yên bindestan de rola gerdûnî ya Cihûyên sosyalîst heye.

Ji ber sedemên stratejîk (Îsraîla li Filistînê bê avakirin) çi di dema derketina holê de, çi jî di dema ketinê de erdên Anatolyayê ji bo Cihûyan xwedî roleke dîrokî bûn. Ji Babîlan, Asûran, Ereban, Roma û Bîzansê ve ev rola stratejîk her bi vî rengî bû. Çawa ku rêya derketina ji Qudsê di Anatolyayê re (hinekî jî Mezopotamya) dibe, rêya ketina wê jî dîsa di Anatolyayê re dibe. Lewma ji bo Siyonîstan Anatolya rawestgeheke stratejîk û kevirê girîng ê derbasokê ye ku pê xwe bigihînin Îsraîlê. Jixwe xeta Îzmîr-Manîsa, Selanîk-Edîrneyê, ji aliyê komeke Cihû ve demeke dirêj weke dayikniştimanê hat nirxandin. Ji ber vê jî ev der pêşdebirin û bi pêş xistin.

Enwer Paşa yê modela Elman ji xwe re kiribû mînak darbeya wî ya di 1'ê Çileya 1913'an de kirî di vê çarçoveyê de girîng e. (Berê jî di dema îlana Meşrûtiyetê de pêngaveke wî ya bi vî rengî hebû.) Di wê demê de kadroyên Cihû li Elmanyayê xwedî statuya herî bi hêz bûn. Enwer Paşa û koma wî jî ji aliyê kadroyên di vê statuyê de yên mîna Liman Von Sander û Goltz Paşa ve hatin perwerdekirin. Hilweşîna Împaratoriya Elman û Osmanî, pêşengî da kadroyên Cihû yên alîgirên Ingilîstanê. Di dema Şerê Rizgariyê de xwelihevrakişandina mezin a li ser pêşengiyê bi vê destguhertinê ve girêdayî ye. Herçiqasî rastiyek e ku çûyîna M. Kemal Paşa ya Samsûnê bi erêkirina Ingilîstanê ye, di serîrakirina Anatolyayê de rola wî li ser bingehê welatparêzî û serxwebûnê ye. Bi serwextbûna li vê rewşê Ingilîstanê du tedbîr girtin: Ji derve destekê bide dagirkeriya Yewnan û isyanê bitepisîne; eger ev nebe, li hundir bi destê Îsmet Înonî û Fevzî Çakmak, Mistefa Kemal kontrol bike. Bi têkçûna Yewnaniyan re (bûrjûwaziya Yewnan a hevkar weke rêûresm alîgirê Ingilîz û DYE'yê ye) bi tevahî giranî ket aliyê Îsmet Înonî û Fevzî Çakmak ango mehkûm bûn ku van herdu kesan bi hêz bikin. Îsmet û Fevzî Paşa, ne li serê isyanê bûn û ne jî xwediyê biryara wê bûn, herdu jî li Stenbolê di nava artêşa li bin destê Ingilîstanê û hevgirtiyên wê de li ser wezîfeyên xwe bûn. Ti tedbîr nehatin girtin, paşê tevlî tevgerê bûn, ya rastî ew şandin. Li ser vî bingehî ji pênc paşayên pêşengî ji isyanê re kirin çarê wan Kazim Karabekir, Elî Fûat Cebesoy, Raûf Orbay û Refet Bele bi sedemên cûrbicûr hatin tesfiyekirin. Mistefa Kemal Paşa ma, ew jî bi sedema pozîsyona wî ya stratejîk û polîtîkaya wî ya tewazunê li cihê xwe ma. Bi komployên zincîrwarî yên sala 1925'an bi ya li dijî Şêx Seîd dest pê kirin xwestin rejîma em dikarin jêre Faşîzma Spî ya Tirk bibêjin weke bernameyeke siyasî pêk bînin, herçiqasî vê weke sîstemeke Tirkparêz a laîk bidin naskirin, ev bi xwe metafizîk e, dînekî nû yê bêhtir dogmatîk û terorîst e; îdeolojiya Cihû ya di vê mijarê de xwedî tecrûbeyeke dîrokî ye, kirasê vî dînê nû li gorî demê li Komara Tirkiyê kiriye. Xwedakirina Mistefa Kemal, pêxemberkirina Îsmet Înonî, fermandarkirina Fevzî Çakmak (mînaka Yeşûa û Dawid) li gorî mîtolojiya Cihû ye. Îdeolojiya dînê nû Tirkparêzî ku li derveyî pirraniya civaka Tirk hat îlankirin û kirin bernameyeke siyasî, koda genetîk a teror, qirkirin û mêtinkariya heta roja me ya îro dewam dike, pêk tîne.

Li Îzmîrê li dijî Mistefa Kemal ketin nava hewldaneke reşkujiyê û bi vê xwestin wî bitepisînin. Bi isyanên Kurdan ew kirin nava provokasyonê. Hevalê wî yê nêz Fethî Okyar bi vê sedemê (ew alîgir nebû ku isyana Kurd bi xwînrijandinê were tepisandin) ji serokwezîrtiyê hat girtin û li şûna wî Îsmet Paşa hat wezîfedarkirin. Artêş jî bi temamî ji kontrola Fevzî Çakmak re hat hiştin. Statuya Mistefa Kemal êdî bi nasnavê Serokkomariyê sembolîk e, û bi awayekî li Qesra Çankayayê mîna girtiyekî ye. Tê gotin di Şerê Rizgariyê de Ingilîstan jî têkçûye. Ev rasterast derew e. Ji sala 1922'an ve rola Ingilîstanê di rizgariya muhtemel de hema hema zelal bûye. Ji mêj ve hew destekê dide Yewnanistanê (Ingilîstanê Siltan Wehdeddîn jî vekişand), bi xas kadroyên xwe ketiye nava avakirina dewleta netewe, ji împaratoriyeke giregir bi Komareke Tirkiyê ya di Anatolyayê de tengavbûyî gihiştiye armanca xwe. Delîlekî din ê vê yekê ew e, Komar li ber bêvla Rûsya Sovyetê timî weke dîwarê bendavekê hat danîn. Ji lewra qirkirina

sosyalîstan a ku bi Mistefa Suphiyan dest pê kir, heta roja me ya îro dewam kir. Qirkirina Ermeniyan bi tenê destpêkek bû. Ji aliyê çandî ve qirkirina Kurdan hê jî dewam dike. Hindikayiyên din, çandên din, Suryanî û Tirkmen, kirin ku li ber hovîtiya Tirkparêziyê û li ber qirkirinên piçûk ên tevlîhev ji ber xwe, ji xwe bigerin.

Mirov dikare bipirse, çi têkiliya van hemûyan bi Cihûtiya gerdûnî û milliyetgir, herweha bi sermayeya Cihû re heye. Bêguman pirseke bi vî rengî pirseke pûç nîne, pirseke bingehîn û nazik e ku mirov dikare pê dîroka Tirkîtiyê ya dused salên dawî fêhm bike. Dîroka Tirkîtiyê ya Tirk di navê de tine ye, avakirineke îdeolojîk e; weke teorî û pêkanîn nîv bi nîv beriya Filistînê amadekariya Pêş-Îsraîlekê ye. Eger polîtîkayên tewazunkar ên Mistefa Kemal nebûna (li derve Yekîtiya Sovyetê û Ingilîstan, li hundir di navbera çînên cûrbicûr û tebeqeyan de), ti hêzê nikarîbû pêkhatinên nû yên li Anatolyayê ji kontrola Enwer Paşa û kadroyên Îttîhad û Teraqiyê derxista û nikarîbû pêşî lê bigire ku Tirkparêzî neçe faşîzmeke şoven a ku faşîzma Elman li ber ne tiştek be. Ev jî wê bibûya sedem ku Komar hê beriya bigihêje Şerê Cîhanê yê Duyemîn hilweşiya. (Gelo komar ê ava bibûya? Ev jî pirseke din e) Beriya Şerê Cîhanê yê Duyemîn mirina Mistefa Kemal, di navbera salên 1938-45’an de reqabeta Ingilîstan û Elmanyayê li ser Tirkiyê-Anatolyayê, piştî salên 1945’an vebirrî pêkhatina hegemonya DYE’yê, dewleta Tirk bi ketina NATO’yê tercîha xwe ya ji bo sîstemê fermî kir û ev bi awayekî dewama salên 1922’an in. Partiya Komarê CHP bi awayekî sîgorteya sîstemê bû. Sîstema bi darbe û kompoloyan heta serê salên 2000’î hat meşandin navekî wî yê din ‘Faşîzma Spî ya Tirk’ bû. Mebest jî ji vê ew e, Tirkîtiya çêkirî û li gorî vê Tirkîtiyê bi terorê homojenkirina civakê ye; çi kes û çanda li derveyî vê danasînê bimîne mafê wê yê hebûnê nas nakin.

Kapîtalîzma Tirkiyê beşa wê ya xwe Anatolyayî dihesibîne û kirasê Îslamî li xwe kirî bi teoriya ‘Kembera Kesk’ a hegemonya DYE’yê ji spî ber bi kesk ve şemitî ji serî ve li pey gavavêtinekê bû. Çepgiriya Tirkiyê û Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê ev firsend danê. Faşîzma Spî ya Tirk di şerê xwe yê li dijî Çepgiran û Tevgera Azadiyê ya Kurd de hilhilî û tecrîd bû û vê jî kir ku baskê Anatolyayî bi hêz bibe. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê Tevgera Milliyetgir a Îslamî, hem li dijî gelên herêmê, hem jî li dijî belavbûna Rûsya Sovyetê di rewşa berbiçav a Tirkiyê de pêşî bi koalîsyonan, piştî salên 2000’î jî bi tenê li desthilatdariyê bi cih kir. Di Faşîzma Spî ya Tirk de milliyetgiriya Siyonîst a Cihû çiqasî bi bandor be, di Faşîzma Kesk a Tirk de jî sermayeya gerdûnî ya Cihû ewqasî bi bandor e. Van kesan herî dawî biryar daye ku AKP ji bo wan partiya sîgorta ye. Di derketina holê ya bûrjûwaziya burokratîk a Tirkiyê de milliyetgiriya Siyonîst a Cihû çiqasî bi bandor bû, di mezinbûna bûrjûwaziya Anatolyayê (jêre sermayeya taybet û lîberal jî tê gotin) û li desthilatdariyê bi cihbûna wê de sermayeya global a Cihû jî (Karaîmî) ewqasî bi bandor e. Enwer Paşa, Nîhal Atsiz, Alparslan Turkeş û MHP’ê xwestin faşîzma bi cureyê Hîtler temsîl bikin. Hêjayî gotinê ye, Partiya Tevgera Milliyetgir MHP’ê damezrandina xwe disipêre Partiya Millet a Fevzî Çakmak. Têkçûna Elmanyayê şensê desthilatbûnê yê vî baskê Faşîzma Reş a Tirk kêm kir. Hersê

baskên faşîzmê şaxên xwe ji derve ji hêzên hegemonîk tên û kîjan hêz li ser sîstemê serwer bibe bila bibe weke dewama wê li desthilatdariya hundir bi cih dibin.

Dîroka dused salên dawî ya Tirkiyê ji hêzên hegemonîk ên derve serbixwe nîne; bi girêdaneke hişk statuya 'valîtiya taybet' bi îhtîmam pêk anîne. Ji ber statuya Tirkiyê ya li fitlonekeke krîtîk e, bivênevê tewazuna hegemonîk a navneteweyî bi awayekî xweser xwe lê nîşan dide. Tevî îdeayên tûj ên serxwebûnê hemûyan, welat, netewe û dewleta netewe ya herî zêde sîstema hegemonîk xwe lê bi cih kiriye û bi girîngî bi xwe ve girêdayiye, Tirkiye ye. Sîstema hegemonîk a kapîtalîzmê rast ji hev neyê derxistin, Tirkiye jî rast ji hev nayê derxistin. Berevajiyê vê jî dibe. Çareseriya gerdûnî ya sîstemê çareseriya Tirkiyê ye. Bi vî awayî jî wê rastiyên qirkirinê ji hev bêne derxistin.

**c-** Terora li ser gelên Xiristiyan, ceribandina asîmîlasyon û qirkirina Ermenî, Suryanî, Pontûs û çandên cihê yên Misilman bi tenê em dikarin bi pêkanînên modernîteya kapîtalîst li ser cografya Anatolya û Mezopotamyayê ji hev derxin. Mirov qirkirina Ermeniyan bi tenê bi Faşîzma Spî ya Tirk (tevgera bi bernameya siyasî û îdeolojîk a fermî ya Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê û CHP'ê) ve girê bide wê nêzîkatiyeke teng be. Di bingehê vê qirkirinê de sedemên civakî yên gelekî tevlîhev û dîrokeke rîşên xwe kûr berdide heye. Bi qasî sermayeya Cihû nebe jî tebeqeya jor a qebîleyên Ermenî di pêkhatina çanda Rojhilata Navîn de cihekî girîng digirin. Ji ber ku Ermeniyan ji xwe re bajar zû kirin navend, jêhatîbûna wan a di bazirganiyê de û hostebûna wan a di warê zenaetkariyê de, ew hê ji dema dewleta Hîtîtiyan ve kirin xwediyê sermayeyê. Nexasim di bajarvaniya Anatolya û Mezopotamyayê de bi rola aktorê bingehîn rabûn. Bi Xiristiyaniyê re (bi salên 300'î P.Z. re) hem ev rola wan gelekî cuda bû, hem jî hebûna wan bêhtir berbiçav bû. Bi awayekî jidayikbûna pêşwext a kapîtalîzmê li Rojahilata Navîn pêk anîn. Em dema pêşwext dibêjin, em behsa jidayikbûneke sîstematîk dikin. Naxwe daneheva kapîtalê ji dema Sumeran ve ji aliyê hêmanên her çanda marjînal ve pêk dihat anîn. Bûrjûwaziya Ermeniyan bi Xiristiyaniyê re cara pêşî ev danehev sîstematîk û bi tesîr kir. Statuya wan a bi tesîr a di bazirganî û zenaetkariyê de ev yek mumkîn dikir. Daneheva sermayeyê her tim li hêrs û dijberiya civakên qebîle û eşîrên kominî rast tê. Lewma zirar û ziyanê li çanda wan a wekhevîxwaz dike. Bi pêşdebirina bajar, çîn û dewletê rê li ber nakokiyên sazîbûnê vedike. Di bingehê qirkirina Ermeniyan de divê mirov nakokiyên bi vî rengî timî li ber çavan bigire.

Sedsala 16. destpêka serdema mezinbûna modernîteya kapîtalîst e, di heman demê de sedsala mezinbûna bûrjûwaziya Ermeniyan e. Hem di nava Îranê de, hem jî di nava Împaratoriya Osmanî de, di pîşesaziya manîfaktur (dezgehdarî) û bazirganiyê de bi rola sereke radibûn. Tevî bajarên Bender Abbas û Îsfahanê, di ser Îran, Stenbol û Îzmîrê re di nava yekdestdariyeke bazirganiyê ya berfireh de ku xwe dighand Ewrûpa û Rojhilatadûr a Asyayê, xwediyê pareke mezin bûn. Li çend bajarên sereke û pêşketî yên diyar taxên Ermeniyan hebûn. Heta bi sedsala 19. bûrjûwaziya

mezin û piçûk a Ermeniyan di qada ekonomîk de bi bandor e. Di hunerê mîmarî de jî xwediyê roleke pêşeng in. Li bin gelek berhemên mîmarî yên Rojhilata Navîn mohra wan heye. Mîsyonerên Xiristiyan ên Rojavayî bi sedsala 19. re kengî li nava Împaratoriya Osmanî ketin nava xebatê yek ji hedefa wan a pêşî ew bû, Ermeniyan bigirin cem xwe. Dêrên Suryanî û Rûman xwe bi xwe têra xwe dikirin. Dêrên Ermeniyan di rewşeke krîtîk de bûn. Di nava gelên Îslamî de bi awayekî gelekî belav bi cih bûbûn. Cografyayên lê pirranî bin, pirr kêm bûn. Nexasim li Anatolya û Mezopotamyayê di çarçoveya dabeşkirina kar de cihûwarên têkel xisleta bingehîn a avabûna demografîk bû.

Ewrûpayê bi milliyetgiriya sedsala 19. bi xebatên propagandayê û dibistanên bi destê misyoneran vekirin bivênevê wê bandoreke bi hêz a tevdan û sorkirinê li ser civaka Ermeniyan bikirana. Ji vê jî girîngtir, bûrjûwaziya Ermenî ya bi pêngava pêşî ya globalbûnê ya sermayeya Ewrûpayê re hevkarî kir, çawa ku li tevahiya Ewrûpayê pêk hat, gelekî ket bin bandora milliyetgiriya bi armanca dewleta netewe. Ev bûrjûwaziya Ermenî ket derdê bazara neteweyî ya karibe sermayeya xwe bi awayekî ewle lê bi kar bîne. Çawa ku Cihû bi pey peydakirina welatekî ketin, xwesteka Ermeniyan jî ji bo welatekî, bi hêz ket rojevê. Civaka Ermenî gelekî kevnare yê cihwar bû, lê ji statuyeke pirranî û homojentiyê mehrûm bû. Ji lewra gera li dewleta netewe armancek wisa bû ku bi xwe re bûyerên bi tehlûke dianîn.

Rêxistiniyên milliyetgir ên di duyemîn nîvê sedsala 19. de pêşxistin, armanc ji wan ew bû di nava împaratoriyê de li gorî rêjeya hejmar û sermayeya xwe tevlî siyasetê bibin. Ev jî bernameyeke bêhtir realîst bû û qabîliyeta wê ya pêkanînê hebû. Di Meşrûtiyeta Yekemîn û Duyemîn de têra xwe serketî bûn. Lê di dawiya sedsala 19. de milliyetgirî derketibû asta herî jor û di serê sedsala 20. de ber bi daxwaza dewleta netewe ya serbixwe ve çûn. Li ser erdên daxwaza wan dikirin, di serî de Kurd û Tirk gelek çandên cihê hewiyabûn. Eger pêkhatineke mîna Partiya Karker a Sosyal Demokrat a Rûsyayê hebûya, belkî jî li ser bingehekî mîna Şoreşên Rûs ên 1905 û 1917’an di Împaratoriya Osmanî de avakirina sîstemeke federatîf bikira armanc belkî bibûya rêbaza herî rastî ya çareseriyê. Partiyên Çepgir ên Hinçak û ya Rastgir a Taşnak nikarîbûn ji rêxistiniyên milliyetgir ên hişk û teng bibihurin.

Di bin trajediyê de sedemeke din a dîrokî heye, ew jî milliyetgiriya Ermenî ye ku ji Xiristiyaniyê bi tesîr bûye û rê li ber reaksiyonên dijber vekiriye. Çawa ku milliyetgiriya Cihû li Ewrûpayê rê li ber reaksiyên antî-Semîtîk vekir, nerazîbûneke bi heman rengî di nava civakên Misilman de holan da. Ji vê jî xeternaktir, hevrikiya wê ya bi bandora sermayeya Cihû ya di nava Împaratoriya Osmanî de bû. Bi giştî, hê di dema salên damezrandina Împaratoriyê de, di dema fetha Stenbolê de û nexasim piştî ku Cihûyên ji Spanyayê hatin qewitandin li Stenbol û Selanîkê hatin bicihkirin, vê nakokiya di navbera sermayedarên Xiristiyan û sermayedarên Cihû de dest pê kir, her ku çû sor bû. Lewma sermaye û çanda Ermenî û Rûman di nava împaratoriyê de hukmên xwe kevin,

domdar û zêde bûn. Jixwe karûbarên bazirganî, malî û sinaî yên împaratoriyê di nava van hersê etnîsîte, herdu dîn û milletan (di sîstema Osmanî de ji van re millet dihat gotin) de hatibûn parvekirin. Lewma bivênevê wê di navbera wan de reqabet çêbûya. Hegemonîkbûyîna kapîtalîzma Ewrûpayê û belavbûna wê li ser împaratoriyê, ev reqabet bêhtir sor kir. Di sedsala 19. de, hersê komên etnîk bi tenê bi daxwazên parvekirina desthilatdariya bi hêz ranedibûn, gera wan a li welatekî jî çêdibû. Ev lêgerîn bi hev re nakok bûn û reqabet sor dikirin. Herweha di dema derketina Xiristiyaniyê de Hz. Îsa ji aliyê hevkarên Cihû yên Waliyê Romayê ve li çarmîxê hat xistin û lewma ev yek bi giştî di navbera Xiristiyan û Cihûyan de dibû sedema jihevnexweşbûn û nefretê. Dema ku ev faktor hemû digihiştin hev, sermayedarên Cihû yên di têkiliyên malî de bi hêz bûn, di qesra Osmanî û burokrasiya wê de xwedî gotin bûn, pozîsyoneke serdest dagir dikirin.

Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê bi destekeke xurt a Cihûyan a hem ji aliyê îdeokojîk ve (xebatên Tirkparêziyê), hem jî ji aliyê maddî ve (ji bo xwedîkirinê, çavkaniya rastî ya Tirkparêziyê bûn) hat avakirin û bipêşxistin. Li ser navê millîtarîzma Elman beşekî mezin ê paşa û serbazên ji bo avakirina artêşa Osmanî ya modern di perwerdeyê de cih girtin, bi koka xwe Cihû bûn. Hem di îlankirina Meşrûtiyeta Duyemîn de, hem di tepisandina darbeya dijber a 31’ê Adarê de, hem jî di Şerê Rizgariya Neteweyî yê piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn de kadroyên Cihû bi roleke stratejîk rabûn û di vê rola xwe de serketî bûn. Bi tevahî berhemên bingehîn ên Tirkparêziyê, cara pêşî ji aliyê rewşenbîrên Cihû ve yên weke Vambery û Cohen ve hatin weşandin. Ew afirînerên rastî yên îdeolojiya Tirkparêziyê bûn. Tevî ku pirraniya civaka Tirk di nava rastiyeke berevajiyê vê îdeolojiyê de ye jî lê ji ber perwerdenebûn û birêxistinnebûnê bê bandor bû, lewma ev kadroyên Cihû di jinûve avakirina dewletê de bi destê Îttîhad Teraqî û CHP’ê bi rola kakilên bingehîn rabûn. Li hemberî vê serdestiya eşkere ya Cihûyan, bandora Ermenî û Rûmên Xiristiyan di avakirina dewleta nû de şensê xwe gelekî kêm bû. Di ekonomiyê de hebûna wan a bi hêz, dihişt ku bêhtir bibin hedefa reqîbên xwe (sermayedarên Cihû û çîna kapîtalîst a kolektîf dewletdar Tirkgir a ku wan pêk anîbû) yên li desthilatdariyê. Jixwe dema ku Komar hat îlankirin tiştekî wan ê zêde wê li dawiyê nemaya.

Qirkirina Ermeniyan di nava vê tabloya giştî de beşê herî trajîk e. Kengî ji bo dewleta netewe rabûn (beriya 1914’an û salên destpêkê yên şer), di çarçoveya biryara rêveberiya Îttîhad û Teraqiyê ya 24’ê Nîsana 1915’an de bi êrîşekê ji welatê xwe yê hezarê salan hatin derxistin û li ser rêyan hatin kuştin, yên mayî jî bûn mehkûmê jiyaneke dîasporayê ya demdirêj. Dîaspora ji bo Ermeniyan rastiyek e, lê rastiyeke gelekî bêkêf, şikestî û hilweşiyayî ye. Bi dewleta netewe ya piçûk a Ermenî belkî dilê xwe xweş kirin. Di qirkirinê de ji bilî bûrjûwaziya Tirk, mirov dikare behsa para feodalên Kurd jî bike. Ev kesên ku gunehkarên rastî ne, bi tenê di qirkirina Ermeniyan de cih negirtin, di heman wextî de bi gelek awayên cuda, nexasim bi Alayên Hemîdiye di qirkirina Kurdan de jî cih girtin. Di qirkirina Kurdan de ya ku hê dewam dike weke

‘cerdevanên gundan’ di berdêla înkara Kurdîtiyê de milk û sermayeya xwe zêde dikin û kengî pêdivî pê dibînin Kurdîtiyê jî dikin û bi vî awayî rola xwe ya bi lanet dewam dikin.

Ti mînaka dewleta netewe bi qasî şerê dewleta netewe ya Tirk û Ermeniyan rejîmeke qirkirinê (bi giştî înkarkirina dîrokê û tinekirina otorîteya demokratîk û çanda xwecihî) baş hînî mirov nake. Trajediya Ermeniyan, ji ber zû kapîtalîstbûna bûrjûwaziyekê, asteke çandî ya di ser cîranên xwe re û lîstikên bêrehm ên hegemonya kapîtalîst (ji ber berjewendiyeke piçûk a rojane dîrokeke hezar salî ji ber çavên xwe avêtine) pêk hatiye.

Qirkirina Suryanî-Keldaniyan jî bi heman mekanîzmayê, îcar li hundirê başûrê Kurdistanê pêk tînin. Çîroka kokqelandinê ya van sê çandên Xiristiyan û versiyonên wan ên din ku ji Asûr, Babîl û Aqadan (li gorî ku Mehelmiyên Mêrdînê xwe disipêrin Aqadan) mane, têra xwe trajîk e. Ev gelên ku demekê bi çanda sê împaratoriyên (Aqad, Babîl, Asûr) bi heybet rabûne, belkî jî di dîrokê de qewmê pêşî yê zenaetkar û bazirgan bûn. Çavên xwe li bajêr vekiribûn û li bajêr mezin bûbûn. Hûrûkûr bi heybeta mîtolojî, dîn û hunerê tamijîbûn. Çanda Sumeran gihandibûn dinyayê. Ew qewm bûn ku şaristanî gihandibûn dinyayê. Ji vê dîroka bi heybet a pênchezar salî bi tenê weke ku bi tenê mîrateyeke muzewarî mabe: Hinek xirbe û bermahiyên dêrên xweser, çendek zenaet û hinek jî asarên mîmarî û hunerê modeyê. Serhatiya wan jî dişibe ya Ermeniyan. Ji xisletên wan ên rastî ne ku xwediyê kapîtala pêşî ya bi salên 2000’î B.Z. dest pê kiriye, karxaneyên (Kar=karûm, bi maneya kargeha serdema destpêkê ye) pêşî vekirine, xwediyên karwanên pêşî ne. Koloniyên pêşî yên bazirganiyê wan ava kirin. Bazirganên berhemê herî baş ê tevnê bûn. Pêşengên zenaetkariya têlkariyê, zîv û zêrkerên hostekar bûn. Nivîskarê bi hezaran nameyên li ser kevalên tûxle û muhasebeya bazirganiyê bûn. Bi qasî vî aliyê dîrokê yê serê mirovan pê bilind bibe, aliyên wê yên xemgîn dikin, di zikhev de her hebûn.

Gotinek heye ji bo Romayê dibêjin, “Bi Xiristiyantiyê xisletên xwe yên şerkeriyê ji dest dan û lewma hilweşiya.” Mirov dikare vê gotinê ji bo gelên Xiristiyan ên Rojhilat jî bibêje. Gelo heke van çandên antîk xwe li Xiristiyantiyê negirtibûna, şensê wan ê manê wê bêhtir nebûya? Pirs girîng e, û bi rastiya rojane re têkildar e. Ew gelên pêşî bûn ku bûbûn Xiristiyan. Ew û Ereb ji heman kokê bûn. Wan şaristanî bi Ereban dabûn nasîn. Di derketina holê ya Îslama Ereb de jî amadekarê rastî ne. Bi qasî mîrateya çandî barhilgirê bazirganiyê jî bûn. Ji Çîn û Hindê heta bi Ewrûpa û nava Efrîkayê bi tenê mal nebirin, gelek nirxên dewlemend ên çandî birin, nirxên çandî afirandin. Di navbera çandan de tercûmanî kirin. Ha gelên em behsa wan dikin xwediyê vê mîrateya dîrokî hemûyî ne, yek ji mijarên sereke yên dîrokê ne ku hêja ye mirov li ser çîrok û serhatiya wan bisekine, lêbikole û bibîne ku çawa koka wan hat qelandin. Ji ber ku hem di serê mijaran de, hem jî di serê pirsgirêkan de cih digirin.

Dibe ku bêşensiya van gelan ew bû, beriya Xiristiyantiyê di Serdema Antîk de hêmanên pêşî kapîtal nas kiribûn di nava xwe de dihewandin. Laneta kapîtalê bi Cihûyan jî gelek êş û azar da

kişandin. Qirkirin bi serê wan de hat di encamê de têkiliya wê bi serketina wan a di kapîtalîzmê de heye. Rewşên bi heman rengî, mirov dikare li cem çandên din ên xwedî kapîtal bibîne. Jixwe bi awayekî seferên tevkujî û talanê yên bêrehm ên Împaratoriyên Aqad, Babîl û Asûran vegera van kapîtalan e. Ango qanûna hinekî pêk tê ev e, 'neke, bila neyê serê te.' Ji salên 600'î B.Z. ve, ev çandên antîk ên Mezopotamyayê hegemonya xwe pêşî bi destê Med û Persan, paşê jî bi destê Skender, Helen, Roma û Bîzansiyan ve berdan, lewma weke gelên damezrîner ên Xiristiyantiyê diviyabû bi awayekî bibin xwediyê berxwedanê. Ev çandên weke Suryanî û Keldanî nav guhertin, li dijî Roma, Bîzans, Pers û Sasaniyan bi çanda Xiristiyantiyê bersiv dan. Ev tespîteke girîng e. Ji ber ku têra xwe hêza wan a fizîkî tinebû, dikarîbûn hebûna xwe bi hêza nerm, ango bi çandeke nû ya dînî dewam bikin. Neçar bûn Xiristiyantiyê biafirînin. Eger bi awayekî din tevbigeriyana wê di bin piyên herdu hêzên hegemonîk de bipelixiyana, tine bibûna. Ji lewra zimanê nerm ê Xiristiyantiyê ("Dema li aliyê rastê yê rûyê te dan, serê xwe bizîvirîne bila li aliyê çepê yê rûyê te bidin) ne tercihek e, neçariyek e. Li ser vî bingehî, ji çanda împaratoriyê ya kevin û pûtperestiya wê, li dînê nû yê çand û aştiyê yê xizanan vegeriyan, veguherîn. Ev veger û veguherînek ji çanda dîroka zalim ber bi çanda mazlûm ve bû. Di vê çarçoveyê de Xiristiyantî di sêsed salên xwe yên pêşî de li derveyî sîstema koledar tevgera herî ji dil a wijdanî û exlaqî ya mirovatiya kolektîf e. Ji şêweyên pêşî yê herî girîng ê bîrbirina azadiyê ye. Çanda Babîl, Asûr, Grek û Ermenî çandên herî pêşketî yê wê demê ne.

Di rêûresma pêxembertiya Cihû de Quds di statuya navendeke girîng de ye. Ya rastî, piştî Ûrfayê duyemîn perestgeha girîng a navend e. Di dema Romayê de kengî tebeqeya jor a dînî serê xwe ji hevkartiyê re tewand weke nûnerê tebeqeya jêr rê li ber Hz. Îsa vebû. Kengî tebeqeya jor a dewlemendên Cihû bi Romayê re bûn yek, hingê alîgirên Îsa ketin rewşa hindikan. Di vê rewşê de komên mayî yên herî bi çand Grekî, Asûrî, Babîlî û Ermenî ji wan gelan bûn ku herî zêde xwedî li Xiristiyantiyê derketin û ew weke tevgera rêxistinî û bîrbirina kolektîf parve kirin. Lewma mirov dikare Xiristiyantiyê weke tevgera piştgiriya di navbera qewm û qebîleyên pêşî, xizan û bindestan de jî binirxîne. Bi awayekî, şêweyê destpêkê yê Enternasyonala Kominîst e.

Helen, Ermenî, Suryanî û Keldanî ji salên 300'î P.Z. ve li dora patrîkan hewiyan û dêrên xwe ava kirin, bi vî awayî dîn bi sazî kirin. Bûn gel û qewmên Xiristiyan. Li gorî dema xwe ev veguherîneke girîng bû. Heta bi derketina holê ya Îslamê jî di vê mijarê de gelekî serketî bûn. Gelekî beriya Ewrûpayê di şaristanî û çanda Rojhilata Navîn de qonaxeke dîrokî pêk anîbûn. Heta bi sedsala 6. erdên Bîzansa Rojava bi temamî kirin Xiristiyan û Tevgera Xaçperestan a dîrokî ya bi lez bi nava Ewrûpayê ve belav bû ji zû ve dabûn destpêkirin. Heta bi sedsala 10. wê wijdan û aqlê Xiristiyantiyê mohra xwe li tevahiya Ewrûpayê bide. Ewqas bi hêz bûbûn, hema bêje ji aliyê dînî ve (paşvexistina Zerdeştîtiyê) li Rojhilat Împaratoriya Sasanî anîbûn ber hilweşînê. Heta bi nava Hindistan û Çînê ve çûbûn. Di vê de dîndarên Suryanî patrîk bi rola pêşeng radibûn. Xiristiyantî tam wê bibûya dînê dinyayê, Îslamiyet derket holê.

Şervanên pêşî yên Îslamiyetê ango mucahîdên wê yên bi rola kakilên pêşeng radibûn, ji bawermendên pûtperest ên dînên destpêkê anîmîzm û totemîzmê quliptîbûn, pêk dihatin. Di vegotinên Hz. Muhammed de diyarên şaristaniyê weke ‘cennetê’ hatibûn teswîrkirin. Ya rastî, çûyîna dinya din a di têgîna cennetê de, welatên jiyanxweş ango diyarên şaristaniyê yên mirov di berdêla wan de heta ku can bide jî şer dike, îfade dikir. Paşê gotinên Hz. Muhammed ji aliyê suxteyên wî ve hatin berevajîkirin û weke jiyana axretê ya piştî mirinê hatin şîrovekirin. Ya rast, li vê dinyayê fetihkirina diyarên şaristaniyê yên xwedî xweşjiyana cennetê ne. Mirov van deveran bi çolên Erebistanê re bide ber hev rewş wê baştir bê fêhmkirin. Lê ji bo van diyarên şaristaniyê şervaniyeke dijwar a têde mirin û candayîn hebe, dihat ferzkirin. Mirina li vir weke cenneta li axretê hat şîrovekirin. Eger em dixwazin Îslamiyetê rast fêhm bikin, divê em baş zanibin ku şîroveyên bi vî rengî berevajîkirina gotinê ne. Vê soza hatibû dayîn, gelekî bala mirovê qebîleyê yê çolê û paşvemayî kişand. Çawa ku tê zanîn, hê sedsalek neqediyabû, ev mirov ji Okyanûsa Atlasê heta bi Okyanûsa Mezin (ji Fasê heta bi Çînê) belav bûn. Îslamiyet jî weke dînekî Brahîmî ji heman kokê weke versiyona wî ya sêyemîn derket holê. Lewma xwe weke dînê dawî yê temamker û pêxembertiya wî dide nasîn û îlan dike. Herdu versiyonên din weke ku pêdivî bi wan nemabe destnîşan dike, versiyona sêyemîn jî weke dînê temambûyî û Hz. Muhammed jî weke pêxemberê dawî îlan dike, li ser vî bingehî weke şertê dîn û fermana Ellah beyan dike ku divê Îslamiyet weke dînê heq û Hz. Muhammed jî weke pêxemberê dawî bê qebûlkirin. Di vê rewşê de bivênevê wê bi Cihûtî û Xiristiyantiyê re bikeve nakokiyê û şer bike. Ji yek kokê tên, lê ev nuqta wan a hevpar wê nikarîbûya pêşî lê bigirta ku cudabûnên wan ên bi nakokiyên tebeqeya jor a qewm û qebîleyan re bûn yek (roja me ya îro elîtên kapîtalîst û desthilatdar ên dewleta netewe) veneguherin şer û pevçûnê.

Di vê çarçoveyê de nexasim ji bo civakên Suryanî, Helen û Ermenî yên Îslamiyet li cografya wan zû belav dibû demeke neyênî dest pê dikir. Civakên navbihurî pêşî giraniya xwe ya siyasî ji dest dan. Dewlet û desthilatdariyên palpiştiya wan dikirin hilweşiyan. Hegemonya Îslamîk bi şertê ku serî ranekin ew sax hiştin. Di berdêla vê de jî ew bi baceke giran ‘cizye’yê ve girêdan û vê yekê jî kir ku bikevin pêvajoyekê, bibin qewm û gelên her biçe neçar û xizan bibin. Lê tecrûbeyên wan ên çandî û ekonomîk têrê dikirin ku wan di dema desthilatdariyên Îslamî de dîsa dewlemend bike. Desthilatdarî hewcedarî jêhatîbûna wan çandî û ekonomîk bûn. Heman xusûs bi zêdeyî ji bo Cihûyan jî bi vî rengî bû. Li ser vî bingehî, karîbûn hebûna xwe bigihînin heta serê sedsala 19. ango dema belavbûna hegemonya kapîtalîst a li Rojhilata Navîn.

Ji hêzên hegemonîk ên Ewrûpayê Ingilîstan ji bo xeta ji Misrê heta bi Hindistanê bi awayekî ewle kontrol bike li pey hêmanên bi wê ve girêdayî digeriya. Ji aliyekî ve, ev hêman bi destê siltanên Osmanî (bi polîtîkayên zordestî û şantajê) peyda dikir, ji aliyê din ve jî hewl dida wan bi hêmanên xwecihî bi hêz bike. Ji bo vê polîtîkayê Suryaniyan di serê wan hêmanan de cih digirt û munasib dihatin dîtin. Di kontrola kendav û Iraqê de dikarîbûn bi rola pêşeng rabin. Ji aliyê

Bakur jî Çartiya Rûsyayê li ser Ermeniyan heman lîstik dilîst. Xiristiyantî weke faktorên hundir, bi kapîtalîzma pêşwext û xebatên mîsyoneriyê re bi milliyetgiriya bi hêzbûyî Ermenî ber bi felaketê ve birin, Suryanî û Keldanî jî xistin pêvajoya felaketa mezin ango qirkirinê. Mekanîzma di qirkirina Ermeniyan de bi heman awayî di qirkirina Suryanî û Keldaniyan de jî xebitî. Çawa ku li Bakurê Kurdistanê Alayên Hemîdiye di felaketa Ermeniyan de hatin bikaranîn, li Başûrê Kurdistanê jî -li Botan û Behdînanê hê zûtir- di salên 1840'î de begtiyên Kurd li dijî hêzên Suryanî hatin bikaranîn. Tevkujiyên Suryaniyan pêk hatin. Di encamê de hem Tevgera Kurd a bi pêşengiya Bedirxan Beg ku hatibû provokekirin, hem jî Tevgera Millî ya Suryanî a bi pêşengiya patrîk neçar tesfiye bûn. Bi vê provokasyona pêk anîn, burokrasî û siltantiya Osmanî li Kurdistanê, hegemonya Ingilîz jî li Iraqê xurt bû û rehên xwe berdan. Piştî vê tevkujiyê Suryanî careke din bi ser xwe ve nehatin. Li ser rêya dîaspora û jihevbelavbûnê bi lez çûn.

Îslamparêziya Sunnî hê ji dema Emewiyan ve ji bo gelên Xiristiyan rejîmeke talanê bû. Firsend nedida wan ku weke gelekî bi rûmet û xwedî anor bijîn. Ji aliyê çandî û dewlemendî ve li Rojhilata Navîn tesfiyekirina Xiristiyantiyê îşaret bi demeke xeternak a mirov jê bibizde dikir. Jidestdana van çandan jidestdana dewlemendiyeke mezin a zêhniyet û maddî bû, paşveketina hunerê bû. Hêza rastî ya ji pêkhatina van qirkirin û tesfiyeyan berpirsiyar modernîteya kapîtalîst e. Hevkarên wê yên misilman di dereceya duyemîn de xwedî rol in. Yên li ser navê gelên xwe têkoşîna hebûn û azadiyê dimeşînin divê baş zanibin ku bi analîzeke rast a dîrokî û civakî, û bi nêrîneke ji awirê modernîteya demokratîk, dikarin mîrateya çandên bermayî biparêzin û azad bikin.

Di çîroka tesfiyekirina Helenên Anatolyayê de jî xetên bi heman rengî hene. Kolonîbûna Îon a bi salên 1000'î B.Z. dest pê kir, salên 600'î B.Z. di serî de li peravên Egeyê ket herêmên hundir û peravê, û bi vî awayî hîmê şaristaniyeke nû danî. Çanda Rojhilat bi awayekî serketî kiribû malê xwe û bi sentezeke nû derketibû ser dika dîrokê. Di warê zanist, felsefe û huner de mohra xwe li demeke bi heybet dabû. Piştî şaristaniya Sumer bûbû duyemîn qonaxa mezin a şaristaniyê. Berevajî yeqînan, ev şaristanî ji ber Atîna û bajarên din ên li giravê pêk nehat; berevajî, şaristaniya li peravên Egeyê, ji Atînayê heta bi Marsîlyayê peravên Bakurê Deryaspî û Deryareş kiribûn kolonî. Bi fetha Skender, ev şaristanî ji peravên Egeyê heta bi Hindistanê çû. Demeke bi navê Serdema Helen (300 B.Z.-250 P.Z.) vebûbû. Roma û Bîzans li ser vê çandê mezin bûbûn. Heman çandê gelek bandor li Sasaniyan jî kiribû. Bi rêya Suryaniyan tercumeyî çanda Rojhilata Navîn hatibû kirin, lewma di dema derketina holê ya Îslamê û meşa wê ya li ser rêya hikmetê (di felsefeyê de) de ji bo mezinbûna wê bi rola yek ji rehên sereke rabû. Bîzans bi xwe, bi awayekî Împaratoriya Grek a Xiristiyan bû. Tevî ku bi Îslamiyetê re ket pêvajoya paşveçûnê jî heta bi fetha Stenbolê Helenan hêza xwe ya siyasî dewam dikir. Bi fetha Stenbolê re serweriya xwe ya siyasî ji dest dan. Lê mîna Ermeniyan ji pêkanîn û pêşdebirina hêza xwe ya ekonomîk û çandî

paşve neman. Di pêkhatina Împaratoriya Osmanî, deryagerî, bazirganî û zenaetkariyê de cihekî girîng girtin. Wan ev rewşa xwe heta bi avabûna dewleta netewe ya Yewnan (1829) dewam kir.

Piştî vê demê dîrok ji bo wan jî êdî bi êş û elem bû. Di serê sedsala 20. de her ku diçû xwîn ji wan dikişiya. Piştî Şerê Balkanan û Şerê Cîhanê yê Yekemîn rewşa wan zehmettir bû. Hevgirtina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê bi sermayedarên Cihû re tevî wan li dijî hemû gelên Xiristiyan bû. Ji ber ku di şer de alîgiriya Ingilîzan kiribûn berdêla wê giran dan. Di serî de Stenbol, neçar hatin hiştin ku ji gelek bajar û gundan veqetin. Polîtîkayên mîna yên li dijî Ermenî û Suryaniyan hatin meşandin, li dijî wan jî hatin pêkanîn. Piştî Şerê Rizgariya Neteweyî bi rêya mubadeleyê neçar hatin hiştin ku welatê xwe yê sêhezar salî biterikînin. Berjewendiyeke demî û sûkî ya Ingilîzan, kir ku yek ji şaristanî û çanda herî girîng a dîrokê bê tesfiyekirin. Yên mayî jî bi terora Faşîzma Spî ya Tirk hema bêje bi temamî ji Anatolyayê hatin derxistin. Hebûna wan bi kêmanî bi qasî trajediya Ermenî û Suryaniyan bi rewşeke giran bi encam bûbû. Aqûbeta gelên li peravên Deryareş jî bi heman awayî bû, heman trajedî parve kirin. Bi herhalî wan jî ango Pontûsan li vê deverê şaristaniyeke bi hezarê salan bi pêş xistibûn û afirandibûn.

Weke gelekî Xiristiyan li Bakur-Rojhilatê Anatolyayê, Gurciyan li peravên Rojhilatê Deryareş ji mêj ve (ji dema Hîtîtiyan ve têne naskirin) şaristaniyek pêk anîne. Di dema Xiristiyantiyê de şaristaniya wan bêhtir bi pêş ketibû. Ew jî bûn hevparê çarenûseke mîna ya Ermeniyan. Beşekî mezin ji dayikniştimana xwe di belavbûna Îslamiyan de ji dest dan û di devereke piçûk de asê man. Di vê de para polîtîkayên Çartiya Rûsyayê jî heye. Gelê Gurcî yê pirr zor û zehmetî kişandin hê jî xwe ji birînên di derûniya wî de vebûne rizgar nekiriye.

Çawa ku me berê jî behs kiribû, Cihûtiya Anatolyayê ji dema Selçûq Beg (Dewleta Cihû ya Hazara, salên 900'î P.Z.) bi tebeqeya jor a qebîleyên Tirk re hevgirtî bûn. Ev yekîtiya xwe bi awayên cuda li Qafqasya, Qirim, Rojhilatê Ewrûpayê û Anatolyayê jî dewam kirin. Piştî ku ji Spanyayê hatin derxistin Anatolya ji bo wan bûbû stargeheke ewle. Di maliya împaratoriyê de cihekî wan ê girîng hebû ku nedihat tijîkirin û ev xisleta wan di vê yekê de bi roleke girîng rabû. Li dijî gelên Xiristiyan, têkiliyên wan bi burokrasî û siltantiya Osmanî re xurt bûbûn. Di salên 1550-1600'î de li qesra Osmanî bi giranî kontrol kiribûn destê xwe. Di dawiya sedsala 19. de û di çaryeka pêşî ya sedsala 20. de hêza rastî ya veşartî ya Împaratoriyê bûn. Di Meşrûtiyeta Duyemîn, Darbeya 1'ê Çileya 1913'an, Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Şerê Rizgariya Neteweyî de bi rola pêşengiya stratejîk a bi awayekî veşartî ya bi maskeya Tirkparêziyê bi awayekî serketî rabûne. Avaker û mûcîdê rastî yê neteweperestî ango faşîzma spî ya Tirk bûn. Ji ekonomiyê heta bi çandê, ji eskeriyê heta bi polîtîkaya derve di tevahiya pêşketinên sazîbûnê de hem di warê zêhnî de û hem jî di warê avabûnê de pêşengî kirine. Herçiqasî di navbera wan û bûrjûwaziya Misilmanên Tirk ên Anatolyayê de hinek nakokî çêbibin jî ev rola wan hê jî dewam dike. Li gorî tehlîla dawî; Komara Tirk li dijî gelên Xiristiyan bi hevgirtina di navbera sermayeya Cihû û

bûrjûwaziya Tirk a burokratîk de hatiye avakirin û heta roja me ya îro vê xisleta xwe dewam dike. Herçiqasî piştî avabûna Îsraîlê sermayeya Cihû xwe hinekî vekişandibe jî ev rastî dewam dike. Eger em ji dema Selçûqiyan ve rola çanda Cihû li ser yekdestdariyên desthilatdarî, ekonomî û îdeolojiyên li Anatolyayê nehesibînin, em ne dikarin tesfiyekirina gelên Xiristiyan, ne jî pêşketina elîtên Tirk ên îdeolojîk, ekonomîk û desthilatdar analîz bikin. Jixwe em heta vê hevgirtinê ji hev dernexin, em qet nikarin tenkîl, tedîb, asîmîlasyon û qirkirina Kurdan a ji salên 1925'an ve li dijî Kurdan li ser kar e, fêhm bikin.

Ev analîzên ez weke pêşnûme bi espriya parêznameyê pêşkêş dikim, bi armanca eşkerekirina rûyê rastî yê dîroka hezar salên dawî yê Anatolyayê ye. Di vê mijarê de ji aliyê serwextbûna li dîrokê kirêtî û serkoriyeke mezin heye. Em heta ji vê kirêtî û serkoriyê nebihurin, em ê nikaribin mîrateya çanda gelan nexasim gelên di rewşa trajîk de rast fêhm bikin û herweha em ê nikaribin rojane rast pêk bînin, bigihînin paşerojê, azad bikin, bi xuşk û biratî bijîn.

**7- Di Çanda Rojhilata Navîn De Jihevdûrketina Desthilatdarî û Civakê**

Li Rojhilata Navîn jihevdûrketina desthilatdarî û civakê û xurtbûna mêtingeriyê li ser gelên Misilman ji wan pirsgirêkên herî bingehîn ên sosyolojîk in ku divê bêne ravekirin. Pirtûkên dîrok û sosyolojiya fermî weke tinebin nêzî van mijaran dibin. Dîroka şaristaniyê bi awayekî bi dûrketin û jihevcihêbûna civak û desthilatdariyê dest pê dike. Desthilatdarî û yekdestdariyên sermayeyê yên pêre çêdibin, çiqasî ji civakê dûr bikevin, ewqasî weke hêzeke cihêwaz nirxên zêde yên civakê desteser dikin. Tevî ku nirxandina Marksîzmê ya li ser nakokiya çînî û mêtinkariya wê di vî warî de xwedî rastiyeke bi sînor be jî zordestî û mêtinkarî li ser xeta têkiliyên di navbera civakê û desthilatdarî-sermayeyê de pêk tên. Di çanda Rojhilata Navîn de diyardeyên di vî warî de pêk tên balkêş in. Ji ber ku hegemonya şaristaniya navendî ya ji pênchezar salî zêdetir divê mirov dîroka şerekî rastî yê civak û desthilatdariyê di nava çanda civaka Rojhilata Navîn de bişopîne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare dewletê bi xwe weke rewşa çarçovekirî ya bi nakok û bi şer a civak û desthilatdariyê, weke rewşa aştî yan jî agirbesta demî ya bi hin pîvanên bingehîn ve girêdayî û rewakirî bide naskirin. Dewlet weke rewşa agirbesta demî, rewşa dewleta fiîlî ye ku hê normên wê pêk nehatine û rewa nebûye. Dewlet weke rewşa aştiyê jî rastiya dewletê ya normên wê pêk hatine û rewa bûye îfade dike ango civak û desthlatdarî gihiştine hevpeymanekê. Mirov dikare ji hevpeymana di navbera dîn û desthilatdariyê re jî dewlet bibêje. Ya rastî, civakên bi hêzên şaristaniyê yên mezin dibin dikevin nakokiyê û berjewendiyên wan ji hev cihê dibin weke dînên yekxwedayî li ser bingehê dewletê li rêya lihevkirinê digerin. Dema ku bi hêzên şaristaniyê re li hev nekin dîn serî radikin. Lê eger li hev bikin, wê wextê dewleta rewa pêk tê. Dîroka Xiristiyantî û ya Îslamê bi mînakên bi vî rengî tijî ne. Nakokiya beşên heman dînî jî rastiya mezhebbûnê îfade dike. Mezheba bi desthilatdariyê re li hev bike dibe dewlet, beşê pêre li hev neke weke muxalif têkoşîna xwe eşkere yan jî bi dizî dewam dike û bi vî awayî hewl dide rastiya xwe ya civakî bêdesthilatdarî û bêdewlet pêk bîne.

Me di sernavên berê yên mijarê de hewl dabû, serhatî û nakokiyên gelên Xiristiyan bi hêzên împaratoriyê û desthilatdariyên Îslamî re binirxînin. Li Rojhilata Navîn têkiliya civak û desthilatdariyên din ên ji heman dînî, hewcedariyê bi bêhtir ravekirinê didin hiskirin.

**a-** Îslama Ereb, şaxên wê yên gihiştine Efrîkayê jî di navê de, di navbera hêzên desthilatdarî-dewletê û hêzên gel ên civakî de şer û nakokiyên gelekî ciddî tevahiya dîrokê pêk anîne. Hz. Muhammed hê sax bû vî şerî dest pê kir. Dînê Îslamê (bi awayekî bernameya îdeolojîk û siyasî), weke berhemekî têkoşîna di navbera qebîleya Haşimî ya bêhtir xizan a Hz. Muhammed bi xwe jî mensûbê wê ye û şefên qebîleyên din ên ji tebeqeya jor ên bêhtir dewlemend û ji heman etnîseyê de derket holê. Piştî wefata wî nakokî dijwartir bû. Ji ber vê nakokiyê ji çar xelîfeyên pêşî sisê Emer, Osman û Elî hatin kuştin. Muawiye weke nûnerê tebeqeya jor di vê pêvajoyê de karîbû meyla xwe bi dewleteke xanedaniyê ango Dewleta Emewî bi encam bike. Yên mayî weke

hêzeke civakî alîgirên Ehlîbeytê ango alîgirên Malbata Hz. Muhammed û hêzên civakî yên radîkal ên bêhtir xizan Xaricî man. Ev dabeşbûna pêşî û ciddî ya civak, çîn û dewletê ye. Bi pêvajoyê re dabeşbûna em behsa wê dikin her ku çû mezin bû û heta roja me ya îro dewam kir.

Îslama desthilatdariyê xwe bi bêhejmar dewletên piçûk û împaratoriyan xurt kir, bi pîvan û rewa kir, ev jî bi navê şerîeta Îslamê û bi rêya mezhebê Sunnî kir, mezhebên Îslamî yên dijberê desthilatdariyê jî hewl dan hebûna xwe weke Xaricî û alîgirên Ehlîbeytê pêk bînin. Xaricî weke beşê herî xizan ê civakê her ku diçe dibin Bedewî. Ev jî tê wê maneyê ku bêhtir dibin kedkarên gundan û hêmanên proleter ên bajaran. Li cem Ereban proleterbûyîn xwe bi Bedewîbûnê berbiçav dike û heta roja me ya îro dewam dike. Bedewiyên feodalîteya serdema navîn, dibin fellah û karkerên kapîtalîzma roja me ya îro û bi vî awayî dîrokeke hevpar in. Alîgirên Ehlîbeytê bi awayekî tebeqeya navîn a Ereban temsîl dikin. Beşê wê yê bêhtir xizan weke komên radîkal ên Şîa û Elewiyan dijbertiya xwe ya dewlet û desthilatdariyê dewam dike û beşê wan ê jor jî di nava pêkhatina gelek dewletan de hebûna xwe dewam dike. Ji Fasê heta Hindistanê, nexasim heta bi Libnan, Sûrî, Iraq û Îrana îro bi awayekî zêde li tevahiya cografya misilman weke hêzeke civakî û desthilatdarî, bi van xisletên xwe hebûna xwe dewam dikin. Îslama desthilatdariyê ya ji rêûresmê jî ji serî ve hewl da bi norma dewletê (şerîet) û rewabûnê (mezhebbûna Sunnî) hebûna xwe heta roja me ya îro dewam bike. Hêzên dewlet û civaka Ereb hem di dîrokê de, hem jî di roja me ya îro de gelek parçe ne, û bi hev re di nava şer de ne. Di bingehê vê de, rastiya kûr û berfireh a jihevdûrketina civak û desthilatdariyê heye. Jixwe perdeya hevpar Îslamiyet jî nikare vê rastiyê binixumîne û bitepisîne.

**b-** Jihevdûrketina civak û desthilatdariya Îslamî ya li Îranê û jê wêdetir li Afganîstan, Pakîstan û Başûr-Rojhilatê Asyayê bi heman awayî li ser sê xetan pêk hatiye. Ji bo şaş neyê fêhmkirin, ez bi girîngî tînim ziman ku wexta ez xet dibêjim, ez behsa xeteke rast a li ser bûyer diqewimin nakim, ez bi awayekî çerxwarî behsa pêkhatina bûyeran li ser xetekê dikim. Yek ji devera ku Îslam lê bi kok şikil û şêwe girt Îran e. Mirov divê şaxên ji wê çûne jî li vê zêde bike û wisa fêhm bike. Îslama li Îranê şikilgirtî Îslama veguherî ye. Herçiqasî bi xetên giştî weke Şîa were binavkirin jî bêhtir xwedî perspektîf û şîroveyeke berfireh e. Bi xwe Îslama Ehlîbeytê ya çîna navîn e. Bawer dikin ku divê îmametî timî ya Ehlîbeytê be, û dixwazin ev weke heqekî bê fêhmkirin. Di dema fetihkirina Îranê de kirinên zalimane yên bêhtir rêûresma Sunnî û Emewiyan pêk anîn, ev meyla han xurt kir. Heman Emewî timî weke yên li Kerbelayê nûnerê neqane yê Ehlîbeytê Îmam Husên û heftêûdu hevrêyên wî kuştine têne bibîranîn. Ji ber şêwazê wê yê pêşketina împaratoriyê û çanda wê ya dewlemend, li gorî xwezaya Îranê ye ku Îslamê ji rêûresma civak û desthilatdariya Ereb cuda bi şikil û bi gewde bike. Li vir a girîng nêzîkatiya bi nakok û bi şer a beşên jor û jêr ên çîna navîn di warê civak û desthilatdariyê de ye. Beşê jor ji ber finasên desthilatdariyê yên ji împaratoriyê mîrate mayî xwest Îslamê bi lez ber bi dewletbûnê ve bibe û bi vî rengî wê pêk bîne. Beşê jêr jî baş serwext bû ka tevahiya dîrokê çawa ji desthilatdaran timî êş û azar

kişandine, lewma hewl da Îslamê bi awayekî civaka sivîl û bi aliyê wê yê dijberê desthilatdariyê pêk bîne. Mirov dikare vê rastiyê di dîroka Îrana Îslamî de timî bişopîne, bibîne. Jixwe li pişt perdeya dîrokî di vî warî de nakokiyeke bi vî rengî ya civak û desthilatdariyê ya ji rêûresma Zerdeştî ji nakokiya Med-Pers heta roja îro her hebû. Di bingehê vê de jî dabeşbûna hiyerarşîk a civaka qebîleyê heye.

Îran bi tenê xwediyê rêûresma etnîk a Pers nîne; li heman cografyayê gelek rêûresmên etnîk hene. Dabeşbûna civakî xisletên etnîk û dînî di zikhev de bi pêş xistine. Em Îranê weke civak û desthilatdariya jor, nikarin bi tenê bi xisletên dînî û etnîk ên têde xwedî giranî ne bidin naskirin. Eger mirov wê weke şêweyekî xweser ê têde xisletên dînî û etnîk di zikhev de bi hev keliyane bide naskirin, mirov ê karibe zêdetir jê hîn bibe. Herçiqasî carcaran herdu alî jî derketibin pêş, mirov tevahiya dîrokê di navbera wan de dabeşbûneke pirr radîkal nabîne. Mînak, ne mîna Ereban bûne civakeke qewm a klasîk, ne jî mîna Cihûyan bûne civakeke dînî. Bi awayekî xweber, mîna ku pêdivî dîtiye weke modeleke sêyemîn pêk bê. Hebûna hejmareke zêde ya etnîsîte û baweriyên dînî di vê de bi roleke girîng rabûne. Bandora dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst li ser bingehê vê rastiyê pêşwazî kiriye. Ne xwedî ezmûneke dewleta netewe û milliyetgiriyeke bi cureyê li welatên Ewrûpayê ye, ne jî dewletdariyeke netewe ya mîna li welatên Ereb pêk aniye. Xisletên xwe yên dîrokî parastine, li beramberî herdu modelan ji meşandina modela xwe nehatiye xwarê. Şahtiya Îranê nikarîbû li ser piyan bimîne û di binê vê yekê de ev rastî heye. Lê hebûna xwe bi vî şêwazî li dijî modernîteya kapîtalîst û kapîtalîzma global zêde nikare dewam bike. Yan wê bi kok bibe xwediyê veguherînekê (ji aliyê dewlet û desthilatdariyê ve ev yek gelekî zor e; bixwaze bibe dewleteke netewe ya lîberal ev ê bibe sedema hilweşîna wê); yan jî wê parçe bibe û tebeqeya jêr ê li ser bingehê nirxên demokratîk ên sivîl ên rêûresma Îslamî û nirxên modernîteya demokratîk ên rojane bike milkê xwe, di rizgarbûna ji kaosa Rojhilata Navîn de bibe yek ji hêzên avaker ên pêşî yên modernîteya demokratîk û bi awayekî hêjayî rabihuriya xwe careke din di dîrokê de cihê xwe bigire.

**c-** Tirk weke gel bi koka xwe ji koma ziman a Ûral-Altay tên. Beriya qederê heft hezar salan pêşî li keviyên Sibîrya Başûr û paşê ji wir jî hinekî din bi aliyê Başûr ve çûne û li wir yek ji komên sereke yên çandî ne ku veguherîne civakên qebîleyan. Çawa ku ji bo her çandê dibe, Proto Tirk jî bi pêşketina şaristaniyê li ser dika dîrokê berbiçav dibin û xuya dikin. Nexasim Çîniyên ji heman komên çandî zû dibin xwedî şaristanî (salên 1500'î B.Z.) û ev yek bandorê li ezbetên Tirkan jî dike û dihêle Tirk zû li ser dika dîrokê xuya bikin. Em dibînin ku di sedsala 3. B.Z. de begtiyên xwecihî ava dikin. Çiqasî dibin desthilatdar ewqasî di nava Çînê de dihelin. Hebûna xwe ya etnîk bi tenê dikarin weke qebîle biparêzin. Kengî nikarin serî bi Çînê re derxin ber bi rojava ve belav dibin. Hişkesalî, zêdebûna şêniyan, zor û zehmetiyên Çola Asya Navîn jî di vê belavbûnê de sedemên girîng in. Di sedsalên beriya mîladê de têkiliyên wan ên bi şaristaniya Îranê re hene. Di ser Hindistanê re têkiliyên bi heman rengî hene. Piştî mîladê di sedsala 3. de koçberî bi Rojava

ve zêde dibe. Bi du rêyên sereke diçin bakur û başûrê Derya Hezarê. Di salên 450'î P.Z. de ji aliyê bakur ve xwe disipêrin sînorên Împaratoriya Romaya Rojava û ewqas bi hêz bûne ku dikarin erdên wê dagir bikin. Ji navend Macaristanê dikarin êrîşan bibin hundirê Îtalya û Franseyê. Lê nikarin xwe bikin desthilatdarî û dewleteke sazîbûyî ya mayînde. Di heman wextî de zorê didin sînorên Îranê jî. Herweha di salên 550'î P.Z. de cara pêşî dewleteke bi kok etnîk bi navê Goktirkan pêk tînin. Piştî van Tirkên Uygur (salên 740'î P.Z.) ên dînê Manî bi awayekî fermî qebûl dikin tên. Di sedsalên 8. û 9. de weke eskerên bi peran şer dikin di Împaratoriyên Abbasî û Bîzansî de bi roleke girîng radibin. Bi awayekî girseyî cara pêşî Îslamê di sedsala 10. de qebûl dikin. Qerexanî dibin yekemîn Begtiya Tirk a Misilman.

Di sedsalên 9. û 10. de li bakur û rojhilatê Hezarê dewleteke Tirk a Cihû xuya dike. Ezbetên Tirk ên pêşî daketin nava Îranê û bûn misilman Tirkên Oxiz in, û weke Xanedaniya Selçûqî têne naskirin. Selçûq Beg di nava Dewleta Hezarê ya Cihû de xwedî payeya efseriyê bû û tevî qebîleya xwe cara pêşî li Tirkmenistana îro di navbera çemên Seyhûn û Ceyhûnê de xwe li avakirina begtiyekê radikişîne. Şerên dijwar diqewimin. Weke tebeqeya jor a qebîleyê di warê desthilatdariyê de dibin xwedî ezmûn û tecrûbe. Derdikevin seferên ji bo xenîmetê. Pirr zû bîr dibin ku ji bo serketî bibin û gelek xenîmetî bi dest bixin divê bibin misilman. Jixwe hê di sedsala 9. de li qesrên Abbasiyan komeke wan a eskerên bi peran şer dikin pêk tê. Ji bo xwe bajarê Samarayê ava dikin. Yekîneyên wan ên ji ezbetên Selçûqiyan êrîşan dibin heta nava Bîzansê û xenîmetan kom dikin. Li hemberî xwe Tirkên Xiristiyan dibînin. Di sedsala 11. de tev bi hev re dibin misilman. Selçûq Beg di sala 1008'ê de dimire. Lawên wî yên dikevin şûnê navê wan Mîkaîl, Mûsa, Yûnis û Arslan e. Ev jî nîşan dide ku gelekî ketiye bin bandora Cihûtiyê. Di vê demê de nakokî û jihevdûrketina di navbera beşê jêr ê xizan û beşê jor ê dewlemend ê qebîleyan de zêde dibe. Qebîleyên pêşî ji elîta desthilatdariyê qut dibin ji salên 1018'an pêve bi nava Îranê ve diçin. Li wir, li dijî şefên qebîleyên xwe ji rayedarên dewletê bergiriyê dixwazin. Di dîrokê de cara pêşî gelê Tirkmen (li cem Ereban Bedewî, li cem Kurdan Kurmanc) weke qebîle li ber begên xwe radibin û dixwazin serbixwe bimînin.

Ev jihevdûrketin û cihêbûna cara pêşî bi awayekî ciddî li cem civakên qebîleyên Tirk tê dîtin wê tesîreke mayînde di dîrokê de bike. Ev jihevdûrketina li ser bingehê civak û desthilatdariyê bi xwe re têkoşîneke dijwar tîne. Diyardeya Tirk ji vê demê û pêve (Dîroka Tirk-Îslam) wê weke du milên bi hev re gelekî nakok û di nava şer de dewam bike. Tebeqeya jor a qebîleyan ku xwe li dora amûra desthilatdariyê bi rêxistin kiriye, jiyana bi vî rengî wê bike pirsgirêkeke manûnemanê. Jiyana li ser bingehê desthilatdariyê hê di dema Dewleta Tirk a Cihû ya Hezarê de pêk hatibû û her ku çû xwe bi hêz kir û heta roja me ya îro hat. Ji bo van komên elît jiyaneke bêdewlet û bêdesthilatdarî weke mirinê hatiye hesibandin. Di asteke dînî de dewletbûn hatiye pîrozkirin. Dewlet weke dêûbav hatiye dîtin. Ellah weke cisim û dewlet jî weke siya wî hatiye qebûlkirin. Lewma têgîna Zîllah ango siya xwedê hatiye bikaranîn. Gotinên Xwedê, Ellah ku

têgînên semawî û uxrewî ne, herî zêde di diyardeya dewletê de berbiçav bûne. Di vê çarçoveyê de Begên Selçûqiyan hem li hundir, hem jî li derve bûn şervanên yeman ên dewlet û desthilatdariyê. Wer li wan hat ku ji bilî vê bi ti karekî din re mijûl nebûn. Di nava gelek dewlet û xanedananên weke Abbasî, Xeznewî, Samanogullari, Atabegî û Tolunogullari de yan bûn hêza eskerî ya bingehîn an jî bi xwe dewlet ava kirin. Di salên 1055’an de Împaratoriya Selçûqî ava kirin. Piştî Şerê Melazgirê yê di sala 1071’ê de li her devera Anatolyayê begtî ava kirin. Şerên di navbera begtiyan bi xwe de heta bi avabûna Împaratoriya Osmanî dewam kirin. Bi Împaratoriya Osmanî di asta herî jor de bi desthlatdariyê tamijîn. Di tevahiya van desthilatdarî û dewletan de şerîeta Îslamê (normên huqûqê) pîvana wan a bingehîn bû û mezhebê Sunnî yê Îslamê jî ji bo rewabûnê amûrê wan ê bingehîn bû.

Li cem elîta desthilatdar a Tirk, bi giştî dîn, bi taybetî jî dînê Îslamê bi temamî weke amûrekî desthilatdariyê maneya xwe heye. Ji bilî desthilatdariyê dîn kêm mane û nirxê xwe heye. Mirov metafizîka Tirk a desthilatdariyê baş nizanibe, wê nikaribe analîzeke rast a dewlet û civakê bike. Analîzên hatine kirin jî di wan de kêmasiyên mezin û gelek şaşî hene. Elîta Tirk a desthilatdar hê di pêvajoya begtiya pêşî de, heta di hiyerarşiya jor a qebîleyê de fîgur û têgînên Şamanîstî fetîşîze kirine. Alperestiya îro û sembolperestiya bi heman rengî çavkaniya xwe ev e. Fetîşîzma totem a qebîleyê jî gelekî tesîr kiriye. Hespperestiya wan jî bi vê yekê ve têkildar e. Di desthilatdariya begtiyê de hesp, pîrek û sîleh, ev hersê namûs in, nirxên pîroz in, jiyan bi xwe ne. Jiyana desthilatdariyê hesp, pîrek û sîleh bi xwe ye. Di şaneya kok a desthilatdariyê de ev hersê gen hatine danîn û ew kirine xisletên bingehîn ên genetîk. Di navbera Ellahê Îslamê û desthilatdariyê de têkiliya herî xurt hatiye danîn, bi awayek sergirtî xweda û desthilatdarî kirine weke hev, ango herî zêde desthilatdarî û dewlet pîroz kirine. Bêguman di binê vê pîrozkirinê de ajo û xerîzeya destdanîna ser xenîmetê heye. Jixwe armanca fethê ew e, her tiştê heqê xwe bibîne dikare desteser bike.

Di çanda Rojhilata Navîn de elîta Tirk a desthilatdariyê têgînên bi vî rengî yên desthilatdariyê mezin kirine û di vî warî de bûn pêşeng, lê ne ew bi tenê, ji bilî wan jî yê bi vî karî rabûne hene. Ji serdema navîn heta roja me ya îro hêzên ji tevahiya elîtên desthilatdariyê re pêşengî kirine hema bêje di nava hev de heliyane. Ev Tirkîtiya navê wê Tirk e, di serî de Tirkmen, mêtinkarî û zordestî li Tirkê civakî kiriye, rê li ber têgihiştina ‘Etrak-î Bî Îdrak’ (Tirkê cahil ê bêfêhm) vekiriye. Dîsa ev Tirkîtî ye ku herî zêde bi awayekî zalimane û mêtinkarî nêzî Tirkîtiya civakî bûye. Ji lewra Tirkîtiya desthilatdariyê, zordestî, mêtinkarî, mêtingerî û qirkirina li ser ti civak an jî gelî nekiriye li ser Tirkmenan kiriye. Di vî warî de gelek rê û rêbaz hatine ceribandin. Heta bi mirinê eskertiyê li ser wan ferz dike, bi awayekî cuda bacê ji wan distîne, nezan dihêle, li hemberî nerazîbûneke wan a piçûk hewl dide wan qir bike, timûtim wan talan dike, wan nefî û mişext dike, daxwaza wan a demokratîk a herî piçûk ditepisîne, dema mêtinkariya hundir qîma wî neke di statuya kole de wan dişîne diyarên xerîbiyê û kurtûkurmancî pîvana ‘hestî yê min, goşt ji te re’ pêk tîne û

heta dawiyê wan bi kar tîne, roja me ya îro keviyên bajaran bi wan tijî kirine, ji bo kara yekdestdaran pirraniya wan a ji nîvî zêdetir bêkar dihêle, dewletdariya netewe mezin dike û çanda civakî tine dihesibîne. Ev hin ji rêbazên wan in ku me rêz kirin. Li ser vî bingehî, Tirkîtiya kategoriya duyemîn an jî Tirkmentî diyardeyeke cuda ya civakî ye.

Tirkmentiyê ango Tirkên Misilman ên li derveyî desthilatdariyê, bi awayekî bingehîn dûrketina xwe ya ji desthilatdariyê hê dema Selçûq Beg sax bû, nîşan dabûn. Êlên pêşî û xizan ên Tirkmenan di sala 1005’an de ji ber zilma beg xwe avêtin bextê Xeznewiyan. Paşê çûn deverên cûrbicûr ên Îranê, nexasim çûn Bakur-Rojavayê wê ango xwe vekişandin Azerbegcana îro û bi vê hewl dan bergiriya xwe bikin. Ji gelek milan ve daketine erdên Iraq û Sûriya îro û hewl dane li van deveran bihewin. Di van sedsalên pêşî de timî ji nava wan êl û eşîr veqetiyane. Di ser rêya Bakurê Hezarê re jî koçberiyên bi heman rengî pêk hatine. Siltan û begên Selçûqiyan ji bo ji zexta Tirkmenan rizgar bibin, ew timî mişextî Qefqasya, Erebistan, Kurdistan û Anatolyayê kirine. Rêzeçiyayên Deryareş, Deryaspî û deştên Anatolya Navîn bi Tirkmenan tijî bûn. Şert û mercên dijwar ên jiyanê, zordestî û mêtinkariyê timî Tirkmen ber bi isyanê ve dahf dane. Siltan Sincar di qefesekê de bi xwe re birine, bûne Elewî û bi vî awayî ji desthilatdariya Sunnî qut bûne, gelek terîqet ava kirine û bi vî awayî civaka sivîl xurt kirine û di vê rê de serî rakirine. (Ji Ehmed Yesevî heta bi Mewlana, Ji Baba Îshaq heta bi Şêx Bedreddîn, ji Pîr Siltan Ebdal heta bi Şah Îsmaîl, ji serîrakirina Celaliyan heta bi serîrakirina esnafan) Mirov van mînakan hemûyan dikare di vê mijarê de numûne nîşan bide. Çanda xwe ya berxwedanê di vegotinên Pîr Siltan Ebdal, Qereceoglan, Koroglî û Dadaloglî de bi şêweyekî destanwarî nîşan dane. Li dijî zimanê sosret ê desthilatdariyê ji têkelkirina Farisî û Erebî çêkiribû, Tirkmenan zimanê xwerû yê Tirkî hilgirtin û xwedî lê derketin. Bi dostî nêzî gelên Rojhilata Navîn bûn û bi dilê xwe di nava wan de man û ji vê fikar nekirin.

Weke çanda civakî, divê mirov hem ji aliyê maddî hem jî ji aliyê manewî ve bi awayekî berfireh li Tirkmentiyê bikole. Avakirina dîroka civakî ya wan bi xwe hewce ye. Di dema modernîteya kapîtalîst de bêhtir bi şert û mercên zehmet dor li hebûna Tirkmenan hat girtin. Derfet û îmkanên civaka koçêrî û jiyana niştecihî kêm bûn. Mîna eskerên azib ên li qadên herî bi tehlûke têne wezîfedarkirin, lê mîna ev jî ne bes be, bi bêkarî, koçberbûna derve û bi jiyana fena kulmozan li keviyên bajaran di şert û mercên dijwar ên roja me ya îro de hewl didin hebûna xwe dewam bikin. Tirkmentiya dîrokî ya bi qasî neteweyekî maneyeke xwe heye, di nava çerxên zordestî û mêtinkariya dewleta netewe û yekdestdariyên kapîtalîst de, di nava lep û pencên partiyên dîndar û faşîst ên dewletê de bi qedînê re rûbirû ye. Yek ji sedemên girîng ê vê yekê ew e, nikarîbûye tevgera xwe ya demokratîk pêk bîne. Tevgerên dîndar û faşîst ên hedefa wan desthilatdarî û dewlet vê valatiyê tijî dikin, xisletên erênî yên Tirkmentiyê berevajî dikin û bi vî awayî xiyaneta herî mezin pêre dikin û herweha derba kuştinê li çanda dîrokî-civakî ya Tirkmen didin a ku nirxekî mezin îfade dike. Bi giştî li Asya Navîn û Qefqasyayê, bi taybetî li Anatolyayê

Tirkê Tirkmen ê dîrokî civakî ji Tirkîtiya di nava çerxên desthilatdarî û dewletê de weke milliyetgir, dîndar, desthilatparêz û cinsiyetparêz çêbûye, pêkhatin û diyardeyeke pirr cuda ye. Ya ji vê jî girîngtir ew e, divê mirov Tirkmenan ji wan pêkhatinên di mişara modernîteya kapîtalîst de ji aliyê hêmanên ne Tirk ve weke dewletparêzên netewe, komploger-faşîst ên bi rengên spî-reş-kesk ve li hev hatine çêkirin cihê bike, li ser bingehê neteweya demokratîk, welatê demokratîk û komara demokratîk veguherîne hêmanên modernîteya demokratîk. Ji bo vê jî divê mirov rêxistiniya siyaseta demokratîk, civakparêziya sivîl û xweseriyê bike bingeh, vê bi çanda Tirk-Tirkmen a rêûresmê re sentez bike û bi vî awayî çandeke hemdem bi pêş bixe. Pirsgirêka bingehîn a Tevgera Demokratîk a Tirkiyê ew e, pêwîst e ku vê çandê ji tevahiya aliyên wê yên civakî û dîrokî rast bide naskirin, lêbikole û xwedî lê derkeve, ji bo vê jî divê wê perwerde û bi rêxistin bike, bixe nava çalakiyê û bi vî awayî bi sîstema modernîteya demokratîk re bike yek.

Li Anatolya û Mezopotamyayê ji bilî Tirkmenan rastiya çand û gelên din ên bi çanda Îslamî radibûn heye. Hindikayiya Ereb a li Başûrê Torosan ji dema fetha Îslamî maye. Ji ber ku ji îmtiyaza desthilatdariyê mehrûm bûye, her ku çûye bûye çandeke xizan. Tebeqeya wê ya jor di nava elîta Tirk de heliyaye. Çanda beşê Ereb ê xizan jî bi bandora asîmîlasyonê paşvemaye û her diçe nayê bikaranîn. Tevî ku di nava Kurdan de ne, hebûna xwe parastine. Di şert û mercên kapîtalîzmê de her ku diçe zehmet dibe hebûna xwe dewam bikin.

Komên Arnawit û Boşnak ên bi koka xwe Balkanî ne, çandeke girêdayî desthilatdariyê temsîl dikin. Zêde jê dûr neketine. Di nava burokrasiyê de hewl didin hebûna xwe dewam bikin. Gelekî bi îdeolojiya fermî ve girêdayî ne. Ji bo berjewendiyên xwe gelekî xwedî li milliyetgiriya Tirk derdikevin. Beşên xizan ên ku ji aliyê hejmarê ve kêmtir in, bûne proleter û em dibînin di nava tevgerên kedê de cih digirin. Li gorî îdeolojiya desthilatdariya fermî, di mijara girêdana etnîk de zêde li ser a xwe namînin.

Yên bi koka xwe Qefqasî komên hê bêhtir xwedî giranî pêk tînin. Ji çanda wan e ku bi desthilatdariyê re di nava têkiliyên nêz de bin û di nava elîta desthilatdariyê de cih bigirin. Tevî ku bêriya dayikniştimana xwe dikin jî heta dema nêz jî veger xeyalek bû. Piştî jihevdeketina Yekîtiya Sovyetê careke din bi dayiknîştimana xwe re têkilî danîn. Yên bi koka xwe Balkanî jî ketin nava rewşeke bi heman rengî. Li cem hêzê cihgirtin rêûresmeke tebeqeya jor a van beşan e. Em dibînin ku di asta pêşengtiyê de di nava tevgerên şoreşger de cih girtine û bi heman awayî di nava tevgerên rastgir de jî xuya dikin.

Ji bo erdên Anatolya û Mezopotamyayê gotina 'mozaîka çandan' tê bikaranîn. Herçiqasî ev têgîn di cih de be jî mixabin mîna rûyê mozaîkên ji bin erdê têne derxistin têra xwe peritî ye. Ji ber projeya afirandina civaka homojen a dewleta netewe, ev mozaîka çandê mîna xîçikê hûr kirine û hebûna wê xistine ber çerxa qirkirinê. Herçiqasî hebûnên çandî hindikayî bin jî mîrateyên dîrokî

ne ku ji sedî sed divê bêne parastin. Xisleta qirkirinê ya dewleta netewe herî zêde xwe bi polîtîkayên li dijî van çandan nîşan dide. Li her devera dinyayê modernîteya kapîtalîst tevkujiyan pêk tîne û ev polîtîkayên qirkirinê li dijî van çandên hindikayî parçek ji wan e. Ji bilî polîtîkayên zorê yên li dijî wan, ji aliyê ekonomîk ve jî wan bêqîmet dikin û wer li wan dikin ku bêhnê li wan diçikînin. Mîna ku vê pîvanê li ser wan ferz dikin: Eger tu di çanda xwe de li ser a xwe bimînî, di vê de serhişkiyê bikî û xwe teslîmî çanda pirraniyê ya fermî nekî, tu yê bêkar û birçî bimînî! Heta ku tu tevlî çanda fermî ya dewleta netewe nebî, dev ji çanda xwe bernedî û vê tevlîbûnê bi teslîmbûnê pêk neyînî di nava civakê de nikarî pêşde biçî û nikarî cih bigirî, ji ber ku bi hezar û yek kelemên li pêşiya te hatine danîn tu yê nikaribî gavê biavêjî. Bi vî awayî bivênevê endametiya fermî ya civaka homojen ferz dibe.

Ezmûna faşîzmê ya di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de li Ewrûpayê pêk hat, modernîte neçar kir ku projeya xwe ya homojenkirina civakê di ber çavan re derbas bike. Bi projeya Yekîtiya Ewrûpayê weke alternatîf li pirrçandîbûnê vegeriyaye. Tevî ku postmodernîte bi xwe pirrçandîbûnê weke nirxê bingehîn parve dike, ji alternatîfbûna modernîteya kapîtalîst dûr e. Tevahiya çandên li derveyî nasnameya çandî ya fermî ne, li gorî tehlîla dawî wê bêne marjînalkirin û bi vî awayî bi wê rastiyê re rûbirû ne ku yan bi xwe yan neyekser bi rêbazên zordestî û mêtinkariya kapîtalîst an jî bi polîtîkayên fermî yên afirandina civaka homojen a dewleta netewe bên tesfiyekirin û bi qirkirinê werin tinekirin. Mirov çawa dikare bi awayekî herî rast li ber vê bisekine; bêguman divê mirov hebûna xwe ya çandî biparêze û ji bo wê azad bike divê têgihiştineke nasnameyê ya serê wê vekirî qebûl bike û vê yekê bi çandên din re sentez bike û li qonaxeke jortir projeyên hevpar ên jiyanê çêke. Neteweya demokratîk, welatîbûna destûra bingehîn, komara demokratîk, têgihiştina welatekî pirrçand û pirrparêz çendek ji van projeyên sereke yên bi vî rengî ne. Rêbazên weke siyaseta demokratîk, rêxistiniya civaka sivîl û xweseriya demokratîk ji bo pêkanîna van projeyan amûrên bingehîn in. Hem ji bo parastin û azadkirina çandên ji rêûresmê, hem jî ji bo bi awayekî sentez bi çandên hemdem re bijîn, çareseriya modernîteya demokratîk hewcedariyeke bivênevê ye.

**B- DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE RASTIYA KURD**

Wexta ku ez di dema zarokatiya xwe de bi sîstema dibistana seretayî ya Tirk re rûbirû bûm, rastiya Kurd a mirovan bi zorê dikarîn ji hev derxin, di mejî û ruhê min de rê li ber peydabûna pirsan vekiribû. Bi awayekî xwezayî min Tirkîtî qebûl nedikir. Min di kûrahiya ruhê xwe de bandoreke mirov piçûk dixe, his kir. Ya pêşî hat bîra min ew bû ku divê ez têkiliyeke malbatê bi Tirkîtiyê re bibînim. Ji aliyê diyê ve, ji dûr ve têkiliyek bi Tirkîtiyê re hebû, lê zêde tiştek pê safî nedibû. Jixwe Kurdîtiyeke bavikanî xwe eşkere dida hiskirin. Min nikarîbû ji vê rastiyê birevim. Lê bi dibistana seretayî re birîna min a pêşî jî bi vê rastiyê ve girêdayî vebûbû. Kurdîtî ji bo min gelekî bi pirsgirêk bû û cara pêşî têkiliya min a bîrbirinê bi wê re bi vî awayî çêbû. Di vî warî de hestyariya hemsalên min zêde çênedibû. Li gundê berê yê Ermeniyan li dibistana seretayî zarokên Tirkîtiya Komarê qebûlkirî hebûn û ji bo ku min mesafeya di navbera xwe û wan de ji holê rakirana, diviyabû min xwe bixista çavên mamosteyên xwe. Ji dibistana seretayî ve, ez timî li pey yekemînbûnê çûm. Ez niha wer fêhm dikim ku ji bo ez xwe ji neyêniyên ji rastiya Kurd bên biparêzim min serî li rêbazeke bi vî rengî daye. Min bi vî awayî dixwest xweseriya xwe piştrast bikim. Ez di vê de serketî bûm. Min di vî warî de çîroka xwe ya serketinê ya heta sinifa dawî ya zanîngehê her dubare kir. Min bi vê rêbazê ciddiyeta xwe piştrast kiribû û nîşanî 'dost û dijminan' dabû ku ez dikarim bibim zilam. Lewma ez dikarim êdî dest biavêjim karên girîng.

Ya rastî, bi duayên min ji ber kirî, ez li dîn serwext bûbûm. Ev awayê serwextbûnê jî awayekî ji rêûresmê bû. Min sîûsê sûreyên piçûk ji ber kiribûn. Ez di vî warî de wisa pêşde çûbûm, ez êdî her di ber mînbera melê gund de bûm. Jixwe mele jî ji bo min weha digot: "Abdullah tu bi vê lezê biçî tu yê karibî bifirî!" Ev jî ji bo min rêyeke din bû ku min pê rê li ber xwe vedikir û xwe bi bandor dikir. Bi vî awayî, min karîbû xwe di nava civaka ji rêûresmê de bikim kesekî xuya û karibe bikeve çavê her kesî. Van herdu rêbazan têra min kiribû. Di mijarên din de zêde xwestek û hewesa min çênebû. Carcaran wexta min emeletî jî dikir, min karîbû ku ez xwe bikim mînak. Di mijarên din de min xwe li paş digirt. Bêguman meşên çiya, kuştina maran, nêçîra çivîkan jî ji wan mijûliyan bûn ku min pêşengiya wan dikir.

Min di sala 1969'an de pêşî cesaret kir gav biavêjim sosyalîzmê û di sala 1970'î de jî min cesaret kir gav biavêjim Kurdîtiyê. Diviyabû min herdu bi hev re bimeşanda. Şêwazê min ê rahiştina van herdu rastiyên di nava xwe de pirsgirêkên mezin dihewandin, pêşî bi xisletên giraniya xwe bawerî û dogma bû û jixwe ji vê wêdetir jî nikarîbû biçûya. Dem demeke wisa bû, dema şoreşgertiya sloganan bû. Min jî hewl dida ez bi çend sloganên sereke bimeşim. Bêguman min timî guh dida hosteyan û lewma çend sloganên sereke yên min ew pîroz kiribûn hebûn. Ew jî ev bûn: 'Kurd hene', 'Pirsgirêka Kurd heye', 'Mafê her neteweyî heye çarenûsa xwe diyar bike', 'Mafê her neteweyî heye dewleta xwe ava bike', 'Meseleya millî herî rast bi rêya sosyalîzmê

çareser dibe', 'Mirov dikare şerê rizgariyê li ber çav bigire', 'Eger partiya hevpar çênebe partiya millî jî çêdibe'.

Jixwe ez di pratîkê de ji zarokatiya xwe ve ji bo peydakirina hevalên xwe nêçîrvan bûm. Yek ji derdê min ê sereke ew bû, ez komên piçûk ên zarokan pêk bînim. Ji bo vê jî min her tişt bi kar dianî. Di dema çûna xwe ya dibistana seretayî de min cemaeta xwe ya nimêjê pêk anîbû û dest bi îmamtiya wê kiribû. Seansên kuştina maran, seferên ji bo nêçîra çivîkan, kampanyayên ji bo berhevkirina pîvokan hertim di rojevê de bûn. Min ê hertim bahaneyek bidîta û bi pey hevalên xwe yên zarokatiyê biketama. Malbat jî di vî warî de têra xwe hişyar bûbûn. Li çareyekê digeriyan da ku zarokên xwe ji min biparêzin. Ma ne ez 'Dînekî Çolê' bûm. Çawa ku ev lêgerînên min jî nîşan didin, derdorên civaka modern û rêûresmê têra min nedikirin. Di ruh û zêhnê min de valatiyên kûr çê bûbûn. Wer xuya dikir ku ez ê bi hêsanî têr û razî nebûma. Rûsipiyê gund carekê bi mebesta min hişyar bike weha gotibû: "Tu mîna civayê qet di cihê xwe de nasekinî!" Bi rastî jî ez wisa bûm. Têgîna 'di cihê xwe de bitebite' ji bo min çênebûbû. Ez dema bi vê lezê gihiştim sala dawî ya zanîngehê ez bi awayekê serketî ji ezmûna gihiştî û pijiyayî bihurîbûm û ji bo karibim gav biavêjim karên ciddî dem hatibû.

Dema ku min di serê salên 1970'î de dest avêt karên civakî û neteweyî yên Kurdan ez têra xwe di nava nakokiyan de bûm. Mîna ku kesayeteke min a gelekî ciwan û ya gelekî kalbûyî ketibûn zikhev. Ez ji rêûresmê qut bûbûm, lê ez bi modernîteyê re jî nedibûm yek. Herdu jî mîna kincên lihevçêkirî û beloq ên li min nedihatin bûn ku min ew li ser pişta xwe digirtin. Lê herdu jî ji bo xelk wan bibîne min li xwe dikirin. Ya rastî, bi vî awayî ez ji şoreşgeriyê gelekî dûr bûm. Ji vê jî ya rasttir ew bû, ez di navbera mizgeft û dêrê de mabûm, lê ez ketibûm neqebek wisa her kêlî pêkan bû ku têde bifetisim. Ji vê jî wêdetir, ji bo nefetisim, diperpitîm. Li pêşberî min du mekanîzmayên xwe weke amûrên rizgariyê pêşkêş dikirin hebûn: Milliyetgiriya Kurd û çepgiriya Tirk. Min xwe nêzî herduyan kir. Aliyên balkêş ên herduyan jî hebûn. Kurdîtiya Barzanîgir-Talabanîgir deng vedida. Min bi şagirtên wan re têkilî danîn, lê ez tatmîn nekirim. Min millîtaniya çepgir a Mahîrgir-Denîzgir-Brahîmgir zêdetir nêzî xwe his dikir, lê ez di wê rewşê de nebûm ku karibim xwe bigihînim wan. Min qîma xwe bi sempatîzaniya Mahîr anîbû.

Bi vê rewşa derûnî di zivistana sala 1975'an de min li gorî xwe dest bi propagandaya gotina fermî kir. Min teorî û pratîk bi hev re dimeşandin. Jixwe piştî Mahîr Çayan û hevalên wî di 30'ê Adara 1972'an de li Qizildereyê hatin kuştin boykota me kirî û piştî wê heft meh razana me ya li Girtîgeha Mamakê (Nîsan-Cotmeh 1972), di Newroza 1973'an de bi civîna me li keviyên Bendeva Çûbûkê kir, min wêrîbû gavê biavêjim pratîka koma herî sist û berpirsiyariya wê bigirim. Ji bo min rastiya Kurd wê êdî bi encamên pratîka komê ve girêdayî bûna. Piştre ez timûtim fikirîm: Gelo ji bo gavavêtina ber bi rastiya Kurd ve ji bilî komê amûrekî baştir hebû? Ez hê jî bawer dikim ku ji bo xwe gihandina rastiyê kom amûra herî rast bû. Ji bawerkirinê wêdetir,

ji bo ez bibûma kesayeteke afirîner û şoreşger (ji bo muhafezekar û antî-şoreşger jî), komeke kolektîf amûrek bû ku bêyî wê nabe. Ez hê jî bawer dikim ku ferdê koma wî/wê yan jî rêxistina wê/wî nebe nikare bibe mirovekî civakî. Bêguman form û naveroka amûrê di warê encamgirtinê de diyarkera bingehîn e. Diviyabû ez komê, kom jî min bi pêş bixe. Kom ji roja ava bû heta bi Mijdara sala 1978'an roja xwe weke PKK îlan kir, ji komeke li heqîqetê digere û belav dike wêdetir neçû. Mirov nikare bibêje di polîtîkayê de bi çarpîkan jî dimeşiya. Lê bi giştî, em ji rewşa şîddet û polîtîkayê bi tesîr dibûn.

Heta bi darbeya 12'ê Îlonê sala 1980'î em ji her komek di nava vê rewşê de pêşdetir nebûn. Gavavêtina Rojhilata Navîn gavavêtineke stratejîk bû. Rastiyê me bêhtir serwext bikirana. Bi awayekî sîstematîk vegera me ya li têkoşîna çekdarî, em dahf dan ku em bêhtir li rastiya xwe serwext bibin. Me hewl da, em têkiliya Kurdistan û zorê lêbikolin. Pêngava 15'ê Tebaxê bi awayê xuya dikir eskerî bû, lê bi xwe pêvajoyeke aliyê wê yê polîtîk bêhtir xwedî giranî dabû destpêkirin. Têkiliya di navbera polîtîka û şîddetê de her ku diçû bêhtir eşkere dibû. Kesayeta civakî, afirêneriya ferd, hêza rêxistinî, civakbûna neteweyî û azadiya jinê xwe bi vê yekê bêhtir rave dikirin.

Duyemîn Hîcreta Mezin kir ku em rastiya navneteweyî bêhtir ji nêz ve nas bikin. Ez wexta dibêjim hîcreta duyemîn, hîcreta yekemîn jî li ser rêya Hz. Brahîm gavavêtina Rojhilata Navîn e, û heta divê mirov bi isyana min a li gund hîcreta xwe ya bajêr jî zêde bikim. Pêvajoya girtina min a li Îmraliyê di serê sala 1999'an de dest pê kir, zor da min ku ez hûrûkûr û bi awayekî yekpare li rastiyê serwext bibim. Asta heqîqetê ya di pêvajoya Îmraliyê de ji pêvajoyên berê bi gelekî li pêştir bû. Ji sûbjektîvîzmê ber bi objektîvîzmê, ji dogmatîzmê ber bi realîzmê, ji bêhestyariyê ber bi hestyariyê, ji dewleta netewe ber bi demokratîzmê, ji ekonomîzmê ber bi modernîteya kapîtalîst (sermayeparêzî, îndustriyalîzm û netewe-dewletparêzî), ji modernîteya kapîtalîst ber bi modernîzma demokratîk, ji dîroknasiya îdealîst ber bi dîroknasiya zanistî-felsefî ve gavên girîng hatin avêtin. Kesayeta xwedî heqîqet, tesewifa Îslamî jî gelekî li ser rawestiyaye û payeberz kiriye. Gotin û kirina der barê çarenûsa netewe û civakan de bi qonaxên heqîqetê re ji nêz ve têkildar in, û bi rêjeya heqîqetê ya di çarçoveya encamên pratîk de diyar dibin.

Dema destpêkê, bi modernîteya kapîtalîst re pêwendî tê danîn, rastiya Kurd û Kurdistanê ji rastiya yek cîranê xwe jî ne li pêştir e, ne jî li paştir e. Heta, dema ku bi mînakên xwe yên di asta gerdûnî de li ber hev bê girtin, wê bê dîtin ku di navbera wan de cudahiyeke ciddî tineye. Belkî jî kêmasiya xwe tineye, zêdehiya xwe heye. Qutbûn ji rastiya gerdûnî di serê sedsala 19. de dest pê dike. Sedsala 19. di çarçoveya dîroka gerdûnî de demek e ku têde serwextbûna li dîroka neteweyî derdikeve pêş. Dabeşbûna civakan li ser bingehê dîn veguheriye dabeşbûna li ser bingehê neteweyan. Li Ewrûpayê ji ummeta Xiristiyan a Katolîk gelek neteweyên laîk cihê bûne, kategoriyên civaka neteweyî derketine holê. Civakên neteweyî bi mezinbûna kapîtalîzmê re

kirasên netewe-dewletparêz û îndustriyalîst li xwe kirine. Civaka ji rêûresmê li ser bingehê sêberiya kapîtalîzm, îndustriyalîzm û neteweparêziya dewletê daqurtandine û ew kirine 'qefesa hesinî'. Li beramberî vê, têgînên civakparêziya demokratîk û sosyalîst û kêm ezmûnên wan hatin bipêşxistin. Ev ezmûnên ku Ewrûpayê di sedsala 19. de pêk anîn di sedsala 20. de li tevahiya Ewrûpayê belav bûne. Bi globalbûna kapîtalîzmê re îndustriyalîzm jî global bûye û dinya dabeşî zêdetirî dused dewletên netewe bûye. Li nava dinyayê rastiya civakî her ku çûye di nava sînorên teng û şidiyayî de bi civaka dewleta netewe ya homojen re wekhev hatine hesibandin. Ji aliyê heqîqeta civakî ve pêvajoyeke gelekî berevajî û xapînok bi mezinbûna modernîteya kapîtalîst re xurttir bûye. Nêrîna metafizîk a ku sîstema şaristaniyê ew bi pêş xistibû veguherî şêweyê pozîtîvîst ê kapîtalîzmê û bi vî awayî mohra xwe li têgihiştin, têgîn û teoriyên der barê rastiya civakî de xist.

Herçiqasî ev koma têgîn û teoriyan bi navê zanista mirovî û civakî têne pêşkêşkirin ji salên 1970'î ber bi roja me ya îro ve ketibin krîzeke kûr jî dîsa qalibên bingehîn ên têgihiştin û bîrbirina civakî pêk tînin. Têgîna rastiya civakî ya dabeşî hezar û yek şaxî kirine êdî bûye amûrekî sergirtin û maskekirina polîtîkayên kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewletparêziya netewe ku bi xwe dijminê rastiyê ne. Tevî vê yekê, sêlingê distanê yên modernîteyê di nava xwe de yekpare ne, ango rastiyeke wan heye. Rastiya modernîteyê di berdêla înkara civaka dîrokî de pêk tê. Rastî di civakên şaristaniyê yên kapîtalîst de bi awayekî bêhtir qelişî, birîndar û parçeparçebûyî ye. Rastiya civakî ya li dora kara herî zêde hatiye avakirin ew rastî ye ku di berdêla qirkirin û asîmîlekirina civaka ev rastî zirarê lê dike, pêk tînin. Mînak, civaka kapîtalîst kengî civaka ji rêûresmê û civaka kedkaran bike dûvikê xwe yê kole, dikare xwe pêk bîne. Civakên bibin dûvik jî bi tenê dikarin weke obje û alav hebin. Ew bi serê xwe zêde heqîqetekê îfade nakin. Ango rastiyeke pirr qels temsîl dikin. Civaka îndîsturiyel bi tenê li ser bingehê mêtingehkirina civaka cotkar û zenaetkar û bi heqdestê kolekirina wan pêk tê. Civaka dewleta netewe jî di berdêla kirina mîna moriyan û helandina civaka sivîl a demokratîk û civaka li derveyî dewletê de pêk tê. Di van mînakan de, kirine ku civaka dîrokî êdî ne rastî be, û civaka li şûna wê tê danîn, ji civakê wêdetir, veguheriye amûrên mekanîk ên diyardeya kara herî zêde pêk tînin. Hilweşîna rastiya civakî di vê diyardeyê de ye. Li vir, yekdestdariyên dêwane yên îndustriyê, saziyên fînansê û saziyên dewleta netewe di pozîsyona amûrên mekanîk de ne. Bi serê xwe rastiyeke wan a civakî tineye. Di pozîsyona amûrên kujer ên asîmîlasyonîst û millîtarîst, cinawirên malî û îndustriyel de ne ku civak û xwezayê diqedînin. Eger mirov rastiya Kurd li ber rohniya vê danasîna modernîteyê şîrove bike, wê şîroveya mirov gelekî nêzî rastiyê be û mirov ê karibe jê gelekî hîn bibe.

**1- Di Rastiya Kurd De Dayiknîştiman**

Moderníteya kapîtalîst li Anatolya û Mezopotamya Jor, li Tirkiyê û beşê mezin ê Kurdistanê mekanîzma sêling a distanê pêk aniye û bi vê, civaka ji rêûresmê ya Tirk-Tirkmen di nava wê de bi tevahî kiriye mêtingeh û helandiye, rastiya Kurd jî di astên cûrbicûr de parçe kiriye û xistiye hedefa xwe ji bo hebûna wê tine bike. Min hewl da, ez bi awayekî pêşnûme pêşkêş bikim ka di rastiya çandên li derveyî Kurdan de çi qewimiye, lewma ez ê dubare nekim. Lê ji ber têkiliya wê ya xurt bi rastiya Kurd re dubare be jî ez ê timûtim bi girîngî şîrove bikim. Eger mirov rastiya Kurd ji çend aliyan û şaxan ve şîrove bike, ji bo hêsankirin û hînkirinê gelekî di cih de ye. Em dema ku bi tevahî alî û şaxên wê binirxînin, em ê bibînin ku hemû kirine tiştên parçekirî, helandî û kirine ku ew êdî ne ew bin (bi sedema qirkirinê) û tevî vê rewşê di nava hemû parçeyan de wekheviyek heye û divê mirov vê bi girîngî li ber çavan bigire.

Bi awayekî dîrokî, ji Proto Kurdan heta bi Kurdên hemdem hertim rastiyeke dayiknîştiman ji bo Kurdan hebû. Di dema Sumeran de Kurtiye, di dema Lûwiyan Kurdiwana (welatê Kurdan) û di dema Helenan de têgîna Kardokya hatiye bikaranîn. Ev têgîn hemû ji yek kokê zêde bûne û bi demê re veguherîne û herî dawî jî siltanên Selçûqiyan ji dema serweriya xwe ya li Îranê û pêve (ji sedsala 11. P.Z.) bi awayekî fermî Kurdistan bi kar anîne. Di dema Împaratoriya Osmanî de têgîna Kurdistanê di nava sedan fermanî de ango di nava fermanên siltan de timûtim hatiye bikaranîn. Di dema damezrandina Komarê de M. Kemal bi xwe gelek caran têgîna Kurdistanê bi devkî û nivîskî bi kar aniye û parlementerên pêşî yên herêmê çûn Parlementa Tirkiyê xwe weke ‘Mebûsên Kurdistanê’ dane naskirin. Ji komploya Tirkê Spî ya sala 1925’an û pêve, her cure mîrate û navlêkirinên têkildarî Kurd, Kurdistan û Kurdîtiyê bi carekê bi rêbazên dehşetwarî hatin qedexekirin û xwestin bikin ku ew êdî ne diyarde bin.

Ev darbeya li dijî têgîna Kurdistanê gelek armancên xwe hene. Ya pêşî, Tirkên Spî (Em ji van re dikarin burokrasiya ciwan a bûrjûwaziya Tirk jî bibêjin, lê bi şertê ku li rêveberiya wê ya kakil sermayeya Cihû bê zêdekirin) bi rêbazên Ingilîz û Fransiyan Kurdistan ji nû ve kirin çar parçe û parçeyê herî mezin ji xwe re veqetandin û bi her tiştê di navê de Tirk hesibandin û xistin pêvajoya qirkirinê. Ev, li dijî cografya Kurdistanê darbeyeke komplowarî ye. Di sala 1925’an de bi Plana Islahkirina Şerqê xwestin rastiya Kurd bi temamî ji dîrokê rakin û welatê Kurdan ‘bi hikmê tine’ hesibandine.

Têgînên welat, dayiknîştiman di serdema netewebûnê de girîng bûne. Dayiknîştiman weke têgîneke sosyolojîk, cografyayeke bi sedsalan li ser çand hatiye afirandin, bazar hatiye çêkirin, serwextbûneke dem û dewranan pêk hatiye û weke demografîk li ser cihûwarbûnê îfade dike. Kapîtalîst hewcedarî bazarê ne, lê ji vê girîngtir, ji bo gel û neteweyan ku ew afirênerên rastî yên çanda civakî ne, welat ew mekanê jiyanê ye, bêyî wî nabe. Welat bi tenê ne ew cografya ye ku li ser çand pêk tê û hilberîna maddî ya jiyana civakî çêdibe, ew xanî û dergûşa jiyana civakî ye ku

têde ruh û dîroka wê pêk tê. Mirov jê mehrûm û bêpar bimîne (weke ruh û têgîn), ji bêruhmayîn û bêxanîmayînê xirabtir e. Yê civakê bêxanî û bêruh bihêle, dikare wê bê çanda maddî û manewî jî bihêle. Jixwe bûyerên bi vî rengî di bin navê Plana Islahkirina Şerqê de bi awayekî hovane pêk anîne. Di çarçoveya komployê de isyanên li ser zemînê provokasyonê pêk hatine, kirine bahane û kevir li ser kevir nehiştine û hewl dane ku gotineke bi tenê jî der barê rastiya Kurd û Kurdistanê de neyê bikaranîn. Hêmanê xwerû yê damezrînerê Komarê, gelê di dîrokê de belkî cara pêşî bi navê xwe bûye xwedî welat, hatiye ber jidestdana wesfê gelekî xwediyê welatê xwe bi xwe.

Di ti serdema dîrokê de nehatiye dîtin ku îdeolojiyekê û dînekî welatek bi vî awayî tine hesibandibe. Di zêhn û biryara pirraniya civaka Tirk de nêzîkatiyeke bi vî rengî tineye. Mirov dikare mînakên pratîka diyardeya Tirkê Spî heman wextî di serî de Elmanya, Îtalya û Japonya li cem gelek neteweyên (neteweya dewletdar, neteweya bi destê dewletê hatiye afirandin, dewleta bi destê neteweperestî û milliyetgiriyê hatine pêkanîn) gav avêtine moderNîteya kapîtalîst bibîne. Lê ji ber ku kadroyên burokratîk ên Îttîhad û Teraqîgir ên dixwestin ji neteweperestiya Tirk dewletê çêkin di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de tevî Elmanan şer kiribûn millîtarîzm û milliyetgiriya Elman a li mişara wê gihiştibûn esas digirtin, ne bi tenê cêwî yan jî weke neteweperestên Nazî bûn, ji hêmanên wê yên damezrîner bûn. Hîtler li xwe mikur hatiye ku dema wî xwe li qirkirina Cihûyan rakişandiye, wî ji ceribandina qirkirina Ermeniyan a Hukûmeta Îttîhad û Teraqiyê îlham girtiye.

Bêwelatmayîna Kurdan bi van du ceribandinên dîrokî re ji nêz ve têkiliya xwe heye. Herweha divê mirov bandora demeke îdeolojiya pozîtîvîst derket asta herî jor jî li vê zêde bike. Zanistperestiya pozîtîvîst diyardeyên civakî jî bi pîvanên zanistên fizîk û biyolojiyê dinirxandin. Tirkperestên Spî yên di bin bandora vê îdeolojiya dogmatîk laîk de bûn, kengî diyardeyek bi qanûnan tine dihesibandin, bawer dikirin ku ew diyarde êdî hukmê xwe û rastiya xwe namîne. Bi vî aliyê xwe, ji dogmatîkên serdema navîn bêhtir dogmatîk bûn. Têgîna Tirkiyê di van salan de pêk hatibû. Ji ber pirraniya şêniyên Tirk û pêkhatina wan a dîrokî, ev têgîneke şaş nebû. Lê bi darê zorê û qanûnan berfirehkirina sînorên vê têgînê bi awayekî ku Kurdistanê jî bigire nava xwe, bi rastiyên dîrokî re li hev nedikir. ModerNîteya neteweperest a Tirk, bi awayekî, mîna dînekî nû ava bike, wisa ji xwe bawer dikirin ku her diyarde û têgîna qebûl nakin jêre bibêjin “tine bibe” wê tine bibe. Bêguman di vê yekê de millîtarîzma kujer bi rola sereke radibû.

Ji bo Kurdistan ji Kurdan re nebe welat, isyanên Kurdan bi awayekî bêrehm pelixandin. Li şûna gelekî beşdarî damezrandina Komarê bûyî, hinek kesên bê welat û hov mabûn. Navê wan qedexe bû. Jixwe dema li çiyê li ser berfê meşiyabûn dengê ‘kart kurt’ derxistibûn û navê xwe ji wir girtibûn; bê zar û ziman bûn, lewma diviyabû bi her awayî bêne pelixandin û tinekirin. Hêza hegemonîk a kapîtalîst Ingilîstan hevkarê herî nêz ê vê polîtîkayê bû. Qet dengê xwe dernexist û

di binî re destek da vê polîtîkayê. Jixwe ji ber vê sedemê li ser petrolên Mûsil û Kerkûkê rûniştibû. Nêzîkbûna li Franseyê, qebûlkirina têgihiştina huqûq û neteweyê laîk, têrê dikir ku çavên xwe li van kirinên li derveyî mirovahiyê bigire. Elmanya jixwe endamê damezrîner bû. Li gorî sosyalîzma pêkhatî ya Rûsyayê, kirinên Tirkperestiyê li Kurdistanê serketina pêşverûtiyê li dijî paşverûtiyê bû. Komara Mahabadê ya Kurd a li Rojhilatê Kurdistanê jî bûbû qurbana heman polîtîkayan. Hêzên modernîst ên kapîtalîst ji bo berjewendiyên xwe yên rojane welatê hezar salan ê gelekî bi carekê feda dikirin, tine dihesibandin û ji vê jî fikar nedikirin. Ev piştrast bûbû.

Rastiya Başûrê Kurdistanê di encama hesabên şerê sar de hatiye amadekirin. Gelê Kurd ê bi fizîkî be jî hebûna xwe diparêze, ji bo nikaribe bîr bibe û hukim li çarenûsa xwe bike bi vî awayî pêşî lê digirin û bi armanca qereqola pêşî ya sîstemê rabe Kurdistaneke piçûk timî yedek hiştin. Ji ber ku vê carê berjewendiyên wan ev ferz dikir. Çawa ku gelên Helen û Ermen ên welatên xwe yên dîrokî ji dest dan û di berdêlê de weke deynekî diyet mehkûmî parçeyekî piçûk ê welêt kirin, diyardeya jêre Kurdistana Iraqê tê gotin jî bi heman awayî derket holê. Dema sedsala 20’an bi dawî bû, belkî jî di dîrokê de welatê pêşî û yê herî kevin hema hema hatibû tinekirin. Modernîteya kapîtalîst civakekê bêwelat bihesibîne, ev ji bo wê civakê tê wê maneyê ku nîv bi nîv rastî û hebûna xwe ji dest daye. Piştî ku welat tine hat hesibandin, ji bo civak li ser piyan bimîne, çanda maddî û manewî ya heyîna xwe dewam bike, hewcedarî mûcîzeyan e. Ev dişibe rewşa mirovekî di valatiyê de avjeniyê bike yan jî bimeşe. Yan tu yê bibe masî bilîzî yan jî tu yê bibî çivîk bifirî.

Yek ji gunehên herî mezin ên modernîteya kapîtalîst li beramberî diyardeya welat kirî ew e, têgihiştina hişk û naguhere ya sînorên tek netewe ye, û ev bi sextekarî weke têgîneke herî pîroz xistiye piyaseyê. Li ser têgihiştina sînor a dewleta netewe weke kult û îbadetekê radiwestin qaşo dixwazin nîşan bidin ka çawa welat diparêze. Sînorên wê bi xwe, sînorên milkiyeteke herî berfirehkirî û giştîkirî ne. Sînorê herî pêşdebirî yê milkiyetê ye; qonaxa herî dawî ya dîroka milkiyeta bi çîtkirina dora erdekî destpêkirî ye. Sînoran wisa hişk û asê dikin, qaşo ji bo bihostek wê jî dikarin şer bikin. Şer dikin, lê ne ji bo gel, ne ji bo berjewendiyên netewe, ji bo potansiyela kara herî zêde ya di nava xwe de dihewîne. Sînorên dewleta netewe çiqasî hatibin şidandin û asêkirin, derfet û îmkanên kara herî zêde jî ewqasî hatine amadekirin.

Bêguman sînorên welat ên gel û neteweyan hene. Lê pêkhatin û bergiriya van sînoran bi temamî ji zêhniyeta dewleta netewe cuda ne. Sînorên welat ên gel û neteweyan xetek e ku bi milkiyetê hişk nebûye, berevajî li ser bi cîranan re parvekirin û hevkartiyeke gurûgeş, senteza çandan a piştgirî, dostanî û pêkhatinên civaka jor dibe. Herî zêde li van qadan pirr netewebûn û çandbûn pêk tên. Ev qad xelekên afirîner in ku şaristanî û çandeke jortir lê dimeye. Ne qadên pevçûn an jî şer in, qadên aştî û biratiyê ne. Sînorên di dîrokê de ji karûbarên bi vî rengî re bûne dergeh, di dema modernîteya kapîtalîst de bûne xetên herî zêde li ser wan dijmintî û şer

qewimîne, mayîn hatine danîn, têlên rêsayî lê hatine badan û dîwarên mirov nikare ji wan derbas bibe, hatine lêkirin. Veguherandine dîwarên girtîgeha ku gel û netewe têde têne hiştin. Gel û neteweyên di nava wan sînoran de têne hiştin, bergiriya wan nayê kirin, ew kirine qefesa hesinî, ew kirine girtî, ew kirine eskerê bi darê zorê, ew kirine bêkar û ew kirine karkerên heqdesta wan kêm. Rêûresm û çandên etnîsîte, gel û neteweyên li derveyî neteweya serdest a fermî dixin ber çerxa asîmîlasyon û qirkirinê. Di rastiya sînorê dewleta netewe bi xwe de berjewendiyên bêsînor ên yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê veşartî ne.

Rastiya Kurd a ji dayiknîştiman hatiye qutkirin, rastiyek e ku birîndar e, diperpite. Gel û neteweyek li dayiknîştimana xwe xwedî dernekeve, ev tê wê maneyê ku dev ji dîrok û çanda xwe berdaye. Di encamê de dev ji netewebûnê û jiyana bi awayekî civakî berdide. Mirov nikare rastiya civaka Kurd bê welat bide naskirin, ji ber ku ew bê welat nikare hebûna xwe dewam bike, paşê şik têde nîne ku wê ji hev de bikeve û tesfiye bibe.

Herçiqasî rastiyeke welat a mêtingeh û qirkirinê hebe jî hebûna Kurdistanê înkar nabe. Heta ferdê dawî yê ji wan kesan ku bixwazin bi awayekî azad, girêdayî û hêjayî dîroka wê û rastiya wê ya civakê li ser erdên wê bimînin, hebe, hebûna wê wê dewam bike. Ne bi tenê welatê Kurdan, wê bibe welatekî hevpar ê Ermenî, Suryanî, Tirkmen, Ereb û her ferd û çanda bi awayekî demokratîk, azad û wekhev parve dike. Nebûna dewleta netewe wê nebe bêşensî wê bibe şens. Vê carê, wê nebe welatê bajarvaniyeke biçîn a nû ku dijminê ekolojiyê ye, û nebe yê dewletdariya netewe, li Rojhilata Navîn wê bibe welatê şeveqa modernîteya demokratîk lê biavêje û bibe dergûşa wê ya têde mezin bibe.

**2- Di Rastiya Kurd de Şaxê Neteweyî**

Hewl didan rastiya Kurd di çarçoveya pirsgirêka Kurd de bikin têgîn. Dema ku behsa pirsgirêka Kurd dikirin, serwextî û bîrbirineke berfireh çênebûbû û nizanîbûn bi rastiyeke çawa re rûbirû dibin. Beriya her tiştî hewl didan rastiya Kurd bi aliyên wê yên ziman û çanda cuda piştrast bikin. Herweha ji ber ku îdeolojiya fermî bi kampanyayeke dijwar a înkar û îmhayê dor li rastiya Kurd girtibû, piştrastkirina hebûna Kurdan dibû pirsgirêka pêşî ya di rojevê de cih bigire. Ev ji bo rastiya Kurd dibû nêzîkatiyeke çewt û gelekî paşvemayî. Jixwe hebûneke li naverastê hebû û piştrastkirina wê dişibiya guftûgoya roj heye yan tineye. Ev jî dihat wê maneyê ku axaftinên dihatin kirin vala û pûç bûn, dem bê mane dibihurî û ava diherikî aşê rejîma qirker û mêtinkar digerand. Ya rastî, guftûgo jî ji aliyê Jon Kurdên di asîmîlasyonê re hatibûn derbaskirin dihatin meşandin. Di bin navê guftûgokirina pirsgirêka Kurd de ya rastî hebûn û statuya xwe guftûgo dikirin.

Dema min dest avêt van karan, min xwe zêde nekir destikê van guftûgoyan. Herçiqasî min a rast hûrûkûr analîz nekiribû jî min bawer kiribû rêbaza rast ew e ku divê pirsgirêk ne weke guftûgoya

hebûn û tinebûnê, belê bi têgînên rizgarî û azadiyê bê îfadekirin û min li ser vî bingehî gav avêt. Sedema herî girîng a pê em ketin pêşiya komên heqîqetê yên ji hev belawela, ev rêbaza gavavêtinê bû ku me ji xwe re kir bingeh. Piştî ku me rêbaz rast hilbijart, zû dereng wê em bigihandana rastiyê bi xwe. Lê kêmasiyeke ku vê rêbazê rê li ber vedikir hebû, wê rê li şîroveya dogmatîk a rastiya Kurd vekiribû. Jixwe pêşhukmên xurt hebûn ku weke her rastiya gelekî yan jî neteweyekî dikarîbûn rastiya Kurd binirxînin. Weke rastî guftûgonekirina rastiyê çiqasî rêbazeke rast be, mirov pêşnebîne ku çawaniya wê dikare pirr guhertî be û bi guman nêzîkî nebe jî ewqasî rêbazeke kêm bû.

Di Newroza 1973'an de civîna koma me ya pêşî çêbû. Min têgîna 'Kurdistan mêtingeh e' pêşkêşî civînê kir û di wan rojan de ev têgîn diviyabû weke sirr û razekê bihata veşartin. Herçiqasî nûnerên du komên sereke yên meylên asîmîlasyonîst hevkar ê wê demê Kemal Burkay û Mumtaz Kotan îddîa bikin ku ew têgîn bi kar anîne jî ez yeqîn nakim ku rast e. Eger wisa bûya min hewce nedidît vê têgînê weke sirrekê veşêrim. Paşê guftûgoyên der barê Kurdan de li ser têgîna 'Kurdistana Mêtingeh' meşiyan. Pirraniya çepgirên Tirk bi gotina "Tevahiya Tirkiyê mêtingeh e, yan jî nîv-mêtingeh e" hewl didan pirsgirêkê ji ciddiyetê dûr bikin. Li gorî min hebûna Kurdan bi şêwazekî şoreşgerî, di serî de Mahîr Çayan, Denîz Gezmîş, Brahîm Kaypakkaya û hevalên wan, kengî di berdêla canê xwe de weke gotin ev têgîn anîne ziman piştrast bûye. Ji vir û pêve, pirsgirêk azadî û rizgariya ji vê statuyê bû. Teoriya Kurdistana Mêtingeh li ser vê riyê destpêkeke rast bû.

Rasyonalîzm û ampîrîzm, di rastiya Kurd de weke du rêbazên bingehîn ên lêkolînê bikêrhatîbûna xwe nîşan dan. Rasyonalîstan wer bawer kiribûn ku ew ê karibin bi piştrastkirina rastiya Kurd bigihîjin armanca xwe. Rewşenbîrên bûrjûwa yên bi awayekî hay ji xwe heyî komele ava dikirin, kovar diweşandin û bi tevgerên partiyan ên destên xwe ji ava sar di ya germ de danedikirin, yeqîn dikirin ku wê bi vê riyê bigihîjin encamê. Bendewar bûn ku wê rojekê mentiqê modernîteya kapîtalîst ber bi bextê wan ve çerx bike. Kesên di nava hewldanên teng ên ceribandinê de bûn, bêhtir tercîh dikirin ku hisên isyankar biteqin û serî rakin. Li gorî konjonkturê ciwanên şoreşger ketin vê rewşê. Bêguman darbeya 12'ê Îlonê bi hêsanî karîbû bêhnê li herdu aliyan biçikîne, ber bi teslîmiyetê ve bibe û wan îmha bike û bi vî awayî hêza wan a heqîqet û îradeyê derxist holê. Yên bi xwe ji sîstemê qut nebûbûn li ser rêya teslîmiyetê dewam kirin, yên li derveyî sîstemê lêgerînên wan hebûn wê li pey îradeyeke bi hêz û lêgerîneke hûrûkûr bibeziyana.

Min darbeya 12'ê Îlonê ji van herdu meylan cuda bi lêgerîneke heqîqetê û bihêzkirina îradeyê pêşwazî kir. Rasyonalîteyeke min a diyar hebû. Hewldanên min ên îradeyî jî nabe ku piçûk bêne dîtin. Piştre, kengî min xwe di ber çavan re derbas kir, ez li cudahiya xwe serwext bûm. Ya min cuda dikir ew bû, min teorî û pratîk di zikhev de, ne bi gotinê, lê bi xwe pêk dianî. Min gotin û

çalakî sipartibûn sedemên teorîk û pratîk û bi vî awayî meşiyabûm. Vê yekê hişt ku ez karibim pêngava 15’ê Tebaxê 1984’an û vegotina aştiyê ya 1993’an bikim. Ez li ser heman riyê meşiyam û di pêvajoya Îmraliyê de bi pratîkên çareseriya demokratîk ez gihiştim serwextbûna modernîteya demokratîk.

Rastiya netewe û gelê Kurd di dîrokê de cara pêşî ye ku gihiştiye asta herî bilind a bîrbirin û serwextbûnê. Li vir serwextbûn û bîrbirina em behsa wê dikin, ji qîmkirin an jî qîmnekirinê, bîrbirin û serwextbûna li rastiyê ji komeke elît an jî partiyekê wêdetir e, jê bihurî ye. Gel û netewe weke qurmê bingehîn ê rastiyê, li rastiya xwe serwext bûye. Ez behsa gel an jî neteweyekî li xwe serwextbûyî dikim. Netewe bi xwe weke têgîn, rewşeke zêhniyetê îfade dike. Ji bo Kurdan ev rewşa zêhniyetê pêk hatiye. Lê em heman xusûsê nikarin ji bo bigewdebûnê bibêjin. Ji ber ku bi tenê jiyan bi zêhniyetê nabe, bi gewdebûna wê pêkhatineke girîng e, ango rewşa heqîqetê îfade dike û wê bike.

Min serdema çanda neolîtîk weke serdema bi heybet a Proto Kurdan şîrove kiribû. Heta bi modernîteya kapîtalîst Proto Kurdan bi awayekî qewmî di sîstema şaristaniya navendî de weke rastiyeke bi hêz a Kurd gav avêtibûn. Kominên ji federasyonên qebîle û eşîrên serdema destpêkê heta bi ceribandinên împaratoriyan rêbazên polîtîk nas kiribûn, nexasim bi sîstema baweriyê ya Zerdeştî forma gelbûnê bi dest xistibûn. Formên pêşî yên Kurdan li gorî dema xwe ne paşvemayî bûn, bi roleke pêşeng radibûn. Herçiqasî ev form bi Îslama serdema navîn bêne berevajîkirin jî hem ji aliyê zêhniyetê ve hem ji aliyê bedenê ve Kurdan formên xwe yên qewmî xurt kiribûn. Her qebîle û eşîr bi qasî misilman bûn ewqasî jî Kurd bûn. Herweha her mezhebî rastiyeke çînî ya diyar îfade dikir. Forma gel an jî qewm, gava pêşî ye ku etnîsîte di nava xwe de dabeş dibe û vediguhere çîna civakî. Eşîr û qebîle hebûna xwe diparêzin, lê destûr didin ku di nava wan de çînên civakî pêk bên. Rastiya etnîk û rastiya çînî di zikhev de ne. Dînên yekxwedayî hinekî jî forma îdeolojîk a vê dizikhevdebûnê, perdeya wê pêk tînin. Çi bi awayekî begtiyên serbixwe bin, çi jî yekeyeke girêdayî sîstema împaratoriyê bin, tebeqeyên jor ên qebîleyan rastiya çînan a bûye navenda desthilatdariyê îfade dikin. Xwe weke elîta serdest a xanedaniyê bi nav dikin.

Di serdema navîn de bi maneya desthilatdariyê ji bo qewman a pirsgirêk ew e, qraltiyeke navendî pêk bînin. Di xet û rêzên Ehmedê Xanî de ev hesret tê ziman. Ereb, Fars û Tirk jî dilê xwe dibijînin derketina holê ya qraltiyên navendî ango seltenetiyê. Ji bo Kurdan jî wer dihesibînin ku  qraltiyeke navendî ya Kurdan a bi vî rengî pêk bê, kes ê nikaribe li pêşiya wan bisekine û bi vî awayî pirsgirêk ê çareser bibin. Di rastiya qewmî ya Kurd a serdema navîn de pirsgirêkeke bi vî rengî heye. Dînamîzmek e ku her diçe hêza wê ya pêngavê zêde dibe îfade dike. Me berê diyar kiribû ku ji beşên xizan ên gel re ên ku ji qebîle û eşîran vediqetin Kurmanc tê gotin. Çawa ku li cem Ereban Bedewî, li cem Tirkan Tirkmen û li Îranê Ecem tê gotin. Kurmanc

pêşî li gundan, paşê li bajaran hejmara wan her ku çû zêde bû. Ev kategorî bi firotina keda xwe yan jî kirêkirina wê debara xwe dike. Di çînîbûnê de ev beş tebeqeya jêr a bi heqdest dixebite û tê kirêkirin pêk tîne. Ev bi awayekî proleterbûn e. Nexasim dema ku bi heqdest û kirêkirinê dixebitin weke zehmetkêş an jî karker têne binavkirin. Di nava şert û mercên kapîtalîst de wê ev pêvajo bi leztir bibe. Bi pêvajoya gelbûnê re wê veguherîna ji çanda qebîle û eşîrê ber bi çanda gel ve pêk were. Di nava vê rewşa çandî ya maddî û manewî de wê bigihişta qonaxa pêkhatina netewe.

Tê gotin, bazar netewe pêk tîne. Lê ev fikrek e ku şêwazê pêkhatina rastiya netewe ya bûrjûwa îfade dike û yek ji têgînên şaş ên netewe yên sosyalîzma pêkhatî ye. Di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de du cure rêbazên sereke yên netewe hene. Mirov dikare rêbazan cûrbicûr bike. Rêbaza yekemîn ew e, li ser bazarê divê serdest bibe, ji bo vê jî divê çîtên feodal ango sîstema begtiyê rake, para karê û xistina mal a bazarê zêde bike. Bi vê armancê bi slogana bazara neteweyî radibe. Ji ber ku ev rêbaza netewebûyînê di dema pêşî ya milliyetgiriya bûrjûwayê de beşekî berjewendiyên hevpar ên herkesî îfade dikir weke hêmaneke pêşdebir a civakê hatiye nirxandin. Di çarçoveya netewe de desthilatdarî û sermayeyê xwe bi rêxistin kirine û vê yekê herdu beş jî bi hêz kirine, lewma dewletdariya netewe xurt destek kirine. Neteweparêziyeke bi vî rengî alîkariya xwe ji neteweparêziya destpêkê re her ku diçe kêm dike û diterikîne. Neteweparêzî her ku diçe li ser bazarê û kesên bi heqdestê xwe dixebitin, li ser dezgehdar, dikandar, li ser bazirgan û zenaetkaran vediguhere amûrê îdeolojîk ê zordestî û mêtinkariyê. Duyemîn rêbaza sereke ya netewebûyînê, li dijî hêzên desthilatdarî û sermayeya hundir û derve neteweparêziya demokratîk a tebeqeyên kedkar e. Neteweparêziyeke bi vî rengî hem weke meyleke îdeolojîk, hem jî weke çalakî hewl daye bi bandor bibe. Diyardeyên ji wan re demokrasiyên Ewrûpayê tê gotin, di bingehê wan de ev bandor heye. Têgîna demokrasiya bûrjûwayê şaş e. Jixwe demokrasiya bûrjûwayê nabe, weke şêwazê dewletekê jî demokrasî hîç nabe. Rewşa li Ewrûpayê pêk hatî jî mirov dikare weha îfade bike; tebeqeyên kedkar ên têkoşîna heq meşandin bi yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê re li hev kirin.

Piştî ku hêzên hegemonîk ên kapîtalîst ên Rojava ketin herêmê, çawa ku li gelemperiya Rojhilata Navîn bû, pêşdeçûna neteweyî ya diyardeya Kurd jî ji dînamîkên hundir qut bûye. Ev pêvajoya ku di serê sedsala 19. de bi lez bûye pêvajoyên netewebûyînê çeloxwarî kirine. Hêzên hegemonîk bi destek an jî astengkirinan hewl dane şêweyekî bidin netewebûyînên di nava Împaratoriya Osmanî de û di vê de jî pîvana diyarker berjewendiyên sîstemê ne. Li gorî berjewendiyên xwe neteweyan pêk tînin an jî ditepisînin, heta rê li ber tinebûna wan vedikin. Împaratoriya Osmanî demeke dirêj li dijî netewebûyînê li ber xwe da. Hewl da bi rêbazên netewetiya lihevçêkirî dewam bike. Li gorî rêzê rêbazên hatin ceribandin Osmanîgirî, Panîslamîzm û Pantirkîzm e. Piştî ku ev rêbaz têkçûn û li gorî berjewendiyên hêzên hegemonîk gelek dewletên netewe derketin holê, bi tenê li dawiyê ji neteweparêziya Anatolyayê re

zemînekî di cih de ma. Pêvajoya em jêre neteweparêziya Komarê û Rizgariya Neteweyî dibêjin rastiya vê pêvajoyê îfade dike. Ev meyla ku dixwazin weke kemalîzmê jî nîşan bidin, me çîroka wê gotibû. Ji dubarekirina wê zêdetir, mirov di çarçoveya neteweparêziya Kurd, Tirk, Cihû û Ereb de binirxîne wê bêhtir kêrhatî be û mirov ê baştir jê hîn bibe.

Neteweparêziya Anatolyayê bi pêşengiya Mistefa Kemal weke tevgera rizgariyê bi gewde bû. Di vê de para rastiyê heye. Destpêkê isyaneke li dijî hêzên hegemonîk kiribû bingehê xwe. Di vê tevgerê de Kurd û Cihû bi rola damezrîner radibin. Tevî xwediyên erdan û eşrafên Kurd, sermayedar û kadroyên elît ên Cihû, bi hêmanên milliyetgir burokratîk ên Tirk re hevgirtin. Xiristiyan li derveyî vê hevgirtinê man û bi giranî bûn hedefa wê. Ev hevgirtin di qonaxa damezrandina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de dibe û di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de tê pêkanîn. Di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de (1919-1922) tê tengkirin û dewamkirin. Herçiqasî hin gumanên xwe hebin jî pirraniya rewşenbîr û eşrafên Kurd destekê didin vê hevgirtinê. Protokola Amasyayê, Kongreyên Erzirom û Sêwazê, pêkhênerên pêşî yên Meclîsa Tirkiyê vê hevgirtinê eşkere nîşan didin. Bi Qanûna Reforma Kurd a di 10'ê Adara 1922'an de ev hevgirtin tê xurtkirin. Bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana Komarê re qonaxeke nû dest pê dike. Arîşeya Mûsil û Kerkûkê ya bi Ingilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî Kurdan bigihînin encamê. Peymana Enqereyê ya bi Fransiyan re herçiqasî ji Mîsak-î Millî paşvegavavêtinek bû û hinekî jî li dijî Kurdan û Tirkmenên li Sûrî bi encam bûbe jî di asta felaketê de pêk nehatiye. Beşekî Kurdistanê ji Franseyê re hatiye hiştin. Lê ji ber neyêniyên wê yên li ser rastiya netewe ya Kurd divê mirov bi girîngî li ser raweste.

Li ser bingehê avakirina Iraqê Kurdistan hat parçekirin û ev bi awayekî eşkere binpêkirina Mîsaq-î Millî bû. Vê bûyerê li Parlementa Tirkiyê û di navbera Kurdan de rê li ber tengezariyeke mezin vekir. Ev peymana di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Ingilîzan re hatiye mohrkirin, gelek aliyên wê yên tarî hene. Şert e ku mirov vê peymanê weke destpêka dîroka qirkirina Kurdan binirxîne. Çawa ku tê zanîn, Mistefa Kemal di vê mijarê de jî gelekî tengav bûye û di warê hesabdayînê de ketiye zehmetiyê. Bi vê peymanê, dinamêt xistine bingehê lihevkirina dîrokî ya Kurd û Tirkan. Ya rastî, isyana sala 1925'an a bi serokatiya Şêx Seîd ji bo sergirtina vê xiyanetê hem hatiye provokekirin, hem jî bi awayekî gelekî bêmane bi xwînrijandin û bêrehm hatiye tepisandin. Di vê çarçoveyê de sala 1925'an, ne bi tenê isyan, bi awayekî rastî dema destpêkirina komplo, xiyanet û qirkirinê ye. Di vê de dîplomasiya Ingilîz û hêmanên Cihû bi rola diyarker rabûne. Çawa ku tê zanîn, di vê demê de ji ber ku Fethî Okyar gotiye "Ez destê xwe bi tevkujiya Kurdan nakim" ji serokwezîrtiyê hatiye xistin û li şûna wî Îsmet Înonî hatiye wezîfedarkirin. Fethî Okyar ji zarokatiya xwe ve hevalê Mistefa Kemal bû û herî zêde ji wî piştrast bû. Di dema ceribandina Firqeya Serbest de kengî hat dîtin ku serketiye, dîsa ji aliyê Îsmet Înonî ve hatiye xistin. Eşkere ye ku di van salan de bi tenê hêmanên Çepgir û Îslamî nayên tesfiyekirin, bi awayekî rastî yên

weke netewe têne tesfiyekirin Kurd in. Wekî din, M. Kemal û koma wî gelekî bêhêz hatine hiştin. Ne ku komareke demokratîk, lê sîstemeke dîktator a tesfiyeker derdikeve holê.

Ji bo rastiya hemdem a Kurd û Tirk û têkiliyên di navbera wan de rast bêne fêhmkirin, pêwîst e ku pêvajoya komploya 1925'an bi awayekî berfireh were analîzkirin. Îmajeke 'Atatirk' heye ku fikra fermî her tiştî pêve girêdide û ev îmaj li Tirkiyê di tevahiya têgihiştinên zêhnî de bi awayekî hegemonîk hatiye bicihkirin. Li gorî zêhniyeta Îslamî ya gelekî bi hêz e, ev îmaj serdesttir hatiye kirin. Ev zêhniyeta ku xwe weke neteweparêziya Tirk a laîk nîşan dide ji sedî sed diyardeyeke nû ya dînî ye. Laîktî û neteweparêziya Tirk weke dînekî pozîtîvîst hatine avakirin. Mînaka herî nêz a vê yekê li Franseyê di salên 1880'î de weke Komara Franse ya Sêyemîn hatiye avakirin û neteweparêziya Tirk ev mînak ji xwe re weke model girtiye. Ji vê jî ya girîngtir ew e, di vê avakirina neteweya laîk de ne bi tenê milliyetgiriya Tirk, milliyetgiriya Cihû ya Siyonîst jî gelekî bi bandor bûye. Heta di vê avakirina neteweya nû de milliyetgiriya Cihû ya Siyonîst di mijarên polîtîka derve, eskertî û rejîma ekonomîk de bi rola pêşeng rabûye. Di dîroka hemdem a Tirkiyê de xusûsa herî zêde tê veşartin naveroka vê rolê ye. Beriya Îsraîlê milliyetgiriya Siyonîst li Anatolyayê xwe bi maskeya neteweparêziya Tirk ango 'Tirkê Spî' serwer û ava kiriye. Proto Îsraîlek mewzûbehs e.

Neteweparêziya Tirk a Spî di bin rejîma dîktatoriyeke hişk de domandina herdu neteweparêziyan e. Li vir, di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de hêmanên Çepgir, Îslam û Kurd ên di çand û polîtîkayên hundir û derve de hev girtibûn, bi komployan têne tesfiyekirin. Komplo di nava xwe de bi dijwarî û bêrehm hatiye meşandin. Weke hedef Kurd hatine hilbijartin, isyan hatiye provokekirin (Komeke piçûk a jendermeyan dişînin ser Şêx Seîd ê li Pîranê û di şerê li vir de du esker têne kuştin û ev bûyer bi temamî provokasyon e) û di encamê de bi rêbazên bigihîjin qirkirinê Kurd ji sîstemê hatine tesfiyekirin û bi 'hukmê tinene' hatine hesibandin. Ji koma Mistefa Kemal çar general (koma ji pênc generalên isyankar) bi dekûdolabên cûrbicûr li derveyî koma elît a desthilatdariyê têne hiştin û bi vî awayî Mistefa Kemal bi tenê dihêlin û bi Kurdan re tînin beramberî hev (Ji koma Mistefa Kemal hevalê wî yê herî nêz Fethî Okyar ji ber ku got "Ez destê xwe bi tevkujiya Kurdan nakim" kirin ku ji serokwezaretiyê dest bikişîne), beşek ji vê dekûdolabê bi hewldana reşkujiya li Îzmîrê dewam kiriye û bi vî awayî Mistefa Kemal kirine rewşa kesayeteke sembolîk a bi tenê. Heman dekûdolab di tesfiyekirina hêzên Çepgir û Îslamî de jî hatine gerandin. Li vir, du hêzên diyarker ên xuya dikin, serokwezîr Îsmet Înonî û Serokê Fermandariya Giştî Fewzî Çakmak in. Lê ya rastî, li pişt wan jî hegemonya Ingilîz a wê demê û komên sermayê yên di nava wê de rejîma nû çêdikin, pêk tînin û dewam dikin. Yek ji van komên sermayeyê koma Cihû ye (ne tevahî), û ji bo Cihûyan li welatekî digere. Ji bo li Filistînê welatekî Cihûyan bê avakirin, pêşî hewl dane Ebdulhemîd bi kar bînin, lê ji ber ku bi temamî weke dixwazin tevnagere darbeya 9'ê Adarê (provokasyona wê) dikin bahane û wî ji text tînin xwarê, dikevin Şerê Cîhanê yê Yekemîn, şertên şer firsendê didin wan ji bo qirkirina Ermeniyan,

mudaxeleyî Şerê Rizgariya Neteweyî dikin, pêşengiya pratîk pêk tînin, Xiristiyanên bi koka xwe Rûm ên mayî tesfiye dikin, di dema şer û piştî şer de tevî hevgirtiyên Çepgir û Îslamî hevgirtiyê stratejîk Kurdan tesfiye dikin û bi vî awayî komplo di 1925’an de digihîje serketinê.

Çawa ku tê gotin di sala 1925’an de Mistefa Kemal di asta herî jor de xwedî hêz nîne, ew kirine xwediyê hêzeke sembolîk, ew di dînê nû de rakirine mertebeya xwedatiyê û ew kirine ‘îkon’ekî li Çankayayê mehkûmkirî û kesekî ji perestinê re terikandine. Komploya herî hûrûkûr, nexasim isyanên Kurdan weke firsend hatine dîtin, li dijî naveroka şoreşger a Şerê Rizgariyê (komara demokratîk, Destûra Bingehîn a 1921’ê) û isyanê yan jî li dijî serokê rastî yê şer Mistefa Kemal pêvajoyek heta dawiyê hatiye meşandin û bi vî awayî raûnda pêşî bi serketî temam bûye. Di vê mijarê de pirsgirêk mezinkirin an jî piçûkkirina M. Kemal Atatirk nîne, divê mirov wî di nava dîroka rastî de bi cih bike û bi vî awayî rola rastî ya kesayeta wî ya ji mîtolojiyê şuştî deyne holê.

Dema mirov pêvajoya 1925-40’î binirxîne divê baş zanibe ku Ingilîstan hegemonê dinyayê ye, di Şerê Rizgariya Neteweyî de têk neçûye bi tenê alî guhertiye û ev yek ji bo berjewendiyên sîstemê kiriye. Komar li dijî Ingilîstanê nehat avakirin, berevajî bi alîkariyeke diyarker a Ingilîstanê hat avakirin. Bi vê du armancên Ingilîstanê hebûn: Yekemîn, di wê demê de Yekîtiya Sovyetê çavê xwe berdabû şoreşa dinyayê û dixwest Tirkiya li ser rêya wê ya Başûr di tewazuneke stratejîk de bihêle; duyemîn, ji bo dewleta netewe ya Tirk a nû jêre nebe tehlûke dixwest wê di nava sînorên teng de bigire. Peymana Lozanê encama vê nêzîkatiyê ye. Jê û pêve propagandaya erzan a serketinê ye. Li ser Komarê kontroleke xurt a Ingilîstanê heye. Vê kontrola xwe bi Proto Îsraîlê pêk tîne. Li dinyayeke evçend hegemonîk bi tenê rewşenbîrên jihevdeketî û kêmaqil ên bûrjûwaya piçûk dikarin behsa ‘serxwebûna temam a komarê’ bikin. Di wan şert û mercan de ne bi tenê li Anatolyayê, li ti devera dinyayê serxwebûneke temam mewzûbehs nîne. Jixwe sîstema şaristaniya navendî ya temenê wê ji pênc hezar salî bihurî karekterê xwe yê hegemonîk bi moderníteya kapîtalîst re mezintir kiriye. Serxwebûn di şertên xweser de bi tenê nisbî dikare pêk bê. M. Kemal Atatirk jî ev şert û merc di nava balansa Ingilîstan û Rûsyayê de nirxandine û bi qasî jê hatiye, hewl daye polîtîkaya serxwebûnê bimeşîne.

Eger em heta li Proto Îsraîlê serwext nebin, em ne dikarin damezrandina Komara Tirkiyê fêhm bikin û ne jî dewamkirina wê. Lê belê ji bo ev herdu dewletên netewe yên ketine zikhev pêkan bibin û dewam bikin, pêdivî bi ‘ya din’ heye. Ew “a din” jî bûn Kurd. Kurd kirin hedef û di vê de berjewendiyên Ingilîstanê jî hebûn. Komareke Kurd-Tirk a Mûsil û Kerkûk jî kiribe nava xwe (li gorî Mîsaqî Millî), wê ji aliyê petrolên Iraqê ve bibe derbeke ciddî li Ingilîstanê bikeve. Bi vî awayî M. Kemal Atatirk anîn serê duriyan, ango wê yan Komar an jî Mûsil-Kerkûk hilbijarta. Herdu bi hev re nedibûn. Eger herdu bikirana armanc, diviyabû şerê bi hegemonya dinyayê re li ber çavan bigirta. M. Kemal bi qasî ku vê yekê neke realîst bû. Ha ji vê nuqteyê û pêve wê pêvajoya

komplo, qirkirin û trajediya mezin a Kurd dest pê bike ku heta roja me ya îro dewam dike. Mebest ji tratejiya Kurd ev e: Komar ji bo karibe bimîne, neçar dibe Mûsil-Kerkûkê ji Ingilîstanê re bihêle. Hiştina Mûsil-Kerkûkê ji Ingilîstanê re bi xencerlêdana ser dilê Kurdan re yek tişt bû. Komara Tirkiyê ya Proto Îsraîl û hegemonyadariya Ingilîz ji bo berjewendiyên xwe yên pîroz li qurbanekê geriyane û ew qurban jî bûne Kurd. Ya ji vê jî girîntir ew e, trajediya Kurd a hemdem ku mirov dikare bi 1925'an bide destpêkirin, bi awayekî bêhtir girankirî heta roja me ya îro bênavber dewam dike.

Di dema Serokkomariya Îsmet Înonî de betoneke stûr rijandin ser rastiya Kurd. Piştî salên 1950'î li ser zêhnên mirovan wisa ferz kirin ku ev rastî nabe bikeve ber lêpirsînê û nabe ku weke pirsgirêk bê dîtin. Kirin ku weke tabûyeke rêveberiyên Komara Tirk bê parastin û kirin weke xeteke sor a polîtîkayên wê. Şaxê neteweyî yê rastiya Kurd hê serê xwe dernexistibû qurmiçandibûn û gotin li cih be, bi erdê re kiribûn yek. Kurdistan kiribûn çar parçe û vê yekê qîma wan nedikir, li ser her parçeyî jî polîtîkayên yek ji ya din xirabtir dimeşandin û bi van polîtîkayan hebûn ji hebûntiyê dikirin. Ji lewra mirov rastiya neteweya Kurd a piştî 1925'an weke rastiyeke ketiye pêvajoya qirkirinê binirxîne ev ê nêzîkatî û nirxandineke rastî be. Di vê nuqteyê de teza mêtingeriyê kêm e. Bêguman ji hemû aliyan ve mêtingerî tê pêkanîn û meşandin, lê belê kirinên ji mêtingeriyê wêdetir ên bi armanca jiholêrakirina hebûna Kurdan mewzûbehs in. Jixwe navê vê jî qirkirin e.

Mirov pirsgirêka Kurd piştî salên 1970'î weke pirsgirêka azadiyê binirxîne ji aliyekî ve rast be jî, ji aliyê din ve kêmasiyeke girîng bi xwe re tîne. Ew jî pirsgirêka Kurd a hebûnê ye, ango pirsgirêka Kurd a ontolojîk e. Jixwe rastiyeke hebûna wê bi îmhayê re rûbirû be, pirsgirêka wê ya pêşî azadî nîne, berê pêşî divê hebûna xwe biparêze û ev yek çiqasî pêkan be, ew û azadî wê di zikhev de pêk bên. Tişta nebe azadiya xwe jî nabe ango tişta hebûna wê tinebe azadiya wê jî nabe. Azadî bi tenê bi hebûnê mumkîn dibe. Xweseriya rastiya neteweya Kurd a hemdem di vê nuqteyê de ye. Dîsa ji qirkirinên Ermenî û Cihû yên di demên nêz de qewimîn cudatir (di van qirkirinan de îmhaya fizîkî li pêş e) di qirkirina Kurd de qirkirina çandî (di zêhn de dev ji xwebûnê berdan) li pêştir e. Komeke çandê ya dev ji xwebûnê berdayî, çi fizîkî çi zêhnî pêk hatibe, yan ketiye ber çerxa qirkirinê yan jî pêvajoya wê ya qirkirinê temam bûye. Kurd kirine çar parçe û li ser hebûna her parçeyî bi sedema kirinên cuda yên tesfiyeyê pêvajo (qirkirin) bi awayekî cihê meşiyaye û her parçeyî di asteke cuda de para xwe ji qirkirinê girtiye. Ji ber karekterê qirkirina li ser tê meşandin ev pêvajo hê jî dewam dike. Rastiya Kurd a ji vî alî ve, bi dagirkerî, mêtingerî, asîmîlasyon û kokqelandinê re rûbirû ye, divê di çarçoveya vê pêvajoyê de bê nirxandin: Rastiyek e ku dixwazin wê ji kirasê nasnameya neteweyî derxin!

Di roja me ya îro de hewl tê dayîn ku rastiya Kurd weke nasnameya Kurd bê îfadekirin. Gotina nasnameyê li miqabilî hebûnê tê. Di vê rewşê de xusûsa bingehîn a divê were nirxandin xisletên

der barê nasnameya Kurd de ye. Mirov kengî dikare li pêkhatina rastiya Kurd, bi gotina aktuel nasnameya Kurd serwext bibe? Dema ku mirov, çiqasî bi rabihuriyeke dirêj a dîrokî, ewqasî jî bi kirinên xweser ên dema ‘niha’ tevahiya aliyên wê yên dixwazin wê pê ava bikin an jî bikin ji xwebûnê derxin binirxîne, hingê wê lê serwext bibe. Ango wê di warê heqîqetê de bi nirx bibe. Lêgerînên der barê pêkhatina Kurd an jî Proto Kurdên nava dîrokê de çiqasî girîng bin, rastiya Kurd bi awayekî rojane bi çi cureyên kirinan re rûbirû ye ewqasî girîng in. Ji ber ku me hewl dabû em têkiliya di navbera dîrok û niha de analîz bikin, ez ê dubare nekim. Lê divê mirov ji bîr neke ku mirov di nava dîrokê de li rastiyê negere, ti diyardeya civakî bi tenê bi rêbazên analîtîk ên rojane nayên nasandin û eger li derveyî dîrokê bêne nirxandin wê rastiyên civakî gelekî kêm bimînin û şaş bêne fêhmkirin. Ji ber vê sedemê, her rastiya civakî ya em dinirxînin, em timî wê di çarçoveya dîroka wê de lêdikolin.

Herçiqasî min lêkolîna me ya dîrokî bi awayekî pêşnûme kiribe jî ez yeqîn dikim ku min bi awayekî berfireh kiriye. Em hewl bidin rastiya Kurd an jî bi gotineke din nasnameya Kurd, li gorî rojanetiyê ango dema niha bi rêbaza analîtîk analîz bikin.

**a- Nasnameya Kurd a Hemdem a di bin Hegemonya Yekdestdariya Sermaye û Desthilatdariya Tirk û Hevgirtiyên wan de**

Çawa ku me di nirxandina xwe ya li ser dîrokê de dît, dema ku yekdestdariya mêtinkarî û desthilatdariya Osmanî ya ji rêûresmê hilweşiya, komeke elît a di nava rêûresma burokratîk de şikilgirtî û di nava Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de bi rola kirdar rabû, bi komplo û darbeyên cûrbicûr di Meşrûtiyeta Duyemîn de, di Adara 1909'an û 1'ê Çileya 1913'an de, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn ê 1914-1918'an de û herî dawî di Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1919-1922'an de weke hêzeke bûrjûwa burokratîk a herî rêxistinkirî yekdestdariya desthilatdariyê desteser dike. Hem ji aliyê îdeolojîk ve hem jî ji aliyê ekonomîk ve mohra xwe li yekdestdariya hegemonîk dixe. Ji sala 1923'an ve rêveberiya Komarê desteser dike. Li ser bingehê Tirkîtiya Spî li dora amûrê desthilatdariyê bi îdolojiya neteweparêziya Tirk komek pêk anîn û vê komê hevgirtiyên bingehîn ên Şerê Rizgariya Neteweyî, Sosyalîst, Ummetgirên Îslamî û Hêzên Millî yên Kurd bi rêbazên komplowarî tesfiye kirin û heta roja me ya îro bênavber 'dîktatoriyeke olîgarşîk' damezrandin. Ev dîktatoriya hegemonîk a hundir, li derve bi perspektîf û kontrola nêz a serkêşê hêzên hegemonîk ên dinyayê Ingilîstanê dimeşiya. Nexasim kesayeta netewe ya serbixwe ya M. Kemal Atatirk dikin sembol ango bi kirinên gelekî hişk wî ji taqetê dixin, carcaran di bin navê Atatirkparêzî yan jî Kemalîzmê de ji muhafazekariyeke serdema navîn girantir bi nasnameyeke îdeolojîk a faşîst di nava sînorên Tirkparêziya etnîk-sunnî de bi bernameyeke qirkirin û asîmîlasyonê li ser tevahiya çandan pêk tînin. Ji aliyê ekonomîk ve bi yekdestdariya dewletê dikeve heta nava dilê civakê dimije, zuha û hişk dike. Herçiqasî di nava wan bi xwe de hevrikî û şerên wan ên dijwar hebin jî weke yekdestdariyên di nava têkiliyên hegemonîk de (weke îdeolojî, ekonomîk û desthilatdarî) li ser tesfiye û îstîsmara çanda civakî (ji aliyên maddî û manewî ve) di nava yekîtiyeke temam de tevdigerin. Klîka Tirkê Spî dîktatoriya xwe ya bi rêbazên komplo, darbe û kontrgerîlla (rêxistina veşartî ya NATOyê Gladîo, beşê Tirkiyê) ava kir heta serê salên 2000'î dewam kir.

Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn avahiya hegemonîk a li Anatolyayê hat avakirin naşibe çi avahiyekê. Bi qasî ku xuya dike, serweriyeke hişk a Tirkî mewzûbehs e; lê bi xwe sîstemek e ku bi manîpulasyonên komeke teng a komploker dimeşe. Bi sîstemên dewletan bi monarşî, komar û demokrasiyan re zêde têkiliya xwe nîne. Despotîzmeke xweser e. Mekanîzmayeke wê ya gelekî veşartî ya bi falsîfîkasyonan dimeşe heye. Bêguman di vê de para bûrjûwabûna burokratîk a Tirk, Proto Îsraîlê heye. Di tesfiyekirina hêmanên Ermenî, Suryanî, Pontûs û hêmanên din ên Helenîstîk ên Xiristiyan û tevgera îmhakirina Kurdîtiyê de pareke diyarker a vê Proto Îsraîlê heye. Rejîmeke di nava kirinên gihiştî qirkirinan de cihgirtî bi rêbazên eşkere û rewa nikare dewam bike. Bi tenê qirkirina çandî ya Kurd a rojane bi dizî tê meşandin, ji bo bi temamî rûyê rastî yê rejîmê were eşkerekirin têrê dike. Lê ti kes newêre vê eşkere bike. Eger kes li ber rabe

yan jî wê rexne bike dikare wî/wê bi awayên nediyar bike qurbanekî ‘fail nediyar’. Li dinyayê belkî jî şefafî herî zêde ji bo vê pêkhatinê hewce dike.

Ev sîstema ku em dikarin weke Faşîzma Tirk a Spî bi nav bikin xwedî xisleta damezrîneriyê ye. Ya ecêb ew e, pirraniya kesên di sîstemê de rol digirin an jî dibin destik haya wan ji rola wan nîne û nizanin ji çi re xizmetê dikin. Pirr kêm kes, ew jî yên ji derve bi sîstemê re eleqedar dibin haya wan ji rola wan heye. Di serî de Mistefa Kemal Paşa, bîranînên pênc generalên navdar ên isyanê baş bêne xwendin, wê pirr eşkere bê dîtin ku li derveyî berhema dixwazin ava bikin bi pêkanîna avahiyên din re mijûl dibin heta bi pêkanîna yên dijber re mijûl dibin û ji vê gelekî bêzar û bi hêrs in. Ji vê jî ya xeternaktir ew e, têkiliya Faşîzma Tirk a Spî bi Tirkîtiya navê xwe jê girtiye pirr kêm e, û haya pirraniya civaka Tirk ji vê nîne û heta di vî warî de korfêhm û serkorî ye. Bi herhalî ‘Etrak-î bî îdrak’ vê rastiyê îfade dike. Ya rastî di tevahiya dîrokê de dema desthilatdarî têne avakirin argumanên bi heman rengî têne bikaranîn, lê ti ji wan bi argumanên avakirinê yên desthilatdariya hemdem a Anatolyayê re nikare rabe û naşibe van argumanan.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê pêşengiya hegemonîk a sîstemê kir destê xwe û Faşîzma Tirk a Spî bêhtir tekûz kir û bi vî awayî kontrola li ser Komara Tirkiyê dewam kir. Çawa ku tê zanîn, wê komeke efserên ku wê darbeya 27’ê Gulanê bikin, li ser bingehê rêxistiniya Gladîo di navbera salên 1945 û 1950’î de perwerde kir û di kompasekirina sîstemê de bi kar anî. Dîsa tê zanîn ku berê jî Ingilîstanê komeke pîlotên Tirk di vê çarçoveyê de di şer de bi kar anî. Nexasim di nava van efseran de yê berbiçav Alparslan Turkeş û koma wî piştî salên 1960’î dîsa di vê çarçoveyê de ji bo bêtesîrkirina çepgirên Tirkiyê û tevgerên kedkar hatine bikaranîn. Ev komên em behsa wan dikin, di vê nuqteyê de têkiliya wan bi Faşîzma Tirk a Spî re hebe jî divê were zanîn ku versiyoneke wan timî li ser kar e. Ev kom antî-Siyonîst in, nijadperestên Tirk in ku bêhtir li ser xeta Hîtlergiriyê kar dimeşînin. Ev beşên ku em dikarin weke Faşîzma Tirk a Reş bi nav bikin, hebûnên Proto Îsraîlê li Anatolyayê tesfiye dikin û dixwazin sîstemeke hegemonîk a Tirk a Anatolyayê ya ji Tirkparêziya xwerû pêkhatî, ava bikin. Ev beşên em behsa wan dikin, sîstema di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de bi dest xistin û cara pêşî li dijî Ermeniyan pêk anîn careke din bi temamî nikarîbûn bi dest bixin. Hinekî, ew jî li ser hewcedariya Faşîzma Tirk a Spî bi ser avahiya heyî ve hatin kirin. Nexasim li dijî tevgerên sosyalîst û demokratîk ên Tirkiyê bi awayekî gelekî bêrehm, bi şêwazê komployan û li derveyî huqûqê hatin bikaranîn. Ya seyr û ecêb ew e, dema mijar dibe tesfiyekirina nasnameya Kurd, pêkhatinên çepgir û demokratîk ên dewleta netewe, li derveyî îstîsnayan, di nava pêkhatina kakil a Faşîzma Tirk a Spî de cih digirin û ji vê namînin. Hem jî bêyî ku haya wan jê çêbibe, bi destê emperyalîstên li dijî wan tevdigerin têne bikaranîn!

Yên dixwazin nijadeke xwerû biafirînin, wexta hewce bibînin dikarin Anatolyayê hemûyî – Kurdistan jî di navê de- ji nû ve fetih bikin. Ev kes dixwazin li ser bingehê etnîsîteyeke teng

dewleteke netewe ya Tirk ava bikin û vê weke utopya xwe ya bingehîn dibînin. Alîgirên Îsraîlê û kesên ji çandên hindikayiyên cûrbicûr nakokiya van kesan e. Lê ji ber ku dizanin bêyî Îsraîlê (hem Îsraîla li hundir û hem jî ya li derve) nikarin bimeşin, eşkere li hemberî wê nabin xwedî helwest. Weke partî sedema hebûna wan milliyetgiriya etnîk a Tirk a herî nijadperest û dewletdariya netewe ye. Dema mijar nasmaneya Kurd e, hem polîtîkaya Faşîzma Tirk a Spî û hem jî ya Reş bi tevahî tesfiyekirina fizîkî û çandî ye, û dixwazin bikin ku Kurd êdî ne hebûn bin. Li gorî Tirkên Spî her kesê xwe Tirk bihesibîne divê wan weke Tirk qebûl bikin, lê Tirkên Reş (mirov ji van Tirkan re dikare bibêje Gurên Spî) xwe nêzî vê têgihiştinê nakin. Ew zêdetir li pey nijadeke xwerû diçin. Çi demeke dûr çi demeke nêz, qirkirina Kurdan bi awayekî fizîkî ji hedefa wan a bingehîn e. Tirkên Reş ên ji aliyê hêzên hegemonîk ve di tesfiyekirina tevgerên sosyalîst û demokratîk de hatin bikaranîn, roja me ya îro weke berê qîmeta wan tineye.

Darbeya 12'ê Îlonê senteza Tirk-Îslam qebûl kir û vê jî tevgera faşîst a nifşên sêyemîn kir rojevê. Ev ekola ku em dikarin jêre Faşîzma Tirk a Kesk bibêjin, DYEyê ji salên 1970'î ve li dijî belavbûna Yekîtiya Sovyetê ya li Rojhilata Navîn, ji bo derxistina Rûsya Sovyetê ji Afganistanê û lebikandina wê li Asya Navîn bi pirsgirêkan û pêşîgirtina pêşketina sosyalîzm û demokrasiyê li welatên Îslamî, li gorî milliyetgiriya nijadperest bêhtir kêrhatî dît û destek dayê. Bi palpiştiya Emerîkayê ev ekol xurt bû. Tevgera Îslamî bi giranî li ser hîmê xizmetkariya ji hegemonya Ingilîz re derketiye holê. Ji modernîteya kapîtalîst serbixwe nîne. Weke ku tê zanîn, millîgir û azadîxwaz nîne. Weke versiyoneke milliyetgir a kapîtalîst hatiye hûnandin. Hedefa wê ya bingehîn ew e, pêşî bigire li civakên bi giranî bi çanda Îslamî radibin ji bo demokratîze û sosyalîst nebin û çanda Îslamê entegreyî kapîtalîzmê bike. Yek ji wan amûran e ku tevahiya hêzên hegemonîk wê bi vê armancê bi kar tînin.

Di Împaratoriya Osmanî de ji bo hêmanên Îslamî di nava dewletê de li cem hev bêne girtin û li dijî hegemonya Ingilîz bêne bikaranîn, pêşî PanÎslamîzma bi desteka Elmanyayê hat xurtkirin. Ingilîstanê li cografya Ereb bi xurtkirina Wehabîtiyê bersiva vê yekê da. Hevkarên hêzên hegemonîk ên ku çanda Îslamê îstîsmar kirin, ji bo para xwe di nava mêtinkariya hêzên hegemonîk de zêde bikin û pêşde bibin, Îslamtî hê ji roja derketina wê ve xistin xizmeta xwe. Îslamtî bi şêweyê milliyetgiriya dînî bi ser hegemonya kapîtalîst ve dibe. Divê mirov hêmanên Îslamî yên welatparêz ji Îslamgirên siyasî cihê bike. Çawa ku tê zanîn, serokên antî-hegemonîk ên bi vî rengî derketine holê. Çanda Îslamê homojen nîne, li gorî rewşên çînî û civakî li pêkhatina helwestên cuda vekiriye û ev jî rewşek e ku tê fêhmkirin. Di Şerê Rizgariya Neteweyî de Îslamgiran weke hêzeke antî-hegemonîk helwest nîşan daye. Mîna hêmanên welatparêz ên Kurd û sosyalîst, hêzên welatparêz ên Îslamî jî ji aliyê Faşîzma Tirk a Spî ve hatine tesfiyekirin. Nabe ku Îslamgirên welatparêz bi komplogeriya Tirk a Spî re di nava dewletê de bin. Ev Îslamgirên welatparêz nikarîbûn bi laîktiya hişk re ango bi dîndariya laîk re bimana. Ji ber vê hatin bêdengkirin. Bi pêşengiya hegemonîk a DYE'yê re weke baskên din ên antî-kominîst hewl

dan Îslama siyasî jî ji nû ve gurûgeş bikin, ji nû ve zindî bikin. Fena faşîzma Tirk a nijadperest, ev ekol jî piştî pêngava tevgera sosyalîst û demokratîk a salên 1960'î bû partî. Herçiqasî bi baskên din ên faşîst re nakokiyên wan hebin jî hemû li dora hedefeke sereke dibûn yek û digihiştin hev. Wan jî ji salên 1970'î ve di desthilatdariyê de cihê xwe girt.

Tevgera şoreşger a mezin bû, bandoreke eşkere li vê rewşê kir. Lê bi darbeya 12'ê Îlona 1980'î re gihiştin astekê ku bi hêzên din re bibin hevgirtî û di vê de pareke girîng a dagirkirina Sovyetê ya Afganistanê û Şoreşa Şîî ya li Îranê heye. Hem ji bo şikandina hegemonya Yekîtiya Sovyetê û hem jî ji bo pêşîgirtina li Şoreşa Îranê, bi lez hewcedarî bi tevgereke Îslamî hebû ku diviyabû ji nû ve bihata avakirin. Em fêhm dikin ku li Tirkiyê ji nava Tevgera Necmeddîn Erbakan (bi Tevgera Millî Goruşê armanc afirandina bûrjûwaziyeke Tirk a millî bû) a ji bo vê modelê radîkal dihat hesibandin, hêmanên nerm dihatin qebûlkirin, hatin neqandin û bi kadroyên ji cemaetên cuda berhevkirî komeke elît a desthilatdar hatiye devşîrmekirin. Bi Turgut Ozal a dixwestin bikin ev bû. Lê hê jî weke sirrekê ye ka çawa û çima Turgut Ozal bi awayekî fizîkî û siyasî hat tesfiyekirin û piştre Necmeddîn Erbakan di 28'ê Sibata 1997'an de ji Serokwezaretiyê hat xistin, lê bi van bûyeran em fêhm dikin ku li ser modela ku wê weke AKP'ê bi gewde bikin, xebitîne. Weke ku tê zanîn, AKP di sala 2001'ê de derneketiye holê; bi kêmanî kokên wê digihîjin heta darbeya 12'ê Îlonê. Di dema Serokê DYE'yê G.W. Bush de Projeya Rojhilata Navîn a Mezin ket rojevê û herweha dagirkirina Afganistan û Iraqê, projeya Îslama Nerm a li Tirkiyê kir alternatîfeke nû. Faşîzma Tirk a Spî ji ber avabûna xwe ya kevinbûyî û laîk ji girseyan îzole bûbû. Herweha deriyên xwe li derve girtibûn. Li kapîtalîzma global zêde ne vekirî bû. Ji ber ku li hemberî Emerîkayê tevgereke ciddî ya sosyalîst û demokratîk tinebû, hewcedariya wê zêde bi faşîzmeke nijadperest tinebû. Ji vê jî ya girîngtir ew bû, Tevgera Demokratîk a Azadiya Gelê Kurd li gelemperiya Kurdistanê û li parçeyê Kurdistana di bin serweriya Tirkiyê de pêşketina xwe dewam dikir. Ango wexta ku mirov rewşa îdeolojiyên faşîst ên di rengên nijadperest û spî de li ber çavan bigire, mirov bi hêsanî fêhm dike ku hewcedariyê bi elîteke Tirk a faşîst kesk dibînin.

Çanda Îslamî di nasnameya çanda Kurd de xwedî roleke girîng e, û ev jî di vê de bi bandor bûye. Bi sedsalan e ku meylên terîqetparêz di civaka Kurd de bi tesîr in, û vê jî alternatîfa faşîst a Tirkê Kesk kire argumaneke bêhtir bê bikaranîn. Herdu baskên din ên faşîzmê, nûnerên wan ên di nava artêşê û partiyên siyasî de (di serî de CHP û MHP) li vê destguhertina desthilatdariyê ya li hundir razî nebûn û bi dijwarî li ber rabûn. Ji sala 2001'ê heta bi sala 2007'an xwe li kirina çar darbeyan rakişandin. Lê ji ber ku ji desteka DYE û Yekîtiya Ewrûpayê mehrûm bûn, derfeta wan a serketinê çênebû. Herweha alîgiriya zêde ya AKP'ê bi sermayeya fînans a global re ew kir alternatîfa bi tenê û heta hişt ku ew weke partiya bi tenê ya desthilatdariyê bimîne. Hatina AKPê ya desthilatdariyê, di nava dewletê de demeke nû ya hegemonîk îfade dike. Hegemonya heştê salî ya Tirkê Spî ya Komarê hêdî hêdî û bi awayekî bi êş cihê xwe ji Faşîzma Tirk a Kesk a xwe weke Îslama Nerm a Komarê dihesibîne hişt. Bêguman ev nayê wê maneyê ku dewlet bi temamî

hatiye fetihkirin, lê ketiye ser wê riyê. Li şûna Faşîzma Tirk a Spî ya navenda wê Enqere ye, Faşîzma Tirk a Kesk a navenda wê Konya-Qeyserî ye, hêdî hêdî, lê bi awayekî ji xwe piştrast gav diavêje ji bo bibe hêza nû ya hegemonîk a Komarê. Sala 2023’an sedsaliya Komarê ye û ji niha ve bi awayekî eşkere tê plankirin ku ew roj di bin vê hegemonyayê de bê pêşwazîkirin.

Di vê dema nû ya hegemonîk de nasnameya Tirk wê karektera xwe ya dewleta netewe weke heyî biparêze û bi amûrên îdeolojîk ên Îslama Sunnî bêhtir were xurtkirin. Ya rastî, wê pirsgirêka nasnameyê bêhtir bibe pirsgirêka Kurdan. Baskekî artêşê bi hêza nû ya hegemonîk re hev girtin. Ji ber ku bawer dike, di tepisandin û tesfiyekirina nasnameya Kurd de amûrên îdeolojîk ên Îslamî wê bi roleke girîng rabin. Bi sedema ku herdu amûrên îdeolojîk ên faşîst hatin bêtesîrkirin, fermandariya nû ya artêşê bi hegemonya faşîzma kesk razî bû. Jixwe fermandariya darbeya 12’ê Îlonê jî xwedî meyleke bi heman rengî bû û têkiliya organîk a di navbera wan de eşkere bûye. Xusûseke din a girîng, têkiliya hêza nû ya hegemonîk bi sermayeya Cihû û versiyonên wê yên îdeolojîk re ye. Hêza nû ya hegemonîk bi sedema karektera wê ya Îslama nerm û têkiliyên wê bi hêzên Îslamî û desthilatdariyên weke wê re bivênevê wê bi Siyonîzma Îsraîlê re (milliyetgiriya hişk) rê li ber nakokiyê vekirina. Lê belê ev rewş nayê wê maneyê ku têkiliya AKP’ê bi sermayeya Cihû û bi amûrên wê yên din ên îdeolojîk re tineye. Berevajî, AKP bi baskê sermayeya Cihû ya gerdûnger-global a fînansê ya ne Siyonîst, bi îdeolojiya Cihû ya Karaîm a gerdûnger re xwedî têkiliyên xurt e; ya rastî, li şûna baskê Siyonîst ev bask bêhtir bi hêz tê bicihkirin. AKP ji her partiyeke Tirk a nijadperest û spî bêhtir bi rola acente û nûneriya sermayeya Cihû û amûrê îdeolojiya wê li Anatolyayê di nava Komara Tirkiyê de radibe.

Divê mirov ji bîr neke ku ev sermayeya Cihû ya bi kok û amûrên wê yên îdeolojîk ji wan hêzên bingehîn in ku ji çarsed salî ve hegemonya global a modernîteya kapîtalîst pêşde birine û meşandine. Di pêkhatina bi sedan sermaye û desthilatdariya dewletan de ango derketina şer û pevçûnên wan de xwedî roleke diyarker e. Di hegemonya dinya modernîteya kapîtalîst de hêzeke di warê ekonomîk û îdeolojîk de evqasî bi bandor, rasyonel nîne ku li cografyayeke ji bo xwe herî stratejîk dibîne, di avakirina modernîte û pêkanîna desthilatdariya li Anatolya û Mezopotamyayê de bê bandor bimîne. Çawa ku di salên damezrandina Komarê de dewleteke netewe ya laîk-milliyetgir ava kir û li gorî berjewendiyên xwe (Proto Îsraîl; avakirina desthilatdariyeke li herêmê îzole bûyî û li dijî hegemonya Sovyetê) modela modernîteyê ya herî di cih de hesiband, di salên 2000’î de jî li ser bingehê armancên weke wan, lê bi amûrên berevajiyê wan (dewleta netewe ya Tirkî-Sunnî ya ji nû ve birêkûpêkkirî ya zêdetir dest wer dide herêmê û Komareke Tirkiyê ya bi sermayeya global re bûyî yek) hêza hegemonîk birêkûpêk kir. Xusûsa herî girîng a divê were zanîn ew e, di avakirina vê hegemonya nû de hêza hegemonîk a dinyayê bi roleke diyarker rabûye.

Ji bo nasnameya Kurd di dema vê hêza hegemonîk a nû de bê tesfiyekirin rêbazên nû yên komployê têne ceribandin, wê bêne ceribandin. Provayên vê yekê cara pêşî bi awayekî eşkere bi navê Hîzbûllah a Tirkiyê di salên 1990'î de hatin kirin. Gelê Kurdistanê ji vê pêkhatinê re Hizbul-Kontra digot. Çawa ku damezrînerê JITEM'ê Albay Arîf Dogan eşkere anî ziman, Hizbul-Kontra wan bi xwe ava kiriye. Ji aliyê herkesî ve baş tê zanîn ku vê pêkhatinê di kuştina ji deh hezarî zêdetir mirovî bi awayekî failê wan nediyar de roleke girîng girt. Piştî vê ezmûn û tecrûbeyê bi AKP'ê gav avêtin qonaxa duyemîn. Modela bingehîn a tesfiyeker û amûrên bingehîn ên vê modela AKP û hevgirtiyên wê (hêzên wan ên hevgirtî terîqet-holdîng, nexasim ê bi navê F. Gulen didin naskirin bi xwe pêkhatineke nava dewletê ye û kontraya kesk e ku Emerîka dixwaze wê li şûna kontraya reş a nijadperest bi cih bike) ji bo Kurdistanê difikirin, Îslamtiya Sunnî ya Nerm e, û li şûna Hizbul-Kontra jî hêzeke nû ya tetikkêş difikirin, ew jî pêkhatineke mîna Hamasê ye ku em jêre dibêjin 'Hamasa Kurd'. Plana nû ya tesfiyeyê rêbazên berê yên Tirkên Spî û Tirkên Reş ên faşîst bi temamî ji dewrê dernaxe, bêhtir wan bi awayekî temam dike, qadên ew bêbandor in, ji nû ve bi rêkûpêk dike. Li gorî vî pîlanî, van qadan 'li dijî terora PKK û şaxê wê yê bajêr KCK'ê' di bin navê ekonomî, civakî, çandî, psîkolojîk, eskerî, siyasî û dîplomatîk de dabeşî pênc-şeş beşan dikin, û hewldanên xwe bêhtir zêde û sîstematîze dikin. AKP, nexasim bi DYE û koma fermî ya fermandaran a artêşê re bi Protokola 5'ê Mijdara 2007'an li Washingtonê û Protokola 4'ê Gulana 2007'an li Dolmabahçeyê (Ev protokol di navbera serokwezîr Erdogan û Serokê Giştî yê Fermandariya wê demê Yaşar Buyukanit de bi şertê heta hetayî veşartî bimîne, pêk hat) hewl dan van planan bi lez bi cih bînin û hê jî hewl didin bi cih bînin. Êrîşên hewayî yên berê hîç nehatibûn dîtin, yekser parvekirina îstîxbaratê bi DYE'yê re, operasyonên KCK'ê, girtina DTP'ê, insiyatîfên civaka sivîl ên bûrjûwa Kurd a sexte, êrîşên li ser ROJ TV'ê, operasyon û girtinên berfireh û zêde yên li welatên Ewrûpayê, li her bajarê Kurdistanê avakirina holdîngan û hewldanên wan ên ji bo zarokên Kurdan bixin dibistanên qişleyî YIBO, ji wan nimûneyên girîng in ku mirov dikare pê di van pîlanên wan derxe. Kirine ku rastiya Kurd ango nasnameya Kurd bi xwe, bi şerekî taybet ê di dîrokê de herî berfireh û di her qadê de hatiye plankirin rûbirû bibe. Ji qada ekonomîk, çandî, civakî, siyasî, eskerî, dîplomatîk, sportîf û hwd. di gelek qadan de hatiye plankirin. Bi hin gavavêtinên qaşo demokratîk ên weke qursên Kurdî, serbestkirina weşanê, TRT-6, belavkirina komirê û alavên spî xwestine ser vê qirkirinê bigirin û ev jî bi propagandayeke gelekî berfireh kirine. Sermayerazandina li Başûrê Kurdistanê, têkiliyên dîplomatîk û hevgirtinên sêalî yên xurt jî divê mirov li van zêde bike. Ango bi hevgirtina Iraq-DYE-KT, Sûrî-Îran-KT; dixwazin dorgirtina li hundir bi dorgirtina derve temam bikin. Bi vî awayî, şerê qirkirinê, şerê taybet, şerê sergirtî, bi dizî û eşkere yê li tevahiya qadên civakî û di dîrokê de herî berfireh, xistin pratîkê û dimeşînin.

Dema desthilatdariya hundir a hegemoniya nû ya li dema hilweşîna komara burokratîk rast tê, ji aliyê avahiyên yekdestdar ên qadên îdeolojîk, civakî û ekonomîk ve ji avahiyên dema damezrandinê xwedî cudahiyên girîng e. Îdeolojiya fermî ya di dema avakirina dewleta netewe

de pozîtîvîst laîk milliyetgir bû. Fikrên hişk ên Darwinîst serdest bûn. Ji ber ku biryar dabûn çandeke homojen pêk bînin, diviyabû hebûna çandên din û nexasim jî hebûna çanda Kurdan tesfiye bikin û li gorî qanûna Darwinîst a 'mafê jiyanê yê bi hêz heye' ev li ser navê pêşketinê rewa dihesibandin. Heman qanûn li Ewrûpayê jî di avakirina dewletên netewe de hatibû bicihanîn. Encam, çandên li derveyî îdeolojiya fermî heta qira wan bînin wê îmha bikirana. Karektera burokratîk a bûrjûwabûnê, ev fikra biyolojîst bêhtir ber bi awayekî bêrehm ê pêkanînê ve dibir. Li pişt qirkirinên li Anatolyayê ev hêza îdeolojîk a xwe disipart fikra hişk a pozîtîvîst-biyolojîst hebû. Hêza hegemonîk a avahiya civakî ya nû pêk anî bûrjûwaziya burokratîk e ku bi destê dewletê gihiştiye. Di vê gihandin û mezinkirinê de daneheva sermaye û malên nemisilmanan ên desteserkirî xwedî roleke girîng in. Jixwe diyar e ku bi awayekî din pêkanîna bûrjûwaziya Tirk ne mumkin e. Bi awayekî ekonomîk li dora bazareke girtî ya hundir bi saziyên dewleta yekdestdar firsenda pêşengiyê dane pêşesaziyê. Ya rastî, yekdestdariyên bazirganî, malî û pîşesaziyê di zikhev de ne, lê li gorî demê rola sereke didin hin ji van sektoran. Modela kapîtalîst a Elman ango modela bi destê dewletê rê dide kapîtalîstbûyînê ji serî ve û bi awayekî neçar hatibû tercîhkirin. Yekdestdariya desthilatdariyê bi xwe dîktaya olîgarşîk a tek partiyê ye. Ji ber mêtinkariya kapîtalîst mirov fêhm dike ka çima ev avahiya desthilatdariyê ji navikê ve bi faşîzmê ve girêdayî ye.

Ji ber ku li qadên van avahiyên sereke dewletdariya netewe hatiye avakirin û hedefa wê ya bingehîn afirandina civaka homojen e, aqûbeta rastiya Kurd bi qirkirinên fizîkî û çandî tesfiyekirin e. Pêvajoya tesfiyekirina Kurdan bivênevê wê rê li ber isyanan vekirina û provokekirina civakê jî li gorî armanca heman tesfiyekeran bû. Li gorî pozîtîvîzmê bawerî bi vê anîbûn. Tesfiyekirina rastiya Kurd weke pêşketin dihesibandin. Hêzên dewleta netewe gelekî ji xwe piştrast bûn ku wê di demeke herî kin de di vê tesfiyeyê de bi serkevin. Di Destûra Bingehîn de xala ev yek îfade dikir jî weha bû "Her kes ê bi welatîbûnê xwe bi dewletê ve girê dide Tirk e." Îdeolojiya pozîtîvîst bi qasî ku xuya dike, xwe weke dinyewî (sekularîst), diyardeyî û zanistî dide naskirin. Piştî fikra dînî û metafizîk, xwe weke paradîgma sêyemîn û dawî ya mirovatiyê dihesibîne. Lê ew bi xwe jî qalibekî fikrê yê metafizîk e, û fikreke dinyayê ya bêhtir teng, hişk û dogmatîk e. Em vê rastiyê bi awayekî eşkere di danasîna Tirkîtiyê ya dewleta netewe ya Tirk de dibînin ku xwe disipêre îdeolojiya netewegir û laîk. Bi zêhniyeteke wisa radibe, çawa ku bi fermana xwedê ya "bibe" her tişt dibe, ji xwe wer bawer kiriye ku dema ew jî bibêje "bibe Tirk" mirov ê bibin Tirk. Çawa ku di vê mînakê de tê dîtin zanistiya sosyolojîk ketiye valatiyê, karekterê xwe yê metafizîk pozîtîvîst bi awayekî balkêş piştrast kiriye. Bi awayekî bêrehm tê pêkanîn û ev jî li gorî wê ye. Îdeologê sereke yê milliyetgiriya nijadperest Nîhal Atsiz jî ev kirinên Tirkên Spî weke 'dehşeta Tirkîtiyê' şîrove kiriye.

Dema salên 1950-1980'î dema gihiştin û stewînê ya Faşîzma Tirk a Spî ye. Lê bi darbe û komployan hatiye meşandin. Li ser guherîna hêza hegemonîk a derve (DYE ket şûna Ingilîstanê)

hin kirinên cuda ketin rojevê (demokrasiya parlementerî ya pirr partî, gavavêtina kapîtalîzma lîberal, di warê laîktiyê de dayîna beşek tawîzan), lê bi awayekî bingehîn dîktatoriya faşîst a olîgarşîk avahiya xwe parast û dewam kir. Şerên çînî û civakî yên dijwar encam nedane. Encam, darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê ye. Darbeya eskerî ya li gorî konjonktura hundir û derve hatiye plankirin (Li Rojhilata Navîn tewazuna hundir xira bû ji ber ku Şoreşa Îranê pêk hat û Yekîtiya Sovyetê Afganistan dagir kir; tewazuna hundir xira bû ji ber ku mezinbûna têkoşîna şoreşger a hundir nehat rawestandin), di çarçoveyeke dîrokî de li pêvajoya hilweşîna sîstema faşîst a Tirkê Spî rast hatiye û xwestiye hilweşînê rawestîne. Ji bo vê yekê jî di çarçoveya îdeolojîk de li şûna laîktiyê milliyetgiriya Tirk-Îslamê kir bingehê xwe, di qada ekonomîk de jî li şûna ekonomiya xwe li hundir girtî ber bi yekparebûneke bi yekdestdariyên global re gav avêt, ji bûrjûwaziya bi giranî burokratîk ber bi pêşengiya sermayeya taybet ve çû, di qada siyasî-desthilatdariyê de jî wesayeta eskerî ferz kir. Destûra Bingehîn a 12'ê Îlonê ev bi rêkûpêk kir û bi darê zorê bi gel dane qebûlkirin. Rejîma wesayetkar a dema hilweşînê bi giranî heta dema Hukûmeta Bulend Ecewît dewam kir (1999-2002) û bi temamî bi nîzamekî şerê hundir hat meşandin. Li ser civaka Tirkiyê rejîmeke pasîfîkasyonê zêde hat meşandin û li Kurdistanê jî her cure şerê taybet hat ceribandin. Belkî jî rejîmeke şerê taybet ê hundir ê ku di dîrokê de kêm mînakên wî hatibin dîtin, hatiye tesîskirin, ango Destûra Bingehîn şiklî maye. Bi gotineke din Destûra xwe jî bi awayekî berbiçav bin pê kirine. Hem di nava dewletê de (di sala 1993'an de pêvajoya tesfiyeyê ya berfireh bi tesfiyekirina Turgut Ozal û Eşref Bitlis dest pê kir), hem jî dewletê bahozeke dijwar a terorê li civakê rakiriye (bi hezaran gundên Kurdan hatin valakirin, hovîtiyên li zindanan, bi deh hezaran kuştinên failê wan nediyar, li Sêwazê komkujiya li Hotêla Madimakê, çalakiyên kontr-gerîlla yên di ti qanûnên şer de tinene, girtinên ji sedhezaran bihurî, kuştinên ji hezaran derbasbûyî). Belkî bi vî awayî pêşî li hilweşîna dewleta netewe hatiye girtin, lê bi awayekî klasîk dewlet jî ji dewletbûnê derketiye. Jixwe Komar di çarçoveya Rohnîbûnê de bi ti awayî ava nebû û di sala 1980'î de teslîmî wesayeta eskerî bû.

Ji serê vê pêvajoyê û pêve bi pêşengiya PKK'ê nexasim bi Pêngava 15'ê Tebaxê pêvajoyeke berxwedanê ya gelekî bi zor û zehmetî pêk hat û bi vê pêvajoyê ne bi tenê tesfiyekirina hebûna rastiya Kurd hatiye rawestandin, li ser riya azadiyê dûrûdirêj ber bi pêş ve gavên girîng hatin avêtin. Di şerê taybet de ku bi desteka zêde (di berdêlê de ji aliyê ekonomîk ve teslîmî sîstema fînans a global dibe, destekeke temam dide polîtîkayên wê yên herêmê, di warê eskerî de mezinkirina beşê Tirkiyê yê artêşa bi dizî ya NATO'yê Gladîo'yê û erêkirina wê ji bo bikaranîna di şer de) ya hêzên hegemonîk ên derve (di serî de DYE, Ingilîstan û Elmanya) tê meşandin, ji bilî çend hevkar û xayînan, Kurdên di nava şerê hebûnê û azadiyê de bi tenê hatine hiştin û tecrîdkirin. Bi tevahî dewletên netewe yên hişk, li gorî berjewendiyên xwe yan di pêkanîna van hovîtiyan de bûne alîgir an jî lê temaşe kirine. Nexasim dewleta netewe ya Îsraîlê, ji sala 1958'an ve peymanên eskerî yên bi dizî di sala 1996'an de bêhtir berfireh kirin û di vî şerê taybet de desteka xwe ya ji bo dewleta Tirk gelekî pêşde bir. Eger desteka hêzên hegemonîk ên

modernîteya kapîtalîst (di nava van de Rûsya Sovyetê jî heye) nebûya, ti çanda civakî ya Anatolya û Mezopotamyayê wê neketibûya ber çerxa qirkirinê. Di encama vê rewşê de meyla sermayeyê ya ji bo kara herî zêde diyarker bûye. Ev rastî bi tevahî rewşa xwe ya eşkere û bi tevahî rewşa xwe ya li derveyî huqûq û exlaqê ji sed salî zêdetir e ku xwe di qirkirina çandî ya Kurd de piştrast dike. Qirkirina çandî ya Kurd ku em behsa wê dikin, her ku diçe dijwartir dibe. Ji bo berjewendiyên demkin ên sermayeyê yan çavên xwe li tesfiyeya kom û hebûna çandên hezar salan girtine yan jî destek dane. Bi qasî li Kurdistanê li ti welatekî dinyayê têkiliyên di navbera yekdestdarên sermaye û dewleta netewe de bi qirkirinê eşkere xuya nekiriye. Tevgera Rizgariya Filistînê jî tawîzkar tevgeriyaye, bi desthilatdariyên Tirkiyê re li hev kiriye û desteka diviyabû bidaya nedaye.

Ji ber ku di şerê navxweyî de rejîm gelekî ji hev de ket û operasyona Iraqê ya Emerîkayê (bi qasî xuya dike, êrîşa provokatîf a rêxistina El Qaîdeyê bir ser Bircên Cêwî bikin bahane jî), li Tirkiyê gera li hegemonya desthilatdariyeke nû ferz kiriye. Amûrên hundir ên hegemonya nû ji salên 1970'î ve dihatin amadekirin. Qebûlkirina senteza Tirk-Îslamê, Biryarên Ekonomîk ên 24'ê Çileya 1980'î (derî vekirina li sermayeya fînansa global), darbeya 12'ê Îlonê, girtina partiyên dewleta netewe yên Tirkê Spî, di nava Serokatiya Fermandariya Giştî de wezîfedarkirinên li derveyî usûlê, di nava Partiya Rêya Rast de operasyona Tansû Çîller û Hukûmeta wê, pêvajoya 28'ê Sibatê, xistina hukûmeta Erbekan û herî dawî jî bi awayekî şexsî tesfiyekirina Bulend Ecewît û hukûmeta wî mirov dikare weke qonaxên diyar ên vê pêvajoyê rêz bike. Gelekî girîng e ku mirov AKP'ê weke rêkûpêkirina tevahiya van hêmanên hundir û derve binirxîne. Ev di dîroka hemdem a Tirkiyê de pêngavek e ku bi qasî pêngava Komarê girîng e; navê veguherîneke di wê eyarê de ye. Çawa ku CHP partiya dewletê ya navendî ya pêvajoya Tanzîmat, Meşrûtiyeta Yekemîn û Duyemîn û Şerê Rizgariya Neteweyî ye, AKP jî di heman pêvajoyan de bi giranî muxalif maye, bi rejîma Ebdulhemîd re li hev kiriye, li dijî hegemonya Elman hegemonya Ingilîstanê kiriye esas, li dijî neteweparêziya laîk milliyetgiriya Îslamî bi pêş xistiye, li dijî milliyetgiriya Siyonîst bi gerdûngeriya Cihû ya Karaîm re hevgirtine, îdeolojiya Tirk-Îslam a artêşê bi darbeya 12'ê Îlonê destek dayê ji xwe re kiriye destek, piştî ku artêşê bi xwe bi pêvajoya 28'ê Sibatê partiya millîgirê radîkal Necmeddîn Erbakan parçe kir, AKP weke partiyeke dewleta netewe ya navendî di encama vê pêvajoya dirêj de derketiye holê. Di berdêla CHP a Denîz Baykal serokatiya wê kirî de bibe muxalefeta sereke, bi serokatiya R. Tayyip Erdogan jî partiyeke bi stratejîk hegemonîk û di dema nû de weke hêza rêveber û avaker a faşîzma Tirk a Kesk, xwe disipêre rabihuriyeke dirêj û bi desteka hêzên hegemonîk ên hundir û derve li desthilatdariyê rûniştiye.

Eger mirov rejîma bi pêşengiya AKP'ê weke Komara Duyemîn an jî Komara Îslama Nerm bi nav bike wê bibe şîroveyeke zû hatiye kirin. Tevî ku weke karekterê bingehîn ê komarê tê îdeakirin û di destûrê de ev tê îfadekirin jî ti carî rejîm nebû dewleteke demokratîk, laîk û civakî, berevajî ji dema damezrandinê ve timî karekterê xwe yê faşîst olîgarşîk parast. Di çarçoveyeke klasîk de

rejîma komarê timî weke navekî maye. Nexasim nikarîbûye bibe komara demokratîk. Çawa ku li dijî hegemonya CHP'ê têkoşîna ji bo komara demokratîk û destûra bingehîn her di rojevê de bû, li dijî hegemonya AKP'ê jî ev yek wê her di rojevê de be. Ji lewra mirov ji pêvajoyê re bibêje, dema têkoşînê ya di navbera dîkta olîgarşîk û komara demokratîk a li dijî wê de, bawer dikim wê rasttir be. Herçiqasî bi israr û bi berevajîkirinên bi zanebûn ên medyatîk weke alternatîfa Faşîzma Tirk a Spî ya heştê salî were pêşkêşkirin jî bi biryar e ku vê rejîmê bi xwe dewam bike bi cudahiya reng ê ku di cewher de pêre li hev dike. Rejîma faşîst a Spî ji hev de ketiye, beşekî mezin ê desteka xwe ya derve û hundir ji dest daye û herweha weke encameke normal a jihevdeketina wê û jidestdana wê ya desteka wê ya veşartî, rê û pêşî li rejîma Faşîst a Kesk a AKP'ê hatiye vekirin.

Heşt salên pêşî yên desthilatdariya AKP'ê gelekî dişibin heşt salên pêşî yên CHP'ê (1923-1931). Li cem herduyan jî rejîmeke tekpartî serwer e. Mîna faşîzma Îsmet Înonî û Recep Peker a ji salên 1931'ê ve (tevî ceribandina Firqeya Serbest a Mistefa Kemal) her ku diçû giran dibû, AKP jî ji hilbijartinên sala 2011'an ve dîktatorya xwe zêde kir (gelekî dişibe rewşa hilbijartinan a Hîtler a di sala 1933'an de) û îhtîmaleke xurt e ku bi destûra xwe ya bingehîn vê bi hêztir bike. Dîsa dibe ku li cem CHP'ya hingê çawa qewimî, pêvajo bi êş derbas bibe û nakokiyên hundir zêde bibin (çawa ku di navbera Mistefa Kemal û Îsmet Înonî de), û heye ku ev jî AKP'ê bixe ser rêyeke din. Heye ku xwelihevrakişandina R. Tayyîp Erdogan û Abdullah Gul xurt bibe. Beşekî guh bide lihevkirina demokratîk, dikare cihê bibe. Gengaz e ku Tirkiya Demokratîk û Destûra Bingehîn a Demokratîk weke alternatîfeke ciddî di rojevê de giraniya xwe nîşan bide. Çawa ku desthilatdariya hegemonîk a AKP'ê vebirrî nebûye, çarenûsa rejîmeke destûra bingehîn a demokratîk jî ji sedî sed zelal nebûye. Ji herdu îhtîmalan wê kîjan bi ser bikeve, wê ev bi rewşa têkoşîna di navbera hêzên hegemonîk û hêzên Tirkiyê yên demokratîk, sosyalîst û xweseriya demokratîk a Kurdistanê de diyar bibe.

Di dema desthilatdariya hegemonîk a nû de rejîma şerê taybet ê bi armanca tesfiyekirina hebûna Kurd û azadiya wî, wê bêhtir were bi hêzkirin û dewamkirin. Jixwe AKP'ê li ser vî bingehî di şexsê artêşê de bi xwediyên desthilatdariya berê yên rêjîmê re li hev kir ango di bingehê vê lihevkirinê de domandina tesfiyekirina hebûna Kurd (rastiya ontolojîk) û azadiya wî (serwextî û rêxistinî) û qirkirina çanda wî heye. Lewma bi awayekî din desthilatdarî radestî AKP'ê nedikirin. Di sala 1925'an de jî milliyetgiriya Siyonîst û neteweparêziya Tirk li ser bingehê înkara hebûna Kurd û bi şîddetê tepisandina hêzên isyanê li hev kiribûn. AKP'ê ne bi tenê ev lihevkirin qebûl kiriye, di heman demê de bi argumanên Îslamî bi hêz kiriye û dewam kiriye. Kurtûkurmancî, nuqteya hevbeş a ku hersê ekolên sereke yên milliyetgir ango milliyetgiriya Siyonîst û neteweparêziya Tirk, milliyetgiriya Tirk û milliyetgiriya Tirk-Îslamê li ser li hev kirine ji aliyê çandî ve qirkirina Kurdan e. Hersê ekolan herçiqasî di tevahiya mijarên din de li dijî hev darbeyên xwînrij kiribin û li dijî hev têkoşiyabin jî li dijî rastiya Kurd timî xwedî helwesteke hevpar in.

Diyardeya jêre ‘qanûna hesin’ a rejîma faşîst tê gotin ev e. Çi hêza ku vê qanûnê nas neke di nava sîstemê de mafê jiyanê û siyasetkirinê nadinê.

Hegemonya AKP’ê pêkanînên taktîk ên bêhtir cuda dimeşîne û ev bi stratejiya hevpar re a ku armanca wê tesfiyekirina hebûna Kurd û Tevgera Azadiyê ye, li hev dike û ji bo vê stratejiyê bi awayekî bêhtir afirîner pêk bîne, ev dibin manewrayên taktîk. Mînak R. Tayyip Erdogan di sala 2005’an de li Amedê pêşî got “Pirsgirêka Kurd pirsgirêka me ye” û bi vê gotina xwe beşekî girîng a desteka gelê Kurd kişand cem xwe û paşê di sala 2006’an de Qanûna Ceza ya Tirk bi xasûkî derxist; jin û zarok jî xistin çarçoveya vê qanûnê û di tevahiya demên Komarê de qanûna herî zêde antî-Kurd ev qanûn e. Ji ber vê stratejiyê, cara pêşî bi awayekî zêde zarok û gede hatin girtin, operasyonên KCK’ê destpêkirin û êrîşên hewayî pêk hatin. Dîsa ji nêz ve bi vê stratejiya nû re têkildar, her cure şerê psîkolojîk, sermayeyeke Kurd a hevkar hem li Bakur û hem jî li Başûr li bajarên girîng weke navendeke balkêş hewl dan pêk bînin û saziyên rêxistinên civaka sivîl ên Kurdî yên sexte ava kirin. Divê mirov medya Kurd a hevkar jî weke amûrên şerê psîkolojîk li vê zêde bike. Gelek şaxên huner û sporê jî di çarçoveya heman armancên stratejîk de têne bikaranîn. Belkî jî kirina herî xeternak ew e, li şûna Hîzbul-kontrayê Hamasa Kurd bê pêkanîn. Hedefa bingehîn a rêxistin û weşanên dînî ew e, di qonaxa dawî de li dijî KCK’yê koma xwe ya Hamasê ya Kurd damezrîne, bixe nava tevgerê û bike sereke. Mînak, tevî ku ti têkiliya Hamasê bi têkoşîna Filistînê re tinebû, MOSSAD’ê ji bo qelskirina Rêxistina Rizgariya Filistînê RRF’ê ew damezrand û kir ku îro RRF’ê û nexasim hêza bingehîn El Fetihê bîne ber tesfiyeyê. Heman modelê hewl didin li Kurdistanê li dijî KCK’ê pêk bînin û bi pêş bixin. Qursên Quranê û lîseyên dînî yên nû bi lez û bez bi vê armancê bi xwe ava dikin. Serokatiya Karûbarên Diyanetê mizgeft hemû xistine xizmeta tesfiyekariya çandî. Dîn bi temamî polîtîze kirine û weke amûrekî di reşkirina têkoşîna azadiyê û înkara hebûna Kurd de bi kar tînin.

Bi sedan kirin û pêkanînên bi heman rengî bi tenê niyet û polîtîkayên hêza hegemonîk a nû nîşan nadin, di heman demê de kirinên wê yên tesfiyeker ên gelekî bi tehlûke eşkere radixin pêş çavan. Çawa ku CHP di dema 1925-1940’î de ji bo berxwedana Kurd û hebûna wî bi awayekî xwînrij tesfiye bike partiya dewleta netewe ye, ji salên 2000’î û pêve jî AKP bi heman awayî û li ser bingehê şertên bêhtir girankirî partiyeke dewleta netewe ye, bi armanca tesfiyekirina rastiya Kurd û Tevgera Azadiyê radibe. Bêguman di nava wê de carcaran dengên cihê derdikevin û hin kirinên wê yên cuda yên demî hene û ev armanca wê ya stratejîk naguherîne, berevajî piştrast dike. Ji sala 2002’an ve tevgera tesfiyekirinê ya AKP’ê di nava PKK’ê de meşand (hewldana tesfiyeyê ya bi DYE, otorîteya Başûrê Kurdistanê û hêmanên hevkar ên PKK’yî hat meşandin), ji sala 2006’an ve hevdîtinên di bin navê diyalogê de bi nûnerên DTP û KCK’ê yên Ewrûpayê re hatin meşandin û heta xwe li cem Abdullah Ocalan nîşan dan, tevî niyetên baş ên hin rayedarên dewletê, li dîwarên heman stratejiyê qelibîn û pûç bûn. Eşkere ye ku heta ev stratejiya tesfiyekar a dijminê aştiyê neyê terikandin, hegemonya AKP’ê ya nû wê di bin navê şerê taybet

de bêhtir bi dijwarî dewam bike. AKP û hêzên hundir û derve yên ku AKP xwe disipêre wan, heta der barê aştiyê de nêzîkatiyeke stratejîk ji raya giştî re deklare nekin û ji bo destûreke bingehîn a demokratîk biryarên pêve girêdayî bimînin nedin, her helwest, çalakî û gotina der barê rastiya Kurd û Tevgera Azadiyê de wê ji tesfiyekariyê wêdetir tiştekî din îfade neke.

Weke encam em dikarin bibêjin, ezmûna şerê dused salên dawî li dijî rastiya Kurd û Tevgera Azadiyê bi awayekî bêhtir giranbûyî veguheriye qirkirineke çandê. Hebûna Kurd û xwesteka ji bo jiyaneke azad, di bin pêngavên qirkirinê yên bêrehm de hewl dane xwe bidin dewamkirin. Tevgera tesfiyekirina otorîteyên şêxtî, serekeşîrtî û begtiyên Kurdistanê yên di dema modernbûna Împaratoriya Osmanî de dest pê kirin, her ku çû veguherîn tesfiyekirina rastiya çanda Kurd. Di dema pêşî ya Komarê de Faşîzma Tirk a Spî polîtîkaya behsa wê tê kirin hûrûkûrtir kir, li tevahiya civakê belav kir û di nava dewleta netewe de Kurd helandin, anîn ber tinebûnê. Berxwedanên li dijî vê yekê, bi sedema bingehê civakî yê li ser radibûn û karekterên serokatiyên wan, tesfiye bêhtir xurt dikirin û jê zêdetir ti encamên xwe tinebûn. Di dema gihiştin û stewînê de destûra hebûna tebeqeyên hevkar hat dayîn bi şertê rastiya Kurd înkar bikin û vê yekê jî kir ku qirkirina çandî bêhtir hûrûkûr bibe. Ji salên 1980'î ve di dema hilweşîn û serberjêrçûnê de, DYE'yê li ser bingehê berjewendiyên xwe destek dayê û bi vî awayî serî li rêbazên şerê taybet ên nedîtî da, û ne bi tenê weke Tevgera Azadiyê, weke hebûnê bi xwe jî xwest Kurdîtiyê biqedîne. Çawa ku me di qedexekirina ziman de jî dît weke hebûneke ontolojîk dixwaze ji holê rake. Li dijî vê tevgera qirkirinê ya mislê wê nehatiye dîtin, Tevgera Azadiyê ya bi pêşengiya PKK'ê hat bipêşxistin, tevî gelek şaşî û kêmûkurtiyên xwe, ne bi tenê hebûna çanda Kurd piştrast kir, weke hebûneke azad dibe gihand qonaxeke gelekî girîng. Pêşketinên bi vî rengî parçeyên din ên Kurdistanê jî kirine bin bandora xwe; li Başûrê Kurdistanê rê li ber pêkhatineke siyasî ya aliyê wê yê dewleta netewe xurtir vekiriye, li Kurdistana Rojhilat û Rojava jî bi awayekî xurt rê li ber hişyarbûna gel vekiriye, bi tevlîbûna wan a nav Tevgera Azadiyê û pêşdebirina wan a xweseriya xwe ya demokratîk bi encam bûye.

Şerê taybet ê tesfiyekar ê hêzên hegemonîk ên Tirk li dijî KCK'ê di dema li pêş me de wê ji aliyê stratejîk, polîtîk û civakî ve, ji sedî sed rê li ber bûyerên mezin ên gelekî girîng veke. Eger biryara aştiya stratejîk neyê dayîn, di rewşa berbiçav a Kurdistanê de bi îhtîmaleke mezin şerê gel ê şoreşgerî wê bi perspektîfa modernîteya demokratîk pêk bê û her biçe wê li cografya cîran belav bibe, bi şerê xweparastinê di zikhev de wê şaxên rêveberiyên xweseriya demokratîk ekonomî, civakî, çandî, huqûqî û dîplomatîk bêne bipêşxistin.

**b- Li Başûrê Kurdistanê Nasnameya Kurd a Hemdem**

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn dewletên Iraq û Sûrî hatin çêkirin. Rewşa Kurdên di nava sînorên van welatan de hatin hiştin, ji bo analîzkirina nasnameya Kurd a hemdem gelek dersên kêrhatî pêşkêş dike. Di pêvajoya parçebûna Împaratoriya Osmanî de, li gorî Peymana Sykes-Picot (1916), di bin hegemonya Ingilîstan û Franseyê de rejîmên mandater ên Iraq û Sûrî hatin pêkanîn. Rejîma mandater tê maneya rêveberiyên demî yên mêtingehê. Rêya trênê ya di navbera Komara Tirkiyê û dewleta Sûrî de sînor hat qebûlkirin. Sînorên Iraq-Tirkiyê jî li gorî Peymana Mûsilê (1926) hatin destnîşankirin û di diyarkirina sînoran de berjewendiyên petrolê esas in. Peymanên herdu sînoran jî di ber binpêkirina Mîsaq-î Millî ya pîroz îlankirî de hatin îmzekirin. Berjewendiyên yek ji sê dewletên Lihevkirî yên Şerê Cîhanê Yê Yekemîn Franseyê li ber çavan hatin girtin û hê di destpêka Şerê Rizgariya Neteweyî de Peymana Enqerê di Çileya 1921’ê de hat îmzekirin. Paşê dewleta bi navê Komara Ereb a Sûrî hat îlankirin. Kurdên di nava sînorên wê de hatin hiştin, heta Tirkmenên hatin hiştin qet li ber çavan nehatin girtin, bi tenê tewazuna eskerî û siyasî hesibandin û weke meseleyeke, bû çû qediya, nêzîk bûn. Jixwe rewşa Ereban jî bi çi awayekî qanûnî ve nehatibû girêdan, bi tenê berjewendiyên dewleta mêtinkar ango Franseyê li ber çavan hatibûn girtin.

Ji ber statukoya destpêkê çêkirin diyar bû ka wê bi serê xwe rê li ber pirsgirêkên çiqasî ciddî veke. Jixwe dewleta Sûrî ji 1920’an ve bi ti awayî nebû normal û neket rêyekê. Hê jî bi awayekî fermî bi îdareya orfî tê birêvebirin. Xwedî sîstemeke destûrî ya ku civakê li ser li hev kiribe, nîne. Beşekî mezin ê Kurdan hê nebûne welatî jî ango ji aliyê huqûqî ve bi hukmê tinene têne hesibandin. Jixwe yên mayî jî ti heqekî wan ê qanûnî, çandî, ekonomîk, îdarî û siyasî tineye. Rewşa Kurdan pêşî ji ber berjewendiyên mandater ên Franseyê û paşê jî ji ber berjewendiyên millî yên Ereb ji statuya mêtingehê jî gelekî paşdetir e, û li ser hebûna wan (mîna sîstema dewleta netewe ya Tirkî) pêvajoya înkar, îmha û qirkirina çandî hatiye destpêkirin. Ev statuko li gorî hesabên tawazunê yên desthilatdariyên hegemonîk, bi guhertinên qismî, lê di encamê de bi awayekî bêhtir mezinbûyî heta roja me ya îro dewam kiriye.

Di destnîşankirina sînorên Iraq û Tirkiyê de komploya li serê rastiya Kurd gerandin girîngiya xwe ya diyarker heye. Dema ku ev komplo li dijî yekparebûna Kurdan pêk anîne, hesabên sedsalan ên piştre kirine. Ev komplo ji bo Kurdan destpêka fermana qirkirinê ye. Li ser vê demê gelekî xweş tê axaftin û wêje tê kirin û tê gotin Kurdistan di vê demê de kirine çar parçe, lê mixabin naveroka wê demê bi awayekî rastî qet nayê ravekirin û şîrovekirin. Eger ev rastî bi awayekî eşkere û berbiçav neyê analîzkirin û şîrovekirin, bi tevahî bûyerên li Kurdistanê diqewimin, rastiya Kurd û hebûna wî ya civakî, nabe ku rastûdurist bêne terîfkirin.

Di çarçoveya sînorên Iraqê de parçebûna Kurdistanê û Kurdan di sedsala 20. de yek ji bûyerên herî trajîk e. Bi vê re, ne bi tenê bingehê dîroka Kurdan, ji bombeya atomê bi bandortir

bombeyekê dixin bin hîmê dîroka Ereb, Fars û Tirkan. Di wê demê de li parlementa Tirkiyê li dijî vê rêveçûnê îtîrazeke mezin çêbûbû. Rewşenbîrên Kurd ên wê demê û efserên di artêşê de li ser piyan bûn. Di bingehê isyana 1925'an de ev rastî heye. Berevajî rewşa di dîroka fermî de li hev anîne, yên bi hegemonya Ingilîz re li hev kirine Kurd nînin, rejîma Tirk ê Spî ye. Divê mirov ji bîr neke ku vê rejîmê M. Kemal jî bi kompleyê bê tesîr kiriye. Tê zanîn, M. Kemal ev peyman weke bûyera herî nexweş û zor a jiyana xwe nirxandiye û aniye ziman ku vê peymanê erê nekin Komar ê bi temamî bikeve tehlûkeyê. Pêşî li Rojhilat bi Peymana Qersê (1921), paşê li Rojava bi Peymana Lozanê yên bi destxistibûn, di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Peymana Mûsil-Kerkûkê bi awayekî stratejîk têkbirin. Dagirkeriya dawî ya Iraqê bi awayekî eşkere nîşan da ku ev têkçûn çiqasî stratejîk e. Dîsa, berevajî yeqînan, bi xêzkirina van sînoran bi tenê petrolên Mûsil-Kerkûkê ji dest neçûne, di heman demê de Kurd ji dest çûne, biratiya dîrokî ya Kurd-Tirkan ji dest çûye, yekparebûna tevahiya çanda gelên Rojhialta Navîn ji dest neçûye.

Hê jî rojane virde wirde sînoran dişemitînin qaşo hewl didin sererast bikin, dîwaran lê dikin, têlên rêsayî yên bi elektrîk datînin, qereqolên mîna kelhan rêz dikin û bi rêbazên mîna artêşa taybet bawer dikin ku wê van sînoran biparêzin û sererast bikin. Bikaranîna van rêbazan bi temamî xeflet e, ji dîrokê ders negirtin e, pişta xwe bi kompleyê germkirin e, yan jî xwe dikin destikê wê. Eger şaşiyên bingehîn bêne rakirin û li şûna wan rastiyên bingehîn bêne danîn wê bêne sererastkirin. Jixwe Ingilîzan ev lîstika xwe li tevahiya Ewrûpayê, Asya, Efrîka, û Emerîkayê, heta li parzemîna Awisturalyayê lîstin û bi vî awayî hegemonya xwe xurt kirin û dewam kirin. Bi sedan, bi hezaran çandên civakî bi sînorên bi cedwelan xêzkirî hatin parçekirin, ew berdan hev û bi vî awayî ew bi rê ve birin. Dewletdariya netewe di nava vê lîstikê de weke pevçûna di asta desthilatdariyê de şêweyê herî bi tehlûke ye. Dinya îro heta dabeşî ji dusedî zêdetir dewletên netewe nebûya, hegemonya kapîtalîst pêk nedihat û nikarîbû xwe dewam bike. Eger bi vê rêbazê were ravekirin wê dîroka rastî derkeve holê û em ê bi vî awayî serwext bibin ka kî bi vê rêbazê bi ser ketiye û kîjan îdeolojî û çand bi ser ketiye û kîjan têkçûne.

Dîroka Kurd a hemdem û hebûna wî, bi tenê di nava vê yekparebûnê de û bi parçebûna sînorên Iraq-Sûriyê dikare bê zelalkirin. Ev parçekirin û dabeşkirineke wisa ye, qirkirin jî di navê de, mîna ku tevahiya potensiyela alternatîfên îmhayê têde hatibin depokirin. Li ser pirralî hesab hatine kirin. Ya yekê, Kurdên Iraqê ji bo Erebên Iraqê kontrol bikin yedek hatine hiştin. Karekterê Tevgera Kurd a Iraqê têra xwe vê rastiyê piştrast dike. Herî dawî bi awayekî bingehîn xwe sipartin Kurdên Iraqê û rejîma Saddam Husên hilweşandin. Ya diduyan, di nakokiya Iraq-Îranê de amûrê herî girîng ê bikaranînê ye. Dîrokê ev jî têra xwe piştrast kiriye. Ya sisiyan, ji bo Komara Tirkiyê kontrol bikin yedek hiştine. Ji 1925'an ve, heta ji isyana pêşî ya hemdem a Kurd a bi pêşengiya Babanzade Ebdurrehman Paşa Isyana Soran a 1806'an ve tevahiya bûyerên girîng ên dîrokî ji bo rêveberiyên Osmanî û Komarê mijûl û kontrol bikin, kirine amûrên girîng. Ya çaran, ji bo Rojhilata Navîn di kontrola hêzên hegemonîk ên dinyayê de bihêlin ango di kontrola

Ingilîstan û Emerîkayê de bihêlin (ji salên 1800'î heta salên 1945'an hêza hegemonîk Ingilîstan e, ji salên 1950'î ve DYE ye), yek ji amûrên herî kêrhatî bûn. Ya pêncemîn û ya herî girîng, di statuya baregeha bingehîn de wê bi kar tînin, ji bo bi xwe tevahiya Kurdistanê û potansiyela şoreşger a gelê Kurd di kontrolê de bigirin û karibin ji rê derxin (ji 1920'an ve bi gotina wan ji bo Rêveberiya Kurd a Iraqê hewl didin statuyekê pêk bînin. Herweha hewl didin bikin navenda îdolojiyên eşîrên paşvemayî, dîndar û modernîst ên bi wan ve girêdayî.) Kengî tevahiya Kurdistanê û gelê Kurd bi vê rêveberî û parçeyê piçûk ve girê bidin hingê wê wan bikin amûrekî stratejîk ê kontrolê. Ya şeşan, dewlemendiyên wê yên binerd ku têra xwe hene, ava wê û cografya wê ya xweş, bi hêsanî wê bêne bikaranîn û îstîsmarkirin.

Dema ku mirov van sernavên sereke bêhtir ji nêz ve analîz bike, mirov ê bibîne, dewletdariyeke netewe ya Kurd timî weke potansiyel yedek tê girtin, bi awayê, ha ava bû wê ava bibe, hem dewletên netewe yên herêmê kontrol û terbiye dikin, hem jî li şûna xwe bisipêrin hêza xwe, hêviya xwe bi pêkhatineke muhtemel a bi destê hêzên hegemonîk ên derve pêk bê girê didin û bi vî awayî ji wan nayê hebûna Kurdan biparêzin û potansiyela azadiya wan zêde bikin ango hêza wan bi xwe ditevize. Li ser vî bingehî dikevin rewşekê ku ji xwe piştrast nînin, timî xwe hewcedarî hêzên derve dibînin û ditirsin ku her kêlî felaket û tevkujî bi serê wan de bên û lewma dibin evd û bendeyên dilsoz ên efendiyên xwe. Di şexsê wan de heman dekûdolab li serê tevahiya Kurdan tê gerandin. Tevgerên bi rastî şoreşger, demokratîk, neteweyî û welatparêz ên hewl didin vê dekûdolabê xira bikin bi hêsanî tecrîd dikin, wan gunehbar dikin ku Kurdan dixin tehlûkeyê (ya rastî ev lîstikek e ku ew bi xwe baş dilîzin), ji dîplomasiyê fêhm nakin (dilsoziya bi efendiyan re), Kurdan parçe dikin (sînorên ku Kurd û Kurdistan ji can û dil parçe kirine, weke wezîfeyeke xwe ya sereke rewa dikin) û tewazuna dinyayê (parastina statukoya ku hêzên hegemonîk ew afirandine) li ber çavan nagirin. Timî hewl didin bi teorî û pratîk bînin ziman ku gelê Kurd bi tena serê xwe nikare tiştekî bike (lê divê qîma xwe bi tifingên hêzên hegemonîk bîne) û bi vî awayî hewl didin nîşan bidin ku avakirina civakeke demokratîk, azad û wekhev pêkan nîne. Gelê Kurd ê belkî karîbû bibe yek ji gelên şoreşger ê hemdem, bi vê zêhniyeta hegemonîk kirin gelê dinyayê yê herî di binî de maye, kirin gelekî kole yê li ber qirkirinê. Ji gelê Kurd re gotin 'gelê bêparêzer' û bi vî awayî xwestin gelê Kurd timî li pey parêzerên sexte biçe û bibeze. Jixwe ya rast ew e ku gelek bibe parêzerê xwe bi xwe.

Lîstikeke din a girîng ku li ser Kurdên di nava sînorên Iraqê de dimînin, tê lîstin di pêkanîna nasnameya neteweyî ya Kurd de karekterê bûrjûwa yê Sunnî yê lihevçêkirî û çeloxwarî ye. Rastiya qewm û gelê Kurd ku yek ji çandên herî dewlemend ên dîrokê gihand heta roja me ya îro, çanda wî ya dewlemend a qebîle, eşîr û baweriyê tine tê hesibandin û hewl didin neteweyeke Kurd a lihevçêkirî ya bi bermahiya herî bêkêr û paşvemayî ya milliyetgiriyê û paşverûtiya Îslama Sunnî xwe xwedî dike, ava bikin. Hewl didin bi çandeke neteweyî ya ne demokratîk, li azadî û wekheviyê girtî û dijminê jinê, li şûna civaka neteweyî ya demokratîk

dewletdariya netewe weke utopya xwe ya pîroz dihesibîne û fena rastiya bi tenê ya civakî û ew tenê dikare wan temsîl bike, têgihiştineke li heqîqetê biafirînin.

Li ser Kurdên di nava sînorên Iraqê de diman, hesabekî wan ê kûr heye. Dixwazin her kes bawer bike ku pirsgirêka Kurd bi tenê bi modernîteya kapîtalîst çareser dibe. Di plansaziya demdirêj a têkiliyên hegemonîk de Kurdên Iraqê timî weke amûrên laboratûwarekê têne bikaranîn. Ji bo rastiya Kurd a neteweyî bi gewde bibe, wisa plan kirin ku bi tenê dikare bi têkiliyên kapîtalîst ava bibe. Fêhm û têgihiştineke dibêje rastiya neteweyî ya bi xisletên şoreşger, demokratîk û sosyalîst nabe, timî di rojevê de dihêlin. Di vê mijarê de destikê herî girîng ê hêzên hegemonîk pê radibin, Ereb-Sunnî ya navend Bexda ye yan jî milliyetgiriya Şîî ye. Tehlûkeya milliyetgiriya Ereb timî li ser serê wan digire û bi vî awayî Kurdan dixe rewşekê ku timî xwe biavêjin bextê wê. Tehlûkeyê berevajî dike û vê carê tehlûkeya Kurdan li ser serê Ereban digire. Bi heman awayî, bi gotina, dewleta Kurd ha ava bû wê ava bibe, gefan li rejîmên dewletên Tirkî, Sûrî û Îranê dixwe. Li aliyê din, van hêmanên sêber an jî çarber weke çavkaniyeke tehlûkeyê zindî dihêle û bi vî awayî girêdan û dilsoziya Kurdan bi xwe bi temamî pêk tîne. Çawa ku tê dîtin, laboratûwar ji bo çêkirina lîstikên polîtîk têra xwe berhemdar e. Sîstem têne avakirin û xirakirin, lê di laboratûwara Kurd a Iraqê de bi ti awayî amûrekî mayînde ango polîtîka pêk nayê. Timî wan di bin fermana efendiyên wan de dihêlin û bi vî awayî wan berhemdar dikin. Tevî ku pirsgirêka Kurd yek ji pirsgirêkên herî kevin ên Rojhilata Navîn e, hê jî nehatiye çareserkirin. Di bin vê rastiyê de ev mentiq heye û lewma çareser nabe.

Çawa ku ji bo Siyonîzma Îsraîlê neteweparêziya Tirk a Spî li Anatolyayê bi roleke Proto Îsraîl rabûye, milliyetgiriya Kurd a li Başûrê Kurdistanê jî nexasim qebîleya Barzaniyan bi roleke heman rengî radibe. Ev bi awayekî neteweparêziya Kurd a Spî ye. Ji aliyê heman hêzan ve bi awayekî îdeolojîk û pratîk hatiye avakirin. Di navbera neteweparêziya Tirk a Spî û neteweparêziya Kurd a Spî de ne bi tenê di warê teoriyê de, di warê pratîkî de jî têkiliyên xurt hene. Partiya Demokrat a Kurd PDK weke CHP hatiye plankirin û parçeyek ji xebatên hêzên komploger e ku ji sala 1925’an ve li ser kar in. Hêzên komploger, ji aliyekî ve Kurdan di dema 1925-1940’î de dixin nava çerxa tevkujiyan, ji aliyê din ve jî ji sala 1926’an ve ne ku bi tenê bi zorê Kurdistanê parçe dikin, li ser parçeyê Iraqê vê carê hîmê neteweparêziya Kurd a Spî datînin ku wê di pozîsyona xelaskar de dihêlin.

Ya rastî, tevahiya provokasyonan li ser rêya diçin Îsraîlê qonax in. Mirov heman tiştî dikare ji bo milliyetgiriya Şîa û Ereb BAAS jî bifikire. Li Rojhilata Navîn ekolên netewegir ên milliyetgir (milliyetgiriya dînî jî di nava vê de) bi qasî xuya dikin çiqasî antî-Siyonîst û antî-Îsraîl xwe bihesibînin jî bi awayekî ontolojîk (hebûn weke zêhna avakirinê) varyanteke milliyetgiriya Îsraîlê ne. Çawa ku dînên yekxwedayî ji dînê pêşî Mûsewiyetê (Tewratê) zêde bûne, varyantekê wê ne, di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de, ne bi tenê li herêmê bi tevahî milliyetgirî û

neteweparêziyên dinyayê varyanteke Îsraîlê ne. Li navenda fermandanê ya milliyetgiriya dinyayê milliyetgiriya Îsraîlê disekine, lewma herçiqasî milliyetgirî, partiyên netewegir û dewletên netewe hemû di pozîsyona dijber de xuya bikin jî bi awayekî ontolojîk bivênevê wê ji Hêza Sereke ya Fermandanê re xizmetê bikin. Ji ber ku sîstem (milliyetgirî û dewletdariya netewe) li ser vî bingehî hatiye avakirin. Di vê mijarê de aqûbeta trajîk a Saddam Husên mînakeke balkêş e, û mijarê piştrast dike. Saddam Husên sîstem nas nedikir û bi awayekî şaş li ber wê radibû. Ezmûna sosyalîzma pêkhatî ya heftê salî ya Rûsya Sovyetê jî li gorî tehlîla dawî di sîstema hegemonîk de ji ber rola sereke ya hêzên avaker ên kapîtalîzmê û dewleta netewe ji hev de ketiye. Çiqasî nirxandina rast a sîsteman girîng e, ewqasî jî dijderketina wan bi awayekî sîstematîk ji ber vê sedemê girîng e. Naxwe, mirov nikare pêşî li trajediyan bigire. Di ser re heftê sal jî derbas bibe, dawiya sîstemên şaş bi xem e. Ji ber van sedeman, ji bo Iraqê û Kurdên Iraqê bi modernîteya demokratîk dijberiya modernîteya kapîtalîst gelekî girîng e. Em ne mehkûmê dîndarî, milliyetgirî û dewletdariyên netewe ne. Em kengî xwe ji paradîgmaya milliyetgir û dewletdariya netewe ya mirovan serkorî dike rizgar bikin hingê em ê civaka rastî fêhm bikin û em ê karibin wê demokratîze bikin.

Çawa ku ev danasîna me ya kin jî nîşan dide, parçebûna Kurdan li ser bingehê pêkhatina dewleta netewe ya Iraq û Sûrî, rastiya civaka neteweyî ya Kurd birîndar kiriye û bandoreke welê lê kiriye ku ji xwebûnê derxistiye û bûye derbeke mezin a ku li pêşketin û yekparebûna civaka neteweyî ketiye. Ev jî bi awayekî dişibe mirovekî gewdê wî ji mil û piyan hatibe kirin. Kurd nebûn civakeke neteweyî, timî birîndar û seqet hatin hiştin û di vê de sînorên Iraq û Sûrî bi bandor in, lewma divê mirov bi girîngî li ser xêzkirina van sînoran raweste, û li dijî modernîteya kapîtalîst a berpirsê van sînoran e, modernîteya demokratîk bi pêş bixe. Em dema ku behsa yekparebûna civaka neteweyî ya Kurd dikin divê jê dewleta netewe neyê fêhmkirin, berevajî divê mirov jê civaka neteweyî ya demokratîk fêhm bike. Ji bo vê jî hewcedarî bi sînorên nû yên dewletdariya netewe nîne. Bi tevahî çandên civakî yên di nava hev de û nexasim jî gelên cîranên hev in, pêdiviya wan bivênevê bi çareseriyên xwe disipêrin xweseriyên demokratîk heye. Pirr baş eşkere bûye ku dewletokên netewe yên ku modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn ava kirine, nikarin bi hev re bijîn û nikarin civakan bextewar bikin. Li hemberî vê, sîstema modernîteya demokratîk a hedefa wê xweserî, wekhevî û azadkirina mîrateya çandên hezar salan e, riya rast, baş û xweş a jiyana bextewar û aştiya civakî ye.

**c- Li Rojhilatê Kurdistanê Nasnameya Neteweyî ya Kurd**

Îran weke welat di pêkhatina nasnameya Kurd de xwediyê pareke girîng e. Nêzîkbûna çand û ziman di vê pêkhatinê de cihekî girîng digire. Navê Îranê ji têgîna Aryen tê, koka xwe diçe heta civaka neolîtîk; tê maneya 'welatê komên Aryen'. Komên Aryen jî ew qebîle û klanên şivan û cotkaran in ku şoreşa neolîtîk pêk anîn. Ji van koman Proto Kurd weke çand ji komên pêşeng in ku derketin ser dika dîrokê. Ya rastî, têgîna Arî ji bo danasîna van koman tê bikaranîn. Ard bi maneyeke xwe tê maneya erd, bi maneya xwe din jî tê maneya ar ango agir. Di herdu maneyan de heman rastî tê îfadekirin. Di bingehê têgîna Îranê de pîroztiya ard û ar heye. Li qûntara çiyayên Zagrosê zivistanan agir, havînan jî cotkarî hêmanên bingehîn ên jiyanê ne. Hem şaristaniya Sumer, hem jî şaristaniya li qûntara çiyayên Zagrosê berhemên agir, cotkarî û heywanxwedîkirina çandên van civakan e. Di tevahiya dîrokê de ango ji Sumer-Gûtiyan heta bi Med-Persan, ji Sasaniyan heta bi Îrana îro di tevahiya pêkhatinan de mirov dikare vê rastiyê bibîne. Nasnameya pêşî ya qewmî jî bi rêberiya rahibên Zerdeşt di dema Konfederasyona Med de pêngaveke girîng kiriye û di vê nasnameyê de gihiştine qonaxeke girîng. Med ji aliyê nasnameya Kurd ve di dîrokê de xwediyê nasnavê pêşiyên pêşî yên qewmê Kurd in. Ya rastî, nasnameya Pers jî hebûna xwe deyndarê Medan e. **Dîroka Heredot** Medan weke qewmê herî pêşketî yê wê demê dide naskirin, Pers û Grekên wê demê jî mîna şagirtan in ku ji Medan çandê hîn dibin. Di qonaxbihurîna sîstema şaristaniya navendî de bi kêmanî bi qasî Sumeran bi rolekê rabûne. Çanda Medan bingehê şaristaniyên Pers, Ege, Helen û Romayê daniye û pêkhatina wan mumkîn kiriye.

Heman mîrateya dîrokî di pêkhatina çanda Îslamê ya serdema navîn de bi roleke girîng rabûye. Beşekî mezin ê Quranê ji ber doktrîna Zerdeşt hatiye girtin. Beşekî mezin kategoriyên hem baweriyê hem jî exlaqî ji vê rêûresmê tên. Êzîdîtî beşekî piçûk ê vê rêûresmê ye ku hê jî hebûna xwe dewam dike. Di nava rêûresma Kurdên Elewî, Soran û Lor de para vê mîrateyê heye.

Îran a Şîa bi awayekî kategorîk ji hebûna qewmên Tirkmen, Fars û Kurdan ên li dijî Îslama Sunnî ya desthilatdar hevgirtine, pêk hatiye û ava bûye. Kurdekî xwedî ocax ê bi navê Şêx Sefiyuddîn bingehê mezhebê Sefewiyan daniye. Şêx Sefiyuddîn di heman demê xanedanê pêşî yê Şîiyan e. Bi demê re xanedanên bi giranî Tirkmenên Şîî yên li dijî xanedanên Tirk ên Osmanî yên Sunnî jî bi nexweşiya desthilatdariyê ketin û nikarîbûn xwe ji vê bikin. Ji konfederasyoneke siyasî ya bi giranî xwe disipêre rêûresmên demokratîk ber bi sîstemeke dewletê ya bi giranî xwe disipêre burokrasiya navendî ve vediguhere. Şîatî jî bûye parçeyekî îdeolojiya desthilatdariyê. Herçiqasî beşekî wê yê girîng bi rêûresmên antî-desthilatdar heta roja me ya îro hatiye jî Îslama Şîa jî mîna Îslama Sunnî desthilatparêz û dewletparêz e. Bi awayekî balkêş pirraniya Kurdên Îranê bi rêûresmeke Îslamî yê ne hişk li dijî desthilatdariyên Şîa temsîla muxalefetê dike ango temsîla rastiyê dike. Kurdîtiya hemdem a Îranê ji serê sedsala 19. ve hewl daye li dijî desthilatdariyên Şîa

şikil bide xwe. Serîrakirina Simko di sala 1920’an de, ezmûna Komara Mahabadê di sala 1946’an de vê rastiyê îfade dikin. Ev rêûresm û rastiya berxwedanê, herî dawî bi helwesta xwe ya li dijî Komara Îslamî ya Îranê ya bi pêşengiya Xumeynî (desthilatdariya despotîk a Îranê) xwe careke din piştrast kiriye. Hem Sunnîtî, hem jî Şîatî, çandên Îslamî yên desthilatparêz li ser Kurdan mîna kirasekî li wan nayê, mîna kirasekî gemarî yê bi darê zorê li wan kirine, disekinin. Kurd dema firsendê dibînin nabînin van kirasên gemarî û qirêj ji xwe dikin û bi kirasên çandî yên heqîqeta xwe, xwe gurçûpêç dikin.

Di qutbûna Kurdên Îranê ji yekparebûna Kurd û Kurdistanê de para Peymana Qesrî Şîrîn 1639 heye û para wê girîng e. Ji ber ku bi vê peymanê Kurdên Zagrosê ji yekparebûna Kurdan qut dibûn. Kurdên Îranê şaneya kok a nasnameya Kurd bûn. Nûnerên rêûresma Zerdeştî bi xwe bûn. Li dijî desthilatdariya Şîa pozîsyona wan demokratîk e. Mîna têkoşîna azadiyê ya demokratîk a Kurdên Elewî li Rojavayê Kurdistanê li dijî rêûresma desthilatdariya Sunnî dimeşînin, bi awayekî mîna wê Kurdên Sunnî yên li Rojhilatê Kurdistanê jî li dijî desthilatdariya Şîa dimeşînin. Ev rewş bi çavkaniyên îdeolojîk û çandî yên desthilatdariyê re têkildar e. Di rastiya Kurd a Îranê de çanda serdest ji dînî û mezhebî bêhtir etnîk û qewmî ye. Di nava çanda Şîa de xisletên qewmî yên Fars û Azeriyan bêhtir qels dibin, lê pirraniya Kurdên ji ber dijberiya xwe ya li beramberî çanda fermî ya Şîa xisletên xwe yên qewmî parastine. Li aliyê din, Kurdên Şîa yên hindikayî ne, û Kurdên Lor (Yek ji şaxên çandî yê Kurdan ê herî kevin) xisletên wan ên qewmî jî qels bûne. Di nava çanda Şîa de zû asîmîle bûne. Li Rojhilatê Kurdistanê di pêkhatina nasnameya Kurd a hemdem de pareke girîng a bandora berxwedanên 1806 yên bi pêşengiya Babanzadeyên Soran hene ku heta roja me ya îro dewam kirin. Bandora isyanên di serê sedsala 19. de pêk hatin giştî ye. Tevgerên bi armanca xurtkirina desthilatdariya navendî û tesfiyekirina otorîteyên eşîr û begtiyên Kurdan hatin kirin, herçiqasî desthilatdariyên hevkar ên ji rêûresmê jî tesfiye kiribin, lê nikarîbûne li ser çanda civakî zêde bi bandor bibin. Bi awayekî Kurdîtiya desthilatdar tesfiye bûye, lê Kurdîtiya civakî ber bi qonaxeke nû ve beridiye. Bi giranî isyan bi armanca desthilatdariya ji dest hatiye dayîn ji nû ve bi meqseda bidestxistinê pêk hatine. Ji armanca pêşdebirin û parastina hebûna neteweyî ya tevahiya Kurdan mehrûm in. Pêwîst e ku mirov baş li vê xisleta otonomiyên arîstokratîk serwext bibe û divê cudahiya wan ji tevgerên azadî û parastina hebûna neteweyî pêşde dibin, bibîne.

Şer û pevçûnên li ser otonomiyê yên ne demokratîk, ji ber şêweyê pêkhatina çînî ya pêşengên wê bi giranî bi têkçûnê bi encam bûne û vê yekê bi tevahî zirar û ziyaneke mezin daye hebûna neteweyî ya Kurd û azadiya wî. Her têkçûnekê bi xwe re rê li ber şikestinekê vekiriye û her şikestinê jî bi xwe re gaveke din qirkirina çandî pêşde biriye. Li Rojhilatê Kurdistanê, tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî ya sala 1878’an, tevgera Simko a salên 1920’an û tevgera Qazî Muhammed di salên 1945’an de rê li ber encamên bi heman rengî vekirine. Têkçûn û bêhtir tepisandinê, hebûna neteweyî û azadiya wî zêdetir qels kiriye û hiştiye ku bikevin rewşeke bêhêvî. Ezmûna

Komara Mahabadê ya bi pêşengiya Qazî Muhammed tevî karektera xwe ya hemdem a gelparêz, nikarîbû xwe ji aqûbeta isyanên din xelas bike. Faşîzma Tirk a Spî û faşîzma Riza Pehlewî di sala 1937'an de peymaneke bi navê Pakta Sadabadê mohr kirin û ev bi xwe şêweyekî hemdem ê Peymana Qesrî Şîrîn bû, armanca wê bi awayekî hevpar tesfiyekirina tevgera azadiyê bû û bêhtir dabeşkirina Kurdan bû. Roja me ya îro li Tirkiyê di navbera desthilatdariya faşîst a Kesk û desthilatdariya faşîst a Îrana Îslamî de li dijî têkoşîna azadkirin û parastina hebûna neteweyî ya Kurdistanê, gelek peyman hene ku bi dizî hatine mohrkirin û têne meşandin.

Li Ewrûpayê, li Federasyona Sovyetê ya berê û li gelek welatên Rojhilata Navîn, hebûneke mirov dikare jêre Dîaspora Kurd bibêje hestyariya wê ya neteweyî pêş dikeve heye û her diçe dibe parçeyekî girîng ê nasnameya neteweyî. Ev beşên em behsa wan dikin, nexasim li hêmana serwextbûnê ya çandê bêhtir vekirîne. Nasnameya neteweyî di warê pêkanîna yekparebûnê de divê bi rola katalîzor rabe.

Kurdîtî weke rastiya neteweyî di serdema modernîteya kapîtalîst de derbên kujer dixwe û ev eşkere li pêş çavan hatiye raxistin. Ji vir encama herî girîng a divê mirov derxe ew e, bi amûrên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst hebûna neteweyî ya Kurd pêk nayê û nikare were parastin. Min ev mijar di parêznameya xwe ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê de bi awayekî berfireh di çarçoveya sêberiya dewleta netewe, îndustriyalîzm û sermayeya yekdestdar de anîbû ziman. Çi seraktorên sîstema hegemonîk Ingilîstan, DYE, Elmanya û wekî din, çi jî hêmanên hevkar ên rejîmên faşîst ên spî yên herêmê, kapîtalîzma komprador û pîşesaziyên jihevdeketî yên hawîrdorê tine dikin, hesabên xwe li ser parçebûna Kurdistanê, li ser parçe parçe mayîna wê, li ser her parçeyê wê bi temamî qirkirin û asîmîlekirina hebûna neteweyî ya Kurd an jî bi pêkhatinên lihevçêkirî yên Kurd ên bi kirinên temamker ên bi heman xisletan dixwazin di bin serweriya xwe de bigirin. Eger ev hesabên wan, li gorî kêfa wan rasterast bimeşin, li naverastê ne Kurdistan, ne jî hebûna neteweyî ya Kurd dimîne. Sîstema hegemonîk li ser navê Kurdîtiyê li her parçeyî Kurdîtiyeke lihevçêkirî, sexte û jirêderketî çêdike, hêmanên hevkar ên vê Kurdîtiyê weke maske li rûyê xwe dixin, bi awayekî bingehîn dixwazin qirkirina çandî ya demeke dirêj bajo, rewa bikin. Yên li ser hebûna neteweyî ya Kurd xebatên entelektuel, polîtîk û estetîk dimeşînin, xusûsa bingehîn a divê kêliyekê be jî ji bîr nekin û di cîhana xwe ya hisan de zindî bigirin ev pêkhatinên Kurdîtiyê yên sexte yên bi maske û ser rastiyê digirin bi xwe ne û divê hay jê hebin ku ev pêkhatin xefik in. Niyeta wan çi dibe bila bibe, rola wan rewakirina qirkirinê ye. Bi qasî ku xuya dike, ev kes îdea dikin, ew hêmanekî hebûna neteweyî ya Kurd in, û hewl didin vê realizasyone bikin, lê bi xwe kurmê darê ne, qurmê wê dixwin, hêmanên potansiyel ên hebûna neteweyî ya Kurd dikeritînin. Mixabin cihê xemê ye, pirraniya wan jî vê rola xwe ya kurmê darê bi nezanî ji bo berjewendiyên xwe yên rojane dikin û ya ji vê jî xeternaktir vê bi niyeta baş dikin.

Di vê rewşê de rastiya neteweyî ya Kurd a hemdem bi du seriyên berevajiyê hev, hewl dide xwe heyî û azad bike. Meyla yekemîn, di bin statuyeke ji mêtingehê wêdetir de bi rêbazên moderniteya kapîtalîst ên weke dagirkirin, îstîla, îmha, tenkîl, tedîp, asîmîlasyon û heta bigihîje qirkirinê awayeyekî tesfiyeyê û bi vî awayî wî ji netewebûnê derdixe, nahêle bibe civaka neteweyî ya azad û di encamê de tine dike. Di vê meylê de xusûsa bingehîn a divê haya me jê hebe ew e, qirkirinên Cihû, Çermesor û Ermeniyan bêhtir fizîkî pêk hatin, lê qirkirina Kurdan ji van wêdetir bi rêbazên qirkirina çandî pêk tînin; vê jî bi komên Kurdparêz ên sexte û xayinên wan pirr ên ku mîna Kurdîtî heye û kes destê xwe nadiyê nîşan didin, rewa dikin. Meyla duyemîn, li dijî meyla yekemîn weke neteweya Kurd bi awayekî xweber an jî bi serwextî, rêxistinî û çalakî bi wê re dimeşe û ji bo hebûn, meşandina hebûnê û bi vê hebûnê re yekparekirin û azadkirina tevahiya parçeyan, û bi vî awayî jî avakirina civaka neteweyî ya Kurdê azad e. Di nasnameya Kurd a hemdem de ev herdu meyl weke du seriyên dijber bi hev re hene. Gelo meyla dikuje, jiyanê her roja diçe ji holê radike û bêmane dike, yan jî meyla jiyanê heyî û yekpare dike, jiyanê manedar û azad dike wê bi ser bikeve? Têkoşîna di navbera herdu meylan de wê vê encamê diyar bike. Ev pêvajoya hemdem a bi qasî dused salan dewam dike, û em dikarin jêre têkoşîna ji bo parastin û azadkirina hebûna neteweyî bibêjin, bi berxwedana çandî ya Kurd a di qada îdeolojîk, eskerî, siyasî, civakî, ekonomîk û dîplomatîk de kirî, dike û wê bike, di asteke manûnemanê de bi têkoşîna berfireh a stratejîk û taktîk a hêzên azadîxwaz û demokratîk wê diyar bibe.

### 3- Şaxê Civakî yê Rastiya Kurd

Nasnameya Kurd an jî çi nasnameyeke din dema bibe mewzûbehs xusûsa pêşî ya divê bê fêhmkirin ew e, nasname rastiyeke civakî ye. Diyardeya herî berfireh a cureyê mirov di nava xwe de dihewîne civak e. Lewma dema têgîna civakê bê bikaranîn, ji bilî wê pêdiviya bi têgîna aîdiyetê dibe ku zêdeyî be. Belkî jî ya bêhtir rast ew e, divê mirov kategoriya civakê bi nasnameyên hundir bide naskirin. Lê ji ber ku civak gelekî cûrbicûr in, bivênevê mirov nav li wan dike. Li vir a girîng ew e, têgîna rastî ya civakê gerdûnî ye. Gerdûnî jî dikare tevahiya nasnameyan temsîl bike. Mirov gerdûniyê bi cûrbicûriyê dabeş bike, bandorê li wê bi xwe nake. Civaka Emerîka û civaka Ewrûpayê bi xwe yek in. Cudahiya navbera wan di warê şêweyê de ye. Em dema dibêjin rastiya Kurd, ya rastî em civaka Kurd kategorîze dikin. Mirov li vir dubare bibêje civaka civakê belkî nexweş û tewş be. Mirov bibêje rastiya Kurd ev yek bi awayekî maddî û îdeolojîk weke ku mirov bibêje civaka Kurd. Lewma mirov bibêje di civaka Kurd de şaxê civakî belkî bêmane be. Lê li vir nuqteya em dixwazin hûrûkûr bînin ziman têkiliya di navbera beş û gerdûnî de ye. Weke rastiya Kurd civak naguhere û bi xwe timî weke xwe dimîne, lê şaxê Kurd ê civakî dibe şêweyê guherî yê civakê bi xwe. Şaxê Kurd ê klanê, şaxê Kurd ê neteweyî di çarçoveya rastiya Kurd de ne. Rastî weke xwe ye, klan û netewe civaka diguhere û şêwe digire

îfade dikin. Piştî ku me ev mijar bi serûber kir, em dikarin li ser şaxê Kurd ê civakî rawestin û bawer dikim mirov ê karibe gelekî jê hîn bibe.

Mirov dikare cudahiya mezin a di navbera Kurdîtiya serdema antîk an jî neolîtîk û Kurdîtiya di nava lepên modernîteyê de tavilê tespît bike. Çawa ku ya her civakê heye, rastiyeke neolîtîk an serdema antîk a civaka Kurd jî heye, lê rastiyeke wê ya hemdem an modern jî heye. Civakeke rastiya wê ya modern heye, nabe ku nasnameya wê ya klan, qebîle, eşîr an qewm çênebûbe. Qonaxa qewm kengî xwe bigihîne modernîteyê hingê êdî nasnameyê xwe cuda kiriye. Eger tine nebe, tê wê maneyê êdî dest pê dike xisletên neteweyî nas dike. Netewebûyîn şêweyekî qonaxa jor e ku êdî qewm xwe gihandiyê. Mirov li civakê bi xisletên wê yên neteweyî serwext bibe ji bo rastiyê bêhtir di cih de ye. Mirov jêre bibêje Kurdîtiya etnîk, ev bi zanebûn an bi nezanîn berevajîkirinek e. Di roja me ya îro de ev yek gelekî tê kirin. Etnîsîte diyardeyek e ku di salên 5000 B.Z. de pêk hatiye û bi gihiştina roja me ya îro rastiya civaka neteweyî ya Kurd ji mêj ve gihiştiye şêweyê wê yê jor û dixwazin vê înkar bikin û mîna Kurd negihiştibin vê qonaxê rastiyê berevajî dikin. Lewma ya di bin vî sernavî de tê analîzkirin rastiya Kurd e ku bûye nasnameya neteweyî. Ji ber ku tê zanîn sosyolojî zanisteke ceribandinê ya gelekî girîft e, daxuyaniyên bi vî rengî gelek caran hewce dikin.

Şaxê civakî di çarçoveyeke tengtir de, ji bo civakên bûne xwedî xisletên çînî tê bikaranîn. Mînak rastiyên bûne xwedî xisletên qebîle, klan û qewm, mirov yekser bi navê wê qebîle, klan an jî qewmî behsa wan bike nêzîkatiyeke rast e. Hewce nake ku mirov di çarçoveyeke teng de têgîna civakê fonksiyonel bike. Civak kengî bibe xwedî xisleta çînî, mirov dikare jêre bibêje civaka Kurd an çi civak be mirov wî jêre bibêje wê bêhtir kêrhatî be.

Em bi hêsanî dikarin bibêjin, Kurdan tevahiya dîrokê meylên çînîbûnê yên hundir an derve gelekî nas kirine. Pêşiyên orîjîn ên Kurd ku ji serî heta binî neolîtîk pêk anîn û bi şêwazekî şoreşgerî jiyan, ji civaka bi çîn a Sumerê ve çînîbûn nas kirine. Çînîbûna şaxên xwe li derve berdide her ku diçe ew şaxên wê li hundir vedigerin. Mînak, Xanedaniya Gûtî (2250-2150 B.Z.) di civaka Sumer de çînîbûn pêk anî û xwe disipart federasyona qebîleyên orîjîna wan Kurd. Bêhejmar bûyerên bi heman rengî qewimîne. Serdema destpêkê di pêkhatina dewletên Babîl, Hîtît, Asûr û Ûrartûyan de federasyonên eşîrên Kurdan ango bi awayekî berbiçav bandoreke mezin a Hûrriyan heye. Yan gelek xanedanên ji wan di avakirina van dewletan de rol girtine yan jî van dewletan di nava komên Hûrriyan de gelek xanedanên bi ser xwe ve pêk anîne. Ev vebirrî wisa ye. Tevî vê, kokên Kurd xisletên xwe yên xwerû yên qebîle û eşîrê bi girîngî parastine. Di van rewşan hemûyan de qebîle û eşîr gelekî serwext in ku bi tenê bi federasyonbûneke berbiçav dikarin hebûna xwe biparêzin û bi awayekî azad bijîn. Konfederasyona Medan di dawiya salên 600'î B.Z. de ango bi hilweşîna Împaratoriya Asûr re bûye împaratoriya herî mezin a wê demê. Piştre vê împaratoriyê bi Persan dewam kiriye û diyardeya çînîbûnê ya di orîjînên Kurd de jî

bûye navxweyî û rehên xwe berdane. Mirov dikare bibêje, sîstema begtiyê ya Kurdan ji wê demê ve veguheriye diyardeyeke civakî. Orîjînên Kurd di dema Helenîstîk, Sasanî û Roma de li ser bingehê nîzama begtî û eşîrtiyê bi hevgirtinên hundir û derve girîngî dane parastina hebûn û azadiya xwe. Ji ber ku şerên wê demê bi giranî li cografya orîjînên Kurd diqewimîn.

Îslamiyet weke civakbûneke nû bandora wê li ser orîjînên Kurd li ser bingehê pêşdebirin û bi hêzkirina nîzamên cemaetên dînî û begtiyan pêk hatiye. Cemaetên dînî bêhtir xwe bi terîqetan bi awayê civaka sivîl pêk anîn, lê nîzamên begtiyê yên ji rêûresmê xwe bi nîzamên pêşketî yên eskerî û çînî nû û bi hêz kirin. Terîqet weke rêxistinên civaka sivîl, belkî jî piştî civaka rahib a Zerdeşt di binyeya civakê de bêhtir bi cih bûn. Ya rastî, terîqet bi rewşa xwe ya xwerû saziyên berxwedanê ne li dijî desthilatdariya li ser hîmê çînîbûnê. Terîqetên berê ji yên roja me ya îro bêhtir rêxistinên civaka sivîl ên radîkal û kêrhatî bûn. Lê desthilatdariyan timûtim destê xwe dirêjî nava wan kir û tebeqeyên wan ên jor bi desthilatdariyan re ketin nava hevkariyê û bi vî awayî riziyan û bi armancên xwe re ne li hev meşiyan. Mirov dikare civaka serdema navîn bi xwe bi begtiyên feodal û cemaetên terîqetan ên derketin pêş karekterîze bike. Di civaka Kurd de herdu diyarde jî têra xwe pêk hatine. Pirraniya begtiyan bûne dewletên berfireh. Heta bi sedsala 16. begtiyên Kurdan xwedî statuyeke nêzî serxwebûnê bûn. Girêdaneke wan a sembolîk bi xelîfeyan re hebû. Kengî li dijî Sefewiyan bi Împaratoriya Osmanî re dilsoziya xwe nîşan dan, her ku çû xweseriya xwe ji dest dan. Sedsala 19. di 1847’an de, di şexsê Bedirxan Beg de bi tesfiyekirina Begtiya Botanê dawî li wan hat. Terîqet, nexasim Qadirî û Neqşîbendî weke rêxistinên parelel timûtim weke alternatîf li dijî begtiyan hatin bikaranîn. Siltanan li gorî berjewendiyên xwe ji herdu beşan jî sûd wergirtin. Kengî di sedsala 19. de dawî li begtiyan anîn terîqet derxistin pêş û asta temsîla wan a di civaka Kurd de gelekî bi pêş ket. Lê ji ber ku ev rola wan di isyanan de bi kar anîn, bêguman neyênî bû. Ji ber vê, di civakê de rê li ber zirar û ziyaneke mezin vekirin. Alayên Hemîdiyê di nava civaka Kurd de rê li ber encamên malwêran vekirin. Tebeqeya jor a Kurd hem di nav xwe de bera hev da, hem jî ew bi eşîrên Ermenî, Suryanî û Ereban re da şerkirin. Hevkartiya Kurd a bi serdestan re ket qonaxa xwe ya herî xirab û neyênî.

Bi sedsala 19. re bûyerên di civaka Kurd de qewimîn, encama dînamîkên navxweyî nebûn. Şêwazê paşvemayî, hevkar û her ku diçû şêwazê înkarker mohra xwe li bûyeran dida. Tebeqeyên jor ji bo kurtêlan û girêdana bi desthilatdariyê devberdana ji Kurdîtiyê kiribûn polîtîkayeke bingehîn, ya rastî kiribûn bêpolîtîkatî. Xiyaneta herî mezin a civaka Kurd bi modernîteya kapîtalîst ve girêdayî di dused salên dawî de pêk hat. Li vir a diyarker berjewendiyên maddî yên tebeqeya jor bûn. Girêdan û dilsoziya bi civaka Kurd, şerkirin û çûyîna li pey civaka neteweyî ferz dikir. Li ser vî bingehî, kengî isyanên pêk hatin bi ser neketin, bivênevê bi lez teslîmî desthilatdariyê bûn, di berdêla kurtêlan de dev ji Kurdîtiyê berdan, xiyanet bi Kurdîtiyê re kirin û di tesfiyekirina wê de rol girtin. Naxwe nikarîbûn debara xwe bikin. Jixwe yên mayî jî girse bûn ku ji serwextî û pêşengiyê mehrûm bûn. Ew jî li formên hezar salan

berê li klan û qebîleyan vedigeriyan. Yên diketin nava lep û pencên terîqetan bi temamî ji rastiya civakî qut dibûn. Ji ber ku di van sedsalan de terîqet ji jor ve bûbûn saziyên herî bi bandor ên sîxurtiyê. Di wê demê de bûyera herî girîng a di warê civakî de diqewime, yên derketine derveyî qebîle û eşîran, yên di nava rêxistinên begtî û terîqetan de cih nedîtine, ya rastî beşên civakê yên li derve hatine hiştin pêk tên. Ango di encama pêşdeçûna kapîtalîzmê de mirovên bêmilk û keda xwe di berdêla heqdestê de dixin bazarê çêdibin û mirov ji vê re dikare bibêje proleterî. Ev proleterî ji kesên nîvcotkar, şirîk, karkerên bi heqdest ên demsalê pêk dihat. Bi gotineke din mirov ji van kesan re dikare bibêje kesên bê xwedî. Her ku diçû hejmara wan zêde dibû. Ev girse li jêr çêdibe û weke kategorî ji van kesan re Kurmanc dihat gotin ango 'Mirovê Kurd'. Her ku çû Kurmanctî û Kurdîtî ket zikhev. Di sedsala 19. û 20. de wexta Kurd dihat gotin bi giştî Kurmanc dihat fêhmkirin.

Li vir a balkêş ew e, ya li cem ezbetên Tirkan qewimiye mîna wê bi derengî be jî li cem eşîrên Kurdan pêk hatiye. Li cem Ereban jî berê bi şêweyê Medenî-Bedewî ango Erebê Bajar û Erebê Çolê pêk hatiye. Tebeqeya jor a Tirk li ser bingehê desthilatdariyê çiqasî ji tebeqeya jêr dûr dikeve û cihê dibe, ewqasî komên Tirkmenan berfireh dibin. Tebeqeyên jor ên Tirkmenan ew piçûk didîtin û ew bi gotina 'Tirkê bêfêhm' mohr dikirin. Lê ya rastî, Tirkîtiya ji rêûresmê li cem Tirkmenan bû. Heman rewş bi derengî be jî di cihêbûn û jihevdûrketina tebeqeyên civaka Kurd de jî derdiket holê. Li vir cudahiya bingehîn a tebeqeyên jor ên Ereb û Tirkan ji yên Kurdan ew e, tebeqeyên Ereb û Tirkan hêmanên serdest ên dewletê bûn, lê yên Kurdan ji beşekî hevkar pêk dihatin. Tebeqeyên jor ên Tirk û Ereb bi awayekî xweser bi Erebtî û Tirkîtiyekê ditamijîn (li cem tebeqeya jor a Tirk a pêk dihat, çandeke kozmopolît a ji çand û zimanê Ereb û Fars pêkhatî), lê tebeqeya jor a Kurd ji bo di desthilatdariyê de cih bigire ji Kurdîtiyê nexasim bi giranî ji Kurdîtiya siyasî û neteweyî qut dibe û bi pirranî bi Kurdîtiyê re xiyanetê dikin. Lewma ji bo ku xulamtiyê ji desthilatdariyê re bikin rêyeke din nîne. Lewma girseya her diçe mezin dibe weke li cem Bedewî û Tirkmenan, girseya Kurmanc e. Diyardeya Kurdîtiyê jî bi awayekî bingehîn dibe xisleta vê girseyê. Ev şêweyê prîmîtîf û destpêkê yê civaka qebîle û terîqetê ber bi civaka neteweyî ve diberide û ji vir û pêve beşê rastî yê civaka Kurd a hemdem pêk bîne ev beş e. Kurmanc weke xwediyê hêza kar a serbest, ji ber ku ji şoreşa pîşesaziyê mehrûm pêk hatin, bi giranî bêkar bûn. Şêweyê nîv-proletertiyê herî zêde di qada cotkariyê de bi hevpartiyê pêk dihat. Piştî vê jî rêncbertiya demsalî dihat. Mîna vê rewşê gelek mînak li cem civakên mêtingeh û nîv-mêtingeh têne dîtin. Ev Kurmanctiya pêşî li gundan pêk hat, paşê wê bajaran tijî bike û wê li keviyên bajaran bi girseyî cih bigire. Herweha girseya bingehîn e ku wê koçberî derve bibe. Ev beş ji aliyê siyasî û çandî ve di valatiyê de bû û PKK bi îddîaya temsîla şaxê civakî yê hemdem derket holê û xweber nîne ku ev girseya bingehîn a PKK'ê ye.

Li cem Kurdan di tebeqeyên jor û jêr de veguherînên hemdem ên diqewimin li gorî xwe xwedî cudahiyan in. Eger mirov ji tebeqeya jor a Kurdan re bûrjûwazî bibêje, ev ê bibe şîroveyeke pirr

bi zorê hatibe kirin. Bûrjûwazî weke çîneke afirîner hêza gavavêtinê ya Ewrûpaya Rojava ye. Bûrjûwaziyê bi xwe re teknîk û çandeke xweserî xwe bi pêş xist. Çanda xwe ya siyasî bir nav desthilatdariyê. Sektorên ekonomîk ên li ser bingehê karê derxistin pêş. Li ser vî hîmî li nava dinyayê hegemonya xwe ava kir. Li cografyayên bi ser wê ve bûrjûwaya pêk hat jî bivênevê teqlîda wê kir. Xisletên bi heman rengî yên tevahiya sîstemên hegemonîk hene. Ya li Rojhilata Navîn qewimî, şêweyekî vê bûyera gerdûnî bû. Lê Rojhilata Navîn a bi hezarê salan ji sîstema navendî ya şaristaniyê re pêşengî kiribû li dijî modernîteya kapîtalîst gelekî li ber xwe da. Rastiya Împaratoriya Osmanî û Îranê ku bûbûn pêlîstoka sîstema hegemonîk, ev bi xwe bû. Li dijî bûrjûwabûnê demeke dirêj li ber xwe dan. Kengî biryara bûrjûwabûnê dan, li şûna bi temamî tine bibin, şêweyê wê yê burokratîk kirin bingehê xwe. Bûrjûwaziya burokratîk bûrjûwazîbûna bi destê dewletê ye. Bi awayekî giştî, xwediyên desthilatdariya ji rêûresmê bi awayekî paşverû bûrjûwaziyê pêk tînin. Ji lewra afirînerî û millîtiya bûrjûwaziyên bi vî rengî bi sînor e, xisleta wan bêhtir komprador e, ango veguhezêner û acentekar in.

Derfet û îmkanên bûrjûwabûneke bi vî rengî ya tebeqeya jor a Kurd hema bêje bi qasî tine be, kêm e. Ji ber ku bi xwe xwediyê çi dewleteke serbixwe yan nîv-serbixwe nîne û bi awayekî dîrokî xwedî rabihuriyeke hevkartî û înkarkeriyê ye, bûrjûwabûna Kurd qaşo bûrjûwabûn e. Ne hêzeke wî heye ji bo bazara millî şer bike, ne jî ji bo vê çandeke wî ya siyasî mewzûbehs e. Berevajî, bi tenê dema ji şerê xwe yê bazarê û çanda wê ya millî geriya, pirr kêm be jî derfet û îmkanên jiyanê didanê. Ji lewra tevahiya sedsala 19. û 20. ji bilî dengên ferdî, em retorîkeke bûrjûwa Kurd nabînin. Berevajî bi helwesteke ji qral bêhtir qralparêz (jixwe di dîrokê de mînakên bi vî rengî gelek in) çiqasî di tesfiyeya Kurd de cih digirtin ewqasî kara xwe zêde dikirin. Li gorî vê meyla bûye mîna pîvanekê, ne ku ji bo netewetiyê, berevajî di înkarkirina neteweyî de li ber hev didan. Kokên wan ên dîrokî jî li gorî vê meylê bûn. Ji bilî hin hêmanên ferdî, pêkan nîne, mirov tebeqeyeke jor a Kurd weke bûrjûwa afirîner an burokratîk bîne ziman. Jixwe hê zehmettir e ku mirov karibe behsa çanda çîna bûrjûwayê bike.

Me beşek ji xisletên bûrjûwaziya Tirkê Spî ya di sedsala 20. de xwe weke Cemiyeta Îttîhad û Teraqî û Komara Tirkiyê bi rêxistin kir, rave kiribû. Bi rastî, di bin van şablonan de bûrjûwaziyeke aliyê wê yê burokratîk xurt heye. Ji sedî sed ev bûrjûwabûyînek e ku xwe sipartiye desthilatdariyê. Herweha xwe nesipartana hêzeke hegemonîk a derve nikarîbû pêk bê. Li hundir jî Xiristiyan, Ermenî û Rûmên zû bûn bûrjûwa çiqasî tesfiye bikirana wê ewqasî xwe bi pêş bixista. Ya herî rast ew e, mirov tesfiye û qirkirina Ermenî û Rûman li ser vî bingehê rastiya çînî û hegemonîk analîz bike. Bi awayekî bingehîn hêza hegemonîk a bûrjûwaziya Tirkê Spî sermayedarên Cihû û hêmanên wan ên çandî ne. Ya rastî, ew hem ji aliyê maddî ve, hem jî ji aliyê îdeolojîk ve di pozîsyoneke hegemonîk de bûn. Herweha bi sedsalan bû ku bûrjûwayên Ermenî û Rûm li pêşiya wan asteng bûn. Li gorî qanûna kara herî zêde diviyabû ji van astengan rizgar bibin. Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ev firsend da wan. Tirkên li

mişarên xwe gihandibûn û hindikayiyên Misilman tevî hêmanên ne millî bi pêşengiya xwe bi hostetî gihandin hev. Ji herdu şeran jî weke hêza serdest derketin. Herweha li nava dinyayê rewşa wan a bi hêz di nava hegemonya Ingilîz de ew bi temamî bi şens dikirin. Li ser bingehê lihevkirina bi Ingilîzan re îlana Komarê firsendeke bêhemta dida van beş û derdoran. Komara nû, hem ji aliyê cografîk ve, hem jî ji aliyê şêniyan ve, ji bo kara herî zêde ya kapîtalîst potansiyeleke mezin dida. Ermenî û Rûm hatibûn tesfiyekirin, Çerkezên serhişkî kiribûn li derveyî sîstemê hiştibûn. Ji Misilmanên Balkanan û yên bi koka xwe Qefqasî kodroyên burokrat ên îdeal ên Komarê hatibûn amadekirin. Ereb jî li derve hatibûn hiştin. Bi tenê çavkaniyeke muhtemel a tehlûkeyê mabû, ew jî Kurd bûn.

Tebeqeya jor a Kurd herçiqasî ji mêj ve bûbû hevkar jî eger bixwesta pareke zêde ji desthilatdariyê bigire û statuya xwe ya berê bi dest bixe, dibe bi tehlûke bibûya. Herweha girseyeke gel a potansiyel a her kêlî karîbû serê xwe rake çêbûbû. Em wer fêhm dikin ku di qirkirina Kurdan a 1925’an de ku Ingilîzan senarîstiya wê kir, ev rastiyên bingehîn diyarker bûne. Ji bo kara herî zêde ya li Anatolyayê were misogerkirin, mîna qirkirina Ermenî, Rûm û Suryaniyan, diviyabû Kurd jî ji kokê ve bêne qelandin. Ingilîzan weke hêza hegemonîk tevî kadro û sermeyedarên Siyonîst li ser vê mijarê bi hêmanên bûrjûwaya burokratîk a Tirk re li ser bingehê hevgirtineke pirr bi dizî û komplowarî li hev kiribûn. Ji bo serwextbûna li diyardeya Tirkê Spî ev lihevkirin gelekî girîng e, û bi rola kilîtê radibe. Berxwedana bi pêşengiya Şêx Seîd a hate provokekirin û bi awayekî bêrehm hat pelixandin û paşê ji hegemonya Ingilîzan re hiştina Mûsil-Kerkûkê encamên pêşî yê vê hevgirtinê bûn. Dîsa di çarçoveya vê hevgirtinê de sosyalîst û ummetgirên Îslamî bi dijwarî hatin tesfiyekirin. Seltenet û xîlafet ji holê rakirin. Dîrok ji 1920’an dan destpêkirin, çandeke îdeolojîk û siyasî ya ecêb a ku mirov dikare jêre bibêje xwedatiyeke nû, pêk anîn ya ku ti têkiliya xwe bi çanda Tirk û Îslamê bi xwe re tine, ti têkiliya wê bi çanda Ewrûpaya Rohnîbûnê re tine ya ku gelekî dilê xwe dibijandinê. Bi vê çand û îdeolojiya hişk armanca wan afirandina civakeke homojen bû. Ji sedî sed sertewandin ferz dikirin. Çawa ku me qal kiribû, piç û kirtikên demokrasiyê hatibûn tesfiyekirin. Ji lewra bi giştî xisletên Kurdîtiyê hemû, bi taybetî jî tebeqeya jor a Kurd wê di nava vê hedefa civaka homojen û hişk de bi dilê xwe biheliyana yan wê bi zorê bihatana helandin an jî bihatana tinekirin. Kengî behsa tinekirinê bû, yekser serîrakirin ketin rojevê. Bi vê bahaneyê jî xwe li tesfiyeya fizîkî rakişandin. Li gorî felsefeya pozitîvîst ji vê bawer kiribûn û bi heman biryardariyê pêk anîn. Naxwe weke îddîa dikin, di wê demê de berxwedaneke Kurd a bi rêxistinkirî û bi serwextî hatibe kirin û bibe tehlûke tineye. Lê belê potansiyeleke xurt a berxwedanê çêdibû. Lewma diviyabû serîrakirinê bikin bahane yan jî bi komployan vê potansiyelê tine bikin, ji holê rakin. Ya kirin jî ev bi xwe bû.

Hêmanên bûrjûwaya burokratîk a Tirk di pêkanîna vê tesfiyeyê de bi roleke girîng rabûn û ji bo para xwe ya karê zêde bikin jî di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de ji dewlemend û sermayedarên Cihûyan bi temamî mîna ya li Emanya nebe jî bi awayekî weke wê bi navê Baca

Hebûnê xûkî stendin. Sermayedarên Cihû yên di çêbûna bûrjûwaya Elman de 'pîriktî' kiribûn li Elmanya Hîtler ji aliyê bûrjûwaya Elman hatin tesfiyekirin û sermayeya wan hat desteserkirin, dema Hîtler bi hêz bû, bûrjûwaziya burokrat a ciwanên Tirk hinekî bi sînor be jî heman tişt li hemberî sermayeya Cihû kir. Sermayeya Cihû di çêbûna bûrjûwaziya Tirk de jî 'pîriktî' kiribû. Cihûyên ji sermayeya wan gelekî hat xwarin an bi tiştekî pirr kêm razî bûn an jî pirraniya wan bi koçberiya bi lez dibû, Anatolya terikandin. Bûrjûwaziya burokratîk a Tirk ev tevgera tesfiyeyê li dijî tebeqeya jor a Tirk a li derveyî xwe jî meşand. Nexasim nehiştin xwediyên erdan û erbabên bazirgan-esnaf çavên xwe vekin. Jixwe Kurd ê weke nijad timî li hedefê bûya. Darbeyên piştî salên 1950'î, pêvajoya komplo û şerên hundir dewamkirina vê rêûresmê bi awayekî bêhtir xurtbûyî nîşan dide. Piştî salên 1980'î li dijî Kurdan komplo, îmha, êşkence, gundvalakirin û qedexekirina Kurdî derxistin asta herî jor û ev dîsa kirinên berfireh ên heman hêza hegemonîk in ku ji aliyê rêxistina Gladîo ya NATO'yê ve palpiştiya wê tê kirin. Ango rêûresmeke sed salan a pêkanînan bi awayekî berfirehtir û lezeke mezinkirî tê meşandin û ji vê pêve jî ne tiştekî din e.

Bi vî awayî em dikarin bibêjin, rastiya civakî ya Kurd li Komara Tirkiyê rastiyek e ku bi dijwarî tê tesfiyekirin. Rastiya Kurd di rewşeke nakok de ye. Ji bo hebûna xwe divê ji ya xwe neyê xwarê û ji bo vê jî divê li ber xwe bide, plana tesfiyeyê ya bi armanca afirandina civakeke homojen jî ji bo pêk bê divê tine bike. Ji lewra rastiya civakî ya Kurd rastiya civakî ya ji rêzê nîne. Tebeqeya wê ya jor bi awayekî dîrokî ji aliyê çandî û siyasî ve ji rastiya civakî ya Kurd qut bûye, pekiyaye rewşeke hevkar û xiyanetkar, girseya bingehîn û sereke ya mayî jî bi awayekî bêîdeolojî û bêpêşeng ketiye ber çerxa asîmîlasyonê. Eger ev têrê neke, bi çi bahaneyê bibe bila bibe wê eciqandina serê wan bikeve rojevê. Armanca vê yekê ew e, bi temamî dev ji Kurdîtiya kolektîf berdin, bikevin rewşekê ku ti îdîaya wan nemîne, ji Kurdîtiya xwe fedî bikin, dema nêzî wê jî bibin wê bela mezin bînin serê xwe, bêkar û bêqîmet bibin, ew jî eger hê tiştek mabe. Belkî jî li vê dinya me ya hemdem, mînakeke duyemîn a realîteyeke civakî bi vî rengî tinebe. Aliyê xeternaktir ê vê meseleyê ew e, pirr kêm kes bîra vî aliyê meseleyê dibin yan jî ti kes bîr nabe. Li naverastê ne bûrjûwaziyeke Kurd a bi çand û bîrbir heye (jixwe ji bo vê kesî niyet jî nekir), ne jî proleteriyeke hemdem an jî bûrjûwaziya piçûk heye. Di rewşeke bi vî rengî de divê mirov behsa çînên ferazî yan jî siha wan bike. Hinekî jî li dijî vê rastiya kirine ferazî divê mirov welatparêzî, netewebûyîn û civakbûyîna Kurd ava bike, bêguman di çarçoveya van analîzan de baştir tê fêhmkirin ka ev karekî çiqasî zor e.

Zemînê Tevgerê, nexasim zemînê Tevgera PKK'ê xwest xwe bisipêriyê ew zemîn bû, hebûna Kurd ji xwebûnê derketibû, bi xeyalî be jî cesareta ku bi xwe bîr bibe nemabû, mirovê Kurd biketa pozîsyona berxwedanê ew hezar carî poşman dikirin, îddeaya dayikniştiman, neteweyetî û civakbûna xwe bi xwe yan nemabû yan jî ji mêj ve hatibû terikandin. Paşê wê baştir bê fêhmkirin ku li ser vî zemînî tevgera berxwedan û rizgariyê ya bi îdeolojiya hebûn û azadiyê gelekî zehmet bû.

Ji serê salên 2000'î ve di sîstema hegemonîk a Tirkê Spî de veguherînek heye. Herçiqasî rabihuriya wê biçe salên 1970'î jî destguhertina desthilatdariya hegemonîk di van salan de dest pê dike. Ev bûyer girêdana xwe bi desthilatdariya hegemonîk a dinyayê re heye û bi awayekî bingehîn teoriya 'Kembera Kesk' a DYE'yê li Komara Tirkiyê xwe nîşan dide. Guhertin di meseleyê bi xwe de nîne di şikil û şibûtê wê de ye. Çawa ku tê zanîn, teoriya 'Kembera Kesk' li Rojhilata Navîn bi sîstema hegemonîk re têkildar e. Sîstema hegemonîk a kapîtalîst nexasim sîstema hegemonîk a dused salan bi pêşengiya Ingilîstan û DYE'yê hat avakirin biparêze, pêşde bibe û di îhtîmala guhertina wê de ji bo neşikê û ji dest neçe bi pirsgirêkan re mijûl dibe û hewl dide ji van pirsgirêkan re çareyan bibîne. Heta bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn û bi rejîma Hîtler re heta bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn îdeayeke Elmanan a hegemonîk ji bo Rojhilata Navîn hebû. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn Yekîtiya Sovyetê ber bi mezinbûnê ve gav avêtin û piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn li ser Rojhilata Navîn ket nava reqabetê û di nava wan de rê li ber 'Şerê Sar' vekir. Projeya 'Kembera Kesk' bi awayekî bingehîn armanca wê şikandina hegemonya Rûsya Sovyetê li herêmê bû. Piştî ku li Afganistanê Rûsya Sovyetê têk bir, bi ser ket. Şoreşa Îranê herçiqasî di teoriya 'Kembera Kesk' de rê li ber aloziyê vekir jî bi xwe tiştek neguhert. Bêhtir aliyê wê yê veguherîna demokratîk a gelan dişikîne, dewam kirin.

Senteza Tirk-Îslamê ya bi darbeya 12'ê Îlonê li Komara Tirkiyê kirin îdeolojiya fermî, ya rastî gavavêtineke bi patenta DYE û Ingilîstanê bû. Şoreşa Îranê ya wê demê û dagirkeriya Yekîtiya Sovyetê li Afganistanê (1979-1980), sîstema hegemonîk a bi giranî ji DYE û Ingilîstanê pêk hatî li hemberî van bûyeran neçar kir ku bi rêya Komara Tirkiyê tevdîran bigire. Di encama vê tevdîrê de têkoşîna şoreşger a Tirkiyê bi awayekî bêrehm tepisandin, li Kurdistanê polîtîkayên qirkirinê hûrûkûr meşandin û Komara Tirkiyê li Rojhilata Navîn kirin jendermeyekî pê ewle û jê piştrast. Rejîma dewleta Tirkiyê di vê çarçoveyê de bi temamî bûbû Gladîo. Ya rastî, ya pêkhatibû ew bû; artêşa NATO'yê ya bi dizî Gladîo bi awayekî berfireh hatibû bikaranîn. Ev amûrên Gladîo yên cara pêşî li Tirkiyê ketin nava tevgerê şerê îro li Iraq û Afganistanê dimeşînin. Civîna Bilind a dawî ya NATO'yê ji bo vê konsepta şer weke stratejiya nû ya fermî ya NATO'yê îlan bike (Civîna Bilind a Lîzbonê ya di dawiya 2010'an de), xwe amade dike.

Faşîzma Tirk a Spî, derfet û îmkanên Gladîoyê danê bi salên 1985'an re hewl da Kurdan tevî şûnûşopên wan hemûyan ji nava rûpelên dîrokê bibe. Di vê nuqteyê de nakokiyek di navbera wan de peyda bû. Mîna nakokiya Mûsil-Kerkûkê ya di sala 1923'an de, bi heman awayî Faşîzma Tirk a Spî ya xwest Başûrê Kurdistanê jî bixe kontrola xwe, mîna di dema derketina xwe ya holê de dîsa li hemberî xwe Ingilîstan û hevparê wê yê stratejîk DYE dît. Nakokiyên berê ji nû ve geş bûn. Faşîzmê wisa dida nîşan ku bi tenê tesfiyekirina PKK'ê ji xwe re kiriye armanc. Lê di rastiyê de bi awayekî berbiçav bi tevahî Kurd kiribûn armanc û hedefa xwe. Ji lewra bi hêzên pêwendîdar re nakokî bêhtir zêde bûn. Rejîmên Îran, Iraq û Sûrî jî tevlî pêvajoyê bûn. Herweha hatibû fêhmkirin ku PKK weke tevgerên berxwedanê yên pêvajoyên 1925-1940'î bi hêsanî

tesfiye nabe. Vê rewşê kir ku hegemonya faşîst a Tirk a heştê salî (1925-2002) bi awayekî ciddî biheje û hilweşe. Bûrjûwaziya burokratîk a Tirkê Spî (gelek derb cara pêşî li hevparên xwe yên Siyonîst dabûn û beşekî wan ê girîng li derve hiştibû) ji aliyê civakî ve bi temamî ji hevrikên xwe rizgar bûbû û wexta hê nû hegemonya xwe ava kiribû (Di şerê Gladîoya Tirk bi PKK'ê re tevahiya kanalên sîstemê xistin kontrola xwe) bi awayekî ne li bendê bû, hegemonya DYE-Ingilîstanê derketin pêşiya wê.

Rejîma Gladîo ya Tirk (bi taybetî dema Dogan Gureş, Tansu Çiller, Silêman Demîrel, Erdal Înonî û Mehmed Agar) bi erkên bê sînor hatibû gurçûpêç kirin û DYE, Ingilîstan û hevgirtiyên din ên Rojavayî ev bi temamî erê kiribûn. Ji ber hebûna PKK'ê ya li Başûrê Kurdistanê nakokî çêdibû. Bi vê armancê, heta bi dawiya dema 1984-1999'an ango ji Pêngava 15'ê Tebaxê heta bi kompoloya ku A. Ocalan di 15'ê Sibata 1999'an de pê êsîr hat girtin, her cure çalakiyên kontrgerîlla bi hev re pêk anîn. Hêzên hevkar ên Başûrê Kurdistanê jî bi temamî destek dan vê yekê. Lê belê Faşîzma Tirk a Spî ji vê zêdetir dixwest, wê tesfiyekirina tevahiya Kurdan plan dikir. Sîstema Rojava di vê nuqteyê de sekinî. Rejîma Faşîst a Tirkê Spî ya navenda wê Enqere kengî xwe bi tenê dît matmayî ma. Eger zêdetir lingê xwe dirêj bikira, pêkan bû ku weke Hîtler bihata dadgehkirin. Dema ku ev nakokî mezin dibû, operasyonên DYE û hevgirtiyên wê li Aftanistanê ketin rojevê. Bi vê rewşê re, têkiliyên stratejîk ên Gladîoya Tirk bi îstîxbaratên eskerî yên rejîma Saddam Husên û Pakistanê re derketin holê. Bi awayekî nedihat payîn Gladîoya NATO û Gladîoya Tirk (di vê demê de bi navê Ergenekonê tam millî bûbû) hatin beramberî hevdu. 'Bûyera çewal' a li Silêmaniyê qewimî, nîşaneyeke sembolîk a vî şerî bû. Di encama vê bûyerê de ku haya DYE û Ingilîstanê jê hebû, ji bûrjûwaziya Tirk a Spî ya ji rêûresmê desteka xwe kişandin û li gorî teoriya 'Kembera Kesk' a berê xwedî kiribûn bi operasyonên li pey hev weke bûrjûwaya Tirk-Kurd a Kesk derxistin pêş û kirin hêzeke hegemonîk. Nîşaneyên herî girîng ê vê yekê, tevî 'bûyera çewal' a li Silêmaniyê, bombekirina Sînegogekê û bankeya global a Ingilîz HSBC'ê, ji nû ve çalakkirina Talîbanan û bi hêzkirina muxalefeta Iraqê bûn. Herçiqasî şer weke di navbera DYE û El Qaîdeyê de xuya bike jî bi awayekî rastî êdî di navbera Gladîoya Tirk û DYE'yê de ye.

Di encamê de hevgirtina hegemonîk a hêzên hevkar ên nû yên AKP'ê, Emerîkaya bi kirasê sivîl, Ingilîstan û hevparên din ên Rojavayî derket pêş. Gladîoya Tirk a bi temamî millî bû yan jî bi tenê hat hiştin, di nava artêşê de çar caran xwe li darbeyê rakişand, lê bi ser neket. Mîtîngên Komarê, hevgirtina 'Sêva Sor' a CHP û MHP'ê, di qada siyasî û civaka sivîl de nîşaneyên vê yekê bûn. Hevgirtina em behsa wê dikin ji Rûsya, Çîn û Elmanyayê desteka dipa negirtibû. Ji têkiliyên bi Sûrî û Îranê re zêde piştrast nebûn û lewma asê man. Di vê navberê de pêkhatina siyasî ya Kurd a li Iraqê gelekî pêşde çûbû. Gavên qaşo serketî yên AKP'ê di vê rewşê de hatibûn avêtin. Ev bûyerên qewimîn hemû weke serketina hilbijartinê ya AKP'ê bê şîrovekirin û weke hunerê R. Tayyîp Erdogan bê nîşandan, ev ê bi tenê lîstikeke propagandayê be. Hêzên rastî yên şer gelekî

bi dizî û bi awayekî berfireh tevdigeriyan. Mîna salên 1920'an, li ser Anatolya û Mezopotamyayê şerekî mezin ê hegemonîk dihat meşandin.

Ya herî tîpîk pozîsyona sermayeya Cihû di vî şerê hegemonîk de ye. Di şerê hegemonîk ê heştê salî yê bûrjûwaziya Tirkê Spî de hevgirtiyê bingehîn sermayeya Cihû ya milliyetgir Siyonîst bû. Vê hevgirtina stratejîk pêvajoya avakirina Îsraîlê ferz dikir. Hêza Îsraîlê ya roja me ya îro tê zanîn. Bi qasî berê hewcedariya xwe bi bûrjûwaziya Tirkê Spî tineye. Berevajiyê vê di cih de ye. Ji lewra mirov karîbû bipa ku têkiliya di navbera wan de biheje. Lê ev rewş nedihat wê maneyê ku wê di pêkhatinên nava Komara Tirkiyê û avakirina hêza nû ya hegemonîk de sermayeya Cihûyê bêbandor bimana. Kesên ne li gorî sermayeya milliyetgir a Siyonîst, bêhtir globalîst û nexasim di warê fînansê de bi bandor bi awayî çalak ketin dewrê. Van beş û derdoran Tirkiye xerqî 'pereyên germ' kirin. Beşê bi awayekî bingehîn AKP'ê fînanse dike ev e. Ev beşa ku em dikarin wê weke sermayeya Cihû ya gerdûnî û global û îdeolijya wê (Evangelîzm) bi nav bikin, bi hêsanî li şûna sermaye Siyonîst û îdeolojiya wê hat bicihkirin. Jixwe di navbera herdu beşên van îdeolojî û sermayeyan de bendên Çînê yên ba di ber wan re naçe tinebûn. Kurtûkurmancî serdema Komara Tirkiyê ya Îslama Nerm a ku bûrjûwaziya nû ya Tirkê Kesk a navenda wê Konya-Kayserî bi hêzên hundir û derve re ava kir (ya pêşî îdeolojîk, ya duyemîn bi giranî sermaye) dest pê dikir.

Dema em dibêjin, ji salên pêşî yên avakirina Komarê heta bi serê salên 2000'î beşê ji sermaye û îdeolojiya hegemonîk berpirsiyar, bi wê mezinbûyî û pê bi hêzbûyî Tirkê Spî ye, mebesta me bi vê bi tenê orîjîna Tirk nîne. Di nava vê de îdeolojî û sermayeya hegemonîk a derve pareke xwe ya pêşeng a diyarker heye. Xulase, mirov bi giştî hêza lihevkirinê ya dîplomatîk û hêza îdeolojîk û sermayeya hegemonîk a Ewrûpayê û bi taybetî jî ya Ingilîstanê nebîne nikare li Komara Tirkiyê serwext bibe û jê fêhm bike. Eger mirov îddîa bike ku lê serwext bûye û jê fêhm kiriye, mînak bibêje Komar bi sermayeya millî ya serbixwe û bi îdeolojiya millî ya xwe ava bûye, wê xwe bixapîne û mehkûmê şaşiyê bike. Mirov vê tespîta giştî dikare ji bo hegemonya bûrjûwaziya Tirkê Kesk a hewl dide li şûna bûrjûwaziya Tirkê Spî bi cih bikin bêhtir bîne ziman. Ji ber ku di salên destpêkê yên Komarê de bi hêza ji Şerê Rizgariyê tê girtin, ruhekî xurt ê serxwebûnê heye û li hundir derfetên tevgerên azad bêhtir in. Herweha hêzên hegemonîk ên kapîtalîst di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de gelekî ji taqet ketibûn. Ingilîstan di nava xwe de bi zor û zehmetî li ser piyan disekinî. Şoreş ji bo tevahiya dewletên Ewrûpayê weke tehlûkeyeke nêz bû. Ji vê jî girîngtir, bûrjûwaziya Tirkê Spî hem bi awayekî pratîkî hem jî bi awayekî objektîv ji Rûsya Sovyetê destek didît. Lê îdeolojî û sermayeya kesk di rewşeke bi vî rengî ya konjonkturel de nîne. Daneheva wê ya heyî di bin kontroleke zêde ya sermayeya burokratîk yekdestdar a navend Stenbol û Enqereyê de ye. Herçiqasî xwe sipartibe îdeolojiya Îslamê ya ji rêûresmê (Îslama desthilatdar) û navendên sermayeya navneteweyî ya Îslamî tê hesibandin jî ev derfet û îmkan ji bo avakirina hegemonyayê bi sînor in. Lewma bivênevê gelekî hewcedarê sîstema hegemonîk a cîhana kapîtalîst e. Mirov li AKP'ê binêre bi hêsanî dikare vê hewcedariyê bibîne.

AKP'ê li derve bi sermayeya global re têkiliyên xwe germ û xweş pêşde birin, li hundir jî bi giştî rojeva demokratîkbûnê bi taybetî çareseriya pirsgirêka Kurd timî di rojevê de dihêle, li şûna çareserkirinê dikeve pozîsyonekê ku mîna wê çareser bike tevdigere û li dijî navendên hegemonîk ango hinekî artêş, dadgerî, CHP, MHP û rêxistinên çepgir ên bi wan ve girêdayî, vê rewşa asêmayî ya nehatiye çareserkirin dike amûrê propagandayê û bi vî awayî mezinbûna xwe dewam kir. Çawa ku di salên pêşî yên Komarê de ji bo avakirina hegemonîk hêza motor a derve Ingilîstan û nexasim DYE bû, di avakirina desthilatdariya nû ya hegemonîk de jî dîsa heman hêz li ser kar in.

Di vê çarçoveyê de desteke kapîtala fînansê ya globalîzmê jî diyarker bû. Di qada îdeolojîk de jî li şûna Tirkê Spî yê ji milliyetgiriya Siyonîst zêdebûyî, nêzîkatiyên dînî yên hêmanên Cihûtiya gerdûnî yên Evangelîst, Kabalîst û Karaîmî bi roleke bi tesîr rabûne. Ev mezinbûna hegemonîk a em dikarin weke Îslamî yan jî Tirkê Kesk bikin têgîn, dewam dike. Di warê bikaranîna stratejî û taktîkên xwe disipêre wan de gelekî bûye hoste. Kiriye armanc ku di sedsaliya Komarê de avabûna xwe ya hegemonîk temam bike.

Ji bo Kurdan girîng e ku li ser vê hegemonya nû rawest in. Ev hegemonya di mijara pirsgirêka Kurd de li aliyekî bi ser sermaye û desthilatdariya yekdestdar û burokratîk a Tirkê Spî (her tim di zikhev de bûn) ya di qirkirina Kurdan de gelekî pêşde çûyî de diçe, li aliyê din, tevî rêbazên di qonaxa damezrandina hegemonya xwe de bi rêbazên pêşketîtir xwe bêhtir bi hêz dike û bi awayekî hewce bi rêbazên berê nehêle, dimeşe. Ji bo vê, hêza xwe ya rastî ji amûrên sermaye û îdeolojiya derve (saziyên think-tank) digire, û ji bo desteka artêşê jî bigire hoste ye ku Îslamê bi kar bîne. Li şûna argumanên faşîst ên Tirkê Spî yê ti rewabûna xwe nameye, weke îdeolojiya rewaker 'biratiya dîn' û 'bihevrebûna dîrokî' (ji dil na, bi şêwazekî demagojîk) bi kar tîne. Têkçûna milliyetgiriya nijadperest û neteweperestiya înkarker bi kar tîne û hewl dide artêşê û saziyên din ên burokratîk îqna bike ku bi tenê bi rêya bikaranîna Îslamê, ne tevahiya Kurdan be jî beşekî girîng dikare di bin kontrola xwe de bigire. Xulase, bandora dînê ji rêûresmê li ser Kurdan, di nava hesabên hegemonîk ên sermayeya kesk de cihekî girîng digire. Di vê mijarê de terîqetên ji rêûresmê, Kursên Quranê, Lîseyên Îmam Xetîban û amûrên weke wan ên îdeolojîk dixin dewreyê yên ku nû vekirine û wê bêhtir vekin. Di serî de Neqşîbendîtî û Qadirîtî, çawa di dîrokê de bûye, beşê wan ê jor ku timî ji desthilatdariyê xwarine, û di dema dawî de pêşengên terîqetan ên bi xwe bûne holdîng weke karteke girîng bi kar tînin. Hinek ji wan bi rola hêzên lêdanê radibin mîna bazkên Hîzbûllahê. Hegemonya sermayeya kesk ji bikaranîna dîn berjewendiyeke mezin dipê.

Beşekî din ê girîng ku difikirin bi kar bînin, bûrjûwaziya Kurd a lihevçêkirî ye. Li şûna feodalên hevkar ên ji rêûresmê, hevkarên hemdem ên bûrjûwaya Kurd çêdikin. Pêkhatina siyasî ya li Kurdistana Iraqê bi vê armancê gelekî tê bikaranîn. Li gelemperiya Kurdistanê ji bo tevahiya

komên sermayeyê karibin sermayeya ekonomîk razînin, şensê pêşengiyê didinê. Mîna rola Dubaî li Erebistanê dilîze diwazin wê rolê li Kurdistanê bi Hewlêrê bidin lîstin. Silêmanî û Amedê jî weke gava duyemîn difikirin. Li ser vî bingehî rêxistinên civaka sivîl û partiyên siyasî têne avakirin. Mîna ku di doza Kurd de can, mal û hêza aqil dane, cureyekî Kurdîtiyê yê qelp di vê projeyê de weke perdeyeke sexte tê bikaranîn. Sermayeya global a li pişt vê pêkhatinê, mîna li Tirkiyê di vê de jî bi roleke diyarker radibe.

Hem sermayeya global hem jî sermayeya Tirk eleqeyeke zêde nîşanî pêkhatina sermayeyeke bûrjûwa Kurd didin, mîna dûvikê xwe, maketa xwe pêkhatineke civakî ava dikin. Bi vê armanca wan ew e, hêzên civakî û neteweyî yên li Kurdistanê bi can, mal û zêhniyeta xwe berdêlên giran dane, tevgera wan a demokratîk û şoreşger parçe û bê tesîr bikin. Yeqîn dikin ku di vê de çiqasî bi ser bikevin, bi qasî berjewendiyên xwe yên ji rêûresmê, wê ewqasî karibin derfetên nû yên sermaye û kurtêlên derdikevin holê biparêzin û pêşde bibin. Berjewendiyên xwe yên berê ku li ser bingehê înkarkirina Kurdîtiyê bi dest dixistin û diparastin, vê carê jî bi Kurdîtiyeke sexte (jixwe di berdêla wê de ti fedekarî nekirine, yên bi can û malê xwe fedekarî kirine jî wê bi awayekî bêperwa bi alîgiriya şîddetê gunehbar bikin) hem dixwazin dewam bikin hem jî mezin bikin. Hevkarên Kurd di vê mijarê de bi awayekî dîrokî xwedî tecrûbe ne, û dizanin sura ba ji kîjan alî ve tê û hoste ne ku li gorî wê bibin xwedî pozîsyon. Federalîzma dewletê û dewletoka netewe ya Kurd a navend Hewlêr ku dixin nava guftûgoyên rojane, ji nêz ve têkiliya xwe bi sermayeya global re heye. Dewletokên netewe yên Ereb û Tirk çawa bin, dixwazin bi awayekî versiyona wan a Kurd pêk bînin. Bi vî awayî li dijî projeya Kurdistana Xweser a Demokratîk a bi perspektîfa modernîteya demokratîk roj bi roj pêş dikeve alternatîfekê pêşkêş dikin.

Hewl didin bûrjûwaya millî enjekteyî rastiya civaka Kurd bikin, ev yek ji dînamîkên hundir mehrûm e; ji derve û bi awayekî lihevçêkirî tê ferzkirin. Hêzên qirkirin meşandin, dema gelekî tengav dibin, bi hêsayî dikarin Kurdekî hevkar, rewşenbîrê sexte yê Kurd û sektoreke bûrjûwa biafirîne. Çawa ku Alayên Hemîdiye û cerdevaniya gundan mumkîn e, di berdêla kurtêlan de bi van rewşenbîrên sexte û tebeqeya bûrjûwayê dewam bikin. Bi awayekî dixwazin bi ‘cerdevaniya gundan’ û îtîrafkariya entelektuel di qada modern a civakî û siyasî de temam bikin. Ji ber ku dînamîkên hundir ên rastiya civakî ya Kurd bi giranî şikiyane, ev hêmanên sexte û lihevçêkirî dibin xwedî cesaret û diwêrin gav biavêjin. Lewma divê bi nêzîkatiyên hosteyane û baldarî maskeyên van kesan ji rûyê wan bêne kirin û rûyê wan ê rastî bê nîşandan.

Hesabên hegemonya nû bi tenê bi Îslamiya ji rêûresmê û hêmanên lihevçêkirî bi sînor nîne. Ev hegemonya hemû rêbazên Faşîzma Tirk a Spî jî di dewreyê de digire. Hegemoniyadariya ekonomîk, civakî, siyasî û çandî, rêbazên heta digihîjin asîmîlasyon û qirkirinê, bi tenê bi mafên ferdî û mirovî ser wan şapinêz dike û dewam dike. Her kes baş dizane ku mafê kolektîf nebin mafên ferdî nabin û bibin jî ti maneya xwe nînin. Welatê Kurdan, netewe û nasnameya wan a

civakî nayê naskirin. Gotinên 'tek ziman', 'tek welat', 'tek netewe', 'tek civak' û 'tek al' weke berê dewam dikin. Tevî ku ti mafê Kurdan ê destûrî û qanûnî tineye, xwestina vê yekê jî sûc û guneh tê hesibandin. Diyarkirina mafê ekonomîk, mafê perwerde û tenduristiyê, mafê xwe bi netewe û nasnameya civakî ya dixwaze, di asta îfadeyê de jî sûc e. Jixwe em behsa mafên siyasî nakin. Hegemonya nû bi tenê bi awayekî hişk bi desteserkirina van mafan namîne; di bin navê 'têkoşîna li dijî terorê' de bi artêşên xwe yên eskerî, siyasî, civakî, ekonomîk, çandî, psîkolojîk û dîplomatîk ên hejmara wan gihiştiye mîlyonan bi heft bedenan dor li hebûna Kurdan û îradeya wan a jiyana azad girtiye; bi tevahî derfet û îmkanên dewletê û hevgirtiyên wê seferber kirine û vê jî weke wezîfeyeke xwe ya bingehîn dihesibîne. Rêûresma bûrjûwa burokratîk a CHP'ê ya ji Îttîhad û Teraqiyê tê, tevahiya sedsala 20. li dijî hebûnên çandî, demokrasî û sosyalîzmê asîmîlasyon û qirkirin meşand û hewl didin vê di sedsala 21. de bi cîlayeke cuda bi AKP'ê temam bikin.

Di rastiya civakî ya Kurd de van pêkhatinên civakî yên hemdem ên di asta tebeqeya jor de li gorî kokên xwe yên dîrokî bi aliyên xwe yên neyênî yên hişk û jixwedûrketî, li bûyerên hemdem ên di asta tebeqeya jêr de jî bi neyênî tesîr kirine. Ji ber ku tebeqeyên modern ên ku divê çanda neteweyî û civakî bi kêmanî temsîl bikin (ji bilî îstîsnayên ferdî) çênebûn û yên çêbûne jî xerîb ketine û weke dûvikê neteweyên serdest bûne heyî û mîna gotina pêşiyan 'masî ji serî ve genî dibe' zirar û ziyaneke mezin dane tebeqeyên Kurmanc û karkeran. Rastiyeke civakî ya têra xwe bi birîn û kurmîbûyî... Ev rastî çiqasî nû û hemdem be, birîn û kurmîbûn jî ewqasî berfireh û kûr e. Bihêlin ji xwe re qadeke civakî û çînî biafirîne, bi awayekî xweber nikare bibe rastiyeke çînî û civakî. Ji bo xweber pêk bê, ji hewldan û taqeta pêdivî pê heye, mehrûm hatiye kirin. Bihêlin çandeke civakî û çînî pêşde bibe, ji ya rêûresmê jî mehrûm bûye. Rastiya civakî ya Kurd li tebeqeyên jêr bi awayekî marjînal dewam dike. Nikare xwe di nava neteweya serdest û hêzên civakê de bihelîne û ji wê hêzê mehrûm e, mîna meytekî û parçeyên termekî li naverastê ye. Ji ber ku ji bo helandina di nava çandên serdest de jî hêz û jêhatibûn divê. Dema ev jî nebe, ya dimîne hêmanên marjînal ên Kurdîtiyê ne. Kurdîtiya eşîrî, dîndarî û Kurmancî nikare ji marjînalbûnê bibihure û nikare bibe tebeqeyeke çînî û civakî ya hemdem.

Ev rewş hemû bi awayekî giştî bi tenê encama mêtinkarî û zordestiya rastiyên civak û neteweya serwer a bi destê modernîteya kapîtalîst tê rêvebirin nîne. Jixwe em dûrûdirêj li ser modernîteya kapîtalîst sekinîbûn. Ev mêtinkarî û zordestî têkildarî polîtîkayên qirkirina çandî ye ku bi armanca Kurdan ji rastiya neteweyî, welatî, civakî, ekonomîk û çandî bike, tê kirin. Rastiya civakî ya Kurd bi kirinên wisa yên qedandinê re rûbirû ye ku mînakên wê li dinyayê kêm têne dîtin. Xwezaya van kirinan hemû neyê analîzkirin, diyardeya Kurd nayê fêhmkirin, eger bê fêhmkirin jî wê di navê de şaşiyên mezin hebin. Encam 'Kurdîtiyek' e ku ji xwe ditirse, direve, xwe înkar dike, çiqasî xwe înkar dike bawer dike ku wê nasnameya mirovekî modern bi dest bixe, xafil, sextekar, nezan, ûqela, xwe nenas, maf nenas, ji huqûqê fêhm nake, li derveyî

siyasetê, anormal û qediyayî ye. Mirov ji vê Kurdîtiyê re dikare marjînal jî bibêje. Belkî jî bi sedema ku şêweyekî wê yê norman bigire nemaye diyardeyeke danasîna wê mirov nikare bike mewzûbehs. Wêjeyeke Cihûyan der barê qirkirina xwe de kirine heye û li nava dinyayê cihekî wê yê hatiye qebûlkirin heye. Li ser wan bêhejmar film, roman, berhemên zanistî, muzîk û resim hatine çêkirin, ji bo serhatiyên Kurdan an jî ji bo felaketên bi serê Kurdan de anîne rewşeke berevajî mewzûbehs e. Ji bo serhatiyên Kurdan ne wêjeyek, sînamayek, ne jî lêkolîneke zanistî hatiye kirin. Bi tenê di qada muzîkê de şêweyekî destanwarî yê ji rêûresmê maye, heye. Ew jî diqede, wê diqedînin.

Dema ku min cesaret kir ez li ser realîteya Kurdîtiyê rawestim, min bandora giran a van heqîqetan timî his kir. Min xwest wê bi rêbaza zanistî qebûl kiriye îfade bikim. Ravekirinê têrê nekir, min xwest siyaseta wê bikim. Wê jî têrê nekir, min xwe li şerê wê rakişand. Wê jî têrê nekir, min gav avêt aştiyê. Ew jî dikim nakim pêk nayê. Ev hemû nîşan didin û piştrast dikin ku rewşa hemdem a rastiya civakî ya Kurd çiqasî tirsnak e. Min bi hezar zor û zehmetiyî karîbû bi van rêzan rastiyê bînim ziman û haya min ji min heye ku divê ev ti car piçûk neyê dîtin. Ez dema li van hemûyan difikirim, ji bo dost û hevrêyên li derveyî vê dimînin xemgîn dibim, li dijî yên rastiyê durû û bêrû îfade dikin, hêrsa xwe diparêzim.

**4- Şaxê Ekonomîk ê Rastiya Kurd**

Têgihiştina zanistî ya modernîteyê xwezaya civakî vediqetîne li qadên cûrbicûr an gelek şaxan jê dibe û bi vî awayî hewl dide lê serwext bibe û fêhm bike. Kapîtalîzm weke sîstemeke hegemonîk mezin dibe û ev rêbaz bi vê yekê ve têkildar e. Polîtîka ekonomiyê di nava zanistên civakî de ya herî çav li ser in û di vê de jî para aktîvîteya kapîtalîst a li ser ekonomiyê heye. Aktîvîteya kapîtalîst xwe wisa nîşan dide, mîna ku qadek e, ji siyaset û desthilatdariyê serbixwe ye, lê bi xwe ew qad e ku lê herî zêde siyaset û desthilatdarî ango zor lê heye; îfadeya wê zor, şîddet û diyardeyê ye ku em jêre dibêjin kara herî berdar û bêhtir xwe bi pereyan berbiçav dike û herî zêde hukim li civakê dike. Kapîtalîzm bû ew sîstem ku herî zêde civak ji civakbûnê dûr kir û ew li hemberî rastiya wê xerîb kir. Sedema ku kapîtalîzmê dike sîstemeke bi vî rengî têkiliya nêz a di navbera pere û şîddetê de ye. Pere şêweyê zorê yê herî parzûnkirî ye, şêweyê wê yê herî dawerivandî ye. Herçiqasî ji aliyê îdeolojîk ve weke dijberê desthilatdarî û dewletê were pêşkêşkirin jî hêmanê di bingehê dewlet û desthilatdariyê de ye. Kapîtalîzm bi tenê sîstemeke xwe disipêre desteserkirina berhemê zêde nîne; bi xwe bingehê tevahiya sîstemên desteserker, sîstemên talanê ango pêkhatinên desthilatdariyê ye. Mirov bi tenê wê bi îndustriyalîzm, kara herî zêde, hilberîna hemdem û bazarê bide nasîn, mirov ê bixape. Navê sîstemekê ye; şêweyên herî pêşketî yên rêbazên wê mêtinkarî û zordestiyê bi kar tîne, xwe bi maske kiriye û bi hegemonya îdeolojîk xwe rewa kiriye, bi şêweyê desthilatdariyê yê herî zêde şîddetê enjekteyî civakê dike (bi dewleta netewe) xwe bi rêxistin kiriye û bi îndustriyalîzmê ango bi awayekî

teknolojîk êrîş dibe ser hawîrdora xwezayî. Sîstemek e ku civak xistiye 'qefesa hesinî' û ew êsîr kiriye. Ew îdeolojî û pratîka zorê ye ku gihandine şêweyên herî berfireh ên qirkirinê.

Ev danasîna me, serhatiyên rastiya Kurd dema bi rasthatina wê li modernîteya kapîtalîst dîtine piştrast dike û ji bo vê delîlên balkêş pêşkêş dike. Ji bo kesên dixwazin kapîtalîzmê û vê sîstema hegemonîk a serdema me fêhm bikin, rastiya Kurd û Kurdistanê bi temamî weke laboratuarekê ye. Rûyê rastî yê kapîtalîzmê ne li London û New Yorkê ye, mirov dikare wî rûyî li ser xeta Amed-Hewlêr, Mahabad-Qamişloyê nas bike. Ji bo em bi awayekî balkêş bibînin welat û gelek bi tevahî xwezaya wî xistine çi rewş û halî, divê em van xetan tevî hawîrdora wan nas bikin û rastiya rûtî tazî bibînin ya ku nikare xwe veşêre û rewa bike. Dema me ev kir, em ê bibînin, bi qirkirin û asîmîlasyonê, bi talan û bêkarhiştinê, bi her cure şêweyê zordariyê, bi kirinên qirker û sînornenas ên dewleta netewe, ji bo berjewendiyên rojekê yên sermayedariya burokratîk û taybet rastiya Kurd çawa ji civakbûnê hatiye derxistin, çawa welat û netewe nehatine hesibandin û çawa Kurd ji mirovbûnê derxistine.

Lewma di rastiya Kurd de şaxê ekonomiya hemdem nabe ku bi tenê weke jiyana ekonomîk were şîrovekirin. Ev ê bibe şîroveyeke gelekî teng û mirov pê bixape. Bi qasî xuya dike, ji sedî heştêyî zêdetir bêkarî, heywanxwedîkirin û cotkariyeke hatiye tesfiyekirin, çavkaniyên dewlemend ên sererd û binerd ên hatine talankirin weke nîşaneyên bingehîn ên ekonomiyê têne pêşkêşkirin. Ev rast in, lê ev nîşane gelek kêm in; heqîqeta diyardeya jêre ekonomî tê gotin, kêm îfade dikin. Niha mirov dikare rengê berevajîker û manetêkbir ê polîtîka ekonomiya bûrjûwayê bêhtir bi hêsanî derxe holê. Ew jî ev e; rastiyê parçe parçe dike, ango jiyanê dike mîna meytekî û dixe ber lêkolînê. Rêbaza 'bikuje, parçe bike, lêbikole' rêbazeke bi qasî sîstemê hov e, rêbazeke jiyanê dide înkarkirin e! Dema ya behsa wê tê kirin civak be, ne weke sîstemeke zindî, bi îrade, bi exlaq û yekpare radihêje civakê, berevajî wê parçe dike, ji eyarê zindîbûnê derdixe, dike mîna alavekî, ji exlaq û îradeyê (bi maneya rastî ji polîtîkayê) bêpar dihêle, ne maneyê û bêmanebûnê, bêwijdanbûnê û korfêhmiyê pêşde dibe.

Bi qasî ku xuya dike, mirov yeqîn dikin ku di rastiya Kurd de bandora hêmanên modernîteya kapîtalîst zêde pêşde neçûne, bi wan bûyeran re ku diqewimin têkiliya wan tineye yan jî bi sînor e. Bi vê helwestê pêxapîneke ciddî heye. Eger hêmanên modernîteya kapîtalîst (qanûna kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyalîzm) nebûna, tevahiya şaxên rastiya Kurd (welat, netewe, sosyalîte, ekonomî, çand, dîplomasî) wê li ber îmha û înkarê nebûna. Ji ber sîstemê bi xwe di vê mijarê de tinebûn û nemanek pêk tê. Hêmanên weke rastiya Kurd li ser piyan tên girtin li aliyekî di înkarkirina diyardeya Kurd de têne bikaranîn û bi awayekî mînakên wê kêm hatine dîtin xiyanetê dikin, li aliyê din jî heman hêman ji bo berjewendiyên xwe jê namînin û Kurdîtiya sexte dikin, rêxistinên xefk ên bi maske ava dikin û sîstemên bi heman rengî bi pêş dixin. Vê jî li ser navê sermaye razandinê, li ser navê çêkirina fabrîkeyan, rê, bendav (li dijî jiyana

cotkariyê û cografyayê qirkirin), dibistan (saziyên qirkirina çandî) û mizgeftan (di warê sergirtina îmhayê de dîn weke amûrekî îdeolojîk tê bikaranîn), li ser navê parastina welêt çûna eskeriyê (hunerê li xwe danê, bi kêmanî ji aliyê red û qebûla rastiya Kurd ve) weke xizmetên heta dawiyê hemdem pêşkêş dikin, li aliyê din jî li dijî têkoşîna tekûzkirina azadiyê û parastina hebûna xwe ji tevahiya bereyên civakê ve êrîş dikin û weke beşekî ji îmhayê hevkartiyê dikin; weke mînaka kurmê darê yê ne ji darê be, îhmal nakin kurmên darê çêdikin ji bo qurmê darê bikeritînin. Ji vî alî ve ekonomî weke amûrekî îmhayê zêdetir bi rola xwe radibe.

Di dîrokê de Proto Kurdan hîmê çanda ekonomiya cotkarî û heywanxwedîkirinê danî. Bi çandên gelên din ên cîran re cara pêşî dî dirokê de li ser bingehê madenkarî, bazirganî û acentekariyê (karûm) ekonomiya bazarê ya xuya dike pêşde birine. Heta bi serê sedsala 19., ango heta modernîteya kapîtalîst bandor li herêma wan kir di ekonomiya dinyayê de ji hêmanên sereke bûn. Ekonomî, hem weke çandeke maddî ya bi sazî bûyî, hem jî weke zêhniyeteke exlaqî û manewî hînê mirovatiyê kirine. Çandên di dîrokê de evçend bi kok di dused salên dawî de ji aliyê ekonomîk ve anîn ber îflas û petaxê. Modernîte ji afirînerên rastî yên ekonomiyê tolê hiltîne. Serê pêşî, cotkarî, heywanxwedîkirin, çavkaniyên binerd û sererd kirin mêtingeh, talan kirin û bi temamî miçiqandin. Pirranî girseya şêniyan, tebeqeyên kedkaran kirin artêşeke mezin a bêkaran. Bi heqdesteke herî kêm hewcedarî karên herî li erdê mayî kirin. Ew kirin girseyeke mehkûm a hêza xwe ya karkirin bi herî erzanî bifiroşin tevahiya dinyayê. Ji bilî çend hêzên zordar û serdestên mêtinkar û kompradorên sîxur (qaşo bûrjûwayên xwecihî), civak bi temamî di nava birçîbûn, bêkarî û nexweşiyê de diperpite, ew bêperwerde û bêçare hiştin. Ya rastî, di vî warî de bi kirinên desthilatdariyê yên bi zanebûn ferz kirin, zor dan civakê ji bo wê bi temamî teslîm bigirin.

Li Kurdistanê di roja me ya îro de ekonomî bi temamî weke amûrekî sîxurkirin û zilmê tê bikaranîn. Civakê bêkar û birçî dihêlin û zorê lê dikin da ku xwe ji tevahiya rengên xwe yên civakî bişo û pê didin qebûlkirin ku eger dev ji Kurdîtiyê berde wê bibe xwedî kar û xwarin. Ji bo kesek bibe xebatkarekî baş ê dewletê yan xebatkarê şîrketekê li pêşiyê weke şertên bingehîn datînin ku divê nirxên neteweperestiya serdest hemûyan qebûl bike. Mirov Kurdîtiyê bike, ji nasnameya Kurd neyê xwarê wê vê bikin sedem ku mirov ji çavan bikeve, ji derfetên kar bêpar bimîne, birçî û xizan bibe. Holdîng û zanîngehên têne avakirin weke navendên tinekirina Kurdîtiyê bi kar tînin. Bendav bi rola cinawirê cihûwarên dîrokî, qadên cotkariyê, gund û ekolojiyê dadiqurtînin radibin. Bi tevahî saziyên maddî û manewî yên karibin ji diyardeya Kurd re xizmetê bikin têne pûçkirin, paşê dikin mêtingeh û bi vî awayî wan dikin ew amûrên xisletên Kurdan dadiqurtînin. Ji bo vê jî her cure amûrên zor û ekonomiyê (pere, kar, bazar, pîşe) weke sîleh têne bikaranîn. Weke ku xuya dike, qadên ekonomîk ên divê bi polîtîka û desthilatdariyê re zêde di nav hev de nebin, wan dikin ew qadên herî zêde rastiya Kurd dikeritînin û diqedînin. Ji bo vê xebateke herî ji rêzê ya dukandariyê jî weke kart tê bikaranîn. Jixwe ji bo mirov karibe bibe xwediyê amûrên

weke banke, kooperatîf û fabrîkeyê divê mirov ji rastiya Kurd re bibêje bi xatirê te. Qedexe ye ku bi awayekî ferdî yan kolektîf ji bo rastiya Kurd li jiyanê bimîne xebat bêne kirin û li ser xebatên têne kirin jî kontroleke zêde pêk tînin. Jixwe qet firsendê nade ku bazara xwe ya xwecihî pêşde bibe û biparêze. Li ser bazarê divê ji sedî sed amûrên qelpezan û muhtekîr ên kapîtalîzmê serdest bibin. Jixwe hema bêje li şûna alavên xwecihî yên tinene, alavên têne anîn derfetên reqabetê nayên hiştin û dikin ku xweparastina ji buhayên yekdestdaran bêîmkan bibe. Di mijara qrêdî, teserrûf û bacgirtinê de heman armanc heye, ango ji bo mirov karibe ji wan sûdê bigire divê dev ji Kurdîtiyê berde û di nava neteweya serdest de bihele.

Biqasî ku tê fêhmkirin, têkoşîna ji bo parastina hebûn û azadiyê nikare were tinekirin û li ser vî bingehî berxwedan tê birêxistinkirin û qadên jiyana azad têne berfirehkirin, qada ekonomîk ji nû ve tê dizaynkirin. Di serî de li navendên bajarên mezin ên Kurdistanê, li qadên potansiyela wan a ekonomîk xurt ê bi temamî têne birêvebirin û li navendên metropolan bi hevparên qaşo bûrjûwa Kurd re holdîngan ava dikin. Heta di vê mijarê de behsa karsazên Kurd ên rêveber û jinên wan dikin. Xwedêgiravî gelek Kurd, heta yên Kurdîtiyê dikin û hewldanên civaka sivîl amade ne ku vî aliyê xwe bi awayekî ji kerxaneyê xirabtir pêşkêş bikin. Ode, yekîtî têne avakirin. Bêguman di tevahiya van qadan û hewldanan de hêmanên durist ên bi nasnameya xwe ya civakî û neteweyî ve girêdayî hene. Lê çawa ku di tevahiya qadan de dibe, îstîsna pîvana giştî betal nakin, berevajiyê wê, wê piştrast dikin. Li vir a girîng ew e, mirov karibe hêman û hewldanên îmha û derblêdanê li ser rastiya Kurd ferz dikin û hêman û hewldanên rastiya Kurd li ser piyan digirin û diparêzin ji hev cuda bike. Li gorî ku heta civak hebe wê qada ekonomîk jî hebe, divê mirov destûrê nede ku rastiyên wê yên civakî bi xwe derbê bixwin û bêne îmhakirin, li şûna vê, divê mirov ekonomiyê ji bo pêşxistina hebûna civakî û azadkirina wê bike amûrekî kêrhatî.

Piştî dagirkirina dawî ya Iraqê (2003) di çarçoveyeke stratejîk de ji bo modernîteya kapîtalîst girîngiya rastiya civakî ya Kurd û Kurdistanê zêde bûye û li ser vê, ekonomî jî di navê de, kirinên veguherî yên bingehîn mewzûbehs in. Nexasim hewl didin ekonomiyeke xweşhaliyê ya ku navenda wê Başûrê Kurdistanê ye, pêşde bibin. Li vir, tevî pêkhatina siyasî, pêkhatinên ekonomîk jî bi temamî di kontrola hêzên xwecihî, herêmî û global ên hegemonîk de tên pêşxistin û weke model tên pêşkêşkirin. Li gelek herêmên dinyayê modernîteya kapîtalîst dikeve nava veguherînên bi vî rengî û pirr hewce dike ku mirov bi paradîgmaya modernîteya demokratîk van veguherînan analîz bike û amûrên çareseriyê yên alternatîf bi pêş bixe. Gelekî girîng e ku mirov firsendê nede vê sîleha dawî ya emperyalîst-mêtinkar ku nexasim bi rêbazên ekonomîk veguherîna demokratîk bêtesîr bike. Ji lewra divê mirov sê amûrên bingehîn ên modernîteya demokratîk bi pêş bixe; ango divê mirov neteweya demokratîk, pîşesaziya ekolojîk û ekonomiya bazarê ya bi armanca civakî bi pêş bixe. Hem pîşesaziya ekolojîk, hem jî ekonomiya bazarê ya civakî ya armanca wê ya karê tineye, ji bo piştgiriya civakî xizmetê dike û xwe disipêre pêdiviyên bingehîn ên civakî, divê weke amûrên herî girîng bêne nirxandin.

**5- Şaxê Çandî yê Rastiya Kurd**

Di çarçoveya teng de divê mirov behsa şax û aliyê civakî bike. Şax û aliyê çandî bêhtir têkiliya xwe bi rewşa zêhniyetê re heye. Ji ber ku ziman amûrê bingehîn ê îfadeya zêhniyetê ye, girîng e. Ziman yek ji amûrê herî kevin ê civakbûyînê ye; kevirên verrotî ji amûrên pêşî ne, û civakbûyîn jî bi roleke bi qasî ya wan rabûye. Ya rastî, pêşketina zimanî bi pêşketina amûran ve girêdayî ye, û gelekî di zikhev de bandor li hev kirine. Nîzama zimanê sembolan yek ji sedema girîng a gavavêtina Homo Sapiens e. Bi vê nîzama zimên mirovatiyê hêza fikrê bi pêş xist, piştre jî li pey hev rê li ber bûyerên şoreşî vekir. Cinsê mirov bi van şoreşan di warê civakî de gelekî bi pêş ket. Ji aliyê cografîk ve navenda van şoreşan sîstema çiyayên Toros-Zagrosê ye. Em li ser sedemên vê rawestiyabûn. Dapîr û bavpîrên Kurdan koma sereke ya vê sîstemê bûn. Çand û zimanê Aryen a koma ziman a herî kevin pêk anî, hem di warê pêşketina neolîtîkê, hem jî di warê pêşdebirina pêvajoya bajar-şaristaniyê de bi roleke bingehîn rabû. Ev bûyer hemû heta bi beriya bîst hezar salan şaxên xwe ber didin, diçin. Ango mirov dikare di cîhana Kurdan a zêhniyetê de şopên pêvajoyên neolîtîk û şaristaniyê bigerîne. Piştre, bûyera jêre koma çand û ziman a Hind-Ewrûpayê tê gotin jî kokên xwe ji vê rabihuriyê digire. Yên di nava vê koma çand û ziman de timî li hemberî xwe du komên çand û ziman ên cuda dîtin. Li Başûr komên Semîtîk ên ji nêz ve bi kokên xwe Efrîkî (çanda çol û qadên germ) û li Bakur komên Ûral-Altay ên li keviyên Sibîryayê (çanda qutbê û qada sar). Li gorî van herdu koman koma navî bi derfet û avantaj bû. Avantaja cografîk di pêşketinê de xwedî roleke diyarker bû. Ji ber vê yekê, em dibînin ku komên qada navîn bi awayekî dîrokî gavên mezin diavêjin û mohra xwe li bûyerên mezin dixin. Lewma em dikarin fêhm bikin ka çima hem di pêşketina çanda maddî û hem jî di ya çanda manewî de bi rola sereke rabûne.

Çanda Kurd tevahiya dîrokê di mezinkirina çanda çemê sereke de û di tesîrlêkirina wî de bi roleke pêşeng rabûye. Lê ji ber ku devera wê ya jiyanê timî li qada şer a dîrokê bû, ji bo hebûna xwe biparêze û bergiriya xwe bike, xwe vekişandiye serê çiyan. Bi saya çiyan, karîbûye bibe gelê herî kevin û bibe xwediyê vê nasnavê. Aliyê vê yê neyênî jî ew e, di nava xwe de zêde cih nedaye çanda bajêr. Bi bajêr re timî di pozîsyoneke dijber de maye û bajar weke cinawirekî wê daqurtîne û bixwe dîtiye. Lewma çanda qebîle û eşîrê ya ji rêûresmê heta roja me ya îro hebûna xwe parastiye. Forma qebîle û eşîrê şêwe û qalibê bingehîn ê çanda Kurd e. Çawa ku sosyolojî dide nasîn çanda eşîrê çandeke bi rêya baviktî û xizimtiyê nîne, çandeke jiyana azad û şêwazekî heyînê ye, bi berxwedana li dijî şaristaniyê xwe diyar dike, bawer dikim ku bi vî awayî danasîna wê duristir û rasttir e. Li cem Kurdan çanda eşîrê gelekî bi hêz û xurt e. Ji ber ku tevahiya dîroka şaristaniyê bûne xwedî îrade ku bi berxwedanê xwedî li hebûna xwe û jiyana azad derkevin. Di vê de têkiliya baviktî an jî xizimtiyê diyarker nîne. Rêûresma Zerdeştiyê di vê çarçoveyê de ji rêûresma dînê Semîtîk cudatir e; mirovan nake evd, bêhtir wan dikişîne aliyê jiyana azad. Di navbera wan de cudahiyeke evqasî bi kok û binyad heye. Di dema serdestiya Îslamê de

rêûresma Zerdeştî derb xwar û bi vê re jî evdîtî hat. Desthilatdariya Îslamê bi dijwarî dijmintiya rêûresma Zerdeştî kir û di binê vê dijmintiyê de ev diyardeya evdkirinê û çînîkirineke hişk heye. Kurd çiqasî tevlî Îslama desthilatdariyê bûne ewqasî bûne evd, bûne kole û ev xusûseke gelekî girîng e. Di çanda Kurdan de îradeya ji bo jiyana azad bi hatina Îslama Desthilatdariyê re derbeke xedar xwariye. Li dijî vê, berxwedanên li ser bingehê Elewîtî û Êzîdîtiyê bi rêûresma Zerdeştiya kevin re têkildar in, û bi awayekî bingehîn a di vê de rol dilîze destnekişandina ji îradeya jiyana azad û çanda derfetê dide wê ye. Terîqet û mezhebên ji Îslama Desthilatdariyê reviyane û xwe jê dûr girtine, çiqasî bi nexweşiya desthilatdariyê neketine, bêhtir alîkariya jiyaneke azad û bi exlaq kirine. Ev bi awayekî rêxistinên xweparastinê yên serdema navîn in. Çanda Kurdan bi awayekî bingehîn di serdema navîn de bi van du riyan hem hebûna xwe parastiye, hem jî di jiyana xwe de cih nedaye evdîtiyeke bikeve hinavê wê û xwesteka xwe ya ji bo azadiyê bi dilsozî dewam kiriye.

Modernîteya kapîtalîst, çawa ku di qada çanda maddî de kiriye, di qada çanda manewî de jî helwesteke asîmîlasyonîst û qirker nîşan daye û ev jî bi mekanîzmayên tinekirinê yên dewleta netewe pêk aniye. Dewletên netewe yên Ereb, Tirk û Îranê ku bi awayekî acente û saziyên sîxur ên modernîteya kapîtalîst in, ji avahiyên desthilatdariyê yên rêûresmê sûd wergirtine û çanda Kurdan bi temamî kirine mengeneyê, ji tevahiya derfet û îmkanên perwerdeya bi zimanê dayikê mehrûm kirine, pergala perwerdeyê ya medreseyên rêûresmê xira kirine qedexe kirine, çand û zimanê Kurdî di nava saziyên çand û zimanê serdest ên dewletên netewe de ji îmhayê re terikandine. Hinek hewldanên lawaz û zelûl ên milliyetgiriya Kurd ji bo parastina çanda Kurd (xebatên wêje û ziman) bi ser neketin û tevî vê jî li hemberî hevrikên wan ên bi hêz rê li ber reaksiyoneke dijber vekiriye. Eger çanda berxwedanê ne bi hêz be, çawa di her diyardeya bi vî rengî de tê dîtin, bivênevê her ku diçe dihele û tine dibe. Herweha bi awayekî giştî formên milliyetgir ên bûrjûwayê di wê kapasîteyê de nînin ku çandên gel zindî bihêlin û pêşde bibin, berevajî xwedî fonksiyonekê ne ku wan çeloxwarî dikin û naveroka wan pûç dikin. Di modernîteyê de çanda nivîskî li asta herî jor e, lê bi sedema qedexekirin û asîmîlasyonê, ji bilî çend xebatên lawaz û qels çanda Kurd pirr kêm berhem dane. Di van berheman de jiyana azad negihiştiye îfadeyeke rast, bêhtir di van berheman de arîstokrasiya eşîrê, pergala wan a begtiyê û otorîteyên dînî derketine pêş.

Di rastiya Kurd de ji bo pêşketina çanda neteweyî rola modernîteya kapîtalîst neyênî ye. Di warê pêkanîna çanda neteweyî ya bûrjûwayê de nêzî rastiyê jî nebûye. Çanda dimeşe û tê pêkanîn, çanda îmhaker, asîmîleker û qirker a dewleta netewe ya serdest e. Sloganên faşîst ên weke ‘tek welat’, ‘tek netewe’, ‘tek ziman’, ‘tek dewlet’ û ‘tek al’ ku her roj têne dubarekirin vê rastiyê îfade dikin. Hêmanên modernîteya kapîtalîst ên ji asîmîlasyon û çanda zordest a serdema destpêkê û navîn bi gelekî wêdetir xwedî sîstemekê ye, weke sê suwarên mehşerê, demekê beriya demekê li pey pêkanîna mehşerê ye. Çanda dewleta netewe, îndustriyalîzm û kara herî

zêde ji bo ku çanda Kurdan a rêûresmê ya hê ji modernbûnê dûr e, û hê nebûye neteweyî biqedîne, bêperwa tevahiya rêbazên îmhaker bi kar tîne.

Çîroka pêkhatina bûrjûwaziya Tirkê Spî ya kapîtalîzma burokratîk a Tirk ew afirand, bi temamî komploker e. Komplokeriyê ji serî ve çanda împaratoriyê ya ji rêûresmê ji xwe re kiriye pêpelûk û maske, bi awayekî navenda wê derve û hundir be civak rehîn girtiye. Di vê çandê de civak êsîr e. Elîteke çînî ya welê çêbûye ku çanda civakî ya ji xwe re orîjîn dihesibîne jî (etnîsîteya Tirk û Îslama Sunnî) rehîn girtiye, û eşkere ye ku ev elît wê li ser rastiya çandî ya Kurd bi roleke texrîbkartir rabe. Tevahiya sedsala 20. bi mînakên bi vî rengî yên balkêş tijî ye. Çanda Îttîhad û Teraqî ya îdeaya wê ya gavavêtinê li ser bingehê laîk hebû û nexasim bi CHP'ê şêweyên wê yên bêhtir bûne desthilatdar, piştî ku tesfiyekirina hebûna çandî ya Ermenî, Helen û Suryanî temam kirin bi tevahiya hêza xwe berê xwe dane tesfiyekirina çanda Kurd. Hem di dema 1925-1940'î pêvajoya isyanên provokekirî de, hem jî paşê di bêdengiya mirina spî de rêbazên tineker heta dawiyê bi kar anîn. Tevî ku carinan qirkirinên fizîkî pêk anîn jî bi awayekî bingehîn a pêk anîn modela qirkirina çandî bû.

Di vê demê de çanda Kurd bi tevahî hêmanên xwe yên maddî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin. Ji bo Kurd hebûna xwe ya çandî li ser piyan bigirin, îmkan nedane ku bi tenê dibistana 'baxçeyê zarokan' jî vekin. Pêkanîneke welê ye ku mînakeke wê ya din li dinyayê tineye. Di xaleke bi tenê ya qanûnê de ji îfadeya nasnameya çandî re cih nehatiye veqetandin. Çanda Kurd tevî hêmanên xwe hemûyan ango wêje, dîrok, muzîk, resim û hwd. li derveyî huqûqê hatiye hesibandin. Li ser rûyê erdê jî emsaleke duyemîn a vê yekê nîne. Der barê Kurdan de çi hêmanên divê bêne hilweşandin û tinekirin hebin hatin hilweşandin û ji holê hatine rakirin û yên divê bêne bikaranîn jî bi çanda dewleta netewe ve entegre kirin û helandin, ji çanda Tirk hesibandin. Bi qedexekirina zimanê dayikê re navên dîrokî yên gund, bajar, herêm û dayikniştiman hemû hatine qedexekirin û li şûna wan navên Tirkî yên 'Tirkê Spî' hatine danîn û bi vî awayî hukim dane ku rastî wê bi hêsanî bêne tesfiyekirin. Tevahiya şêwazên îfadeyê yên çanda Kurdî ango wêje, muzîk, resim, dîrok û zanist di çarçoveya heman qedexeyan de girtine û bêhtir bi çavsorî bi ser de çûne, yên di van qadan de xebatê dikin ne ku bi tenê li derveyî huqûqê hesibandine, kirine mehkûmê bêkarî û xizaniyê û ew tevizandine. Ji bo Kurd karibin bijîn şert ew e, divê ji çanda xwebûnê bigerin û ev pêk anîne. Nemaze piştî dema isyanan ekonomî, huqûq û siyaset weke sîlehên herî bi bandor ên tesfiyeyê hatine bikaranîn. Piştî van pêkanînan a li dawiyê mayî Kurdekî ji xwebûnê dest kişandî û çandeke Kurd a weke meyt û beratê ye ku kî nêzîkê wê bibe ji serî ve belayeke mezin bi serê xwe de tîne. Çiqasî ev rewş bê qebûlkirin, ewqasî jî mirovî tine dike. Bêguman weke rizîna hêmanên berate û meytekî ji ber qirrakan mayî ye. Di diyardeya çandî ya Kurd de pêvajoyeke mezin a rizînê pêk hatiye, pêk tê.

Ji rêûresma deshilatdar a Îslamî ya bûrjûwayê nehatiye ku ji nêzîkatiya Tirkê Spî bibihure heta ji wê paşketîtir e. Li dijî hebûna çandî ya Kurd tevî rêbazên laîk modernîst, rêûresma Îslamî jî bi kar aniye û di bin navê senteza Tirk-Îslamê de milliyetgirî hê dijwartir kiriye û pêk aniye. Nexasim kengî di tesfiyeyê de Tirkkirina laîk kêm ma, motîfên Tirk-Îslamê kirin dewreyê. Di serî de terîqetên Neqşî û Qadirî, bi tevahî amûrên dînî di vê mijarê de weke amûrên tinekirina çandê hatine bikaranîn. Serokatiya Karûbarên Diyanetê Ya Fermî bi Komarê re hat avakirin û ji wê rojê ve di xizmeta laîkgiran de hatiye xebitandin. Nexasim girêdana Kurdan bi çanda dîn îstîsmar kirine û bi giranî dîn weke şêwazekî komplowarî bi kar anîn. Naveroka xisletên terîqetên xwedî rêûresmeke berxwedêr, hatin pûçkirin û ew ne li gorî armancên damezrandinê, berevajî van armancan bi kar anîn. Têkoşîna milliyetgiriya Tirkê Spî (rojane bi awayekî berbiçav CHP, MHP û yên weke wan) li dijî çanda jiyana azad û berxwedana PKK'ê bêkêr bû, lewma li şûna wê yan bi wê re, li gorî polîtîkayên dewleta netewe (tevî ku bi prensîbên Komara Atatirk re li hev nakin) pêkhatinên Îslamgiriya Tirk temsîl dikin (di serî de AKP, partî û ekolên mîna Millî Goruşê û yên weke wê) bêyî ku fikaran bikin bi kar anîne. Dema ku mijar bûye hebûna çanda Kurd, gelek partî û ekolên Îslamgir bi awayekî biçin 'Seferên Xaçperestan' tevgeriyane û ev şêwaz weke pêdiviyeke 'yekîtiya millî û yekparebûnê' hesibandine.

Di demên dawî de piştî ku hat fêhmkirin hebûna çanda Kurd nayê tinekirin, bi ferzkirina hegemonya global polîtîkayên tinekirinê yên ji rêûresmê hatine sistkirin rê li ber pêkhatinên seriyekî wê yê sexte bigihîje heta çanda dewleta netewe ya Kurd hatiye vekirin. Di vê de hêmana diyarker, çanda jiyana azad û berxwedanê ye. Bi vê Kurdîtiya ku bi şêwazekî komplowarî, sexte û naveroka wê pûç, hedefa bingehîn çanda civaka neteweyî ya Kurd a demokratîk û şoreşger e. Mîna ku Kurdîtiyeke lîberal a bûrjûwa bi vî şêwazî heye, hewl didin vê nîşan bidin û dixwazin wê li şûna çanda jiyana azad û berxwedana Kurd bi cih bikin.

Ev rêbaz, ji aliyê hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst ve, ji roja ku derketine holê ve li dijî tevahiya îdeolojiyên şoreşger, sosyalîzma pêkhatî û çandên rizgariya neteweyî pêk anîne bi kar aniye û di vê de têra xwe jî bi ser ketiye. Hegemonya îdeolojîk a lîberal di sêsed salên dawî de nexasim di serdema şoreşan de ev fonksiyona xwe hem bi amûrên hûrûkûr, hem jî bi yên çor bi awayekî serketî pêk aniye û di vê de têra xwe bûye xwedî tecrûbe. Ezmûnên sosyalîst, demokratîk û neteweparêz ên bi serketin jî nikarîbûn xwe ji hegemonya îdeolojîk lîberal a modernîteya kapîtalîst rizgar bikin, nikarîbûn xetên zelal bikişînin nava xwe û wan, û lewma di nava wê de heliyane. Bêguman ev nayê wê maneyê ku çanda jiyana azad û rewşa berxwedanê bi temamî tine bûye; ev piştrast dike ku zordestiya hegemonîk a di dîroka şaristaniyê de timûtim kiriye mînakeke wê bi awayekî bêhtir pêşketî bi serketî bi pêş xistiye û pêk aniye.

Tevahiya dîrokê îdeolojiyên hegemonîk û çandên bi cihkirî yên li ser çanda jiyana azad û berxwedana Kurd hatin ferzkirin pêkanînên xwe yên herî dijwar û asîmîlasyonîst di pêvajoya

modernîteya kapîtalîst de kirin. Ev rewş bi naveroka faşîst a modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Kara herî zêde îndustriyalîzmê, îndustriyalîzm jî dewleta netewe mecbûrî sîstemeke koletiyê dike. Di asta gerdûnî de qirkirinên çandî yên pêk tên ji bo ev sîstem fonksiyonel bibe ji wan pêkanînan e ku timûtim serî li wan didin. Qirkirina çandî ya Kurd ji wan mînakên sereke ye ku vî rengê heyînê yê sîstemê darî çav dike. Qirkirin weke ku tê îddîakirin ji diyardeyeke Tirk, Ereb, Cihû yên ku her yek ji wan diyardeyeke civakî ye yan jî ji diyardeyeke neteweyî pêk nayê. Qirkirin diyardeyek e ku bi şêwazê mêtinkariyê yê modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Lê weke ku xuya dike, qirkirinê mîna diyardeyeke di navbera neteweyên modern de pêk tê nîşan didin. Çandan bera hev didin heta bigihîjin qirkirinê, eger vê nekin meyla kara herî zêde ya kapîtalîst kar nake.

Pêvajoya qirkirinê ya dewleta netewe ya Tirk li ser hebûna çandî ya Kurd dimeşîne, bi heman awayî û pêve girêdayî, ji aliyê dewletên netewe yên din ên parçeker dewletên Ereb û Îranê jî tê meşandin. Li gorî mentiqê sîstemê, bi hev re parçekirin û tinekirin ji bo serketinê hewce dike. Di van demên dawî de ceribandina koalîsyona antî-Kurd a di navbera dewletên netewe yên Îran, Sûrî û Tirkî de bingehê xwe yê dîrokî heye. Lê kengî ji ber petrolê û ewlekariya Îsraîlê berjewendiyên hegemonya global bi yên dewletên netewe yên xwecihî re li hev nekin, ev pêkanîn weke berê bi hêsanî nameşin. Nakokî dike ku carinan derz li sîstemê bikevin. Di vê rewşê de ji bo tevgera jiyana azad û berxwedana çanda Kurd careke din şens heye bi roleke dîrokî rabe; ango li dijî modernîteya kapîtalîst a hêza herî dawî ya navendî ya şaristaniyê ye, firsend çêdibe modernîteya demokratîk xwe weke alternatîfeke bi hêz pêşkêş bike. Çanda Kurd a modern ji ber sedemên xweser bi tenê dikare xwe bi hêmanên modernîteya demokratîk bigihîne serketinê. Em dema serketin dibêjin, em behsa mayîndebûna çanda jiyana azad û hebûna wê ya nayê tinekirin dikin. Formê bingehîn ê vê jiyanê, ekonomiya kominî ye ku cih dide bazara civakî, îndustriya ekolojîk û neteweya demokratîk. Kurdistan û rastiya Kurd a hemdem bi awayekî dîrokî çawa ku di derketina holê ya sîstema şaristaniyê de bi rola dergûşê rabûne, şensê wan heye ku ji bo modernîteya demokratîk weke sîstem xwe piştrast bike dîsa bi rola dergûşê rabin. Çanda demokratîk ne bi tenê weke çanda jiyana modern a Kurd, weke şensekî herêmê û mirovatiya gerdûnî, li ser vî bingehî bi rola xwe rabe, ev yek xwedî girîngiyeke dîrokî ye.

Weke encam mirov dikare bibêje, di danasîna rastiya Kurd de zehmetî hene û ev ji rastiyên wê bi xwe ne. Kurd ne bi tenê rastiyeke civakî ne ku xwedî pirsgirêkên giran in; weke hebûn di danasîna wan de jî pirsgirêk derdikevin pêş. Di dîrokê de û bêhtir jî di pêvajoya modernîteya kapîtalîst de hebûna wan hat guftûgokirin û di bin vê de sîstema zordestî û mêtinkariyê heye û ev sîstem xwedî wan xisletan e ku qir dike. Kurdîtî ne bi tenê ji azadbûnê mehrûm dimîne, di heman demê de tê parçeparçekirin, ji mêtingehbûnê jî wêdetir mîna kelaş û meytê civakî parçe dikin û dixwazin bi vî awayî tine bikin. Lê dîsa jî dikin û nakin, nikarin biqedînin. Di vê de

hêmanên bi rola bingehîn radibin cografya Kurdistanê ya derfet û îmkan dide, û xisletên civakî yên qebîleyî û terîqetî ne ku civaka Kurd tevahiya dîrokê parastine. Kengî dixwaze bibe civakeke siyasî, desthilatdarî û dewletdarî hingê bi dijwarî dor lê tê girtin û bi armanca tinekirinê seferan dibin serê, destûrê nadinê di vî warî de bikeve nava kategoriyekê. Di rewşên bi vî rengî de neçar maye dabeşî komên piçûk ên civakî bibe û xwe biavêje bextê çiyan. Ev komên piçûk ên ji serdema neolîtîkê pêk tên nikarîbûne ji civaka qebîleyan bibihurin. Weke komên piçûk dabeşbûna wan têkiliya xwe bi paşvemayînê re tineye bi hêzên şaristaniyê (bajar, çîn û dewlet) re yên li dora wan û yên dirêjî nava wan bûne, heye. Rastiya di qebîlegirî û eşîrgiriya Kurd de û israra di vê rastiyê de ji ber dînamîkên hundir nîne. Di dewamkirin û pêkhatina sîstema şaristaniya navendî de pozîsyona stratejîk a cografya Kurd diyarker e. Pozîsyona cografyayê û pêvajoya bi şer a bi şaristaniyê re li ser rastiya civakî ya Kurd ferz dike ku weke qebîleyên çiyayî û komên eşîr bimînin, hebûna xwe dewam bikin û biparêzin. Heman xusûs ji bo rastiyên civakî yên Ereb û Tirk jî bi vî rengî ye. Erebistan û Çolên Asya Navîn û sîstemên şaristaniyê yên li dora wan, tevahiya dîrokê Ereb û Tirk neçar kirine ku bi xisletên bi hêz ên qebîle û eşîrê bimînin.

Di rastiya Kurd de pêvajoya çînîbûn û bajarbûnê rê li ber veguherînin girîng ên civakî vekirine. Di vê pêvajoya veguherînê de ku xwe bi şêweyê sazî û îdeolojiyên dînî nîşan da, rastiya Kurd bi şêweyên civakê yên ji civaka qebîle û eşîrê ya Kurdan dibihure, da naskirin. Îdeolojiya dînî ya rê li ber bandoreke dualî vekir, li aliyekî tebeqeya jor a qebîle û eşîrê neçarî dewletbûnê kir, li aliyê din jî tebeqeyên jêr veguherandin komên terîqetan. Mirov dikare terîqetan bi rewşa wan a xwerû bi awayekî wan weke komên xweparastinê yên li dijî hiyerarşiya dînî ya dibe desthilatdar û dewletdar bide naskirin. Mirov van herdu dualîteyan li cem komên orîjînal ên Kurdan di rêûresma Zerdeştî ya serdema pêşî de û di rêûresma Îslamî ya serdema navîn de gelekî dikare bibîne. Ji bo Kurdan Zerdeştîtî girîng e, ji ber ku di dîrokê de mînakeke payeberz a civaka exlaqî û polîtîk e. Di Konfederasyona Medan de û di dewama wê Împaratoriya Persan de ev herdu dualîte bi hêz hatine dîtin. Di destguhertina desthilatdariya navbera Med û Persan de Magî gelek bi tesîr bûne û têkoşîna wan a zêde vê dualîteyê piştrast dike. Di Îslama serdema navîn de dualîteyên bi vî rengî û têkoşînên wan bêhtir eşkere xuya dikin û berbiçav dibin. Ji dema derketina holê ya Îslamê û pêve, dualîteyeke bi awayê Îslama dewletê û Îslama qebîleyan pêk tê. Bi gotineke din, hiyerarşiya jor a qebîleyan dibe dewletdar û li beramberî vê, isyanên tebeqeyên jêr wan ber bi bêhejmar şerên mezheb û terîqetan ve dibe.

Ev pêvajoya têkoşînê ku di tevahiya civakên Îslamê de tê dîtin, çawa ku tê zanîn di rastiya civakî ya Kurd de jî timî û gelekî pêk tê. Di orîjînên Kurd ên serdema destpêkê de civaka qebîle û eşîrê sereke bûn, lê di pêvajoya şaristaniya Îslamî ya serdema navîn de Kurdîtî hem weke nav, hem jî weke diyarde xwe baştir dikare bide naskirin. Lê heman pêvajoyê bi xwe re dabeşbûneke kûr jî aniye. Kurdîtiyê bi giranî xisletên xwe yên qebîleyî û eşîrî parastine, lê bi Kurdîtiya çînî û bajarî re weke Kurdîtiya dewletdar û Kurdîtiya li dijî wê ya xwe bi mezheb û terîqetên sivîl diparêze,

gelekî ji hev dûr û cihê dibin. Dîroka civakî ya serdema navîn bi awayekî bingehîn xwe disipêre vê cihêbûna sêber û diyardebûnê. Vegotin xwe bi çi şêweyên îfadeyê binixumînin bila binixumînin, di bingehê wan ê maddî de diyardeyên eşîr, terîqet û mezhebê dimînin. Şerên qewmî û çînî hemû xwe disipêrin yekeyên di nava van sê kategoriyan de cih digirin. Parçebûnên bi vî şêwazî ji bo tevahiya civakên Rojhilata Navîn dibin û heta bûye xisleteke gerdûnî. Ji bo rastiya Kurd jî rewş cuda nîne. Xisar û destketî hevdu temam dikin, tevî hemû hebûna asîmîlasyonîst û tineker a rêya desthilatdarî ketiyê, beşên civakî yên mezheb û terîqetan ên ketine ber çerxa zordestî û mêtinkariyê xwe hişk bi hebûna xwe digirin û li jiyana azad xwedî derdikevin.

Piştî ku sîstema şaristaniya navendî dest guhert û ket aliyê Ewrûpaya Rojava, di civaka Rojhilata Navîn de veguherînên bi kok pêk hatin. Jixwe sîstema şaristaniyê ya timî bi pêxîrtengiyên dewrewî xwe dewam dike, di vê qonaxa nû ya modernîteya kapîtalîst de bi awayekî kûr ketiye pêvajoya hilweşînê. Hegemonya Rojava ya bi sedsala 19. re li ser herêmê xurt bû, bi saziyên sîxur û acenteyên bi ser xwe ve bi veguherîna pêk anî, hilweşîn bi lez kir. Kapîtalîzmê meyla xwe ya kara herî zêde bi tenê bi dewletokên netewe yên îfadeya herî zêde ya despotîzmê ne, dikarîbû dewam bikira. Ev statukoya nû ya ji şoreşa îndustriyê mehrûm û ji şoreşa polîtîk gelekî dûr, çawa ku li gelemperiya civakê jî rê li ber vedike, bivênevê wê di rastiya Kurd de jî rê li ber dualîteya hebûn û tinebûnê vekirana. Hem weke dewlet, hem jî weke civak mayîna li ser piyan êdî bûbû mijareke ku li ser guftûgo bê kirin. Li cem Împaratoriyên Îran û Osmanî mirov dikare van guftûgoyan bibîne. Di dema şaristaniya Îslamîk de serwerên Ereb, Fars û Tirk ku bêhtir xwedî rola sereke bûn pirsgirêka wan a bingehîn parastina dewletên wan bû, lê kom û milliyetên bindest bi pirsgirêka parastina hebûna xwe ya civakî re rûbirû bûn. Di vê demê de ji ber rewşa jeostratejîk a cografyayê û avabûna civakê ya belav, ji pêkanînên statukoyê yên mêtinkarî û zordestiyê yên ji rêûresmê wêdetir, Kurd bi gelek pêkanînan re rûbirû bûn. Di serî de Împaratoriya Ingilîz, hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst bi rêbaza rejîmên sîxur û acenteyî yên pêk anîbûn, ji gelemperiya li nava dinyayê gelekî zêdetir li herêmê, nexasim li Anatolya û Mezopotamyayê li ser qewm û komên li derveyî desthilatdariyê mayî, rê li ber felaketeke temam vekirin. Gelên Xiristiyan li ser bingehê îdeolojiyên ummetê yên ji rêûresmê hatibûn fetihkirin û ew kiribûn mehkûmê statuyeke bi vê yekê re hatî pêkanîn; ha bi serê van gelan de felaketa herî mezin anîn ango ew qirkirin û tevî wan çanda hezar salan jî tesfiye bû. Komên Misilman jî ketin ber çerxa mêtinkarî û zordestiya ji rêûresmê û wan jî para xwe ji felaketa mezin girt. Bi qasî Ermenî, Helen û Suryaniyan, bi awayên cuda be jî felaketa mezin a bi destê saziyên sîxur û acenteyên herêmê yên ku modernîteya kapîtalîst li pişt wan e, li Fellah û Bedewiyên Ereb, Tirkmen, Ecem, Berberî û Kurdan jî qewimî.

Rastiya Kurd hebûna xwe ya qewmî û çanda xwe ya tevahiya serdema navîn pêk anî bû bi giranî di vê demê de ji dest da. Rewş serberjêr diçû, ya rastî berepaş paşve diçû. Li gorî şêwazê hebûnê

yê modernîteyê bihêlin bibin xwedî sîstemeke kapîtalîst, îndustrî û dewleta netewe, ji aliyê hêzên hegemonîk û saziyên wê yên sîxur-acente ve li ser sêlingê distanê hatin hiştin. Di nîvê sedsala 20. de ji bo Kurdan mijara guftûgoyê ji azadiya hemdem, demokrasî û wekheviyê wêdetir li dora dualîteya “gelo em hene, yan tinene?” digeriya.

Li ser gelên herêmê û neteweyên wê pêkanîn û kirinên digihîjin qirkirinê hene. Hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst bi girîngî berpirsiyariya van pêkanîn û kirinan dixin stûyê dewletdariya netewe. Lê ev rûyê rastiyê nîne, rastî tiştekî din e. Sermayeya hegemonîk û yekdestdariyên îdeolojîk bi xwe van elîtên dewleta netewe pêk tînin, wan hem di warê îdeolojî de, hem jî di warê eskerî û ekonomîk de bi gurçûpêç dikin. Mînak, faşîstên Tirkên Spî ên laîkgir ku ji qirkirinên li Anatolya û Mezopotamyayê berpirsiyar têne dîtin, hem di warê îdeolojîk de, hem jî di warê bi gurçûpêçkirina maddî de ji serî heta binî bi desteka hêzên hegemonîk ango Ingilîz, Franse, Elmanya û Emerîkayê hatiye avakirin. Eger desteka van hêzên hegemonîk nebe, hebûna Tirkê Spî ne pêkan bû. Jixwe weke çand ne Îslamiyet ne jî Xiristiyanî yan Mûsewîtî xwediyê wê kapasîteyê nînin ku pratîka qirkirinê pêk bînin. Lê ev kapasîte li cem hêmanên modernîteya kapîtalîst heye, di nava xwe de digire. Lê bi awayê xuya dike, ji van qirkirinan bi giştî bi awayekî kategorîk Ereb, Tirk, Cihû û Kurd berpirsiyar têne dîtin. Roja me ya îro bi îdeolojiyên milliyetgir ên di bin navê Îslamgiriyê de çêkirine hewl didin kirinên bi heman awayî dewam bikin. Lê di bingehê van gavavêtinên îdeolojîk û rêxistinî de para diyarker a rêûresma Ingilîstanê û niha jî ya DYE’yê heye. Eger desteka hêzên hegemonîk nebe, navendên ji wan re hêzên Îslamî tê gotin nikarin bêhna xwe jî bidin. Faşîzma Tirk a Kesk ku pêkanînên qirkirinê yên bi awayekî nûkirî roja me ya îro li ser rastiya Kurd dimeşîne û divê ji van kirinan berpirsiyar bê dîtin, ji serî heta binî navenda wê London, Washington û Berlîn e. Eger desteka van navendan nebe faşîzma Tirk a Kesk nikare gavekê jî biavêje. Li vir berpirsiyariyê dixin ser milê dînê Îslamê yê rêûresmê. Lê ya rastî, çawa ku ji aliyê sosyolojîk ve Faşîzma Tirk a Spî pirr kêm têkiliya xwe bi Tirkîtiyê re heye, herweha Faşîzma Tirk a Kesk jî ji aliyê sosyolojîk û rêûresmê ve pirr kêm têkiliya wê bi Îslamê re heye. Hebûna wan û şêweyê wan ji sedî sed bi modernîteya kapîtalîst û hêzên wê yên hegemonîk re têkildar hatine pêkanîn. Dewamkirina wan jî bi desteka nêz a van hêzan pêkan e. Mînak, çawa ku li tevahiya Rojhilata Navîn dibe, li Tirkiyê jî pêkhatinên desthilatdariyê yên bi meyla Îslamî û dewamkirina wan ji modelên laîkgir zêdetir li navendên hêzê yên hegemonîk têne avakirin û destekkirin.

Rastiya Kurd bi awayekî ji hebûnên civakî yên rêûresmê yên Îslamî yên din cuda, nikarîbûye xwe veguherîne civaka neteweyî, nikarîbûye îmkanên wan ên dewleta netewe bi kar bîne. Berevajî, ji bo nebin civakeke neteweyî dewletên netewe yên serdest li ser wan rejîmên zordest û talanê yên bigihîjin qirkirinê timî û sîstematîk meşandine. Ev rejîmên zordest û talanê desteka hêzên hegemonîk nebe nikarin dewam bikin. Ji ber ku nebûne civaka neteweyî, bi awayekî xwezayî di bin bandora hiyerarşîk, korker û berjewendîperest a çandên terîqet û mezhebên dînî yên

serdema destpêkê û navîn, û çanda eşîr û qebîleyê ya serdema neolîtîk de mane, ji dînamîkên hundir mehrûm bûne. Mîna meyt û kelaşeyekê dihêlin. Li ser vî meytî bê sînor pêkanînên tinekirin û talanê yên hêzên hegemonîk û dewletên netewe yên mehkûmî wan e, têne pêkanîn. Di binê guftûgoya hebûn-tinebûnê de ev rastî heye. Li gorî tehlîla dawî, ev rastî bi temamî ji aliyê hêmanên modernîteya kapîtalîst û saziyên sîxur-acente yên hevkar ve tê avakirin û ew wê mumkin dikin.

Bêguman, çawa ku di her diyardeya civakî de weke gerdûnî dibe, di rastiya Kurd de jî qutbên berxwedanê weke heyînê ji roja derketina holê heta roja me ya îro her hebûn. Di pêkhatina qebîle û eşîrên pêşî de ya diyarker civakên dijber û li dijî tehlûkeyên şertên xwezayî refleksa bergiriyê û parastinê ye; fikir û rêxistiniya parastinê ya destpêkê û pêşneketî ye. Di vê mijarê de şîroveyên Darwinîst rastiyê nîşan nadin, berevajî dikin. Di pêkhatina qebîle û eşîran de aliyê diyarker têkiliya xwîn û xizimtiyê nîne, li dijî tehlûkeyan parastin, xwezêdekirin û bêhtir bi başî xwe xwedîkirin e. Di çanda qebîle û eşîr a rastiya Kurd de berxwedan, hilberandin û avahiya xwezêdekirinê vê feraziyê bi awayekî vebirrî piştrast dike. Heman xusûs, paşê di rewşa herî xwerû ya çanda mezheb û terîqetan de bi şêwazê berxwedan, hilberandin û bi xwezêdekirineke tekûz a civakê ve girêdayî dibe. Mezheb û terîqet li dijî navendên desthilatdariyên hundir û derve, li dijî bandora bajêr a xiraker û çînîbûnê, bi rola parastina civakê, dewamkirina hebûna wê û azadhiştina wê radibin û ev rola wan girîng e. Ji ber ku wisa bûye, yan xwestine wan tine bikin an jî hêmanên hevkar xistine nava wan û hewl dane ku wan ji rola wan a berxwedanê, ya azadker û heyî dike, dûr bikin.

Li dijî modernîteya kapîtalîst tevgerên hemdem ên demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz hewl dane vê rêûresma dîrokî dewam bikin. Bi destê hêmanên modernîteya kapîtalîst firsend nehatiye dayîn şert û mercên xweser ên rastiya Kurd civakeke neteweyî ya hemdem pêk bînin. Hewldanên qels û lawaz ên hêmanên feodal û bûrjûwaya piçûk di vî warî de negihiştine encamê. Herî dawî dewletoka netewe ya Kurd a serî lê dane, eger bi pêkhatinên berfireh ên civaka neteweyî demokratîk neyê xurtkirin, ji tesfiyekirina bi qirkirinê, ji vexwendina felaketên mezin wêdetir wê ti encameke ciddî dernexe holê. Avakirina civaka sosyalîst demokratîk a bi PKK’ê îfade dibe, rastiya Kurd bi têgihiştineke cuda ya modernîteyê digihîne hev û tîne ziman ku Kurd dikarin bi teoriya modernîteya demokratîk û pratîka wê hebûna xwe biparêzin, pê bibin yekpare û azad bibin.

Modernîteya demokratîk a weke alternatîf tê pêşkêşkirin ne bi tenê utopyayeke paşerojê yan mîtolojiyeke civakî ya li rabihuriyê mayî ye; bi xwezaya rastiya civakî re parelel rêyeke dikeve pêşiya me. Modernîteya demokratîk tevî ku li gorî deman şêweyê xwe diguherîne her heye û di tevahiya dîroka şaristaniyê de rastiyek e ku mîna dijberê xwe dîrokeke wê heye. Dîroka gerdûnî ya tevahiya mirovatiya li derveyî hêzên zordest û mêtinkar dimîne temsîl dike. Rastiya Proto

Kurdan weke orîjîn ji bo şaristaniyê bi rola dergûşê rabûye. Ha ji ber vê ye ku mîna dayikekê li zilma ewladên şîrheram rast tê; lewma ji hêzên şaristaniyê herî zêde derban dixwe û çanda wan ji aliyê van hêzan ve tê tinekirin. Ji lewra hebûna xwe bi tenê dikare bi şaristaniyeke li derveyî şaristaniya çînî ya ji rêûresmê, bi şaristaniya civakparêz a demokratîk pêk bîne. Eger dîrokeke manedar a Kurd ê bê nivîsandin, bi tenê di vê çarçoveyê de dikare bê nivîsandin. Roja me ya îro îfadeya vê modernîteya demokratîk e. Kurd parçeyên ji hebûna xwe mayî (parçeyên ontolojîk) bi tenê dikarin li ber rohniya dîroka şaristaniya demokratîk bi awayekî zelal bibînin; bi van dikarin bikevin ser rê, bi hêmanên modernîteya demokratîk neteweya demokratîk, îndustriya ekolojîk û ekonomiya bazara civakî ji nû ve xwe ava bikin û bi vî awayî hebûna xwe pêk bînin.

Di dîrokê de cografya Toros-Zagrosê di navbera Efrîka (parzemîna cinsê mirov lê derketiye holê) û Avrasyayê de (cografya lê civaka şaristaniyê pêk hatiye) ne bi tenê di civaka mirov de ji Homo Sapiens, şoreşa cotkarî ya neolîtîkê û şoreşa bajêr a şaristaniyê re bûye dergûş, di heman demê de ew gihandine dîroka me ya nêz û heta şoreşa îndustrî ya Ewrûpa Rojava aniye, mezin kiriye. Niha jî di krîza herî kûr a mirovatiyê de ku koka wê di modernîteya kapîtalîst de ye, hebûna rastiya Kurd weke qebristaneke mirov diçin ziyaretê. Dîrok careke din li heman cografyayê li ser navê mirovatiyê zorê dide Kurdan ku hebûnên civakî biparêzin û mirovî azad bikin û bang li wan dike da ku modernîteya demokratîk ava bikin.

**Beşa Sêyemîn: DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE PIRSGIRÊKA KURD û TEVGERA KURD**

Mirov dikare têgîna pirsgirêkê bi awayekî gerdûnî weke zoriya di pêvajoya bi êş a hebûn an nebûnê de bide nasîn. Ev kategoriyek e ku di tevahiya pêvajoyên heyînê de pêk tê. Dema mijar civak be, mirov dikare pirsgirêkê di çarçoveyeke teng û fireh de bide nasîn. Di çarçoveyeke fireh de pirsgirêka civakî, zor û zehmetiyên xwezaya civakî li hemberî hawîrdor û xwezaya yekemîn dikeviyê îfade dike. Mînak, ji ber hişkesalî, germî yan jî serma dijwar jiyana hawîrdorê bi awayekî biyolojîk nikare xwe dewam bike û ev rewş rê li ber pirsgirêkên ciddî yên civakî vedike. Dîsa komên di statuyên bi heman rengî de ne, di nava wan de yên bi hêz li dijî qelsan serî li hin çalakiyên zorê didin û mirov van tevgeran jî dikare di heman çarçoveyê de binirxîne. Di çarçoveyeke teng de jî mirov dikare pirsgirêka civakî bi derketina holê ya diyardeyên civaka hiyerarşîk, bajar, çîn, desthilatdarî-dewletê re weke bûyer û pêkanînên xwe disipêrin mêtinkarî û zordestiya van diyardeyan bide nasîn. Ji aliyê sosyolojîk ve pirsgirêkên civakî yên bingehîn çavkaniya xwe zordestî û mêtinkarî ne. Mirov pirsgirêkên din dikare di çarçoveyên cuda de binirxîne.

Hiyerarşî û dewlet, tevî ku di destpêkê de bi armanca çareserkirina pirsigirêkên civakî yên derketine holê hatine pêkanîn, bi demê re ew bi xwe bûne çavkaniya sereke ya pirsgirêkên civakî. Di civakekê de saziyên hiyerarşîk û dewletî çiqasî giraniya xwe hebin, mirov dikare hukim bide ku ewqasî jî pirsgirêk hene. Hiyerarşiyên pêşî bi giştî weke serweriya mêr li ser jinê pêk hat,

lewma mirov dikare ji pirsgirêka pêşî ya civakî re pirsgirêka jinê bibêje. Paşê çînên civakî, çîna kole û pirsgirêkên civakî yên li cudabûna cinsan guhdarî nakin ku îlhama xwe ji koletiya jinê girtin, derketin holê. Di vê qonaxê de, di civakê de hiyerarşî û çînîbûn dikevin zik hev û her ku diçe dema civakên bi pirsgirêk a di tevahiya qadên civakî de bi bandor dest pê dike. Cinsparêzî û çînîparêziyê yekser mohra xwe li her qada civakî xistin. Pirsgirêkên li hundir ên yeke û komên civakî derbasî nava civakên li derve jî bûn. Diyardeya mêtinkarî û zordestiyê ji civakê ber bi civakê ve pêşde çû. Bêhtir bi awayekî berbiçav ji klanê ber bi klanê, ji eşîr û qebîleyê ber bi eşîr û qebîleyê, ji qewm û neteweyan ber bi qewm û neteweyan pirsgirêk pêk hatin û xwe dirêjî hev kirin. Bi pêşdeçûna bajar, çîn û dewletê re şaristaniyên pêk hatin pirsgirêk gerdûnî û sîstematîze kirin. Mirov dikare bi awayekî bingehîn bi tevahî sîstemên şaristaniyan ên serdema destpêkê û navîn li ser hîmê diyardeya zordestî û mêtinkariyê bide naskirin. Mirov dikare modernîteya kapîtalîst jî weke sîstema şaristaniyê ya herî dawî ya zordestî û mêtinkarî herî zêde mezinkirî bide nasîn. Bi giştî di tevahiya qonaxên şaristaniyê de, bi taybetî di qonaxa modernîteya kapîtalîst de pirsgirêkên civakî rê li ber krîzên trajîk û rewşên kaotîk ên demdirêj vekirin. Roja me ya îro, nexasim ji salên 1970'î ve, pêvajoya kapîtala fînansê ya mohra xwe li modernîteya kapîtalîst da, mirov dikare weke serdema krîzên civakî yên herî kûr û domdar pêkhatî binirxîne.

Civakên li cografya Rojhilata Navîn a Kurdistan di navenda wê de cih digire, ji sedsala 19. û pêve di nava krîzeke kûr de ye ku çavkaniya wê modernîteya kapîtalîst e. Dewletên Rojhilata Navîn, statuya xwe ya hegemonîk a ji pênc hezar salan zêdetir di nava sîstema şaristaniya navendî de bi destê şaristaniya navenda wê Ewrûpaya Rojava ve berdan û bi vî awayî ji serê sedsala 20. ve ketin rewşa civakên mêtingeh. Ya pêk dihat û diqewî bi tenê pirsgirêkên civakî nebûn, bi awayekî yekpare krîzeke sîstemê bû ku tevahiya qadên desthilatdarî, ekonomîk û îdeolojîk di nava xwe de dihewandin. Roja me ya îro ev krîz bi şîddeta xwe hemûyî dewam dike. Yek ji xisleta girîng a krîza pêk tê ew e, demdirêj e, û ketiye rewşeke kaotîk. Rewşa kaotîk tevahiya cografyayê û cîranên nêz dixe bin bandora xwe û bi vî awayî ji Asya Navîn heta bi Qafqasan û Balkanan, ji Hîmalayan heta bi Bakur û Nava Efrîkayê bandora xwe li tevahiya civakên li van qadan dike. Cografya Kurdistanê di dîroka mirovatiyê de li ser sîstema çiyan a Toros-Zagrosan bi rola avaker a herî demdirêj rabû û cara pêşî ye ku ber bi roja me ya îro hûrûkûr ketiye paradoksa ji ber rewşa kaotîk a çavkaniya wê modernîteya kapîtalîst e. Paradoks ew e, piştî şoreşên mezin ên dîrokî çemê mirovatiyê yê şaristaniyê ku her diçe gurr û boş dibe, di dema modernîteya kapîtalîst de zuha dibe, dimiçiqe. Kurd weke gelê herî kevin ê otantîk ketine rewşa qurbanên herî zehmetkêş ên vê atmosfera kaotîk. Cografya Kurd li ser wê, mirovatî ji şoreşa Homo Sapiens heta bi şoreşên neolîtîk, kalkolîtîk, sifir, bajar û hesin gihandiye heta roja me ya îro û hema hema ji tevahiya serûbinbûnên dîrokî re dergûşî kiriye. Gelê Kurd gelê vê cografyayê ye û ev gel li qonaxekê ye ku kêm maye ji nava dîrokê rabe. Bêguman ev rewşa gelê Kurd trajediyeke mezin îfade dike. Ya pêk tê û diqewime, gulokeke besît a pirsgirêkên civakî nîne. Di her civaka mirov de pirsgirêkên hemdem ên bi heman rengî pêk tên. Herçiqasî rehên Kurdan

bigihîjin kûrahiya dîrokê jî weke gel, ji ber ku ji gelek aliyan ve di nava hûr û pencên hêmanên herî zalim û mêtinkar ên modernîteya kapîtalîst de hatine hiştin, diperpitin û pirsgirêkên wan jî ji ber vê ne.

Pirsgirêkên pêk tên, krîz û rewşa kaotîk a civakê dixin navê bi tenê ji ber qanûna kara herî zêde ya kapîtalîzmê nîne; tevî qirkirinên çandî yên dewleta netewe kirinên îndustriyalîzmê yên bi tevahî civakê ji civakbûnê derdixe, bi temamî rê li ber xizankirin, tinebûn, bêperwerdehî, bêtenduristî û têkçûna zêhniyetê ya saziyên avahiya jor û binesaziyê vedike. Rewşa pêk tê, ji pirsgirêkê wêdetir di asta felaketa herî mezin a civakî de ye. Civak bi awayekî xweber ji civakbûnê dernakeve, ji vê wêdetir civakeke ji hev belavkirî, navendên refleksên wê bazkokirî û veguherî parçeyên tevizî, li naverastê ye. Dema ku pirsgirêka Kurd tê gotin, qala her çi pirsgirêkeke dîrokî yan jî her çi pirsgirêkeke civakî ya rojane nayê kirin; çawa ku me di tevahiya analîzên xwe de hewl da rave bikin, ji ber rewşa xweser a rastiya Kurd, dema pirsgirêka Kurd tê gotin a tê fêhmkirin ev e: qewimîna felaketên li pey hev û di nava hev de yên ku gihiştine heta bi qirkirinên çandî û tevahiya qadên civakî dikevin ber wan û li demeke dirêj a dîrokî belavbûyî ne.

**A- PÊŞDEÇÛNA DÎROKÎ YA PIRSGIRÊKA KURD û REWŞA WÊ YA NIHA**

Çavkaniya pirsgirêka Kurd a îro, ne bi tenê ya Kurdan belkî jî çavkaniya pirsgirêkên pirraniya mirovahiyê ye. Çavkanî hiyerarşî, bajar, çîn û dewleta ji nava civaka neolîtîk a Kevana Bi Bereket derketî ye. Şaristaniya Sumerê ya li Mezopotamya Jêr (3000-2000 B.Z.), bi awayekî weke çareyekê ji bo pirsgirêkên civakî pêk hat yên ku civaka neolîtîk a çavkaniya wê Mezopotamya Jor rê li ber wan vekiribû. Pirsgirêk pêk dihatin lewma şênî zêde dibûn, erdan qîm nedikir û şer pirr dibûn. Rahibên Sumeran ên li Mezopotamya Jêr bi zanebûna xwe ya pêşketî û bi çanda neolîtîkê ya xwe pê serwext kiribûn, bi tevahî hêmanên maddî û manewî bi kar anîn û bajar, çîn û dewleta bi navend perestgeh vedîtin û di vê çarçoveyê de ji van pirsgirêkên dîrokî re li çareyê geriyan. Di destpêkê de dîtin ku nexapiyane. Mirov dibêje qey serdema destpêkê ya xwe disipêre sêbera bajar, çîn û dewletê ji pirsgirêkên demê re çareyên mûcîzewarî dîtine. Mîtolojiya demê bê sedem nîzamekî nû îfade nedikir, belkî jî ya bê menaye gava pêşî ya tevahiya bûyerên di dîroka mirovatiyê de nîzamekî xwedayî îfade dikir. Mûcîzeya şoreşa neolîtîk veguherîbû mûcîzeya şaristaniyê. Sîstema hatibû avakirin belkî jî dîsa sîstema dîrokê ya herî dirêj û bêpirsgirêk dixebitî bû. Lê her ku nakokiyên di nava wê de mezin bûn û gihiştin, vê carê ji derketina holê ya pirsgirêkên civakî re bi rola pîriktiyê rabû û xwe ji vê nehişt. Di belgeyên nivîskî yên pêşî de cih digire ku di dîrokê de pirsgirêka civakî bi rewşa xwe ya herî xwerû di civaka Sumeran de pêk hatiye. Di navbera xweda û xwedayan de, di navbera xweda û evdên wan de pirsgirêkên rastî yên civakî, şer û nakokiyên navbera xwediyên desthilatdariyê û mirovên weke koleyê xwe bi kar tînin nîşan didin. Civaka Sumer a di dîrokê de mohra xwe li gelek yekemînan

daye, di heman demê de ji aliyê pirsgirêkên rê li ber wan vekiriye jî yekemîntiyeke bêhemta temsîl dike.

Mirov dikare pirsgirêkên civakî yên ciddî û pêşî yên komên orîjînên wan Kurd bi şaristaniya Sumer ve girê bide. Jixwe Destana Gilgamêş li ser van pirsgirêkan hatiye hûnandin. Hem çanda hiyerarşîk a El Ubeydê (4500-3500 B.Z.) hem jî çanda sîte ya Ûrûkê (3500-3000) diviyabû xwe timî ber bi Rojhilat û Bakur ve berfireh bikirana. Ji bo karibin weke pêkhatinên pêşî yên xwedî çanda bajar, çînî û dewletdar dewam bikin neçar û mecbûr bûn ber bi herdu aliyan ve biçin û xwe bi civaka neolîtîk xurt û xwedî bikin. Neçarî, şer bi xwe re tîne. Têkiliya di navbera Gilgamêş û Enkîdo de, problematîka têkiliyên tîpîk û pêşî ya emperyal-mêtinger a di dîrokê de îfade dike, nîşan dide. Komên orîjînên wan Kurd di şexsê Hûmbaba de berxwedana li dijî têkiliya bi emperyal mêtingeran re temsîl dikin. Di bingehê pirsgirêkê de li dijî jiyana bajarî, çînî û dewletdarî parastina jiyana wekhevîxwaz û azad û civaka neolîtîkê heye. Enkîdo weke êsîr tînin Ûrûkê, wî kedî dikin û di nava civaka bajêr de li dijî civaka ji navê tê hevkariyê dike û di rênîşandanê de tê bikaranîn.

Qebîleyên Hûrrî li dijî mezinbûna şaristaniya bajêr timî li ber xwe dan. Ev berxwedanên li rêzeçiyayên Zagrosê nîşan didin ku pirsgirêkên civakî çiqasî belav û domdar bûne. Gûtî avahiyeke konfederatîf ya eşîrên bi koka xwe Zagrosî ne; ew ji van eşîran ên pêşî ne ku li dijî rêveberên Sumeran bi ser ketin û navê xwe li dîrokê nivîsandin. Paşê çawa ku em di dîroka şaristaniyê de gelek caran dibînin, yên serketî di nava çanda serwer ên têkçûyî de dihelin û em mînakên pêşî yên di vî warî de bi awayekî vebirrî dibînin. Hegemonên ku hunerê şer ew derxistine holê, sîstema serwer timî bi hêz dikin. Dema hewl didin pirsgirêkan çareser bikin, bi awayekî nakokane bêhtir mezin dikin. Desthilatdarî bêhtir rê li ber desthilatdariyê, dewlet bêhtir rê li ber dewletê vedike; bi vî awayî pirsgirêk qat bi qat zêde dibin.

Hegemonên Babîl û Asûr ên rêûresma desthilatdariyê ji Sumeran girtibûn, sîstem bi awayekî berfireh û seranser belav kirin û bi vî awayî ketin rewşeke bi heman rengî. Ev pirsgirêkên çavkaniya wan bajar, çîn û desthilatdarî-dewlet e, bi berfirehî û kûrahî mezin bûn û xwestin çareseriya wan jî di heman xeleka kor de bi bêhtir berfirehbûn û kûrkirinê bibînin. Berfirehbûn rê li ber emperyalîzm û mêtingeriyê, seranserî-kûrbûn jî rê li ber bêhtir çînîbûn û mêtinkariyê vedike. Paşê vê mekanîzmeya sîstemê heta roja me ya îro bi dubarekirinê xwe mezin kir û hat timî weke xwe ma: Li derve avahiya emperyalîst û mêtinger mezin kir, li hundir jî serweriya çînî. Yê bi ser dikeve û yê têk diçe dibin qurbanê heman sîstemê. Xeleka berxwedanê ya antî-şaristanî ya li rêzeçiyayên Toros-Zagrosê jî wê her tim bi dubarekirinê xwe mezin bike û mekanîzmeya xwe ya azad pêşde bibe. Bi mekanîzmeya berxwedanê ya ji bo azadkirinê bîreweriya qebîle û eşîrê wê bêhtir bi pêş bikeve, rêxistiniya wan bêhtir berfireh bibe û bi vî

awayî wê hewl bidin bêhtir qebîle û eşîran azad bikin. Li cem herdu mekanîzmeyan jî diyalektîka heyînê dimeşe, meşa herdu diyalektîkan jî timî xwe mezin dike.

Bi belavbûna çanda Sumer û hegemonya Babîl û Asûran pirsgirêkên şaristaniyê dijwar dibin. Bersiva orîjînên Kurd ji van pirsgirêkan re di rêûresma Mazda-Mîtra û Zerdeşt de xwe nîşan dide. Di vê rêûresmê bi xwe de çanda Sumeran heye. Lê vê çandê çawa digirin, qebûl nakin wê vediguherînin ango afirîneriya wan bi xwe bingeh e. Veguherîn dîrokî ye. Ya rêûresma çanda Greko-Romen mumkîn kir, ev veguherîna dîrokî ye. Erê di dîroka mirovatiyê de dogmatîzma civaka koledar hilneweşand, lê dîsa jî xwedî wê serdestiyê ye ku dikare hinekî nerm bike, bişikîne û carinan jî alternatîfên nû pêşkêş bike. Mirov, exlaqê wî, ango îradeya wî digihîne qonaxeke jor. Têkiliya azadiya mirov bi exlaq û îradeyê re datîne. Mirovatiya ku li cem xweda û qral-xwedayên beriya hingê di dereceya ne tiştekî de bû, di rewşa girseyên evdan a besît de bû, êdî isyan dikir, bi îradeya xwe radibû û exlaqê xwe bi xisletên nû yên azadiyê ava dikir. Çanda li qûntara çiyayên Zagrosê û nexasim bersiva Zerdeştî, ji bo ku mirov li pirsgirêkên bingehîn ên demê serwext bibe gelekî girîng e, mîna kilîta deriyê fêhmê ye.

Mirov dikare bersiva Îslamî ya ji pirsgirêkên çavkaniya wan şaristanî re ji nêz ve analîz bike. Du heta sê hêzên hegemonîk ên demê şaristaniyên Bîzans, Sasanî û Hebeşê bandora wan her diçe ji çar aliyan ve li ser jiyana qebîleyî ya Nîvgirava Erebistanê zêde dibe. Bi vê re jî pirsgirêkên civakî pirr dibin. Mirov dikare Îslamê weke bersiva van pirsgirêkên civakî şîrove bike. Şaristaniyên behsa wan tê kirin, nûnerên herî dawî yên çanda serdema destpêkê bûn. Ji pirsgirêkên tevahiya serdema destpêkê re nebûn bersiv, berevajî li qadên berfirehtir belavkirin û kûr kirin. Jixwe ji vê zêdetir roleke wan a din nemabû. Mirov dikare rêûresma bersivdanê ya dînî ya Brahîmî bi awayekî bingehîn weke şêwazekî xweser ê çareseriyê ji bo pirsgirêkên ji çanda qral-xwedayên serdema destpêkê peydabûyî şîrove bike. Di qonaxa ji Brahîm heta bi Mûsa de di navbera Nemrûtên Babîl û Asûr ên bi koka xwe Sumerî (dema qral-xwedayan) û Firewnên Misrê de (qralên îdea dikin ku ew xweda bi xwe ne) civakeke tengavbûyî heye. Mirov dikare vê demê weke dema bersivdan û çaredîtina ji pirsgirêkên civakî re bi awayekî pêxemberwarî, şîrove bike. Tevî xweseriya xwe hemûyî, bersiva Mûsawarî ya ji bo pirsgirêkên qebîleya Ibrî ji Qraltiyeke Piçûk a Îsraîlê wêdetir neçûye. Qraltiya bi taybetî xwe bi fîgurên Pêxember Dawid û Silêman nîşan dide, sentezeke çor a çanda Misrê ye; çîroka qraltiyê ya tebeqeya jor îfade dike.

Rêûresma berê di dema Împaratoriya Romayê de pirsgirêkên civaka koledar bi qasî çiyan mezin kirin. Rêûresma Îsewî jî ji aliyê xizan, kole û bêkarên aware bersivek bû. Nakokiya di navbera Xiristiyantî û Mûsewîtiyê de pêşî çînî bû. Romayê hem di nava qebîleyên Ibrî de, hem jî di nava çanda qebîleyên din ên cîran de qelşek vekir û vê jî xwe weke veqetîneke nû ya dînî nîşan daye. Rêûresma Îsewî li qada pirsgirêkên civakî lê herî zêde û rêûresma serîrakirinê lê bi kok pêk hat, lewma bi qasî rêûresma Zerdeştiyê nebe jî dîsa di wê potansiyelê de bû di dîroka mirovatiyê de

rê li ber serdemekê veke. Xiristiyantiyê ji bo tevahiya pirsgirêkên di nava çanda qebîleyan de pêk tên xwe weke bersiv pêşkêş kiriye. Cara pêşî ye ku civakên cemaetên dînî yên ji civakên qebîleyan dibihurin pêk tên û ew ji wan berfirehtir û mayînde ne. Mirovên ji her etnîsîte û qebîleyê weke endamên dînê nû pîroz têne hesibandin. Ji aliyê civakbûnê ve, ev qonaxeke girîng e. Civakên gelan li ser dika dîrokê xwe bêhtir bi awayekî eşkere û bi dengekî bilind nîşan didin. Ermenî, Suryanî, Grek û Latîn bêhtir bi Xiristiyantiyê derketine ser dikê û xwe nîşan dane.

Muhammedîtî jî bersiveke dîrokî ya qebîleyên Ereb e. Lewma heman rêûresma nikare pirsgirêkên xwe çareser bike û naveroka wê ji mêj ve pûç bûye, nûnerên despotîzma wê yê serdema destpêkê ji çar aliyan ve misêwa qebîleyên Ereb tengav dikin. Hz. Muhammed ji aliyekî ve xwediyê dengê dijber ê Împaratoriyên Hebeş, Sasanî û Bîzansê ye, ji aliyê din ve jî Mûsewîtî û Xiristiyantiya weke dînên heq qebûl dike, di heman demê de weke dînên êdî dema wan bihurî ye îlan dike û ev jî rastiya em behsa wê dikin piştrast dike. Hem li hundir, hem jî li derve pirsgirêkên komên qebîleyên Ereb ji sînorê xwe bihurîne û ne Cihûtî û ne jî Xiristiyantî nikare ji van pirsgirêkan re çareyê bibîne. Cihûtî û Xiristiyantiya vê demê naveroka xwe ya şoreşgerî ji zû ve ji dest dane, veguherîne qebîlegiriya hişk û milliyetgiriya qewm. Qraltiyên Hebeş, Bîzans û Sasanî ku nûnerê dawî yê despotîzma qral-xwedayên ji rêûresmê bûn, şer û pirsgirêkên wan ên hem di nava xwe de hem jî di navbera xwe de hem ew qels dikirin, hem jî hewcedariya bi wan nedihişt. Lewma mirov dikare fêhm bike ku Hz. Muhammed xwestekên zindî yên qebîleyên çolê ji bo azadiyê û xwesteka fetihkirinê ya tebeqeyên jor bi arezûya bidestxistina diyarên cennetê bi rêûresmeke nû ya dînî pêşwazî kir.

Rêûresma Îslamî xwedî wan xisletan e ku di dema derketina xwe de rastiya qebîleyên Ereb û rastiya şaristaniyê li ber çavan girtiye. Du çandên alternatîf bi awayekî îdeolojîk û polîtîk ango çanda alternatîf a qebîleyên xizan û tebeqeya jor a alternatîf ku ji bajar, çîn û dewletê pêkhatî, karîbûye bi hostetî sentez bike. Bajarê Mekkeyê li ser rêyên çûnûhatinê ye. Lewma ev herdu çand li vir gelek caran li hev rast tên û sentez dibin. Lewma Mekke di vê pozîsyonê de xwedî avantaj û serdestiyekê ye. Hz. Muhammed ev sentez bi awayekî serketî kiriye û mohra xwe lê xistiye. Jixwe girîngbûna wî ya dîrokî jî ji vê tê. Ji aliyê civakî ve, encama girîng a Şoreşa Îslamê ew e, ji civaka qebîlegir a hişk karîbû gav biavêje civakeke cuda ya ummetê. Li qadeke mîna Erebistanê îzolebûyî ji civaka bi rêûresma çanda hezar salan a qebîleyê gavavêtina civaka ummetê şoreşeke mezin a civakî ye. Sosyalîteya nû hê ji destpêkê ve dualîteyek di nava xwe de dihewand. Meyla veguherînê ber bi çîneke dewletdar a tebeqeya jor ji arîstokrasiya qebîleyê girtibû û meyla demokratîk û wekhevîxwaz a tebeqeya xizan timî li ber hev didan. Pirsgirêka civakî hê giştî bûbû û ji nû ve reng digirt. Van pevçûn û problematîkên nû hê Hz. Muhammed sax bû dest pê kirin, bandora wan heta roja me ya îro dewam kir.

Ev şoreşa civakî ya herî mezin a serdema navîn, yekser bandora xwe li ser komên orjînal ên Kurd jî nîşan da. Hem meyla fetihkar a arîstokrasiya Ereb, hem jî lêgerîna desthilatdarî û dewletê ya tebeqeya jor a Kurd, di çarçoveyeke demdirêj a bi têkilî û pevçûn de li cem Kurdan civaka ummetê pêk anî. Çawa ku bi giştî pêk tê, civaka nû ya ummetê bi pirsgirêk bû. Meyla bajarî, çînî, dewletdarî û meyla wekhevîxwaz û demokratîk bi cudabuneke bi rengê mezheb û terîqetan xwe nîşan dan. Yên ku hegemonya desthilatdariya Îslamîk temsîl dikirin çiqasî mohra xwe li civaka ummetê dixistin, Kurdên Elewî û Zerdeştî jî terîqetên tesewifî yên li binî kirin sedema hebûna rêûresma xwe ya berê û bi vî awayî cemaetên xwe yên xweser ên berxwedanê bi israr pêşde birin. Diyardeyeke ku ez dikarim jêre bibêjim civaka Kurd pêk tê, lê tevî vê jî bi awayekî gelekî parçebûyî, dabeşbûyî tebeqe û çînên ji hev re xerîb hebûna xwe dewam kir. Pirsgirêkên civakî bêhtir xwe bi awayên gelekî cuda yên terîqetan nîşan didan. Nakokiyên di navbera bajar û yên li derveyî bajar de bi dabeşbûnên çînî di zikhev de pêk dihatin. Di serdema navîn de her tişt ji serdema destpêkê zêdetir bûbû pirsgirêk û dabeş bûbû. Tevî pirsgirêkên qebîle û eşîran ên koçerî û bicihbûnê, li ser bingehê nakokiya bajar û gund pirsgirêkên ji ber dabeşbûna çînî ya li bajêr jî derketibûn holê. Tebeqeyên jor ên qebîleyan bêhtir bi awayê dewletê radibûn, lê parçeyên qebîleyan ên xizan ku bêhtir piçûk bûbûn, vediguherîn qebîleyên nû yên xizan. Çanda jiyanê ya xwe disipart gund li hemberî çanda jiyanê ya xwe disipart bajêr paşve diçû. Di civaka bajêr de nakokiyên civakî û pevçûn zêde dibûn. Di encamê de ji bo çareseriya van pirsgirêkan li amûrekî dewletê yê bêhtir bi hêz difikirîn. Lê ya rastî, dewlet bi xwe dihat wê maneyê ku wê pirsgirêk û xanedanên kurtêlxur bêhtir bibin. Civaka serdema navîn bi pirsgirêkên civakî yên bi vî rengî li dora singê xwe dizîvirî û mehkûm bûbû her wisa li dora xwe bigere.

Civaka Kurd a serdema navîn ji elîtên desthilatdariyê yên Ereb, Fars û Tirk cuda nikarîbû elîteke bi hêz a desthilatdariya xwe pêk bîne. Ji pirsgirêkên xwe yên bingehîn re ne çareseriyeke qraltiyê ya navendî û yekbûyî didît, ne jî karîbû bi civaka qebîleyê ya sekan, li derve girtî ya rêûresmê dewam bike. Ji lewra ji pirsgirêkan re yên ku ji vê nakokiyê derdiketin holê, hewl didan bêhtir bi civakên terîqetgir û mezhebgir çareyê bibînin. Zerdeştîtî her ku diçû parçe û qels dibû. Elewîtiyê bi tenê li deverên çiyayî yên fetihkirina wan zor, dikarîbû hebûna xwe biparêze. Îslamtiya li ser gelê bajar û deştê serdest bû gelekî îstîsmarkar bû. Nûnerên siltanan û begtiyên xwecihî civak di nava pirsgirêkên welê de xeniqandibûn, jibinderketina wan gelekî zehmet bû. Lewma di rewşeke welê de mirov wê pirsgirêkan çareser nekin, bi tenê wê ji wan birevin. Ango terîqetgirî û ummetgiriya bi navê çareseriyê xwe lê girtibûn, vediguherîn amûrên pê bi lez ji rastiya xwe birevin, pê xwe nas nekin, bi xwe re xerîb bikevin. Bi kurtî em dikarin bibêjin ku diyalektîka serdema navîn bi vê rêveçûnê xwe nîşan dida.

Pirsgirêkên bingehîn ên civaka Kurd di dema modernîteya kapîtalîst de bi kok bûn û şax berdan. Modernîte bi xwe weke sîstem hewl dide qadên civakê hemûyan û ji her alî ve bixe qefesê. Mirov civakê bixe qefesê ev tê wê maneyê ku civak bi tevahî dibe pirsgirêk. Ji bo qanûna kara

herî zêde bimeşe, bivênevê divê sîstemeke zordestî û mêtinkariyê li ser civakê were ferzkirin. Lê belê ev sîstema mêtinkarî û zordestiyê li gorî serdemên destpêkê û navîn ji aliyê kûrahî û berfirehî ve cuda ye. Nirxê zêde yê di serdemên destpêkê de ji bo xwedîkirina xanedaniya qraltiyekê pêdivî pê hebû û yê di serdema kapîtalîst de pêdiviya bi hezaran yekdestdariyên îndustiriyê pê heye, ne bi tenê cuda ye, ji hev gelekî dûr in. Tevahiya dîrokê ji bo kapîtalîzm nebe sîstemeke serwer bi tevahî tedbîrên di qada îdeolojîk, siyasî û ekonomîk de hatin girtin, ji ber wê tirsê bû ku wê nikaribin bersiva vî şêwazê mêtinkariyê bidin. Civakê di wê demê de wê nikarîbûya kapîtalîzmê weke sîstemeke serwer rake û hilgire. Li hemberî kapîtalîzmê, mumkîn nîne ku civak karibe li ser piyan bimîne. Faktora binbehîn a vê yekê ew e, di xwezaya civakî û hawîrdorê de tişta li beramberî şêwazê mêtinkariyê yê kapîtalîst dewamî bersivê bide tineye. Kapîtalîzm ji bo xwe weke sîstemekê pêk bîne di destê wê de sîleha herî mezin desthilatdariya dewletê ya veguherandiye dewleta netewe ye. Dewleta netewe bi xwe, kengî deshilatdarî li tevahiya mûrehk û rehên zîro yên civakê gişî belav bû, pêkan e. Civakeke ku desthilatdarî li tevahî mûrehkên wê belavbûyî, wê ne bi tenê heta bi mejiyê hestiyên xwe bi pirsgirêkan bifetise, wê bê parçeparçekirin û mehkûmî belavbûnê bibe. Dewleta netewe civak bi tevahî kiriye qefesê. Sînorên welat, artêşa neteweyî, burokrasiya sivîl a navendî, îdareya navendî û mehellî, bazara neteweyî, serdestiya ekonomîk a yekdestdar, pereyê neteweyî, pasaport, nasnameya hevwelatiyê, îbadetxaneya millî, dibistana seretayî, tek ziman û sembolên mîna alê, tev digihîjin hev û bi hev re ji bo pîvana kara herî zêde ya kapîtalîzmê bimeşe, encameke bingehîn derdixin holê. Sosyologên modernîteyê vê pêvajoyê weke ji civaka rêûresmê bihurîn û pêkanîna civaka homojen a modern didin naskirin û herweha weke nîşaneya bingehîn a pêşketina civakê nîşan didin, lê ya rastî ev pêvajo bi xwe bi kûrahî qefeskirina hesinî ya civakê îfade dike. Kengî civak bi temamî li gorî pîvanên kapîtalîzmê hat kedîkirin hingê serbest tê berdan. Ev serbestiya jêre lîberalîzm tê gotin, ji koletiya hemdem pêve ne tiştekî din e. Di civaka serdema kapîtalîzmê de berdêla israra di azadiyê de faşîzm e. Faşîzm jî navê sîstema herî xwînrij û mêtinkariya kara herî zêde ye. Li vir a rast ew e, mirov nikare behsa hebûna civakê bike, mirov dikare behsa tinebûna wê bike.

Sosyolojiya serdema me bi zanebûn koletiya kapîtalîst analîz nake, li gorî îdeolojiya lîberal rastiya koletiya çînî rewa dike û vê jî weke erkeke xwe dizane. Lewma ne zanistî ye, xwediyê xisletên mîtîk ên paşverû ye. Di serdema fînans kapîtalê de ku dema herî zêde paşverû û zordest a kapîtalîzmê ye, hukimraniya 'pere' bûye xwediyê wê di dîrokê de ti xweda nebûye xwediyê wê hêzê, belkî jî xwedayê herî bi hêz ê hukimranan îfade dike. Eger ev xweda nebe, ne kapîtalîzm, ne dewleta netewe, ne jî îndustriyalîzm mumkîn e. Ji bo mirov karibe li hemberî pere civakê li ser piyan bigire, hewcedarî bi hêza jiyana civaka kolektîf û maneya mezin a mirov heye. Ji civakeke bi vî rengî li naverastê zêde tiştek nemaye. Ezmûnên civaka sosyalîst ên bi vê îdeayê rabûne bûne xwediyê serketineke bi sînor, lê bi pirranî têk çûne û nikarîbûne pêşiyê li vê encamê bigirin.

Herçiqasî mirov li hemberî modernîteya kapîtalîst bi mehkûmî bijî jî dîsa ji israra di civakbûnê de û ji parastina civakê pêve ti çare tineye. Pirsgirêk çiqasî kansêrwarî bûbin, gihiştibe wê asta bi krîz û kaotîk jî ji bo jiyaneke mirovane şert e ku mirov hebûna civakî biparêze û hewl bide azad bike. Jiyana alternatîf an jiyana sosret a ji tevahiya nirxên mirovî şuştî ya hukmê kara herî zêde li ser e, yan jî jiyana di qebrê de ye ku ji rizînê re hatiye hiştin.

Mirov sîstema koleker a modernîteya kapîtalîst li ser rastiya civakî ferz dike bi awayekî herî eşkere dikare di rewşa rastiya civakî ya Kurd ketiyê de bibîne. Rastiya civakî ya Kurd, ji civakîbûneke bi pirsgirêk wêdetir, bi qirkirineke li dema dirêj û li tevahiya komikên wê pêk tîne belavbûyî tê qedandin. Ne bi tenê her çi civakeke bi pirsgirêk e, yên diqewimin ji pirsgirêkbûnê wêdetir rewşekê îfade dikin. Ji bo ku mirov rewşa tijî ders û xeternak a rastiya Kurd ketiyê fêhm bike, qîm dike ku mirov bi tenê li rewşa ziman binêre. Zincîr li zimanê herî otantîk ê dîrokê xistine. Ji zarokan re jî nikarin baxçeyê zarokan vekin. Ji vê rewşê jî xeternaktir rewş ew e, ji bo xwedîderketina li zimanê Kurdî û hewldana ji bo vî zimanî, di nava sîstema serdest de divê birçîmayîn û bêkarmayîn li ber çavan bêne girtin. Kurdîtî bi xwe kirine tiştekî pênc pereyan nake. Ne tenê ev, kî pihînekê li vî tiştî bide, sîstem xwedî lê derdikeve û ji bo bêhtir karibe bijî hukim dide. Tu çiqasî rastiya xwe ya civakî înkar bikî û piçûk bibînî, di nava sîstema neteweya serdest de ewqasî dibî xwedî paşeroj, dibî xwedî kar û şensê te yê mezinbûnê mumkîn dibe. Ev rewş sîstematîk e, û ji bo tevahiya nirxên civakî yên Kurd bi vî rengî ye. Li ku Kurdekî derketibe pêş, pereyê wî zêde û ji karê xwe piştrast hebe, ew Kurd ji sedî sed li dijî civaka xwe di nava hîleyê de ye, yan jî bi zanebûn hewl dide xwe înkar bike, ji xwe bireve û xwe xerîb bike. Herçiqasî di van demên dawiyê de hin fîgurên Kurd bi etîketa neteweyî bêne pêşkêşkirin jî divê mirov baş zanibe ku têkiliya van hemûyan ji nêz ve bi berjewendiyên global ên hegemonya kapîtalîst re hene.

Di serî de fethên Ereb, Tirk û Farsan, tevî hemû fetihkarî, mêtingerî û asîmîlekariya hêzên serwer, civakbûyîna orîjînên Kurd ên serdema navîn bi pêş dikeve. Hem civaka qebîleyî, hem jî civaka cemaetî li ser xeta civaka qewmî xwe pêşde dibirin. Pirsgirêkên derdiketin holê, pirsgirêkên çavkaniya xwe hiyerarşî, desthilatdarî û dewlet bûn û ev pirsgirêk ji bo tevahiya civakan mewzûbehs bûn. Mirov dikare bibêje, dema ku civaka Kurd di serdema navîn de gav diavêtin, ji gelek civakên serdemê pêşdetir bû. Ji gelek pirsgirêkên xwe re çareseriyên weke yên her kesî didîtin, heta mirov dikare bibêje di çareserkirina pirsgirêkan de ji gelek civakan re pêşengî dikir. Tevî êrîş, dagirkerî, destavêtin û mêtingeriya fatihan gişan jî xweparastina civakê û têkoşîna ji bo jiyaneke azad bênavber dewam dikir. Bi vî awayî, pirsgirêkeke ciddî ya hebûnê û yan jî rewşeke koletiyê ya ji yên weke xwe gelekî cudabûyî nîne.

Di serdema kapîtalîzmê de ev rewş bi kok guherî ye. Ji ber ku gelê Kurd nikarîbû xwe li gorî pîvana kara herî zêde bi rêxistin bike, weke dewleta netewe xwe bi sazî bike û nikarîbû îndustriyalîzmê seferber bike, bi awayekî pirralî bi tevgerên mêtingehkirin, asîmîlasyon û

qirkirinê yên dewletên netewe yên serdest û yekdestdariyên kapîtalîst û hegemonên sîstemê yên li ser serê wan ên hêmanên li jor behskirî hemû pêk anî re rûbirû bû. Mirov vê rewşê nikare di sedsala 16. de bi mezinbûna sîstema hegemonîk a kapîtalîst re bi fetihkirina parêzemîna Emerîkayê, ne di sedsala 19. de bi dagirkirina Efrîkayê re, ne jî di sedsala 18. de bi mêtingehkirina Asyayê re bidin ber hev û qiyas bikin. Rastiya serdest a mohra xwe li jiyana civakî ya Kurd xistiye ji vê gelekî cudatir e. Rejîma hukim li Kurdan dike beriya her tiştî hebûneke bi navê Kurd qebûl nake, qebûl bike jî ji bo wê tine bike û di nava xwe de bihelîne xwe bi rêxistin kiriye, bahaneyên xwe yên hundir û derve yên xwe bisipêre wan bi girîngî bi sazî kirine, lewma rejîmeke tineker û îmhaker e ku timî bi taktîk û stratejiyên komplowarî tê meşandin. Ji sedsala 19. û pêve, bi guloka problematîk a her diçe mezin dibe û tevkujiyên li pey hev pêk tên, ji nû ve di nava pencên dijwar ên dewleta netewe de û bi fethan li talana kapîtalîst vedibe. Sîstemeke bi vî rengî mumkîn nîne bi qirkirinê bi encam nebe. Jixwe bûyerên diqewimin jî bi vî awayî ne.

Di modernîteya kapîtalîst de çawa ku bi giştî dibe, pirsgirêka Kurd jî hewl da xwe di aliyê ‘neteweyî’ de nîşan bide. Dema ku pirsgirêka Kurd tê gotin yekser pirsgirêka neteweyî tê bîra mirov û ev jî ji lêkolîneke berfireh wêdetir gotinek e ku li gorî konjonkturê hatiye kirin. Naveroka wê ya rastî ji nîşandana yekparebûna dîrokî-civakî nirxandineke gelekî dûr bû. Bi helwestekê hatibû kirin mirov digot qey hema hema da ku dost û cîran bibînin hatiye kirin. Ji danasînên rastî û çarçoveya teorîk gelekî dûr bû. Lê ya rast ev bû, ne bi tenê rastiya Kurd bi pirsgirêk bû, her tişt û her kesê bi pirsgirêka Kurd re pêwendîdar mîna ku bi pirsgirêk bûn. Kesekî xwe bi pirsgirêk his neke, nefikire tinebû. Bi awayekî bingehîn a bi pirsgirêk der barê naveroka rastiya heyî de bû; ango der barê nêzîkatiyên cuda yên çawabûn û çibûna xwezaya civakî ya Kurd de bû. Bêguman, dema ku her tişt û her kes bi pirsgirêk bê hesibandin, naveroka pirsgirêkê jî ji ber çavan wenda dibû, qîmeta lêkolîn û lêgerînan nedima.

Min bi xwe di bin berpirsiyariya xwe de timî weke meseleyeke bingehîn hewl da ji vê xeleka her li dora xwe dizîvire, derkevim. Li ser diyardeya Kurd bi zêdeyî demogojiya dihat kirin û ji awayê xuya dikir gelekî bêhtir giran bûbû, lewma serê pêşî diviyabû pirsgirêk bi xwe bihata zelalkirin, ew jî diyardeya Kurd bû û eşkerekirina aliyên wê yên xweser bû. Di destpêkê de bi gerdûnîbûna pirsgirêka neteweyî rabûm, nêzîkatiyên ku min hewl da di vî warî de nîşan bidim di demeke kin de bi nêzîkatiyeke din a gerdûnî, bi nêzîkatiya ‘Kurdistana Mêtingeh’ bi encam bûn. Lewma ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdistana mêtingeh rêçeteya rizgariyê teoriya demê ya populer teoriya ‘rizgariya neteweyî’ bû û dîsa pratîka wê ya populer ‘şerê rizgariya neteweyî’ bû. Bêguman bi van têgîn, teorî û kirinan pirraniya pirsgirêkên nava rastiyê hatibûn dîtin. Lê çawa di gelek bûyeran de mirov bi giştî nêzî dibe, di vê de jî bi awayekî giştî nêzîkbûnê wê bi xwe re şaşî û çewtî bianiya. Nexasim îhtîmala diyalogê di navbera muxatebên pirsgirêkê de, neçar dikir ku mirov bêhtir bi awayekî berbiçav nêzîk bibe. Ji salên 1990’î ve gelemperiya dinyayê ji modernîteyê dibihurî û bandorên postmodernîteyê xwe nîşan didan û ev rewş jî di vê

neçarkirinê de xwedî rol bû. Jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî, bi awayekî bingehîn bi xwe re jihevdeketina îdeolojiya lîberal jî dianî. Ji ber ku ya têk diçû û ji hev de diket ne sosyalîzm bû, mezhebê wê yê çepgir ê ji rêderketî û hişkfikrên wê bûn. Lewma mirov neçar dibû bêhtir bi awayekî berbiçav nêzî rastiyê bibe û ev jî ji nêz ve têkiliya xwe bi vê jihevdeketina çepgiriya lîberal re hebû. Di encamê de, çiqasî aliyên dogmatîk-pozîtîvîst ên di fêhmkirina rastiya Marksîst de dipişkivîn, derfet û îmkan çêdibûn ku mirov bi perspektîfa dîrokî, felsefî, hunerî û zanistî rahêje rastiya civakî û li ser bisekine. Nexasim derfet û îmkan çêdibû ku mirov bêhtir yekpare kapîtalîzmê di çarçoveya sêlingên distanê yên sereke de weke meyla kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyalîzmê de bixe ber lêpirsîn, lêkolîn û şîroveyê, bêguman ev jî di qada zanista civakî de bi qasî rêvekirina li qonaxeke nû girîng bû. Li ser vî bingehî ya di zanista civakî de diqewimî û pêk dihat şoreş bû. Ya rastî, derdiket holê ku Marksîzma xwe herî zêde zanista civakî hesibandibû û weke sosyalîzma zanistî raxistibû pêş çavan, nikarîbûye xwe ji zêhniyeta dogmatîk û metafizîka pozîtîvîst qut bike.

Dema mirov bi vê perspektîfa nû ya zanista civakî (bi paradîgma) li rastiya Kurd û avahiyên bi pirsgirêk ên di nava wê de binêre, dikare her tiştî bêhtir yekpare û berbiçav şîrove bike. Mirov hay jê çêdibû ku nêzîkatiyên mutleq xwedî xisletên dogmatîk in, dîsa tehlûke hebû ku zêde berbiçavkirin jî rê li ber heman encamên dogmatîk veke. Di encamê de ji bo rastiya diyardeya Kurd a gelekî tevlîhev, parçebûyî û bi lez tê tinekirin û pirsgirêkên wê yên gelekî berfireh, yekpare û avabûnî yên ku rehên wan ên dîrokî hene, derfet û îmkan çêdibin mirov helwestên nêzî heqîqetê nîşan bide. Analîzên bêhtir berbiçav rê li ber çareseriyên bêhtir berbiçav ên ku nirxê wan ê bicihanînê bilindtir e, vedikir.

Sosyolojî û zanistên civakî yên modern ên ku bi fonksiyona normkirin û rewakirina hêmanên modernîteya kapîtalîst erkdar in, berevajî îddîayan, di rahiştina rastiya civaka dîrokî de bi tenê dualîteyên serdema navîn ên weke reş-spî û qenc-xirab ji nû ve çêkirin û ji vê wêdetir jî tiştek pêk neanîbûn. Li ser xeta dewleta netewe bi tenê jî pêkan bû ku rastiya civaka dîrokî bi giranî bi erdê re bikin yek. Heta, mirov dikare bibêje, xwe sipartibûn metafizîka serkorî ya ji afirandina fikrê û hestan mehrûm. Jixwe di qonaxa dawî de derket holê ku ji afirandina faşîzmê bêhtir ti encama dewleta netewe tineye. Ne jiyaneke biyolojîk, ne jî jiyaneke civakî ya xwe bisipêre îndustriyalîzmê hebû. Modernîte ji van hêmanên ku zanistên wê ew gelekî kiribûn norm û rewa kiribûn pêk dihat û jê bêhtir ne tiştekî din bû.

Dema ku mirov hûrûkûr li ser pirsgirêka Kurd radiwestiya, mirov didît ku nirxandinên weke pirsgirêk û çareseriya wê dihatin pêşkêşkirin bi xwe bi pirsgirêk bûn. Di bingehê pirsgirêka Kurd de hêmanên modernîteya kapîtalîst bi xwe hebûn. Ji lewra mirov xwe bisiparta van hêmanan û analîz bikirana û li gorî wan çareseriya pratîk bianiya wê ji xwexapandinê bêhtir bi kêra tiştekî nehatana. Bi awayekî gerdûnî di vî alî de diyalektîkên pirsgirêk-çareseriyê li pêş çavan hebûn û

di encamê de van hemûyan krîza fînans-kapîtala global a her diçû kûr dibû û çaresernekirina wê piştrast dikirin. Li Rojhilata Navîn dewletên netewe yên ku modernîteyê rê li ber wan vekiribû pirsgirêkên wan ber bi roja me ya îro bi herêmeke tam kaotîk û civakeke bi krîz bi encam bû. Îdeolojiyên dewletdarî û milliyetgirî û hewldanên ji bo bisazîkirina wan ji Afganistanê heta bi Lubnanê, ji Çeçenistanê heta bi Yemenê li gelek welatan naverast kir gola xwînê. Dewleta netewe ya Iraqa Sunnî ku di navika van herdu xetan de cih digire, bi rewşa xwe ya berbiçav mîna ku bi belgefilmekî trajîk têkçûna şaristaniya rêûresmê û şaristaniya kapîtalîzmê nîşan bide, îşaret bi rastiyeke berbiçav a pirr xwînrij û bi êş dikir.

Bi tevahî hêmanên min hewl da di çarçoveya rastiya Kurd de analîz bikim, di şert û mercên modernîteyê de neketin pêvajoya netewebûyînê, berevajî ketin pêvajoya derketina ji netewebûyînê. Lewma ji pirsgirêka neteweyî ya Kurd zêdetir, pirsgirêka nebûna netewe bêhtir giraniya xwe nîşan da. Bi ti awayî dayikniştiman nedibû welatê neteweyî, berevajî weke welatê dewleta neteweyê serdest dihat nîşandan. Yanî mekanê bingehîn ê netewe ji dayiknîştimantiyê dihat derxistin û weke welatê neteweyên din dihat nirxandin. Hebûna neteweyî bi xwe hê nebûbû Kurd û neteweya Kurd hê pêk nehatibû, hewl didan di nava neteweya serdest de bihelînin. Ji aliyê çandên dewletên neteweyên serdest ên Ereb, Tirk û Fars ve dikirin eşya, dikirin mêtingeh û asîmîle dikirin. Ji bo vê jî bi tevahî hêmanên modernîteyê seferber dikirin. Di vê qonaxê de pirsgirêk gelekî giran dibû, ji ber ku derketina ji netewebûnê diket rojevê. Di modernîteyê de tebeqe û çînên civakî yên weke hêza çareseriya pirsgirêka neteweyî derdiketin holê, di nêzîkbûna li pirsgirêka Kurd de bi temamî di nava rewşeke nakok de bûn. Tebeqeya jor a ji rêûresmê çiqasî bûrjûwayî dibû, para ji kurtêlên dewletê bêhtir digirt û di berdêla vê de ji hevkartiyê wêdetir bi amûrtiya her cure îmha û înkarkeriya Kurd radibû. Tebeqebûna bûrjûwaya piçûk ji ber bêhêziya xwe û ji ber pêdiviya wan a bi kurtêlên dewletê, ji hêmanên demagojîk ên pirsgirêkê wêdetir bi roleke din ranedibû. Bi vî awayî, herdu hêzên modern jî nikarîbûn bibin hêmanên pirsgirêkê çareser dikin. Beşên mayî yên pirranî bêkar, nîv-proleter û kedkarên din bi awayekî objektîf dibûn hêza bingehîn a çareseriya pirsgirêka Kurd. Di vê çarçoveyê de pirsgirêka Kurd bi awayekî bingehîn nedibû pirsgirêkeke bûrjûwayê, dibû pirsgirêka civaka kedkar.

Ji bo netewebûyînê hewcedarî bi îradeya siyasî heye û her cara ji bo vê piçûk be jî serî hatibe rakirin bi awayekî bêrehm hatiye pelixandin. Ev bi sloganên berevajîkirinê yên weke ‘yekîtî û yekparetiya dewletê têk dibin’ meşandin û ji bo civakekê çanda siyasî demokratîk a bivênevê pêwîst e, mohra ‘cudakarî’ û ‘cihêkariyê’ lê dan û bi kirinên heta bigihîjin qirkirinê, ser wan girtin. Civakek bêyî pêdiviyên maddî nikare li ser piyan bimîne, lewma tevahiya qada ekonomîk kirin kontrola xwe û ev weke amûrê civakê ji neteweyê ekonomî derxe, bikaranîn. Ekonomî bi xwe kirin amûra nebûna netewe ya herî girîng. Der barê nasnameya Kurd de îmkan nedidan ti belgeya huqûqî û statuyê. Nasnameya Kurd dema hewl dida bibe netewe, li ser wê bêhuqûqî û neqanûnîbûn dihat ferzkirin û bi vî awayî tine dihat hesibandin; bi nasnameyeke ti têkiliya xwe

bi huqûqê re tine, bênav û bêterîf mehkûm dikirin. Ji çil mîlyonî zêdetir hebûneke civakî di huqûqa neteweyî û navneteweyî de bi hukmê tine dihat hesibandin. Di netewebûnê de perwerde yek ji amûrê herî girîng ê modernîteyê bû, lê Kurd di çarçoveya nasnameya xwe ya dîrokî û civakî de hê di dema dibistana baxçeyê zarokan de bi sîstema perwerdeya înkarker a neteweyên serdest ji nasnameya xwe dihatin qutkirin. Amûra civakbûnê ya jêre perwerde tê gotin, kirin amûra pê Kurd ji nasnameya xwe û civakbûna xwe bigerin. Perwerdeya bi zimanê dayikê li pirraniya parçeyan qedexe ye, û zimanên neteweyên serwer li şûna zimanê dayikê ferz dikin; zimanê dayikê li şûna ku bi rola civakbûnê rabe û di vê çarçoveyê de bi kêr bê, dibe amûra reva ji civakbûnê. Kurdîtî weke zêhniyeta çandî li şûna ku hebûna Kurd bîne bîra Kurdan, dikirin nîşaneya teslîmbûna li çanda neteweyê serdest.

Mînak, mirov dema asta netewebûyîna gelên Efrîkayê bi gelê Kurd re bide ber hev, mirov ê bibîne gelê Kurd ji gelên Efrîkayê gelekî paşve hatiye hiştin. Bêguman têkiliya vê yekê bi cudabûna dewletên netewe re yên ku modernîteya kapîtalîst pêk tînin, heye. Kurd hêmanên modernîteyê bi îradeya xwe pêk nayînin. Yên pêk tînin dewletên netewe yên serdest in. Dema ku wisa dibe, ev dewlet di bin serweriya xwe de mafê netewebûyînê nadin rastiya Kurd û ji bo Kurdan rejîmeke faşîst a taybet ji sedî sed pêk tînin, çerxên îmha û înkarê timî digerînin. Di encamê de pirsgirêka derdikeve holê ew e, Kurd ji netewebûyînê derdikevin û nikarin bibin netewe.

Pirsgirêka Kurd xwe ji gelek aliyan ve, bi xisletên cuda di şertên zeman û mekan de nîşan dide. Bi qasî van xisletên wan ên sereke yên bi şertên zeman û mekan ve girêdayî, herweha xisletên wan ên cuda û taybet jî hene. Em hewl bidin wan jî berbiçav bikin.

**a-** Rastiya Kurd û Kurdistana di bin serdestiya dewleta netewe ya Tirk de ji destpêkê ve pêkhatin û şêwazê heyîna wê bi rejîmeke hişk a îmhaker û înkarker re rûbirû ye. Bi awayekî xwezayî, ev rewş dihêle ku rastî ji destpêkê ve bi pirsgirêkên giran seqet bibe. Bi demê re hêmanên nasnameya xwe ji dest dide. Sîstema dewleta netewe ya Tirk, rastiya Kurd berî ku bibe netewe ji netewebûyînê, ya rastî ji bûyîna netewe dûr dike, li ser ferz dike ku xwe red û înkar bike. Ev rewş ji pirsgirêkbûnê wêdetir rastiyekê îfade dike, hûn ji kîjan alî ve li mijarê dinêrin binêrin, rejîmeke qirkirinê ya nav lê nehatiye kirin îfade dike. Rejîmeke qirkirinê ya ser wê hatiye girtin, bi dizî û bi awayekî cuda tê meşandin heye. Ji qirkirina Ermenî û Helenan cuda tê kirin. Ev gelên navbihurî bi awayekî eşkere hatin tesfiyekirin. Lê Kurd bi rêbazên hîle, bi pirr xayînan, bi hevkaran, bi zorê, bi bêkarî, bi birçîhiştinê û êşkenceyê, li ser bingehê bi dizî û sergirtî têne tesfiyekirin. Pirsgirêk ne pirsgirêkeke netewebûyînê ye, pirsgirêka bêbandorkirina rê û rêbazên tinekirinê ye. Bi awayekî xwezayî, bivênevê navê rawestandina vê pêvajoyê dibe; tevgera Kurdan a ji bo hebûn û azadbûnê. Her çi rêbazeke din, nexasim bûrjûwayên lîberal ên sextekar, rêbazên bûrjûwaziyên piçûk ên xwe zîrek dihesibînin, xwe milliyetgir û çepgir qebûl dikin,

nikarin pêvajoya îmha û înkarê rawestînin, xwedî wê hêzê nînin ku têgîn û pratîkên wê bi pêş bixin. Li hemberî rejîmên bi vî rengî pirsgirêka hebûnê heye. Çareseriya wê jî şerê ji bo hebûnê ye, û li gorî xwezaya wê hêza jiyana azad e.

**b-** Rastiya Kurd û Kurdistana di bin serdestiya dewleta netewe ya Îranê de ji aliyê rewşa hebûna xwe ve ji modela dewleta netewe ya Tirk pirr cuda nîne. Cudatî, ji cudatiya moderniteyan tê. Ji ber serhatiyên cuda yên rastiyên dîrokî û civakî di modelên pêkanînê de rê li ber şêweyên cuda yên pêkanînê vedibe. Mîrateya desthilatdariyê ya herdu jî xwe disipêrinê ji serdema navîn ve bi Peymana Qesrî Şîrîn a 1639’an bi awayekî fermî Kurd parçe kirine, bêhêz hiştine, bi moderniteyê re li hemberî serîrakirinên Kurdan bi hev re tevgeriyane, bi vî awayî rê li ber rejîmeke hevpar a îmha û înkarê vekirine. Di navbera herduyan de li ser hîmê sînoran dixwazin pirsgirêka Kurd li gorî xwe çareser bikin û ji bo vê jî bi hev re tevdigerin. Roja me ya îro, hevgirtina antî-Kurd a di navbera dewletên netewe yên Tirk û Îranê de vê rastiya dîrokî piştrast dike.

**c-** Rastiya Kurd û Kurdistanê ya di bin serdestiya dewleta netewe ya Iraqê de hinekî rêyeke cuda şopandiye. Di vê de hegemonya Ingilîz diyarker e. Ji ber ku dewleta netewe ya Ereb dereng û qels pêk hatiye, Kurdan jî keysa xwe lê aniye hebûna xwe ya neteweyî hinekî pêşde bibin. Rejîm çiqasî hişk û tund bûye, berxwedana Kurdan jî ewqasî hişk û tund bûye. Ev hişkbûn û tundbûna li beramberî hevdu çiqasî dewam kir, ji bo Kurdan pêvajoyeke ku ji aliyê tinebûnê bêhtir aliyê wê yê hebûnê xurt bike, bi pêş ketiye. Di dema dawî de bi avabûna hegemonya Emerîkayê re şensê Kurdan çêbûye dewletokek neteweyî ya bi karektera federe ava bikin. Lê ev şens ji aliyê dewletên netewe yên cîran ve, heta ji aliyê dewleta netewe ya navendî ya Iraqê ve timî wê weke tehlûke û gef bê dîtin û kengî keysa xwe lê bînin armanca wan tesfiyeya wê ye. Di herdu rewşan de jî derî li netewebûnê û derketina ji netewebûnê vekiriye. Bi vî awayî, pirsgirêkên Kurdên Iraqê yên hebûn û jiyana azad dewam dikin.

**d-** Kurdên di bin serdestiya dewleta netewe ya Sûrî de, ji helandina wan a di nava sîstemê de zêdetir li derve hiştina wan rê li ber pirsgirêkan vedike. Beşekî Kurdan bi hukmê tine ne têne qebûlkirin. Kembera Erebî ya li ser sînor bi armanca Kurdan demeke dirêj bihelîne hatiye danîn. Sînorên hegemonya Ingilîz û Franseyê piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn danîn ji bo Kurdan duyemîn parçebûna mezin bû. Armanc ew bû, bi hegemonya Tirk re li ser bingehê berjewendiyên hevpar Kurdan tesfiye bikin. Ji bo Kurdan ev parçebûn derba herî xedar bû ku ji moderniteya kapîtalîst xwaribûn. Ji ber ku bi vê derbê pêşî li netewebûna Kurdan digirtin û pêşî lê vedikirin da ku ji netewebûnê derkevin. Nexasim hegemonyadariya Ingilîz ji bo berjewendiyên xwe rêbazeke li cih didît ku li Rojhilata Navîn Kurdan timî weke pirsgirêk bihêle. Problematîk bi xwe ava dikirin û ji bo mayîndebûna sîstemê weke destik û palpiştên sereke radigirtin.

Weke encam em dikarin bibêjin, pirsgirêka Kurd bi parçebûna dayiknîştimana wan û înkara wan, bi dabeşbûneke kûr a rastiya wan a civakî û derketina wan a ji xwebûnê, bi berbendkirina

îradeya wan a siyasî, bi sedema ku neçar hatin hiştin li hemberî rêbazên dewletên îmhaker û înkarker stûyê xwe xwar bikin, bi sedema ku kirin, di berdêla tedarikkirina pêdiviyên xwe yên ekonomîk de dev ji nasnameya xwe berdin, bi sedema ku firsend nedan wan û nehiştin statuya qanûnî ya nasnameya wan a xwe bisipêre hebûneke çandî û îdeolojîk, bi sedema ku ji amûr û pêkanînên hemdem ên perwerdeyê mehrûm hatin hiştin û tevî hemû kirinên di van qadan de, hebûn û nasnameya wan tine hat hesibandin, û bi awayekî azad nikarîbûn bijîn. Ev hemû dibûn pirsgirêk û weke rastiya pirsgirêka Kurd derdiketin holê. Bi gotineke din, pirsgirêka Kurd pirsgirêkeke neteweyî nîne, pirsgirêk ji netewebûnê derketin e.

Ji ber ku parçebûn domdar e, û her ku diçe li ser her parçeyî rejîmên înkarker û îmhaker bi hêz dibin, pirsgirêk ji pirsgirêkbûna netewebûyînê derdikeve, dibe pirsgirêka dewamkirina hebûnê. Herçiqasî tinekirina fizîkî bi temamî negihîştibe asta jiholêrakirina hebûnê û weke rêbaza bingehîn nehatibe meşandin jî qirkirina di asta çandî de timî hatiye meşandin. Ermenî û Cihû bi awayekî fizîkî hatin qirkirin, lê li ser Kurdan ev rêbaz yekser nehat meşandin û vê jî pêvajo bi êştir û bi elemtir kir. Eşkere ye ku dema mirov van hêmanan hemûyan li ber çavan bigire, bêhtir rast e ku mirov ji pirsgirêka Kurd zêdetir behsa girêka kor a Kurd bike. Çawa ku Skender girêka kor a Gordîonê bi şûr ji hev vekir û vê yekê fetihkirina tevahiya Asyayê mumkîn kir, vekirina girêka kor a Kurd jî di serî de Rojhilata Navîn wê şens bide tevahiya civakan ji bo fetihkirina demokratîk û jiyana azad.

**B- DÎROKA TEVGERA KURD**

Tevgerên civakî bûyerên bi bîreweriyê re pêwendîdar in. Tevgerên xweber bi xwe jî bîrbirineke paşvemayî nebin, pêkan nîne pêk bên. Kengî mijar dibe civak, bîrbirin û objektîvîte bêhtir xweser dibin. Di çarçoveyeke gerdûnî de ya tevgerê mumkîn dike, hebûna em jêre dibêjin enerjî ye ku bi awayekî diyalektîkî ji rewşekê vediguhere rewşeke din. Enerjî bi xwe mûammayek e, ango rewşek e ku hê diyar nebûye; lê em pê dizanin ku bi veguherînê tevgerê, ya rastî pêkhatinê pêk tîne. Dîsa em dizanin ku bêyî zeman û mekan tevger nikare bibe. Mûammaya jêre enerjî tê gotin, kengî di nava demê de bi lez dibe, di nava mekan de ji qonaxan dibihure, tevger pêk tê. Ev jî tê maneya pêkhatin û heyînê. Dema ku em bûyerên ji teqîna mezin a pêşî (big bang) ya tê îdeakirin pêk hatiye, heta bi civaka mirovî şîrove bikin, em ê bibînin ku yên têne ziman ji rewşên cuda yên enerjiyê bêhtir tiştekî din nînin. Gerdûn xwe bi xwe bi rêya enerjîk ava dike. Ji fizîkê heta biyolojiyê zanistan di vê mijarê de danasînên girîng ên zanistî kirine, bi pêş xistine. Enerjî vediguhere maddeyê. Têkiliya van xusûsên ku em behsa wan dikin hemûyan bi vê veguherînê re hene. Ji bo zanist mumkîn bibe, bi kêmanî bi zêhniyet û rêbaza Rojavayî, divê obje û sûbje ji hev bêne cihêkirin. Sîstema şaristaniya Rojava bi xwe ji nêz ve têkiliya xwe bi pêşketinên zanistî yên xwe disipêrin cihêkirina obje û sûbjeyê hene. Dîroka modernîteya kapîtalîst xwe sipartiye rêbazên zanistî û zêhniyeta wê ya cihêkirina obje-sûbjeyê û ev weke ji sedî sed rêyeke heqîqetê

qebûl kiriye û xwe pê kiriye hêza hegemonîk. Eger modernîteya kapîtalîst hûrûkûr li ser jihevcihêkirina obje-sûbjeyê weke bîrbirin û pêkanînê nesekine, nikare hegemonya modernîteya kapîtalîst pêk bîne. Lewma gelekî girîng e ku mirov tevgerên pişta xwe didin jihevcihêkirina obje-sûbjeyê bixe ber lêkolînê.

Civakên dema neolîtîkê û yên beriya wê, pirsgirêkeke wan a obje-sûbjeyê tineye. Hîmê vê cihêbûnê bi pêşdeçûna şaristaniya bajarî, çînî û dewletdarî hatiye danîn. Em dizanin ku rahibên şaristaniya Sumerê ku şaristaniya pêşî ye, di çarçoveya xweda û evdên wan de cara pêşî obje û sûbje ji hev cihê kirine. Bi xwe têgînên xweda û evd xwe disipêrin hukmê bajêr li ser gund, hukmê çîna jor li ser a jêr, hukmê dewletê li ser civakê û li ser yekdestdariyê pêk tîne û nirxê zêde desteser dike. Şêweyê mîtolojîk ê destpêkê yê cihêkirina obje û sûbje ye. Di vê rewşê de mîtolojî dibe şêweyê pêşî yê zanist an jî bîrbirinê yê xwe disipêre cihêkirina obje û sûbjeyê. Di çanda Rojhilata Navîn de şêweyê bîrbirinê yê rêûresma pêxembertiyê ku weke reaksiyoneke li dijî mîtolojiya Sumer û Misrê derket holê, têgînên evd û xwedê, cihêkirina obje û sûbjeyê bêhtir pêşde birin. Li vir xwedê kirdar û evd jî obje ye. Lê ji mîtolojiyê cudatir evdîtî hinekî hatiye nermkirin; hindik be jî derfeta tevgerê dane mirovê kole ye.

Rêûresma Zerdeşt li ber evdîtiyê serî radike, têgîna xwedê dixe ber lêpirsînê û hewl dide cihêkirina hişk a obje û sûbje bi dawî bike. Bi sînor be jî hinekî xwe nêzî têgîna mirovê azad dike. Li vir, mirov bêyî ku hewcedarî xwedê bibe, bi exlaqê azadiyê dikare tevbigere. Rêûresma Zerdeştiyê di çanda Îon de tê pêşdebirin û bi vî awayî çanda felsefeya serbixwe pêk tê. Mirov bi xwe dibe kirdar û xwezayê weke obje nîşan didin. Li şûna xweda-evd obje-sûbje, dualîteya kirdar mirov-ojbe xweza tê danîn. Di serdema navîn de dîsa li dualîteya xweda-evd obje-sûbjeyê vedigerin û felsefeya vê tê pêşdebirin. Di Xiristiyantî û Îslamiyetê de dualîteya xweda-evd bi awayekî dînê felsefî tê pêşkêşkirin.

Li Ewrûpaya Rojava cihêkirina obje-sûbjeyê (Descartes, Spinoza) hat pêşdebirin. Li vir bûyer ev e, bi awayekî rewşa nîvçemayî ya obje-sûbjeyê di serdema destpêkê û navîn de tê temamkirin û herî zêde tê bi hêzkirin. Hersê rewşên xwezayê fizîk, biyolojî û civakê dikin obje, mirov dixin şûna xwedê û bi vî awayî mirov dikin kirdarekî temam. Ev şoreşa zêhniyetê pêşî li modernîteya demokratîk vedike û wê rewa dike. Sûbjektîvîteya mutleq a mirov û objektîvîteya mutleq a xwezayê rê dide sîstema kapîtalîzmê da ku bibe hegemon. Di ti serdema şaristaniyê de ji kapîtalîzmê re bi vî awayî rê û şens nehatiye dayîn û ev jî bi têkiliya wekhevkirinê ya di navbera sûbjektîvîteya mutleq a mirov û objektîvîteya mutleq a xwezayê de pêk tê. Di vê dualîteyê de mirov bi temamî bi rola xwedê radibe. Xweza jî bi hersê şêweyan jî bi temamî di xizmeta mirov-xwedê de obje ye. Bêguman kirdarê mutleq di dawiyê de dewleta netewe ye ku di asta herî jor de yekîtiya sê hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst îfade dike. Bi felsefeya Hegel mirovê kirdar derdikeve asta herî jor û kengî bi dewleta netewe li şûna xwedê tê danîn pêvajoya xwe

temam dike. Serhatiya ruhê mutleq bi mirovê herî azad ê bîrbir ê dewleta netewe weke xwedatiya nû temam dibe. Kengî dewleta netewe bi tevahiya aliyên xwe yên dîrokî û civakî hat analîzkirin wê bê dîtin ku xwedatiya herî pêşdebirî ye, û welatî jî evdê wê yê herî pêşdebirî ye. Ya rastî, di dîroka şaristaniyê de rewşa kirdarbûnê ya îdeolojiyên xwedatiyê, di dewleta netewe de xwedatiya herî bi hêzkirî îfade dike, îdeolojiya evdîtiya objetiyê jî bi evdîtiya welatî xwe îfade dike.

Xwedatiya dewleta netewe di dema Şerê Cîhanê Yê Duyemîn de bi şexsê Hîtler temsîla xwe ya xwedatiyê kir û piştre jî ji kuştina zêdetirî pêncî mîlyon mirovî berpirsiyar hat dîtin û xistin ber lêpirsînê. Ya rastî, di dema mezinbûna wî de hin fîlozofên mîna Nietzsche ew bi tehlûke dîtibûn û rexne lê girtibûn. Di duyemîn nîvê sedsala 20. de maskeya wî ketibû xwarê û bi vî awayî derketibû holê ku xwedayê herî kujer e. Jihevderxistina wî û jihevdeketina wî bi hev re meşiyan. Di salên 1970'î de dewleta netewe ya di dema xwe ya herî xweş de bû dest pê kir ji hev de ket û ev jî vê rastiyê îfade dike. Lewma lingê distanê yê herî bi hêz ê modernîteya kapîtalîst çiqasî ji hev de ket ewqasî jî bivênevê sîstem ji hev de ket. Piştî salên 1970'î herî dawî xwe avêt bextê xwedatiya pereyê Serdema Kapîtala Fînansê, lê ev yek dihat wê maneyê ku jihevdeketin bi leztir dibe. Weke xwedayê şer maskeya wî çiqasî dihat xwarê, bêhtir eşkere dibû ku weke xwedayê pereyan xwedatiya wî çiqasî kirêt e, dijminê mirov û xwezayê ye. Ew hêzek e ku piştrast bûye, bi rêbazên ferazî şelandinên di dîrokê de nedîtî dike, civakê hildiweşîne û talana hawîrdorê ya xweber pêk tîne. Bûye hêza ferazî û divê ev weke xulaseyeke stûr a dîroka şaristaniyê were şîrovekirin. Bi tevahî xwedatiyên bi maske deşîfre dibin, karekterên wan ên rastî li naverastê li pêş çavan têne raxistin.

Qada ku ev xwedatiya şaristaniyê lê meyiyaye qûntar û serê rêzeçiyayên Toros-Zagrosê ye. Di nava civaka neolîtîk de, lê bi awayekî mîna 'kurmê ji darê' dar dixwar û pê  çêdibû. Rêxistina bajar, çîn û dewleta li deştên Mezopotmayayê serdema wê ya rastî ya ciwanî û gihiştinê bû. Şaristaniya Ewrûpaya Rojava jî serdema wê ya yextiyarî û mirinê bû.

Weke welat Kurdistan û weke civak jî Kurd, ji vê xwedatiya di serdema mirinê de ku ji nava erd û civaka wan derket û pêşdeçû, ezabekî herî bi qehr û êş dikişînin. Kengî mirov hêmanên modernîteya kapîtalîst weke rewşên yextiyarî û mirinê yê xwedayê şaristaniyê şîrove bike, wê rastî bêhtir berbiçav bibe. Di rastiya modernîteya kapîtalîst a weke sûbjektîvîte û rastiya Kurd û Kurdistanê weke objektîvîte de, gewixandineke li ti devera dinyayê nehatiye dîtin pêk tê. Çawa ku di gelek şoreşên mezin de hatiye dîtin, mîna ku tevahiya dîrokê careke din vejiyaye, bi hunerên xwe hemûyan şer dike. Bi vî şerî re ya hildiweşe û ji hev de dikeve bi tenê dewleta netewe, qanûna kara herî zêde, sêlingên distanê îndustriyalîzm û 'sêla sor' nîne; cihêkirina obje-sûbje jî hildiweşe. Ev parçebûna têgînê xulaseya xulase ya şoreşê ye. Kengî ev têgîn ji holê rabe şoreş ê pêk bê. Mezinbûn, hişkbûn (dogmatîkbûn) û jihevdeketina îdeolojiya obje-sûbje, bi

kêmanî ji bo sîstemeke mêtinkar û xwînrij a temenê wê ji pênc hezar salan bêhtir e, pêk hat. Ev sîstem li ser dîroka mirovatiyê bi temamî bi rola kabûsê rabû. Mirovatî ji vê kabûsê hino hino nû hişyar dibe. Weke mirov û welatê azad tevgera hişyarbûna Kurd û Kurdistanê hêviyê dide.

Orîjînên Kurd ên şoreşa neolîtîkê li qûntar û rêzeçiyayên Toros-Zagrosê pêk anîn, cihêkirina obje-sûbjeyê nas nedikirin; cihêkirina kirdar-mirov û obje-xweza jî li cem wan tinebû. Jiyan bi heybet bû, weke mûcîzeyeke bi coş û boş manedar pêk dihat. Jiyan bi xwe weke serhatiyeke tijî mûcîze diherikî. Ango di vê demê de mirovatî bi awayê qebîleyan civakî dibe û bi awayekî azad tevger her tişt bû. Bi tenê tevger hebû, ew jî bi awayekî azad û serxweşker bû. Jiyan li dora jina dayik bi rêxistin dibû. Ango mûcîze dibûn malê jina dayik; di vê çarçoveyê de xwe digihandin xwedawendiyê. Bi hêza çor a mil û destan xwe nedigihandin rûmetbilindiya xwedawendîtiyê, qedirbilindiyeke zêhnî bû ku bi pêkanîna jiyanê û xwedîderketina li wê pêk dihat. Civaka neolîtîk bi dest, dil û zêhnê jina dayik pêk dihat. Li ser tevahiya vedîtin û keşfên bi cotkarî û heywan xwedîkirinê re têkildar mohra wê hebû. Bi derengî be jî xwedawenda bajarê pêşî Ûrûkê Înannayê li dijî mêrê desteserkar û xasûk Xweda Enkî şer dike bi sedema ku “104 vedîtinên wê” dizîne, û destana pêşî vê rastiyê îfade dike. Tevî ku bajarbûna pêşî ye, xwedawendek hê bajêr rêve dibe û li dijî xwedatiya mêr têdikoşe. Bêguman ev gelekî manedar e. Hêza çanda civakî ya jina dayik, tevgera wê û berxwedana wê li dijî şaristaniyê tîne ziman. Gelekî zehmet e ku mirov çanda jina dayik bi zêhniyeta roja me ya îro ya şaristaniya mêrê serwer şîrove bike. Ev çand rastiyek e ku bi hezarê salan dewam kiriye. Sîstema şaristaniya navendî ya ji pênc hezar salî zêdetir dom kiriye, timî weke sîstemeke serwer a mêr pêşde çû û ev vê rastiyê îspat dike. Çawa ku di xwezayê de dibe, di civakê de jî her tişt bi dijberê xwe pêşde diçe. Li gorî vê yekê, pêşdeçûna sîstema şaristaniyê bi serweriya mêr bi tenê bi hebûna sîstema jina dayik a xwedî erk tiştekî îfade dike.

Me destnîşankiribû ku dualîteya sûbje-obje pêşî di dema civaka Sumer de diyar bûye. Ji aliyê orîjînên Kurdan ve, maneya vê rastiyê şerekî dûvdirêj e, bi civaka qebîleyê re ya ku bi erka dayikê radibe. Bi rastî, tevahiya şaristaniya Sumerê, komên qebîleyan ên li rêzeçiyayên Toros-Zagrosan xwedî jiyaneke neolîtîk bûn, timî li dijî vê şaristaniyê di nava liv û tevgerê de bûn. Çawa ku sosyolojiya Rojava îddîa dike, qebîle bi tenê yekîtiyeke li ser xwîn û xizimtiyê ava nebûye, komek e ku li dijî şaristaniyê xwe disipêre xweparastin, hilberandin û xwezêdekirinê. Ev pêvajoya di salên 5000-4000’î B.Z. de dest pê kir heta roja me ya îro dewam kir. Tevî ku hêzên hiyerarşîk û hêzên bi şaristaniyê re hevkarî kirin ji nava wê derketin jî komên qebîleyan bi awayekî bingehîn karekterê xwe parastin. Ango qebîle di warê xweparastin, hilberîn û xwezêdekirinê de komên civakan ên herî kêrhatî ne. Di tevger û bîreweriya qebîleyê de ji cihêkirina obje-sûbjeyê wêdetir tevger û bîreweriya kominî ya ji rêûresmê giraniya xwe heye. Tevî pêngavên şaristaniyan ên li ber serê wan, qebîleyan ev tevger û bîrbirinên xwe yên kolektîf parastine û pêşde birine.

Hiyerarşî û hevkartiya bi şaristaniyê re çiqasî pêşde çû, çanda qebîleyê ji hev parçe bû, di nava tevger û bîrbirina qebîleyê de bivênevê cihêbûna obje-sûbjeyê pêk hat. Li dijî vê tevgera bîrbirinê ku hegemonya îdeolojîk a Sumer nîşan dide, tevî çanda dayika xwendawend a ji rêûresmê (Çanda Xwedawend Starê) tevgera baweriyê ya nûjenxwaz a Mazdayê bi pêş ket. Sîstema baweriyê ya Mazdaîk xwe disipêre dualîteya hêzên ronahî û tariyê. Ew bi xwe digihîje dualîteya diyalektîkê. Nîşan dide ku bîrewerî çêbûye di biwara tevgera diyalektîk tez-antîtezê de ya ku ji bo bûyînê hewce ye. Bi vî aliyê xwe, tevgerek e ku ji dualîteya xwedayê afirîner û evdê afirandî ya vedîtineke çor a mîtolojiya Sumer e, gelekî li pêştir e. Baweriya Mazdaîk bi xwe diyalektîka gerdûnî dike bingehê xwe. Bi îdeolojiya xwedayê afirîner û evdê afirandî evd-obje rastiya gerdûnî îfade nake û ji vê jî wêdetir di bîreweriya mirov de rê li ber berevajîkirinekê vekir ku sererastkirina wê gelekî zor e. Ev tevgera bîrbirinê ya mohra xwe li tevahiya dînan, nexasim jî li dînên yekxwedayî xistiye, bingehê tevgerên zêhniyetê yên xwe disipêrin cihêbûna obje-sûbje yên heta îro hatine, danîne. Tevî Taotiya li Çînê û hin şêweyên din ên li Hindistanê, şêweyê bîrbirinê yê Mazdaîk celebekî cuda yê zêhniyetê temsîl dike. Bi vê zêhniyetê li şûna dualîteya afirîner-afirandî, li pêşketina diyalektîkî ya xwe bi xwe pêk tîne, derî vedibe.

Tevger û bîreweriya Zerdeşt a dewama şêweyê bîr û baweriya Mazdaîk e, exlaqê mirovê azad mumkîn dike. Baweriya Zerdeşt şêweyê bîr û tevgera pêşî ye ku xwedayê afirîner xistiye ber lêpirsînê. Banga “bêje tu kî yî?” ya ji rêûresma Zerdeşt gihiştiye îro, cewherê wê felsefeyê pêk tîne ku xwedayê afirîner dixe ber lêpirsînê. Şaristaniya Îonê vê felsefeyê ji Medan digire û bêhtir pêşde dibe. Ev felsefe bingehê şêweyê fikrê yê mohra xwe li serdema me dixe datîne. Bi pêşketina şêweyê fikrê yê diyalektîk ê ji xwedayan qut û xwe disipêre hêza mirov bi xwe, pêşî li mirovê azad dibe vedibe. Medan şaristaniya dawî ya Asûrê şikandin ku zalim bû û bi koka xwe ji şaristaniya Sumeran tê, û ev gaveke mezin a dîrokî ye. Medan li derdora sêsed salî tevgera bîrbirinê ya polîtîk û exlaqî meşandin û di şikandina wan a Asûran de ev hêmana bingehîn e. Dîsa ev bûyera dîrokî ye ku pêşî li şaristaniya Îonê vekiriye. Tiştekî xweber nîne ku van herdu tevgeran di salên 600’î B.Z. de mohra xwe li dîrokê daye, eger mirov bi carekê û bi hev ve girêdayî rahêje wan, dibe ku mirov bi awayekî rast li wan serwext bibe. Hêmanên Med-Kurdan di bin serweriya tevgerên Împaratoriya Pers û Sasaniyan de ketin dereceya duyemîn û bi vê re tevgerên bîrbirinê yên azad derb xwarin. Formên bîrbirinê yên eşîr û qebîleyên destpêkê jî xwe guvaştin ser hev. Bîr û baweriya Zerdeştî çiqasî bû amûrê împaratorîparastinê, ewqasî cewherê xwe yê azadîxwaziyê jî ji dest da û riziya. Rewşa em qala wê dikin heta serketina Skender (330 B.Z.) xwe nîşan daye. Felsefeya Îon a bi Arîsto herî zêde hatiye temsîlkirin bi vê serketinê diyarker bûye. Qonaxa şaristaniya Helenîstîk a paşê pêk hat (300 B.Z.-250 P.Z.), bi forma serketî ya bîrbirinê ya felsefeya Îonê ji nêz ve têkildar e. Di vê qonaxê de cara pêşî senteza Rojava-Rojhilat pêk hat. Lewma bîrbirina di vê qonaxê de mohra xwe li tevahiya şêweyên fikir û baweriyê xist. Eşkere ye ku mezinbûna Romayê û kulta împaratoriyê li ser şopa vê fikir û baweriyê pêşde çûye û manedar bûye.

Di vê demê de şaristaniyên Komagene (navenda wê Firata Jor), Abgar (navenda wê Ûrfa û Firata Navîn) û Palmyrayê (navenda wê Palmyra û Firata Jêr) ku ji nêz ve bi hêmanên Kurd re di nava têkiliyê de ne, heybeteke berbiçav îfade dikin. Hem li dijî Romayê li ber xwe didin, hem jî bi peymanên lihevkirinê yên serketî mezinkirina tevgerên bîrbirinê dewam dikin. Tevgera bîrbirinê ya Xiristiyan vê demê bi dawî dike.

Xiristiyantî li ser bingehê înkara yekemîn felsefeya rohnîbûnê (felsefeya Îonyayê) û neyênîkirina wê mezin bûye. Tevgereke bîrbirinê ya neyînî û nebextewar e; bîrbirina nebextewar a bêrehmiyên serweriya Romayê rê li ber vekiriye îfade dike. Tevî ku ji aliyê felsefeya rohnîbûnê ve paşketineke mezin îfade dike jî di çarçoveya tevgera kolektîf a xizanan de jî tê menaye pêşketineke mezin. Şêweyê pêşî yê bîrbirina çînî ya zû pêkhatî temsîl dike. Ji ber ku di salên 300'î P.Z. de vediguhere îdeolojiya împaratorî û begtiyê, vê xisleta xwe ji dest dide.

Piştî Zerdeştiyê Dînê Manî weke tevger û bîrbirina rohnîbûnê di salên 250'î P.Z. de li dijî sîstema şaristaniya hegemonîk weke nerazîbûnê derket holê û gelekî bi tesîr bûye. Eger ji aliyê împaratoriya Sasanî ve nehatibûya mehkûmkirin, belkî jî berî Ewrûpayê li Rojhilata Navîn rê li ber duyemîn tevgera rohnîbûnê vekira. Manî bi xwe felsefeya Îon, baweriya Xiristiyantiyê û rêûresma Zerdeştiyê sentez kir û bi vî awayî, reforma herî mezin a fikir û baweriya wê demê pêk anî. Ev tevgera ji peravên Dîcleyê dest pê kir, di demeke pirr kin de ji Romayê heta bi Geliyê Îndus belav bû. Lê ji ber ku rêûresma riziyayî ya împaratoriya Sasanî firsend nedayê û di sala 276'an P.Z. de Manî gurandin û darvekirin, ev bextê dîrokî reş bûye. Ya rastî, cihê heq kiriye negirtiye û mohra xwe li demê nexistiye.

Dema ku mirov rahibên Suryaniyan (bi rahibên Xiristiyan ên bi koka xwe Asûr) bi Manîgir û Zerdeştiyan re bide berhev mirov ê bibîne ji wan serketîtir in. Heta tevger û bîrbirina Îslamî bê, tevger û bîreweriya mohra xwe li herêmê xistiye, ya rahibên Suryaniyan e. Ji salên 300-600'î P.Z. ji Deryaspî heta bi nava Hindistan û Çînê tevgereke bi hêz a bîreweriyê bi pêş xistine û cemaetên Xiristiyan pêk anîne. Bîreweriya Kurd di vê demê de ne bi temamî ji Zerdeştiyê qut bûye, ne jî bi temamî Dînê Manî qebûl kiriye, ne jî pêşengên Suryanî pejirandine. Kurdan forma xwe ya bîreweriyê ya pêşî û marjînal parastiye. Îdeolojiya qebîleyê ya ji rêûresmê ku gelekî li dawiya demê maye, bi tenê dikare hebûna qebîleyan li ser piyan bigire. Ji lewra Kurd di vê demê de ji pêşketinên civakên bi koka xwe Ermenî û Asûrî yên di nava wan de paşve mane. Bîreweriya Xiristiyantiyê komên bi koka xwe Ermenî û Asûrî bêhtir pêşde dibe û wan dike gelên hevdugirtî û yekpare, lê formên bîreweriyê yên pêşî dike ku Kurd bêhtir di nava xwe de bimînin û bi tenê hebûna xwe biparêzin. Asêmayîna îdeolojîk li pêşiya pêşketina civakî bendan datîne û dibe sedema pêxîrtengiyê.

Ji pêxîrtengiya bîreweriyê ya serdema destpêkê bi Îslamiyetê gav hatiye avêtin. Piştî Cihûtî û Xiristiyantiyê di civaka Rojhilata Navîn de Îslam tevgereke şaxê dînî û dawî ya civakîbûyîn û

bîreweriya gerdûnî ye. Forma bîreweriya Îslamî herçiqasî xwe weke gelekî nûjenxwaz û wehiyeke xwedayî pêşkêş bike jî belkî jî forma bîreweriyê yê herî têkel û biserhevvekirî îfade dike. Di bingehê wê de tesîra tevahiya formên bîreweriyê heye. Ji anîmîzmê heta bi afirînerekî bi tenê yê mutleq, formên bîreweriyê hemû nîzameke têkel pêşkêş dikin. Nexasim formên mîtolojîk ên Sumer û Misrê bi rêya dînên Brahîmî xwedî tesîreke bi hêz in. Piştî formên mîtolojîk ên Cihûtî û Xiristiyantiyê versiyona sêyemîn e. Lê ne bi tenê şopên van versiyon û forman, bi giranî bandora felsefeyên Zerdeş û Eflatûn-Arîsto jî li ser heye. Divê mirov bandora dînên pagan (pûtperest) ên ji rêûresmê jî li van zêde bike. Yek ji sedemên bingehîn di belavbûna bi lez a Îslamiyetê de ew e ku xwe bi van formên bîreweriyê yên têkel pêşkêş kiriye. Her kom dikare li gorî xwe şîroveyekê bike û bipejirîne. Jixwe ya dibe jî ev bi xwe ye. Mîna ku ji her derdî re derman e.

Ev rewşa muxtelif a bîreweriya Îslamê di heman demê de qelsiya wê ya herî bingehîn e; ji ber ku wê ji xweseriyê mehrûm dike. Gerdûnîtiya pirr zêde xisletên beşan qels dike û kiriye ku bi tenê weke rîtuelên besît bimînin. Bi vî aliyê xwe, hem ji Cihûtiyê, hem jî ji Xiristiyantiyê bêbertir maye. Li şûna ku manedanê pêşde bibe, di vî warî de bibe forma pêşdebirina fikreke diyalektîkî, bûye kîsekî bîreweriyê yê cureyê çîrokê ku jihevbelavbûyî û bêserûber e. Di paşvemayîna civakên Îslamî de para van kîsên bîreweriyê mezin e. Di bîreweriya Cihûtî û Xiristiyantiyê de rewş cuda ye. Cihûtî ji xwedatiya xwe timî têgînan zêde dike û bi vî awayî serdestiya xwe ya îdeolojîk timî diparêze. Xiristiyantî bi rêxistintiya xwe ya şidandî ya dêrê cemaetên bêhtir berbiçav pêk tîne. Ji ber ku zêde girtî ye, derî li sekulerîzmê û laîsîzmê vedike. Ewrûpaya serdema navîn di bin bandora herdu dînan de li gorî diyalektîkê formên fikir û bîreweriya hem sekuler û hem jî laîk pêşde dibe û di vê de zehmetiyê nakişîne. Dogmatîzma hişk a di herdu dînan de, rê li ber tevgera modernîteya Ewrûpayê vekiriye. Bîreweriya dogmatîk ewqas bêmane dibe, bivênevê formên nû li ser bingehê dijberiyê derdikevin holê. Lê divê mirov ji bîr neke ku forma bîreweriyê yê herdu dînan di tevgera şaristaniya Ewrûpayê de bi rola diyarker rabûne. Naxwe em ê nikaribin tevgerên civakî û formên bîreweriyê yên modern ên Ewrûpayê fêhm û terîf bikin.

Îslamiyet li ser xeteke cuda meşiyaye. Ji bilî bawerî û fikrên têkel ên di nava wê de, gelek hêmanên sekulerîzm û laîktiyê jî dihewîne. Ji ber ku xwe hem weke dinê dinyewî hem jî yê uxrewî pêşkêş kiriye, ketiye nakokiyê û di nava xwe de xetimiye. Guftûgoyên felsefî yên di navbera sedsalên 9.-12. de ku mirov van sedsalan weke Ronesansa Îslamî jî dikare bi nav bike, mîna rohnîbûna Ewrûpayê bi kêra felsefeyê nehatine. Di vê çarçoveyê de forma îdeolojîk a dimîne, siya fîgura qralên xweda ne (Zîllûlah) ku ji dema Sumeran ve dewam dikin. Rejîmên mîrtî û siltantiyên despotîk ên xwe sipartina van fîguran, ji sedsala 12. ve heta roja me ya îro ji pêşkêşkirina bêhejmar mînakên desthilatdariyên keyfî û dogmatîzmên hişk wêdetir bi ti rolê ranebûne. Di van sedsalan de li Ewrûpayê, heta li Çînê bûyerên girîng diqewimin, lê herêma

sereke ya pêşketinên dîrokî mehkûmî pêvajoyeke paşvemayî bûye; bi sedsala 19. re li hemberî modernîteya kapîtalîst ji hev belav bûye û ji vê rizgar nebûye.

Di vê dema jihevbelavbûnê de herçiqasî xwestine ji nû ve bîreweriya Îslamê şîrove û ava bikin jî ev yek ji karektera reformeke rastî dûr e. Bi qasî Xiristiyantiyê jî nikarîbûye reformasyonekê pêk bîne. Ji ber ku şoreşên felsefî û zanistî jî nas nekirin, bivênevê ket pêvajoya jihevbelavbûn û hilweşînê. Ya rastî, lêgerînên nû yên Îslamî ji modernbûnê wêdetir ti maneyên xwe tinene û bi van hewl dide entegreyî kapîtalîzmê bibe. Herçî ji afirînerî û xweseriyê dûr e.

Herçiqasî komên Kurdan li beramberî Îslamê demeke dirêj li ber xwe dan jî, lê kengî tebeqeya wan a jor bi Îslamiyetê û bi rêya şîroveya wê ya Sunnî firsenda desthilatdariyê bi dest xist, veguherînên bi kok û bingehîn pêk hatin. Civakbûneke dualî pêk hat. Tebeqeya jor bi şoreşa feodal re civakên xwe yên begtiyê pirr zêde mezin kirin, lê tebeqeya jêr û beşên civakê yên çiya û baniyan, li dijî zordestiya desthilatdariyê û mêtinkariya wê bi awayekî xweparastinê xwe bi rêxistin kirin û ev jî bi rêya terîqet û mezheban pêk anîn, lewma bivênevê civakbûna wan jî di vê çarçoveyê de pêk hat. Formên cuda yên bîreweriya Îslamî ku dabeşbûna çînî xurt dikirin, xwe bi şêweyên terîqet û mezheban nîşan didan. Tebeqeya hiyerarşîk a jor, kengî ji bîreweriyên qebîle û eşîrê bihurî ket formên bîreweriya Îslama Sunnî û mezhebên wê yên cuda, lê tebeqeya jêr di serî de Elewîtî xwe bi şêweyên terîqetên tesewifî berbiçav dikir. Kurdîtiya begtiya Sunnî ji aliyekî ve xwe bi awayekî bi kêra tebeqeyên jêr neyê mezin dikir, ji aliyê din ve jî bi formên wan ên bîrbirinê re bi dijwarî pev diçû û şer dikir. Şer û pevçûna çînî xwe di bin perdeya dînî de dewam dikir. Li aliyê din, Kurdîtiya Elewî û tesewifî timûtim xwe vediguherand rêxistina siyasî û eskerî û bi vî awayî diket pozîsyona parastinê. Tevahiya civakê ji vê dabeşbûn û pevçûnê zirareke mezin didît û êş dikişand. Ji bo bidawîbûna vê rewşê hêviyên mirovan bi axretê ve girê didan, yan jî dihiştin ku ji rejîmeke qraltiyê ya bi hêz û hevgirtî hêvî bêne kirin. Li cem Kurdîtiya serdema navîn form û lêgerînên îdeolojîk ên di vî warî de wê her biçin bi hêz bibin.

Îdrîsî Bedlîsî (di sedsala 16. de) û Ehmedê Xanî (di sedsala 17. de) bi formên xwe yên bîrbirinê û lêgerînên xwe hewl didin di civaka Kurd de ji van bendewariyan re bibin bersiv. Li hemberî vê, kesekî bi navê Safiyuddîn ê ji binemaleke şêx û Kurd ji tevgera Şîî-Qizilbaş re pêşengiyê dike û di dawiyê de ev tevger bi desthilatdariyeke nû ya xanedaniyê bi Împaratoriya Safewî bi encam dibe. Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî (dawiya sedsala 16.) şîroveya qraltî û begtiya Kurd dike, terîqetên mîna Qadirîtî û Neqşîbendîtiyê jî civaka li derveyî desthilatdariyê mayî diparêzin. Tebeqeya jor a Kurd di navbera Safewî û Osmaniyan de ji xwe re li cihekî baş ê wan biparêze digere, lê Ehmedê Xanî çareya bi kok bi Qraltiyeke Mezin a Kurdistanê dibîne.

Di bîreweriya Îslamî ya Kurdan de pareke mezin a medreseyan heye. Hertim tebeqeyeke entelektuel a Kurd û bi hêz pêk hatiye. Pirraniya wan di qesrên Ereb, Fars û Tirkan de ji xwe re cih dîtine. Tevî ku têkiliya wan bi Kurdîtiyê re heye jî bi sedema karektera desthilatdariya li cem

in, bi sînor mane. Bîreweriya qebîle û eşîrê tevahiya serdema navîn hebûna xwe dewam kiriye. Qebîle û eşîrên ku pirr û mezin dibin, çavkaniya sereke ya Kurdîtiya begtî û terîqetê ne.

Bîreweriya Îslamî komên Kurd bextewar nekirine, bi qasî Xiristiyantiyê nikarîbûye civakê homojen bike. Bi qasî ku civak kiriye xwenenas, ewqasî jî veguherandiye gelek komên bi hêviya axretê radibin û rûdinin. Ji civakên xwenenas û parçebûyî hêviya berdariyê nayê kirin û avakirina wan ne pêkan e. Di serê sedsala 19. de bi bandora modernîteya kapîtalîst burokrasiya bi pêş dikeve, xwestina esker û bacan statuya serdema navîn a Kurdan xira dike. Begtiyên Kurdan û terîqetên wan ên tesewifî hewl didin statuya xwe biparêzin û ev jî bivênevê rê li ber şeran vedike, civaka ji rêûresmê dixe nava kaos û krîzên kûr.

**C- TEVGERÊN KURD ÊN HEMDEM**

Zanista civakî ya modernîteyê hewl da tevgerên civakî yên hemdem bi şîfreyên wan ên çînî û netewe terîf bike û ji bo vê jî teorî hatin çêkirin. Bi vî şêwazê pozîtîvîst şîrovekirina rastiyê di warê heqîqetê de pêşketineke girîng bû. Encamên wê di pratîkê de piştrast bûn û vê jî kir ku civaknas bêhtir ji xwe razî bibin. Bawer kirin ku rêbaza yekane ya rastiyê ev nêzîkatî ye. Her ku çû bêhtir di warê xwegihandina heqîqetê de bi rola vê rêbazê ewle bûn û ev veguherî baweriyeke hişk xwe pê bigirin. Li şûna zanistê zanistperestî bi cih kirin. Pozitivîzma îdea dikir ku ji dîn û metafizîkê bihuriye, bi xwe veguherî dîn û metafizîka materyalîst a herî çor û hişk. Hingê zanista civakî bi lez riziya û dejenere bû. Li aliyekî, di zanistên civakî de kategoriyên gerdûnî hatin avakirin û rastiya berbiçav hat înkarkirin, li aliyekî din jî di nava beşan de asê man û yekparebûna rastiyê li guhereke din hat hiştin. Dema bêhejmar şaxên zanistên civakî û lêkolînên beşan dest pê kir. Dil xwe de ji dogmatîzma serdema navîn rizgar dibûn, lê dogmatîzma modern kirin amûrekî welê ku gefan li jiyana civakî bixwe û bixe tehlûkeyê. Nexasim di warê heqîqeta civakî de teoriyên polîtîka ekonomiyê, dewleta netewe û îndustriyalîzmê civak serkorî kirin, meylên ji bo kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyel jî li ser civakê veguherîn mekanîzmeyên malwêrankirinê.

Tevgerên civakî yên hemdem ku bi tenê weke netewe û çîn destnîşan kirin, her yek ji wan di çarçoveyeke gerdûnî de ji jor ve bi heman rolê rabûn. Rastiyên mîna civakê çeprast û di zikhev de, bi awayekî heta dawiyê reduksiyonîst xistin nava qalibên çîn û neteweyan û hewl dan bi vî awayî wan bidin naskirin, teorîzekirin û bi cih bînin. Teorî û têgînên der barê milliyetgiriyê de diyardeya neteweyî kirin xwedayî, teorî û têgînên der barê sosyalîzma pêkhatî de diyardeya çînî kir kirdar an jî kir xweda. Li şûna ku wê ji fikra serdema navîn bibihuriyana, bi van şablonên teng û hişk ên reduksiyonîst, ketin nava dogmatîzmên mîna yên serdema navîn. Krîza modernîteyê ya ji destpêkê ve hebû û xisletên wê yên kaotîk bi vî awayî xwe di nava krîza zanistên civakî de nîşan da. Krîza sîstemê ya avabûnê û global a ji salên 1970'î ve zêde bû, bandora xwe li ser ekonomî, hawîrdor û desthilatdariyê da der û da hiskirin. Ekonomî di serdema hegemonya

fînansal de, di nava pencê sîstemeke şêlandinê de ku di dîrokê de hevtayê wê nehatiye dîtin, diperpitî û bi rizîna dewleta netewe re desthilatdarî bi temamî veguherî amûrekî manîpulasyonê. Jiyana îndustriyel li ser hawîrdor û avhewayê rê li ber felaketeke temam vekir. Zanistên civakî li beramberî van bûyeran bivênevê wê biketa krîzê. Di salên 1990'î de bi jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî re rûyê rastî yê lîberalîzma rastgir û ya çepgir bêhtir derket holê. Krîza hegemonya îdeolojîk a lîberal ku hêmanekî girîng ê krîza zanistên civakî ye, di vê demê de xwe baş dide hiskirin. Rêçeteyên postmodernîzmê ji bo çareserkirina krîzê bi tenê krîza zanistî û îdeolojîk a modernîteyê îspat dikin. Bi vî awayî, analîzên teorîk û çareseriyên pratîk ên neteweyî û çînî yên hemdem ji bo ji krîza sîstematîk a modernîteyê bibihurin ketin rewşekê nikarîbûn bi rola xwe ya berê rabin. Jixwe pêk bên jî, derket holê û hat fêhmkirin ku ji bo pirsgirêkên civakî yên çeprast û di zikhev de ne, utopyayên rizgariyê yên neteweyî û çînî têra çareserkirinê nakin.

Dema ku mirov di vê çarçoveyê de şîrove bike, mirov ê bibîne tevgerên Kurd ên hemdem diyardeya netewetiyê û çînayetiyê zêde nîşan nadin. Tevgereke rizgariya neteweyî ya modern zêde nas nekirine. Tevgereke zelûl û paşvemayî ya milliyetgiriya pêşî mewzûbehs e. Em tevgerên çînî yên modern jî nabînin. Dîsa bi şêwazê Rojava di çarçoveya çînî de em zêde nikarin behsa tevgerên bûrjûwa, proleter û bûrjûwa piçûk bikin. Gelekî zehmet e ku mirov tevgerên Kurd bi awayekî îdeolojîk, rêxistinî û çalakî di nava şablonên neteweyî û çînî de bi proje û plan bide nasîn. Lê dîsa jî dused salên dawî gelekî tevlîhev û xwînrij derbas bûne. Salên behsa wan tê kirin, bi serîrakirin û şeran tijî ne. Tevî ku li dijî serîrakiriyan artêşên her diçûn modern dibûn û dewletên netewe hebûn jî wan bi xwe nikarîbûn bi artêşên modern û dewletên netewe yên bi heman armancê rabûna, bihêlin rabûnê, nikarîbûn xwe bilivînin. Tişta dikir ku pê rabin, fikarên wan ên di warê parastina desthilatdariya wan a begtiyê de û berjwendiyên wan ên di bin perdeya dînî de bûn. Ji bo dewletên netewe û artêşên modern ên bêhtir bi gurçûpêç, zehmet nebû ku van gavavêtinên îdeolojîk û çalak ên bi armanca dewamkirina hiyerarşî û parastina desthilatdariya xwe ya ji serdema navîn mayî bitepisanda. Jixwe mirov nikarîbû bipa ku pêkhatinên ji rêûresmê, îdeolojî û saziyên li Kurdistanê, li hemberî hêzên modernîteyê bi ser bikevin. Mirov bi hinek mînakan dikare vê mijarê zelaltir bike.

**a-** Statuya begtiya ji rêûresmê di serê sedsala 19. de ket tehlûkeyê. Împaratoriya Osmanî ya hewcedariya xwe ya bi modernbûnê didît, bi taybetî bi Siltan Mehmûdê Duyemîn (1839) ji bo reforman gav avêt. Reform der barê ji nû ve sererastkirina dewletê de bûn. Di gavavêtina ber bi dewleta netewe de burokrasiya navendî, sîstema bacê û artêşê ji wan mijaran bûn di serê reforman de dihatin. Li hemberî van reforman nîzama begtiyê ya Kurd a ji rêûresmê nikarîbû dewam bike. Jixwe begtiyên Kurdan sîstema wan a bac û eskertiyê qebûl bikirana, vê bi xwe dawî li wan dianî. Lewma ya diviyabû bikirana ew bû, yan diviyabû xwe tesfiye bikin an jî serî rakin. Serîrakirina pêşî ya dest pê kir navenda wê Silêmanî bû. Ev serîrakirin bingehê xwe terîqet

û begtî bû. Ji ber ku ev serîrakirina terîqeta Qadirî û Xanedaniya Babanzade bû. Ev serîrakirina di sala 1806’an de destpêka vê pêvajoyê îfade dike. Silêmanî li seriyekî din ê Kurdistanê ye, têkiliyên wê yên bi qebîle û eşîrên cîran re yên heta bi nava Îranê bandora xwe nîşan didin hene, rewşenbîrên xwedî kapasîteyeke bi hêz a entelektuel dihewîne û bi van aliyên xwe balê dikişîne ser xwe. Herweha ji navendên rêûresmê yên terîqetên Neqşî û Qadirî ye. Di çarçoveya tewazunê de hostetiya siyasî ya bengtiyên Kurd bi pêş ketibû. Têkeltiyên pêşî yên rêûresmê û moderntiyê li vê herêmê pêk hatibûn. Yek ji wan deveran bû ku hegemona dinya nû Ingilîstanê cara pêşî dest avêtibûyê. Kurdîtî yan Tevgera Kurd di van şert û mercan de dest pê kir. Di nava vê tevgerê de xisletên dînî, mîllî, qebîleyî û arîstokrastîk di zikhev de bûn xwedî rol, lê ev tevger li devera xwe asê ma. Li hemberî polîtîkayên împaratoriyê yên ji rêûresmê û seferên tepisandinê, nikarîbû demeke dirêj li ber xwe bide. Lê ev tevger dihat wê maneyê ku pêvajoyeke nû dest pê dike. Jixwe paşê ber bi Bakur ve tevgerên bi heman rengî li pey hev serê xwe rakirin. Belkî jî ji van tevgeran a herî dawî û ya herî girîng a bi pêşengiya Mîrê Botanê Bedirxan Beg bû.

Bedirxan Beg nexasim ji mînaka Misrê ders girtibû û lewma ji salên 1820’an ve begtiya xwe timî berfireh kir; ber bi pergala dewleteke modern ve bir. Xwedî xisletên tevgereke mîllî ya zû destpêkirî bû. Eger nehata tepisandin, heye ku ber bi dewleteke netewe ve biberidiya. Tevgera ku herî zêde nêzî navlêkirina modern, bêguman tevgera bi pêşengiya Bedirxan Beg e. Lewma bûyer û polîtîkayên li dora vê tevgerê pêk hatin, mirov dikare ji bo roja me ya îro jî dersan ji wan bigire. Ingilîz bêhtir li pey pêkhatineke tampon a bisipêrin Suryaniyan bûn. Tercîha wan di vî warî de bû. Li aliyê Bakur jî Çartiya Rûsyayê mekanîzmayeke tampon a bi heman rengî dixwest bisipêre Ermeniyan. Împaratoriya Osmanî û heta ya Îranê dixwestin otorîteya xwe ya navendî berfireh bikin. Ji çar aliyan ve dor li Kurdan hatibû girtin. Vê carê cudahiya vê dorgirtinê hebû, yên dihatin dor li Kurdan digirtin bi amûr û motîvasyonên modern gurçûpêçkirî bûn. Tevî ku rê li pêşiya Bedirxan Beg hebûn jî rêyên pêde biçûya bi sînor bûn. Suryanî kirin hedefa xwe û ev şaşiyeke stratejîk bû. Tevî ku têkiliyên wî bi Ermeniyan re baş bûn jî ji stratejîkbûnê dûr bûn. Ya herî girîng, ji hêzeke hegemon a xwe bisipêrê mehrûm bû. Mînaka Misrê xwe sipartibû Ingilîstanê û ber bi dewleteke netewe ya nû ve diberidî, lê Ingilîstan û Împaratoriya Rûs li beramberî Begtiya Botanê destek didan Siltantiya Osmanî. Helwesta Îranê jî neyênî bû. Herweha di nava xwe de jî artêşeke bi şêwazê gerîlla ava nekiribû, rêxistiniya wî ya eskerî ji artêşên nîzamî nebihurî bû. Ji bo berxwedaneke demdirêj niyet û amadekariyên wî tinebûn. Bi rêxistin û îdeolojiyên ji rêûresmê tevdigeriya. Ji nîzameke qanûnî wêdetir bi fermanan rêveberiya xwe dimeşand. Di nava binemalê de jî (Yezdan Şêr) li ser begtiyê xwelihevrakişandin hebû û ev jî dibû ku weke xiyanet derkeve pêşiya wî. Tevî van xusûsan hemûyan, ji ber ku di dema xwe ya herî baş de neket nava tevgerê û bi taktîkên siltan re mijûl bû, dawî li xwe anî. Ji Bihara 1847’an ve şer dijwar bû û bi xiyaneta Yezdan Beg heman salê hat tepisandin. Bi desteka hêzên Rojava ev tevgera Kurd a herî nêzî modernbûnê hat tepisandin û bi awayekî neyênî rê li ber encamên stratejîk vekir.

Bi şêwazekî rêûresmî be jî saziyên çandê yên Kurdan ku xwedî xweseriyeke berfireh bûn êdî wê weke berê nikaribûna zindîbûna xwe dewam bikin. Burokrasiya navendî hewl dide gav bi gav otorîteya xwe li her goşe û quncikê belav û bi cih bike. Statuya Kurdistanê ya eyaletê her diçe teng dibe; di salên 1860'î de bi dawî kirin û navê Kurdistanê weke gotineke cografî ma. Belkî jî nîzama begtiyê ya Kurdan a ji Mîtannî û Hîtîtan ve (1600-1200 B.Z.) xwedî rêûresmeke bi kok bû êdî bi dawî dibû. Bermahiyên begtiyên Kurdan wê ji bo modernbûnê kabên xwe biavêjin û li metrepolên mêtingeran wê hewl bidin weke hevkarên Kurd hebûna xwe dewam bikin. Di vê babetê de çîrok û serhatiyên hem Babanzadeyan hem jî Bedirxaniyan gelekî balkêş in. Li aliyekî, kengî keysa xwe lê anîn û firsend dîtin di binî re isyan û serîrakirin tevdan, li aliyê din jî di avakirina dewletên netewe yên serdest de weke kadroyên herî bi tesîr rol girtin. Çi di Împaratoriyê de, çi jî di damezrandina Komarê de gelek kadroyên di vê çarçoveyê de rol girtine û endamên van malbatan in, hene. Herweha jî bi rola bavê milliyetperestiya Kurd a pêşî radibin. Di vî warî de mînaka herî balkêş neviyê Bedirxan Beg, Kamûran Elî Bedirxan e ku hem îdeolojîk (kovar û rojnameyên Kurdistan û Hawar hwd.) hem jî rêxistinî (di serî de rêxistina Xoybûn) di hewldanên milliyetgir ên pêşî de pêşengî kiriye. Wekî din, di danîna têkiliyên dîplomatîk de ku kalê wî nikarîbû deyne, hoste ye. Hêja ye ku mirov jêhatîbûna wî di warê ziman û çanda Rojava de destnîşan bike.

Ya ji vê jî balkêştir ew e, ji bo tevahiya şexsiyet û derdorên arîstokratên Kurd ên piştî xwe bên hîmê polîtîkaya Kurdîtiyê ya weke model bibînin daniye. Kurdî û Kurdîtî di destê van şexsiyet û derdoran de bûye amûrek ku pê xwe û malbatên xwe li ser piyan bigirin. Bi tevahî bazarên xwe di çarçoveya dewamkirina hebûna xwe de meşandine. Bazarên li ser serxwebûnê dest pê kirine heta pê efûyê ji bo şexsê xwe bixwazin birine. Bi Bedirxan Beg vê riyê dest pê kir û bi Kamûran Elî Bedirxan re bû weke model an jî rêbazekê. Kamûran Elî Bedirxan hewl daye heman bazarê bi rêya Komara Tirkiyê bi Mistefa Kemal re jî dewam bike. Di vê bazarê de li gorî şertên bazarê Kurdîtî carnan gelekî buha dibe, carnan jî pirr erzan dibe. Tevgereke civakî ya Kurd û Kurdîtiyeke bi taktîk û stratejiyên dîrokî, civakî û bernameyî tê meşandin li naverastê nîne. Tam jî di vê nuqteyê de çînayetî û netewetî girîng dibin. Karekterê wan ên çînî yê dema wan derbasbûyî van şexsan ewqasî dixe tengasiyê û wan ber bi fikarên şexsî ve dahf dide, karekterên wan ên neteweyî yên pêşneketî wan ber bi rêxistinî û îdeolojiyên paşvemayî yên tevgerên rê li ber heman encaman vekirî dibe.

Carnan van karekteran bi Îdrîsî Bedlîsî re didin ber hev. Îdrîsî Bedlîsî kesayetek e ku di dema begtiyan a gihiştî de heye. Di serê sedsala 16. de hem li qesrên Safewî û hem jî li qesrên Osmaniyan bi tesîr bûye, fîgura polîtîk a desthilatparêz a wê demê temsîl dike. Begtiyên Kurdan ên nikarin rejîma qraltiyên xwe yên serbixwe damezrînin, li qesrên hêzên hegemonîk li rêyekê digerin. Begtiyên Kurd ên pêşî di damezrandina Xanedaniya Safewî de rola wan hebû, piştî ku Şiatî bû mezhebê fermî xwe di tehlûkeyê de his kirin. Ji ber ku ji mezhebê Sunnî bûn xwe li

hevkartiya bi Xanedaniya Osmanî girtin. Di vê de berjewendiyên wan ên girîng hebûn. Îdrîsî Bedlîsî di vê gera nû ya li xanedaniyê de mîmarê polîtîk û îdeolojîk e. Pirraniya begtiyên Kurdistanê li ser bingehê hevgirtina hêzên wekhev razîbûn bi Xanedaniya Osmanî re desthilatdariyê parve bikin. Ev hevgirtinek bû ku li gorî şert û mercên di cih de bi riza dil pêk hatibû. Di nava sîstema desthilatdariyê ya Osmanî de bicihbûneke wan a xweser hebû. Begtiyên Kurdan belkî ji nava xwe begekî began derxistana wê bêhtir serbixwe bibûna û paşerojê karîbûn selteneteke bêhtir navendî pêk bianiyana. Lê divê mirov ji bîr neke ku şert û mercên wê demê ji rejîmên ji gelek seltenetan pêkhatî wêdetir, sîstemên desthilatdariyan ên xwe bisipartina çend hêzên hegemonîk bêhtir di cih de didîtin. Statukaya wê demê xwe bi vî şêwazî ava dike. Qraltiyên serbixwe ne pîvanek in, îstîsna ne. Lewma xebatên hevgirtinê yên bi pêşengiya Îdrîsî Bedlîsî li gorî dema xwe di cih de ne, û serketî ne. Aliyê mirov jê fikaran bike ew e, şert û mercên erênî û neyînî yên paşê derkevin holê ne hesibandine, konjonkturel maye. Mirov nikare rewşa wî bi hevkartiya bi tehlûke ya di sedsala 19. de piştî hilweşîna sîstema begtiyê derket holê bide ber hev. Bi vî şêwazî liberhevgirtin û daneberhev, şert û mercên demê li ber çavan nagire, deman tevlîhev dike û xwe disipêre wekhevkirin û analojiyeke şaş.

Statuya Kurdan weke gel heta bi serê sedsala 19. ji statuya Tirkan an Tirkmenan û Ereban kêm nîne, belkî jî bêhtir li pêşiya wan e. Cudabûna statuyê û hilweşîna rastî di sedsala 19. de dest pê kir. Di vê demê de tê fêhmkirin ku êdî dema begtiyan derbas bûye. Lewma mîrasgirên mayî weke gel ji bo Kurdan daxwaza ti statuyê nekirin û heta ji vê jî wêdetir ketin nava helwestên bêhtir neyênî; ji statuya otonomiyê ya rêûresmê dest kişandin, rê li ber modeleke wisa vekirin ku li ser bingehê hevkartiyê neçar man berjewendiyên xwe yên şexsî û malbatî misoger bikin. Bêguman kesayet û malbatên behsa wan tê kirin bi riza dilê xwe ev hevkartî nekirine. Şert û mercên di serê sedsala 16. de êdî tinene. Hewl dane ku serî rakin, di statuya rêûresmê de ji ya xwe nehatine xwarê û heta bêhtir pêşde çûne li rê û rêbazên avakirina dewletekê pirsîne. Lê belê li gorî şert û mercên serdema modern û karekterê wan ê çînî di van hewldanên xwe de ji têkçûn û şikestinê rizgar nebûne. Rêyek bi tenê ya karin pêk bînin li pêşiya wan dimîne; dîsa li gorî karekterên xwe yên çînî, ji bo berjewendiyên xwe yên paşerojê yên şexsî û malbatî Kurdîtiyê dikin metayeke erzan a bazarê û bi vî awayî berê xwe didin cureyekî nû û bi tehlûke yê hevkartiyê. Dewletên netewe yên serdest jî ev qelsiyên wan xirab bi kar anîne; ji bo li ser civaka Kurd rejîmeke modern a mêtinkarî û zordestiyê pêk bînin ew weke amûrên herî bi tehlûke û bi bandor bi kar anîne.

Kesayet û malbatên behsa wan tê kirin dilê xwe bijandine û xwestine bibin çîneke bûrjûwayê û hê jî dilê xwe dibijînine. Lê şert û mercên wan ên maddî, têkiliyên wan ên ekonomîk û desthilatdarî, rewşa wan a îdeolojîk û rêxistinî, rê nadin ku ew bibin çîneke modern a bûrjûwayê. Kamûran Elî Bedirxan dibe ku bi xwe milliyetgirekî îdealîst be. Lê şert û mercên wî yên berbiçav dike ku ev îdealên wî bibin xweziyên di ber wî de bimînin. Lê ev jî nikare pêşiyê lê

bigire ku modela hevkartiyê ya ketine navê ber bi tehlûke û xiyanetê ve neçe. Jixwe çawa ku tê gotin 'masî ji serî ve genî dibe' model heta roja me ya îro gelekî bi tesîr dibe û mîna şêwazekî jiyana civakî ya normal be, di diyarkirina tevahiya çîn û tebeqeyên civakî û karekterên kesayetan ên ji nava wan derketî de bi rola sereke rabûye.

Dema ku mirov rêûresma arîstokratîk a Kurd binirxîne divê mirov bi ya Ewrûpiyan re û heta bi mînakeke li devereke din a dinyayê re nede berhev û tevlîhev neke. Di vê mijarê de rewşeke xweser pêk hatiye. Rola vê tebeqeya arîstokratîk ew e, ji bo li ser Kurd û Kurdistanê hukmên dewletên netewe û şêwazên wan ên mêtinkariya kapîtalîst pêk bînin ew xistine rewşa amûr û destikan. Ev pozîsyona wan di dused salên dawî de bi ehemiyet pêk anîne. Li ser bingehê tesfiyekirina Kurdîtiyê, di serî de rêya şîddet û zorê, paşê her ku çûye rêbazên 'qirkirinê yên taybet û sergirtî' yên şikandina tevahiya qadên civakî kirine hedef û di vê de tebeqeya behsa wê kirî weke amûrekî bingehîn bi kar anîne. Lewma dema mirov di nava rastiya Kurd û tevgerên wê de bandora vê rêûresma arîstokratîk û terîqetgir binirxîne û nexasim modelên wê yên têkiliyê bi hêmanên serdest ên modernîteya kapîtalîst re analîz bike, mirov çiqasî li ser van aliyan raweste jî ne bes e. Gelekî girîng e ku mirov statu û pozîsyona wan hûrûkûr bixe ber lêkolînê, bandorên wan ên îdeolojîk û polîtîk diyar bike.

Dema mirov li ser mîrateya tebeqeya jor radiweste, ya divê mirov bike ne ew e ku etîketa xiyanetê li wan bike û wan kategorîze bike; li hemberî rastiyeke civakî ya li ber qirkirina çandî, divê mirov  hewl bide lê serwext bibe ka xisletên tevahiyia tebeqe û çînên wê civakê, nasname û kesayetên wan têne çi maneyê, ka di çarçoveya neteweyetî û çînayetiyê de çi bandora wan çêbûye. Civaka Kurd civakeke normal nîne ku em jêre analîzên normal bikin. Cihû ji bo qirkirinên xwe têgînên 'taybet' û 'tekane' bi israr diparêzin; bi israr tînin ziman ku qirkirineke hevtayê wê nîne bi serê wan de hatiye. Ji bo qirkirina Kurdan jî mirov dikare têgînên bi heman rengî bi kar bîne. Qirkirineke çandî ya mînaka wê tineye, 'taybet' û 'tekane' pêk hatiye, pêk tê. Ji lewra hewcedarî bi lêgerîn û lêkolîneke xweser heye. Di vê çarçoveyê de gelekî girîng e ku mirov di qirkirina çandî de rola mîrateya tebeqeya jor a Kurd û bermahiyên wan ên îro binirxîne da ku bergiriya hebûna çanda Kurd û azadkirina wê bike.

**b-** Bi hilweşîna sîstema begtiyê re hiyerarşiya dînî derket pêş. Têkçûna Bedirxan Beg û Yezdan Şêr di nîvê duyemîn ê sedsala 19. de kir ku saziya şêxtiyê ya her ku diçû bi hêz dibû însiyatîfê bigire û di nava civakê de xwe li rola pêşengtiyê rakişîne. Nexasim şêxên Neqşî û Qadirî gelekî girîng bûn. Herdu terîqet jî bi awayekî rêûresmî li Kurdistanê bi hêz bi cih bûne. Lê divê mirov rêûresma şêxtiyê bi tenê weke saziyeke xweserî serdema navîn nebîne. Rehên wê digihîjin heta bi dewleta rahib a Sumeran. Rahibên zîggûratên Sumeran bûn ên ku cara pêşî organîzasyona dewletê afirandin. Pêkhatina dewletê têkiliya xwe bi zanyartiyê re heye. Dewlet bi tenê organîsazyona hêzeke çor û hişk nîne, hêza wê ya maneyê bêhtir diyarker e. Demeke dirêj

rahiban ango bi Erebiya wê, şêxan dewleta rahiban a Sumeran meşand. Siyasetvanên laîk paşê rêveberiya dewletê dixin destê xwe. Herweha têkoşîna herdu beşan li ser desthilatdariya dewletê dewamî bûye û ji roja derketinê heta roja me ya îro dewam kiriye.

Di derketina holê ya dewletê de saziya rahibtiyê bi roleke bingehîn rabûye, lê di dewamkirin û berfirehkirina wê de rola xanedanên laîk derketiye pêş. Di pêkhatina postê desthilatdariya orîjînên Kurd de jî mirov heman rewşan dibîne. Li cem Hûrrî, Hîtît, Mîtannî, Ûrartû û Konfederasyonên Med xwelihevrakişandina rahib û xanedanên laîk li ser desthilatdariyê ti carî kêm nebû. Bi têgîna qralê xweda hewl dane di navbera herduyan de sentezekê çêkin û ev dualîte tevahiya dîrokê her hebû. Dînên Ibranî weke dînên yekxwedayî timî xwedî dualîteyên bi vî rengî bûn. Di organîzasyona pêşî ya qebîleya Brahîmî de rahibtî li pêş e. Mûsa bi xwe pêxember e, birayê wî Harûn serê rahiban e. Ev dualîteya di qebîleya Ibranî de heta roja me ya îro dewam kiriye. Îsa bi xwe hahamekî Cihû yê xwedî payeya piçûk e. Piştî wî bi sêsed salan hukmê rêveberên ne rahib hatiye naskirin. Dîroka Ewrûpayê ya hezar salên dawiyê bi têr-têkoşîna dêrê û laîkan a li ser desthilatdariyê derbas bûye. Dema ku Îslamiyet weke dîn derket holê pirr zû desthilatdariya siyasî nas kiriye. Di ser avakirina dewleta Îslamê re hê sîh sal derbas nebûbûn, xanedaniya rahib Ehlîbeyt û xanedanên laîk Emewî pevçûn. Ev têkoşîna di navbera dewleta dînî û dewleta laîk de bûye yek ji pirsgirêkên bingehîn ên di dîroka Îslamê de qewimîne.

Ev rêûresma dirêj a dîrokî ye, xwe di civaka Kurd û xwelihevrakişadina li ser desthilatdariya wî de nîşan dide. Di pêkhatin û parvekirina desthilatdariya li Kurdistanê de rêûresma dînî bi roleke mezin radibe. Bihêzbûna rêûresma qebîle û eşîrê rêûresma dînî bi sînor kiriye û pêkhatinên begtiyê yên laîk jî bi sedema wekhevîxwazî û azadîxwaziya di nava xwe de bi sînor kiriye. Tevahiya dîrokê otorîteya siyasî di nava van sê avahiyan de hatiye parvekirin. Kengî tewazuna di navbera wan de xira bûye şer û xwelihevrakişandin jî kêm nebûne. Ti saziya otorîteyê bi temamî ji nava sîstemê tesfiye nebûye. Di tebeqeyên jor de pevçûn û lihevkirinên li ser parvekirina desthilatdariyê di navbera van saziyan de pêk hatine û di tebeqeyên li jêr de dûvik û şaxên wan bi tesîr bûne. Li beramberî vê, parvekirina otorîteyê bi awayekî demokratîk di binyeya van hersê saziyan de xwe daye hiskirin. Mirov nikare behsa desthilatdariyeke mutleq bike. Rêûresma demokratîk hertim bi hêz bi sînor kiriye û heta îro hatiye. Her saziyê bi tenê bi girseya xwe, bi demos'a xwe hebûna xwe dewam kiriye. Herçiqasî carcaran hin sazî derketibin pêş jî tevî demosê timî tewazun li ber çavan hatine girtin.

Însiyatîfên begtiyê yên demdirêj di duyemîn nîvê sedsala 19. de bi giranî hatine şikandin. Saziya şêxtiyê ev rewşa hanê nirxandiye. Jixwe Siltan Mehmûdê Duyemîn ê derbên giran li saziya begtiyê dan û Ocaxa Yenîçeriyê tesfiye kir, derb li terîqeta fermî Bektaşîtiyê jî da. Mehmûdê Duyemîn hewl da valatiya di warê meşrûiyetê de derket holê dîsa bi terîqeteke nû bi Neqşîbendtiyê tijî bike. Di vê demê de şêxên Neqşî yên Kurd ên di nava terîqeta Neqşî de bi tesîr

derketin pêş. Yek ji van şêxan Mewlana Xalid ê Silêmaniyê ye. Piştî ku di sala 1826'an de Yenîçerî û Bektaşîtî hatine tesfiyekirin, ew bû yek ji şêxên herî bi hêz e ku sîstemê ekola wî da pêş. Şêx weke hevkarên nû yên siltantiyê li şûna began hatin bicihkirin. Li qesrê her ku çû bandora wan zêde bû. Roleke bi heman rengî ya terîqeta Qadirî jî derket pêş. Dîsa şêxên Kurdan li pêş bûn. Rola şêxan di tevgerên Kurd ên hemdem de kêm hatiye lêkolînkirin. Bi herhalî, piştî ku saziya begtî û eşîrtiyê qels bû saziya şêxtiyê ye ya ku bi sedema hevkartiyê li qesran saziya bi însîyatîf û bi hêz bû. Di vê de rêveberiyên qesran bi zanîn tevgeriyane. Li Kurdistanê di sedsala 19. û 20. de civak li ser têgihiştina cemaetan bi pêş ket û di vê de saziya terîqetê bi roleke diyarker rabûye. Lê bi lez bi pêş ketin û di vê de hevkartiya wan a bi qesrê re ya ku bi awayekî ajantî ye, bi roleke girîng rabûye. Sîstem wan weke hêza nû a xwe pê rewa bike bi kar tîne. Lewma nakevin kategoriya civaka sivîl a xweber pêk hatiye. Ya rastî, ev aliyê wan timî qels maye. Gel ji ajantî û hevkartiya saziya şêxtiyê hayedar nîne. Ev aliyê wan timî veşartî hatiye hiştin. Di herdu sedsalan de rola bingehîn a şêxan ew e ku li şûna dilsoziya began a bi qesrê re, bi pêşengiya xwe dilsoziyeke nû û bêhtir bi hêz pêk bînin. Çawa ku arîstokrasiya begtiyê di rewakirin û dewamkirina sîstemê de xwedî rol bû, bi awayekî bi heman rengî şêxên terîqetan di rewakirin û dewamkirina sîstemê de xwedî rol in, û divê ev rola wan bi girîngî bê lêkolîn û eşkerekirin.

Em bi bûyereke mînak bêhtir dikarin di vê mijarê de merama xwe rave bikin. Tevgera Şêx Ubeydullah, bi Şerê Osmanî û Rûsan ve (1877-1878) girêdayî qewimiye. Osmanî li hemberî Rûsan ketine tengasiyê, ji vê yekê sûd hatiye wergirtin. Hewl daye ji nakokiyên bi hêzên derve re sûdê wergire. Herweha ketiye bin bandora tevgerên mîllî yên di nava împaratoriyê de. Bendewariyên nû yên di nava civaka Kurd de derdikevin holê li ber çav hatine girtin. Tevger bi tenê ji kesayetên dînî pêk nayê, derdorên din ên bi bandor jî destekê didin û bi vî awayî di demeke kin de tevger mezin bûye. Gilî û gazin ji burokrasiya navendî hatine kirin û daxwazên millî zêde bûne. Ev di civînan de hatine guftûgokirin û di nava armancan de hatine bicihkirin. Tevger hem di nava Împaratoriya Osmanî de hem jî li Rojhilatê Kurdistanê li beşên berfireh bi bandor bûye û xwe gihandiye forma eskerî. Ji bo bibe dewleteke fermî desteka hêzek an jî çend hêzên hegemonîk ên wê demê têrê dike. Lê ev destek nehatiye dîtin. Ji ber ku dewletên Osmanî û Îranê bi tevahî xwestekên hêzên hegemon ên Rojava qebûl kirin û ev sedema bingehîn bû ku destek nedan tevgerê. Kengî destek ji bo dewletên Osmanî û Îranê hat nîşandan, ev tevgera mezin a serîrakirinê jî bi hêsanî hat tesfiyekirin. Ev tevger di dema Siltan Ebdulhemîdê Duyemîn de pêk hat û siltantiyê ji vê bûyerê gelek ders girtin. Rêbaza li dijî malbata Bedirxan Beg bi heman awayî li dijî malbata Ubeydullahê Nehrî jî hatiye ceribandin. Ew birin Stenbolê û bi rêya wan hewl dan beşekî Kurdan kontrol bikin.

**c-** Polîtîkayên Kurd ên di dema Ebdulhemîd de hatine meşandin, hêja ye ku mirov di bin sernavekî din de lêbikole. Alayên Hemîdiye ji ber Alayên Qazak ên Rûs hatine wergirtin. Bûyerên

ku tevgerên Ermenî û Kurdan rê li ber wan vekirine, dikin ku burokrasiya împaratoriyê tevdîrên bi kok bigire. Ya yekê, divê nakokiya di navbera Ermenî û Kurdan bê gurrkirin û bê bikaranîn. Heman rêbaz di têkiliyên Kurd û Suryaniyan de jî hatiye ceribandin. Ev gelên ku ne bi sedsalan, bi hezar salan bi hev re mane, ji ber hêrsa kar û qezenca modernîteya kapîtalîst rê li ber vekiriye, li hemberî hev xistin rewşeke nakok. Ya rastî, ji ber hêzên hegemonîk nakokiyên di navbera tebeqeya jor de hatine pêkanîn, hatine bikaranîn û gel jî di vê de kirin destik û amûr. Dîrok piştrast dike ku Bedirxan Beg û Suryaniyan hev bigirta wê di warê maf û azadiyên herdu gelan de bibûya xwedî gelek destketiyan. Polîtîkaya 'bi rê ve bibe-parçe bike' li ser herdu aliyan bi ehemiyet hatiye pêkanîn. Di vê polîtîkayê de Ingilîstan bi rola sereke radibe. Operasyona Iraqê ya wê demê bi van rêbazan tê pêkanîn.

Dîroka têkiliyên Kurd û Ermeniyan bêhtir kevn e, û di navbera xwe de bi awayekî xwezayî kar dabeş kirine. Zenaetkariya Ermeniyan û cotkariya Kurdan hevdu temam dikin. Cudabûna dîn nabe sedema şer û nakokiyê. Tevgerên milliyetgiriya Ermenî ya ji dîrokê û rastiya civakî ya Rojhilat qut, rewşa pêdiviya Siltan pê heye bi kar bîne, pêşkêş dikin. Diviyabû Kurdistan weke welatê hevpar bihata nirxandin, lê çawa ku di tevgera Suryaniyan de jî hat dîtin, li gorî welatekî xwedî tek millet Ermenistaneke xwerû fikirîn. Zirara herî mezin a îdeolojiya dewleta netewe ew e, timî etnîsîteyeke serdest an neteweyek kiriye bingeh. Yên din jî yan weke hindikayî yan jî weke neteweyên din, xwestine bikin ku neyên naskirin. Ji ber ku mentiqê wê vê ferz dike. Encam, cîranên kevin, gel û çandên di nava hev de diman ketine nava şerekî ku hevrikiyê bikin. Aliyên li ser heman parçeyên cografyayê heta xwedî îdeayên bi heman rengî bin bivênevê şer ê biqewimin. Di bingehê pevçûna nava têkiliyên Kurd-Tirk-Ermenî-Suryanî de mentiqê milliyetgir ê dewleta netewe heye.

Siltan Ebdulhemîd di çarçoveya vê nakokiyê de ji sala 1982'an ve Alayên Suwarî yên Hemîdiye ku ji eşîrên Kurdan pêk anîn, xistin nava tevgerê. Stratejî û taktîkên milliyetgirên Ermenî ji desteka Çarên Rûsyayê piştrast bûn, lê li hemberî yekîneyên eskerî yên ji eşîrên Kurdan pêkhatî bi ser neketin. Lê eger Ermeniyan stratejî û taktîkên xwe bisipartana dostaniya bi gelên cîran re, karîbûn çarenûsa Rojhilat bi awayekî radîkal di asta şoreşê de biguhertana. Rola Cihû di Şoreşa Rûsyayê de pê rabûn, bi roleke heman rengî Ermeniyên Osmanî jî karîbûn pê rabin. Milliyetgiriya bûrjûwa ya mirovan çavkorî dike û mentiqê wê yê cihêkar rê neda bûyerên bi vî rengî pêk bên.

Lê Alayên Hemîdiyê zirara esas dan Kurdan. Mirov divê Mektebên Eşîran jî li Alayên Hemîdiyê zêde bike. Bi qasî xuya dike, Alayên Hemîdiyê li dijî tehlûkeya milliyetgiriya Ermenî hatiye sazkirin, lê bi xwe li dijî tevgera neteweyî ya Kurd hatiye damezrandin. Ji ber ku tevgera Kurd a neteweyî ber bi modernbûnê ve diçe. Lewma hewl didin, bi kevirekî çend nîşanan bi hev re rakin. Ev Alayên Hemîdiyê ku mirov dikare weke 'Qoricitiya Gundan' a zû pêkhatî binirxîne, bi

tenê tehlûkeya Ermeniyan (Dîroka fermî wisa nîşan dide; lê ya divê bê zanîn ew e ku daxwazên demokratîk û mafdar ên gelê Ermenî hene, lewma van daxwazên wan ditepisînin) ji holê ranake, di heman demê de tevgerên neteweyî yên Kurd ên gengaz in ku derkevin holê jî difetisînin. Aliyê herî xeternak ê Alayên Hemîdiyê ev e. Elîteke teng a eşîran bi sîleh dikin, bi mûçe û payeyan vê elîtê girê didin, pê tevahiya eşîr û endamên wan dixin bin destê xwe, Siltan çawa dixwaze wan wisa bi kar tînin. Eger careke din tevgerên pêşeng ên di asta Bedirxan Beg û Ubeydullah Nehrî de derneketibin holê, di vê de rola Alayên Hemîdiyê diyarker e. Derba esas û rastî, tevgerên demokratîk û neteweyî yên Kurd xwarine. Herweha bi nakokiyên di navbera eşîran de afirandine, ew kirine dijminên hev. Di vê rewşa bi pevçûn û nakok de beşê herî girîng ê nîv sedsaleke dîroka Kurdistanê badilhewa û tewş derbas bû, pevçûn û nakokî li dijî wan bi xwe hatin bikaranîn û bi vî awayî civaka Kurd avêtin bîreke kûr a neyêniyan û neçarî nakokî û pevçûnên navxweyî kirin ku careke din nikaribin bi ser xwe ve bên.

Tevî saziyên begtî û şêxtiyê yên hevkar, polîtîkayên xwe spartin eşîrên hevkar ên mîlîtarîzekirî, ev jî gelekî baş nîşan didin û rave dikin ka çima tevgera Kurd a neteweyî weke mînakên hatin destnîşankirin pêşde neçûye. Gelekî girîng e ku mirov di vir de bibîne, tebeqeya jor a Kurd di dema modernîteyê de bi roleke pirr neyênî rabûye yan wê bi vê rolê rakirine. Mîna ku pêkhatineke taybet be, li dijî nasname û hebûna wê ya civakî dabin şerkirin. Ne mîna ku wisa bûye, bi rastî em bi pêkhatinên wisa re rûbirû ne ku ji aliyê muhendîstiya modernîteyê ve hatine çêkirin û li dijî nasnameya xwe şer kirine. Mentiqê di vir de divê mirov baş bibîne. Kengî hêzên xwe yên ji rêûresmê ango berjewendiyên xwe ji dest didin (di serî de serîrakirinên bi têkçûnê bi encam bûn û hêmanên din ên cûrbicûr di vê de rola wan heye), ji bo bi awayekî şexsî û malbatî li ser piyan bimînin amûra bi tenê ya di destê wan de ew e, li ser tevgera muhtemel a Kurd bazarê bikin. Devberdana ji pêşengiya ji tevgerên muhtemel re, heta bi cihgirtina di nava tevgerên komplo yên dijber (kontrgerîllaya pêşwext) de, her rêbazê di hesabên bazarê de bi kar tînin. Rêbaza herî bi tesîr ew e, ji diyardeyeke bi navê Kurdîtiyê digerin ku ji bo xwe bikin diyardeyeke xuya ya neteweya serdest û di berdêla vê de li berjewendiyên maddî û manewî yên bi dest bixin difikirin. Heta roja me ya îro li ser tevahiya çîn û tebeqeyan, malbat û kesayetên di nava wan de rêbaza bi awayekî herî zêde û serketî hatiye empozekirin ev rêbaz e. Ev fermana mîna sloganekê vekirî tê gotin ev e: Dev ji Kurdîtiyê berde, tu dikarî bibî her tişt, tu dikarî her tiştî bi dest bixî!

Encameke din a vê rêbazê ew e, rê li têgihiştineke bi hêsanî biçe Kurdîtiya sexte vedike. Kurdîtiya sexte, ji bo bandor û berjewendiyên şexsî û malbatî weke amûrekî tê pêşdebirin û bikaranîn. Bêguman di her civakê de malbat û kesayetên bi tesîr hene. Bandora van kesan xwe disipêre nirxên li civaka xwe zêde dikin. Lê di civaka Kurd de rewş berevajî ye, ji bo kes û malbatek bibe xwedî bandor, divê nirxên xwe yên civakî di qadên herî heyatî de bike mijara bazarê, xiyanetê li wan bike û heta li dijî wan şer bike. Ya xwesertir û xeternaktir ew e, bi van kirin, hesab û nêzîkatiyan nêzî rastiya civakî dibin. Bêguman di her çîn û tebeqeyê de malbat û

kesayetên îstîsnayî yên hêja û bi rola erênî radibin hene. Lê li vir em behsa îstîsnayan nakin, em qala rêbazên bi lanet ên rehberdayî dikin.

**d-** Polîtîkaya li dijî Kurd bi Alayên Hemîdiyê hat îfadekirin û polîtîkayên dewletê yên li dijî tevgera Kurd di dema derketina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê ango Faşîzma Spî ya Tirk de li ser şopa van polîtîkayan bêhtir hat kûrkirin û pirralî bi sazîkirin. Alayên Hemîdiyê hebûna xwe parastin. Zarok û ciwanên elîta Kurd a hevkar li şûna Mektebên Eşîran li dibistanên fermî bêhtir dan xwendin. Kurdên ji elîta arîstokrat, dîn û eşîrê yên ji rêûresmê, bûn komên pêşî yên Kurd ên ku modernîzm nas kirin. Beşên em behsa wan dikin rojname, kovar û cemiyet ava kirin û bi vê dengê xwe derxistin. Ev pêkhatineke nû bû. Mirov dikare van beşan weke tevgera pêşî ya bûrjûwabûna kolektîf bibîne. Ev beş serwext bûbûn ku êdî bi têgihiştina begtî, eşîrtî û şêxtiyê aşê wan nagere, lewma çawa ku bi giştî mînakên wê têne dîtin, wan jî di warê çînî de xwe vediguherandin. Rûm, Ermenî û Suryanî bêhtir bi lez dibûn bûrjûwa, ji ber ku Xiristiyan bûn û bandorên kapîtalîzma Ewrûpayê li ser wan hebûn. Civakên misilman di vê veguherînê de ji par re dihatin. Kurd jî di vê pêvajoyê de ji par re dihatin. Mirov fêhm dikir ka çima xwe bi milliyetgiriyeke pêşî îfade dike. Mîna Jon Tirkan, wan jî Jon Kurd temsîl dikirin. Jixwe bi Jon Tirkan re di zikhev de pêk dihatin. Bi temamî di bin hegemonya îdeolojîk a Rojava de gav diavêtin. Di wê rewşê de nebûn ku bibin xwediyê gavavêtineke orîjînal. Bêyî ku felsefe û zanista Rojava fêhm û qebûl bikin, bi veguhestinên qetqetokî û bi serhevkirî yên ji Rojava qîma xwe dianîn.

Ji ber ku çîna ji rêûresmê şikest û bi awayekî sîstematîk bûn hevkar, gavavêtinên entelektuel ên ciwanên Kurdan jî çeloxwarî û ji nasnameya xwe mehrûm bûn. Xebat, lêkolîn û lêgerîneke wan a ciddî der barê dîrok û rastiya civaka Kurd de tinebû. Ji bo vê ne derfet û îmkanên wan, ne jî qabîliyeta wan hebû. Argumanên wan ên milliyetgiriya pêşî ku heta dawiyê biserhevkirî, berhevkirî û sloganwarî bûn û jê wêdetir nediçûn, bingehê wan ê îdeolojîk pêk dianîn. Bendewariyên wan ji Meşrûtiyetê hebûn. Di salên pêşî yên Meşrûtiyetê de bi rojnamegerî, kovargerî û cemiyetgeriyê bêhtir bi pêş ketin. Tevlî reqabeta milliyetgir bûn. Ji ber ku milliyetgiriya Tirk bêhtir xwe bi tesîr kir û mohra xwe li dewletê xist reqabeta di navbera wan de zêdetir bû. Tevger û avahiya bi hêz a milliyetgiriya Ermenî bi awayekî neyênî bandor li reqabeta di navbera wan de dikir û ev reqabet sor dikir.

Hersê milliyetgirî jî bi lez ber bi dewleta netewe ve diçûn û vê yekê jî têkiliyên di navbera wan de ber bi şer ve dibirin. Şerê Balkanan û Şerê Cîhanê Yê Yekemîn di vî warî de bû qonaxa destpêkê. Tevgera Ermenî bi qirkirinê bi encam bû, tevgera Kurd dabeşî du parçeyan bû. Beşê dixwest bi bûrjûwaziya Tirk re li ser heman mafan tevbigere û beşê alîgirê veqetînê ji hev cihê bûn. Ev dabeşbûn û cihêbûna heta bi Şerê Rizgariya Neteweyî yê sala 1919-1922'an dewam kir bi xisirîna stratejîk a tevgera Kurd bi encam bû. Ji ber ku ji rêxistinî û serwextbûna xwe mehrûm

bi şêwazekî şexsî beşdarî Şerê Rizgariya Neteweyî bûn, di pêvajoya şer de, nexasim di hevdîtinên piştî Peymana Lozanê û îlankirina Komarê de bi zelûlî hebûna xwe nîşan dan. Ew bendewariya wan a bi Tirkan re bibin xwedî heman mafan pûç bû. Qanûna Teşkîlata Esasiye 1921 û Qanûna Xweseriya Kurdan a di 10'ê Adara 1922'an de bi cih nehatin anîn û li ser kaxizê man, vê jî kir ku hemû hewes û xeyalên wan bi dawî bibin. Lê bi herhalî hêmanên bingehîn ên Şerê Rizgariya Neteweyî bûn. Divê mirov bi girîngî li ser vê ezmûna milliyetgiriya Kurd a pêşî rawest e, û dersan jê bigire.

Ezmûna meyla cudaxwazan Serîrakirina Koçgirî (1919-1920) girîng bû. Eger dersên hewce hatibûna girtin heta bi xweseriya Kurd karîbûn biçin. Lê ji ber kêmasiyên pêşengtiyê û qelsiya wan a li hemberî hevgirtina bi hêz a di navbera Tirkê Îttîhadgir û Cihûyan de (pêkhatina faşîst a Tirkê Spî) û gurçûpêç nebûna wan, kir ku zû tesfiye bibin. Cemiyeta Azadiyê bi derengî hat avakirin û di sala 1924'an de xwest ji tevgera weke reaksiyonekê pêk hatî re pêşengiyê bike, lê di 15'ê Sibata 1925'an de bi provakasyona li navçeya Amedê Pîranê kirin ku pêşwext biqewime. Serîrakirina bêrêxistin û ji hev belav li ser milê Şêxê Neqşî Seîdê Kal hiştin û bi vî awayî diyar bû ku wê serîrakirinê li hemberî bûrjûwaziya ciwan a Komarê bi tesfiyeyeke giran bi encam bibe. Xisletên balkêş di vê serîrakirinê de hene. Cemiyeta Azadiyê bi xwe rêxistiniyeke milliyetgir e. Serokê wê Xalid Cibrî ye ku berî serîrakirinê li Bedlîsê tê girtin û bêpirs û îfade bi gullebarandinê tê kuştin. Di nava Alayên Hemîdiyê de fermandarekî bi tesîr e. Di Şerê Rizgariyê de li bereyê Rojhilat xebatên wî yên girîng hene. Xisletên wî yên rewşenbîriyê hene. Şêx Seîd ji mezhebê Şafiî ye, û yek ji pêşengên bi bandor ê terîqeta Neqşî ye. Di heman demê de li ser çûnûhatina bazirganiya pez a ji Çepexçûrê heta bi Helebê giraniyeke xwe ya girîng heye. Mirov dikare wî weke bûrjûwayê bazirganiyê bihesibîne. Seyîd Ebdulqadir kurê serokê Serîrakirina Nehrê Şêx Ubeydullah e (1878). Ew jî Şêxê Neqşî ye. Wekî din gelek bermahiyên begtiyan ên xwecihî bi serîrakirinê re girêdana wan heye.

Çawa ku tê dîtin, tebeqeyek e ku bi tevahî weke berhemê polîtîkayên Alayên Hemîdiyê derketiye holê û wê temsîl dikin. Li gorî hevkariyê ne. Lê ji serî ve hevgirtina sermayeya Cihû û burokratên Tirk ên elmangir ku di bin navê Jon Tirkan de kadroyên bingehîn ên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê pêk anîn (Tirkê Spî bi awayekî bingehîn vê pêkhatinê îfade dike), tesfiyekirina bi tevahî ya dîn û etnîsîteyên (Xiristiyantî, Misilmantî, Kurd, Ereb, Çerkez) li derveyî xwe weke polîtîkayeke bingehîn diyar kiribûn. Ev tesfiye gav bi gav meşandin. Di sala 1915'an de Ermenî, di sala 1921'ê de Çerkez, di sala 1923'an de Rûm, di sala 1924'an de Suryanî, di sala 1924'an de Tirkên Misilman (Xelîfetî), ji sala 1925'an ve jî Kurd hatine tesfiyekirin. Em jêre qirkirin bibêjin an jî tiştekî din, bi gotina roja me ya îro beşên li derveyî xwe (Jon Tirk = bûrjûwa burokrat a Tirk + kadro û sermayedarên masonîk û Cihûyên çerxkirî = Milliyetgiriya Tirk + Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê + CHP = Faşîzma Spî ya Tirk) hemû tesfiye kirine.

Di vê pêvajoyê de divê mirov bi girîngî pêşengtiya Mistefa Kemal Paşa analîz bike. Heta mirov mîtolojiya Kemalîst an Atatirkperest a li derveyî Mistefa Kemal hatiye çêkirin analîz neke, mirov ne dikare li Şoreşa Rizgariya Neteweyî, ne jî li rastiya Komarê serwext bibe.

Mirov Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1919-1922 ji şerekî li dijî derve zêdetir, weke şerekî navxweyî binirxîne wê heqîqetan bêhtir derxe holê. Ya qewimî ye û pêk hatiye, serîrakirineke Anatolya û Mezopotamyayê ye. Li derve û hundir bi destguhertinên girîng ên hegemonyayê re têkildar e. Li hundir desthilatdariya ji rêûresmê û hegemonya hiyerarşîk dest diguherînin, li derve jî Rojava hewl dide bi temamî hegemonya xwe pêk bîne û li dijî vê berxwedanek heye. Girîngiya stratejîk a cografya Anatolya û Mezopotamyayê çawa ku tevahiya dîrokê hebû careke din xwe nîşan dide. Eger hegemonya Rojava bi temamî Anatolya û Mezopotamyayê fetih bike hingê wê bibe xwediyê serdestiyeke mezin. Ji ber ku hegemonya Siltantiyê ya ji rêûresmê destguhertiye, di vê rewşê de xwedî wê pozîsyonê nîne ku pêşî li destguhertina hegemonîk bigire. Pêkhatina Îttîhadgir a Tirkê Spî jî li hemberî Ingilîzan têkçûye. Lê hegemonya Ingilîz jî hem li hundir û hem li derve bi zehmetiyên ciddî re rûbirû ye. Şoreşa Cotmehê ya Sovyetê pêk hatiye. Li hin rêyan digere ji bo bi serîrakirinên li Anatolya û li Mezopotamyayê têkiliyê deyne. Di nava van şert û mercan de pêngava bi pêşengiya Mistefa Kemal Paşa hem balkêş e, hem jî gelekî girîng e. Tê zanîn ku li derveyî kadroyên desthilatdariya Îttîhadgir hatiye hiştin. Ji ber statuya wî ya asî zehmet e ku Ingilîzgir be. Rewşa wî dişibe rewşa Robespierre ya di Şoreşa Franseyê de û ne ya Napolyon.

Çawa ku tê zanîn, di wê demê de Qralê Franseyê yê 16. Louis li dijî şoreşa qewimî serî li hêzên hevalbend ên qralên Ewrûpayê da û ji wan xwest ku Franseyê dagir bikin. Ev rewş gelekî dişibe peymana Siltan Wehdeddîn a bi Ingilîzan re. Li wir, li Franseyê Montagnar ango yek ji sê serokên girîng ên partiya şoreşa radîkal a bûrjûwaya piçûk Robespierre, bi serokatiyê radibe (1791-1794) û komarê îlan dike. Ew vê yekê di nava rewşekê de dike ku şîddet li hundir û derve gelekî zêde ye. Mistefa Kemal ê dîroka Şoreşa Franseyê baş dizane, bi îhtîmaleke xurt bi zanebûn bi rola Robespierre radibe. Çawa ku tê zanîn, ji pênc paşayên girîng ên serîrakirine (Ali Fuat Cebesoy, Kazim Karabekir, Rauf Orbay û Refet Bele), ew weke paşayê herî zêde însiyatîfa xwe bi kar anî, derdikeve pêş. Piştî şerekî zêde yê hundir û derve Komarê îlan dike. Eşkere ye ku şoreşgerekî tîpîk ê Komarê ye. Di serî de, di rakirina seltenet û xîlafetê de, di gavavêtinên din ên şoreşê de rola wî diyarker e. Lê rastiyeke din a girîng heye, Ingilîz ji nêz ve wî dişopînin û kengî fêhm dikin wê Mistefa Kemal bi ser bikeve yekser taktîkê diguherînin. Ji Wezareta Parastinê Fevzî Paşa û Albay Îsmet, bêyî ku li astengiyeke ciddî ya Ingilîzan rast bên dixin nava kadroyên îhtîlalê, ya rastî berdidin navê. Ango wan bi dizî dixin nava kadroyên îhtîlalê. Di xebatên dîrokê de ev bûyera gelekî sergirtî hatiye hiştin û eşkerekirina vê bûyerê di wê giraniyê de ye ku wê rê li ber qonaxeke nû veke.

Piştî Şerê Sakaryayê di sala 1922’an de Ingilîz desteka xwe ya ji bo Yewnanan vedikişînin û bi lez hewl didin bi kadroyên îhtîlalkar re li hev bikin. Di vê de Churchill bi roleke girîng radibe. Ji 1922’an ve isyan ji nêz ve di kontrola Ingilîzan de ye. Pêşî li radîkalbûna wê tê girtin, ew û Sovyeta Rûsyayê ji hev dûr têne hiştin. Kominîst, Ummetgir û Kurd têne tesfiyekirin. Di şexsê Çerkez Ethem de hêmanên îhtîlalkar ên bi koka xwe Qafqasî jî têne tesfiyekirin. Ya girîngtir, ji pênc paşayên girîng ên îhtîlalê çarê wan têne tesfiyekirin. Serîrakirina Kurdan dikin bahane û bi ser partiya milliyetgir û muqeddesatparêz a muxalefetê Firqeya Komarê ya Teraqîperwer de diçin û ev partî jî para xwe ji tesfiyeyê digire. Serîrakirinên Kurdan di destguhertina desthilatdarî û faşîstbûna wê de bi roleke qerase û manîvelayê radibin. Mistefa Kemalê ku hê beriya şer ji sala 1916’an ve bi giregir û rûsipiyên Kurdan re nexasim yên Bedlîs, Sêrt û Amedê di nava têkiliyên baş de bû, di dema şer de van têkiliyên xwe xweştir dike. Serîrakirina Koçgiriyê bi lihevhatinê bi encam dike. Bi Qanûna Teşkîlata Esasiye 1921 ji bo gelê Kurd wekhevî tê misogerkirin. Bi Qanûna Xweseriya Kurd a di 10’ê Adara 1922’an de ewlebûna bi hev tê xurtkirin. Piştî ku Komar tê avakirin, Mistefa Kemal 16-17’ê Çileya 1924’an di Konferansa Çapemeniyê ya li Îzmîtê de ji bo Kurdan behsa xweseriyeke berfireh dike. Dema Kurd neçarî serîrakirinê kirin, li miqamê serokwezaretiyê hevalê zarokatiyê û hevalê herî nêzîkî Mistefa Kemal Fethî Okyar rûdinişt û ji ber ku wî got “Ez destên xwe bi xwîna Kurdan nakim” îstîfa dike. Bi bahaneya serîrakirinê dema Îsmet Înonî û Fevzî Çakmak dest pê dike.

Li Îzmîrê bi reşkujiyekê ceribandin Mistefa Kemal ji holê rakin. Bi vê pêvajoyê re bêtesîrkirina wî bi lez dibe. Dibe ku Mistefa Kemal weke Robespierre bi awayekî fizîkî ji holê nehatibe rakirin, lê hem dorgirtina Çankayayê ji aliyê Topal Osman ve hem jî reşkujiya Îzmîrê mirov dikare weke derbên kujer şîrove bike. Ji van bûyerên mînak diyar dibe ku kadroyên Îttîhadgir ên alîgirên Ingilîz ku dor li Mistefa Kemal girtibûn, çembera xwe teng dikin. Piştî vê, ji Mistefa Kemalê şoreşger tişta dimîne, fîgurekî xwedayî ye ku li Çankayayê mehkûm bûye, ji aliyê siyasî û eskerî ve ti tesîra wî nemaye. Bi tevahî neyêniyên dîktatoriya proto-faşîst li vê fîgurê tê barkirin û nîmetên dîktatoriyê hemû jî ji aliyê bermahiyên Îttîhadgir ve ên di nava CHPê de kombûyî tê parvekirin. Mistefa Kemal ji vê pêvajoyê nerazî ye û vê bi hewldana xwe ya Firqeya Serbest a di sala 1930’î de nîşan dide. Lê ewqasî bêhêz e ku ev partiya bi hevalê xwe yê herî nêz Fethî Okyar û xuşka wî Meqbûle Xanimê dide damezrandin –tevî ku gelekî bi hêz dibe –bi tenê sê mehan dewam dike. Pêşengtiya Îsmet Înonî û Fevzî Çakmak, vê carê jî bi provakasyona îrtîcayê ya Menemenê vê pêngava demokratîk tesfiye dikin.

Bi kurtî, mirov rastiya Mistefa Kemal ji rastiya faşîst a Îttîhad û Teraqiyê û CHP’ê veqetîne, ji bo em xwe bigihînin nirxandin û analîzeke rast, gelekî girîng e. Li ber rohniya van analîzên nû, mirov dikare bi awayekî rast, li înkar û tinekirina di dema Komarê de li dijî Kurd û tevgera Kurd û li hewldanên tesfiyekirinê yên bi rê û rêbazên qirkirina çandî û asîmîlasyonîst têne meşandin

serwext bibin. Yek ji mijara sereke ya parêznameya min jî ew e, ez hewl didim analîzên bi vî rengî xurt bikim.

Li gorî min felaketa herî mezin a di dîroka Kurdan de bi komploya faşîst a Tirkê Spî di 15’ê Sibata 1925’an de dest pê kir. Komploya 1925’an a li dijî Kurdan, ji komploya 1915’an a li dijî Ermeniyan gelekî zêdetir berfireh e, û bêhtir demeke dirêj girtiye. Hîtler dema berê xwe dide qirkirina Cihûyan nêzîkatiyeke bê maneya “Jon Tirkan Ermenî tesfiye kirin, ma kê çi kir?” nîşan dide û ev jî bi awayekî berbiçav dide xuyakirin ku koka komploya faşîst û kirinên wê yên bingehîn çiqasî girîng in. Min analîza modernîteya kapîtalîst kir ku ez îspat bikim îdeolojiya dewletdar a netewe û dewleta netewe bi xwe di tehlîla dawî de çawa çavkaniya faşîzmê ne, ya rastî, min hewl da bidim xuyakirin ku yek ji xisletên girîng ên dewleta netewe pêşdebirina wê ya nîzama faşîzmê ye, û têkiliya wê bi sîstema kapîtalîst re raxim pêş çavan. Teorisyenê serweriya kapîtalîzmê Hobbes ji bo desthilatdariya dewletê îfade bike têgîna ‘Levîethan’ (Cinawir) a ji Tewratê girtibû bi kar anî. Ev têgîn herî zêde jî xwe di kapîtalîzmê de, di avakirina wê ya desthilatdariyê de û di karektera faşîst a vê avakirinê de berbiçav dike. Ji ber ku ezmûna desthilatdariyê ya Jon Tirkan (ji aliyê sosyolojîk, civakî û dîrokî ve ti têkiliya vê têgînê bi Tirkan re tineye, ya rastî sembolîk e.) vê rewşê bi awayekî balkêş û berbiçav temsîl dike, dîsa xwedî nirxekî gerdûnî ye, divê mirov bi girîngî li ser raweste. Di asta pêşnûmeyê de be jî min hewl da vê biceribînim.

Tevgerên Kurd ên di navbera salên 1925-1940’î de hewl dan weke serîrakirinên paşverû yên li dijî rejîma Komarê nîşan bidin û hukim li wan bibirrin, lê tevgerên vê demê bi armanca parastina hebûna xwe li dijî faşîzma Tirk a Spî û li dijî tesfiyekirina nasnameya Kurd, li ber xwe dan. Kurd weke gel bi awayekî ji dil hem tevlî Şerê Rizgariya Neteweyî û hem jî tevlî damezrandina Komarê bûne. Tevlîbûna wan weke hêmanekî bingehîn di tevahiya belgeyên civînên girîng de, di Protokola Amasyayê de, di belgeyên Kongreyên Erzirom û Sêwazê de, di gelek qanûnên Meclîsa Mezin a Gelê Tirkiyê de û heta di Qanûna Teşkîlata Esasiye ya sala 1921’ê de hatiye diyarkirin. Rizgariya Neteweyî ji bo gelê Tirk çi îfade dikir, ji bo gelê Kurd jî xwedî heman maneyê bû. Komar ne bi tenê weke komara etnîsîteya Tirk, di serî de Kurd weke komara pirretnîsîteyan hatibû avakirin û bi vî awayî hatibû manedarkirin. Herweha nasnameyên kedkaran û ummeta Îslamî jî ji nasnameyên damezrîner hatibûn hesibandin. Desteka Sovyetê eşkere bû. Kengî Îttîhadgiran Tirkparêziya bi etnîsîteyekê weke ekoloke îdeolojiya fermî qebûl kirin, bi tevahî hêmanên din ên damezrîner bivênevê bûn yên din. Daxwaza maf a herî piçûk bi îmhayê bi encam bû. Ji ber ku gelê Kurd mezin bû û wê tesfiyekirina wî hêsan nebûya, biryar dan ku ji Mîsaqî Millî paşve gavê biavêjin û Mûsil-Kerkûkê ji hegemonya Ingilîzan re bihêlin. Di vê çarçoveyê de bi Ingilîstanê re li hev kirin ku hebûn û tevgera Kurdan tesfiye bikin. Hevgirtina bi Elmanyayê re çawa ku di îmhakirina Ermeniyan de bi kar anîn, herwisa der barê Mûsil û Kerkûkê de lihevkirina wan bi Ingilîstanê re jî di îmhakirina Kurdan de hat bikaranîn. Çawa ku gelekî îddîa

dikin, di serîrakirinên Kurdan de desteka derve ne li aliyê Kurdan bû, li dijî Kurdan li cem rejîmên faşîst bû. Desteka Rûsya Sovyetê jî di nava vê de ye.

Hêmanên faşîst gelekî beriya Gladio'ya NATO'yê li dijî Kurdan şerekî taybet ê bi dizî û eşkere birêxistibûn. Bi awayê xuya dikir, dilxwede li dijî hêmanên paşverû yên antî-Komarê nirxên Komarê diparastin. Lê bi herhalî tevgereke dijber a Kurdan li beramberî Komarê tinebû. Di pêvajoya Rizgariya Neteweyî de soza mafên azadî û wekheviyê dabûn wan, wan jî bi dengekî nizim be jî daxwaza vî mafî dikir. Kok û rehên dîrokî yên vê daxwazê hene ku bi Şerê Melazgirê yê 1071'ê dest pê kirin, heta bi Şerên Çaldiran û Mercîdabikê yên 1514 û 1516'an û ji wir jî heta bi Şerê Rizgariya Neteweyî yê di navbera salên 1919 û 1922'an de diçin û ev kok û reh xwe berdidin nava jiyana  bi hev re ya weke gelên dost û cîran dewamkirina desthilatdariya dewletê ya li derdora nehsed salên derbasbûyî. Ti sedema dîrokî û civakî ya lidervehiştina wan tineye. Lê rastiya faşîst a modernîteya kapîtalîst nas nedikirin. Li dekûdolaba faşîst a li hemberî xwe serwext nedibûn. Bi huqûqa gelên cîran û dewleta hevpar a ji rêûresmê tevdigeriyan. Di nava bendewariyê de bûn.

Ya rastî, di van sêsed salên dawî de projeya afirandina civaka neteweyî ya homojen li Ewrûpayê, mînakeke wê di dîroka mirovatiyê de tineye. Mînak gelê Cihû yek ji wan gelên dîrokê yê dewlemend û bîrewer e. Diyar e ku ew jî li benda qirkirina xwe nebûn, naxwe Cihûyekî bi tenê jî li Ewrûpayê wê nesekiniya. Dîktaya faşîst bi giştî weke kapîtalîzm, bi taybetî jî weke kapîtalîzma dewletê bêyî rêxistinkirina erka qirkirinê nedihat meşandin. Hêmanên modernîteya kapîtalîst ên ji derve li ser Komara Tirkiyê hatin ferzkirin bi tenê bi destê dewletê û modela desthilatdariya faşîst pêkan bû bihatana meşandin. Di ezmûnên gelek dewletên netewe yên dereng de faşîzm kêm çalak bû û ev ji ber kapîtalîzma dewletê bû. Jixwe mirov nikare behsa kapîtalîzmekê bike ku xwe nesipêre dewleta netewe. Li gorî rewşên berbiçav ezmûnên faşîzmê dibe ku gelekî hişk an jî cureyekî nerm bin. Mînak li dewletên weke Ingilîstan û DYE'yê yên şert û mercên wan di cih de li hin qadên bi sînor serî li vê sîstemê bidin jî carnan bi îddîayên rejîma lîberal karîbûn li ber pêkanîna wê rabûna. Nermbûna di sîstemê de ji bo vê derfet û îmkan didan. Herweha ezmûnên têkoşîna civakên demokratîk li her welatî demeke dirêj firsend nedan rejîmên faşîst. Bûyerên li Komara Tirkiyê jî bi van meylên giştî re li hev dikin. Ji ber ku Şerê Rizgariya Neteweyî û desthilatdariya dewletê tevahiya dîrokê bi gelek milletan pêk hat, derfet û îmkan nedidan hêmanên kapîtalîst ên faşîst ku li her qada civakî û bi awayekî mayînde cih bigirin. Çanda Îslamê û tevgerên çîna kedkar jî ji wan hêmanan bûn ku faşîzm bi sînor dikirin. Lê ezmûnên dewleta faşîst ên bi hêz li Ewrûpaya wê demê (1919-1945) bi tesîr bûn, bandor li rejîma Komarê jî kirin. Ev polîtîkayên faşîst li ser hêmanên din jî hatin pêkanîn û ji vê jî para herî zêde ya Kurdan ket.

Çawa ku wê ji karekterê kirinên asîmîlasyonîst û qirker jî bê fêhmkirin, serîrakirin li ser bingehê fikreke berê bi pîlan, bi proje û bername hatiye amadekirin nînin. Ji nêzîkatiyên stratejîk û taktîk

mehrûm in. Amadekariyên wan nehatine kirin û demeke wan a di cih de nehatiye destnîşankirin. Ji **Qanûna Islahata Şerq** a 1925'an heta bi **Qanûna Îskana Mecbûrî** ya 1935'an pîlanên hatine meşandin hedefa wan hebûna Kurdan e. Ne bi tenê ji aliyê çalakî û tevgerê ve, weke hebûn tesfiyeya Kurdan kirine armanc. Li vir jî rêzik û pîvan heman tişt e: Eger tu dixwazî sax bimînî û bibî xwedî hebûn, divê tu dev ji nasnameya Kurd berdî!

Heta modela qirkirinê ya modernîteya kapîtalîst a Tirk xweserî Kurdan bi pêş xist neyê fêhmkirin, mirov ê nikaribe ti tevger û hêmana nasnameya Kurd a hemdem bide naskirin û analîzkirin. Ji bo mirov karibe modernîteya kapîtalîst a Tirk jî ji hev derxe, divê mirov rola yekdestdariya sermayeya Cihû û îdeolojiya wê diyar bike. Analîzên sûbjektîf ên kapîtalîzmê, dewletê, dîrok û civakê ji bo ravekirina modernîteya kapîtalîst a Tirk têrê nakin. Ji vê jî girîngtir, hem modernîteya kapîtalîst a Tirk, hem jî tevger û nasnameya Kurd a di nava pencê vê modernîteyê de, 'taybetî' û 'tekanetiyên' xwe yên xweser hene. Ez nabêjim ti xisletên wan ên gerdûnî nînin. Li vir a divê mirov diyar bike, ne wekhevbûnên gerdûnî ne. Her kesê bi mijarê re eleqedar kêm zêde van mijaran dizane. Rastiya nayê zanîn, ya nayê xwestin bê zanîn, ya dibe tabû, ya tê veşartin û berevajîkirin, ev 'taybetî' û 'tekanetiyên' mînakên wan tinene û xisletên wan in ku bi xwe dibin mînak. Ji ber ku ev tabû û tekanetî hatin înkarkirin Tirkiya serdema nêz û dîroka Kurd di tariyê de ma, ya rastî, bi temamî û rast nehatin analîzkirin. Sedema vê yekê jî têkiliya rejîmê ya bi komployên sergirtî, bi planên şerê taybetî, rêbazên qirkirina çandî û asîmîlasyonîzma topyekûn e. Pîlanên tesfiyekirina Ermeniyan ên bi rengê pêşceribandinê ne, pêkanînên bi heman rengî yên ku paşê bêne meşandin gelekî baş rave dikin. Jixwe ev kirin û pîlan bi tenê li ser hêmanên etnîk û gelan nehatin ferzkirin, di heman demê de ji van kirin û pîlanan hêmanên sosyalîst, lîberal û ummetgiran jî para xwe bi zêdeyî girtin. Ev kirinên ku bi dewletdariya netewe ya Tirk xwe bi awayekî herî eşkere nîşan didin sîstematîk in, û heta roja me ya îro her çûye bêhtir hatine girankirin û dewamkirin. Ev ne ji kirinên demî, arizî û car caran serî li wan didin in; ev têgihiştin û kirin li ser tevahiya saziyên stratejîk, fermî û xwedî yekdestdariya îdeolojîk serwer in. Bêguman rastiya dinya hemdem, peymanên navneteweyî, ji van hemûyan jî girîngtir têkoşîna gelan û xweparastina çandên civakî, pêşî li serketina mutleq a rejîmên faşîst girtiye û beşekî girîng jê bi sînor kiriye.

Hebûna gelê Kurd û zindîbûna wî ya di demên navbera salên 1925-1945'an de gelek tişt li xwe kêm kirin û mîna bêdengiya li nava goristanan sekan bû, lê karîbû bi awayekî fizîkî li ser piyan bimîne. Eger mîna Ermeniyan bi awayekî fizîkî nehatibin tesfiyekirin, ev ji ber însafa kirdaran nîne, ji ber hesabên wan in ku bawer dikirin wê ji Kurdên bûne mîna alav û tiştan ango ji Kurdên dibin esker, cotkar, şivan, gavan, rêncber û artêşeke nîv-bêkaran kar û qezencê bikin. Ermenî, Suryanî û Rûm gelên xwedî çand in. Bi tenê bi jiyana fizîkî qîma xwe nayînin. Li cem Kurdan rewş cuda ye. Kurd kirine mîna alav û tiştan, kirine mîna amûran. Cudahiya em behsa wê dikin ji ber vê rastiyê ye. Hindikayiyên din ên nehatine tesfiyekirin an jî li derveyî wê mane, nexasim ên bi

koka xwe ji Balkan û Qefqasan û Cihû ji Tirkan bêhtir bûne Tirkparêz û bi vî awayî hebûna xwe parastine. Ji bilî mînakên îstîsnayî û yên têkoşîna demokratîk şoreşger rê li ber wan vekiriye, rewşa xwe hê jî bi vî awayî dewam dikin. Koma herî zêde rewşa wê xweser koma Cihûyan e. Hebûna wan a li Anatolyayê, hêza wan a îdeolojîk û rewşa wan a sermayeyê, li gorî stratejiya Siyonîst statuya wan di Tirkparêziya Spî de kiriye pêşeng. Lê rast nîne ku mirov ji bo rewşa Cihûyan gotinên giştî bi kar bîne. Di pêvajoya Rizgariya Neteweyî de alîkariya wan a bi têkoşîna demokratîk şoreşger re ne kêm e, divê piçûk neyê dîtin.

Rewşa li beşên din ên Kurdistana parçekirî kêm zêde li ser şopa modela modernîteya Tirk çûye. Modela antî-Kurd a modernîteya kapîtalîst a Tirk mohra xwe li polîtîkaya demê ya li ser Kurdan daye û bi bandoreke diyarker rabûye. Li Sûriyê rejîma manda ya Franseyê heta bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn dewam kir û vê yekê jî kir ku rewşenbîrên Kurd hinekî atmosfereke azad bibînin. Di çapkirina kovaran û avakirina rêxistinan de zêde li astengiyan rast nehatine. Lê nikarîbûne statuyeke qanûnî ya Kurd jî pêk bînin. Kamûran Elî Bedirxan û derdora wî kirinên antî-Kurd şopandine û li dijî vê têkoşîna çekdarî ceribandine (li çiyayên Kolik ceribandina şerekî gerîllayî ji aliyê Osman Sebrî ve), ji bo serîrakirina Agiriyê rêxistina Xoybûnê saz kirine (bi maneya ‘weke xwe mayîn’, ‘xwebûn’ navekî di cih de ye), kovara Hawarê derxistine û ev hemû ji xebatên girîng ên vê demê ne. Gelek hewldanên wan ên dîplomatîk jî çêbûne. Lê di hemûyan de jî serketina li bendê bûn bi dest nexistine. Dema ku mirov hewldanên korkirina bîr û hafizayê li ber çavan bigire, eşkere ye ku ev xebatên hatine kirin girîng in. Çîrok û serhatiye komikeke rewşenbîrên li Sûrî bi xem e. Ji bo mirov li wê demê serwext bibe û dersan jê bigire hêja ye ku mirov van xebat û ezmûnan lêbikole. Di vê demê de Franse têkiliyên xwe bi Tirkiyê re xweş dike û sînorê Tirkiyê bi Sûrî re xêz dikin. Di vê de rola Franse pê radibe herçiqasî bi qasî kirinên neyênî yên Ingilîstanê li Iraqê nebe jî Kurdan weke qertekê bi kar tîne û ev xusûsek e ku divê bi girîngî bê diyarkirin. Bi Peymana Enqereyê ya sala 1921’ê di parçekirina Kurdan a pêvajoya hemdem de Franse bi awayekî egoîst tevgeriyaye û bi roleke pêşeng rabûye.

Di vê demê de tevgera li Kurdistana Iraqê bêhtir girîng e. Kurdên li vir hegemonya Ingilîstanê bi temamî qebûl kirin û li dijî polîtîkayên alîgirê Ereban li ber xwe dan. Silêmanî di vê demê de navenda van tevgeran e. Berxwedana Mehmûd Berzencî ku di şexsê xwe de xisletên şêx, serekeşîr û begtiyê hewandibûn, girîng e. Cara pêşî û bi awayekî eşkere ji bo desthilatdariya siyasî ya xweserî Kurdistanê ketiye nava tevgerê. Bi hêsanî li ber Ingilîzan serê xwe netewandiye û jê hatiye ku demeke dirêj li ber xwe bide. Rewşeke bi heman rengî ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn pêve ji bo Barzaniyan jî mewzûbehs e. Şêx Ebdulselam Barzanî di sala 1914’an de tê darvekirin, lewma wî ezmûna Şêx Ubeydullah dewam kiriye. Ji bo mafên Kurdan ji ya xwe nehatiye xwarê. Ji zarokên Barzaniyan nexasim pêşengtiya Mistefa Barzanî gavavêtineke din a girîng e ku wê demê hatiye avêtin. Di sêgoşeya Tirkiye-Îran-Iraqê de jiyaneke wî ya bi liv û lebat çêbûye. Herdu

serokatiyan jî heta bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn weke nûnerên dawî yên serokatiya rêûresmê bi rola xwe rabûne.

Di dîroka Kurdistana hemdem de bûyera herî neyênî ew e, Komara Tirkiyê û Împaratoriya Ingilîstanê sînorên Iraq û Tirkiyê danîne. Ev tê wê maneyê ku gewde û bedena Kurdistanê ji hev tê parçekirin. Mafên demokratîk neteweyî yên tevgerên Kurd bi lez dikevin rojevê û bi fikara pêşiyê li wan bigirin, bi lez sînoran datînin. Eger tevgera Kurd a neteweyî bi xisletên hemdem bi pêş biketa, ne xwestekên Ingilîstanê ji bo petrolên Iraqê bi cih dihatin, ne jî pêkan bû ku Komara Tirkiyê bibe dewleta netewe ya bi karektera faşîst. Herwisa, eger Kurdên Îranê jî tev li tevgera neteweyî ya Kurd bibûna, gelekî zehmet dibû ku hegemonya Ingilîstanê li ser herêmê pêk bihata. Bi vî awayî, pîlana tesfiyekirina Kurdan a Komara Tirkiyê ji xwe re kir amanc jî wê pêk nehata. Ji aliyê herdu beşan ve jî hevgirtina Mûsil û Kerkûkê vî mentiqî îfade dike. Bingehê vê hevgirtinê xwe disipêre Konferansa Qahîreyê ya di sala 1920'î de pêk hat. Yek ji tespîtên konferansê ew e, ji bo hegemonya kapîtalîst a li Rojhilata Navîn pêk bê, divê pirsgirêka Kurd timî di rojevê de be. Dema ku mirov pirsgirêka Îsraîl û Filistînê jî li vê zêde bike, mirov wê bibîne ku hêzên hegemonîk di parçekirina welat û gelan de û di warê pêkanîna statukoyên wan ên hewcedarî xwe kirî de çiqasî li pîlanên demdirêj fikirîne û ev ji bûyerên paşê biqewimin gelekî baş tê fêhmkirin. Xwe nêzî çareserkirina pirsgirêka Kurd nakin û di vê de sedema bingehîn hesabên hegemonîk ên li ser herêmê ne. Bûyerên li Kurdistana Iraqê van hesaban pirr vekirî pêşberî me dikin. Li parçeyên din jî pirsgirêk bêhtir giran dibin û di vê de para van hesaban piçûk nîne. Nêzîkatiyên ji bo PKK'ê jî nîşan didin ku hesabên behsa wan tê kirin bi awayekî aktuel dewam dikin.

Di heman demê de bûyerên bi heman rengî li Kurdistana Îranê jî qewimîne. Modela tesfiyeyê ya ji aliyê Tirkiyê ve hatiye meşandin Şah Riza jî ji xwe re mînak dîtiye. Dîsa bi herdu hêzên hegemonîk Ingilîstan û Rûsyayê re li hev kirine û tevgera tesfiyekirina hebûna Kurdan bi lez dewam kirine. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn tevgera bi pêşengiya Simko ya li Kurdistanê tesîr kiriye, ji ber ku Tirkiyê û Ingilîstanê pişta Îranê girtin û destek dan Şahtiyê hat tesfiyekirin. Kengî Rûsya Sovyetê jî xistin nava heman hevgirtinê Komara Kurd a Mahabadê ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn hatibû îlankirin ji holê rakirin.

Dema di navbera du Şerên Cîhanê de dema pêşketina tevgera neteweyî ya Kurd bû. Parçebûna Kurdistanê, tesfiyekirina tevgerên piçûk ên li serê û piştre meşandina polîtîkayên giran ên asîmîlasyonîst, şensê bûyîna tevgereke neteweyî ya modern ji holê rakir. Alayên Hemîdiyê beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi heman rola pêşîlêgirtin û astengkirinê rabû. Herdu dem jî hema bêje nîvsedsal in. Di dema vê nîvsedsalê de li nava dinyayê tevahiya tevgerên neteweyî yên gelan ên bi heman rengî dest pê kirine, bi pêş ketine û gihiştine. Ji ber Alayên Hemîdiyê û di encama operasyonên parçekirinê de Kurdan şensê xwe yê serketinê û şensê xwe yê bibin

tevgereke neteweyî ya modern ji dest daye. Dema ku em pêvajoyên çaresernebûnê yên heta îro dewam kirine li ber çavan bigirin, em ê baştir fêhm bikin ka di encama dekûdolabên mêtingerên emperyalîst de çi ji dest çûne.

Di vê sedsalê de tevgera neteweyî ya Kurd a bi pêşengiya bûrjûwayê weke li nava tevahiya dinyayê bi pêş neket an jî gelekî zelûl ma, û divê sedemên vê hûrûkûr bêne lêkolan. Mirov vê rewşê bi nêzîkatiyeke çor a materyalîst binirxîne û bi pêşneketina kapîtalîzmê ango pêşneketina çîna bûrjûwayê ve weke diyardeyeke objektîf girê bide, ev şîroveyeke tatmînkar nîne. Li gelek welatên bi heman rengî tevgerên neteweyî yên bêhtir serketî pêk hatine. Mînak tevgera neteweyî ya Tirk a pêre di zikhev de meşiyaye di nava heman şert û mercan de pêşde çûye û bêhtir serketî bûye. Herweha mirov pêşneketina tevgera neteweyî ya Kurd bi kêmhewldan û kêmçalakiyan ve, heta bi kêmşerkirinê ve girê bide rast nîne. Berevajî, gelek tevger pêk anîne û pirr şer kirine, lê bi ser neketine.

Sersedema pêşneketina tevgera neteweyî ya Kurd a modern têkiliya xwe bi şêwazê pêkhatina dîrokî ya tebeqeya jor a Kurd re heye. Ji dema hilweşîna Konfederasyona Med ve di şêwazê pêkhatina vê tebeqeyê de çeloxwariyek heye. Di Dîroka Heredot de çîrokek der barê hilweşînê de heye, wisa tê gotin: Keyayê dawî yê Medan Astiyag wisa bang li Harpagosê ku pêre xiyanet kiriye dike: “Hey rezîl, te xiyanet li min kir, keyatiya min hilweşand. Qet nebe tu bi xwe li textê min rûniştina. Hey te ev ne kir, qet nebe te keyatî bi destê Medan ve berdana. Çima te keyatî bi rezîlî bir radestî xulamê me Kyros kir?” Em nizanin ev çîrok çiqasî rast e, ne rast e, lê ev çîrok pêkhatina tebeqeya jor a Kurd a hevkar gelekî baş tîne ziman. Hêmanên tebeqeya jor hertim ji bo berjewendiyên xwe yên besît ên şexsî an malbatî, erkê desthilatdariyê ji serwerên li ser gelê xwe re pêşkêş kirine. Tevî ku îstîsna hene jî ev zêhniyet û helwest heta roja me ya îro bi tesîr bûye. Bi herhalî di vê de rola hevrikiya di navbera qebîle û malbatan de jî wê hebe. Di zêhniyeta Kurdîtiyê de tevahiya dîrokê xweperestî û arizîkirin bi awayekî şexsî û malbatî timî li pêş bûye. Di dema Împaratoriya Pers û Sasaniyan de jî rewşa wan bi vî rengî ye. Di dema desthilatdariya Îslamî ya serdema navîn de tevî ku têra xwe derfet û îmkan hene jî erka desthilatdariyê pêşî ji Emewî û Abbasiyan re, paşê ji Selçûkî, Aqqoyînî, Safewî û Xanedanên Osmanî re pêşkêş kirine. Xwediyê wê hêzê ne ku bi hêsanî dikarin siltantiyeke navendî ava bikin. Ehmedê Xanî hesreta vê yekê bi xemgînî bi xetên danîne, nîşan dide. Heta Siltanê Osmanî Yawiz Selîm ji Îdrîsê Bedlîsê re pêşniyar dike ku ji xwe re begekî began hilbijêrin. Lê bîstûheşt begên Kurdan ên di nava xwe de nikarin li hev bikin, ji Yawiz bi xwe dixwazin ew begekî began ji wan re destnîşan bike. Di sedsala 19. de yê ku derba stratejîk li Bedirxan Beg dide biraziyê wî Yezdan Şêr e. Di pirraniya tevgerên bi vî rengî de ev çîrok naguhere. Aqûbeta wan yek e. Herî dawî li cem PKK’ê jî vê çîrokê bi dehan car xwe dugêsinî kiriye. Heman rastî li cem tevgerên tesfiyeyê hemûyan rola xwe pêk tîne.

Duyemîn sedema bingehîn bi sedema yekemîn ve girêdayî bi şêwazê rêxistinî, bername û nêrîna li dinyayê ya hêmanên tebeqeya jor re têkildar e. Serxwebûn û azadî bi awayekî bi kok ji zêhniyeta wan derketiye, çûye. Di pencereya teng a hewcedarbûnê de li dinyayê serwext dibin. Serxwebûn û azadî mîna dijminê wan in. Hinekî jî wisa ye. Lewma li çanda civakî-dîrokî ya endamên wê ne xiyanet kirine, hêja nedîtine ku ew çand azad bibe û li gorî berjewendiyên xwe jiyana di nava çandên biyanî de çêtir dîtine û hebûna xwe bi vî awayî pêk anîne.

Sêyemîn sedema bingehîn dîsa bi du sedemên pêşî ve girêdayî ew e, tebeqeya jêr di nava formên qebîle û malbatê yên bêhtir paşveçûyî de maye, di nava pirsgirêkên şexsî û malbatî de û di nava şerên ji ber wan pêkhatî de xeniqîne. Ji bo Kurdekî xwedî rewşa normal û navîn, namûs ji bergiriya malbat û berjewendiyên wî yên xweperest wêdetir tiştekî din nîne. Ji mezinên xwe hînî vê têgihiştina namûsê bûye. Nafikire û aqilê wî nagihîje ku namûsa xwe û ya malbata xwe bi namûs û exlaqê civakê ve girê bide (namûs = nomos = pîvana civakî = exlaq); nikare vê ji xwe re weke helwest û pîvaneke exlaqî qebûl bike.

**e-** Tevgera Kurd piştî Şerê Cîhanê Yê Duyemîn bi tesfiyekirina Komara Mahabadê re ketiye nava bêdengiyeke kûr. Tevgerên li gorî rêzê xwe bi beg, şêx û milliyetgirên paşverû îfade dikirin bi awayekî xedar têkçûn û vê rê li ber bêdengiya mirinê vekiriye. Rê li ber demeke bêhêvî û reşbîn vekiriye. PDK'yên di salên 1945'an de hatin îlankirin, hewl dan xwe weke partiyên hemdem terîf bikin. Bi awayekî xwezayî li ser wan şopên rabihuriya nêz hebûn. Bingehê wan ê çîna bûrjûwayê qels bû. Rewşenbîrên wan hindik bûn. Bêhêvîtiya ji ber têkçûnan, dikir ku bi îhtiyat û fikar nêzîkî hewldanên nû bibin. Li gorî mînakên xwe yên li dinyayê, ew gelekî paşve mabûn. Rewşa wan ji rohnîbûn û tevgera Kurd a di dema Meşrûtiyeta Duyemîn de bêhtir paşvemayî bû. Ev jî nîşan dide ku tesfiyekarî çiqasî bi tesîr bûye. Fîgura pêşengiya demê bi Mistefa Barzanî tê temsîlkirin. Piştî rola xwe ya li Mahabadê (Mistefa Barzanî li vir rayedarekî eskerî ye) bi meşeke tijî serhatî karîbûye bigihîje Yekîtiya Sovyetê. Îhtîlala Iraqê ya di sala 1958'an de rêya vegerê lê vekiriye. Bêyî ku xwîn birije, şensê çareseriyekê heye. Ji ber ku bersiva bendewariyên aliyan ên beramberî hev nehatin dayîn, di sala 1961'ê de pêvajoyeke bi şer dest pê kiriye. Tevî ku di sala 1964'an de xwe gihandin Peymana Xweseriyê jî ev bi cih nehatiye anîn. Lihevkirina aliyan di sala 1971'ê de bêhtir berfireh e, lê ew jî bi cih nehatiye anîn. Di sala 1975'an de dewletên Îran û Iraqê li Cezayîrê li ser bingehê tawîzdanên li beramberî hev li hev kirin (gelekî dişibe lihevkirina Ingilîstan-Tirkiyê di sala 1926'an de) û vê jî kir ku ji bo tevgerê pêvajoyek bi dawî bibe. Ji ber lihevkirina di sala 1964'an de Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî li dijî serokatiya Mistefa Barzanî bûn muxalif û vê jî rê li ber gavavêtineke nû ya li ser bingehê rêûresma Silêmaniyê vekir. Di sala 1975'an de Yekîtî Nîştîmanî Kurdistan YNK hat damezrandin û bi vê jî hewl dan tevgereke hemdem pêk bînin. Ev tevger xwedî xisletên çepgiriya radîkal û lîberal bû. Zemînê cografî û avahiya çandî ya tevgerê, derfet û îmkan nedidayê bi îdeaya temsîla tevahiya Kurdistanê rabe.

Çawa ku di demên bihurî de bûyî, rîsk û tehlûke hebû ku weke tevgereke radîkal û li seriyekî din bimîne.

Li parçeyên din ên Kurdistanê jî pêşî şaxên PDK'ê û paşê çepgirên alternatîf çêbûn. Şaxên PDK'ê yên li Kurdistana Tirkiyê pêşî di sala 1959'an de bi Doza 49'an paşê jî di sala 1965'an de xwe weke PDK'a Tirkiyê nîşan dan. Dema gelek piçûk bûn û gavên xwe yên pêşî diavêtin ketin kontrola kontr-gerîllayê. Serokê pêşî yê PDK'a Tirkiyê Faik Bucak mîna ku ji ber pevçûneke nava eşîrê be, kuştin û bi vê bûyerê re eşîra Bucakan li Siwêregê bû baregeheke girîng a kontr-gerîllayê. Şaxên çepgirên Tirkiyê li Kurdistanê ji şovenîzma sosyal a weke nexweşiya neteweya serdest tê binavkirin wêdetir nikarîbûn bi ti rolê rabin. Hebûna Kurd û Kurdistanê guftûgoya herî bingehîn bû. Pêşî tabû bi van têgînan dihatin şikandin. Bername û rêxistiniyeke rastî mewzûbehs nebû. Pirsgirêka Kurd ji sloganê wêdetir nediçû. Xebatên sosyolojîk ên dihatin kirin mînakên çor ên pozitivîzmê bûn. DDKO'yên (Ocaxên Şoreşger ên Çanda Rojhilat) di sala 1969'an de hatin damezrandin, ji asta Cemiyetên Tealî Kurd ên dema Meşrûtiyeta Duyemîn nedibihurîn. Tevî ku di sala 1940'î de bêdengiya bêhna mirinê jê dihat li dawiyê mabû jî hê jî negihiştibûn wê astê ku bibin tevgereke neteweyî ya hemdem. PKK'ya di vê demê de hîmên wê hatin danîn, hewl dida rastiya xwe bibîne.

Piştî Komara Mahabadê Kurdistana Îranê jî ketibû nava bêdengiyeke kûr a bi heman rengî û li vir jî PDK weke ceribandineke nû derdiket holê. PDK'a Îranê bi pêşengiya Ebdurrehman Qasimlo ku bi xwe rewşenbîr bû, ji bo bibe partiyeke modern gav diavêtin. Bi Şoreşa Îranê re firsenda serketinê bi dest ketibû, lê ew jî baş nehat bikaranîn. Piştî ku bi bêbextiya Îranê Ebdurrehman Qasimlo û lîderê piştî wî Sadiq Şerefkendî hatin kuştin, tevger bû penaber. Piştî salên 1970'î komên çepgir ên hatin damezrandin û Komala zêde bi tesîr nebûn.

Li cem Kurdên Sûrî xebatên wêjeyî rê li ber pêşketinê vekirin û xebatên bi vî rengî piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî dewam kirin. Helbestvanekî mîna Cîgerxwîn gihişt. Xebatên bi heman rengî yên Osman Sebrî jî çêbûn. Hewl dan rêûresma Bedirxaniyan dewam bikin. Şaxên PDK'ê yên Sûrî çêbûn. Rêxistinên Partiya Kominîst gelekî bi tesîr bûn. Lê ji ber ku xwe nedisipartin nasnameya xwe û nikarîbûn xwezaya civakî ya Kurdistanê ji hev derxin şensê wan ê serketinê tinebû. Bi giştî bi nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî ketibûn.

Weke encam mirov dikare bibêje, tevgerên Kurd piştî Şerê Cîhanê Yê Duyemîn di qonaxa derbasbûnê de bûn. Pêşengiya ji rêûresmê ya tebeqeya jor tesfiye bûye, çûye. Li dawiyê bi tenê tabloyeke reşbîn maye. Kurd ji hebûna xwe û xwestekên xwe yên ji bo jiyana azad ketine nava neewlehiyeke hûrûkûr. Belkî jî di dîrokê de cara pêşî bêbawerî û neewlehiyek çêdibe. Bi awayekî tirs û fikar hene ku bibin diyardeyeke mîna Çermesoran. Li cem Kurdên Zaza û Elewî vê diyardeyê xwe bêhtir nîşan dida. Kurdîtî di çarçoveyeke modern de mirî hatibû dinyayê. Ya rastî, di rewşa berbiçav a tebeqeya jor de Kurdîtî 'mirî' hatibû dinê. Rewşenbîr û çîna modern a

diviyabû xwedî li nasnameyên civakî û neteweyî derkevin, li naverastê xuya nedikirin. Polîtîkayên hişk ên asîmîlasyonîst encam dabûn. Dilxwede rewşenbîr hebûn mîna ji nexweşiya webayê birevin ji Kurdîtiyê direviyan. Bi tevahî derdê gel ew bû hebûna xwe ya fizîkî dewam bike. Bûrjûwabûna derketibû holê ne dişibiya ya Cihûyan, ya pêkhatî bêhtir çîneke çerxkirî bû. Çiqasî ji Kurdîtiyê direviyan ewqasî pere bi dest dixistin, lewma mîna kûçikên Pavlov hînê vê yekê bûbûn. Civaka Kurd û Kurdistana salên 1970'î bûbû civak û welatê mirovên di heqê xwe de îdeayên wan nemayî yan nîşaneyên baweriya wan gelekî zelûlbûyî. Bêbextiya 'Kurdê bi dûvik' cihê xwe girtibû. Di vê rewşê de her kesê dixwest bawer bike ku bi dûvik nîne yan ji Kurdîtiyê derdiket an jî dema îddîa dikir ku dûvikê wî tineye bi awayekî şermoke carê sê caran bêhemdê xwe li ser milê xwe dizîvirî, li paş xwe dinêrî.

Min ev rastî di şexsê xwe de jî didît, his dikir. Eger min rê bidîta, ez ê jî ji zû ve ji Kurdîtî û Kurdistanîtiyê derketibûma. Lê piştî ku min bîrbirina hemdem nas kir, ev rastî bi ser min de hat, mîna kabûsekî bi ser min de kumişî. Rohniyên birqokî ên modernîteyê min ber bi xwe ve dikişandin. Lê ew cografya navlênekirî an ji zû ve terikandî û ew gelê min ê ku her cara navê wî dihat hildan ji berê dihat fedîkirîn, her ku diçû min nikarîbû ji wan qut bibim û vê yekê ez ji wan rohniyên birqokî berepaş vedigerandim. Modela modernîteya Tirk ji sedî sed destkişandina ji Kurdîtî û Kurdistanîtiyê ferz dikir. Carnan wexta ku xwe weke jineke bedew pêşkêş dikir, ji bo jiyana bi wê re diviyabû ji sedî sed te xwe înkar bikira. Heta mêrê te bixwesta tu pêre bibûya dost û heval jî heman tiştî ferz dikirin. Ji bo hinek xwebûnê tenêbûneke mutleq diviyabû li ber çavan bihata girtin. Ez tam li Arafê bûm. Ne hêviya min a ji bo cennetê ne jî tirsa min a ji cehennemê mabû. Ez weke dînan diçûm û dihatim. Li hemberî jiyana modernîst, Kurdîtî daxistibûn rewşa benekî û kelemekî ku li lingê mirov bigere.

Zemînê çînî yê tevgera neteweyî ya bûrjûwa pêk bianiya hê di dema derketina xwe ya holê de diviyabû xwe weke Tirk terîf bikira. Rewşa entelektuel ji nêz ve bi înkara Kurdîtiyê re têkildar bû: Entelektuel ew kesê ne Kurd bû. Salên 1970'î ew sal bûn ku diviyabû li ser diyarkirina hêmanên hemdemiya Kurd û Kurdistanê biryar bihata dayîn. Hê jî di bîra min de ye: Dema ku cara pêşî ez li ser têgîna "Kurdistana Mêtingeh" fikirîm û bi dilê xwe his kir, ez ji xwe çûbûm. Hevparê min ê malê, mirovê mezin Hakî Karer, dema ew rewşa min dît, tevî ku ne Kurd bû jî heta bigihîje şehadetê hertim weke pêşengê rastî yê tevgerê meşiya û ji vê xwe paşve neda. Semboleke rastî ya hevalî û hevrêtiyê bû. Rewşa cenînê ya tevgeran, ji rewşa di malzarokê de gelekî bêhtir bi zehmetiyan barkirî ye. Rewşên cenînê yên biyolojîk, qanûnên xwe yên bi xerîzeyên cinsî diyarkirî hene. Xwebûn hukmê xwe pêk tîne. Tevgerên civakî, eger ji wî celebî bin ku wê şopa xwe li ser jiyana civakî bihêlin, ji bo bikevin malzarokê demeke dirêj û di nava şert û mercên zehmet de wê rawestin. Di rêûresma pêxember de qonaxa derketina çiyê û ketina şikeftê bi temamî ew qonaxa malzarokê ye ku îşaret bi wan bûyerên tevgerên civakî dike ku wê biqewimin. Hz. Muhammed û melek Cebraîl dema cara pêşî têne cem hev, melek Cebraîl wehiya "Bixwîne!"

didiyê û paşê Hz. Muhammed ji xwe diçe, diricife û ta digire, ev hemû wê kêliya mezin û payeberz îfade dikin.

Xwesipartina hêzeke pêkhatî nayê maneya gavavêtineke nû. Ji ber ku bi tenê dikarî li gorî pîvanên wê hêzê di nava çerxên jiyanê de bi kêra dubarekirinê bê. Heman xusûs ji bo girêdanên dogmatîk bi hêzên baweriyê jî di cih de ne. Heta meşeke li ser xeta fikra zanistî jî tevgereke civakî ya nû pêk nayîne, eger bibe jî wê xetîbekî bawerî pê bê bibe. Di nava şert û mercên 1970'î de ji bo tevgereke azadiyê ya bi kok biryardan dişibe mîsala çêlika mirîşkê ya bibe çêlika qertelê, hem jî dora wê bi dijminên qertalan tijî ye ku wê di wê rewşê de hewl bide mezin bibe û bifire. Şert û merc wisa ferz dikin ku divê timî weke qertelekî bilind bifirî. Ji şehîdên me yên mezin Mazlûm Dogan tespîteke wî ya der barê şexsê min de hebû. Dema min ev rêz dinivîsandin ew tespîta wî hat bîra min. Min bihîstibû wisa gotiye: "Meşa rê ya heval dişibe firîna qertelekî. Hem jî timî bilind difire".

**Beşa Çaremîn: TEVGERA PKK'Ê û ŞERÊ GEL Ê ŞOREŞGERÎ**

Têgîna 'Kurdistana Mêtingeh' dil û mijiyê min hejandibû û paşê ji xwe çûbûm. Ev bûyera pêşî û dawî bû. Bi rastî, ev bûyer ji bo min ecêb û seyr bû, lê bûyerên piştre qewimîn îspat kirin ka çima têgînek evqasî bi tesîr dibe. Lê hê jî ji bo min zor e ku ez wê tesîra destpêkê rave bikim. Di demekê de ku fermana kuştinê ya Kurdîtî û Kurdistanê hatiye dayîn û ev bi awayekî herî dijwar bi cih tê anîn, li Enqerê ji bo vejîna têgînî biryardan hem jî bi tena serê xwe, bi qasî bibe mijara romanekê analîzeke ciddî jêre divê.

Ez hem di nava atmosfera tevgerên ciwananên şoreşger ên Kurdan de û hem jî di nava yên Tirkan de bûm. Eşkere ye ku tesîra van tevgeran li min bûye. Di salên DDKO û Dev-Gençê de sempatîzaniya van pêkhatinan wisa bûyereke kêmtesîr nîne. Min navên rêxistinên THKP-C, THKO, TKP/ML-TIKKO bihîstibû û min şehadeta bi egîdî ya pêşengên wan dîtibû. Lîderê THKP-C'ê Mahîr Çayan pêşî bi Huseyîn Cevahîr re li Maltepeyê li ber xwe da, paşê reva wî ji girtîgehê û tevî neh hevriyên xwe li Kizildereyê şehadeta wan gelekî bandor li min kir. Ewqasî bandor li min kiribû, min ji çalakiya pêşî ya boykotkirinê ya protestokirina vê komkujiyê re pêşengî kir. Dema ku lîderê THKO'yê Denîz Gezmîş û du hevriyên wî birin bi dar ve bikin, min ew dîtin. Dîsa di heman wextî de şehadeta lîderê TIKKO'yê Îbrahîm Kaypakkaya li zindana Amedê yê ku li dijî êşkencê li ber xwe da bi tesîr bû. Min dît ka hersê lîderan çawa di berdêla giyana xwe de rastiya gel û neteweya Kurd anîn ziman. Tevî ku bi rêzeke hêmanên di dereceya duyemîn de ev lîder ji nava ciwanan derketibûn jî şehadeta wan a ji bo heqîqetê, sedema bingehîn bû ku kir ez biwêrim bi ser rastiya xwe de bimeşim.

Mirov biwêre bi ser rastiya xwe de bimeşe tiştek e, û mirov zanibe çawa bi ser de bimeşe tiştekî din e. Di dema dibistana seretayî de min ji zarokan koma nimêjê pêk anîbû û bi vê bûbûm

xwediyê tecrûbeyekê. Wekî din jî tecrûbeyên min ên çêkirina komên li gundan hebûn. Lê mirov biwêre bi ser rastiya kujer de biçe û gavên vê yên pêşî biavêje, ev tiştek e ku hevtayê wê nîne, gavavêtineke taybet e. Paşê gelekî hatiye guftûgokirin, gelekî rexne hatiye kirin û hatiye gotin "Çima rêxistina polêsan nedît, çima tedbîrên xwe negirtin?" Li naverastê rewşeke polîsiye tinebû. Gavavêtineke seyr a weke dînan hebû. Gavavêtineke wisa bû ku mirov hay ji xwe nebe, dibe ku hêz û heqîqet bibin jêdera bêhêzî û şaşiyê. Gelo çiqasî tevgereke bi aqil bû, yan jî çiqasî tevgereke berhema hisan bû? Bersivdana van pirsan zor e, ya rastî zêde hewce jî nîne. Li Tirkiyeya salên 1970 û 1980'î bi têgîneke siyasî ya ji du gotinan pêkhatî meş û jiyan gelekî girîng e. Ne sal, roj mîna gulleyan giran derbas dibûn. Hedefa pêkhatina wê dihat payîn ji xeyalê jî bêhtir şîlo û girravî bû. Hemin min zanîbû ku pêkanîna komekê jî karekî gelekî mezin e. Ne zehmet bû ku mirov texmîn bike, lîstika me ya komê ku me dilîst wê li ber çavên polîsekî îstîxbaratê yê herî jêhatî ciddî neyê girtin û henekê xwe pê bike. Çawa ku di tecrûbeya min a pêşî ya civakî de (tecrûbeya em dikarin bibin Kurd) ku min ragihandibû, gundiyekî gotibû "Tu ji dareke hişkbûyî re dipeyivî, tu yê dareke hişkbûyî çawa hêşîn bikî?" Diyar bû bi vê gotinê, ez bi bêbaweriyê pêşwazî dikirim. Jixwe gelek komên hemsalên me bûn, xwe nedigirtin û em weke 'çeteya xwedê ji wan stendî' bi nav dikirin. Tew UKOCU û APOCÎ jixwe bûbûn navên me yên pêşî. Ji ber ku nav li me dihatin kirin em pê kêfxweş û serbilind dibûn. Çawa ku nav li zarokekî tê kirin. Lê me bi xwe ev nav li xwe nekiribûn. Bi tenê dema em kom bûn me karîbû em ji xwe re bibêjin **Şoreşgerên Kurdistanê**. Piştî komê bi pênc salan me diwêrîbû navê rastî li xwe bikin. Rêwîtiya gelekî bi heyecan û mîna ya dînan li Enqerê di Newroza sala 1973'an de li keviyên Bendava Çûbûkê dest pê kir di 27'ê Mijdara 1978'an de li gundê Fîsê yê Amedê bi navê PKK'ê bi encam bû û bi vî awayî me xwe weke kesên namûsa xwe rizgarkirî dihesiband. Ma ji vê mezintir hedef hebû? Ma ne rêxistina modern a çîna modern hatibû avakirin.

## A- PKK û ÎDEOLOJIYA DEWLETDARIYA NETEWE

Îro dema ku em vedigerin li rabihuriyê dinêrin, em bêhtir dikarin atmosfera bîrbirinê û şertên em birin îlana PKK'ê bi awayekî rastî şîrove bikin. Berî ku em şîroveya xwe ya di vî warî de bikin, ez dixwazim şêweyê fikrê yê xwe disipêre cihêkirina obje-sûbje hinekî din hûrûkûr binirxînim û wê ev yek mijara me jî bêhtir zelal bike. Me berê anîbû ziman ku ev şêweyê fikrê di mezinbûna hegemonya kapîtalîst a Ewrûpaya Rojava de bi roleke bingehîn rabûye. Sîstema şaristaniyê xwe bi sêberiya bajar-çîn-dewletê îfade dike û xwe disipêre têgîna xweda-evd a ji hev cihêkirî ku pê dabeşkirina bi kok a civakê rewa dike û bi şîroveya herî zelal a cihêkirina obje-sûbje ya şaristaniya Ewrûpayê gihiştiye asta xwe ya herî mezin. Têgîna obje-sûbje têgîna bingehîn a sîstema şaristaniyê ye. Ev cihêkirin derfet û îmkan dide modernîteya kapîtalîst û bi wê gihişt şîroveya xwe ya herî pêşketî.

Tê zanîn, felsefeya xwe disipêre têgîna obje-sûbje di qada heqîqetê de rê li ber bûyerên mezin vekiriye. Di pêkhatina bîrbirina heqîqetê de felsefeya qala wê tê kirin gelekî rê kudand û vê jî hegemonya kapîtalîzma Rojava li nava dinyayê pêk anî. Divê mirov ji bîr neke ku her sîstema hemdem têgihiştina li heqîqetê ya di dema xwe de hewl dide bike sereke. Li derveyî têgihiştina li heqîqetê ti rêbaz şensê xwe yê serketina mayînde nîne. Sîstema şaristaniyê ya têgihiştina wê ya li heqîqetê gelekî zêde ye, herwisa bi qasî vê hêza xwe, xwe hegemonîk dike, lê bi tenê sîstemên têgihiştina wan li heqîqetê ji wê zêdetir dikarin jê bibihurin. Sîstema şaristaniyê ya li Ewrûpaya Rojava mezin bû, hêmana bingehîn a ew li nava dinyayê hegemonîk kir, serdestiya wê ya di warê têgihiştina li heqîqetê de ye. Ev jî bi saya cihêkirina obje-sûbjeyê pêşde bir û ew kir felsefeya xwe ya bingehîn (Descartes). Xusûsa divê mirov bixe ber lêpirsînê ew e, gelo ev têgîn îfadeya heqîqeta mutleq e, yan na. Analîzên di çarçoveya fizîka kuantumê de hatine kirin, îspat dikin ku mirov nikare ji sedî sed obje û sûbjeyê ji hev cihê bike. Li gorî tehlîlên dawî çavdêr û çavliser maneya xwe nînin. Bandorê li hev dikin. Encama derdikeve holê karekterê îzafî yê heqîqetê ye. Çawa ku objektîvîteya mutleq (materyalîzm) nîne, sûbjektîvîteya mutleq (îdealîzm) jî ne pêkan e. Heqîqet di têgihiştina li herdu seriyan de qîmeta xwe namîne. Ew têgîna ku têgihiştina îzafî ya cihêkirina obje-sûbjeyê mutleq nake, xwediyê wan xisletan e ku herî zêde xwedî kapasîteya afirandina heqîqetê ye. Jixwe di bingehê şoreşa fizîkê ya Albert Einstein de têgîna îzafiyetê heye ku pê şîroveya der barê heqîqetê de dike. Ango derketibû holê ku modernîteya kapîtalîst a xwe sipartibû cihêkirina obje-sûbjeyê ne xwedî nirxekî mutleq bû û diviyabû mirov jê bibihurin. Ji şîroveya K. Marks a der barê kapîtalîzmê de bêhtir, bi şîroveya Albert Einstein a der barê heqîqetê de derket holê ku divê mirov ji kapîtalîzmê bibihurin. Ji ber ku felsefeya materyalîst a xweza, civak û dîrokê ya K. Marks û F. Engels ji cihêkirina obje-sûbjeyê nikarîbû bibihure mirovê wê yê azad mumkîn nebû. Ya rastî, hewldanên wê yên di vî warî de qîm nekirine. Talana hawîrdorê û hilweşîna civakê girêdayî hêza pêkanîn û maneya têgîna obje-sûbjeyê li cem kapîtalîzmê ye. Li gorî ku jiyaneke bê hawîrdor û civakê ne pêkan e, û eger em ji bo dewamkirina jiyana mirov ji ya xwe nayên xwarê, divê em ji kapîtalîzmê bibihurin. Felsefeya îzafiyetê ya cihêkirina obje-sûbjeyê mutleq nake derfet û îmkan dide da ku mirov ji kapîtalîzmê bibihure.

Dema ku me ber bi avakirina PKK'ê ve gav avêt, me û min gelekî hewl da ku bi xeta sosyalîzma zanistî ya Marksîzmê ve girêdayî bimînin. Eger sosyalîzma pêkhatî nebûya, belkî jî rêxistineke bi awayê PKK'ê çênebûya. Lê ev rastî nayê wê maneyê ku PKK di dema derketina xwe ya holê de bi temamî pêkhatineke sosyalîzma pêkhatî bû. Herçiqasî gelekî ketibe bin bandora wê jî mirov nikare bi temamî rastiya wê bi sosyalîzma pêkhatî rave bike. Li vir ji bo ku em karibin şîroveyeke rast bikin, divê em li têgînên îzafiyet û cudabûnê binêrin. Hê jî tê bîra min; ji ber cihêkirina obje-sûbje ya di sosyalîzma pêkhatî de, ez jî ji bo avakirina PKK'ê li zemînê maddî û li şîroveya materyalîst digeriyam. Ji ber ku ev lêgerîn weke pîvaneke bivênevê bû. Li cem Kurdan, li Kurdistanê diyardeyên dişibiyan çîna karker hebûn. Bûrjûwabûyîn dihat hiskirin. Ji bo aliyê reel

van diyardeyan qîm û têrê dikir. Lê rast nîne ku ez bibêjim, em bi temamî ji vê piştrast bûn. Me ev li gorî pîvanê qebûl kiribû. Wexta ku wisa dibû, min xwe û me xwe bi temamî bi awayekî dogmatîk li şêwazê xwezayî yê herikîna jiyanê nedigirt. Her ku biçûya wê ev aliyê me bi pêş biketa û vê yekê wê cudahiya me ji yên din diyar bikira.

Her tim tehlûke heye ku pîvan mirov bibin dogmatîzmê. Li ser me jî bandora dogmatîzmê demeke dirêj dewam kir û hê jî mirov nikare bandora wê piçûk bibîne. Lê ji ber ku bi sînor be jî deriyên me li îzafiyetê vekirî bûn, vê yekê em ji tehlûkeyên dogmatîzmê diparastin. Mirov felsefeya îzafiyetê bi temamî ji para obje-sûbje ya di heqîqetê de mehrûm neke û li ser bingehê dijberiyê firsendê nede mutleqiyetekê û bi kar bîne, mirov dikare xwe bigihîne şîroveya herî mezin a heqîqetê û di her şert û mercê krîtîk de mirov dikare serî li wê bide û ji bo serketinê gav biavêje û ji bo mirov azad bibe derfet û îmkanan bibîne. Eger em îro li rabihuriyê vedigerin û hewl didin PKK'ê ji nû ve şîrove bikin, ev bi saya veguherîna felsefî ye ku cihêkirina obje-sûbjeyê mutleq nake û bi îhtîmam hewl dide xwe jî mutleq neke. Divê mirov veguherîna felsefî ya ji cihêkirina obje-sûbjeyê dibihure, piçûk nebîne. Bêyî ku mirov bi ber bayê postmodernîst bikeve, yên Marksîst jî di navê de divê mirov ji tevahiya versiyonên şîroveyên felsefê yên di bingehê modernîteya kapîtalîst de bibihure û ev tê wê maneyê ku şoreşa herî mezin a fikrê pêk tê. Bêguman em hê li serê vê şoreşa fikrê ne. Lê dîsa jî mirov nikare encamên pratîk ên vê şoreşê piçûk bibîne. Di vê çarçoveyê de mirov PKK'ê ji nû ve şîrove bike, mirov tespît bike ku di serê salên 1970'î de xwe sipartiye kîjan hêmanên çanda maddî û şertên kîjan dinyayê, dîsa di heman demê de bi kîjan formên bingehîn ên bîrbirin, rêxistin û çalakiyê rabûye û kîjan çanda manewî kiriye bingehê xwe; tespîtkirina van hemûyan ne bi tenê wê bibe sedem ku em Tevgera PKK'ê rast nas bikin, em ê rola wê ya roja me ya îro jî bêhtir zelal bikin.

**1- Rast Danasîna Şertên Dinya Salên 1970'î**

Ti tevgera fikrê û mirov ji formên maddî yên di navê de serbixwe nikare pêk bê. Ya girîng ew e, ka fikir kîjan formên maddî nîşan dide. Dema ku mijar dibe rastiya civakî, hingê formên maddî bi xwe jî ew rewşa formên fikrê yên ava kirî û bi sazî kirî ne. Ziman jî di navê de, divê mirov formên civakî weke xwezayên nerm yên rêjeyên wan ên fikir û zêhniyetê pirr, binirxîne. Xwezayên nerm bi timûtim veguherîna enerjiyê û form bidestxistina wê, pêk tên.

Sîstema hegemonîk a salên 1970'î modernîteya kapîtalîst e. Mezinbûna vê sîstema navenda wê Ewrûpaya Rojava ye, di pêncsed salên dawî de bûye xwediyê karektera hegemonîk. Ji sedsala 16. heta bi sedsala 18. kapîtalîzma bazirganiyê, ji sedsala 18. heta dawiya salên 1970'î kapîtalîzma îndustriyel, ji salên 1970'î û şûn ve jî bi hegemonya kapîtala fînansê xwe globalîze dike û xwe dewam dike. Cudahiya di navbera deman de bi veguherîna naveroka sermayeyê re têkildar e; ya rastî bi mîqdara karê ya bi dest dixe ve girêdayî ye. Kapîtalîzma bazirganiyê, bi veguherîna di pîşesaziya manîfaktur de û bi pêşxistina sîstemên fînansê xwe karekterîzê dike.

Bazirganiya deverên dûr karê gelekî zêde dike. Ji ber vê sedemê, bazirganiya di navbera parzemînan û ji deryayan wêdetir bi pêş dikeve. Kapîtalîzma pîşesaziyê bi hilberîna fabrîkeyan kara herî zêde bi dest dixe. Hem kapîtalîzma bazirganiyê hem jî ya pîşesaziyê bi amûrên fînansê (pere, sened û wekî wan) bi rola lezdayîna veguherîn û hilberînê radibin. Hê negihiştine wê astê ku bi serê xwe rêjeya kara herî zêde bi dest bixin. Derfeteke bi vî rengî di dinya salên 1970'î de bi guhertina sîstema pereyan, ango kengî di berdêla zêr de ji çapkirina Dolar geriyan, bi dest xistin. Ji vî aliyî ve, dinya salên 1970'î bidestxistina pereyan ji pereyan û xwe gihandina rêjeya kara herî zêde îfade dike. Di dîroka mirovatiyê de ev bûyer cara pêşî diqewime, yekemîn e. Di herdu demên pêşî de hem di hilberîna mal de û hem jî di hilberîna fikrê de afirênerî heye. Di pêkhatinên fikrî û hilberîna mal de serdestiyeke berbiçav a kapîtalîzmê ji sîstemên din ên mêtingeriyê heye. Bi heman awayî, serdestiya xwe ya li ser civakê jî qat bi qat zêde kiriye. Desthilatdariya îndustriyalîzm û dewleta netewe serketina hegemonîk a kapîtalîzmê îfade dikin. Kengî dewleta netewe û îndustriyalîzm li ser civakê serwer dibin kara herî zêde jî çêdibe.

Di dema kapîtala fînansê de êdî hewcedarî bi afirîneriya fikrî û exlaqê hilberîneriyê nemaye. Serweriya pere yan xwedakirina wî xweserî kapîtalîzma fînansê ye. Xwedayê kapîtalîzma pîşesaziyê dewleta netewe ye, pere jî xwedayê kapîtalîzma fînansê ye. Pere di serdema kapîtala fînansê de bi tenê amûrê bihevguhertin, danehev û bilezkirina hilberînê nîne, bi xwe amûr an jî kirdar e ku dewleta netewe jî di navê de hukim li her tiştê der barê civakê de dike. Ji bo mirov derxe holê ka vê karektera xwe çawa bi dest xistiye, pêdivî bi analîzkirineke berfireh a dîroka şaristaniyê heye. Lê eger mirov bixwaze kurtûkurmancî lê serwext bibe, mirov dikare wê weke diyardeya mezintir û zêdetir a bazar û desthilatdariyê bide naskirin. Li gorî danasînê, ewqasî serdest e ku hem bazara ekonomîk hem jî desthilatdariya dewleta netewe bi xwe ve girê dide. Ya dimîne ew e, li ser amûrên pere bilîze, ji bo vê jî diyardeyên borsa, dovîz û faîzê têra xwe îmkan didin. Xwediyên pereyan bêyî ku bixebitin, bêyî ku serî li rêbazên nû yên fikir û hilberînê bidin, bi awayekî mirov nikaribe li ber herdu demên wê yên pêşî bigire, bi van amûran kara herî zêde bi dest dixin.

Ev rastiya kara herî zêde bi hilweşîna civakê re yek tişt e. Tevahiya dîroka civakê bi normên hişk ên exlaqî û polîtîk hebûna xwe bi pêş xistiye û dewam kiriye. Jixwe beriya dîroka şaristaniyê mirovatî diyardeya karê nas nake. Hem fikir û hilberîn derfetê nadin diyardeya karê, hem jî dema ku zêde tê hilberandin hingê wê zêdehiyê bi 'ekonomiya diyarîkirinê' belav dike. Karê û daneheva sermayeyê gunehê herî mezin dihesibîne. Tevahiya dîroka şaristaniyê dema di avahiyên marjînal ên civakê de û di delhîzên bi dizî de derfetê zêdebûnê dibîne, jêre şensê jiyaneke bi sînor tê qebûlkirin û timûtim tê desteserkirin. Nexasim dînan sîstema murabeheyê ya dişibe daneheva sermayeyê gunehê herî mezin hesibandine, qedexe kirine û bi şîrka bi xwedê re yek qebûl kirine. Sedema bingehîn a vê yekê ew e, zû haya wan jê çêbûye ku daneheva sermayeyê antî-civakî ye, û têkiliya wê bi hilweşîna civakî re heye. Lewma xwediyên

desthilatdariya civaka şareza û kesên bi armanca karê rê nîşanî ekonomiyê didin, hewl didin hebûna civakî ya di bin hukimranî û mêtingeriya wan de dewam bike û hilneweşe. Hêzên me îşaret bi wan kir, haya wan ji wê tehlûkeyê heye ku kar û sermaye bibin sedem.

Di herdu serdemên pêşî yên kapîtalîzmê de sîstema fînansê bi rola sereke derneket pêş û giranî nedana wê û eleqe nîşan nedana wê, nîşan dide ku bandora nêzîkatiya rêûresmê hê jî bi hêz e. Jixwe kapîtalîzm bi xwe sîstemek e ku krîzê diafirîne û cinawirek e ku bi hezarê salan li zincîrê hatiye xistin û kengî ji pêxîrtengiya giran a dêr û desthilatdariya Ewrûpaya Rojava ketiyê sûdê werdigire, qefesa xwe parçe dike û dest pê dike li ser civakê weke xwedayekî nû hukmê xwe dimeşîne. Divê mirov baş zanibe ku kapîtalîzm nîzameke normal a civakî nîne û wê nebe. Tevahî ekolên felsefeyê û zanistên civakî (hinekî sosyalîzma zanistî jî di nava vê de ye) di hewara xwe de anîne û li dora xwe kom kirine da ku pê karibe razî bike ew sîstemeke rewa ye. Nemaze polîtîka ekonomiyê pirtûka pîroz a rewakirina kapîtalîzmê ye. Divê mirov wisa şîrove bike. Di dîroka mirovatiyê de, di rastiya civakî de, sîstemeke bi vî rengî ya serdestî û mêtinkariyê bi serdema fînansê re bi temamî ji kontrolê derdikeve, her tiştê bi civakê re têkildar û heta bi hawîrdora wê re têkildar dixe kontrola xwe. Gelekî girîng e ku mirov antî-şoreşa mezin a di salên 1970'î de bi vî awayî bide naskirin.

Hînê bi awayekî teze di bîra me de ye, me ji bîr nekiriye, antî-şoreşa salên 1970'î li dijî şoreşa çandê ya antî-modernîst ku derket asta herî jor, pêk hat. Di salên 1970'î de kapîtala fînansê gav avêt serdema xwe ya serweriyê û mirov nikare vê yekê bi maskeya bêguneh a veguherîna ekonomîk ku da ber rûyê xwe, rave bike. Serweriya kapîtala fînansê li ser du Şerên Cîhanê, li ser şerên herî xwînrij ên dîrokê yên sedsala 20., ji van jî wêdetir li ser mîrateya şerên mêtingerî û serweriya çînî ya pêncsed salên dawiyê û li ser desthilatdariya dewleta netewe ya ji serî heta binî tê maneya şer, mezin bûye. Xwe disipêre nîzamekê an sîstemekê ku bi tenê kara herî zêde dibîne, ekonomiyê ji ekonomîbûnê derdixe, ji aliyekî ve bi dîn û harî hilberînê sor dike, ji aliyê din ve jî artêşên birçîtî û bêkartiyê mîna çiyan mezin dike. Xwe disipêre şerekî ku bi hegemonya medyayê zêhn û exlaqê mirov bîstûçar saetan bombebaran dike, zêhniyet û bêexlaqiyeke dijber ferz dike; li ser navê mirovatiyê di van pêncsed salên dawiyê de her çi mîrate mabe, dewr hatibe girtin û her çi bi şoreşan (nexasim Şoreşên Mezin ên Franse û Rûsyayê) hatibe bidestxistin li dijî hemûyan şer dike. Em dizanin ku dema navbera salên 1970'yî-1990'î neo-konformîzma Ronald Reagen, Margaret Thatcher û Mîxaîl Gorbaçov a tesfiyekirina şoreşên mezin ên dused salên dawî yên Franse û Rûsyayê îfade dikin. Kapîtala fînansê di dema neo-konformîzmê de dibe hêza hegemonîk û ev xweber nîne.

Tirkiyeya salên 1970'î ew Tirkiye bû ku hêdî hêdî diket bin bandora şoreş û antî-şoreşa li nava dinyayê pêk dihat. Jixwe di encama Şoreşa Ciwanan a 1968'an û antî-şoreşên eskerî û ekonomîk ên 1980'î de (Biryarên Ekonomîk ên 24 Çileyê û operasyonên eskerî yên 12'ê Îlonê) herçiqasî li

dora xwe dîwarên stûr lê kirin jî dîsa nikarîbû nekeve nava vê dinyayê. Pêxîrtengiya sîstema kapîtalîst a li nava dinyayê, li Tirkiyê jî xwe weke pêxîrtengiya faşîzma Tirkê Spî nîşan da. Pêxîrtengiya modernîteya kapîtalîst pêxîrtengiya dewleta netewe ya Tirk bû.

Darbeyên eskerî yên 12'ê Adara 1971'ê û 12'ê Îlona 1980'î nîşan didin ku tevgerên şoreşger ên ku hêmanên faşîst ên sivîl nikaribûn wan bitepisînin bi tenê bi darbeyan dikarin werin rawestandin. Ev kelha muhkem a sîstemê timûtim bi tevgerên faşîst ên sivîl ên antî-şoreşê û bi palpiştiya darbeyên eskerî diparêzin. Sîstema komploker a Tirkê Spî ku ji 1925'an ve di serî de nasnameya Kurd li dijî tevahiya liv û lebatên demokratîk û hebûnên çandî di nava şer de ye û her ku dihat teşhîrkirin û rûyê wê yê rastî derdiket holê, dîn û har dibû. Hêzên herî operasyonel ên Gladîo'ya NATO'yê hêzên wê bûn. Bi tevahî avahiyên siyasî xistibûn nava lepê xwe. Eger beşek hinekî ji kontrolê derketa bi komên faşîst ên sivîl ditepisandin yan jî wan hêzan têrê nekirana bi tevahî hêzên artêşê dixistin nava tevgerê. Ji ber ku weke sîstemeke Proto Siyonîst rola xwe pêk dianî, ji aliyê hêzên hegemonîk ên global ve dihat destekkirin. Mînakeke din wisa nîne ku gelê xwe evqasî xistibe kontrolê. Ango pêxîrtengbûna modernîteya Tirkê Spî ji nêz ve sîstema global eleqedar dikir. Bi darbeya eskerî ya faşîst a 12'ê Îlonê hewl dan ji pêxîrtengiyê rizgar bibin. Ji bo derketina ji vê pêxîrtengiyê polîtîkayên wan ên bingehîn di qada ekonomiyê de vekirina deriyên xwe li derve û pevkelîna bi sîstema global a fînansê re bû, di qada îdeolojîk de jî tevî milliyetgiriyê berê xwe dan milliyetgiriya Tirk-Îslamê û bi dewleta netewe ya laîk palpiştiya dewleta netewe ya Tirk-Îslamê kirin. Darbeya 12'ê Îlonê çalakiya herî berfireh a Gladîo'ya NATO'yê bû. Erk û wezîfeya wê ew bû ku tevahiya çalakiyên şoreşger demokratîk ên gelên Rojhilata Navîn bi awayekî mayînde bitepisîne. Heta roja me ya îro hewl dide ku vê rola xwe bi tevahiya komên faşîst ên sivîl û hêmanên nîv-mîlîter ên sîstemê bimeşîne. Bi tevahî partiyên siyasî çi desthilatdarî dibe çi jî muxalefet dibe, hemû mîna diranê heman çerxê bi rola herî girîng radibin.

**2- Pêxîrtengiya Sosyalîzma Pêkhatî û Gavavêtina Şoreşger**

Pêxîrtengiya sîstemê ya di qada çanda maddî de xwe di qada îdeolojîk de jî nîşan da. Jixwe ya diviyabû bibe jî ev bû. Şoreşa 1968'an bi awayekî bingehîn weke şoreşa îdeolojîk di qada çanda manewî de teqiya. Li ber çanda modern, li ber tevahiya şaxên wê yên lîberal, rastgir û çepgir radibû. Di vê çarçoveyê de şoreşeke girîng bû. Bi kêmanî bi qasî Şoreşên Polîtîk ên Franse û Rûsyayê şoreşeke îdeolojîk bû. Hegemonya îdeolojîk a modernîteyê ji dema ku hatibû avakirin û vir ve cara pêşî şikest xwaribû. Ji sedan salan ve li ser navê homojenkirina civakê gelek hêmanên civakî yên çandî, cinsî, dînî û xwecihî hatibûn girtin, asîmîlekirin û heta qira wan hatibû anîn ji bo şerên nasnameyê rabûn. Ji vê serîrakirinê re ciwanan pêşengî kir û ev jî bi serê xwe manedar bû. Ji ber ku ciwan beşê civakê yê modernîteyê herî kêm bandor lêkirî bû. Şoreşa îdeolojîk bi tenê li dijî lîberalîzma kapîtalîst nedihat meşandin, bi qasî dewleta netewe ya lîberal bi dewleta netewe

ya sosyalîzma pêkhatî re jî têkiliyên xwe birrîbûn. Li beramberî îndustriyalîzmê dijberiya îdeolojîk cara pêşî bû ku bi vegotinên bi hêz ên teorîk xwe îfade dikir. Femînîzmê bi kêmanî bi qasî teoriyên çînî xwe gihandibû argumanên girîng ên teorîk. Nasnameyên çandî yên ji rêûresmê îspat kiribûn ku bi qasî nasnameyên modern hêja ne, û dest ji wan nabe. Hatibû fêhmkirin ku teoriya neteweparêziya modern rewakirina etnîsîteya serdest e, û ne tiştekî din e. Derketibû holê ku ji îdeolojiyên wê demê ya herî populer û muteber fikra rizgariya neteweyî ya modern û pratîka wê bi qasî tê gotin ne antî-kapîtalîst û rizgarîxwaz e. Dîsa mirovan gelekî guftûgo dikir ku sosyalîzma pêkhatî ji modernîteya kapîtalîst nabihure, berevajî sîstemê bi hêz dike. Demokratbûna sosyal demokrasiyê ji zû ve kiribûn pelê mêwê yê ku eybên kapîtalîzmê vedişêre, dinixumîne.

Pêxîrtengiya îdeolojîk a sîstemê li Tirkiyê yek ji holanên xwe yên bi hêz veda. Pêxîrtengiya avabûna faşîzma Tirkê Spî di qada îdeolojîk de xwe nîşan dabû, bi derbên îdeolojîk ên şoreşger ketibû pêvajoya teşhîr û tecrîdê. Cîla modernîst a milliyetgiriya laîk negirtibû. Bi qasî îdeolojiya dînê ji rêûresmê îdeolojiyên modern ên şoreşger jî bi hêz holan didan. Tevgerên şoreşger ên salên 1970’î bi awayekî bingehîn tevgerên îdeolojîk bûn. Xislet û karekterên wan ên polîtîk nehatibûn bipêşxistin. Ji ber ku sîstem teşhîr dikirin, girîng bûn. Rastiyên civakî cara pêşî bû ku dihatin îfadekirin. Rastiyên ku yeqîn dikirin ji zû ve hatine veşartin û xistine qebrê, bi têkoşîna îdeolojîk yek bi yek vedijiyan. Li pey îdeolojiyên Îslamî îdeolojiyên sosyalîst hatin. Li pey herduyan jî formên îdeolojîk ên diyardeya Kurd îfade dikirin hêdî hêdî xwe nîşan dan. Ji vê nerazî bûn, lewma milliyetgiriya nijadperest rakirin pêdarê, rakirin ser herdu lingan. Tirkiya salên 1970’î di dîroka xwe de bi awayekî rastî li şerên herî mezin ê îdeolojîk şahidî kir. Milliyetgiriya nijadperest bi awayekî Elmanya Hîtler li pey dewletdariyeke netewe ya bi hêz diçû, îdeolojiyên Îslamî jî rola xwe ya ji rêûresmê ku bi destê dewleta neteweparêz a laîk ve berdabûn ji nû ve dixwestin pê rabin û di nava dewletê de cih bigirin. Îdeolojiyên çepgir di nava pêxîrtengiyeke kûr a têgînan de bûn û bi civakparêziyeke ji civakê şuştî re mijûl dibûn. Civakparêz û dewletdariya netewe tevlîhev kiribûn. Ezmûnên demokratîk ku diviyabû îdeayên wan ên herî bikok bûna, mixabin bi sînor bûn. Ji çalakiyên gel ên demokratîk zêdetir, di nava çalakiyên teng ên koman de bist bûbûn. Lê dîsa jî hemû bi awayekî giştî bi rola xwe ya ravekirina heqîqetên civakî radibûn.

Heqîqetên bi têkoşîna îdeolojîk a li dijî pêxîrtengiya avahiyên modern (kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzm) ên li dinya û Tirkiya salên 1970’î derketin holê di pêkhatina PKK’ê de roleke wan a girîng heye. Herçiqasî xwediyê gelek kêmasî û şaşiyan bin jî di pêkhatinê de para şehîdên têkoşînê diyarker e.

**3- PKK û Îdeolojiya Dewletdariya Netewe**

Di pêkhatina PKK’ê de pirsgirêka bingehîn ew e, di mijara dewletdariya netewe de şîlo maye. Nexasim tezên J. Stalîn di mijara pirsa neteweyî de bi tesîr bûne. J. Stalîn pirsgirêka neteweyî weke pirsgirêka dewlet avakirinê dibîne. Ev nêzîkatiya wî bandor li tevahiya sîstema sosyalîst û tevgerên rizgariya neteweyî kiriye. Lenîn jî vî mafî qebûl dike û avakirina dewletê weke mafê neteweyan ê çarenûsa xwe diyar bikin dibîne û ev sedema bingehîn e ku dike, bi tevahî partiyên kominîst û sosyalîst ji aliyê îdeolojîk ve şîlo bibin. PKK di dema derketina xwe ya holê de ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd îdeayeke xwe ya bingehîn hebû û modela wê ya çareseriyê modela dewlet avakirinê bû ku Stalîn ew pêşkêş kiribû û Lenîn jî erê kiribû. Di wê demê de ango di salên 1950’î û 1970’î de tevgerên rizgariya neteweyî gihiştibûn asta herî bilind û pirraniya wan jî bi cihêbûna dewleteke din bi encam dibûn û vê jî dikir ku modela behsa wê tê kirin bibe yekane, bibe modela ji wê çêtir tinebe. Avakirina dewleteke cihê bûbû pîvaneke pîroz a amentûya sosyalîst. Ji bo mirov bibûya sosyalîst, diviyabû mirov bibe alîgirê dewlet avakirina gel û neteweyên têne mêtin û bindest. Sosyalîstbûn bi vê alîgiriyê re wekhev dihat qebûlkirin. Mirov berevajiyê vê bifikiriya, ji sosyalîstbûnê derdiket. Ya rastî, prensîba her netewe mafê xwe heye çarenûsa xwe diyar bike pêşî ji aliyê Serokê DYE’yê Wilson ve di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hatibû gotin û ji nêz ve têkiliya xwe bi gavavêtinên hegemonîk ên DYE’yê re hebû. Lenîn ji bo ji Wilson kêm nemîne û ji bo desteka neteweyên bindest û gelên dihatin mêtin bikişîne cem Yekîtiya Sovyetê, heman prensîb bêhtir radîkal kir û bir heta bi avakirina dewleta serbixwe. Di vî warî de herdu sîstem ketin nava pêşbaziyekê. Mînaka herî berbiçav a vê yekê ew e, herdu hêzan jî hewl dida destekê bidin berxwedana neteweyî ya nû li Anatolyayê dest pê kiribû. Paşê ev nêzîkatî di navbera herdu sîsteman de bi awayekî gurrtir dewam kir.

Damezrînerên sosyalîzma zanistî K. Marks û F. Engels jî di vê mijarê de xwediyê helwestek zelal nebûn. Di felsefeya Hegel de bingehîn modela dewletê bi dewleta netewe hatibû teorîzekirin û li ber vê jî ranebûbûn û rexne nekiribûn. Wan jî modela dewleta netewe weke şêweyekî nû yê dewletê erê kiriye. Ev şêweyê modernîteyê û serdemê qebûl kirine. Bawer kirin ku ev bi awayekî xwezayî û çawa divê bibe bi wî awayî pêk hatiye. Mînak di dema wan de yek ji pirsgirêkên bingehîn ên neteweyî yên Elmanyayê pirsgirêka yekîtiyê ye, û weke çare ew jî helwesta xwe li cem dewleteke netewe ya navendî nîşan didin û bawer dikin ku bi vî awayî Elmanya wê ji komên ji hev belav ên federe rizgar bibe. Li vî şêweyê çareseriyê xwedî derdiketin nexasim jî li dijî anarşîstan ev çareserî diparastin. Dîrokê îspat kir ku di vî warî de anarşîst mafdar in. Nemaze fikrên Bakunîn û Kropotkîn hem mafdariya xwe û hem jî îro hukmê xwe yê rastiyê dewam dikin. Ya dawî li sosyalîzma zanistî û pratîka wê sosyalîzma pêkhatî anî, ya rastî, sedema bingehîn a rê li ber jihevdeketina wê vekir modela bi hêz a dewleta netewe bû ku xwe sipartibû burokrasiyeke zêde navendîkirî. Bi giştî dîktatoriya proleteryayê weke dewlet, bi taybetî jî şêweyê wê yê herî navendî û ketiye heta mûrehên civakê dewleta netewe, sedemên bingehîn ên hilweşîna ji hundir ve û jihevdeketina wê ne. Sedemên din di dereceya duyemîn de xwedî rol in. Di dîroka sosyalîzma pêkhatî de ku ji sedûpêncî salî zêdetir e, bi saya fedekariyên

mezin nirxên hêja derketin holê, lê ji ber ku sosyalîzma zanistî di mijara dewlet û demorasiyê de ji teoriya xwe bi xwe mehrûm bû, nirxên xwe ji rizînê re hiştin û dev ji xwe berda ku xwe bi xwe ji hev de bikeve.

Ji ber ku Marks û Engels dewleta netewe ya Elman a di serê salên 1870'yan de hat avakirin pirr rûmetbilind kirin û weke mînak pêşkêş kirin, bi destên xwe û bi mejiyên xwe li sosyalîzma zanistî ya kiribûn yek ji utopya herî bi îddîa ya mirovatiyê şaşiya herî bingehîn kirin. Eger rexneyên dîrokî yên anarşîstan li ber çavan girtibûna nexasim jî rexneyên Bakunîn û Kropotkîn, wê ji sedî sed çarenûsa sosyalîzma zanistî cuda û serketî bibûya; nirxên sosyalîzmê azadîxwazî, demokrasî û wekhevîxwazî wê li dijî modernîteya kapîtalîst bibûna sîstemeke alternatîf a serketî û mayînde. Li dijî tevahî hêmanên modernîteya kapîtalîst ango li dijî meyla kara herî zêde ya sermayeyê, dewleta netewe û îndustriyalîzmê wê hêmanên avaker ên modernîteya demokratîk ango ekonomiya bazara civakî, îndustriya ekolojîk û neteweya demokratîk wê gelekî bi pêş biketana. Em dizanin ku K. Marks û F. Engels di demên dawî yên temenê xwe de mîna ku li vê kêmasiya bingehîn hayil bibin, nexasim diyar dikin ku ji civaka komin a destpêkê gelek tiştan hîn bûne, haya wan jê çêbûye ku qonaxa kapîtalîzmê mecbûriyet nîne û şêweyên civaka berê yên xwe bisipêrin sosyalîzmê hêjayî ceribandinê dîtine. Marks, xwestibû **Kapîtal**ê bi tehlîla li ser dewletê temam bike. Tê zanîn, temenê wî têra vê nekir. Engels di berhema xwe ya navdar **Koka Malbat, Dewlet û Milkiyeta Taybet** de sosyalîzma zanistî hûrûkûr kiriye û aliyekî dîrokî dayê. Li ser navê teoriya sosyalîzma zanistî bêşensiyeke mezin e ku revîzyon ne ku wan, lê Bernstein kiriye. Paşê ya hûrûkûr hatiye kirin ne rastî ne, şaşî ne. Nexasim nêzîkatiyên lîberal bûrjûwa yên Bernstein der barê demokrasiyê de, û yên Lenîn û Stalîn jî der barê dewlet û pirsgirêka neteweyî de, di dîroka sosyalîzma zanistî de bûne şaşî û jirêderketina herî mezin. Ne bi tenê jirêderketin û şaşî hatine kirin, li şûna rastiyên bingehîn weke sosyalîzma pêkhatî hatine avakirin.

V. I. Lenîn li Bernstein rexneyan digire û di nava rexneyên wî de rastî hene. Lenîn rexne li Bernstein digirt ku demokrasiya sosyal (di wê demê de ev nav didan partiyên sosyalîst) dike dûvikê lîberalîzma bûrjûwayê û dike şaxekî wan ê çepgir. Ev rexneyên wî di cih de bûn. Jixwe bûyerên piştre qewimîn ev fikir piştrast kirin. Revîzyonîzma Bernsteinparêz jirêderketineke rastgir bû û derba herî xedar û pêşî bû ku li sosyalîzma zanistî ket. Lê ji ber ku kêmasî û şaşiyeke gelekî girîng a sosyalîzma zanistî hebû vê derbê bandora xwe kir. Ew kêmasî û şaşî jî tinebûna demokrasiyê bû û li şûna wê avakarina dewleta netewe bû. Vê kêmasî û şaşiyê Bernstein bi tesîr dikir. Bernstein, dixwest demokrasiya civakî ji dîktatorî û saziyên dewletê dûr bike, dewleta netewe ya Elman li ser rêya dewleta civakî nerm bike û bi vî awayî di mijara dîktatoriyê de ji şaşiyê bibihure û tinebûna demokrasiyê ji holê rake. Herdu nêzîkatiyên wî jî oportunîstwarî bûn. Lê rexneyên rast ên Lenîn jî ji alternatîfên rast mehrûm bûn. Tişta ku Lenîn li şûna sosyal demokrasiya Bernsteinparêz a demokrasiya bûrjûwa û şaxê wê yê çepgir pêşniyar dikir, dîktatoriya proleterya û dewleta sosyalîst e. Di vê mijarê de Lenîn gelekî asêmayî ye, û tevahiya

jiyana xwe nikare ji vê bibihure. Mijarên dîktatoriya proleterya û dewleta sosyalîst Lenîn gelekî mijûl kirine. Di van mijaran de pirr hewl daye, lê bi ti awayî nikarîbûye çareyekê bibîne. K. Marks bi rasthatina Komina Parîsê (1871) çend caran têgîna dîktatoriya proleteryayê tîne ziman, lê ev jî mijarek e ku ji aliyê teorîk ve nehatiye lêkolîn. Ji bûrjûwaziyê îlhama xwe girtine û gotine "Ma dîktatoriya wan heye çima dîktatoriya me ya proleteryayê tinebe?" bi vî awayî analojiyeke çor tê kirin.

Lenîn, piştî ezmûna Sovyetê di serê salên 1920'î de serê xwe li ser teoriya dewleta sosyalîst êşandiye. Tê zanîn, temenê wî têra vê nekiriye. Dîsa tê zanîn ku di vê demê de Kropotkîn bi xwe ji Lenîn re pêşniyar kiriye ku divê Sovyet weke modela demokratîk bi sazî bibe û bê mayîndekirin. Lenîn pirr zêde guh nedaye vê pêşniyarê, nexasim ji ber kesayeta anarşîst a Kropotkîn bi guman nêzîk bûye û xweş nedîtiye. Ji vir û pêve jî tê zanîn. Stalîn bi ew sosret û hetîketiya bi navê dîktatoriya proleteryayê tevahiya meylên şoreşger, demokratîk û sosyalîst daqurtandiye û herî dawî jî Stalîn bi xwe li ser bêbextiya vê makîneyê hatiye daqurtandin. Gotina Lenîn heye dibêje, riya diçe sosyalîzmê di nava demokrasiya herî berfireh re derbas dibe. Lê bi çavkorî di ser vê gotinê re derbas bûne, teorî û pratîka wê nekirine. Ewqasî bawer kirine ku bêyî dîktatoriya proleteryayê û dewleta wê nikarin bijîn, têgîna demokrasiya proleter weke dîktatorî û şêweyê wê yê dewletê terîf kirine. Ango demokrasî weke şêweyekî dewletê û dîktatoriyê hesibandine. Şaşiya kategorîk jî di vir de ye. Em ji dîrokê zanin, demokrasî ne şêweyekî dewletê û ne jî şêweyekî dîktatoriyê ye. Berevajî, şêweyekî rêveberiya civakê ye, alternatîfê xwe heye û bi vî awayî hem dijberê dîktatoriyê ye, hem jî dijberê dewletê ye. Li cihê ku civaka demokratîk hebe dewlet an jî dîktatorî nabe, hebe jî bi kêmanî di astekê de bi civakê re li hev dikin. Ji K. Marks heta bi Lenîn a ku sosyalîstên zanistî nikarîbûn pêk bînin, sîstema demokrasiya civakî ye yan jî civaka demokratîk e. Lewma li şûna wê dîktatoriya proleteryayê û dewleta sosyalîst danîn. Ev şaşiya mezin ku firsend da revîzyonîzma Bernsteingiran ji kêmmayîna sîstema demokrasiya sosyal e, bi gotineke din ji kêmmayîna civaka demokratîk e.

Min di cildên berê yên parêznameyên xwe de hewl dabû van mijaran analîz bikim, lewma ez ê niha tenê qîma xwe bi dubarekirineke kurt bînim. Civaka demokratîk şêweyekî rêveberiya civakî ye, ne dîktatorî û ne jî dewlet e, û divê nebe şêweyekî rêveberiya dewletê û dîktatoriyê. Eger em ê behsa demokrasiyê bikin, mînakên dîrokî hemû îspat dikin ku weke şêweyekî rêveberiyê yê bêdewlet pêk hatine û bi gewde bûne yan jî ji aliyê dîrokî ve şert û mercên wan pêk nehatibin bi dewletê re li ser bingehê lihevkirineke bi pîvan rêveberî parve kirine û pêk hatine. Weke têgîn dewleta sosyalîst û dîktator jî şaş in. Dîktatorî weke ontolojîk, diyardeyek e ku bi tenê xweserî çîn û tebeqeyên elît ên yekdestdariya hêz û mêtinkariyê di destên xwe de digirin. Diyardeyek e ku bi xwîn, êş û mêtinkariyê hatiye stran û ev rewş bûye têgîn. Ji lewra kedkar, bindest û kesên têne mêtin bi amûreke wisa re hem weke zêhn ji aliyê teorîk ve, hem jî weke amûr ji aliyê pratîkê ve nabe têkiliya wan pêre hebe. Eger bê gotin, na dibe ku têkiliya wan pêre

hebe, hingê hêsan e, û balkêş e ku mirov li gorî demên berê niha bi ezmûna Sovyetê û ezmûnên bi heman rengî îspat bike ku ezmûnên behsa wan tê kirin çawa bi encam bûne û vê şaşiyê nîşan bide. Mirov heman xusûsan dikare ji bo dewleta sosyalîst jî diyar bike. Serketina siyasî bi dest bixin jî piştî serketinê nabe ku dewleteke civakî ya kedkaran, bindestan û kesên têne mêtin hebe; berevajî, bibe wê demokrasiya wan a civakî an civaka wan a demokratîk bibe. Li gorî tehlîla dawî, dewlet; navê wê û naveroka wê çi dibe bila bibe, bi temamî bê kêr nebe û der barê rêveberiya civakî de fonksiyonên wê yên girîng hebin jî sîstemeke yekdestdariya hêz û mêtinkariyê ye ku li ser civakê hatiye avakirin. Ji aliyê ontolojîk ve hebûna xwe bi saya vê rastiyê ye, û navê wê yê kevnar e. Ne pêkan bû ku bi vê hêka ‘dewleta sosyalîst’ bikirana. Çawa ku çêlek nikare hêkan bike û dizê, dewlet jî bi tenê dikare bi şêweyên cuda dewletan bizê. Ji heman dewletê nayê ku hêkan bike çêlikên sosyalîst bizê. Ji ber ku çivîk hêkan dikin, li ser hêkên xwe kurk dikevin û bi tîna germê ya diyar çêlikan ji hêkê derdixin. Belkî mînaka me hinekî çor be, lê divê ti carî ji rastiya wê guman neyê kirin.

Der barê anarşîstan de xusûsek heye ku ez behsa wê nekim, nabe. Rexneyên anarşîstan li ser dewleta netewe ya zêde navendkirî û dîktatoriyê rast in. Dîrokê rexneyên wan ên di vî warî de piştrast kirine û mafdar kirine. Lê wan jî weke alternatîf azadiyên ferdî û ji nû ve vegera li jiyana komên destpêkê yên mirovatiyê pêşkêş kirin û çawa ku di sosyalîzma pêkhatî de hat dîtin û li gorî tehlîla dawiyê, ew jî ji şaxên çepgir ên lîberalîzma bûrjûwayê wêdetir bi rolekê ranebûn. Eger rexneyeke mafdar bi kirineke rast an teoriya rast a civaka demokratîk û şêweyên wê yên pratîk re temam nebe, bivênevê wê pûç bibe û wê bibe versiyoneke cuda ya lîberalîzmê yan jî mezhebên wê. Li vir, di tevahiya mijaran de ya diyarker niyeta baş a ji bo wekheviyê û xwestekên ji bo azadiyê nîne, nêzîkatiyên rast ên teorîk der barê rastiya dîrokî û civakî de, û der barê pêkhatina wan a pratîk de ye.

Di pêvajoya derketina holê ya PKK’ê de rewşa wê ya îdeolojîk a ne zelal û şîlo, bi giştî ji ber rewşa sosyalîzma zanistî, kêmasî û şaşiyên wê yên me diyarkirî bû. Îdeolojiya dewletdar a netewe tevî îdeolojiya civakparêz a demokratîk di zikhev de tevlîhev û biserhevvekirî li cem hev bûn. Partiyên kominîst û karker ên mînak hatibûn girtin hemûyan ji şaşî û kêmasiyên sosyalîzma pêkhatî para xwe girtibûn. Di qonaxa damezrandinê de em ne xwediyê wê hêz û qabîliyetê bûn, îdeolojiya dewletdar û îdeolojiya civakparêz ji hev bikin. Herçî mînakeke me jê ders bigirta jî tinebû, herwisa em xwediyê kapasîteyeke teorîk û daneheveke zanînê nebûn ku pê karibin ezmûna dîrokî rast şîrove bikin. Li gorî teoriya biserhevvekirî ya rizgariya neteweyî di pratîkê de girêdayî têgîna ‘Kurdistana Mêtingeh’ tiştên bihata kirin diyar bûn. Li gorî şerê rizgariya neteweyî yê demdirêj armanc dewleteke neteweyî bû. Li Efrîkayê hema bêje her roj şerên rizgariya neteweyî yên dubare dibûn bi îlankirina dewleteke serbixwe bi encam dibûn. Van mînakan di çareseriya pirsgirêka neteweyî ya Kurd de bêyî ku pêdivî bi teorî yan jî pratîkeke din hebe, riya tevgera Kurd biketiyayê raber dikir. Bêyî ku me serê xwe li ser teoriyên giştî yên

rizgariyê biêşanda, qîma me dihat ku em bi tenê pratîkên rizgariyên neteweyî lêbikolin. Wekî din, îcazeta me ji hosteyên mezin Lenîn û Stalîn digirt, tevahiya qûtê teorîk û qalibên pratîk ên pêdiviya me bi wan hebû pêşkêş dikir. Lewma ya li ser milê me dima ew bû, em bi lez çarçoveya îdeolojîk a kombûnê temam bikin û wê bikin malê girseyê. Me jî ev kir.

Eger mirov dema 1973-1976’an weke dema koma teng diyar bike, mirov dikare salên navbera 1976-1978’an jî weke salên girsebûnê bi nav bike. Em bi awayekî serketî ji herdu deman bihurîne. Pirsgirêk ew bû ku wê piştre çi û çawa bihata kirin. Piştî koma ciwanan û belavbûna li nava girseyan, gelo wê gava partîbûnê bihata avêtin an jî wê rêxistina çalakiyên eskerî bihata sazkirin. Bi bersivadana vê pirsê, wê pêvajoya piştî van qonaxan diyar bibûya. Me bi partîbûnê hewl da bersivê bidin vê pirsa teknîkî xuya dikir. Ma ne Şoreşa Viyetnamê di vê mijarê de mînakeke têra xwe xweş pêşkêş dikir. Jixwe çalakî jî pêk dihatin. Li cem Çepgirên Tirkiyê ezmûnên mîna rêxistiniyên bere û artêşê hebûn. Bi awayekî çalakî bi yekîtiyên rizgariya neteweyî jî dikarîbûn pêk bihatana. Li gorî ruh û giyanê demê jî bûyerên bi vî rengî di cih de bûn. Me ezmûneke serketî di rewşa berbiçav a Kurdistanê de pêşde dibir. Ji bereya dij-şoreşê, me dengê lingên darbeya eskerî ya 12’ê Îlonê dibihîstin. Komkujiyên li Mereş, Çorum, Bahçelîevler û kuştina gelek ciwanên şoreşger û rewşenbîran nîşan didan ku ji bilî derketina derveyî welêt rizgarî ne pêkan e. Ji ezmûna 12’ê Adara 1971’ê têra xwe ders hatibûn girtin. Me dîtibû, kengî kadroyên pêşeng têne tinekirin, rêxistin bi hêsanî careke din nikarin pişta xwe rast bikin. Me di 2’ê Tîrmeha 1979’an de, gavavêt nava Rojhilata Navîn û ev jî li gorî ruhê têkoşîna demdirêj di cih de bû. Li gorî şerê gel ê demdirêj û ji bo desteka dîplomatîk, me gaveke di cih de û di dema wê de avêtibû. Dema darbeya eskerî ya 12’ê Îlona 1980’î pêk hat, bi tevahî komên çepgir derbên stratejîk xwarin, lê PKK’ê dest bi pêvajoyeke nû û bi hêvî dikir. Eşkere ye ku ev gavên serketî yên taktîkî bûn.

Em dema ji nû ve salên 1970-80’î binirxînin, em bi hêsanî dikarin bibêjin, pirsgirêka Kurd cara pêşî ye ku ji mijara rojname, kovar û komeleyê derdikeve û bi karekterê çînî xwe digihîne rêxistinkirina partiyeke pêşeng a modern û bi vê rêxistiniyê re di zikhev de xwe digihîne avahiyeke çalakiyê. Li vir a girîng ne ew e ku partî rêxistineke bi hêz be û kapasîteya wê ya çalakiyê hebe. Ji ber ku rêxistinên din ên Kurd bi van xisletan hebûn. Partiyên mîna PDK û TKSP’ê ji mêj ve hebûn. Tişta nû ew bû ku cara pêşî rêxistinî û çalakî di zikhev de pêk dihatin. Ev ji aliyê rastiya civaka Kurd û cografya Kurdistanê ve dihat wê maneyê ku ev serîrakirineke nû bû, hem jî şer û serîrakirineke bi partiya pêşeng û bi rêxistinî bû. Bi kêmanî di teoriyê de hatibû qebûlkirin ku karekterê şer demdirêj e, û ji qonaxên stratejîk pêk tê. Hem li gorî rastiya neteweyî hem jî li gorî rastiya navneteweyî ya wê demê di cih de bû, û li gorî wê jî gavên stratejîk û taktîk ên serketî dihatin avêtin. Lê herçiqasî rastî û îradeyê bi awayê xuya dikir xwe nîşan bidana jî fikar û kêmasiyên mezin ji binî ve dihatin hiskirin.

Darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê pêk hatiye û rûyê mîlîtarîst ê dewletê bi rastiya xwe hemûyî berbiçav bûye. Civak mîna gihiştibe mêrê xwe yê rastî û hiyerarşîk xwe rehet his dikir. Di rabihuriya nêz de kirinên li Kurdistanê diyar bûn. Kirinên di çarçoveya înkar û tinekirinê de bi tevahiya şîddeta xwe li ser kar bûn. Faşîzma mîlîtarîst a ji aliyê NATO'yê ve hatibû erêkirin, wê ti cureyê zordestî, şîddet, êşkence û komkujiyê nemana ku nekiribana. Kengî mijar dibû rastiya Kurd û Kurdistanê, qirkirinên bi temamî ji dîrokê û cografyayê rakirin diketin rojevê. Felaketên mezin ên bi serê Ermenî, Rûm, Suryaniyan de û di dema nêz de bi serê berxwedanên Kurdan de hatibûn hînê birînên wan teze bûn û nehatibûn jibîrkirin. Ev sedema fikarên mezin bûn. Kêmasiyên bingehîn jî ew bûn ku li hundir û derve hêzên ewle û têkûz ên xwesipartinê tinebûn.

Ti hêviya zêde ya mirov ji dublokbûna kapîtalîzm û sosyalîzmê bike, tinebû. Bêhna revîzyonîzmê xwe berdabû her derê. Çepgiriya Tirk ji ber sedemên hundir û derve xetimî bû û derba stratejîk xwaribû. Lewma di pêvajoya nû ya li pêşiya PKK'ê de gelek tiştên nediyar hebûn.

**4- Bi Awayekî Rast Nîşandana Şerê Bîrbirinê û Ruhê Demekê**

Li dijî modernîteyê ez xwe diparêzim. Biqasî ku di nava qalibên zanistî de bême stran, ez îfadeya zanistî ya parêznameya xwe tercîh dikim. Min heta niha her tim wisa kir. Lê ruh û giyanê min timûtim û misêwa dinihurandin ku hinek tişt kêm dimînin. Min timî his dikir ku awayê ravekirinê yê zanista modernîteyê di berdêla destkişandina ji hin tiştan de pêk tê. Ez ji xwe piştrast bûm ku ev şêweyê ravekirinê hewce bû, lê qîma min nedikir. Ez her ku li ser mijarê diponijîm, vê rewşê sihêrbazên ji sihêrbaziya xwe ketî û rabihên Sumer û Misriyan ên ji pîrozbûna xwe ketî û xwe vekişandibûn perestgehên xwe û li ser çarenûsa mirovan nivişt dinivîsandin dianîn bîra min. Ew zimanê modernîteyê ku her diçû akademîk, pispor û sembolwarî dibû, dest pê dikir dişibiya zimanê rahib û sihêrbazên di serdema pêşî de bêhtir hêvî didan mirovan. Heta ji wan bêhtir bêhêvî bûn, ji sêhra xwe ketîbûn, bûbûn şaxekî ji wan ên bêcan û bêheqîqet. Li gorî tehlîla dawî, bi tenê çerxa sîstemê digerandin ku ew çerx jî karê didizin. Li vir dixwazim gotineke Fîlozof Nietzsche ya gelekî balkêş diyar bikim. Nietzsche weha dibêje; "Huner jiyanê baştir îfade dike, heqîqet bi hunerê baştir tê ravekirin."

Rojên min ên di nava pencê dibistanên modernîteya Tirkê Spî yê faşîst de hê jî baş têne bîra min. Dema min gava xwe avêt dibistana seretayî min xeyal dikir ka ez ê bi cinawirekî çawa re rûbirû bibim. Bîranînên wan rojan hê jî teze di hişê min de ne. Çi tiştekî xerîb e, ez bûbûm zarokê xweşdivî yê wan cinawirên pêşî li wan rast hatibûm. Ewqas qedrê min digirtin, ez li ser destan datanîm. Min jî ji wan re hêk û mast dibir. Kengî peyvên pêşî yên Tirkî ji nava lêvên min derketin, min bi xwe dabû bawerkirin ku min bi awayekî serketî gav avêtiye bîrbirina giyana modern. Lê li wir halekî min hebû ku min veşartibû. Min rewşa ruhê xwe yê ji tirsa diricifî timî veşart û hewl da nîşan nedim. Bi herhalî kesayeta durû bi vî awayî pêk dihat. Min nizanîbû gund û malbatê çi daye kesayeta min, jixwe min fêhm jî nedikir. Tişta ez dizanim, ez nebûbûm

ewladekî bi xêr yê gund û malbatê. Her kesî hêdî hêdî di binî re digot, rewşa Evdilayê Uwêşê derdekî bê derman e, xêr û hêvî jê nîne. Ev gotegot belav dibûn. Min ji ber vê rewşê fedî dikir, zivêr dibûm, lê min nikarîbû ji vî tewrê xwe paşve gavê biavêjim. Her ku diçû ez bi tenê dimam. Her kesî zarokê xwe ji min dûr digirt. Em dema derdiketin gera li derveyî gund razî nedibûn wan bişînin. Çend rêbazên min hebûn ku ji bo ez xwe bidim qebûlkirin. Min bi nêçîrvaniya çûkan, seansên kuştina mar û gumgumokan bal dikişand ser xwe. Di dema dibistana seretayî de min gelek dua ji ber kiribûn û ji ber dawa melê ranedibûm (bi sedema mînberê) û di nava refên nimêjê de min cih digirt û bi vî awayî min zêdetir bal dikişand ser xwe. Jixwe Mele Muslim hukmê xwe yê pêşî di heqê min de dabû û gotibû “Bi vê lezê biçe tu yê karibî bifirî” gotinên wî yên bi vî rengî belav dibûn û ez jî têra xwe bi firê xistibûm.

Bi vê lezê di rêya dibistana seretayî ya bi qasî saetekê de min ji koma xwendekarên perwerdeyê re pêşengî dikir û di kêliyên bêhndanê de min li pêşiya wan meletî dikir. Jixwe min berê jî ev anîbû ziman. Lê îmamtiya min demeke zû îfade dike û wisa li cihê xwe ma. Çavên min çûbûn ser modernîteya Tirk. Min fêhm kiribû ku ez ê bi hêsanî ji wê qut nebim. Dîsa min berê diyarkiribû ku li ser navê Kurdîtiyê çi li ser min hebû li pêşiya min dibû asteng û nedihişt ez xwe bigihînim modernîteyê. Jiyana min a li dibistanên modernîteyê heta bi Newroza sala 1973’an ango dema min wêriya koma pêşî li ser navê Kurd û Kurdistanê biceribînim, hema mîna robotekî derbas bû. Ez dema hewl didim şîrove bikim ka ew jiyan çi îfade dike, ez divê bibêjim ku ew hîçtî û netiştekiyeke mezin e. Li hemberî modernîteya Tirk, ez dikirim ne tiştek. Vê rewşê ne bi tenê rê li ber kesayeteke bi kompleks vedikir; di heman demê de rê li ber kesayeteke pûç vekiribû, a ku ti têkiliya wê bi jiyanê re tine, ya rastî dema dixwaze serketî bibe mîna robotan çend gotinên jiberkirî yên şildim bildim dubare dike. Di van salan de aliyê min ê herî hêja ye ku mirov behsê bike, ev kesayeta robotwarî ye ku min bêqusûr û serketî pêk aniye. Bi rastî kesayeteke zor e ku mirov bide nasîn. Ez hîç bawer nakim ku filmê wê jî bê çêkirin. Lê dîsa jî divê ez dubare bikim ku bi wî halê xwe jî ji dibistana seretayî heta bi Fakulteya Siyasî ez xwendekarê herî xweşdivî û xuya yê ber dilê tevahiya mamosteyên xwe yên jin û mêr, esker û sivîl bûm. Bi herhalî pirsgirêkek e ku ji hev derxistina wê zor e.

Di tevahiya vê pêvajoyê de min li gorî xwe ji hewaya xwe ya serokatiyê ti carî paşve gav neavêt. Baş e, eger ez dubare bipirsim rewşeke min a rûhî ya çawa hebû, ev ê weke pirseke bersiva wê gelekî nediyar bimîne. Ya rastî divê ev pirs bê kirin: Gelo bi rastî ruhekî xwezayî li cem min mabû? Ma modernîteya li hemberî min ruhekî xweserî min hiştibû? Belkî jî encama herî girîng a mirov ji vir derxe ew e, li hemberî modernîteyê mîna ku ez her saet xwe di îmtîhanê de bihêlim tevgeriyabûm. Ez ê bi awayekî serketî ji sinifên xwe bibihuriyama, lê ti carî ez ê weke wê nebûma. Baş e, ez ê bibûma çi? Pirsa li hewa daliqandî dimîne ev e. Yanî divê mirov zanibe li hewa daliqandî mayîn çiqasî zor e. Ez bibêjim jiyanek wisa derbas bûye, belkî ez karibim hinek xusûsetên wê rave bikim. Modernîte bi awayekî yekalî nasnameya te înkar û îmha dike. Li

hemberî vê ez jî bi jiyanekê radibim ku hevtayê wê kêm hatiye dîtin li ber xwe didim. Bêguman bi vî awayî mirov dikare şîrove bike. Di vê nuqteyê de min rewşa xwe timûtim bi nasnameya jinê re ku tevahiya dîroka şaristaniyê rewşa ketiye navê daye ber hev û muqayese kiriye. Min jiyana xwe ya kurtik a antî-modernîst û berxwedana jinê ya antî-şaristaniyê ya hezarê salan wekhev didît. Bi vî awayî, her ku diçû min ji nêzîkatiya cinsiyetparêz a li dijî jinê nefret dikir, kirêt û rezîl didît. Ez pirr zû lê varqilîm ku pîrektî pirrpiçûkxistin e.

Di vê navberê de, mijareke din a girîng heye, heke ez behsa wê nekim, ez ê nikaribim ji vê babetê bibihurim. Ew jî têkiliya min a bi Xwedê re bû. Heta bi sinifa dawî ya lîseyê min rîtuelên xwe yên dilsoziya bi wî re bi nimêj û rojiyê bi cih dianîn. Lê gumanên min ên der barê hebûna wî de hema bêje ez anîbûm ber xwekuştinê. Ez li gorî xwe li wî digeriyam û di gerdûnê de heta bi pirtikeke tozê jî li her derê ez li wî digeriyam. Vê şopgeriya min ji zêdekirina gumanên min wêdetir ti encam nedida. Tam jî di vê demê de min ê dînê çepgiriyê û pêxemberê wê yê nû Marks nas bikira.

Berî ku ez çepgiriyê nas bikim, gelo ez rastgir bûm? Eşkere ye ku rastiya dualîteya rastgir-çepgir ne ew dualîte ye ku rastiya me îfade bike. Ya rast rêûresm-modernîte ye, yan jî ya bêhtir rast ew e, divê dualîteya rastiya civakî-modernîte be. Têgîna Ellah ez hejandibûm û ev bi xwe hejîna civaka ji rêûresmê li hemberî civaka modern bû ku di şexsê min de nîşan dida. Sembola nasnameya serdest a civaka ji rêûresmê Ellah bû û xwe li hemberî xwedayê laîk ê civaka modern dewleta netewe nikaribû li ser piyan bigirta. Min ê ev yek gelekî paşê ji hev derxista. Ber bi salên 1970'î ve bi vî awayî ez pêxîrtengî bûbûm û dihejiyam. Piştî ku min rewşa xwe ya hejînê bi vî awayî îfade kir, tam jî di wan deman de li cem rastgir an çepgirên bi hev re di nava şer de bûn ji bo derketina ji vê tengasiyê li çareyê geriyam. Tê bîra min, weke kesekî nimêjker pêşî min rastgir pelandin. Li Enqereyê rojên ku min nimêj li Mizgefta Maltepeyê dikir, heta bi salên 1969'an jî çûn. Rojên min îrşad dikirin, ne kêm bûn. Heta bêyî ku ez destûrê bistînim, min li konferansa Necîb Fazil Kisakurek ê weke 'Ustadê Mezin' dihat bi navkirin li Ocaxa Tirk guhdarî kir. Ez gelekî bi heyecan bûbûm. Xeyal meyal Kovara **Rojhilata Mezin** tê bîra min. Eşkere ye, dengek bû ku hêz dida mefkûreya min a der barê Xwedê de ku dihejiya. Li Komeleya Têkoşîna Li Dijî Kominîzmê li Silêman Demirel û Refîk Korkut rast hatibûm. Piştre nizanim çawa çêbû, lê min di bin balgiya xwe de pirtûka bi navê **'Alfabeya Sosyalîzmê'** dît. Min ji ber xwe ve dest pê kir xwend. Tê bîra min, hê min neqedandibû hisên bi vî rengî li cem min çêbûbûn: "Muhammed têk diçe, Marks bi ser dikeve." Ne bi bîreweriyeke zelal, lê bi hisan rêya nû hatibû bijartin.

Dîsa di wê demê de cenazeyê Serokê Dadgeha Bilind ê wê demê Îmran Oktem di ber dibistana me ya qişleyî Lîseya Pîşeyî ya Tapû Kadastro re derbas dibû. Car din bêyî ku kes tesîrê li min bike, bi awayekî ji dilê min bê, pêşî bi çend gavên bizdonek tevlî merasîma cenaze bûbûm. Bêguman ev tevlîbûn bi awayekî bîrewerî û bawerî çênebûbû; di atmosfereke meraqê de mîna

heweseke ber bi rastgiriyê, mîna heweseke ber bi çepgiriyê pêk hatibû. Eşkere bû ku ez ewqasî serwext nebûbûm ku rastgirî û çepgiriyê ji hev derxim. Di vê mijarê de lêgerînên min ên wisa bi hêz jî tinebûn. Buhran û pêxîrtengiya rûhî bêhtir ez mijûl dikirim. Di jihevderxistina dîn û felsefeyê de gelekî dijwar şoke bûbûm. Min ê gelekî paşê fêhm bikira ku di bingehê vê de jihevderxistina civaka rêûresmê û modern heye. Hûrûkûr fikirkirina min a li ser dîn di dema dibistana seretayî, navîn û lîseyê de her hebû. Pirtûkên Seyîd Qutûb jî bi destê min ketin, lê ne xwediyê wê tesîrê bûn ku ji pêxîrtengî û buhrana min re bibin çare û derman.

Di sala 1970'î de min dibistana xwe qedand û li Amedê weke karmendê dewletê hatim erkdarkirin. Min li vir mûçe û bertîl nas kirin. Dema min cara pêşî bertîl xwar ez hejiyam. Dema ku Peyas hê gund bû, bêyî ku haya min jê hebe min îmzeyeke bi kêra gundiyan bê danî û bi pereyê wê demê ez ne şaş bim min çar hezar xistin bêrîka xwe. Ez wê şevê ricifîm. Pîvana min a exlaqî bertîlxwarin qebûl nedikir. Lê min yekser ji vê re çare dît. Ez fikirîm ku ez ê vî pereyî di demên pêş de ji bo armancên civakî ango der barê Kurdayetiyê de bi kar bînim; bi vî awayî min dawî li lerzîna xwe ya exlaqî anî û ev bêhtir exlaqî xuya dikir. Armanca rûmetbilind ji armanca nizim dibihurî. Bi vî awayî, bi teşwîqa atmosfera bajêr jî eleqeya min a ji bo Kurdîtiyê her ku çû zêde bû. Min sermayeya xwe ya pêşî li Kurdîtiyê razandibû û çîrokê bi vî awayî dest pê kir. Bûyera behsa wê dikim di heman demê de kesayeta min jî nîşan dide. Ji rojên zarokatiyê yên têne bîra min, ez her tim evîndarekî civakê bûm. Gotin di cih de be, ez nexweşê civakbûnê bûm. Mînak, qet kêfa min nedihat ku diya min û xizmên me min bixin himbêza xwe, lê hevaltî û hogirtiya bi zarokên malbatên hevrik re têra xwe bala min dikişand. Ji şehîdên me yên mezin Hesen Bîndal ji bo min yek ji wan hevalan bû. Ji bo keçikan jî pîvana min bi heman rengî bû. Lê haya min jê hebû ku di vê qadê de derfetên têkilîdanînê bi sînor bûn. Lê tê bîra min ku min timî qedexe bin pê dikirin.

Di sala 1971'ê de min li Fakulteya Huqûqê ya Zanîngeha Stenbolê navê xwe nivîsand. Min hem li taxeke neqane xwedî jiyana modern Bakirkoyê karmendî dikir, hem jî min Stenbol nas dikir. Bêguman vê yekê wê bandor li min bikirana. Rojên bi liv û lebat ên Dev-Genç û DDKO'yê bûn. Eleqeya min ji bo herduyan jî hebû. Bi awayekî fermî jî bûm endamê DDKO'yê. Bîranîneke min a der barê semînerekê de, dibe ku der barê nasnameya min de hinek agahiyan bide. Bi awayekî seyr û balkêş min gotibû Hz. Muhammed jî gotiye "Ya rebî, îmkana dewletbûnê nede Kurdan, eger bibin dewlet wê dinyayê teng bikin." Endam û ciwanên DDKO'yê bi nîv çavên gumanbar li min mêze dikirin. Komele ya çanda Rojhilat bû. Min li vir, di atmosfereke bi guman de guftûgoyên bi rojan û dirêj ajotin, kirin. Lewma gotinên bi vî rengî dihatin gotin, "Îcar ev çi gotin in, Kurdê dewletê ava bikin", "Ma dema van gotinan e", "Gelo dibe ku ev provokator be?".

Ji wan rojan bîranîneke min a girîng diyalogeke di navbera min û Serokê demê yê DDKO'yê Mehmet Tuyuz de ye. Rêxistiniyeke bi şêweyê DDKO'yê û fikrên wê zêde ez tatmîn nedikirim.

Mîna di meseleya dîn û dewletê de ez timî dibûm sedema guftûgoyan. Lê di pirsgirêka Kurd de ez hê bi çarpîkan dimeşiyam ango hînê şagirt bûm, lewma hêza min a pêşniyar bikim tinebû. Serokê DDKO'yê ji min bi tecrûbetir bû. Ez bawer dikim ku min bala wî kişandibû. Timûtim dihat cem min û digot “Apo pêşniyaran bike, pêşniyaran!” Bi vî awayî gotina wî bala min kişand. Lewma min ti carî ji bîr nekir û min hewl da bi cih bînim. Ez yeqîn dikim ku ew jî mîna Serokê PDK'ê Faîk Bucak mîna şerekî navmalbatê nîşan dan û bi destê kontrgerîlla kuştin. Dîsa hînê jî tê bîra min: Dema darbeya 12'ê Adarê bû, Mûsa Anter ji koma me ya piçûk a sempatîzanan re gotibû “Ew xwe bi xwe bi hev ketine, em bi karê xwe rabin, yekîtiya xwe xurt bikin.” Dibe ku helwesta wî milliyetgirî be, lê manedar bû. Jixwe bagera 12'ê Adarê rabûbû.

Bîranîna min a dawî ya li Stenbolê der barê civînekê de ye. Civîn li Maçkayê li salona Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê pêk hatibû. Nizanim çawa çêbû, ez jî li salonê bûm. Salon gelekî qelebalix bû. Yek ji civînên herî krîtîk ên Dev-Gencê bû. Ji nişkê ve Mahîr Çayan, Yusuf Kupelî û Munîr Remezan Aktolga (Aktolga dibe ku navê şaş be, dibe ku navê rast Sînan Kazim Ozudogru) ketin hundir. Pêşeng Mahîr bû. Bi şêweyekî şoreşgerî dest danî ser mîkrofonê û axaftineke dirêj kir. Ji axaftina wî tiştên di bîra min de mane ev in: “Revîzyonîzm tehlûkeyeke ciddî ye, xwe li Marksîzmê alandiye; weke ku di her meseleyê de kirî, di meseleya Kurd de jî (ez cara pêşî dibihîsim ku nav li meseleyê tê kirin) oportunîst tevgeriyaye. Netewe bi xwe çarenûsa xwe diyar dikin û meseleya Kurd jî ev mesele ye. Eger Kurd bixwazin dikarin mafê xwe yê avakirina dewleteke serbixwe bi kar bînin. Li vir erka dikeve stûyê me Marksîstan ew e, ji bo Kurd bigihîjin vî mafê xwe divê em destekê bidin têkoşîna wan.” Bi awayekî vebirrî bandor li min kiribû. Tîmsalê şoreşgertiyê bû. Şoreşgerek bû ku ji serî heta binî gotin û çalakiyên wî hevdu digirtin. Eşkere ye ku yek ji wan kesayetan e, gelekî bandor li min kiribû. Sempatiyeke min a mezin jêre çêbûbû. Nasnameya min a civakî ji bo min gelekî girîng bû û wî der barê wê de rê nîşanî min dabû ka ez ê çi bikim û çawa tevbigerim. Ev hemû jî di wê dema kin de bi awayekî balkêş kiribû. Heman salê li Maltepeyê ew berxwedana wî ya navdar a bi Cevahîr Huseyîn re li dijî hêzên çekdar ên dewletê, bi birîndarî girtina wî, ji zindanê revandina wî û dîsa şehadeta wî ya tevî hevalên wî di Adara sala 1972'an de li Kizildereyê, van qonaxan hemûyan gav bi gav ez ber bi jiyana şoreşgerî ve birim. Eger ez ê bi xwe re û bi civakê re dilsoz bimama, ti rê û çareyeke min a din tinebû, diviyabû ez li ser xeta van qonaxan bimeşiyama.

Ji nava bîst kesan û bi bûrsê min navê xwe li Fakulteya Siyasî ya Enqereyê nivîsî. Di vê de gavavêtina Mahîran rola xwe girîng bû. Dema ku Mahîr û neh hevriyên wî li Kizildereyê hatin kuştin, min ji çalakiya boykotê ya li Fakulteya Siyasî ya Enqereyê re pêşengî kiribû. Di 7'ê Nîsanê de ketim girtîgehê û bi qasî heft mehan di hundir de mam. Ji dadgeran Yuzbaşî Bakî Tûg ku cezayê darvekirinê dabû Denîz Gezmîş û hevalên wî, der barê endambûna min a rêxistinê de ji ber kêmbûna delîlan (ez yeqîn dikim ku Dogan Firtina yê THKP-C'ê bavê wî ji dadgerên albay ên wê demê bû, lewma ji 15 sal cezayê diviyabû bi sedema endambûna rêxistinê li me bihatana

birrîn bi saya vê ekîbê, bi sûkî em filitîn) cezayekî demkin li min birrî. Ez zanim Bakî Tûg paşê gelekî xem xwarin. Di sala 1972’an de bûbûm sempatîzanê THKP-C’ê. Ez li ber endambûnê bûm. Bi awayekî pratîkî endam dihatim hesibandin. Lê hem pêvajoya girtîmayînê û hem jî piştî komkujiya Kizildereyê tesfiyekariya bi serê THKP-C’ê de hatî em li naverastê hiştin. Piştî vê bi salekê ango di serê sala 1973’an de li dora teza ‘Kurdistana Mêtingeh’ min dest bi avakirina komê kiribû. Bivênevê wê rêxistiyeke cuda pêk bihata. Lê em ne xwedî helwesteke milliyetgir bûn. Li cem min di rêza pêşî de Hakî Karer hebû. Ev hevalê ji Deryareş ji Ulubeyliyê di helwestpêşdebirina min de yek ji kesên li pêş ên xwedî rol bû. Bûyera min a jixweçûnê ya pêşî û dawî ku min berê jî behsa wê kiribû, li cem wî pêk hatibû. Eşkere ye ku di dema derketina holê ya fikrên mezin de hevaltî xwedî girîngiyeke dîrokî ye. Heta bi serê sala 1975’an, bêyî ku materyaleke nivîskî, mîna ku sirr û razek me hebe, min propagandaya komê bi dizî û devkî dikir. Çawa ku min qal kiribû, di sala 1975’an de pêşnûmeya pêşî me bi hev re amade kir. Me li wê mala ku em bi hev re lê diman çêkir. Ez şipiya bûm, mîna xîtab bikim dipeyivîm, M. Xêrî Dûrmûş jî erê dikir û dinivîsî. Ew axaftin li ser rastiya Kurd di asta pêşnûmeyekê de bû. Min pêşnûmeyeke dirêj dabû nivîsîn. Eger were lêkolîn, wê bê dîtin ku gelekî bi rêkûpêk e. Min hewl dabû ku ez bi awayekî kategorîk rewşa dinyayê ya kom xwe disipêrê û şertên xwecihî binirxînim. Li gorî wê demê, çarçoveyeke teorîk qîm dikir. Çawa ku her kes yeqîn dike, ne wisa, berevajî; koma me di warê îdeolojîk de koma herî bi gurçûpêç bû. Herçiqasî kom bi aliyê xwe yê çalakiyan derdiket pêş jî bi tezên xwe yên bi hêz ferqa xwe û yên din her ku diçû zêde dikir. Em mîna cemaeteke girêdayî amentûyê bûn.

Nivisandina fikrekê dişibe jidayikbûna zarokekî/ê. Ji vir û pêve pirsa bingehîn ew e, belkî jî ji awayekî biyolojîk û civakî mezinkirina zarokekî hezar qat zehmettir bi awayekî siyasî û çalakî mezinkirin û gîhandina wî/wê ye. Em dibînin ku di dîroka fikir û çalakiyên siyasî de bi hezaran mînak hene ku xweş çêbûne û ji diya xwe bûne, di temenekî ciwan de mirine. Pirr kêm ji wan bi awayekî serketî gihiştin û stewîna xwe îspat kirine. Dema 1974-75’an ji aliyê çalakiyan ve bi ezmûna Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqerê ADYOD’ê ve derbas bû. Min peywireke mîna serokatiyê bi rîsk girtibû. Min fikra xwe ya teorîk cara pêşî bi awayekî ciddî û çalak diceriband. Encam, bi awayekî stratejîk ji Çepgiriya Tirk qut bûm. Di sala 1976’an de em bi komek e (Hakî Karer, Kemal Pîr û Dûran Kalkan) ku bi kokên xwe Tirk bûn, ji Çepgiriya Tirk qut bûn. Teoriya komê jî li gorî vê bû. Îdeaya me ev bû: Bi pêşdebirina tevgera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê pêkan bû ku Çepgiriya Tirk a di bin serweriya şovenîzma civakî de bi ser xwe ve bê. Gotinên Kemal Pîr ev rewş xulase dianî ziman: “Rizgariya gelê Tirk bi rizgariya gelê Kurd dibe.” Dîrokê ev fikir piştrast kiriye.

Bi sefereke sembolîk a propagandayê, min di sala 1977’an de gav avêt Kurdistanê. Di meha Adarê de min li salona berfireh a Odeya Mîmaran ji komeke qelebalix re cara pêşî tezên xwe di asta konferansê de eşkere kirin. Hema yekser piştî vê, Necatî Kaya’yê bi nasnav Pîlot ê ku ji

ustegmeniyê îstîfa kiribû û navê xwe li Fakulteya Zanistên Siyasî nivîsandibû bi min re di sefera welêt de hevalbendî kir. Rawestgeha min a pêşî Agirî û Bazîd bû. Xusûseke girîng a divê ez diyar bikim der barê nasnameya Necatî Kaya de ye. Piştre ajantiya wî hat guftûgokirin. Ez ne şaş bim, li Antalyayê dema balafira dermankirinê bi kar tîne, balafira wî dikeve û dimire. Têkiliya wî ya bi min re bêqusûr bû. Gelekî bi disîplîn bû. Di serê meha Çileya sala 1977'an de me civîna xwe ya pêşî û ciddî li mala wî ya Enqereyê çêkiribû. Nûnerên me ji Kurdistanê bang li wan kiribû û kadroyên me yên Enqereyê di vê civîna girîng de amade bûn. Çi dibe çi nabe me devê sobeyê vekirî hiştibû. Eger polês ji nişkê ve bi ser me de bigirta me yê notên xwe biavêta sobeyê û bişewitanda. Jixwe di destê me de wekî din belgeyên nivîskî tinebûn. Dîsa bi qasî ku tê bîra min, di heman civînê de wexta me xwarin dixwar, Necatî gotineke bê maneya "Nêçîra çivîkan dikin, bi vê xwêdanîkê xwê li wan dikin û dixwin" anîbû ziman. Min ti mane nedabûyê. Paşê bi Kemal Pîr re bi israr şêlandina kûryekî û revandina Sabîha Gokçenê (pîlota jin a yekemîn û keça manewî ya Atatirk) pêşniyar kirin. Ji ber ku min ji bîr nekiribû ku Yuzbaşî Îlyas Aydin bi çalakiyên provakatîf rê dabû pêşiya Mahîr Çayan û koma wî û herweha bi sedema ku min bawer dikir rewşa koma me dest nade vê yekê, min destûra çalakiyên bi vî reng neda. Eger çalakiyên bi vî rengî pêk bihatana, bi îhtîmaleke mezin me yê dawî li koma xwe bianiya; bi kêmanî wê pêvajoyek bi awayekî cuda bi dawî bibûya. Di vî warî de helwesta min a bi tevdîr di cih de bû.

Wekî din, Necatî Kaya pereyên îddîa dikir ku ji tazmînatê bi dest xistine, bi zêdehî di ber komê de xerc dikirin. Wî bi xwe ji min re weha digot: "Bi tenê tu ferman bike. Ez ê xwe ji vî qatê çaran çip bikim biavêjim xwarê." Yekî wisa bû, ji gotina xwe nedihat xwarê, dikarîbû bikira. Di sefera min a Kurdistanê de, li qûntara Çiyayê Agiriyê di deh civînên min ên pêşî û herî berfireh de ew bi xwe jî amade bû. Piştre veqetiya. Eger şaş nayê bîra min, piştre yan têkiliya min pêre çênebû yan jî pirr kêm çêbû. Di pêvajoya dema derketina derve de virde wirde pirr li min geriya. Ji sedî sed dixwest min bibîne. Heta bi mala me ya gund çûbû. Piştî ku ez derketim derve, haya min ji mirina wî çêbû û ez li ber ketim. Sîxur bû, yan jî ne sîxur bû, ev hat guftûgokirin û di çapemeniyê de cih girt. Weke encam ez dikarim bibêjim, eger ne ajan be û heta ajan be, lê bi zanîn pêdiviyê wê bi cih neanîbin, divê mirov wî weke kadroyekî hêja yê dema komê bibîne. Nirxek e ku divê mirov rûmeta wî lê vegerîne û bidiyê. Na eger endamekî kontrgerîlla be, divê ez bi girîngî bibêjim, bi saya tevdîra min plansaziya wî bi ser neketiye û nemeşiyaye.

Di sefera xwe ya li Kurdistanê de wexta min serdana xwe ya bi civînan li Agirî, Bazîd, Qers, Dîgor, Dêrsim, Çewlîk, Elezîz, Amed, Mêrdîn, Ûrfa, Dîlok û Enqerê temam kir, tê bîra min mîna ku min sefereke rastî ya şer pêk anîbe, ez ber bi bayê hisekê ketibûm. Axaftinên min ên di dema seferê de weke pirtûk hatin amadekirin. Eger bêne lêkolîn, wê bê dîtin ku berfirehiya pêşnûmeya xîtaba min a ji bo Xêrî ye. Tevahiya salekê axaftinên min di seferê de kiribûn, bûn xurekê sereke yê îdeolojiya komê. Min a ku kovar û rojnameyên komên din dikir, bi vê rêbazê bi mîsala kovar û rojnameyeke bi ling pêk dianî. Di pêvajoyên paşê de min timî hewl da çarçoveya van axaftinan

berfireh bikim. Di sala 1978’an de bi Serxwebûnê (bi serê xwe bûn: Xoybûnê tîne bîra mirov) me gav avêt pêvajoya nivîsê. Di hejmara wê ya pêşî de **Şoreşa Riya Kurdistanê** bi navê wê yê din Manîfesto ya min di sala 1978’an de nivîsî bû, hat çapkirin.

Li Enqereyê hînê çend rojên me derbas nebûbûn, ji Dîlokê nûçeya der barê şehadeta Hakî Karer de gihişt me. Ez dikarim bibêjim, hema bêje bi vê nûçeyê re hilweşiyam. Bi awayekî vebirrî me derbeke xedar xwaribû. Ya girîng ew bû, diviyabû me bersiveke rast bidaya vê êrîşê. Min nikarîbû ez bi xwe tevlî merasîma cenaze bibim. Paşê çûm serdana qebra wî ya li Ulubey a Orduyê. Min ji bo bîranîna wî soz da ku ez komê bigihînim partîbûnê. Di Payîza heman salê de min metnê **Pêşnûmeya Bernameyê** bi xwe nivîsî. Ya min dikir ew bû, li kolanên keviya Dîlokê li ser şopa şehadetekê dimeşiyam û di vê çarçoveyê de dixebitîm. Di vê navberê de du bûyerên girîng bi serê min de hatin. Ev bûyer mîna beşekî jiyana min a taybet xuya dikin, lê ya rastî maneyên wan ên siyasî û îdeolojîk hene. Ya yekê, di sala 1976’an de wefata bavê min bû. Min dema xebera mirina wî li Enqerê bihîst ez gelekî aram bûm û nayê bîra min ku ez giriyam. Kehaneteke bavê min bi cih hatibû: “Ez dema bimirim hûn li pey min nagirîn.” Ez yeqîn dikim ku ruhê wê demê fêhm kiribû. Rastiya modernîteyê dianî ziman. Bi qasî ku nakokiyên min bi diya min re çêbûn, bi wî re çênebûbûn. Dema min xwe li serîrakirina pêşî ya gund û malbatê rakişandibû nakokiya min a herî girîng pêre çêbûbû. Berevajî derdora me, hêviyên wî ji min hebûn, mizgînî dabû min ku ez ê bi ser bikevim. Gelekî paşê dema min rewşa wî şîrove kir, ez lê hayil bûm ku ew yek ji wan hêmanên rêûresmê ye, gelekî durist e, û xira nebû ye. Bi awayekî ferdî exlaqekî wî yê xurt ê dînî hebû. Ferdekî rêûresma malbata berê bi hêz bû ku niha lawaz bûbû. Hêza xwe ya bavikantiyê ji dest dabû. Di nava malbatê de aliyê dayikantiyê xurtir bûbû. Di navbera herdu erkan de weznek hebû û vê jî dihişt ku ez karibim gavê biavêjim. Hema bêje îddîayên herdu aliyan li ser min qediya bûn. Bi awayekî bingehîn ti carî fêhm nekirin, ya rastî, ya ku haya wan jê çêbû, lê ti carî hêza wan têrê nekir; ez li hemberî dinya modern bi tenê hiştim û ez bi temamî nizanim wexta ev qewimî wan çi his dikir. Lê ji min piştrast bûn û bi min ewle bûn. Divê mirov endambûna malbateke durist, bêhêz û girêdayî rûmeta xwe piçûk nebîne.

Bûyera dudiyan di van salan de xwesteka min a ji bo jinan bû ku dilebitî. Beriya komê di nava şert û mercên modernîteyê de ez ne xwediyê wê hêzê bûm ku nêzî jinan bibim. Dinya jinan, dinyayek bû ku min nas nedikir û ez jê direviyam. Bi tenê hisên min ên platonîk hebûn ku min di hundirê xwe de mezin dikirin. Ti carî wê ne pêkan bûya ku ez li cem kesekî li wan mikur bihatama. Ji dema gund ve nêrîna jinan li min balkêş bû. Lê ez li vê ti carî serwext nedibûm. Lê kengî min ev paşê şîrove kir, ez yeqîn dikim ku ez li cudahiya balkêşiyê hayil bûm. Wan cudahiya min bi eleqe ji hev derxistibûn. Belkî jî der barê min de li cem wan perçikên hêviyan çêbûbûn. Mîna ku wisa bibêjin: “Ho zarok! Tu nizanî çi bi serê me de hatiye. Rewşa me weke tu dibînî nîne. Tew te zanibûya çi dibe çi diqewime! Herçî tu mêr be jî dîsa hêviyên me ji te hene.” Ne ku

ez li xweşikbûna jinê hayil nebûbûm. Tê bîra min, ji bo yekê, ji bo keçeke Kurd min hukmekî wisa dabû "Ji bo te, ji bo qewm û zurriyeta te, hêjaye mirov şerê serxwebûnê bimeşîne."

Ez yeqîn dikim ku bi sedema hemşehriya Mazlûm Dogan bû, di dema komê de min kesa bi navê Kesîre Yildirim nas kir. Ji ber eleqeya wê ya ji komê re me ew jî ji komê dihesiband. Min jiyana wê ya berê qet nizanîbû. Lê ji destpêkê ve fikarên min hebûn ku wê bi awayekî berbiçav nîzama nava komê xira bike. Hêza min tine bû ku ez wê kontrol bikim. Ji bo selameta komê min hewce dît ku ez pêşniyar bikim, di nava komê de bi yekî re bibe dergistî. Herçiqasî ji vê helwesta min bêhna muhafezekarî û rêûresmê bê jî min ev kir. Karîbû bi min re yan jî bi endamekî di nava komê de bibûya dergistî. Ya rastî, min dixwest ez tercîha wê bim. Lê jinik xwedî karektereke dêlguran bû. Lê rastî fêhm kiribû, ango fêhm kiribû ku ez hewl didim wê kontrol bikim. Lewma tercîha xwe ji bo yekî din kir. Anora min a rêûresmî bi awayekî ciddî hatibû binpêkirin, lê min dengê xwe nekir. Dîsa min li xwe daneanî li ber vê yekê rabim. Lê dîsa jî tiştekî wisa bû ku mîna mirov ji duaya bi cih nayê re bibêje amîn. Têkiliya wê nemeşiya, nikarîbû bimeşîne. Kengî min car din ji bo têkiliyê berê xwe dayê, hem ez gelekî hilhilî bûm, hem jî me endamekî hêja yê komê ji dest dabû.

Rewşa min a hisî ya dilebitî dibû arîşeyeke ciddî û bi îhtîmameke mezin min hewl da ku ev rewşa min ti carî xwe di nava komê, partiyê û heta HRK'ê de nîşan nede. Pêxîrtengiyeke mîna ya dawiya salên 1960'î der barê Xwedê de girtibû min, xwe der barê vê jinê de nîşan dida û dubare dikir. Ez nizanim vê jinê çima xwe nêzî komê kir. Ez yeqîn nakim ku eleqeyeke wê ya cinsî hebû. Heta dawiyê di warê eleqeya cinsiyetparêz de serdest bû û ev tiştekî vebirrî bû. Di vê nuqteyê de ez xapiyabûm. Tevî ku hêza min a ez wê bi dest bixim tinebû jî min di vê de israr kir. Min têkilî heta bi zewaceke şiklî û yekalî pêşde bir. Bi kartvizîta zewacê di serê Havîna 1978'an de cara pêşî bi balafirê daketim Amedê. Belkî jî di dîrokê de, di têkiliyên mirovan de min meha hingivîn a herî seyr û neyênî pêk anî bû. Dema jinik bû weke qalibekî qeşayê, ti şensê min ê çareseriyê tinebû. Ez ne di wê rewşê de bûm ku derdê xwe ji kesî re bibêjim. Ji ber ku ji vê rewşê bi tenê ez berpirsiyar bûm. Di vê têkiliyê de berpirsiyariya jinikê tinebû. Min çi kiribû, min ew dîtibû. Bi gotineke din min çi çandibû, min ew diçinî. Ya rastî, hîç haya min ji nasnameyeke bi vî rengî ya jinê tinebû û lewma nedibû ku ez jê hêviyan bikim. Jin bi tevahî dêlguriya xwe li hemberî min bû. Min li vê rewşê, bi temamî deh salan, heta Havîna 1987'an, heta ew bi vîna xwe ji tevgerê veqetiya, bi awayekî wisa xwe ragirt, ez bawer nakim ku ev di nava du mirovên din de hatibe ceribandin. Ceribandineke bi dehşet û tirsnak bû.

Ez bi saxî derketina ji nava vê têkiliyê weke derhoze û mûcîzeyekê dibînim. Bûyerên statuya jinê ya di çanda Rojhilata Navîn de serûbinî dikirin dibûn sedema zehmetiyê û min li hemberî vê hewl dida kesayeta xwe li ser piyan bigirim. Pevçûn û hevduberdan ne çare bûn. Ji ber vê, min rewşa kesa li hemberî xwe dişiband rewşa pêxîrtengiya xwe ya ji ber şika ji hebûna Xwedê ya

ketibûmê. Diviyabû min ev têkilî ji aliyê siyasî û îdeolojîk ve ji hev derxista. Wekî din, heta analîzên der barê jinê de nehatana kirin, çareseriya siyasî û îdeolojîk jî bi bi temamî pêk nedihat. Di vê demê de hêza min a analîzkirina jinê pêş neketibû. Min ê ev ji sala 1987'an ve pêş bixista. Lê çawa ku bersiva min a ji bo şehadeta Hakî Karer amadekirina Pêşnûmeya Bernameyê bû, bersiva min a ji bo vî şerê psîkolojîk jî xebata min a bi navê **Riya Şoreşa Kurdistanê** bû. Di Havîna 1978'an de min ev xebat weke bingehê teorîk ê bernameyê amade kir. Bi vê derûniyê, amadekirina Manîfestoya Şoreşa Kurdistanê hêz û qabîliyeteke mezin divê. Dema min behsa mûcîzeyê kir, min xwest îşaret bi vê rastiyê bikim.

Kemal Pîr, Cemîl Bayik û M. Xêrî Dûrmûş di salên pêşî yên vê pêvajoyê de çavdêr in, û bi hurmetiya xeternak a vê jinikê li hemberî min dibînin û heta bêyî ku haya min jê hebe, difikirin wê bikujin, lê Kemal Pîr bi helwesta xwe ya hevrêtiya bêhevta dibêje "Em destê xwe nedinê, tiştekî heval dizane heye" û ev bêhtir kare rewşê zelal bike. Ji ber ku bavê jinikê di serîrakirina 1925'an de bi xwe bi Îsmet Înonî re têkiliyên ajantî û hevkartiyê danîne, ji wê jî guman hat kirin û weke mînaka Necatî Kaya ev jî gelekî hat guftûgokirin. Bi rastî ew ajan e, ne ajan e, em nizanin, ez nizanim. Min wê demê jî bîr dibir ku divê kesek ji ber bavê xwe neyê gunehbarkirin û di heqê wê de hukim neyê dayîn. Li hemberî van rexneyan helwesta min xulase bi vî rengî bû "Elewî ye, çepgir e, bi koka xwe Kurd e, û xwe gelekî baş perwerde kiriye, lewma hebûna keseke bi vî rengî di nava komê de çêtir e, ji tinebûna wê." Ji ber ku min nikarîbû têkiliyeke serketî û pozîtîf di warê hestyarî de pêre pêk bianiya, ev nedihat wê maneyê ku min di heqê wê de hukmekî neyênî bida. Ji lewra biryara di heqê wê de diviyabû bi temamî di çarçoveya pîvanên rêxistinî de bûya. Ew heta ji nava rêxistinê reviya jî helwesta min bi vî rengî bû. Lê li pişt min, gelekî bi tesîr karûbarên tesfiyekirinê dimeşandin û eşkere, ev rola xwe bi awayekî berbiçav bi cih dianî. Mirov dikare bibêje, xisletên xwe yên gelekî erênî nexistin xizmeta tevgerê.

Wê jî bixwesta yan jî pîlan bikira karîbû min bikuşta. Rojekê, nexasim nêzî demên reva wê, tê bîra min gotibû "Netirse, ez te bi jehrî nakim." Ji ber ku di wê demê de ajan bi pey min ketibûn ji bo ji sedî sed bikujin. Dîsa jî diviyabû ku ez bi tevdîr bûma. Di demên dawî yên têkiliya me de du şifêrên min hatin ber xwekuştinê, ji wan hevriyan kesê bi navê Ferhan gotibû, "Divê mirov wê bi çar hespan ve girê bide û parçe bike", yê din ê bi navê Sebrî jî reviya, û dema min gav avêt Rojhilata Navîn hevalê bi tenê yê li cem min Ethem Akcan gazinên xwe kiribûn û gotibû "Li pişt Serok çi dekûdolab têne gerandin" û balkêş e, ev heval bi êşa ji vê yekê bi rakişîna damarên mîdeya xwe bû şehîd û giyana xwe ji dest da. Di gelek tesfiyekariyên krîtîk de bi rola aktora li pişt perdeyê radibû û ev girîng e. Li ser gelek hevalan bi tesîr bû, mîna wan hîpnotîze bike bi bandor bû û mirov dikare vê jî bi xisletên wê yên xurt ên hizipkariyê ve girê bide. Têkilî û kesayetek e ku hînê jî hewce dike mirov bi girîngî ji hev derxe.

Kesayeteke din a gelekî bal dikişand ser xwe Dîlaver Yildirim bû. Ji bo siberojê mirov hêvî jê dikirin û yek ji hevalên li pêş bû. 12'ê Îlonê di zindanê de mabû. Di nava komên têkel de ma. Bi tena serê xwe di ser Bulgaristanê re derket Ewrûpayê, demekê li Ewrûpayê geriya, hat Rojhilata Navîn cem min, pirr kêm diaxivî û bi qasî ku tê bîra min gotibû "Bi vî awayî tu digerî bi tehlûke ye" û li kampa Bekaayê yek du jinên sivik jêre gotin "Te çav berdaye şûna Serok" û piştî vê, wî ji min re nameyeke xatirxwestinê şand û piştre xwe kuşt. Ev xwekuştina wî ji bo min bûyereke seyr e. Yek ji wan hevalan e ku divê mirov li nasnameya wî ya rastî bipirse.

Li ser bingehê Bernameya Partiyê ya ji bo bîranîna Hakî Karer hatibû amadekirin di 26-27 Mijdara 1978'an de li gundê Fîsê yê bi ser Amedê ve civîna me ya ji 22 kesan a di asta kongreya damezrîner de du rojan ajot û bi vî awayî ev kongre jî qonaxeke din a girîng a riya me bû ku em ketibûnê û êdî veger jê tinebû. Weke PKK binavkirin û îlankirin, ya rastî dawiya demekê bû. Hem li gorî şert û mercên dinya û Tirkiyê, hem jî di pratîka komê de çi hewce dikir bi awayekî bingehîn hatibû kirin. Li vir şêwazê şoreşgerî girîng e. Ji ber ku bi tenê nehat gotin; bi gelek çalakiyan di zikhev de pêk hat. Ji şert û mercên berbiçav ên heyî mebest ew e, ji nava bajar, çîn û dewleta netewe li ser navê çîna 'karker' gav tê avêtin. Asta teorî û pratîkê li gorî vê bû. Gelek komên din bi heman rengî hebûn. Lê ti ji wan bi qasî koma me nikarîbû şoreşgertiyeke komple di kesayeta xwe de berbiçav bike. Ji ber vê, di dema darbeya eskerî de bêtevdîr hatin zevtkirin.

Ji serê salên 1979'an ve, min hewl da, ji du aliyan ve xwe bi tevdîr bikim. Ji aliyekî ve min dixwest amadekariyên têkoşîneke demdirêj li deşt û çiyan bikim, ji aliyê din ve jî min dixwest li derveyî welêt ji bo tevgerê riyekê vekim ku karibe pê bêhna xwe bide. Eger ez di vî warî de bi ser biketama bi awayekî vebirrî tevger ê mayînde bibûya. Li gorî şert û mercên demê gavavêtinên taktîkî yên di cih de, bi qasî pêşxistina stratejiyê girîng e. Em di demeke wisa de bûn. Min di mehên destpêkê yên salê de gazî Ferhat Kurtay (paşê li Zindana Amedê bû şehîd) kiribû û anîbû cem xwe. Me makîneya teksîrê li erebeya wî ya fermî kir û wî ez heta bi Qoserê birim. Di vê navberê de piştî Civîna Damezrandina PKK'ê bi qasî mehekê komkujiya Mereşê pêk hatibû. Em li Mereşê bi tesîr bûn. Ji sala 1925'an ve ji bo Kurdan biryara tesfiyekirinê hatibû dayîn û dihat meşandin. Di vê çarçoveyê de li herêma jêre Rojavayê Firatê digotin tevgereke Tirkîfîkasyonê li ser kar bû. Me li van deveran Kurdîtî hinekî zindî kiribû. Bi heman awayî bi komkujiyên li Meletî, Semsûr û Elezîzê bersiv didan vê yekê. Komkujiyên em behsa wan dikin, encama çalakiyên besît ên faşîstên sivîl nebûn; dewama qirkirinên dîrokî bûn û bi desteka NATO-Gladîo dihatin kirin. Li Amedê bi îlankirina PKK'ê me bersiva van komkujiyan dida. Di van salan de ku Desteya Wezîran a Bulent Ecevît li ber ruhdanê bû, me ev gavên dîrokî avêtibûn û komkujî pêk hatibûn. Di van salan de kontrgerîlla têra xwe bûbû xwedî însiyatîf. Ewqasî ji xwe piştrast bûn, li dijî Ecevît jî reşkujiyek ceribandin. Komkujiya Taksîmê ya berî vê bi salekê jî ji aliyê heman hêzan ve hatibû kirin.

Min di nîvê sala 1979'an de ji Ethem Akcan ê Pirsûsî re got, xwe amade bike em ê di sînor re derbas bibin. Ji bo vê li Ûrfayê çil rojî rawestiyam. Rewşa min mîna ya Brahîm Xelîl bû. Min gelek pûtên şaristanî û modernîteyê şikandibûn. Di wan rojan de ku gelek Nemrût bi xezeb li ser piyan bûn, ez li bajarê Nemrûtan bûm û ev têra xwe bûyereke balkêş bû. Ez li ser şopa derketinê ya Brahîm bûm. Di Pirtûka Pîroz de navê Pirsûsê weke Serûc derbas dibe. Hema hema piştî hemû serîrakirinan rewşa ji bo derketinê dîsa xwe dubare dikir. Di vê navberê de ez derketim ser kelha Ûrfayê. Ez li tevahiya kelheyê seranser geriyam. Ez li cem herdu stûnên Hz. Brahîm bi mencenîqê avêtibûn nava êgir demeke dirêj sekinîm û min li jêr temaşe kir. Piştî çend rojan Ethem Akcan xeber şand ku ji bo derbasbûna di sînor re her tişt amade ye. Her tiştê amade jî suwarbûna li mînîbuseke gund bû. Ez li mînîbusê suwar bûm û bi gundiyan re li gundekî ser sînor daketim. Ez hê jî difikirim, gelo çiqasî rast bû ku ez li wê wesayîta modernîteyê suwar bûm. Encama di vî warî de gihiştimê ev e: Mirov bi tevahiya amûrên zêhnî û fizîkî yên modernîteyê kar bike, ji çarenûssipartina xwe ya xwedayên serdema pêşî bi tehlûketir e. Berêvarê amadekariyên gava duyemîn ketin dewreyê. Kûryeyê bi navê Cehnî got "De rabin" û em rakirin. Eskerê nobedar têlên rêsayî rakirin û got "De hemşehriyê min bi lez biçe" û bi vî awayî em derbas kirin. Em li pey Ethem diçûn me pê li şopên wî dikir û bi meşa bizinan em ji zeviyê mayînkirî bihurîn. Ji bilî min, ev ji bo hemû kesên din rewşeke hêsan û normal bû, lê ji bo min dîrokî û cara pêşî bû. Min bi qasî Donkîşot jî xwe gurçûpêç nekiribû. Ethem alîkarê min ê bi tenê bû. Min hewl dida welatekî Nemrûtan bi hezarê salan lê agir bi erdê xistiye ji nû ve bigihînim îman û baweriyê. Li naverastê gelek hebû ku dihat înkarkirin û dixwestin koka wî biqelînin û ev gel li ber qedandinê bû. Înkar û îmhaya li ser vî gelî ewqasî giran bû, pûtên wî yên serê xwe li ber wan xwar bike jî tinebûn. Pûtên hatibûn şikandin biyanî bûn û pûtên modernîteyê bûn.

Mîna Hz. Brahîm piştî rêwîtiyeke çend rojan kudand min hew dît ez di nava Filistîniyan de me. Rojên min ên bêziman û bêtercuman dest pê kiribûn. Ji bilî girîngiya armancê tiştekî din tinebû ku min li ser piyan bigire. Eger fedekariyên Ethem nebûna, hewldanên min ber tiştekî nedigirtin, kolana avê bûn. Kesên ku bûyerên bi vî rengî bi serê wan de hatibin, girîngiya mezin a rêxistinî û têkilîdanînê ji bo civakbûneke nû dikarin ji dil fêhm bikin. Ya bi serê min de dihat û min didît heqîqetek bû ku di PKK'ê de rastî û girîngiya wê kêm hatibû fêhmkirin. Ev têkiliya me danî, belkî jî ji şerekî li meydanê girîngtir bû, lê li ser bi hev ketin. Qîmeta wê nezanîn û xirab bi kar anîn. Hevrê û hevalên durist hemûyan berdêla vê pirr bi êşên giran, zirar û ziyanên trajîk dan û hin xasûk û qurnazan jî ji bo şêweyekî qehremantiya erzan bi kar anîn. Qebîleya Brahîm di rê de gelek zor û zehmetî kişandibûn. Em jî bi awayekî qebîleyeke hemdem bûn. Zor û zehmetî li ser heman rê û belkî li heman mekanan hatin kişandin. Derketina me ya ji welêt bi awayekî jî dişibiya derketina Mûsa ya ji Misrê. Jixwe em weke heman qebîleyan bûn. Bi herhalî li ser xeta Ûrfa-Heleb-Şam-Quds-Misrê ji dema firewnên Sumer û Misrê heman çîrok bi hezar caran dubare bûye. Li gorî min, dîroka mirovatiyê ji dema komên mirovên pêşî ji Efrîkayê derketin û bi nava Asya û Ewrûpayê ve çûn heta roja me ya îro li ser vê xetê diyar bûye. Derketin û

gavavêtina min û me jî xweber nîne, yek ji wan gavavêtinên dîrokî ye ku tevahiya kêliyên krîtîk pêkhatina wê neçar û ferz dike.

Mirov dema 1970’yî-1980’yî tevî nirxandinên îdeolojîk û siyasî, bi awayekî wêjeyî binirxîne û têkiliyên wê bi jiyana berbiçav re deyne wê bi roleke temamker rabe. Tevgerên îdeolojîk û siyasî di serî de wêje têkiliya wan bi hunerê re neyê danîn û heta bi nazenîniya hunermendekî neyên gurçûpêçkirin û meşandin kêmasiyeke mezin e. Heta mirov dikare bibêje wê nexweşokî bin. Mirov heqîqetê bi tenê nikare bi rêbazeke zanistî û îdeolojîk bide xuyakirin; mirov bide xuyakirin jî wê kêm bimîne. Şêweyekî bi vî rengî yê daxuyakirinê divê weke fikirsabitbûneke moderníteyê bê fêhmkirin. Ez ê di beşên pêş de bêhtir bidim xuyakirin ku modernîte kesayetê dike yekalî mîna ekonomîst, siyasetvan, îdeolog, akademîsyen, esker, karker, zanyar, rewşenbîr û wekî van, lewma mirov heta ji vê nêzîkatiye nebihure, nikare li dijî modernîteya kapîtalîst bibe xwediyê têkoşîneke yekpare û hevgirtî ango nikare bi awayekî serketî têbikoşe. Rêxistin, kesayet û gavavêtinên şoreşger heta xwe bi tevahî bi gurçûpêç nekin, bi çanda dîrokî-civakî û bi rewşa niha ya temsîla van çandan dikin têkiliyê daneynin û bi van rewşan xwe gurçûpêç nekin, bivênevê wê bikevin xefika jiyana lîberalîzmê. Modernîteya kapîtalîst bi sîlehên teorîk û îdeolojîk ên jiyana lîberal dihewînin hevber û hevrikê xwe dixînin. Wer tê bawerkirin ku ferd lîberal an jî jiyana lîberal, jiyaneke gelekî xwezayî û azad e. Lê ya rastî jiyanên bi vî rengî ji jiyana dînên herî hişk bêhtir xwedî jiyaneke dogmatîk û yekalî ne. Eger PKK bi heman awayî weke mînakên sosyalîzma pêkhatî ber bi bayê neketibe û bi temamî tesfiye nebûbe, nikarîbûne wê tesfiye bikin, sedema vê ya bingehîn ew e, bi heqîqeta civakî re bûye yek, pêve girêdayî maye û karîbûye bi gavavêtinên teorîk û pratîk ên di naveroka wan de nûjenxwazî heye bigihîne hev û bike yek. Di encamê de gavavêtin û meşa bi vî rengî li dijî hêmanên modernîteya kapîtalîst xwedî alternatîf in, û rê li ber pêşketina hêmanên modernîteya demokratîk vekirin. Mirov eger gavavêtinên şoreşgerî bi tenê daxe asta hêzeke fizîkî yan jî aliyekî taybet û beşekî, wê ev yek zû-dereng ji aliyê yekparetî û tevahîtiya jiyanê ve li dawiyê bê hiştin. Hêmanên şaristaniya paşverû û modernîteya kapîtalîst xwediyê hêza zêde ne. Tevî ku di warê hêzê de bêtewazuniyeke mezin heye jî têkoşîna bîrewerî û giyanê azad weke rehên xwe di nava tahtan de berdin pişkivîne, kulîlk vedane û ber girtine.

**B- TECRÛBEYA PKK'Ê YA ŞERÊ GEL Ê ŞOREŞGERÎ Û ENCAMÊN WÊ**

Dendika PKK'ê li Enqereyê hat danîn û ev jî bi awayekî tîpîk nîşana polîtîkayên mêtingeriya klasîk e. Li gelemperiya dinyayê di çarçoveya têkiliya mêtingeh-metrepol de gelek mînakên bi heman rengî pêk hatine. Min hewl da diyar bikim ku derketin û gavavêtina ji Enqereyê bi êş û jan bû. Eşkere ye ku ev yek ji pêvajoyên herî zor û zehmet bû. Dema ez behsa zor û zehmetiyê dikim, mebesta min hêza çor û qebe nîne, ji ber xweseriya faşîzma Tirkê Spî, ji ber atmosfera wî ya çanda derûnî ya bêhnê li mirovan diçikîne, zor û zehmet bû. Çiqasî ketina wir zehmet bû, derketina ji wir jî ewqasî zehmet bû. Ka bi kîjan ruh û çandê gav hatibûn avêtin, ev gelekî girîng bû. Faşîzma Tirkê Spî di warê qirkirina çandî de bi serketina xwe şa dibû û di nava vê rewşê de me gav diavêt, me di vê rewşê de tevgera neteweyî ya Kurd vejand û ev bûyer dişibiya sax derxistina miriyekî ji qebrê. Wekî din vê rewşê gotina "Canê nehatibe stendin hêvî jê nayê qutkirin" dianî bîra mirov. Nexweşê me ruh pê ve dihat û nîşaneyên vê yekê xuya dikirin. Lewma wezîfeya me ya bingehîn bû ku em nexweşê xwe bibin devereke din, bibin cihekî ku lê karibe bi sihet bi ser xwe ve bê. Rewşa me ya li Ûrfayê dişibiya nexweşiya Eyûp Pêxember jî û lewma terk-î diyar alternatîfa herî lezgîn a li pêşiya me bû. Ji bo xebata stratejîk me herêma herî germ a Rojhilata Navîn hilbijartibû û têkiliya vê jî bi armancê re li hev dikir. Gelek hêzên bi heman rengî derketibûn Ewrûpayê. Ji bo xebatên şoreşgeriyê Ewrûpayê ji zû ve rola navendbûnê ji dest da bû. Bav û diya modernîteya Tirk bû ku kiribû bela. Şoreşgerên li Tirkiyê xwestin bi lêdanê terbiye bikin, li Ewrûpayê bi dermankirina derûnî wê ew islah bikirana. Karîbûn li Ewrûpayê bixebitin, lê destûr tinebû ku Ewrûpayê bikin navenda stratejîk a xebatê.

Sala me ya pêşî bi dabînkirina pêdiviyên lojîstîk û bi ji nû ve birêkûpêkkirina komê derbas bû. Eger em serhatiya wê ji paşê re bihêlin, mirov dikare bibêje, rastbikaranîna zeman û mekanê nû gelekî girîng bû. PKK'ya salên 1970'î ya Kurdistan û Tirkiyê îdeolojîk bû. Îdeolojiya dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî qebûl kiribû. Xisletên demokratîk weke potansiyel di navê de hebûn. Lê em ne xwediyê wê kapasîteyê bûn ku bi revîzyonîzma sosyalîzma pêkhatî re têbikoşiyana. Me li gorî xwe, bi tenê karîbû bi awayekî serketî li dijî îdeolojiyên milliyetgiriya paşverû û şovenîzma sosyal têbikoşin. Li zeman û mekanê nû yê Rojhilata Navîn hewcedarî bi vê tinebû û şertên wê jî tinebûn. Şertan li hundir PKK'ya şer a şoreşger, li derve jî hevgirtina bi rêxistinên din û dewletên sosyalîst ên reel re ferz dikir. PKK'ya îdeolojîk, tevî hêmanên xwe yên ne zelal ên îdeolojîk, ji bo jiyaneke azad têra xwe hêvî bi mirovan re çêdikirin. Lê bi awayekî îdeolojîk hêvîçêkirin ji bo jiyaneke azad ti carî têrê nedikir. Ji lewra PKK'ya şer qonaxeke bivênevê bû. Eger me şer li ber çavan negirtibûya me ti azadî bi dest nedixist, bihêlin jiyaneke azad, me nikarîbû em nasnameya xwe jî bi dest bixin. Li Enqereyê ya me xeyal dikir ne jiyana azad bû, ji wê gelekî dûr bû; ya me xeyal dikir, belkî der barê nasnameya xwe de me dixwest em navekî bi dest bixin. Ji bo vê bi xwe jî gelek rîsk û tehlûke hebûn. Di encamê de herçiqasî bi rîsk bûya jî me weke nav nasnameya Kurd bi dest xistibû. Gava dudiyê ya mezin ew bû ku diviyabû

ya hatibû bidestxistin me dugêsinî nekiribûya. Lewma em ketin nava şerê azadiyê yê nasnameyê.

Li vir pirsa bingehîn a li pêşberî me dîsa têra xwe felsefîk e. Pirsa bingehîn a felsefîk têkiliya di navbera nasname û azadiyê de ye. Gelo bêyî azadiyê mirov dikare nasnameya xwe bijî? Gelo di çarçoveya ferdî de azadî bêyî nasnameya civakî pêkan e? Eger bersiveke erênî ji bo van herdu pirsên bingehîn neyê dayîn, hingê divê mirov têkiliya di navbera çalakî û azadiyê de manedar bike, bi gotineke din divê mirov têkiliya di navbera îrade û azadiyê de manedar bike. Şêwazê zordestî û mêtinkariya xwe disipêre nasnameya Kurd, mînak weke zordestî û mêtinkariya her çi dewleteke netewe ya Ewrûpayê nîne. Rêbazên qirkirina çandî yên li gorî demeke dirêj hatine eyarkirin û li tevahiya qadên civakî hatine belavkirin, li ser kar in. Heta ev rêbaz li ser kar bimînin, ne hebûn ne jî nasname mewzûbehs dibin. Azadî jî bi tenê ji bo hêmanên modernîteya dewleta netewe yên serdest e. Li wir jî pirraniya welatiyan xwediyê jiyaneke koletiyê ya modern in. Kurd jî weke hebûn û nasname parçe parçe têne qedandin û ji holê têne rakirin. Ji bo vê jî amûrên qirkirinê û asîmîlasyonê bi tevahî li ser kar in. Bi tenê zordestiya siyasî û mêtinkariya ekonomîk mewzûbehs nîne. Hebûna dîrokî-civakî ango nasname bi xwe di pêvajoya îmha û înkarê de ye. Ji lewra azadiyeke mîna ya Ewrûpayê bi têkoşîna siyasî û ekonomîk bê bidestxistin, mewzûbehs nîne. Li Ewrûpayê pêdivî bi şerê hebûnê jî tineye. Ji bilî kêm îstîsnayan, nasname di bin zordestiyê de bin jî di pêvajoya îmha û înkarê de nînin. Herçiqasî bê gotin, bêyî azadî jiyana bi nasname hêja nîne jî dîsa girîng e ku mirov xwedî nasname û hebûn be.

Di warê diyardeya Kurd de rewş cuda ye. Hebûn û nasnameya wî bi xwe tê înkarkirin û li ser parçeyên wî yên mayî jî pêvajoyeke dijwar a îmhakirinê tê meşandin. Di rewşeke bi vî rengî de hebûn û azadî dibin du têgînên ketine zikhev. Yek bêyî ya din pêk nayê. Eger tu azadiyê dixwazî divê tu bibî xwedî hebûn; eger tu hebûnê dixwazî divê tu di warê azadbûnê de bi ser bikevî. Tevî ku di pêvajoyên îmha û înkarê de pirr zêde amûrên îdeolojîk ango amûrên derûnî û çandî li ser kar in jî lê bi awayekî bingehîn îmha û înkar li ser bingehê hêza fizîkî ango bi darê zorê têne meşandin. Artêş, polês, kontrgerîlla, mîlîsên faşîst ên sivîl, cerdevan û mîlîsên ajan weke tevn û torekê li ser tevahiya çaviyên hebûnê çalak in. NATO û hêzên din ên hevgirtî li pişta wan in. Hêzên îmhakirina fizîkî yên bi kêmanî paşxaneke wan a dîrokî ya bi qasî sedsalî heye, timî hewl didin desthilatparêzên ji rêûresmê û hêzên hiyerarşîk bi kar bînin. Berî çalakiyeke li dijî van hêzên fizîkî an têkoşîneke li dijî wan, rastiya wan li ber çavan neyê girtin, ne hebûn û nasname ne jî azadî tê bidestxistin.

Di hevkartiya Kurd a dema nêz de hin gavavêtin piçûk ên di bin dawa bûrjûwayê de têne dîtin, milliyetgirên paşverû û şovenîstên civakî yên Tirk ên hevkartiya dewleta netewe ya serdest dikin, bêyî ku sîstema îmha û înkarê ya li ser hebûn û nasnameya Kurd li ber çavan bigirin, dîsa bêyî ku rêbaz û amûrên qirkirinê bibînin, bi awayekî kategorîk û giştî behsa têkoşîneke azadiyê

dikin. Kesên behsa wan tê kirin herçiqasî durist bin jî bi sedema ku statuya qirkirinê ya objektîv paşguh dikin, ji hêzên îmha û înkarê yên bi zanebûn tevdigerin zêdetir bi roleke neyênî radibin. Bi gotinên qelp û demagojîk ên ti hikmê wan tineye, tînin ziman ku wê nasname û azadiyê bi dest bixin. Ji bo duaya ku nabe û pêk nayê, ji mirovan dixwazin jêre bibêjin amîn. Ji bo hebûneke li ber îmha û înkarê, mînak ji bo nexweşekî kansêrê aspirînê weke derman pêşniyar dikin û bi vê rêbazê dixwazin wî xweş bikin ango hewl didin nexweş bikujin. Tevî ku bi salan rêbazên behsa wan kirî ceribandin jî encam li pêş çavan e. Bi sextekariyeke mezin, mafê mirovan û azadiyên tinene mîna ku hene nîşan didin û hewl didin bidin bawerkirin ku bi têkoşîna îdeolojîk û siyasî mirov ê karibin bi nasname û azadiya xwe rabin. Ji bawerkirinê wêdetir, bi propagandayê hewl didin bîrewerî û îradeya gel kor bikin.

Eşkere ye ku li dijî rêbazên sîstema îmha û înkarê, bi awayekî cuda be jî têkoşîna bi rêbaz û amûrên bandora wan bişikîne ji bo bi hev re bidestxistina hebûn, nasname û azadiyê şert e. Tevî ku amûrên îdeolojîk û siyasî hewce dikin jî di şertên heyî de nikarin diyarker bin. Kengî amûrên îmha û înkarê bi rêbaz û amûrên şoreşgerî hatin bisînorkirin amûrên behsa wan tê kirin mirov kare qala wan bike û ev amûr dikarin bi roleke manedar rabin. Jixwe gelekî kêm be jî di derketina holê ya PKK'ê de ev rewşa çalak a rêxistinê li ser gel bandora xwe kir û gel palpiştiya wê kir. Ango rastiya em behsa wê dikin ew e, bi rê û amûrên rast têkoşîn li ber çavan hatibû girtin. Herçiqasî hinek nuqteyên ne zelal û şîlo hebûn jî stratejiya şerê rizgariya neteweyî ya antî-mêtingerî di destpêkê de bi rastiyên girîng radibû û lewma jî gel destek dayê. Dîsa li ser riya vê stratejiyê hinek çalakiyên bi sînor hatin lidarxistin û ji ber heman sedeman bi awayekî dûrî aqilan rastî eleqeyê hat û palpaştiya wan hat kirin. Dema em daketin qada Rojhilata Navîn der barê pirsgirêkên hebûn û azadiyê de guftûgoyên bi vî rengî dihatin kirin. Hinek bûyerên diqewimîn dihatin rexnekirin, û gera li stratejî û taktîkên nû û bêhtir rast hebû.

**1- Şerê Gel ê Şoreşgerî, Tesfiyekarî û Xiyanet**

Me weke têgîn ji şerê gel ê şoreşgerî guman nedikir. Pêvajoyeke bi vî rengî pêk nehata, mirov ne karîbû behsa nasnameyê bike, ne jî karîbû behsa azadiyê bike. Bi vê armancê, em hê ji destpêkê ve di civaka dîrokî de li ser rola zorê fikirîn. Jixwe her roj û her saet hêzên zorê yên li ber çavan heta bi nava dilê me xwe nîşan didan. Fetihkirina bi zorê, ne bi tenê weke mafekî serweriyê, lê wekî fermana Ellah jî dihat hesibandin. Çawa ku li dinyayê bi giştî wisa bû, hêzên li ser Kurdistanê serwer bûbûn jî tevî awayên wan ên ji rêûresmê îdeayên wan ên xwe disipartin modernîteyê jî bi vî rengî bûn. Kurdistan parçeyekî erdê yan jî welatek bû ku ji berê ve hatibû fetihkirin. Fermana Xwedê bi cih hatibû anîn. Dema mijar dibû hêmanên modernîteyê, tevî hin rastiyên din mafê serweriyê ti carî ne ya guftûgoyê bû. Pêdiviya bi pîşesaziyê û qanûna kara herî zêde berfirehkirina bazaran û ya erdan ferz dikir. Têgihiştina serwertiya dewleta netewe xwe disipart teoriya hêzê ya ti carî bi kesî re parve nake û ti carî cihêbûnê qebûl nake. Kes nikare bi

bihosteke sînoran jî bilîze. Kevirekî piçûk bi tenê jî nadin. Mîna fermana xwedê ye, çawa dibêje ‘bibe’ dibe, ya rastî dewleta netewe bi hêzên di bin fermana xwe de û bi navenda hêzê, bi civaka homojen, bi welatiyê mutleq kole û bi têgihiştina tekperest a di her warî de (‘tek welat’, ‘tek ziman’, ‘tek çand’, ‘tek al’, ‘tek sirûd’ û weke wan) serwertiya xwe ya xwedatiyê ya hezarê caran ji xwedatiyên berê bi hêztir kirî, vebirrî dike û nahêle ku bê guftûgokirin. Guftûgoyeke herî piçûk an tezeke dijber, ji bo ‘yekîtî û yekparetiya welat’ tehlûkeya herî mezin tê hesibandin, sûc tê qebûlkirin û bi cezayê herî giran tê cezakirin. Şert û mercên bi vî rengî xwe bi hemû gotin û çalakiyan nîşan didin û pêk tînin. Ha di rewşeke bi vî rengî de, eger tu bibî xwedî îdeayeke herî piçûk, bi tenê tu dikarî xwe bi rêbazên zorê biparêzî. Ev nedihat guftûgokirin. Mijara dihat guftûgokirin der barê pêdiviyên wê yên stratejîk û taktîk de bû. Jixwe di dema derketina holê ya PKK’ê de amûrên xweparastina rewa bêdudilî hatibûn bikaranîn. PKK bi awayekî neçar mabû xwe weke hêzeke mîlîs bi rêxistin bike. Di rewşeke berevajî de nikarîbû rojekê li ser piyan bimaya. Bimaya jî ti cudahiya wê ji hêzên din nedima û wê tesfiye bibûya.

Me şerên gel ên şoreşgerî yên wê demê lêkolabûn. Nexasim ezmûnên Viyetnam û Efrîkayê ji wan mijaran bûn ku herî zêde em li serê hûrûkûr sekinîbûn. Di dema şerê dijwar ê di navbera hêzên hegemonîk û sosyalîzma pêkhatî de tevgerên rizgariya neteweyî serketineke mezin bi dest xistibûn. Gelek mînakan teoriya rizgariya neteweyî piştrast dikirin. Lewma ji bo Kurdistana bi xwe mêtingeh bû jî, bivênevê modela şerê rizgariya neteweyî ferz bû. Ji qonaxa komê heta bi amadekariyên li Rojhilata Navîn modela mohra xwe li pêvajoyê da, ev modela şerê rizgariya neteweyî bû. Di tevahî civînên perwerdeyê, belgeyên konferans û kongreyan de mijara sereke ya herî zêde hatiye guftûgokirin, lêkolîn û bûye biryar şerê gel ê şoreşgerî ye. Amadekariyên pratîk jî di vê çarçoveyê de dihatin kirin.

Kirinên darbeya eskerî ya 12’ê Îlonê, di serî de zindana Amedê li zindanên bi mirovan hatibûn tijîkirin êşkenceyên xeternak dihatin kirin û şertên jiyanê bi xwe bi temamî kiribûn mîna kampên komkirinê, van hêmanan hemûyan tavilê destpêkirina pêngava nû ya stratejîk ferz dikir. Wekî din darvekirin di rojevê de bûn. Rojiyên mirinê dest pê kiribûn. Eger me yê tiştek bikira diviyabû me di dema wê de bikira. Dîrokê wê derengmayîna me nebexşandaya. Jixwe çalakiyên bi rengê xweparastinê ti carî nesekinîn; carinan kêm û carinan zêde be jî timî dewam kirin. Ya diviyabû me bikira ew bû, çalakiyên dihatin kirin me derxista asteke jortir. Ji bo vê amadekarî têra xwe hatibûn kirin. Ji bo stratejiya şerê gel ê xwe disipêre hêza xwe, eger em zêde bisekiniyana û me wext derbas bikirana, wê ev bihata maneya oportunîzmê. Bi van sedeman, hê 12’ê Îlonê pêk nehatibû, di Tîrmeha 1980’î de me bi pêşengiya Kemal Pîr û Mahsûm Korkmaz koma pêşî ji nû ve şand welat. Paşê wê di ser Îran û Iraqê re çûyîna koman a welêt dewam bikirana. Nexasim ji ber êşkence û rojiyên mirinê li zindana Amedê, diviyabû sala krîtîk a 1982’an ji sedî sed bibûya sala pêngava nû. Me navenda pêngava pratîk bir welat, bir Lolanê. Em li bendê bûn pêngav ji wir dest pê bike. têkiliyên hewce hatibûn danîn û hêzên pêdivî bi wan hebû ji zû ve hatibûn

veguhestin. Ji lewra bendewarî mafdar û rast bû. Kesên li wir di statuya pêşengiyê de bûn, bi sedemên ku min hê jî naveroka wê ya rastî fêhm nekiriye, lê li gorî min bûn xwedî helwestekê, mirov dikare weke ketina rêya rastgiriyê bibîne. Pêvajoya amadekariyê ya li Rojhilata Navîn dubare dikirin ango bi kopîkirina wê re mijûl dibûn. Jirêderketina pêşî û ciddî ev bû. Bi vî awayî bandora vê jirêderketinê heta roja me ya îro dewam kir. Fikarên min zêde bûbûn, min dest bi rexneyên pêşî û ciddî kiribûn. Mirov dikare di gelek axaftin û talîmatan de van rexneyan bibîne. Herî dawî di Civîna Navendî ya Çileya 1984'an de bi rexneyên herî berfireh bûyer hatin dadgehkirin.

Pêngava 15'ê Tebaxê, heman salê bi derengî, ne pirr bi hosteyî û ne bi şêwazekî bersivê bide amadekariyên me, dest pê kir. Ji çalakiyê zêdetir, maneya wê ya dîrokî û aktuel girîng bû. Lewma bivênevê wê mohra xwe li rojevê bidaya. Artêşa Tirk a xwe li gorî tepisandina serîrakirinên klasîk ên Kurd bi rêkûpêk kiribû, bi stratejî û taktîkên heyî di wê hêzê de nebû ku vê pêngavê tavilê bitepisîne. Di şerê gel ê klasîk de taktîkên gerîlla yên ji rêzê bivênevê ev artêş wê neçar bikirana. Bûyerên pêşî qewimîn ev yek piştrast kirin. Lê bihêlin ku taktîkên gerîlla di şerê gel de bêne bikaranîn, bi awayekî ji rêzê jî nedihatin pêkanîn. Firsendeke dîrokî pêkan bû ku têk biçûya. Pêşengiya pratîk a li hundir bi israr bi berpirsiyariyên xwe ranedibû. Li hemberî ferzkirina serokatiyê bi awayekî xweber diketin nava hewaya xebatên komê. Cara pêşî Mahsûm Korkmaz îşaret bi tehlûkeyê kiribû. Piştî pêngavê, ez hûrûkûr pêre axivîbûm, min erkên berpirsiyariyê bi bîra wî xistibûn û ji nû ve şandibû welêt. Mîna girtina bêşens a Kemal Pîr, şehadeta Mahsûm ku li gorî min divê were rohnîkirin, şensê serketina pêngavê lawaz û qels dikir. Li ser vê yekê, me kesên di asta pêşengiyê de anîn cem xwe. Ez ewqasî ji wan qehirîbûm, min Kongreya 1986'an bi wan da kirin û paşê min pirraniya wan şand Ewrûpayê. Ji ber ku ez gelekî qehirîbûm ez tevlî temamiya kongreyê nebûm. Ji sala 1987'an ve heta bi 9'ê Cotmeha 1998'an roja ji Sûrî veqetiyam, min bi xwe pêngavên dijwar û li pey hev amade kirin, ez xebitîm da ku oportunîzma tê ferzkirin û JITEM û kontrgerîllayên ev baş bi kar anîn pûç bikim. Me di têkoşînê de domdarî û mezinkirina hêzê pêk anîbû. Bêguman van hewldanan bi serê xwe nikarîbû serketinê bînin; lê karîbûn oportunîzmê û pîlanên tesfiyê yên kontrgerîlla pûç bikin. Wisa jî bû. Dema em gihiştin dawiya sala 1998'an pêngava me ya dîrokî ya şerê gel ê şoreşgerî nehatibû tesfiyekirin, nikarîbûn tesfiye bikin. Lê ji serketina em li benda wê bûn, em gelekî li paş mabûn. Eger em li ser sedemên vê yekê yên hundir rawestin em dikarin vê bibêjin:

**a-** Stratejiya şerê gel ê şoreşgerî û xisletên wê yên taktîk hînê ji destpêkê ve li aliyekî hatibûn hiştin. Li Rojhilata Navîn bicihbûna min, di dîroka hemdem a Kurdistanê de belkî jî cara pêşî ji bo pêdiviyên stratejiya şerê gel ê şoreşgerî gaveke girîng bû û di cih de bû. Rewşa tewazunê ya min di nav de cih girtibû rê nedida ti hêzê ku xwe li ser min ferz bike; derfet û îmkanan bihêlin ku bi me gav paşve bidin avêtin, berevajî rê li pêşiya me vedikirin û destek didan me. Pozîsyoneke gelekî girîng a stratejîk hatibû bidestxistin. Ji bo bipêşxistina şerê gel hem di warê danîna

têkiliyên stratejîk de, hem jî nexasim di warê peydakirina destekên taktîk ji bo lojîstîk û perwerdeyê de şert û merc têra xwe li cih bûn. Me heta dawiyê şert û merc bi kar anîn û ev nêzîkatiyeke rast bû û xwedî maneyeke dîrokî bû. Çi komên li welat çi jî komên nû yên derbasî welat bûbûn wezîfeya wan ne ew bû ku bi heman rolê rabin û li welat biryargehekê çêkin. Hewldanên wan amadekariyên hatibûn kirin pûç û bêmane kirin. Kampên li Lolan, Xakûrkê, Gare, Zap, Metîna û li hin deverên din, nikarîbûn bi rola Bekaayê rabûna; bi tenê karîbûn bi rola desteka taktîk rabûna. Jixwe ne hêza wan ji bo vê hebû û ne jî hewcedarî pê hebû. Wekî din mirov karîbû ji şerê di navbera Îran û Iraqê de sûd werbigirtana. Bi heman awayî, mirov karîbû rast nêzî şerê di navbera PDK û YNK'ê de bibûya, li gorî pêdiviyên stratejîk û taktîk ên şerê şoreşgerî rewşên wan binirxanda û jê sûd werbigirta. Beriya her tiştî oportunîzmê xwe di van têkiliyan de nîşan da. Ji teqlîdkirina pozîsyona Bekaayê wêdetir tiştek nekirin, hem jî teqlîdeke gelekî paşvemayî û kêm. Bi awayekî objektîf û berbiçav, hêzên me ketibûn rewşa yedek a Îran, Iraq, PDK û YNK'ê.

Ya rastî, ev hemû pêkan bûn ku ji bo şerê gel ê şoreşgerî bêne bikaranîn û danîna têkiliyan bi van hêzan re karîbû rê li pêşiya bûyerên mezin veke, lê li ser hêzên me bandoreke berevajî kir û ew ber bi xeta rastgiriyê ve birin. Bi awayekî ez hîç ne li bendê bûm, hêzên me heta bi qirikê di van têkiliyan de çûbûn xwarê û ketibûn nava rewşekê ku berpirsiyariya xwe ji bîr kiribûn. Ji aliyekî ve têkiliyên pê bibin dûvik danîbûn, ji aliyê din ve jî têkiliyên ji berpirsiyariyê dûr û bi serê xwe. Têkiliyên bi vî rengî, li her deverê xwe alandibûn û bêyî ku serê xwe rakin û pêşiya xwe bibînin dimeşiyan. Biryargeha ewqasî bûbû heyranê xwe, xebatên dîrokî yên li Bekaayê ne tiştek dihesibandin û mîna dîrok bi wê dest pê dike tevdigeriya, komên ji bo Bakurê Kurdistanê hatibûn şandin jî ji têkiliyên ehbabçawişiyê wêdetir şêweyekî din ê danîna têkiliyan nedihat bîra wan û nedifikirîn. Gelek mîlîtan bi destê hêmanên kevin ên kontrgerîllayên PDK'ê hatin kuştin, lê dîsa nedifikirîn ku pêşiyê li vê bigirin. Hem li Başûr hem jî li Bakurê Kurdistanê bi hêsanî karîbûn xwe pirr mezin bikin, lê yekîneyên gerîlla ji ser xwe ve çûbûn û bûbûn komên ehbabçawiş an jî komên asî-awar e. Bi tenê karîbûn têkiliyên pê debara xwe bikin deynin. Pirraniya wan jî dihatin xapandin û dibûn nêçîr. Lê karîbûn însiyatîfeke şoreşgerî pêk bînin û ji şerê di navbera PDK û YNK'ê de sûdê werbigirin û gavê biavêjin, gel ji kontrola van hêzan derxin, berê wan bidin şerê azadiyê û bi vî awayî pêşiyê li komkujiyên muhtemel bigirin, lê wan bi navê danîna têkiliyan bivir li lingê xwe dida û çawa ku me di şehadeta Mehmet Karasungur de dît, derbên stratejîk dixwarin. Heta bi salên 1990'î danîna têkiliyên bi vî rengî, ne bi tenê dibû sedem ku firsendên dîrokî ji dest biçin, ji vê jî bi tehlûketir ber bi rastgiriyê ve diçûn. Pêngava 15'ê Tebaxê pêkan bû ku bi dehan qat zêdetir bi tesîr bê kirin, lê hem bi derengî hat kirin û hem jî ji bo xelk bibîne, bi awayekî paşguh bikin, pêk anîn.

Li herêmên hundir, di serî de li Botanê li tevahiya Bakurê Kurdistanê nîzameke biryargehan a lihevçêkirî, weke versiyona sêyemîn xwe dugêsinî dikirin. Di serî de li ser namzetên gerîlla yên

bêhemta yên bi kedeke mezin û bi gelek zor û zehmetiyan hatibûn amadekirin, li ser derfetên lojîstîk û desteka gel a pirr hêja li hesabên xwe yên herî rezîlane yên ‘axatiya şer’ difikirîn. Her fermandarê nejixweve payebilind ji bo xwe hesabên payeya fermandariya jor dikir, lê li aliyê din, hewl dida lingê kesên di heman rewşê de bişemitîne. Pirsgirêk hemû bûbû “Kî bêhtir wê bibe kesê bi tesîr?” Gelekan ji wan di xewna xwe de jî evqasî amûr, têkilî û pere nedîtibûn, lewma li ser wan hewl didan hesabên xwe yên egoîst bi cih bînin û bi vê re mijûl bûn. Li kompleksên wan ên rezîlane pêşî vedikir. Kokên van kompleksên wan sedsalan kûr diçûn û ji koka xwe qutbûyî bûn. Ceribandina şerekî gel ê karîbû derketa asta herî jor, hema bêje ji ber van hesaban li ber têkçûnê bû. Namzetên gerîlla yên gelekî durist, wêrek, fedekar û hêja wê bibûna qurbanê bêberpirsiyarî, erkên bi cih nehatî û rezîliyên bi vî rengî. Gel jî her ku çû kirin cerdevan û xistin bin tesîra kontrgerîlla, ji vê jî wêdetir mîna ku pêşkêşî wan bikin, ji kontrola wan re hiştin. Bi tevahî kom, têkilî, pere û amûr ji bo parastin û xwedîkirina fermandarên sexte û hempayên wan hatibûn seferberkirin. Jirêderketin û ketina rêya rastgir ji herî jor ve dest pê kiribû û bi awayekî zincîrwarî heta bi berpirsê yekîneya herî jêr xwe nîşan dida. Rexne û hişyarkirinên me hemû ji aliyê vê zêhniyetê û kirdarê wê ve hatin pûçkirin. Paşê hema bêje li her herêmê têgihiştinên çeteyan ên weke ‘Çaran’, ‘Sisiyan’ û ‘Tekan’ di rojekê de çênebûn. Di salên 2002-2004’an de, di reva keriyên xayînan de ku hejmara wan ji hezaran bihurî, bi awayekî diyarker para vê xeta rastgiriyê heye.

**b-** Di qada fermandarî û rêxistiniyê de mînakên bi vî rengî têra xwe derketin holê. Kengî têgihiştina ber bi rastgiriyê ve çû xwe di şêwazê şer de da xuyakirin bêhtir zirar û ziyan da. Nûnerên vê têgihiştinê li şûna ku şerê gel mezin bikin, hewl dan şûn û statuya xwe biparêzin û wexta ku ev kirin, bi heyranê awayên herî kirêt ên parastina statuya xwe bûn, ew awayên kirêt ji ajantiyê jî xirabtir bûn. Di vê çarçoveyê de namzetên gerîlla yên herî hêja di çalakiyên bêmane de têkbirin û ewqasî rezîl bûn namzetên durist ên fermandariyê ku karîbûn gerîlla mezin bikin, ji piştê ve xencer li wan dan. Nexasim Çeteya Çaran (Şemdîn Sakik, Şahîn Balîç, Halîl Kaya –Kor Cemal û Cemîl Işik- Hogir) di vî warî de bûbû pispor. Serekên çeteyê di jêpirsînên bi êşkence de ku bi bahaneya “Em ajanan tespît dikin” bi îhtîmaleke mezin bi sedan heval û hevriyên durist kuştine. Gelek serekên dînik ên weke Terzî Cemal (Ali Ömürcan) û Doktor Suleyman (Sait Çürükkaya) bûn makîneya şervan û kadroyan dixwe. Bi tevahî xisletên erênî yên rohnî didan, mîna kunên reş daqurtandin. Li şûna ku şerê gel bi pêş bixin, ji endamên kontrgerîlla yên herî jêhatî zêdetir bûn hêmanên pêşiyê li vî şerî bigirin. Ez yeqîn nakim ku pirraniya van kesan ajan bin. Dibe ku di nava wan de tektûk ajan hebin. Ez yeqîn dikim ku pratîka çetewarî ya pirraniya wan ji ber sedemên psîko-çandî ye, ber bi rastgiriyê ve çûna wan jî ji ber kêmşoreşgertiyê û encama têgihiştina berpirsiyariya wê ya bicihnehatî ye.

Li qada di bin berpirsiyariya min de jî gelek bûyerên bi heman rengî yan jî weke wan hebûn, lê bi şoreşgertiyeke têrê bike û têgihiştina min a berpirsiyariyê, bi kêmanî min karîbû rojane pêşiyê li

zirar û ziyanên wan bigirim. Ya derdiket holê û li pêş çavan ne şerê gel an jî gerîlla bû, kirin û têgihiştinên çetewarî yên paşvemayî bûn. Bêyî ku bi navendeke derve ve girêdayî bin, bi xwe tesfiye dimeşandin. Bi çend çalakiyên didan kirin jî xwe li ber rêxistinê diparastin. Jixwe di van çalakiyan de para wan a şexsî tinebû, bi namzetên gerîlla yên wêrek û fedekar didan kirin û ew têk dibirin. Her yekî ji wan ji bo parastina şexsê xwe û bi armanca tatmînkirina xerîzeyên xwe yên rezîl şebeke pêk anîbûn. Yê destê xwe bidaya vê şebekeyê dişewitî. Me ji bo destwerdana vê rewşê hêz amade dikirin, lê çawa ku di mînaka heval Harûn (Hüseyin Özbey) û koma wî ya li Sasonê de hat dîtin, di nîvê rê de hatin îmhakirin. Şer ji şerê rizgariya neteweyî derketibû, di kesayeta şexsan de bûbû şer an jî pevçûna di navbera kesan, malbat û çîna paşverû de. Atmosfer û şensê azadiyê bi vê awayî diqedandin. Bêguman bandor, tehrîk û ketina nava wan a kontrayan hebû, lê ev ne diyarker bû. Ya diyarker ew bû, şêwazê jiyan û şerê partiya gel ê şoreşgerî sabote dikirin, ji bo ku berjewendiyên xwe yên şexsî û çînî yên egoîst tatmîn bikin, hesab dikirin ka wê çawa zû dereng serokatiyê bixin destê xwe. Yeqîn dikirin ku firsend ketiye destê wan û bê perwa dixwestin vê firsendê ji bo nasnameyên malbatî û çînî heta dawiyê bi kar bînin.

Mirov ji hêmanên dijber dipê ku çav berdin serokatiya kolektîf a kesên ber bi rastgiriyê ve diçûn nikarîbûn bikirana û dîsa mirov li bendê bû ku ew şêwazê şer û jiyana hevrêtiyê bêhnçikandî bikin. Ya pêk dihat jî ev bû. Çawa ku dîroka şoreşan timî piştrast kiriye, eger di dema xwe de valatiyên di qadên rêxistinî û polîtîk de bi hosteyî û rast neyên tijîkirin, wê ew valatî ji aliyê dijberên şoreşê ve, hem jî di nava refên şoreşê de bi helwestên sergirtî û bi lafazaniya herî dijwar bê tijîkirin. Ev pîvana şoreşan pêk dihat. Kom û hêmanên dijşoreşê yên li Kurdistanê tesfiye dibûn, kesayet û meylên çînî yên hevkar ên li pişta wan di nava refên PKK'ê de ji nû ve vedijiyan û ji Kurdîtiya azad heyfa xwe hildianîn. Di nasnameya Kurd de hêmanên bi vî cureyî dîrokî ne, di kûrahiya tebeqeya jor de bi cihbûne, firsendperest in, xayîn in. Di hin atmosferan de ku mirov hîç li bendê nîne, di hin şert û mercên zeman û mekan de ku nayê payîn, derdikevin holê û bêperwa hunerê xwe nîşan didin. Hema bi tenê ew kêlî ji bo berjewendiyên wan di cih de be, û mekan ji bo vê firsendê bide. Ez ji bo maskeyên van hêmanan bînim xwarê, hê ji serê sala 1980'î ve min analîzên berfireh ên kesayet, nasname û çînî kirin, lê serketina van analîzan bi sînor bû. Ji bo ku ev analîz di pratîkê de pêk neyên, heman hêmanan jî li gorî xwe her cure tedbîr girtin. Ji bo vê jî hin rêbazên wan ên sereke hebûn ku timî pêk dianîn, mînak analîzên ku min kiribûn di perwerdeyan de baş bi kar nedianîn, li cem xwe digirtin, vedişartin û wenda dikirin.

**c-** Kirin ku şerê gel ê şoreşgerî ne şerê gel be, kirin ku bibe şerê hêzê yê li dijî gel û bibe hewldana serdestiyê li ser gel. Ji bo şerekî serketî yê gel desteka gel a dûrî aqilan bi rêbazên provakatîf berevajî kirin û gelek derdoran çare di xwesipartina hêzên kontra de dît. Mirov pirr bi hêsanî li ser xeta şerê gel ê şoreşgerî karîbû van mirovan bike bîrbir û bi rêxistin bike û ji wan

artêşeke gerîlla pêk bîne, lê mirovên em behsa wan dikin ne tenê rast nehatine perwerdekirin û rêxistinkirin, bi tenê weke çavkaniya erzaqan hatine dîtin. Endamên kontrgerîlla yên ev weke firsend dîtine, hinek bûyerên kuştinê yên xeternak jî xistine dewreyê û kirine ku gel neçar bi lez xwe biavêje wan û penahî wan bibe. Bi hezaran gundên li ber xwe dan û bi mîlyonan gundiyên ku her tiştên wan hatin desteserkirin, birçî û perîşan ketin ser riyan, neçar kirin ku koçî metrepolan bibin. Yek ji tevgera herî mezin a tesfiyekirinê ya di dîrokê de pêk anîn. Ji deh hezarî zêdetir mirov kuştin. Dest danîn ser malê gel û çav ber namûsa wan dan.

Rêveberiya gerîlla, kesayetên ber bi rastgiriyê ve çûn û ji wan xirabtir qurnazên gundî yên paşvemayî yên egoyên xwe tatmîn nekirî û qeşmerên bûrjûwaya piçûk li van kirinên her yek ji wan qirkirin in, temaşe kirin, heta bi pratîkên xwe yên şaş û kêm desteka herî mezin dan wan. Di dîrokê de kêm mînak hene ku em bibînin bi vî awayî li hemberî qirkirina gelê xwe evqasî bêberpirsiyarî, bêrûmet û belengaz bimîne. Eger çend komên gerîla yên hevgirtî, gurçûpêç û yekser karibin taktîkên şoreşgerî diyar bikin hebûna, di vê pêvajoyê de mirov bi hêsanî karîbû artêşeke gerîlla ya ji pêncî hezar kesî pêk bianiya. Lê kesên diviyabû vê bikin, destê xwe jî dirêjî gelê ketibû pêvajoya qirkirinê nekirin. Li dijî êşkence, desteserkirin û destavêtinên nedîtî çalakî û tevgerên bersivdanê jî pêk neanîn. Bi sedan ciwanên xwestin tevlî nava refên gerîlla bibin, hiştin ku li ser riyan îmha bibin. Ji bilî xwexwedîkirin û parastinê hema bêje bi her tiştî re xiyanet kirin û eleqe nîşan nedan. Lê ya rastî, ber bi rastgiriyê ve çûyîn jî pîvanên xwe hene. Lê rastiya berbiçav a derdiket holê, ya wan kesên bêberpirsiyarî û ji ser xwe ve çûyî bû, yan ji ber bêhêvîbûnê yan jî bi sedema pirr bûbûn heyranê xwe nedihatin naskirin, xwediyê wan pratîkan bûn ku ti têgihiştinê qebûl nedikir. Li gorî tehlîla dawî, kesên behsa wan tê kirin, bermahî û binmahiya çanda îmha û înkarê bûn. Nexweşî pirr kûr bû, lewma diviyabû rêbazên dermankirinê jî kûr daketana.

**d-** Taktîkên gerîlla danîbûn aliyekî û hêzên gerîlla bi awayekî Donkîşotwarî bi ser qereqolên herî qehîm û êrîşbirina ser wan zor de diajotin û bi vî awayî dibûn sedema zirar û ziyaneke bêmane. Tevî ku hîç hewce nedikir di van çalakiyan de bi dehan gerîllayan giyana xwe ji dest dida. Ya rastî karîbûn pirr bi kêm zirarê çalakiyên bêhtir encamgîr pêk bînin, lê kesî serê xwe li ser vê nediêşand an jî bîr nedibir. Ti taktîkekî şerê gel ê bi plan pêşde nebirin, pêk neanîn. Aliyê hember pirr zû mesele ji hev derxist û pêş zanîbû ku wê çi bikin, lewma li gorî vê bi tevdîr rabû. Şêwaz û avantaja gerîlla jî ew e, ‘Li ku, çawa û kengî wê lê bide diyar nîne’ ev ji bîr kirin û berevajiyê wê pêk anîn. Taktîkên êrîş û parastinê çi bin, wan berevajiyê wê dikir. Di şertên ne cihê wan û dema wan de xwe diavêtin pêş û şêweyên herî bi tehlûke yên xwe vekişandinê bi awayekî bêmane diceribandin. Tew nedixwestin li şêweyên êrîş û xwevekişandinê bifikirin yên ku dibe serketî bibin. Ya pêk dihat û diqewimî, bi awayekî berbiçav kontrgerîllatî bû. Ev tiştên hatine kirin, piştî ku kadroyên berê ji qadên gerîlla hatin vekişandin, ji sala 1987’an ve hunerê qaşo kadroyên nû ne ku bawer dikin, rêxistin kirine destên xwe. Erê, ev hunerê van hêmanên

îfleh nabin e. Ev kes ji ketina rêya rastgir wêdetir, mînakeke tam a bêberpirsiyarî û sistiyê bûn. Têkiliyeke bi navê têkiliya rêxistinê jixwe nehat bîra wan. Hemû hunerê wan ew bû, kesekî bi tenê jî li derveyî kontrola xwe nehêlin. Hewl dan min jî bixin kontrolê û eger nikaribin bixin kontrolê jî divê tesfiye bikin, ji bo vê jî li pey pîlanên dûrî aqilan çûn. Hema bêje bidestxistina PKK'ê bûbû armanca wan a bi tenê. Eger PKK bixistina destên xwe wê çi bikirana? Kengî tesfiyekirin temam bikirana wê bi tiştên bi dest bixistana jinikek an jî mêrikek bixista milê xwe biçûna cem rêveberiya Başûrê Kurdistanê yan xwe biavêtina dewleta Îranê, eger bi wê nehatana ser wê berê xwe bidana Ewrûpayê û xeyalên xerîzeyên jiyana herî rezîlane yên di paşxaneya wan de mayî, tatmîn bikirana. Tesfiyekariya 2002-2004'an vê rastiyê bi awayê zelal li pêş çavan radixîne.

Mirov bi xalên sereke dikare lîsteyê dirêjtir bike. Ya min xwest nîşan bidim ew e, li ser navê şerê gel çi hatiye kirin. Ez dema ku vê demê dinirxînim û di îdeolojiya partiyê de şîlobûna di warê dewletdariya netewe de nîşan didim, ez hînê jî ji rastbûn û encamgiriya stratejiya şerê gel ê şoreşgerî bawer dikim. Şerê gel ê şoreşgerî stratejiya bi tenê ya rast a wê demê bû. Rêbazên din, ji bilî xizmetkirina ji qirkirinê re nikarîbûn bi roleke din rabin. Gavên sereke yên taktîkî jî bi giştî rast bûn. Li Rojhilata Navîn bicihbûn, pêkanîna perwerdeyê û lojîstîkê, gavavêtina welat, li baregehên demî amadekarî û bi vê armancê têkilîdanînên taktîkî rast bûn û qîm dikirin. Lê ya tinebû û nedihat kirin; niyeta pêşengiya pratîkî û bicihanîna taktîkên ji rêzê yên gerîlla bûn. Bala xwe bidinê, ez behsa hostetiya bicihanînê nakim, ji ber ku eşqiyayek be jî bi hêza heyî dikare di asteke gelekî li jor de bibe xwediyê serketinê. Ez bi salan li ser vê rewşê sekinîm û min li ser sedemên wê mitale kirin. Ji bo pêşiyê li encamên wê û bandorên wê yên tesfiyeker bigirim bi heman awayî min gelekî hewl da û me hewl da. Kêmasî ne ji têkiliyên bi gel re bû; desteka gel ji bo şerekî serketî qîm dikir. Kadro û şervan jî ne kêm bûn. Ev jî têra xwe hebûn. Qadên derve û hundir ên bicihbûnê, lojîstîk û amûrên mirov xwe pê gurçûpêç bikin bi zêdeyî û têra xwe hebûn. Bi tenê ji sala 1980'î heta bi dawiya sala 1998'an her sal, veguheztina kadro û şervanan a min dikir, salê bi giştî ne di bin panzdeh hezaran re bû. Hemû jî bi zêdeyî bi amûr û pêdiviyên maddî hatin gurçûpêçkirin. Me berpirsiyariya herî mezin girt ser xwe, beşekî mezin ji wan bi gelek zor û zehmetiyan gihandin baregehên wan. Pirsgirêk, sabitfikrî û xiyanet paşê hatin ferzkirin. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin eger nebûna heyranê xwe, ji rê derneketana û xiyanet nekirana, serxwebûna neteweyî bi temamî pêk nehata jî wê bi hêsanî çareseriyeke di cih de pêk bihata. Xebatên me meşandî bi zêdeyî ev heq kiribûn.

Di vê mijarê de ez hînê jî li ser xwe difikirim; ez diponijim, gelo kêmasî û şaşiyên min çi bûn. Yek ji pirsên ku ez timî ji xwe dipirsim ew e, "Gelo diviyabû serokatiya pratîkî ango serokatiya nava welat jî min bi xwe berpirsiyariya wê hilda ser milên xwe?" Ez hê jî bi hêsanî nikarim bersiva vê pirsê bidim. Heta ez carnan difikirim, gelo pêşengiya hundir bi tiştên dûrî aqilan ên ferz dikir, hewl dida min bikişîne nava welat û bi vî awayî, bi zanebûn an jî bi nezanîn şert û mercên

berbiçav ên tesfiyekirina min amade dikir. Ji ber ku hebûna min a li derve hesabên kariyer û tesfiyeyê yên gelekan xira dikir. Lewma ez xwe nagirim û difikirim ku ji ber vê xwe kêm tevlî xebatan kirin. Li Rojhilata Navîn şêwazê min ê mayînê, hem di nava rêxistinê de, hem jî li derveyî rêxistinê hesabên gelek kes, hêz û heta dewletan xira dikir. Hêzên di nava rêxistinê de nerazîbûna xwe bi kêm tevlîbûna xebatan nîşan didan. Bêguman ez bi tevahî kadro û pêşengan gunehbar nakim. Ji duristbûna pirraniya wan hîç guman nayê kirin. Bêguman wêrekî û fedekariya mezin a pirraniya kadro û şervanan dîrokî ye, nayê guftûgokirin û kes nikare zimanê xwe jî dirêjî wan bike. Jixwe li ser navê bidestxistinê çi hebe encama van hewldanên hêja ye. Li vir pirsgirêk ew e, li hemberî evqasî xiyanet û kêmasiyan, hêmanên behsa wan tê kirin, çima ji vê meş û rêveçûnê re negotine êdî bisekine. Kêmasî û şaşiyên îdeolojîk û polîtîk ku di vê de rol girtine, gelekî hatin rexnekirin. Em dipirsin, gelo çima ewqas salan kêmasiyên xwe nedîtin û ji holê ranekirin. Eger ez li ser zemînê welat bûma, di vê mijarê de tiştekî min bikirana tineye. Jixwe min ji derve gelekî destek dida. Materyalên nivîskî û devkî (axaftinên bêtêlan) yên pêdivî bi wan hebû her tim di xizmeta wan de bûn. Naxwe pirsgirêk ne ew bû ku ez li derveyî welat bûm. Ez ê rola hêman û tesîrên derve bi xalên sereke diyar bikim, lê hêman û tesîrên hundir diyarker in.

Eger di çarçoveya siyaseta demokratîk de çareserî çênebe, ez hê bawer dikim ku divê ji bo bidestxistina azadî û nasnameyê stratejiya şerê gel ê şoreşgerî neçar weke amûrê sereke yê têkoşînê bê ceribandin. Ez bawer dikim ku çareseriya demokratîk wê bi siyasetê bibe. Şertê vê yê bi tenê ew e, hukûmetên Tirkî, Sûrî û Îranê (hêzên diyarker ên desthilatdariyê) ji aliyê siyasî ve îradeya siyasî nîşan bidin. Naxwe ya bikeve rojevê û dewrê, şerê gel ê şoreşgerî ye ku şêweyekî berê yê çalakiya gel a şoreşgerî ye, lê hê jî hukmê xwe yê nûbûnê diparêze. Di demên rabihurî de bi taktîkên herî ji rêzê hat ceribandin û serketina xwe piştrast kir, lewma şerê gel ê şoreşgerî ku piştî evqasî tecrûbe û ezmûnan nabe ku encamgîr nebe. Qirkirinê jî bixin dewrê dîsa jî encam naguhere. Piştî evqasî teşhîr û tecrîdê, nabe ku rêbazên qirkirina çandî yên heyî dewam bikin. Hêzên di van rêbazan de ji ya xwe neyên xwarê wê hebin, lê wisa be jî encam ê bêhtir bi awayekî neyênî li dijî wan vegere û jê ne wêdetir. Li vir pirsgirêka bingehîn ew e, divê şerê gel ê ku berê bi ser nexistin, pêdiviyên wê bi awayekî rast û temam pêk bînin.

**2- Şerê Gel ê Şoreşgerî û Îttîfaq**

**a-** Her şoreş hevgirtin û îttîfaqek e. Di şoreşan de ne bi tenê du hêzên safî, lê du dinya têne beramberî hevdu. Di îdeolojiya şoreşan de pêşketina civaka gerdûnî xulase hatiye destnîşankirin. Di îdeolojiya dijşoreşê de jî heman pîvan heye; bi xulaseya ezmûna gerdûnî ya hêzên dijber tevdigerin. Di rastiya polîtîk de hevgirtin û îttîfaq bêhtir berbiçav in. Aktualîteya polîtîkayê îttîfaqan bêhtir berbiçav dike. Ya îdeolojiya PKK'ê mumkîn dike, ezmûna sosyalîzma pêkhatî ye. Sosyalîzma pêkhatî jî rastiyeke welê ye ku karekterê xwe yê enternasyonal bi

awayekî berbiçav raber kiriye. Peyva enternasyonlîzmê bi xwe jî di nava xwe de maneya hevgirtin û piştgiriya navneteweyî dihewîne. PKK'ê ji aliyê polîtîk ve di şertên sosyalîzma pêkhatî de hewl daye hebûna xwe pêk bîne. Di şertên neteweyî û navneteweyî de tercîhkirina bloka sosyalîzma pêkhatî, mîna ku ji berê ve ji roja derketina wê ve hatibe destnîşankirin. Pirsgirêk ji têgihiştina hevgirtina wê ya teorîk nîne, hevgirtin ê di pratîkê de çawa bi gewde bibe, pirsgirêk ev e. Hewldanên ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd di nava şert û mercên sosyalîzma Tirkiyê de tercîheke rast bû. Di derketina holê ya PKK'ê de mirov nikare rola Tevgera Sosyalîst a Tirkiyê ji nedîtî ve bê. Eger Tevgera Sosyalîst a Tirkiyê curretî şer nekiribûya, mirov nikare îdea bike ku wê PKK'ê bi tena serê xwe curretî şerê şoreşgerî bikira, ev îdea bi tenê qîmeteke xwe ya ferazî heye. Ev tê wê maneyê ku pêşengên şoreşgerî yên gel ên çarenûsa wan li bin banê heman dewletê hatiye hûnandin li gorî xwezaya wan a civakî ye ku beriya her tiştî di nava xwe de hev bigirin û di çarçoveya vê hevgirtinê de tevbigerin.

Ji aliyê teorîk ve, piştgiriya Tirk, Kurd, komên çandî û çînên din bivênevê ye. Lê mijara tê guftûgokirin ne ev e, di pratîkbûnê de asta ji hev qutbûnê tê guftûgokirin. Di vê de rola hewldanên hêzên xayîn û tesfiyekar ên ketine nava tevgera şoreşgerî û berjewendiyên wan zirar dîtî heye. Tevgera PKK'ê di nava Tevgera Şoreşgerî ya Tirkiyê de weke parçeyekî pêk hat. Yên nikarin xwe li vê ragirin û hewl didin xwe ji vê bişon, ji sedî sed bi bûyîna wan a sîxurên îdeolojiya neteweya serdest ku bi zanebûn an jî bi awayekî xweber ketine nava refên şoreşgerî, mumkîn e. Dibe ku mirov ji milliyet û çînên cuda bin, ev li pêşiya hevgirtin û îttîfaqan asteng nîne. Berevajî hevgirtin bi saya van cudahiyan bêhtir girîng dibin. Armancên şoreşgerî hevgirtina yekîtiyên di asta herî jêr de ferz dikin. Hevgirtin çawa ku di nava heman rêxistinê de dibin, di nava rêxistinên cuda de jî pêkan in. Di tevgerên sosyalîst û demokratîk ên Tirkiyê de hevgirtinên mayînde û têkûz pêk nehatin, ev ji nêz ve têkiliya xwe bi hewldanên hêzên antî-demokratîk û antî-sosyalîst re heye. Îdeolojiya şoven a civakî, kengî nabe hêza polîtîk xwe diyar û eşkere dike. Di pirsgirêka Kurd de û di çareseriya vê pirsgirêkê de hewldanên Kurdan bikin yên din û hewldanên tecrîdkirinê, bi polîtîkayên parçe bike-bi rêve bibe û bandorên dijşoreşê re têkildar in. Ev rastî hemû ku di derketina holê ya PKK'ê de pêk hatin, mîna kaxiza tûrnûsolê bi kêr hatin; nasnameya hêmanên ketibûn nava têkoşînê bi tevahî eşkere kir. Komên şoven ên civakî di dema darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê de hema bêje tevahiya xebatên xwe rawestandin û nabe ku mirov vê bi tenê bi polîtîkayên zordestî û tepisandinê yên faşîzmê rave bike. Hêzên em qala wan dikin, ji bo gotin û gavên wan hevdu bigirin, ji bo bi pêş bikevin, divê li cem şerê azadî û nasnameya Kurd cih bigirin ango divê curret bikin ku bi PKK'ê re hevkariyê bikin.

Piştî sala 1980'î dema firsenda ji nû ve rêxistiniyê û gavavêtina ber bi şerê şoreşgerî ya PKK'ê li Rojhilata Navîn, me careke din xwest bi tevahiya hêzên sosyalîst û demokratîk re parve bikin. Bi vê armancê, me gelek hevdîtin û civîn çêkirin. Me platforma **Bereya Berxwedana Yekbûyî Ya Li Dijî Faşîzmê** damezrand. Lê dema dor hat gavavêtinê, pirraniya van hêzan ya ku tesfiyekarên di

nava me de wê paşê bikin, pêşî kir û ketin ser riya Ewrûpayê. Li wir naveroka şoreşgerî ya tevgera xwe pûç kirin. Nexasim hêmanên serdest ên Dev-Yolê tevî naveroka şoreşgerî ya rêxistina xwe, gelekî hewl dan naveroka şoreşgerî ya PKK'ê jî tesfiye bikin. Lê ya rastî, têkilî û derfetên Dev-Yolê, sempatîzan, kadro û desteka wê ya girseyî ji her alî ve qat bi qat ji ya PKK'ê pêşketîtir bû. Eger stratejiya şerê gel ê şoreşgerî qebûl bikirana, derfet û îmkanên behsa wan hatin kirin bixistana nava tevgerê û di warê gavên taktîk de gavên hevpar bihatana avêtin, veguherîna Tirkiyê di warê sosyalîzm û demokrasiyê de wê di asteke gelekî jor û qonaxeke cuda de pêk bihata. Nexasim di nava avahiya Dev-Yolê ya Ewrûpayê de, di şexsê Taner Akçam ê li ser Devrîmcî Îşê de tesfiyekariya hat ferzkirin, di tesfiyekirina tevgera demokratîk û sosyalîst a Tirkiyê de bi roleke mezin rabû. Vê meyla tesfiyekar bi xwe re gelek hêz kişandin Ewrûpayê û hewl da stratejiya şerê gel ê şoreşgerî ya PKK'ê tecrîd bike. Hêmanên erkdar ên PKK'ê li Ewrûpayê ji xwe re kirin destik û gelek zirar da. Jixwe Dev-Yol piştî vê careke din bi ser xwe ve nehat. Eger vê komê xwe li Rojhilata Navîn bi cih bikirana û berxwedaneke bi sînor be jî nîşan bidaya, wê gelekî di ser hêza faşîst a MHP'ê re bi hêzeke çîna şoreşgerî maskeya sosyal demokrat a CHP'ê biçiranda û li dijî sîstemê bibûya partiya sereke ya muxalefetê. Li gelemperiya dinyayê gelek mînakên bi vî rengî pêk hatine. Wekî din, eger vê komê bi PKK'ê re îttîfaq bikirana, hem di çareserkirina pirsgirêka Kurd de, hem jî bi giştî di gavavêtin û pêşîlêvekirinên demokratîk de dibe ku bibûya hêza pêşeng. Hingê ji pêşîlêvekirinên sexte yên AKP'ê re zemîn nedihat pêşkêşkirin. Meyla tesfiyekar bi zanîn ev firsenda dîrokî têkbir. Hêmanên sosyalîst û şoreşgerên gotin û gavên wan hevgirtî pêwîst e ku vê dîrokçeyê baş analîz bikin. Ez baş dizanim ku vê meyla tesfiyekar hêmanên gelekî hêja yên tevgerê têkbirine. Ev meyla ku em behsa wê dikin, propagandaya reş a li dijî şexsê min hê jî dewam dike û ev jî xusûseke din e, divê mirov li ser rawest e.

Pêşengtiya Dev-Solê nebû xwedî gotin û pratîka hevgirtî. Eger li Rojhilata Navîn bi cih bibûya û berxwedana şoreşgerî di ser Kurdistanê re li tevahiya Tirkiyê belav bikirana wê bibûya tevgera herî bi hêz a muxalefeta Tirkiyê. Lê xwe nêzî vê yekê nekir. Nexwest bi me re hinek têkiliyên dostane deyne, xwe nêzî tevgereke hevpar nekir. Eger hin ji kadroyên wê, nexasim Bedrî Yagan û koma wî ku bi me re ketibûn têkiliyê, nekişandibûna Stenbolê û îmha nekiribûna, bi hêzên me re bi biratî û hevpar tevgeriyabûna, wê karibûya valatiya der barê şoreşgertiyê de Dev-Yolê hiştî tijî bikirana û wê karibûya bibe tevgera herî bi hêz a muxalefeta şoreşger a Tirkiyê. Di polîtîkayên hevgirtinê de gotin û gavên wan ên hevnegirtî ew bi xwe jî birin tesfiyeyê.

Bêguman gelek kom û kesên egîd ên ji rêûresma gelê Tirk tên û xwe weke çepgir bi nav dikin di nava têkoşîna azadiyê û nasnameya enternasyonalîst a PKK'ê de û li cem wê cih girtine. Bi PKK'ê re hev girtine, û bûne yek. Di serî de Kemal Pîr û Hakî Karer, gelek heval û hevriyên me yên jin û mêr ên bi koka xwe Tirk weke kadroyên herî hêja yên PKK'ê heta bigihîjin şehadetê li refên pêş ên têkoşînê cih girtin û şer kirin. Di nava refên PKK'ê de hînê jî gelek heval û hevriyên me yên

wisa hene. Herweha ji roja destpêkê heta roja me ya îro gelek kom û kesan erka dostanî û hevgirtinê bi cih anîne. Lê pirraniya hêzên çepgir bi hegemonya eskerî û îdeolojîk a faşîzma Tirkê Spî yan hatin bêdengkirin an jî dibe ku bi zanebûn û dibe ku bi awayekî xweber xistin rewşekê ku bibin destikdarên vê hegemonyayê. Ev helwest bi xwe tê wê maneyê ku hêmanên civaka modern a Tirk têkiliya stratejîk a Kurd û Tirk ji bîr kirine û naxwazin li vê têkiliyê serwext bibin ku ev têkiliya behsa wê tê kirin ji şerê Kurd û Tirkan li dijî Împaratoriya Bîzansê di 1071'ê de li Melezgirê û serketina vî şerî ve hebû yan jî diviyabû hebûna. Dîsa bi vê helwestê têkiliyên Anatolya û Mezopotamyayê yên bi desthilatdariya hevpar û jiyana civakî ya hevpar ên li ser stûnên sereke radiwestin, înkar dikin. Hêmanên moderniteya Tirkê Spî dîrokê ji qirkirina Kurdan a di sala 1925'an de didin destpêkirin, ji ber ku ji wê demê ve dest pê kirin bîreweriyeke sexte û înkarker a civak û dîrokê ava kirin. Bi heman awayî, sentezkarên berê û yên nû yên Tirk-Îslamê Kurdîtî li derve hiştin û destek dan asîmîlekirina Kurdan. Ji ber ku Îslamiyên ummetgir ên sexte ji heman têgihiştina qirker bi tesîr bûbûn û ji ber paronaya wan a biratiyê bû. Bîreweriyeke rast a dîrok û civakê dikare nîşan bide ku bi giştî çandên Anatolya û Mezopotamyayê, bi taybetî jî di navbera çandên civakî yên Kurd û Tirkan de têkiliyên hevpar ên xurt, azad û wekhev hene û ev têkilî maneyeke stratejîk û heyatî îfade dikin.

Îdeolojiya Tirkîtiya modern tevî hêmanên xwe yên rastgir, çepgir û navendê hemûyan şêweyên bîreweriyê yên dîrok û civakê yên bi heman rengî parve dikin. Bîreweriyeke civak, dîrok û Tirkîtiyê ya homojen weke fikreke naguhere û pîroz e, parve dikin. Têgihiştina ummetê ya ji rêûresmê hinekî bi milliyetgiriya laîk hinekî jî bi sentezkariya Tirk-Îslamê veguherandin, bi cih kirin, bi vî awayî îdeolojiyeke bêhtir sexte û înkarker ava kirin. Di îdeolojiya Tirk a modern de Tirkîtî ji serî ve neteweyeke homojen û cîhangîr e. Hertim serbixwe û azad bûye. Ti carî pişta xwe nedaye ti hevgirtinan, bi tena serê xwe li pey hukimkirina cîhanê çûye û demên dirêj her hukim kiriye. Avahiya wê ya civakî yekpare ye, parçebûn û dabeşbûnê qebûl nake. Artêş millet e. Civakeke wisa ye ku eskertiyê weke nirxeke di ser her tiştî re qebûl dike. Ji nijadeke xwerû pêk hatiye. Ya rastî, ev îdeolojî ji aliyê biyaniyan ve, nexasim ji aliyê îdeologên Cihû yên Siyonîst ve di bin navê Jon Tirkan de hatiye çêkirin û ti têkiliya wê bi rastiya civakî-dîrokî ya çanda civaka Tirk re nîne yan jî wexta ew çêkirine çanda civaka Tirk weke bingeh li ber çavan negirtine. Şêwazekî îfadeyê yê mîtolojîk e. Dîktatoriya hişk a çînî ya li pişt maskeya Tirkîtiyê hatiye avakirin, ya rastî hêmana yekdestdar a modernîst e. Weke Proto-Îsraîl tesewir û ava kirine. Ango li ser entîteyên civakî û çandên din ên di nava şert û mercên modern de pêk hatine û ew kirine yên din, bi rola hegemonîk rabûne. Li vir yekparebûna pêkhatinekê heye ku hem di bin bandora îdeolojîk de hem jî di bin bandora hegemonya eskerî de bi awayekî çeloxwarî, înkarker û asîmîlebûyî çêbûye. Bi tevahî fikrên rastgir, çepgir û yên navendê, li şûna bîreweriya dîrok û civakê ya li ser şopa heqîqetê, para xwe ji vê îdeolojiya lihevçêkirî, înkarker, asîmîlasyonîst û înkarker girtine, lewma hemû bi rola şoven a yên li derveyî xwe wekî yên din dibîne, tekparêz û gewî radibin û heman rolê parve dikin. Ya ji vê jî xirabtir û xeternaktir ew e, ji ber ku vê

îdeolojiya derxistina payeya îdeolojiya fermî, ji dibistana dayikê heta bi asta akademîk bi zorê empozeyî her kesî dikin, gelekî zehmet e ku kesek li derveyî wê bimîne. De îcar li vê hinek tiştên din zêde dibin, mînak, mirov pê dibe karmendekî dewletê, pê kar peyda dike, pê dikare krediyê bistîne, bi kurtî li cem dewletê û çîna serdest ji bo ji bereketê sûdê werbigire weke şertê sereke tê qebûlkirin, lewma neçar her kes vê îdeolojiyê parve dike. Hêzên muxalifên sîstemê bi tenê û tecrîdkirî dimînin, nikarin dostanî û hevgirtinan pêk bînin, di bin vê de jî ev rastiya em îşaret pê dikin heye.

Ne bi tenê di navbera Kurd û Tirkan, hêzên sosyalîst û demokratîk de, ji bo di navbera tevahiya hêzên gel ên civakî de dostaniyên manedar bi pêş bikevin û hevgirtin pêk bên, beriya her tiştî pêdivî bi bîreweriyeke rast a dîrokî û civakî heye. Eger mirov tevahiya dîrokê danûstendina çandan rast nede naskirin, roja me ya îro nikare hevgirtin û têkiliyên adil, azad û wekhev bi pêş bixe; weke îfadeya berbiçav a van têkilî û hevgirtinan destûreke demokratîk pêk bîne. Lewma modernîteya Tirk divê zêhniyeta xwe ya tekperest a faşîst ku dîroka Tirk û nirxên wê yên çandî jî tine dihesibîne, biterikîne, û li şûna wê avahiya civakan a pirrçandî û dîroka wan a dewlemend qebûl bike. Bi kêmanî hêzên civakî yên di nava heman sînorên siyasî de ku alîgirê bihevrebûneke dostane û birayane ne, divê ji rastiyên hev ên dîrokî û civakî re rêzê bigirin û bi hurmet bin, hevdu bi awayekî azad û wekhev qebûl bikin û ev yek çawa ku ji wan re ji bo li ser bingehê hevgirtin û dostaniyên mayînde û demeke dirêj bimînin pêwîst e, herweha bingehê yekîtiya wan a hêz û çalakiyên rojane ye jî; ji bo bi hev re rejîmeke destûrî ya demokratîk ava bikin cewherê meseleyê ye.

**b-** PKK partiyek e ku di nava sîstema sosyalîzma pêkhatî de bûye xwedî hebûn. Bi qasî aliyê îdeolojîk, ji aliyê polîtîk ve jî ev sîstem ji xwe re kiriye bingeh. Herçiqasî ji serî ve li dijî berbiçûna rastgiriya revîzyonîst a xwe berdaye binyeya wê bûbe xwedî helwest jî zanîbû bi rêz û hurmet nêzî sîstema sosyalîst bibe. Di serî de Yekîtiya Sovyetê bi awayekî rexnegîr û dostane nêzî welatên sosyalîst bû. Li hemberî tevgerên sosyalîst ên welatên din jî bi helwesta xwe ya bi pîvan rabû. Hewl da pirsgirêka Kurd ji meseleyeke hegemonya dinya kapîtalîst derxe û bike parçeyekî sîstema dinya sosyalîst. Ev helwesta xwe ya îdeolojîk piştî salên 1980'î bi derketina derveyî welat li qada navneteweyî belav kir. Di wê demê de bi nûnerê sîstema sosyalîst Yekîtiya Sovyetê re têkilî danîn. Bi partiyên sosyalîst ên Ewrûpayê re jî têkiliyên bi heman rengî danîn. Lê ji ber revîzyonîzma ku li gelemperiya dinyayê mohra xwe li sîstemê dabû, têkilî negihiştin wê asta ku hêvî ji wan dihatin kirin, ji ber ku ji armancên taktîk û sûdwergirtinê wêdetir neçûn. Ji me nehat ku em ji helwestên sûdwergirtinê yên dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî bibihurin. Sîstema sosyalîst, polîtîkayên îstîsmarker û berjewendîperest ên dewleta netewe ya kapîtalîst ji xwe re kirin bingeh. Ev têgihiştina ku ji destpêkê ve li ser sîstemê serdest bû, hem destketiyên sosyalîzmê tesfiye kirin, hem jî pêşketina alternatîf a têkiliyên enternasyonalîst asteng kir. Ev têkilî kirin destikê berjewendiyên hegemonîk.

Dîsa jî gelekî girîng e ku PKK'ê ev zemîn bi kar anî, ango weke partiyeke rastî ya enternasyonalîst tevgeriya. PKK'ê Tevgera Kurd kir xwedî naverokeke demokratîk û sosyalîst, bi stratejiya şerê gel ê demdirêj ve girêda, kir ku li nava dinyayê bê naskirin, di serî de gelê Tirk li ser bingehê azadî û wekheviyê ji bo jiyana hevpar a bi gelên cîran re amade kir. Ev hemû encamên dilsoziya PKK'ê bi enternasyonalîzmê re ne. Dema sîstema sosyalîst ji hev de ket PKK tîk li ser piyan ma û ev jî ji dilsoziya wê ya bi sosyalîzma zanistî re nîşan dide. PKK mîna tevgerên din ên rizgariya neteweyî ber bi milliyetgiriya teng ve neçû. Ji destpêkê ve jê hat ku ji şîlobûna îdeolojîk bibihure. Li dijî hêmanên dewletdariya netewe û îndustriyel ên modernîteya kapîtalîst ku mohra xwe li sosyalîzma zanistî û pêkhatî dan, têkoşîneke serketî meşand. PKK'ê xwe veguherand û bi vî awayî li dijî modernîteya kapîtalîst weke alternatîf paradîgma modernîteya demokratîk pêşde bir û di warê xetdanîna navbera wê û modernîteyên din de bi roleke girîng rabû. PKK li Rojhilata Navîn a piştî salên 1980'î, piştî Îsraîl û Rêxistina Rizgariya Filistînê weke sêyemîn hêza dînamîk cih girt.

**c-** PKK weke hêzeke polîtîk, li Rojhilata Navîn, Ewrûpa û li qadên din xwedî hevgirtinên girîng e. PKK'ê piştî salên 1980'î herêma herî germ û dijwar a Rojhilata Navîn ji xwe re weke baregeh hilbijart û ev bi xisletên wê yên şoreşger re têkildar in. Ji bo ji têkoşîna şoreşgerî qut nebe rola vê qadê xwedî girîngiyeke stratejîk e. Rola ji bo Ewrûpayê timî di asta taktîk de hat hiştin. Ev helwesteke rast bû û di heman demê de cewherê hevgirtina tevgerên rizgariya neteweyî yên dînamekeke girîng a serdemê bûn, pêk dianî. Di çarçoveya Sûrî, Libnan, Filistîn û Îsraîlê de pêşxistina têkiliyên rizgarîxwaziyê yên neteweyî tê wê maneyê ku têkilî bi rastiya herî germ, zindî û berfireh a dinyayê re tê danîn. Li derdora bîst salan di çarçoveya van têkiliyan bi xwe de bûyerên pêk hatin, ne bi tenê nasnameya Kurd û tevgera azadiyê li nava herêmê da naskirin; li nava dinyayê jî da naskirin û ew gihand statuyeke stratejîk. Jixwe têkiliyên behsa wan tê kirin îro jî cewherê xwe diparêzin. Ji ber bûyerên PKK'ê rê li ber wan vekir, Îsraîlê bi bloka li dijberî hevgirtiyê xwe Tirkiyê berê xwe da polîtîkayên dostaniyê. Têkiliyên îro yên Tirkî-Sûrî-Libnan-Filistînê ji bo Îsraîlê ji tehlûkeya PKK'ê mezintir rê li ber encamên giran vekiriye. Ev jî îspat dike ka PKK çiqasî hêzeke dînamîk a girîng e. Herçiqasî di rewşeke dijber de bin jî têkiliyên di navbera van hêzan hemûyan de li gorî tehlîla dawî ber bi bayê dînamîzma PKK'ê dikevin û dînamîzma PKK'ê rê dide ber wan. Heman dînamîzm di têkiliyên Tirkî-Îran û têkiliyên sêalî û dualî yên Tirkî-Iraq-DYE'yê de jî bi heman rolê radibe. Eger dînamîzma PKK'ê nebûya, têkiliyê di vî alî de wê bi vî awayî pêk nehatibûna. Têkiliyên em behsa wan dikin, bi saya tevgera dîplomatîk a li dora PKK'ê tê ristin çêdibin. Cewherê sosyalîst, demokratîk û şoreşger ê PKK'ê têkiliyên bi vî rengî yên desthilatdariyê ber bi blokbûnên bi vî awayî ve dahf dide.

Heman xusûs ji bo têkiliyên Komara Tirkiyê bi Ewrûpayê re di cih de ne. Eger Komara Tirkiyê îro bi Yekîtiya Ewrûpayê re gihiştibe muzakereyên hevpartiyê, ev bûyerên di çarçoveya pirsgirêka Kurd û PKK'ê de ne. Di serî de Elmanya, nêzîkatiyên welatên Ewrûpayê ji bo PKK'ê ew bûn ku

pêşî nerm nêzîk bibin û mîna li Dev-Yol û rêxistinên din ên xwedî potansiyela şoreşgerî kirin, xwestin bigirin nava xwe û bi rêbazên hêza nerm asîmîle bikin. Ev şêweyên têkiliyê demeke dirêj dewam kirin. Lê ji ber ku em ji ya xwe nehatin xwarê ango em li Rojhilata Navîn şoreşger man, vê kir ku welatên behsa wan tê kirin rêbaza xwe biguherin. Pêşî hukûmetên welatan yek bi yek, paşê li ser navê Yekîtiya Ewrûpayê PKK weke 'terorîst' îlan kirin û rêbaza lidervehiştinê şopandin. Armanca herdu polîtîkayan astengkirina çareseriya pirsgirêka Kurd bi awayekî şoreşger, demokratîk û sosyalîst bû. Li şûna vê, 'azadî û mafên ferdî' yên bi mafên mirovan hatibûn bisînorkirin hatin ferzkirin. Mîna ku mafên ferdî yên bêyî mafên civakî û kolektîf pêkan bin, bûn xwedî helwesteke durû. Dema bi Komara Tirkiyê re bazar dikirin, dixwestin herdu aliyan ango hem PKK'ê û hem jî Komara Tirkiyê bi vê rêbazê bi xwe ve girê bidin. Li pey têkiliyên hegemonîk bûn. Ji çareseriyên demokratîk û civakî reviyan. Li gorî vê rêbazê, hewl dan ku bi kesayet û rêxistinên naveroka wan a şoreşgerî, demokratîk û sosyalîst pûç kiribûn, piştî tesfiyekirina PKK'ê weke hêmanên xwe yên polîtîk di nava Kurdan û Tirkiyê de bi cih bikin. Weke hêzên mîsyonê rolên diyar amade kirin. Tevahiya sîh salan (bi Gladîo'ya NATO'yê re) ji vê bernameya tesfiyeyê li benda serketinê man, ji ber ku ji bo vê sermayeyeke mezin razandibûn. Çawa ku li gelemperiya dinyayê dibe, piştî dijşoreşa Tirkiye û Kurdistanê xwestin di nûkirinê de rola pêşeng bidin wan. Bi israr PKK weke 'terorîst' îlan kirin û ev ne ji bo destekdana Komara Tirkiyê bû, ev ji bo berjewendiyên wan bi xwe bû.

Ev pîlanê Kurd-PKK ku Yekîtiya Ewrûpayê bi hostetiyeke mezin amade kir û xist pratîkê, ji pîlanê tesfiyekirina Tirk-Qibrisê gelekî girîngtir e, lê bêhtir kûr û bi dizî hatiye meşandin. Bi Komara Tirkiyê re bazarên girîng hatine kirin û hînê jî têne kirin. Ji aliyê têkiliyên Kurd û Tirk ve bi qasî Peymana Sykes-Picotê girîng e. Komara Tirkiyê li rêyên çareseriyê yên bêyî PKK'ê û Kurdan digere, qaşo demokrasî û mafên mirovan ên yekalî ferz dike, û ev encamên van hevdîtinên bi dizî û xasûkî ne. Ji ber ku PKK û Tevgera Azadiyê ya Kurd tesfiye nebûn, ev hevdîtin veguherîn têkiliyên rûtîn û pûç ên mîna têkiliyên Îsraîl-Filistînê. Mîna lîstikên di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de li ser Kurdan (Sosyalîstên Tirk û Ummetgirên Îslamî jî di navê de) careke din ceribandin. Piştî ku berjewendiyên xwe misoger kirin, ne bi tenê çavên xwe li pêvajoya qirkirina Kurdan girtin; li ser navê modernîzma laîk heta dawiyê destek dan faşîzma Tirkê Spî. Dekûdolab û lîstikên bi heman rengî li ser Rûm, Ermenî û Suryaniyan jî hatin lîstin û tevgerên tesfiyekirinê meşandin.

Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê weke serkêşê sereke yê tevgera Gladîo, ji serî ve hem di destdekdana darbeya faşîst a 12'ê Îlonê de û di tesfiyekirina tevahiya hêzên demokratîk û sosyalîst de, hem jî weke parçeyekî van tevgeran di tesfiyekirina Tevgera Kurd û PKK'ê de bi roleke çalak rabû. Destek da tevahiya operasyonên eskerî yên piştî 1984'an hatin meşandin. Ji aliyê dîplomatîk û polîtîk ve dor teng kir, tecrîd kir. Ji bo tesfiyekirina Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan ango çalakiya herî berfireh a Gladîo tevahiya NATO'yê û sîstema sosyalîzma pêkhatî bi

kar anî. Tirkiyê bera ser Sûriyê da. Jixwe Îsraîl jî bi xwe hêza amadekar a vê polîtîkayê bû û bi hostetî ew pêk dianî. Di vê çarçoveyê de Sûrî demeke dirêj li hemberî tevgerên tesfiyekirinê li ber xwe da. Lê di dawiya dawî de ew jî Rûsya jî li gorî berjewendiyên dewleta netewe bi sîstema serdest re li ser hin peymanên bi dizî li hev kirin. Di vê pêvajoyê de bi awayekî pirr zelal derket holê û îspat bû ku di vê pêvajoya tesfiyeyê de hegemonya diyarker û bingehîn sîstema modernîteya kapîtalîst a bi pêşengiya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ye.

PKK'ê tevî tesfiyeyên berfireh ên hem li derve û hem jî li hundir zanî li gorî şert û mercan tevbigere, veguherînên hewce bi hosteyî pêk bîne, û li ser bingehê serketina polîtîk û helwesteke bêhtir bi pîvan bi modernîteya demokratîk a alternatîf li hemberî modernîteya kapîtalîst rawest e. Di veguherîna demokratîk û şoreşgerî ya Rojhilata Navîn de rola xwe ya li pêş a aktoriyê dewam kiriye.

**3- Tecrûbeya Şerê Gel ê Şoreşgerî û Neteweya Demokratîk**

Tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî ku PKK'ê jêre pêşengî kir, yek ji encamên wê yên girîng ew e, rê li ber rastiya neteweya demokratîk vekir. Ya esas, rastiya neteweya demokratîk di avakirina îdeolojiya PKK'ê de bi awayekî zelal nehatiye diyarkirin û programkirin. Di îdeolojiya wê de têgîna netewe ya serdest versiyona dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî ye. Ya ji vê jî girîngtir ew e, dema netewe tê gotin têgihiştineke tek û mutleq mewzûbehs e; ew jî neteweperestiya dewletê ya Hegelîst e. Ji bilî vê têgînî û rastiya wê, behsa rastiyeke din a netewe nayê kirin. Bêguman di vê de şîroveya Hegelîst a têgihiştina sosyalîzma zanistî ya Marksîst weke bingeh tê qebûlkirin. Di dema Marks û Engels de wexta netewe dihat gotin a pêşî dihat bîra mirovan ew bû, çîtên feodal hatin rakirin û di çarçoveya yekîtiya çand û zimanan de bi destê dewleta navendî civakên neteweyî hatine avakirin. Bi vî awayî, weke rastiya bi tenê û mutleq bi dewleta netewe digirin. Dewleta netewe kategoriya bingehîn a felsefeya Hegel e. Rawestgeha dawî ya bigewdebûna civakî û dewletê ye. Ev çi bi pêşengiya bûrjûvaziyê çi bi pêşengiya proleteryayê pêk bê, di encamê de xisleta mutleq û tek a têgînê naguherîne. Dema netewe tê gotin, yekana diyardeya tê bîra mirovan dewleta netewe ye. Ji ber vê têgihiştina dewleta netewe Marksîzmê nikarîbû ji modernîteya kapîtalîst bibihure û ji aliyê wê ve hat asîmîlekirin. Kengî dewleta netewe weke forma bingehîn a civakî hat qebûlkirin (ragihandina dewleta netewe ya Elmanyayê di sala 1871'ê de bi awayekî eşkereke tê destekkirin), ya mayî ew bû ku proleteryayê bikişinin nava van sînoran û bixin xizmeta dewleta xwe ya netewe, di berdêlê de hinek mafên ekonomîk û civakî dikin ku mirov karibe xwe li hebûna wê ragire, û ew jî hebûna xwe dewam bike. Ev qebûlkirin e ku çarenûsa sosyalîzma pêkhatî beriya sedûpêncî salan diyar kiriye. Di serî de tecrûbeyên Yekîtiya Sovyetê û Çînê di çarçoveya her dewleta netewe de hêmanên modernîteya kapîtalîst weke encam serketina xwe îlan kirin, û vê yekê jî têkiliya vê rastî û têgînê bi kapîtalîzmê re îspat kiriye. Naxwe ji bilî vê, mirov ê çawa karibe ji hundir ve veguherîna sosyalîzma pêkhatî ber bi kapîtalîzmê ve şîrove bike.

Di tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî de PKK bi nêzîkatiyên xwe yên sosyalîzma pêkhatî herî zêde di warê dewletdariya netewe de tengav bû. Rastiya kontrgerîlla ya dewleta netewe ya li dijî wê şer dikir, di mijara armanc û maneya şerê şoreşgerî de rê li ber dudiliyan vekir. Ya ji vê jî xirabtir, rêbazên herdu aliyan her ku çû şibiyan hevdu. Sosyalîzma îdealîst a PKK'ê li hemberî rastiya dewletdariya netewe her ku çû tengav bû. Sedema bingehîn a pêxîrtengiya ji sala 1995'an ve her ku çû derket holê, ev rastî bi xwe bû. Gelo dewleta netewe çiqasî diyardeyeke sosyalîst e, çiqasî mumkîn e ku bê pêkanîn? Li gorî bersivdana van herdu pirsên sereke yan pêxîrtengî wê rê li ber tesfiyeyê vekirana yan jî wê bi analîzeke neteweyî ya cuda bi encam bibûya. Di vê nuqteyê de têgîna kilît a ji bo xwe rizgarkirina ji pêxîrtengiya îdeolojîk têgîna neteweya demokratîk e.

Dema ku PKK weke kom derket holê weke ‘Neteweparêzan’ hat binavkirin û ev ne şaş bû. Dîsa binavkirinên weke ‘Rizgarîxwazên Neteweyî’ û ‘Artêşa Rizgariya Neteweyî’ heman maneyan tîne bîra mirovan û rastiya dihat xwestin were temsîlkirin, îfade dikirin. Propagandakariya îdeolojîk a demê bi awayekî bingehîn realîteya neteweyî ya Kurd bû. Me nedixwest ku em weke milliyetgir bêne şîrovekirin û di bingehê vê de jî girêdana me ya xurt a bi Enternasyonala Sosyalîst re hebû. Lê me nikarîbû xwe ji realîteya neteweyî qut bikira. Ango dema ku têgîn ji netewetiyê ber bi neteweparêziyê ve şemitî, hingê tehlûke çêdibû ku bişibe îdeolojiyên milleyetgir û neteweparêz ên ku armanca wan dewleta netewe ye. Dîsa jî di qonaxa îdeolojîk de ji me nedihat ku em van xetên tenik û tayên zirav ji hev derxin. Pêngava 1984’an şaxên xwe yên neteweyî berdan û rê li ber şertên şerê neteweyî yê şoreşgerî vekir û bivênevê vê yekê em ji nêz ve bi têgînên desthilatdarî û dewleta netewe re rûbirû kirin. Me şer bi hêzên gel dimeşand. Çi feodal û çi jî bûrjûwa di navbera me û tebeqeya jor de sînorek hebû. Gavavêtin û çûyîna me ber bi aliyê neteweyî ve têgîna şerê gel bêhukim nedikir. Li şûna netewetiya bûrjûwayê hêdî hêdî têgîneke mîna netewetiya gel pêk dihat. Dema ku em di vê çarçoveyê de li tevahiya Kurdistanê binêrin em dikarin van tespîtan bikin:

**a-** Li Kurdistana Iraqê ji serê salên 1920’an ve, nexasim piştî parçebûna di salên 1920’an de li cem tebeqeya jor liv û lebatên ku em dikarin weke milliyetgiriya paşvemayî bi nav bikin bi lez bûn. Tevger ji çarçoveyeke teng a rewşenbîran derketibû û bûbû xwedî xisleteke girseyî, lewma vê yekê wê milliyetgirî bi lez bikirana. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn îlana PDK’ê li ser riya milliyetgiriyê gaveke girîng îfade dike. Komara Mahabadê weke tecrûbeya pêşî ya mîllî balê dikişîne ser xwe. Şerê gerîlla yê di sala 1961’ê de li Kurdistana Iraqê derket holê, li tevahiya Kurdistanê hestên milliyetgir hişyar kirin û ew bi hêz kirin. Tevî têkçûna tevgerê û bi sedema nakokiyên hundir parçebûna wê, bi xisleta federe be jî bûyeran ew neçar kir ku ber bi desthilatdariyeke neteweparêz a Kurd, ber bi dewletdariyeke netewe ve biçe. Dewletdariya netewe ya Kurd a bi desteka Emperyalîzm û Siyonîzmê, bi kêmanî bi qasî dewletdariya netewe ya Îsraîlê ya li Filistînê weke modeleke xwedî girîngî di dewrê de hiştin. Ev xusûs gelekî girîng e. Çawa ku biryar didin, dewleta netewe ya Tirk, ya rastî, şoreşa komarê ji salên 1923’an ve weke dewletekê û ji salên 1925’an ve jî bi xisletên dewleta netewe weke Proto-Îsraîlekê difikirin (Di vê mijarê de hewcedarî bi lêkolînên berfireh heye), bi derengî be jî piştî salên 1945’an jî bi pêşengiya PDK’ê bi heman awayî biryara modeleke Kurd a Proto-Îsraîlê didin. Cudahiya di navberê de zeman e, û xisletên hêzan ên cuda yên mîllî ne. Ango ji bo paşerojê û ji bo ewlekariya Îsraîlê weke Proto-Îsraîlekê hewcedarî bi avakirina dewletên netewe yên Kurd û Tirk heye. Dewleta netewe ya Tirk a Proto-Îsraîl bi CHP’ê pêk anîn, li cem Kurdan jî bi PDK’ê dewletoka netewe ya Proto-Kurd pêk tînin.

Ez difikirim ku paşê bi awayekî berfireh li ser vê mijarê rawestim, lê ji bo ez Herêma Federe ya Kurd a piştî salên 1990’î di çarçoveya Şerê Yekemîn û Duyemîn ê Kendavê de ket dewrê rast

şîrove bikim, min îşaret pê kir. Yek ji armancên sereke yê Şerê Yekemîn ê Kendavê yê sala 1990'î dest pê kir ew bû ku li ser riya diçû dewleta netewe ya Kurd gavê biavêjin. Li Rojhilata Navîn a piştî salên 1990'î diyardeya di çarçoveya Şerê Kendavê de hatiye destpêkirin weke yek ji versiyonên girîng ên 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' bê nirxandin, mirov ê bibîne piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn ji Împaratoriya Osmanî ya têkçûyî weke Proto-Îsraîlekê dewleteke netewe ya Tirk, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn Dewleta Îsraîlê ya rastî û ji versiyona 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' jî weke amûrê bingehîn ê ewlekariya Dewleta Îsraîlê dewleta netewe ya Kurd a Proto-Îsraîlê tê avakirin. Ango piştî salên 1990'î di serî de hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst ên li dijberî PKK'ê Emerîka, hêzên Yekîtiya Ewrûpayê, Japonya û wekî din, xwestin dewletoka netewe ya Kurd a ku dewletên netewe yên Tirk û Îsraîlê jî wê destek dikin, weke alternatîfekê deynin. Şerên NATO'yê yên bi desteka Gladîo yên piştî salên 1990'î li dijî PKK'ê, vê rastiyê pirr eşkere piştrast dikin. Ji ber ku şerê gel ê şoreşgerî yê PKK'ê bi roleke alternatîf radibe û li nava Kurdistanê rê li ber netewetiya gel vedike û dixwazin bi netewetiya dewletê pêşiyê lê bigirin, dixwazin alternatîfa PKK'ê pûç û tesfiye bikin. Tevî kêmasî û şaşiyan hemûyan jî tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî yê piştî salên 1990'î dest pê kir, polîtîkayên li ser Kurdistanê yên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn ên hêzên hegemonîk ên Rojavayî û polîtîkayên hêzên herêmî yên dewletên netewe Îsraîl û Tirkiyê pûç kirine. Ev hem weke têgîn û hem jî weke diyarde bi vî awayî bû. Çiqasî ji têgîna neteweya demokratîk şax diçûn, rastiya behsa wê tê kirin bêhtir derdiket holê. Bi Şerê Kendavê yê Duyemîn re (2003-2010), ji derketina holê wêdetir, ev rastî bi temamî weke diyardeyekê berbiçav bû. Di vê pêvajoyê de xusûsa bingehîn a îspat bû ew e, PKK wê nikaribe dewleta netewe ya Kurd ava bike, wê nikaribe damezrîne, ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve rewşa wê derfet û îmkan nade, lê netewetiya gel a weke potansiyel di avabûna wê ya îdeolojîk de heye wê weke neteweya demokratîk a alternatîf pêk bê, û kes nikare wê ji vê bike.

**b-** Neteweya demokratîk ne bi tenê têgîn e, weke rastî jî berbiçav dibe. PKK'ê di dema qonaxa koma îdeolojîk de têkoşîna li dijî milliyetgiriya neteweya bindest û serdest meşandî, di çarçoveya tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî de dîsa li dijî herdu dewletdariyên netewe weke têkoşîna neteweya demokratîk dewam dike. Dewletên netewe yên serdest bi tenê bi hêzên zorê yên eşkere yên li ber çavan û hevkarên xwe yên bi peran hewl didin li ser piyan bimînin, lê tevî milliyetgiriyên li dora wê hemûyan, tevî destekdarên wê yên hundir û derve hemûyan, tevgera neteweya demokratîk wê dorê li dewletdariya netewe ya Kurd bigire û wê tecrîd bike. Di Şoreşa Kurdistanê de cara pêşî ye ku alternatîfa dewleta netewe û alternatîfa neteweya demokratîk hewl didin bi hev re rol bigirin.

Di Şoreşên Fransî û Rûs de û di gelek şoreşên din ên modern de ev herdu alternatîf di zikhev de pêk hatine. Di Şoreşa Kurdistanê de jî ev herdu alternatîf ji hev cuda dibin, di navbera wan de xeta îdeolojîk, polîtîk û çalakiyê zelal dibe û ev bûyereke dîrokî ye. Heta niha di tevahiya şoreşên modern de yan bi temamî serdestiya tebeqeya jor an jî berevajiyê wê serdestiya tebeqeya jêr

xwedî hukim bû. Dema bi hev re bûn, yan jî wexta ji hev cihê bûn, sînorên zelal di navbera xwe de danedianîn. Têkoşîna yek a din tesfiye bike kiribûn rêbaza sereke ya têkoşînê. Ji bilî bi hêz kirina modernîteya kapîtalîst, ev rewş bi kêra tiştekî din nedihat. Hem di navbera herdu çînan de hem jî di navbera herdu neteweyan de têgihiştineke şaş a têkoşînê hebû. Herçiqasî di tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî yê Kurdistanê de ev rewşa şîlo ji serî ve bişibe mînakên beriya xwe jî têkoşîna zêde û dijwar di encamê de cudabûn bi lez û zelal kir. Di vê pêvajoyê de PKK ne bi tenê ji dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî bihurî, bi awayekî îdeolojîk ji dewletdariya netewe ya bûrjûwaziyê ya ji nava sosyalîzmê derketî jî bihurî ango pirsgirêka netewe ji pirsgirêka avakirina dewleta netewe derxist û li şûna wê modeleke di kategoriya neteweya demokratîk de ava kir ango gel bi xwe, xwe weke neteweyeke azad û wekhev pêk tîne. Kategoriya neteweya demokratîk hem ji aliyê çînî ve hem jî ji aliyê çareseriya pirsgirêka neteweyî ve kir modeleke alternatîf. Neteweya demokratîk kir hêmana herî girîng a modernîteya demokratîk (Hêmanên din ev in: Îndustriya ekolojîk û ekonomiya kominal a ku karê li derve dihêle). Ji dewletdariya netewe ya Hegelî ku ji sedûpêncî salî zêdetir li serê sosyalîzma zanistî bû bela bihurî û li sosyalîzma herî nêzî zanistê rê vekir. Bi vî awayî di avakirina sosyalîzma felsefî, zanistî, exlaqî û estetîk de alîkariya herî girîng kir.

**c-** Tevî vê alîkariya dîrokî ya di qada teorîk de, di qada pratîkî de, di rewşa berbiçav a rastiya civakî ya Kurd de pêkhatina neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk bi lez bûn. Sînorên di navbera Kurdên çar parçeyan de bi pêkhatina neteweya demokratîk bêkêr bûn. Sînor ji bo dewletên netewe her tişt in, lê ji bo neteweya demokratîk ketin rewşa ne tiştekî. Neteweya demokratîk di zêhnê gel de weke şoreşa herî girîng a bîreweriyê hat hûnandin, xweseriya demokratîk jî weke şoreşa herî girîng a bi gewdebûnê li her parçeyî hat avakirin. Çerxên mekanîzmayên qirkirina çandî ya dewletên netewe yên Tirkî, Îran, Iraq û Sûrî bi giranî vala digerin û her beşê gelê Kurd ê li van parçeyan, bûn parçeyekî avaker û afirîner ê neteweya demokratîk. Şerê gel ê şoreşgerî ne bi tenê qirkirina çandî ya hegemonya dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst û komploya dewletdariya netewe ya ajan derxist holê, jê hat ku weke alternatîf li her parçeyî neteweya demokratîk di zêhnê her mirovê Kurd ê durist de û di bedena her civaka Kurd de pêk bîne û ev serketineke mezin e. Li ser vî bingehî, di serî de gelên cîran ango gelên Tirk, Ereb û Fars, çandên hindikayiyên din û gelên tesfiye bi serê wan de hatine (Ermenî, Grek, Suryanî û yên wekî wan) ji bo weke koma neteweyên demokratîk di nava xwe de bi dostanî piştgiriya hev bikin û bi rola pêşengiyê ya di avakirina modernîteya demokratîk de rabin û vê serketina dîrokî li nava herêmê û dinyayê bi pêş bixin, derî bi temamî vekirine.

**4- Li Dijî Şerê Gel ê Şoreşgerî Şerên NATO yên Gladîoyê**

Hêza esasî û rastî ya li Kurdistanê li dijî Pêngava 15’ê Tebaxa 1984’an şer kir artêşa veşartî ya NATO’yê hêzên Gladîo’yê ye ku ev yek her çûye derketiye holê û eşkere bûye. Bûyera herî girîng a ku îspat kir sîstema ewlekariyê ya Tirk di têkoşîna li dijî PKK’ê de kêm maye Pêngava 15’ê Tebaxa 1984’an e. Ya rastî, kêmasiya sîstema ewlekariyê bi derketina me ya ji Enqereyê dest pê kir bi cihgirtina me ya li Rojhilata Navîn misoger bû. Pêkanîna Pêngavê ev misogerî derxist holê. Piştre di sala 1985’an de Gladîo’ya NATO’yê ya navend Elmanya xistin nava tevgerê. Divê mirov ji bîr neke ku cara pêşî dewleta Elman di sala 1985’an de PKK weke ‘terorîst’ îlan kir û ev jî bi sedema ku navenda artêşa Gladîo’yê bû. Dema Gladîo’ya NATO hat avakirin, ji beşa li Ewrûpayê Elmanya weke navend berpirsiyar destnîşan kirin. Di destpêkê de haya me ji van rastiyan tinebû. Heta di serî de Elmanya, me Yekîtiya Ewrûpayê û welatên din ên Ewrûpayê weke dostên têkoşîna şoreşgerî dihesibandin. Dereng be jî me fêhm kir ku li dijî gelan şerekî bi dizî û nehênî te meşandin. Gelên Ewrûpayê jî di nava vê de ne. Nexasim gelên Îtalî, Yewnan û Balkanan ji van gelan ên sereke ne. Dema NATO hat avakirin, ev artêş jî bi armanca pêşîgirtina li kominîzmê hat damezrandin. Haya kêm kesan ji vê rastiyê hebû. Ev artêşa bi dizî hat damezrandin bêhtir li Îtalya, Yewnanistan, Tirkiye û Elmanyayê li dijî şoreşgeran xistin nava tevgerê. Piştî ku Rûsya Sovyetê êdî weke tehlûke nehat dîtin û Yekîtiya Sovyetê ji hev belav bû, ji bilî Tirkiyê li welatên din ên endamên NATO’yê girîngiya wê nema. Li Tirkiyê rewş berevajî bû girîngiya wê bêhtir bû. Di vê de Şoreşa Îranê (1979) û dagirkirina Afganistanê ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve (1980) bi roleke girîng rabûn. Herweha bi sedema ku Gladîo’ya Tirkiyê li Rojhilata Navîn bi rola jenderme radibû, destekeke bê sînor danê. Daxwaza parastina Îsraîlê jî di vê de faktoreke girîng bû. Dîsa parastina çavkaniyên petrolê û desthilatdariyên hevkar ji wan faktorên girîng in ku bûn sedem Gladîo timî di dewrê de bê hiştin.

Pêngava 15’ê Tebaxê ya ji nişkê ve û bi awayekî kes ne li bendê bû, di van şert û mercan de derket holê. Gladîo’ya Tirkiyê şopên dawî yên şoreşgerên Tirk bi darbeya eskerî ya 12’ê Îlonê jê biribûn û dawî li wan anîbû. Pêngava 15’ê Tebaxê di nava hesaban de tinebû. Dema pêk hat jî weke sergermiyeke ji rêzê ya çepgiran hat fêhmkirin. Yeqîn kirin ku wê bi hêzên klasîk ên artêş, polês û îstîxbaratê ji heqê wê bên. Lê ji ber ku di nava du salan de nikarîbûn bi dawî bikin, mesele çû ber destê NATO’yê. NATO’yê li gorî xala pêncan a qanûna damezrandinê di sala 1985’an de biryara destwerdanê da. Ji ber vê biryarê, dewleta Elmanyayê di heman salê de PKK weke ‘terorîst’ îlan kir. Ji sala 1985’an ve jî bi awayê xuya dikir qaşo me bi hêzên dewleta Tirk re şer dikir. Bi zanebûn ev dîmen çêdikirin û dixwestin bi vî awayî bê dîtin. Ya rastî, me şer bi Gladîo’ya NATO’yê re dikir. Bêguman şaxê Gladîo yê Tirkiyê di vê de bi roleke mezin radibû. Lê ne bi tenê şaxek bû. Erê ji aliyê hejmarê ve mezin bû, lê ji bo encamgirtinê qîm nedikir. Hêzên dewleta Tirk bi tena serê xwe ne bi salan, salekê jî zehmet bû ku şerekî evqasî berfireh bimeşînin. Eger bimeşanda jî dihat wê maneyê ku wê weke dewlet îflas bikira. Ango herçiqasî ne

eşkere bûya û bi giranî mekanîzma bi dizî bixebitiya jî şer şerekî NATO'yê bû. Ji şerên roja me ya îro yên li Afganistan û Iraqê, ji şerê berê yê li Somaliyê qat bi qat di asteke jor de, şerekî mezin û demdirêj bû. Em weke PKK li rûyê rast û veşartî yê şer serwext nedibûn. Rexneyên me li Ewrûpa û Emerîkayê dikirin li asta îdeolojîk diman. Em ne xwediyê wê kapasîteyê bûn, bi giştî di van dused salên dawiyê de, piştî salên 1920'an, bi taybetî jî piştî salên 1984'an cihê modernîteya kapîtalîst di şerên hêza hegemonîk ên li Kurdistanê li dijî gelê Kurd û PKK'ê de analîz bikin. Lewma analîza me ya der barê NATO'yê de gelekî kêm bû. Ji nêzîkatiya sosyalîzma pêkhatî ya di asta sloganê de nedibihurî. Jixwe weke nav jî haya me ji Gladîo tinebû. Kengî asta şerê gel li Kurdistanê bilind û berfireh bû, rastiya em behsa wê dikin hêdî hêdî derket holê. Dîsa kengî piştî Elmanyayê DYE'yê û Ingilîstanê piştî salên 1990'î PKK weke 'terorîst' îlan kirin, berî vê jî hewldana reşkujiya Papa û kuştina Olof Palme, kirin ku ev rastî bêhtir baş bê fêhmkirin. Derxistina holê ya Gladîo'ya Îtalyayê jî qonaxeke din a girîng bû.

Beriya şerên Gladîo li dijî şerê gel ê şoreşgerî û PKK'ê divê mirov komployên dema Komarê li dijî hebûna gelê Kurd û muxalefeta sosyalîst û demokratîk bîne bîra xwe. Serîrakirina Koçgiriyê di sala 1920'an de hat tepisandin, Navenda Partiya Komînîst a ji panzdeh kesan û bi pêşengiya Mistefa Suphî di dawiya Çileya 1921'ê de li Deryareş hatin xeniqandin, heman salê hêzên Çerkez Ethem ji hev hatin belavkirin, herweha serîrakirinên alîgirê siltan û xelîfetiyê jî hatin tepisandin. Hevgirtiyên rastî Kurd, Ummetgirên Îslamî û Komînîst di dawiya Şerê Rizgariya Neteweyî de li derveyî sîstema bê avakirin hiştin. Hêmanên li ber vê rabûn û nerazî bûn, bêhtir bi tundî û dijwarî hatin tepisandin. Hewl dan nîzama proto-faşîst a tek partiyê rewa bikin. Di heman wextî de faşîzma li Elmanya û Îtalyayê mezin dibe, li Komara Tirkiyê bi heman awayî xwe nîşan dide. Li dijî hebûna Kurdan qirkirin û asîmîlasyon bi provakasyona 15'ê Sibata 1925'an bi awayekî fermî hatiye destpêkirin, berxwedanên li hemberî van kirinan herî dawî mîna li Dêrsimê bi tevkujiya 1938'an hatine tepisandin, beşekî mezin ji yên mayî bi qanûna îskana mecbûrî temam kirine. Di vê demê de li ser bingehê peymanên bi emperyalîzma Ingilîz û Franseyê re ji bo parçekirina Kurdistanê û dûrkirina Kurdan ji nasnameya wan her cure rêbazên zordestî, mêtinkarî û asîmîlasyonê hatine ceribandin. Armanc, afirandina dewleteke netewe ya homojen e.

Tirkiyê di sala 1950'î de ket NATO'yê û şaxê Gladîo yê Tirkiyê Desteya Tetkîk a Seferberiyê hat avakirin. Ji wê rojê ve, hêza Gladîo ya Tirk ê bi tevahî muxalif û desthilatdarên siyasî kontrol bikirana. Bûyerên 6-7'ê Îlonê û rêxistinkirina Teşkîlata Mûqawemetê ya Qibrisê çalakiyên pêşî yên Gladîo'ya Tirk in. Tewqîfata komînîstan a 1951'ê belkî jî çalakiya wê ya destpêkê ye. Darbeya 27'ê Gulana 1960'î, piştre bi tevahî birêkûpêkirina desthilatdariyan, bêtesîrkirina muxalifan û tesfiyekirina wan bi temamî wê di bin destê Gladîo'ya Tirk de pêk bên. Hêzên polês, Îstîxbarat û Fermandariya Giştî herçiqasî weke hêzên serbixwe xuya bikin jî kontrol û bikaranîna hêza esas bi destê rêxistiniya Gladîo'yê tê pêkanîn. Bi darbeya 12'ê Adara 1971'ê re tevgerên şoreşger û demokratîk hatin tesfiyekirin û ev bi destê rêxistina Gladîo ya têra xwe serdestî

sîstemê bûyî hatiye kirin. Di serî de komkujiyên Taksîm û Mereşê, hewldana reşkujiyê ya Ecevît bi tevahî komkujî û reşkujiyên şoreşger, rewşenbîr û kesên ji nava gel di çarçoveya doktrîn û çalakiyên artêşa Gladîo ya NATO'yê de ne. Darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê yek ji çalakiyên herî girîng ê Gladîo'ya NATO'yê ye. Heta vê demê NATO û Gladîo'ya Tirk di nava hev de û ji hêzên din ên ewlekariyê serbixwe hem jî di ser wan re bi rolekê rabûne û ev rol pêk anîne. Ji vê demê û pêve, mirov dikare hewldanên wê yên kronolojîk li dijî PKK'ê weha rêz bike:

**a-** Ji qonaxa komê heta bi darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê, herçiqasî hêzên Gladîo di dewrê de bin jî êrîşên bi armanca şopandin û tesfiyekirina PKK'ê bi giranî bi destê hêzên ewlekariyê yên ji rêûresmê (MIT, Emniyet-Hêzên Polês û Cinderme) hat meşandin. Ez yeqîn dikim, ji ber ku bawer nedikir wê koma me zêde mezin bibe weke komên din ên di rewşa aktor û çalak de nehat şopandin. Koma me weke şaxekî THKP-C'ê dihat nirxandin û bawer dikirin ku bi tesfiyekirina THKP-C'ê wê koma me jî tesfiye bibe. Dibe ku xwestibin komê bi hin kesan kontrol bikin û di bin destê xwe de bigirin. Piştî salên 1975'an, kengî hat fêhmkirin ku koma me serbixwe ye, hingê bi riya PDK'ê bi destê Stêrka Sor mudaxeleyî komê kirin. Hêmanê bi navê Alaatîn Kapan ku herî dawî Hakî Karer qetil kir, hat bikaranîn. Ji serî ve PDK bi Îsraîlê re parelel û bi NATO'yê ve girêdayî tevgeriya û li tevahiya Kurdistanê weke rêxistineke kontrolê destek danê û ev tespît êdî misoger e. Mirov dikare bibêje, di bin destê Gladîo'yê de ye, û nexasim ji salên 1961'ê ve bi desteka Gladîo'ya Tirk jî bi sîleh kirin û teşwîqî serîrakirinê kirin. Paşê bi gelek belgeyan wê îspat bibe ku bi riya Şahtiya Îranê heman alîkariyê dewam kiriye. Ango bi riya PDK'ê mudaxeleyî komên çepgir ên li Kurdistanê kirin û girîng e ku mirov tespît bike, ev bi desteka neyekser a Gladîo çêbûye.

Xwedêgiravî 'Pênc Parçeparêziya' Stêrka Sor (Îddîa dikir ku parçeyê piçûk ê Kurdistanê di nava sînorên Yekîtiya Sovyetê de ye) vê fikrê piştrast dike. Paşê bi KUK'ê destek dan vê mudaxeleyê û xwestin kom ji Enqerê dernekeve, eger derkeve jî divê hê negihiştî rojhilatê Firatê bê tesfiyekirin. Ji sala 1976'an ve Pîlot Necatî Kaya ket nava tevgerê û eger ajan be (Em baş nizanin divê bê lêkolînkirin) dibe ku bi ser Gladîo'ya Tirk ve be. Eger pîlanekî tesfiyeyê li dijî komê hebe, firsenda wî çênebûye ku pêk bîne. Kom bi zanebûn neketiye vê dafikê. Eger Kesire Yildirim bi riya bavê xwe Alî Yildirim ajantiyek wê hebe (Em vê jî baş nizanin divê mirov lêbikole), mirov dikare wê weke kadroyeke ji rêûresmê ya MIT'ê bifikire. Mijara Dilaver Yildirim jî mijarek e ku ji bo mirov têde şaşiyê neke, divê mirov lêbikole. Alaattin Kapan di 18'ê Gulana 1977'an de Hakî Karer bi provakasyonekê xist dafikê û qetil kir. Dibe ku ev di qonaxa komê de çalakiya pêşî ya Gladîo'ya NATO û Tirk li dijî PKK'ê be. Mirov dikare diyar bike ku cara pêşî di sala 1977'an de bi awayekî berfireh hewl dan komê tesfiye bikin. Eger bername nehatibûya weşandin, bi îlankirina PKK'ê bersiv nehatiba dayîn û Alaattin Kaplan bi kuştinê nehatibûya cezakirin, tevahiya komê nebûya jî heye ku pirraniya komê bihata tesfiyekirin. Komkujiya Mereşê ya di dawiya sala 1978'an de, mirov dikare weke duyemîn çalakiya mezin a Gladîo li dijî komê binirxîne. Ji ber ku

kom li wê herêmê bi lez mezin dibû. Jixwe Mereş ji mêj ve navendek bû ku lê bi rêbazên yekser û neyekser tesfiyeya Kurdan dihat pîlankirin. Heman xusûs ji bo tevahî Kurdên li Rojavayê Firatê jî bi heman rengî ye. Bi Pîlanê Islahata Şerqê yê di sala 1925'an de armanc ew e, dixwazin li Rojavayê Firatê Kurdekî bi tenê yê bi Kurdî bipeyive nehêlin, di serî de asîmîlasyon bi rêbazên cihêreng wan tesfiye bikin. Divê mirov komkujiya Mereşê di çarçoveya vî pîlanî de ku hê li ser kar e, bifikire. Nexasim divê mirov li asîmîlasyona sîstematîk û li çalakiyên Gladîo yên li deverên Meletî, Semsûr, Elezîz, Dêrsim, Sêwaz, Erzîncan û Dîlokê di vê çarçoveyê de bifikire.

Bi kurtî, ji salên 1960'î ve li ser muxalefeta Kurd û çepgiriya bi pêş dikeve zordestî û kontroleke Gladîo ya her diçe zêde dibe, heye. Bi darbeya 12'ê Adara 1971'ê re ev kontrol, zordestî, şer û reşkujiyên bêhtir zêde dibin sîstematîk in, û girêdayî rêxistinê ne. Bi qasî komên Îslamî û Faşîstên MHP'î, herwisa komikên sexte yên çepgir ên Kurd û Tirk jî di çarçoveya şerê Gladîo de hatine bikaranîn. Hebûna Gladîo li Tirkiyê ji salên 1955-60'î ve di pêkhatina tevahiya hukûmet, şerên navbera komên çepgir û rastgir, pîlankirin û pêkanîna darbeyan, reşkujî û komkujiyên girîng de heta dawiyê bi tesîr e. Rola serbixwe ya rêxistinên din ên ewlekarî û îstîxbaratê her ku çû bi sînor kirin û heta bi tevahî xistin destê xwe. Bi tevahî têkiliyên xebatê yên di warê ekonomîk, civakî, çandî, dîplomatîk û desthilatdariyê de, ji bo ewlekariya dewletê nirxandin û hewl dan di çarçoveya stratejî û taktîkên Gladîo de binirxînin û rê bidin ber wan. Di serî de tevgerên çepgir û kominîst, paşê li ser Tevgerên Kurd ên sosyalîst û çepgir ku li derveyî kontrola wan beridîn, zêde operasyon meşandin. Salên navbera 1970-1980'î dema herî zêde ya operasyonan e, bi darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê û derbxwarina stratejîk a çepgiriyê bi encam bû. Tevgera Kurd a şoreşger û sosyalîst, piştî salên 1980'î li Rojhilata Navîn bi cih bû û bi vî awayî ev operasyonên li dijî wê jî pêk dihatin pûç kirin.

**b-** Dema duyemîn a şerên Gladîo bi darbeya eskerî ya 12'ê Îlona 1980'î dest pê dike û heta sala 1985'an dewam dike. Sefareta DYE'yê ji bo dekûdolabgerînerên xwe gotibû "Zarên me karekî baş kirin bi ser ketin!" û bi vî awayî teqdîra xwe îfade kiribû, jixwe ji bo dema kin armanc û encamên vê darbeyê têne zanîn. Armanca darbeyê ew e, di serî de hêzên çepgir tevahiya tevgerên muxalif û derdorên nerazî yên li hundir bêdeng û tesfiye bike, li şûna wê li gorî rejîma destûrî sîstemeke nû ya faşîst a çandî, siyasî û civakî ya xwe bisipêre îdeolojiya Tirk-Îslam û nîzameke ekonomîk a pala xwe daye îxracata derve (derîvekirina li mêtinkariya derve) ya bi hegemonya kapîtala fînansê ya global ve girêdayî ava bike. Ev ne weke ku dixwazin nîşan bidin sîstemek e ku di bin rêveberiya hêzên ewlekariya hundir a Tirk de ye; encameke xwezayî ya şerên Gladîo'yê ye ku ji salên 1960'î ve zêde kir û bi hişyarnameya 12'ê Adarê re gurr kir. Hêzên diyarker NATO, navenda Gladîo û şaxên wê yên Tirkiyê ne. Hêzên ewlekariya hundir ên Tirk rola wan ji destekdanê wêdetir naçe.

Di vê demê de xebatên Gladîo yên li dijî PKK’ê bi giştî di çarçoveya xebatên li dijî çepgiriyê de hatine nirxandin. Lewma bi kîjan rêbazên tepisandin û tesfiyekirinê bi ser rêxistinên çepgir de çûne, bi heman rêbazan bi ser PKK‘ê de jî çûn. Hêzên xistin nava PKK’ê û pîlansaziyên beşa li pişt wan, ji ber şêwazê tevgerê yê Serokatiya PKK’ê bi ser neketin. Serokatî dema derket derveyî welat bi tenê haya wê û rêberê wê ji derketinê hebû. Ev şêwazê tevgerê di serketinê de bi roleke girîng rabûye. Di wê demê de Necatî Kaya ji sedî sed dixwest min bibîne û rewşa wî ya derûnî gelekî tengezar bû, lewma divê mirov li ser vê rewşa wî bisekine. Herweha di serî de Dev-Yol, dema me bi hin hêzên çepgir re di sala 1982’an de xwest xebatên Bereya Berxwedana Yekbûyî li Dijî Faşîzmê biberidînin, helwestên biguman ên hin kesên ji nava Dev-Yolê û di vê çarçoveyê de sabotekirina hin xebatan, dibe ku têkiliya xwe bi hêzên tesfiyeyê û bi hin kesên berdayî nava rêxistinê re hebe. Pratîkên tesfiyeyê yên Taner Akçam ê xwe li serokatiya demê ya Dev-Yolê rakişand û hêmanê bi navê ‘Sari Cemal’, ne bi tenê di warê tesfiyekirina Dev-Yolê de, herweha divê di warê tesfiyekirina PKK’ê de jî mirov li ser wan bi girîngî raweste. Di wê demê de hewldanên mîna tesfiye û reşkujiya li dijî ASALA’yê û Serokê wê Agop Agopyan meşandin (ku bi ser ketin) li dijî PKK’ê jî pêkanîn lê bi ser neketin. Di herdu xebatên reşkujî û tesfiyeyê de hêmanên bi maskeya çepgiriyê hatin bikaranîn. Piştî darbeya faşîst a 12’ê Îlonê di tesfiyekirina çepgiriyê de (PKK jî di navê de tevahiya rêxistinan) bi tenê zor û êşkence bi kar neanîn; di binyeya rêxistinan de kesên bi dizî xistin nava rêxistinan di tesfiyekirinê de bi roleke girîng rabûn. Di çarçoveya derengxistina Pêngava 15’ê Tebaxê de: Parêzer Huseyin Yildirim piştî 1982’an yekser hatibû qada Serokatiyê û xwe li hinek karan rakişandibû; bi hin rêxistinên bi koka xwe Rojhilata Navînî re têkiliyên bi guman danîbûn û tevî vê di vî warî de helwesta PDK’ê, ji wan mijaran in ku hewce dike mirov careke din li ser wan raweste.

Têkilî bi PDK’ê re krîtîk in. Helwesta PDK’ê li hemberî Doktor Şivan (Sait Kirmizitoprak, Serokê PDK’a Tirkiyê), ango di encamê de Doktor Şivan û du alîkarên wî yên girîng hatin kuştin û endamên din ên komê ji hev hatin belavkirin. Lewma dibe ku helwesteke bi heman rengî li beramberî PKK’ê jî pêk bianiyana. Nûnerên PDK’ê ne alîgir bûn ku gerîlla bibin xwedî pêngav. Gelek astengî çêkirin ji bo gerîlla gavê neavêje. Nexasim di dema qonaxa derbasbûna welêt de li ser sînor gelek hevalên me kirin şehîd. Paşê şer û kuştin dewamî bûn. Di sala 1985’an de min û Mesût Barzanî li Şamê hevdu dît û bi awayekî eşkere ji min xwest ku em ji Pêngava 15’ê Tebaxê gavê paşve biavêjin. Li ser vê, guman û fikarên min çêbûn ku ev xwesteka wî ne bi tenê ferzkirineke hêzên ewlekariya hundir a Tirkiyê ye, ev hewldanek e ku têkiliya xwe bi Îsraîlê û Gladîo’ya NATO’yê re heye. Divê mirov şer û têkiliyên bi PDK’ê re bi tenê weke bûyerên hêzên ewlekariya hundir ên Tirk rê dide ber wan nebîne, mirov di çarçoveya polîtîkayên Îsraîl û Gladîo’ya NATO’yê de li wan binêre gelekî girîng e. Ev mijarek e ku divê mirov bi berfirehî û hûrûkûr lêbikole. Pêngava 15’ê Tebaxê û sala wê ya pêşî, herçiqasî pêşbîniya wan bê kirin jî bi awayekî vebirrî haya sîstemê jê tineye. Nikarîbûne pêşbîniya wê bikin ka wê ber bi ku ve biçe. Bi awayekî rast nikarin pêşbîniya berê wê û berfirehiya wê bikin. Em bi xwe jî vê pêşbîniyê nikarin

bikin. Ji sedî sed diyar e ku rê li ber qonaxeke nû vedike. Lê ez yeqîn dikim, bi kêmanî tevahiya sala 1985'an, nexasim hêzên ewlekariya hundir a Tirk, hêzên NATO û Gladîo'yê encamên wê guftûgo dikirin.

**c-** Dema sêyemîn û dema herî girîng a şerên Gladîo ji sala 1985'an ve heta bi sala 1993'an mirina Turgut Ozal dewam dike. Li gorî xala pêncan a qanûna damezrandina NATO'yê hukmê "Eger êrîş biçe ser endamekî weke çûbû ser tevahiya endaman" heye û ev hukim ji sala 1985'an ve bi cih hat anîn. Pêkanîn di çarçoveya Gladîo de hatine kirin. Ji ber ku navenda pêkanînê Elmanya bû, pêşî dewleta Elmanyayê biryar da ku PKK'ê weke 'terorîst' îlan bike. Elmanyayê, bi navenda Gladîo ya NATO'yê, şaxên wê yên Tirkiyê û hêzên ewlekariyê yên hundir ên Tirk re PDK jî birin cem xwe û di çarçoveya plansaziyekê de êrîşên xwe zêde kirin. Hevdîtinên bi min re û nexasim jî yên bi riya PDK û Barzaniyan bi armanca ku em bi awayekî xweber dev ji pêngavê berdin, hatin meşandin. Ev xwestek an jî pêşniyar, aktualîzekirina biryarên hegemonya kapîtalîst di sala 1920'an de li Konferansa Qahîreyê der barê pirsgirêka Kurdan de dayî îfade dikin. Çawa ku tê zanîn, li gorî vê biryarê; divê Rojhilata Navîn di bin destê hegemonyayê de bê ragirtin, meseleya Kurd jî bi awayekî çareser nebe bê hiştin û bi vê rewşê divê pirsgirêk her dewam bike. Ji bo li Kurdistanê ev pêşbînî bi cih bê, rol didin Barzaniyan û PDK'ê. Ji ber ku di çarçoveya vê pêşbîniyê de pêkanîna hebûna Îsraîlê û mayîndebûna wê jî armanc e, bi tevahî pêkhateyên li Kurdistanê di çarçoveya Proto-Îsraîlê de nebin jî mudaxeleyî wan dikin û wan bê tesîr dikin. Ango di vê çarçoveyê de ji sala 1985'an ve piştî tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî êrîşên hêzên Îsraîl, Tirkiye û PDK'ê tevî NATO û Gladîo tînin ser PKK'ê têne fêhmkirin. Li pişt van êrîşan biryareke dîrokî û berjewendiyên heyatî yên rojane hene.

Herçiqasî bi navgîniya Mesût Barzanî ji me re peyam şandibûn jî dîtin ku em dev ji pêngavê bernadin û kengî ev fêhm kirin, di sala 1986'an de rêxistinên JITEM û Hîzbullahê xistin dewreyê. JITEM a ku bi her cure erkê hatibû gurçûpêçkirin bi rola demê ya 'Teşkîlat-î Maxsûsa'yê radibû. Çawa ku tê zanîn, Teşkîlat-î Maxsûsa di sala 1914'an de hat damezrandin û yek ji rêxistiniyên pêşî yê faşîst e ku ji bo avakirina dewleteke netewe ya Tirk a nijadeperest û homojen berê pêşî di qirkirina Ermeniyan de bi roleke girîng rabûye, di serî de tevkujî bi pêkanîna her cure rê û rêbazê hatiye erkdarkirin û bi van erkan hatiye gurçûpêçkirin. Şaxekî wê yê Îslamî-dîndar ku di navê de Seîd-î Nûrsî û Mehmed Akîf jî hebûn tevî vê rêxistiniyê xistin nava tevgerê. Ev modela qirkirinê di sala 1986'an de weke JITEM û Hîzbûllahê ji nû ve hatin aktualîzekirin û herdu rêxistin di heman çarçoveyê de bi erk û rayeyan hatin gurçûpêçkirin. Di navbera hêzên DYE, NATO, Gladîo, hêzên ewlekariya hundir a Tirk û PDK'ê de koordînasyonek hat pêkanîn. Hîzbûllahê hem ji Îranê hem jî ji polîtîkayên Îslamî yên Erebistana Suûdî xwest sûdê werbigire.

Di vê demê de bi destê PDK'ê kes xistin nava PKK'ê. Di wê demê de yê ku ji nû ve PDK bi rêxistin dikir û li serê rêxistina bi navê 'Qiyadey Mûweqqet' Samî Abdurrehman hebû. Bi awayekî

bingehîn, pratîka hewldanên tesfiyekirinê li dijî PKK'ê û xistina kesan a nava wê, ji aliyê Samî Abdurrehman ve hat kirin. Amûra herî girîng a bi kar anî rêxistina Kurd a sexte KUK bû (Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê. Weke her rêxistina sîxur nav an jî xisleteke rêxistina esas bi kar aniye). Gelek PKK'yî û welatparêzên Kurd bi destê vê rêxistinê hatin kuştin. Rola dayîn KUK'ê ew bû, çi dibe bila bibe divê destûrê nede ku PKK derbasî Rojhilatê xeta Çewlîk û Mêrdînê bibe. Çawa ku damezrînerê JITEM'ê Albay Arif Dogan jî li xwe mikur tê, mirov fêhm dike ku di wê demê de ekîbeke ji deh hezar kesên çekdar hatiye wezîfedarkirin. Li vir xusûsa girîng ew e, ev hêz di ser qanûnê re ye. Erka wê heye ku bêpirs û îfade mirovan bikuje. Ji ber vê ye ku weke rêxistina qirkirinê tê bi wesifkirin. Heman erk ji bo Hîzbûllaha Kurdistanê ya gel wê weke 'Hîzbul-Kontra' bi nav dikir jî hatibû naskirin. Ji deh hezaran zêdetir kuştinên kujerê wan nediyar bi destê van herdu rêxistinên birayên hev bi qanûn û heta bi erkên di ser destûrê re hatin kirin. Di serê wê demê de îmhakirina Ozan Sefkan (Celal Ercan) û koma wî (1985), şehîdkirina heval û hevrê Mahsûm Korkmaz (1986), xebat û hewldanên ji bo teslîmgirtinê yên bi destê Selahattin Çelik û pêxîrtengiya di Kongreya Sêyemîn a PKK'ê ya 1986'an de bûyerên girîng in, yekser û neyekser têkiliya xwe bi JITEM'ê re hene. Dîsa Îbrahîmê ji Nisêbînê (Darar Akay) ku li ber dilê min gelekî hêja bû, çawa ku Arif Dogan li xwe mikur tê di sala 1985'an de li gundê Şax ê Silopiyê bi destê JITEM'ê hat kuştin. Bandorên Rewşa Awarte, JITEM û Hîzbûllahê di sala 1986'an de li ser PKK'ê ewqasî giran bûbûn rê li ber pêxîrtengiyeke qismî vekiribûn. Lewma Kongreya Sêyemîn kêrhatî û çareserker nebû. Ji ber vê jî beşekî mezin ji asta fermandaran hat guhertin.

Ji bo ku ez vê rewşa neyênî pûç bikim, di ser Rojhilata Navîn re ji sala 1987'an ve heta bi kuştina Turgut Ozal hema bêje her sal min bi xwe ji hezarî zêdetir namzetên gerîlla perwerde û gurçûpêç kirin û ew gihandin baregehên wan. Berê û paşê jî bi hêzên gerîlla yên ji hezaran zêdetir, bi amûrên wan û bi riya peran min destek dabû. Lê min desteka herî mezin di van salên tesfiye û tevkujiyan de bi xwe da. Ji sala 1987'an ve me gerîlla bi lez derbas kirin nava welat û me xebatên xwe yên di vî warî de bi lez kirin. Lê di van xebatên me de tiştekî neyênî bal kişand ser xwe. Ji serekên koma ku em ê paşê weke 'çeteya çaran' bi nav bikin, Cemil Işik bi nasnav Hogir çawa derbasî nava welat bû bi bahaneya têkoşîna li dijî cerdevanan bi serê xwe dest bi çalakiyan kir û di navê de jin û zarok jî bû sedema kuştina bi dehan mirovan. Sîstema taktîkan a PKK'ê ku min bi xwe bi rêkûpêk kiribû, bi van çalakiyan pûç bû. Jê û pêve jî PKK'ê kir û nekir nikarîbû careke din taktîkên xwe bi cih bîne.

Mahsûm Korkmaz yek ji wan namzetên me yên fermandariyê bû ku pêşî li vê tehlûkeyê varqilî û hewl da tedbîran bigire. Lewma ew heval û hevriyê me bi taybetî hat hilbijartin û qetilkirin. Kuştina Darar jî di vê çarçoveyê de ye. Kuştina Ozan Sefkan û hevalên wî jî dewama rêzebêbextiyên bi vî rengî ye. Awayê kuştina Mahsûm, şert û mercên têde giyana xwe ji dest da, rola kesên sîxur ên ketine nava rêxistinê tîne bîra mirov. Şemdîn Sakik û gelekî paşê ciwanê ji

Erûhê yê bi nasnav Ferhad ku Zivistana 1987'an li Bekaa'yê xwe kuşt, mirov difikirîne ku Mahsûm bi îhtîmaleke mezin bi reşkujiyeke ji hundir ve hatibe qetilkirin. Cemîl Işik ji sala 1987'an ve ji guhertinên di asta fermandariyê de sûd wergirt û di nava gerîlla de însiyatîf xist destê xwe û berdêla vê yekê PKK'ê bi giranî da. Ango PKK'ê ji vê zirar û ziyaneke mezin dît. Zirara wî ya herî mezin da ew e, planê şerê gerîlla yê PKK'ê bi zor û zehmetiyeke mezin amade kiribû û pirraniya vî planî pêk anî bû, pûç kir. Endamên din ên 'çeteya çaran' Şemdîn Sakik, Şahîn Baliç û Halil Kaya (Kor Cemal) li ser şopa Hogir çûn û bûn ji wan kesên li pêş û bi bandor ên sîstema gerîlla pûç kirin. Pirraniya van navan têkiliya xwe bi PDK û Pênc Parçeparêzan re hebû (Pênc Parçeparêz û KUK jî bi PDK'ê re têkiliya xwe hene. Nexasim têkiliya wan bi 'Qiyadey Muweqqet' re) û ev dike ku mirov ketina sîxuran a nava rêxistinê paşguh neke. Di vê demê de bi qasî sed namzetên hêja yên fermandariya gerîlla ku min ew bi xwe nas dikirin, bi awayekî wisa qetilkirin mîna ku 'di şer de hatine kuştin' nîşan dan û ev jî mezinahiya bêbextiyê nîşan dide.

Lîstika komplo û bêbextiyê gelekî eşkere ye. Bingehê wê yê dîrokî jî heye. Di dema Îttîhad û Teraqiyê de ev lîstik gelekî hatiye lîstin. Dîsa di dema serîrakirinên Kurdan û hewldanên tesfiyekirina Partiya Kominîst de komplo gelekî hatiye ceribandin. Xisletên wê yên bingehîn ev in: Ya yekê, divê têkiliya hêzên şoreşger ji gel bê qutkirin û ji bo gel li ber van hêzan rabe, divê tîmên kuştinê yên bi maskeya gerîlla yan jî serîrakiriyan bêne çêkirin û bi wan bûyerên kuştinê bide kirin. Çeteya Çaran û yên mîna wan di vê mijarê de têra xwe serketî bûn. Van kesan li dijî gel û nexasim jî li dijî malbat û eşîrên xwestin li ber me rakin bi sedan çalakiyên komplowarî pêk anîn. Eger der barê çalakiyên van komployan de bi girîngî lêkolîn bê kirin wê çend cildên pirtûkan pêk bîne. Jixwe divê lêkolîneke bi vî rengî ji sedî sed bê kirin. Rêbaza dudiyan a komployê ew e, kadroyên hêja yên karin bibin fermandarê gerîlla yan pêşengên serîrakirinê dikin hedef û dikujin. Di vê mijarê de jî têra xwe serketî bûn. Bi sedan heval û hevriyên me yên karîbûn fermandariyê bikin bê sedem dan kuştin an jî kuştin û ev jî mezinahiya komployê nîşan dide. Di serîrakirinên Kurdan û tesfiyekirina lîderên çepgir ên Tirkiyê de rêbazên bi heman rengî hatine bikaranîn û bi komployan kadroyên pêşeng hatine îmhakirin. Di vî warî de xeleka herî dawî di sala 1990'î de komploya mezin e ku li dijî şexsê min pêk hat. Komploya em behsa wê dikin, Şahîn Baliç, Mehmet Şener û Cangir Hazir (Sari Baran) serkêşiya wê kirin. Bi şehîdbûna heval û hevrê Hasan Bindal ev komplo eşkere bû û hat pûçkirin. Lê di du qadên din ên girîng de serketî bûn. Karîbûn girseya sereke ango gel ji PKK'ê qut bikin û bixin pêvajoya cerdevanbûnê. Namzetên fermandariyê îmhakirin û gerîlla bê serî hiştin; gerîlla ji xeta sereke ya taktîk derxistin û ew kirin komên asî û awareyan. Di vê demê de Gladîo'ya derve û hundir herçiqasî nikarîbû PKK'ê û şerê gel ê şoreşgerî û tecrûbeya wî ya jêre pêşengî kir bitepisîne û tesfiye bike jî lê nehişt ku şerê gerîlla weke hatibû plankirin û taktîkên wî bi xwe bikevin pratîkê.

Yek ji mijarên herî girîng ên serneketinê ku berpirsên PKK'ê zêde haya wan jê çênabe ew e, plansaziya taktîk çima di pratîkê de bi awayekî serketî pêk nayê û di vê de rola Gladîo-JITEM'ê

pê radibin e. Serketina herdu aliyan jî nîvco maye. Di vê qonaxê de ya min kirî ew bû, şerê şoreşgerî domdar bikim û pêşî li têkçûna wî bigirim. Eger serokatiya pratîk a hundir bi hewldaneke hevgirtî rabûya, pêkan bû ku di asteke jor de serketinek pêk bihata. Dîsa jî pûçkirina komploya 1990'î û encamên Şerê Kendavê nîşan didan ku bandora yekbûyî ya Tevgera PKK'ê bi awayekî giştî zêde dibe. Ji ber ku tewazuna herêmê ya maneya wê ya dîrokî-civakî mezin e, rast hatiye nirxandin, pratîkeke ji rêzê ya şerê şoreşgerî rê li ber encamên girîng û serketî vekiriye. Eger serokatiya taktîk dema navbera 1990-93'an rast binirxanda ango hem ji aliyê hejmarê û hem jî ji aliyê naverokê ve mezinkirina hêzên gerîlla dewam bikira û plansaziya taktîkî bi cih bianiya, rêveçûna dîrokê dibe ku cuda bibûya, di serê salên 1993'an de çareseriyeke dîrokî pêk bihata. Sîstema Gladîo li ber hilweşînê bû. Turgut Ozal ji ber ku ev dîtibû alîgirê lihevkirinê bû. Li şûna ku Kurdistanê ji dest bide, îqna bibû ku gelan bi bendên federal li bin banê dewleteke hevpar li cem hev bigire û vê weke riyeke pirr girîng a ji bo jiyana bi hev re û bi biratî ya gelan didît. Gladîo'ya hundir û derve, ji ber ku ev helwesta wî weke tesfiyekirina xwe dîtin, ji bo xwe ji vê xilas bikin û ji bo riyeke xwe pê xilas bikin bibînin berê xwe dan tesfiyekirina Turgut Ozal. Ya ji vê jî girîngtir, Turgut Ozal li gorî Mîsaq-î Mîllî dixwest Mûsil û Kerkûk bi awayê federal bi Komara Tirkiyê ve bên girêdan. Di vê çarçoveyê de bi Celal Talabanî re têkiliyên xwe û danûstendinên xwe xurt bûn. Bi vê armancê diyaloga bi min re pêşniyar kiribû. Bi rastî gavavêtineke dîrokî difikirî. Çawa ku tê zanîn, Fermandarê Giştî yê Jendermeyan Eşref Bitlis jî bi Turgut Ozal re li ser heman planî xwedî xebat û hewldan bû. DYE û Îsraîl li ser Iraqê xwedî pîlanên cihê bûn. Lewma nêzîkatiyên Turgut Ozal û Eşref Bitlis heta dawiyê ji bo xwe bi tehlûke dîtin û li ser vî bingehî, darbeya pêşî li ber Demirel û Çillerê (û li cem wan Erdal Înonî) vekir pêk anîn.

Sala 1993'an saleke awarte bû. Di nava mehên pêşî yên salê de bi kuştina Ugur Mumcu re reşkujiyên dest pê kirin (Kuştina Adnan Kahveci, Turgut Ozal û Eşref Bitlis, komkujiya li hotêla Madimak a Sêwazê, kuştina Bahtiyar Aydin, kuştina sîhûsê eskerên bi erebeyên sivîl vediguhestin, kuştina gelek rayedarên eskerî û sivîl) divê mirov di çarçoveya darbeyê de li wan bifikire. Ji nava dewletê şaxekî bi hêz di vê demê de xwe ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd amade kiribû. Di civîna 25'ê Gulanê ya Desteya Ewlekariya Mîllî ya MGK'ê de guftûgokirina efûya siyasî di rojevê de bû. Ev darbeyeke wisa bû ku bi kêmanî bi qasî darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê bi bandor bû û rê li ber encamên giran vekir. Jixwe ji ber rêxistina Gladîo ya bi erkên di ser qanûnan û destûrê re hatibû gurçûpêçkirin hewcedarî bi darbeyeke eskerî nedihat dîtin. Hedefa darbeya vê carê hêzên dewletê yên alîgirê çareseriyeke aştiyane bûn. Ango bi darbeya li pêvajoyê belavbûyî dîsa ev hêzên dewletê dihatin tesfiyekirin. Ev darbeya hînê jî di tariyê de ye, divê ji sedî sed bê zelalkirin. Mirov heta şaxên darbekaran ên hem di nava PKK'ê de hem jî di nava dewletê de dernexe holê, bi hêsanî riya çareseriya siyasî û aştiyane venabe.

Di dawiya vê demê de ango di dawiya salên 1990'î de gelek bûyerên tesfiyeyê li eyaletên Dêrsim, Amed, Xerza û Tolhildanê pêk hatin û divê mirov para diyarker a Gladîo'yê di van tesfiyeyan de bibîne. Heye ku li herdu aliyên sînorên bi Iraqê re tesfiyeyên bi PDK'ê re hatin meşandin li Amed û Xerza bi Şemdîn Sakik û Sait Çurukkaya re, li Dêrsimê bi Hidir Sarikaya û yên mîna wî re, li eyaleta Tolhildanê jî bi Terzî Cemal re hatibin meşandin. Ev dema ku em behsa wê dikin gelekî tevlîhev û aloz e. Ji lewra bi hêsanî mirov dikare îddîa bike ku di tesfiyeyên vê demê de gelek hêmanan bi zanebûn an bi nezanîn rol girtine. Di encama operasyona sala 1992'an û êrîşa PDK û YNK'ê de bereya berxwedanê ya Botan û Behdînanê derbeke mezin xwar. Bi teslîmiyeta wî rezîlê Osman Ocalan jêre pêşengî kir, darbeyeke bi maneya stratejîk li ber derî bû. Li dijî vê, di serî de li herêma baregeh a Rojhilata Navîn li her qadê bi berxwedana bi hosteyî û bi biryar ji serê kendalê tesfiyeyê vegeriyan. Lê ya rastî, hêzên gerîlla ku desteka mezin a gel li cem wan bû di warê stratejîk de serdest bûn. Lê tevkujiyên Gladîo'ya derve li gelek navçe û bajaran û li hundir jî hewldanên tesfiyekirina rêxistinê û gerîlla kengî bi êrîşên PDK û YNK'ê re bûn yek, her tişt berepaş meşiya. Dîsa jî serdestiya stratejîk a gerîlla karîbû dewam bikira. Lê me dikir û nedikir serokatiya taktîk bi temamî cih nedigirt, lewma ev firsenda dîrokî baş nehat bikaranîn. Ji lewra gelek zirar û ziyana hîç heq nekiribû li PKK'ê bû, ji ber van sedeman gelek serketinên mezin ên heq kiribûn ji dest çûn û xwe negihand wan. Bûyerên di vê demê de, nexasim bûyerên di dawiya vê demê de qewimîn weke pirsgirêkeke bingehîn li benda zelalkirinê ne.

**d-** Dema çaran a şerên Gladîo, di nava salên navbera 1993-1998'an de cih digire. Kesên li ber şêweyê çareseriya siyasî û aştiyane ya Ozal pêşengiya wê dikir radibûn, wexta vê dema nû didan destpêkirin hinek avantajên wan ên girîng hebûn. Jixwe bi desteka mezin a DYE û Îsraîlê ew xistibûn nava tevgerê. Serokê Fermandariya Giştî yê demê Dogan Gureş di serê sala 1990'î de dema ji Londonê vedigeriya got "Ji bo em PKK'ê bitepisînin ji me re lampeya kesk vêxistin" ya rastî bi vê gotinê îşaret bi vê destekê dikir. Îsraîl ji bicihbûna PKK'ê ya li Rojhilata Navîn bi fikar bû, lewma ewqasî destek dida Komara Tirkiyê. Îsraîlê bi israr dixwest PKK bikeve bin destê PDK'ê. Nedixwest Tevgera Kurd bi hêza xwe, serbixwe û azad bi pêş bikeve. Bi tevahî ne li dijî Tevgera Kurd bû, li dijî şêwazê PKK'ê bû. Ji ber PKK'ê têkiliyên di navbera Îsraîl û Tirkiyê de ketibûn dema xwe ya herî xweş. DYE û Ingilîstanê bi awayekî rêûresmî bi Gladîo'ya NATO'yê Tirkiyê kontrol dikirin. Bi awayekî bingehîn a pişta xwe didanê Gladîo bû. Li hundir bi bloka Silêman Demirel, Tansu Çiller û Erdal Înonî re li hev kirin û bi vî awayî hemû karûbarê pîlanên tesfiyekirinê temam kirin. Turgut Ozal di nava ANAP'ê de tecrîd kirin û bi tenê hiştin. Li Tirkiyê Menderes, Ozal û Ecevît bi heman rêbazê, bi xebatên Gladîo hatin tesfiyekirin. Ji bo kesekî yan jî saziyeke li asta girîng bîne ser a xwe, Gladîo'yê ew bi vê rêbazê tenê dihişt, tesfiye dikir û di vî warî de têra xwe bûbû xwedî tecrûbe. Eger pêncî-şêst salên dawî yên rêveberiya Tirkiyê di çarçoveya bandora Gladîo de li ber çavan neyê girtin, kes nikare bûyer an jî pêvajoyeke siyasî, ekonomîk û eskerî rast û durist ji hev derxe. Bingehê van darbe û komployan di sala 1914'an de hat danîn, lê hê berê sala 1909'an bi jitextanînaxwarê ya Abdulhemît dest pê kiribûn û xeleka wan a herî dawî jî Gladîo ye. Faşîzma Tirk a Spî bi awayekî bingehîn ji aliyê rêxistiniyên mîna Gladîo'yê yên di nava zincîra van komployan de cih digirin, bi rê ve dibin. Hêzên diyarker ev in. Yên darî çav an jî di vîtrînê de xuya dikin; nexasim siyasetvanên sivîl bi rola maskeyê radibin. Guftûgoyên sexte yên di navbera wan de jî bi armanca maskekirin û rewakirina lîstikvanên rastî yên desthilatdariyê ne, û ew lîstikvan kûr di binî de ne.

Di sala 1993'an de alîgirên çareseriya siyasî û aştiyê yên di nava dewletê de hatin tesfiyekirin û li ser gelê Kurd û PKK'ê yek ji tevgerên tesfiyekirinê yên herî mezin di dîrokê de hat meşandin. Li derdora çar hezar gundî hatin hilweşandin û şewitandin; bi mîlyonan gundî bi darê zorê û bê sedemeke qanûnî hatin koçberkirin. Malên wan, alavên wan, xanî û zeviyên wan hatin talankirin; ew pêşkêşî cerdevanan kirin. Bi hezaran gundî ji aliyê cerdevan, Hîzbûllah û JITEM'ê ve (jixwe ketibûn zikhev) hatin kuştin. Dest avêtin jinan. Zarok li dibistanên qişleyî ku mekanên îmhaya komî bûn, bêşexsiyet û bênasname dikirin; ev tinekirina komî jî piçûkxistina bi rêbazên asîmîlasyonîst a zarokan û bûyerên destavêtinê yên pirr e. Li gund û bajarên mayî jî qût û zad bi qarne û kontrolê belav kirin. Rêbaza qaçaxçîtiyê kirin destê xwe û bi tenê di dema Tansû Çîllerê de xanîmeta bi qasî bîst mîlyar dolarî (rêjeya bi belgeyan hatiye eşkerekirin) di nava xwe de parve kirin. Karsaz û esnafên durist ên Kurd nîşan kirin û hin ji wan kuştin, yên nikarîbûn îqna bikin jî xisirandin û ew birin îflasê. Yên mayî jî bi ser kontrgerîlla ve kirin; ew kirin mîna şaxên kontrgerîlla. Hejmara cerdevanên gundan derxistin sed hezarî. Çi kesê bi wan re hevkarî nekir

dijmin îlan kirin. Li dijî PKK’ê operasyona herî berfireh a di dîroka Komarê de pêk anîn. Di vê de PDK, cerdevan û îtîrafkar heta dawiyê û hem jî li rêza pêş bi kar anîn. Hêzeke bi gelekî ji hêza di şerê Yewnanan de hatî bi kar anîn mezintir di van operasyonên şer de yên demeke dirêj ajotî bi kar anîn. Bi ti pîvana şer re girêdayî neman. Cenazeyên gerîllayan jî parçeparçe kirin.

Ji hêzên ewlekariyê yên hundir zêdetir hêzên Gladîo-JITEM-Hîzbûllahê şer dimeşandin. Ev hêzên ku bi erkên di ser qanûn û destûrê re hatibûn gurçûpêçkirin, qaşo şerê manûnemanê dimeşandin. ‘Tehlûkeya Kurd’, ji tehlûkeya Yewnan û Ermeniyan qat bi qat mezintir bû. Bi rastî di vê mijarê de bûbûn paronayak. Dixwestin ji sedî sed tesfiye bikin. Li pey vê bûn û ji bo vê jî komployên gelekî taybet meşandin. Ji ber ku bi tenê der barê pirsa Kurd de rapor amade kiribû Sakip Sabanci weke hedefa reşkujiyê hilbijartin. Alparslan Turkeş bi xwe gef li Sabanci xwarin û got “Tu heddê xwe derbas dikî.” Rojnamevan neman ku ji wan re hişyarnameyan neşînin. Herî dawî di komploya li dijî min a 6’ê Gulana 1996’an de (di vê komployê de Abdullah Çatli, Sedat Bucak û Şaredarê Wêranşarê Keleşabdioglu bi hev re rol girtin) bombeyeke hezar kîloyî hat teqandin û ev ji nîşaneyên vê demê ne. Di nava Artêşê de dubendiya di nava koman de bêhtir kûr bû. Bi Serokê Fermandariya Giştî yê wê demê Îsmaîl Hakki Karadayî re (1994-1998) beşekî artêşê hewl da mesafeyekê bixe nava xwe û Gladîo’yê û ev jî encama vî şerê dîn ê vê demê bû. Ew bi xwe jî bêtesîr kiribûn. Şefên Gladîo’yê piştî tesfiyekirina Ozal û ekîba wî bi temamî bûbûn xwediyê desthilatdariyê. Yên darîçav, rola wan ji fîguraniyê wêdetir ne tiştekî din bû. Di sala 1998’an de Huseyîn Kivrikoglu bû Serokê Fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk. Li Qibrisê bi sîlehê êrîş birin ser Kivrikoglu. Gulle li albayê hema li pişt wî ket û hat kuştin. Kivrikgolu ji vê êrîşê hema firtî firtî filitî. Ev bûyer jî yek ji wan bûyerên girîng e ku pê diyar dibe, kengî kesekî li gorî xwe nebînin çawa bi çavkorî êrîş dikin.

Mîna di demên sala 1985-1993’an de, ji bo di vê demê de jî şerê gel ê şoreşgerî ji tempo û domdariya xwe nekeve, min qebûl kir ku ez baregeha li Rojhilata Navîn weke taktîkeke sereke heta dawiyê bi kar bînim. Min yeqîn dikir ku ev xebateke herî bi bandor a taktîkî ye. Dîsa ji hezarî zêdetir namzetên gerîlla yên me ew her sal perwerde kirin û pêdiviyên wan bi tevahî tedarik kirin, me pirraniya wan gihandin baregehên wan. Me ji pêkanîna ti baregeha nava welat dest nekişand. Hinek qanalên din jî hatin vekirin. Zirar û ziyana me ya di şer de mîna qelemkirin û kesixandina daran bû ango bandora wê neyênî li me nedibû. Berevajî dara azadî û serxwebûnê ji her demê bêhtir geş û mezin dibû. Ji şerê îdeolojîk û polîtîk ê pêl bi pêl hat meşandin gavek jî paş ve nehat avêtin. Lê dîsa jî me kir û nekir, me nikarîbû em xwe bigihînin wê asta serketinê û rewşa tewazunê. Çiqasî hewl bida bila bida şerê Gladîo’ya derve di vê de ne diyarker bû; ya diyarker ew bû, serokatiya taktîk, fermandariya gerîlla tam cihê xwe nedigirt. Herçiqasî di vê de bandoreke girîng a tesfiyekar û sîxurên di nava têkoşînê de hebû jî pirsgirêka bingehîn ji fermandariyê bû. Şer hem ji aliyê çînî ve hem jî ji aliyê kesayetê ve herî zêde di vê qadê de bandora xwe nîşan dida. Herçiqasî hewldana reşkujiyê ya di 6’ê Gulanê de bi ser neketibe jî

Zeynep Kinaci ya bi nasnav Zîlan li naveroka bi tehlûke ya vê hewldanê baş varqilîbû di 30'ê Hezîranê de li Dêrsimê çalakiya fedaî pêk anî û bi vê çalakiyê pêşî li taktîka sala 1996'an û riya serketinê vekir. Ji ber ku taktîka hundir xetimîbû û ji derve îmha dihat ferzkirin.

Min di vê demê de pirr eşkere dît ku şerên gelan di heman demê de şerên yeman ê çînî ne. Min di analîzên kirî de cihekî berfireh da vê rastiyê. Mîna di serê sala 1990'î de, dîsa di dawiya wê de derfetên serketina stratejîk bi zêdeyî hebûn. Hewldanên ji bo diyalogê yên bi însiyatîfa Turgut Ozal dest pê kiribûn di sala 1997'an de bi Serokwezîr Erbakan û bi şaxekî ji nava artêşê re dewam kirin. Em dîsa gelekî nêzî çareseriya siyasî û aştiyane bûbûn. Ez yeqîn dikim ku dîsa heman Gladîo'yê dest avêt meseleyê û bi hêzên hundir û derve yên li pişta wê ket nava tevgerê û lewma şensê çareseriya siyasî û aştiyane ya ji van diyalogan dihat payîn nehat nirxandin û firsend nehat dayîn. Hem di asta Serokwezîrtiyê de hem jî di asta Serokatiya Fermandariya Giştî de ji bo çareseriyeke siyasî û aştiyane niyet hebû, lê tevî vê, firsend nehat dayîn, û ev jî gelekî baş û eşkere nîşan dide ku NATO, Gladîo û şaxên wê yên hundir li ser rejîma Tirkiyê çiqasî bi bandor in. Em behsa sîstemekê dikin ku mîna kabûsê ketiye ser Komarê û lê piçikî ye.

Di Îlona 1998'an de hêzên em behsa wan dikin gef li Sûrî xwarin ku bi ya wê nekin wê pêre şer bikin. Bi vê xwestin, dawiyê li statuya stratejîk a baregeha me ya li Rojhilata Navîn bînin. Di gihiştina vê nuqteyê de rewşa stratejîk a qadê û rewşa min a stratejîk xwedî rolên sereke ne. Lê bi ya min, sedema bingehîn ew e, çareseriya siyasî û aştiyane careke din bi awayekî ciddî ketiye dewreyê. Gelekî berê jî karîbûn ji aliyê eskerî ve bi ser Sûrî de biçin; di vê mijarê de astengeke ciddî li pêşiya wan tinebû. Ji bo vê destwerdanê hilbijartina vê demê û salê têkiliya xwe bi îhtîmala çareseriya siyasî û aştiyane re heye. Bi kurtî, dixwazin biryara 1920'an hê jî li ser hukim bihêlin. Ji bo Rojhilata Navîn û Tirkiya ji bo wan gelekî girîng di kontrola xwe de bigirin, bêçareserîhiştina pirsgirêka Kurd ji bo wan bi roleke heyatî radibe. Eger mirov nêzîkatiyên gelek hêzên derve û hundir ji bo Kurdan û PKK'ê di çarçoveya van parametreyan de binirxîne, mirov ê karibe baştir pêşiya xwe bibîne. Sala 1998'an diviyabû ji bo min bi rastî bibûya qonaxeke nû. Min di analîzên xwe de jî gelekî behsa vê rewşa her xwe dugêsinî dikir kiribû; ya rastî, şerê gerîlla li sêbereya Gladîo-JITEM-Hîzbûllahê aliqîbû û ji bo em li dora singê xwe nezîviriyana, diviyabû em ji nava pencê vê sêbereyê derketana, naxwe me nikarîbû şer derxista asteke jortir. Di vê mijarê de kêmasiyên hundir hê jî diyarker bûn. Eger çareseriya siyasî û aştiyane nebûya, bi tenê riyek dima, ew jî şerê gel ê şoreşgerî bû ku diviyabû me derxista asteke jortir, naxwe ne rast bû ku em li riyeke din bifikiriyana.

**C- LI CEM KURDAN ŞERÊ ŞOREŞGERÎ û AFIRANDINA MÎLÎTANAN**

Pirsgirêka bingehîn a PKK'ê di qonaxa komê de pêşengiya îdeolojîk û polîtîk bû. Naveroka vê jî ji xebatên têgînan û kadroyan pêk dihat. Komê bawer dikir ku çareserkirina pirsgirêka Kurd ne bi tenê pirsgirêkên Kurdan, bi tevahî pirsgirêkên Tirkiyê û heta ji bo çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên civakî yên Rojhilata Navîn jî girîng e, û xwedî rola kilîtê ye, lê kapasîteya îdeolojîk û polîtîk a komê ji vê dûr bû. Hejmara endamên komê ji hejmara tiliyên destan ne zêdetir bû, nikarîbûn debara xwe bikin, virde wirde ber bi bayê diketin û ji zû ve felekê yan jî şaristaniyê sîleya xwe dawişandibû rûyê wan, îddîayên wan ên ji bo pêşengiya îdeolojîk û polîtîk di wê demê de belkî bi tenê xeyalek bûya. Bêguman bêyî xeyalan mirov nikare rê biçe; lê bi tenê bi xeyal û hêviyan jî jiyaneke rast û azad pêk nayê. Di deh salên pêşî de şêweyê xebata me ya bingehîn peydakirina têgîn û kadroyên bersiv bidana û têra me bikirana bû. Bi gotineke din, mîlîtaniya îdeolojîk û polîtîk bû. Me bi xetên sereke hewl dabû çîroka vê bînin ziman.

Me gav avêtibû Rojhilata Navîn, ev dever qadeke pîroz a hîcretê bû, lewma maneyeke xwe ya cuda hebû. Hemşehriyê me Brahîm jî ji Ûrfayê li ser vê riyê derketibû û çîroka wî di pirtûkên hersê dînên yekxwedayî de çîroka herî girîng e. Çiqasî balkêş e, piştî sêhezarûpêncsed salan bi heman sedeman, li ser heman riyê û hema hema bi qebîleyeke bawermendan a bi heman hejmarê ber bi heman mekanî ve em ketin ser rê. Dîsa li heman qadê me konên xwe vegirtin. Şerên Brahîm ên li van deveran û encamên wan têne zanîn. Ya rastî, bûyerên ji wan re şerê dînî tê gotin, bi şêweyekî din vegotina îdeolojîk û polîtîk e, ango bi şêwazekî dînî anîna ziman e. Di Ahda Qedîm de behsa gulaşa kurê Brahîm Yaqûb a bi Xwedê re tê kirin. Navê Îsraîl bi xwe jî ji 'El'ê tê yanî kesê bi Ellah re gulaşê dike. Zimanê şer e, û têkoşîna îdeolojîk îfade dike. Têkoşîna polîtîk a li dijî arîşe û gengeşiyên qebîleyên li diyarê Kenanê tîne ziman.

Piştî Brahîm li derdora bi sêsed salan, vê carê Mûsa yê ji qebîleya Ibrî re pêşengî kir, ji Misrê ber bi heman mekanî ve, ber bi diyarê Kenanê ve gav avêtiye. Dema behsa bûyera Mûsa tê kirin ji ya Brahîm bêhtir berbiçav hatiye îfadekirin. Maneya gavavêtina bi Mûsa tê sembolîzekirin ji ya Brahîm cudatir e. Êdî ji lêgerîna îdeolojîk û polîtîk bêhtir behsa şerkerî û renggirtina karekterê şerkeriyê tê kirin. Qebîleya Ibrî xweda û dînê xwe ango nasnameya xwe ya îdeolojîk û polîtîk berî hingê bi sêsed salan bi dest xistiye û salên dûrûdirêj xurt kiriye. Tişta Mûsa lê digere dînê nû û xweda nîne; tişta lê digere îlham e, ew jî Deh Ferman e. Çîroka girtina wî ya vê fermanê jî bi zimanê demê yê serdest û dînî tê gotin. Gotina 'fermanê' gotineke eskerî ye û bi fermandariyê re têkildar e; ango fermanan dide qebîleyê, qebîleyê ji bo nîzama şer amade dike. Li gorî awayê gotina Tewratê, piştî ku Mûsa ji Misrê derdikeve çil salên wî bi şerên li nava Çola Sînayê derbas dibin û dema li keviyên Erîhayê (li Filistîna îro bajarek) xwe ji fetihkariyê re amade dike bi wefata wî re demek li dawiyê dimîne. Ango ziman an jî şêwazê dema vê têkoşîna qederê 1300 salan B.Z. pêk hatî, şer e. Bi qasî ku em dikarin Tewratê şîrove bikin, di vê çîroka çil salan de gelek tişt

hene ku tiştên roja îro bi bîra mirov dixin. Rizgariya Brahîm ji Nemrûdê hegemon (qral-xweda) bi têkoşîneke dijwar a îdeolojîk û polîtîk û di berdêla Hîcretê de pêk hatiye, lê rizgariya Mûsa ji Firewnê qral-xwedê bi rêbazeke têkoşînê ya şêweguhertî, bi şerkeriya qebîleya Ibrî ya mîlîtan û bi sîlehê pêkan bûye. Şer dîsa ji bo qada pîroz tê meşandin. Pîroztiya qadê ji ber statuya wê ye.

Ji derketina holê ya Brahîm heta bi roja me ya îro hema hema tevahiya dîroka şaristaniyê dewrûbera Qudsê ji hêzên hegemonîk re bi rola herêma tampon rabûye. Serê pêşî ev rola xwe di navbera şaristaniyên Sumer û Misrê de pêk aniye. Herêm di dema 3000-2000 B.Z. de ji bo herdu hêzên hegemon û herdu şaristaniyên sereke qadeke xweser, marjînal û li seriyekî ye. Komên qebîleyan ên li herêmê bi bazirganiya bi herdu şaristaniyan re dewlemend dibûn û bi vî awayî tovên şaristaniya sêyemîn direşandin. Qebîle di dema derketina holê ya Hz. Brahîm de (1700-1650 B.Z.) van xisletên xwe diparêzin. Gelek komên baweriyê û qebîleyên xweser rengekî cuda, xweser û pîroz didin herêmê. Her koma (di vê demê de şêweyê bingehîn ê koman qebîle ye) ku dixwaze ji îfadeya dînî ya zordariya Firewn û Nemrûdên dema xwe rizgar bibe, hêza qebîleya xwe ya xweparastinê pêk tîne, hem jî tevî vê hêza xweparastinê ya qebîleyê dînê wê yê nû jî ava dike. Tewrat bi awayekî bingehîn çîroka têkoşîna dînî ya xweparastina van qebîleyan a li vê qadê ye. Belkî jî ya Brahîm û Mûsa kirî ew e, li gelek çîrokên bi heman rengî yên hezar salan berê li heman qadê pêk hatine modela xwe zêde kirine.

Îsa bi qebîleya xwe ya bawermendan a piçûktir bû (koma hewariyan a duwanzdeh kesî) di serê Mîladê de tişta pêk anî versiyoneke din a heman çîrokê ye. Hedef careke din Quds e; fetihkirina dewrûbera pîroz e. Cudahiya wî ya girîng ji Brahîm û Mûsa ew e, Hz. Îsa hem ji aliyê dînî ve hem jî ji aliyê siyasî û eskerî ve şefê qebîleya Ibrî nîne. Weke kahîn û koçekekî gelekî xizan bi armanca reformê di dînê Cihû yê xwedî hiyerarşî yê wê demê de bike, gavê diavêje. Hewl dide hem dîn û hem jî qebîleya Cihû ya bi cihbûyî parçe bike. Yek ji şoreşên civakî ya herî pêşî û ciddî ya di dîrokê de pêk tê. Bi Spatakus re hevdem e. Ya Spartakus dixwaze bi awayekî eskerî li Romayê bike û bi ser bikeve (salên 70’î B.Z.) Îsa Mesîh li dewrûbera Qudsê hewl dide bi koma îdeolojîk û şoreşgerî bike û dixwaze Qudsê fetih bike. Di wê demê de dîsa du hêzên sereke yên hegemon li ser herêmê xwe li hev radikişînin. Hegemonên Roma û Persepolîsê timûtim bi seferan diçin ser herêmê û hewl didin hevkarên xwe lê bi cih bikin. Piştî Skender (B.Z. dawiya salên 300’î) qralên Helenîstîkî jî xwedî rewşeke bi heman rengî ne, û di vê çarçoveyê de li dijî hev têdikoşin. Îsa û koma xwe hem li dijî hegemonyadariyê hem jî li dijî hevkartiyê bi awayekî dikevin nava têkoşîna serxwebûn û azadiyê. Lê li gorî şert û mercan vê tokêşîna xwe bi awayekî îdeolojîk dimeşînin ango bi gavêtineke nû ya dînî pêk tînin. Jixwe encamên vê bûyerê yên heta roja me ya îro têne zanîn.

Hz. Muhammed ê em wî ji nêz va nas dikin, di destpêkê de gavavêtina wî hedefa xwe Quds e. Di Quranê de bûyera Mîracê (derketina ezmên, dîtina Xwedê ango pêkhatina dînê nû) li Qudsê pêk

tê. Jixwe hîcreta ber bi Medîneyê ve jî armanca xwe Quds e. Qibleya nimêjên pêşî Quds e. Qebîleya Hz. Muhammed cuda ye. Herçiqasî xisletên wê yên dişibin qebîleya Ibriyan hebin jî (xisletên Semîtîk) ew bi xwe qebîleyên Ereb ên wê demê (P.Z. serê salên 600'î) li dewrûbera Mekke û Medîneyê weke hêza bingehîn dinirxîne. Di çarçoveya rêûresma Brahîmî de weke dîn ango di çarçoveya têkoşîna îdeolojîk de versiyona sêyemîn pêk tîne. Çarçoveya wê ya îdeolojîk bêhtir civakeke bazirgan ji xwe re dike armanc. Li cem Brahîm û Mûsa hiyerarşiya jor a qebîleyê mohra xwe li dîn didin, li cem Hz. Îsa jî xizanên qebîleyê di dîn de bingeh in. Li cem Hz. Muhammed jî berjewendiyên beşa bazirganên navîn ango civaka çîna navîn mohra xwe li dînê nû didin. Cudahiya sereke ya gavavêtina Hz. Muhammed ji yên beriya xwe ew e, têkoşîna wî ya îdeolojîk, polîtîk û eskerî yekpare û hevgirtî bû. Di derketina holê ya Îslamî de yekparebûn û hevgirtina îdeolojîk, polîtîk û eskerî diyardeyek e ku em di kêm dînan de dibînin. Pirr di demeke kin de xwe gihand gelek serketinên mezin û ev bi vê rastiyê ve têkildar e. Ev serketineke welê ye ku mirov di şoreşên hemdem de jî mînakên wê kêm dibîne. Dema pêşî derket holê ji bermahiyên qebîleyan, ji kesên aware, jineke bazirgan û koleyekî pêk hatibû, lê di demeke pirr kin de (li derdora çil salî) sê împaratoriyên gerdûnî ango Bîzans, Sasanî û Hebeşî hilweşandin û ev ji hêza wê ya yekpare û hevgirtî pêk tê ku weke hêza îdeolojîk, polîtîk û eskerî ya civakbûna nû derket holê. Xeleka dawî ya gerdûnî ya rêûresma Brahîmî pêk tîne.

Gerdûnîtiya kapîtalîst bi şerê li dijî sê versiyonên gerdûnî yê Brahîmî (Mûsewîtî, Îsewîtî, Muhammedî) meşand hegemonya xwe ava kir. Bêguman, eger nirxên hersê gerdûnîtiyên Brahîmî nebûna, kapîtalîzm nikarîbû bibe xwedî nirxeke gerdûnî. Di bingehê kapîtalîzmê de serdestiya çanda şaristaniya maddî –ji dema şaristaniyên Sumer û Misrê kom bûye –li hemberî çanda şaristaniya manewî (ruhban, dînî) heye. Herdu çand jî têkiliya xwe bi bajar, çîn û dewletê re hene. Di navbera wan de timî li ser desthilatdarî û îstîsmarê têkoşînek hebûye. Heman rêûresm îro jî bi awayekî aktuelbûyî dewam dike. Ev têkoşîn bêhtir bûyerên global diyar dikin û mirov dikare vê ji xwelihevrakişandina Îsraîl û Filistînê fêhm bike.

Ev tê wê maneyê ku piştî salên 1980'î zemînê me yê derketina holê rastiyeke xwe ya dîrokî heye. Em li ser şopa vê rastiya dîrokî meşiyane. Mirov dikare ji analîzên me heta niha kirî (ji rastiya me ya îdeolojîk) pirr bi hêsanî fêhm bike ku hêmanên modernîteya kapîtalîst hem ji aliyê bêrehmiyê ve hem jî ji aliyê hejmarê ve ji Nemrûd û Firewnên serdema destpêkê qat bi qat zêdetir in. Ez naxwazim şaş bê fêhmkirin, lê deh salên pêşî yên têkoşîna me ya îdeolojîk a navenda wê Enqere, bi awayekî balkêş dişibe têkoşîna îdeolojîk a Brahîm, Mûsa û Îsa di demên xwe yên pêşî de meşandine. Nexasim deh salên pêşî yên têkoşîna îdeolojîk a Hz. Muhammed li Mekkeyê meşandî bi awayekî gelekî balkêş dişibe salên me yên pêşî û mirov nikare vê ji nedîtî ve bê. Ew li dijî firewn, nemrûd û împaratoriyên dema xwe derketin, lê me li dijî hêmanên modernîteya kapîtalîst ên hezar qatan ji wan xirabtir ên ji wan ketî, gav avêt. Têkoşînên civakî timî dîrokî ne. Ti têkoşîna civakî nîne ku reh û kokên xwe yên dîrokî kûr bernede. Jixwe me

zemînê xwe yê civakî-dîrokî yê em xwe disipêrinê, bi vê parêznameyê eşkere kir û ev jî heqîqet bi xwe ye. Xulase, em jî di nava herikîna çemê sereke yê civakî-dîrokî de weke milekî herikîne.

Divê mirov li hemberî analîzên di nava rastiya rojane de radihêjin civakê û dinirxînin bi baldar bin. Sosyolojiya modernîteya kapîtalîst, rastiya civakî di 'kêliya niha' de difetisîne. Têkiliya civakê bi dîrokê, bi rabihuriyê re bi awayekî bêrehm, di heman demê de bi navê zanistiyê bi maske, bi derew û bi jirêderxistineke mezin, qut dike. Dînê hatiye modernîzekirin jî li ser şopa heman sosyolojiyê dimeşe; şêweyekî bi maske yê dîn ê vê sosyolojiyê ye. Bi vî aliyê xwe, li hemberî heqîqetê (rêûresma dîn jî di navê de) ji sosyolojiyê (modela pozitivîst) bêhtir korker û derewker e. Ez dixwazim vê bibêjim: Piştî sala 1980'î rewşa me ya şer a li qûntara Şêx Cebel dest pê kir, têkoşîneke maneya xwe gelekî mezin e, û li ser bingehekî civakî-dîrokî ye. Ji têkoşîna Brahîm El Xelîl, têkoşîna Mûsa ya Sînayê, ji têkoşîna Îsa ya li Qudsê û têkoşîna Muhammed a li Medîneyê şopên kûr hene. Bi vê jî qîma xwe nayîne; ji şopên Bruno, Erasmus, Babeuf, Bakunîn, Marks, Lenîn û Mao bi tesîr dibe. Ji şopên Zerdeşt, Buda, Konfuçyus û Sokrates bêpar namîne. Dîsa xwe ji şopên xwedawend Starê heta bi Înannayê, ji Kîbele, Meryem, Fatma û heta bi Rosayê mehrûm nake û para xwe digire. Bi qasî ku karibe hilgire, xwe bi tevahiya rastiyên heqîqeta civakî xweş û bar dike.

Me di serê Tîrmeha 1979'an de ji navçeya Ûrfayê Pirsûsê gav avêt û em derketin. Mirov ji çîroka vê gavavêtinê dikare gelek tiştan hîn bibe. Nexasim berî derketinê di serê Nîsanê de tevî Ferhat Kurtay veqetîna me ya ji Amedê, rojên me yên li Qoser û gundê Xursê hêjayî bîranînê ne. Şehîdê me yê mezin Ferhat Kurtay, bêguman îfadeya abîdewarî ya van rojên manedar e. Di dawiya Biharê de ji Qoserê gihiştina me ya Ûrfayê, tevî serhatiyên me bîranînên bi heyecan îfade dikin. Her nuqteya me serî lê daye maneyeke xwe ya dîrokî heye û xisletên xwe yên hêjayî behskirinê hene. Vê carê yê li cem min şehîdê me yê mezin Mehmet Karasungur e. Em li Ûrfayê bi qasî çil rojî man û hema hema bi temamî dişibin rojên dawî yên Brahîm. Em di ser şopa wî re derbas bûn. Me laneta Nemrûd heta bi mejiyê hestiyên xwe his dikir. Sêyemîn şehîdê mezin ê pêvajoyê Ethem Akcan e, rewşa wî ya derûnî ya hîç nayê jibîrkirin rewşa berbiçav a pîroziyên rabihurî bû. Piştî gavavêtin û derketinê çar pênc salên wî dilsoziya rastî, xebatkarî û xebat temamkirinê sembolîze dikin. (Kêm xwendibû, lê xwe bi xwe baş perwerde kiribû.) Niqrîska wî ya dawî jî îspata vê rastiyê bû.

Dema me têkilî bi Filistîniyan re danî, modernîteya kapîtalîst ji zû ve ew rizandibûn. Lê ne ku surên şoreşgerî ji ber wan ranedibûn. Di eskerîkirina PKK'ê de para wan nayê înkarkirin. Lê mixabin, vê têkiliyê nikarîbû zêhniyeta kapîtalîst a li cem wan bişikîne. Berjewendiyên rojane yên demkurt, têkiliyeke diyalektîkî ya karîbû maneya wê gelekî mezin bibûya stewr û bêber hişt. Fermandarên Filistînî qebîleya me ya şer a bi zor û zehmetî me civandibû, dixwestin bi statuya eskerên bi pere ya çêkiribûn bi kar bînin. Me rê neda vê yekê. Me ji giyan û berxwedana xwe ya

şoreşger hîç paşve gav neavêt. Me ji şoreşgerên Tirk re çi digot me ew jî ji Filistiniyan re got: Bi gotina Kemal Pîr “Heta şoreşa Kurdistanê nebe, ne rizgariya gelê Tirk, ne yê gelê Ereb û ne jî ya gelekî din ê Rojhilata Navîn pêk tê.” Bi vî awayî wê ji me bihata em bi rola xwe ya dîrokî û enternasyonalîst rabin. Dîsa jî me li wê qadê di asta mînakan de bersiv da erk û wezîfeyên xwe yên şoreşgerî. Tevî ku li dijî Îsraîlê pêngaveke me ya taybet tinebû jî di sala 1982’an de kengî Îsraîlê Libnan dagir kir, me jî li vir a para me ket rakir û di encama berxwedanên destanwarî de me deh şehîd dan. Bîranîna van şehîdên me çavkaniyek bû ku bîst salên me yên li wir xwedî û bi hêz kir. Ew ti car nayên ji bîrkirin û bîranînên wan nabe ku piçûk bêne dîtin. Ev şehîdên me yên nemir nirxên me yên rastî yên enternasyonal in.

Hebûna me her ku diçû mezin dibû. Navbera me bi Kurdên Sûrî û Libnanê re zû xweş bû. Ev Kurd bi giranî di encama Şerê Cîhanê yê Yekemîn de ji girseya sereke ya Kurd dabeş bûbûn û parçeyek ji wan bûn. Li xezeba dewletên netewe qewimî bûn, bi awayekî ew neçarî jiyana penaberiyê kiribûn. Kêmtir asîmîle bûbûn û haya wan ji Kurdîtiya wan hebû. Ji Kurdên tîpîk Kurmancan pêk dihatin. Her ku kapîtalîzm pêşde diçû ew xizan dibûn. Ev xisletên wan bi lez ew dahf didan nava qebîleya me ya şer. Gelekî girîng bû ku jiyaneke bêhtir pêşketî ya eskerî û bi sîleh nas dikirin. Di nava Tevgera Azadiya Gelê Kurd de bi şêweyê heyî cara pêşî perwerdeyên komî pêk dihatin. Lê dîsa jî her ku diçû pirsgirêkên kesayetê yên xwe ferz dikirin derdiketin holê. Ya rastî, ya li ber çavên me diqewimî, ji yeqînên me jî wêdetir kûr bû û der barê pêkhatin û nûbûna civakî de bû. Mîna salên pêşî yên Îslamiyetê bû; ji qebîleyên cihê mirov hatibûn, pirranî mirovên bêserûber û ji hevqutbûyî bûn. Ji van mirovan avakirina civakeke nû û mînak pêk dihat. Jixwe em ji Tewratê zanin ku Mûsa ji bo ezbetên qebîleya Ibrî disîplîne bike çiqasî zor daye wan û bi ser wan de çûye. Pêkanîna çandeke nû ya civakî û ji çanda qebîleyan a ji rêûresmê bihurîn ewqasî zehmet e, mîna ku mirov bi awayekî bombeya atomê ya civakî pêk bîne. Piştî çarmîxkirina Îsa demeke dirêj hebûn û tinebûna hewariyên wî wekhev bûn. Ji bo ku mirovên çanda civakî ya berê jî nikarîbû wan biparêze, mirov wan li hemberî terora dijwar a Gladîo li ser piyan bigire hewldan û qebîliyeteke taybet divê. Ji bo mirov karîbûya wan di sînorên asê yên dewletên netewe re derbas bikira, ji wan re nasname û devera mayînê peyda bikira û zikê wan têr bikira bi serê xwe pirsgirêkên mezin bi xwe re dianîn. Li dijî şîddeta herî dijwar a serdemê ango terora Gladîo’yê pêkanîna rêxistineke mîlîtan û şerker hêzeke awarte ya îqnakirinê, hêvîdayînê û di nava vê de pêşdebirina bîrewerî û baweriyê ferz dikir. Çepgiriya Tirk û berxwedaniya gel a ev ji wan nehatibû û nikarîbûn vê qabîliyetê nîşan bidin bi lez ji hev belav bûbûn.

Ez dema li welêt bûm, herî dawî min **Riya Şoreşa Kurdistanê** nivîsî bû. Ev pirtûk weke manîfestoyekê bû. Bi awayekî giştî, bi armanca rê nîşanî ciwanan bide û perspektîfên îdeolojîk bide wan hatibû amadekirin, jixwe ji vê jî wêdetir nikarîbû bi roleke din rabûya. Girîng bû, lê qîm nedikir. Li pêşiya me pirsgirêkeke zor a mîna jiyana eskerî ya demdirêj hebû. Ji bo vê jî pêdivî bi

perspektîfên nû hebû. Ji bo vê jî weke gava pêşî di sala 1981'ê de ji ber kasetên analîzan me pirtûkeke bi navê **Li Kurdistanê Pirsgirêka Kesayetê, Jiyana Partiyê û Xisletên Mîlîtanê Şoreşger** amade kir. Bi heman awayî, ji bo em tiştên di destê rêxistinê de bi rêkûpêk bikin û bidin ser hev di Tîrmeha 1981'ê de me Konferansa Yekemîn pêk anî ku ji bo min îmtîhaneke girîng bû. Ji vê civînê re **Rapora Polîtîk** a min pêşkêş kir bi awayekî nivîskî heye. Ji bo fêhmkirin û serwextbûna li wê demê belgeyeke baş e. Ji bo birêkûpêkirin û anîna cem hev a rêxistinê ev konferans gaveke ciddî bû. Bîranîna wê beşekî girîng ê jiyana min e. Lê pirsgirêk ewqasî zêde bûn, diviyabû mirov weke dînamo çalakî, rêxistin û îdeolojî çêkira û pêk bianiya. Me komên pêşî xistibûn rê şandibûn, li Lolan û Xakûrkê dest pê kiribûn bi cih dibûn. Diviyabû şerê gerîlla bihata destpêkirin. Ji ber ku qêrînên ji zindana Amedê bilind dibûn, em neçar dikirin ku em demekê beriya demekê bikevin nava tevgerê. Tam di vê demê de min xebateke berfireh û bi îdeal bi navê **Li Kurdistanê Rola Zorê** nivîsî. Vê carê alîkarê min Duran Kalkan bû. Ev nirxandin karîbû ji bo demê û koman bi rola îqnayê rabûyana. Çalakiya Rojiya Mirinê ya Mezin bi şehadeta Kemal Pîr, M. Hayrî Durmuş, Akif Yilmaz û Ali Çîçek bi encam bûbû û ji sedî sed me dixwest em bersivekê bidin vê çalakiyê. Lê helwesta komên li nava welêt hê ji destpêkê ve bersivdana me dereng xist. Ji ber ku koma berpirsiyar tiştên hatibûn kirin dugêsinî kirin, firsenda dîrokî ya wê dem û kêliyê nenirxand û bi tevgerên bi navê keşfê yên tewş em dereng xistin. Eger me di dema xwe de bersiv dabûya, belkî jî me zû pêşî li darvekirinan bigirta û nehişta ku rojiya mirinê bi mirinê encam bibe. Ji lewra sala 1983'an weke saleke ji destçûyî tê bîra min.

Li gorî min Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an ji sedî sed diviyabû ji Bihara 1983'an ve bi awayekî bêhtir berfireh bihata destpêkirin. Amadekariyên me derfet û îmkan didan gavavêtineke bi vî rengî. Yek ji derbên ciddî û pêşî li plansaziya me ya gerîlla ket, ev derengmayîn û tevgerên keşfê yên bêberpirsiyarî, aware û tewş bûn. Yên ji vê rewşê berpirsiyar, erkeke wan a şoreşgerî ye ku vê pêvajoyê zelal bikin. Ya rastî, me hewl da destwerdaneke bêhtir bi rêxistinî di Havîna 1980'î de bi koma bi pêşengiya Kemal Pîr pêk bînin. Bi vê destwerdanê, bêyî ku pêdivî bi baregehdanîna li Başûrê Kurdistanê bê dîtin armanc yekser xwe gihandina heta bi Dêrsimê bû. Kemal Pîr bi awayekî xweber û bi awayekî diviyabû nebûya hat girtin –Girtina wî bûyereke pirr bêyom bû -, eger ev girtina wî nebûya rastiya fermandariyê ya PKK'ê wê di rewşeke din de bûya. Ti hevalî nikarîbû şûna wî bigire. Dîsa di van salan de Mazlûm Dogan û M. Hayrî Durmuş li pey hev hatin girtin. Pirr bi hêsanî pêşîgirtina van girtinan jî pêkan bû û hîç hewce nedikirin. Lê ya rastî derbên xedar bûn, me xwaribûn. Dilê me dabeşî çend parçeyan bûbû. Li aliyekî, me hewl dida em di nava kaosa Rojhilata Navîn de rêxistineke şoreşger mîlîtan û şerker biafirînin û ji gerîllayên me gihandibûn nava welêt hêviyan bikin, li aliyê din jî me xwe li qêrînên ji zindana dihatin radigirt û ji bo vê diviyabû mirov mîna perwaneyê li dora agir bizîvire. Ji bilî Ethem Akcan ên ku bibûna alîkar pirr kêm bûn. Her kesî bi awayekî xwe ferz dikir.

Şefên Dev-Yolê yên li Ewrûpayê, ji bo biçin Ewrûpayê û rêxistina xwe tesfiye bikin gelekî hewl dan û mîna ku vê têrê nekiribe, bi armanca hêza liberxwedanê ya PKK'ê bişikînin giraniya xwe dabûn ser PKK'ê. Bi qasî ku tê fêhmkirin, bi kêmanî îhtîmalek e ku wezîfeya wisa danîne pêşiya wan. PDK, bihêlin ku bibe alîkar, rola pêşîgirtina li Şoreşa Bakurê Kurdistanê bi israr dewam dikir. Di sala 1926'an de bi Peymana Mûsilê biryar hatibû dayîn di berdêla destkişandina ji Bakurê Kurdistanê de wê PDK û malbata Barzaniyan bihata destekkirin. Bi qasî ku xuya dikir, vê polîtîkayê dewam dikir. Rola dabûn PDK'ê ew bû, destek bide kirinên pasîfîkasyonê yên li ser Kurdistana Îran û Tirkiyê. Li ser vî bingehî wê li Kurdistana Iraqê ji bo tevgera xwe ya otonomiyê destek bigirta. Em bi van rastiyên hişk ên polîtîkayê re rûbirû mabûn. Şerê Îran û Iraqê rê li ber rewşeke nû vekiribû, lê serokatiya hundir nikarîbû vê rewşê binirxîne. Bi ser de jî me ji pêşengên neqane yê Berxwedana Hîlwan-Sêwregê (1978-1980) Mehmet Karasungur di navbeynkariyeke bêmane ya PDK-YNK'ê de yan jî di navbeynkariyeke pêk nayê de şehîd da. 2'ê Gulana 1983'an me tevî wî Îbrahîm Bîlgîn bi awayekî hîç hewce nedikir, bi awayekî bêyom û bi awayekî ne zemanê wê bû, ji dest da. Karasungur tevî Kemal Pîr ji wan hevalan bû ku belkî çarenûsa gerîlla biguhertana. Di serî de Mazlum Dogan, Kemal Pîr, M. Hayrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Ferhat Kurtay nûçeyên şehadetên hevalan ji zindanan her ku hatin, me ti çare nedidît ji bilî ku em bêhtir zorê bidin dil û mejiyê xwe. Roj roja xwe ragirtina li êş û azaran bû.

Bi derengî be jî Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an pêk hatibû. Kengî nûçeya wê hat bihurandina roj û saetan mesele bû. Encamên wê girîng bûn. Cara pêşî bû ku çalakiyeke eskerî bi rêkûpêk hatibû plankirin û pêkanîn, derî li bûyerên rewşê ji binî ve biguherin hatibû vekirin. Ya girîng ew bû, mirov pêngav mezintir bikira û domdar bikira. Me giraniya xwe gelekî da ser vê wezîfeyê. Me ji bo her qadê kom amade kirin û yedekê wan pêk anîn. Sala 1985'an karîbû bibe sala pêngaveke mezintir. Nexasim me yê bi qasî Botanê giraniya xwe bidaya eyaletên Dêrsim û Tolhildanê. Me hêzên xwe yên Amed, Xerza û Serhedê xistibûn nava tevgerê. Ji ber ku heval Sabrî Ok nava Zivistanê bi awayekî bêtalih hat girtin û bi sedema şehadeta komên pêşeng ên hevalên Hacî (Sabri Gözübüyük) û Xidir ên li Hewengê, tevgera me ya ji bo Semsûrê pêk nehat. Kuştiyên me yên em pê biêşin çêbûn. Hevalê me Selîm ê di ser Erebanê re çû tevî koma xwe li ser heman riyê hat kuştin. Tevî vê jî hêzên me heta dawiyê li deverê man. Herçiqasî hêzên gerîlla li Dêrsim, Amed û Xerza di asteke jor de hebûna xwe nîşan nedan jî yekîneyên wan hebûna xwe timî parastin. Komên li Serhedê li Çiyayê Agirî bi tevger bûbûn. Hemşehriyê min ê ciwan ku min ew nas dikir, Mehmet Erturk li vir şehîd bûbû. Nûçeyên şehadetên egîdên gelekî hêja yên Agiriyê gihiştin me. Pêngava di 1985'an de em li bendê bûn pêk nehat, lê tesfiye jî pêk nehat. Di vê salê de Artêşa Tirk a bi desteka NATO'yê bi awayekî klasîk êrîşên xwe zêde kirin. Ji bo herdu aliyan jî ew sal dihat wê maneyê ku dawî li demekê hatibû. Pêngava gerîlla li gorî bendewariyên me pêk nehatibû û artêşa Tirk ev ji aliyê xwe ve weke serketinekê dihesiband, lê herçiqasî ev ji bo xwe weke serketin dihesiband jî mayîndebûna hebûna gerîlla jî ji bo wê têkçûneke girîng bû. Li ser bingehê amadekariyên mezin, pêkan bû ku hema hema li her qada stratejîk bi desteka xurt a gel

hêzên gerîlla şer bikin, lê PKK'ê nikarîbû vî şensî bi kar bîne û ev ji aliyê wê ve zirareke mezin bû. Lê dîsa jî hêzên gerîlla li her deverê reh berdan û hebûna xwe parastin, ev jî serketinek bû ku divê piçûk neyê dîtin.

Sala 1986'an ji bo herdu aliyan ji nû ve bi amadekariyan derbas bû. Di sala 1986'an de ji bo min û Tevgera me, nûçeya herî bi êş û nexweş şehadeta hevrê Mahsum Korkmaz bû. Di nava vê nûçeyê de tevahiya tehlûkeyên li benda me hebûn. Dîsa mîna ku li dora min çembereke dorgirtinê çêdibû. Ez hêrs bûbûm, bûyerên diqewimîn min nikarîbû qebûl bikira. Me heval û hevriyên xwe pirr bi hêsanî ji dest didan. Bi vê êşê, ez tevlî tevahiya Kongreya 1986'an nebûm. Kongreya me ya sêyemîn bû. Me ya duyemîn di sala 1982'an de li Başûrê Sûrî li kampa Bereya Rizgariya Gelê Filistînê çêkiribû. Bi awayekî, dubareya Konferansa Yekemîn bû, lê bi vê kongreyê gelek kesan dest pê kir vegeriyan welat. Di dema wê kongreyê de me nûçeya şehadeta hemşehriyê min Adnan Zincîrkiran bihîst. Ji Ewrûpayê tevlî nava tevgerê bûbû. Dema ku li keviya Firatê tê girtin tevî xwe efserê artêşa Tirk di kendêl re wer dike. Ev bûyer timî weke janeke dil timî di bîra min de ye. Gelek nûçeyên bi vî rengî digihiştin me, lewma ji bo ku ez karibim bersivê bidim hemûyan min bêhtir zor dida xwe.

Kongreya Sêyemîn tam bû kongreyeke dadgehkirinê. Herkesî hevdu dadgeh dikir. Ji bo Kesîre û Selahattîn Çelîk rê qediya bû. Kongreyê ji bo herduyan jî biryarên kujer dabûn. Wer lê hatibû, şifêrê min Ferhan digot, divê mirov Kesîre bi çar hespan ve girê bide û wê parçe bike. Dîsa rizgarkirina herduyan ji kuştinê para min ketibû. Ji bo Selahattîn digotin, hevdîtinên teslîmiyetê bi Komara Tirkiyê re di ser Çiyayê Cûdî re meşandiye. Ji bo min helwestên sar û bi tehlûke yên Kesîreyê hebûn û ji hev derxistina wan zehmet bû, gelo li pişt van helwestên wê çi hebûn? Gelo Ferhan (şifêrê min ê din jî Sabrî bû) çi tespît kiribû ku digihîşt encameke bi vî rengî ya xeternak? Mehmet Saît jî (Ethem Akcan) berî ku bimire gotiye "hûn nizanin li pişt serok çi dekûdolaban digerînin." Ji kerb û qehran can dabû. Min timî guman kir ku yek ji komployên piştî 1980'î li dijî min hat pêkanîn di nava Dev-Yolê de hatiye birêxistinkirin. Eger hatibe pîlankirin, ez yeqîn dikim ku Gladîo'ya Tirk û hêzên ewlekariyê yên hundir bi vê riyê komployek ceribandine. Ji ber ku eşkere tesfiyekarî dikirin, desteka dewleta Elman girtibûn û PKK ji xwe re weke hedefa pêşî destnîşan kiribûn, divê mirov vê îhtîmalê piçûk nebîne.

Ti hevalî sedemên biryara xwe ya kuştinê û hêrsa xwe ya mezin li dijî Kesîreyê bi awayekî eşkere neanî ziman. Li dijî kesayetiya min tehrîk û heqaretên wê yên mezin hebûn. Lê ev nedibûn sedem ji bo kuştina wê. Lewma min timî meraq û guman kir: Gelo wê şifêr xistibûn destê xwe û xwestibû komployekê bike? Ji şifêran yek reviya, yê din jî hewl da xwe bikuje û mîna ber bi mirinê ve biçe çû welat û şehîd bû. Lewma ez li ser vê rewşê timî fikirîm. Min Selahattîn Çelîk bi destê xwe şand Ewrûpayê. Kesîre jî di nîvê sala 1987'an de li Atînayê bi îhtîmaleke mezin bi desteka îstîxbarata Yewnan xwe ji ber çavan wenda kir.

Di vê navberê de ez carekê di sala 1982'an de çûm li Bulgaristanê geriyam. Ez yeqîn dikim ku di wê demê de Bulgaran dixwest helwesta min li hemberî polîtîkaya xwe ya Tirkan bi zorê koçberî welatê wan bikin zelal bikin. Min cara pêşî çavdêriya sekantiya sosyalîzma pêkhatî kir. Ji her alî ve bêhna revîzyonîzmê jê dihat. Cara duyemîn jî di sala 1987'an de bi desteka KGB'ê çûbûm. Belkî jî berî jihevdeketina Yekîtiya Sovyetê yek ji vexwendinên wê yên dawî bû. Van serdanên me bi xwe re destek û alîkariyeke ciddî neanîn û ev jî dibe ku ji pirsgirêkên navxweyî bûn. Belkî bi tenê bi kêra tiştekî hatin, ew jî ji bo ez li Sûrî bi awayekî ewle bimînim destek dan. Di wan salan de me bi gelek rêxistinên Iraq, Libnan û Filistînê re hevdîtin pêk anîn. Me peyamên dostaniyê dan û stendin. Lê sozên destekê zêde bi cih nedihatin. Nexasim rêxistina El Fethê di têkiliyên xwe yên bi Tirkiyê re ji wan rêxistinan bû ku herî zêde ji statuya min sûd wergirt. Li Sûrî, helwesta Esedên bira ji me re ji rêxistiniyê wêdetir şexsî bû. Gelekî bi tecrûbe bûn. Nêzîkatiyên wan ên li ser îstîxbaratan bi hosteyî bûn. Eger wan bixwesta karîbûn rê li ber bûyerên gelekî mezin vekirana. Ji Tirkiyê fikarên wan hebûn. Bi riya me dixwestin bi Tirkiyê re pozîsyoneke tewazunê çêkin. Di vê polîtîkaya xwe de jî bi ser ketin. Lê ji tevgera azadî û nasnameya Kurd hat ku ji vê têkiliyê encamên dîrokî bi dest bixe. Têkiliyeke bi heman rengî di ser Yewnanistanê re pêk hat. Lê wan nikarîbû bersiva bendewariyên xwe ji Tirkiyê bibînin. Polîtîkayên DYE û YE'yê bi şêweyê 'kîvroşk baz bide, tajî bigire' bû. Ji rêya vê polîtîkaya xwe ya ji rêûresmê hîç derneketin. Ditepisandin bi qasî ku nekujin, destek didan bi qasî ku çareser nebe. Fêhm kiribûn ku neçareserî gelekî bi kêra wan tê. Dixwazin vê polîtîkaya di sedsalên 19. û 20. de pêk anîn di sedsala 21. de jî berfireh bikin.

Pêngava pêşî ya gerîlla ya PKK'ê ji ber kêmasiya fermandaran aliqîbû. Kêmasî û muhafezekariyeke ciddî derketibû holê. Rastiya Kongreya Sêyemîn a li Bekaa'yê ev îfade dikir. eşkere bû ku diviya li ser rastiya fermandaran analîz bihata kirin. Min nivîsên pêşî yên ceribandinê bi xwe nivîsîn. Min gelek axaftinên kasetan kirin. Weke tedbîr jî min kesên ji nifşên pêşî yên komê mayî şandin Ewrûpayê. Bi îhtîmaleke mezin, piştî şehadetên namzetên fermandariyê yên hêja kesên mayî ew kes bûn bi xasûkî mabûn û hin ji wan jî muhtemelen hêmanên sîxur bûn û di dema pêş de çavên wan lê bû valatiya fermandariyê tijî bikin. Maskeya van kesan bi awayekî pirr eşkere di tevgera xiyanet û tesfiyekariya 2002-2004'an de ji ber rûyê wan hat xwarê. Ferhat (Osman Öcalan), Botan (Nizamettin Taş), Ebûbekîr (Halil Ataç), Serhat (Hıdır Yalçın), Ekrem (Hıdır Sarıkaya), Celal, Dogan (yê Şirnexî), Kanî Yilmaz (Faysal Dunlayıcı) û hê hejmareke zêde ya hêmanên bi heman rengî, bi Çeteya çaran û Çeteya Çurukkayayan bi awayekî berbiçav benê rêxistinê xistin destê xwe. Yên ev rê li wan vekirin, kadroyên nifşên kevin bûn ku li rola xwe ya navendî xwedî derneketin û di serî de Mahsum Korkmaz û Mehmet Karasungur gelek hevalên durist û karîbûn bi rola fermandariyê rabûna bi pirranî bi rêbazên kompoloyê hatin tesfiyekirin. Gelek nîşane hebûn ku didan xuyakirin, bi kompoloyeke di serê 1990'î de pîlana wê dikirin rêxistinê bi temamî bixin destê xwe. Kuştina damezrînerê JITEM'ê Cem Ersever ji nêz ve bi vî pîlanî re têkildar e. Du sîxurên di Star TV de dipeyivîn li xwe mikur

hatin û gotin “ferman dabûn me ku em Ocalan nekujin bi saxî zevt bikin.” Di vê mikurhatinê de gelek nîşane der barê vê kompleyê de hene ku mirov dibîne. Herweha şehadeta Hesen Bîndal nîşaneke eşkere bû. Li Amedê ji bilî hêmanên çeteyan ên weke Sait Çurukkaya û Şemdîn Sakik kadroyên fermandariyê yên durist hemû û li Dêrsimê Doktor Baran di vê demê de hatin tesfiyekirin. Jixwe devera Botanê ji Cemîl Işik û şelaqên wî re hatibû terikandin. Dor hatibû dest biavêjin rewşa min a li Bekaa’yê.

Tevahiya pirsgirêkên PKK’yîbûyîn, artêşbûyînê û heta yên berebûyîn (HRK’bûyîn û ERNK’bûyîn) weke xwe mabûn. Pirsgirêk hemû li ser min mabûn. Hêmanên durist bi tenê zanîbûn bimirin. Jixwe hîç nedihat bîra wan ku ji heqê pisgirêkên taktîk bên. Mînakên cesaret û fedekariyên mezin ne kêm bûn, lê cesaret û fedekarî bi serê xwe ji bo çareserkirina pirsgirêkên pratîk û taktîkê têrê nedikir. Bi armanca çareserkirina van pirsgirêkan bi Bihara 1987’an re min giraniya xwe da ser metoda analîzan. Mijarên berê ez bi broşuran li ser wan sekinîbûm, min vê carê bi kasetên deng û dîmen hewl da bêhtir hûrûkûr ji hev derxim. Li ber min komên ji çarsed kesî yên bi dewreyên sê mehan bêne perwerdekirin hebûn. Pêvajoyeke nû ya perwerdeyê ku têde ji hezarî zêdetir namzetên gerîlla bêne perwerdekirin weke wezîfe li pêşberî min bû. Me bi van perwerdeyan xwestibû pêşiyê li tevahî tesfiyekariyên hundir û derve bigirin. Bi vî awayî hema bêje me tesfiyekarî bêîmkan kiribû û me xweziyên kesên çavên wan li vê jî di qirika wan de hiştibûn. Wer xuya dikir ku hinek jê bi çar çavan li bendê bûn, bê ka wê çi bi min bê. Ev bendewarî têra xwe xurt e, û şopê wê hê jî mane. Heval û hevriyên ji nişfê berê yên ku me ew şandibûn Ewrûpayê, bi êrîşên bi pêşengiya Elmanyayê ji sala 1987’an û pêve hatibûn girtin. Vê bûyerê bi tenê jî nîşan dida ku Elmanya navenda Gladîo’yê ye, û pêngava Gladîo ya li dijî PKK’ê rave dikir. Elmanya ji Komara Tirkiyê bêhtir bi awayekî berfireh, bi pîlan û bi xasûkî bi tesfiyekirina PKK’ê re mijûl bûye. Lê tevî van hemûyan jî gelê Kurd ê li Ewrûpayê bi xwestekên azadî û nasnameyê li dora tevgerê bi dilsozî civiya û vê jî têrê kir ku pîlanên tesfiyeyê yên di ser Ewrûpayê re bêne meşandin bi tevahî pûç bibin. Di wê demê de dilsoziya gelê me yê li Sûrî û Ewrûpayê nebûya, gelekî zehmet bû ku mirov PKK û şerê şoreşgerî li ser piyan bigirta. Divê mirov gelê me yê li herdu qadan timî bi rêz bi bîr bîne û pîroz bike.

Min der barê jinê de cara pêşî di Adara 1987’an de dest bi analîzan kir. Belaya bi riya jinê anîbûn serê min ango anîbûn serê tevgerê, min heta bi mejiyê hestiyê xwe his kiribû. Li hemberî helwestên ku hevriyên min dîn û har kiribûn, min cara pêşî bi rêbazeke nû, bi rêbaza analîzan hewl da bersivê bidim. Di serî de Ayşe Akarsu ya Pazarcixî, Saîme Aşkin a ji Dêrsimê û Ayten a ji Nisêbînê ku bi kuştinê hatibûn cezakirin, di vê gavavêtina min a analîzan de xwedî par in. Ji ber ku min cezakirina van jinan ticarî nikarîbû qebûl bikim. Pirsgirêka jinê her ku diçû ciddî û giran dibû. Her serê dewreyeke perwerdeyê min analîzên der barê vê mijarê de gaveke din pêşde dibir û kûr dikir. Jinên ciwan her ku diçû di nava refên me de zêde dibûn û vê jî dikir ku em bersiveke bi kok bidin pirsgirêka azadiya jinê. Lê belaya bêrehm a bi navê Kesîreyê li ser serê

min di vê xebata min de bi rola sereke radibû. Kuştina wê ne rast bû, lê ewqasî bêîmkan kiribû ku mirov nikarîbû saetekê jî bi wê re bimîne. Hêmaneke gelekî zîrek bû. Çawa ku hevrê Mahsûm Korkmaz bû şehîd, gotinên wê kirî nîşan didin ka çiqasî zîrek e, û çiqasî rast rêxistinê dişopîne. Gotinê wê ev bûn: "Kesê ku tu herî zêde jê piştrast û pê ewle Mahsum Korkmaz jî çû, niha tu yê çi bikî?" Mîna ku bixwaze ez paş ve gavê biavêjim û teslîmî wê bibim. Bi hêrs û êşa ji ber helwestên bi vî rengî min pêngava 1987'an avêt. Bi rêbazên ji rêûresmê min karîbû hezar caran ew bikuşta yan berdana û jê rizgar bibûma. Lê maneya helwesteke bi vî rengî ji bo min têkçûneke îdeolojîk û polîtîk bû. Wekî din, min partî û rêxistin bi wê re parve bikira yan jî teslîmî wê bikira, dîsa encam ê heman tişt bûya. Hêmaneke duristbûya jî keda wê tinebû. Bi tenê bi hosteyî çavdêrî dikirin, bi maneyeke neyênî pêngavên taktîkî sor dikirin. Di şexsê wê de der barê jinan de çi hebû min dixwest ji hev derxim. Herweha min dixwest têkiliyên jin û mêran ên li dora min her ku diçûn xwe ferz dikirin jî ji hev derxim, lewma min dixwest bersivên bi kok ên azadî û wekheviyê bidim wan.

Tevlîkirina jinan a nava xebateke mîna rêxistina eskeriyê ya ji sedî sed mohra mêran li ser e, û bi îdeolojiya mêrê serwer pêk hatiye gelekî bi rîsk bû; tiştekî wisa bû, mîna ku mirov dinamêtê bixe nava xebatan. Têgihiştina jin û mêrên heyî, ji têgihiştina cinsiyetparêz a çor û ji rêûresmê wêdetir nediçû. Têgihiştina wan ji hev du re ji tehrîkkirin û sorkirinê, ji îşaretdayîna bi çav û birûyan wêdetir bi pêş neketibû. Min bi destê xwe belayeke mezin anîbû serê xwe. Fermandarê navdar ê gerîlla Che Guevara jî dema jinan digire nava refên xwe wê di warê tatmînbûna cinsî de şaş nabîne, weke pêdiviyeke hewcedarî pê heye qebûl dike. Min nikarîbû ev qebûl bikirana, min ev bi xwe û xebatên rêxistinê, nexasim jî qada eskerî bida qebûlkirin, ji serî ve maneya vê ew bû ku me xwe bi destê xwe tesfiye dikir. Min nikarîbû jin bi rewşa heyî jî bihişta, ji ber ku rewşa wê ya heyî jî ji bo tesfiyebûna me têrê dikir. Heval an jî ekîbek tinebû, hukim li xerîzeyên cinsî bike, wan bi awayekî rast, li ser bingehê hunerê polîtîk û berjewendiyên rêxistinê binirxanda. Ne ji bo min û ne jî ji bo rêxistinê rast bû ku me jin li derve bihişta û şoreşek bê jin pêk bianiya. Bi tenê rêbazeke din dima ew jî bi gotina gelêrî me yê ew 'bi serî bikirana' yan 'serê wan girê bidana' û 'zewaca şoreşgerî' ya rêxistinên çepgir ên şoreşgerî kiribûn mode jî dibe ku bibûya çare. Lê min ev rêbaz rast nedidîtin. Erê van rêbazan wê enerjiya şoreşgerî pûç bikirana, lê belê jixwe şert û mercên fizîkî derfet û îmkan nedidan zewac û sergirêdanên bi vî rengî. Ev dihat wê maneyê, kê kel û pelên xwe ber hev bikira wê berê xwe bidaya Ewrûpayê û lê bibûya penaber an jî biketa nava gel û li ser navê rêxistinê weke kurtêlxuran bijiya û ji bilî vê jî rê nedima. Ev jî şêweyekî din ê tesfiyekariyê bû.

Lê riya min ceriband, di çanda Rojhilata Navîn de şêweyekî têkiliyê bû, kes lê nefikirîbû û bîr nebiribû; li derveyî zewaca weke hewcedarî dihat dîtin, jiyan û şerekî di nava nakokî û têkiliyên diyalektîk de li ber çavan digirt. Di vê çarçoveyê de min dixwest ez hem mêr û hem jî bi taybetî jinê bi heyîna wan û azadiya wan a rastî ya insanî bida naskirin. Ev îmtîhaneke mezin a navxweyî

ya şoreşgertiyê bû. Pirr hat îstîsmarkirin, pirr xirab hat bikaranîn, kirin destikê bi sedan xapan. Lê dîsa jî jinên delal û zîrek, jinên bi destê xwe û egîd bi van xebatan derketin holê. Me keçên gelekî bedew û zîrek şehîd dan. Ji bo em bersiva hesretên wan bidin hema bêje min her roj xwe ji nû ve afirand. Lê ji ber ku min nikarîbû bersivê bidim timî bi êş û jan bûm. Min bi awayekî azad û dîrokî xwe gîhandibû jinê. Lê bi awayekî mîna Ferhat û Şîrîn ez ê ti carî negihiştibûmayê. Lê min bawer nekir ku pêkanîna vê bîranîna nostaljîk hewce û manedar e. Di şertên heyî de ango di nava sîstemên hegemonîk de min ji hev derdixist ku xwegihandina wê kuştina eşqê ye. Yanî, ya girîng ew bû, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî hemûyan xebata bi eşq bû. Ya rastî, exlaqê heqîqî yê eşqê ew e, mirov karibe xwediyê wê hêz û qabîliyetê be, li dijî pirsgirêkên civakî şer bike û wan çareser bike. Kesên ev hêz û exlaqê wan tinebin, kesên nikarîbûne vê hêzê û qabîliyetên xwe pêşde bibin, ne eşqa wan û ne jî exlaqê wan ê eşqê dibe.

Di felsefeya Hegel de ji bo pêkhatina eşqê şert e ku tewazuna hêzê pêk bê. Ev şertê hewce lê belê kêm, jina bi hêzbûyî îfade dike. Em behsa tewazuna hêza maddî û çor nakin. Tewazuna hêzê ya behsa wê tê kirin, tewazuna fizîkî, derûnî û civakî ye. Ango tê gotin, eşq bi wê jinê re ku di nava koletiya herî kevin û ya herî kûrkirî de ye, nabe. Ji bo ez nava vê fikra felsefîk a para rastiyê têde heye tijî bikim, diviyabû min jinên di nava refan de pirralî (îdeolojîk, polîtîk, exlaqî, estetîk, fizîkî û heta eskerî –ji bo xweparastinê-, ekonomîk, sportîf û hwd.) bi hêz bikirana û lewma min pêşî giraniya xwe da vê yekê. Eger mirov bixwesta li hemberî jinê bi hurmet û hevgirtî bibûya û bixwesta bi awayekî rast, baş û xweşik xwe bigihanda hezkirinê diviyabû jin bi hêz bikirina û ez bi temamî bi vê hayjixwebûnê bi jinê re eleqedar dibûm. Ango heta jin bi hêz nebûya eşqa wê jî wê pêk nehata. Min ji sedî sed ji rastbûna vê terîfê bawer dikir. Ez ji xwe piştrast bûm ku diviyabû di vê mijarê de paşve gav nehata avêtin. Piştî ku min hêz û qabîliyeta di vî warî de bi dest xist, xebatên min ên der barê jinê de bi nirx dibûn. Mîna ji kabûs û xeweke hezar salan hişyar bibin keçikan dinêrî û hev himbêz dikirin. Tevî ku ez jî di van mijaran de gelekî bi îhtiyat bûm jî ez netirsiyam wan bi hezkirin û hesreteke bê dawî himbêz bikim, û wan bikim taca serê xwe. Di vê mijarê de du têgihiştinên şaş timî xwe ferz kirin: Hin kesan bi awayekî kevneşopî dixwestin bi serî bibin, bi cinsiyetparêziyeke çor a ti bingehê wê yê îdeolojîk, siyasî û çalakiyê tine di bin navê bi hev re bûnê de her cara firsend bidîtana tevgerên rezîlane nîşan bidana, kesên bi vî rengî têra xwe zirar didan. Li hemberî vê, kesên hişk mîna sofiyan, ango kesên xwe ditepisandin û bi navê, wê ji bandorên cinsiyetparêziyê bibihurin, ji mezinkirina pirsgirêkê wêdetir ti encam nedidan. Xebatên li ser xeta demokratîk, azadî û wekheviyê hatin pêşdebirin bûn pîvaneke têkûz a azadiya civakî. Bûyerên pratîk rastî, xweşikî û qenciya nêzîkatiya bipîvan piştrast kirin.

Heta bi serê salên 1990’î ji komên perwerdeyê re ku salê bi giştî hejmara wan ji hezarî dibihurî, kirina analîzan bi tempoyeke zêdetir dewam kir. Vê xebatê, ne bi tenê em ji pêxîrtengiya pêngava gerîlla ya 1986’an bihurandin, bi qasî ku me bigihîne asta tewazuna stratejîk şerê

gerîlla gîhand qonaxeke nû ya li pêş. Di salên 1991-1992'an de desteka gel a ji nû ve zêde bû, çareseriya siyasî bi awayekî ciddî ji nû ve xist rojevê. Ya rastî, Turgut Ozal ji sala 1985'an ve bi konsepteke nû ya şer bûbû xwedî helwestek dijwar û şahînwarî. Di sala 1987'an de rêveberiya Rewşa Awarte hatibû sazkirin. Rêxistina JITEM'ê ya bi erkên awarte hatibû gurçûpêçkirin bi awayekî ku saziyên dewletê bi tevahî bixe rewşeke yedek, hatibû wezîfedarkirin. Ji sala 1987'an ve çalakiyên li derveyî taktîkê (jin û zarok kirin hedef) yên Çeteya Çaran û hêmanên weke wan, yekser an jî neyekser bi JITEM'ê ve girêdayî bûn. Di heman wextî de li Elmanyayê kadroyên pêş ên PKK'ê hatin girtin û Hîzbûllah xistin nava tevgerê. Ev hemû parçeyên pêvajoyekê bûn û bi armanca tesfiyeyê bûn. Bi vî awayî jî me fêhm dikir ku Gladîo bi awayekî bi tesîr bi tenê li dijî PKK û Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd li ser kar e. Li dijî pêngava nû ya şer a şoreşgerî pêngava Gladîo'yê ya li dijî şoreşgeriyê pêk dihat. Ev pêvajoya pêngavan a li beramberî hev her ku çû hate dijwarkirin û heta bi serê salên 1990'î hat. Di dîroka Kurdistanê de cara pêşî bû ku li tevahiya parçeyên welêt û li her parçeyî hema bêje li her qadê, yekparebûna têkoşînê ya azadî û nasnameyê hatibû naskirin. Di dîroka Komara Tirkiyê de cara pêşî bû ku di vê demê de weke rêyekê li ser çareseriya siyasî dihate fikirîn.

Turgut Ozal bîlançoya şer a heft salan nirxand û dît ku Tirkiyê ber bi kendalekî kûr ve tê dahfdan. Bi helwesteke radîkal (Me ev di wî wextî de tespît nekir), hem jî bi awayekî Mûsil û Kerkûkê bigire nava xwe alternatîfa aştî û çareseriyê hewl da bi însiyatîfa xwe bixe dewrê. Bereyê artêş û muxalefetê li ber vê rabûn. DYE û Ingilîstanê bi giştî Iraq û bi taybetî jî Kurdistana Iraqê ji sala 1925'an ve di bin hegemonya xwe de didîtin nikarîbûn vê helwesta nû ya Ozal qebûl bikin. Îsraîlê jixwe Kurdistana Iraqê weke Proto-Îsraîl dinirxand. Bi dualîteya 'Yan Komar an Mûsil-Kerkûk' Ingilîzan (di qonaxa avakirina Îsraîlê de ji tevgera Siyonîst re hamî ne) bi M. Kemal re li hev kir û di encama vê de Mûsil û Kerkûk (ev dibe Kurdistana Iraqê) ji serweriya Komara Tirkiyê hat qutkirin. Ango Mûsil û Kerkûk ji Ingilîzan re nehata hiştin Komar ê pêk nehata. Çawa ku tê zanîn, serokatiya Mistefa Kemal ji neçarî Mûsil û Kerkûk teslîmî Ingilîzan kiriye. Eger teslîm nekira, hem destekdana Serîrakirina Kurd a 1925'an hem jî reşkujî li ber derî bûn. Ev îhtîmal bi wî didan hiskirin. Ev lihevkirin faktora sereke ya di bin pirsgirêka Kurd de ye û hê jî bi hemû giraniya xwe faktorbûna xwe dewam dike. Sê serokwezîrên niyet kirin vê statuyê biguherînin berdêla vê canê xwe dan. Darvekirina Menderes, kuştina Turgut Ozal, felckirina Ecevît û paşê mirina wî, ji nêz ve bi polîtîkayên Kurdistana Iraqê re têkildar in. Ji lêkolînên Yalçin Kuçuk ên di vê mijarê de mirov dikare hîn bibe. Ev rastî derketin holê: Çareseriya pirsgirêka Kurd yekpare ye. Ti parçe bi serê xwe nikare gavê biavêje çareseriyê. Parçeyê herî mezin ê Kurdistanê parçeyê Kurdistana Tirkiyê ye û heta pirsgirêka vî parçeyî neyê çareserkirin, gelekî zehmet e ku pirsgirêk li parçeyên din bikeve ser riya çareseriyê. Wekî din, nuqteyeke din a balê dikişîne ser xwe ew e, çareseriya pirsgirêka Kurd bi hêzên hegemonîk ên kapîtalîst kilît bûye; bêyî wan, bi awayekî berjewendiyên wan neyên dîtin çareseriyeke bi hêsanî pêk nayê. Heke hewl were dayîn were

çareserkirin, hingê berdêlên gelekî giran wê bi wan bidin dayîn. Hewldana çareseriyê ya Turgut Ozal îhtîmalên em behsa wan dikin bi dehşet û bêrehmiya wan hemûyî îspat kir.

Tevî bêtecrûbetiya wî ya siyasî û dîplomatîk, kengî bi riya Celal Talabanî ji Ozal banga diyalog û çareseriyê hat, min bi mehan bawer nekir. Ez li ser du îhtîmalan fikirîm: Ya yekê, min digot Ozal li pey lîstikeke taktîkî ye; ya dudiyê jî min got, ev nizane bi çi re mijûl dibe. Dîrokê ez di demeke kurt de piştrast kirim. Bi awayekî hovane Ozal kuştin û ez bi vê êşiyam. Ji bo perdeya raz û sirran a li ser kuştina wî rabe min ad li canê xwe kir û min timî bûyerên di vî warî de şopandin. Serokê AKP'ê Tayyîp Erdogan ê xwe bi Ozal re qiyas dike yan rastiya wî nizane yan jî li pey berevajîkirina rastiyê ye. Ozal nedigot "Ez bi Serokatiya PKK'ê re têkiliyê danaynim." Bi germahiya zanyarekî ji Celal Talabanî re gotibû 'Her tiştê hûn dikin şaş nîne.' Çima diyalog girîng e, û çima ji bo aliyên çareseriyê heyatî ye, ji me bêhtir bi xweşfikrekê îfade kiribû. Ya rastî, bi bihîstin û dîtina hilweşînerî û xeternakiya şer gihiştibû qonaxa çareseriya siyasî. Bi qanûna bi şert a ceza daxistinê hinek PKK'yî bêyî şert ji zindanê dabûn berdan. Ango Tayyîp Erdogan xwe hevtayê Ozal bibîne ev tiştekî realîst nîne. Polîtîkayên Erdogan versiyoneke pîlanên Çîller ên bêhtir kûr tîne bîra mirovan. Dîsa jî ji bo mirov hukmê dawî der barê wî de bide divê mirov hinekî din bisekine û bibîne.

Me gelekî anî ziman ku sala 1993'an saleke dramatîk e. Li gorî min, sala 1993'an, ew sal e ku Gladîo'yê dewlet xistiye destê xwe. Bi tenê saleke reşkujî û darbeyên siyasî nîne, salek e ku têde gelek darbeyên bi dizî, komplo û tevkujî pêk hatine. Ji vê jî wêdetir, salek e ku di dîroka Kurdistanê de sala bi awayekî herî berfireh bêkurdkirinê ye. Faşîzma Tirk a Spî ku pişta xwe dabû NATO û Îsraîlê di vê salê de terora qirkirinê ya dest pê kir heta sala 1996'an heta dawiyê bir. Ango di vê salê de qirkirin derxist asta herî jor. Di vê salê de li gelek navçeyên Kurdistanê di serî de li yên weke Şirnex, Cizîr, Nisêbîn, Licê û wekî wan tevkujiyên gel ên xeternak hatin kirin, bi qasî çar hezaran gund hatin xirakirin û şewitandin, piştî valakirina gundan û kuştinên li van gundan bi mîlyonan Kurd hatin koçberkirin û dema ketin ser riyan di destê wan de ti tişt tinebû, lewma ji bo wan saleke manûnemanê bû. Yek ji xisleta girîng a vê salê ew e, di vê salê de dewleta qanûnî hat tesfiyekirin. Dewleteke nû ya jêre 'dewleta çete' dihat gotin derket holê. Yên ev kiribûn, bawer dikirin ku ew mîna Şerê Rizgariyê yê Mistefa Kemal li dijî Yewnaniyan meşandî û heta şerekî jê qatbiqat mezintir ew dimeşînin. Lewma behsa 'Atatirk'tiya Çîllerê dikirin. Lê ya rastî Kurdîtî li ser heman erdan di nava pêkhatina dewlet û desthilatdariyên çar hezar salî de hêmanê hevpar ê resen bû. Niha jî dixwestin wan bi temamî tesfiye bikin.

Di nava refên têkoşîna şoreşgerî ya bi pêşengiya PKK'ê de nexweşiyên berê her ku diçûn bêhtir kûr dibûn û dewam dikirin. Li van nexweşiyan hêmanên din jî zêde bûbûn. Nifeşekî bi navê qaşo 'nifşê navîn' çêbûbû ku ji kêmasî û şaşiyên ku nifşê berê ketibûyê hêzar carî zêdetir bi çavkorî, bêmetirsî dikir û hîç şerm nedikir. Van kesan mayîna xwe ya li ser piyan weke serketina xwe

didîtin û bi bayê serketinê têra xwe serxweş bûbûn. Lê ev hêman bi xwe ji mîmarên tesfiyekariya giran a di sala 1992’an de bûn. Sala 1992’an sala çarenûsa gerîlla ye. Eger fermandariya sexte ya gerîlla nebûya heyranê xwe û li maneya desteka me ya dîrokî serwext bibûya, li ser bingehê parastina qadê, ji aliyê hejmar û naverokê ve gerîlla wê karîbûya rewşê kontrol bike. Mirov karîbû artêşeke gerîlla ya pêncî hezar kesî pêk bianiya. Ji bo vê her cure derfet û îmkan hebûn. Ji lewra îhtîmala çareseriya siyasî ketibû dewrê. Ev firsenda dîrokî nehat nirxandin. Li şûna vê bi pey wê pêşengtiyê ketin ku bûbûn bengiyê wê û ew har kiribûn.

Di dîroka Kurd de sahneyên bi heman rengî gelekî hene. Bedirxan Beg jî sala 1847’an li Botanê di heman rewşê de bû. Bi artêşa xwe ya ji panzdeh hezar kesî hakimê herêmê bû. Êrîşên artêşa Osmanî bê tesîr kiribûn. Jixwe demeke dirêj halê wan tinebû li ber xwe bidin. Tam wê pêlê xiyaneta biraziyê wî Yezdan Şêr serî da. Paşê Begtiya Botanê bi awayekî ku careke din bi ser xwe ve neyê ket pêvajoya hilweşînê û serberjêr çû. Rêûresmeke hezar salan, ne di ber tiştekî de ji dest çû. Yezdan Şêr îddîa dikir ku begtî heqê wî ye. Di dawiyê de bi awayekî careke din lê venegere malbat ji Botanê mişext kirin. Hem jî wê Begtiya Botanê careke din nehata avakirin. Li cem me jî di serî de Osmanê rezîl, li cem gelek fermandariyên sexte hewes û xwestek hişyar kiribûn ku bi rastî serokatî heqê wan e. Van kesan rêûresma Barzanî û Talabanî ji xwe re esas qebûl kiribûn. Wekî din, ew miz dabûn û nepixandibûn û ji wan re gotibûn, “Hêza we ji ya Apo zêdetir e. Ew bi tenê li Şamê rûdinê, ma wekî din çi dike! Divê hûn bibin xwediyê her tiştî.” Ev fitne di dil û aqilê xwe de baş bi cih kiribûn. Jixwe hêzên PDK û YNK’ê yên bi Fermandariya Giştî ya Tirk re di nava têkiliyên nêz de bûn ji Başûr, artêşa Tirk jî ji Bakur bi awayekî bi pîlan û bi awayekî yekbûyî tevgeriyan, kengî ev tevgera xwe derxistana asta herî jor, wê Tevgera me di cihê xwe de rûnişta û bihata ber tesfiyeyê û bi vî awayî tevgera me xistin nava şerekî encama wî ji berê ve diyar bû. Encam xeternak bû; bi sedan mîlîtan û şervanên giranbuha gihiştin şehadetê û li ser bi hezaran jî şert û mercên teslîmiyetê ferz kirin. PDK û YNK’ê di operasyonê de bi awayekî eşkere cih girtin û nabe ku mirov li vê li derveyî Gladîo’ya NATO’yê bifikire. Di berdêla vê de Tirkiyê destûr da ku ‘Hêza Çakûç’ li Başûrê Kurdistanê bi cih bibe, ev dihat wê maneyê ku dewleta Tirk bi pêkhatina federe ya Kurdistana Iraqê razî kiribûn. Bi vî awayî, hevgirtina 1925’an dewam dikir.

PKK ji ber deriyê serketina eskerî vegeriyabû. Di vê de qelsiyên hundir, şaxên kompleyê û xiyaneta hêzên Başûrê Kurdistanê diyarker bûn, ji aliyê derve jî dixwestin ku hegemonyaya ji salên 1920’an ve statuya Kurdistanê diyar dikir, bi heman awayî dewam bike. Rastiyeke din a îspatbûyî ew bû, hêzên hegemonîk ên hundir û derve çiqasî bi hêz dibin bila bibin, gelekî ji bo mafên xwe yên sereke yên nasname û azadiyê rabûye ser piyan dikare bi ser bikeve. Di Bihara 1993’an de çarenûsa ezmûna agirbestan û gera li diyalogê, kengî firsenda serketina eskerî ya 1992’an ji dest çû, diyar bû. Bloka li dijî Turgut Ozal û Eşref Bîtlîs, gelekî nêzî bûbû ku desthilatdariyê bi temamî bixe destê xwe. Vê blokê Biryar dabû ku Ozal tesfiye bike. Wê yê gera

Ozal a li diyalogê bi Serokatiya PKK'ê re weke xiyanetê bihesibanda û ji bo xistina wî bi kar bianiya. Blokê xistina Ozal weke firsendê dît û bi biryar bû ku li Bakurê Kurdistanê bêdengiya mirinê pêk bîne. Ji finasê wê bû ku çi hêz bê pêşiya wê bipelixîne. Koalîsyoneke dijber a gelekî bi hêz hatibû avakirin. Demirel, Çîller, Înonî, Turkeş, Erbakan, medya û artêş bi giranî bûbûn yek. Armanca bi tenê ya koalîsyonê ew bû ku gera Kurdan a li nasname û azadiyê heta dawiyê bifetisînin.

Li dijî vê bloka faşîst a ku DYE û Îsraîlê bi temamî û welatên Yekîtiya Ewrûpayê jî hinekî destek didanê, karê sereke yê min kir, bi awayekî tekrara xebatên piştî 1986'an bû. Kengî kampên me yên li Bekaa'yê hatin valakirin, hem li Libnanê, hem jî li Sûrî di serî de li bajarên Şam û Helebê li hin bajarên din, li malên ku me ew kiribûn mîna kampan, me perwerdeya xwe dewam kir. Ji 1993'an heta bi dawiya 1998'an me li ser bingehê analîzên hê kûrtir salê bi qasî hezar kadroyî perwerde kir û bi vî awayî me hewl da lez û domdariya tevgerê biparêzin. Me hewl da, nexasim operasyonên mezin ên Gladîo'yê yên bi desteka PDK'ê salên 1994, 1995, 1996, 1997 û 1998'an li Botan û Behdînanê pûç bikin. Me xwest bêyî ku rawestin xebatên li tevahiya qadan bimeşînin. Serokatiya li hundir hê jî dibû pirsgirêk. Ji reva Mehmet Şener, Cangir Hazir û Şemdîn Sakik re mîna firsend hatibû dayîn. Ji ber ku cihê fermandariyê vala bû, gelek gerîlla îmha bûbûn. Tevî van hemûyan jî hê derfet û îmkanên tevgerê zêde bûn. Lê ev derfet û îmkan ji bo mezinkirina têkoşînê û derxistina holê ya qabîliyetên gerîlla nehatin bikaranîn. Li gelê hat koçberkirin xwedî derneketin. Terora cerdevanan û Hîzbûllahê li bajar û gundan bêhn li gel çikand. Li naverastê bi hezaran kuştin hebûn ku weke failê wan meçhûl dihatin binavkirin, lê li ber çavan pêk dianîn. Rêz ji ti pîvana exlaqî re negirtin. Rêbazên li ser ti gelî nehatibûn ceribandin pêk anîn; pêvajoyên ji qirkirinên fizîkî bi êştir ferz kirin. Bi mîlyonan mirov bêkar û birçî hiştin. Dest danîn ser mal û gundên wan. Zarokên wan xistin dibistanên qişleyî û hewl dan wan bikin Tirk. Dîn kirin xizmeta faşîzmê. Ekonomî bi tevahî bi şer ve girê dan. Xwe li rexne û nerazîbûneke herî piçûk jî ranegirtin, yên rexne kirin û yên nerazîbûn têk birin.

Tevî vê jî me ji xwe re jiyan û berxwedan kir bingeh. Tevî ku Kurdistana Iraqê li ser pişta me statuya federe bi dest xist, şerê wan ê li dijî hêzên me yên li wê qadê nikarîbû me tesfiye bike. Berevajî em li tevahiya Başûrê Kurdistanê belav bûn. Artêşa Tirk ji aliyê stratejîk ve pêşî li serketina eskerî girtibû, lê ji ber ku pêşî li Kurdistana Federe vekir derbeke stratejîk xwaribû. PKK'ê tevî ku serketina eskerî ya stratejîk a hatibû ber wê ji dest wê çûbû jî di warê eskerî û siyasî de hêza xwe bi giranî parastibû. Di qada navneteweyî de hatibû naskirin û li gelek welatan wisa bi cih bûbû careke din wê jê derneketa. Li Kurdistana Îran, Iraq û Sûriyê rola partiya pêşeng bi dest xistibû. Desteka pirraniya zêde ya Kurdên li Ewrûpayê girt û li gelek welatên Balkan, Qafkasya û Asya Navîn gihişt statuya ku nûneriyan saz bike.

Di salên 1997 û 1998’an de bi riya Serokwezîr Necmeddîn Erbakan û Artêşê ji nû ve rêbaza diyalogê hat ceribandin. Gera li diyalogê, encama rewşa dewamkirina wê ne mumkîn bû. Em hê li benda encama diyalogê bûn, Fermandarê Hêzên Bejahiyê Atîlla Ateş di 18’ê Îlonê de li ser sînorê Sûrî axaftineke tehdîtkar kir û ji vê axaftinê mirov fêhm dikir ku serdemek bi dawî dibe. Vê axaftinê hem pêngava lobiya şer a bi hêz nîşan dida, hem jî nîşan dida ku diyalog nikare dewam bike. Dîsa hêzên komplo û darbeyê yên bi hêzên derve ve girêdayî hem Necmeddîn Erbakan ji desthilatdariyê anîn xwarê, hem jî li dijî helwesta muhtemel a aştiyane (wê demê nirxandinên bi vî rengî hebûn) ya Serokê nû yê Fermandariya Giştî Huseyîn Kivrikoglu bi ceribandineke reşkujiyê çavê wî tirsandin. Gera li çareseriyeke aştiyane û siyasî bi kêmanî bi qasî ya dema Turgut Ozal girîng careke din hatibû pûçkirin. Em li ber deriyê demeke nû bûn. Em hatibûn dawiya dewra zêde ya li Sûrî û Rojhilata Navîn. Vê dewra em behsa wê dikin, ez jî gelekî westandibûm. Tam jî dem hatibû guhertin bêne kirin. Mîna ku ez jî li benda şikandina vê dewrê bûm. Tevî ku li serketina eskerî ya PKK’ê pêşî hatibû girtin jî ev nedihat wê maneyê pêşketin û serketina wê bi dawî dibe, berevajî nikarîbûn pêşiyê lê bigirin ku bibe xwediyê wê jêhatîbûna tecrûbeya her kêlî karibe xwe li pêngavên mezintir rakişîne û hêza vê yekê ya potansiyel bi dest bixe. Eger pêşengtiya pratîk kêmasî û qelsiyên xwe ji holê rake, ne dûr e ku ji hêza xwe ya pêngavan a berê qatbiqat zêdetir pêvajoyên nû yên pêngavan û şer bide destpêkirin û çalakiyên gerîlla yên niha jî dewam dikin, bigihîne qonaxeke gelekî li asta jor û bi kalîte.

Tecrûbeya min a bîst salan li Rojhilata Navîn bêhtir dişibe çil salên Mûsa yên li Çola Sînayê. Mûsa ji bo ezbetên qebîleya Ibrî ya disiplîn nas nedikirin bike qebîleyên şer, gelekî hewl da. Ezbetên qebîleyan bi hêsanî ji wehiyên Xweda Yehowa vedigeriyan û car din ji pûtên berê re stûyê xwe xwar dikirin û dev ji kirinên xwe yên jirêderketî bernedidan. Deh Fermanên Xwedê nas nedikirin, bi hêsanî bi ber bayê hewes û xwestekên xwe diketin. Ber bi ‘Welatê Cennet’ ê ku Xwedê soza wî dabû, nikarîbûn bimeşin. Çîroka wê nîşan dide ku gera komên penaber a li welatekî çiqasî rêûresmeke kevn e. Eger tu koman nekî îdeolojîk û şervan, ne dûr e ku bihelin û ji hev belav bibin. Aliyekî jiyana me yê bişibe çîroka hewariyên Îsa heye. Hewariyên Îsa xwestin ji zilma Nemrûtan rizgar bibin, lê li zilma Firewnan qelibîn û li bin siya Gladîo’yên Romayê li çarmîxê hatin xistin. Ji bo me jî her kêlî tehlûkeya çarmîxkirinê hebû. Me dest pê kiribû ku em hêdî hêdî hinekî bişibin mucahidên Muhammed. Em îdeolojîk, polîtîk û eskerî bûn. Ji bo jiyanê me paxav nedikir ku em êrîş bikin û xwe biparêzin. Em bi tenê ber bi ‘erdên soza wan hatibû dayîn’ ve nedimeşiyan, me bi ti awayî qebûl nedikir ku em ji wan erdan veqetiyana. Lewma em ti carî ji serê çiyayên wê û qûntara çiyayên wê kêm nebûn. Tevî parçebûnê hemûyî, me xwe ji pêkanîna îmkana yekîtiyê paşve neda.

Di dema 1970-1980’î de armanca min afirandina rêxistin û partiya pêşeng bû. Ez di vê de bi ser ketibûm. Piştî 1980’î armanca min, di çiqas wextî de dibû bila bibûya, afirandina gelekî şervan û rêxistina wî ya mîlîtan bû. Ya rastî, li Rojhilata Navîn ji mêj ve em gihiştibûn vê armancê.

Bûyerên di navbera salên 1990'î an jî herî dereng piştî 1995'an de qewimîn dugêsinkirineke bêmane îfade dikirin. Helwesta sûdwergir ez ber bi vê dugêsinkirinê ve dahf dabûm. Ji bo têkoşîna azadî û nasnameya Kurdan qad gelekî girîng bû û min dixwest heta dawiyê bi kar bînim. Ji bo dema veqetînê ji mêj ve amade bûbûm. Yên ne amade, heval û hogirên li qadên din bûn, dost û herkesê ji xelkê me bûn.

## Beşa Pêncemîn: DI SOSYALÎZMA ZANISTÎ DE PÊXÎRTENGÎ, KOMPLOYA MEZIN û VEGUHERÎNA PKK'ê

### A- PÊXÎRTENGIYA SOSYALÎZMA ZANISTÎ

Di pêkhatina îdeolojîk a PKK'ê de me behsa şîlobûna wê ya der barê dewleta netewe de kiribû. Ev ji ber pirsgirêkên di binyeya têkiliyên me yên îdeolojîk ên gerdûnî de bû ku me hewl da weke sosyalîzma zanistî îfade bikin. Çawa ku min timûtim destnîşan kir, piştî ku hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst karekterê hegemonîk bi dest xist, çawa ku di her qadê de xwe ji nû ve ava kir di qada civakî de jî xwe ji nû ve ava kir û bi awayekî hûrûkûr bandor li pêşketina zanistên civakî kir. Dema ku sîstemeke civakî pêşde diçe, dixwaze xwe bi tevahî bike sereke. Ev xusûs di sîstemên şaristaniyan de bi awayekî zelal tê dîtin. Hegemonya bi tenê bi qadên eskerî û ekonomîk bi sînor namîne; hewl dide xwe di tevahiya qadên civakî de li her qada bi jiyana civakî re têkildar weke îdeolojîk, huqûqî, polîtîk, civakî, çandî û ekolojîk ava bike. Li qadên civakî yên têkildarî şaristaniya kapîtalîst an jî bi gotineke din li qadên sîstema modernîteyê hegemonya hem gelekî zêde ye, hem jî li ser vê hegemonyayê mohra hêmana şîddetê heye. Modernîteya Kapîtalîst dema li Ewrûpaya Rojava di serê sedsala 16. de dest bi mezinbûnê kir û bi her qada civaka rêûresmê re pev çû, ji bo xwe rewa bike amûrên bi hêz ên rewakirinê pêk anîn. Nexasim bi awayekî gelekî dijwar bi sê dînin mezin ên yekxwedayî re têkoşiya. Hingê bêhtir mezhebê Katolîk ê Xiristiyantiyê li Ewrûpayê serwer bû û lewma hewl da vî mezhebî neçarî veguherînê bike. Çawa ku tê zanîn, mezhebê Protestaniyê yê ku bi awayekî mîlîbûyîna Xiristiyantiyê ye, di vê pêvajoyê de bi awayekî fermî hat îlankirin. Protestantî pêşî di salên 1517'an de li Elmanyayê hat îlankirin û ev serketina pêşî ya îdeolojîk a kapîtalîzmê ye. Paşê bi beridîna Ronesansê re felsefeya antîk hat tercumekirin û çanda Îslamî hat veguhestin û vê jî kir ku felsefe weke têmayeke bi hêz a îdeolojîk ji nû ve hilê. Sedsala 17. bi awayekî sedsala şoreşa felsefeyê ye. Descartes, Spinoza, Bacon, Bruno û Erasmus ji wan nirxên sereke ne ku pêşî li vê şoreşê vekirine. Pêşketina kapîtalîzmê di paşketina îdeolojiyên dînî yên ji rêûresmê de û di pêşdebirina ekolên felsefî yên berjewendiyên wê rewa kirî de bi bandor bû.

Bi şoreşa felsefî re di sedsala 18. de şoreşa zanistî jî pêk hat. Di heman demê de sedsala 18. 'Sedsala Rohnîbûnê' bû û di vê sedsalê de fikra laîk a ji dîn serbixwe gelekî pêşde çû. Di dawiya

sedsalê de şoreşa polîtîk a Franseyê û şoreşa pîşesaziyê ya Ingilîz zanistên civakî neçarî şoreşê kirin. Ji vî alî ve sedsala 19. di warê zanistên civakî de weke sedsala şoreşê ye. Herçiqasî Auguste Comte navê nû yê zanistên civakî weke sosyolojî kir têgîn jî sosyolojiya rastî Karl Marks û Friedrich Engels weke 'Sosyalîzma Zanistî' ava û îlan kirin. Sosyalîzma zanistî ya bingehê wê yê dîrokî û materyalîst heye, di fikrê de rêbaza diyalektîkê dikir bingehê xwe. Herweha bingehê wê yê çînê hebû û proleterya weke kirdar dinirxand. Hegelî weke hem pêxemberê felsefeya dîrokê û hem jî weke ya fikra diyalektîk, hûrûkûr bandor li tevahiya zanistên civakî, herweha li sosyolojiya A. Comte û sosyalîzma zanistî ya K. Marks û F. Engels jî kiribû. Hegel dewleta netewe weke kategoriya civakî ya herî dawî û herî pêşketî îlan kiribû. Yeqîn dikir ku ferd ê bi dewleta netewe bigihîje azadiya herî zêde. Ev ew îdea bû ku ferd bi zemînê civakî yê herî pêşketî ango bi dewleta netewe derfet û îmkanên azadiya herî zêde bi dest xistine. K. Marks û F. Engels jî bi sedema ku Elman bûn, fikra Hegel a dibêje divê dewleta Elman navendî bibe û weke dewleta netewe bi gewde bibe, weke bûyera li ser xeteke rast wê biqewime nirxandin. Di serî de Bakunîn anarşîst li ber vî hukmî rabûn; îdea kirin ku dewleta netewe, ne ku azadiya ferdî ya herî pêşketî, lê koletiya modern îfade dike, jiyana bi awayê kominîteyan bêhtir bi kêra azadiya ferdî tê.

Sosyalîzma zanistî xwe kir bin banê dewleta netewe ya navendî. Lewma diviyabû her çîna proleter a welatekî berê pêşî ji bo xurtkirina vî banî hewl bida, hem jî di bin vî banî de rêxistiniya çîna xwe biafiranda. Diviya riya enternasyonalîzmê di dewleta çînî ya mîlî re derbas bibûya. Sosyalîzma zanistî çiqasî pêk hat, dest pê kir xwe weke sosyalîzma pêkhatî îfade kir. Bi avakirina Yekîtiya Sovyetê re xwe bi awayekî fermî weke sosyalîzma pêkhatî îlan kir. Dewleta sosyalîzma pêkhatî jî dewleta netewe ya bi pêşengiya proleteryayê bû. Ji vê jî wêdetir, cudahiya dewleta proleter ji dewleta netewe ew bû ku bêhtir navendî bû û li civakê belav bû. Bi awayekî 'Sosyalîzma Firewn' a proleteryayê derketibû holê. Ji welatên paşvemayî û bi hegemonya kapîtalîst ve girêdayî û ji kapîtalîzma burokratîk a modela kapîtalîstbûna neteweyan re sosyalîzm gotin. Sosyalîzma zanistî weke sosylîzma pêkhatî, sosyalîzma pêkhatî jî weke kapîtalîzma burokratîk pêk hat (kapîtalîzma kolektîf) û ev jî bûbû sosyalîzm. Me bi xwe dît ku ev sosyalîzm bi sedemên hundirîn riziya û di serê salên 1990'î de bi dengênî ji hev de ket û hilweşiya. Me bawer nedikir ku sosyalîzm bi vî awayî ji hev de bikeve, lê jihevdeketin û hilweşîn rast bû. Ya rastî, ya ji hev de diket ne sosyalîzm bû, eşkere, ya ji hev de diket kapîtalîzma burokratîk bû; ew jî dewleta netewe bû ku xwe weke kirdarê kapîtalîst bi rêxistin kiribû. Ango proleteryaya ku xwestibû civakeke bêçîn biafirîne bi xwe veguherîbû çîna herî hov a kapîtalîzmê. Bi vî awayî cîlweyeke diyalektîkê pêk hatibû.

PKK ji têgihiştina dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî ku me bi xetên stûr pêşnûmeyeke wê pêşkêş kir, bi tesîr bûbû. Hem jî bi awayekî çor û seresere bi tesîr bûbû. Asta me ya çandî ji bo vê ewqasî derfet û îmkan dida. Ya rastî, me nizanîbû bê ka dewleta sosyalîzma pêkhatî çi ye. Li

vir mirov dikare behsa bîrbirinekê bike ku deriyê wê li her cure şîroveyê vekiriye, şîlo ye. Çi di dema derketina holê de weke fikra siyasî û îdeolojîk ango di dema partîbûnê de, çi jî wexta em bûn rêxistineke şer, me timûtim têgîna 'Kurdistana Demokratîk, Yekbûyî, Serbixwe' bi kar anî. Lê me nikarîbû vê Kurdistanê bi temamî rave bikin û bidin nasîn. Gelo wê civakeke wekhev û azad be, yan jî wê bibûya dewleteke mîna dewletên sosyalîst yên demê? Gelo bi şêweyê herî paşvemayî wê bi tenê bibûya dewleteke mîllî? Naxwe mebesta me Kurdistaneke xwedî civaka demokratîk bû? Ya rastî, der barê van pirsan hemûyan de bersiveke me ya zelal tinebû.

Di çarçoveya van pirsan de hedefa şerê me yê gel ê şoreşgerî û rêxistina mîlîtan şîlo bû; pêkan bû ku ber bi her alî ve bê şîrovekirin. Li gorî şert û mercên em di navê de bûn, em bi pirsan re rûbirû bûn ku karîbûn rê li ber jirêderketinê vekin. Artêşek û şerek heta hedefên xwe zelal nebin, her tim pêkan e ku bikevin şaşiyê û heta birizin. Herçî li ber serketinê be jî eger bi temamî neyê zanîn wê çi bê kirin, ev dikare bi xwe re ji hev belavbûnê jî bîne. Mînak, şervanên Spartakus di wê rewşê de bûn ku bajarê Romayê bistînin, lê nizanîbûn wê çi ji Romayê bikin û çawa wê bi rê ve bibin. Belkî karîbûn talan bikin. Lê talankirin bi xwe riyek bû ber bi têkçûnê ve diçû. Ezmûna me ya şerê gel ê şoreşgerî jî hatibû gihiştibû ber gelek serketinên mezin. Lê me pêşbîniya paşê nedikir û me nizanîbû em ê çi bikin. Li gelek dever û herêman şert û mercên otorîteya şoreşger derketibûn holê. Lê kadro yan jî namzetên me yên fermandariyê hê nizanîbûn otorîteya şoreşger çi ye. Heta demekê min ev gotina gel pirr anî ziman: "Çîngene kirine paşa, pêşî bavê xwe bi dar ve kiriye." Rewş li cem me jî hinekî bi vî rengî bû. Me otorîteya şoreşgerî bi serê gelê xwe de teqand. Hê jî tê bîra min: Ciwanekî zanîngehê yê ji Colemergê ji bo her cure alîkarî û xizmetê tê cem Hogir. Ev rezîl tişta pêşî dike ew e, vî ciwanî weke 'ajan' îlan dike û dikuje. Dîsa kurê serekêşîrekî ku desteka wan a ji bo têkoşînê gelekî krîtîk bû, di şertên herî zor de tevî endamên eşîrê timî xizmet dikirin. Ew kurik jî kuştin. Hevalekî mîlîtan û fedekar bi nasnav Cîhan hebû. Min gelek qîmet didayê. Paşê ez hîn bûm ku zarokê bi tenê yê malbatê ye. (Trajediyeke mezin bi serê bavê wî de hat. Yek ji hezaran trajediyên ku min ji bîr nekiriye) Min ew bi armanca destekê bide şand Dêrsimê cem Hidir Yalçin (Serhat) û Aysel Çurukkayayê. Lê bi tenê bi fikara wê bibe hevparê otorîteya wan texsîr nekirin bi awayekî rezîl ev kurik kuştin.

Şemdîn Sakik ê rezîl bi vî awayî gelek kes kuştin; qetl û qutûlên wî bêhed û hesab in. Min gotina 'paşayê çîngene' ji bo vê xisleta wî bi kar anîbû. Lê ne bi tenê ev, pirraniya zêde ya fermandaran otorîteya gel a şoreşgerî ya li ber serketineke dîrokî bû, bi awayekî rezîl, xayînane û bêrehm bi kar anîn û ji vê paxav nekirin. Bi vê rêbazê yeqîn dikirin ku wê bibin otorîte, kê darve bikin wê bikin, kê serjê bikin wê bikin. Mirov dikare bibêje ku em tam li ber serketinê bûn, di warê otorîteyê de em ketin nava vê rewşa riziyayî û dejenere bûyî. Bêguman di vê rewşê de mirov nikare bandora Gladîo-JITEM'ê yekser an jî neyekser ji nedîtî ve bê. Lê pirraniya neyêniyan ji sedî sed ji ber 'nexweşiya otorîte û desthilatdariyê' bû. Di demekê de ku destekdayîna gel gihiştibû asta herî jor, bi vî awayî piçûkxistina gel û bi awayekî egoîst nêzîkbûna wî, ji xiyanetên

herî mezin ên bi zanebûn bêhtir rê li ber encamên bi zirar û ziyan vekir. Kengî ev nêzîkatî bi kirinên kontrgerîlla re bûn yek, ne bi tenê desteka gel kêm bû an jî hat birrîn, gelek mirovan ji bo xweparastinê ji bûyîna cerdevaniyê jî paxav nekirin. Bi mîlyonan mirovên fedekar ên ji gelê me, bi sedema ku otorîteya şoreşger xwedî li wan derneket li keviyên metrepolan ketin ser hev û bi awayekî şerpeze, reben û birçî man. Bi tiştên li ser çopan debara xwe kirin. Lê ew fermandarên rezîl ên me îşaret bi wan kir, ti tişt ji wan ne kêm bû. Bêguman em li vir kesên ji bo gel her fedekarî kirine, ji bo vê her tişt li ber çavan girtine, di nava şert û mercên dijwar de birçî û tî mane, di nava pûk û berfê de heta niqrîska dawî li ber xwe dane û şehîd bûne û yên hê hene tenzîh dikin û dûr dibînin û dibêjin, dûrî wan be.

Otorîte di felsefeyê de yek ji wan mijarên civakî û polîtîk e ku zêde tê guftûgokirin. Civak çiqasî bi pêş bikevin bivênevê otorîte jî wê bi pêş bikeve. Ji civaka klan heta bi civakên hegemonîk ên roja me ya îro li cem tevahiya civakan cureyên gelekî cuda û cihê yên otorîteyê hatine dîtin. Weke pîvan mirov bi xirabî nikare behsa otorîteyê bike. Divê mirov otorîteyan li gorî şert û fonksiyona wan binirxîne û bide naskirin. Erka dayikê jî otorîteyek e, lê gelekî hêja ye, hilberîner e. Erka bavan otorîteyeke bêhtir cuda ye. Aliyên wê yên erênî û neyênî ketine zikhev. Otorîteya hiyerarşîk di destpêkê de herçiqasî bi roleke tenzîmker rabe jî paşê her diçe dirize. Otorîteya veguherî desthilatdariyê, tê wê maneyê ku ji sedî sed gihiştiye sînorê xirabiyê. Tevahiya dîrokê otorîteya desthilatdar weke çavkaniya xirabiyê hatiye dîtin û ev ji karekterê wê yê desteserker û koleker e. Di otorîteya dewletê de xisletên erênî û neyênî di zikhev de hene. Di çarçoveya gelemperiyê de aliyên wê yên neçar pêk bên hene. Aliyên wê yên neyênî hene ku neçar nînin bêne pêkanîn û bi armanca desthilatdariyê têne bikaranîn. Otorîteya demokratîk cureyekî otorîteyê ye ku cudatir e. Maneya wê ew e, civaka rojane xwe bi xwe bi rê ve dibe. Rêveberiya polîtîk ji ber ku neçar e guftûgoya kolektîf û nexasim bi tevahî berjewendiyên gel bike bingeh, gelekî hêja ye û jiyana exlaqî misoger dike, stûna sereke ya vê jiyanê ye. Ji bilî van, em di gelek qadên din ên weke zanistî, ekonomîk û dînî de şêweyên cihê û cuda yên otorîteyan dibînin. Bi şertê ku mirov van cureyên otorîteyê muhafezekar, şexsî û zumreyî neke hemû hêja ne, û dest ji wan nabin.

Otorîteya şoreşgerî kêliya derketina holê ya otorîteya divê li tevahiya van qadan hebe, îfade dike. Ew otorîte ye ku paşî bi sazî dibe. Herçiqasî di destpêkê de aliyê wê yê şexsî bêhtir li pêş be jî timî kolektîfbûna wê tê tercîhkirin. Bêguman her otorîteya şexsî xirab nîne. Otorîteyên şexsî kengî di cihê xwe de û li gorî maneya xwe ya dîrokî û civakî hatin bikaranîn nirxên mezin diafirînin; guhertin û veguherîna civakî bêhtir bi lez û serketî dikin. Lê carinan dikarin berevajiyê vê jî bin. Bi qasî kesayetên erênî yên dîrokî, kesayetên neyênî yên dîrokî jî hene. Ango divê mirov ti carî dest ji otorîteya kolektîf nekişîne. Otorîteya şexsî erênî be jî gelekî girîng e ku mirov li cem wê otorîteya kolektîf kêm neke. Otorîteya şoreşgerî, çi kolektîf dibe çi şexsî dibe, ji ber ku wê paşê rê li ber bisazîbûna civakê veke, gelekî hêja û nazik e. Gelekî heyatî ye ku di cihê xwe de

û rast bê bikaranîn. Hê girîngtir e ku di dema xwe de bê bikaranîn. Di şert û mercên bi vî rengî de bi otorîteya şoreşgerî lîstin û li ser navê berjewendiyên şexsî yên egoîst ên otorîteyê bi awayekî neyênî û xirab bikaranîn, xirabiya herî mezin e ku bi civakê, gel û heta dewletê bê kirin.

Ji me hat em bibin otorîte. Lê yan me nizanîbû em ê bi otorîteyê çi bikin an jî mîna mîsala 'kesê ji ser xwe ve çûyî" her kesî dixwest wê bi aliyê xwe ve bikişîne. Ez dema dibêjim her kesî, bêguman mebesta min qehremanên gelekî hêja û fedekar ên bênav nînin, ez behsa wan kesan dikim ku heqê fermandariyê nedane û erka xwe bi oportunîstî bi kar anîne. Derketibû holê ku kesên em behsa wan dikin, bihêlin otorîteya dewletê yan jî otorîteyeke din temsîl bikin, tîpên bi vî rengî ji bo daxwazên xwe yên herî rezîl otorîte bi kar dianîn û ji vê nedigeriyan. Di bingehê pêxîrtengiya PKK'ê de pêşketina şêweyên riziyayî, çeloxwarî û komploker ên otorîterbûn û desthilatdarbûnê hebûn. Ya pêk dihat, nexweşiya desthilatdarbûnê bû. Ev nexweşiyek e ku li cem sosyalîzma pêkhatî gelekî çêbû. Divê mirov baş zanibe ku tevahiya dîroka şaristaniyê di bingehê tevahiya nexweşî yan jî pirsgirêkên civakî de bi giranî hêza desthilatdariyê, nexasim tepeserkirin û mêtina wê ya civakê heye. Vê nexweşiyê di PKK'ê de piştî salên 1990'î dest pê kir û bi tevahiya giraniya xwe bi tesîr bû. Bêguman bingehê çandî yê nexweşiyên bi vî rengî li cem civakan her heye. Dema firsendê dibînin li ser navê çareseriyê fikaran nakin, hildiperikin, derdikevin holê. Ji bo rizgarbûna ji bandora neyênî ya şêweyên çandê pêdivî bi partiya îdeolojîk û polîtîk hebû. Lê partî bi xwe di sosyalîzma pêkhatî de bû çavkaniya otorîte û desthilatdariya sînornenas. Modela dewleta netewe herî zêde bi riya partiyê xwe zêde dikir. Di dewletên netewe de partiyan ji bo desthilatdariya dewleta netewe bi dest bixin an jî ji bo heman desthilatdariyê bigihînin civakê û rewa bikin weke amûran rol girtin. Herî zêde li cem sosyalîzma pêkhatî ev têgihiştin hat bikaranîn û kirin tek sîstem. Ha sîstema tek partî, ha dewleta partiyê yek tişt e. Ev têgihiştina dewleta partiyê bû ku dawî li sosyalîzma pêkhatî anî.

Di civakeke mîna civaka Kurd de ku ferd bi sedsalan hatiye eciqandin, kengî otorîte dikeve destê wî mîna li ser wî hatiye bikaranîn ew ê jî bi kar bîne û bi hêsanî jî ji vê nagere. Ji ber ku bi vê çandê hatiye strandin. Ji ber ku têgihiştina otorîteya rast pêş neketiye, bi tenê ya ji dijminê xwe hîn bûye wê pêk bîne. Çawa ku em zanin, li cem sosyalîzma pêkhatî ev gera li dora singê xwe ya bêber û bêencam nehatiye rawestandin, berevajî bêhtir hatiye şidandin, bêhtir hatiye xurtkirin.

Otorîteya bi vî rengî ya PKK'ê hewl da ji sosyalîzma pêkhatî hîn bibe û li derveyî têgihiştina dewletê pêk dianî, hêmaneke din a girîng bû ku ev şîlobûn zêde dikir û ev ji xwezaya desthilatdariya di bin navê Komara Tirkiyê de pêk dihat. Împaratoriya Osmanî ya li ser mîrateya desthilatdariyê ya Rojhilata Navîn û Bîzansê hatibû avakirin, beşek be jî ji vê mîrateya xwe dewrî Komara Tirkiyê kir. Rejîma nû hêmana dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst bi vê mîrateyê qelem kir û mîna cinawirekî civakê daqurtîne (Levîathanê modern) derxist holê. Di desthilatdariya Komarê de Kurd hem bi rola hêmana sereke radibûn, hem jî piştî demeke kin

hebûna wan hat înkarkirin. Vê rewşê hem pirsgirêka Kurd dikir pirsgirêkeke bi êş û xwînrij, hem jî di heman demê de ji aliyê mijara desthilatdariyê ve bi fonksiyoneke gelekî korkir û aloz radibû. Kir ku di desthilatdariyê de (ji bo çînên bûrjûwa yan jî serwer) para wan xuya neke û weke civak jî li nava tinebûn û valatiyê bimînin. Ji lewra vê rewşê bi awayekî xwezayî rê li ber têgihiştina şaş a desthilatdariyê yan jî otorîteyê vedikir. Ya rastî, rejîmê bi xwe cihêkarî dikir, lê hevparê xwe yê ku înkar dikir, bi cihêkarî û cudaxwaziyê gunehbar dikir. Falsîfîkasyon bi vî awayî dihat kirin. Bêguman ez vê rastiyê ji bo rêxistina hevpar an jî rastiya desthilatdariyê diyar nakim; ez hewl didim nîşan bidim ka rastiyê çawa dikin diyardeyeke jirêderketî û korker. Ev rastî, rê li ber daxwaza dewleteke netewe ya şaş hatiye hûnandin vedike. Kengî bingeh şaş hat danîn, li cem rêxistinê yan jî PKK'ê şîlobûna îdeolojîk û polîtîk jî zêde dibe.

Em du qatî ketine nava şîlobûnê: Ya yekê, tek partiya dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî ye; ya dudiyê, şêweyê avabûnê yê tevlîhev û korker ê desthilatdariya di bin navê Komara Tirkiyê de hatiye hûnandin e. Wekî din, mirov qelsiyên tepisokî yên nasnameya Kurd a xwenenas li vê zêde bike, hingê pirsgirêkên binyewî yên PKK'ê der barê desthilatdarî û otorîteyê de wê baştir bêne fêhmkirin. Di salên 1990'î de pirsgirêkên otorîte û desthilatdariyê çiqasî zêde bûn û hewcedariya gel bi otorîteyeke wî biparêze ket rojevê û her ku çû bersiva vê hewcedariyê nehat dayîn, pirsgirêk veguherîn pêxîrtengiyê. Ji bilî min kesek li ser van pirsgirêkan nedifikirî, nedixwest bifikire, bi awayekî çor be jî kesekî hewl nedida bersivekê ji van pirsan re bibîne. Min bi hêl û hêza xwe hemûyî hewl dida rêxistin û çalakiyan domdar bikim, pirsgirêkên mezin dikirin û derdixistin holê çareser bikim. Vê nêzîkatiyê di dawiya dawî de pirsgirêk mezintir dikirin. Cara pêşî di sala 1995'an de min his kir ku ez ji xwe zivêr bûme. Haya min ji min hebû ku min rêbaz zêde dugêsinî dikir. Diviyabû ez ji vî şêwazî bigeriyama, di qadeke din de şêwazekî din pêşde bibirana û ev şêwaz ê bêhtir çareserker û pêşdebir bibûya. Ez ne bi tenê bi vê hisiyabûm, min pêdiviya bi vê jî his dikir. Lê ji ber sedemên rêxistinî û siyasî min rast nedidît ku ez dev ji statuya stratejîk a li Sûrî berdim. Lewma mirov dikare bibêje ku ez xetimîbûm. Lê vê rewşê gurrûgeşiya xebatan ti carî kêm nedikir, rê li ber ti zirar û ziyanê venedikir û bi awayekî pirralî serketina di xebatan de dewam dikir. Dîsa jî bi awayekî kûr min timî pêdiviya bi rêbazguhertinê his dikir.

Di salên 1997-1998'an de bi navbeynkariya Alîkarê Sereke yê Serokdewletê Sûrî Hafiz Esed, Ebdulhelîm Xeddam neyekser be jî diyaloga ji nû ve pêk hat, karîbû rê li ber rêbazeke nû veke. Qada Sûrî ji bo vê derfet û îmkan dida. Ango ji vî alî ve jî min tercîh nekir ku ez qadê biterikînim. Wekî din, nexasim piştî salên 1990'î bi malên mezin me kampên xwe barkiribûn nava Sûriyê. Bi desthilatdariyê re têkiliyên me bêhtir bi pêş ketibûn. Eger ez hinekî behsa bandora vê rewşa nû li ser jiyana xwe bikim, dibe ku bêhtir bê fêhmkirin. Li Sûriya Hafiz Esed jiyanê berpirsiyarî û qabîliyeteke mezin ferz dikir. Statuyeke wisa bû, bi hêsanî mirov nikarîbû bi dest bixista. Li dijî tehlûkeyeke ji Tirkiyê bihata hebûna me weke garantî dinirxand û têkilî li ser vî bingehî hatibû danîn. Ji aliyê dîrokî ve jî fikarên Sûrî ji cîranê wî yê Bakur hebû. Lewma hebûna me ji her alî ve ji

bo Sûrî mîna sîgortayê bû. Ji bo PKK'ê jî Sûrî ew welatê kilît bû, pê herêm vedikir. Rewşa Kurdên li Sûrî girîngiya me bêhtir dikir. Eger rast bihata bikaranîn wê girîngiya têkiliyan bigihişta asteke stratejîk. Herweha li ser tewazunên hundir ên desthilatdariyê rola Kurdan girîng bû. Di dîrokê de jî yek ji rawestgeha pêşî ya mişextkiriyên Kurd bû; qada dostaniyên hêja bû.

Li herêmê bi qasî bîst salên min çêbûn û min behsa nuqteyên sereke yên van salan kir. Di xebatên xwe yên demên dawî yên li Sûrî de ji bandora nêz a desthilatdariyê zivêr bûm. Ev zivêriya min ji ber çi zor û zextekê nebû. Min ji bandora desthilatdariyê ya mirov xira dike fikar dikirin. Dîplomasiya xwe disipêre desthilatdariyê zêde bi xwezaya xebatên şoreşgerî re li hev nake. Xebata min a li Libnanê bi awayekî mîna xebata li çiyê bû. Ez li wir bêhtir bi aram û bi huzûr bûm. Şertên tevgerê û tenduristiyê bêhtir baş û di cih de bûn. Li Sûrî ez mehkûmî erebe û xanî bûbûm. Perwerdeya di çarçoveya analîzan de ji perwerdeya li Libnanê paşvetir nebû heta bêhtir bi kalîte û berfirehtir bû. Ji ber ku ez yek bi yek bi namzetan re eleqedar nebûm, min ev timî weke kêmasiyeke xwe dît. Ji bo min namzetên ewqasî hêja hebûn ku min hez dikir ku tevahiya temenê xwe bi wan re derbas bikim. Lê xebatan ez ewqasî ji hev belawela dikirim, min ji ber vê yekê firsend nedît bi dilê xwe bi wan re eleqedar bibim. Beşekî mezin ji wan şehîd bûn. Di dilê min de cihê hemûyan weke kulekê ma. Ya rastî, di bin vê helwesta min de baweriya min a bi mezinbûna têkoşîna şoreşê hebû. Ji ber ku min têkiliyên şexsî di dereceya duyemîn de didîtin. Nêzîkatiya kolektivîst li cem min bûbû mîna nexweşiyekê. Min têkiliyên ferdî di kategoriya têkiliyên taybet de didîtin û lewma min ew piçûk didîtin. Ji ber vê, dilê min tim diêşe, bi sedema ku min bersiva hesretên van mirovên mezin neda. Lê dîsa jî bi awayekî sembolîk be jî di çûn û hatinan de, di dersan de min hewl da bi wan re diyalogê deynim. Serdana gel jî min bi dilê xwe nikarîbû bikirana. Di pîrozbahiyên hin salvegeran de ez ji gel re dipeyivîm, lê ev têkiliyeke gelekî giştî bû û qîm nedikir. Ji lewra min li têkiliyên fermî weke têkiliyên bêhna desthilatdariyê ji wan tê dinêrî û dilê min li wan germ nedibû. Mîna alternatîfekê bûn ku min ji gel dûr dikirin. Gelek dost, kes û kom hatin cem me. Em bi wan re baş eleqedar nebûn û mîna ku ev hemû encama desthilatdarbûnê bûn. Fena ku ez di navbera gel û desthilatdariyê de diçûm û dihatim. Kûrfikirkirina min a li ser dualîteya desthilatdarî û demokrasiyê bi saya van têkiliyan e.

Min jin weke kategoriyeke cuda ya gel nirxandin. Herçiqasî şert di cih de nebûn jî min timî hewl da ji wan re cihekî bibînim. Min fikar nekir ku malên lê diman bidim berpirsiyariya wan. Hinek kesên rezîl, ji ber ku nasnameya jinê rast ji hev dernexistibûn û qebûl nekiribûn, ev nêzîkatî û xebat şaş dinirxandin. Dema jin an jî keç dihat gotin, timî têkiliyên cinsî yên çor û erzan dihatin bîra wan. Lê bi herhalî di xebatên jinan de ez bêhtir li girîngiya rastî, heqîqeta dîrokî û civakî hayil dibûm. Ew ji bo min cewherê sosyolojiyê bûn. Li qada xwe, herçiqasî tengbû jî min nîzama hîyarerşîk a li ser wan xira dikir û tiştên mirov ji vê hîn dibû mirov nikarîbû ji hezaran pirtûkî hîn bibûya. Platforma têkiliyan a min bi wan re danîbû statuya mêrê serwer a di çarçoveya pîrek û

zilam de hatibû danîn parçeparçe dikir. Ya rastî, ez bêhtir jî bi parçeparçebûna vê statuyê bextewar dibûm. Her ku diçû derdiket holê ku ew objeyeke cinsî nînin, mirovên hêja ne, û bi vê yekê em serbilind dibûn. Vê nêzîkatiyê rê vedikir li hezkirinê bi xwe. Ew cîhana hezkirin û rêzgirtinê ya ku ji nava rastiya dîrokî û civakî tê, yek a din nas dike, ji sedî sed kes zorê li kesî nake, xwedî hêzeke bêhevta ye. Herçiqasî ji nava wan kesên ji pîreka ketî nikaribin bibihurin derketin jî û hewl dan bi gotegotên xwe xira bikin jî gelek jinên hêja û gelek bi kalîte derketin. Pirraniya wan jî şehîd bûn. Ez ê ji wan re nebêjim qehremanên bênav, ew qehremanên rastî bûn. Eger jiyaneke civakî ya mirov pê rabe wê hebe, bi tenê bi dilsoziya bi bîranînên wan û bi meşa li ber rohniya wan a rênîşaner re dibe. Jiyaneke bi jinê re bi tenê di vê astê de jiyaneke hêja ye. Jiyanên din ku li ser nivînên ji perîkên çivîkan derbas bibin jî li gorî min ji perpitîna di çalekê de ti cudahiya xwe tineye. Bi kurtî ez gihiştim vê encamê: Rastî, bedewî û qenciya xwedayî ya li cem jinê bibîne û pêre bijî! + Pirr hindik be jî me ji vê jiyanê para xwe girt, me parve kir û em jiyan. Ez dema dibêjim, em jiyan, min xwest ez diyar bikim ku felsefeya jiyana azad bi tenê li ser bingehê parvekirinê dikare manedar bibe û mirov dikare wê terîf bike.

Me û gelek hunermendên dost li vê qadê hevdu nas kir. Me ji hevdu îlham wergirt. Min bi saya van têkiliyên dostane fêhm kir ku huner şêwazek e ku rastiyê rave dike. Bêguman di nava van hunermendan de ji bo min ê li rêza pêş tê Aram Tîgran e. Jixwe ez behsa naskirina wî ya li vê qadê dikim ku ji bo min xwedî nirxekî mezin ê dîrokî ye. Ji bo min hunera wî, Kurd û Kurdistana rastî bû ku dihat ziman. Di dema xwendina min a lîseyê de bû; min cara pêşî bi awayekî xweber dengê wî bihîstibû û ez ji bîr nakim ku min di ber xwe de gotibû: “Rastiya ku ev deng îfade dike, divê ji sedî sed mirov wê bide jiyîn, hem jî bi awayekî azad!” Berî ku ez ji Sûrî veqetim bi rojekê em bi hev re bûn. Ez ti carî nefikirîbûm ku em ê careke din hevdu nebînin. Min ti carî veqetîneke wisa nexwestibû. Ji bo wî bextewariyeke mezin bû ku konsêrên xwe yên Diyarbekirê pêk anîbûn. Wî em, me Ew dişopand. Di demekê de ku li ser Kurd û Kurdistanê bêdengiya mirinê dihat ferzkirin ev dengê dawidî derketibû holê û ev dengê ji wan heyeman tê weke siltanê deng ê rastiya me ya azad wê her tim bi me re bijî.

## B- KOMPLOYA MEZIN A GLADÎOYÊ

### 1- Derketina Ji Sûrî

Derketina ji Sûrî bi operasyona NATO-Gladîo’yê re têkildar e. Eger em jihevcudabûna di nava artêşa Tirk de û Gladîo’yê li ber çavan negirin, em nikarin vê operasyonê rast şîrove bikin. Bi qasî tê yeqînkirin, Serokatiya Fermandariya Giştî ya I. Hakki Karadayi û ya Huseyin Kivrikoglu serdestî her tiştî nebûn. Di pirsgirêka Kurd de nêzî helwesta Eşref Bitlis bûn. Li gorî wan bi şer bi temamî tesfiyekirina Kurdan hem ne pêkan bû, hem jî ne rast bû. Çareseriya siyasî û aştiyane ya Turgut Ozal û Eşref Bitlis dixwestin bidin destpêkirin hem weke erkeke welatparêziyê, hem jî li gorî têgihiştina şerê klasîk di cih de didîtin. Sakip Sabanci jî di nava TUSIAD’ê de temsîla beşekî dikir

ku xwedî li vê xetê derdiket. Di nava MIT'ê de Serokê Daîreya Kontrgerîlla Mehmet Eymur û ji nava Midûriyeta Polêsan jî Hanefî Avci nêzîkatiyên wan parelelî heman xetê bûn. Vê ekîbê bûyera Sûsûrlûkê jî nirxandibû û li dijî lobiya şer pêngavek avêtibû. Dogan Gureş û Çevîk Bîr temsîla ekîba dijber an jî baskê Gladîo'yê dikirin. Hewldanên reşkujiyê yên li beramberî Sakip Sabanci û Huseyin Kivrikoglu ji aliyê vê ekîbê ve hatibûn pîlankirin. Wekî din, berê jî di serî de li dijî Turgut Ozal û Eşref Bitlis gelek reşkujiyên bi armanca tesfiyekirina hin kesan di nava dewletê de ji aliyê selefên heman ekîbê, û dûvikên wan ên berê ve hatibûn pêkanîn. Sala 1990'î li gorî rêûresmên artêşê dora Serokatiya Giştî ya Fermandariyê hatibû Muhittin Fisunoglu. Kengî li derveyî rêzik û pîvanan Dogan Gureş bû Serokê Fermandariya Giştî derz û nakokiya di navbera wan de mezin bû. Ekîba din, bi çaya jehr xistibû navê hewl da bi destê du eskerên sempatîzanê PKK'ê yên di nava artêşê de Dogan Gureş bikujin. Ev hewldana reşkujiyê tam bi ser neket. Li Îmraliyê kengî dozgerê eskerî yê taybet pirsî kê der barê vê mijarê de biryar daye, min got herdu esker sempatîzanê PKK'ê bûn, piştî bûyerê reviyan û tevlî nava refên gerîlla bûn û herdu jî şehîd bûne. Min gotibû ez texmîn dikim ku biryar ji nava artêşê hatiye dayîn. Bi vî awayî, jêpirsîna di vî warî de jî bi dawî bû.

Di nava artêşê de nakokiyên bi vî rengî heta bi serê sedsala 20. û heta hê beriya wê hene. Ji xistina text a Siltan Ebdulhemîd heta bi hewldana reşkujiyê ya Mistefa Kemal, ji pêvajoya qirkirinê ya li dijî Kurdan a bi komploya 15'ê Sibata 1925'an a li dijî Şêx Seîd dest pê kir û heta bi 18'ê Mijdara 1937'an bi komployê darvekirina Seyîd Riza, ji girtina Firqeya Serbest (1930) heta bi xistina Înonî ya ji serokwezaretiyê (1937), ji darbeya eskerî ya 27'ê Gulana 1960'î heta bi darbeya postmodern a 28'ê Sibata 1998'an û herî dawî jî piştî salên 2000'î amadekariyên darbeyê bi qasî sedsalekê derbas bûye û di tevahiya van bûyerên bi vî rengî de şerê heman xetê heye. Pêşî Elmanya, paşê li gorî rêzê hêzên hegemonîk Ingilîstan û DYE'yê ji derve destek didan van şeran û bi vî awayî ew kontrol dikirin. Ev bûyerên reşkujî û komployê hemû bi xwe şerên hegemonyayê yên li dijî gelên Rojhilata Navîn, nexasim li dijî gelên Anatolya û Mezopotamyayê îfade dikin. Ji van şeran a para berxwedana Kurd a PKK pêşengiya wê dike çar demên girîng ên şerê Gladîo'yê ne ku min di beşên beriya vê de bi awayekî pêşnûme pêşkêş kiribûn. Şerê hêzên hegemonîk ên kapîtalîst bi kirasê faşîzma Tirkê Spî dewam dikir. Ji dema M. Kemal ve beşekî di nava artêşê de yê ji vê zivêr hebû. Ev beş welatparêz û Anatolîparêz bû. Ji darbeya 27'ê Gulana 1960'î heta bi amadekariyên darbeya piştî salên 2000'î rewşa vî beşî ji komploger û darbekaran cuda bû. Li pişta darbekar û komplogeran bi awayekî bingehîn NATO û Gladîo'ya wê hebûn. Herweha di nava civaka sivîl de navend û şaxên xurt ên herdu aliyan hebûn. Ev di nava xwe de timî xwedî nakokî û têkilî ne. Li gorî deman serdestiya wan a li ser hevdu diguhere. Ji aliyê çînî ve jî divê bûrjûwaya mîllî û hevkar temsîl bikin.

Ha di navbera van herdu beşan de berî ku ez ji Sûrî derkevim dîsa hevrikî û reqabetê serî dabû. Reqabeta di navbera beşê alîgirê diyaloga bi me re û dijberê wan de, bi desteka Îsraîl û DYE'yê

baskê NATO-Gladîo ango beşê alîgirên şer û îmhayê serdest bûbûn. Beriya derketinê bi demeke kin, îstîxbarata Îsraîlê bi awayekî neyekser bi israr peyam dida ku divê ez ji Sûrî derkevim. Min veqetîn di cih de nedîtibû. Min fikar dikir ku wê statuya me ya li Sûrî derbeke mezin bixwe. Min ji aliyê stratejîk û îdeolojîk ve rast nedidît. Şer wê di riya xwe ya xwezayî de bimeşiya, di çarenûsê de çi hebû wê ew biqewimiya. Ez ne li ser xeta çarenûsî bûm. Lê ji bo min helwesteke manedar a dijçarenûsê nebû ku ez rabûma min xeta eskerî, polîtîk û îdeolojîk a sîh salî bidaya aliyekî û rota biguherta. Diviyabû ez durist bûma, ne rast bû ku ez li rizgarkirina xwe bifikiriyama. Piştî ku Atîlla Ateş li ser navê NATO-Gladîo cara dawî hişyar kir, eger Sûrî û Rûsya bi awayekî bi biryar pişta me bigirta şensê me hebû ku me şer derxista asteke jortir û bêhtir berfireh bikira. Lê bihêlin em vê destekê bibînin, herdu welat hêza wan tinebû giraniya min a şexsî rakin an jî ji bo vê niyeta wan tinebû. Bi rastî ji bo Sûrî ev ne pêkan bû. Ji Bakur Tirkan, ji Başûr jî Îsraîliyan di nava rojekê de karîbûn wê dagir bikin. Eger neketibûna nava panîkê, karîbûn ji bo min cihekî bêhtir di cih de bibînin. Nikarîbûn vê jî li ber çavan bigirin. Jixwe helwesta Rûsyayê bêhtir bêrûmet bû. Di berdêla Projeya Herikîna Şîn û krediya deh mîlyar dolar a IMF'ê de em bi darê zorê ji Moskovayê derxistin.

Berî ku ez behsa serhatiya xwe ya Atîna û Romayê bikim, divê em bêhtir ji nêz ve li dema beriya derketinê û dema derketinê binêrin. Ev gelekî girîng e, û mirov dikare ji vê pêvajoyê gelekî hîn bibe.

Eger mirov rast li dualîteya darbeya 28'ê Sibatê serwext nebe nikare fêhm bike ku çi diqewime. Milekî darbekaran bi pêşniyareke rastî ya aştiyê nêzî me bûbû. Ez yeqîn dikim ku der barê vê de wê di arşîva me de belge hene. Min bawer kiribû ku nêzîkatiyên wan jî weke yên Turgut Ozal û Necmettin Erbakan ciddî ne, û aştiyê dixwazin. Ev helwesta alîgirê çareseriya siyasî û aştiyane rê li ber darbeya di nava darbeyê de vekiribû. Niha têra xwe eşkere bûye ku di wê demê de ango heta bi girtina min, Îsraîl û DYE ji sedî sed alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane nebûne. Di asteke nizim de be jî dewamkirina şer û bêçareserîhiştina pirsgirêka Kurd bi israr xwestine. Ji bo Rojhilata Navîn, nexasim ji bo Iraqê kontrol bikin û wê bişikînin, bi dijwarî pêdiviya wan bi vê hebû. Ji ber ku bi tenê bi vê riyê karîbûn Tirkiyê pasîfîze bikin û pîlanên xwe pêk bînin. Turgut Ozal, Necmettin Erbakan û Bulent Ecevît bi sedema ku guh nedan van pîlanan û bêhtir bûn xwedî helwesteke Anatolîparêz, mîllîgir û di pirsgirêka Kurd de bûn alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane ji desthilatdariyê hatin xistin. Ji bo alîgirên şer pirr girîng nîne ku wexta kesên behskirî ji desthilatdariyê dixin ew kes bêne kuştin an neyên kuştin. Jixwe di nava şer de ne. Bi şer dixwestin heta dawiyê biçin û her astengiya derkeve pêşiya xwe bişikînin û bi vî awayî bigihîjin armanca xwe. Di nava van astengiyan de pirsgirêka Kurd jî hebû. Ya lê difikirîn bi riya eskerî bi tevahî tesfiyekirina wê bû ango bi awayekî li qirkirina Kurdan difikirîn. Eger hêzên hegemonîk pişta vê têgihiştina ku dewama xeta Îttîhad û Teraqîgirên berê bûn negirta, ti carî şensê wan ê serketinê tinebû. Ji ber ku wan jî bi vê zanîbûn, ji sedî sed hewcedarî desteka DYE, Ingilîstan û

Îsraîlê bûn. Bi derketina min a ji Sûrî di sala 1998'an de desteka pêdiviya wan pê hebû tedarik kiribûn.

Di serê salên 1990'î de desteka DYE û Ingilîstanê, di sala 1996'an de jî desteka mutleq a Îsraîlê (Di navbera Îsraîl û Tirkiyê de, di warê eskerî de peymanên hevkariyê yên stratejîk) tedarik kiribûn. Piştî ku alîkariya hewcedariya wan pê hebû tedarik kirin, dor hatibû destwerdana hundir ango di nava hukûmetê de guhertinên dixwestin wê bikirana û di nava artêşê de yên ji wan nexweşbûn wê tesfiye bikirana. Ji serê salên 1990'î ve wê ev jî gav bi gav bi cih bianiyana. Dogan Gureş ê wezîfeya Serokatiya Fermandariya Giştî dewr wergirt pêşî çûn serdana Ingilîstanê û di dema vegera xwe ya ji vî welatî de got "Ji bo tesfiyekirina PKK'ê ji me re lampeya kesk vêxistin" ev gotina wî rastiya em behsa wê dikin, îfade dike. Çawa ku em dizanin di pêvajoya pêş de bi tenê bi êrîşên îmhakirina Kurdan û PKK'ê qîma xwe nayînin, Serokkomar dikujin, di nava hukûmetê de guhertinan dikin, di nava artêşê de tesfiyeyê dimeşînin, li dijî civakê tevgerên pasîfîkasyonê bi rêxistin dikin, rêzeke reşkujiyên rewşenbîr û karsazan pêk tînin û heta bi pîlankirina tevkujiyên girseyî û teslîmgirtina medyayê gelek bûyerên xeternak û şer xistin rojevê. Li vir a kêm ew e, divê mirov van hemûyan weke bûyerên zincîrwarî yên bi hev ve girêdayî fêhm bike. Ji roja Tirkiye ket NATO'yê heta bi 1998'an di bingehê tevahiya bûyerên siyasî û civakî yên li Tirkiyê de mirov heta xeta stûr a NATO-Gladîo'yê nebîne, nikare ti bûyera girîng, şer û reşkujiyê ji hev derxe. Ya rastî, li dijî daxwazên gelan ên ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê şerekî NATO'yê dest pê kiriye û weke xeleka dawî derxistina min a ji Sûrî di sala 1998'an de li vî şerî hatiye zêdekirin.

Di dema derketina ji Sûrî de du rê li pêşiya min hebûn: Ya yekê riya çiya bû, ya diduyan jî riya Ewrûpayê bû. Eger min riya çiyê hilbijarta ev dihat wê maneyê şerê dijwar bibûya û eger min riya Ewrûpayê tercîh bikira ev jî dihat wê maneyê ku ez li şensê çareseriya dîplomatîk û polîtîk digerim. Çawa ku tê zanîn, amadekariyên ji bo riya çiyê ji zû ve dest pê kiribûn. Derketina çiyê îhtîmala xurt bû. Lê tam di wê pêlê de heyeteke Yewnanî hat cem me. Nûnera me ya Atînayê Ayfer Kaya gelek têkiliyên telefonî bi rayedarên di asta jor de danîbûn. Di encama van têkiliyan de heyeta Yewnan hat cem me û vê bûyerê kir ku em berê xwe bidin Atînayê. Derdê rayedarên Sûrî ew bû ku ez bi lez derkevim. Lê ji çûna min a Ewrûpayê zêde ne dilrehet bûn. Di vê mijarê de alternatîf neafirandin û ev ciddî qusûra wan e. Ya rastî, di nava hesabên me de çûna Atînayê tinebû. Firsendek bû. Min ji ciddiyeta dostên li wir jî bawer kiribû û lewma min fikar nekir ku ez vê firsendê bi kar bînim. Eger min zanibûya ez ê bi wê tabloyê re rûbirû bibim, ji sedî sed ez nediçûm Atînayê. Li vir pirsa divê mirov bike ev e: Li Yewnanistanê jî beşê Gladîo'yê bi hêz e, gelo di senaryoya derketina min de xwedî rol bû? Ez nikarim bersiveke vebirrî bidim. Hewcedariya vê mijarê bi lêkolînê heye. Heye ku di radestkirina min a Tirkiyê de DYE'yê bi rêveberiya Tirkiyê re li hev kiribe ku pirsgirêkên bi Yewnanistanê re çareser bikin. Ji bo vê, dibe ku bi kêmanî di asta sozdan û prensîbê de li hev kiribin. Nexasim di çareserkirina pirsgirêkên Ege

û Qibrisê de îhtîmaleke xurt e, niyetên xwe diyar kiribin. Ji sedî sed divê mirov ji bîr neke ku Tirkiye di vê mijarê de dikare bêsînor paşve gavê biavêje.

Sûriyê di 9’ê Cotmehê de bi hosteyî berê balafirê guhert û li Atînayê daxist. Kengî balafir li Atînayê daket Sûrî dilrehet bûbû. Dema ez li Atînayê daketim Kalenderîdîs derket pêşiya min. Kalenderîdîs serbazek bû di NATO’yê de wezîfedar bû û demeke dirêj li Tirkiyê mabû. Heman wezîfe li Swêdê jî meşandibû. Îhtîmal hebû ku di Gladîo’ya Yewnan de cih digirt. Gelekî dostane xuya dikir. Di navbera me de rêberekî balkêş jî hebû. Hinek belgeyên NATO’yê bi dizî dabûn min. Belkî jî bi sedema ku ez pê ewle bibim, wisa kiribû. Li heman balafirgehê wî ez bi xwe birim cem generalê hewayî û Şefê Îstîxbaratê Stavrakakîs ê li odeyekê radiwestiya. Stavrakakîs ji min re got, ji bo demekê be jî nabe ez li Yewnanistanê bimînim. Helwesta xwe di vî warî de hişk bû û mîna bibêje Nûh lê nebêje pêxember ji ya xwe nehat xwarê. Dostên soz dabûn me li naverastê xuya nedikirin. Heta êvarê me li ber hev da. Bi awayekî xweber têkiliya me ya Moskovayê Numan Uçar ket dewreyê. Me bi balafireke taybet a Yewnan berê xwe da Moskovayê. Di wê demê de Rûsya di nava kaoseke ekonomîk de bû. Me bi riya Serokê Partiya Demokrat a Lîberal Jîrînoskî xwe li Moskovayê danî. Îcar Şefê Îstîxbarata Hundir a Rûs derket pêşiya me. Ew jî xwedî hewayeke wisa bû, Nûh got pêxember negot. Di wan şertan de me nikarîbû ku em bimînin. Di wan rojan de qaşo ez sîhûsê rojan veşartî mam. Yên ku ez li cem wan dimam û bi min re eleqedar dibûn siyasetvanên bi koka xwe Cihû bûn. Min ji wan bawer dikir ku durist in. Bi rastî dixwestin min veşêrin. Lê ne rast bû ku ez vê rêbazê qebûl bikim. Di nava vê demê de hem Serokwezîrê Îsraîlê Şaron, hem jî Wezîra Karê Derve ya DYE’yê Allbright hatibûn Rûsyayê. Serokwezîrê wê demê yê Rûsyayê Pîrîmakov bû. Hemû jî bi koka xwe Cihû bûn. Herweha Serokwezîrê demê yê Tirkiyê Mesût Yilmaz jî di dewrê de bû. Di dawiya dawî de li ser Projeya Herikîna Şîn û krêdiya IMF’ê ya deh mîlyar dolarî li hev kirin û bi vî awayî rê li derxistina min a ji Rûsyayê vekirin.

Min çûyîna Moskovayê tavilê tercîh kir. Ji ber ku min bawer dikir ku “Çi dibe bila bibe ezmûneke wan a heftê salî ya sosyalîzmê heye; çi li gorî berjewendiyê wan be, çi jî li gorî enternasyonalîzma wan be, bi hêsanî wê karibin min qebûl bikin.” Tevî ku sîstem hilweşiyabû jî min pêşbînî nedikir ku ewqasî ji aliyê moralê ve têkçûne. Ji kapîtalîzma lîberal gelekî xirabtir em bi kapîtalîzmeke burokratîk re rûbirû bûn. Ji helwesta dostên li Moskovayê bi kêmanî bi qasî yên li Atînayê hêviya min nemabû. Ya rastî, derketibû holê ku têkiliyên bi navê dostaniyê hatibûn danîn zêde ewle nebûn.

Bi awayekî xweber em ketin riya xwe ya sêyemîn. Berê me li Romayê bû. Me xwest em ji têkiliyên xwe yên li wir sûdê bigirin. Me bi du parlementerên dost ên Partiya Kominîst a Jinûve Avakirinê têkilî danîn. Bi alîkariya van têkiliyên nû me dest bi serhatiya xwe ya Romayê kir. Îcar bi senaryoya formalîte ya Îstîxbarata Îtalî rojên me yên Romayê dest pê kirin. Vê serhatiya me jî

şêst rojan dewam kir. Serokwezîrê wê demê Massîmo D'Alema helwesta xwe durist, lê kêm bû. Ji aliyê siyasî ve tam garantî nedabû. Em bi destê dadgeriyê ve berdan. Ez ji vê hêrs bûbûm. Ez bi biryar bûm ku min çawa firsend bidîta ez ê ji Îtalyayê derketama. D'Alema di daxuyaniya xwe ya dawî de dabû xuyakirin ku ez çiqasî bixwazim ez dikarim ewqasî li Îtalyayê bimînim. Lê min ev weke helwesteke bi zorê fêhm kir. Di vê navberê de hewldaneke hevpar a Ereban jî çêbû. Dixwestin min bibin deverekê ku navê wê diyar nekiribûn. Lê ji ber ku fermî nebû û garantî nedabûn, min qebûl nekir.

Cara duyemîn çûyîna min a Rûsyayê şaşî bû. Lê di vê şaşiyê de rola helwesta şelaq a Nûman Uçar hebû. Min ji vê helwesta şelaq a min hê jî rastiya wê fêhm nekiriye bawer kir û ketim rê. Eger min rastiya vê helwestê zanîbûya, ji sedî sed ez ji Romayê dernediketim. Ez hatibûm xapandin. Tê bîra min, dema ez bi balafira taybet a D'Alema ji saha NATO'yê derketibûm, min kesereke kûr kişandibû. Lê ev rewşeke wisa bû ku mîna mirov ji baranê bireve li zîpikê biqelibe. Îcar Îstîxbarata Hundir a Rûsyayê piştî ku ez razî kirim ji bo ez biçim Ermenîstanê, ez birim balafirgehê. Li gorî lihevkirina wan, çûyîna min a Ermenistanê xira bûbû û lewma ji min re gotin, eger ez bixwazim dikarim hefteyekê li Tacikistanê bimînim û di nava hefteyê de wê karibin alternatîfekê peyda bikin. Bi awayekî wan ez xapandim û li balafireke kargo suwar kirim û li paytexta Tacikistanê daxistim. Em hefteyekê bêyî ku derkevin derve timî di odeyekê de man. Em paşê vegeriyan Moskovayê. Neçar me dîsa serî li dostên Yewnan da. Di nav du rojan de piştî rojeke tijî serhatî, sar û bi berf a Moskovayê me dîsa berê xwe da Atînayê.

Bi qasî ku tê bîra min, min di ber xwe de kir pistepist û got, ez vê carê jî bi temamî ji aliyê xwedayên Olympos ve hatim xapandin. Ez tam di nava xeyalên van xwedayan de bûm. Nexasim Hades hatibû bîra min. Di deriyê VIP'ê yê balafirgehê re ketim hundir. Bi ketina min a hundir re şopandina Xwedayê Cehennemê Hades jî pêre dest pê kir. Ez şevekê li mala xesûya dostê xwe Nagzakîs mam. Mala wê gelekî belawela bû. Dişibiya pîresêhrên serdemên berê. Min ji wê pirsî "Pangalos wê çi bike." Dema got "wê di hilbijartinan de bi kar bîne" min dît çiqasî ji rastiyên serdemê dûr û qut e. Hinekî jî di rastiya gelê Yewnan de ew esilzadeyên berê yên bêhêz hatine hiştin anî bîra min. Ji wê şevê û pêve, mîna ku ez bi awayekî ber bi kampa mirinê ve diçûm. Bi temamî Hades li ser kar bû. Bi tevahî tiştên dihatin kirin û gotin qelp û sexte bûn. Ma qey hêmanên durist tinebûn? Bêguman hebûn, lê hemû li hemberî cinawirê modernîteyê bê çare bûn. Îcar berê me li Efrîkayê bû û di ketina vê rêyê de fîgura Mandela bi tesîr bû: Çawa ku di ketina ser riya Moskovayê de fîgura Lenîn bi tesîr bûbû. Qaşo ez ê biçûma Efrîkayê min ê hem têkiliyên têkûz ên dîplomatîk daniya, hem jî min ê pasaporta fermî ya kêrhatî bistenda. Sextekariya dewleta Yewnan di vê lîstikê de jî bi ser ketibû. Tevahiya dîrokê demokrasiya gelê Yewnan ji aliyê vî sextekarî ve timî hatibû xapandin û li trajediyên mezin hatibû qewimandin. Ya rastî, diviyabû min jî ev ji bîr nekiriba û li gorî wê nêzîk bibûma. Ez bi dilpakiya zarokan nêzî dostatiyê dibim û di vê helwesta min de jî ev bi tesîr bû. Di dema derketina ji Yewnanistanê de

wexta em diçûn balafirgehê erebeya ez têde şifêrên wê gelekî hewl dan ji bo ku ez bi ser xwe ve bêm û neçim. Çi ji destê wan hat bi duristî kirin û xwestin nîşan bidin ku komployeke mezin li ser kar e. Bi îhtîmaleke mezin ew jî karmendên îstîxbaratê yên di payeya jêr de bûn. Şifêrê pêşî erebe li balafirgehê qeliband û xwest çûyînê asteng bike. Yê diduyan jî erebe li nêzî balafirgeha diviyabû nepenîbûya heft caran bi bahaneya xirabe ye, tibabekî sekinand. Me ji sozên hatibûn dayîn ewqasî bawer kiribû, em bi ser xwe ve nedihatin. Berevajî min dixwest bilezînim da ku demekê beriya demekê di çarenûsa min de çi heye ez bibînim. Balafira em lê suwar bûn di operasyonên bi dizî yên Gladîo de dihat bikaranîn.

Lê berî vê seferek me jî li Mînskê bû. Berî Naîrobiyê ez ê di ser Mînksê re derbasî Hollandayê bibûma. Dîsa bi balafireke taybet ji du saetan zêdetir di hewa sar a Mînksê de rawestiyam. Balafira em li bendê bûn nehat. Polêsên balafirgeha Rûsya Spî bi saetan nava balafirê kontrol kirin. Belkî jî weke îhtîmal û firsenda dawî wê ez li Balafirgeha Mînskê bihiştama. Êdî em û însafa rêveberiya Rûsya Spî diman. Ya balkêş ew e, di wê demê de Wezîrê Parastinê yê Dewleta Tirk Îsmet Sezgîn jî hatibû serdana Mînskê. Kengî balafira em li bendêbûn nehat, qaşo firsenda dawî jî ji destê me çûbû. Veger jî bi awayekî 'mirina spî' bû. Dema balafira Gladîo'yê di ser Deryaspî re perwaz dikirin, min ev çûyîna xwe weke sefera trênê ya di qirkirina Cihûyan de hatibû bikaranîn dît û paşê bi vî rengî şîrove kir. Di kesayeta min de rejîma qirkirinê ya li dijî gelekî ketibû qonaxeke gelekî krîtîk. Min rûyê rastî û veşartî yê NATO'yê di dema van seferan de dît. Di dema vegera ji Mînskê de ferman û alarma bîstûçar saetan dabûn ku balafir li ti balafirgeha welatekî Ewrûpayê danekeve. Em fêhm dikin ku di wê demê de ji bilî balafirgeha Mînskê ya dewleta bi tenê ya îsyankar Rûsya Spî balafirgeha welatekî din a destûrê bide daketina me nehiştibûn. Li cehennema Naîrobiyê sê rê li pêşiya min danîbûn: Ya yekê, bi sedema ku min demeke dirêj guh nedaye fermanê bi awayekî şiklî ez ê bihatama kuştin; ya diduyê, min ê yeka CIA'yê nekirana didu biketama bin fermana wê û teslîm bibûma; ya sisiyan, wê min radestî tîmên şerê taybet ên Tirk bikirina ku ev ji zû ve amade kiribûn.

Di dema li Naîrobiyê de ji kesên li cem min Dîlan diqilqilî û ne aram bû. Eger fikrên xwe tam bida xuyakirin û rêxistinên civaka sivîl bixista nava tevgerê, belkî jî komplo hinekî xira bibûya yan jî bihata pûçkirin. Min jê lome kiribûn, bi sedema ku pêşniyar kir ez bi demançeyekê xwe biparêzim. Ev, ji bo me û min xwekuştin bû. Niyeta min a xwekuştinê hîç tinebû. Ji bo ez sîlehê li cem xwe bigirim li dora min weke perwaneyê dizîvirî. Eger sîleh li ser min bûya û min hewl bida ew bikişanda, encama vê helwestê ji sedî sed wê mirin bûya. Paşê di dema jêpirsînê de ji min re hat gotin, eger te sîleh bi kar bianiya, fermana wî bikujin, hatibû dayîn. Dîsa gotin, eger tu ji sefaretê jî derketibûya tu yê bihata kuştin. Gotin, helwesta te ya herî aqilane bû. Bêguman em nizanin ew jî çiqasî rast dibêjin. Di pêvajoya panzdeh rojî ya Naîrobiyê de hêja ye mirov helwesta Sefîr Kostulas fêhm bike. Gelo hatibû bikaranîn? Min ev ji hev dernexist. Berî radestkirina min hîç nehat mala xwe ya lê dima. Di dema derxistina min a ji seferatê de ku bi awayekî bi darê

zorê bû, hinekî hişk li ber zebaniyê Naîrobiyê rabû. Lê dibe ku ev helwesta wî bi sextekarî be jî. Îcar Pangalos qaşo ji bo çûyîna Hollandayê destûr wergirtibû. Min ji vê zêde bawer nekiribû. Ji ber ku ez ji malê derneketima, tîmên taybet ên Yewnan ji bo êrîş bikin û bi darê zorê min derxin di kemînê de bûn. Polêsê Kenyayê jî xwe ji bo heman tiştî amade kiribû. Jixwe ji mêj ve eşkere bûbû ku çûyîna Komara Efrîkaya Başûr çîrokeke xapandinê ye. Senaryoyên weke penabûna li dêrekê û li Neteweyên Yekbûyî bi guman bûn. Ji bo derneketinê min nigên xwe dabûn erdê û li ber xwe dabû.

Ji 9'ê Cotmeha 1998'an heta bi 15'ê Sibata 1999'an pêvajoyeke çar mehan a mîna bahozê derbas bû. Ji bilî hêza hegemon DYE'yê ti hêzê nikarîbû vê operasyona çar mehan amade bikira. Di vê pêvajoyê de rola hêzên taybet ên Tirk (Serokê van hêzan General Engîn Alan bûye) bi tenê bi balafirê birina min a Îmraliyê bû, ew jî di kontrolê de pêk hat. Di dîroka pêvajoyên NATO'yê de ji sedî sed operasyoneke herî girîng a pêvajoyan e. Ev ewqasî eşkere bû, em diçûn kîjan deverê ti deverê dengê xwe nedikir. Yên qebûl nekiribûna jî yekser bêdeng dikirin. Rûsya mezin jî bi awayekî pirr eşkere bêtesîr kiribûn. Jixwe helwesta Yewnaniyan têra ravekirina her tiştî dikir. Li Romayê tedbîrên ewlekariyê yên li nava mala lê dimam her tişt eşkere li pêş çavan radixistin. Li gorî girtinê tedbîrên awarte girtibûn. Rê nedan ku ez gava xwe jî biavêjim derve. Tîmên ewlekariyê yên taybet heta ber deriyê odeya min jî bîstûçar saetan kontrol dikirin. Hukûmeta D'Alema hukûmeteke çepgir demokrat bû. D'Alema bêtecrûbe bû, nekarî bi serê xwe biryarê bide. Li tevahiya Ewrûpayê geriya. Ingilîstanê jêre got divê ew bi xwe biryara xwe bide. Zêde piştgiriya wî nekirin. Helwesta Brukselê ne zelal bû. Di encamê de em şandin ber destê dadgeriyê. Di vê helwestê de ne pêkan bû ku mirov bandora Gladîo'yê nebîne. Jixwe Îtalya yek ji wan welatan bû ku Gladîo lê gelekî bi hêz bû. Berlusconî tevahiya hêza xwe xistibû nava tevgerê. Ew bi xwe peyayê Gladîo'yê bû. Ji ber ku min zanîbû Îtalya wê nikaribe xwe bide ber barê min, ez ji Îtalyayê veqetiyam. Bêguman di berdêla vê de Tirkiye bûbû welatê DYE û Îsraîl herî zêde pê ewle, lê di heman demê de li Tirkiyê wer kiribûn ku herî zêde bûbû dûvikê wan û bi pey wan ketibû. Ew pêvajoya jêre digotin Tirkiye weke şîpeke har global dibe, ya rastî, ew çîroka pêvajoya pêşkêşkirina Tirkiyê ji kapîtalîzma fînansê ya globalîzmê re bû û ne tiştekî din bû.

Di navbera senaryoya dagirkirina Iraqê û radestkirina min de têkiliyeke xurt heye. Ya rastî, bi operasyona li dijî min tevgera dagirkirinê dest pê kir. Heman xusûs ji bo dagirkirina Afganistanê jî bi vî rengî ye. Ya rastî, ji bo bicihanîna Projeya Rojhilata Navîn a Mezin gaveke girîng û pêşî operasyona li dijî min e. Ecevît badilhewa negot "Min bi ti awayî fêhm nekir ka çima Ocalan radestî me kirin." Çawa ku Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi kuştina Prensê Awusturyayê ji aliyê milliyetgirekî Sirp ve dest pê kir, bi awayekî 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' jî bi operasyona li dijî min dan destpêkirin. Ji bo mirov pêvajoya piştî operasyonê fêhm bike, divê mirov baş fêhm bike ka çi bûyer berî û piştî operasyonê qewimîne. Serokê DYE'yê Clinton ji bo derxistina min ji Sûrî guftûgo bike, carekê li Şamê û cara din jî li Swîsreyê ji çar saetan zêdetir du civîn bi serokdewlet

Hafiz Esed re pêk anîn. Hafiz Esed di wan hevdîtinan de li girîngiya mijarê hayedar bû. Ji bo xwe di cih de dît ku pêvajoyê dirêj bike. Ji bo demekê be jî ji min derketina ji Sûrî nexwest. Li dijî Tirkiyê dixwest min weke hêmaneke tewazunê heta dawiyê binirxîne. Lê min jî Sûrî dahf dida ji bo bibe xwedî helwesteke stratejîk. Lê hêza min û rewşa min derfet û îmkan nedidan ku ez di vê de bi ser bikevim. Eger ez li Îranê bûma, belkî hevgirtineke stratejîk pêk bihata. Di vê mijarê de jî ez bi Îranê ewle nebûm; ji helwestên wê yên ji rêûresmê fikarên min hebûn. (Kuştinên Simko û Qasimlo û komployên bi vî rengî, dekûdolabên di dîrokê de yên weke ji textxistina Keyayê Medan Astiyag ji aliyê Harpagos ve) Clinton û lîderên Kurdan ên Iraqê yên bi wan re di nava têkiliyê de bû, mayîna min li Sûrî ji bo armancên xwe yên stratejîk di cih de nedidîtin. Ji ber ku her diçû Kurd û Kurdistan ji kontrola wan derdiket. Îsraîl jî ji vê rewşê gelekî bêzar bû. Wan nikarîbû rêveçûna bûyerên li Kurdistanê û derketina Kurdan ji kontrola wan qebûl bikin. Nexasim ji bo planên xwe yên der barê Iraqê de bi cih bînin, ji bo wan heyatî bû ku Kurdistanê di kontrola xwe de bigirin. Lewma li ser min ferz dikirin ku ez ji sedî sed veqetim û dev ji xeta azadiyê û nasnameya serbixwe ya Kurd berdim.

Sedema hebûna me jî partiya me û xebata me ya azadiyê bû. DYE û Ingilîstanê soza ji 1925'an ve didan Tirkiyê diviyabû bi cih bianiyana; bi şertê destê xwe nede Kurdistana Iraqê Kurdistana Tirkiyê feda dikirin. Li ser vî bingehî Tirkiye ketibû NATO'yê û li ser vî bingehî li ser pirsgirêka Kurd pêre li hev kiribûn. Statuya me û stratejiya me, ev hegemonya û tewazuna ku li Rojhilata Navîn bi awayekî rêûresmî û rojane girîng bû, dixist tehlûkeyê. Yan em ê biketana çarçoveya vê hegemonyayê yan jî em ê bihatana tesfiyekirin. Komara Tirkiyê ji 1925'an ve bi peymanên bi van hêzên hegemonîk re çêdikir (di sala 1926'an de peymana li ser Mûsil û Kerkûkê, di 1952'an de ketina NATO'yê, di sala 1958 û 1996'an de peymanên bi Îsraîlê re) dixwest Kurdan ji nava dîrokê rake. Îdeolojiya pozitivîst a mîliyetgir û laîk ji bo vê derfet û îmkan didan. Kadroyên Komarê bi vê dabûn bawerkirin. Ya rastî, ev rewş li dijî hevgirtin û ruhê têkiliyên dîrokî yên Kurd û Tirkan bû. Lê li gorî hesabên damezrandina Îsraîlê, hema bêje ti dînîtî tinebû ku sîstemê nekiribûya. Pêkhatina çîn, kadro û îdeolojiya lihevçêkirî ya jêre rastiya Tirkê Spî tê gotin li ser vî bingehî hatibû avakirin. Herweha PKK'ê darbeya kujer li vê pêkhatinê xistibû. Ji ber ku qebûlkirina nasnameya Kurd û naskirina azadiya wî dihat maneya înkara vê pêkhatinê, bi kêmanî diviyabû ev polîtîkayên kujer biterikanda. Peymanên bi Îsraîlê re ji bo vê pêkhatinê maneyeke xwe ya girîng heye. Jixwe dewleta netewe ya Tirk weke Proto-Îsraîl hatibû avakirin.

Di çarçoveya PDK'ê de hewl dan pêkhatineke bi heman rengî ya Kurdê Spî ava bikin. Heman navendê hem ji Tirkan hem jî ji Kurdan du hêzên wekhev lê xwedî nakokî diafirandin û ev jî ji bo hebûna wan (di serî de DYE û Ingilîstan, ji bo berjewendiyên Rojava yên hegemonîk ên li Rojhilata Navîn û ewlekariya Îsraîlê) heyatî û girîng bû. Ya rastî, ji bo berjewendiyên wan ên li herêmê, polîtîkayeke têra xwe aqilane ye; du hêzên bi xwe ve girêdayî çêdikin û hêzên behsa wan jî tê kirin timî di nava nakokiyan de ne. Bi derketina holê ya PKK'ê, ev dekûdolaba têra xwe

dîrokî û ewqasî jî rojane xira dibû. Derfetên çareserî û aştiyê di sala 1993 û 1998’an de derketin holê, dihatin wê maneyê, dekûdolaba hêzên hegemonîk bi dawî dibû. Ji lewra destûr nedan şêwazekî bi vî rengî yê çareseriyê. Reşkujî û kompleyên mezin pêk anîn. PKK’ê Kurd ji kontrolê derdixistin û di serî de Tirk bi dewlet û komên din re li hev dianîn û ev jî dibû derbeke stratejîk li berjewendî û dekûdolabên van hêzên hegemonîk ên li Rojhilata Navîn diket. Ev xusûsên ku em ê karibin sedemên wan bi awayekî berfireh rêz bikin, têrê dikin ku îspat bikin, çima kompleya 1998’an ewqasî xwedî armancên stratejîk û mezin bû.

Clinton di wê demê de girîngiyeke mezin bi pêngava hegemonîk a li Rojhilata Navîn dida û girîngiya rola Tirkiyê di vê de timî destnîşan dikir. Şêwirmendê wî yê taybet General Galtieri bi xwe dabû xuyakirin ku operasyona li dijî min bi fermana Clinton bi rê ve birine. Eger em behsa ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ bikin, divê em bibêjin, di serî de bîlançoya bûyerên li welatên diyar ên weke Iraq, Afganistan, Libnan, Pakistan, Tirkiye, Yemen, Somalî û Misrê ji zû ve ji gelek aliyan ve ji bîlançoyên Şerên Cîhanê yê Yekemîn û Şerê Cîhanê yê Duyemîn derbas kiriye û ev jî ji bo fêhmkirina rastiya vî şerî têrê dike. Jixwe ji ber sîlehên nukleer mirov dikare fêhm bike ku wê ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ parçeparçeyî be, demeke dirêj û bi teknolojiyên cuda dewam bike. Civîna Bilind a dawî ya NATO’yê li Lîzbonê pêk anî û şidandina dorgirtina li Îranê ji aliyê DYE ve, nîşan dide ka wê ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ çawa bimeşe.

‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ rastiyek e, û bi giranî navenda lê diqewime cografya Rojhilata Navîn û atmosfera wê ya çandî ye. Em bi tenê li bûyerên li Iraqê diqewimin binêrin û navenda ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ lê gurr bûye temaşe bikin, em ê bibînin ku bûyerên li vir diqewimin têkiliya xwe bi welatekî re nîne. Ji ber ku bûyerên li vir pirr eşkere nîşan didin ku têkiliya wan bi hebûn û berjewendiyên hêzên hegemonîk re heye. Kengî Îran bi temamî bêtesîrkirin, li Iraq û Afganistanê aramî wê pêk bê, Çîn û Emerîka Latîn êdî nebin tehlûke, belkî ev şer bi dawî bibe. Ango ev şer hê li nîvî ye. Dibe ku ev şer bi kêmanî hê deh salên din (li gorî pîlanên dawî û stratejîk ên NATO’yê) dewam bike. Di çarçoveya zanistên civakî de rast nîne ku mirov bibêje, bi awayekî vebirrî wê wisa bibe, lê bi îhtîmaleke xurt wê wisa bibe. Carinan dîplomasî û carinan jî wê şîddet zêde bibe. Bi krîzên ekonomîk ên bi kontrol û dijwar wê destwerdin rojevê. Carinan wê pêşektiya qadan biguhere, lê bi vî awayî yan jî bi awayekî din şer bi giştî wê li gelek qadan pêk bê. Eger ev xwezaya bingehîn a şer li ber çavan were girtin, hingê baştir wê bê fêhmkirin ka çima operasyona 1998’an a li dijî min di çarçoveyeke navneteweyî de hatiye meşandin û çima operasyona herî mezin a Gladîo’ya NATO’yê ye. Bêguman di şerên mezin de timî hêzên hegemonîk bi ser nakevin, gel jî dikarin gelek tiştan bi dest bixin. Heta hêzên hegemonîk ji aliyê sîstemîk ve dikarin têk biçin, gel jî dikarin ji aliyê sîstemîk ve bi ser bikevin.

Ez ê vê mijarê di beşa piştî vê de weke babeta sereke analîz bikim.

**2- Pêvajoya Îmraliyê**

Beşa herî girîng a komploya mezin a Gladîoyê li vir li Îmraliyê hewl didan pêk bînin. Şefê yekîneya ez anîm Giravê General Engin Alan e, û wezîfeya wî bi xwe jî vê rastiyê têra xwe zelal dike. Engin Alan bi awayekî fermî şefê Fermandariya Hêzên Taybet ango şefê Gladîo Tirk bû. Rayedara Konseya Yekîtiya Ewrûpayê ya ez li giravê pêşwazî kirim pirr baş nîşan dida ku Yekîtiya Ewrûpayê çiqasî di nava vê komployê de ye. Bi vî awayî hevpeymana rêveberiyên DYE, YE û Dewleta Tirk derdiket holê. Operasyon ji serî heta binî di bin berpirsiyariya siyasî ya DYE û YE de hat meşandin ango ji aliyê Gladîo NATO ve hat meşandin. Ji sê nîşaneyên me îşaret bi wan kir (şêwirmendê Serokê DYE'yê Clinton General Galtieri, li ser navê komîseriya siyasî ya YE rayedara jin û Şefê Fermandariya Hêzên Taybet Engin Alan) ti tefsîreke din nîne vê piştrast bike. Ev rastî piştre derketin holê, lê min ti carî bawer nekiribû ku hêzên min bê tesîr dikin hêzên hukûmeta Tirk nînin, lê ez bi temamî li vê mekanîzmayê serwext nebibûm. Pêvajo li derveyî awayê wê yê rast gelekî cuda nîşan didan. Pirr zêde hewl didan nîşan bidin ku hukûmeta Tirk bi ser me de tê û encam digire. Dema wan ez radestî Tirkiyê kirim haya serokwezîr Bulend Ecevît ji vê tinebû û ev jî vê îddîaya min piştrast dike.

Li Giravê eskerê ez pêşî pêşwazî kirim albayekî bi paye yê bi kincên eskerî bû. Xwe weke nûnerê Fermandariya Giştî da naskirin. Bi awayekî dualî û bi dizî axaftinên girîng kiribûn û ev yek bi kêr dîtibû. Paşê dema jêpirsînê bi awayekî fermî dest pê kir heman rayedarî axaftinên girîng û cihê kiribûn. Jêpirsînê çeprast deh rojan dewam kiribû û têde heyeteke ji çar yekeyên ewlekariyê (Fermandariya Giştî, Cindirme, Emniyet û Îstîxbarata Mîllî) pêkhatî cih girtin. Di vê navberê de min kaseteke xîtabî fermandaran bike qeyd kir. Paşê bi mehan em bi awayekî sohbetwarî axivîn. Hinek kesên din jî car caran diketin dewreyê û ji Ewrûpayê jî car caran hinek heyet dihatin.

Ji Ewrûpayê jî car caran heyet hatin. Min bi têgihiştinekê parêzname amade kir ku xisleta komploya navneteweyî ya pêvajoya Îmraliyê li ber çavan girt. Kesên bi bîreweriyeke giran a tirkparêziyê û li ser navê tirkparêziyê tevdigeriyan bi rastiyê re têkiliya wan qut bûbû. Li gorî xwezaya wan nebû ku karibin li felsefeya li pişt komployê serwext bibin. Ji ber ku bi kêmanî bi qasî sedsalekê vê felsefeya komployê avahiyên xwe pêk anîbûn û ew jî berhemên wan bûn. Lewma mirov nikarîbû li bendê be ku ew van pêkhateyên hatibûn avakirin înkar bikin û bi awayekî rexnegir nêzîk bibin. Hem di dema dadgehkirina komedîwarî de, hem jî di pêvajoya hukimxwarina min de bê mane bû ku ez ji wan li benda guhertineke erênî ya îradeyê bûma. Nûnerê Serokatiya Fermandariya Giştî ya Artêşê bi pistepist hinek tişt gotin. Di şertên heyî de mirov ji pêkhatina gotinên wî bawer bikira wê safiktî bûya. Jixwe ne xwediyê wê hêzê bûn ku gotinên xwe bi cih bianiyana. Ji bo min sîstemeke DYE li pişt wê û di kontrola YE'yê de vedîtibûn. Ingilîstanê ev vedîtin hûnandibû û li hev anîbû, ya para Tirkan jî diket pêkanîn bû. Gelekî girîng e ku mirov zêhniyeta felsefî û polîtîk a li pişt komployê fêhm bike. Ez têm û diçim, dizîvirim û

timtûtim tînim ziman ku komplo bingehekî xwe yê sedsale heye. Min behsa wan komployan kir ku di her demê de gava qonaxekê bûn. Mirov bi carekê dikare bi sedan ji van komployan mînak bide û rêz bike, hema bi tenê ji van ên li dijî Kurdan komploya Alayên Hemîdiye, di sala 1959'an de doza 49'an û di sala 1960'î de doza 400'an, kuştina Faîk Bucak û kuştina Sait Kirmizitoprak ji aliyê PDK'ê ve, dîsa di qonaxa avabûna îdeolojîk a PKK'ê de bi sedan komployên ji aliyê heman zêhniyetê ve hatine organîzekirin. Komlogeran ev weke hunerekî hosteyane yê desthilatdariyê dihesibandin. Ango komplo giyan û amûrê herî girîng ê hunerê desthilatdariyê ye. Ji sedî sed diviyabû ev huner ji bo Kurdan li ser bingehê komployê bihata meşandin. Eger komplo bi rêbazeke eşkere bihata meşandin wê bibûya mîna bûyera zarokê ji diya xwe re gotiye "Yadê binêre qral tazî ye." Hêzeke desthilatdariyê ya kirinên heta bigihîje qirkirinê dabe pêşiya xwe ji wê re amûrek ji bilî komployê û zêhniyeta rê dide wê tineye. Li vir a girîng ew e, mirov hêzên di nava komployê de cih digirin rast nas bike û bide naskirin.

Ez divê diyar bikim ku di pêvajoya Îmraliyê de ez di vê mijarê de ketim tengasiyê. Ji ber ku di nava komployê de hêzên gelekî di nava nakokiyê de hebûn. Ji DYE'yê heta bi Federasyona Rûsyayê, ji Yekîtiya Ewrûpayê heta bi Yekîtiya Ereb, ji Tirkiyê heta bi Yewnanistanê, ji Kenyayê heta bi Tacikistanê gelek dewletan di nava komployê de cih girtibûn. Ew çi bû ku dijminên sedsalan Tirk û Yewnan dianîn cem hev? Çima li ser pişta min hevgirtinên evqasî bêpîvan an jî yekîtiyên berjwendiyan çêdibûn? Herweha bi sedema ku ez bûbûm hedef hevkarên neteweyî, çepgirên Kurd û Tirk ên di ber xwe de kêfxweş bûbûn hejmara wan têra xwe hebû. Dinya fermî mîna ku di şexsê min de dijminê xwe yê herî bi tehlûke xistibe quncikê û tengav kiribe. Di nava PKK'ê de jî kesên ku bawer dikirin deriyên siberojê li wan vedibin û firsend çêdibe çawa bixwazin wisa bikin, hejmara wan ne kêm bû. Bêguman bi danasîneke giştî û sereke mirov dikare bibêje, bi tevahî hêzên behsa wan tê kirin, ji wan beşên ku li pey berjewendiyên modernîteya kapîtalîst a lîberal diçin, pêk tên. Ez li hemberî zêhniyeta wan a faşîst û lîberal û ji bo berjewendiyên pirraniya wan tehlûke bûm.

Mînak Ingilîstan di nava van hêzan de ya herî bi tecrûbe ye. Ji bo min li Ewrûpayê polîtîka nekirana vê hêzê gava pêşî avêt. Min çawa gava xwe avêt neavêt Ewrûpayê ez tavilê weke 'persona non grata' ango 'Kesê Nayê Xwestin' îlan kirim. Ev ne gaveke besît bû, ji ber ku vê gavê ji destpêkê ve encam diyar dikir. Baş e, helwesteke bi vî rengî ya ji bo Xumeynî, ji bo Lenîn nehatibû nîşandan, çima ji bo min hat nîşandan? Min di gelek beşên parêznameya xwe de hewl da der barê bersiva vê pirsê de hinek agahiyên mirov pê bi ser meseleyê ve bibe, bidim. Ji lewra hewce nake mirov dubare bike. Bi kurtî, li pêşiya hesabên dused salan ên hegemonîk ên li Rojhilata Navîn, nexasim li pêşiya polîtîkayên li ser Kurdistanê (bi kurtî, ez li pêşiya polîtîkaya ji Komara Tirkiyê re dibêje "Mûsil û Kerkûkê bide, Kurdên xwe tine bike" bûbûm asteng) ez weke kelemekî ciddî derketibûm holê. Ez hêdî hêdî li dijî pîlansaz û pêkhêneran bi tehlûke dibûm. Derdê DYEyê jî cuda bû. Dixwest Projeya Rojhilata Navîn a Mezin bixe dewreyê. Ji bo vê jî

bûyerên li Kurdistanê bi qasî ku bibin kilîta vê gavavêtinê girîng bûn. Li gorî konjonkturê bi kêmanî diviyabû ez bihatama bêtesîrkirin. Di wan rojan de tesfiyekirina min li gorî polîtîkayên wan ên global di cih de bû. Rûsya di dîroka xwe de bi krîzeke ekonomîk a girîng re rûbirû bûbû û gelekî bi lez pêdiviya wê bi krêdiyê hebû. Eger ji bo derdê wê bibûya derman, ti sedem tinebû ji bo ku di komployeke li dijî min de cih negire. Jixwe yên din birayên piçûk ên sernerm ên 'Kekê mezin' bûn. Her gotina wî datanîn ser serê xwe. Ji bo çepgirên Tirk (li derveyî îstîsnayan), hevkarên Kurd û kesên di nava PKK'ê de nerehet, firsendek hebû ji bo ji hevrikekî xwe yê ciddî rizgar bibin. Li gorî tehlîla dawî, felsefeya herî li jêr a di binê vê helwesta wan de felsefeya berjewendiyên rojane yên lîberalîzmê, pragmatîzm û egoîzm e.

Dema ez van dibêjim, ez bawer dikim ku bi vî awayî rastiyê hinekî din zelal dikim. Di wan rojan de ji bo ku mirov karibe alîgirê azadiya Kurdistanê û bidestxistina nasnameya Kurdan be, divê mirov karibe ji her cure berjewendiyên rojane yên lîberal, pragmatîzm û egoîzmê bihurîbe, û her tişt mirov neçar dike û fermanê dide mirov -çi çepgirî û çi rastgirî- divê ji jiyana modernîteya kapîtalîst dest bikişîne yan jî li ber wê rabe. Berevajî dinyaya wan rojan ew dinya bû ku lîberalîzma global ji bo şerê fetihkirina dinyayê rabûbû pê darê. Di wan salan de faşîzma lîberal li nava dinyayê serweriya xwe îlan dikir. Ji aliyê polîtîk ve, Rojhilata Navîn navenda têkoşîna hegemonîk bû. Têkoşîna li ser Kurdistanê di warê hesabên hegemonîk de bi rola kilîtê radibû. Pozîsyona îdeolojîk û polîtîk a PKK'ê bi hesabên hegemonîk re di nava nakokiyeke eşkere de bû. Ango bi tesfiyekirina min re pêşî li van hesaban vedibû.

Di çerxa Îmraliyê de ev hesab hemû di şexsê min de ji nû ve lebitîn û tevgeriyan. Ji bo min karîbûya pêvajoya Îmraliyê analîz bikira, diviyabû ez xwedî bîrbirinekê bûma haya xwe ji şerên berjewendiyan ê rojane yê bingehekî xwe yê dirêj ê dîrokî hebûya. Di nava hesabên komployê yên sîstema hegemonîk de yek ji xusûsa divê haya mirov jê hebe ew e, polîtîkayên 'parçe bike-bi rêve bibe' di dused salên dawiyê de bi hosteyî li ser herêmê pêk tînin û diviyabû mirov nebûya destikê van polîtîkayan, nexasim şerê Kurd û Tirkan armanca van polîtîkayan bû û diviyabû mirov di kûrkirina vî şerî de bi kêra van hêzan nehata. Ermenî, Grek, avahiyên etnîk ên li Balkanan, Ereb, Suryanî, Tirk û Kurd bûn destikê van polîtîkayan û gelek tişt ji dest dan. Hinek ji van navbihuriyan ji çand û welatên xwe yên hezarê salan bûn û heta ew ji civakbûnê derxistin. Herweha ji ber ku bi Tirkan re diman hêrsa gelek hêzan li dijî Kurdan rabûbû. Yekîtiya ji Şerê Melezgirê ve girîngiya xwe ya stratejîk diparast, nexasim bi polîtîkayên îmha û înkarê yên ji 1925'an ve hatin meşandin, badilhewa çû. Eger mirov tesfiyekirin û înkara vê hêmana rastî ya Komarê hûrûkûr lêbikole û bi felsefeya dîrokê şîrove bike, mirov ê bibîne ev yekîtiya stratejîk bi xwe hedef e. Ingilîzan û şaxên wan ên hundir zor didan Mistefa Kemal û ev gava herî girîng a komployê ye. Di felsefe û diyardeya rêveberiya Tirk a ji rêûresmê de asîmîlekirin û dijminatiya Kurdan tineye. Ev dijminatî bi armancên taybet çêkiribûn. Pêvajoyên serîrakirinan û bûyerên

piştî wan vê rastiyê piştrast dikin. Ev rewşa ku li Îmraliyê bala min kişand û kir ku bêhtir li ser biponijim, di felsefeya min a polîtîk de rê li ber veguherînên bingehîn vekir.

Min parêznameyên xwe bi sê versiyonan pêk anîn û di navê de mirov dikare pêşketina vê fikra siyasî bibîne. Bi xetên sereke encamên ez gihiştim wan wisa ne:

**a-** Komplo di şexsê min de bi tenê ne li dijî Kurdan, di heman demê de li dijî Tirkan jî hatibû kirin. Şêweyê radestkirina min û niyeta kesên di vê de rol girtin, ne bi dawîkirina teorê û çareserî bû, dixwestin bingehê şerekî sedsaleke din dewam bike, kûr bikin. Komploya wan a li hemberî min ji bo vê niyeta wan firsendeke îdeal dida. Bêguman dixwestin heta dawiyê vê firsendê bi kar bînin. Jixwe nabe ku mirov berevajiyê vê bifikire. Ji ber ku wan bixwesta, karîbûn bi kêra gelek bûyerên erênî bihatana. Lê wan timî hewl dida pêşiyê li çareseriyê bigirin, li şûna çareseriyê mesele dikirin tam mîna girêkeke kor û li hev digerandin. Dixwestin dualîteyeke tîpîk a Îsraîl û Filistînê biafirînin. Çawa ku dualîteya Îsraîl û Filistînê ev sed sal in ku ji hegemonya Rojava ya li Rojhilata Navîn re xizmet kir, dualîteya Kurd û Tirk a gelekî ji wê mezintir jî bi kêmanî karîbû sedsalekê ji hesabên hegemonîk re xizmet bikirana. Jixwe bi heman armancê di sedsala 19. de li herêmê gelek pirsgirêkên etnîk û mezhebî afirandin û bê çareserî hiştin. Rastiya Îmraliyê di vî warî de agahiyên min ên xam têra xwe gihandin. Lê pirsgirêka herî girîng a li pêşiya min ew bû, min ê ev bi elîtên rêveber ên Tirk çawa bida fêhmkirin.

**b-** Ango pirsgirêka min a herî girîng ew bû, ez bidim fêhmkirin ku ev komplo ji şexsê min û Kurdan bêhtir li dijî Tirkan e. Min ev timûtim ji bo kesên di jêpirsînê de destnîşan dikir. Lê ew bi ber bayê serketinê ketibûn. Vê rewşa wan heta bi 2005'an dewam kir. Ango kengî fêhm kirin ku tevgera azadiyê û nasnameya Kurd ji berê bêhtir zindî, gurr û geş e. Ez li ser mijarê bêhtir hûrûkûr sekinîm û min mitale kir. Hingê min hêmanên komployê yên demên Meşrûtiyet û Cûmhûriyetê ji nêz ve dîtin. Min dît ku ew bûyera jêre serxwebûna Tirk digotin cureyekî girêdanê yê yeman e. Girêdana Tirkan îdeolojîk û polîtîk bû. Her ku diçû, ez bêhtir baş lê hayil dibûm ku milliyetgirî û neteweparêziya Tirk jêdera xwe derve bû û zêde têkiliya xwe bi dîrok û diyardeya civakî ya Tirk re tinebû. Hêzên hegemonîk der barê desthilatdariyê de zanîbûn ku elîta rêveber a Tirk çiqasî qels e, û ev qelsiya wan bi kar dianîn. Hakimiyeta wan a sînornenas li ser Kurdan jî ji heman qelsiyê dihat. Ev hakimiyet di heman demê de mehkûmiyeta wan bû. Hakimiyeta wan timî bi destê xelkê bû, îdeolojiya wan bi xwe tinebû; ya rastî pîvana 'hakimiyet her tişt e, îdeolojî ne ti tişt e' pêk dianîn.

**c-** Hêzên hegemonîk ji bo kûrkirina dualîteya Kurd û Tirk rêbaza bi kar dianîn rêbaza 'kîvroşk bireve, tajî bigire' bû. Jixwe di peyhevketinê de hem kîvroşk û hem jî tajiyê biwestin û di encamê de herdu jî wê bikevin xizmeta xwediyên xwe. Li gorî min, tişta li ser min dimeşandin hebûna vê rêbazê piştrast dikir. Çi nêzîkatiyên Konseya YE'yê, çi jî biryarên DMME'yê tam jî ji pêkanîna van polîtîkayan re xizmet dikir. Di herduyan de jî mentiq ew e, heta dawiyê herduyan bi xwe ve girê

bide. Armanc dad û çareserî nîne. Min parêzname bêhtir jî bi armanca teşhîrkirina vî mentiqî pêk anîn. Bi awayekî li ti welatê NATO'yê nehatiye dîtin, rêxistiniya Gladîo li ser dewletê dane rûniştandin. Kes nikare vê bi niyeta baş û mijarên ewlekariyê rave bike. Ji ber ku hefsar di destên wan de ne, û ji bo ku welat çawa dixwazin bi rêve bibin firsendeke bêhevta dide wan, çavên xwe li hebûna şaxê Gladîo yê Tirkiyê girtin. Kengî mirov bi tevahî ji nêz ve li Gladîo'yê bikole û felsefeya wê derxe holê, mirov ê bibîne, armanca wê ew e, bi awayekî kurtebirr welat dagir bike, gelê wê ji hev parçe bike û parçeyan berde hevdu. Nexasim li cem şaxên wê yên li Rojhilata Navîn ev rastî timûtim bi kirinên wan xwe dide der. Ji bo rêvebirina gelekî amûra herî bi tesîr e. Hem gelê wê li ber dewletê radike, hem jî herduyan bi hev dide pelixandin. Yên bi tehlûke didîtin bi vê rêbazê tesfiye dikirin. Di rastiya rêveberiya şêst salên dawî yên Tirkiyê de ev diyarde pirr balkêş e. Mîna ku welat kirin laboratuwara şerên Gladîo'yê. Bi tenê şerên ji ber Gladîo yên di tevahiya pêvajoyên girîng ên PKK'ê de qewimîn têrê kir ku dawî li dostaniyên sedsalan ên ji rêûresmê yên dewlet û gelan bîne.

**d-** Ji bo xirakirina vê lîstikê, min pêvajoya Îmraliyê weke platformeke îdeal nirxand. Ji bo vê jî min bingehê xwe yê teorîk ku pêdivî pê hebû, bi hêz kir. Min şertên çareseriya siyasî û aştiyane bi tevahî argumanên pratîk û felsefî beridandin. Ez li ser xweseriya çareseriya siyasî û demokratîk ponijîm. Ev xebatên zor bûn û ji bo wan diviyabû mirov bi sebir be, karîbûn girêkên kor ên komployê ji hev vekin û alternatîfên çareseriyê biberidînin. Di vê mijarê de ti çareya min ji bilî baweriya min a bi min tinebû. Ya rastî, yên di pêvajoya komployê de cih girtibûn niyeta wan cuda bû. Di şexsê min de dixwestin PKK'ê û Tevgera Azadiyê biqedînin, tine bikin. Kirinên li girtîgehê, bi tevahî nêzîkatiyên li DMME'yê û YE'yê bi vê armanca sereke ve girêdayî bûn. Li Tevgereke Kurd digeriyan ji min şuştî be. Tevgereke xesandî dixwestin; dixwestin versiyoneke modern a hevkarên ji rêûresmê ya di xizmeta efendiyên xwe de pêk bînin. Nemaze xebatên demdirêj ên DYE û YE'yê di vê çarçoveyê de bûn. Li ser vî bingehî, ji bo hevgirtinê deriyên wan li elîtên rêveber ên Tirk vekirî bûn.

Xulase, ev modela xesandinê ya nexasim hegemonyadariya Ingilîz pêşî di tevgera çînî ya karker de, paşê di tevgerên rizgariya neteweyî û tevgerên şoreşgerî-demokratîk de bi awayekî serketî pêk anî, bi rêbaza azadî û mafên mirovan ên lîberal gihand serketinê. Serokên şoreşger û rêxistinên wan tesfiye kirin. Rêbazên tesfiyeyê yên bi sedan salan pêk dianîn bi awayekî bi heman rengî li dijî PKK'ê, tevgerên şoreşgerî, azadî û wekheviya kolektîf pêk dianîn. Encama ji pêvajoya Îmraliyê li bendê bûn ev bû; pîlana li ser gelekî xebitîbûn û dixwestin bi hosteyî pêk bînin ev bû. Stratejî û taktîk di çarçoveya vî pîlanî de diberidandin. Parastina min li beramberî van, ne xwe disipart helwesta dogmatîk û klasîk a Ortodoks, ne jî xwe disipart xwerizgarkirinê û başkirina şertên min. Tişta rê da ber parastina min, riya çareseriya demokratîk û aştiya bi rûmet a bi pîvan bû ku ev li gorî rastiya civakî û dîrokî ya gelan bû.

**C- DI PKK'Ê DE VEGUHERÎNA RADÎKAL**

Bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetê re pêxîrtengiya di sosyalîzma zanistî de xwe da der û di sala 1998'an de Komploya Mezin a Gladîo'yê PKK neçar kirin ku xwe ji binî ve veguherîne. Ji ber ku rewşa şîlo ya di qonaxa koma îdeolojîk de nehatibû zelalkirin, pirsgirêka dewletê ji hev nehatibû derxistin, ji komployên hundir û derve yên di tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî de nehatibû bihurîn, PKK demeke dirêj li dora xwe dizîvirî, xwe dubare dikir û her diçû dixetimî û ji hev de diket. Min ev rastî ji mêj ve dîtibû. Asta entelektuelî ya heyî qabîliyetên îdeolojîk bi sînor dikirin. Zirar û ziyana di nasnameya Kurd de hatibû kirin şerê hebûnê ango manûnemanê ber bi bêhêvîbûnê ve dahf dida. Bi namzetên kadro yên xwestekên wan ên azadiyê di çarçoveya lîberal de jî çênebûbûn avakirina komê bi hezar zor û zehmetiyan dihat meşandin. Eger ez bîranîneke xwe bînim ziman rewş ê baştir bê fêhmkirin. Di wê demê de ku min hewl dida bi zor û zehmetî komê ava bikim, min hevalekî ji komê bi navê Îsmaîl ê ji Gimgimê ku min ew weke kesekî baş nas dikir, birîndarbûyî û her dera wî pêçayî dît û min jê pirsî çi qewimî ye û wî jî gotibû, "Min wexta afîşên paç ên Rizgariya Gel bi dîrekan ve dadiliqand ketim xwarê û ketim vî halî." Min bi awayekî bêhêvî lê temaşe kir û hewce nedît ku jê bipirsim çima ev yek kiriye. Lê min di ber xwe de weha gotibû: "Tu yê bi van kesan re çiqasî karibî vî karûbarî pêşde bibî!" Hêmanên weke vî, tevgerên bi vî rengî ne bi tenê di nava komên çepgir de, di nava komên faşîst û dînî de jî nîşan didan. Lê dema mirov ji wan re bigota ji bo azadî û nasnameya xwe têbikoşin yekser ji naverastê wenda dibûn. Xwenenasiyê bi xurtî xwe berdabû hinavê karektera Kurd. Ji yê herî bindest, kedkar heta bi yê komprador, axa û serekeşîrê wê hemû bi vî awayî bûn. Bi awayekî bingehîn vî zemînê çandî yê maddî û bênirxî an jî bêparmayîna ji nirxên xwe yên çandî yên hema bêje tine bûbûn, pêşketina komê tengav dikir.

Dema ku me navê PKK'ê li xwe kir û hêjayî xwe dît, ya rastî di mecala dawî de me li ser navê namûsrizgarkirinê gavek diavêt. Eger bi ser neketa jî wê di dîrokê de weke mîraseke baş bimana. Pêvajoya hîcretê ya ber bi Rojhilata Navîn ve, hem şens dida me ku em bibin rêxistin, hem jî rê dida me ku em karibin pêre şerekî gel ê bi rêkûpêk bimeşînin. Çawa ku min diyar kir, mîna qebîleyên Ibrî bûn, Mûsa ew bi zor û zehmetî dimeşandin, dikir û nedikir ji îbadetkirina ji Golika Zêrîn re qut nedibûn ango ji wê jiyana têde xerîb ketibûn û bûbûn heyranê wê bi ti awayî qut nedibûn. Herçiqasî şens çêbibûya û herçiqasî ez weke Mûsa biqîriyam jî peyama me mîna leylana li çolê dima. Sebir (xweragirtin) û înad (rik) bûbûn du sîlehên min ên mezin. Min tîpolojiya rêxistina modernîst danîbû aliyekî û ez li zimanê axê û xwecihiyê vegeriyabûm. Min badilhewa behsa vegera li jiyana pêxemberan nedikir, min bi armanca xwepîrozkirinê ev nedigot. Ji bo ku xwe bigihînim zimanê heqîqetê, min serî li vê rêbazê dida. Civînên fermî bêmane bûbûn. Termînolojiya fermî ya rêxistina sosyalîzma pêkhatî êdî bi kêr nedihat. Ne bi tenê Kongreya me ya di sala 1986'an de, gelek civînên me yên weke wê xwediyê pirr kêm maneyê bûn. Tişta diqewimî ew bû, li ber siyaset û rêxistiniya şoreşgerî radibûn. Di dilê xwe de li

ber şêwazê jiyanê yê maneyeke xwe ya rêxistinî û siyasî hebû, serî radikirin. Pêkhateyên bi navê Çepgirên Tirkiyê ji ber heman sedeman ji zû ve xwe tesfiye kiribûn. Çawa ku her kes bawer dike, hêzên me îşaret bi wan kir, ji ber faşîzma 12'ê Îlonê tesfiye nebûn, ji ber ku ew li gorî şêwazê jiyana siyasî û rêxistiniya şoreşgerî nemeşiyan tesfiye bûn. Di nava PKK'ê de jî vê rastiyê xwe gelekî ferz kir. Rik û înadek hebû, xwe nedida ber şêwazê jiyana siyasî û rêxistiniya şoreşgerî, min jî li dijî vê rikê şêwazê jiyana siyasî û rêxistiniya şoreşgerî ferz dikir û bi vî awayî hewl dida wê pûç bikim. Ji salên 1990'î ve şerên Gladîo zêde bûn û xwe di komployên hundir de her ku çû nîşan dan û vê yekê kir ku rizîna rêxistinê û şêwazê wê yê jiyanê bêhtir bibe. Her ku çû têgihiştina çeteyên asî-aware û axatiya şer di nava rêxistinê de ji xwe re bêhtir cih dîtin. Me roj bi roj kadro û şervanên herî hêja yên ji bo partîbûyînê di cih de bûn ji dest didan û vê jî PKK anî ber tesfiyeyê. Min êdî bi awayekî eşkere û timûtim tiştên li ser navê PKK'ê dihatin kirin bi antî-PKK'tiyê rexne kir, û heta min ew gunehbar kirin. Tevî ku ez bi tevahî tevlî Kongreya 1986'an nebûm jî dîsa dema ez li Romayê bûm, min ji Kongreya 1998'an re peyamek şand û min têde got "Eger wisa dewam bike, ez ê ji PKK'ê îstîfa bikim" û bi vê gotinê min dixwest van rastiyan bînim ziman.

Pêvajoya Îmraliyê ev rastiya di nava PKK'ê de diqewimî têra xwe derxist holê. Ez dema li derve bûm, kesên bi awayekî veşartî û sergirtî tevdigeriyan, ji esareta min sûd wergirtin û texsîr nekirin nasnameya xwe ya rastî nîşan dan. Li naverastê mîrateyeke ciddî ya PKK'ê hebû. Yên hêviya xwe ya serketinê ji bo siberojê nemayî û hesabê vê dabûn aliyekî li ser vê mîrateyê şer dikirin û bûyera jêre pevçûn û xwe li hev rakişandina navxweyî dihat gotin ev bû. Mirov fêhm dikir ku komên xwe şidandî pêk anîne. Komparêzî û lîberalîzm di nava hev de pêk dihat. Jixwe jiyana keyfî ya ferdî bi tenê bi komparêztiyê pêkan bû. Ji bo vê jî bi navê têkoşîna nava partiyê, hirs û xwestekên xwe heta dawiyê danîn holê û di vê de texsîr nekirin. Di encamê de PKK bi tevahî û bi lez ber bi tesfiyeyê ve diçû. Komparêziya tesfiyeker a ez hê li derve bûm pêş lê nedihat girtin, rewşa nû ji bo hesabpirsîna dawî weke firsendeke bi dest nakeve dît. Di vê demê de weke pêdiviyeke komployê Yekîtiya Ewrûpayê xwe amade dikir ku PKK'ê bixe lîsteya 'rêxistinên terorîst'. Ji bo vê biryarê bide demeke dirêj ma, ji ber ku hinek welatên Ewrûpayê bi vê razî nedibûn. Xuya ye ku esareta min hêviya van welatan jî şikandiye. Herweha hewldanên bi pîlan ên DYE û Ingilistanê jî hebûn. Pirr bi xurtî piştgiriya Tirkiyê dikirin. Yek ji sedemên herî girîng ê vê piştgiriyê ew bû, diviyabû PKK weke rêxistina terorîst bihata îlankirin. Zexta li ser Yekîtiya Ewrûpayê zêde kirin û di encama sozên dan wê de PKK weke 'rêxistina terorîst' hat îlankirin. Me destê xwe sivik girt û me KADEK îlan kir. Me ji bo pêkanîna KONGRA GEL bang kir.

**1- Ezmûna KADEK û KONGRA GEL û Veguherîna PKK'ê**

Di nava şertên heyî de li ser navê PKK'ê siyasetmeşandin ne bi tenê bi rîsk bû, dihat wê maneyê ku mirov xwe bi xwe tesfiye dike. Jixwe naveroka wê hatibû pûçkirin û bi nav jî ji tesfiyekariyê re xizmet dikir. Bi kêmanî bi armanca parastina mîrateya wê û bi kêm zirarê derketina ji krîza berbiçav, me di cih de dît ku em xebatên Tevgera Azadiyê di bin navekî nû de bimeşînin. Hewcedarî bi termînolojiyeke nû hebû ku hem şertên derve yên wê demê li ber çavan bigire, hem jî şertên hundir ên rê li ber pêxîrtengiyê vekiribûn bihesibîne. Jihevcihêbûn bi awayekî demî heta temam bûya, ji aliyê taktîkî ve di cih de bû ku mirov navê PKK'ê bidaya aliyekî. Me dixwest em navê PKK'ê ji nava lepên tesfiyekaran derxin da ku weke sîlehekê bi kar neyînin. Organîzasyonên bi rengê KADEK û KONGRA GEL belkî bersiva vê hewcedariyê bidana. Ya ji vê jî girîngtir ew bû, em di nava veguherîneke ciddî de bûn. Ev xwenûkirineke radîkal bû, ango di bin navekî nû de karîbû bêhtir serketî bibe. Li gelek welatên sosyalîzma reel ceribandinên bi heman rengî pêk dihatin. Ya me dixwest em bikin, nedihat wê maneyê ku em wan teqlîd dikin. Berevajî, afirîneriyeke manedar û cuda pêk dihat. Min di versiyonên pêşî yên parêznameyên xwe de û di nivîsên ji PKK'ê re şandî de hewl da xetên sereke yên vê veguherînê îfade bikim. Di veguherînê de têgîna bibûya kilît çareseriya demokratîk bû. Analîzên pêşî yên li ser têgîna 'demokratîk' gelekî kêm û teng bûn. Lê xusûsek ji bo min zelal bû: Piştî jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî, beşên girîng ên partiyên kominîst û çepgirên kevin berê xwe dabûn demokrasiya lîberal û ez bi biryar bûm bi awayekî vebirrî li dijî vê rawestiyama. Ez di nava hewldan û lêgerînan de bûm ku herdu têgihiştinan mehkûm bikim. Di hewldanên min ên lêgerînê de têgîna 'demokratîk' bi rola kilîtê radibû, lê têrê nedikir.

Paşê ez li ser têgîna siyaset-polîtîka'yê hizirîm. Têgîna siyasetê (polîtîka) weke îfadeya berjewendiyên heyatî yên civakê û civaka nebûyî dewlet, weke têgîneke di dereceya duyemîn de girîng di rojeva min de cih girt. Ez li siyasetê weke dijberê îdareya dewletê difikirîm. Ango felsefeyeke demokratîk û polîtîk xwe weke alternatîfa rêvebirina civakê ji aliyê dewletê ve manedar dikir. Sosyalîzma bi destê dewletê hatibû avakirin îflas kiribû û vê jî dikir ku ji bo avakirina sosyalîzmê ez li têgihiştineke rast bigerim. Lewma pêkan bû ku felsefeya siyaseta demokratîk di vê çarçoveyê de bibe gaveke girîng a bê avêtin. Di pratîkê de jî gelê me berxwedaneke girîng li dijî dewletê nîşan dabû. Lê ji ber xebatkar an jî kadroyên PKK'ê yên neafirîner, ev berxwedan li ber têkçûnê bû. Ez dema li riyekê digeriyam ku pê pêşî li vê bigirim, min yeqîn kir ku rêbaza siyaseta demokratîk û felsefeya li pişt wê ji bo vê yekê nêzîkatiyeke di cih de ye. Dersa herî girîng a mirov ji ezmûna Rûsya Sovyetê bigirta diviyabû ev bûya. Eger mirov di têgihiştina partiya kominîst a klasîk a sosyalîzma pêkhatî de israr bikira ku ji zû ve xetimî bû û di hundir de bi hilweşînê bi encam bûbû, ev ê bihata maneya muhafezekarî û çaresernekirinê. Jixwe rola van partiyan di xetimîna sosyalîzma zanistî de eşkere derketibû holê. Eger mirov li ser vî bingehî hewl bida PKK'ê biparêze, ev dihat wê maneyê ku mirov rê li ber muhafezekarî û

tesfiyekariyê vedikir. Tevî vê me nikarîbû qebûl bikira ku em mîrateya sosyalîzma pêkhatî bi temamî red û reş bikin, û bi ber bayê demokrasiya lîberal bikevin. Demokrasiya lîberal demokrasîparêziya sexte bû. Têgihiştina sosyalîzmê û çepgiriya lîberal a dihat maneya çepgiriya wê, bi temamî tesfiye îfade dikir; ya rastî, xwedîderketina li kapîtalîzma di binyeya sosyalîzma pêkhatî de dihat wê maneyê ku mirov wê vediguherîne kapîtalîzma taybet. Gelekî girîng bû ku mirov PKK'ê û nirxên berxwedanê yên gel ji van herdu têgihiştin û kirinan biparasta. Erk û wezîfeya lezgîn ev bû. Eger mirov rast xwedî li vê erk û wezîfeyê derketa, ev hem ji bo kesên hewl didan mîrateya PKK'ê ji bo xwestekên xwe yên egoîstî bi kar bînin, hem jî ji bo wan kesên hewl didan li ser nirxên berxwedanê yên dîrokî yên gel lîberalîzmeke bûrjûwa ya pûç ava bikin, bibûya bersiveke hewce û manedar.

Di vê çarçoveyê de ji bo xwedîderketina bi şêwazekî herî rast li mîrateya dîrokî ya şerê şoreşgerî yê gel û PKK'ê, em weke amûrên demî li KADEK û KONGRA GEL fikirîn. Ji bo ku bi awayekî serketî bi rola xwe rabûna, diviyabû pêvajo bi xwe binirxanda û erkên xwe rast diyar bikirana û xwedî lê derketana.

Pêvajoya bi dewletê re, ji jêpirsîn û dadgehkirinê wêdetir, bi lêgerîna çareseriya siyasî derbas dibû. Tevî ku şert bi tevahî ne alîkar bûn û PKK'ê bi tevahî berê meyla xwe dabû şer, dîsa jî ya min di cih de dît ew bû ku ez pêvajoya Îmraliyê weke firsendeke çareseriya siyasî binirxînim. Di ber de darvekirin jî hebûya, min girîng didît ku serê pêşî ev rê bihata ceribandin. Min bawer dikir ku bi tenê bi vî awayî pêkan bû ku komplo bihata pûçkirin. Bi dijwarbûna şer re û di encama têkçûn û zirarên muhtemel de mumkîn bû ku tabloyê dubare mîna salên 1925-1940'î reng bigirta. Pêşbîniya pîlana komployê jî bi vî rengî bû. Nûnerê Fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk jî rewş weke komployê dinirxand. Herçiqasî armancên wan cuda bûn jî diviyabû ev helwesta wan jî li ber çavan bihata girtin. Destûr hatibû dayîn ez û PKK'ê ji hev re binivîsînin. Di nivîsan de encamên hevdîtinan jî dihatin ragihandin. Di van şert û mercan de min bi awayekî yekalî vekişandina derveyî sînor weke taktîk qebûl kir. Bêyî ku ez zêde li ser şertan bifikirim, bi lez ez bûbûm xwediyê vê helwestê. Di vî warî de dewletê tiştek li ser min ferz nekir. Lê bi awayekî bingehîn a ez ber bi tevdîrên bi vî rengî de birim, hewaya şovenîzmê ya giran a li Tirkiyê hatibû afirandin û zêhniyeta komployê bû. Di dema vekişînê de operasyon hatin zêdekirin û hêzên gerîlla zêde zirar dîtin. Vê jî nîşan da ku hêzên ewlekariyê û saziyên wê, xwestin vekişînê weke pêvajoya tesfiyeyê bi kar bînin. Gaveke bi niyeta baş hatibû avêtin, bi mentiqê tesfiyeyê xwestin bi kar bînin. Ev şaşiyeke ciddî bû. Bi qasî tehrîk û sorkirina hêzên derve, pirsgirêkên tenduristiyê yên Serokwezîr Bulend Ecevît û tevî hewldanên tesfiyekirina wî, nêzîkatiya neyênî ya MHP'ê û biryara îcbarî ya hilbijartinên pêşwext, di vê de bi roleke girîng rabûn.

Çareseriya demokratîk a muhtemel û aştiya em li bendê bûn pêk nehatin. Bi kêmanî bi qasî aştî û çareseriya siyasî ya muhtemel a di salên 1993 û 1998'an de, di nenirxandina îhtîmala serê

2000'î de jî pareke girîng a hêzên ji 1925'an ve dixwazin Tirkiyê di çirava antî-Kurd de kontrol bikin, heye. Ji awayê xuya dike gelekî zêdetir, pirsgirêka Kurd amûrê manîpulasyona sîstema hegemonîk e. Sîstema hegemonîk naxwaze pirsgirêk çareser bibe. Ji ber ku ev bi kêra wê tê. Faşîstên Tirkê Spî jî bi psîkoza şer di polîtîkaya hundir de weke amûrê rêvebirinê bi kar tîne. Heta pirsgirêka Kurd çareser nebe, bivênevê wê welat timî bi mentiqê şerê hundir heye bi rêve bibin. Her tim wê gotinên 'tehlûkeya derve û hundir' û 'yekparebûna welat a parçe nabe' di dewreyê de bigirin û bi vî awayî rewşa şer dewam bikin. Kapîtalîzma dewletê ya yekdestdar bi awayekî di dîrokê de hevtayê wê kêm hatiye dîtin bi despotîzma dewleta netewe dibe xwedî îmkan ku çawa bixwaze bi wî awayî ji welat bixwe û bimije. Ango ne bi tenê Kurd ji civak û mirovbûnê têne derxistin, li gorî qanûna kara herî zêde ya kapîtalîzmê weke amûrên herî kêrhatî têne nirxandin. Polîtîka şerê hundir a li ser Kurdan ferz dikin nebe, li Tirkiyê nikarin dewletdariya netewe û kapîtalîzmê bimeşînin. Ya ji vê jî xeternaktir ew e, vê polîtîka şerê hundir bi awayekî yekalî û weke polîtîka şoreşê dimeşînin. Ev polîtîkayên ku têne îddîakirin, li dijî dijminên hundir û derve ji bo yekîtiya neteweyî û yekparebûnê têne meşandin, bi xwe polîtîkayên sîstema hegemonîk in ku wê bi xwe ew pêk anîne û di kontrola xwe de wan dimeşîne. Heman polîtîkayên hegemonîk ên ji rêûresmê ne ku di serê salên 2000'î de li pêşiya çareseriya demokratîk û aştiya Kurd danîn. Herçiqasî îddîa bikin ku li ser navê mîlliyetgirî û neteweparêziyê pêk tînin jî bi xwe polîtîkayên emperyalîst, mêtinger û qirker in.

Bi parêznameyên li Îmraliyê, bi awayekî bingehîn min xwest vê girêka kor a Kurd ji hev derxim. Ya rast jî ev bû. Têra xwe eşkere bûbû ku ez heta tariyên di rastiya Kurd de rohnî nekim wê rastiya parêznameyên min jî ti tiştî îfade nekin. Piştî ku her tişt ji bo aştî û çareseriyê hat ceribandin, dor hatibû sedemên dîrokî û civakî yên tarîtî pêk anîbûn. Diviyabû îcar ew ji hev bihatana derxistin. Li dadgehê min bi awayekî kurt cara pêşî xwe parast û ev ji bo aştiyê bangeke dilnizm bû. Duyemîn parêznameya mezin di wê astê de bû ku karîbû girêka kor ji hev derxe. Parêznameya behsa wê dikim, min ji DMME'yê re pêşkêş kir û di cewherê wê parêznameyê de min rastiya Kurd û hebûna Kurdan li hemberî şaristanî û modernîteyê lêkola. Li gorî vê lêkolînê, di derketina holê ya pirsgirêka Kurd de berpirsiyariya rastî ya kapîtalîzmê ye, lewma min cara pêşî cewherê çareseriya demokratîk ji dewletdariya netewe veqetand. Cewherê veguherîna di PKK'ê de jî ji vê helwestê pêk dihat. Ji dema ku em bûn kom, me nikarîbû em şêweyên dewletdarî û çareseriya demokratîk zelal bikin, lê bi vê parêznameyê min cudahiya wan danî holê. Bi vî awayî, di vê nuqteyê de ji sosyalîzma pêkhatî û doktrîna Marksîst-Lenînîst a klasîk ku li pişt wê bû, vediqetiya. Her netewe mafê xwe heye çarenûsa xwe diyar bike, ev ji çarçoveya mafên bûrjûwayê hat derxistin û di çarçoveya demokrasiya civakî de hat danîn. Ango pirsgirêka Kurd bêyî ku xwe bi dewletdariyê bike, bêyî ku berê xwe bide lêgerînên dewledariya netewe û neçarî çareseriyê di vê çarçoveyê de bibe, pêkan bû, bi modelên civakê yên rêveberiya demokratîk çareser bibe. Cewherê veguherîna di nava PKK'ê de ev bû. Ji aliyê termînolojîk ve jî KADEK û KONGRA GEL ev rastî îfade dikirin.

Di tevahiya van qonaxan de min parêznameyên xwe beridandin, lê di van qonaxan de berevajî cewherê parêznameyên min, tesfiyeyên salên 2002-2004’an careke din hem jî bi awayekî berfireh ketin rojevê. Bi sedema ku parêzerên min di dema xwe de û têra xwe agahî nedan min, tevî tesfiyekariyeke berfireh, di serî de kadro û şervan, destketî û nirxên gel û partiyê yên di warê maddî û manewî de gelekî giranbuha, badilhewa heba bûn. Di pêvajoya veguherînê de şerê gel û partiyê yê bi giştî pêk dihat li tesfiyekariya herî mezin a dîroka me ya di navbera du seriyên tûj de qewimî.

**2- Girîngî û Maneya Tesfiyekariya 2002-2004’an**

Dîroka PKK’ê dîrokek e ku bi tesfiyekariyê re meşiyaye. PKK hê di qonaxa komê de bû timûtim bi tesfiyeyan re rûbirû bû. Her ku partî bi pêş ket, tesfiye jî berfirehtir bûn. Ya di navbera salên 2002-2004’an de qewimî, ji tesfiyekariyê wêdetir şaxên komployê bûn xwe li hundir didan der. Ya rastî, komplogerî û tesfiyekarî ketibûn zikhev. Ji hev nedihatin derxistin ka çiqasî bi zanebûn û çiqasî jî xweber bû. Ji bo ku mirov karibe ji hev derxe, zemîn derfet û îmkan nedida. Ji ber zemînê xwe spartibûnê, kesayet di heman demê de karîbûn hem di nava komployê de û hem jî di nava tesfiyekariyê de cih bigirin. Rêveberiyeke karibe kesayetên ji ber vî zemînî derketine holê li ber çavan bigire di asta heyatî de girîng bû. Min timî bala xwe dabû ser vê yekê û bal kişandibû serê. Dema ku mirov civakbûneke şoreşgerî pêk bîne, mirov hûrûkûr serwext nebe ka ev çiqasî karekî zor e, ji civakbûna Kurd pêkanîna rêxistin û tevgerê jî pirr zehmet e. Di vê çarçoveyê de rêveberiya partiyê û rêxistina şer xwediyê wê bîreweriyê nebûn ka çawa li ser piyan têne girtin. Herweha bi sedema ku ji qaşo Çepgirtiya Tirk û çanda mezhebî ya dîrokî bi tesîr bûbûn, li cudahî û girîngiya civakbûna şoreşgerî û çalakbûna wê serwext nedibûn û ji vê dûr bûn. Me ew ji nêz ve kontrol dikirin, lewma neksa xwe ji me kort dikirin û qelsiyên xwe yên di vî warî de nîşan nedidan. Ji dil nebûya jî hewl didan li gorî hewaya rêxistinî tevbigerin. Li şûna ku disîplîna çalakî û rêxistinî weke pêdiviyeke jiyana azad bibînin û binirxînin, li pêşiya jiyana xwe ya keyfî weke asteng û kelemekê didîtin. Zêhniyeta qebîlegirî û malbatgiriyê ketibû heta bi mejiyê hestiyên wan. Dema netiştikbûna ferd jî li vê zêde dibû, tiştekî mirov xwe zehmet lê ragire û îdare bike derdiket holê. Mirov dikare van xusûsên me jimartin hemûyan weke rastiyên giştî fêhm bike. Lê eger ev hemû di demeke herî krîtîk a dîroka şerê gel ê şoreşgerî û PKK’ê de weke tevgereke tesfiyeyê û komployekê ketibin zikhev û pêk hatibin û bi vî awayî xwe ferz kiribin, hingê mirov dikare bibêje tevgera herî mezin a xiyanetê ketiye rojevê. Girîngî û cudahiya tesfiyekariya dema 2002-2004’an ji yên beriya xwe ji vê xisleta wê ya bi kok û xiyanetkar tê.

Em bi nexweşiyeke mîna ya di dîroka Kurdan de kronîk bûyî re rûbirû bûn. Tevî têkoşîna îdeolojîk, rêxistinî û çalakî ya sîh salan, hişyarbûn û serîdana heman nexweşiyê tehlûkeyeke mezin bû. Şertên zeman û mekanê lê pêk dihat jî heta dawiyê derfet û îmkan didanê. DYE’yê li Iraqê dest bi dagirkeriyê kiribû, AKP jî weke şaxê xwe yên hundir hilbijartibû. Dîsa mîna di dîrokê

de hewl dida Tevgera Kurd bi awayekî yekalî manîpule bike. Ew hêza bingehîn bû ku li pişt şerê Gladîo yê li dijî PKK'ê û li dijî min bû. Li ber destê wê hevkarên wê yên bi hêz hebûn. Gladîo'ya Tirk ji nû ve pêk dianî. Dema ev faktor hemû digihiştin hev, operasyoneke di nava PKK'ê de ferz dibû. Armanc ew bû, operasyona dawî ya wan operasyonên berê jî ji derve û hundir ve hatibûn ferzkirin, pêk bînin. Diviyabû armanca ku ev sîh sal bûn li pey diçûn, bi cih bînin. Armanca operasyona klasîk a tê zanîn ew bû, di nava PKK'ê de ji xwe re aliyekî hevkar çêkin û pê aliyê din tesfiye bikin. Ev rêbaz di dîrokê de gelek caran ceribandibûn û pê bi ser ketibûn. Dema ku bi Komploya Mezin re li vê fikirîn, bawer kirin ku wê vê carê bi ser bikevin. Hêzên kompoyê yên di nava şerê taybet ê Tirk de, vê carê di nava şemaya AKP'yê ya bi maskeya kesk de tevdigeriyan. Şaxên wan ên Kurd ji bo opsiyona federe ya li Kurdistana Iraqê ji wan re hat pêşkêşkirin, ji mêj ve ji bo her cure hevkartiyê amade bûn. Jixwe ji sala 1985'an ve eşkere yan jî veşartî destek dabûn pêngavên Gladîo'yê hemûyan. Îcar jî bi hêviya ji PKK'ê û şerê gel rizgar bibûna çi ji destê wan bihata wê bikirana. Kirin jî, her cure derfet û îmkan dan tesfiyekaran. Dilxwede xwediyê para mezin ê mîrateyê bûn. Heyf û mixabin, koma tesfiyekaran a xwe hem xwediyê rastî yê partiyê û hem xwediyê şerê gel dihesiband, haya wan ji wan tinebû ji kîjan efendiyan re xizmetê dikin. Hêmanên dogmatîk û muhafezekar ên tesfiyekaran ji xwe re timî weke sedem nîşan didan, ne xwediyê wê hêzê bûn ku karibin şexsî xwe biparêzin. Gavavêtineke dîrokî ya bi ser ketiye, bi vî awayî bi destê xwe diqedandin û dixwestin dawiyê lê bînin. Lê mîrateya PKK'ê mîrateyeke welê nebû ku bi hêsanî bê tinekirin.

Ji bo em baş fêhm bikin ka PKK çawa ket vê rewşê, divê em hinekî li rabihuriya xwe ya nêz temaşe bikin.

Serê pêşî di pêvajoya damezrandinê de ji ber nasnameya zirarlêbûyî û kêmasiya azadiyê kesayetên bêîradebûyî û kêmbûn di gihiştina vê rewşê de xwedî rola bingehîn bûn; weke qelsî û zeîfiyeke giştî tesîra xwe kirin. Ji bo rakirina ji holê ya van kêmasiyan gelek xebat nehat meşandin. Her ku pêvajo pêşde çû qelsî û zeîfiyan xwe bêhtir nîşan da. Me heta bi Kongreya 1986'an xwe li kadroyên di vê rewşê de gelekî ragirt û hewl da bi wan re bimeşin. Piştî ku me Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an bi zor û kotekî bi wan da kirin, di krîza 1986'an de xwedî helwestekê bûn ku mîna bibêjin 'Ji vê bêhtir em nikarin bikin.' Nexasim zêde nerast bû ku mirov zorê bida kesên xwe weke kadroyên ji nifşê pêşî dihesibandin. Gelek caran me rola erka navendî dabû van kesan lê xwedî li berpirsiyariyên xwe derneketibûn. Bihêlin ku ev kes bibûna afirîner, xwedî li yên amade jî dernediketin. Di serî de Kemal Pîr, Mehmet Karasungur û Mahsum Korkmaz, kengî namzetên fermandariyê yên hêvî ji wan dihatin kirin, hatin bêtesîrkirin, bi namzetên kadro yên mayî ku mirov dikare wan weke nifşê duyemîn bi nav bike, me neçar xwe li pêngava 1987'an rakişand. Hema bêje min bi tenê xwe da ber barê vê pêngavê. Heta dawiya sala 1992'an her sal ji hezarî zêdetir şervan û kadroyên hatibûn perwerdekirin, gurçûpêçkirin û ji aliyê malî ve hatibûn amadekirin, me ew veguhestin welêt û her cure destek pêşkêş kir. Li van

hemûyan, divê mirov desteka gel a qet nabe piçûk were dîtin û li derve derfetên bicihbûnê û desteka dîplomatîk jî zêde bike. Li hundir jî li hemû herêman baregehan hebûna xwe diparast. Kengî namzetên nû yên fermandariyê yên me ew weke nifşê navîn bi nav dikir, li ser van derfetên bêhempa rûniştin, mîna şêxê kerametên wan ji wan menqûl, dest pê kirin bûn heyranê xwe. Ji wan we bû, ji nû ve mezinbûna Tevgerê ji huner û jêhatîbûna wan e. Ya rastî, rola pê radibûn ji rola bûka baranê wêdetir nediçû. Kengî kesayeta wan a qels bi kesayeta wan a bûbû heyranê xwe re bû yek, her ku çûn ketin nava kêmasiyên welê ku kadroyên nifşên beriya wan neketibûnê. Nifşên pêşî qet nebe pîvan û exlaqekî wan ê diyar ê rêxistinî û siyasî hebû. Li cem van kesên nûgihiştî û xeşîm ev jî tinebû. Eger piçek hebû jî li şûna ku şertên dijwar ên têkoşînê wan xurt bike ew tine kiribûn. Her ku Serokatiya li Rojhilata Navîn bi cih bûbû û li hundir gel destek dida wan, bêhtir ji ser xwe ve çûn, gewî û bitir bûn.

Çeteya Çaran di vê mijarê de nexasim li eyaleta Botanê serî dikişand. Yên ku diviyabû li zirar û ziyanên çeteya çaran bipirsîn û bêtesîr bikin jî xwe dan ber siya wan û li kêfa xwe nêrîn. Di serê van kesan de jî Nizamettin Taş (Botan), Halil Ataç (Ebûbekîr), Osman Ocalan (Ferhat) û Celalê Şirnexî hebûn. Bi vî awayî, qadên Botan, Behdînan û Zagrosê bi awayekî fiîlî ket bin bandora vê koma tesfiyekar. Eyaleta Amedê (Amed, Çewlîk, Mûş û deverên dewrûberê) bû mîna gundikê Sakik û birayên ji malbata Çurukkayayan. Van kesan destekeke mezin a hêza kadroyî û destwerdanê pûç kirin. Bi îhtîmaleke mezin Amed bû eyaleta pêşî ya ket kontrola JITEM'ê. Li Botan, Behdînan û Zagrosê jî xebatên hundir ên komplogeran û JITEM'ê yên xwe disipartin PDKê her ku diçû bi tesîr dibûn. Li Dêrsimê bi mirina Doktor Baran re ku rastiya vê bûyerê hê zelal nebûye, însiyatîfa hêmanên mîna Hidir Sarikaya (Ekrem) zêde dibû. Tevî tesfiyekariyê şerê bêmane yê bi hêzên din ên çepgir re û kuştinên hewce nedikirin zêde bûbûn. Li eyaleta Tolhildanê (Mereş, Semsûr û dewrûbera wê) Terzî Cemal (Ali Ömürcan), li eyaleta Mêrdînê Serhat (Hidir Yalçin) meylên muhafezekar û tesfiyekar ên bi heman rengî serwer kiribûn. Li Rojhilata Navîn bi JITEM'ê ve girêdayî Serokatî anîbûn ber tesfiyekirinê. Kompoloya di serê Çileya sala 1990'î de rê li kuştina hevrê Hesen Bîndal vekir di vê çarçoveyê de wê bi rola îmhayeke stratejîk rabûya.

Tevî van meylên komploger û tesfiyekar jî têkoşeriya kadro, şervan û gel bi qehremanî mezin bû û xwe nîşan da. Lewma ji salên 1991'ê ve li qatê dewletê hewcedariya bi diyaloga siyasî hat hiskirin. Lê xebatên Gladîo'yî û JITEM'warî jî bi awayekî ti pîvanê nas nekin bi tevahiya hovîtî û şîddeta wan xistibûn dewreyê. Derzeke ciddî li nava dewletê ketibû. Di bin van şertan de ji serî ve hêmanên tesfiyekar xwe weke çetekariyeke eşkere yan jî bêhtir bi xasûkî ji binî ve xwe ferz dikirin û têra xwe bi gewde bûbûn. Ji texmînên min ên şexsî gelekî wêdetir, ewqasî zêde lingê xwe radabûn xwe xwediyê nû û rastî yê partiyê û gel didîtin. Gelekî gewî û bitir bûbûn. Lê di heman demê de ji bo ku van helwestên xwe veşêrin gelekî bûbûn hoste.

Ji bo derketina ji nava vê rewşê, me serî li rêbazên klasîk ên partiyê da. Me bi civînên navend, konferans û kongreyan hewl da ji pirsgirêkê bibihurin. Me nûkirina komîteyan, ji nû ve destnîşankirina nûneran û mezinkirina hêzê weke çareserî dît. Diyar bû ku çareseriyên bi vî rengî aliyên teknîkî û rêxistinî bûn; bi van rêbazan mirov nikarîbû dakeve bingehên îdeolojîk û polîtîk ên pirsgirêkê. Lewma ji bilî çend encamên şiklî rê li ber tiştekî venedikirin. Ya rastî, bûyerên li pêş çavên me diqewimîn, ezmûna li Yekîtiya Sovyetê çawa li nava dinyayê pêk dihat, di binyeya partiya me de jî xwe dida der. Sosyalîzma pêkhatî di dawiya heftê saliya xwe de ji hev de diket û PKK'ê jî ev yek piştî damezrandina xwe bi bîstûpênc û sîh salan dubare dikir. Eger bibûya dewlet jî jihevdeketinên bi vî rengî pêkan bûn. Modelên îdeolojîk û polîtîk ên xwe ji perspektîfa dewletdariya netewe rizgar nekiribin, bi awayekî binyewî bi pirsgirêk in, antî-demokratîk in, û nikarin civakê bi awayekî sosyalîst veguherînin. Çi li ser bingehê dewletê dibe, çi jî li ser bingehê partiyê dibe, modelên bi vî rengî li gorî xwezaya xwe kesayet û elîtên desthilatdarî, yekdestdarî û destpotîk pêk tînin. Lê bi tesfiyekariya 2002-2004'an re em li vê rastiyê bi awayekî dijwar serwext bûn.

Xayînên tesfiyekar, ne bi tenê ji rêûresma têkoşînê qut bûn, di nava xwe de jî ji hev qut bûn. Hinek hesabên wan ên taktîk û girîng hebûn. Berî her tiştî yeqîn dikirin ku rastiya Serokatiya Damezrîner bêtesîr bûye. Li gorî wan ti hêzê nikarîbû Serokatî rizgar bikirana. Ji lewra ji tehlûkeya ji Wî bihata xwe dûr didîtin. Di vî warî de hêzên xwe disipartin wan, ew têra xwe piştrast dikirin. Duyemîn hesabê wan ê taktîk ew bû, kadroyên berê yên bi giranî aliyên wan ên dogmatîk xurt (tevî ku bi pîvan bûn) bêtesîr bikin û ji bo xwe wan ji pozîsyona tehlûkeyê derxin. Ji bo vê jî amadekariyên wan hebûn. Gelek nirxên têkoşîn û partiyê di kontrola wan de bûn. Beşekî girîng ê kadro û şervanan ji rê derxistibûn. Bi salan xasûkî û qurnaziyên di nava refên têkoşînê de ceribandibûn ew li jor digirtin. Ya sêyemîn, xwe weke xwediyê rastî yê tevahiya nirxan dihesibandin. Ma ne wan şer meşandibû, gel û şervan bi wan bawer bûbûn! Serokatî jî di navê de bi tevahî nifşên berê bi rola xwe rabûbûn û lewma diviyabû êdî li aliyekî û li cihê xwe rûniştana! Weke kesên aqilkemaliya xwe îspatkirî diviyabû wan her tişt kontrol bikira û heqê wan bû ku ew bibûna xwediyê çalakî û gotinê! Bi rêûresmeke tîpîk a malbatgirî û mîratexuriyê hesab çêdikirin. Ya çaremîn, hêza ew rewa qebûl dikirin û wan xwe disipartiyê lîberalîzma nû ya global bû ku li nava dinyayê serketin bi dest xistibû. Herçiqasî nezanê wê bin jî meyla neo-lîberalîzmê tam jî li gorî wan bû. Di bin van faktoran de zehmet bû ku bêne girtin. Jixwe êdî derfetên pêkanîna jiyana ferdî ya timî dixwestin bi dest xistibûn. Êdî kesî nikarîbû wan ji van 'eşqên' wan ên nû veqetanda. Ji ber ku bibûya sedema jêkirina serê wan jî, weke komên ji gelek jin û mêran pêkhatî wan hevdu direvandin. Di dawiya dawî de bi tevgereke xiyanetê ya bi heybet digihiştin wê 'eşqa' bi salan bi hesreta wê bûn. Berê timûtim revên îtîrafkaran ên ferdî çêdibûn, wan ev yek bi awayekî komî pêk anîbû, hem jî bi awayê tevgera nû ya lîberal pêk anîbûn. Bi vê karîbûn ber dilê xwe xweş bikin, rûyê xwe spî bikin! Bi riya tevgereke navdar a

mîna PKK'ê wê karîbûna xwe weke pêşnûmeyên lîberalîzmê pêşkêş bikirana û pere bikirana. Di serî de Komara Tirkiyê, DYE û alîgirên wê, wê karîbûna xwedî li wan derketana.

Li hemberî vê, di serî de kadroyên ji nifşên berê yên heta dawiyê rêûresma Serokatiyê li ber çavan digirtin, beşên ji nirxên têkoşîn û partiyê re bi hurmet bûn û bi pîvan tevdigeriyan, lê nikarîbûn ji dogmatîzmê bibihuriyana û gavên taktîk ên di cih de û di dema xwe de biavêtana, herçiqasî li dijî tesfiyekaran sekinîn jî di parastina nirxan de serketî nebûn. Di vî warî de gelekî bi qusûr bûn. Bi afirîneriyeke hewce nikarîbûn pêşiyê li tesfiyekaran bigirin û hesab ji wan bipirsin. Bi kêmasî, bi bêtevdîrî û şêwazê xwe yê tevgerê yê nedişibiya ti tiştî, derî heta ser piştê li tesfiyekaran vekirî hiştibûn. Ya wan kirî, bi awayekî şexsî namûsa xwe parastin an jî rizgarkirin bû. Dogmatîzm û kêmasiyên salan kiribûn ku bi awayekî neçar li bûyerên pêş çavên wan diqewimîn temaşe bikin. Ne di wê rewşê de bûn, mezinahiya pêla nû ya xiyanetê bibînin û li gorî wê tevdîran bigirin. Bi awayekî dişibiyan bermahiyên partiya kominîst. Lîberalan desthilatdarî bi dest xistibû, wan jî temaşe kiribû.

Rewşa derketibû holê, encama sosyalîzma pêkhatî bû ku xwe di nava PKK'ê de nîşan dida. Lê tevgera me beridandî di wê xisletê de bû, ji zû ve ji sosyalîzma pêkhatî bihurîbû û heta bi hîmên civakê rehên xwe berdabûn. Herçiqasî em ji sosylîzma pêkhatî bihurîbûn jî xisletên wê yên cewherî xwe di nava me de niqirandibûn û bi cih bûbûn. Hem di warê hebûn û nasnameya Kurd de, hem jî di warê asta azadiya civakî de pêşketinên mezin pêk hatibûn. Ne di tevgerê bi xwe de, lê di rêbertiya wê de pirsgirêkan xwe dabûn der. Tevgerê zindîbûn û mezinbûna xwe dewam dikir. Eger rewş û pêvajo rast bihata nirxandin, bi awayekî kes ne li hêviyê bû, wê tevgera nasname û azadiyê bi hêz bibûya û gav biavêta.

Min asta tesfiyekariyê jî li ber çavan girt û min weke dewama parêznameya xwe hewl da bi versiyona bi navê Parastina Gelekî bersivê bidim. Herçiqasî dema pêşî mirov li vê parêznameyê binêriya û bifikiriya ji birina rizgariyê ya gelekî, heta ji avakirina wî gelî weke civakeke sosyalîst, ji komkirina wî gelî li bin banê dewleteke serbixwe paşve gav hatibe avêtin û pozîsyona parastinê hatibe hilbijartin jî ya rastî rewş gelekî cuda bû. Maneya vê yekê ew bû, ji vegotina îdeolojîk me xwe nêzî rewşa berbiçav a civakî kiribû; bi vî awayî me dixwest ku em ji valatiya mezin a di navbera îdeolojî û pratîkê de çêbûye bibihurin û ji vê rewşa nakok xwe rizgar bikin. Vegotina sosyalîzma pêkhatî û heta ya sosyalîzma zanistî bersiva rewşa nû ya derketibû holê nedidan. Çawa ku li nava tevahiya dinyayê pêk dihat, jihevdeketina di nava PKK'ê de jî mirov çiqasî hewl bida jî bi şêwazê berê pêşî li vê jihevdeketinê nedihat girtin û nedihat rawestandin. Diviyabû aliyê îdeolojîk û zanistî ji nû ve bihata avakirin. Herweha bi awayekî berbiçav rastiya gelê Kurd û qadên civakî yên azad dibûn êdî bi şêwazên berê ne dewam dikirin û ne jî bergiriya wan pêkan bû. Ne bi tenê hewcedarî bi çalakî û vegotina nû hebû, di têgihiştina exlaq, siyaset û zanista civakî de pêdivî bi guhertineke bingehîn hebû. Pirsgirêk ne bi tenê xwecihî, lê belê gerdûnî bû.

Kengî mirov li ser disîplînên felsefeya zanistî û civakê diponijî mirov têra xwe li pêdiviya veguherînê serwext dibû.

Lîberalîzm tevî êrîşên xwe yên îdeolojîk hemûyan jî modernîteya kapîtalîst ketibû pêvajoya pêxîrtengiya herî mezin a dîroka xwe. Bi jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî re stûneke wê ya bi hêz qelibîbû. Ya rastî, modernîteya kapîtalîst di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de ji hev de ketibû, lê sosyalîzma pêkhatî temenê wê dirêj kir. Lewma jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî serketina lîberalîzmê nebû, berevajî ji mezhebê xwe yê herî bi hêz mehrûm bûbû. Pirr dirêj neajot ev yek hat fêhmkirin. Piştî salên 1990'î pêxîrtengiya ekonomîk bêhtir zêde bû û weke çare dagirkeriya Iraq û Afganistanê xistin rojevê û bi vê re hewl dan Projeya Rojhilata Navîn a Mezin pêk bînin û pirr neçû pêxîrtengiya sîstemê ya ji avabûnê bi temamî xwe da der. Çîn a ji sosyalîzma pêkhatî mabû jî wê nikarîbûya modernîteya kapîtalîst rizgar bikira, berevajî, wê weke navenda hêzeke nû ya hegemonîk bi roleke bi tehlûke rabûya. Rewşa dinyayê ya nû, ji ber modernîteya kapîtalîst bû ku dinyayê bi wê nikarîbû dewam bikira, ya din jî ji ber tinebûna alternatîfeke nû bû. Veguherîna di zanista civakî, siyaset, etîk û estetîkê de bi vê rewşa derketibû holê re têkildar bû; hem sedem, hem jî encama wê bû.

Weke encam, ji aliyekî ve ji bo em destketiyên pratîk û berbiçav ji zirarê biparêzin me hewl da em modelên nû yên polîtîk bi pêş bixin, ji aliyekî din ve jî em di felsefeya siyaset û şêwazê jiyanê de li bersivan geriyan. Me bi tevahî xwe ji bûyerên îdeolojîk û polîtîk ên berê qut nedikir. Me xwe ji hêmanên dibûn kelem dişuşt û em bi hêmanên kêrhatî li bersiva pêdivî û pirsgirêkên derdiketin holê digeriyan û bi vî awayî em ber bi pêvajoyeke mayînde û tesfiye nebe diberidîn. Nîşaneya vê yekê ya eşkere ew bû, me navê PKK'ê ji nû ve li xwe dikir, me destketiyên gel ên di warê nasname û azadiyê de bi Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê bi nav û berbiçav dikir. Bi vî awayî, me hewl dida em hem rêûresmê hem jî guhertinê di qonaxeke nû de bi hev re pêk bînin. Bi vê parêznameya dawiyê, me hewl da, em bûyerên di vî warî de hemûyan ji aliyê teorîk ve rave bikin. Ji ber vê yekê, min tercîh kir ku ez rewşa dawî ya parêznameya xwe ji roja derketina holê ya cinsê mirov heta bi civakbûna wî, ji şaristaniyê heta bi modernîteya kapîtalîst û ji wir jî heta bi pêvajoya modernîteya demokratîk tevahiya pêvajoyan bi nasnameya gelê xwe û kesayeta xwe re ji hev derxim û bi dawî bikim.

**Beşa Şeşemîn: PKK, KCK û NETEWEYA DEMOKRATÎK**

PKK û KCK'ê di çarçoveya teoriya demokratîk de xwe bi awayekî fermî di destpêka sala 2003'an de îlan kirin. Mirov dikare vê weke sêyemîn qonaxa mezin an jî sêyemîn derketina holê ya mezin bi nav bike. Yekemîn qonaxa mezin, ji îdeolojiya şoreşgerî ya gerdûnî xwebûna zêhnî ya civaka neteweyî îfade dike. Bi awayekî bingehîn bi zêhnî radihêje nasnameya civaka neteweyî û dinirxîne. Civaka neteweyî çi pêk hatibe çi pêk nehatibe, weke derketineke holê ya zêhnî tê tesewirkirin û plankirin. Weke pîvan, Kurdîtî bingeh e, lê gelekî tê guftûgokirin ka Kurdîtiyeke çawa li naverastê heye. Parçe parçeyî be jî heyîna Kurdan ji aliyê dîrokî û mekanî ve tê nirxandin. Tê guftûgokirin ka civakeke çawa ye, welatê wî, zimanê wî, sînorên wî, parçebûna wî, paşvemayîna wî yan jî hemdemiya wî bi agahiyên herî çor tê guftûgokirin.

Koma kakil a ev guftûgo dimeşand, di salên pêşî de hejmara wê ji tiliyên du destan ne zêdetir bû. Girîngiya komê ne di hejmarê de, di naverokê de bû. Îfadekirina rast a rastiya me dixwest ku em wê derxin holê, heqîqet girîng dikir. Ji Enqereyê derketin û li Kurdistanê belavbûn di salên 1973-1979'an de naveroka vê rastiyê bi awayekî bingehîn tîne ziman û weke Heqîqeta nû ya Kurd manedar dibe. PKK navê vê heqîqeta nû ye. Şehîdê mezin ê vê demê Hakî Karer e. Ji hejmara tiliyên destan ne zêdetir şehîdên vê demê hene. Pêvajoya ji 1980'î heta bi 2005'an jî ji diyardeya Kurd a obje ye, vegera li civaka Kurd a neteweyî ya bîrewer, bi rêxistin û şerker dibe û bi vî awayî azad û kirdar dibe, îfade dike. Rewşeke welê heye ku ji Kurdîtiya obje ber bi Kurdîtiya azad û kirdar dibe, gavavêtin heye. Em ji vê re dikarin bibêjin, ji Kurdîtiya berê ya mîna meytekî û bûye kole, ber bi Kurdîtiya ji nû ve zindî û azad dibe, gav tê avêtin. Li vir, em behsa komeke piçûk nakin ku bi nav û zêhn derketiye holê, li vir, em behsa gelekî dikin ku ji mîlyonan bihuriye, ji rewşa eşya û rabihuriya kole ber bi rastiya gelê ku xwe bi awayekî azad îfade dike, xwe bi rêxistin dike, xwe bi çalakî dike û xwe dide şerkirin, diçe. Em dikarin vê weke ji nû ve bûyîna gelekî hemdem ê tîpîk û civaka neteweya demokratîk îfade bikin. Navên pêşî yên pêvajoya bûyînê Hêzên Rizgariya Kurdistanê HRK û Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê ERNK ye. Hejmara wan ji sîh hezarî bihurî, bi qasî ku neyên hejmartin zêde, ne bi tenê ji bo Kurd û Tirkan, ji bo tevahiya mirovatiyê şehîdên wê yê maneya xwe mezin hene. Bi sedhezaran kadro, sempatîzan û gelê wê yê ketine ber êşkencê hene. Hejmara girtiyên wê yên zindanê ji deh hezaran bihurî. Hîcret û koçberiya wê ya qat bi qat ji mîlyonan bihurî heye. Di van şert û mercan de xwe gihandiye rastiya gelê şerker. Ji ber bûyerên di rabihuriya wê de û ji ber îmha û înkara di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de yên gihiştin asta qirkirinê, xayînê wê, hevkarên wê, çerxkiriyên wê û qetlîamkerên wê gelek in, lê li hemberî vê, civakeke neteweyî ya demokratîk û gelekî neteweyî ya ku têkoşerên wê, lehengên wê û şehîdên wê pirr çêbûne.

Cudahiya 2005'an û salên piştre, ji bûyînê ber bi nasnamebûyîneke nû ve, ber bi hebûneke mayînde ve û ji israra di jiyana azad de ye. Ango piştî pêvajoyeke bi êş a bûyîn û vejînê, bi

heman nazikî û ehemiyetê çawa ku zarok bi awayekî serketî ji diya xwe bû, bi heman awayî divê zarok bi xweparastinê bê mezinkirin, bi xwarinên pê bi jehrî nekeve were xwedîkirin, hebûna xwe bi awayekî azad îfade bike û bi awayekî karibe cudahiya xwe pêk bîne, bijî. Pirsgirêk êdî yên bûyîn û ji dayikbûnê nînin, pirsgirêkên jiyana azad û nasnameya xwe ne ku ji ber parastin, mezinbûn û cudabûnê ne. Piştî derketina holê ya zêhnî derketina holê ya gewde dikeve rojevê, ango gewde vediguhere endamên cuda û xwe bi awayên din pêk tîne. Bûyîn û ji dayikbûyîn li her nexweşiya zarokatî û gedetiyê vekiriye. Ji bo zarok nemire pêdivî bi hewldanên gelekî mezin ên hosteyane heye. Beriya wê, derketina holê ya zêhnî gelekî bi êş û jan e. Bi awayekî divê bûyîna di malzarokê de bi tenduristî, bi esil be û bêjî nebe. Ji bo vê jî divê pêngava îdeolojîk diyardeya civakî ya Kurd rast îfade bike, ango heke bibe heqîqeta wî pêkan e. Divê mirov ji bîr neke ku li ser axa niştimanî ya Kurdistanê bi hezaran sal hêzan xwe gevizand, ji bo wê pevçûn û şer kirin, lewma ji bo erda dayik ne bi destavêtinê lê bi îradeya xwe ji xwe zarokekê bi şêweyê gelekî azad bîne dinê, şertê pêşî û herî zor ew e, divê xwe bi xwe bibe hebûn. Di qonaxa sêyemîn de ji bo ev heyîna em behsa wê dikin bibe hebûn divê xwe weke hebûneke bi nasname û azadiyê îfade bike. Diyardeya nû ya pêk tê, ew hebûna berê ya naskirî, ne ew a berê ye ku êdî ji xwebûnê derketiye û ew objeyeke hatiye parçeparçekirin û bi hêsanî tê daqurtandin nîne. Kurdîtiya berê bi tenê weke obje û eşyayekî hebû. Her hêza fetihkar, dagirker, mêtinkar, îlhaqker û qirker çawa bixwesta li ser karîbû her kirina îmhayê û asîmîlasyonê (helandinê) bimeşîne. Di rewşa amûrekî bikaranînê de bû. Nasname û kirdariya wî ya kolektîf pêş neketibû yan jî ji vê bêpar hatibû hiştin. Ji xweîfadekirin û parastinê dûr bû. Mîna çêlekeke li benda dotinê bû, weke berateyeke ji qijakan re hatibe hiştin bû. Ji aliyê civakî ve mirov nikarîbû ji vê re hebûn bigota. Mirov bêhtir karîbû jêre bigota obje û eşyayeke ku ji hebûn û nasnameyê hatiye kirin.

Kurd û Kurdistana piştî salên 2000'î êdî ne eşya û alavek in, di sîh salên dawiyê de bûne embriyoneke ruhpêketî û bûye hebûneke xwedî nirx a serketî ji diya xwe bûye. Nasnameyeke Kurd û jiyaneke wî ya azad a dikare rastiya xwe îfade bike û xwe weke heqîqet nîşan bide û biparêze heye. Bêguman vê rastî û heqîqetê xwe weke dewleteke netewe îfade nekir. Di destpêkê de îdeayeke xwe ya bi vî rengî hebû, ew terikand. Ya rastî, ya jê yeqîn dikir ku sosyalîzm e, lê nexasim bi jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî re derket holê ku rastiya weke sosyalîzm lê serwext bûbû kapîtalîzm e, û lewma sînor danî navbera xwe û wê. Di destpêkê de li dewletdariya netewe ya ne zelal û civakparêziya demokratîk di zikhev de difikirî, lê ev herdu ji hev cuda kirin. Dewletdariya netewe terikand û xwe da ber civaka demokratîk. Bi hemû hêl û hêza xwe li ser vê mijarê mitale kir. Civaka demokratîk a neteweyî êdî ne xeyal û utopyayek bû, rastiyek bû ku bi awayekî azad pêk dihat. Herçiqasî hin pirsgirêkên rastiya nû hebûn jî ev ji ber rewşên embriyona canpêketî, ji dayikbûnê û bûyînê nebûn, ji ber ku heyîn dibû xwedî nasname û hebûn azad dibû pirsgirêkan rû dida. Eger em şibandina xwe dewam bikin, em ê bibêjin, êdî ji zaroktiyê bihuriye, bûye keçek an jî xortekî bi hêza xwe dikare li ser piyan bimîne. Ango

pirsgirêkên serdema xortanî û keçikaniyê ne. Di vê demê de nexasim pirsgirêkên jiyana azad gelekî girîng dibin. Eger mirov hay jê nebûya, nexweşiyên berê yên Kurdîtiyê ji nişkê ve, bi awayekî mirov ne li bendê karîbûn ji nû ve bi pêlekê bilebitin û serî bidin. Hevkartiya bi dijmin re, xiyaneta derve û hundir ji berê gelekî xirabtir karîbûn canê hebûn û nasnameya azad a Kurd hilqetanda. Hêmanên modernîteya kapîtalîst û hiyerarşiya berê ku li ber serê wê hebûna xwe dewam dikirin, karîbûn her kêlî hebûna nû di nava xwe de parçe û par bikin. Ya rastî, karîbûn bi zêhniyeta berê, hebûna yeqîn dikirin milkê wan e, û mafê bikaranîna wê yê wan e, çi cudahiya nû û kevin nekirana û bixwestana bimêtana û bixwarana. Pirsgirêk pirralî bûn û giş ji vê çarçoveya me destnîşankirî derdiketin holê.

Çi ji ber şaristaniya berê, çi ji ber modernîteya kapîtalîst û çi jî ji ber jiyana bi nasnameya azad bin, bûyerên diqewimin ji pirsgirêkên berê gelekî berfirehtir û cudatir in. Lewma divê rêbaz û amûrên çareseriyê jî cuda bin. Ne bi Kurd û Kurdistana berê dibe, ne jî bi 'Neteweparêz', PKK, HRK û ERNK'ya rabihuriya nêz têkoşîn dibe. Dijmin jî êdî dijminê berê nîne. Pirr bawerî pê nebe jî hatiye veguherandin, û bi şermokî be jî gihiştiye astekê, Kurd û Kurdistanê qebûl dike û nasnameya Kurd a azad bi helwesteke yekcar red nake. Ev veguherînên dîrokî-civakî hemû, bi awayekî eşkere danasîneke nû ji bo Kurdîtî û PKK'yê ferz dikin, pêdiviya bi têgîn û teoriyên sîstemê nîşan didin. Li ser vî bingehî, em ê hewl bidin bi danasîna nû ya Kurdîtî û PKK'ê têgîn û teoriyên nû yên sîstemê bi pêş bixin.

**A- PKK û JIYANA NETEWEYA DEMOKRATÎK**

Ez van rêzan di salvegera 32'an a navlixwedanîna PKK'ê de dinivîsim. Ji bo mirov nasnameya partiyeke modern, rol û serketina wê binirxîne, bawer dikim ku evqasî sal têrê dikin. Eger mirov li van salan dema komê jî zêde bike – divê mirov zêde bike –ji çil salî zêdetir jiyaneke dijwar e. Çi qonaxa komê, çi jî salên navlêdanînê û heta bi Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an demek e ku bi şêwazê partîzaniyê pêk hatiye. Ji aliyê îdeolojiya gerdûnî ve, em ji cîhana sosyalîzma pêkhatî û fikra pêve girêdayî ya me yeqîn dikir sozyalîzma zanistî ye, bi tesîr bûbûn. Ji bo mirov li nasnameya PKK'ê serwext bibe, nirxên bi wan ve girêdayî ma yan jî bawer dikir ku bi wan ve girêdayî ye, û paradîgma sosyalîzma zanistî ya cîhanê nuqteyeke girîng a nîrengî ye. Eger em hewl bidin bi şibandinekê şîrove bikin, em ê bibêjin, me dixwest em şaxekî nû yê civakeke ji xwe re qebîleya sosyalîst digot ava bikin. Eger em qebûl bikin ku bi vî şêwazî gelek şax hatine avakirin, me jî weke komeke piçûk mafê xwe didît em şaxekî bi vî awayî ava bikin. Bi awayekî berbiçav, bîr û baweriya me ya der barê rastiya welat (Me Kurdistan weke welatekî dihesiband) û gelekî (Me hebûna Kurdan weke gelekî ji sedî sed qebûl dikir) de sedema me ya bingehîn bû ji bo ku em vî mafê xwe bi kar bînin. Li gorî fikra me ya cîhanî, bi awayekî xwezayî me yê xwe weke hêza pêşeng a beşên gel ên kedkar û bindest bi nav bikirana. Lewma me gotina 'Karker' bi

kar anî. Ji aliyê konjonkturel ve hem bi maneya bindest hem jî bi menaya xebatkar dihat, û ev navlêkirin li gorî rastiya me bû.

Eger mirov bala xwe bidiyê, mirov ê bibîne, di PKK'ya salên derketina holê û partîzaniyê de cîhaneke bîr û baweriyê ya bêpirs hatiye qebûlkirin heye. Dema ez dibêjim endamê nû yê qebîleya sosyalîst mebesta min ev rastî ye. Çawa ku zarokeke dema ji diya xwe dibe, divê bêpirs qebîleya xwe qebûl bike, me jî qebîleya cîhana sosyalîzma zanistî û sosyalîzma pêkhatî bêpirs qebûl kiribû. Cudahiyeke me ji qebîleyên klasîk hebû, ew jî ew bû, qebîleya me ya nû ya dinyayê xwe disipart bingehekî zanistî yê guman jê nedihat kirin. Herçiqasî me yeqîn bikira ku bingehê me zanistiye jî (Me di cildên berê de rexneyên di mijara sosyalîzma zanistî de kiribûn û me hewl dabû ku em aliyên dogmatîk nîşan bidin) şêwazê me yê girêdanê li ser bingehê pirr kêm bi bîrewerî û bêhtir bi baweriyê bû. Ango aliyên dogmatîk bêhtir giraniya xwe hebûn. Ez vê ji bo bi temamî dogmatîzmê reş bikim nabêjim. Di xwezaya mirov de fikrek tineye ku têde dogmatîzm nebe. Di îde'yê de, di fikrê bi xwe de nirxeke dogma û baweriyê heye. Mirov ji vê re dikare nirxa pîvanê jî bibêje. Mirov ji dogmaya baweriyekê, pîvanekê û bîrbirinekê bawer neke, pirr zor e ku jiyana xwe dewam bike. Belkî ji bo ku karibe bêyî hewceyî ti pîvan û dogmayekê bibe û bijî divê îlahî bibe. Gelek mirovên îddîa kirine ku bi vî rengî ne derketine holê, lê kesên bi vî rengî yan hîç tinene yan jî kêm kesayetî hene ku heta dawiya temenê xwe di kêliyên pirr bi sînor de bi ber pêleke bi vî rengî ketibin.

Di vê mijarê de têgihiştina şaş ew e, mirov dogmayan weke heqîqetên hişk û naguherin qebûl bike. Lewma dogmayên dînî bi pirranî bi vî awayî hatine fêhmkirin û dîroka mirovatiyê bi trajediyan fetisandine. Felsefe û fikra zanistî, li dijî şêwazê dogmatîzekirina dogmayan şêweyekî pozitîf ê fikrê ne ku duristtir in. Serdestiya felsefe û zanistê li hemberî dogmayê ew e, dihêle ku rastiya jiyana gerdûnî di nava tevahî cihêrengî û zindîtiya wê de bê fêhmkirin. Ji lewra her civaka di felsefe û zanistê de bi pêş ketiye, li hemberî civaka ji baweriya dogmatîzmê nebihuriye û di bin destê wê de maye, timî serdest bûye. Di têkoşîna civakan de ya diyarker nirxên felsefî û zanistî ne ku timî di fikra wan a cîhanî de hene; ya rastî, ew asta wan e ku rastiya jiyana gerdûnî di nava tevahiya cihêrengî û zindîtiya wê de fêhm dikin. Di rewşên bi vî rengî de, ango biserketina li hemberî tevahiya komên din ên li derve û hundirê civakê û heta li dijî hawîrdora xwezayî, girêdayî bi asta di şêwazê nêrîna gerdûnî de serwextbûna li cihêrengî û zindîtiyan e.

Kengî mirov bi awayekî dogmatîk bi dogmayan, bi gavavêtinên bi pîvan ve bê girêdan, hingê rîsk heye û mirov dikare fikaran bike. Di dema derketina holê û salên partîzaniyê yên PKK'ê de dogmayên sosyalîzma zanistî yên PKK bi wan ve girêdayî bû, ya rastî, bi roleke erênî rabûn. Sosyalîzma zanistî herçiqasî bi temamî ji metafizîkê nehatibû şuştin jî der barê rastiya civakî de îdeolojiya herî zêde nêzî zanist û felsefeya dîrokê bû. Di serwextbûna felsefî û zanistî ya civakê de li gorî dema xwe paradîgmaya herî pêşketî pêşkêş dikir. Di sosyalîzma pêkhatî de xetimîna

çêbû bi awayekî encama aliyên dogmatîk ên sosyalîzma zanistî bûn. Ji destpêkê ve rexne li wê hatin girtin û di van rexneyan de para rastî û mafdariyê hebû. Ji ber ku di dema xwe de nehatin sererastkirin, dogmayên binyewî encamên xwe bi hilweşandina sosyalîzma pêkhatî nîşan dan. Di PKK'ê de jî herçiqasî di asta dewleta netewe de nebe jî weke proto dewleta netewe encamek di nava wê de derket holê. Di salên şerê gel ê şoreşgerî de hêmanên di nava PKK'ê de yên nikarîbûn ji dogmayan gavê biavêjin zanist û felsefeyê, dogmatîk bûn. Di vê de herî zêde hêmanên desthilatgir û peyrewên dewleta netewe derketin pêş. Her ku derketin pêş dogmatîzmê jî rehên xwe berdan. Nêzîkatiyên desthilatgir nêzîkatiyên demokratîk tepisandin. Erka partiyê rê li ber erka fermandariyê, erka fermandariyê jî rê li ber desthilatdariya şexsî vekir. Bi awayekî dewletokên netewe yên mîkro pêk hatin. Di têgihiştina partiya Lenînîst de şîroveya têgihiştina otorîteyê ne demokratîk e, lê desthilatgir û alîgirê dewleta netewe ye, ev çawa di cîhana sosyalîzma pêkhatî de bi tesîr bû, bi heman awayî di nava PKK'ê de jî bi bandor bû. Kengî ev têgihiştin bi temamî serwer bû, bivênevê rizîna ji ber desthilatdariyê pêk hat. Tevî ku PKK negihişt dewleta netewe ya Kurdistana Yekbûyî Ya Demokratîk a kiribû armanca xwe, dîsa jî ew di gelek astên mîkro de pêk anî û dît. Dema 1984-1998'an ew dem e ku têde bi giranî dewletokên netewe yên Kurd çêbûn. Jihevdeketina dewletên sosyalîzma pêkhatî bi derengî û bi awayekî dijwar di sala 1998'an de dest pê kir bi serê PKK'ê de hat. Herçiqasî di vê de bêtesîrkirina Serokatiyê ji aliyê dewletên netewe yên faşîst lîberal global bi bandor bûbe jî, bi awayekî bingehîn ev berê, nexasim ji salên 1995'an ve, pêvajoyek bû ku di hundir de dest pê kiribû. Li gelemperiya dinyayê pêvajoyên bi heman awayî li cem partiyên din ên bi heman rengî jî pêk hatin. Piştî jihevdeketinê du ekolên sereke hewl dan hebin. Ya yekê, partiyên kominîst bûn ku di têgihiştina sosyalîzma pêkhatî ya berê ya ortodoks de israr dikirin; ya diduyê, partiyên veguherîn lîberal demokratan bûn ku bûn şaxên partiyên lîberal ên li welatên berê kapîtalîst bi rola partiyên kok radibûn.

Di nava PKK'ê de piştî jihevdeketinê meylên bi heman rengî derketin holê, lê belê nikarîbûn bibin baskên serdest. Nexasim têkoşîna di navbera baskan a salên 2002-2004'an de gelekî zirar da, lê bi ser neket. Çeteyên sextekar ên bi maskeya lîberalîzmê reviyan û ketin xiyanetê, hêman an jî baskê ji rêûresmê yê nikarîbû ji muhafezekarî û dogmatîzmê bibihure jî tercîh kir ku li ser riya ekola sereke bimîne. Ekola sereke serhatî û çîroka wê jî gelekî balkêş e. Dema ku herdu bask û aliyan li dijî hev têkoşîneke dijwar dimeşand, bawer dikirin ku partî bi tevahî ji wan pêk tê. Herdu alî an jî baskan nedixwest ji diyalektîka pêşketinê ya PKK'ê hayedar bibin. Ya rastî, haya wan ji diyalektîka pêşketinê ya PKK'ê tinebû. Lê nizanîbûn ku cudahiya PKK'ê ji yên weke xwe ew bû, têkiliya xwe ti carî bi pêşketina diyalektîkî re qut nekir. Çi di dema derketina holê û partîzaniyê de çi jî di salên şerê gel ê şoreşgerî de, tevî hewldanên jirêderxistinê hemûyan, partî li gorî pêşketina diyalektîkê tevgeriya û xwe bi vî awayî parast. Herçiqasî di PKK'ê de fikreke bi serhevhatî ya diyalektîkê çênebûbe jî di jiyanê de pîvanên diyalektîka şoreşgerî bi awayekî pratîkî li ser kar bûn. Xwebûn weke diyalektîkekê hebû. Bask an jî hêmanên fikirsabit ên

cûrbicûr bi ti awayî li vê rastiyê serwext nedibûn. Her jirêderketin an jî xiyanetê bawer dikir ku derba kujer li partiyê daye, lê paşê didîtin ku partî bêhtir bi lez pêş dikeve û lewma nikarîbûn vê diyalektîkê fêhm bikin. Ji lewra bi her jirêderketin û revê re ya diqediya ne partî bû, ew bi xwe bûn. Li beramberî vê partî bêhtir zelal dibû û hinekî din bi awayekî diyalektîka xwe bidestxistî pêşketina xwe dewam dikir. Di hemû pêvajoyên krîtîk de bûyer û pêşketinên bi vî rengî hatin dîtin.

Di pêvajoya 2002-2004'an ya jihevdeketinê de bawer dikirin ku heta wê rojê ya nikarîbûn pêk bînin wê têde bi ser bikevin û mîna ku partî bi awayekî bi tenê ji wan pêk tê, wê bimîne. Bi destwerdaneke pirr kêm di demeke kin de hat fêhmkirin ku ev wisa nîne. Parêzeran ji bûyerên diqewimîn ez rast û durist agahdar nedikirim. Li pêşiya wan ti asteng tinebû. Ez yeqîn dikim ku ew jî li gorî baskan dibûn xwedî pozîsyon û ez jî weke neçarekî zor rabe ser xwe dihesibandin. Ya rastî, mirov ji rewşa min a wê demê zêde hêvî nedikir. Lê ez ne bi tenê ji ketûbereke wê demê pêk dihatim. Min di şexsê xwe de bi tenê dîrokek zindî nekiribû, piştî hebûna min a fizîkî jî heta civak bi awayekî kolektîf li ser piyan bimana, nemaze heta Kurd bi awayekî azad bijiyana, ez ê jî bi awayekî azad bijiyama û ez ji zû ve bûbûm rastiyeke bi vî rengî. Min xwe weke rastiyeke bi vî şêwazî û hêza maneyê hûnandibû. Haya wan ji vê rastî û maneyê tinebû yan jî hêza wan têra serwextbûna li vê yekê nedikir. Di encamê de bi hewldana komek heval û hevrê navê PKK'ê ji nû ve hat bikaranîn û li ser vî bingehî dan xuyakirin ku wê li ekola sereke xwedî derkevin. Bi vê re jî pêvajoyeke PKK'ê ya ji berê gelekî pêşketîtir dest pê kir. Dîwarên sextekarên rastgir ên lîberal pişta xwe dayî wan ji mêj ve hilweşiyabûn û ew jî di bin de mabûn. Çepgirên hişk ên ji rêûresmê vê carê bi xwerexnekirineke bêhtir ciddî hewl dan xwe bi pêvajoya ekola sereke re bikin yek. Bêguman li vir a mirov pê diêşe ew e, di vê pêvajoyê de ji hezarî zêdetir hêmanên karîbûn bi ekola sereke re bimeşiyana, gelek nirxên maddî û gelek nirxên girîng ên manewî badilhewa çûn, hatin hebakirin. Lê bi vî awayî PKK piştî jihevdeketina mezin ket sêyemîn qonaxa xwe ya mezin an jî ket pêvajoya pêngava xwenûkirinê û di vê pêvajoyê de dibe partiya dema civakbûneke cuda û partiya dema neteweya demokratîk.

**1- Di Dema Nû De Nasnameya PKK'ê û Maneya Wê**

Bêguman qutbûna ji demên berê nedihat maneya nasnameyeke cuda, lê ne kopiyeke demên berê jî bû. Pêşketina çêdibû ne ji aliyê hejmar û çendayetiyê bû, pêşketina naverokê bû ango di warê kalîteyê de bi pêş diket. Ne bi tenê di warê nasnameya PKK'ê de pêşketin hebû, di civaka Kurd a xwenûkirî de jî veguherîneke naverokê ya bi kalîte pêk hat. Ango mirov niha dikare nasnameya PKK'ê ya hebûna xwe ya dema gihiştin û stewînê vebirrî û îspat kirî bi awayekî berbiçav bide naskirin û pêkan e ku xwe bigihîne hinek encamên gerdûnî.

**a-** Serê pêşî bi giştî partî, nexasim jî PKK partiya dewletdariya netewe ya berê ya sosyalîzma pêkhatî nîne. Bi tevahî partiyên sosyalîst weke prensîb divê bi armanca dewlet avakirinê neyên

damezrandin. Sosyalîzm nabe ku bi amûra dewletê ya modern bê avakirin. Amûra em jêre dewlet dibêjin bi xwezaya sosyalîzmê re li hev nake. Dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst, stûna sereke ya pîvana kara herî zêde ya kapîtalîzmê ye. Sîstema karê ya kapîtalîzmê bêyî dewleta netewe pêk nayê. Her sîstema dewleta netewe têde hebe, bi pêkanîna kara kapîtalîst ve girêdayî ye. Rewş li cem sosyalîzma pêkhatî jî cuda nîne, heta hebûna kapîtalîzma burokratîk bêhtir hewcedarî dewleta netewe ye. Sosyalîzma pêkhatî nikarîbû bibe sosyalîzm û di vê de avahiya dewletdariya netewe bi roleke diyarker rabûye. Ji partiyê ber bi dewletê, ji dewletê ber bi partiyê her gava bê avêtin wê bi înkara sosyalîzma demokratîk bi encam bibe. Di teoriyê de ji bo xwe gihandina civaka kominîst a weke civaka bê dewlet tê tesewirkirin, li gorî sosyalîzmê û şêweyê wê divê di ti qonaxê de û bi ti sedemê amûra dewletê neyê bikaranîn û ji bo xwe gihandina civaka kominîst divê mirov serî li amûra dewletê nede. Sosyalîzm kengî bi hemû aliyan demokrasiyê pêk bîne wê pêk bê; ew demokrasiya lîberalîzm wê bi awayekî durû bi kar tîne û bi rastî bi naveroka wê re li hev nake. Mirov nikare bêyî demokrasiyê li sosyalîzmê bifikire û li derveyî demokrasiyê jî bi riyeke din ti carî ava nabe. Bi tenê bi jiyaneke demokratîk a tevlîbûna wê herî berfireh mirov dikare sosyalîzmê ava bike.

Ji lewra xisleta yekemîn a partiyên sosyalîst divê ew be ku xwe weke protîpeke demokrasiyê ava bikin. Partiyeke nikaribe xwe demokratîze bike ew nikare civakê demokratîk bike. Demokrasî bêotorîtetî nîne. Otorîteya demokratîk ji otorîteya dewletê cuda, dikare xwe di şert û mercên civaka siyasî de pêk bîne. Dewlet civaka siyasî li derve dihêle û xwe pêk tîne, lê ji bo pêkhatina demokrasiyê hebûna civaka siyasî ferz e. Civaka siyasî jî ew civak e ku azadiya xwe pêk aniye. Diyardeya siyasetê maneya xwe ew e, civak di mijara berjewendiyên xwe yên heyatî de gihiştiye wê hêzê ku difikire, biryarê dide û dikeve nava çalakiyê. Civakên siyasî nebûne, nikarin çarenûsa xwe diyar bikin û di heman demê de nikarin xwe demokratîk bikin. Di navbera diyardeyên siyaset, azadî û demokrasiyê de têkiliyeke ji hev nabe heye. Yek bê yên din nabe. Lewma partiyên siyasî bi tenê weke protîpeke civaka siyasî ya azad û demokratîk karin bibin xwedî nasname. Ji lewra bi giştî modelên desthilatdariyê, bi taybetî jî desthilatdariya dewletê nikarin ji xwe re mînak bigirin. Desthilatdarî û dewlet, herçiqasî weke hebûn diyardeyên cuda bin jî bi awayekî bingehîn yekdestdariyên hêz û mêtingeriyê ne. Tevî ku hêmanên karûbarê civakê bi rê ve dibin hildigirin jî ev hêman bi rola talî radibin. Ji bo rewakirina yekdestdariyên hêz û mêtingeriyê yên bi rola diyarker radibin têne bikaranîn. Ev sedem hemû îspat dikin û têra xwe rave dikin ka divê çima partiyeke sosyalîst bi armancên desthilatdarî û dewletdariyê neyê avakirin. Dîsa têra xwe îspat dikin ka divê çima bi tenê bi awayê demokratîk bên damezrandin û sazkirin.

**b-** Partiyên sosyalîst tevî ku saziyên modern in, ji aliyê dîrokî ve xwedî erk û berpirsiyarî ne ku li beramberî modernîteya kapîtalîst modernîteya alternatîf çêkin û biberidînin. Modernîte têgîneke bêalî û notr nîne; têgînek e ku bingehê wê yê çînî, siyasî û îdeolojîk heye. Modernîteya

serdest, tevî ku xwedî karektera kapîtalîst e jî moderníteyên bi tîpên din jî hene. Moderníteya demokratîk di serê van tîpan de tê. Modernîte di nava xwe de demên civakî yên veguherînên bi kok û cuda îfade dikin. Avahiya îdeolojîk, siyasî, ekonomîk, teknîk û zanistî ya serdema her moderníteyê xweserî xwe ne. Serdema destpêkê, navîn û nêz, her yek ji wan li gorî xwe moderníteyekê temsîl dikin. Wekî din her modernîte li gorî xwe şêweyên xwe yên serdest ên çînî, teknîkî, îdeolojîk, siyasî û ekonomîk hene. Her yek ji wan li gorî van şêweyên serdest karekterîze dibe. Di serdema me de ji destpêkê ve li ser şert û mercên jiyana me ya modern mohra şêwazê daneheva kapîtalîst heye, lê tevî vê yekê mirov nikare vê serdemê bi her tiştî bike malê kapîtalîzmê. Eger sosyalîzma pêkhatî bi kapîtalîzmê bi encam nebûya, pêkan bû wê jî mohra xwe li moderníteyê bidaya. Jixwe demeke dirêj jî wisa hat fêhmkirin. Partiyên sosyalîst heta ji hêmanên sereke yên moderníteya kapîtalîst (şêwazê daneheva kapîtalîst, dewleta netewe û îndustriyalîzmê) nebihurin û li dijî wan tênekoşin nikarin mohra xwe li moderníteyê bidin. Sosyalîzma pêkhatî li dijî hêmanên moderníteya kapîtalîst tênekoşiya, berevajî ji ber ku bi qilifdûritina ji van hêmanan re mijûl bûbû bi kapîtalîzmê bi encam bû. Eger partiyên sosyalîst bi tenê hêmanên xwe yên moderníteyê (neteweya demokratîk, îndustriya ekolojîk û ekonomiya bazarê ya sosyalîst) bi pêş bixin karin ji moderníteya kapîtalîst bibihurin û karin moderníteya xwe bi rola sereke rakin.

PKK nikare qîma xwe bi tenê bi bihurîna ji dewletdariya netewe bîne; di heman demê de bi xweavakirina weke prototîpa hêmanên moderníteya demokratîk dikare bi rola pêşengiyê rabe. Di dema nasnameya nû ya PKK'ê de yek ji erkên wê yên sereke ew e, civaka Kurd weke neteweya demokratîk ava bike. Ji bo di vê erka xwe de bi ser bikeve, beriya her tiştî divê karibe xwe bike alternatîfa hêmanên sîstema moderníteya kapîtalîst. Di navbera xwebûn û bûyîna prototîpa moderníteya demokratîk de cudahiyeke girîng heye. Eger nebe prototîpa moderníteya demokratîk, zor e ku civakbûna xwe û serekbûna xwe bi dest bixe. Jixwe partî ji bo vê zoriyê ji holê rakin hene; kengî bibin kakilekî pêşeng dikarin vê zoriyê li paş bihêlin. Di navbera hêmanên moderníteyê de, di warê îdeolojîk, polîtîk û ekonomîk de, di her qadê de têkoşîneke zêde heye. Encama têkoşîna di navbera wan de wê diyar bike ka kîjan modernîte wê bi rola sereke rabe. Partî hêzên pêşeng ên vê têkoşînê ne. Ji ber ku di Marksîzmê de têkoşîn daxistin qada ekonomiyê bi tenê, encam negirtin. Marksîzmê yeqîn dikir ku moderníteyê û heta bi tevahî hêmanên din ên moderníteya kapîtalîzmê weke hene pêk bîne wê karibe xwe bigihîne kominîzmê. Lê têkoşîna moderníteyê ya tevî hêmanên kapîtalîzmê hemûyan encam diyar kirin. Ji ber vê sedema bingehîn hewcedarî bi moderníteya demokratîk heye. Eger têkoşîn di çarçoveya pêşdebirina alternatîfê de neyê meşandin, ne pêkan e ku têkoşîna li dijî kapîtalîzmê û tevahiya hêmanên wê serketî bibe. Divê mirov bi tenê qîma xwe bi analîza kapîtalîzmê neyîne, şertê pêşî ew e, divê mirov teoriya moderníteya demokratîk û di vê teoriyê de hêmanên alternatîf ên moderníteyê zelal bike û têbikoşe. Lewma partiyên sosyalîst bi awayekî bingehîn xwe bi teoriya moderníteya demokratîk zelal dikin û li dijî kapîtalîzmê têdikoşin. Bi tenê qîma

xwe bi têkoşîna teorîk nayînin, tevî vê, amûrên pratîkbûnê jî pêşde dibin ango neteweya demokratîk pêk tînin, teknîkên îndustriyel ekolojîk pêşde dibin û diyardeya bazara sosyalîst pêk tînin. Kengî ev pêk anîn dikare li dijî hêmanên modernîteya kapîtalîst serketî be.

Di nasnameya nûkirî ya PKK'ê de weke berê hûrik û perçikên agahiyan der barê mêtingeriya kapîtalîst de tinene, pêşbîniyeke têkûz a xwe disipêre bi tevahî analîzkirina modernîteya kapîtalîst û paradîgmaya wê ya nû ku xwe disipêre teoriya wê bi xwe ya modernîteya demokratîk, heye. Qîma xwe nayîne ku modernîteya kapîtalîst bi tenê tevî hemû hêmanên wê ji hev derxe; weke alternatîfa wê modernîteya demokratîk weke hêzeke pêşeng derdikeve holê, ev hêza pêşeng xwedî wê erk û berpirsiyariyê ye ku tevî kokên xwe yên dîrokî bibe xwediyê wan hêmanên der barê îro de û bername, stratejî û taktîkên van hêmanan bi ser bixin çêke..

**c-** Herçiqasî gotina hêza pêşeng modelên partiyên klasîk bi bîra mirov bixe jî ji aliyê cewherî û naverokê ve cudahiyên xwe hene. Hêza nû ya pêşeng prototîpa civaka demokratîk e. Modela pêş a civaka neteweya demokratîk pêk tîne. Herçiqasî weke berê yekparebûna bername, stratejî û taktîkê îfade bike jî di warê naveroka van têgînan de veguherîneke girîng heye. Stratejiya wê hêmanên modernîteya demokratîk dike bingehê xwe. Bername, ji aliyê pîvanan ve diyar dike ka wê heman hêman çawa bêne avakirin. Taktîk jî nîşan dide ku pîvanên programatîk wê li ser xeta stratejîk bi kîjan hêz, amûr û şêweyên têkoşînê bêne bicihanîn. Bername li gorî paradîgma modernîteya demokratîk hedefên polîtîk, ekonomîk, civakî, çandî, yên xweparastinê û yên dîplomatîk diyar dike, stratejî jî ji bo demên pêş diyar dike ka ev hedef wê li ser kîjan bingeh û hêzên taktîkî bêne pêkanîn. Ekonomiya civakan a li dora neteweya demokratîk, îndustriya ekolojîk û bazara sosyalîst ji hêmanên stratejîk ên sereke ne. Hêmanên taktîk ên bingehîn jî wê hedefên bingehîn û hêmanên stratejîk bi cih bînin û ji bo avakirina wan bi awayekî berbiçav şêweyên rêxistin û têkoşînê yên pêdivî bi wan heye, diyar dike.

Dema ku behs bibe têkoşîn û rêxistin, pirsa kadro derdikeve pêş. Di civakên modern de girîngiya pêşeng û kadroyan kêm nabe. Berevajî, bi sedema ku civak tevlîhevtir û aloztir dibin rola wan bêhtir girîng dibe. Li vir a girîng ew e, ka dîsa kîjan perspektîfê dikin bingehê xwe. Eger kadro û pêşengiyên partiyê ji dinya modernîteya kapîtalîst nebihurin, çi zû çi dereng wê veguherin hêmanên desthilatdarî û mêtingeriyê. Eger di hêmanên modernîteya demokratîk de israr bikin, wê kadro û pêşeng li gorî wê dirûvê xwe bigirin. Eger li şûna perspektîfa desthilatdarî û dewletê, ji perspektîfên otorîteya demokratîk, civaka exlaqî û polîtîk danegerin, li gorî nasnameya nû ya partiyê pêşeng û kadroyên demokratîk wê bigihîjin.

Di dema nû de erka bingehîn a PKK'ê ji ya berê cuda ye. PKK'ê di dema komê de bi bandora îdeolojîk şer û çalakî dikir bingehê xwe û rê li ber tesîra polîtîk vedikir. Divê tevî vê di dema nû de bi nasnameya Kurd a hatiye bidestxistin û bi xwesteka ji bo jiyana azad neteweya demokratîk ava bike. Herdu qonaxên pêşî ji bo avakirina neteweya demokratîk gelek nirx bi ser hev de anîn.

Lê avakirina neteweya demokratîk hê jî weke wezîfeyekê li pêşiya wê ye. Lewma di dema nû de yekparebûna bername, stratejî û taktîkê bi vê avakirinê berpirsiyar in. Em ê di babeta KCK'ê de rahêjin hûrguliyên vê mijarê û ji hev derxin. Di vir de têkiliya PKK û KCK'ê girîng dibe. Hêza PKK'ê ya îdeolojîk, polîtîk û rêxistinî di çarçoveya KCK'ê de divê ji bo bicihanîna wezîfeyên hewce têrê bike.

**d-** Çawa ku wê ji van tiştên me gotî hemûyan bê fêhmkirin, kapasîteya îdeolojîk a PKK'ê bi rexnekirina sîstema sosyalîzma zanistî û sosyalîzma pêkhatî bi hêz bûye. Li şûna nêzîkatiya dogmatîk dikare nêzîkatiyeke dijwar a lêpirsînê nîşan bide. Di fikirkirina diyalektîk û ketina nava çalakiyê de pêşketin heye. Di nirxandina rewşa berbiçav û pêkanîna veguherînên hewceyî de li gorî berê bêhtir xwedî naverok e, û hêzê dide jiyana azad. Mesafeya di navbera îdeolojî û sosyolojiyê de kin bûye. Cudahiya di navbera sosyolojî û sosyalîzma zanistî de jî kêm bûye. Danûstendina di navbera fikra îdeolojîk, sosyolojîk û sosyalîzma zanistî de yekparebûnek çêbûye û her ku diçe ber bi zanisteke civakî ya hevgirtî ve diberide. Di vê babetê de PKK di serê wan partiyên bi îdeal de tê. Hêza bingehîn a partiyeke sosyalîst bi rêjeya lihevbûna wê ya bi zanista civakî re tê pîvan. Hêza wê ya diyarker ji girêdana wê ya bi zanista civakî ye. Di kapasîteya wê ya îdeolojîk û sosyolojîk de payeya zanistî çiqasî bi pêş bikeve, di rola pêşengiyê de jî wê ewqasî bi pêş bikeve.

Asta polîtîk a PKK'ê li gorî berê di dema nû de têra xwe bi pêş ketiye. Ji ber ku kapasîteya polîtîk bêhtir bi ezmûn û tecrûbeyê tê bidestxistin, PKK di vî warî de li dinyayê yek ji partiyên sereke ye. Tevî ku modernîteya kapîtalîst di asta hegemonîk de dor lê girtiye û lê şidandiye jî tesfiye nabe û ev yek tecrûbeya polîtîk dide wê ango wê bi hêz dike. Polîtîkbûna civaka Kurd û polîtîkbûna PKK'ê di zikhev de û bi awayekî hevdu bi hêz bikin pêk hatiye. Gelê Kurd di dîroka xwe de di dema xwe ya herî bi hêz a polîtîk de ye û mirov vê rastiyê ji bo PKK'ê jî bîne ziman di cih de ye. Li cem PKK'ê polîtîka hundir û derve di zikhev de pêk tên. Asta polîtîka pêk tê hem têkiliya wê bi dîrokê re hem jî têkiliya wê bi rastiya rojane û gerdûnî re hatiye danîn. Herweha têkiliya di navbera exlaq û polîtîkayê de jî xurt û têkûz hatiye danîn. Di dizikhevdebûna civaka exlaqî û polîtîk de bingeh tê qebûlkirin. Di bingehê polîtîka PKK'ê de bi qasî hebûna îdeolojîk û sosyolojîk ango bi qasî hebûna hêmanên zanistî, hêmanên exlaqî û etîk jî hene. Têkiliya bi poetîkayê re jî ango têkiliya bi hunerê re jî paşguh nake û girîngiyê pê dide. Bi vî awayî, polîtîkayê bi tenê bi îdeolojî û exlaqê bi gewde nake, bi awayekî hunerî jî wê heyî û manedar dike. Bi vê, hewl dide xwe ji polîtîkayeke hişk û pûç bigihîne diyardeyeke polîtîkayê ya dewlemend û heqîqeta wê.

Tevî ku di PKK'ê de ji aliyê hejmara kadroyan ve ti tengasî çênabe jî di tevahiya deman de pirsgirêka bingehîn ji ber kolektîfnebûnê derketiye holê. Ne ferd bi rola xwe radibin, ne jî hêza kolektîvîzmê têra xwe tê bikaranîn. Bi qasî ku rolên ferdî bi rolên xwe ranabin, reva ji kolektîvîzmê jî timûtim weke qelsiyekê xwe nîşan dide. Ji ber vê sedemê, ferd û rêxistinî gelekî ji

taqetê dikevin. Pirsgirêka bingehîn a ku di rojevê de cihê xwe diparêze, kadroyê rêxistinkirî ye; ango rola ferdî bi rêxistinbûnê dibe û birêxistinbûn jî bi kadroyên bi însiyatîf dibe.

**2- Cihê PKK'ê Di Jiyana Neteweya Demokratîk De**

Di demên berê de rahib, aliyên polîtîk, mezhebên dînî û zanyarên civakan bi rola partiyên modern radibûn. Xanedan, baskên burokrasiyê yên eskerî û îlmiye bi awayekî berbiçav gelek hevgirtiyên xwe çêdikirin û bi hev diketin; bi vî awayî hewl didan serdestî û bandora xwe çêkin. Bi derketina holê ya pirsgirêkên civakî re partiyên çareseriyê yên cuda jî derketin holê. Bi dizî yan jî eşkere, tevahiya serdeman partî her hebûn. Eger mirov bi awayekî ferdî bixwaze li pirsgirêkeke civakî destwerde yan li hundir an jî li derve hêza wî têrê neke ji bo li ber rêveberiyê rabe, hingê ya herî aqilane ew e, serî li hêza partiyê bide. Dîn, mezheb û terîqetên di dînan de dema derketina xwe ya holê bi rola partiyê rabûne. Ji aliyê îdeolojîk, polîtîk û exlaqî ve xwe bi çi nasnameyê bi nav dikin bila bikin di encamê de partî ne. Di dema modern de ev rêûresmên dîrokî ber bi şêweyên nû ve beridîne, gav bi gav ber bi şêweyê partiyên roja me ya îro ve reng girtine.

Partî ji bo beşên civakî yên xwe disipêrin wan û wan dikin hedef bi rolên girîng radibin; ango divê bikin ku ew beş xuya bikin, wan beşan temsîl bikin, wan bikin xwedî maf û di çarçoveya pîvanên hemdem de wan bi gewde bikin. Ev rastî hemû îspat dikin ku rastiya partiyê ji rola xwe ya di civakê de bi hêsanî nagere. Civakeke bixwaze bi pêş bikeve û xwe biparêze nikare bi hêsanî doza bêpartîbûnê bike. Ev jî nayê wê maneyê ku partî wê ti carî bêkêr nebin. Ji ber ku kengî civakek bi pêş ket, hemû karên xwe bi endamên xwe meşandin, maneya partiyê jî namîne. Rewşeke berevajî vê jî rast e: ango civakek di rewşa klanên destpêkê û qebîleyên ezbetan de be, pêdiviya wê bi partîbûnê tineye. Jixwe tevahiya klan an jî qebîleyê weke partiyekê ye. Ji bo partî pêk bên, divê di civakê de çînên dijber û berjewendiyên wan hebin. Çiqasî çîn û cudabûn ji holê rabin û berjewendî hevpar bibin, avakirina partiyên cuda maneya xwe namîne. Carinan jî ji bo heman fonksiyona civakî ji partiyekê zêdetir partî têne avakirin. Partiyên bi vî rengî jî li hemberî partiyeke gotin û gavên wê hevgirtî û kêrhatî bivênevê tesfiye dibin. Rewşên em qala wan dikin, îspat dikin ka çima em nikarin dev ji partiyên civakî berdin. Hebûna dewletê bi xwe jî pêdiviya bi partîbûnê bi temamî ji holê ranake.

PKK hê di dema derketina xwe ya holê de rastî eleqeyeke mezin hat. Ji ber ku di civaka Kurd de valatiyeke mezin dagirtibû û bersiva pêdiviyeke mezin a heyatî dabû. Çiqasî gotin û gavên PKK'ê hevdu girtin, di civakê de jî ewqasî hat qebûlkirin. Tevî kêmasiyên xwe hemûyan û heta tevî zirarên dan jî di civakê de ji rûmeta wê tiştek kêm nebû û civakê dev jê berneda, ji ber ku bersiveke dîrokî-civakî dida û bi vê rolê radibû. Eger PKK di dema nû de bersiva dîrokî bide û bi awayekî rast xwedî li erkên rojane derkeve, wê karibe di dema nû de bi rola xwe rabe. Eger nasnameya Kurd bê naskirin û îradeya jiyana azad derkeve holê, ev nayê wê maneyê ku

pirsgirêka civakî bi temamî hatiye çareserkirin; bi tenê tê wê maneyê qonaxeke girîng li pey xwe hiştiye. Yek ji pirsgirêkên divê pêşî bê çareserkirin ew e, xwesteka ji bo nasname û azadiyê bi garantiyên têkûz ê bê misogerkirin û bê domdarkirin. Xwesteka jiyana azad û nasnameya Kurd a ti garaniya xwe ya qanûnî, ekonomîk, polîtîk û ewlekariyê tine, ji aliyê dijminên xwe ve dikare her kêlî bê tepisandin û li tevkujiyan rast bê. Ji ber van sedeman, divê PKK ji niha û pêve rola xwe ya pozitîf bi awayekî serketî pêk bîne. PKK'ê heta niha wezîfeyên negatîf, ango bi pêşîgirtina li neyêniyan xwest di wezîfeyên xwe de serketî be. Ji niha û pêve, divê wezîfeyên xwe yên avakirinê ku bêhtir aliyên wan ên pozîtîf li pêş in, bi awayekî serketî pêk bîne. Di bingehê van wezîfeyan de avakirina neteweya demokratîk heye û eger PKK nasname û maneya wê ya hat diyarkirin bi dest bixe wê karibe van erk û wezîfeyan bi awayekî serketî bi cih bîne. Naxwe bi PKK'bûyîneke din nikare di van wezîfeyan de bi ser bikeve.

Avakirina neteweya demokratîk pêştirî avakirina sosyalîzmê ye, û pêşiyê li riya diçe sosyalîzmê vedike. Li gorî zanista civakî, ev avakirin bi şoreşê dibe, ji bo vê jî divê wezîfeyên exlaqî û polîtîk bêne bicihanîn. Tevî dorgirtinên moderniteya kapîtalîst hemûyan, pêşengiya PKK'ê di vê çarçoveyê de li wezîfeyên xwe xwedî derkeve dikare bi ser bikeve. Di vê rewşê de şert e ku kadro xwe perwerde bikin û felsefeya jiyana azad bikin şêwazê xwe yê jiyanê. Partî bi tevahî li dijî her cure êrîşên ji derve û hundir bi tenê dikare xwe bi nasnameya îdeolojîk û polîtîk biparêze; bibe xwedî hêza pêngavê û bi civakê re bi yek be. Kadroyên partiyê divê bi temamî di warê îdeolojîk û polîtîk de têra xwe hebin, nexasim divê di her şert û mercî de xwedî wê hêzê bin ku girêdana xwe ya bi exlaqê jiyana azad re nîşan bidin. Di çanda Rojhilata Navîn de 'insanê kamil' heye ango ew ferdê têra xwe dike, divê kadroyê partiyê jî bibe xwediyê wê hêzê ku karibe bibe 'insanê kamil' û vê aktualîze bike û pêk bîne. Divê xwediyê wê hêzê be ku karibe li ber tevahiya şêwazên jiyanê û îdeolojiyên desthilatgir, mîlliyetgir, cinsiyetparêz, dîndar, lîberal korker û ji heqîqetê dûr dixin rabe û wan pûç bike. Di tevahiya serdeman de hewcedarî bi insanên kamil hebû û herî zêde jî roja me ya îro pêdivî bi wan heye û kengî mirov bibe kadroyê modern ê sosyalîst ev pêkan e. Bi tenê bi van kadroyan mirov dikare xwe li pêvajoya avakirina jiyana neteweya demokratîk rakişîne. Dema hewce bike, divê her kadro karibe xwe veguherîne bi sedan rêxistinên neteweya demokratîk û bi vî awayî di wezîfeya xwe de bi ser bikeve. Naxwe kadroyek û rêxistina wî di bin bandora şêwazên jiyanê û îdeolojiyên navbihurî de bi tenê dibe çavkaniya pirsgirêkan. Her kadroya/ê pêşeng a/ê di warê îdeolojîk, polîtîk, exlaqî û rêxistinî de têra xwe bike, serketina wê/wî ya di avakirina neteweya demokratîk de misoger dibe.

Divê mirov li têkiliyên hevaltî û hevrêtiyê baş serwext bibe. Têkiliyên hogirî û hevrêtiyê naveroka têkiliyên civakî nîşan didin an jî divê nîşan bidin. Çiqasî civaka dîrokî nîşan didin divê ewqasî civaka siberojê jî nîşan bidin. Bi awayekî bingehîn têkiliyên îdeolojîk in; têkiliyên heqîqetê ne ku îdeolojî wan derdixe holê û rê li wan vedike da ku darî çav bibin. Di vê çarçoveyê de yekîtiya du heval û hevriyan bi tenê yekîtiyeke îdeolojîk nîne, di heman demê de yekîtiyeke

heqîqetê ye ku kapasîteya îdeolojîk rê li ber vekiriye yan jî divê bi vî rengî pêk bê. Eger du hevalan bi rastî xwe gihandibin sirr û raza hevrêtiyê û bûbin yek, divê mirov vê weke temsîla bihêz a heqîqetê fêhm bike. Mirov bibe hevriyê hevriyan tê wê maneyê ku mirov ji heqîqeta tê temsîlkirin para xwe digire. Ji bilî vê, divê mirov badilhewa li maneyeke hevaltî û hevrêtiyê negere. Yên ku derdekî wan ê mezin ji bo heqîqetê tinebe divê nekevin vê 'riyê'. Yên li pey hewes, xerîze û berjewendiyên besît nikarin bibin heval û hevrê. Bi van kesan re hevrêtî nabe. Kesên bi awayekî çavkorî bawer dikin, kesên bi hisên fanatîk aqlê xwe berdayî, bi wan re jî hevrêtî nabe. Tew kesên ji îdeolojiya zilam û pîrektiyê nebihurî, kesên nikarîne têkiliya besît a nêr û mêtiyê bişikînin û cîhana xwe ya zêhniyetê azad bikin divê behsa hevrêtiyê nekin û badilhewa nekevin vê riyê. Têkiliya hevrêtiyê divê ji peran, mal, milk, zilamtî-pîrektî, hewesa alavan, çûyîna li pey nefsa xwe, rabûna bi hesreta desthilatdariyê, wêrekiya çavkorî an jî tirsîn û her cure gotin, çalakî û têkiliyên mirovî ji rêwîtiya heqîqetê bigirin û nehêlin xwe bigihîne nasnameya wê ya temsîlê, divê dûr bisekine. Divê bi awayekî serketî li ber tehlûkeyên bi vî rengî bisekine. Di heman demê de divê xwe bi wê hêza îdeolojîk, polîtîk, exlaqî û rêxistinî gurçûpêç kiribe ku karibe di her şert û mercî de heqîqetên mezin bîne ziman û pêk bîne. Eger partiya behsa yekîtî û yekbûna wê tê kirin di vê çarçoveyê de têkiliyên hevrêtiyê pêk bîne, pêkan e. Bi vî awayî, dikare bibe îrade û berdevkê civaka dîrokî û paşeroja wê. PKK jî bi tenê bi van pîvanên têkiliya hevrêtiyê dikare bi rola xwe ya dîrokî û civakî rabe.

PKK bi awayekî berbiçav û bi awayekî aktuel bi du pirsgirêkên bi qasî çiyan mezin rûbirû ye. Bêguman em behsa pirsgirêka şer an aştiyê dikin ku têkiliyeke xurt a diyalektîkî di navbera wan de heye. Neteweya demokratîk mafek e, û di çareserkirina aştiyane ya pirsgirêka Kurd de weke xwestek formula herî zêde nêzî çareseriyê û ya di asta herî jêr de ye. Lê statuya qirkirinê ya li ser Kurd û Kurdistanê, xwe bi ti awayî naxweza nêzî formula çareseriya demokratîk aştiyane ya di nava yekparebûna dewleta netewe de bike. Ji ya xwe nayê xwarê û israr dike ku xwediyê hêz û mafê îmha û înkarê ye. Yekdestdariyên mêtinkariyê û hêzên dewleta netewe yên Kurd û Kurdistan di nava xwe de parve kirine tevî ajan û hevkarên bi koka xwe Kurd, dixwazin siyaseta qirkirinê bi xapên weke 'mafên ferdî' bixemilînin, bi maske bikin û dîsa dewam bikin. Vê weke mafê xwe yê çînî û neteweyî yê dev jê nayê berdan dihesibînin. Di nava yekparebûna dewleta netewe de be jî ev helwest derfetê nade çareseriya aştiyane û demokratîk. Eger çareseriya aştiyane û demokratîk nebe, ev tê wê maneyê ku rêbazên berevajiyê vê wê bêne meşandin ango ji hemû aliyan ve; şerê qirkirinê bi rêbazên eskerî, siyasî, civakî, çandî, ekonomîk, dîplomatîk û psîkolojîk ve bi awayekî yekpare wê bê meşandin. Jixwe ya li ser kar jî ev şerê qirkirina Kurdan e ku beşekî mezin bi dizî û sergirtî tê meşandin. Ev şerê qirkirinê ji sedsalî zêdetir bi awayekî yekalî û bi gelek hevgirtiyan tê meşandin û armanca wî ew e, Kurdan ji dîrokê bibe, koka wan biqelîne û bike civakeke ji azadiyê bêpar.

Bi dersên ji şerê sîh salên dawî bêne girtin, mirov karîbû çareseriyeke demokratîk û aştiyeke manedar pêk bianiya. Bêyî ku mirov hewcedarî bi dewletdariya netewe ya Kurd bibîne, heta bêyî ku mirov dewletên netewe yên serdest veguherîne şêweyên federasyonan çareseriya herî serketî ya pêkan bû, mafê bûyîna neteweya demokratîk bû. Li ser vî bingehî, di encama diyalogên bi dewletê re Rêbertiyê **'Nexşeya Rê'** ya ji 160 rûpelan amade kir, wê têra xwe pîvanên aştî û çareseriya hewce îfade dikirin. Lê beşên nava dewletê yên bandora rêûresma qirkirinê gelekî li ser wan û olîgarşiya polîtîk (amûra propagandayê ya dewletê) dikin nakin nikarin di warê çareseriya demokratîk û aştiyane de biryarê bidin. Tevî ku KCK'ê gelek caran agirbestên yekalî ceribandin jî bersiva li bendê ma negirt. Rewşeke wisa heye ku mirov mîna li ser êgir be, li ser sêleke sincirî be. Eşkere ye ku wê ev rewş zêde dom neke. Yan herdu alî wê bikevin nava pêvajoyeke lihevkirinê ya têde li ser pîvanên sereke yên çareseriyeke aştiyane û demokratîk a bi awayekî mayînde, bi rûmet û manedar li hev bikin, yan jî di ser pêvajoya şerê sîh salan re qonaxeke şer a dijwar û dawî wê pêk bê. Divê PKK ji her alî ve li ser herdu pêvajoyan hûrûkûr bifikire. Ji bo çareseriyeke demokratîk û aştiyeke bi rûmet qabîliyeteke mezin a entelektuel û polîtîk divê. Çareseriya aştiyane û demokratîk a behsa wê tê kirin divê bi tevahiya gel re bê parvekirin. Ne bi tenê ji bo serwextbûna li wê, divê gel di çarçoveya wê de bê perwerdekirin, bê birêxistinkirin û bê çalakkirin; lewma divê bi hezaran civînên guftûgo û biryarê, bi hezaran rêxistinî û çalakî bêne kirin. Ji ber ku çareseriya aştiyane û demokratîk a em behsa wê dikin, wê ji tevahiya mirovatiyê û gelên herêmê re bibe mînakeke aştiyê ya dîrokî û şêwazekî çareseriya siyasî ya demokratîk.

Ji van herdu pirsgirêkên bi qasî çiyan mezin, îhtîmala pêkhatina şer bêhtir xuya dike. Lewma divê mirov serê xwe li ser pirsgirêkên şer biêşîne. Em dema li tecrûbeyên sîh salên şerê rabihurî dinêrin, em dibînin pirr bi amatorî, heta bi gelek provokatorî, bi kêm şêwazê gerîllatiyê, bi şêwazekî nîv-serîrakirin û nîv-gerîllatiyê hatiye meşandin. Di dema pêş de şêwazê şer bi vî awayî nabe. Beriya her tiştî gel êdî gelê berê nîne; şer wê di asta şerê rastî yê gel de bimeşe. Piştî ezmûn û tecrûbeya sîh salan, divê pêşengtiya şer ango HPG erkdar be ku xwe bi tevahî li gorî şerekî bajar û çiyan amade bike, bi şev û roj, hem zivistanê û hem havînê, li gund û li bajêr, li deşt û li çiyê, bi deh hezaran mirovî di heman pêlê de li her qadê ji bo şerê muhtemel e biqewime, bixe nava tevgerê, bimeşîne û kontrol bike. Herçiqasî ev şerê di çarçoveya KCK'ê de bê meşandin jî PKK di dema şerê nû de divê ji aliyê îdeolojîk, polîtîk, exlaqî û biryarê ve berpirsiyariyê parve bike. Divê weke berê şerê partîzaniyê, nîv-serîrakirin nîv-gerîllatî û heta şerên bi awayê asî-awareyan dubare nebin, dubare bibin jî wê neyê qebûlkirin û pêwîst e ku li gorî vê xwe bikin xwedî qabîliyet. Qonaxa nû ya şer, çiqasî dijwar dibe bila bibe, bi tevahî pirsgirêkên derkevin holê divê bi biryardarî û hostetiyeke exlaqî, polîtîk û îdeolojîk ji her alî ve û di dema xwe de bersiva wan bê dayîn. Bi qasî ku mirov tevahiya şert û mercên derve û hundir binirxîne, divê mirov xwe li aliyên şer pêde biçe hemûyan di dema xwe de rabigire û bi berpirsiyariya ku wê bi kêra xwe bîne, tevbigere. Li aliyê PKK'ê nabe ku mirov weke berê bêhn

fireh be, li nekarîn û jiheqderneketinên wan qebûl bike. Bi qasî hesabdanê hesabpirsîn jî wê dijwar bibe. Weke berê kes wê nikaribe ji berpirsiyariyê bireve yan jî kes wê nikaribe pişta xwe bide pratîkên tesfiyekar û xwe rizgar bike û bifilite. Rastiya partî û gel a heyî wê derfet û îmkanê nede vê yekê. Jixwe aqûbeta hêmanên revok û tesfiyekarên berê nediyar e, yan jî xweş nîne. Dewlet jî bi rastiyên xwe yên rabihurî re rûbirû dibin û hewl didin xwe pak bikin, lê rewşa hêmanên îtîrafkar, hevkar û tesfiyekar encama xwe ya xeternak eşkere nîşan dide.

Ji niha û pêve her tişt wê yan bi aştiyeke bi rûmet û çareseriyeke demokratîk, yan jî bi şerekî dawî yê topyekûn ve girêdayî manedar bibe û nirxa xwe ya jiyanê çêbibe. Jê wêde her tiştwê di bin piyan de biçe. Demên dîrokî, bi biryar û çalakiyên dîrokî derbas dibin. Jê pêve li ber bayê xeyal û derewan diçe. Yên weke ferd, rêxistin û gel, weke dewlet û partî xwe ji demên bi vî rengî re amade nekiribin, yên amade kiribin û nikaribin bersivê bidin, bivênevê cihê wan sergo û çopa dîrokê ye. Eger PKK bi dersên ji tecrûbeyên rabihurî derxe aktualîteyê ji her aliyî ve binirxîne û amadekariyên xwe têra xwe bike û bi heman biryardarî û wêrekiyê bi ser pratîkê de biçe dikare ji heqê van herdu wezîfeyên dîrokê bê. Ji pêvajoyê mirov li benda serketinên mezin an jî têkçûnê be, realîst nîne. Ji sedî sed encam wê li gorî aştiyeke bi rûmet û çareseriyeke neteweyî ya demokratîk a bêhtir zelalbûyî be. Ji vê û pêve, her tişt wê di gerîneka qirkirinê de wenda bibe ku rewşa mirovatiya heyî wê derfet û îmkanê nede vê.

Tevahiya şert û mercan bûyerên muhtemel ên pêvajoya li pêşiya me bi qasî şoreşên mezin ên Rûs û Fransî yên di dîrokê de qewimîn girîng dikin. Çi bi şer pêk bê, çi jî bi aştiyê pêk bê, gelê Kurd ne bi tenê ji bo xwe çareseriya pirsgirêka neteweyî demokratîk pêk tîne, gavekê diavêje ji bo tevahiya herêma Rojhilata Navîn û mirovatiyê maneyeke xwe ya mezin heye. Bi vê gavavêtinê li dewletên netewe yên modernîteya kapîtalîst yeke nû zêde nabe, tevlî statuya kapîtalîst a ji zû ve hatiye amadekirin nabe, beşdarî yekdestdarî û cîhana pîşesazan nabe; rohniya şaristanî û modernîteya nû dide. Gavavêtina vê modernîteyê ku mirov dikare wê weke modernîteya demokratîk jî bi nav bike, ji çanda Rojhilata Navîn re ku di yek ji demên xwe yên herî kaotîk de ye, dikare riya çareseriya hewce nîşan bide. Ev nirxa rola xwe ya çareserker hê ji niha ve, nexasim bi Iraqê (Ûrûk) îspat kiriye. Ev pêvajoya pêk tê ku bi awayekî mirov dikare jêre 'Şerê Cîhanê Yê Sêyemîn' bibêje, mîna di dema şeveqavêtina dîroka şaristaniyê de rola Proto Kurd li qûntara Zagros-Toros pê rabûn bi awayekî heman rengî dide ber PKK'ê û ji bo bi vê rolê rabe wê dike namzet. Lê vê carê, li ser xeta civakeke bê çîn, bê dewlet, bajarên ekolojîk, ekonomiya karê nake armanc û demokratîk ji PKK'ê tê xwestin li gorî şaristaniya nû û modernîteya demokratîk bibe namzetê vê rolê. PKK'ê ji serî ve xwe li gorî vê rola dîrokî da naskirin. Herçiqasî gelek kêmasî û şaşiyên wê hebin jî sîh salên wê yên dijwar îspat kirin ku dikare bi vê rolê rabe. Gelê Kurdistanê yê PKK bang lê dikê, bersiva erênî daye. Kurdistan êdî di wê bêdengiya mirin û goristanê de nîne. Pêvajoya li pêşiya me çi bi şer û çi jî bi aştiyê bi ser bikeve, di encamê de wê bibe serdema avabûna neteweyên demokratîk. Bi vî awayî di çanda

şaristaniya Rojhilata Navîn de bi hezaran sal in, dekûdolabên şaristaniya çînî, bajarî û dewletdarî yên ku her dever kirin gola xwînê, qebîle, dîn, mezheb û netewe bera qirika hevdu dan, li ser bingehê yekparebûna neteweya demokratîk wê serdema modernîteya demokratîk hilê.

**B- KCK û ÇARESERIYA NETEWEYA DEMOKRATÎK**

Mirov dikare bibêje, têkoşîna PKK'ê ya heta niha, bi awayekî bingehîn ji bo pirsgirêka Kurd bê dîtin, hatiye meşandin. Ji ber ku di şert û mercên derketina holê de realîteya Kurd dihat înkarkirin, bi awayekî xwezayî pirsgirêka hebûnê diket rojevê. PKK jî serê pêşî bi argumanên îdeolojîk hewl da hebûna pirsgirêkê îspat bike. Ji ber ku Çepgirên Tirk realîst nêzî pirsgirêkê nebûn, pêdiviya bi rêxistinî û fikrên di çarçoveya welat û netewe de derketin holê. Bi pêvajoyê ve girêdayî nav li PKK'ê hat kirin. Ji ber ku înkarkirin bi rêbazên hûrûkûr ji aliyê çepgiran ve jî dihat meşandin, li ser bingehên nasnameyên cuda rêxistinî û çalakbûyîn ket rojevê. Bi sedema ku polîtîkaya îmha û înkarê ya ji rêûresmê ya dewleta netewe ya Tirk di vê pêvajoyê de derfet neda ti lêgerîna çareseriyeke polîtîk, berevajî, kengî ev lêgerîn li terora faşîst a darbeya 12'ê Îlonê rast hat, pêngava şerê gel ê şoreşgerî yê PKK'ê weke riya bi tenê ket rojevê. Di vê rewşê de PKK yan wê weke komên çepgir ên demokratîk li Tirkiyê tesfiye bibûya yan jî wê ji bo berxwedanê biryar bidaya. Pirsgirêka Kurd êdî ne pirsgirêka nasnameya îdeolojîk bû, veguherî pirsgirêka şer, di vê de jî pareke diyarker a polîtîkayên îmha û înkarê yên faşîzma 12'ê Îlonê hewl da bi teroreke eşkere bimeşîne, heye. Mirov Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an di vê çarçoveyê de binirxîne wê bêhtir realîst be. Pêngav ji tevgera rizgariyê wêdetir nêzî armanca îspatkirina hebûnê û dewamkirina wê ye.

Polîtîkaya îmha û înkarê, ne bi tenê bi awayekî bi dizî û sergirtî dihat meşandin. Pêkanînên heştê salî yên van polîtîkayan dikir ku Kurd xwe nas nekin, li hemberî xwe gelekî xerîb bikevin. Kurd neçar kiribûn ku dev ji hebûna xwe berdin. Bi amûrên zorê û ekonomiyê kiribûn ku Kurd dev ji xwe berdin û bi giranî jî ev qebûl kiribûn. Li naverastê rastiya civak û gelekî xwenenas, li hemberî xwe xerîbketî hebû. Pêngava 15'ê Tebaxê bi awayekî bingehîn ev xwenenasî û xerîbxistin şikand û bi vî awayî polîtîkayên îmha û înkarê û encamên wê pûç kirin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, pêngav bi giranî bi ser ketiye. Ango Kurdîtî ji nû ve dipişkive, derdikeve rûyê erdê, dibe diyarde û realîteyek ku ji aliyê Kurdan bi xwe ve tê qebûlkirin. Ya rastî, li qatê dewletan jî hatin qebûlkirin. Bêguman qebûlkirina pirsgirêkê nedihat wê maneyê ku pirsgirêk çareser dibe. Ji ber ku niyeta çareseriyê derneket holê, rewşa pevçûn û şerê bi sînor bi awayekî dewrûbera xwe birizîne dewam kir. Herdu alî jî di wê pozîsyonê de nebûn ku pirsgirêkê bi zora eskerî çareser bikin. Herçiqasî car caran ev şens bi destê wan ket jî di wê qabîliyetê de nebûn ku pêk bînin. Kengî şensê çareseriyê di sala 1993'an de hat sabotekirin, pêvajoya şer bêhtir bi awayekî bêrehm û dewrûbera xwe birizîne dewam kir. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, dema 1993-1998'an ji bo aliyan di warê çareseriya eskerî de pêvajoyeke têkçûyî û pûçkirî

îfade dike. Eger lêgerîna polîtîk a di sala 1993'an de bi komplo û reşkujiyan nehatibûya têkbirin, hem di çareseriya pirsgirêka Kurd de, hem jî di warê avakirina Komara Tirkiyê de mumkin bû ku pêvajoyeke bêhtir pozitîf dest pê bikira. Firsendeke dîrokî bû ji dest çûbû yan jî kiribûn ku biçe. Heman tişt bi serê lêgerînên çareseriyê yên 1997-98'an jî hat an jî anîn. Heman hêzên reşkuj û komplogeran firsend neda çareseriya siyasî. Pêvajoya Îmraliyê pêvajoyeke bi nakok derxist holê. Di şexsê A. Ocalan de alîgirên çareseriyê û dijberên wê pirr dijwar xwe li hev rakişandin.

Pevçûna aliyan, pêşî di binyeya hundir a herdu aliyan de dewam kir. Lê kengî PKK'ê ji 2005'an û pêve li ser bingehê KCK'ê xwe weke hêzeke çareserker zelal û pêşkêş kir, Komara Tirkiyê jî pevçûn û guftûgoya di nava xwe de bi lez kir. Ev pevçûn û guftûgo di çareserkirina pirsgirêka Kurd de bi rola kilîtê radibûn. A. Ocalan li hemberî PKK û Komara Tirkiyê helwesta xwe li aliyê çareseriya KCK'ê danî. Di vê rewşê de tam li hev nekiribin jî pêvajoya diyalogê bi saziyên dewletê re ji nû ve dest pê kir. Di diyalogê de para AKP'ê pirr tinebû. Ev bi awayekî însiyatîfa dewletê bû. AKP'ê di 4'ê Gulana 2007'an de li Dolmabaxçeyê bi Serokatiya Fermandariya Giştî re bi dizî li hev kir, paşê di 5'ê Mijdara 2007'an de bi DYE'yê re li hev kir û vê yekê rewş tevlîhevtir kir. Hukûmeta AKP'ê di çarçoveya tesfiyekirina PKK'ê de dest bi gera li çareseriyê kir. Di berdêla hinek mafên formalîte û şiklî de (Kursên Kurdî û pirr bi sînor serbestkirina weşanê) ji derve destek hat wergirtin û bi vî awayî şer ket qonaxeke nû. Serokwezîr R. Tayyîp Erdogan sala 2005'an di axaftina xwe ya li Amedê de gaveke girîng a taktîkî avêt û soz da wê pirsgirêka Kurd çareser bike. Bi van sozên dayî armanca wî tecrîdkirina PKK'ê û destek wergirtina ji bo AKP'ê bû. Lewma jî wê demê niyeta wan dayîna mafên ferdî bû. Pîlanekî nû yê tesfiyeyê bi navê 'pêşîlêvekirina demokratîk' dixistin piyaseyê. Li ser gelekî xebitîbûn, bi DYE, YE û welatên cîran re, herweha di nava xwe de bi partiyên din ên dewletê re bi gelek saziyên çapemeniyê û rêxistinên civaka sivîl re bi rêxistin kiribûn û desteka hevkarên Kurd jî girtibûn. Wekî din, ji berê qatbiqat zêdetir di pratîkê de pêngaveke çalakî û seferberiyê ya topyekûn di bereya eskerî, siyasî, ekonomîk, çandî, psîkolojîk û dîplomatîk de tevî pîlanî xistin dewreyê. Hêzên mîlîs ên nû ne Ulkucî û Hîzbûllaha berê bûn, di bin rêveberiya Hukûmeta AKP'ê bi xwe de hêzên parçe parçe pêk anîn û ya pêk hatî bi awayekî 'Hamasa Kurd' bi xwe bû. Ev pîlan û pêngav bû ku di destpêkê de hin fermandarên di nava artêşê de û CHP'ya Deniz Baykal destek danê û li ser li hev kirin. Herçiqasî di nava dewletê de hinek sazî bi awayekî xurt li ber vê rabûn jî texsîr nekirin û ev pîlan meşandin. Operasyonên KCK'ê parçeyekî girîng ê vî pîlan û pêkanînê ne. Êrîşên hewayî û operasyonên bi destûr ên li dijî Başûrê Kurdistanê jî di çarçoveya heman pîlanî de ne.

Divê mirov bi girîngî bibêje, li pişt pîlan û pêkanînan pareke girîng a têkilî û helwestên tesfiyekaran di sala 2002-2004'an de heye. Ya rastî, AKP û hevkarên wê, ji pîlan û pêkanînan li benda serketineke temam bûn. Pirr aliyên pîlanê hebûn û gelekî tevlîhev bû, li gorî wan vê carê pêkan bû ku bi serketinê bi encam bibe. Bi rastî li pêşiya vî pîlanê pirr tevlîhev û gelekî bi xasûkî hatibû hûnandin, PKK weke astengê bi tenê xuya dikir. Lewma jî pêngavê bi tevahiya aliyên xwe

tecrîdkirin û bêsîlehkirina PKK’ê ji xwe re kire armanc. Di vê çarçoveyê de tevahiya hêzan hatin bikaranîn. Hema bêje hêz nema ku di vê de nehatibe bikaranîn û çawa ku kum bikeve serê keçel xuya bike, her kes deşîfre bû. Lê ji ber ku PKK’ê xwe hem li ser hîmê çareseriya neteweya demokratîk weke KCK’ê pêşkêş û pratîze kir, hem jî bi giranî xwe ji kêmasî û sabitfikriyên xwe şuşt, tesfiyekirina wê pêkan nedibû. Weke berê ne pêkan bû derban jî bixwe. Tevî ku tevgera veguherîn û sererastkirinê hê nû bû, gelekî pêşde çûbû û bi pêş ketibû. Ev pîlanê ku AKP’ê belkî jî cara pêşî bi beşekî girîng ê artêşê re hewl da pêk bîne, ji destpêkê ve diyar bû ku wê neçe serî û pûç bibe. Lê AKP ji bo li desthilatdariyê baş rûnê, yekser nebe jî bi desteka artêşê texsîr nekir ku vî pîlanî bi kar bîne. AKP’ê ev çiqasî ceriband û pozîsyona xwe ya li desthilatdariyê bi hêz kir, tevî ku ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd ti amadekariyeke wê ya ciddî û durist bi awayekî teorîk û pratîk tinebû û herweha ti hewldan û baweriya wê tinebû jî, mîna dinyanedîtî û çilekekî çavbirçî gotinên ‘pêşîlêvekirina demokratîk’ fena benîştekî her di devê xwe de cût. Hesabekî karê yê navend desthilatdarî û bi tevahî ji wê roja têde mewzûbehs bû. Di vê çarçoveyê de pirsgirêka Kurd bêhtir tevlîhev bû. Eger li hemberî xwe şensê çareseriyeke aştiyane û demokratîk a manedar û bi rûmet nebîne, vê carê wê bikeve qonaxeke nû. Di vê qonaxê de ‘ji bo hebûna xwe biparêze û bi hêza xwe azadiya xwe pêk bîne’ wê gavê biavêje jiyaneke azad û berxwedaneke topyekûn.

Dema ku PKK di serê salên 1970’î de ket ser rê, erka li pêşiya wê ew bû, hebûna Kurd ji rewşa hebûneke ku li ser hebûn û tinebûna wê guftûgo tê kirin, derxe û pirsgirêka Kurd bi têgihiştina dewleteke sosyalîst a reel çareser bike. Êdî guftûgo li ser hebûna Kurd nayê kirin, lê bi awayekî di dewletdariya netewe de bist bû û ma. Di pêvajoya xwerexnekirinê de derket holê ku dewletdariya netewe antî-sosyalîst e, û antî-demokratîkbûn bi xwe ye. PKK’ê bi awayekî pirr zelal dît ku bêyî civaka demokratîk sosyalîzm nayê avakirin, û lewma çareseriya pirsgirêka Kurd bi avakirina neteweya demokratîk dibîne. Niha aliyê ku pirs çûye ser ew e, divê xwe bi siyaseta qanûnî ya demokratîk an jî bi şerê gel ê şoreşgerî yê topyekûn bigihîne vê armancê.

**1- Di Komara Tirkiyê De Destguhertina Desthilatdariya Hegemonîk**

Piştî Şerê Rizgariya Neteweyî yê ku Kurd û Tirkan di serê salên 1920’an de li Anatolyayê meşand, firsend çêbû li ser xirbeyên dewleta Osmanî di çarçoveya Mîsaq-î Mîllî de komareke demokratîk bê avakirin. Di sala 1919’an de tevî Tamîma Amasyayê di Kongreyên Erzirom û Sêwazê de jî gavên ber bi vî alî ve hatin avêtin. Li Meclîsa Mezin a Milletê Tirkiyê ku sala 1920’an hat vekirin di Destûra wê ya pêşî de (1921) naveroka demokratîk a rejîma bê avakirin eşkere xuya dikir. Qanûna Xweseriya Kurd di 10’ê Adara 1922’an de bi pirraniya Meclîsa Mezin a Milletê Tirkiyê hat qebûlkirin. Mistefa Kemal di serê sala 1924’an de li Konferansa Çapemeniyê ya Îzmîtê ji bo Kurdan weke modela çareseriyê ya xwe nasipêre sînoran behsa ‘muxtariyet’a herî berfireh dikir ango behsa xweseriya demokratîk dikir. Li ser Kurdistana Iraqê ya îro ku di çarçoveya Mîsaq-î

Mîllî de bû, bi Ingilîzan re li hev kirin, û bi vî awayî gav avêtin pêvajoya komploya herî bi tehlûke. Ingilîzan dualîteya ‘yan Komar an jî Mûsil-Kerkûk’ li ser serokatiya M. Kemal ferz kirin û di bingehê vê komployê de ev hewldana polîtîk a bingehîn bû. Di encamê de, Mûsil û Kerkûk ji Ingilîzan re hiştin û di berdêla vê de ya para Komara Tirkiyê ket; îmha û înkara Kurdistanê bû. Ev dualîteyê bi lez Komar kir kirasê dîktatoriya tek partiyê. Bi komploya li dijî rêbertiya Şêx Seîd a 15’ê Sibata 1925’an kindira di stûyê Kurdan de kişandin. Di babetên berî vê de em dûrûdirêj li ser vê mijarê sekinîbûn, lewma eger em vê mijarê bi tezên sereke binirxînin em ê weha bibêjin:

**a-** Di desthilatdariya Duyemîn Meşrûtiyeta Îttîhad û Teraqî de sermayedar û kadroyên Cihû destek dan Jon Tirkan ango bûrjûwaziya ciwan a Tirk û bi Komarê re pêşketina wan bi lez bû. Di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de hevgirtiyên xwe komînîst, ummetgir û Kurd bi tenê li derveyî desthilatdariyê nehiştin, ew kirin yên din. Bi tenê kadro û sermayedarên Cihû yên Siyonîst ên bi desteka Ingilistanê kirin hevgirtiyên xwe. Bi awayekî bingehîn yekdestdariya ekonomîk û desthilatdariyê di navbera van herdu hêzan de hat parvekirin. Ji aliyê Cihûyan ve, vê sîstemê Proto-Îsraîl îfade dikir. Desteka Ingilîz a ji bo rejîmê jî di vê çarçoveyê de ye. Sembola Mistefa Kemal ji hevgirtiyên xwe yê rastî hat qutkirin, bi reşkujî û komployên cûrbicûr hat bêtesîrkirin, rengekî xwedayî danê û ew mehkûmî perestgeha nû ya li Çankayayê kirin. Firqeya Cumhûriyeta Teraqîperwer (1925) û Firqeya Serbest (1930) ku ji aliyê kadroyên damezîner ên Komarê ve hatibûn avakirin hatin tesfiyekirin û rejîma Tirkê Spî ya pro-faşîst a bi tek partiyê misoger kirin. Bi vî awayî şensê avakirina komareke demokratîk ji holê rakirin.

**b-** Kurdên ev rejîm hem li dijî dema Osmanî hem jî li dijî Şerê Rizgariya Neteweyî yê rê li ber avabûna Komarê vekir xiyanet hesibandin, xwe bi komploya 15’ê Sibata 1925’an re rûbirû dîtin. Dema Kurd di dîrokê de li Tirkan rast hatin, bi sedema berjewendiyên xwe yên stratejîk û hevpar timî statuya jiyaneke hevgirtî ya nêzî hevpartiyê tercîh kirin. Ne ku hatibûn fetihkirin an jî bi darê zorê serî li wan tewandibûn ev jiyan tercîh dikirin, ji ber ku li gorî berjewendiyên xwe di cih de didîtin qebûl dikirin. Şerên Melezgirê (1071), Çaldiranê (1514) û Rîdaniyê (1517) tevî Şerê Rizgariya Neteweyî (1919-1922) bi navber be jî di nav pêncsed salî de li ser heman rastiyên stratejîk bi hevparî hatine kirin û di wan de bi ser ketine. Ev serketin jî vê rastiyê piştrast dike. Tevahiya dîrokê têkiliyên Kurd û Tirkan bi riza dilê wan pêk hatine û bingehên wan ên xurt ên stratejîk, dînî, siyasî, ekonomîk û çandî hene. Kengî bi awayekî yekalî û ji nişkê ve bi komploya Tirkê Spî yê pro-faşîst bi çembera îmha û înkarê dor li Kurdan girtin, neçar Kurd jî ketin rewşekê hebûna xwe biparêzin. Ya rastî, mirov nikare ji vê pêvajoyê re isyan an jî serîrakirin jî bibêje. Êrîşên bi komployên yekalî hatin meşandin armanca wan ew bû; Kurdan ji nasnameya etnîk û neteweyî bikin  ango wan tesfiye bikin, Kurd bêhtir hatin pelixandin û nikarîbûn xwe ji vê rizgar bikin. Ev kampanya îmha û înkarê heta bi salên 1938’an bi awayekî fizîkî hat meşandin û paşê bi giranî bi rêbazên asîmîlasyonîst hat dewamkirin. Kurd weke Kurd li tevahî qadên eskerî, siyasî, ekonomîk, civakî û çandî hatin tinekirin. Navên Kurdî jî hatin qedexekirin. Wer lê hat, li bazaran

jî nikarîbûn bi zimanê xwe bipeyivin. Dewleteke netewe ya homojen, li welatiyekî tek tîp dihat avakirin. Eşkere bû ku vê dewletê modela Prûsyayê ji xwe re kiribû bingeh û dibû prototîpa dewleta faşîst a Elman ku bi destê Hîtler hat avakirin. Ewqasî reh û kokên xwe berdan, tevahiya dîroka Komarê ji çepgiran bigirin heta bi rastgiran, ji Îslamiyan heta bi lîberalan hema bêje fikir, derdor û elîtên siyasî neman ku ji vê modelê bi tesîr nebûn. Kurtûkurmancî mirov dikare ji vê demê re bibêje, Dema Komarê ya Yekemîn. Avakerê wê ango damezrînerê wê CHP'a pro-faşîst a salên 1930'an e. Herçiqasî bi pratîkên cûrbicûr pêk anîn jî ev sîstem heta bi salên 1980'î anîn.

**c-** Darbeya eskerî ya 12'ê Îlona 1980'î bi sedema ku li hundir muxalefeta gelan zêde bû, li derve jî bi sedema guhertina konjonktura li Rojhilata Navîn (Şoreşa Îslamî ya Îranê, dagirkirina Afganistanê ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve), li şûna 'mîlliyetgiriya Tirkê Spî yê laîk' ê Komara Pêşî xwe li avakirina Komara Duyemîn a xwe bisipêre 'mîlliyetgiriya Tirkê Kesk ê Îslam Tirk' rakişand. Di hedefa vê hewldanê de bi awayekî bingehîn muxalifên Tirk ên demokratîk û sosyalîst û muxalifên Kurd ên neteweparêz hebûn. Ummetgir, ya rastî Evangelîstên Îslamgir (Îslama Mûsewî terîqeta nûxwaziyê) ji xwe re weke zemînê îdeolojîk hilbijart. Ya rastî, ji tevgera Nûrciyan heta bi tevahiya Neqşî û Qadiriyan terîqetan xwe bi lez di ber çavan re derbas kirin û veguherîn ekola Îslamî-Cihû ya modern ku versiyona Tirkiyê ya Evangelîstên Xiristiyan-Cihû yên li DYE'yê ne. Zemînê rastî yê îdeolojîk ê faşîzma 12'ê Îlonê jî ev ekol e. Bi vî awayî, versiyona Tirkiyê ya hegemonya Reagan-Tahtcher-Kohl hatibû pêkanîn. Di vê sîstema nû de gava pêşî hêzên sosyalîst û demokratîk hatin tesfiyekirin û piştre giraniya xwe dan ser Kurdên bi temamî bi pêşengiya PKK'ê li ber xwe didan. Bi awayekî pêvajoya Komarê ya salên 1925-1938'an dubare dibû. Ango Komara Duyemîn a dema 1984-1998'an, dubareya Komara Yekemîn a dema 1925-1998'an bû. Yên xetimîna sîstemê dîtin û alîgirê çareseriya siyasî bûn hatin tesfiyekirin. Bi tesfiyekirina van kesan re rejîmê xwe baş bi sazî kir. Komara Duyemîn jî bi faşîzmê bi encam bû. Lê vê carê, havênê îdeolojîk ji rengê spî bi ser kesk ve diçû. Ev dihat wê maneyê ku wê ev komar bêhtir muhafezekar be. Bi vê Komara Duyemîn re ya para Kurdan ket dîsa siyaseta îmha û înkarê bû. Di dema 1925-45'an de hêza hegemonîk a global a li pişt polîtîkayên îmha û înkarê bi awayekî bingehîn hêza hegemonîk a sîstema global Ingilistan bû. Li pişt Komara Duyemîn jî hêza hegemonîk dîsa hêza hegemonîk a sîstema global DYE bû. Sîstema hegemonîk ji salên 1920'an ve ya ji bo Kurdan lê fikirî 'statuya weke pirsgirêk bihêle' bû, û vê yekê heta serê salên 2000'î bêyî ku biguhere dewam kir.

**d-** Guherîna Komara Duyemîn a bi darbeya 1980'î dest pê kir, di serê salên 2000'î de bi pêxîrtengiyeke dijwar ji Komara Duyemîn qut bû. Avahiyên îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk û civakî yên ji Komara Yekemîn mayî ji krîzê derbên giran xwarin û lawaz bûn. Yekdestdariyên ekonomîk û îdeolojîk ên Îslamî-Cihû yên Evangelîst ku bi destekdana DYE'yê beriya 1980'î hîmê wan hat danîn, bi AKP'ê dest avêtin desthilatdariya dewletê. Li dijî sazî û zêhniyeta Komara Yekemîn a lawaz bûyî, bi lez zendûbendên xwe badan û binesaziyên îdeolojîk ên Komara Duyemîn ava

kirin. Li pişt diyardeya jêre desthilatdariya AKP'ê tê gotin, Neo-con'ên (muhafezekaran nû yên lîberal) DYE'yê û hevkartiya yekdestdariyên sermayeyê yên navenda wan Konya-Qeyserî Anatolî yên bi lez xurt dibin hene. Bi awayekî li têgihiştina Îslamî ya ji 1923'an ve li derveyî desthilatdariya dewletê hatibû hiştin, ji nû ve deriyên dewletê têne vekirin. Lê deriyên dewletê li sosyalîst, li demokratên radîkal, li Kurdên xwedî nasnameya kolektîf û azadîxwazan hê jî hişk asê kirîne. AKP bi awayekî bi rola CHP di dema Komara Yekemîn de pê rabû, di nava demeke kintir de di Komara Duyemîn de pê rabû. Bêguman mirov dikare di navbera yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê de jî behsa destguhertineke hegemonîk bike. Hemin di navbera herdu hêzên hegemonîk de Benda Çînê tineye. Gelek saziyên îdeolojîk û polîtîk ên Komarê bi hev re parve dikin. Lê dîsa jî di navbera wan de cudahiyên girîng ango nakokî hene. Bi awayê xuya dike, pevçûna di navbera wan de bêhtir di çarçoveya şerîetxwaz û laîsîstan de yan jî bêhtir bi awayê bûye sembol li dora guftûgoyên der barê sergirtina jinê de derbas dibin. Lê ev pevçûn bi xwe ji ber nakokiyên ciddî yên îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk û çandî yên di navbera herdu hêzên hegemonîk de ye. Eger mirov vê nakokiyê bi paşxana wê ya dîrokî ve girê bide, mirov dikare bibêje, nakokiya Osmanî-Komargeran weke nakokiya Osmaniyên Nû û Komargerên Laîk dewam dike. Bêhtir rast e ku mirov AKP'ê weke bi sazîbûna îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk û çandî ya rejîma 12'ê Îlonê binirxîne. CHP'ya Komara Yekemîn çi be, AKP'ya 12'ê Îlonê ya Komara Duyemîn jî ew e. AKP dixwaze desthilatdariya xwe ya hegemonîk bi Destûra Bingehîn (ya rastî, versiyoneke lîberal a Destûra Bingehîn a 12'ê Îlonê ye) tacîdar bike. Armanca bingehîn a hilbijartinên 2011'an ev e.

**e-** Polîtîkayên hegemonya AKP'ê der barê Kurdan de ji yên hegemonya CHP'ê cuda nînin. Eger herdu partî jî weke berê nikaribin polîtîkayên îmha û înkarê bimeşînin, di bingehê vê de têkoşîna PKK'ê ya nayê tepisandin heye. Naxwe bi wan bimîne, di îmhakirin û înkarkirina Kurdan de wê ji CHP'ê kêmtir nemînin. Heta ji hin aliyên din ve, nexasim di warê fanatîkiya îdeolojiya dîndar de (çawa ku di mînaka Hîzbul-Kontra de hat dîtin) ji CHP'ê hostetir e. Li pişt tesfiyekariya PKK'ê ya di sala 2002-2004'an de weke hêza teşwîqker bi awayekî bingehîn AKP hebû. Dîsa bi awayekî bingehîn hêza pêşî li çareseriya siyasî ya di nava dewletê de digire AKP ye. Meyla çareseriyê ya dewletê ji bo pêşdebirina hegemonya xwe bi kar tîne. Hem naveroka vê meylê ji ciddiyetê dûr dike, hem di propagandaya xwe de bi kar tîne, hem jî nava wê pûç dike. Bi vî aliyê xwe ji MHP û CHP'ya helwestên wan eşkere bi tehlûketir dibe. Dozên Ergenekonê jî bi heman armancê bi kar tîne. Bi darbekarên rastî re li ser tesfiyekirina Kurdan li hev dike û mîna kesên di asta jêr de dadgeh dike xwe nîşan dide û bi vî awayî xwe rewa dike. Xwedêgiravî li ber wesayeta artêşê radibe û demokratîk tevdigere, tiştekî wisa tineye. Ji bo tepisandina meseleya Kurd cara pêşî di dema AKP'ê de evqasî berfireh û bi pîlan bi artêşê re li hev hatiye kirin. Di vê polîtîkayê de yek ji têgînên kilît 'mafên ferdî û çandî' ne. Ev bi xwe di bin navê çareseriya pirsgirêka Kurd de maskekirin e ji bo pêkanîn û pîlanên tesfiyekirina nasnameya azad û kolektîf a Kurd. Piştî ku tesfiyekariya 2002-2004'an hat pûçkirin, çareseriya bi navê 'mafên ferdî û çandî' li dijî çareseriya

KCK'ê bi beşê artêşê yê fermandariyê re bi desteka DYE, YE û rêveberiya Kurd û Ereb a Iraqê (wekî din, tevî Îran û Sûrî hevgirtineke din a destekdar xistin dewreyê) ji 2005'an ve xistin dewreyê. Bi gotina Serokwezîr R. Tayyip Erdogan 'li dijî terorê ji aliyê eskerî, polîtîk, ekonomîk, çandî, dîplomatîk û psîkolojîk têkoşîn û seferberiyeke topyekûn' dest pê kirin.

Hukûmeta AKP'ê xwe xist bin berpirsiyariya şerekî ku ti hukûmetê bi qasî wê newêrîbû vê bike ango hukûmeta AKPê Gladîo'ya xwe pêk anî û bi wê şerê xwe dimeşîne (Dema Pêncan a Şerê Gladîo). AKP dev ji şer berneda; şer pirralî û berfireh kir, ango şer hûrûkûr dimeşîne. AKP ji partiyên dewletê yên beriya xwe bêhtir partiya dewletê ye, hukûmeta wê jî ji tevahî hukûmetên beriya xwe bêhtir hukûmeta 'şerê taybet' e. Ji rêxistina tetikêş Hîzbûllahê ya bi ser JITEM'ê ve berfirehtir li pey rêxistiniyeke kontra ya Îslamî ye. Di serî de îmamên kadro yên Karûbarên Diyanetê endamên cemiyetên gelek terîqetan bi rêxistineke ban û sîwanê ya şêwazê Hamasê bi pirrarmancan bi kar tîne. Kontrola xwe ya li ser ekonomiyê di xizmeta şerê taybet de dimeşîne. Çanda jiyana dînî bi heman armancê dinirxîne. Bi giranî navenda dîplomasiyê di heman warî de dixebitîne. Bi kurtî, di navenda xebatên hukûmetê de tesfiyekirina Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd heye.

Hukûmeta AKP'ê ne bi tenê gav bi gav desthilatdariya dewletê dixe destê xwe, di heman demê de hegemonîze dike. Mîna di dema damezrandina Komarê de, di pêvajoya hilweşîna wê de jî dixwaze desthilatdariyê hegemonîze bike û bidomîne. Tevgera tesfiyeyê ya li dijî Kurdan çawa ber bi hegemonya faşîst a Tirkê Spî ve çû, di pêvajoya jihevdeketina faşîzmê de jî tevgera nasnameya Kurd a azad dikin hedef û bi vî awayî dixwazin heman hegemonyayê ji nû ve ava bikin. Tesfiyekirina Kurdan, yek ji wan faktorên sereke ye ku kir Komar ji tevahî naveroka xwe ya demokratîk û ronakbîr dûr bikeve. Çawa ku tesfiyekirina Kurdan sedema bingehîn a tevahiya bûyerên neyênî yên Komarê ye, berevajiyê wê jî rast e. Ango di serî de demokratîkbûn, pêşdeçûna Komarê li ser bingehekî erênî têkiliya xwe bi azadbûna Kurdan re heye. Dîroka nod salî ya Komarê, ev rastî bi temamî û bi awayekî berbiçav piştrast kiriye.

**f-** Di qonaxa li pêşiya me de Komara Tirkiyê wê tam bê serê duriyan. Komara di qonaxa rizgariyê de Ingilîzan berê wê da şerê antî-Kurd, mixabin dîsa Ingilistan û hevgirtiyê wê yê sereke DYE wê berê wê bidin şerê antî-Kurd û vê carê wê bêhtir tengav bibe. Jixwe sîh salên dawî yê vê Komara Duyemîn di vê tengaviyê de derbas dibin. Komar di vê tengavbûnê de diperpite. Bûyerên diqewimin, ne bi tenê 'şerê di asta jêr de' ye; nirxên civakî heta bi şaneyan ji hev dûr dikevin û dirizin. Ji têgînên hilweşînê û jihevdeketinê gelekî girantir jihevbelavbûn û rizîneke civakî pêk hat. Îradeya xwe weke organîzasyoneke Gladîo dimeşîne pêkan e ku bibe rejîmeke tarî, lê ti carî nabe rejîmeke komarê. Di şer de israr dibe ku pêngava dawî ya Gladîo'yê be, lê ji bo bêtesîrkirinê têrê dike ku ji odeya kozmîk bê derxistin û zelalkirin. Riya duyemîn a Komar pêde biçe riya yekîtiya demokratîk e ku di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de pêk hatibû. AKP dikare vê

riyê careke din bike bingehê Komarê. Ya komar kir komar, hevgirtina neteweyî û demokratîk a şerê 1919-1922’an bû. Aliyê antî-hegemonîk yê vê hevgirtinê jî hebû. Bi redkirina vê hevgirtinê re, şensê komara demokratîk ji dest çû û li şûna wê desthilatdariya çete û darbeyan a komploger, pro-faşîst û Gladîokar pêk hat. Ev riya gelek caran hatiye ceribandin û têkçûna wê hatiye îspatkirin nabe ku bibe riya rastî ya Komarê. Riya komara demokratîk a diviyabû ji destpêkê ve bihata şopandin di qonaxa li pêşiya me de ji bo çareseriya pirsgirêkan û aştiya civakî riya bi tenê ye. Li ser vê riyê ku ji bo AKP’ê û hukûmeta wê şensa dawî ye, KCK ne asteng e, lê belê firsendeke çareseriyê ye.

**2- Cihûtî, Têkiliya Tirk-Îsraîl û Pirsgirêka Kurd**

Mirov heta li rastiya Cihû û Îsraîlê rast serwext nebe, zor e ku mirov li pirsgirêka Kurd serwext bibe û çareser bike. Min ji ber vê yekê hewce dît ku ez meseleya Ibriyan di parêznameyê de weke beşekî cihê binirxînim. Marks bi xwe jî dema hewl dide pirsgirêkên der barê sosyalîzmê de çareser bike, neçar maye **‘Meseleya Cihûyan’** weke pirtûkçeyekê binivîsîne. Meseleya Cihûyan ji dema şaristaniyên Sumer û Misrê ve hebûna xwe dewam dike û her ku diçe ev pirsgirêk girantir dibe û heta roja me ya îro tê. Di Ahdî Atîk de bi awayekî berfireh behs dike ku Brahîm ji ber pirsgirêkên bi Nemrûdên Babîlan re û Mûsa jî ji ber pirsgirêkên bi Firewnên Misrê re cihûwarê xwe terikandine, derketine bi qebîleya Ibrî ber bi diyarê Kenan-Filistînê ve ketine rê, çûne. Pêkhatin û dewamkirina Qraltiya Cihû-Îsraîlê ku bi pêxember Dawid dest pê dike û bi qasî hezar salî dewam dike, cewherê pirsgirêkê pêk tîne. Serê pêşî bi qebîleyên li welatê Kenan pirsgirêkên wan ên der barê cihûwar û dînî de çêdibin (dema 1300-1000 B.Z. bi Mûsa dest pê dike; dema 1300-1600 B.Z. bi Brahîm dest pê dike) û di heyama pêxember Dawid de hewl didin van pirsgirêkan bi qraltiyeke piçûk çareser bikin. Dema Pêxember Silêman ‘serdema zêrîn’ a vê qraltiya piçûk e. Di Pirtûkên Pîroz de bi awayekî rengîn behsa çîroka wê tê kirin. Qraltî paşê ji hev belav dibe. Şêxên serekqebîle û zanyarên ji wan re pêxember dihat gotin (pirr kêm be jî di nava wan de jin hene) tevî ku gelekî hewl dan careke din nikarîbûn qraltiyê bi ser hev de bînin. Ya rastî, Ahdî Atîk ji rêzeçîrokên li dora pirsgirêkên vê qraltiya piçûk çêdibin, pêk tê.

Li herêma berê ket bin destê Împaratoriya Asûrê (B.Z. 720), paşê jî ket bin destê Împaratoriya Med-Pers (B.Z. 546) pirsgirêka Cihû bêhtir giran bû. Berxwedan û serîrakirin çêdibin. Cara pêşî di dema Qralê Babîlê Nebûqednezar de (B.Z. 596) wan bi komî mişextî Babîlê dikin. Bi vî awayî dema mişextkirinê ya çil salî dest pê dike. Keyayê Persan Kyros (bi Medî-bi Kurdî kuro ye, bi Grekî kyros tê xwendin) wan rizgar dike û ji nû ve wan dişîne welatê Yehûda-Îsraîlê. Di wê demê de ji doktrîna Zerdeşt gelekî bi tesîr dibin. Perestgeha Silêman a hilweşiyayî ji nû ve ava kirin. Serhatiyên qebîleya Ibrî cara pêşî di bin navê Pirtûka Pîroz de (Ahdî Atîk) nivîskî tomarkirin. Di vê de bi rola herî girîng Pêxember Îşaya radibe. Çîrokên qebîleya xwe bi mîtolojiyên Sumer û Misrê bi îlhama ji doktrîna Zerdeştî girtin di bin navê Ahdî Atîk de (Pirtûka Pîroz) bi awayekî nivîskî

pêşkêş kirin. Li cem Împaratoriya Persan di karûbarên qesrê de bi rolên girîng radibin. Pêkan e ku di wê demê de bi Proto-Kurdan re têkilî û nakokiyên wan çêbûbin. Di Pirtûka Pîroz de mirov dikare şopên van têkilî û nakokiyan bibîne. Bêhtir bi qralên Persan re hevkarî kirine. Jixwe di dema derketina Brahîm ji Ûrfayê de çawa ku em şopan dibînin, em têkiliyên wan bi çandên qebîleyî yên Hûrrî re (Proto Kurd in) dibînin. Dîsa tê guftûgokirin ku pêkan e, qebîleya Ibrî jî nîv Hûrrî be. Bi îhtîmaleke xurt çandeke navbera çanda Aryenîk û çanda Semîtîk be.

Di dema qral û împaratoriyên Helen û Romayê (300 B.Z. – 70 P.Z.) timî li ber xwe dane. Di salên 70'î P.Z. de cara duyemîn Perestgeha Silêman ji aliyê Romayê ve hat xirakirin û vê carê demeke dirêjtir mehkûmî jiyana surgûnê bûn. Mişextî tevahiya qadên şaristaniyan bûne. Koçberî û surgûnên heta bi nava Asya, Efrîka û Ewrûpayê pêk hatin. Li her devera çûnê herî zêde bi karûbarên pere, bazirganî û entelektueliyê re mijûl bûn. Kesên herî baş sermayeyê kom bikin û bidin hev wê ji nava Ciyûyan derketana. Nivîskarên herî baş jî êdî ji nava wan derdikevin. Nivîskar bi awayekî mîna peyrewên pêxemberan bin rêûresma wan dewam dikin. Kengî mezhebê Îsa ji aliyê qewmên bindest û xizan ve bêhtir hat qebûlkirin û veguherî dînê Xiristiyantiyê, di navbera kahînên tebeqeya jor a Cihû û Xiristiyantiyê de nexweşî û li hev nekirin jî zêde bû. Şerên ji ber nakokî û têkiliyên di navbera Mûsewîtiya fermî û Xiristiyantiyê de, serdema Antîk a klasîk (30-300 P.Z.) têkoşîna herî girîng a çînî ye.

Cihûtiya di serdema navîn de bi derketina holê ya Îslamîk re bêhtir bi pirsgirêk bû. Nexasim ji bo Cihûyên li Nîvgirava Ereb dîsa koçberbûn ket rojevê. Yên nexwestin koç bikin, ji bo hebûna xwe biparêzin, neçar man maskeyên Îslamî bidin ber rûyê xwe. Bi vî awayî hewl dan hem guftûgo û nakokiyên nava Îslamê kûr kirin, hem jî xwe biparêzin. Kengî navenda Îslamê bû Bexda, ji têkelkirina Cihû-Xiristiyantî-Îslamê pêkhatî û mîna terîqeta Evangelîst a roja me ya îro, terîqeta Karaîmê pêk anîn (850 P.Z.). Bi vî awayî karîbûn hem bi Xiristiyan û Misilmanan re bêhtir xweş li hev bikin, hem jî ketin nava qewmên Tirk ên koçêr û li Bakurê Hazarê Dewleta Tirk a Hazarê ava kirin. Di nav etnîsîteya Tirk de û di nava elîta Tirk Cihû ya cara pêşî bû dewlet de Selçûq Beg jî hebû ku rê li ber avabûna Xanedaniyên Selçûqî û Osmaniyan vekir. Ew bi xwe Sûbaşî bû. Bi çanda ji Dewleta Tirk Cihû girt dema dewletên xanedaniyê yên Selçûqî dest pê kir. Li vir a girîng ew e, di nav elîta desthilatdariya Tirk de bandoreke bi hêz a Cihû ji xwe re cih çêkiriye. Li Rojava jî li Mexrib û Nîvgirava Îberîkê di nav dewletên Îslamî de bi rola avaker rabûn. Di warê pêşketinên malî û entelektuel de alîkariya wan kirin.

Ji ber ku nakokiyên wan bi Xiristiyantiyê re zêde bûn, bi biryara Konsula Lateranê di dawiya sedsala 12. de Cihû di gettoyan de asê kirin. Ji vir û pêve li dijî Xiristiyantiyê ji du milan ve ketin nava çalakiyan: Pêkhatina baskê Masonên Laîk û di nav Xiristiyantiyê de tevgerên mîllî yên reformê. Di derketina ji serdema navîn de bandora van tevgeran gelekî heye. Herî dawî di sala 1492'an de tevî Misilmanan ji Nîvgirava Îberîkê hatin qewitandin û bi vî awayî careke din bi ber

pêla koçberiyê ketin. Bêhtir ber bi Rojhilatê Deryaspî û Anatolyayê, di serî de Hollanda ber bi peravên Rojavayê Ewrûpayê ve koç kirin. Li Ewrûpaya Rojhilata jî bêhtir Xiristiyantiyê zordestî li wan kir. Tevkujiyên ji wan re pogromên Cihûyan dihatin gotin bi serê wan de hatin. Li hemberî vê tebeqeya jor a Cihû, beşên wan ên sermaye û rewşenbîr-nivîskaran kirî ew bû, ji bo kapîtalîzm weke sîstemekê bi pêş bikeve, bi rola pêşengtiyê rabûn. Bi rola xwe ya di berxwedana neteweyî ya Hollandayê de Împaratoriya Katolîk a navenda wê Spanya (mezhebê gerdûnî) bi awayekî stratejîk şikandin. Di pêvajoya vê berxwedanê de Prenstiya Hollandayê di dîrokê de weke dewleta netewe ya pêşî derket holê. Di navbera salên 1550-1650 de şerên xwînrij ên mezheban pêk hatin û di encama van şeran de hem dinya Katolîk parçe bû, hem jî kapîtalîzm weke sîstem gavên ber bi mezinbûnê ve avêtin. Di vê de sermayeya Cihû û nivîskar-rewşenbîrên wê bi roleke girîng rabûn. Paşê bi dewleta netewe ya navenda wê Brîtanya-London, di pêvajoya pêşdebirina împaratorbûna Ingilistanê de alîkariya wan çêbû. Bi vî awayî, ji cîhana Katolîk û Ortodoks a zordestî li wan kiribû bi modelên laîk û Protestan heyfa xwe hilandin. Ya rastî, bi têkoşîna çînî û neteweyî ya li ser bingehê modernîst zêde kirin, deriyên serdema navîn ên Katolîk û Ortodoksiyê girtin. Bêguman mirov nikare serdema nû bi temamî bike malê Cihûyan. Lê rola Cihûyan nebûya yan jî ev rola wan neyê dîtin, mirov nikare destpêkirin û pêşketina serdema nû baş binirxîne. Di Şoreşên Fransî û Rûs de hem di kuştina Qralê Fransî yê Katolîk hem jî di kuştina Împaratorê Ortodoks ê Rûs û dawîanîna li xanedaniyên wan de rola îdeolojiya laîk û pêşengên bi koka xwe Cihû bêhtir eşkere ye. Nabe ku ev rol bê înkarkirin. Di tevahiya pêngavên şoreşê û sermayeyê yên bi heman rengî yên Ewrûpayê de heta rola Cihûtiyê neyê destnîşankirin, nabe ku ravekirinên rast bêne kirin.

Hebûna Cihûyan a li Anatolya û Mezopotamyayê ku bêhtir têkiliya xwe bi mijara me re heye, û pirsgirêkên rê li ber vekirin, parçeyekî girîng ê heman pêvajoya dîrokî ye. Cihû di tevahiya dîroka xwe de ti carî ji herdu qadan kêm nebûn. Jixwe ji nêz ve têkiliya kok û rehên wan bi çanda Mezopotamyayê re heye. Devera cara pêşî lê herî zêde hatin cem hev Anatolya ye. Ev serhatiya wan a bi cihbûnê heta bi dema Persan diçe. Hem dema ji Nîvgirava Îberîkê hatin qewitandin, hem jî dema ji ber pogromên (tevkujî) li Ewrûpaya Rojhilat reviyan, Anatolya ji bo wan bû penageheke girîng. Împaratoriya Osmanî li Rojava bi cîhana Katolîk û li Bakur jî bi cîhana Ortodoks re li ser sîstemê pev diçû û bêguman ev di cihûwarbûna Cihûyan a Anatolyayê de bi roleke girîng rabûye. Ji roja damezrandina Împaratoriya Osmanî heta bi hilweşîna wê, rola Cihûyan ji awayê tê zanîn gelekî zêdetir e. Mirov bê Kurd û bê Cihû nikare li Împaratoriyê bifikire. Nexasim di dema Silêmanê Qanûnî û Siltan Hurremê de ev rol ji bo Cihû û Kurdan di asta herî jor de ye. Wekî din, di salên 1650'î de Sabetay Sevî bi îddîaya pêxembertiyê derket holê û bandora tevgera wî ya li Îzmîrê gelekî mezin bû. Li ser dijbertiya Siltan, Sabetay Sevî rêûresma jêre 'çerxkirin' tê gotin daye destpêkirin. Ji wê demê û pêve Cihûyên çerxkirî di serî de Bektaşîtî û Neqşîbendîtî ketin nava tevahiya terîqetên Îslamî, terîqetên nû ava kirin û di nava

wan gelekan de reform kirin û bi vî awayî li ser wan bandoreke mezin a îdeolojîk çêkirin. Herweha bi giranî maliyeya Împaratoriyê kirin kontrola xwe.

Mîlliyetgiriya bûrjûwa ya Cihû di sala 1896'an de Kongreya Siyonîst a pêşî pêk anî. Bi pêkhatina vê kongreyê re demeke nû dest pê kir. Li Ewrûpaya Rojava mîlliyegirî zêde dibû û li Ewrûpaya Rojhilat jî pogroman dewam dikir. Lewma Cihû neçar man ji xwe re li welatekî bigerin. Di destpêkê de fikirîn ku li Efrîkayê ji xwe re welatekî Cihû çêkin, lê kengî ev plana wan neçû serî, bala wan çû ser Împaratoriya Osmanî. Plana welatekî di serî de li Îzmîr, Selanîk, Edîrne û beşekî Mezopotamyayê neçû serî û dîsa ji nû ve biryar dan li welatê berê Kenanê-Filistîna Nû vegerin. Lê li pêşiya vê jî Siltan Ebdulhemîdê Duyemîn (1876-1909) hebû ku xwe zêde nêzî hevkariyê nedikir û dibû kelem. Wan jî bi heman sedeman weke Qralê Fransî û Împaratoriya Rûs heq kiribû ku tevî xanedaniya xwe bêne hilweşandin. Xebatên locayên Mason ên sermayeya Cihû û Sabetayîstên xebatên wan li ser Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê zêde bûbûn, bi Meşrûtiyeta Duyemîn re encamên xwe yên pêşî dan. Rejîma Destûra Meşrûtî ket pratîkê. Erkên Siltan hatin bi sînorkirin. Paşê bi provakasyona 31'ê Adara 1909'an Ebdulhemîd ji desthilatdariyê hate xistin.

Di pêvajoya bi lezbûyî de mîlliyetgiriya Cihûtiyê bi du milan tevgeriya. Ya yekê, bi bûrjûwaziya Elman û bûrjûwaziya burokratîk a Tirk re tevgeriya, ya dudiyê, bi bûrjûwaziya lîberal a Ingilîz re hevpar tevgeriya. Milê yekê, di nava yekparebûna Împaratoriya Osmanî de li welatekî digeriya. Herî zêde li ser herêmên Îzmîr-Manîsa, Selanîk-Edîrne û Kurdistana Iraqê ya îro difikirîn û dixwestin ji xwe re bikin welat. Hinek ji wan difikirîn ku hewce nake, yekparetiya Împaratoriyê weke herêman parçe bikin û dikarin Împaratoriyê yekpare weke welat qebûl bikin. Nexasim yên 'çerxkirî' ango Sabetayîstên xwe Cihûyên Tirk dihesibandin bêhtir ji vê komê bûn. Bi tevahî kadroyên li rêza pêş ên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê mason bûn û kabê xwe ji bo Tirkîtiyê (Ereb, Kurd, Arnawid, Çerkez û yên din) diavêtin û ev jî nîşan dide ku ev têgihiştin çiqasî bi hêz bûye. Bi awayekî koalîsyona 'Tirkparêzên ne Tirk' pêk anîbûn. Hem kadroyên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê û hem jî kadroyên desthilatdariya CHP'ê ji kesên têgihiştina wan ev wê pêk bihata. Felsefeya wan pozitivîzma çor a Durkheimî bû. Tevî ku Tirkparêz xuya dikirin, dema derfet û îmkan didîtin her yek ji wan li eslê xwe vedigeriya ango dibû mîlliyetgirekî Ereb, Kurd, Arnawid, Çerkez, Ermenî, Rûm, Bûlgar û hwd. Weke kopyayên li dereceya sêyemîn ên ezmûnên li Ewrûpayê pêkhatî tevdigeriyan. Nexasim ji dewletdariya netewe ya Fransî û Elman bi tesîr bûbûn.

Milê dudiyan milê lawaz e, ji beşê alîgirên Ingilîz pêk dihat. Pêşî ji bo xwe li Efrîkayê li welatekî digeriyan. Lê paşê kengî Împaratoriya Osmanî ji hev parçe bû, giraniya meyla wan çû ser qada Filistinî ya lê qraltiya ji rêûresmê ya Cihû-Îsraîlê hatibû avakirin. Ev beşa han, wer difikirî ku Împaratoriyê temenê xwe temam kiriye û divê parçe bibe. Peymana Tîlsît a sala 1807'an di navbera Franseya Napolyon û Çartiya Rûsyayê de jî ji bo vê fikrê dibû bingehek. Tevî ku di nava Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de temsîla wan hebû jî mil û baskekî mezin bûn. Ne ku bi tenê

difikirîn împaratoriyê bivênevê hilweşe, lê ji bo vê jî di koalîsyonên alîgirê Ingilîzan de cih digirtin û bi hêza xwe hemûyî dixebitîn. Li bereya Çanakkale û Filistînê (di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de) bi yekîneyên xwe yên taybet li cem Ingilîzan cih digirtin û şer dikirin. Çawa ku tê zanîn Pîlanê Sykes-Picot (1916), Deklarasyona Balfour (1917) û peymana rejîma manda Ingilîz a li Filistînê (1916) bi hevkariya van beşan hatiye amadekirin. Li Rojhilata Navîn li şûna Împaratoriya Osmanî avakirina gelek dewletên netewe encama xwezayî ya van plan û peymanan bû.

Xisletên hevpar ên herdu bask û milan hene. Modernîst bûn, ji bo pêşengiya modernîzma kapîtalîst kabê xwe diavêtin. Pirraniya wan mason bûn. Alîgirên Ingilîz ji serî ve –yanî ji sedsala 16. ve ji roja avabûna dewleta netewe ya Hollanda û Brîtanyayê heta roja me ya îro –li pey wê yekê bûn ku dixwestin împaratorî û dewletên mezin parçe bibin û li şûna wan dewletên netewe yên piçûk ên nikaribin li ber hegemonya Ingilîz rabin û neçar bimînin pêre hevkariyê bikin, bêne damezrandin. Îsraîl wê di encama vê zêhniyetê de bihata avakirin. Bi cudahiyekê, Ingilîstan û paşê bi DYE’yê re bibûya hêza hegemonîk a kapîtalîzma global. Rastiya navneteweyî jî jixwe li ser vî bingehî hatibû avakirin û hê jî li ser vê rastiyê dewam dike. Yên kapîtalîzm weke sîstemeke hegemonîk a global ava kirin, bi awayekî bingehîn ev beş bûn. Bila şaş neyê fêhmkirin, em nabêjin, ev beş dinyayê bi pîlanekî bi dizî îdare dikin. Tevî ku fikrên bi vî rengî hene jî fikrên bi vî rengî nepixandî ne. Rola van beşan (bi tenê ji Cihûyan pêk nayên, di nava wan de ji her neteweyî ferd hene; Cihû bêhtir xwedî rola pêşeng in) bi awayekî katalîzorî ye; di avakirina sîstemê ya îdeolojîk, polîtîk, civakî, hunerî û ekonomîk de bi rola pêşeng radibin. Alîgirên Elmanyayê di destpêkê de bi hêz bûn. Di dema dawî ya Împaratoriya Osmanî de Împaratorî xistibûn destê xwe. Li ser rêxistina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê bi awayekî bingehîn mohra van kesan hebû. Wan rê dida ber desthilatdariya rêxistinê. Meşrûtiyeta Duyemîn, Bûyera 31’ê Adarê, tevî Şerên Yekemîn û Duyemîn ên Balkanan Şerê Cîhanê Yê Yekemîn ji wan bûyeran in ku têde bi rolên girîng rabûne. Têkçûna Elmanyayê, ji hevbelavbûna Împaratoriya Osmanî û paşê mezinbûna faşîzma Hîtler hilweşîna vî baskî îfade dikirin. Yên mayî tevlî Şerê Rizgariya Neteweyî bûn. Têra xwe bi hêz bûn. Lê kuştina Enwer, Talat û Cemal Paşa kir ku bê serok bimînin. Baskê Ingilîzgir beriya hilweşînê bi Wahdeddîn re gaveke nû avêtibû û di nava bermahiyên dewletê de hêzeke girîng bi cih kiribû. Ev jî tevlî Şerê Rizgariya Neteweyî bûn. Serokên wan ên esasî Îsmet Înonî û Fewzî Çakmak bûn. Ji ber ku Ingilîz ji şer serketî derketin, pozîsyona alîgirên wan her ku diçû xurt dibû.

Li vir diyardeya Mistefa Kemal derdikeve pêşiya me. M. Kemal, mîna li Rûsya û Çîna wê demê, di şert û mercên dagirkeriyê de radîkalîzma bûrjûwaziya piçûk a tîpîk temsîl dikir. Diyardeya bingehîn a M. Kemal derxist holê, dagirkeriya fiîlî ya li Anatolya û Mezopotamyayê bû. Eger dagirkeriya fiîlî nebûya wê M. Kemal jî nebûya. Rewşeke bi heman rengî di Şoreşa Franseyê de jî pêk hatibû. Mîna Wahdeddînê wê demê, Louîsê 16. ji bo alîkariya wî bikin eger bang li monarşiyên Ewrûpayê nekiribûya ji bo bêne Franseyê, Robespierre û hevalên wî wê weke

radîkalên bûrjûwaya piçûk derneketana holê. Tişta ew derxistin holê û ew gihandin îlana Komara Yekemîn rastiya dagirkeriya di dema 1791-1794’an û rastiya berxwedana li hemberî vê yekê ye. Ma ne şert û mercên dagirkeriyê çawa bi dawî bûn, radîkalîzma bûrjûwaziya piçûk jî ji holê hatiye rakirin. Komara Tirkiyê jî di nava şert û mercên bi heman rengî de gihiştiye. Eger radîkalîzma bûrjûwaya piçûk a M. Kemal nebûya, avakirina Komarê gelekî zehmet bû. Hebûna Komarê ji sedî sed bi saya radîkalîzma M. Kemal pêk hatiye. Lê kengî bi Lozanê re statuya dagirkeriyê bi awayekî fermî bi dawî bû û komar gihişt Destûra xwe ya nû (1924), radîkalîzma M. Kemal jî bi awayekî bingehîn tevî hevgirtiyên xwe hat tesfiyekirin. Di dîroknasiya Tirk de herî zêde ev diyardeya tesfiyeyê di tariyê de hatiye hiştin û heta ev neyê fêhmkirin, ne pêkan e ku diyardeya Komara Tirkiyê bi awayekî rast bê nirxandin. M. Kemal kirin Serokkomar, ev nayê wê maneyê ku radîkalîzma wî dewam dike, berevajî, ev îspat dike ku radîkalîzma wî ji holê hatiye rakirin. Di dîroknasiya Tirkiyê de li ser vê babetê analîzên ji civaknasiyê dûr bi kronolojî û ravekirinên bi modelên dîn û pozitivîzmê tevlîhevkirî têne kirin. Mîna ku hevgirtin, çîn, mîlliyet û îdeolojiyên wan ên cuda tinebûne, her tişt ji ezmanan bi zenbîlan daketiye xwarê, Şerê Rizgariya Neteweyî bi nasnameyeke homojen û yekpare pêk hatibe, têgihiştineke serdest ferz kirine. Di anîna ziman a M. Kemal de herî zêde ev têgihiştin tê îfadekirin. Ji danasîneke zanistî bi israr direvin. Piçûkdîtin an jî zêde mezinkirina M. Kemal ji bo fêhmkirina heqîqetê bi kêr nayê, bêhtir zirara wê heye. M. Kemalê şert û mercên dagirkeriyê ew pêkanî û Atatirkê statukoyê ew pêkanî cuda ne. Mîna ku li dijî şoreşê dijşoreş hatibe kirin. Dijşoreş jî ne di sala 1950’î de, di sala 1925’an de hatiye kirin.

Eger em careke din li rastiya Cihû vegerin, divê mirov li rola Cihûyan a di dijşoreşa 1925’an de serwext bibe. Çawa ku xwezaya mijarê ferz dike,  M. Kemal nikarîbû radîkalîzma bûrjûwaziya piçûk li derveyî pêvajoya dagirkeriyê dewam bike. Hêzên alîgirê Sovyetê yên li aliyê wî yê çepê ji zû ve hatibûn tesfiyekirin. Di nava atmosfera dijşoreşê de ku di 15’ê Sibata 1925’an de bi provakasyona li dijî Şêx Seîd pêk anîn, kadro û zêhniyeta Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê vê carê di nava CHP’ê de dewleta nû bi temamî kirin kontrola xwe. Îdeolojî û polîtîkayên wê bi xwe pêk anîbûn. Payeya Serokkomariyê ya dabûn M. Kemal sembolîk bû. Nerazîbûna mezin a M. Kemal ji pêvajoyê vê rastiyê îspat dike. Wekî din, ezmûna Firqeya Serbest îspateke din a ciddî ye. Di nava CHP’ê de sala 1935’an bi sekreteriya Recep Peker bernameyek hat amadekirin û bi sedema ku dişibe bernameya faşîzmê ya Mussolînî, M. Kemal wê rexne dike.

Esasê bûyerên diqewimîn ev e: Bûrjûwaziya burokratîk a Tirk ku ji dema desthilatdariya Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê ve bi tesfiyekirina hindikayiyan xwe dewlemend kir, li hundir ji xwe re yekdestdariyên sermaye û kadroyên Cihû kirin bingeh û li derve jî her ku çû hegemonya Ingilîstanê kir polîtîkayeke ku bişopîne. Tişta derketî holê faşîzma Tirkê Spî ya duşirîk an jî pro-faşîzm bû. Piştî ku Mûsil-Kerkûk ji Mîsaq-î Mîllî hatin veqetandin ji sê milan ve ji bo projeya Proto-Îsraîlê ketin nava tevgerê. Komara Tirkiyê, Manda Ingilîz a li Filistînê û mîlliyetgiriya Kurd a

li Bakurê Iraqê di nava rewşên xwe yên berbiçav de bi rolên heman rengî radibûn; hemû jî li ser riya pêkanîna Îsraîlê her yek ji wan pêlikek in. Li ser riya diçû Îsraîlê projeya herî zêde dihat qebûlkirin li ser vî bingehî bû. Mijûmorana Tirkiyê ketî navê û zêde xwe li nava xwe girtina wê û rewşa bi heman rengî di pêkhatina Kurd a li Bakurê Iraqê de bi çîroka derketina holê ya Îsraîlê ve têkildar in. Ti têkiliya tebeqeya civakî ya di bin navê bûrjûwaziya Tirk de pêk anîn, bi Tirkîtiya rastî re tineye. Pêkanîneke mîtîk e. Heman tiştî mirov dikare ji bo pêkhateya Kurd a li Bakurê Iraqê jî bibêje. Kopya ji destê çaran ê bûrjûwaziya Tirk e. Ew jî ne sosyolojîk, pêkhateyeke mîtîk e. Bi rastî li dora herdu pêkhateyan mîtolojiyek çêkirine. Herdu jî pêkhateyên lihevçêkirî ne û ti têkiliya wan bi rastiyên dîrokî-civakî re tineye. Em rolên wan bi tenê dikarin di çarçoveya pêkhatina Îsraîlê de tam fêhm bikin. Li hemberî Mistefa Kemalê Tirk hewl dane Mistefa Barzaniyê Kurd mîtîk bikin. Ne ji bo piçûk bêne dîtin an jî zêde bêne mezinkirin, lê belê ji bo ku rave bikim ji aliyê sosyolojîk ve rastiyên civakên Kurd û Tirk di nava mijûmoranê de hiştine û kirine ku ji hev neyên derxistin, ez van herdu nasnameyan bi nîşan bidim. Kurd û Tirk kengî weke gel dikevin pêvajoyên demokratîkbûnê, bi awayekî kêm hatiye dîtin dîsa bi darbe û komployan perdeyeke faşîst diavêjin ser wan. Dikin ku darvekirin, reşkujî, pevçûn û şerê navxweyî neqedin. Şerên sexte yên çepgir û rastgiran, şerên etnîk û mezhebî diafirînin. Tevgerên gel û têkoşînên civakî yên jirêderketî û ji cewherên xwe qutbûyî mewzûbehs in. Lê di dawiya hemûyan de mirov dibîne rê li ber pirsgirêkên giran ên civakî û gelî vekirine. Ev rastiyên encam in ku mentiqê komplo, darbe û provakasyonan herî baş nîşan didin.

Piştî ku di sala 1948'an de dewleta Îsraîlê hat îlankirin, heman sê proje hê bi awayekî berfirehtir hatin dewamkirin. Yên li ber rabûn, xwestin bi nasname û armanca xwe ve girêdayî bimînin çi rastgir çi çepgir, çi Kurd çi Tirk bi cezayên herî giran hatin tesfiyekirin. Ji salên 1960, 1971, 1980, 1993, 1998 û 2002'an ve di nava gelek darbeyan de ev rastiyên bêrehm hene. Ji sala 1925'an ve di asîmîlekirin, êşkence, girtin, koçberkirin û îmhakirina Kurdan, çepgiran, Îslamiyan û heta mîlliyetgirên Tirk ên Elmangir de bi giranî heman zêhniyetê rol girtiye. Ev zêhniyet bi rêxistiniya Gladîo ya NATO'yê bêhtir xurt bûye di ser tevahî beşên kedkar ên civakê, sosyalîst û demokratên Kurd û Tirk re weke bûldozerekê derbas dibe. Bêguman, dema ku em vê analîzê di çarçoveya modernbûna tebeqeya jor a Cihû-Tirk-Kurd de dikin, armanca me ne antî-Semîtîzm ne jî antî-Tirkîtî yan jî antî-Kurdîtî ye. Berevajî, di çarçoveya tebeqeyên jêr de sosyalîst û demokratên Cihû-Tirk-Kurd li dijî hevgirtina tebeqeya jor têkoşînên mezin ên berxwedanê kirine. Ji Meşrûtiyeta Duyemîn heta roja me ya îro têkoşînên hevpar ên gelên bindest –li vir gelê Cihû jî di navê de –û kedkaran timî di dewreyê de bûn. Çawa ku nabe mirov li tevahiya Ewrûpa û Rûsyayê li sosyalîzm û demokrasiyê bêyî Cihûyan bifikire.

Çi seyr û balkêş e, di roja me ya îro de têkiliya Kurd-Îsraîl ber bi hevgirtineke dîrokî ve tê dahfdan. Li şûna hevgirtina Îsraîl-Tirk an jî bi awayekî mîna wê, hevgirtina Îsraîl-Kurd dikeve rojeva dîrokê. Di vê de ji salên 1980'î ve, nexasim piştî salên 2000'î destguhertina hegemonîk a

di nava Komarê de bi roleke mezin radibe. Hukûmetên AKP'ê yên bi destê Îsraîl, DYE û YE'yê hatin ser kar di destpêkê de bi armanca tesfiye û tecrîdkirina PKK'ê bi dewletên Îran û Sûrî re hinek îttîfaq çêkirin, lê paşê hevgirtinên wê encamên berevajî dan û li nerazîbûna Îsraîl, DYE û welatên Yekîtiya Ewrûpayê rast hatin û bi derketina derveyî xetê hat gunehbarkirin. Di vê qonaxê de, di çarçoveya pirsgirêka Kurd de li hemberî hevgirtina dij-Kurd a hukûmetên Tirkiye, Îran û Sûrî, bloka DYE, YE, Îsraîl û Kurdan pêk tê. Di hedefa van herdu blokên hevgirtinê de ku hema bêje dikarin Rojhilata Navîn ji binî ve veguherînin, PKK-KCK hene. Li vir xeta îdeolojîk û polîtîk a PKK'ê û di çarçoveya modernîteya demokratîk de têkiliya xeta bêhtir pratîk a berbiçavtir a KCK'ê bi heqîqetê re derdikeve holê. Di bûyerên dîrokî-civakî de tişta encamê diyar bike derewên mezin ên demagojîk û hevgirtin nînin, heqîqet bi xwe ye. Careke din a xwe dide der, ev rastiya bi êş û adil a heqîqetê ye. Dîrok bi xwe mîna ji efsaneyên mîtîk û demagojiyên li ser navê wê hatine çêkirin, heyfê hiltîne. Rastî bi xwe bêhtir bi awayekî rût û tazî ango weke heqîqet derdikeve holê. Dîrok di 'niha' de bêhtir dibe, 'niha' jî ji her demê zêdetir dibe dîrok. Têkoşîn bi awayekî bingehîn bi qasî ku li ser xeta Hewlêr-Amedê aktuel dibe ewqasî jî dibe dîrok. Dilê herêmê û heta dilê dinyayê bi maneya 'Şerê Cîhanê Yê Sêyemîn' bi rîtmeke bi lez li ser vê xetê hildiavêje. Dilê şoreşê û dijşoreşê yê demekê li ser xeta Amsterdam-London-Parîs û Petersburg-Moskovayê hildiavêt, niha li ser xeta Amed-Hewlêr-Bexdayê hildiavêje.

Bi qasî girêka kor a Îsraîl-Filistînê girêka Afganistan û Pakistanê, bi van ve girêdayî tevahiya cografya Misilman a Efrîkayê, li Asyayê ji Rûsyayê heta bi Hindistanê çanda Îslamî li navenda çareseriya xwe ya demokratîk digere. Di vê qonaxê de xeta navend a herî çareserker di çarçoveya Iraq-Îran-Sûrî û Tirkiyê de ango xeta çareseriya demokratîk a şoreşgerî ya li Rojhilata Navîn xeta Amed û Hewlêrê ye ku dilê Bakur û Başûrê Mezopotamyayê li vir hilavêtiye û dîroka mirovatiyê gelek tiştan deyndarê vê cografyayê ye. Problematîka qebîleya Ibrî pêşî li ser vê xetê pêk hat. Piştî serpêhatiyeke ecêb a qederê sêhezarûpêncsed salan, dîsa li çavkaniya wê, qebîleya Ibrî li çareseriya vê problematîka jê kêm nebûyî digere. Çawa ku pêşiyan gotî, “Her gîha li ser koka xwe hêşîn dibe.” Wer xuya ye ku pirsgirêka Cihû wê li ser kokên xwe çareser û hêşîn bibe. Elîtên Komara Tirkiyê bi lez û bez hewl didin di navbera du qutbên dijber ango qutbê DYE-YE-Îsraîl û bloka Îran-Sûrî-Iraqê de (Ew bi xwe hewl didin bihûnin) tevna dijşoreşê bihûnin û şensê pêkhatin û serketina vê blokê tineye. Dused sal in ku modernîteya kapîtalîst bihêlin çareseriyê bîne, pirsgirêkên civakî timî sor kirine û han dane, lewma ev pirsgirêk gihiştine wê qonaxê ku bi tenê bi modernîteya demokratîk çareser bibin. Avakirina neteweya demokratîk a KCK'ê li ser vê riyê tîrêjeke rohnîker û dengekî bangker e.

**3- Di Têkiliyên Kurd-Tirk De Pirsgirêka Desthilatdarî û Dewletê**

Analîzkirina têkiliyên Kurd-Tirk belkî jî mijara herî zor a sosyolojiyê ye. Ji ber ku naverok û cewherê pirsgirêka Kurd nayê zanîn an jî naxwazin fêrî bibin û ji vê jî wêdetir bi gotinên begzadeyan ên ti bingehê wan ên zanistî tine nêzî meseleyê dibin, analîzkirin û jihevderxistina pirsgirêka Kurd zor û zehmet dibe. Ji ber vê sedemê, parêzname bi tevahî hêza zanistên civakî bi kar tîne ji bo ku têkiliyê rast deyne û gelekî girîng dibîne ku li ser vî bingehî gavê biavêje çareseriyê. Piştî komploya qirkirinê ya 15'ê Sibata 1925'an têkiliyên dîrokî-civakî yên nehsed salan yên ku çiqasî stratejîk bûn ewqasî jî xwe dispartin bûna ji yek ummetê, bi carekê tine hesibandin. Der barê Kurdan de yeqîn dikirin ku bibêjin 'tine bibe' wê tine bibin. Tiştên ku wê bi fermana Xwedê ya 'bibe' jî nebin, der barê Kurdan de yeqîn kirin kengî bibêjin 'tine bibe' wê tine bibin. Jêdera vê materyalîzma herî çor a metafizîk pozitivîzm bû û ew jî bingehê îdeolojîk ê faşîzma Ewrûpayê bû. Bi vê têgihiştinê di bin serdestiya desthilatdariya wan de kengî fermana 'îmha û înkarê' hate dayîn, yeqîn kirin ku Kurd ê di demeke kin de tine bibin. Kadroyên bermahiyên heman pêkhateyê yeqîn dikirin ku rêbaz û nêzîkatiyên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê di tesfiyekirina Ermeniyan de bi awayekî serketî pêk anîn, ji bo Kurdan jî wê heman encamê bidin. Van kesan gel û neteweya xwe jî bi vê siyaseta înkar û derewê dan bawerkirin û bi vê jî neman, li hemberî dinyayê mîna ku diyardeyeke bi navê Kurd tinebe tevgeriyan.

Mirov heman rastiyê dikare ji bo dîroknasiyê jî bibêje. Mirov dikare bibêje, kêm têkiliyên dîrokê hene bi qasî yên di dîroka şaristanî û dewletên Anatolya û Mezopotamyayê de karibin di nava xwe de yekparebûneke diyalektîkî îfade bikin. Di pêşketina dîroka mirovatiyê de xeta Mezopotamya-Anatolyayê bi rola stûna navendî radibe. Li ser vê xetê, bi vê yekparebûna diyalektîkê û bi rola xwe ya stûna navendî dewlet û şaristaniyên pêşî yên dîrokê ava kirin, ji civakên Sumer û Misrê heta rastiya civakên roja me ya îro bi heman rola xwe radibe û dewam dike. Lê tevî vê yekê, modernîzma dewleta netewe, xeteke sor a înkarê dikişîne ser vê dîrokê û dîrokê ji sifirê ji xwe dide destpêkirin ango xwe destpêka dîrokê qebûl dike û vê jî weke zanist dihesibîne. Ev qirkirina çandan e ku înkarkirina rastiyên çandên gelan neteweparêzî dihesibîne. Lewma divê mirov ji sedî sed vê hovîtiyê bide aliyekî û wisa hewl bide dîrokê hîn bibe. Parêznameya min ji bo rûyê rast ê vê çanda îmha û înkarê deşîfre bike bi israr hewl dide xeta dîrokê pêşkêş bike.

Hem çandên çînî, bajarî û şaristaniyên dewletî, hem jî çandên civakan ên li dijî van hersiyan hebûna xwe diparêzin, yekpare ne. Yekparetî hem di warê dijberiya wan a li beramberî hevdu de hem jî di nava wan bi xwe de heye. Em vê rastiyê tevahiya dîrokê herî zêde di navbera çandên Anatolya û Mezopotamyayê de dibînin. Diyardeyên desthilatdarî û dewletê yên ji bo tebeqeyên jor ên şaristaniyê ne, li van herdu cografyayan timî di zikhev de yekparebûnek pêk anîne. Yekparetî di her qadê de heye. Nexasim di qadên ekonomîk, siyasî û çandî de xwe timî

diyar dike. Ji Sumer, Aqad, Babîl, Asûr, Hîtît, Mîtannî, Ûrartû, Med, Pers, Helen, Roma, Bîzans, Osmanî heta bi Komara Tirkiyê çandeke civakî ya yekpare weke çemekî mezin ê sereke heye. Hem ji aliyê serweran ve hem jî ji aliyê kesên serî li wan tewandî ve yekparetî esas e. Tevî yekparetiyê xusûseke din a divê bê fêhmkirin cihêrengîniya xwecihî ye. Ji bo yekparetî hebe divê cihêrengî hebe. Yekparetiya xwe nesipêre cihêrengiyê, jiyana bi darê zorê ye, yan jî bi awayê roja me ya îro tê gotin, jiyaneke tek tîp a faşîst e.

Divê mirov di nava vê yekparebûnê de tevahiya dîrokê li têkiliyên Kurd-Tirk binêre. Lewma min hewl da di beşên pêwendîdar de pêvajoya ji Şerê Melezgirê yê 1071'ê heta bi Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1919-1922'an li Anatolya û Mezopotamyayê terîf bikim. Ji ber vê niha bi tenê balê dikişînim ser û qîma xwe bi vê tînim. Ez bi israr vê xusûsê destnîşan dikim, ji ber ku dibêjin sîstemeke dewletê û serweriyeke Kurd a diyar di dîrokê de çênebûye. Li dijî vê zêhniyetê min hewl da têgîna yekparetî û cihêrengîniyê terîf bikim. Ji Sumeran heta bi roja me ya îro li cem tevahiya şaristaniyên li Anatoliya û Mezopotamyayê pêk hatine û li cem desthilatdarî û dewletên van şaristaniyan rê li ber wan vekirine, hukimranî hevpar e. Yekparetiyê îfade dikin. Eger em li serwertiyê û dewletê weke dewleta netewe bifikirin, em ê şaşiyên mezin bikin. Dewleta netewe formekî desthilatdariyê ye, nikare ji sedsala dawî ya kapîtalîzmê bibihure. Di forma desthilatdariyê ya hezar salan de dewleta netewe cihê xwe nîne. Formê serweriyê yê ku gelekî belav heye, dewleta bajêr û împaratoriya gerdûnî ye. Li cem van jî çand bi awayekî hevpar têne temsîlkirin.

Li Anatolyayê dewleta pêşî dewleta Hîtît e, û nabe ku mirov bêyî Mezopotamyayê li vê dewletê bifikire. Jixwe dîrokê îspat kiriye ku prens, prenses û qralên Hîtîtan bi koka xwe Hûrrî ne, ango Proto-Kurd in. Wekî din Mîtanniyên xizm û cîranên wan in, weke dewleta pêşî ya navenda wê Bakurê Mezopotamyayê, bi Hîtîtan re di nav hev de ne. Sînorê yekê ji ku dest pê dike û li ku diqede, pirr diyar nîne. Li cem Asûr û Ûrartûyan jî mirov dikare behsa heman rastiyê bike. Med û Pers jixwe gelekî berfireh û belav bûne. Em baş dizanin ku li cem Helen, Roma, Bîzans û Osmaniyan jî heman rastî pêk hatine. Ne bi tenê li cem çandên desthilatdarî û dewletê, li cem tevahiya qadên çandên civakî hevpartiyên bi heman rengî pêk tên. Îslamiyet, Xiristiyantî û Mûsewîtî dînên ji heman kokê ne. Mînakên herî berbiçav ên hevpartiya çandî pêk tînin. Modernîteya kapîtalîst a Rojava bi zanîn forma dewleta netewe li ser çandên Rojhilata Navîn ferz kir. Li şûna diyardeya desthilatdarî û dewletê ya ji berê ve timî bi tek forma împaratoriya gerdûnî dihat temsîlkirin, li ser bingehê dewletên netewe yên qels ên ji dehan parçeyan pêkhatî û dijberê hev, parçebûna çanda Rojhilata Navîn û nîv-mêtingehkirina wê pêk hatiye. Bi vî awayî herêm ketiye bin hegemonya sîstema kapîtalîst. Komara Tirkiyê ya weke hêzeke jêr hegemonîk hat avakirin jî, yek ji parçeyên herî girîng ê Mîsaq-î Mîllî ya kiribû bingehê xwe yanî Mûsil û Kerkûk hat veqetandin ango Kurdistana Iraqê jê hat veqetandin û ew mîna werdeka bi yek lingî mehkûmî jiyaneke qop û kulekî kirin. Yekparetiya ji rêûresmê ya Anatoliya û Mezopotamyayê bi

zanîn hem jî li ser bingehê dijberî û hevdu înkarkirinê parçe kirin. Yekparetî kirin qurbanê jiyana tek tîp a faşîst û bi vî awayî bi tevahiya çandên cuda xistin ber çerxa îmha û înkarê û ji tinebûnê re terikandin.

Tebeqeya jor a Kurd ango beşên bi meseleyên desthilatdarî û dewletê re mijûl dibûn, ji dema Siltan Alparslan heta bi M. Kemal bi çanda desthilatdarî û dewleta hevpar tevgeriyane û ev helwesta xwe bi gel jî dane qebûlkirin. Herçiqasî ji bo cudahiya xwe ya çandî statu û garantiyek pêk neanîbin û ev yek bi şêweyê pêkhatina wan a çînî re têkildar be jî gel bi xwe hem ji aliyê stratejîk û hem jî ji aliyê dîrokî-civakî ve çanda dewleteke hevpar li gorî berjewendiyên xwe di cih de dîtiye. Ji ber ku di cih de dîtiye mirov nikare gunehbar jî bike. Yên divê mirov wan gunehbar bike ew kes in, bihevrebûna gelan a dîrokî bi statuya huqûqî û rêveberiya demokratîk ve girê nedane, li şûna vê xwe li îmha û înkarê rakişandine.

Herçiqasî PKK'ê paşê şaşiya xwe fêhm kiribe û bi xwerexnekirinê jê bihurîbe jî di dema derketina xwe ya holê de li dijî vê çanda îmha û înkarê bi têgihiştina sosyalîzma pêkhatî bi dewleta netewe gav avêt û ev xusûsek e ku mirov fêhm dike. Bi têgihiştina sosyalîzmê be jî li dijî dewleta netewe ya cihêkar û cudakar bi dewletdariyeke din a netewe bersivdan, tê wê maneyê ku mirov dikeve dafika kapîtalîzmê. Gelên cîhanê bi vî awayî ketine dafika polîtîkaya 'parçe bike-birêve bibe'. Sosyalîst di nava ti şert û mercî de nikarin dewleta netewe biparêzin. Çi li ser navê gel û neteweyên serdest û çi jî li ser navê gel û neteweyên bindest, prensîba sereke ya dijberbûna kapîtalîzmê ew e, mirov formê dewleta netewe qebûl nake. Çawa ku bi giştî dibe, tevahiya dîrokê li ser bingehê çandên hevpar di têkiliyên Kurd û Tirkan de yekparetiyek pêk hatiye û di her şert û mercî de parastina vê yekê, duyemîn prensîba sereke ya sosyalîstbûnê ye. Jixwe herî dawî li ser riya diçe avakirina Komarê, ji bilî îlankirina Mîsaq-î Mîllî, Tamîma Amasyayê û komkirina Meclîsa Mezin a Milletê Tirkiyê li dora tevgereke stratejîk a hevpar, her helwest weke helwestên herdu gelan têk bibin hatine destnîşankirin û di serî de M. Kemal ev yek ji aliyê tevahiya sîmayên girîng ên pêvajoyê ve hatiye gotin û belgekirin. Statuyeke hevpar hem jî li ser navê hemdemtiyê bi hev re û bi riza dilê xwe qebûl kirin. Nêzîkatiyên darbekar û komploger ên paşê, rastiya statuya hevpar a Kurd û Tirkan bi riza dilê xwe weke hêmanên bingehîn ên Komarê pêkanîn nikare ji holê rakin. Tevahiya dîroka Komarê xwediyên heman zêhniyeta komploger û înkarker rêbazên asîmîlasyonîst û qirkirina çandî ferz kirin, lê ev jî nikare statuya di Destûra pêşî de (1921) hat diyarkirin û nirxê wê yê diyarker ê dîrokî heye, betal bike.

Ev rastî li herêmên din ên Kurdistanê jî di warê jiyana civakî ya Kurd de bi heman rengî ye. Kurd ji aliyê ti dewletê ve nehatine fetihkirin. Ji bo wan ti statuya fetih, dagirkerî û îlhaqê nîne. Ango ji aliyê siyasî û huqûqî ve statuya wan di nava wan dewletan de ku bi wan re dimînin li ser bingehê hevpartiya bi riza wan e. Hem ji aliyê zêhniyeta wan a dîrokî ve hem jî ji aliyê çanda wan a civakî ve rêûresmeke bi vî awayî – herçiqasî dewleta netewe ya modernîteyê sûravka vê

yekê di serê wan re derxistibe jî – kirine bingehê jiyana xwe. Ev rêûresm hê jî hebûna xwe dewam dike. Dewletên netewe yên pêwendîdar divê pirr baş li vê rastiyê serwext bibin, siyaseta îmha û înkarê ya ferz dikin biterikînin, bi dîrok û civakê re li hev bên û qîmetê bi heqîqetê bidin. Naxwe çawa ku ji mêj ve hatiye fêhmkirin, wê ne bi tenê bi qopîtî û kulekî bimeşin, mîna bi serê her dewleta netewe ya faşîst de hatiye, wê felaketên wan jî ji ber pêkanîn û siyasetên wan ên îmha û înkarê bin.

Kengî PKK li van rastiyên civakî û dîrokî serwext bû û fêhm kir ku dewleta netewe dafikeke kapîtalîzmê ye, KCK weke sîstema rêveberiya demokratîk a gel îlan kiriye. KCK li beramber dewletdariya netewe dewletdariya netewe ya Kurd nîne. Weke prensîb vê yekê red dike. Çi di bin banê dewleteke netewe de be (eger girêdana xwe ya bi demokrasiyê re qebûl bike), çi jî bi serê xwe be, otorîteya siyasî ya gelê Kurd qebûl bike, rêveberiya xweser a demokratîk e. Ji vê modelê KCK para Kurdan dikeve. Bi Kurdî em jêre Koma Civakên Kurdistanê dibêjin. Bi Tirkî divê ev weke demokratîkbûna civakê were fêhmkirin. Li gorî vê sîstemê, tevahiya gelan, bêyî ku bikevin nava şovenîzma neteweyî, nava şerên li ser sînoran, nava burokrasiyê, nava mîlliyetgiriyê û dewletdariya netewe, bi awayekî hevpar û bi riza dilê xwe otorîteyên xwe yên siyasî ava dikin. Bi şertê ku rêveberiyên wan ên xweseriya demokratîk bêne naskirin, dikarin jiyana di bin banê dewletên netewe de qebûl bikin. Ev şêwazê jiyanê nayê wê maneyê ku dewlet li ser bingehê federal an jî konfederal bêne birêkûpêkkirin. Li ser vî bingehî bi dewletan re di çarçoveya Destûrî de lihevhatin çênabin. Kengî rêveberiyên xweseriya demokratîk ên civakê bêne naskirin, ber bi ‘lihevhatina li ser destûra demokratîk’ gav tê avêtin. Di navbera herduyan de cudahiyên bi kok hene.

KCK di nava dewletên netewe yên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûrî de, wekî din li hemberî Dewleta Federe ya Kurd a Iraqê weke pêkhateyeke xweser a demokratîk projeya herî îdeal a jiyana wekhevî û azadiyê ye. Çawa ku rastiyên dîrokî û civakî jî îspat kirine, KCK jî bawer dike ku pirsgirêkên bi van dewletan hemûyan re bi tenê li ser bingehê xweseriya demokratîk, di nava aştiyê de û bi rêbazên siyasî yên demokratîk çareser dibin. Bi vê bîrewerî, biryardarî û van amadekariyan radibe. Eger dewletên netewe van rastiyan û çareseriyên destûrî yên demokratîk qebûl nekin, KCK xwedî wê hêz û biryardariyê ye ku xwe weke otorîteyeke siyasî ya xweseriya demokratîk pêk bîne û biparêze.

## 4- Aştî, Çareseriya Demokratîk û Avakirina Neteweya Demokratîk

PKK'ê bi analîzên berfireh ên der barê desthilatdariya dewleta netewe de xwest ji asêmayîna xwe ya der barê pirsgirêka Kurd de bibihure. Dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî ku ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve di pêkhatina PKK'ê de bandora xwe heye, herî zêde di dema mezinbûna şerê gel ê şoreşgerî de ango di Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an de xwe nîşan da. Her ku diçû vê bandorê rê li ber xetimînê vedikir û heta ew ji hev nehat derxistin pêşketin zehmet bû. Sosyalîzma pêkhatî di salên 1990'î de bi lez ji hev de ket û vê kir ku mirov baştir li bandora di bingehê pêxîrtengiyê de serwext bibe. Tişta sosyalîzma pêkhatî ji hev de xist, problematîka desthilatdarî û dewleta netewe bû. Ya rastî, sosyalîzmê nikarîbû pirsgirêka deshiltadarî û dewletê ji hev derxista. Li tevahiya dinyayê di pêxîrtengiya sosyalîzmê de ev pirs bi bandor bû. Nakokiya desthilatdarî û dewletê ya bi giranî ketibû ber deriyê pirsgirêka Kurd kengî bi pêxîrtengiya sosyalîzma pêkhatî ya li tevahiya dinyayê re bû yek, hingê bivênevê pêwîst bû, mijara desthilatdarî û dewletê ji binî ve bihata çareserkirin.

Ji lewra min di beşekî girîng ê parêznameya xwe de bi vê armancê hewl da diyardeya desthilatdarî û dewletê di tevahiya dîroka şaristaniyê de analîz bikim. Li ser şaristaniya roja me ya îro serdest, li ser modernîteya kapîtalîst pirr fikirîm û min mitale kir. Di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de ez li ser veguherîna di diyardeya desthilatdarî û dewletê de fikirîm. Nexasim min dît ku desthilatdarî veguheriye dewleta netewe û ev yek bingehê kapîtalîzmê ye. Min ev rastî destnîşan kir û ev tezeke girîng bû. Eger kapîtalîzm û desthilatdarî xwe weke modela dewleta netewe bi rêxistin nekin, nikarin bibin sîstema hegemonîk û min hewl da vê yekê baş analîz bikim. Dewleta netewe yek ji wan amûrên sereke bû ku hegemonya kapîtalîst mumkîn dikir. Lewma min hewl da îspat bikim ku sosyalîzma xwe weke civaka dîrokî pêşkêş dike û weke antî-kapîtalîst nîşan dide, nabe ku xwe bisipêre heman modela dewletê ango nabe ku xwe weke dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî ava bike. Li gorî sosyalîzma jêdera wê Marks û Engels e, sosyalîzm bi tenê li ser bingehê dewletên netewe yên navendî tê avakirin. Min hewl da nîşan bidim ku ev fikrên wan şaşiyeke sîstemîk a sosyalîzma zanistî ye. Di vê çarçoveyê de min teza xwe danî holê û min got, sosyalîzm bi giştî bi dewletê û bi taybetî jî bi dewleta netewe nayê avakirin, na eger di vê de israr bê kirin, çawa ku di serî de li cem sosyalîzmên pêkhatî yên Rûs û Çînê hat dîtin, bi gelek mînakên din ên li dinyayê îspat bûye ku bi şêweyê herî riziyayî yê kapîtalîzmê bi encam dibe. Di çarçoveya vê tezê de sîstema şaristaniya navendî ya tevahiya dîrokê pêk hatiye, têgîna desthilatdariyê û şêweyên desthilatdarî û dewletê yên modernîteya kapîtalîst a serdema me bi awayekî xweser serdest e, min gelekî hewl da hûrûkûr ji hev derxim. Di dawiyê de ez gihiştim wê encamê, nabe ku sosyalîst xwedî prensîba dewleta netewe bin, der barê çareseriya neteweyî de prensîba çareseriyê ya bingehîn divê neteweya demokratîk be. Îfadeya berbiçav a vê yekê jî ezmûna KCK'ê ye.

Der barê desthilatdariyê de duyemîn sererastkirina girîng a PKK'ê der barê mijareke bêhtir berbiçav de ye. Kengî têkiliyên Kurd-Tirk di çarçoveya qewmî û dewletî de hatin nirxandin, bêhtir eşkere bû ku têkiliyên jeopolîtîk û jeostratejîk ên Anatoliya û Mezopotamyayê li ber çavan neyên girtin wê analîzên rast neyên kirin. Tevahiya dîrokê di navbera cografyayên herdu civakan de danûstendinên zêde yên çandî ku nêzîkatiyên xurt ên jeopolîtîk û jeostratejîk diyar bikin, pêk hatine. Ev têkiliyên ku nihayê û rojaneyê diyar dikin bi nêzîkatiyeke yekpare pêkan e ku rast bêne analîzkirin. Tebeqeya jor a hiyerarşîk a Kurd ku bêhtir bi pirsgirêka desthilatdarî û dewletê re rûbirû dibe, tevahiya dîrokê çarenûsa xwe bi giranî li ser bingehê xweseriyeke nîsbî timî bi desthilatdarî û dewletên ji xwe gelekî bi hêztir ve girêdaye. Pirr zêde li pey sîstemên serbixwe yên desthilatdariyê û dewletê yên xweserî civaka Kurd neçûne. Şert û mercên dîrokî û civakî di vî warî de li gorî berjewendiyên xwe di cih de nedîtine. Dîroka li derdora hezar salên dawî ya bi Tirkan re jî di vê çarçoveyê de nirxandine. Bi riza dilê xwe bi Siltanê Selçûkî Alparslan re Şerê Melazgirê gihandin serketinê û bi vî awayî li ser cografya Anatoliya û Mezopotamyayê li ser bingehê Îslamî parvekirina desthilatdarî û dewleteke nû pêk anîne. Rastiyên jeopolîtîk û jeostratejîk ên ji ber herdu cografyayan parvekirina desthilatdarî û dewleta Îslamî di navbera tebeqeyên jor ên herdu qewman de ferz kiriye. Herçiqasî di vê parvekirina desthilatdarî û dewletê de berjewendiyên gelan zêde nebin û timûtim bi berxwedanê li ber jiyana di bin banê hevpar ê desthilatdarî û dewletê de rabûbin jî li gorî pêdiviyên jiyana hevpar û ji ber şerên dînî û mezhebî yên demê bi hev re jiyane û ji vê nemane. Ev hevpartiya bi hiyerarşiya jor a qewmê Tirk re her tim bi riza dilê xwe kirine. Di nava rêûresma fethê ya Tirk de diyardeyeke bi navê fetihkirina Kurdistanê zêde nîne. Seferên fethê yên car caran hatine kirin bi alîkariya giregir û pêşengên Kurd çêbûne. Lewma ji van seferên bi vî rengî re jî mirov nikare fetih bibêje.

Ev rastiya dîrokî ya di têkiliyên Kurd û Tirk de, roja me ya îro jî ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd divê hûrûkûr bê fêhmkirin. Di dîrokê de qonaxên sereke yên van têkiliyan hene; dema Împaratoriya Osmanî bi Yavuz Siltan Selîm gav avêt polîtîkayên Rojhilat (1512-1521), dema Siltan Ebdulhemîd (1876-1909) di avakirina Alayên Hemîdiye de, dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn di dewamkirina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de, û ji van girîngtir bi pêşengiya Mistefa Kemal di dema Şerê Rizgariya Neteweyî ya modern de ev rastî hem esas bû û hem jî di encamê de diyarker bû. Piştî ku bingehê demokratîk ê Komarê hat înkarkirin û komploya 15'ê Sibata 1925'an hat destpêkirin, temsîla bi riza dilan û hevpar di desthilatdarî û dewletê de bi awayekî dîrokî û cografî pêk hatibû, cara pêşî hewl dan wê bi dawî bikin. Di beşên pêwendîdar ên parêznameyê de em dûrûdirêj li ser vê komployê rawestiyabûn û me gotibû, hêza hegemon a kapîtalîst a wê demê Împaratoriya Ingilîz Komar ji aliyê etnîk ve parçe kir û bi vî awayî hewl da herêma petrolê Mûsil û Kerkûkê bike bin destê xwe. Lewma mirov dikare bibêje di pêkanîna vê komployê de hesabên hegemonya Ingilîz ên der barê Mûsil û Kerkûkê de diyarker bûn. Projeya Ingilistanê ya mînîmûm Komar an jî dewleta netewe, çawa ku li gelemperiya dinyayê bi ser ketiye, li cografya Rojhilata Navîn, li Anatolyayê û li Mezopotamyayê jî bi ser ket. Bi tevahî

hêzên çandî, gel û heta dewletên li Rojhilata Navîn ên ji aliyê civakî û ji aliyê dewletî ve parçe bûn bi van polîtîkayan gelekî lawaz bûn, timî di nava xwe de parçe bûn û bi hev re ketin nava şer, qels bûn û bi vî awayî hegemonya Ingilîz bi şêweyekî serketî bi pêş ket.

Kengî Komar kirin antî-Kurd hingê hevgirtina ji rêûresmê jî têkçû û Kurd bi temamî li derveyî sîstemê hatin hiştin. Projeya li pêşiya tebeqeya jor a Kurd danîn ew bû, di berdêla destkişandina ji nasnameya Kurd û Kurdîtiyê de wê weke ferd-welatiyên Tirk karibin hebûna xwe biparêzin û heta ji vê jî wêdetir ew hîn kirin, eger di nava sîstemê de bixwazin bi hêz û payebilind bibin, ev yek di berdêla îmha û înkarkirina Kurdîtiyê de bi mezinkirin û pêşdebirina Tirkîtiya Spî dibe. Di nava Komarê de ji bo mirov bibe xwedî hebûn ‘qanûna hesin’ bi vî awayî tê formulekirin. Tebeqeya jor di destpêkê de hinekî serî radike û nerazîbûna xwe nîşan dide, lê sîstem paşê bi tevgerên dijwar ên ‘tedîp û tenkîlê’ vê helwestê dişkîne. Dike ku kesên xwedî vê helwestê sernerm bibin. Di dîroka civaka Kurd de belkî jî cara pêşî ye ku tebeqeya jor di berdêla îmha û înkara hebûna civaka xwe de (îstîsna pîvana giştî betal nakin), hewl dide hebûna xwe ewle û misoger bike. Êdî çiqasî ji Tirkîtiya Spî re (Ez vê têgînê bi israr bi kar tînim. Ji ber ku ji Tirkîtiya ji rêûresmê û sosyolojîk cihê ye, hegemonya Rojava bi rêbazên komployê ew diyar kiriye, beşekî sîxur e ku bi awayekî objektîf û sûbjektîf hatiye amadekirin. Bûne mîlliyetgirên tûj ên Tirk ên levanten û şêweyekî ultra ye ku heta bi dawiyê şîddet barkirî ye) xizmetê bikin wê ewqasî karibin hebûna xwe biparêzin û pêşde bibin. Beşên gel ên bê serî û serok mayî êdî tişt û eşya ne. Deriyên wan li her cure pêkanînên înkar, îmha û asîmîlasyonê vekirî ne. Kî xwe piçekî bi Kurdîtiyê bike ev tê maneya kuştin û mirinê. Terikandina Kurdîtiyê riya bi tenê ya rizgarî û jiyanê ye. Kurdîtiyê ne bi tenê weke diyarde, hewl didin tevî hemû nav û sembolên wê tesfiye bikin. Tevahiya dîroka Komarê der barê Kurdan de projeya qirkirina çandî ya sergirtî (ji bo çandên din jî bi heman rengî ye, lê proje bi awayekî bingehîn der barê Kurdan de ye) roj bi roj gav bi gav hat pêkanîn. Armanca sereke ya tevahiya polîtîkayên hundir û derve ew e, di çarçoveya vê ‘qanûna hesin’ de xizmetê bikin. Ji ber ku bi giranî bi dizî tên meşandin, bêyî ku haya me ji van polîtîkayan hebe partî, rêxistinên civaka sivîl, ekonomî û cîhana siyasetê ya em pêk tînin li heman ‘qanûna hesin’ endeks dibin. Organîzasyonên derve yên weke NY, NATO û YE’yê jî di çarçoveya heman ‘qanûna hesin’ de têne nirxandin. Di darbe, komplo, reşkujî, her cure êşkence û girtinan de para vê qanûnê diyarker e.

**a-** Di dema derketina holê ya PKK’ê de bîreweriya der barê van rastiyan de gelekî bi sînor e. Yekparetiya çandî di navbera Anatoliya û Mezopotamyayê de, yekîtiya jeopolîtîk û jeostratejîk, bandora wan li ser têkiliyên Kurd û Tirk zêde nehatiye fêhmkirin. Polîtîkayên dewleta netewe ya mînîmûm a hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst Ingilistan û DYE’yê çawa bandor li tevahiya zanistên civakî kirine, herwisa bandor li sosyalîzma zanistî jî kirine. Di vê de tişta para PKK’ê jî ket dewletdariya netewe ya sosyalîst bû. Bi xwerexnekirineke bingehîn ji vê jirêderketinê ango dewleta netewe bihurî. Çepgiriya li gelemperiya dinyayê û Çepgiriya Tirkiyê

bi sedema ku nikarîbûn ji vê jirêderketinê bibihurin bivênevê ji hev de ketin. Sedema sereke ya pêxîrtengiya sosyalîzmê ku hê dewam dike, ev mijar e ku nikare ji navê derkeve.

**b-** PKK'ya vediguhere li ser bingehê pirsgirêka Kurd modela nû ya çareseriyê ji pirsgirêkên neteweyî re aniye ji her cure dewletdariya netewe şuştî ye, û navê wê jî neteweya demokratîk e. Di kapîtalîzmê de şêwazê avakirina neteweyan divê ji qanûna kara herî zêde re xizmetê bike. Ji bo vê jî hedefa dînê nû yê moderníteyê mîlliyetgirî ye û wekî din hedefa wê dewleta netewe ye. Mîlliyetgirî dewleta netewe, dewleta netewe jî mîlliyetgiriyê derdixe holê. Dema pêxîrtengiya kapîtalîzmê zêde dibe, mîlliyetgirî û dewleta netewe faşîst dibin. Sosyalîzm çiqasî ji mîlliyetgiriya kapîtalîzmê û dewleta netewe ya rê li ber vekiriye bibihure wê ewqasî karibe xwe bike alternatîf û weke sîstem bi pêş bixe. Ev jî bi neteweya demokratîk û ekonomiya bazara civakî ya bê kar dibe; li hemberî îndustriyalîzma kapîtalîzmê ya bi armanca kara herî zêde îndustriya ekolojîk e.

**c-** Di pirsgirêka Kurd de navê modela çareseriya neteweya demokratîk KCK ye; ji dewletdariya netewe şuştî ye, ne bi tenê ji bo Kurdan ji bo tevahiya komên etnîk û neteweyî ye. KCK di vê çarçoveyê de tê pêşniyarkirin û pratîzekirin. Tevahiya dîroka moderníteya kapîtalîst di hemû demên pirsgirêkên neteweyî de weke riya bi tenê ya çareseriyê dewleta netewe hatiye ferzkirin û vê şêwazê çareseriyê dîrok kiriye gola xwînê. Çareseriya dewleta netewe, ne riya çareseriya pirsgirêkan e, riya kûrkirin, dijwarkirin û mezinkirina şeran e, bi vî awayî kara herî zêde û îndustriyalîzmê pêk tîne û domdar dike. Ji bo KCK'yê riya aştî û çareseriyê terikandina sêlingên distanê yên moderníteya kapîtalîst (dewleta netewe, kara herî zêde û îndustriyalîzm) û li dijî wan weke alternatîf danîna hêmanên moderníteya demokratîk (neteweya demokratîk, ekonomiya bazara civakî ya bê kar û îndustriya ekolojîk) e.

**d-** Di serî de dewleta netewe ya Tirk, dewletên netewe yên Îran, Iraq û Sûrî û heta Dewleta Federe ya Kurd, eger di pirsgirêka Kurd de bi nêzîkatiya aştiyane û siyasî mafê gelê Kurd ê netewebûyîna demokratîk nas bikin (ev maf ji bo gelên din in jî) û weke encameke xwezayî ya vî mafî statuya rêveberiya xweseriya demokratîk qebûl bikin hingê çareserî mumkîn dibe. Yekîtiya Ewrûpayê ku welatê çareseriyên dewleta netewe ye, ji niha ve deriyên xwe li çareseriyên neteweya demokratîk vekirine û ev gaveke erênî ye, û hêviyê bi mirov re çêdike. Ji bo karibe vê çareseriyê pêşde bibe divê gav bi gav qadê li dewleta netewe teng bike û qada civaka sivîl a demokratîk berfireh bike. Eger dewletên netewe yên Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûrî dixwazin ji pirsgirêka Kurd rizgar bibin, divê weke gava pêşî bikevin riyeke mîna ya Yekîtiya Ewrûpayê. Li ser vî bingehî pozîsyona KCK'ê derfet û îmkanê dide çareseriya siyasî û aştiyane. Projeya qirkirina çandî ya sergirtî, polîtîka û pêkanînên wê yên ku ev dewlet li ser Kurdan ferz dikin, li pêşiya aştî û çareseriya siyasî asteng in. Eger dev ji kirinên xwe berdin û di serî de neteweya demokratîk hêmanên din ên bingehîn ên moderníteya demokratîk ango ekonomiya bazara civakî ya ku karê

bi sînor dike û îndustriya ekolojîk, entegrekirina wan bi sîstemê re û gihandina wan a statuyê (Destûra Bingehîn a Demokratîk) qebûl bikin, hingê rê li ber aştiyeke mayînde û çareseriya siyasî vedibe.

**e-** Hegemonya kapîtalîst a global du şêweyên çareseriyê di çarçoveya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de li ser dewletên netewe yên ku qirkirina çandî pêk tînin ferz dike û ji du aliyan ve dixwaze çareseriyê pêk bîne. Ya yekê, dewleta netewe ya federe ya Kurd a navenda wê Hewlêr e, û di dema dirêj de weke gava pêşî ya çareseriya dewleta netewe pêk tînin. Ya dudiyan, çareseriya pirsgirêka Kurd li ser bingehê 'mafên ferdî û çandî' ye ku navenda vê jî Amed e. Yekîtiya Ewrûpayê û DYE vê projeyê nexasim bi destê Hukûmeta AKP'ê dixwazin bi cih bînin û yekser an jî neyekser hewl didin vê projeyê bi Dewleta Federe ya Kurd a Hewlêrê re bi hev re bi awayekî yekpare bimeşînin. Di berdêla rizgarbûna ji PKK'ê û çareseriya siyaseta demokratîk a bi KCK'ê berbiçavbûyî de, van herdu çareseriyan li ser dewletên netewe yên qirkirina çandî pêk tînin, ferz dikin. Ev projeyên çareseriyê ku hegemonya kapîtalîst a global wan ferz dike, ji ber ku ji desteka gel qut in, şensê wan ê serketinê nîne.

Kurdistan ji niha ve di sedsala 21. de bi awayekî bûye navenda şoreş û dijşoreşê. Xeleka herî qels a moderníteya kapîtalîst e. Pirsgirêkên civakî û neteweyî yên gelê Kurdistanê ewqasî giran bûne bi rêçeteyên lîberal, bi demagojiyên mafên ferdî û çandî ser wan nayê girtin. Em dema behsa pirsgirêka Kurd dikin, hem ji bo neteweyên bindest hem jî ji bo neteweyên serdest dewletdariya netewe ya rê li ber pêkanînên gihiştine qirkirinê vekiriye, ne ku pirsgirêkan çareser dike ji mêj ve bûye cihê pirsgirêk jê çêdibin. Dewletdariya netewe dest pê kiriye ji bo moderníteya kapîtalîst jî dibe pirsgirêk û êdî her ku diçe ji hev de dikeve. Bûyerên neteweyî yên demokratîk ên bêhtir nerm, di serê bûyerên çareserker ên demê de tên. Moderníteya demokratîk îfadeya teorîk a bûyerên bi vî rengî û gavavêtinên wê yên pratîkî ye. KCK weke îfadeya berbiçav a veguherînên neteweyî yên demokratîk ên li Kurdistanê, riya çareseriya moderníteya demokratîk a Rojhilata Navîn rohnî dike.

**f-** Çareseriya KCK'ê roja me ya îro li serê duriyan e. Yan pirsgirêk ê bi riya siyaseta demokratîk û aştiyane bi rêbaza destûra demokratîk bêne çareserkirin ango di vê rewşê de dewletên netewe yên pêwendîdar wê ne bi tenê dest ji polîtîkayên îmha û înkarê bikişînin wê bi awayekî realîst danasîna pirsgirêkê qebûl bikin û çareseriya wê jî di destûra demokratîk a gerdûnî de bibînin, hem naverok û hem jî rêbaza destûra demokratîk wê bi muxateban re parve bikin. Ji bo vî şêweyê çareseriyê ku welatan hem weke dewlet û hem jî weke netewe yekpare dike, divê veguherînên radîkal bibin. Yan jî ev riya dil dixwaze pêşî pêk bê were astengkirin, hingê riyek dimîne; KCK wê bi awayekî yekalî û şêwazekî şoreşgerî otorîteya xwe ya demokratîk ava bike û biparêze. Gelek hêman hene ku ji bo di vê riyê de bi awayekî serketî bimeşe. Bi rêbertiya îdeolojîk û polîtîk a PKK'ê ya xwedî tecrûbeya ji sîh salan zêdetir, bi desteka xurt a bi şerê gel ê

şoreşgerî hatiye ceribandin, bi hêza xwe ya eskerî ya pê dikare xweparastinê li her qadê bike, bi tevna xwe ya berfireh a têkiliyan li derve û hundir, mumkîn dibe ku KCK neteweya demokratîk ava bike, bi rê ve bibe û biparêze. Ev rê wê careke din weke berê nexitime. Ji ber ku ne netewetiya dewletê, lê neteweya demokratîk armanca wê ye, her tim wê alîgirê aştî û çareseriyê be, wê bi hêzên dewleta netewe re deriyên wê li diyalog û muzakereyan vekirî be û di vê de jî bi ser nekeve wê li riya xwe ya rast, bi hêzên xwe, zanibe neteweya demokratîk bi awayekî serketî ava bike, bi rê ve bibe û biparêze.

**C- KCK û ŞAXÊN NETEWEBÛYÎNA DEMOKRATÎK**

Mafê neteweyan heye çarenûsa xwe diyar bikin. Di pirsgirêka Kurd de KCK vê yekê îfade dike. Li derveyî dewletê bi awayekî demokratîk vê yekê îfade dike. Di vê çarçoveyê de KCK dibe şîroveya demokratîk a vê rastiyê. Lewma di çareserkirina pirsgirêka neteweyî de divê weke veguherîneke bi kok bê nirxandin. Timî hewl dane bi paradîgma û zêhniyetên mîlliyetgir û dewleta netewe pirsgirêkên ku modernîteya kapîtalîst rê li ber wan vekirine çareser bikin. Dewleta netewe bi xwe weke aktorê sereke yê çareseriyê hatiye pêşkêşkirin. Dema ku pirsgirêka neteweyî tê gotin a yekser tê bîra mirov fikra “bila dewlekteke me jî ya neteweyî hebe” ye. Hema bêje ji bo her etnîsîte û neteweyî li dewletekê tê fikirîn. Xwediyê vê fikir û nêzîkatiyê Ingilistan e. Ji ber ku li nava dinyayê dixwaze bibe hegemon, li pêşiya xwe dewletên mezin ên mîna împaratoriyan û dewletên piçûk ên mîna dewletên bajaran weke asteng dîtiye li pêşiya polîtîka xwe ya ‘parçe bike-bi rêve bibe’. Dewleta netewe rêxistinkirineke desthilatdariyê ya hegemonya xwe disipêre sîstema kapîtalîst e; ji bo kara herî zêde û pêkanîna îndustriyalîzmê rêxistiniya dewletê ya herî di cih de ye. Ji bo mirov bi awayekî rast li dewletên netewe serwext bibe divê mirov cihê wan ên di nava sîstema hegemonîk de û têkiliyên wan bi kapîtalîzm û pîşesaziyê re rast ji hev derxe. Eger mirov bibêje, ji her etnîsîte yan jî ji her mezheb û qewmî re dewletek divê, hingê mirov ji globalbûna kapîtalîzmê re ango ji mezinbûna mêtinkarî û îndustriyalîzmê re (ji xirakirina ekolojiyê re) xizmetê dike. Lewma me bi israr anî ziman ku bi vê xizmet û alîkariyê sosyalîzma pêkhatî ji hev de ket. Dîsa me hewl da em diyar bikin ku PKK dema ket ser rê sîstema sosyalîzmê kir bingehê xwe û di pirsgirêka neteweyî de xetimî û sedema vê heman nêzîkatî bû. Me diyar kiribû ku di vê mijarê de PKK’ê xwe rexne kiriye û veguheriye. Di pirsgirêka neteweyî de dema em veguherîn dibêjin xeta wê ev e, divê dev ji dewleta netewe bê berdan û weke alternatîf çareseriya demokratîk esas bê girtin. Mebest ji çareseriya demokratîk jî li derveyî dewletê lêgerînên ji bo demokratîkbûyîna civakê ne. Di pirsgirêkên civakî de divê mirov dewleta netewe weke têgîn tevî kapîtalîzmê ne weke çareserî, lê weke jêder û çavkaniya ku pirsgirêkan bêhtir dike, binirxîne.

Girêdana pirsgirêkên civakî û neteweyî bi dewleta netewe ve aliyê herî zordar ê modernîteyê pêk tîne. Ji amûreke ku bi xwe rê li ber pirsgirêkan vedike bendewariya çareseriyê, dike ku

pirsgirêk mîna çiyan mezin bibin û dibe sedem kaosa civakî pêk bê. Kapîtalîzm bi xwe qonaxa herî bi krîz a sîstema şaristaniyê ye. Dewleta netewe ya di vê qonaxê de xistine rojevê tevahiya dîroka civakê rêxistina şîddetê ya herî bipêşxistî ye. Bi wê, şîddeta desthilatdariyê dor li tevahiya civakê digire û dibe amûrek ku hawîrdor û civaka bi kara herî zêde ya kapîtalîzmê û îndustriyalîzmê ji hev de dikeve, bi darê zorê bi hev ve digire. Gelekî zêde bi şîddetê bar kiriye, ev ji ber meyla sîstema kapîtalîzmê ya ji bo kara herî zêde û daneheva bê navber e. Rêxistiniyeke şîddetê ya tîpa dewleta netewe nebe qanûnên daneheva kapîtalîst naxebitin, îndustriyalîzm nikare were dewamkirin. Di serdema kapîtalîzma fînansê ya global de ku qonaxa dawî ye em gihiştinê, civak û hawîrdor tam bi têkçûnekê re rûbirû ne. Pêxîrtengiyên di destpêkê de dewrewî bûn, karektereke domdar û avabûnê girtine. Di vê rewşê de dewleta netewe bi xwe jî bûye astengek ku sîstem bi temamî kilît kiriye. Tevî ku kapîtalîzm bi xwe avahiyeke bi krîz e, di rêza pêşî ya rojeva xwe de rizgarbûna ji dewleta netewe daniye. Serweriya dewleta netewe bi tenê çavkaniya pirsgirêkên civakî nîne, li pêşiya çareseriyê jî astengiya sereke ye. Sîstemeke ji bo çîna kapîtalîst a serwer bi vî rengî be, mirov wê çawa ji bo civak, gelan û kedkaran weke amûrekî çareseriyê lê bifikire ev bi xwezaya civakê re li hev nake, ev tê wê maneyê ku mirov xwezayê înkar dike. Pirsgirêkên neteweyî parçeyê herî girîng ê pirsgirêkên civakî ne, lewma ji bo ku çareseriya wan hem li gorî xwezaya civak, gel û kedkaran be, hem jî bi sedema dewleta netewe li pêşiya sîstema hegemonîk dibe asteng, divê modela demokratîk esas bê qebûlkirin.

Modela çareseriya demokratîk bi tenê alternatîfeke çareseriyê nîne, rêbaza çareseriyê ya sereke ye. Eger tevgerên rizgariya neteweyî û sosyalîst dixwazin bi ser bikevin, divê ji bilî demokrasiyê li amûreke din a çareseriyê negerin. Her cure meylên dîktatoriyê yên çepgir, rastgir û navend bi tenê çaresernekirinê kûr dikin; kapîtalîzmê bêhtir talanker, şêlanker û ferazî dibe. Divê mirov li modela çareseriya demokratîk weke şêweyê federe an jî konfedere yê dewleta netewe ya unîter nefikire. Şêweyê federe û konfedere yê dewleta netewe çareseriya demokratîk nîne. Ev jî çareseriyên şêweyên cuda yên dewletê ne, dîsa ji girankirina pirsgirêkan bêhtir bi roleke din ranabin. Belkî di nava mentiqê sîstema kapîtalîst de dewleta netewe ya hişk a navendî veguhere şêweyên federe û konfedere û bi vî awayî pirsgirêk nerm bibin û hinekî çareser bibin, lê bi awayekî bingehîn pirsgirêkan çareser nake. Di navbera hêzên çareseriya demokratîk û dewleta netewe de şêweyên federe û konfedere weke amûrên çareseriyê bêne ceribandin. Lê dema ev amûr hatin bikaranîn mirov li benda çareseriyên bingehîn be, mirov ê careke din xwe bixapîne. Xwexapandina yekê dewleta rizgariya neteweyî bû yan jî dewleta sosyalîzma pêkhatî bû ku em jêre dewleta netewe dibêjin, lê em dizanin ku ew bi maskeya çepgiriyê ye. Pirr baş derketiye holê ku ev sîstemên li gorî dîktatorî û faşîzmê ne.

Divê ez bi girîngî bibêjim, modela çareseriya demokratîk bi temamî ji dewleta netewe serbixwe nîne. Dewleta netewe û demokrasî weke du otorîteyan dikarin di bin heman banê siyasî de bi rola xwe rabin. Destûra demokratîk qada bibandorbûnê ya herduyan diyar dike. Tevî ku Yekîtiya

Ewrûpayê di vî warî de hinek gav avêtin jî, lê li cem wan aliyê serdest serweriya dewleta netewe ye. Lê li gelemperiya dinyayê em dibînin ku rewş her diçe ji dewleta netewe dûr dikeve. Li dinyayê veguherîna siyasî ya herî bingehîn ji aliyê teorîk û pratîk ve dûrketina ji dewleta netewe ye. Çareseriya demokratîk xwe çiqasî xweser û sîstematîze bike ewqasî dikare alîkariya veguherîna siyasî bike. Bi pêşdebirina demokratîkbûn, rêveberiyên xweseriya demokratîk, avakirina neteweya demokratîk, demokrasiya herêmî û çanda demokrasiyê li tevahiya qadên civakî ji nêz ve têkiliya xwe bi veguherîna erênî ya dewleta netewe ve heye.

KCK di pirsgirêka Kurd de îfadeya berbiçav a çareseriyê ye. Ji nêzîkatiyên ji rêûresmê cuda ye. Çareseriyê di pargirtina ji dewletê de nabîne. Heta ji bo Kurdan di çarçoveya xweseriyê de li pey dewletê nîne. Dewleta federe yan konfedere armanca wê nîne û weke çareseriya xwe nabîne. Tişta ji dewletê dixwaze ew e, dewlet bihêle Kurd bi îradeya xwe ya azad xwe bi rê ve bibin, ji bo bibin civaka demokratîk li pêşiya wan nebe asteng. Eger dewletên netewe yên serdest ne di gotinê de lê bi prensîbî bi demokrasiyê ve girêdayî bin, destekê nedin civaka demokratîk jî divê wê asteng û qexede nekin. Dewlet an jî hukûmet çareseriya demokratîk pêk nayînin. Ji çareseriyê hêzên civakî bi xwe berpirsiyar in. Hêzên civakî bi dewlet an hukûmetan re di çarçoveya destûra demokratîk de li riyên lihevkirinê digerin. Di navbera hêzên civakî yên demokratîk û hêzên dewlet an hukûmetan de parvekirina rêveberiyê bi destûran diyar dibe. Ne realîst e ku rêveberiya mutleq a dewletê bê xwestin û dîsa ne realîst e ku demokrasiya mutleq bê xwestin, ev li gorî giyan û ruhê çareseriyê nîne.

Çareseriya demokratîk bi xwe netewebûyîna demokratîk e, û civak xwe weke civaka neteweyî ya demokratîk ava dike. Ne bi destê dewletê dibe netewe û ne jî bi destê wê ji netewebûnê derdikeve; civak bi xwe mafê xwe yê avakirina neteweya demokratîk bi kar tîne. Di vê rewşê de divê mirov netewe ji nû ve bide naskirin. Beriya her tiştî divê ez bibêjim, danasîneke bi tenê ya netewe tineye. Dema bi destê dewleta netewe bê avakirin, danasîna giştî ya netewe dewleta netewe ye. Dema hêmana tîne cem hev ekonomî be, hingî mumkîn e mirov ji vê re bibêje neteweya bazarê. Neteweya huqûq li ser serwer be ew neteweya huqûq e. Danasîna neteweya polîtîk û çandî jî pêkan e. Civaka dîn tîne cem hev jixwe jêre millet tê gotin. Ji koma milletên ji heman dînî re jî ummet tê gotin. Neteweya demokratîk jî ew e, kom û ferdên azad bi îradeya xwe civaka hevpar pêk tînin. Li cem neteweya demokratîk hêza mirovan tîne cem hev îradeya azad a ferd û koman e ku pê biryarê didin ku wê di heman neteweyî de bi yek bin. Têgihiştina neteweya hevpar bi ziman, çand û dîrokê ve girê dide, neteweya dewletê terîf dike û nabe bê giştîkirin ango bi têgihiştina tek neteweyekî nabe bê mutleqkirin. Ev têgihiştina netewe ya ku sosyalîzma pêkhatî jî ew qebûl kiribû, dijberê têgihiştina neteweya demokratîk e. Nexasim ev terîf li Rûsya Sovyetê ji aliyê Stalîn ve hat xurtkirin û yek ji sedemên bingehîn ê jihevdeketina Yekîtiya Sovyetê ye. Ev terîf û danasîna netewe ya ku modernîteya kapîtalîst ew mutleq kiriye heta li dawiyê nemîne, pirsgirêkên neteweyî wê tam bixetimin. Ev demek e ji sêsed salî zêdetir e

ku pirsgirêkên neteweyî hê jî bi giraniya xwe hemûyî dewam dikin û ev ji nêz ve bi vê terîfa kêm û mutleq re têkildar e.

Civakên neteweyî yên bi vî rengî ku di nava sînorên dewleta netewe de mehkûm bûne û desthilatdarî ketiye nava wan heta bi şaneya wan a herî piçûk bi îdeolojiyên mîlliyetgir, cinsiyetparêz û pozîtîvîst mîna gêjan bûne. Ji bo civakan modela dewleta netewe tam şebekeyeke zordestî û mêtinkariyê ye. Têgîna neteweya demokratîk vê terîf û danasînê berevajî dike. Terîfa neteweya demokratîk bi şîroveya tek ziman, çand, dîn, dîrok û sînorên şidandî yên siyasî ve ne girêdayî ye, jiyana hevpar a kom û welatiyên li cem hev û piştgiriya hev bi awayekî azad, plural û wekhev dikin, îfade dike. Civaka demokratîk bi tenê bi modeleke netewe ya bi vî rengî pêk tê. Civaka dewleta netewe ji ber xwezaya wê deriyên wê li demokrasiyê girtî ne. Dewleta netewe ne rastiyeke gerdûnî ne jî rastiyeke xwecihî îfade dike; berevajî tê maneya înkarkirina gerdûnîbûn û xwecihbûnê. Civaka tek tîpkirî ya welatiyan mirina mirov e. Li beramberî vê, neteweya demokratîk ji nû ve avabûna xwecihî û gerdûnî mumkîn dike. Dihêle ku rastiya civakî xwe îfade bike. Danasînên netewe yên din hemû di navbera van herdu modelên sereke de li cihekî radiwestin.

Herçiqasî terîfên modelên avakirina neteweyan li guherên berfireh hebin jî mirov dikare danasîneke giştî ya hemûyan bîne cem hev bike; ew jî danasîna netewe ya têkildarî zêhniyet, bîr û baweriyê ye. Di vê rewşê de mirov dikare bibêje, netewe ji koma mirovan a xwedî zêhniyeta hevpar pêk tê. Di vê danasîna netewe de ziman, dîn, çand, bazar, dîrok û sînorên siyasî diyarker nînin, ew bi rola gewde radibin. Bi awayekî bingehîn divê mirov netewe weke rewşeke zêhniyetê bide nasîn û ev xwedî karektereke dînamîk e. Di neteweya dewlet de mîlliyetgirî mohra xwe li zêhniyeta hevpar dide, lê di neteweya demokratîk de bîreweriya piştgirî û azadiyê mohra xwe li zêniyeta hevpar dide. Lê netewe bi tenê bi rewşên xwe yên zêhnî bêne terîfkirin ev danasîn wê kêm be. Çawa ku zêhniyet bê gewde nabin, netewe jî bê gewde nabin. Neteweyên xwedî zêhniyeta mîlliyetgir gewde û bedena wan saziyên dewletê ne. Jixwe ji ber vî gewdeyê wan ji van neteweyan re dewleta netewe tê gotin. Dema ku saziyên huqûq û ekonomiyê derkevin pêş û bibin xwedî giranî, mirov dikare neteweyên bi vî rengî weke neteweyên huqûq yan jî neteweyên bazarê destnîşan bike. Gewdeyê neteweyên xwedî zêhniyeta azadî û piştgiriyê xweseriya demokratîk e. Bi awayekî bingehîn xweseriya demokratîk ew e, kom û ferdên zêhniyetên weke hev parve dikin xwe bi îradeyên xwe bi rê ve dibin. Mirov dikare ji vê re rêveberiya demokratîk an otorîteya demokratîk jî bibêje. Danasîn û terîfeke deriyên wê li gerdûnîtiyê vekirî ne.

Di çarçoveya vê danasîna giştî ya netewe de KCK di çareseriya pirsgirêka neteweyî ya Kurd de nêzîkatiyên neteweya dewlet red dike, modela neteweya demokratîk, mafê netewebûyîna Kurd an veguherîna diyardeya civaka neteweyî bi xweseriya demokratîk pêk tîne. Li vir bi neteweyên

din re, mînak bi neteweya Tirk re li terîfeke netewe ya jor vekirî ye, terîfa netewe ya tek gewdeyî mewzûbehs e. Mirov dikare terîfa neteweya jor bi awayekî ku gelek neteweyan bihewîne berfireh bike. Mirov dikare li ummeta Îslamê weke prototîpa vê terîfê bifikire. Îhtîmaleke gelekî xurt e ku Rojhilata Navîn çandên xwe yên civakî çi zû çi dereng bi millet an jî neteweyekî hevpar (ummeta nûkirî) bîne cem hev.

Mirov netewebûyîna Kurdan di çarçoveya van têgînên bingehîn de beriya her tiştî dikare ji du aliyan ve bifikire. Ya yekê, aliyê zêhnî ye. Divê Kurd ziman, çand, dîrok, ekonomî û deverên lê zêde paşguh nekin û der barê van qadên bingehîn de bi bîrewerî rabin ango em behsa hebûnekê dikin ku bi dinya zêhnî (CÎHANA ZÊHNÎ YA HEVPAR) ya bi hisên hevpar ên piştgiriyê têne cem hev û parve dikin. Li vir krîtera bingehîn ew e, proje û xeyaleke dinya xwe bisipêre cihêrengiyên wekhev û azad bi awayekî zêhnî bê parvekirin. Mirov ji vê cîhana zêhnî re dikare bibêje utopya an cîhana komin a ferdên azad. Ya girîng ew e, zêhniyeteke azadî û wekheviyê ya cihêrengiyan red nake di qada gelemperiyê de, di cîhana polîtîk û exlaqî ya civakê de TIMÎ pêk bîne. JIYANA BÎSTÛÇAR SAETAN BI ZÊHNIYETA DEMOKRATÎK E. Ya dudiyan, gewde û bedena cîhana zêhniyet ê xwe bisipêriyê. Li vir mebesta me ji gewde û bedenê ew e, li gorî cîhana zêhniyetê ya heyîna civakî xwe bisipêriyê civak ê çawa bê birêxistinkirin? Heyîna bedenî bi kîjan mîmariyê bê avakirin? Bi kurtî, xwezaya civakî û hawîrdora wê ya ji rabihuriyê mayî û modernîteya kapîtalîst ew li gorî armancên xwe gelekî bi nexweşî, bi krîz, bi zordestî û bi mêtingeriyê (Divê mirov pêkanînên gihiştine radeya qirkirina çandî jî li vê zêde bike) bi rêxistin kiriye an jî bê rêxistin kiriye ji nû ve divê bê rêxistinkirin û ev gewde û bedenê terîf dike.

Ji ber ku aliyê zêhnî piştgiriya hestî û cîhana xeyal û fikrî ya kom û ferdên dixwazin bibin netewe eleqedar dike, divê bi awayekî bi sînor were birêxistinkirin. Ji bo vê, pêwîst e ku perwerdeya zanist, felsefe û hunerê (dîn jî di navê de) bê pêşdebirin û bi vê armancê ji xebatên pratîk ên sereke vekirina dibistanan e; erka wan e ku di warê netewe de perwerdeya zêhnî û hestan bidin. Bi qasî ku li hebûna civakî-dîrokî serwext dibe li têkiliya çanda civakî ya niha bi serdemê re serwext dibe û aliyên wê yên rast, xweşik û baş bi hest û fikrên hevpar parvekirin esas e. Xulase, erka bingehîn a zêhnî di rewşa berbiçav a KCK’ê de ew e, Kurdan der barê hebûna wan de, li cîhana hest û fikrên BAŞ, RAST Û XWEŞIK ên hevpar têne parvekirin weke neteweyekî tesewirkirin e. Bi gotineke din, divê bi şoreşa zanistî, felsefî û hunerî netewebûyîna Kurdan, cîhana bingehîn a hest û zêhniyeta vê netewebûyînê biafirîne; ravekirina heqîqeta rastiya Kurd bi zanistî, felsefî (îdeolojîk) û hunerî bi awayekî azad parve bike. Riya vê jî ew e, divê mirov bi xwe bifikire, perwerdeya xwe bibîne, başiyê parve bike û xweşikiyê pêk bîne. Di asta zêhnî de xusûsa bingehîn a divê dewletên netewe pêk bînin ew e, divê bi azadiya fikir û îfadeyê ve tam dilsoz bin. Eger dewletên netewe dixwazin di bin normên hevpar de bi Kurdan re bimînin, divê azadiya fikir û îfadeyê bi destûra bingehîn misoger bikin û pêve tam girêdayî bimînin û bihêlin

Kurd cîhana xwe ya zêhnî û hestî pêk bînin û li ser bingehê cihêrengiyan xwe weke civakeke neteweyî çêkin. Neteweya hevpar bi girêdana tam a bi azadiya fikir û îfadeyê çêdibe.

Aliyê duyemîn ê netewebûna demokratîk ji aliyê gewde û hebûnê ve rêxistina hebûnê ye. Di bingehê alî û şaxê bedenî de xweseriya demokratîk heye. Mirov dikare xweseriya demokratîk di çarçoveyeke teng û fireh de bide nasîn. Di çarçoveya fireh de xweseriya demokratîk neteweya demokratîk îfade dike. Li guhereke berfirehtir şaxên neteweya demokratîk hene. Mirov dikare wê bi şaxên çandî, ekonomîk, civakî, huqûqî, dîplomatîk û şaxên din bi firehî bide nasîn. Di çarçoveya teng de xweseriya demokratîk şaxê siyasî îfade dike, bi gotineke din tê maneya otorîteya demokratîk an jî birêveberiya demokratîk. Ji bo netewebûyîna demokratîk şaxê xweseriya demokratîk ji bo dewletên netewe yên serwer bêhtir bi pirsgirêk e. Dewletên netewe yên serwer bi giştî xweseriya demokratîk qebûl nakin. Heta neçar nebin naxwazin weke mafekî nas bikin. Ji bo Kurdan jî li hev hatin bi dewletên netewe yên serwer re li ser bingehê pejirandina xweseriya demokratîk dibe. Ji bo jiyaneke hevpar a li bin banekî siyasî bi dewletên netewe yên bi etnîsîte serdest, xweseriya demokratîk şertê herî kêm e. Tercîheke di bin vê re wê pirsgirêkê çareser neke, berevajî wê çaresernekirinê xurt bike û şer zêde bike. Nexasim di van demên dawiyê de projeya kapîtalîzma Ingilîz a ji bo çînên karker û mêtingehên xwe bêhtir bi hêsanî bi rê ve bibe bi navê 'mafên çandî û ferdî yên lîberal' pêk aniye, li Komara Tirkiyê jî dixwaze bi destê AKP'ê pêk bîne. Ev projeya ku ji çanda Rojhilata Navîn re xerîb e, bi tenê wê şer û pevçûnê mezin bike. Xweseriya demokratîk projeyeke çareseriyê ye, ji bo dewletên netewe jî ya herî kêrhatî ye. Her fikir û ezmûna di bin vê re ji şer re û ji rewşa pevçûnê re ku mezin dibe, xizmet e.

Mirov dikare çareseriya xweseriya demokratîk bi du riyan pêk bîne: Ya yekê, li ser bingehê lihevhatina bi dewletên netewe re ye. Çareseriya wê ya berbiçav bi destûra bingehîn a demokratîk tê îfadekirin. Ji mîrateya civakî-dîrokî ya gel û çandan re rêzê digire. Azadiya rêxistinî û xweîfadekirinê ya van mîrateyan ji mafên bingehîn ên destûrî yên dest ji wan nabe, dihesibîne. Xweseriya demokratîk prensîba bingehîn a van mafan e. Şertên sereke yên vê prensîbê ew in, divê dewleta netewe ya serwer dest ji her cure polîtîkayên îmha û înkarê bikişîne û neteweya bindest jî divê fikra xwe ya avakirina dewletoka xwe ya netewe biterikîne. Heta herdu netewe van meylên xwe yên dewletparêz neterikînin, zor e ku projeya xweseriya demokratîk were pêkanîn. Welatên Yekîtiya Ewrûpayê di encama ezmûna xwe ya dewleta netewe ya ji sêsed salî zêdetir de qonaxa gihiştinê ew e, di çareserkirina pirsgirêkên herêmî, neteweyî û hindikayî yên dewleta netewe de modela herî baş xweseriya demokratîk qebûl dikin. Li derveyî vê riyê hemû riyên din an pirsgirêkan paş ve dixin û bi vî awayî xetimînê xurt dikin an jî rê li ber şerên dijwar û ji hev dûrketinê vedikin. Dîroka pirsgirêkên neteweyî bi mînakên bi vî rengî tijî ye. Welatên Yekîtiya Ewrûpayê şêst salên xwe yên dawiyê di nava dewlemendî û xweşhaliyê de derbas dikin. Ji ber ku kengî xweseriya demokratîk qebûl kirin, karîbûn bi

helwestên nerm û afirîner nêzî pirsgirêkên neteweyî, herêmî û hindikayiyan bibin. Lê li cem Komara Tirkiyê berevajiyê vê dibe. Bi polîtîkayên îmha û înkarkirina Kurdan dixwazin dewletdariya netewe temam bikin. Ji ber vê yekê Komar anîn ber jihevdeketinê, rê li ber pirsgirêkên mîna çiyan mezin vekirin, kirin ku timî rewşa krîzê hebe, her deh salan carekê serî li darbeyên eskerî didin û Komar xistin nava rejîmeke şerê taybet ê Gladîo. Eger dewleta netewe ya Tirk dest ji van polîtîkayên bi vî rengî yên hundir û derve hemûyan û pêkanînên rejîmê bikişîne, bi giştî hemû çandan (çanda Tirk û Tirkmenan jî di navê de) û bi taybetî jî xweseriya demokratîk a hebûna çanda Kurd her ku qebûl bike, wê karibe weke komareke demokratîk û laîk a normal (huqûqî) bigihîje xweşhalî, dewlemendî û aştiya mayînde.

Riya duyemîn a çareseriya xweseriya demokratîk li ser bingehê lihevhatina bi dewletên netewe re nîne, projeya xwe bi awayekî yekalî bi cih tîne. Di çarçoveyeke berfireh de alî û şaxên xweseriya demokratîk bi cih tîne, mafê netewebûyîna demokratîk a Kurdan pêk tîne. Bêguman dewletên netewe yên serwer wê vê riya yekalî ya netewebûyîna demokratîk qebûl nekin û şer ê zêde bibin. Di rewşeke bi vî rengî de dewletên netewe çi yek bi yek çi jî bi awayekî hevpar (mînak Îran-Sûrî-Tirkiye) wê êrîş bikin. Li hemberî van êrîşan gelê Kurd 'ji bo hebûna xwe biparêze û ji bo bi awayekî azad bijî neçar e ku bikeve pozîsyona şer û seferberiya topyekûn.' Eger di nava şer de lihevhatinek muhtemel bibe yan heta serxwebûn çêbibe, li ser bingehê xweparastinê wê bi tevahî şaxên netewebûyîna demokratîk bi hêza xwe bi pêş bixin, pêk bînin û wê di vê de texsîr nekin.

Neteweya demokratîk a li ser van herdu şaxên bingehîn dikare ava bibe mirov alî û şaxên wê bi berfirehî dikare weha rêz bike:

**1- Di Neteweya Demokratîk De Ferd-Welatiyê Azad û Jiyana Komin a Demokratîk**

Ez dema şax û aliyên jiyana neteweyî ya demokratîk diyar bikim, ji bo em nekevin şaşiyekê ji niha ve divê ez di xusûsekê de hişyar bikim. Ew jî ev e; neteweya demokratîk an jî cureyeke din a jiyana neteweyî timî ji aliyê zêhnî û sazî ve yekpare ye. Bi giştî civak, bi taybetî jî civakên neteweyî yên demokratîk, dema têne tehlîlkirin ji bo bi hêsanî bêne fêhmkirin şax û aliyên wan ji hev têne derxistin û li gorî qad û beşan têne analîzkirin. Lê ev beş, şax û alî bi serê xwe ji yekpare û tevahiyê qut nînin û bi serê xwe çênabin. Eger em civakan, nexasim neteweyên demokratîk ên serdema me bişibînin organîzmayeke zindî û ruhber, bi tevahî alî û şax weke organîzmayeke zindî ya yekpare û bi ser hev ve dijîn. Ango herçiqasî her alî û şax yek bi yek bêne rêzkirin jî divê timî hemû parçe weke beş û şaxên yek lem û yekpareyê li ber çavan bêne girtin.

Ferd û welatiyê neteweya demokratîk bi qasî azad e, ewqasî jî divê kominal be. Ferdê azad ê sexte yê ferdperestiya kapîtalîst ku li dijî civakê hatiye sorkirin, bi xwe di nava koletiyeke pêşketî de ye. Lê îdeolojiya lîberal îmajeke welê çêdike, mîna ku ferd di civakê de xwedî azadiyên bêserûbinî ye. Rastî bi xwe tiştekî din e, ferdê koleyê kedê yê mûçegir meyla kara herî zêde pêk tîne, wê vediguherîne sîstema hegemonîk û ev ferd şêweyê koletiya herî bipêşxistî temsîl dike. Ferdê em behsa wî dikin di nava perwerde û jiyana pratîk a dewleta netewe de tê afirandin. Ji ber ku bi serweriya pereyan ve hatiye girêdan, sîstema heqdestiyê mîna toqa kûçikekî xistibin stûyê wî çawa dixwazin wî wisa dimeşînin û bi ku deverê ve bixwazin berê wî didin wir. Ji ber ku ji bo bijî wekî din ti çareya wî tineye. Eger jê bireve ango bêkariyê tercîh bike, ev jî bi awayekî perpitîna şipiya îfade dike. Jixwe ferdperestiya kapîtalîst li ser bingehê înkara civakê bi gewde bûye. Bawer dike ku çiqasî rêûresm û çanda civaka dîrokî înkar bike wê karibe xwe pêk bîne, bi gewde bike. Berevajîkirina herî mezin a îdeolojiya lîberal jî ev e. Slogana wê ya sereke jî bi vî rengî ye, “Ferd heye, civak tineye.” Kapîtalîzm sîstemek e ku bi nexweşî û şewbê ye, û li ser bingehê qedandin û nehiştina civakê heye.

Li hemberî vê, ferdê neteweya demokratîk azadiya xwe di kominalîteya civakê de dibîne ango di civakên piçûk ên bêhtir kêrhatî de dibîne. Kom an komina demokratîk û azad dibistana bingehîn e ku ferdê neteweya demokratîk lê çêdibe. Yê nebe komin, yê bi kominî nejî, ferdîtiya wî jî pêk nayê. Gelek cureyên kominan hene û di her qada jiyanê de dibin. Li gorî cudahiyan, ferd ji kominekê zêdetir dikare di nava koman de cih bigire. Ya girîng ew e, ferd li gorî qabîliyetên xwe, li gorî ked û cudahiyên xwe zanibe di nava koman de cih bigire. Ferd berpirsiyariya xwe ya beramberî komin an jî koma girêdayî wê ye, weke pîvana sereke ya exlaqîbûnê dihesibîne.. Exlaq girêdan û hurmeta ji bo jiyana komin îfade dike. Komin yan kom jî heta dawiyê xwedî li ferdên xwe derdikeve, bi vê jî wan diparêze û jiyana wan misoger dike. Jixwe prensîba bingehîn a avabûna civak û komina mirov ev prensîba berpirsiyariya exlaqî ye. Karektera demokratîk a

kom û kominan azadiya kolektîf pêk tîne, bi gotineke din kom û kominên polîtîk pêk tînin. Kom û kominên ne demokratîk nikarin polîtîk bibin. Kom û komina ne polîtîk jî nikare azad bibe. Di navbera demokratî, polîtîkî û azadiya kominê de wekheviyeke şidandî û hişk heye.

Hingê em dikarin şax û aliyê sereke û pêşî yê neteweya demokratîk di çarçoveya komin û ferdê wê de bi vî awayî bidin nasîn. Şertê pêşî yê neteweya demokratîk ew e, divê ferd azad be û vê azadiya xwe bi kom û komina pêve girêdayî ye, li ser bingehê polîtîkaya demokratîk pêk bîne. Ferd û welatiyê neteweya demokratîk bi sedema ku di bin banê dewleta netewe de dijî terîfa wî berfireh dibe. Di vê rewşê de, di çarçoveya 'welatiyê destûrî' de welatî û ferdê neteweya demokratîk e, di heman demê de yê dewleta netewe ye. Li vir xusûsa girîng ew e, statuya neteweya demokratîk tê naskirin ango xweseriya demokratîk di destûra neteweyî de bi statuyeke huqûqî tê diyarkirin. Statuya neteweyî ya demokratîk du aliyê xwe hene: Ya yekê, di nava xwe de pêkhatina statu, qanûn an destûra xweseriya demokratîk îfade dike. Ya diduyan, statuya xweseriyê weke beşekî jêr ê destûra neteweyî tê tenzîmkirin. Li gelek welatên Yekîtiya Ewrûpayê, heta li welatên dinyayê di destûrên bingehîn de tenzîmkirina statuyên bi vî rengî heye.

Tevî ku avakirina neteweya demokratîk a xwe disipêre bihevrebûna komin û ferd-welatiyê azad a KCK yekalî pêk tîne esas e, bi dewletên netewe yên serdest re ku statuya xweseriya demokratîk qebûl bikin, di çarçoveya destûra demokratîk a neteweyî de gavavêtina çareseriyê mumkîn e. Şêweyê avabûna KCK'ê li herdu statuyan vekiriye, ango li jiyana ferd-welatî û komên azad û heman jiyana bi qanûn û destûra bingehîn hatiye misogerkirin.

Endametiya KCK'ê mirov dikare weke ferd û welatiyê azad ê neteweya demokratîk jî bide naskirin. Lê divê mirov vê endametiyê bi welatibûna dewleta netewe re tevlîhev neke. Welatîbûna dewleta netewe statuya koletiya modern diyar dike. Ferdeperestiya kapîtalîzmê evdîtiya mutleq a ji xwedayê dewleta netewe re, welatîbûna neteweya demokratîk jî bi awayekî rastî bûyîna ferdê azad îfade dike. Kurd dikarin welatîbûna xwe ya neteweya demokratîk di bin statuya KCK'ê de pêk bînin. Lewma mirov endametiya KCK'ê weke nasnameya welatiyê neteweya demokratîk îfade bike wê ev danasîneke di cih de be. Kurd divê bibin welatiyê neteweya demokratîk, ev hem mafekî wan ê dest jê nabe, hem jî erkeke wan e. Eger mirov nebe welatiyê neteweya xwe, mirov ê gelekî xerîb bikeve, ji xwe dûr bikeve û kes nikare bi ti sedemê xwedî li vê derkeve, vê yekê biparêze. Li vir pirsa derdikeve pêşiya me ew e, wê welatîbûna dewletên netewe yên serdest çawa be. Ya rastî, pêkan e ku herdu welatîbûn di zikhev de bêne temsîlkirin. Eger li welatê pêwendîdar bi pirsgirêka Kurd ve girêdayî di bin statuya welatiyê destûra demokratîk çareserî çêbibe, xwedîderketina li herdu welatîbûnan li gorî rastiya civakî ye. Heta eger Tirkiyê bibûya endamê Yekîtiya Ewrûpayê terîfa sê welatîbûnan jî mumkîn dibû. Çawa ku li Spanyayê welatîbûna Katalonya-Spanya-Yekîtiya Ewrûpayê bi awayekî sêberî heye,

welatîbûna Kurdistan-Tirkiye-Yekîtiya Ewrûpayê jî bi sêberî pêkan bû. Di dema KCK'ê de li her welatê pêwendîdar her ferdê Kurd divê xwe di çarçoveya duwelatîbûnê de bi girîngî bide nasîn û ji vê wêdetir divê nasnameya duwelatîbûnê pêk bîne. Eger KCK li gorî ferdê xwe yê neteweya demokratîk vê duberiyê yan lihevhatinê nikaribe pêk bîne, hingê divê nasnameya yekberî a welatî pêk bîne. Ji bo vê, pêwîst e ku rewşa zordest a dewletên netewe yên serwer li ber çavan bigire, nasnameya nivîskî ya welatîbûnê bi amblem û çarçoveyeke di cih de ji her ferdê xwe re çêke.

Her welatî û endamê KCK'ê divê ji ferdê kapîtalîzmê wî bi ferdperestiyê kiriye ne tiştek bibihure û weke endamekî kominê bijî. Em divê weke prensîbeke exlaqî nas bikin û qebûl bikin ku kesê jiyana wî ya kominal nebe, ferdiyeta wî jî ne mumkîn e. Em divê ji bîr nekin ku endambûna kom an jî kominekê di heman demê de timî aliyekî xwe yê demokratîk heye. Kom an jî komin kengî bi awayekî demokratîk tevgeriya dikare polîtîk be ango dikare azad bibe. Hingê mirov ê karibin serwext bibin ku bi vî awayî her kom û komin di heman demê de yekeyeke civaka exlaqî û polîtîk e. Her kom û komina KCK'ê di heman demê de yekeyeke exlaqî û polîtîk e jî. Welatî û ferdên wê jî ferd û welatiyên exlaqî û polîtîk in. Em dema behsa kom û kominan dikin, mebesta me di her qada civakê de komên mirovan ên kêrhatî ne. Mînak gundekî bi xisletên kominê rabe yanî şertên kominbûnê bi cih anîbe, ew kom an jî kominek e, û mirov dikare vê terîfê ji bo kolan û bajaran jî bi kar bîne. Kooperatîf, fabrîke, weqif, komele û rêxistiniyeke civakî dikare bibe kominek. Ji ber ku di heman demê de divê demokratîk bin, mirov dikare ji wan re bibêje nîzama kominal a demokratîk. Mirov dikare jiyana komin li tevahiya qadên perwerdehî, çandî û zanistî pêk bîne, herwisa mirov dikare jiyana civakî û polîtîk jî hem kominalîze bike û hem jî demokratîze bike. Welatî û ferdê azad bi tenê dikare di nava vê jiyana kominal a demokratîk de pêk bê. Bi giştî welatî û ferdê neteweya demokratîk, bi taybetî û bi şêweyê bêhtir berbiçav welatî û ferdê KCK'ê hewcedariyeke jiyana bi berpirsiyarî, exlaqî û polîtîk e. Ev hewcedarî di heman demê de divê weke erk û mafekî bingehîn jî bê fêhmkirin. Kengî dewletên netewe van maf û erkên me yên bingehîn qebûl kirin, Kurd jî dikarin erk û mafên bingehîn ên welatîbûna van welatan qebûl bikin.

**2- Di Neteweya Demokratîk De Jiyana Polîtîk û Xweseriya Demokratîk**

Mirov di avakirina neteweya demokratîk a KCK'ê de dikare alî û şaxê polîtîk weke xweseriya demokratîk bike têgîn. Mirov bêyî xwebirêvebirinê nikare li neteweya demokratîk bifikire. Bi giştî bi tevahî şêweyên neteweyan, bi taybetî jî neteweyên demokratîk hebûnên civakî yên xwedî rêveberiyên xwe ne. Eger civakek ji rêveberiya xwe mehrûm be, ew ji netewebûnê derdikeve. Di rastiyên civakî yên hemdem de mirov nikare li neteweyan bêyî rêveberî bifikire. Heta neteweyên mêtingeh jî herçiqasî ji xerîban pêk bê jî rêveberiyeke wan heye. Lê ji bo civakên ketine pêvajoya jihevbelavbûnê mirov nikare behsa rêveberiyê bike. Eger mirov behsa

rêveberiyê bike jî ew rêveberî ya hêza ji hev belavker e, rêveberiya tesfiyekirinê ye, û vê bi demê re û bi kontrol dike. Dema Kurd ne xwedî rêxistiniya xwe bûn, rewşa wan jî bi vî rengî bû. Ne bi tenê nedihiştin Kurd bibin netewe, di heman demê de ew ji civakbûnê jî derdixistin. Pêşengiya PKK'ê û polîtîkaya KCK'ê ne bi tenê ev pêvajo rawestand, ji civaka polîtîk ber bi netewebûyîna demokratîk ve pêvajoyek da destpêkirin. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, Kurd bi qasî ku dibin civaka polîtîk, vê rastiya polîtîk li ser riya netewebûyîna demokratîk têra xwe bi rêxistin dikin.

Di serdema me de polîtîkbûna civakê bi xetên sereke ji du aliyan ve civakê dibe netewebûyînê: Riya kapîtalîst a ji rêûresmê ew rê ye ku ber bi dewleta netewe ve dibe. Di şert û mercên kapîtalîst de eger civakek bêdewlet be, dewleta wê hilweşiya be yan di rewşa jihevdektinê de be, polîtîkayên dîndar û mîlliyetgir wê civakê ber bi dewleteke nû ve, ber bi dewleta netewe ve dibe. Eger dewleteke wê civakê ya ji rêûresmê hebe û bêhêz be, li şûna wê dewletê wê dewleteke netewe ya bi hêztir bê danîn. Riya duyemîn a netewebûyînê, riya netewebûyîna demokrtîk e. Nexasim karekterê dewleta netewe yê pirsgirêkan diafirîne, di roja me ya îro de civakên polîtîk û hêzên wan ên rêveberiyê ber bi netewebûyîna demokratîk ve dixe nava tevgerê, yan bi reformê yan jî bi şoreşê wan neçarî netewebûyîna demokratîk dike. Dema ku kapîtalîzm mezin dibû meyla serdest dewletên netewe bûn, lê di van şertên roja me ya îro de ku hildiweşe, bêhtir ber bi netewebûyîna demokratîk ve diberide. Di vê mijarê de gelekî girîng e ku mirov hêza polîtîk bi desthilatdariya dewletê re wekhev neke. Di xwezaya polîtîkayê de azadî heye. Netewe û civakên polîtîk dibin, ew civak û netewe ne ku azad dibin.

Her civak û neteweya hêza desthilatdarî û dewletê bi dest dixe çawa ku azad nabe, eger xisletên wê yên demokratîk hebin, dikeve rewşekê ku azadiyên xwe yên heyî jî ji dest bide. Lewma mirov civakekê ji diyardeyên desthilatdarî û dewletê çiqasî bişo, ewqasî li azadiyê vedike. Şertê bingehîn ê mirov wê civak û neteweyî azad bike ew e, divê mirov timî wê di rewşeke polîtîk de bihêle. Civakeke ji desthilatdarî û dewletê hatibe şuştin, lê polîtîk nebûbe, dibe civak an neteweya teslîmî kaos an anarşiyê bûyî. Eger civak û netewe demeke dirêj ji anarşî û kaosê rizgar nebin wê birizin, ji hev belav bibin û wê bibin alavê kozmosên xerîb ên din. Kaos û anarşî bi tenê ji bo demeke kin û demî dikarin bi roleke afirîner rabin. Ji bo vê jî şert e ku diyardeya polîtîk bikeve dewreyê. Polîtîka, bi tenê azad nake, di heman demê de tenzîm dike. Polîtîka hêzeke bêhempa ya tenzîmkirinê ye. Li cem netewe û civakê polîtîka çiqasî bi hêz be, ew dewlet û desthilatdarî jî ewqasî lawaz in, divê lawaz bibin. Berevajiyê vê jî dibe. Li cem netewe an civakê dewlet an hêza desthilatdariyê çiqasî zêde be, polîtîka ango azadî jî ewqasî lawaz dibe.

Di avakirina neteweya demokratîk de Koma Civakên Kurdistanê KCK bi rola darê piştê radibe. Ji bo netewebûyîna demokratîk divê KCK bi rola organa polîtîkaya demokratîk rabe. Tevlîhevkirina wê bi dewleta netewe re berevajîkirineke bi zanîn e. KCK weke prensîb dewleta netewe amûrê

çareseriyê nabîne. Ne qonaxa pêşî û ne jî qonaxa dawî ya dewleta netewe ye. Herdu têgînên ji hev cuda yên otorîteyê ne, û xwedî xisletên cihêreng in. Herçiqasî ji aliyê şemayê ve ji hin aliyan ve bişibe bisazîbûna dewleta netewe jî bi xwe û naveroka xwe cuda ye. Weke organa biryarê ya KCK'ê KONGRA GEL bi rola Meclîsa Gel radibe. Girîngiya wê ew e, gel bi xwe biryarên xwe dide. Meclîsa Gel an KONGRA GEL organeke demokratîk e. Ew alternatîf e, li beramberî netewebûyîna di tebeqeya jor de an jî pêşketina netewebûyînê bi pêşengiya hêmanên bûrjûwa. KONGRA GEL netewebûyîna bi pêşengiya çînên gel û tebeqeya rewşenbîr bi pêş dikeve, îfade dike. Ji aliyê naverokê ve ji sîstema bûrjûwa ya parlementeriyê vediqete. Lewma dewletên netewe yên serwer divê sîstema xwe ya hilbijartinê û navenda civînên xwe li gorî şertên li cih bi rêxistin bikin. Konseya Rêveber a KCK'ê pîramîda rêveberiya rojane ya navendîkirî û xurtkirî îfade dike. Ew ê yekeyên xebatê yên li nava gel belav bûne, koordîne bike. Divê hewldanên rêxistinî-çalakî yên rojane yên netewebûyîna demokratîk koordîne bike, bi rê ve bibe û biparêze. Rast nîne ku bi organên hukûmetên dewletê re bê tevlîhevkirin. Bêhtir nêzî sîstema konfederasyona civakên sivîl ên demokratîk e. Saziya Serokatiya Giştî ya KCK'ê ku bi hilbijartina gel tê destnîşankirin, bi awayekî giştî asta herî jor a neteweya demokratîk îfade dike. Ahenga di nava tevahiya yekeyên KCK'ê de û pêkanîna polîtîkayên bingehîn dişopîne û kontrol dike.

Pirsgirêka KCK'ê ya legalbûnê bi dewletên netewe yên serwer re heye. Tevî ku pêşî cih dide xebatên legal jî dewleta netewe vê qebûl neke wê ev yek li Kurdistanê rê li ber rêveberî û otorîteyeke duserî veke. Eşkere ye, kengî li ser van erdan û di nava van civakan de rêveberiya dewletê û rêveberiya KCK'ê bêne meşandin wê ev yek bibe sedema şer û tengezariyê. Eger daxwazên der barê legalbûn û qanûnîbûnê de ji dewletên pêwendîdar re têne pêşniyarkirin bersiva xwe nebînin û berevajî bi şîddet, girtin û şopandinê bersiv bê dayîn, KCK jî wê texsîr neke rêveberî û otorîteya xwe bi awayekî yekalî pêk bîne. KCK di sala 2005'an de hat îlankirin. Ji wê rojê ve bi dewletên netewe yên pêwendîdar re yekser û neyekser diyalog çêbûn û heta niha ji wan encameke çareseriyê ya qanûnî bi dest nehatiye xistin. Eger diyalogên behsa wan tê kirin encamên erênî nedin, di dema pêş de KCK wê weke otorîte û hêza rêveberiyê li Kurdistanê bi civaka Kurd û hindikiyayên li heman cografyayê re bivênevê bi awayekî yekalî xwe pêk bîne.

Kengî KCK xwe bi awayekî yekalî di nava hemû alî û şaxên neteweya demokratîk de pêk bîne, ev yek wê demeke nû bide destpêkirin. Ev dem wê ji dema PKK'ê xwe ava dikir û şerê gel ê şoreşgerî pêşde dibir cuda be. Di vê demê de wê bi tenê partî û rêveberiya şer tinebin. Tevî ku wê dîsa xebatên PKK û HPG'ê û şerên parastinê hebin, lê di vê demê de erka bingehîn wê ji hemû alî û şaxan ve avakirin û rêvebirina neteweya demokratîk be. Eşkere ye ku vê demê di nava şert û mercên nû de wê di navbera sazî û hêzên dewleta netewe û hêz û saziyên KCK'ê de raqebet, xwelihevrakişandin û şerekî mezin pêk bê. Li bajaran, li dewrûbera bajaran û gundan dibe ku otorîte û rêveberiyên cuda pêk bên.

**3- Neteweya Demokratîk û Jiyana Civakî**

Di pêvajoya netewebûyîna demokratîk de, di jiyana civakî de veguherînên girîng çêdibin. Jiyana ji rêûresmê ya di moderníteya kapîtalîst de wê gelekî biguhere. Di civaka berê de wê guhertinên gelekî radîkal bibin. Modernîte bi maneya xwe ya peyvê jî herî zêde di jiyana civakî de xwe dide hiskirin. Beşekî mezin ê guhertinan der barê modeyê de ne, û şiklî ne. Kategoriyên bingehîn ên şaristaniyê hebûna xwe dewam dikin. Pêşketin û veguherîna bajar, çîn û dewletê di warê naverokê de nîne. Di hersê kategoriyan de nepxeke mezin çêdibe. Avahiya civakê ya bi bajar, bi çîn û bi dewletê bi sîstema danehevê ya kapîtalîst bi şêweyekî kansêrwarî mezin dibe. Tevî ku sîstema şaristaniyê ya berê avahiyeke wê ya timûtim rê li ber pêxîrtengiyan veke hebe jî di wê astê de nîne ku bi van nakokiyan bi tevahî civakê bixe tehlûkeyê, wê ji hev de bixe û rê li ber şaneyên kansêrwarî veke. Şêwazê danehevê yê kapîtalîzmê, li gorî xwezaya xwe ji bo karibe bixebite mezinbûna civakî vediguherîne şêwazekî kansêrwarî. Eger roja me ya îro em hem şahidên megapolên şêniyên wan ji bîst mîlyonî bihurî, desthilatdariya dewleta netewe ya xwe berdaye nava mûrehkên civakê û çînîbûna li pey civakeke homojen a monoton in, û bi ser de jî weke meyleke serdest a jiyana civakî, em vê normal dibînin, ev tê wê maneyê em bi nexweşiya kansêra civakî ketine. Tevahiya nîşaneyên zanistî îspat dikin ku dinya me, hawîrdora me û civaka me, mezinbûna bi vê lezê diçe, wê nikaribin rakin. Di vê rewşê de mirov nikare behsa civakeke dijî bike, mirov dikare behsa cinawirekî bike ku çi tê pêşiyê nahêle, dadiqurtîne. Di civaka berê de Levîathan bi tenê desthilatdariya dewletê îfade dikir, lê moderníteya kapîtalîst bi xwe roja me ya îro veguheriye cinawirekî bi tevahî ruhber û zindiyên li dinya me diqedîne, tine dike. Moderníteya kapîtalîst bi xwe cinawirek e, Levîathanekî modern e.

Jiyana modern a serdest li dora koleya herî kevin ango jinê bi temamî veguherandine xefikekê. Jin di kapîtalîzmê de xistine rewşeke welê ku mirov jêre bibêje 'qralîçeya metayê' di cih de ye. Ne bi tenê bêheqdest tê xebitandin, bi heqdesta herî kêm dixebite û ji bo kêmkirina heqdestan weke amûrekê tê bikaranîn. Yek ji wan amûrên sereke ye ku bi nermî tê xebitandin. Makîneyeke zarokanînê ya îndustriyel e ku timî ji sîstemê re nifşên nû amade dike. Amûra sereke ya îndustriya reklamê ye. Ji bo pêkhatina desthilatdariya cinsiyetparêz amûrek e. Ji împaratorê global heta bi împaratorê piçûk ê nava malê amûrê desthilatdarî û xweşiya bê sînor a hemû mêrên serwer e. Ji bo yên hîç desthilatdariya wan tineye, alaveke desthilatdariyê diafirîne. Jin bi qasî ku di dema moderníteya kapîtalîst de hatiye îstîsmarkirin di demeke din a dîrokê de nehatiye îstîsmarkirin. Ji ber ku koletiyên din –koletiyên zarok û mêran –li ser şopa koletiya jinê têne çêkirin, jiyana civakî ya kapîtalîzm ferz dike, ji bilî efendiyan bi qasî ku her kesî dike zarok ewqasî jî dike kole. Jiyana sosyal a civaka roja me ya îro hem weke kalekî kiribin zarok zarokî kirine hem jî kirine mîna pîrekan. "Gel û civak hez dikin ku mîna pîrekan bêne birêvebirin" ev gotina navdar a Hîtler vê rastiyê îfade dike. Malbat saziya herî kevn e ku li dora jinê pêk hatiye û dîsa li dora jinê tam ji hev de dikeve. Tişta malbatê ji hev de dixe şêwazê danehevê yê

kapîtalîzmê ye. Ev şêwaz çiqasî civakê nehêle, tine bike, ewqasî pêk tê, lewma encama mirov dibîne û li bendê ye ew e, çi qasî hucreya bingehîn a civakê ango malbatê biqedîne ewqasî wê karibe civakê biqedîne û atomîze bike.

Tib çiqasî were bipêşxistin bila were bipêşxistin, nikare nexweşiyên di nava civakê de mîna firêzê belav dibin, rawestîne. Pêşketina tibbê bi xwe îspat dike ku bi awayekî diyalektîkî nexweşî jî çiqasî pêş ketine. Sîstema kapîtalîst bi xwe nevrotîk û kansêrolojîk e, lewma mirov dikare jê li bendê be ku ferdên civakê bi van nexweşiyên bi vî rengî bixeriqîne. Mîlliyetgirî, dîndartî, desthilatparêzî û cinsiyetparêzî hem weke sazî hem jî weke ferdî genên zêhnî û hestî yên kapîtalîzmê ne ku timî nexweşiyê belav dikin. Nexweşiyên fizîkî yên zêde dibin nîşaneya nexweşiyên zêhnî û derûnî ne, û ev encamên xwezayî yên wê civakê ne ku ji hev belav dibe û ji hev de dikeve.

Di jiyana civakî ya modern de erka perwerdê gihandina ferdê dij-civakî ye. Çi jiyana ferdê lîberal çi jî jiyana welatiyê dewleta netewe, li gorî hewcedariyên kapîtalîzmê têne programkirin û pêkanîn. Bi vê armancê, îndustriyeke mezin a bi navê sektora perwerdeyê hatiye pêkanîn. Di vê sektorê de ferd bîstûçar saetan ji aliyê zêhnî û rûhî ve tê bombebarankirin û bi vî awayî wî dikin hebûneke antî-civakî. Ev ferd ji polîtîkbûn û exlaqîbûnê hatiye derxistin. Bi ferdên rojane li pey zêdexwarin, vexwarin û bikaranînê dibezin, bi kesên bûne pereperest, seksîst, şoven û şelaqên desthilatdariyê xwezaya civakê ji binî ve tê xirakirin. Perwerde ne ku ji bo duristbûn û têkûzbûna civakê tê bikaranîn, berevajî ji bo hilweşandina wê tê bikaranîn. Der barê jiyana civakî de mirov dikare hê gelek analîzan bike, lê ev analîz hemû îspat dikin ku em ji zû ve gihiştine ber wî sînorî ku ji me re dibêje, ‘yan civak yan netiştekbûn.’

Zanistên ji bo berjewendiyên kapîtalîzmê têne bipêşxistin li ser navê çi qeşmertiyan têne kirin bila bêne kirin, jiyana mirov beriya her tiştî jiyaneke civakî ye. Hê dewlet û kapîtalîzm tinebûn jî civak hebû. Mirov bi civakê bû mirov. Civaka klan a dişibe malbatekê û bi bawayekî besît bi mîlyonan salan dewam kir û em naecibînin nebûya, ne bajar, ne çîn, ne dewlet û ne jî şaristanî wê çêbûna. Bajar, çîn, dewlet û şaristaniyê civak bi pêş nexistine, berevajî hebûna ku ev diyarde hemû pêşde birin, civak e. Di jiyana mirov de ti tişt nikare şûna civakê bigire. Dest kişandina ji civakê, ji civakbûnê derketin, destkişandina ji mirovatiyê ye û derketina ji mirovatiyê ye. Neteweya demokratîk beriya her tiştî israra civakbûnê ye; li hemberî modernîteya kapîtalîst bi durişmeya ‘yan civak yan netiştekbûn’ radiwest e. Bi israr e ku civaka di nava çerxên modernîteyê de ji hev de tê xistin mayînde bike, weke rastiyeke dîrokî-civakî pêk bîne. Ji ber ku girîng e, der barê jin û malbatê de xaleke taybet datîne, lê divê mirov bi awayekî bingehîn civakê weke malbateke mezin bibîne. Ev malbat e ku tevahiya dîrokê mirov çêkiriye. Roja me ya îro her tişt bûye pere, desthilatdarî, seks, fûtbol û tiştên weke wan ên dînê modernîteyê ne ku ev paşê derketine holê û ti carî ferdan pêk nayînin, berevajî ferdan diqedînin.

Neteweya demokratîk modeleke alternatîf e ku pê ferd û welatiyê azad pêk tê. Neteweya demokratîk li dijî netiştkirina civakê, civaka alternatîf e; li dijî civaka desthilatdarî û dewletê yan jî li dijî bêcivakbûnê civaka demokratîk e. Li dijî qedandina civakê ya her şêweyê kolekirin û newekheviyê pêk tê û pê didin qebûlkirinê, civaka gihiştiye hebûna azadî û wekheviyê ye. Dema ku mirov ji aliyê jiyana civakî ve neteweya demokratîk binirxîne, bi hêsanî mirov digihîje van terîfan. Ji bo jiyaneke têkûz û durist yek ji şertê sereke ew e, divê civakbûna neteweya demokratîk pêk bê. Civaka ku dewleta netewe ew qedandiye, ji nû ve wê bi ser wê ve tîne. Civaka bi tenduristî, ferdê bi tenduristî digihîne. Ferdê digihîje tenduristiya xwe ya zêhnî û derûnî li hemberî nexweşiyên fizîkî jî berxwedana wî bi hêz dibe û nexweşî kêm dibin. Têgihiştina li perwerdeyê ya neteweya demokratîk bi sedema ku armanca xwe civakbûn û ferd-welatiyê azad e, diyalektîka pêşketinê ya ferd bi civakê re û civakê bi ferd re ji nû ve tê danîn. Rola zanistan a mirovan civakî, azad û wekhev dike ji nû ve derdikeve holê. Neteweya demokratîk netewebûyîna civaka der barê hebûna xwe de rast serwextbûyî ye.

Civaka Kurd a modernîteya kapîtalîst aniye ber îmhayê ji bo veguhere neteweya demokratîk KCK bi rola darê piştê radibe û ji bo jiyana civaka demokratîk û ferdê azad garantî ye. Ji bo ferdê Kurd û civaka wî li hebûna xwe serwext bibin, amûra bingehîn e. Alî û şaxê polîtîk û exlaqî yê civakê bi pêş dixe û dike ku li rastiya xwe serwext bibe. Di serdema me de neteweya demokratîk ew civak e ku li hebûna xwe serwext bûye û bi vê serwextiyê xwe diparêze. Civaka Kurd a di nava pencê dewleta netewe de ku ji aliyê çandî ve tê qirkirin, bi tenê bi netewebûyîna demokratîk dikare ji rejîma îmha û înkarê ya li ser tê ferzkirin bibihure. Neteweya demokratîk, KCK û ferdê azad yekpare ne, û ji hev nabin.

**4- Di Neteweya Demokratîk De Hevjiyana Azad**

Em dizanin ku di jiyana zindî û ruhberan de sê fonksiyonên bingehîn hene. Ev xwe xwedîkirin, parastina hebûna xwe û dewamkirina zuriyeta xwe ye. Em dema behsa jiyana zindî û ruhberan dikin mebesta bi tenê yekeyên biyolojîk nînin, her hebûna gerdûnî li gorî xwe xwedî fonksiyonên zindîtiyê yên bi heman rengî ne. Ev fonksiyonên bingehîn li cem mirov gihiştine asteke cuda. Li cem civaka mirov rasyonalîte gihiştiye asteke welê ya pêşketinê, eger mirov serê xwe jê neêşîne, dibe ku hebûna tevahî zindiyên din bi dawî bike. Eger gerdûna biyolojîk di astekê de bê rawestandin, jixwe domnedarkirina cinsê mirov ê bi xwe pêk bê. Ev paradokseke ciddî ye. Cinsê mirov ê ji niha ve hejmara wî ji heft mîlyaran bihuriye bi vê lezê pirrbûna wî dewam bike, di demeke pirr kin de wê ji wê asta biyolojîk bibihure û domnedarkirina jiyana mirov ê derkeve holê. Tişta rê li ber vê vedike, rasyonalîteya mirov e. Ango heman rasyonalîte, berî ku mirov bigihîje wê asta biyolojîk, divê pirr zêdebûnê rawestîne. Pirrbûn û heyîn bûyereke xerîb e. Makîneyek e ku em dikarin jêre aqlê xwezayê bibêjin, timî bi roleke tewazunê radibe û tewazuna di navbera heyîn û pirrbûnê de pêk tîne. Lê rasyonalîteya mirov cara pêşî ye ku li ber

vê mekanîzmeya tewazunê radibe. Ya rastî, têgîna xwedabûnê jî ji vê rasyonalîteyê derketiye holê. Mirovê di rasyonalîteyê de sînor nas nake xweda ye. Xisletên rasyonel ên mirov rê li ber avakirina xwedayan, dînan û sîstemên din ên afirîner vekirine.

Yekşaneyê li dijî tinebûnê xwe yekser bi dabeşkirinê pirr kiriye û ev ji bo domdarkirina jiyanê tê fêhmkirin. Xerîzeya pirrbûnê ya li cem her yekeya zindî heta bi mirovî xwesteka jiyanê ya bêserûbinî îfade dike. Xwesteka ji bo jiyana bêserûbinî xwestekeke welê ye ku mirov lê serwext nebûye; qabîliyeta lê serwextbûnê jî gelekî bi sînor e. Gelo divê mirov li vê xwesteka jiyanê serwext bibe yan na, ev jî bi xwe guftogoyeke din e. Lê kengî mirov li xwesteka jiyanê serwext bibe, wê fêhm bike bi dewamkirina zuriyetê xwe nagihîne maneya jiyanê. Jiyana kesekî û mîlyonan kesî yek e. Pirrbûn hem jiyanê manedar nake, hem jî dikare hêza bîrewerî û serwextiyê jî berevajî û lawaz bike. Bêguman mirov der barê wê de serwext bibe, di gerdûnê de bûyereke harîqa ye. Bê sedem navnasa xwedatiyê li mirov nehatiye kirin. Piştî ku der barê xwe de gihişt hêza serwextbûnê, nabe ku ji bo mirov pirsa bingehîn dewamkirina zuriyetê be. Mirovê bîrewer û serwextbûyî zuriyetê dewam bike, ne bi tenê tewazunê li dijî tevahiya zindiyan xira dike, hêza bîreweriyê ya mirov jî dixe tehlûkeyê. Bi kurtî, nabe ku mirovê serwextbûyî derdê wî yê sereke dewamkirina zuriyetê be. Xweza di mirov de gihiştiye asteke welê dewamkirina zuriyetê ji bo wî êdî pirsgirêk nîne. Mirov dikare bibêje, çawa ku li cem her zindiyî dewamkirina zuriyetê baqî ye, wê li cem mirov jî baqî be û wê her wisa dewam bike. Rast e. Lê ev xerîzeyek e ku bi hêza serwextbûnê re dikeve nakokiyê. Ango divê mirov pêşî cih bide serwextbûn û bîreweriyê. Eger bi qasî ku em pê dizanin gerdûn di heqê xwe de cara pêşî li cem mirov gihiştibe asta herî jor a hêza xwenaskirinê, hingê divê mirov pê gelekî bi heyecan bibe ango belkî fêhmkirina gerdûnê maneya rastî ya jiyanê be. Ev jî tê wê maneyê ku mirov ji xeleka jiyan û mirinê ya timî li dora xwe dizîvire dibihure, ma mirov dikare ji vê mezintir li coş û cejneke xweserî mirov bifikire. Ev bi awayekî, Nîrwana ye, Fenafîllah e, xwe gihandina bîreweriya mutleq e, ji vê wêdetir ne maneya jiyanê dimîne, ne jî hewcedarî bi şadûmaniyê!

Mirov dibîne di civaka Kurd de jiyan herî zêde li dora diyardeya jinê nayê hiştin û tê tinekirin. Di çandeke civakî de ku navê jin û jiyanê bi awayekî rastî dike yek (peyvên weke jin, jiyan, can, şen û cîhanê timî ji yek kokê zêde bûne û hemû jî rastiya jin û jiyanê îfade dikin), di jinê de jiyan tê tinekirin û ev jî nîşaneya sereke ye ku civakîbûn tê qedandin. Ji çandeke bingehê şaristaniyê li dora jinê daniye û rê li ber çanda xwedawendiyê vekirî tişta mayî ew e, der barê jiyana bi jinê re çavkoriyeke mezin û çilekiyeke teslîmî xerîzeyan bûyî heye. Jiyana civakî ya di nava pencê modernîteya kapîtalîst de ya li pey rêûresm, îmha û înkarê diçe, jiyanek e ku bi temamî mehkûmî neçariya jinê hatiye kirin. Têgihiştina li namûsê ya xwe disipêre jinê mîna çepera dawî ya parastinê be, rewşeke ji maneya xwe ya rastî nomos = pîvan an qanûnê dûrketinê îfade dike. Pirr bi namûsiya ji bo jinê, pirr bê namûsiyeke civakî îfade dike. Bi temamî paradoksek e, ji namûsa civakê çiqasî dûr dikeve, ewqasî ji bo jinê bi namûs dibe.

Kengî namûsa civaka xwe ji dest dan, Kurdan bîr nebir ku wê namûsa jinê jî nikarîbin biparêzin û ev bi tenê ne cehalet e, di heman demê de li ser navê exlaq bêexlaqî ye. Têgihiştina namûsê ya di bin navê namûsa jinê de dixwazin li ser piyan bigirin mêrê Kurd ê ji aliyê exlaqî û polîtîk ve qediyayî ye û ev hewldana mêr a îspatkirina bi hêzî an jî bê hêziya wî ya li ser koletiya jinê ye. Êşa serdestiya biyaniyan a li ser wî û civaka wî dixwaze di serê jinê de ku di bin destê wî de ye, derxe. Bi awayekî xwe terapî dike. Eşkere ye ku li gelemperiya dinyayê koletiya jinê giran e, lê belkî bi qasî ku li ti devera dinyayê nebe, statuya jina Kurd di koletiyeke pirr giran de ye. Bi giştî bûyera pirrzarokanînê rûyekî din ê vê rastiyê ye. Cehalet û tinebûna azadiyê, di civakên bi heman rengî de ji bo dewamkirina hebûna xwe weke çareya bi tenê yan jî ji ber bêçaretiyê pirr zarokan çêdikin. Di her civaka ji bîreweriyê mehrûm de diyardeya pêk tê ev e. Paradoks di vir de ye, ji ber ku xwexwedîkirin û ewlekarî tineye, pirrzarokanîn rê li ber pirsgirêkên mezin vedike. Bêkarî weke aşûta ji serê çiyê bê xwarê mezin dibe. Jixwe sîstema karê ya kapîtalîst vê hejmara zêde ya mirovan dixwaze da ku koletiya bi heqdestekî kêm bimeşîne. Rêûresma şaristaniyê û modernîte milên xwe didin hev û tevahiya hilweşîneriya xwe li ser jinê bi vî awayî pêk tînin.

Em timî dibêjin, kengî jin û jiyan ji jinbûn û jiyanbûnê derketin şert û mercên civakbûnê jî hildiweşin û ji hev de dikevin. Hêmanên em dikarin ji wan re şoreş, partiya şoreşger, pêşeng û mîllîtan bibêjin, eger vê rastiyê ji hev dernexin û bikevin ser riya azadiyê wê nikaribin bi rola xwe rabin. Kesên bi xwe bûbin girêka kor wê nikaribin girêka kor ên kesên din ji hev vekin. Ango kesên xwe azad nekiribin wê nikaribin kesên din azad bikin. Yek ji encamên girîng ên PKK û şerê gel ê şoreşgerî di vê mijarê de gihiştiyê ew e, azadî û rizgariya jinê bi analîzkirin, rizgarkirin û azadkirina diyardeya jinê dibe. Lê çawa ku me diyar kir, mêrê Kurd jî namûsa xwe ya gelekî hatiye berevajîkirin an jî bi awayekî zanistî bi danasîneke rastir bênamûsiya xwe di serweriya mutleq a li ser jinê de dibîne. Ya bi awayekî bingehîn divê ji hev bê derxistin ev nakokiya no û dijwar e.

Ji ber ku di beşên beriya vê de me behsa hewldanên bi vî rengî kiribû, em ê dubare nekin. Li ser riya avakirina neteweya demokratîk li ber rohniya vê ezmûnê tiştên heta niha li ser navê namûsê hatine kirin, berevajiyê tiştên diviyabû bihatina kirin in. Ez behsa mêrtiyeke Kurd a berepaşkirî ango hinekî jî behsa xwe dikim. Ew jî divê wisa be: Divê em têgihiştina xwe ya milkiyetê bi temamî biterikînin. Jin bi tenê û bi tenê divê ya xwe be (xwebûn). Heta divê wer zanibe ku bê xwedî ye, bi tenê xwediyê wê ew bi xwe ye. Eşq, hezkirina çavkorî jî di navê de divê em bi ti awayî bi jinê ve neyên girêdan. Berevajiyê vê jî rast e. Di heman demê de divê jin jî xwe bi kesî ve girê nede û kesî neke xwediyê xwe. Şertê pêşî yê şoreşgertî û mîllîtantiyê divê bi vî awayî be. Kesên bi awayekî serketî ji vê ezmûnê bibihurin bi awayekî di kesayeta xwe de azadî pêk anîne, lewma bi vê kesayeta xwe ya azadbûyî dikarin dest bi avakirina neteweya demokratîk û civaka nû bikin.

Tam jî di vê nuqteyê de em xwe digihînin danasîna rast a eşqê. Kengî ew kesê nikare hilweşîn û jihevdeketina civakê rawestîne, ji namûsê ango bi awayekî zanistî û rast ji bênamûsiya li dora jinê bi dualî hatiye çêkirin dest bikişîne û bi awayekî mîllîtanî xwe li avakirina neteweya demokratîk rakişîne û vê bigihîne maneya wê ya civakî, pirr zor be jî wê xwe bigihîne potansiyela pêkhatina eşqê.

Di pêvajoya netewebûyînê de azadbûyîna jinê gelekî girîng e. **Jina azadbûyî civaka azadbûyî ye.** Civaka azadbûyî jî neteweya demokratîk e. Me behsa girîngiya şoreşgerî ya berevajîkirina rola mêr kiribû. Maneya vê ew e, li şûna ku li ser jinê serwer bibe û zuriyetê bi jinê dewam bike, netewebûyîna demokratîk bi hêza xwe dewam bike û ji bo vê hêza îdeolojîk û rêxistinî pêk bîne û otorîteya xwe ya polîtîk serwer bike; bi awayekî îdeolojîk û polîtîk xwe çêke. Ji pirrbûna bi fizîkî zêdetir divê bi hêzbûna zêhnî û ruhî bê xurtkirin. Ev rastî xwezaya eşqa civakî pêk tînin. Ji sedî sed divê mirov eşqê weke hevhestyariya di navbera du kesan de û cazîbeya cinsî nebîne. Heta divê mirov bi ber bayê xweşikiyên şiklî yên maneya wan a çandî tineye nekeve. Modernîteya kapîtalîst sîstemek e ku li ser înkara eşqê hatiye avakirin. Înkara civakê, harkirina ferdiyetê, ketina cinsiyetparêziyê ya her qadê, xwedakirina pere, li şûna xwedê danîna dewleta netewe, weke xebatkareke bêheqdest an jî ya bi heqdestê herî kêm bi nasnamekirina jinê bingehê maddî yê vê înkara eşqê ye.

Divê mirov xwezaya jinê baş nas bike. Eger mirov seksualîteya jinê bi awayekî biyolojîk balkêş bibîne û li ser vî bingehî nêzî wê bibe û têkiliyê pêre deyne, ev ji serî ve têkçûna eşqê ye. Em çawa ku ji bihevrebûnên biyolojîk re eşq nabêjin, em ji bihevrebûnên biyolojîk ên li ser bingehê cinsî re jî nikarin eşq bibêjin. Em ji vê re dikarin bibêjin fonksiyona normal a zêdebûna zindiyan. Ji bo vê fonksiyonê hewcedarî bi mirovbûnê jî tineye. Jixwe heywan-mirov vê fonksiyonê bi hêsanî bi cih tînin. Yên eşqa rastî dixwazin, divê vî şêweyê zêdebûnê yê heywan-mirov biterikînin. Em çiqasî karibin jinê weke objeyeke cazîbeyê ya cinsî nebînin, em ê ewqasî karibin jinê bikin hevrê û dosteke hêja. Hevrêtî û dostaniya bi jinê re ya ji cinsiyetparêziyê bihurî têkiliya herî bi hêz e. Bi jinê re di şertên hevjiyana azad de jî divê di bingehê têkiliyan de avakirina civakê û neteweya demokratîk hebe. Em divê mîna di modernîteyê de û di nava sînorên rêûresmê de jinê di rola hevser, dayik, xuşk û evîndarê de nebînin û ji vê bibihurin. Beriya her tiştî divê em têkiliyên mirovan ên bi hêz ku xwe disipêrin avakeriya civakê û yekîtiya maneyê serdest bikin. Jinek an jî mêrek dema hewce kir divê dest ji hevsera xwe, ji zarokê xwe, ji dayika xwe, ji bavê xwe û ji evîndara xwe bikişîne, lê divê ji rola xwe ya exlaqî û polîtîk a di civakê de ti carî dest nekişîne. Mêrê bi hêz ti carî li ber jinê nagere, li pey wê naçe, jêre dijûnan nade, lê nade û hesûdiya wê nake. Hevsera wî û evîndara wî be jî dema bixwaze jê veqete divê destê xwe nediyê, topizka xwe jî lê nede. Heta, heke hebin, piştî ku rexneyên xwe lê kirin, wê pêre alîkar be da ku weke dixwaze bijî. Eger dixwaze bi jinê re têkiliyeke bingehê wê yê îdeolojîk û civakî bi

hêz pêk bîne, divê tercîhê û pirsê ji jinê re bihêle. Asta azadiya jinê, tercîha wê, tevgera wê ya bi hêza wê çiqasî bi pêş ketibe, jiyaneke bêhtir manedar û xweş pêre dibe.

Di şertên roja me ya îro de hevjiyana azad a herî îdeal a mêr û jinê, di rastiya me ya civakî de kengî xebatên zehmet ên avakirina neteweya demokratîk bi serketinên mezin pêk hat, pêk tê. Li Kurdistana roja me ya îro di rastiya civakî de diyalektîka eşqeke manedar divê bi giranî platonîk be, û bi vî awayî pêk bê. Ev eşq hêja ye. Eşqa platonîk eşqa fikir û çalakiyê ye. Lewma hêja ye. Her tim bi jina herî bedew a dinyayê re mayîn eşq nîne. Jixwe ji ber ku eşq nîne, piştî bihevrebûneke demkin durûtî wê xwe nîşan bidin. Ji ber ku bi awayekî bêmane ev têkilî çêbûye yan li ser bingehê têkiliyeke cinsî hatiye danîn. Li hemberî vê di pratîka PKK û KCK'ê de koleyên doh gelek jin û mêrên ti carî li cem hev bi hev re nebûne, di avakirina neteweya demokratîk a gelê xwe de hemûyan bi hev re bi eşqeke platonîk karên mezin bi ser xistin û îspat kirin ka çiqasî kesayetên bi hêz in. Di vê mijarê de bi sedan nirxên me, şehîdên qehreman hene. Ev qehremanên mezin in ku bi ser ketine bibin Mem û Zîn.

Ez bi vê wesîleyê divê ezmûn û tecrûbeyên xwe weke deynekî bînim ziman. Bi qasî ku tê bîra min, dema ez zarok bûm, min di lîstikên xwe yên pêşî de hebûna keçikan weke pêdiviyeke azadiyê hesibandibû. Xuşkên min jî di navê de, di tevahiya pêvajoyên zewacan de mîna min ew hemû ji dest dabin hestek li cem min çêdibû. Jixwe kengî ez hinekî mezin bûm û min exlaqê namûsê yê hişk ê civakê dît, min xwe bi tevahî vekişand. Lê ev xwe vekişandina min bi awayekî dilê min bimîne û bişikêm nebû. Min hêdî hêdî fêhm dikir ku me jin ji mêj ve wenda kirine. Ez ji statuya jin û mêran a hatibû avakirin hîç razî nebûm. Min her tim şik û guman dikir ku ev statu li ser şaşiyan hatiye avakirin. Statuyek bû ku min nikarîbû qebûl bikim. Di çarçoveya vê statuyê de daxwaza min a ji bo jinê çênebû. Ez yeqîn dikim ku diya min li vê rewşê zû hayil bûbû û ji min re weha gotibû "Bi vî halê xwe tu nikarî bi jinê re bibî." Bi rastî min ti carî nexwest jineke min hebe. Min bixwesta jî min hîç nizanîbû ez ê çawa pêre bijîm. Ez her ku mezin bûm, ez bûm mîna zarokekî mezin. Mêrê li ber serê min her yek ji wan bûbûn mîna gurê jinan. Lê ez weke kesekî belengaz mabûm. Xeyal û meyal eleqeya jinan a ji bo min tê bîra min. Ez yeqîn dikim ku wan ez weke 'bûyereke bêhêvî' didîtim. Ya rastî, ez weke tebayekî şîrîn, lê ne li gorî demê didîtim û welê didan hiskirin. Di demekê de ku her kes ji xwe re li mêrekî, li evîndarekî digeriya, ez di van mijaran de bêhnçikandî bûbûm. Eşqa min ji bo tiştên weke xweda jî tinebû. Eleqeya min a bi tenê ji bo heval û hogirên baş bû.

Beriya ku ez behsa bûyera zewaca xwe ya pûç bikim, divê ez bibêjim, eleqeyên min ên mirov wan weke eşqa platonîk bi nav bike, hebûn. Ez her ku li wê bedewiya xwedayî ya li cem jinê hayil dibûm, jê bi tesîr dibûm. Lê ji bo ku ez vê ji aliyê din re bibêjim ne xwesteka min û ne jî hêza min hebû. Min di bingehê vê eşqa platonîk de timî welatê ji dest çûyî, Kurdistan, nasname û Kurdê wendabûyî didît. Li gorî vê, welatekî ji destçûyî û nasnameya wendabûyî eşqa wan bi

hêz, bi xwestek û bi îrade pêk nedihat. Mixabin û cihê xemê ye ku ev tespîta min rast bû. Ez bibêjim di bingehê zewaca min a pûç û bi tehlûke de hest tinebûn wê derew be. Eger ez bibêjim bi tenê bi armancên polîtîk bû, ez ê durûtiyê bikim. Hest jî hebûn û armancên polîtîk jî hebûn. Ez nizanim wê berê li derî da yan jî min lê da. Ez bibêjim xweber çêbû ew jî realîst nîne. Li gorî min ravekirina vê têkiliyê bi tenê ew e, eşqa welatê ji destçûyî û eşqa nasnameya civakî ya wendabûyî pêk nayê. Bûyerên diqewimîn jî ev piştrast dikirin. Ew sal ji wan salan bûn ku têde eşq ti carî pêk nedihat. Jixwe muzîka Aram a min bihîst jî behsa vê nemumkiniyê dikir. Bi hêrseke mezin a ji ber pêknehatina eşqê, min xwe li avakirina PKK'ê û şerê gel ê şoreşgerî rakişand û ez dikarim bibêjim, di vê hewldana min de rola vê mijarê hebû. Dema ku gelek keç û jin tevlî xebata min bûn, ya me bi wan re dikir eşqa kolektîf bû. Şert û merc ji bo eşqa ferdî tinebûn. Ji bilî min di nava PKK'ê de gelek kesan eşqa ferdî ceribandin û min bi xwe newêrîbû ez bikevim nav hewldaneke bi vî rengî. Dîsa tirsonekiyê ez zevt kiribûm. Ya rastî, ez timî li ser nemumkîniya eşqên bi vî rengî difikirîm. Ev fikra min jî rast bû. Wan deman ez timî li 'bûka axê' difikirîm. Di fikra min de ti carî cihê fikra 'bûka min' tinebû. Bi sedan keçên ji min wêrektir, bedewtir û zîrektir hebûn. Beşekî mezin ji wan bûn şehîd. Min timî xwest bi wan bidim hiskirin ku ez ê wan im. Lê ev hewldaneke badilhewa û tewş bû.

Di rewşên bi vî rengî de divê li cem ferd, hêmanên eşqê di azadkirina welatekî de, di rizgarkirina netewe û civakekê de bêne temsîlkirin. Ji bo vê jî gelek şerên polîtîk û eskerî divên; hêzeke zêde ya îdeolojîk û exlaqî divê. Herweha bêparmayîna ji estetîkê û bedewiyê qebûl nake. Kesên bi îddîaya eşqa platonîk radibin dema bixwazin eşqa xwe taybetî bikin û bi awayekî berbiçav pêk bînin, divê bersiva van şert û mercan hemûyan bidin. Eger hêza wan ji bo van şertan têrê neke yan divê eşqa xwe ya platonîk dewam bikin, yan jî hêza wan têra vê jî neke û nikaribin maneyê bidinê, hingê wê bikevin zewacên modernîte û şaristaniyê (rêûresmê) ku di wan de pîvanên biyolojîk an jî bihevrebûnên cinsî yên koledar serdest in. Eşqa azad bi zewacên biyolojîk-koledar an jî têkiliyên li derveyî zewacê li cem hev nabin. Qanûnên eşqê xwe li têkiliyên bi vî rengî ranagirin.

Ez ji şehîdên me yên mezin ên jin, ji wan nirxên payebilind hîn bûm ku jin hebûneke bi nirx e. Tişta bi wan pêk hat, belkî jî bi wan eşqa welatê ji destçûyî û nasnameya civakî ya wendabûyî ji nû ve bi awayekî azad hat bidestxistin. Jixwe ev jî eşqeke gelekî hêja, mezin û heqîqî bû. Eşqeke welê bû ku xayîn û durûyên wê gelek bûn û bi vî awayî min jî bîranîna Mem û Zînê hem zindî kir û hem jî pêk anî.

**5- Neteweya Demokratîk û Xweseriya Ekonomîk**

Amûrê modernîteya kapîtalîst ê desthilatdariyê dewleta netewe ye. Bi vî amûrî kara herî zêde bi dest dixe û pê li ser ekonomiyê serdestiya xwe pêk tîne. Ev amûr nebe nikare kara zêde bi dest bixe û nikare sermayeyê kom bike. Di dîroka şaristaniyê de li asteke herî jor talana ekonomîk û li

ser bingehekî diyar ê rewa pêkhatina wê îfade dike. Eger têkiliya wê bi awayekî rast bi kara herî zêde û daneheva sermayeyê re rast neyê analîzkirin, danasîna rast a dewleta netewe nayê kirin. Mirov dewleta netewe bi tenê weke sîstemeke zor û desthilatdariyê nikare bide naskirin. Desthilatdariya dewletê kengî weke neteweya dewlet hat birêxistinkirin dibe modernîteya kapîtalîst, nexasim kara wê ya herî zêde û daneheva wê ya sermayeyê dikare pêk bê. Ev tê wê maneyê, di tevahiya dîrokê de li ser jiyana ekonomîk a civakê serdestiya dewleta netewe di warê desteserkirina nirx-mayeyê herî zêde de gihiştiye payeya herî li jor a dewletê û dewleteke bi vî rengî pêk hatiye. Bi mîlliyetgirî û welatparêziyê cîla dike, bi perwerdeyê dike mîna xweda û berdide nava mûrehkên civakê û bi vî awayî sîstema desteserkirinê ya li ser ekonomiyê rewa dike. Huqûq, polîtîka ekonomiyê, dîplomasî û têgîn, teorî û saziyên li qadên din têne pêkanîn hemû bi heman armanca rewakirinê radibin. Bi kara herî zêde re li ser qada ekonomiyê teroreke dijwar tê meşandin û ev dike ku civak li aliyekî bi nanozikê bixebite û mehkûmî karkeriya bi heqdestiyê bibe, li aliyê din jî beşekî mezin ê civakê dike artêşa bêkaran. Koletiya bi heqdestiyeke kêm û artêşa herî mezin a bêkaran, encamên xwezayî yên kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyalîzmê ne. Ji bo ev hersê hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst pêk bên, divê azadiya civakê ya li ser jiyana ekonomîk ji holê rabe, mehkûmî koletiya bi heqdestê bibe û ne ev bi tenê, divê beşekî mezin ji civakê bibe artêşa bêkaran û koletiya jinê ya bêheqdest an jî bi kêm heqdestî pêk bê. Kapîtalîzm bi giştî zanistên civakî, bi taybetî jî zanista polîtîka ekonomiyê ji bo rastiyên em behsa wan dikin xuya nekin û wan berevajî bikin weke mîtolojiyan pêk tîne, lewma divê mirov ti carî ji wan bawer neke û rûyê wan ê rastî nas bike.

Li dinyayê belkî jî civaka Kurd û Kurdistanê yek ji mînakên sereke ye, sê hemanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst li ser jiyana wê ya ekonomîk heta bigihîje qirkirina çandî sîstemeke talanê ava kiriye, mêr û jinên wê kirine artêşeke mezin a bêkarên bi heqdesta herî kêm dixebitin. Dewletên netewe yên serwer bi şerê taybet ê yekalî qirkirina çandî ya sergirtî û domdar dimeşînin hewl didin Kurdistanê ji welatbûnê derxin. Ya rastî, dîroka dused salên dawî li ser vî bingehî dîroka ji welatbûnê derxistinê ye, û di nava têgîna dewletên netewe ya 'tek welat' de helandin e. Ji bo civaka Kurd ev dîrok tê wê maneyê, hatiye asîmîlekirin û bi tevkujiyan re rûbirû bûye, bêkar hatiye hiştin û bi heqdesta herî kêm hatiye xebitandin û ji ber vê jî azadiya wî ya li ser jiyana ekonomîk ji destê wî hatiye stendin û di encama vê de ji hev belav bûye, bûye mîna eşayayekî û ji xwebûnê derketiye. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de li ser civaka Kurd mêtingerî, asîmîlasyon, tevgerên fethê, tevgerên talan û dagirkeriyê hatin meşandin û kengî sê hêmanên sereke yên modernîteya kapîtalîst (talana kara herî zêde, zilma dewleta netewe, bi riya teknolojiya îndustriyalîzmê zirar û ziyan) li van zêde bûn, di encama qirkirina çandî de bû civakeke wisa ku tirsiya li xwe xwedî derkeve. Civakeke ku li ser ekonomiyê (ekonomiya di dîrokê de cara pêşî hatiye avakirin û mirovatî xwedî kiriye) serdestiya xwe û tercîha xwe ya azad ji dest daye, bi temamî ketiye kontrola cinawirê modern ê sêlingî yê hêmanên biyanî û hevkaran. Bi nanozikê dixebite (mîna masiyê ketibe derziyê) û ev jî nîşan dide ku civakeke ku bi

armanca qirkirinê ve hatiye girêdan. Civakeke ku jinên wê yên ekonomî ava kirine bi temamî bêkar in, û xwediyê kedeke bêqîmet in. Civakeke ku mêrên wê ji bo qaşo malbatê li çar aliyê dinyayê belav bûne. Civakeke ku mirovên wê ji bo mirîşkekê û ji bo bihosteke erd hevdu dikujin. Eşkere ye ku ev civak ji civakbûnê derketiye, civakek e ku hatiye hilweşandin û ji hev de ketiye.

Dagirkeriya ekonomîk, dagirkeriya herî bi tehlûke ye. Dagirkeriya ekonomîk ji bo xistin, hilweşandin û jihevdexistina civakekê rêbaza herî hov e. Civaka Kurd ji statuyên dewletên netewe yên li ser wan zêdetir, bi sedema ku amûrên wan ên ekonomîk hatine desteserkirin û kontrolkirin, bêhnçikandî bûne. Piştî ku civakekê kontrola xwe ya li ser amûrên xwe yên hilberandin û bazara xwe ji dest da, mumkîn nîne ku jiyana xwe bi awayekî azad dewam bike. Kurdan ne bi tenê bi giranî kontrola xwe ya li ser amûrên hilberandin û têkiliyan ji dest da; kontrola li ser hilberandin, bikaranîna berheman û bazirganiyê jî ji destê wan hat derxistin. Ya rastî, li ser bingehê înkarkirina nasnameya xwe çiqasî bi dewletên netewe ve bêne girêdan ewqasî dikarin di bazirganî, pîşesazî û bikaranîna malê xwe de rol bigirin. Di warê esîrgirtina ekonomîk, înkarkirina nasname û bêparhiştina ji azadiyê de kirin amûrekî herî bi bandor. Nexasim kargehên yekalî yên li ser kanên petrolê û çeman hatin avakirin bi qasî hebûnên çandî erdên herî bi bereket jî tine kirin. Piştî mêtingeriya siyasî û çandî mêtingeriya ekonomîk a bêhtir xurtkirin bû derba kujer a dawiyê. Di encamê de nuqteya em gihiştinê dibêje, “Yan ji civakbûnê derkeve, yan jî bimre!”.

Sîstema ekonomiya neteweya demokratîk hem van pêkanînên hov radiwestîne, hem jî kontrola civakê ya li ser ekonomiyê ji nû ve pêk tîne. Di navbera dewleta netewe û neteweya demokratîk de bi kêmanî li ser xweseriya ekonomiyê lihevkirin çêdibe; lihevkirinek yan çareseriyeke di bin vê re wê bê maneya teslîmiyetê û maneya ‘tine bibe’. Mirov xweseriya ekonomiyê ber bi serxwebûnê ve bibe, ev tê wê maneyê ku ev ê jî bibe dewleteke din a netewe ku di encamê de ev teslîmbûna modernîteya kapîtalîst e. Destkişandina ji xweseriya ekonomîk jî teslîmbûna dewleta netewe ya serdest e. Di bingehê naveroka xweseriya ekonomîk de ne kapîtalîzma taybet, ne jî kapîtalîzma dewletê heye. Demokrasî wê xwe di ekonomiyê de nîşan bide, lewma ekonomiya komin û îndustriya ekolojîk esas dibîne. Lewma sînorê ji bo îndustrî, pêşdeçûn, teknolojî, kargeh û milkiyetê tê danîn, di çarçoveya sînorên civakbûna ekolojîk û demokratîk de ye. Di xweseriya ekonomîk de îndustrî, teknolojî, pêşdeçûn, milkiyet û cihûwarbûna bajar û gundan înkara civaka demokratîk û ekolojiyê bikin hingê cih ji wan re tineye. Mirov nikare ekonomiyê weke qadeke daneheva sermaye û karê li ser pêk bê, bihêle. Xweseriya ekonomîk modelek e ku daneheva sermaye û karê lê herî kêm dibe. Tevî ku bazar, bazirganî, cihêrengiya berheman, reqabet û berhemdariyê red nake, serweriya daneheva sermaye û karê qebûl nake. Sîstema malî û fînansê çiqasî ji berhemdarî û karmeşandinê re xizmetê bike wê ewqasî cih bibîne. Ji pereyan bidestxistina pereyan weke mêtinkariyeke herî hêsan qebûl dike û di sîstema xweseriya ekonomîk de ji tîpeke bi vî rengî ya mêtinkariyê re cih nîne. Xweseriya ekonomîk a

neteweya demokratîk xebatê weke zehmetiyekê, weke suxreyekê nabîne, weke çalakiyeke azadbûnê dinirxîne. Pîvana wê ev e, ‘Xebat azadî ye.” Eger xebat weke zehmetî û suxreyê bê fêhmkirin, ev tê wê maneyê li hemberî kedê xerîbketin heye. Kengî encamên kedê ji azadiya ferd û nasnameya wî re xizmet kir, hingê xebat ê weke çalakiyeke bi bextewarî, bi riza dil û bi kêf û xweşî bê kirin.

Karûbarên ekonomîk ên cih nadin îstîsmarê, di serî de civaka neolîtîk li cem tevahiya civakan bi coşa cejnê hatiye pîrozkirin. Xweseriya ekonomîk a neteweya demokratîk sîstemek e ku bi wê ev coş careke din pêk tê. Bendavên li ser çemên Kurdistanê hatine avakirin rê li ber tevkujiyeke tam a dîrokê û felaketa ekolojîk vekirine. Xweseriya ekonomîk destûrê nade ti bendava ekolojiyê, erdên bi bereket û dîrokê li ber çav nagire û heta destûrê nade ku li şûna yên temenê xwe temam kirine yên nû bêne avakirin. Eger mumkîn be, di tesfiyekirina wan de texsîr nake. Bi ruhekî tam ê seferberiyê li dijî erozyon û bêdaristanîbûnê ku dijminê mezin ê civak û zindiyan in, radiweste. Parastina axê û bi daristankirina dewrûberê weke cureyekî herî pîroz ê kedê îlan dike û xebatên di van herdu qadan de têrê dike ku bêkarmayîna sedsalan ji holê rake. Çawa ku di dewleta netewe de ji bo daneheva sermaye û karê qada herî pîroz a xebatê qada kara herî zêde ye, li cem neteweya demokratîk jî xebatên ji bo daristanan, erd û zeviyan qadên herî pîroz in ku xebatên di vî warî de tevahiya dîrokê civak li ser piyan girtine. Bêyî kapîtalîzm û îndustriyalîzmê civak dikarin jiyana xwe dewam bikin; lê erd û daristan nebin jiyana civakî nikare dewam bike. Kapîtalîzmê civak ji erd, gund û daristanan qut kir û di bingehê bêkariyê de ev heye. Hêza kar a erzan û kewara bêkaran ji bo kara herî zêde ya kapîtalîzmê her hewce bûn û lewma diyardeyên wisa ne ku bi zanebûn û bi darê zorê hatine çêkirin. Careke din vegera li erd û zeviyan, li daristanan, bi kurtî vegera li jiyana ekolojîk wê bi tenê bêkariyê ji holê raneke; di heman demê de wê civakê ji kanserojeniya bajaran jî rizgar bike. Bi vî awayî wê bajêr jî rizgar bike. Bajarê weke gir û girêkekê mezin dibe nexweşiyeke kansêrê ye. Jixwe kansêrên ferdî jî weke gelek nexweşiyên din berhemên jiyana bajêr in. Ango vegera li erd û axê, li xebatên ji bo daristanan, cotkarî û xwarinên ekolojîk ne bi tenê ji bo bêkariyê çare ne; panjehra tevahiya nexweşiyên modernîteyê û bajêr in.

Divê mirov ekonomiya komin a xweseriya ekonomîk bi kapîtalîzma dewletê û ekonomiya wê re tevlîhev neke. Naşibe hewldanên kolektîfkirinê yên sosyalîzma pêkhatî jî. Em behsa yekeyên ekonomîk dikin ku herî zêde bi xwezaya mirov û hawîrdorê re li hev in. Di kominê de ji suxre, hewldan û keda nabe azadiyê re cih nîne. Em behsa model û çavkaniya jiyana bingehîn dikin ku civakan tevahiya dîrokê pê xwe heyî kirine, pîroz hesibandine û bi coş pêşwazî kirine. Li ku coş, bereket û xêrûbêr hebe, li wir ekonomiya komin heye.

KCK weke darê piştê yê neteweya demokratîk xweseriya ekonomîk û ekonomiya komin bi kêmanî bi qasî xweparastina civakê hewce û esas dibîne. Çawa ku bêyî xweparastinê civak

nikare hebûna xwe dewam bike, bêyî xweseriya ekonomîk, parastina erd û axê, bêyî daristan, ekolojî û kominê, civak nikare xwe xwedî bike ango nikare hebûna xwe dewam bike.

Ji bo xweseriya ekonomîk bingehekî qanûnî jî hewce dike. Di qanûna dewleta netewe ya serwer de navendîgirî û yeknesakî di bin navê yekîtiya huqûqê de li pêşiya afirîneriya ekonomîk, ekolojî û reqabetê dibe payebend û asteng. Li şûna vê têgihiştina huqûqê ya xwe disipêre mêtingeriya ekonomîk bi awayekî dijwar hewcedarî bi karmeşandin û ekonomiya xwecihî ya koordînasyona ekonomiya neteweyî li ber çavan digire heye. Huqûqeke ekonomîk a diyardeya bazara neteweyî înkar nake, lê dînamîkên bazara xwecihî li ber çavan digire elzem e. Sîstema huqûqê ya xwe disipêre tek navendê hêmana herî mezin a muhafezekariyê ye. Bi temamî rastiyeke siyasî ye, û mentiqê wê yê ekonomîk tineye.

Di şax û aliyê ekonomîk ê çareseriya neteweya demokratîk a pirsgirêka neteweyî ya Kurd de divê xweseriya ekonomîk statuyeke xwe ya qanûnî hebe. Eşkere ye ku KCK binesaziya xwe ya ekonomîk nebe wê nikaribe dewam bike. Huqûqa xwecihî çiqasî li ser qadên ekonomîk ên azadî û hebûna pirsgirêka Kurd ji nêz ve eleqedar dikin xwedî hukim be, ewqasî xwedî girîngiyeke heyatî ye. Di tenzîmkirina milkiyetê, mezinbûna şîrketan, bikaranîna çeman, bikaranîna dewlemendiyên binerd û sererd, saziyên bazaran, sîstema bankeyan, avahiya butçeyên rêveberiyên demokratîk ên xwecihî, sîstema bacê û mijarên bi vî rengî de qanûnên ekonomîk ên xwecihî esas in. Mirov dikare di navbera qanûnên ekonomiya neteweyî û xwecihî de ahengekê pêk bîne.

Rêveberiya ekonomîk a KCK’ê gelekî girîng e. Civakek e ku bingehê wê yê ekonomîk têkçûye qabîliyeta wê ya jiyanê namîne. Em di serdemeke wisa de ne ku di vê serdema me de serxwebûna tam a ekonomîk utopyayeke ekonomîk e ku ti carî pêk nayê, lê li ser bingehê bi kêrhatina beramber pêkan e ku ekonomiyeke xweseriya wê berfireh pêk bê. Derketiye holê ku di serdema fînansa global de modernîteya kapîtalîst gelekî bêkêr e, ji bo mirovatiyê tehlûke ye, û nikare dewam bike. Li hemberî vê, modernîteya demokratîk a xwe disipêre yekeyên neteweya demokratîk divê weke sîstema alternatîf a rizgarbûna ji krîzên ekonomîk, bêkariyê û birçîbûnê bê fêhmkirin.

### 6- Avahiya Huqûq a Neteweya Demokratîk

Huqûqa demokratîk ew huqûq e ku xwe disipêre cihêrengiyê. Ji vê jî girîngtir, kêm serî li tenzîmkirina huqûqê dide û avahiyeke hêsan e. Dewleta netewe ew sîstema dewletê ye ku tevahiya dîrokê tenzîma huqûqî herî zêde pêşde biriye. Lewma tevlî her tiştê civakê dibe, nexasim hewl dide civaka exlaqî û polîtîk tesfiye bike. Civakên berê bi giranî hewl didan bi rêxistiniyên exlaqî û polîtîk pirsgirêkên xwe çareser bikin. Modernîteya kapîtalîst hewl da xwe bisipêre huqûqê û bi vî awayî xwe rewa bike. Ji ber ku zêde dest werda civakê û ew mêt, serî li

wê amûra jêre huqûq tê gotin da ku gelekî tevlîhev û dadê şiklî dike. Çawa ku gelek caran tê gotin, huqûq ji ew yekparebûna qanûnên maf û erkên ferd û civakê sererast dikin wêdetir, ew hunerê rêveberiyê ye ku tevahiya dîrokê neheqiyên mezin ên kapîtalîzmê rê li ber wan vekiriye bi têgihiştineke şiklî ya dadê bi hejmareke zêde ya qanûnan rewa kiriye. Li şûna bi pîvanên exlaqî û polîtîk bi rê ve bibe bi qanûnan bi rê ve dibe û ev bêhtir xweserî modernîteya kapîtalîst e. Bûrjûwaziya exlaq û polîtîkayê înkar dike serî li erka huqûqê dide ku hêzeke mezin didiyê. Di destê bûrjûwaziyê de sîleheke mezin e. Xwe hem li dijî nîzama berê ya exlaqî û polîtîk, hem jî li hemberî kedkarên li qata jêr bi huqûqê diparêze. Dewleta netewe bi giranî hêza xwe ji erka huqûqê ya bi awayekî yekalî hatiye amadekirin digire. Huqûq bi awayekî ayetên xwedayê dewleta netewe ye. Tercîh dike ku civakê bi van ayetan bi rê ve bibe.

Ji ber vê yekê, neteweya demokratîk li hemberî huqûqê, nexasim li hemberî huqûqa destûrî hestyar e. Neteweya demokratîk ji neteweya huqûqê bêhtir exlaqî û polîtîk e. Kengî bi dewletên netewe re ji bo jiyana li bin banekî li hev hat kirin, hingê pêdivî bi huqûqê çêdibe. Cihêbûna qanûnên neteweyî û qanûnên xwecihî girîng dibin. Kengî huqûqa dewleta netewe ya ku berjewendiyên burokratîk navendî yek alî dike esas bi berxwedana komên çandî û xwecihî re rûbirû bibe, hingê neçar wê qanûnên rêveberiya herêmî qebûl bike. Di serî de DYE û welatên Yekîtiya Ewrûpayê, li gelek welatên dinyayê sîstemên huqûqê yên federal û federe dimeşin. Li dijî kapîtalîzma yekdestdar û burokrasiya navendî sîstemên ku berjewendiyên gelan diparêzin û di wezna navbera hêzên dijber de cih digirin, bêhtir bi pêş dikevin.

Ji ber ku hebûna Kurdan û Kurdistanê tê înkarkirin û îmhakirin, huqûqeke wan a xweser çênebûye. Di nava sîstema Osmanî de hem nivîskî hem jî bi awayekî rêûresmî huqûqeke wan hebû. Tevî ku di pêvajoya rizgariya neteweyî de nasnameya Kurd û Kurdistanê û heta qanûna reformê ya Kurd bi awayekî fermî hat qebûlkirin jî ji 1925’an ve bi rêbazên komplo, darbe û asîmîlasyonê nasnameya wan tine hat hesibandin û hewl dan wan ji nava rûpelên dîrokê rakin. Tevî ku berxwedana PKK’ê hebûna Kurd misoger kiriye jî danasîna Kurd a qanûnî pêk neaniye. Di dema KCK’ê de dewletên netewe yan wê hebûna Kurd bi awayekî qanûnî nas bikin an jî wê huqûqa xwe ya xweseriyê bi awayekî yekalî pêk bînin. KCK beriya her tiştî wê hewl bide di nava destûrên neteweyî de ji xwe re cihekî bibîne. Ango beriya her tiştî wê hewl bide statuya xwe ya xweseriya demokratîk di nava destûrên demokratîk ên neteweyî de îfade bike. Di nava welatên Yekîtiya Ewrûpayê de ku Komara Tirkiyê jî dixwaze tevlî bibe, li gelek welatên endamê wê huqûqên bi vî rengî hene. Jixwe di pirsgirêka Kurd de mebest ji çareseriya demokratîk û aştiyane lihevkirineke li ser destûra demokratîk a neteweyî ya bi statuya (bi qanûnî) xweseriya demokratîk e. Li Iraqê ya pêk hat û li Tirkiyê û Kurdistanê gelekî tê guftûgokirin çareseriyeke bi vî rengî ye. Eger KCK di çareseriya destûra demokratîk a neteweyî ya bi statuya xweseriya demokratîk a xwe disipêre lihevkirinê de bi ser nekeve, hingê wê bikeve riya duyemîn ango bi awayekî yekalî bikeve riya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk. Li Kurdistanê Rêveberiya

Xweseriya Demokratîk rêveberiyeke huqûqê ya dewleta netewe nîne, di asta herêmî û xwecihî de rêveberiya modernîteya demokratîk e.

**7- Çanda Neteweya Demokratîk**

Şax û aliyê çandî di pêkhatina neteweyan de xusûseke girîng e.

Çand di çarçoveyeke teng de heqîqeta hest û zêhniyeta ji rêûresmê ya civakan îfade dike. Dîn, felsefe, mîtolojî, zanist û qadên cûrbicûr ên hunerî di çarçoveyeke teng de çanda civakekê pêk tînin. Bi awayekî rewşa rûhî û zêhnî ya civakekê nîşan didin. Dema bi destê dewleta netewe yan jî bi destê dewletê netewe têne pêkanîn, cîhana çandî gelekî tê berevajîkirin û qirkirin. Modernîteya kapîtalîst rêûresmê bi tevahî heqîqeta wê, weke xwe qebûl nake. Ji wê çi bê hesabê wê diparzinîne û li ser bingehê berjewendiyên xwe vediguherîne û digire. Bi navê dîroka çandî tişta mohra xwe lê dixe û datîne pêşiya ferd û civakê tiştekî din e; li ser navê dîrokê bêdîrokî, li ser navê çandê bêçandîtî ye. Bi gotineke din, tevahiya dîroka mirovatiyê û çanda wê bi berçavka kapîtalîzmê ya berjewendiyan û xerîzeya wê hildibijêre, mîna resmekî nû çêke li pêşberî me radixe. Di vê çarçoveyê de modernîteya kapîtalîst û hêmana wê ya herî girîng dewleta netewe, tevgera reşkirin û berevajîkirina çand û rêûresmeke mezin in. Weke heqîqet derbeke mezin e ku li çand û dîrokê dikeve. Ji lewra wekî din nikare pîvana daneheva sermayeyê û kara herî zêde ya pêk tîne rewa bike. Modernîte û dewleta netewe heta dîrok û çandê li gorî xwe ji nû ve ava nekin nikarin xwe pêk bînin. Rastiya modernîte û dewleta netewe ya derdikeve holê weke heqîqet û rastiyeke din a cuda ya dîrok û çandê maneyeke cuda îfade dikin.

Neteweya demokratîk maneya rastî ya dîrok û çandê li wan vedigerîne û bi vî awayî hewl dide xwe pêk bîne. Çand û dîroka hatine berevajîkirin û qirkirin di pêvajoya neteweya demokratîk de mîna ku Ronesansa xwe bibînin. Jixwe Ronesansa di serdema navîn a Ewrûpayê de derkete holê ji nû ve zindîbûn û hilatina dîrok û çanda Grek û Romayê îfade dikir. Paşê tevahiya qewm û welatên Ewrûpayê bi mînaka Îtalyayê rabûn, Ronesansa xwe pêk anîn û di netewebûyîna demokratîk de bi ser ketin. Ev dihat wê maneyê ku her gelî ji nû ve xwe digihand dîrok û çanda xwe (ji Katolîktiyê ango gerdûnîtiyê dibihurîn) û bi vî awayî xwe weke neteweya demokratîk ava dikir. Di destpêka netewebûyîna Ewrûpayê de hêmanên dîrok û çandê serdest bûn. Ev hêman jî bi awayekî bingehîn dîrok û çanda gelan û qewman bû. Di vê çarçoveyê de, li cem neteweyên pêk dihatin meyla demokratîk bêhtir giraniya xwe nîşan dida. Paşê meyla çîna bûrjûwaziyê bi pêş ket û nexasim di Şoreşa Franseyê de hegemonya xwe ava kir û bi vî awayî karektera neteweya demokratîk a mohra desthilatdarî û dewletê li ser bû, veguherî dewleta netewe. Ya rastî, pêşî Şoreşa Franseyê ya mezin bi tevahî tişta di şoreşên Ewrûpayê de –bi derengî be jî Şoreşa Rûs jî di navê de – qewimî li dijî neteweya demokratîk û şoreşa neteweya demokratîk dijşoreşa dewleta netewe bû. Dewleta netewe li dijî şoreşên mezin ên demokratîk ên gelên Ewrûpayê û kedkarên wê, tevgereke mezin a dijşoreşê bû. Li Ewrûpayê û paşê li tevahiya

dinyayê neteweparêziya bi destê her dewleta netewe yan dewletê tevgereke mezin a dijşoreşê ya kapîtalîzmê û bûrjûwaziyê ye ku li dijî sosyalîzmê û proleteriyayê, li dijî şoreşên wan ên neteweya demokratîk, li dijî neteweyên şoreşger û piştgiriya gelan û li dijî enternasyonalîzmê pêk hatine.

Bi kurtasî, her dewleta netewe dijşoreşek e. Dîkta û faşîzma kapîtalîzmê, bûrjûwaziyê û hevparên wan e. Sîstema kapîtalîst û çîna wê ya damezrîner bûrjûwayê, li dijî sîstema bêxêrûbêr feodalîzmê û nûnerên wê qral û prensên feodal maskeya şoreşger dan ber rûyê xwe, lê ya rastî, yên li hemberî feodalan şer kirin gel bûn; tevgerên gelan ên şoreşger û neteweyên demokratîk bûn. Serketin jî heqê wan bû. Bûrjûwazî ket nava tevahiya van şoreşên gelan û tevgerên neteweya demokratîk. Hêza xwe ya ekonomîk bi kar anî û li dijî şoreşên neteweyên demokratîk bi mîlliyetgiriya dewleta mîllî û neteweya dewletê dijşoreş bi awayekî berfireh meşand û bi vî awayî di bin hegemonya xwe de mohra xwe li serdemê xist. Serdema kapîtalîzmê li nava dinyayê bi şaristaniya nû ango hegemonya modernîteya kapîtalîzmê ava kir û payebilind kir.

Şaşiya herî mezin a damezrînerên sosyalîzma zanistî K. Marks û F. Engels ew bû, li şûna ku li dijî van dijşoreşên dewleta netewe yên di nîvê sedsala 19. de herî dawî li Elmanya û Îtalyayê bi serketin rawestiyana, destek dan wan. Heta roja me ya îro li dijî tevger û şoreşên neteweya demokratîk a gelan, piştî bûrjûwaziyê, ev şaşî bû derba herî mezin. Ji encamên wê hemû kedkar, gelan û neteweyan zirar û êşên mezin dîtin.

Şoreşên neteweya demokratîk ên di salên 1919-1922’an de li Anatolya û Mezopotamyayê bi rastî berhemên gelan bûn. Serketina van şoreşan bi saya hevgirtina gelan pêk hatiye. Daxuyaniyên M. Kemal ê ji van şoreşan re pêşengî kiriye bi tevahî vê rastiyê îfade dikin. Du hêmanên bingehîn ên şoreşa neteweyî gelê Kurd û Tirk bûn. Bi awayekî îdeolojîk û polîtîk welatparêziya Tirk, Kurd, Cihû (Sabetayîst) û Çerkezan, ummetgiriya Îslamî û Kominîstiyê hev girtibûn. Ango serketina bi vê hevgirtinê hatibû bidestxistin li dijî emperyalîzmê û hevkarên wê şoreşeke neteweyî demokratîk bû. Baş e, klîka em jêre dikarin bûrjûwazî bibêjin çi kir? Ango bûrjûwaziya Masonîk a di bin navê Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de hatibû cem hev û weke Jon Tirkan (têkiliya pirraniya wan bi Tirkîtiyê re nîne) dihate binavkirin ji kê pêk dihat û bi kîjan komployan mohra xwe li desthilatdarî û şoreşên neteweyî xist? Bi tevahî rewşenbîr û zanyarên xwedî wijdan baş zanin ku Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê rêxistineke komplo û darbeyan e. Her kesê ku kêm zêde pêwendiya xwe bi mijarê re heye dizane ku bi desteserkirina desthilatdariyê pêşî Şoreşa Meşrûtiyeta Duyemîn paşê jî di Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de mohra xwe li tevahiya desthilatdariyê xist. Herweha divê mirov baş zanibe ka çawa bi xasûkî ketine nava şoreşa neteweyî ya sala 1919-1922’an, nexasim jî yên bi hegemonya Ingilîz re hevkarî kirin divê mirov bi komplo, reşkujî û darbeyên wan baş zanibe. Yên Serokê Partiya Kominîst a Tirkiyê TKP Mistefa Suphî û tevahiya endamên Komîteya Navendî panzdeh kes di Deryareş de bi komployê

xeniqandin, ev kes bûn. Ma ne Bolşevîkên temsîla wan dikirin di serketina şoreşa neteweyî de xwedî rola stratejîk bûn. Ma ne Çerkez Ethem û hêzên wî ku bi komployê neçar kirin xwe biavêjin bextê artêşa Yewnanî, li ser riya şoreşa neteweyî gelek serîrakirinên dijşoreşê tepisandibûn. Dîsa beşekî mezin kesên weke dîndarên sextekar kuştin, ew ummetgirên Îslamî bûn ku di rizgariya neteweyî de bi roleke stratejîk rabûbûn. Mehmed Akif û Seîdê Nûrsî yên piştî serketinê surgûn kirin heta bi serketinê di xizmeta şoreşa neteweyî de bûn. Ji Koçgiriyê heta bi Dêrsimê, ji Silêmaniyê heta bi Diyarbekirê Kurdên Sunnî û Elewî bi awayekî erênî bersiv dan bangên M. Kemal ên ji bo hevgirtina stratejîk û tevî ku rola wan di serketina şoreşa neteweyî de stratejîk bû jî hem di dema şoreşê de û hem jî piştî şoreşê hatin îmhakirin û înkarkirin. Hêzên ew îmha û înkar kirin dîsa ev hêzên komploger bûn. Dîsa van heman kesan li Îzmîrê hewl dan M. Kemal bikujin û paşê ew bi awayekî mîtolojîk derxistin payeya xwedatiyê û bi vî rengî ew bêtesîr kirin û xistin nava pêxîrtengiyeke mezin.

Ev kes kî ne? Em ji wan re Tirkên Spî dibêjin û bi giranî Tirk nînin; em ji wan re bermahiyên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê dibêjin. Navê wan girîng nîne, naveroka wan girîng e. Pirr zêde eşkere ye ku kesên em behsa wan dikin desthilatdariya dewletê xistin destê xwe û pê bûn bûrjûwazî, bi vî awayî hem di dema Meşrûtiyetê de hem jî di dema Komarê de tevgerên neteweyî yên demokratîk ên diberidîn bi komplo, bi darbe û bi reşkujiyan li wan didan û kontrol dixistin destê xwe. Ev dijşoreşên dewleta netewe di vî warî de ewqasî hoste bûn Hîtler bi xwe jî li xwe mikur dihat û fikar nedikir digot, ew wan ji xwe re mînak digire. Eger em dixwazin li dîroka modern a Anatolya û Mezopotamyayê, li ya Tirkiyê û Kurdistanê, li civaka neteweyî ya demokratîk û şoreşa neteweyî ya pêk hat bi awayekî rastî serwext bibin, divê em dijşoreşa neteweya dewlet û dijşoreşgerên vê dijşoreşê baş fêhm bikin. Naxwe bi awayekî din em nikarin dîroka nêz û dîroka Komarê rast fêhm bikin. Nexasim em ê nikaribin dîrok û çandeke bi qasî mirovatiyê kevin, dîrok û çanda Anatolya û Mezopotamyayê ya li înkar û qirkirinê qewimiye, têra xwe û rast hîn bibin. Em heta hîn nebin û qebûl nekin, em ê nikaribin li ser heman cografyayê tevger û hevgirtina neteweya demokratîk a gelên xwe bi awayekî serketî ava bikin û bi pêş bixin.

Di pirsgirêka Kurd de çareseriya neteweya demokratîk beriya her tiştî bi danasîna rast a dîrok û çanda Kurd ve girêdayî ye. Danasîna rast a dîrok û çandê bi xwe re naskirina hebûna civakî jî tîne. Pêkhatina civaka neteweyî tê wê maneyê ku ruh û bîreweriya dîrok û çandê pêk hatiye. Di dîroka Komarê de înkar û îmhaya Kurdan (di dîrokên dewletên netewe yên din de jî pêkanînên bi heman rengî hene) pêşî ji înkara dîroka Kurdan û ji îmhakirina hebûna çanda wan dan destpêkirin. Serê pêşî hêmanên çandî yên manewî, paşê jî hêmanên çandî yên maddî hatine tesfiyekirin. Ji lewra destpêkeke di cih de bû ku PKK'ê bi pêkanîna bîreweriya dîrok û çandê dest pê kir. PKK'ê hewl dida dîrok û çanda Kurd bi dîrok û çanda gelên cîhanê re bide ber hev û rave bike û ev hewldana xwe bi manîfestoya bi navê **Riya Şoreşa Kurdistanê** îlan kir û ji bo dîrok û

çanda Kurd ji nû ve bi ruh bibe bi rola Ronesansa şoreşgerî rabûye. Mirov dikare bibêje, netewebûyîna demokratîk a Kurdan bi vê manîfestoyê destpêkeke radîkal kiriye. Hebûna çandî ya Kurd bi Pêngava Tebaxa 1984’an di şer de hat ceribandin, bi gelek bûyerên qehremaniyê geşbûn û zindîbûna xwe îspat kir. Eger xeta îdeolojîk û polîtîk a PKK’ê û şerê gel ê jêre pêşengî kir rast nebûya, dîrok û çanda Kurd rast nîşan nedabûya, Kurdan ê nikarîbûya hebûna xwe dewam bikira. Jixwe di wê demê de gelek kom û kesayet bi heman îdeayan nêzî pirsgirêkê bûn, lê ji ber ku hemû li dîrok û çanda Kurd rast xwedî derneketin ji tesfiyebûyînê rizgar nebûn.

Avakirina neteweya demokratîk a Kurd di warê avakirina netewe de ji aliyê reng û naverokê ve ji nêzîkatiyên mîlliyetgir û dewletdar cuda ye. Ji netewetiya dewleta netewe ya serwer cuda ye, ji dewletdarî û mîlliyetgiriya Kurd jî cuda ye, û li dijî wan neteweya alternatîf a xwe dispêre dîrok û çanda gelan û kedkaran derdixe holê ku ew jî avakirina neteweya demokratîk e.

Avakeriya neteweya demokratîk a Kurd li rola Kurd a tevahiya dîroka Komarê hatiye înkarin û weke hêmana bingehîn tevlî şoreşa neteweyî ya salên 1919-1922’an bûye, xwedî derdikeve. Şoreşa neteweyî çi qasî ya Tirkan e, ewqasî jî ya Kurdan û hevgirtiyên din ên beşdarbûyî ye. Di pêvajoyên paşê de li derve hiştina hevgirtiyan, înkarkirina dîrok û çanda wan weke darbeyeke li dijî karektera gelêrî ya şoreşê dihesibîne. Berxwedana Kurdan a li dijî vê darbeyê rewa, pêşverû û azadîxwaz dinirxîne. Herweha beyan dike ku hevgirtina stratejîk a Kurd û Tirkan bi Şerê Melezgirê (1071) dest pê kir li ser bingehê bi riza dilê herdu aliyan e, tevî ku carinan qut bûbe jî ji wê rojê ve di pêkhateyên desthilatdarî û dewletê de Kurd û Tirk du hevparên bingehîn in, ango di navbera dîrok û çanda herdu gelan de hevpariyeke xurt heye û gelekî ketine nava hevdu. Qebûl dike ku Kurd û Tirk de dîroka dused salên dawî ya Rojhilata Navîn de bi roleke stratejîk a hevpar rabûne. PKK û KCK’ê der barê dîrok û çanda Kurd de bi fikrên xwe yên di vê parêznameyê de bêhtir berfireh kirine, bi nêzîkatiyên îdeolojîk û polîtîk zêdetir zelal û xurt kirine. Bi gelên din re, bi têgihiştina neteweya demokratîk deriyê wê li hevgirtin û yekîtiyên neteweyî vekiriye. Gerdûnîtî (mînaka wê ya berbiçav ummetgeriya Îslamê ye) û yekîtiyên tevahiya dîrokê di çanda Rojhilata Navîn de hebûn, aktualîzekirin û avakirina wan riya bi tenê ya azadî û rizgariya rastî ya gelên Rojhilata Navîn dihesibîne.

Neteweya demokratîk a Kurd ku di dema KCK’ê de wê bêhtir bi gewde bibe, bi tevahî şaxên xwe ezmûneke nû ya avakirina neteweyî ya ji bo gelên Rojhilata Navîn bibe model wê pêşkêş bike. Li dijî înkarkeriya dîrok û çandê ya dewletên netewe yên ji rola ajantiya modernîteya Rojava nikarin bibihurin, bi Ronesansa neteweya demokratîk û şoreşger wê pêşdeçûna serdemeke nû, serdema modernîteya demokratîk bide destpêkirin.

**8- Sîstema Xweparastina Neteweya Demokratîk**

Di cîhana zindî û ruhberan de her cure û celeb li gorî xwe xwedî sîstemeke parastinê ye. Cureyekî bi tenê yê zindiyan tineye ku bêparastin be. Heta mirov dikare li gerdûnê berxwedana her elementî û her perçikî ji bo parastina hebûna xwe weke xweparastinê şîrove bike. Berxwedana li dijî deformebûn û derketina ji xwebûnê eşkere bi têgînên xweparastinê tê îfadekirin. Kengî ev berxwedan têk biçe, ew element an perçik berepaş diçe, ji xwebûnê derdikeve, vediguhere hêmaneke din. Di cîhana zindiyan de kengî berxwedana xweparastinê bişkê, hingê ew zindî yan ji bo zindiyên din dibe xwarin an jî dimire.

Heman sîstem ji bo civak û cinsê mirov bi zêdehî di cih de ye. Cureyekî narîn mîna mirov û civaka wî hebûnên li tehlûkeyan vekirî xweparastineke wan a bi hêz nebe nikarin hebûna xwe demeke dirêj li ser piyan bigirin. Li cem cinsê mirov parastin bi qasî ku biyolojîk e, ewqasî jî civakî ye. Parastina biyolojîk li cem her hebûna zindî ji aliyê xerîzeyên parastinê ve tê pêkanîn. Parastina civakî jî bi hevpariyeke tevahiya ferdên komê tê bicihanîn. Heta li gorî derfetên parastinê hejmara komê û şêweyê rêxistiniya wê timî diguhere. Parastin yek ji fonksiyonên bingehîn ê komê ye ku dimeşîne. Jiyan bêyî parastinê ti carî nameşe. Çawa ku tê zanîn du fonksiyonên din ên bingehîn xwe xwedîkirin û xwe zêdekirin e. Çawa ku xwe xwedîkirin û xwezêdekirin nebe zindî û ruhber nikarin jiyana xwe dewam bikin, bêyî xweparastinê jî nikarin jiyana xwe dewam bikin. Encameke din a girîng ku mirov dikare ji cîhana xweparastinê ya zindiyan bigire ew e, ev xweparastin bi tenê ji bo parastina hebûnê ye. Li ser cureyên xwe, heta li ser hebûna cureyên din sîstemên mêtinkarî û serdestiyê ava nake. Cara pêşî li cem cureyê mirov sîstemên serdestî û mêtinkariyê pêk hatine. Di vê de pêşketina zêhnê cureyê mirov ê rê li ber derfetên mêtinkariyê vekiriye û bi vê ve girêdayî bidestxistina berhemê zêde bi tesîr bûne. Ev rewş ne bi tenê bergiriya hebûna xwe, herweha parastina nirxên kedê ango şerên civakî jî bi xwe re tîne.

Li gorî şertên berbiçav ên Kurdan xweparastin tevahiya dîrokê ji bo wan her tim girîng bû. Ji ber ku komên Kurdan demeke dirêj û hûrûkûr bi şoreşa neolîtîkê rabûn û di dereceya yekemîn de paşhatiyên wê bûn, timî bi êrîşan re rûbirû bûn. Ji ber hatin û berhemên zêde yên şoreşa cotkariyê li Kevana Bi Bereket timî êrîşan di rojevê de cih girtin. Bi hezaran salan bi vî awayî dewam kir. Piştî ku sîstemên şaristaniyê yên li ser berhemên zêde xwe bi pêş xistin, hêzên xwe di çarçoveya bajar, çîn û dewletê de ava kirin, dema êrîşên wan ên bi pîlan û sîstematîk jî dest pê kir. Ji şaristaniya Sumeran heta bi hêza herî dawî ya hegemon a şaristaniya serdest a roja me ya îro DYE bêhejmar hêzên şaristaniyê êrîşên wan ên yekser an neyekser li ser herêmê û komên wê kêm nebûne.

Bi modernîteya kapîtalîst re êrîşên dused salên dawî ketine kirasekî din û rengekî din girtine. Ji serdema destpêkê ve weke yekeyên qebîle û eşîran li qadên çiyayî bergiriya hebûna xwe kirine

ango xwedî sîstemeke xweparastinê bûn, lê li hemberî amûrên êrîşê yên bi sîstema kapîtalîst re derketine holê ev sîstema wan a bergiriyê kêm ma û têrê nekir. Cara pêşî ye ku tehlûke çêdibe hebûna xwe ji dest bidin û ev dikeve rojevê. Ji aliyê Kurdan ve, avahiya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst, ne bi tenê azadiyên wan ji destên wan digire, di heman demê de dibe sedem ku hebûna wan jî bikeve tehlûkeyê. Di nava sînorên siyasî de bername û çalakiya 'tek ziman', 'tek netewe' û 'tek welat' hatiye meşandin û di nava wan sînoran de jî ziman, netewe û welatên din bi înkar û îmhayê re rûbirû bûn. Kurdistan hat parçekirin û dewletên netewe Kurdên li her parçeyî xistin nava diranên înkar û îmhayê. Dewletên netewe yên ku hêzên hegemonîk piştgiriya wan dikirin, tesfiyekirina Kurd û Kurdistanê weke polîtîkayên bingehîn qebûl kirin. Kengî berxwedana xweparastinê ya Kurdan kêm ma û şikest, hingê dor hat hilweşîn û jihevdeketina civakê, û bi vê re komikên civakê yên mayî bêne asîmîlekirin û tesfiyekirin.

Vê pêvajoya tesfiyekirinê bi dijwarî dewam kir. Tevgera PKK'ê weke nerazîbûnekê derket holê û di destpêkê de bi awayekî bingehîn tevgera xweparastinê ya Kurdan e. Tevgera xweparastinê ya pêşî bi awayekî îdeolojîk û polîtîk hat meşandin, di demeke kin de gav avêt qonaxa xweparastinê ya li ser bingehê şîddeta li beramberî hevdû. Parastina çekdarî ya di destpêkê de bi tenê xwe disipart parastina hebûna kadro û sempatîzanan, bi Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an re gel jî xist çarçoveya xwe û bi vî awayî berê xwe fireh kir. Tevger veguherî şerê xweparastina gel û lewma bû hedefa êrîşên bi plan ên hêzên hegemonîk ên pêwendîdar hemûyan, nexasim hêzên NATO-Gladîo. Bi tevahî hêzên ditirsiyan ku Kurdên li Kurdistanê li ser çarenûsa xwe bibin xwedî gotin û tewazunên li herêmê serûbinî hev bikin, li pişt van êrîşan cih girtin. Lê tevî vê jî van şerên berxwedanê derbeke mezin li polîtîkayên înkar, îmha û asîmîlasyonê dan. Xwedîderketina gel a li nasnameya xwe û helwesta bi israr a ji bo jiyana azad misoger kir. Herçiqasî bi tevahî armancên berê yên dewletên netewe ji bo tesfiyekirina gelê Kurd bi dawî nebûbin jî weke berê îddîayên wan nemane. Em gihiştine wê qonaxê ku nasnameya Kurd bê qebûlkirin û ji jiyana xweser re rêz bê nîşandan. Ev rewş ji aliyê şerê xweparastinê ve rewşeke nû ye. PKK'ê bi riya KCK'ê hewl daye vê rewşa nû binirxîne.

Di avakirina neteweya demokratîk a KCK'ê de sernavekî girîng ê bernameyê û bêyî wî nabe, xweparastin e. Ango sîstematîka xweparastineke mayînde wê çawa bibe. Dewletên netewe yekdestdariya hêza sîlehê bi tenê di destê xwe de digirin û kengî keysê lê bînin di polîtîkayên nû yên înkar, îmha û asîmîlasyonê de bi kar tînin û ev yek jî KCK'ê neçarî sîstemeke mayînde ya xweparastinê dike. Ji bo jiyaneke hevpar bi dewletên netewe re şert e ku bi kêmanî nasnameya Kurd û jiyana wî ya azad bi destûra bingehîn bê misogerkirin. Bêguman misogeriya bi destûra bingehîn têrê nake, wekî din divê bi statuyên bi qanûnan bê diyarkirin li şertên berbiçav ên vê misogeriyê bê pirsîn. Ji bilî parastina neteweyî ya hevpar a li dijî derve, karûbarên ewlekariyê yên hundir divê civaka Kurd bi xwe pêk bîne. Ji ber ku herî baş civakeke bi xwe pêdiviyên xwe yên ewlekariya hundir dizane û dikare bi awayekî di cih de pêk bîne. Lewma divê dewletên

netewe yên pêwendîdar (dewletên netewe yên navendî Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûrî) di polîtîkayên xwe yên ewlekariya hundir de reformên girîng bikin. Kengî çareseriya demokratîk û aştî pêk hat divê KCK jî hêzên xweparastinê ango Hêzên Parastina Gel HPG'ê ji nû ve bi rêkûpêk bike. Bêguman ji bo ji nû ve bi rêkûpêkkirinê qanûnên nû divên. Eşkere ye ku sîstemên mîna Alayên Hemîdiyê û 'cerdevanên gundan' wê neyên qebûlkirin. Lê li ser bingehê lihevkirina bi dewletên netewe re û di çarçoveya ewlekariya hundir a qanûnî de ji nû ve birêkêpêkkirina hêzan mumkîn e.

Eger bi dewletên netewe yên pêwendîdar re lihevkirin nebe, KCK wê hewl bide bi awayekî yekalî avakirina neteweya xwe ya demokratîk di çarçoveya parastina hemû alî û şaxên wê de, hêzên xwe yên xweparastinê ji aliyê hejmar û naverokê ve li gorî pêdiviyan ji nû ve bi rêkûpêk bike. Hêzên HPG'ê yên ji nû ve bêne bi rêkûpêkkirin, wê ji parastina avakirina netewebûyîna demokratîk di her qadê û aliyî de berpirsiyar bin, wê bi awayekî hêja otorîteya neteweyî ya demokratîk ava bikin. Ji ewlekariya mal û canê ferd-welatiyê neteweya demokratîk berpirsiyar bin. Li dijî hemû pêkanînên (şerên eskerî, polîtîk, çandî, civakî û derûnî) dewleta netewe yên gihiştine asta qirkirina çandî bi awayekî domdar di rewşa şer de bin. Hebûn û azadiya Kurdan û Kurdistanê bêyî xweparastinê nabe.

**9- Dîplomasiya Neteweya Demokratîk**

Yek ji saziyên dewletên netewe bi pêş xistine xebata dîplomasiyê ya di navbera dewletên netewe de ye. Dîplomasî, şêweyê xebatê yê berî şeran di navbera neteweyan de terîf dike. Di dîroka dewletên netewe de mirov dikare wê weke qonaxa amadekariyê ya şeran binirxîne. Tevahiya dîrokê têkiliyên cîrantiyê di navbera her cure yekeyên koman de bi şêweyên ji rêûresmê têne îfadekirin û ev şêwe bi xwe rîtuelên diyar in. Nirxeke payebilind ji bo wan heye. Dewletên netewe ev şêweyê têkiliyan bi sazî kirin û ev yek bi meyla kara herî zêde ya modernîteya kapîtalîst ve girêdayî ye. Eger tev têkilî di dema aştiyê de bêhtir karê bînin hingê hewcedarî bi şer namîne. Bi dîplomasiyê têkiliyên karê têne diyarkirin. Eger meyla kara herî zêde bi şer ve girêdayî be, hemû hêzên dîplomatîk bêne cem hev jî nikarin şerê kar têde heye asteng bikin. Ango dîplomasî bi kêr nayê. Dîplomasiyeke mentiqê wê li gorî karê, ti têkiliya xwe bi şêwazê têkiliyên herî bi nirx ên di navbera civakan de tevahiya dîrokê hatiye dîtin, nemaye. Dîplomasî di navbera dewletên netewe de bûye amûrekî manîpulasyonê yê lîstikên şer ên ji bo karê. Êdî ne amûrê aştiyê ye, bûye amûrê amadekirina şeran.

Bi rêûresma neteweya demokratîk wê dîplomasî bibe amûrê danûstendineke afirîner û di navbera civakan de bibe amûrê piştgirî û aştiyê, bi awayekî bingehîn wê bi çareserkirina pirsgirêkan re mijûl bibe, bilebike. Ne amûrê şeran, lê amûrê têkiliyên kêrhatî û aştiyê ye. Mîsyoneke nirxê xwe payeberz a polîtîk û exlaqî ya mirovên zanyar pê radibin îfade dike. Nexasim di navbera gelên cîran û komên xizm de ji bo ku têkiliyên dostane pêk bên, pêvajoyên

bi xêrûbêr û kêrhatî bi pêş bikevin û dewam bikin, bi roleke girîng radibe. Ji bo civakbûyînên hevpar, ji bo ku di asta jor de sentezên civakan pêk bên hêza avaker e.

Di dîroka Kurdan de erênî an neyênî gelek pêvajoyên têkiliyên dîplomatîk hebûna xwe her dewam kirine. Ji ber pirr parçebûnê û îzolebûna di nava koman de, nirxeke payeberz bi xebatên qasidiyê hatiye dayîn û dema ku baş hatibe bicihanîn bi awayekî gelekî hêja bi kêra jiyana civakî hatiye. Kengî bi niyeteke xirab an jî ji bo berjewendiyên ferdî û komikî hatibe bikaranîn, rê li ber dijminatî û şeran vekiriye.

Roja me ya îro Kurd hem ji bo têkiliyên di navbera xwe û cîranên xwe de, hem jî ji bo têkiliyên di qada global de pirr hewcedarî dîplomasiyeke manedar in. Ji bo bergiriya hebûna xwe bikin û ji bo azadiya xwe pêk bînin, xebatên dîplomatîk ên erênî rola xwe gelekî mezin in. Di dema nêz de, di pêvajoya moderníteya kapîtalîst de belkî li nava dinyayê gelê herî zêde bûye qurbanê lîstikên dîplomatîk gelê Kurd e. Tevahiya sedsalên 19. û 20. di parçebûna Rojhilata Navîn de û di ketina wê ya bin hegemonya sîstema kapîtalîst de rola qurbanê para Kurdan ketiye. Nexasim di Şerên Yekemîn û Duyemîn ên Cîhanê de bûne qurbanên herî stratejîk. Di dîplomasiya Rojhilata Navîn de (dîplomasiya dewleta netewe) rola para Kurdan ket timî piyontiya xelkê bû û vê rewşê rê li ber gelek encamên giran vekiriye. Kurd bi tabloyên bi qasî qirkirinê bi êş re rûbirû bûn. Hemin di vê de bi qasî hevkartiya Kurd para berxwedanên Kurd ên ji rêbazên modern qut jî gelek hebû.

Dema ku mirov hem ji aliyê konjonkturel û hem jî ji aliyê çînî ve bibîne ku pêkhatina dewleteke netewe ya Kurd a yekbûyî şensê wê gelekî kêm e, mirov ê dîsa bibîne ku dîplomasiya bi vê aramancê tê meşandin jî şensê wê yê çareserkirinê pirr hindik e. Çawa ku tê zanîn, ji xebatên bi vê armancê di dused salên dawiyê de hatine meşandin encameke serketî bi dest nehatiye xistin. Ji ber ku xwezaya pirsgirêka Kurd derfet û îmkanên serketinê di xebatên dîplomasiyê de nade. Dîplomasiya dewleta netewe der barê Kurdan de çareserker nîne, dixetimîne, nakokiyên di navbera parçeyan de zêde dike û em gelek rolên wê yên neyênî dibînin ka çawa bi awayekî eşkere rê li dewletên netewe yên dijmin vekiriye. Lewma pirr bi dijwarî hewcedarî bi dîplomasiyeke nû, bi dîplomasiya neteweya demokratîk heye.

Dîplomasiya neteweya demokratîk, beriya her tiştî divê di navbera Kurdên parçe bûne û li dora berjewendiyên cuda dabeşbûyî de weke platformeke hevpar pêk bê. Ev platforma ku Kurd pirr bi dijwarî hewcedariyê pê dibînin, divê di navenda xebatên dîplomatîk de cih bigire. Bi tevahî xebatên din ên dîplomatîk, nexasim xebatên dîplomatîk ên her rêxistinê bi serê xwe û ji bo berjewendiyên xwe dimeşîne, bi qasî ku heta niha hatiye dîtin ji feydeyê zêdetir zirar dane; bêhtir ji parçebûn, dabeşbûn û şerên di navbera Kurdan de xizmet kirine. Ango yek ji wezîfeyên bingehîn ên neteweyî ew e, divê dîplomasiyeke yekpare di navbera Kurdan de pêk bê. Ji bo vê jî yek ji wezîfeyên heyatî ya dîplomasiya Kurd pêkanîna **Kongreya Neteweyî ya Demokratîk** e. Kongreya Neteweyî ya Demokratîk divê hem hedefa bingehîn a hemû rêxistin û şexsiyetên Kurd

be, hem jî divê Kongre bi lez bê pêkanîn û bi vê re dîplomasiyeke Kurd a bi sazî bûye, bi yek polîtîka û yek devî diaxive bê bicihanîn. Ti rêxistin bi ti sedemê nikare van wezîfeyên heyatî paşve bixe û îhmal bike. Yên van wezîfeyan timî paşve bixin û îhmal bikin, ew kes in ku li pey berjewendiyên cuda yên ferdî û rêxistinî ne. Di dîrokê de zirar û felaketên mezin ên kesayet û zêhniyetên bi vî rengî rê li ber wan vekirine baş têne zanîn, divê bêne zanîn. Herçiqasî dîplomasiya xwe bisipêre Dewleta Federe ya Kurd a Iraqê girîng be jî bersiva pêdiviya Kurdan hemûyan nade. Ne qabîliyeta wê ya bersivdanê heye, ne jî şert û mercên wê destûra vê yekê didin. Dîplomasiya bersivê bide pêdiviyên tevahiya Kurdan bi tenê dikare bi Kongreya Neteweyî ya Demokratîk bibe. Lewma beriya her tiştî divê Kongreya Neteweyî ya Demokratîk bicive û weke rêxistineke demokratîk neteweyî ya yekpare û mayînde bê îlankirin.

Mirov dikare wezîfeyên bingehîn ên Kongreya Neteweyî ya Demokratîk a muhtemel pêk bê, wisa rêz bike:

**a-** Kongreya Neteweyî ya Demokratîk divê rêxistineke mayînde be. Divê ji her çîn û tebeqeya demokratîk û neteweyî nûneriya kes û rêxistinên guncaw di nava pêkhateya wê de hebe. Di vê de pêwîst e ku rola hejmar û parçeyan, biryardarî û ezma wan a têkoşînê li ber çavan bê girtin.

**b-** Kongre divê Îcrayeke xwe ya daîmî hebe ango divê Desteyeke Rêveber hilbijêre. Desteya Rêveber divê ji meşandina têkiliyên pratîk-polîtîk ê tevahiya Kurdan berpirsiyar be. Desteya Rêveber divê xebatên dîplomatîk ên hundir û derve, têkiliyên ekonomîk, civakî û çandî weke sazî bimeşîne.

**c-** Divê tevahiya rêxistinan hêzên xwe yên xweparastinê li bin banê rêxistineke hevpar a Pêşmerge bikin yek. Divê Fermandariya Hêzên Parastina Gel a Hevpar bê damezrandin. Her rêxistin divê li gorî rêjeya hêza xwe li ser hêzên xweparastinê xwedî însiyatîfeke diyar be.

**d-** Komîte yan Buroya Têkiliyên Derve ya bi ser Desteya Rêveber, di serî de dewletên netewe yên Kurd bi ser wan ve, divê ji têkiliyên bi hemû dewlet û hêzên civaka sivîl ên din re bi serê xwe berpirsiyar be.

Têkiliyên Kongreya Neteweyî ya Demokratîk divê bi awayekî guncaw bi KCK û Rêveberiya Kurd a Herêmî ya Iraqê re di bin statuyekê de bêne bi rêkûpêkkirin. Herdu organîzasyon bi awayekî bi Desteya Rêveber a Kongreyê ve girêdayî, dikarin bixebitin. Mijara xebata bi van herdu organîzasyonan re mijareke girîng e ku divê li ser guftûgo bê kirin û zelalkirin. Eşkere ye ku têkilî û nakokiyên siyasî û îdeolojîk ên KCK'ê di çarçoveya avakeriya neteweya demokratîk de û yên Rêveberiya Federe ya Kurd a Iraqê di çarçoveya avakeriya dewleta netewe de wê demeke dirêj dewam bikin. Di vê mijarê de Kongreya Neteweyî ya Demokratîk dikare bibe rêxistineke ban a çareseriyê. Dîplomasiya neteweya demokratîk di navbera gel û neteweyên Rojhilata Navîn de ku

dîplomasiya dewleta netewe ew xistine nava kaos û şerekî mezin, dikare di çarçoveya modernîteya demokratîk de bi roleke çareseriyê ya mayînde rabe.

### 10- Mirov Bibe Şopger û Lêgerê Çareseriya Neteweya Demokratîk

Ji bo piçûkên mirovan bi herhalî pirsgirêka herî zor bi civakbûnê dest pê dike. Bi qasî ku tê bîra min, têkiliya herî zor a tê hişê min, têkiliya 'namûsê' bû ku ez bi diya xwe re li ser pevçûbûm. Wer xuya ye ku di şertên wê demê yên gund de şertê pêşî yê civakbûyînê ew e, divê mirov bi namûs be. Ji bo mirov bi namûs be jî divê mirov guh bide rêzik û pîvanên malbatê ango bi namûsa xwe ve girêdayî bimîne. Çênedibû ku ez bi vê têgihiştina namûsê ya bi jidayikbûnê çêdibû girêdayî bimama. Bi civakbûyîna ku mirov piştre hîn dibû mirov bi namûs dibû. Bi herhalî diya min jî li gorî xwe ez civakî dikirim. Lewma dixwest min bi pîvanên malbatê ve girê bide. Ji ber ku riya bi tenê ya zanîbû ev bû. Li ser vê ez û wê pirr bi dijwarî pevçûn. Tevî ku ez zarok bûm jî min hê di wî temenî de pîvanên malbatê kêm û nerast didîtin. Cara pêşî serîrakirina li ber rêûresmê mewzûbehs e. Nakokiya di vî warî de demeke dirêj dewam kir. Pirsgirêka malbatê veguherî pirsgirêka jinê, pirsgirêka jinê veguherî pirsgirêka azadî û demokrasiyê û herî dawî jî veguherî pirsgirêka neteweya demokratîk.

Min behsa têkiliya xwe ya bi mizgeft û dîn re kiribû. Di destpêkê de min di asteke mînak de guh dabû dîn û li gorî wê meşiyabûm. Min li derdora sîhûsê duayan ji ber kiribûn û di nava zarokên din de herî zêde ez ketibûm çavê melê. Min ji zarokên dibistana seretayî komek çêkiribû û min ji vê komê re îmamtî kiribû. Di vê mijarê de nota min temam bû. Lê bi xwedayê dîn re pirsgirêkên min ên zêhnî serî dabûn. Ev xweda çi ye, li ku ye, çawa ye, pirsên bi vî rengî her ku diçûn zêdetir serê min tev didan. Di dîn de kûrfikirînê ev pirsgirêk çareser nedikir, berevajî bêhtir giran dikir. Min hewl da nakokiyeke bi vî rengî bi felsefeyê ji hev derxim, li pey vê hinek gavên din hatin û min tevgerên civakî nas kirin û biryara xwe di sosyalîzma zanistî de da. Min tercîhên wilo kiribûn ku gelekî zehmet bû mirov ji bin barê wan rabe. Têkiliya rastî ya civakbûnê nasnameya Kurd bû. Pirsgirêka nasnameya Kurd min li dibistana seretayî ya perwerdeya wê bi zimanê Tirkî bû nas kir. Vê pirsgirêkê hebûna xwe pirr zû dabû hiskirin. Pirsgirêkê birînên kûr di min de vedikirin, lê ji bo çareseriya wê taqeta min tinebû ez demeke dirêj gav biavêjim. Ne kapasîteya min a teorîk û ne jî ya pratîk derfet û îmkan nedidan ku gaveke piçûk jî biavêjim. Di encamê de her ku min dît di bingehê pirsgirêkên malbat, dîn, felsefe û sosyalîzmê de reva ji pirsgirêka nasnameya Kurd heye, min fêhm kir ku ez ê nikaribim xwe ji çareseriyê dûr bixim û ez ê li ser wê neçar biponijim, hûrûkûr bifikirim.

Ji salên 1970'î ve, piştî ku min nasnameya Kurd qebûl kir û weke pirsgirêk lê serwext bûm, bi tevahî dor li jiyana min girt. Bi tevahî pirsgirêkên bi kesayeta min re têkildar derdiketin holê min bi nasnameyê ve girêdida. Ango min fêhm kiribû û bawer kiribû ku heta nasnameya Kurd çareser nebe, ez ê nikaribim ti pirsgirêka maddî û manewî çareser bikim. Piştî vê, serhatiya min

a îdeolojîk û rêxistinî dest pê kir bi awayekî bû çîroka min a jinûvelixwegerînê. Hewldanên min ên lêgerîn û çareseriya nasnameya Kurd bi awayekî dibûn hewldanên min ên ji nû ve xwe danasînê, jihevderxistinê û civakîkirinê. Min ev lêgerînên xwe car caran bi çîrokan anîn ziman, lewma ez ê dubare nekim. Lê qismî şîroveyên felsefî yên çîrokên min balkêş in. Çanda Kurd bi derfet û îmkanên kêm ê muzîkê xwe di zêhn û hestan de bi awayekî zelal dida der. Min ji zarokatiya xwe ve li kilamên Kurdî guhdarî kiribû. Dengên ku min ew pêşî bihîstibûn yên Meryemxan û Cizrewiyên birayên hev bûn. Lê di nava şert û mercên Enqereyê de cara pêşî min dengê Aramê Tîgran bihîst û bandoreke cuda li min kir. Min pirr gelekî paşê dema ev şîrove kir, min fêhm kir ku ev dengekî wisa ye, bêhtir nêzî rastiya Kurd, nexasim nêzî rastiya gelê Kurd e, nemaze di anîna ziman a heqîqeta gelê Kurd de ev deng bêhtir nêzî rastiya Kurd bû. Lewma min qebûl kir ku huner şêweyekî din ê ravekirina heqîqetê bû. Di nava wî dengî de hem bangek ji bo rastiya gelê Kurd hebû, hem jî weke naverok ‘eşqeke hêvîjibirî’ dianî ziman. Ji lewra bi rastiya min re gelekî li hev dikir. Ji aliyekî ve bi lêgerînên xwe min hewl dida pirsgirêka Kurd rave bikim, ji aliyê din ve jî ev yek bi muzîkê bi hêz dibû û ev xusûsek bû ku dihat fêhmkirin. Lêgerîna îdeolojîk û muzîk ji bo pirsgirêka Kurd êdî milê xwe dabûn hevdu û dimeşiyan.

Eleqeya min a ji bo jinê jî di van salan de bi heman awayî çêbû, beridî. Bi awayekî xwezayî girêdanên bi arezû yên di salên pêşî yên ciwaniyê de bi serê ciwanan de tê, ji bo min jî pêkan bûn. Bi awayekî biyolojîk û rêûresmî nêzî jinê nedibûm û ji vê dûr ketibûm, eleqeyeke min a di vî warî de jî çênebûbû. Di nava şert û mercên bajêr de jina xwe nîşan dida bi xemla modern bû. Bala min dikişand, lê nêzîkbûna min a keçeke ku li gorî modernîteya Tirk gihiştibû, bi qasî Çiyayê Qaf îhtîmaleke dûr bû. Ji bo vê, ne min xwe xwedî hêz didît, ne jî ji bo vê min hewl dida. Dema min xeyal meyal çav li hinek keçikên bi eslê xwe Kurd digerand, min ew çîrokên eşqê yên hêvî ji wan birrî yên di nava muzîkê de derbas dibûn his dikirin. Çawa ku min berê jî diyar kiribû, min ji bo rûyê hin keçan gotibû “Divê zuriyeta vê keçikê jî bibe zuriyeteke hêjayî azadiyê” bi vî awayî gotina min ji nêz ve têkiliya xwe bi pirsgirêk û rastiya Kurd re heye. Muzîka Aram çiqasî di rastiya Kurd de rewşa ‘bûyera hêvî jê birrî’ nîşan dida, ew dîmenê min li ser rûyê keçikê didît jî ewqasî nîşan dida ku rastiya Kurd bûyereke bêhêvî ye, lewma bi sînor be jî têgihiştineke min a namûsê hebûya, diviyabû ez bi pey vê bûyera bêhêvî biketama ango diviyabû bi pey rastiya Kurd biketama û min ev bi israr dianî ziman. Li gorî çavdêriya diya min, hatibû fêhmkirin ku ez ê bi vî halê xwe nikarîbûma bi jinê re bibûma. Jina modernîteyê, dema dibû Tirk bi qasî Çiyayê Qaf dûr, dema dibû Kurd jî bi dîmenekî eşqa bêhêvî xwe nîşan dida. Eleqeya ji bo jinê ya ciwanên Kurd û Tirk ên li cem min, ji bo min ne exlaqî û ne jî estetîk xuya dikir. Lewma min ti carî dilê xwe nebijand wan û ez nefikirîm xwe nêzî keçekê bikim.

Tevî vê yekê, ji nişkê ve di zewacê de bist bûm û ev hêja ye ku bê fêhmkirin. Çawa ku di beşên pêwendîdar de min rave kir, ev nêzîkatiyeke welê bû, aliyên wê yên îdeolojîk, etnîk, polîtîk û psîkolojîk ketibûn nava hev. Di wî temenî de min ceribandina zewacê bi awayekî weke

‘qebqebûkirinê’ qebûl kiribû. Ji aliyê rûhî û rêûresmî ve ti carî nezewicîm. Lê pirr zor be jî min bi xwe dabû qebûlkirin ku ji bo dîmenê îdeolojîk û polîtîk ê li dora jinê ji hev derxim ceribandineke bi vî rengî girîng e, û divê ez ji pêkanîna wê netirsim. Nexasim bi vê têkiliyê min xwe gihand rastiya Kurd Elewî û jinê, min têkiliya vê bi nasnameya Kurd, bi pirsgirêk û çareseriya wê re danî û divê ez bi girîng bibêjim, ev ‘gelekî zor’ bû, lê dersek bû ku pirr tiştan jê hîn bûm. Eger ez ji vê pirsgirêkê nebihurîbûma û wê ez têk biribûma, pirr zehmet bû ku mirov bigota, ez ê di gavavêtinên ber bi rastiya Kurd de bi ser ketama.

Eger ez ji aliyê xwe ve bi kurtî bînim ziman, ez ê bibêjim, min salên 1950-1960’î civakparêziya malbatê red kir, salên 1960-1970’î min civaka ji rêûresmê qebûl nekir, salên 1970-1980’î min civaka modern nepejirand. Ez di rewşeke welê de bûm, ez zilamekî bi tenê bûm, ez civakî nedibûm. Komên di zarokatiyê de min çêdikirin û bi wan re derdiketim gera çolê, komên dînî û îdeolojiya çepgir ên min li dora xwe çêdikirin, gavên ezmûnî yên civakbûyînê bûn. Gavên bi îddîa yên weke Apogirî û PKK’ê îşaret bi alî civakbûyînên nû yên xweser dikir, lê ji îdeayekê wêdetir nediçûn. Civakbûyîna ez lê digeriyam û min dixwest bidim qebûlkirin civakbûyîna Kurd bû. Ji bo Kurdan ez li heqîqetê digeriyam. Heqîqeteke Îslam ji bo Kurdan îfade bike hema bêje tinebû. Dema bi mîlliyetgiriyê ve pevdikeliya bêhtir bi rola înkarkeriyê dihat bikaranîn. Bi fikra çepgiriyê nav li rastiyê dihat kirin, lê naveroka wê nedihat ravekirin. Ber bi salên 1980’î ve xwe parastina bi sîlehê jî bi hurmeta ji rastiyê re têkildar e. Darbeya 12’ê Îlona 1980’î ji bo heqîqetê ezmûneke girîng bû. Berxwedan û pêşketin, hêmanên welê bûn, rastiya ku Kurd pêve dihatin girêdan weke heqîqetê îspat dikirin. Eger berxwedan nebûya û ez li revê rast hatibûma, rastiya Kurd a me dixwest em pêve bêne girêdan wê derbeke mezin bixwara.

Ji lewra bûyerên îdeolojîk-polîtîk û berxwedanên piştî 1980’î ji bo ku rastiya Kurd weke heqîqet bê îfadekirin, maneya xwe wê gelekî mezin bûya. Berxwedana çekdarî û kişandina gel a nava şer, gavên dîrokî bûn. Ji ber ku di rewşekê de ku her kesî çîz dikir, van gavavêtinan wê dengê heqîqetê bilind bikira. Lewma têkoşîna çekdarî tam jî di demên bi vî rengî de wê weke dengê herî bi hêz û adil ê heqîqetê holan bidaya. Bi vî awayî jî bû. Tevî ku Pêngava 15’ê Tebaxa 1984’an ji aliyê teknîkî û taktîkî ve baş nehate destpêkirin jî di rastiya Kurd de gelekî holan da. Kurdên em li wan digeriyan hêdî hêdî xwe nîşan didan, tevî hemû aliyên xwe yên neyênî ref bi ref tevlî dibûn. Komên muzîk û hozanan pirr dibûn, hejmara dostan zêde dibû. Min xwe ji tenêtiyê rizgar dikir û ez civakî dibûm. Rastiya heqîqetê ya bi hesreta wê bûm, heqîqeta rastî bi hêz dikir. Di van salan de hozan bi xwe dihatin deverên gerîlla lê bûn, di Newrozan de li deverên kamp hebûn ji deh hezaran zêdetir girseyên gel kom dibûn û vê têra xwe rewşa vejînê îfade dikir. Bi hatina Aram Tîgran a qada min û bi vebûna Med TV ‘eşqa hêvî jê birrî’ dest pê kir hêvî jê dibûn. Keçik jî bi coş û boş diherikîn dihatin. Min cara pêşî ew bi anor û rûmet himbêz dikirin. Dîsa me bi hev re dilîst û carinan min ew datanîn ser milên xwe. Min şerma jinê bi erdê re dikir yek û her ku min di şexsê wan de didît jiyana azad pêk tê, jiyan bêhtir manedar û xweşiktir dibû.

Gelê Kurd tevî ku êş û xiyanetên mezin dîtibûn, di van salan de hêza dilsozî û berxwedanê nîşan da, li heqîqeta xwe hayil bû û li vê weke pîvana bingehîn a exlaqî û rûmeta herî girîng a mirovatiyê serwext bû. Bi vî awayî nebûya, nikarîbû evqasî li hemberî hêzên hegemonîk ên herî pêşketî yên dinyayê û şerên wan ên herî xasûk, şerên Gladîo li ber xwe bidaya. Me di wan salan de slogana 'Kurdistana Demokratîk Yekbûyî Serbixwe' gelekî bi kar dianî. Ez divê eşkere bibêjim, dilê min li rastiya vê sloganê germ nebûbû. Ya ez pê germ û bi hêz bûbûm rastiya gel bû ku rabûbû ser piyan. Em behsa gelekî dikin ku xwe li şerê xwe radikşand, her cure destek didayê, keç û xortên xwe yên herî hêja weke qurbanekê/î pêşkêş dikir. Ma pêkan e ku mirov li hemberî vî gelî bi heyecan û kelecan nebe û jêre gelekî bi hurmet nebe. Bi tevahî tişta min kir ew bû, min bi hêza xwe ya aqil û hestan hemûyî alîkariya vî şerê wan ê heqîqetê kir ku gelekî bi rûmet bû. Ti hewldan bi qasî xebatên di vî warî de bêne kirin hêja nînin. Ev fedekariyên gel û pêşengên wî, kesekî mîna min ê hestên wî cîbicî nebûne û xwedî zêhnekî gelekî gumanbar bi ser xwe ve anîn, bi awayekî ji nû ve ruh bi min hat û zindî bûm. Kengî min hewl da ez wan keşif bikim, hingê wan ez ji nû ve afirandibûm.

Dema ku hewce bike, dema mijar hebûna wan be, dema bêne qonaxekê ku wê azadî û rûmeta xwe ji dest bidin, hingê şerkirina gelan bivênevê dibe. Ji bilî şer ti rê û rêbaz wan ber parastina hebûn, azadî û rûmeta wan ve nabe. Ji bo Kurdan jî ev dem demeke bi vî rengî bû. Şerkirin, beriya azadî û rizgariyê rêbazeke heyînê bû. Faşîzma 12'ê Îlonê bi awayekî mînaka wê tine, zimanê Kurdî qedexe kir. Ya rastî, ev polîtîka jixwe bi awayekî bi dizî û sergirtî dihat meşandin. Bi vê biryarê dixwestin nasnameya Kurdan bi awayekî eşkere tine bikin. Lewma ji bo Kurdan rêbaza bi tenê ya heyînê şer bû. Jixwe riyên din ên xweîfadekirinê hemû bi temamî hatibûn girtin. Ez dema behsa rêgirtinê dikim, mebesta min komên din in. Ji Kurdan re bi ti awayî derfet û îmkan nehatibûn hiştin hebûna xwe îspat bikin û bi awayekî azad bijîn. Di berdêla çi de dibû bila bibûya, encama çawa bibûya bila bibûya, şer ne bi tenê riya heyîn û jiyana azad bû, bi awayekî ji bo li ser piyan mayînê derman bû. Jixwe hêzên din bi sedema ku nikarîbûn bi awayekî hêja serî li vî amûrî bidin ji rojevê, ji jiyana civakî derketin. Rastiya ku temsîla wê dikirin nikarîbû wan li ser piyan bigire, wan nikarîbû pê bijîn.

Di vê demê de tişta ji bo min balkêş ew bû, têgihiştina namûsê ku diya min li ser min ferz dikir bi maneya xwe ya rastî pêk hatibû. Ya rastî, diya min xwestibû pîvaneke jiyana civakî fêrî min bike. Lê ji ber ku hêza wê têrê nedikir rastiyê rast îfade bike, hedef şaş dikir, ne di dema wê de û şaş pêk dianî. Bi vî şerê ji bo hebûna xwe, ya rastî namûsa civakî, hebûna Kurd û rûmeta wî hatibû rizgarkirin. Di vî şerî de cara pêşî bû ku mafê jiyana bi rûmet hatibû bidestxistin. Di wan salan de mirin an mayîn zêde ji hev ne cuda bûn. Ya girîng ew bû, mirov mafê jiyana bi rûmet bi dest bixista. Mînakeke vê jî di Berxwedana Li Zindana Amedê de hatibû nîşandan bû. Çalakiya Newrozê ya Mezlûm Dogan, çalakiya Ferhat Kurtay, Necmi Oner, Eşref Anyik û Mehmûd Zengîn a pê agir berdan bedena xwe, şehadeta Kemal Pîr, M. Xêrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek a di

rojiya mirinê de bi temamî şerên ji bo rûmetê bûn. Bi şerê gel re hevnirx bûn. Ew slogana bi hev re bi qîrîn digotin “Şerê rûmetê wê bi ser bikeve” ev rastiya em behsa wê dikin, îfade dikir.

Kengî me di dawiya 1978’an de biryara îlankirina PKK’ê da em bi rewşeke bi heman rengî re rûbirû bûn. Şerê em têde bi ser ketibûn şerê îdeolojîk û polîtîk bû. Lê her ku diçû komên alîgiran zêde dibûn û ev jî eşkere delîlê wê yekê bû ku gelê Kurd ketibû ser riya jiyaneke bi rûmet û îspatkirina hebûna xwe. Bûyerên di dawiya 1998’an de ji delîlan wêdetir rastî bi xwe bûn. Kengî sîstema Gladîo di asta herî jor de yekser destwerda şexsê min, ew şerpezebûn û fikarên min ên berê hîç tinebûn. Heta min xwe hinekî sivikbûyî his dikir. Mijara ku min têde zehmetî dikişand ew bû, min ji hev dernedixist kîjan maf ên hatine bidestxistin in, kîjan bar in ku divê bêne avêtin. Di dema rojên Moskova-Romayê de dualîteya serê min mijûl dikir ev bû. Dema ez berê xwe didim rabihuriyê û li paş xwe dinêrim, ez baştir fêhm dikim ku ya di wan rojan de min ji destçûyî his dikir utopya dewleta netewe bû. Ji ber ku min hewl dida sosyalîzma zanistî hem weke zanist hem jî weke îdeolojî fêhm bikim di meseleya deshilatdarî û dewleta netewe de zêde dilrehet nebûm. Ne ku konjonkturê derfet û îmkan nedidan, di lêgerîna min a îdeolojîk û zanistî de jî min cih ji dewletê re nedidît. Jixwe dilbijînên desthilatdariyê li Rojhilata Navîn têra xwe ez zivêr kiribûm. Balkêşiya dewleta netewe zêde bala min nedikişand. Li sedan mînakan yeke nû zêdekirin ango li sedan dewletên netewe dewleteke netewe ya Kurd zêdekirin bi cîhana min a li pey lêgerînên bêhtir gerdûnî re li hev nedikir. Lê ji ber bandora salan a sosyalîzma pêkhatî jî min nikarîbû gav biavêta.

Ez dema li Romayê bûm, dîsa min muzîkek nas kiribû. Kilama Derwêşê Evdî bû Bavê Salih digot. Min li vê kilamê di rojên xwe yên bi tengasî yên li girtîgehiya min a nexweşxaneyê de guhdarî kiribû. Min bi çîroka destanê nizanîbû, lê muzîka wê bi tesîr bû. Hozên dema vê destanê dixwîne, ne diyar e ka çiqasî haya wî ji naveroka wê heye. Li gorî min ev destan behsa dewletdariya Kurd dike ku ji dema Ehmedê Xanî ve hesreta wê heye. Di vê destanê de behsa perpitîna vê dewletdariya Kurd tê kirin ka çawa li ber ruh dide. Dîsa bi serhatiya min re li hev dikir. Hesta min a ji dest diçû, min ji dest dabû der barê dewletdariya neteweya Kurd de bû. Di tewazuna dinya heyî de, li ser xeta Moskova-Romayê, di bin bandora şopandina dijwar a Gladîo de ev hesta min li ber ruh dida. Dengên rîtmîk ên muzîkê ev heta bi dil û hinavên min dida hiskirin. Çawa ku tê zanîn, Destana Derwêşê Evdî di şexsê Edûlê de berxwedana hêvî jê birrî ya hem Êzîdiyên dawî û hem jî di şexsê wan de Kurdîtiya li dijî asîmîlasyon û îmhayê hewl dide li ser piyan bimîne, îfade dikir. Tevî ku bi devê hozanê mêr tê gotin, her gotina Edûlê, mîna nefesdayîna dawî ya çandeke hezar salan li ser piyan mabû, xuya dikir. Derwêş her cara xwe ji Çiyayên Şengalê ber dide Deşta Mûsilê, ya rastî li dijî feodalîzma Ereb a Misilman berxwedaneke bi qehremanî nîşan dide. Ev jî rêûresmeke hezar salan bû. Koka wê heta bi Sumeran, belkî jî kevintir diçe. Koka wê diçe heta bi şerê di navbera qebîleyên çolê yên Semîtîk û qebîleyên deşt-çiya yên Aryenîk de diqewimîn. Derwêşê Evdî nûnerê dawî yê vê rêûresmê ye. Derwêş ji hespê

dikeve û birîndar dibe, ya rastî ev ketin û birîndarbûna dîrok û civakbûnekê ye. Mirina hêdî hêdî ya Derwêşê birîndar li ser zimanê Edûlê dibe vegotineke wisa ku bi hêsanî têrê dike, dîrokeke hezar salan û rêûresmeke gel a herî kevin îfade bike.

Ez yeqîn dikim ku hê berê, sala 1995 di dema vebûna Med TV de, bi Aram Tîgran re bi riya telefonê axivîbûm û weke strana ez jê hez dikim min navê strana 'Delalo' gotibû. Li gorî min, di wê demê de straneke bi îhtîşam bû. Paşê ez hîn bûm ku strana Delalo fragmaneke kurt ango parçeyekî Destana Derwêşê Evdî ye. Vê yekê ez digihandim heman encamê. Nuqteya ku ez lê matmayî bûbûm ew bû, fîgureke jinê mîna Edûlê çawa karîbû rastiyeke ewqasî kûr a dîrokî û civakî îfade bike. Bi ya min, ev yek ji pirsgirêka bingehîn a wêjeya Kurd e ku hê ji hev nehatiye derxistin. Bêguman aliyên mijarê yên bi şexsê min re têkildar hebûn. Ne bi tenê li Çiyayê Şengalê û Deşta Mûsilê, hewl didan li ser xeta Şam-Heleb-Atîna-Moskova-Duşanbe-Roma-Naîrobiyê derbê li min bidin. Nabe ku mirov di navbera herduyan de têkiliyê daneyîne. Ya balkêş ew e, tevî ku min kaset gelek caran da guhdarîkirin, hejmareke zêde keç û xortên li dora min bi min re heman his û hest parve nedikirin. Heta dema ku ez li Romayê bûm, hozan Şivan Perwer tevî wêjevan-helbestan Mehmûd Baksî hatibûn serdana min. Şivan dîsa di hewaya xwe ya berê de bû. Mirov nikarîbû jê li bendê be ku karibe bi kûrahiya dîrokî-civakî ve dakeve. Rewşa Mehmûd Baksî bêhtir mirov xemgîn dikir. Min hevpeyvîna dawî bi wî re kir. Xwesteka wî ji min ew bû, li çiyayekî cenazeyên gerîllayan hatibe veşartin ew jî bê veşartin. Mîdeya wî têkçûbû. Rojên wî yên bi jimar mabûn. Ew jî hêdî hêdî dimir. Li ber çavên min weke Derwêşekî Evdî yê ku moderníteya Ewrûpayê ew hêdî hêdî dikuşt û bi qasî hemdem bû weke karîkaturê wî çêkiribe, xuya dikir. Pirr hewl dabûn wî li dijî min bi kar bînin. Lê girêdana xwe ya ji dil ti carî ji dest nedabû. Ez di rojên xwe yên dawî yên li Romayê de careke din bi ber bayê bandora çîrokên trajîk ên Kurdî yên ji rêûresmê ketibûm û li gorî min ev bi qasî ku balkêş bû, ewqasî jî manedar bû. Paşê tevî ku hîç adeta min nebû, ji bo bîranîna Destana Derwêşê Evdî ev rêz ketin hişê min:

**Ez li Çiyayê Şengalê li cem Derwêşê Evdî bûma!**

**Li ser pişta hespên spîbozî min xwe berdaya Deşta Mûsilê.**

**Dema Derwêş derb xwar, min ew rakira, bibira çiyayên Kurdistanê.**

**Min ji wî re bigota "Binêre, bi hezaran Edûlê û Duwanzdekan hene"**

**Min bigota, li van çiyayên xwedawendan lê textê xwe danîne, xweş razê.**

**Mirin ji ku, û çawa tê bila bê êdî xeman nexwe,**

**Kurdîtî û jiyana azad a misogerbûyî rastiyên ebedî ne.**

Dema ez cara dawî ji Ûrfayê derketim bi bîranîna Brahîm û Eyûb pêxember ve girêdayî çend rêz hatin hişê min. Ya rastî, di zimanê berê yê nivîsê de ev rêbaz timûtim tê bikaranîn û bêhtir hêja ye, lê belê tevî ku li gorî zanistê heqîqetê bêhtir bi xurtî îfade dike jî weke encama nexweşiya nivîsê ya modern, min serî li vê rêbazê da lewma divê lome ji min neyên kirin.

Min dewleta netewe ya tinebû ji dest dabû û ya rastî, ev nêzîkatiyeke utopîk bû. Bandoreke korker a mîlliyetgiriyê li ser zêhn û hestên min hebû. Ez ê paşê li xwe hayil bibûma ku rizgarbûna min a ji wan şensekî mezin e. Cîhaneke hest û zêhnî bi giştî noqî dewletdariyê, bi taybetî jî noqî dewletdariya netewe bûbû xwe ji wan xalî dikir, xwe ji wan dişuşt. Ev nexweşiyek wisa bû ku Lenîn dîn û har kir, Stanlîn jî kuşt. Nexweşiyeke wisa bû, Şoreşa Çandê ya Mao jî jêre nebû derman. Tirsa min ew bû, piştî ku zêhniyeta dewleta netewe ji dest bihata dayîn wê rastiya Kurd û azadiya wî ku ji bo wan şer dihat kirin, wê berdêla wê çibûya. Em ji dîrokê baş dizanin ku bi jidestdayîna dewletê, bi tevahî xanedanî, dîn û civak ji dest diçe. Ya rastî, ji bo Kurdan dewleteke bi dest hatiye xistin û ji dest tê dayîn ango dewleteke netewe ya Kurd a ji dest diçû, tinebû. Lê tiştên bi tehlûke bi bîr dixistin. Dema me bi balafira Gladîo xwe ji Deryaspî ber Naîrobiyê dida, hinekî ez bi ber bayê hesteke xerîb ketim. Mîna Cihû bi trênan dibirin kampên mirinê di şexsê min de jî rêwîtiyeke qirkirinê ji bo Kurdan dabûn destpêkirin. Di vê de wê helwestên min bi roleke diyarker rabûna. Di demekê de ku sedsala 20. bi dawî dibû, ya di şexsê min de diqewimî tolhildana xwedayê dewleta netewe bû. Dewleta netewe ya nîzama xwedayî ya şaristaniyê bû, di dema xwe ya pûtperestiya herî hişk de bû.

Jiyana li Îmraliyê bi tevahî bi cehd û xebata ji bo rizgarbûna ji bandora vî xwedayî derbas bû. Demên komployên mezin veguherînên mezin jî bi xwe re tînin. Dewletdariya netewe di serê wan diyardeyên modern de tê ku çarsed salên dawî herî zêde zêhnê mirov hûnandiye û ji nû ve şikil dayiyê. Sîstemeke mêtinkariyê ya mîna kapîtalîzmê ku xwezaya civakî nikare demeke dirêj xwe lê ragire bi saya wê pêkan bû. Min dema berê xwe da sosyalîzmê, ya rastî min xwestibû ez ji van cinawiran ji yê herî mezin rizgar bibim. Lê ji ber ku heman cinawirî sosyalîzm jî xistibû bin bandora xwe, ez xapiyabûm. Feydeya herî mezin a Îmraliyê ji bo min ew bû, ji bo ez vê rastiyê bibînim çavên min vekirin. Ev heqîqet bû ku Gramsci jî gelekî nêzî wê bûbû. Ez her ku di parêznameyan de hûrûkûr fikirîm, rizgariya zêhnî jî pêk hat. Min bi wêrekiyeke pirr mezin bi tevahî sîstema bi dewleta netewe ve girêdayî red kir û ev ti carî nedihat wê maneyê ku em ji civakparêziyê qut dibin, berevajî em bi rêbaz û paradîgmayeke para wê ya heqîqetê gelekî mezinbûyî, nêzîk dibûn. Lewma zehmet nebû ku ez hewl bidim modernîteya kapîtalîst di vê çarçoveyê de bikim têgîn. Cildên berê yên parêznameya min mijarê têra xwe zelal dikin. Li gorî diyalektîkê, min têgîna alternatîf a modernîteyê weke modernîteya demokratîk kir têgîn. Çawa ku K. Marks metafizîka diyalektîk a Hegel veguherand materyalîzma diyalektîk, min jî hewl da modernîteya kapîtalîst veguherînim modernîteya demokratîk. Bêguman encamên wê li gorî

herikîna dîrokî diyar bibûna. Çiqasî wê karibe bersiva sîstema kapîtalîst bide, ev ê erka şîroveya nû ya materyalîzma dîrokî be.

Mirov hewl bide bi **Teoriya Moderníteya Demokratîk** bersiva pirsgirêka Kurd bide, ev hem ji aliyê PKK'ê ve xwerexenekirineke radîkal e, hem jî bingehê çareseriya demokratîk e. Bi paradîgmaya nû derfet û îmkan çêbûn mirov xwezaya civakî bi awayekî zanistî rave bike. Dîrokbûyîna civakê û para zêhniyetê ya di avakirina wê de, dikir ku mirov xweş û nerm rahêjiyê. Bi vê nêzîkatiyê bi awayekî dîrokî derbeke mezin li dogmatîzmê diket. Dogmatîzma modern a di meseleya dewleta netewe de mohra xwe li tevahiya zêhniyetan da, bi helwesta xwe ya tekperest teolojiya berê ya di xwe de dewam kir û herweha derbeke kujer jî li demokrasiyê da. Dogmatîzma modern, çepgir, rastgir û navendparêz bi tevahî şêweyên modern ên zêhniyetan li pareke hevpar dikir yek, bi vê jî dewleta netewe yekane dikir û bi vî awayî bi xwe hem di rewşa wê ya berbiçav de xwedatî pêk dianî, hem jî ji her qebîleya modern re ango ji her neteweyî re pûtekî serwer pêk dianî û bi vî awayî bi îdeaya pluralîzmê radibû. Bi tevahî dîn bi dewleta netewe dibin tek û xwedatiya xwe dikin yek, pûtekî diyarî her qebîleya nû (dewleta netewe) ya bixwaze dikin. Îdeolojiya Cihû ya di çêkirina xwedê de xwedî ezmûneke mezin bû, bêguman di vê de bi roleke diyarker radibû. Qebîleyên xwedê yên berê, di warê girtina van berhem û çêkirinan de ketibûn nava pêşbaziyê û ji vê nediman. Pêşengiya sermayeyê ya Cihû li Ewrûpaya Rojava di çêkirina mal û firotina wî de bi awayekî hegemonîk pêşengiyê dike û dîsa heman pêşengên îdeolojîk ên Cihû li heman mekanî xwedayê dewleta netewe di Panteonê de bi cih dikin û bêyî ku zorê bikişînin bi sedan pûtên wê bazarî her aliyê dinyayê dikin. Îdeologên Cihû yên mîna Marks hem bi hîleya di malê nû de (meyla kara herî zêde) hem jî bi xwedatiya nû (îdealîzma bûrjûwayê) dihesiyan û di her firsendê de ev rastî diyar dikirin. Lê di demeke kin de aqûbeta Îsa wê bi serê Marks de jî bihata. Tişta seyr û xerîb ew e, weke fîgurê damezrîner ê vê rêûresma îdeolojîk Brahîm tê nîşandan û li devera Ew ji dayik bûye ez jî ji dayik bûm û min bi heman rola Wî xwe li pûtşikandinê rakişand, hem jî li ser navê rêûresma Wî li dijî pûtên her alî dagir kirine mîna Wî tevgeriyam û ji cihê Wî meşandibû min jî hewl da tevgera pûtşikandinê bimeşînim û dîsa mîna Wî min gav avêt û ketim ser rê.

Hindik maye ez li girava Îmraliyê duwanzdeh salên xwe temam bikim. Girava Îmraliyê di nava avê de ye. Lewma avhewaya wê bedena mirovî dihilhilîne û di vî warî de cihekî navdar e. Ev yek bi awayekî dîrokî jî sabit e. Ji dema Împaratoriya Bîzansê ve dewlet girava Îmraliyê ji bo mehkûmên herî bi tehlûke weke cihê mişextkirin û mirinê bi kar tîne. Eger mirovek sedemên xwe yên mezin ji bo heqîqetê tinebin, demeke dirêj nikare xwe li van şert û mercan ragire. Xwedayê dewleta netewe ya hegemonîk ku ez li vê Zindana Giravê girtim, ne bi tenê ji bo ku ez ji bandora wî rizgar bibim, lê ji bo ku ez bi tevahî maskeyên wî daxim, Îmralî ji bo min bû mekanekî bêqusûr ê dibistanê. Ne bi tenê ji bo Kurd ji bandora vî xwedayî rizgar bibin, ji bo karibin nîzama xwe ya nû li gorî xwezaya xwe ava bikin, min Îmralî weke dibistaneke rastî bi kar

anî. Doktirînên dibistana Îmraliyê, ne bi tenê gelê me, gelên me, lê Tirkiyeya modern jî ji berê bêhtir gihandiye rewşeke baş û çê. Ez divê diyar bikim ku hîmên Tirkiya demokratîk têra xwe li Îmraliyê hatine danîn. Ez di vê de bi tenê bi awayekî yekalî behsa para xwe nakim. Bi saya Îmraliyê dewletê ji bo veguherînê cesaret kir. Herçî bi komploya mezin (1999) re têkildar be jî derketina holê ya Kurdistana modern jî yekser bi wê heqîqetê re ku li Îmraliyê derket holê, têkildar e. Hem Tirkiya demokratîk a modern, hem jî Kurdistana azad a modern a ku hê li destpêka avakirinê be jî di zikhev de û bi hev ve girêdayî di encama dersên li Îmraliyê de, hewl hat dayîn bêne avakirin.

Avakeriya neteweya demokratîk li Kurdistanê hem ji aliyê teorîk ve û hem jî ji aliyê pratîk ve hebûna Kurd û jiyana wî ya azad a divê mirov li ser zêde bisekine û veguherîne bi awayekî dîrokî û civakî îfade dike. Di asta eşqeke rastî de heqîqeteke fedakirinê ferz dike îfade dike. Di vê riyê de cih ji ti eşqa sexte re nîne, herwisa cih ji rêwiyên sexte re jî tineye. Li ser vê riyê, bi qasî hingivê nisilandî di dîroka mirovatiyê de çi tiştê erênî hebe ji rêwiyê wê re hatiye pêşkêşkirin. Li ser vê riyê, pirsa avakeriya neteweya demokratîk wê kengî bi dawî bibe, pirseke bêkêr e û hewceyî pê nîne. Ji ber ku heta mirovatî hebe wê ev avakerî temam nebe. Heyînên di gerdûnê de çawa her kêlî xwe ji nû ve diafirînin, mirov jî hebûnek e ku her kêlî dikare bi îradeyeke azad xwe biafirîne û lewma avakeriya neteweya demokratîk jî xwediyê wê azadiyê ye ku dikare her kêlî xwe ji nû ve biafirîne. Ji aliyê civakbûyînê ve ne utopyayek û ne jî rastiyek ji vê bi îddîatir heye. Li gorî rastiyên xwe yên dîrokî û civakî Kurdan bi awayekî bi hêz berê xwe daye avakirina neteweya demokratîk. Jixwe bi rizgarbûna ji xwedayê dewleta netewe yê qet jê bawer nekirin û bi darê zorê ketin bin tesîra wî, tiştek ji dest nedan; berevajî ji barekî giran, hem jî ji barekî ew biribûn ber îmha û tinebûnê rizgar bûn. Tevî vê, bûn xwedî derfet û îmkan ku karibin bibin neteweya demokratîk. Ev destketiyeke wisa ye ku çiqasî qîmetê wê bê zanîn ewqasî hêja ye. Kurd divê weke ferd û civak avakeriya neteweya demokratîk mîna sentezeke tevahiya heqîqet, berxwedan û heta baweriyên xwedawendan ên kevin û ji Zerdeştiyê heta bi Îslamê hemû îfadeyên ji kûrahiya dîrok û civakbûnên xwe dawerivî, fêhm bike, qebûl bike, bike malê xwe û bi cih bîne. Dîsa bi qasî tevahiya doktrînên mîtolojîk, dînî û felsefî tiştên zanista civakî ya hemdem dixwaze bide fêrkirin, yek bi yek serîrakirin û şerên berxwedanê hemû û bi awayekî giştî heqîqetên dixwazin bînin ziman, bi gewde û zêhnê avakirina neteweya demokratîk têne temsîlkirin.

Ez ne bi tenê xwe car caran ji nû ve diafirînim, ber bi roja me ya îro, hema bêjin min hewl da ez xwe her kêlî ji nû ve biafirînim. Dema min ev kir, ez bi vê rastiyê û weke heqîqet bi îfadeya wê tevgeriyam. Bi vê, min bi awayekî azad xwe kir civakî, min xwe weke neteweya demokratîk (Kurd) berbiçav kir. Min xwe weke modernîteya demokratîk ji tevahiya mirovatiyê re, ji tevahiya gelên bindest ên Rojhilata Navîn û ferdên wê re pêşkêş kir.

Gelo dibe ku der barê siberoj û paşerojê de utopyayeke min a şexsî hebe? Di çarçoveya sînorên temenê mirov de bi hêviya utopyayên siberojê û der barê rabihuriyê de bi hesreta serdemên zêrîn mirov hewl bide bijî, heke mirov hay jê nebe, dibe ku jiyanê bi xwe pûç bike û ji armanca wê dûr bixe. Ya girîng ew e, mirov bi qedr û qîmetê kêliyê zanibe û bijî. Ya herî qenc ew e, mirov kêliyê bê rabihurî û bê paşeroj nejî. Jiyana zanyarane ew jiyan e, rabihurî û paşeroj bi awayekî azad di kêliyê de bêne ziman. Moderníteya kapîtalîst û çanda wê ya koleker mirovî ji rabihurî û paşerojê bêpar dike û dike ku mirov kêliyê bi awayekî heywanwarî biqedîne. Li dijî vê çanda jiyanê ya heywanker a ferdperestiya kapîtalîzmê, divê ferdê modernîteya demokratîk hesreta rabihuriya serdema zêrîn û hêviyên paşeroja bi utopya bi kêliya komên kominal ên demokratîk re bike yek, xebatê weke azadî bihesibîne û divê di alternatîfbûnê de bi ser bikeve.

Ji ber wê pêdiviya zêde ya dîrokî û civakî, heta niha ez ji bo nasnameyeke kolektîf û azad a Kurd û nasnameya neteweya demokratîk xebitîm. Ji bo kêliyekê be jî firsenda min ji bo jiyana ferdî çênebû. Ji niha û pêve jî wê firsendek wisa çêbibe nebe, ez nizanim. Lê ez dibînim, ji gel û dostên me bi mîlyonan mirov mîna ku ti karekî bê kirin nemaye aware û beredayî digerin. Ez ji vî şêwazê jiyanê pirr bi hêrs dibim. Ez ê ji vî şêwazî re nebêjim, şêwazê jiyanê yê herî rezîl û bêberpirsiyarî, ez ê bibêjim ev înkara jiyanê ye. Ji vî şêwazê dij-jiyanê divê her ferd û kom ji sedî sed bibihure. Min timî diyar kiribû ku di jiyana gerîlla de jî awaretiyên bi vî rengî gelekî pêk tên û ez ji vê jî gelekî bi hêrs dibim. Eger mîllîtanekî çekdarî afirînerekî bê sînor ê jiyana azad be, di asta eşqê de ji bo vê jiyanê bi xwestek be û bi qasî ku li parçeyekî çiyê-deverekê destanan binivîsîne zana, biaqil û bi îdea be, divê derkeve çiyê. Kesên bi qasî turîst û çiyageran ji heyecan û îradeyê bêpar bin, eşkere ye ku wê nikaribin bibin gerîllayên çiya, daristan û çolan. Min timî digot, mirovên wisa aware û bêkar jiyaneke bi vî rengî çawa dikujin. Min digot, her kî dibe bila bibe kesê xwe xistibe rewşa aware û bêkaran wî kesî bênamûsiya herî mezin kiriye, rezîl û bêrûmet bûye. Min ev jî gotibû: Ma morî û mêşa hingiv a bêkar heye? Morî û mêşên hingiv kengî bêkar dibin, dimirin. Ew jî bêkarmayînê bêrûmetî dihesibînin û bi mirinê bersivê didin. Di şertên avakirina neteweya demokratîk de ji bo her mirovê me, ji gedeyê heft salî heta bi pîr û kalê heftê salî, ji jina wî heta bi mêrê wî, asta perwerdeya wî çi dibe bila bibe, ji bo her kesî karek pêkan e. Ji bo her kesî di asta îbadetê de kar an jî karên hem pêre mijûl bibe, hem pê xwe biparêze, hem pê xwe xwedî bike, hem jî pê xwe zêde bike, bi cih bîne û bi wî kar an karan xwe azad bike. Hema bila bi tenê ji îrade û bîreweriya neteweya demokratîk hindik be jî par û nesîbê xwe girtibe!

Mînak ez bûma, ez ê biçûma gundê xwe, Çiyayê Cûdî, qûntara Çiyayên Cîlo, dewrûbera Gola Wanê, çiyayên Agirî, Mûnzûr û Çewlîkê, keviyên Zê, Firat, Dîcleyê, deştên Ûrfa, Mûş û Îdirê, riya min bi ku biketa bila biketa, mîna ku ez ji keştiya Nûh a ji nava tofana xeternak derketî ez ê daketima, mîna Brahîm ji Nemrûdan, Mûsa ji Firewnan, Îsa ji Împaratorên Romayê, Muhammed ji cehaletê reviya ez ê ber bi xwesteka Zerdeşt a cotkariyê û dostaniya heywanan ve

(vejeteryenê pêşî) biçûma, min ê bi îlhama ji wan û rastiyên civaka wan bigirta biçûma ser KARÊN XWE. Hejmara karên min dûrî aqilan wê zêde bûna. Min ê yekser bi kominkariya gund dest pê bikira. Mirov kominek an kominên gundan ên nêzî îdealê pêk bianiya wê çiqasî karekî bi coş, azadker û tenduristî bûya! Mirov komin û konseya kolanê an bajarekî pêk bianiya û bixebitanda wê çiqasî afirîner û azadker bûya! Mirov li bajêr akademiyek, kooperatîfek, komina fabrikeyekê pêk bianiya ma wê rê li ber çi venekirana! Mirov kongre û meclîsên giştî yên demokrasiyê pêk bianiya, li wan biaxiviya, kar bimeşanda wê çiqasî rûmetbilindî û serbilindî bûya! Çawa tê dîtin, sînorê hêvî û hesretan tineye û li pêşiya pêkhatina wan ji bilî ferd bi xwe ti astengiyeke ciddî tineye. Ji bo pêkhatina wan a divê hebe, hema bi tenê hinekî namûsa civakî û hinekî jî eşq û aqil e!

**Beşa Heftemîn: PÊXÎRTENGIYA ROJHILATA NAVÎN û ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK**

Di çanda Rojhilata Navîn de pêxîrtengî û çareserî-rizgarbûna jê cihê xwe di nava çanda gerdûnî de dewam dike. Ji ber ku di cilda pêwendîdar de bi awayekî berfireh li ser rawestiyabûm, ez ê dubare nekim, bi tenê ez ê balê bikişînim ser û qîma xwe bi vê bînim. Mijara divê mirov gelekî li ser raweste, diyardeya desthilatdariya navendî ye. Di bingehê pêxîrtengiyên civakî de diyardeya desthilatdariyê heye û ev tespîteke zanistî ye. Lewma divê çareserî jî di çarçoveya desthilatdariyê de pêk bê.

Me dûrûdirêj anîbû ziman ku sîstema şaristaniya navendî tevahiya pênc hezar salan û jê zêdetir di çanda Rojhilata Navîn de bi rola sereke rabûye. Şaristaniya navendî bi desthilatdariya navendîbûyî re têkildar e. Bi awayekî şaristanî bi desthilatdariya navendîbûyî re bi hev re dimeşin. Şaristaniya navendî ya pênc hezar salî di tevahiya heman demê de tê maneya desthilatdariya navendîbûyî. Belavbûna desthilatdariyê û navendîbûna wê yek ji wan mijaran e ku têgihiştina dîroka serdest li ser disekine. Bi gotineke din, navenda hegemonîk û pêkanîna wê ya dewrûberê, diyalektîka bingehîn e ku heman têgihiştina dîrokê wê dişopîne. Hêzên hegemonîk her tim piştî pêxîrtengiyeke kûr ji nû ve têne pêkanîn. Ji ber ku her sîstema hegemonîk bi desthilatdarî û teknîkeke hilberînê ya nû tê pêkanîn, kengî ev teknîk û desthilatdarî kevin dibin hingê bivênevê mirov ê jê bibihurin. Desthilatdarî û teknîkên hilberînê yên nû bi giştî di nava têkiliyên dewrûberê yê navenda hegemonîk a berê de derdikevin holê. Di têkiliyên dewrûberê de teknîkên bi hêz ên desthilatdariyê û amûrên hilberînê yên berdar hêzên nû derdixin holê. Bi giştî kengî hêzên berê xwe nû nekin û bikevin pêxîrtengiyê, ev hêzên nû ya xwe bi ser a hêza berê ya hegemonîk dixin. Ev pêvajo bi pevçûn û şer derbas dibe. Navenda hêzên berê bi hêsanî naxwazin têk biçe. Navenda hêza nû jî eger dixwaze li ser piyan bimîne û bêhtir bi hêz bibe, divê şûna navenda berê bigire. Pêxîrtengî jixwe ji karekterê bi şer ê vê pêvajoyê derdikeve holê. Hêzeke hegemonîk xwe bi xwe nakeve pêxîrtengiyê, hêzeke nû jî heta li ber sîstema hegemonîk ranebe bi pêş nakeve. Di çanda Rojhilata Navîn û sîstemên şaristaniyê

de gelek çûnûhatinên bi vî rengî çêbûne. Mezinbûn û jihevbelavbûna bajar, çîn û dewletan, avabûn û hilweşîna begtî û împaratoriyan, damezrîn û ji text ketina xanedanan timî bi van pêxîrtengiyên navend û dewrûberê ve girêdayî pêk hatine. Ji bo em dîrokê rast bixwînin, divê em li diyalektîka di bingehê van pêvajoyan hemûyan de rast serwext bibin.

Navenda hêza hegemonîk çawa pêk hatiye? Ev pirsa kilît a diyalektîka dîrokî ye. Ji bo hegemonya pêk bê, divê beriya her tiştî navendên hêzê yên xwecihî çêbibin. Bi giştî ev begtiyên li derveyî bajaran, hiyerarşiyên qebîle û eşîran û dewletokên bajaran in. Piştî ku navendên hêzê yên xwecihî pêk tên, di nava wan de li ser berhemê zêde ku hebûna xwe disipêrinê, şer dest pê dikin da ku para xwe zêde bikin. Şerê li ser parzêdekirinê meseleya sînoran derdixe holê. Sînorên milkiyetê yên ji serdemên berê ji qebîle û malbatan mayî, vediguherin sînorên desthilatdariyên xwecihî. Ew çiqasî mezin dibin sînorên wan jî ewqasî berfireh dibin. Di encamê de sînor li hev rast tên. Her hêza di nava sînorekî de bi awayekî bê tewazun mezin dibe. Tişta rê li ber bêtewazuniyê vedike teknîkên desthilatdariyê (sîlehên nû, amûrên çûnûhatinê) û amûrên hilberînê yên berdar ên nû ne. Hertim zêdekirina hêza xwe, rewşeke destpêkê ya daneheva sermayeyê ye. Çawa ku sermayeya kapîtalîst timî daneheva xwe zêde neke nikare li ser piyan bimîne, hêzên desthilatdariyê yên xwecihî jî hêza xwe mezin nekin nikarin li ser piyan bisekinin. Kengî berfirehbûna sînoran ber bi qadên vala ve temam bibe, kengî bi hêzên cuda re bêne beramberî hev, hingê şer ango bivênevê dema pêxîrtengiyê pêk tê. Ji ber ku hêzên xwecihî berhemê zêde mezin nekin, nikarin hêza xwe biparêzin, lewma pêxîrtengî bivênevê çêdibe. Ji ber burokrasiya zêde dibe, qebîle û xanedaniyên pirr dibin, şêniyên heyî pirr zêde dibin. Desthilatdarî mîna şaneyên kanserê yên mezin dibin, dixwaze li tevahî qadên din ên civakî belav bibe. Ev jî çawa ku li cem şaneyên zindî jî tê dîtin, kengî şane dixwazin xwe biparêzin, hingê şerê xweparastinê dest pê dike. Di şerên pêşî yên dewletên bajaran ên Sumer û xanedantiyan de mirov vê pêvajoyê bi awayekî balkêş dibîne. Li Iraqa roja me ya îro heman pêvajo (bi herhalî ev laneta Xwedawenda Ûrûkê Înannayê ye) bi awayekî herî eşkere dewam dike.

Di pêvajoya şerên desthilatdariyên xwecihî de alî yan hevdu tine dikin yan jî di van şeran de, di van pêxîrtengiyan de aliyek xwe bi ser aliyekî dixe û pêvajo bi encam dibe. Li dora sîte yan xanedaniya bi serketî navendeke nû ya hegemonîk pêk tê. Bi tevahî banîsazî û binesazî ango avahiyên îdeolojîk û polîtîk bi teknîkên hilberînê yên maddî û milkiyetên wê yên manewî ji nû ve têne birêkûpêkkirin. Hegemonya nû xwe pîroz dike û weke xweda îlan dike. Yan wê dînê berê li gorî berjewendiyên xwe bikin, yan wî bikin rewşa mezhebekî û cihêwaziya xwe nîşan bidin, yan jî bi dînekî û dibe bi mîtolojiyekê xwe mayînde bikin ango dixwazin bi awayekî îdeolojîk xwe ebedî bikin. Sîstema şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn di pêvajoyeke pênchezar salan de û heta jê zêdetir timî li ser vî bingehê diyalektîk xwe kir navendî û bi vî awayî ji pêxîrtengiyan rizgar kir. Her pêvajoya xwelihevrakişandinê û şer bi desthilatdariyeke navendî ya bêhtir mezinbûyî bi encam bû. Jixwe ji vê encamê ye ku timî karîbû bibe sîstema şaristaniya navendî.

Navendîbûna zêde, ne bi tenê di berdêla qelsbûna desthilatdariyên xwecihî de pêk hat. Bi awayekî giştî mafê xwebirêvebirinê yê civakan timî desteser kir, li nîzama demokratîk a xwezayî ya qebîle û malbatên hem li navenda xwe, hem li dewrûbera xwe û heta li yên li derveyî xwe jî timî dest werda, mafê xwebirêvebirina wan ji destên wan girt bi xwe ve girê da û bi vî awayî navenda hegemonîk bi hêz kir. Hem desthilatdariyên hegemonîk, hem jî desthilatdariyên xwecihî timî di berdêla berepaşbirin an jî hilweşîna nîzama komî ya destpêkê û xwezayî ya gund, eşîr û qebîleyan û heta xwebirêveberiya bajaran de pêk hatin.

Desthilatdariya navendî ya hegemonîkbûyî her tim li dijî otorîteyên demokratîk ên xwecihî pêk tê. Di çanda Rojhilata Navîn de, di qelsbûna zêde ya ruh û zêhna demokratîk de pareke diyarker a desthilatdariyên hegemonîk ên hezarî salan heye. Çanda desthilatdariyê ya li Ewrûpayê bi sedema ku xwe disipêre dîrokeke nêz, meylên neteweya demokratîk li Ewrûpayê timî bi hêz bûn. Li Rojhilata Navîn bi sedema ku derfet û îmkanên otorîteya komînal nemane, ekolên dînî û mezhebî yên muxalif ku diberidin, rêûresmeke demokratîk a çeloxwarî nîşan didin. Her tevgera muxalifê desthilatdariyê bi xwe demokratîk e. Kengî rêûresma hegemonîk ji sedsala 16. ve ket destê Rojavayê Ewrûpayê, pêxîrtengiya ekonomîk û siyasî ya li Rojhilata Navîn reng û karekterekî sîstematîk wergirt. Hegemonya Îslamî li cem Împaratoriya Osmanî ji dawiya vê sedsalê û pêve paşve diçe, lê li hemberî vê, desthilatdariya hegemonîk a Ewrûpayê dest bi mezinbûnê dike. Divê mirov li desthilatdariya hegemonîk weke sîstemekê bifikire. Li herêmekê di sedsalekê de paşve diçe û dikeve pêxîrtengiyê, lê li hemberî vê, li herêmeke din jî û di sedsaleke din de mezin dibe. Her ku diçe navendî û global dibe. Sîstema hegemonîk herî zêde di sedsalên 19. û 20. de navendî û global bû. Di dused salên dawiyê de bi giranî hegemonya Ingilistan û DYE'yê li Rojhilata Navîn xurt bû. Di vê çarçoveyê de Rojhilata Navîn a ketiye nava pêxîrtengiyeke mezin ketiye rewşa çanda dewrûberê. Piştî ku hegemonya Osmanî ji hev belav bû, pêxîrtengiya di çanda desthilatdariya hegemonîk a navendî ya hezarê salan de bêhtir kûr bûye.

Sîstema desthilatdariya hegemonîk a ku Ingilistan û DYE temsîla wê dikin, di çarsed salên dawî de hat avakirin û bi dewletên netewe yên mezin bûn, tê pêkanîn. Divê mirov xwezaya dewletên netewe baş nas bike. Şîroveyên dewleta serbixwe û nîv-serbixwe şîroveyên îdeolojiya bûrjûwaya piçûk in ku der barê desthilatdariyê de kirine, û ev şîrove ji sergirtina rastiya desthilatdariyê pêve bi ti rolê ranabin û rastiya dewleta netewe rave nakin. Nexasim şîroveyên bi vî rengî yên bûrjûwaya piçûk ên dewletên netewe yên ji aliyê hêzên hegemonîk li Rojhilata Navîn hatine avakirin, bi kêra veşartina pirsgirêkên dewlet û demokrasiyê û şuştina wan ji sîstema kapîtalîzmê tên. Divê neyê jibîrkirin ku Ingilistanê di hegemonya xwe de ji bo avakirina dewletên netewe pêşî li Ewrûpayê û paşê li tevahiya dinyayê pêşengî kir û di vê de du armancên wê yên sereke hebûn. Ya yekê, bi dewletên netewe xwest împaratorî û dewletên mezin ên li pêşiya hegemonya wê asteng parçe bike, wan piçûk bike û bi vî awayî wan ji astengbûnê derxe.

Ya diduyê, di dema derketina ji serdema navîn de rêûresma neteweya demokratîk li pêşiya pêşdeçûna kapîtalîzmê asteng bû û bi dewletên netewe xwest vê astengiyê ji pêşiya xwe rake. Di encamê de serketina herdu armancan wê rê li ber avabûna hegemonya kapîtalîst vekirana. Yekdestdariya dewleta netewe ya hegemonîk çarsed salên dawî di destê DYE û Ingilistana Anglosakson de ye. Bi tevahî dewletên netewe yên din, heta bi berjewendiyên dewleta netewe ya hegemonîk re bi yek bin, bivênevê wê bêne mînîmîzekirin. Her sîstema hegemonîk divê vê bike. Tevahiya dîrokê jî ev wisa bûye. Di dema hegemonya kapîtalîst de tenzîmkirina dewletan bêhtir hatiye sîstematîzekirin. Ango eger hinek îddîa bikin ku li derveyî sîstema dinyayê dewletên serbixwe mumkîn in, ev îddîa bi qestî nebe, hingê ew zimandirêjî û biaqilokiya bûrjûwaya piçûk e. Di tevahiya sîstemên hegemonîk ên pênchezar salî de cih ji diyardeya dewleta serbixwe re nîne. Di hegemonya sîstemeke mîna kapîtalîzmê ya heta dawiyê bi şîddet û emperyalîzmê barkirî de gotinên weke dewletên serbixwe, dewlet bi kêfa xwe têne avakirin û dewletên heyî hebûna xwe bi awayekî serbixwe dewam dikin, bi temamî gotinên pûç û tewş in.

Sîstema kapîtalîst çima hewcedariya xwe bi dewleta netewe ya hegemonîk heye? Eşkere ye ku sedem ew e, sîstem bi dewleteke bi awayekî din re nikare were dewamkirin. Ji ber ku heta împaratorî ji hev neyên belavkirin, nexasim di dema derketina ji serdema navîn de komarên demokratîk ên li bajaran zêde bûne heta ji holê neyên rakirin, bi vî awayî pêşî li netewebûyîna demokratîk neyê girtin, kapîtalîzm weke sîstema hegemonîk nikare mezin bibe. Desthilatdarî weke dewleta netewe ji nû ve neyê birêxistinkirin, kapîtalîzm nikare hebûna xwe biparêze û bi pêş bixe. Hegemonya Ingilistanê nexasim roleke stratejîk dabû Rojhilata Navîn. Ji ber ku li ser riya serweriyê ya heta bi Hindistanê bû. Piştî Napolyon, wê kontrola xwe ya li ser Rojhilata Navîn gav bi gav pêşde dibir û dema ev dikir yekparebûna sîstemê li ber çavan digirt. Bi vê armancê Împaratoriyên Spanya û Franseyê mînîmîze kiribûn. Ji bo Împaratoriya Rûsyayê danekeve Başûr bend li pêşiya wê danîbû. Wê Împaratoriya Osmanî jî heta bi kar anî, di statuya tampon de hişt. Dema ku Împaratoriya Osmanî bi hegemonya Elman a mezin dibû re hevgirt, Hegemonya Ingilistanê ew xist pêvajoya parçebûnê. Bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn gihişt armanca xwe. Ji wê demê û pêve bi tevahî dewletên netewe yên li Rojhilata Navîn hatin avakirin pêşî mohra Ingilistanê û paşê jî mohra hevgirtiyê wê yê stratejîk DYE'yê xwarin. Di serî de Komara Tirkiyê tevahiya dewletên netewe yên hatin avakirin bêyî riza dilê dewleta netewe ya navendî nikarîbûn hebûna xwe dewam bikin. Hilweşîna Rûsya Sovyetê ya piştî heftê sal damezrandina wê, li ser riya kapîtalîzmê pêşdeçûna Çînê ya hê dewam dike, vê rastiyê piştrast dikin. Di destpêkê de hebûna hinek nakokiyan –mînak nakokiyên di salên pêşî yên damezrandina Komara Tirkiyê de –ji bo encam bi vî rengî bibe asteng nînin. Ji çarsed salî zêdetir daneheveke hegemonîk a sîstemê heye û bi hêsanî vê danehevê naterikîne û bi dewletên netewe yên din ên qaşo dewletên serbixwe re parve nake. Parvekirina hegemonyayê bi mentiqê sîstemê re li hev nake. Yan şer ê biqewime, yekê bi ser bikeve, hegemonya wê bi wî re bimîne, yan jî wê sîstemeke bibertir û berdartir derkeve holê. Hêza hegemonya kevin têra vê yekê nake. Ew jî di

çarçoveya yekparetiya diyalektîk de hewce bike bi şerên xweparastinê û hewce bike bi lihevhatinê wê hebûna xwe dewam bike. Eger kapîtalîzm bê tercîhkirin û li derveyî sîstemê dawa serxwebûnê bê kirin, ev bi tenê xwe xapandin yan ji quretiyê ye.

Lewma hukmekî realîst wê bike ku mirov bibêje, dewletên netewe yên di çanda Rojhilata Navîn de saziyên ajan ên dewleta netewe ya hegemon in. Mînak, mirov hebûna bîstûdu dewletên netewe yên Ereb ên mînîmal bi tenê dikare bi berjewendiyên dewleta netewe ya hegemon rave bike. Wekî din, mirov nikare bi awayekî din rave bike. Hebûna Komara Tirkiyê ya bermahiya Osmanî, kengî dewletbûneke netewe ya mînîmal qebûl kir, hat naskirin. Wekî din nikarîbû bi gewde bibûya. Çawa ku bi giştî dewletên netewe amûrên rizgarbûnê yên ji pêxîrtengiyê nînin, berevajî amûrên zêdekirina pêxîrtengiyê ne, li Rojhilata Navîn xwediyê heman fonksiyonê ne. Armanca wan ew e, aramiya global a dewletên netewe yên hegemonîk pêk bînin. Ev jî di encamê de pêxîrtengiya kapîtalîzmê global dike. Dewletên netewe yên Rojhilata Navîn bi sedema ku xwe bi çanda herêmê xwedî nakin, timî di nava nakokiyekê de ne. Li pêxîrtengiya desthilatdariyê ya ji rêûresmê hêmanên ji ber xerîbketina xwe zêde dikin. Bi vî awayî ji rastiya çanda civaka herêmê bi temamî qut dibin. Ev saziyên ajan ên ti pirsgirêka civakî çareser nakin bi vî awayî her ku diçin bêkêr dibin. Dewletên netewe yên li herêmê di destpêka kapîtalîzmê de bi kapîtalîzma dewletê herçiqasî hebûna xwe hinekî rewa kirin jî piştî demeke kin di bin pirsgirêkên civakî de bêhnçikandî man. Ne bi tenê bûn antî-demokratîk, bûn antî-civakî jî. Di çarçoveya mentiqê xwe yê çêbûnê de dewletên netewe li dijî neteweya demokratîk bûn. Di demên wê yên dereng de ev dijberiya wê vediguhere dijberiya civakbûyînê. Dewrûberê jî bi xwe re dibe hilweşînê. Em bi awayekî berbiçav bi rewşa wan a îro dakevin em ê karibin baştir li rastiya wan serwext bibin.

### A- HÛNANDINA KOMARA TIRKIYÊ

Împaratoriya Osmanî nûnerê herî mezin û dawî yê hegemonya Îslamî bû. Pêşî bi hegemonya Bîzansê re, paşê bi hegemonya Xaçperestan a Ewrûpayê ya Habsbûrga Awusturyayê serê wê dikişand, wekî din ji bo Çartiya Rûsyayê ji Bakur ber bi Başûr ve belav nebe, herî dawî jî li dijî hegemonya Ingilîz bi tevahî şeşsed salan şer kir û di dawiyê de hilweşiya. Me timûtim hewl da Komara Tirkiyê ya ji nava xirbeyên wê derket, analîz bikin. Yên hilweşîna Împaratoriya Osmanî bi hevgirtina wê ya bi Elmanyayê ve girê didin dixapin. Elman bi ser biketana jî împaratorî wê dîsa ji hev belav bibûna. Mirov dikare avabûna Komara Tirkiyê jî pêşî bi tesfiyekirina gelên Xiristiyan, paşê jî bi tesfiyekirina hevgirtiyên wê yên kominîst, ummetgirên Îslamî, Çerkez û Kurdan ve, û bi hevgirtina mîlliyetgiriya Siyonîzma Cihû û bûrjûwaziya burokratîk a Tirk ve girê bide. Ev hevgirtina bi hegemonya Ingilistanê pêk hat, li Rojhilata Navîn ji bo pêkhatina Îsraîlê gaveke girîng bû. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku rastiya mînîmal a Komara Tirkiyê bi Proto Îsraîlê ve

girêdayî ye. Li Bakurê Kurdistanê bi tesfiyekirina hebûna Kurd û li Başûrê Kurdistanê ji bo pêkhateyeke siyasî ya Kurd a mînîmal gavavêtin ji nêz ve bi rola Komarê ya Proto Îsraîlê ve grêdayî ye. Konjonktura wê demê vê yekê ferz û ferman dike. Ereb jî dabeşî gelek dewletokên netewe dibin û ev jî bi pêkhatina Îsraîlê ve girêdayî ye. Dewletokên netewe yên Kurd û Filistînê ku roja me ya îro nû ava dibin dîsa di çarçoveya heman bernameyê de ne.

Kurd û Tirkan weke du hêmanên bingehîn di Şerê Rizgariya Neteweyî yê 1919-1922’an de rol girtin û ev helwesta wan li gorî rêûresma wan di cih de bû. Çawa ku di dema Xanedaniyên Selçûkî, Eyyûbî û Osmanî de xwedî helwesteke hevpar bûn, di tevahiya pêkhateyên desthilatdarî û dewletê de helwesteke hevpar qebûl kiribûn. Di sedsala 19. de hegemonya Ingilistanê xwest bi herdu aliyan bilîze û vê hevpariyê xira bike, lê tevî vê jî Ingilistan di lîstika xwe de bi ser neket û hevpartiya herdu aliyan dewam kir. Jon Tirkên ku paşê bi navê Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê dewam kir, hefsarên wan di destên mîlliyetgiriya Cihû û Masontiyê de bû, bi komplo û provakasyonan xwest heman rêûresma dîrokî xira bike, lê bi ser neket. Li gorî tehlîla dawî, ev hevpartiya dîrokî bû ku serketina Şerê Rizgariya Neteweyî diyar kir.

Li vir pirsa divê em bikin ev e, weke hevgirtiyê stratejîk ê nehsed salan û hêmanê bingehîn ê damezrîner ê Komarê çima hebûna Kurdan tê înkarkirin. Dema mirov mentiqê Komara Tirkiyê pê hatiye hûnandin ji hev derxe û analîz bike, divê ji sedî sed mirov bandora mîlliyetgiriya Cihû û hêza wê ya sermayeyê di Şoreşên Fransî û Rûs de li ber çavan bigire. Çawa ku tê zanîn, Qralên Fransî Katolîkên hişkbûn û dijberên Cihûyan bûn. Ji serdema navîn ve Cihû li gettoyan girtibûn û di pêşxistina antîsemîtîzmê de bi roleke girîng rabûbûn. Çarên Rûs jî hişk Otodoks bûn û ji Katolîkan gelekî bêhtir di pogromên (tevkujiyên) Cihûyan de rol girtin. Hem entelektuelên Cihû (em ji wan nivîskar jî dikarin bibêjin; berê nasnavê wan pêxember bû) û hem jî sermayedarên Cihû (Tevahiya dîrokê pêşengên sermayeya marjînal bûn ku xwediyê danehevê bûn) van xanedanên qraltiyê baş nas dikin û diranên xwe li wan diqirçînin. Ji bo heyfa xwe ji wan bistînin li benda roja xwe bûn, lewma diranên xwe li wan tûj dikirin. Şoreşên Rûs û Fransî ev firsend bi zêdehî dan wan. Bê sedem ji herdu şoreşan re nehatiye gotin şoreşên bûrjûwayê. Di karkirina îdeolojîk û polîtîk a şoreşan de bi bandor in. Di darvekirina herdu qralan de û ji bo şoreş bi hegemonya bûrjûwayê pêş bikevin rola wan di asta katalîzur de diyarker bû.

Bêguman bandora van ne ji hejmara wan, lê ji naverok û wesfê wan bû. Jixwe bi qasî ku karibin ji bûrjûwaziyê re pêşengiyê bikin giranî û hebûna wan a sermayeyê hebû. Hevgirtina wan a bi Anglosaksonên Protestan ên ku li ser xeta London-Amsterdamê bi awayekî hegemonîk mezin dibûn, têra xwe bandoreke mezin li ser herdu şoreşan kir. Li pişt şoreşên li ser xeta lîberal an sosyalîzma pêkhatî diberidîn hêza bingehîn a dahfdanê bûn. Dewletdariya netewe ya bûrjûwa ya Anglosakson-Protestan ji bo armancên xwe yên hegemonîk împaratoriyên Katolîk û Ortodoks ên li Ewrûpayê hilweşandin û parçe kirin. Dema ev kir, yên rê nîşanî wê didan û hevgirtiyên wê

hêzên sermayeyê yên cihû û entelektuelên Cihû bûn. Mirov bandora hêzên sermayeyê yên Cihû û entelektueliya Cihû li ber çavan negire û şoreşên bûrjûwayê li Ewrûpayê analîz bike, wê ev gelekî kêm û dogmatîk be.

Bûrjûwaziya Prûsya ya Elman (divê mirov Împaratoriyên Spanya û Awusturya yên Katolîk ên ji aliyê Xanedanên Habsbûrg ên Elman ve dihatin birêvebirin jî zêde bike), Çartiya Rûsyayê û bûrjûwaziya wê ya li ber hegemonya dewleta netewe ya Anglosakson rabûn, ji ber ku bawer kirin ku di têkçûna şerên xwe yên li dijî hegemonyayê de ev bandorên dualî yên Cihûyan hene ango desteka wan a ji bo projeya dewleta netewe ya Anglosakson û modernîteya kapîtalîst bi rola sereke rabûye, li dijî Cihûyan bûn xwedî helwestên dijwar ên heta gihiştin qirkirinê. Mirov heman xusûsan ji bo Împaratoriya Osmanî jî bîne ziman di cih de ye, heta zêdetir di cih de ye. Ji ber ku li gorî biryarên Kongreya Siyonîst a 1896'an Filistîn weke niştimandayika Cihûyan hat qebûlkirin û li pêşiya bicihanîna vê, Împaratorî asteng bû. Sermayedar û mîllîtanên Cihû pêşî bi xweşî û dostanî ji Ebdulhemîd xwestin rê li pêşiya koçberiya Cihûyan a Filistînê veke. Kengî Ebdulhemîd weke wan tevnegeriya (lê dîsa jî têkiliya Ebdulhemîd bi Cihûyan re xweş bû) yan jî kirinên wî kêm man, bi navê Jon Tirkan Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê ava kirin (Sefîrê wê demê yê Ingilîzan, bi Jon Tirkan hatina desthilatdariyê ya Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê weke destdanîna Cihûyan a ser Împaratoriyê dinirxîne) û bi vî awayî Împaratorî kirin bin bandora xwe. Bi darbeya Meşrûtiyeta Duyemîn (1908) û darbeya 9'ê Adara 1909'an Ebdulhemîd jî fena Qralê Fransî û Çarê Rûs bê tesîrkirin. Bi avakirina Komarê re bandora xwe ya li Anatolya û Mezopotamyayê derxistin asta herî jor.

Aliyekî wan ên din ê dişibe hev heye ku gelekî balkêş e. Bi tesfiyekirina neteweparêzên demokratîk ên di şoreşên fransî û rûs de ango bi tesfiyekirina komunar, sovyetparêz û radîkalan dîktatoriyên dewleta-netewe hatin damezrandin; em dibînin ku buyerên bi heman terzî di Komara Tirkiyeyê de jî ducarî xwe pêk tînin. Şoreşa Fransî bi awayekî bingehîn şoreşa neteweyî ya demokratîk a gel bû. Pêşengên mîna Babeuf û Robespierre vê rastiyê îspat dikin. Mîna Qralê 16. Louis serê wan jî bi giyotînê jêkirin û ev jî li ser riya diçe dîktatoriya dewleta netewe gaveke bingehîn e. Li gorî modela Anglosakson dewleta netewe beridî û bi awayekî praktîkî bandora wan li serê hebû. Nuqteya dîroknas li ser hemfikir in ev e, Şoreşa Franseyê bi dewleta netewe bi encam bû û ev yek ji gavên girîng e ku kapîtalîzma Anglosakson a Ingilîz kiriye hêza hegemonîk. Bi temamî weke vê nebe jî heman fikirê mirov dikare ji bo dewleta netewe ya Rûs a piştî hilweşîna Împaratoriya Rûs hat avakirin jî îddîa bike. Di destpêka şoreşê de bi tenê Çartî nehat tesfiyekirin, neteweparêziya demokratîk a Rûs jî di şexs û rewşa berbiçav a Sovyetê de hat tesfiyekirin. Neteweparêzekî demokratîk û baş ê Rûsyayê ango Sovyetparêzekî baş Kropotkîn bi xwe Lenîn hişyar kiriye û pêşniyar jêre kirine ji bo ku Sovyet ber bi dîktatoriya dewleta netewe ve neçe. Bûyerên paşê di dewleta netewe ya Rûsyayê de qewimîn hişyarî û pêşniyarên Kropotkîn mafdar kirine.

Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê di Împaratoriya Osmanî de pêşî kontrol, paşê jî desthilatdarî xist destê xwe û ya rastî ev pêşengiya îdeolojîk û pratîk a hêzên mîlîtan û sermayeya Cihû îfade dike. Di Cemiyetê de rola rêveber û damezrînerên ji mîlliyetên din diyarker nîne. Kurd û Tirkên tevlî Cemiyetê bûne jî di heman pozîsyonê de ne. Hêmanên Kurd û Tirk bêhtir bandora Cihû ya di nava Cemiyetê de maske kirin. Komar di dema damezrandina xwe de bi qasî aliyê wê yê rizgariya neteweyî, aliyê wê yê rizgariya demokratîk jî heye. Weke şoreş di destpêkê de bi hevgirtina hêzên neteweyî demokratîk bi ser ketiye. Hevgirtineke ji Kominîst, Ummetgirên Îslamî, Çerkez, Kurd û Tirkan heye. Mîna di Şoreşa Fransî û Rûs de, di Şoreşa Anatolyayê de jî avahiya bi karektera neteweya demokratîk bi rêbazên komplowarî veguherandin dewleta netewe ya dîktatorî. Di vê de hegemonya Ingilîz bi rola sereke radibe. Lê di dewletdariya netewe ya Komarê de ne ku bi tenê hêmanên neteweyî demokratîk hatin tesfiyekirin. Dîsa ji bilî Mistefa Kemal qîma xwe bi tesfiyekirina pênc paşayên pêşeng jî neanîn. Li Rojhilata Navîn a Ingilistanê dixwest wê ji nû ve birêkûpêk bike yek ji stûna sereke ya sîstema dewleta netewe ya mînîmal Komara Tirkiyê (mezinbûna dewletên netewe bi qasî ku karibin di hegemonya Ingilîz de bimînin), ji şêweyê wê yê di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de hatibû fikirîn bi awayekî pirr cuda, mîna ji nû ve bê tesewirkirin, hat avakirin. Li ser riya biçe damezrandina Îsraîlê weke dewleteke Pro-Îsraîlê (dewleta berî Îsraîlê) hat hûnandin. Meseleya Mûsil-Kerkûkê (parçekirina Kurdistanê) di vê mijarê de weke qeraseyekî hat bikaranîn. Jixwe dualîteya ‘yan Komar yan jî Mûsil-Kerkûk’ ku li pêşiya Mistefa Kemal Paşa danîn jî dihat vê maneyê. Li vir bi kevirekî du nîşan radikirin. Hem Mûsil-Kerkûk digirtin (li dijî Mîsaqî Mîllî bû), hem jî li wir li ser riya diçû damezrandina Îsraîlê bingehê pêkhateya Kurd a dibû duyemîn Proto-Îsraîl, dihat danîn. Parçeyê Bakur jî ku parçeyê herî mezin ê Kurdistanê bû, tevahiya dîroka Komarê di nava xwînê de hiştin û kirin ku nikaribe ji cihê xwe bilive.

Komareke bi dîndarên xwe yên ummetê, bi kominîstên xwe yên serekê hevgirtiyan û Kurdan re timî şer bike, hebûna wan timûtim înkar bike, misêwa bi provakasyonan wan îmha û îdam bike, bêguman şensê wê yê pêşketin û mezinbûnê tineye. Ji jargona çîna nû ya bûrjûwaziya Tirk a burokratîk û hêmanên Cihû re yên ku bi hev re hindikayiyeke piçûk bûn, Tirkên Spî tê gotin. Van kesan mîlliyetgiriya laîk weke dînekî hişk qebûl kiribû û bi tevahî hêmanên demokratîk ên Komarê kiribûn yên din. Dîroka Komarê ji paraztina vî cewherî pêk tê. Kengî hinek peyayên dewletê yên mîna Menderes, Ozal, Erbakan û Ecevît hewl dan ji vî cewherê Komarê bibihurin, li hundir demokratîkbûyînê, li derve jî ji mînîmalîzma Rojhilata Navîn bibihurin û bikevin pêvajoya maksîzmîzekirinê yekser hatin tesfiyekirin. ‘Qanûna hesin’ a cewherê mînîmal dîktatoriyal bi israr hat parastin. Ji bo vê jî bi armanca tesfiyekirinê komplo û provakasyonên li dijî Kurdan, Misilmanan û Kominîstan, heta li dijî Çerkezan timî di rojevê de hiştin. Tevkujî, girtin û darvekirin ti carî kêm nebûn. Ketin NATO’yê. Ji 1952’an ve artêşa NATO’yê ya veşartî bi navê Gladîo ya navenda wê li Elmanyayê bi awayekî fiîlî Tirkiye bi rêve bir. Li pişt pêvajoyên jêre darbe û wesayeta artêşê tê gotin timî Gladîo hebû. Rêveberiya Gladîo tengezariyên çepgir-

rastgir, Elewî-Sunnî, Tirk-Kurd timî bêçareserî hişt û bi vî awayî ji dîktatoriya eskerî û sivîl re bahane amade kirin. Piştî 1925'an provakasyonên li dijî Kurdan bi heman rolî radibûn. Piştî şerê sar dixwestin rolên nû bidin Komara Tirkiyê. Ma ne dewleta Îsraîlê pêvajoya avabûnê temam kiribû, hegemonya li Rojhilata Navîn bi pêş ve çûbû. Piştî ku tehlûkeya Rûsya Sovyetê ji holê rabû (1990), li Rojhilata Navîn ji bo hegemonya DYE'yê pêk bê, tam jî roja dîrokî hilatibû. Bi gotineke din, jêre firsend çêbû.

Ji bo em girîngiya vê roja dîrokî fêhm bikin divê nîşaneya me ya sereke dîsa rewşa Îsraîlê be. Îsraîl hatibû avakirin, lê pirsgirêkên wê yên ewlekariyê nehatibûn çareserkirin. Diyar nebû ka mîlliyetgiriya Ereb wê kengî wê daqurtîne. Lewma hewcedariya wê bi hevgirtiyên mayînde, stratejîk û taktîkên nû hebû. Di salên 1920'an de rola dîktatoriya dewleta netewe ya Tirkê Spî di Komara Tirkiyê de pê rabû, vê carê dewletdariya netewe ya Kurdê Spî li Kurdistanê wê pê rabûna. Dema 1990'an duyemîn dema 1920'an e. Ji bo Duyemîn Şerê Kendavê yê di serê salên 2000'î de jî mirov dikare heman tiştan bibêje. Di serê salên 1990'î de Yekîtiya Sovyetê ji hev de ketibû û lewma ji bo hegemonya cîhana kapîtalîst (hêza pêşeng DYE) diyarkirina dijminekî nû weke pirsgirêkekê derketibû holê. Di encamê de li ser bingehê ewlekariya Îsraîlê, radîkalîzma Îslamî weke tehlûke an jî dijminekî nû hat îlankirin.

Ev rastiya nû ya derketiye holê, li ser mirov ferz dike ku mirov li rewşa Îsraîlê ya li herêmê ji nû ve bifikire. Avabûna Îsraîlê weke dewleteke netewe ya li herêmê nîne û nabe jî. Îsraîl bi tenê dewleteke netewe ya Cihû jî nîne. Mirov nikare bi fêhmeke bi vî awayî qîma xwe bîne. Em dema pêvajoya diçe damezrandina Îsraîlê ji nû ve bînin ber çavê xwe, em ê bibînin di çarçoveya Îsraîlê de diqewimin. Ka em li van bûyeran binêrin; civîna Kongreya Siyonîst (1896), Siltan Ebdulhemîd xistin nava lepê xwe (1876-1909), darbeya Meşrûtiyeta Duyemîn, di 31'ê Adara 1909'an de Ebdulhemîd ji text hat xistin, Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê di 1'ê Çileya 1913'an de desthilatdarî xist destê xwe, bi bûyereke ketûber di sala 1914'an de ketin Şerê Cîhanê yê Yekemîn, li ser bingehê Peymana Sykes-Picot Ingilistan û Franseyê Rojhilata Navîn di navbera xwe de parve kirin, Deklarasyona Balfourê (plana avakirina Îsraîlê, avakirina welatekî Cihû li Filistînê 1917), li Filistînê avabûna mandakariya Ingilîz û îlankirina Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê (heman dem, 1920), piştî Şerê Rizgariya Neteweyî bi qebûlkirina Peymana Lozanê dewleta netewe ya Tirkê Spî komargeriya neteweya demokratîk tesfiye kir (hevgirtina Şerê Rizgariya Neteweyî ji hev belav kir û dîktatoriya hindikayî ava kir) û dîktatoriya CHP'ê ava kir, di 15'ê Sibata 1925'an de bi provekekirina Şêx Seîd pêvajoya tevkujiyên Kurd hat destpêkirin (1925-1938), hevgirtina Ingilistanê û Komara Tirkiyê (1939), damezrandina Îsraîlê bi awayekî fermî hat îlankirin (1948), Komara Tirkiyê ket NATO'yê (1952), darbeya 27'ê Gulanê (1960), darbeya 12'ê Adarê (1971), darbeya 12'ê Îlonê (1980), darbeya Çîller-Demîrel (1993), darbeya Çevîk Bîr (1998) û herî dawî darbeya Ecevît û anîna AKP'ê ya hukûmetê (2002), wekî din bûyerên weke Şerên Kendavê yên Yekemîn (1990) û Duyemîn (Di sala 2001'ê de bi awayê xuya dikir Afganistan hatibû dagirkirin,

lê ya rastî ev provayek bû ku pê zemînê Şerê Kendavê yê Duyemîn û dagirkirina Iraqê amade kirin) û gelek bûyerên bi vî rengî bi awayekî zincîrwarî bi hev ve girêdayî di çarçoveya Îsraîlê de diqewimin. Herweha divê mirov li dewletên netewe (divê mirov ji van re beşekî cihê veqetîne) yên li herêmê hatin avakirin jî di vê çarçoveyê de bifikire û li vê zincîrê zêde bike. Ev bûyer hemû her yek ji wan qonaxekê îfade dikin û mirov bêyî ku bi têkiliya wan dakeve bi hêsanî dikare bibêje, pêvajoya avakirina Îsraîlê, nîşaneya sereke ya pêşketina hegemonya Anglosakson li herêmê ye. Piştî ku Împaratoriya Osmanî bi zanîn hat hilweşandin, Îsraîl weke HÊZA KAKIL a hegemonya nû li herêmê tesewirkirin û avakirin. Li dinyayê hegemonya Ingilistanê-DYE'yê çi be, hêza nû ya hegemonîk a herêmê Îsraîl jî li Rojhilata Navîn ew tişt e. Îsraîl bi tenê dewleteke netewe ya piçûk a Cihû nîne, hêzeke mezin a hegemonîk e.

Hukûmeta AKP'ê hewl dide mohra xwe li Komarê bide. Di çarçoveya vê hewldanê de şêweyê bingehîn ê hûnandina Komarê naguhere, lê ji aliyê sîstema hegemonîk ve dijminê nû yê sereke tê tespîtkirin û li gorî vê tespîtê veguherenîke qismî tê kirin. Di sala 1920'an de bi awayekî mîlliyetgir û laîk Komar weke pêş pêkhateyeke rê li avabûna Îsraîlê vedike hat avakirin, di salên 2000'î de jî ji bo radîkalîzma Îslamî û mîlliyetgiriya Ereb a li dijî Îsraîlê ji tehlûkebûnê derxin hewl didin Komarê veguherînin Komara Tirk a Îslama Nerm. Di dema Komara Yekemîn de xwestin bi dewleta netewe ya laîk ummetgiriya Îslamî ya bi awayekî bingehîn di nava civakê de serwer bû, tesfiye bikin. Siltanên Osmaniyan ku bi qasî şeşsed salî hêza hegemonîk a Îslamî di destê xwe de girtin û di heman demê de xwediyê nasnava xelîfetiyê bûn, ji Komarê re mîrateyeke mezin a ummeta Îslamî hiştin. Di cîhana Îslamî de heta ev yekparetiya Îslamî bihata parastin, hegemonya Ingilîz û pêşgava wê ya piçûk avakirina Îsraîlê wê gelekî zehmet bûya. Rola dabûn Komara di bin dîktatoriya CHP'ya neteweperest û laîk de ew bû, wê rê vekirina li parçekirina yekparetiya ummetê. Ingilistanê bi vê armancê sîleha xwe ya bi navê dewleta netewe li gelek quncik û guherên dinyayê bi kar anîbû. Lewma ji bo Rojhilata Navîn jî ev sîleh gelekî hewce bû û wê bi tesîr bibûya. Komar ji bingehê wê yê neteweya demokratîk hat qutkirin û bi awayekî lezgîn û bi şêweyekî gelekî xwînrij ew veguherandin hişk dewleta netewe ya Tirkê Spî û mirov dikare vê bi tenê bi vê rola wê ya stratejîk rave bike.

Bûyerên paşê biqewimin ku her yek ji wan qonaxekê îfade dikin wê di çarçoveya vê stratejiyê de pêk bên. Di sala 1920'an de Komar weke dewleta netewe hat avakirin û mîsyona duyemîn a danîn pêşiya wê ew bû, diviyabû pêşî li belavbûna Rûsya Sovyetê ya li Rojhilata Navîn bigire û li Komara Tirkiyê nehişta kominîzm bi pêş bikeve. Polîtîkaya hundir û derve ya Tirkiyê bi awayekî bingehîn li gorî van herdu armancên bingehîn bi gewde bûbû. Hêza kontrolker Ingilistan bû. Şoreşa Îslamî ya Îranê di sala 1979'an de û di heman demê de dagirkeriya Rûsya Sovyetê ya li Afganistanê dest pê kir, tewazuna dewletên netewe yên li herêmê hatibûn avakirin ji binî ve hejand. Di dema Komara Yekemîn de tewazuna dewleta netewe ya li Rojhilata Navîn di bin himayeya Ingilîstan û DYE'yê de hatibû avakirin di çarçoveya Îsraîlê de temam bûbû. Xeleka kêm

dewleta netewe ya Kurd bû; ew jî li ber avabûnê bû. Divê ez vê xusûsê bi girîngî diyar bikim ku ji Şoreşa Îslamî ya Îranê di sala 1979’an de heta bi dagirkirina Afganistanê ji aliyê Yekîtiya Sovyetê ve pêvajoyek heye û di vê pêvajoyê de li Rojhilata Navîn bi hegemonya Îsraîlê (bi hevgirtiyên xwe Ingilistan û DYE’yê re bi awayekî hevpar) tewazuna dewleta netewe pêk hatiye. Çawa ku tê îddîakirin, li Rojhilata Navîn dewletên netewe li gorî serxwebûna neteweyî pêk nehatine, li gorî hesabên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst li herêmê çêbûne û ev jî heyîna Îsraîlê weke hêza kakil a hegemonîk baş rave dike. Li Rojhilata Navîn sîstema dewleta netewe bi awayekî şertê pêş ê pêkanîna Îsraîlê ye, lewma sîstemeke hewce ye ku ji bo hegemonya ango hebûna Îsraîlê dewamî be. Ev mentiqê sîstemê mînîmalîzma der barê Komara Tirkiyê de jî têra xwe rave dike.

Ji salên 1979’an ve ji du milan ve li dijî sîstemê tehlûke hebû ango ji aliyê Rûsya Sovyetê û yê Îrana Îslamî ve û ev sedema bingehîn a derve bû ku dikir Komara Tirkiyê veguhere, lê li hundir jî muxalefeta neteweya demokratîk di asta jor de bûbû tehlûke. Ji ber van herdu tehlûkeyan bivênevê li gorî berjwendiyên sîstemê bû ku darbeya 12’ê Îlona 1980’î bi Gladîo’yê pêk bîne. Ji bo vê jî Gladîo jixwe bi hêz bû. Di dema Komara Yekemîn de îdeolojiya neteweperest a laîk bi sedema tehlûkeyên nû têrê nedikir, kêm dima. Lewma senteza Îslama Tirk ji bo rawestandina herdu tehlûkeyan hewce dikir. Di vê çarçoveyê de îdeolojiya fermî ya dema Komara Duyemîn weke senteza Îslama Tirk hat pêkanîn. Bi vî awayî wê bi sentezkariya Îslama Tirk a nerm Tirkiyê bersiva bidaya radîkalîzma Îslama Îranê, herweha tevgerên neteweya demokratîk jî wê bi terora faşîst bihata îmhakirin. Di bin destê Gladîo’yê de wê bi komareke darbeyê –bi Komara Duyemîn –bi awayekî bingehîn bersiva tehlûkeyên dualî yên hundir û derve bihata dayîn. Pêkanîn jî li ser bingehê konsepta nû ya îdeolojîk meşiyan. Dema Komara Duyemîn ku di sala 1980’î de dest pê kir, li AKP’yê weke partiyeke hegemonîk a vê qonaxa bêhtir belav û cihê xwe girtî fikirîn. Weke partiyeke bi polîtîkayên bingehîn ên derve û hundir ên Komara Duyemîn ve girêdayî, lê êdî dixwaze hegemonya xwe temam bike, dîzayn kirin. Bi awayekî mîna CHP’ya Komara Duyemîn lê fikirîn. Pêkanînên wê yên heşt salên bihurî jî vê îfadeyê piştrast dikin. Nakokiyên lihevçêkirî û qelp ên AKP’ê bi Îsraîlê re divê kesekî matmayî nehêlin. Bêguman mirov nikare îddîa bike ku hîç nakokiyên wan tinene; lê ev nakokiyên wan ên li ser berjewendiyan di nava heman sîstema hegemonîk de yên çareserkirinê ne.

Di dema Komara Yekemîn de jî weke Pro-Îsraîlê nakokiyên ciddî û xwînrij çêbûn. Bûrjûwaziya burokrat a Tirkên Ciwan hevgirtina xwe ya bi sermayeya Cihû re timî ber bi xwe ve kişand. Hertim dixwestin para Cihû û Masonan kêm bikin. Wezîrê Ekonomiyê yê alîgirê Ingilîzan Cavît Beg (yek ji lîderên li rêza pêş ê Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê bû) di sala 1926’an de hat darvekirin û bi qanûna bi navê Baca Hebûnê ya 1943’an gelek pêkanînên heta bigihîjin desteserkirinê, timî bi armanca rûçikandina sermayeya Cihû bûn. Lê tevî van bûyeran hemûyan jî Cihûtiya Tirk hertim di warê mohrdanîna li avahiya îdeolojîk, polîtîk û ekonomîk a sîstemê de hêza diyarker bû. Di polîtîkaya derve û artêşê de jî giraniya wan timî diyarker bû.

AKP û baskê nû yê bûrjûwaziya Tirk, sermayeya taybet a Anatolyayê ya navenda wê Konya û Qeyserî, ji sermayeya Cihû û hêza wê ya di nava dewletê de (ya di Komara Yekemîn de) zêdetir parê dixwaze. AKP'ya ji aliyê sêbera DYE-Ingilistan-Îsraîlê ve ji bo ji hegemonya Rojhilata Navîn re xizmetê bike hatiye çêkirin di berdêla xizmeta xwe de dixwaze para wê bê zêdekirin. Ji bo vê jî dixwaze wesayeta artêşê ya li ser wê bê sivikkirin, li dijî wê darbe neyên kirin û ji pasteya mêtinkariyê ya li Rojhilata Navîn bêhtir par jêre bê veqetandin. Îsraîl daxwazên vê bûrjûwaziya Anatolyayê ya nû ya bi çarpîkan dimeşe zêde dibîne û li bendê ye van daxwazên xwe kêm bike. Herweha ji gotinên wê yên gelekî dubare dike weke 'hêza herêmî' û 'hêza global' zivêr dibe, van gotinan nepixandî dibîne û dixwaze rast fêhm bike ku li herêmê û dinyayê hêza hegemon kî ye. Rola dane AKP'ê ew e, divê mîlliyetgiriya Şîî ya Îranê, Îslama Radîkal a Ereb û mîlliyetgiriya laîk nerm bike û bi sîstemê ve entegre bike. Eşkere ye ku ji bo vê di artêşê û karên derve de rolek danê. AKP jî bi vê rolê radibe. Şerê di vî warî de şerekî bi qestîka ye, lê nakokiyên wan ên ji bo zêdekirina para xwe rast in, lê van nakokiyan jî dikarin di nava sîstemê de çareser bikin. Di dema navîn û dirêj de bivênevê AKP wê bi sîstema hegemonîk re bi temamî li hev bike. Lê eger serhişkiyê bike, hela hela bi Îran û Îslama radîkal re, heta bi Îslama Nerm re hev bigire û zorê bide sîstema hegemonîk, hingê jî çi hatibe serê yên beriya wê û CHP'ê heman tişt wê bi serê wê de jî were.

Mirov bi hêsanî dikare bibêje, Tirkiye xeleka qels a sîstemê ye. Lewma qutbûna wê ya ji sîstemê îhtîmaleke qels nîne. Qutbûn dikare di du çarçoveyan de pêk bê: Ya yekê, eger ne xapandin be, bi Îran, Sûrî û heta Rûsya û welatên din ên weke Brezîlya, Hindistan û Çînê re hewl bide bibe hêza herêmî ya bigihîje heta hêza globalbûnê ku weke destguherîna hegemonyayê jî tê şîrovekirin, û bi vî awayî li ber hegemonya DYE, Ingilistan û Yekîtiya Ewrûpayê rabe. Herçiqasî ev îhtîmal ne mumkîn be jî hebûna Komara Tirkiyê ya heyî bi xwe û tewazunên berbiçav nîşan didin ku ev riyek e ku derbasbûna wê zehmet e. Ya diduyan, eger Komara Tirkiyê hevgirtinên xwe yên di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de li ser bingehê neteweya demokratîk aktualîze bike qutbûna duyemîn mumkîn dibe. Eger Komara Tirkiyê bikeve vê riyê di dawiya wê de dikare ji modernîteya kapîtalîst qut bibe, pirsgirêkên xwe yên sereke yên di asta herêmî û neteweyî de bi tenê bi modernîteya demokratîk ji binî ve çareser bike.

**B- HÛNANDINA DEWLETÊN NETEWE YÊN EREB Û ÎSRAÎLÊ**

Yek ji jêderên bingehîn yên pêxîrtengiya Rojhilata Navîn pêvajoya bi hev re avakirina dewletên netewe yên Ereb û Îsraîlê ye. Dema di serê sedsala 19. de Ingilîstanê li ser Împaratoriya Osmanî dest bi operasyonan kir, wê şêxên Ereban weke beştê pê deriyên kelhan dişkînin bi kar anîn. Wê li Balkanan zanyarên dînî yên Ortodoks ên bi eslê xwe Grek bi kar anîn û destek da avakirina dewleta netewe ya Yewnan û bi vî awayî jihevdeketina Împaratoriyê li Balkanan bi lez kir. Li Başûrê Împratoriyê li Nîvgirava Erebistanê ku li ser riya Hindistanê xwedî pozîsyoneke stratejîk

bû, xebateke bi heman rengî meşand, ango dewletdariya netewe ya Ereb bi destê zanyarên dînî yên Misilman yanî bi destê şêxên temsîla hiyerarşiya jor dikirin destek kir. Di heman demê de bi riya Kurdistanê jî bi şêxên terîqetan ên ji Silêmaniyê (di serî de Neqşî û Qadirî) ket nava hewldanên bi heman rengî. Li ser Başûrê Şahtiya Îranê jî kontrola wê ya her diçû zêde dibû pêşde bir. Pêvajoya pêşî bi serîrakirinan dest pê kir, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi rejîmên mandater, bi Şerê Cîhanê Yê Duyemîn re bi dewletên netewe yên tam bi gewedebûyî bi encam bû. Di vê navberê de Împaratoriya Osmanî tesfiye bû. Li herêmê valatiyeke mezin çêbû yan jî çêkirin. Ingilistan bi xwe çawa ku li Hindistanê jî qewimî nikarîbû yekser weke hêzeke mêtinger li herêmê bi cih bibe. Lê hêzeke hevrik jî nehişt. Hewl da, Komara Tirkiyê û rejîmên Ereb ên manda di heman çarçoveyê de (Mijara sereke ya guftûgoyên li Kongreya Sêwazê li ser mandatiya Ingilîz an DYE'yê bû) û di heman demê de (1920) bihûne, pêk bîne. Helwesta radîkal a Mistefa Kemal (Di Şoreşa Franseyê de li dijî tesewira Ingilîzan Qraltiya Destûrî ya Meşrûtiyê dişibe dijberiya Montagnaran, Robespier û hevalên wî yên xwedî helwesta radîkal a komargerî) berê meseleyê da komarê û wisa gihand encamê. Lê bi awayekî cewherî tiştekî diguherî tinebû. Rejîmên manda yên Ereban jî di demeke kin de mîna dewletên netewe yên din veguherîbûn. Navên komarê yan jî qraltiyê li xwe kirin, lê van navan cewherê wan ê dewleta netewe neguherand.

Bi awayekî bi lez derketina holê ya Îsraîlê jî tam li vê pêvajoyê rast tê. Li tiştên ku min di beşên beriya niha de li ser qebîleya Cihû gotin, ya zêde bikim ew e, koka Îsraîlê disipêrin van qebîleyan û îdeolojiyên wan (Îdeolojiya Cihû, dînên yekxwedayî û mîlliyetgirî). Îsraîl bi xwe encameke xwezayî ya şerên dewleta netewe ye ku di salên 1550'î de li ser xeta Amsterdam-Londonê weke dewleta modern derket holê û piştre bi qasî çarsed salan Ewrûpa kir gola xwînê. Di avakeriya dewletdariya netewe de entelektualîzma Cihû û sermayedariya wê (kapîtalîzm) timî bi rola pêşeng rabûye. Bawer dikirin ku bi parçebûna Împaratoriyên Katolîk, Ortodoks û Îslamî, Cihû wê bigihîjin azadiya xwe û her ku pêvajo pêşde biçe mîlliyetgiriya Cihû wê li ser bingehê îdeayên Siyonîst dewleteke Îsraîl-Cihû ava bike. Ev xebatên beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn di dawiya wî de û piştî wî van xebatên bi baweriyê, bi bîrewerî û bi rêxistiniyê encam dan. Bi dewletdariya netewe ya Komara Tirkiyê ya mînîmalîst a li ser xirbeyên Împaratoriya Osmanî hat avakirin û di wê atmosferê de ku bi hejmareke zêde ya dewletên netewe yên Ereb ên mînîmalîst re derket holê, dewleta netewe ya Cihû-Îsraîlê ya armanca îdeolojiya Sion bû di sala 1948'an de bi awayekî fermî hat îlankirin. Komara Tirkiyê mîna ku cewherê xwe yê Pro-Îsraîlê îspat bike, bû yekemîn dewleta netewe ya ku dewleta Îsraîlê nas kir.

Avakirin û îlankirina Îsraîlê bûyereke ji rêzê nîne. Kengî li herêmê hêzên hegemonîk ên dawî Împaratoriya Osmanî û Şahtiya Îranê veguherandin dewletên netewe yên mînîmalîst û hewcedar, hingê ji valatiya desthilatdariyê ya derket holê weke hêza hegemon a kakil a hegemonyadariya modernîteya kapîtalîst Îsraîl derket holê. Îsraîl weke hêza kakil a hegemon

hatiye hûnandin û ev xusûseke gelekî girîng e. Ev tê wê maneyê, li herêmê hêzên din ên dewleta netewe hebûna hêza hegemon Îsraîlê çiqasî nas bikin, ewqasî wê rewa bêne qebûlkirin, eger nas nekin wê bi şeran wan bînin ser xetê û wan wisa bihilhilînin heta ku Îsraîlê nas bikin. Komara Tirkiyê, Misr, Urdun û hinek welatên Kendavê ji wan dewletan in ku Îsraîl pêşî nas kirin, lewma ew weke dewletên netewe yên rewa qebûl kirin û xistin nava sîstemê. Yên mayî Îsraîl û hevgirtiyên xwe bi welatên din re şer dewam dikin. Di çarçoveya pirsgirêka Filistînê de şerê bi Ereban re, di çarçoveya pirsgirêka Kendavê de pevçûn û şerên bi welatên din ên Îslamî re ji nêz ve bi hebûna hegemonîk a Îsraîlê ya li herêmê re têkildar e. Heta hegemonya Îsraîlê bê naskirin ev şer, pevçûn, komplo û reşkujî wê dewam bikin.

Eger mirov hûnandina hegemonîk a modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn rast fêhm neke, mirov nikare rast fêhm bike ka çima bîstûdu dewletên netewe yên Ereb hatine avakirin. Mirov nikare bi şîroveyên dîrokê yên rastgir-çepgir, dîndar-mezhebî, etnîk û qewmî yên serxwebûnxwaziya bûrjûwaziya piçûk ên dewleta netewe modernîteya kapîtalîst a li Rojhilata Navîn hatiye hûnandin rast fêhm bike. Di vê çarçoveyê de ji bo pirsgirêka Ereb bi awayê rastî yê heyî were fêhmkirin (çawa ku divê pirsgirêkên Komara Tirkiyê û kom û komarên din ên Tirkî rast bêne fêhmkirin), beriya her tiştî divê hûnandin û avakirina hegemonyadariya modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn rast were fêhmkirin. Naxwe bi serê xwe bi zêhniyetên civak û dîrokê yên mîna henekên xwe bi rastiyan bikin dibêjin 'avakirina bi şan a dewleta netewe' pirsgirêkên ti civak û dewletê nayên çareserkirin. Lewma pirsgirêka Ereb bi tenê pirsgirêka bi Îsraîlê re nîne û nabe ku bi tenê weke pirsgirêkeke Îsraîl-Filistînê bê ravekirin. Pirsgirêka sereke û herî kûr a civakên Ereb, beriya her tiştî parçebûna wan a li bîstûdu dewletên netewe ye. Ev bîstûdu dewlet ji rêxistinên ajan ên kolektîf ên modernîteya kapîtalîst wêdetir nikarin bi roleke din rabin. Hebûna wan bi xwe ji bo gelên Ereb pirsgirêka bingehîn e. Di vê çarçoveyê de pirsgirêka Ereb pirsgirêkek e ku bi hûnandin û avakirina modernîteya kapîtalîst a li herêmê re têkildar e. Bi tenê di vê çarçoveyê de mesele bê dîtin, ango weke hêza hegemonîk a modernîteya kapîtalîst li herêmê bi Îsraîlê re dibe ku pirsgirêkên wan hebin.

Lê em ji bîr nekin ku hêzên Îsraîl ava kirin û hêzên bîstûdu dewletên netewe yên Ereb ava kirin heman hêz in. Ango têkilî û nakokiyên wan bi Îsraîlê re bi rengê kamûflajê ne. Ji ber ku ew jî bi awayekî cewherî heman sîstema hegemonîk parve dikin, ev nakokiyên wan bi hêz bin jî kengî biwêrin derkevin derveyî modernîteya kapîtalîst hingê maneyek van nakokiyan heye. Tu yê hem di nava heman hegemonya modernîteya kapîtalîst de bimînî, hem jî tu yê Îsraîlê nas nekî! Dîplomasiya bi maske û sexte ha ji înkarkirina vê rastiyê derdikeve holê. Çi Îslama radîkal, çi Îslama Nerm û çi jî Îslama Şîa dibe, bi tevahî nêzîkatiyên mîlliyetgir ên Îslamî ku dixwazin li şûna modernîteya kapîtalîst bi cih bikin, ji sextekariyeke mezin pêve tiştekî din nînin. Ji ber ku ev Îslamgerî ji serê sedsala 19. ve şaxekî mîlliyetgiriya hegemonya modernîteya kapîtalîst e, ti têkiliya wê bi şaristaniya Îslamî re nîne, amûrekî îdeolojîk ê kapîtalîzmê yê xweserî welatên

Îslamî yên Rojhilata Navîn e. Îslamgeriyên siyasî yên di dused salên dawî de ji ajanên bi maske yên hegemonya kapîtalîst wêdetir nikarin bi roleke din rabin. Ji ber ku bi modernîteya kapîtalîst ve girêdayî hatine hûnandin û xistine nava tevgerê. Jixwe di dused salên dawiyê de ev tevgerên Îslamî ji kûrkirina pirsgirêkên civakî û neteweyî yên li Rojhilata Navîn wêdetir bi roleke din ranebûn û ev jî rastiya em behsa wê dikin piştrast dike. Lewma li pêşiya kominalîzmê û neteweparêziya demokratîk astengên îdeolojîk û polîtîk in. Îslama çandî mijareke cuda ye, û di çarçoveya rêûresmê de xwedîlêderketin û parastina wê, aliyekî xwe yê manedar û erênî heye.

Eger ji çarçoveya modernîteya kapîtalîst dernekeve, şerên Ereb-Îsraîl û Filistîn-Îsraîlê wê her weke şerê deve-fîl yan jî mişk-pisîkê be. Di encamê de tişta derdikeve holê ew e, bi qederê sedsalan e ku şerên ji destpêkê ve encama wan diyar bi tevahî enerjiya gelên Ereb têk dibe. Eger ev şerên em behsa wan dikin nehatibûna vedîtin, bi tenê bi hatina ji petrolê Erebistaneke hêjayî deh Japonyayan dikarîbû bihata avakirin. Ji vê tespîtê encama girîng a mirov dikare derxe ew e, sîstematîka dewleta netewe ya li Rojhilata Navîn weke ku tê îddîakirin, çavkaniya çareseriya pirsgirêkên bingehîn ên civakî û neteweyî nîne, berevajî pirsgirêkan mezin dike, giran dike, kûr dike û dike ku mirov nikaribe ji navê derkeve. Dewleta netewe pirsgirêkan çareser nake, pirsgirêkan diafirîne. Ji vê jî wêdetir, heman sîstem ne bi tenê dewletên Rojhilata Navîn, civakên wê jî heta hêza wan nehêle berra hev dide. Rastiya Iraqê vê tespîtê gelekî baş piştrast dike. Li vir em nikarin berpirsiyariyê bi tenê bixin stûyê modernîteya kapîtalîst. Îdeolojiyên çepgir (sosyalîzma pêkhatî) û Îslamî û organîzasyonên polîtîk ên weke rizgarîxwaz û çareserkerên pirsgirêkan derdikevin holê bi kêmanî bi qasî hêmanên veguhezîner ên modernîteya kapîtalîst (Jon Tirk, Jon Kurd, Jon Ereb, Jon Fars) berpirsiyar in. Bi qasî sed salan e ku ti bername û rêbaza wan ji gelên xwe re pêşniyar kirî bi ser neketiye û herwisa ji bo modernîteya kapîtalîst li herêmê ava bibe bi tenê xizmeta wê kirine û li ser vî bingehî hatine bikaranîn, bi roleke din ranebûne. Di çarçoveya rêxistiniyên îdeolojîk û polîtîk ên dewletên netewe yên Ereb de jî em nikarin rola van rastiyan înkar bikin.

Pirsgirêkên Ereban jî mîna pirsgirêkên Tirk û Tirkiyê pirsgirêkên neyên çareserkirin nînin. Li vir pirsgirêk di nava du çarçoveyên sereke de têne analîzkirin û ji hev derxistin: Ya yekê, di nava heman sîstemê de para xwe ya dewlet û civakê zêde dikin û ji bo vê jî şerên koordînekirî diafirînin û hewl didin encamê bigirin. Rêxistina Rizgariya Filistînê jî di navê de rêbaza şer a ku dewletên netewe yên Ereb van pêncî salên dawiyê diceribînin û encama jê dixwazin ev e. Bi peymanên weke yên Camp Davidê zû dereng dixwazin vê çarçoveyê temam bikin. Lê ev rê bi tenê pirsgirêkên civaka Ereb girantir dike û ber bi çareseriyên radîkal ve dahf dide û ji vê jî wêdetir bi roleke din ranabe. Ev rê dikare dewletên netewe yên olîgarşîk ên Ereb tatmîn bike; lê nikare bersivê bide daxwazên gelan ên ekenomîk û demokratîk. Ev daxwazên civakê gelekî giran bûne. Jixwe tevahiya dîrokê pirsgirêkên ekonomîk û demokratîk ên bi qasî çiyan mezinbûyî yên gelên Ereb ên ketine ser hev, hene. Dewletên netewe yên Ereb ku li pey modernîteya kapîtalîst

diçin, bihêlin ku van pirsgirêkan çareser bikin, naxwazin navê çareseriyê jî bînin ser zimanê xwe. Timî pirsgirêkan giran dikin, bi şerên sexte yên dînî û mezhebî ser wan digirin û ber bi qonaxeke welê diberidînin ku çawa di mînaka Iraqê de tê dîtin, yan heta dawiyê jihevdeketin, jihevbelavbûn û şer, yan jî çareseriyên bi kok ên ekonomîk, civakî, çandî û neteweya demokratîk ferz dikin.

Di çareserkirina pirsgirêkên Ereban de çarçoveya duyemîn ew e, divê mirov ji modernîteya kapîtalîst bibihure. Li vir rewşa em behsa wê dikin qutbûna ji sîstemê ye. Divê mirov baş zanibe ku radîkalîzma Îslamî yan jî Îslamî siyasî nikarin bibin modelên alternatîf. Îslam weke çand li dijî modernîteya kapîtalîst dikare di nava jiyaneke alternatîf a modernîteyê de rol bigire. Paradîgmaya modernîteyê ya ji bo rastiyên dîrokî û civakî ya gelên Rojhilata Navîn hemûyan di cih de ye, li gorî gelên Ereb jî alternatîfa herî rast û bi hêz e. Ji bo gelan modernîteya alternatîf modernîteya demokratîk e ku ji yekparebûna tevgerên neteweya demokratîk, sosyalîst, ekolojîst, femînîst û çandî yên timî li dijî modernîteya kapîtalîst têkoşiyane pêk tê.

Di çarçoveya pirsgirêkên Ereban de baqê pirsgirêkan ên di dereceya duyemîn de bi hebûna Îsraîlê re têkildar in. Nêrtina mîlliyetgirî, Îslamgirî û dewletdariya netewe ya Ereb li Îsraîlê ji aliyê hegemonya îdeolojiya Îsraîl-Cihû bi xwe ve hatiye koordînekirin; ango di nava sînorên ku ji aliyê dewlet û îdeolojiya Îsraîl-Cihû ve xêzkirî de, dimînin. Heta di nava heman modernîteyê de bimînin, herçiqasî hegemonya Îsraîlê xwedî hejmareke piçûk be jî wê ji pêlîstokiya wê wêdetir bi roleke din ranebe. Îsraîl bi xwe jî wê ji vedîtina xwe ango ji modernîteya kapîtalîst nikaribe rizgar bibe û wê êsîrê wê be. Îsraîl heta ku xwe di nava derya Ereban de bibîne û his bike ku di vê deryayê de hêzên her kêlî dikarin wê bixeniqînin hene, atom jî di navê de bi serdestiya teknolojîk a sîlehê wê texsîr neke xwe biparêze. Îsraîl ê yan di hegemonya xwe de Rojhilata Navîn a bi xwe re li hev hatiye di çarçoveya tewazuna dewletên netewe de pêk bîne ku ji ber sedemên me hewl da em rave bikin eşkere bûye ka ev çiqasî zehmet e; yan jî heke dixwaze ji êsîrbûna sîstema bi destê xwe afirandiye rizgar bibe, divê lidawîhiştina modernîteya kapîtalîst li ber çavan bigire. Modernîteya demokratîk, di rewşa aloz a li Rojhilata Navîn de, ne bi tenê ji bo pirsgirêka Cihûyan, ji bo pirsgirêka dewleta Îsraîlê ya dora xwe bi cinawirên mîlliyetgir û dîndar girtiye jî alternatîfa bi tenê ya çareseriya mayînde ye.

**C- DEWLETDARIYA NETEWEYA ÎRANA ŞÎA û ROLA WÊ YA LI ROJHILATA NAVÎN**

Rêûresma dewletê ya Îranê mîna Komara Tirkiyê bi hêsanî mînîmalîzebûyînê qebûl nake. Şahtiya Îranê ya di dema modern de jî ji Komarê bêhtir li dijî mînîmalîzekirinê li ber xwe da. Şoreşa Îslamî ya Îranê ya 1979'an li dijî sîstema tewazunê û mînîmalîzma dewleta netewe ya bi awayekî xweser li Rojhilata Navîn sînor danîn, helwesteke girîng bû. Ji destpêkê ve li dijî hegemonya Îsraîlê hegemonya xwe ferz kir. Komara Tirkiyê û dewletên netewe yên Ereb rewabûna sîstema dewleta netewe nas kirin ku bi vê Îsraîl pêkan bû, lê Şoreşa Îslamî ya Îranê

tevî ku gotin û gavên wê yên hevdu nagirin hene jî statuya hatiye diyarkirin û xêzkirin nas nekiriye, hewl daye hegemonya dijber pêk bîne. Tengezariya Îran û Îsraîlê ya ku roja me ya îro em çavdêriya wê dikin, bi tenê di navbera du dewletên netewe de nîne, di navbera du sîstemên hêzê yên li pey hegemonyayê diçin, derdikeve holê.

Ji ber ku Îran duyemîn hêz e ku li pey hegemonyayê diçe û dixwaze bibe hegemon, divê mirov ji nêz ve li rewşa Îranê temaşe bike. Çawa ku me di cildên beriya vê yên parêznameyê de qala wê kiribû, rêûresma dewleta Îranê ji dema Konfederasyona Med (B.Z. 1000-550) tê. Med û Kurdan çandeke wekhev parve kirine. Zerdeştî û Mîtraîzm du çavkaniyên girîng in ku vê çandê di dîrokê de radigihînin. Dewleta pêşî ya Îranî Împaratoriya Pers bi temamî li ser şopa Konfederasyona Med hatiye avakirin. Bi awayekî, qonaxeke împaratoriyê ye, Kurd jî têde bi rola sereke rabûne. Di gavavêtina ji serdema destpêkê ya koletiyê ber bi serdema antîk a koletiyê de (B.Z. 1000-500) bi roleke bingehîn radibe. Hebûna koledariya antîk a Grek û Romayê bi saya belavbûna Pers-Medan e. Serdema Helenîstîk a bi fethên Skender dest pê kir (300 B.Z.-300 P.Z.), di navbera çanda Rojhilat û Rojava de sentezeke afirîner îfade dike. Roma û Partan, Roma (Bîzans) û Sasaniyan (100 B.Z.-630 P.Z.) bi sedsalan li ser hegemonya dinyayê şer kirin û van şerên wan rê li ber pêxîrtengiyeke mezin vekir. Di encama van şerên wan de Îslamiyet weke hêzeke hegemonîk derket holê. Rêûresma dewleta Îranê ji fethên Îslamî heta bi avabûna Xanedaniya Safewî (650-1500) di demeke bi qasî hezar salî de ji aliyê Xanedaniyên Ereb, Tirk û Moxol ve ku bi çanda xwe re xerîb ketibûn, hat temsîlkirin. Şîîtî bi Xanedaniya Safewî re bûye îdeolojiya dewletê. Hîmên Îrana modern di vê demê de hatine danîn. Bi Împaratoriya Osmanî re li ser erdên Kurdistanê şerên hegemonîk meşandin û ev jî bi Peymana Qesr-î Şîrînê ya 1639’an bi encam bûye. Kurdistan di gavavêtina serdema modern de cara pêşî bi vê peymanê bû du parçe. Ji ber vê peymanê pêkhatina dewleteke modern li Kurdistanê derbeke girîng xwariye. Li cem begtiyên Kurdan polîtîkaya jiyana hevpar a bi hêzên hegemonîk re li ser bingehê xweseriya hundir têra xwe cih girtiye.

Dewleta Îranê ya çend xanedan guhertin, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn mîna Komara Tirkiyê û Şahtiya Afgan di çarçoveya hesabên hegemonîk ên Ingilistanê de weke dewleteke netewe ya modern ji nû ve hat avakirin. Çawa ku bi M. Kemal re li hev kirin, di berdêla Îraneke mînîmal de desthilatdarî dan Riza Şah. Ingilîstanê di vê demê de Komara Tirkiyê, Îran û Şahtiya Afgan a mînîmîze kirî, ji bo Rûsya Sovyetê di Başûr re nikaribe dakeve li ser riya wê weke dewletên netewe yên bi rola tampon radibin hûnandin û ava kirin. Wê ev qadên navbihurî nekirin rejîmên klasîk ên mêtingeh û ev ne ji bêhêzbûna wê bû, ji ber ku fikarên wê hebûn Rûsya Sovyetê belav bibe. Polîtîkaya dewletên tampon sîstemeke Ingilîz e ku ji serê sedsala 19. ve heta roja me ya îro bi awayekî giştî serketî hatiye pêkanîn. Xanedaniya Riza Şah bernameyeke modernîteyê ya welê meşand ku rêûresma çanda Îranê da aliyekî û teqlîda Rojava kir. Hewl dan wê weke rejîmeke peyk a pêşî Ingilistan, paşê DYE û heta ya Îsraîlê li ser piyan bigirin. Rengê dewleta peyk a

dewletên netewe li Rojhilata Navîn bi awayekî herî eşkere bi Xanedaniya Pehlewî hatiye nîşandan. Ev dewletên bi hêza esker û polês li ser piyan hatin girtin, kengî hêza hegemonîk desteka xwe ji wan kişand di rojekê de hilweşiyan. Dawiya Xanedaniya Pehlewî jî bi vî awayî hatiye.

Şoreşa Îslamî ya Îranê sala 1979'an bi qasî ku siyasî bû, ewqasî jî şoreşeke çandî bû. Ev şoreşê hêza xwe bi tenê ji rêxistiniya ulemayên Şîî wernegirt; berevajî hêza xwe ya bingehîn ji çanda civakî ya gelê Îranê girt ku rehên wê xwe berdidin kûrahiya dîrokê. Şoreş di destpêkê de mîna Şoreşên Fransî, Rûs û Anatolyayê xwedî naverokeke neteweyî û demokratîk bû. Xwe disipart hevgirtineke berfireh a hêzên neteweyî û demokratîk. Ev hevgirtina neteweyî û demokratîk a ji piştgiriya kominîstan, ummetgirên Şîî û di serî de Kurd ji beşên din ên gelên welatparêz ên Îranî pêkhatî, xwediyên rastî yên serketinê bûn. Lê belê ulemaya Şîî û zumreya bazirgan a çîna navîn ku ji aliyê dîrokî û civakî ve di warê rêûresma rêveberiyê de bi hêz bûn, di demeke kin de hegemonya xwe ava kirin. Hevgirtiyên xwe yên din bi awayekî bêrehm pelixandin. Di Komara Tirkiyê ya salên 1920'î de pêvajoyeke bi heman rengî pêk hatibû. Herçiqasî ulemaya Şîî bingehê şoreşê yê neteweya demokratîk berevajî bike jî ji aliyê naverokê ve bi modernîteya kapîtalîst re li hev nedikir. Olîgarşiya Şîî xwest vê daneheva antî-kapîtalîst a maneya xwe ya dîrokî û çandî gelekî mezin bû, ji bo hebûna xwe rewa bike, li dijî hêzên hegemonîk ên sîstemê weke qertekê bi kar bîne. Hê jî hewl dide li ser vî bingehî bi kar bîne. Bi tevahî hewldana olîgarşiya Îranê ew e, dixwaze vî bingehê antî-modernîst (antî-kapîtalîst) li dijî hêzên hegemonîk ên Rojava weke sîlehekê bi kar bîne di tewazuna dewleta netewe ya Rojhilata Navîn de li statuyeke bi rûmet û erêkirî cih bigire. Weke modernîteyeke cuda, ji aliyê cewherî ve ti nakokiya wê bi modernîteya kapîtalîst re tineye. Nakokiya wê ya bi sîstemê re ew e, mîna dewletên netewe yên Ereb û qonaxên yekemîn û duyemîn ên Komara Tirkiyê bi hesabên taktîk dixwaze ji sîstemê para herî zêde bi dest bixe, were erêkirin û destekkirin, di berdêla vê de jî bi heman rengî wê rê bide wan ku jê sûdê werbigirin û bi vî awayî heman encaman bi dest bixe. Di rêûresma Îranê de cihê bazarê girîng û bi hêz e. Li vir jî awayekî tîpîk ê bazirganiya bazarê heye. Li Îranê jî nakokî tam di vê nuqteyê de dest pê dike. Rêûresma çandî ya bi hêz olîgarşiyeke Şîa ya bi modernîteya kapîtalîst re lihevkirî qebûl nake. Lewma nakokiya li Îranê hertim şensê wê heye veguhere têkoşîneke di navbera du modernîteyên alternatîf de. Çawa ku li cem dewletên netewe yên Tirk û Ereb hat dîtin, ew ê bi hêsanî tesfiye nebe.

Herçiqasî bi giranî di asta devjeniyê de be jî olîgarşiya Îranê di roja me ya îro de bi Îsraîlê re li ser Rojhilata Navîn ketiye nava şerekî hegemonîk. Nexasim xebatên xwe yên nukleerî bi vê armancê hewl dide weke qerta duyemîn bi kar bîne. Rêûresma Şîatiyê di dîrokê de jî dawa hegemonyayê kiriye. Îraneke hegemonîk a hezar salan li pişt xwe weke sîlehê digire, lê di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de ewqasî jî bi hêz nîne, hêza xwe mezin dibîne. Di vê serdemê de ku sîstem herî zêde globalîze dibe, eger berê xwe nede tercîha modernîteya bikok, şensê serketinê

yê olîgarşiya Şîa ya Îranê gelekî kêm e. Xwe dişibîne welatên BRIC (Brasil, Russia, India, China) û lewma hesabên wê yên pêkanîna blokekê jî hene. Bi Komara Duyemîn a AKP'ê re li ser bingehê antî-PKK'tiyê hevgirtina hewl dide pêk bîne dixwaze bi Sûrî berfireh bike. Ev hesabên wê hemû qîmeteke xwe tineye. Mîna dewletên netewe yên din, li pêşiya dewleta netewe ya Îranê jî ji bo çareserkirina pirsgirêkan du rê hene. Ya yekê, divê mîna rejîma Şahtiyê bi sîstemê re li hev bike. Ya rastî, olîgarşiya Şîa ji vê re amade ye. Lê sîstem wê bi halê wê yê heyî qebûl nake. Lê hevdîtinên ji bo lihevkirinê têne meşandin yan bi riyeke aştiyane yan jî bi riya şer wê li gorî hêzên hegemonîk ên kapîtalîst bi encam bibin. Ya diduyan, qutbûneke radîkal a ji sîstemê ye. Lê ev rê jî bi sedema ku hem olîgarşiya Şîa û hem jî hêzên hegemonîk ên Rojava (di serî de Îsraîlê) bêçareserî û bêhêz dihêle, bivênevê çareseriya modernîteya demokratîk ê bikeve dewreyê.

**D- LI IRAQ, AFGANISTAN û PAKISTANÊ JIHEVDEKETINA DEWLETA NETEWE û JI BER AWAYÊ AVABÛNÊ ASÊMAYÎNA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST**

Li New Yorkê di 11'ê Îlona 2001'ê de êrîşeke birin ser Bercên Cêwî ku bi îhtîmaleke mezin komplo bû, û ya rastî, bi vê êrîş û hewldanê sîstema kapîtalîst 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' da destpêkirin. Piştî ku di sala 1990'î de Rûsya Sovyetê ji hev de ket, NATO'yê ango sîstema hegemonîk a dinyayê Îslama radîkal a ji zû ve weke dijminê nû îlan kiribû, ya rastî weke maskeya îdeolojîk bi kar dianî. Armanca vê bi xwe jî ew bû, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li welatên Rojhilata Navîn ên bi çanda Îslamî radibûn, temamkirina hegemonya kapîtalîst a nîvcomayî û nexasim dewletên Îran, Iraq, Sûrî, Lîbya û hwd. yên weke dewletên asî û eşqiya hatine ragihandin bi awayekî bi rêkûpêk entegrekirina wan bi sîstemê ve û bi giştî jî bi hêzkirina hegemonya DYE'yê li dinyayê. Bi 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' ku hegemonya DYE'yê xwe lê rakişand, valatiya piştî hilweşîna sîstema Sovyetê ya derketibû holê bihata tijîkirin. Wekî din, bi vî awayî wê pêşî li mezinbûna hevrikê nû yê muhtemel Çînê bihata girtin. Armanca pêngava pêşî ya li dijî Afganistanê ew bû, ji bo ku Rûsya û Çîn valatiya hegemonîk a li Asya Navîn tijî nekin bi lez tevgeriyabû û xwestibû însiyatîfê ji dest nede. El Qaîde û Talîban bi vê armancê weke amûrên paravan hatin bikaranîn. Eger bixwazin dikarin di nava bîstûçar saetan de dawiyê li wan bînin. Lê ji bo rewakirina şer diviyabû hebûna wan timî di rojevê de bihata hiştin. Di çarçoveya amadekariyên kirî de pêngava pêşî ya şer bi awayekî serketî pêk hat. Pêngava Iraqê jî bi serdestiya teknolojîk bi heman lezê gihişt armanca xwe. Armanc têkbirina rejîma Saddam Huseyîn bû. Ev armanc bi cih hat, lê zehmetiya rastî di qada siyasî de derket holê. Piştî ku rejîmeke asî mîna Iraqê (mirov dikare bibêje waliyê sîstemê wezîfedarkirî yê serî rakir) hilweşiya, tevahiya dîroka şaristaniyê xirabiyên ketibûn ser hev hemû mîna ku Qutiya Pandorayê vebe yek bi yek li naverastê weşiyan, belav bûn.

Iraq welatekî ne ji rêzê bû. Sîstema şaristaniya navendî cara pêşî li vir hatibû avakirin û bi hezaran sal jêre bi rola dergûşê rabûbû. Tevahiya etnîsîte, dîn û mezheb li vê herêmê hatibûn

cem hev. Ji aliyê siyasî ve yan rejîmeke hişk a despotîk yan jî sîstemeke demokratîk a ji yên herî radîkal ferz dikir. Di warê pêkanînê de şensê rejîmên siyasî lîberal ên Rojava tinebû. Herweha herêmeke wisa nebû ku bi sosyolojiya Rojava ji hev bihata derxistin. Bi kurtî, ne ew çand bû ku bi paradîgmayên îdeolojîk û siyasî yên Rojava mirov ji heqê wê bihata der. Rewşa derketibû holê dişibiya rewşa piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn derketibû pêşiya Ingilistanê. Serketina di qada eskerî de nikarîbû bi heman rolê di qada siyasî de rabe. Berevajî bi hilweşîna rejîmên despotîk ên ji rêûresmê re pirsgirêkên rastî yên civakî li naverastê belav bûbûn û ev ew pirsgirêk nebûn ku modernîteya kapîtalîst karibe serî bi wan re derxe. Ji dema Sumeran ve heman çerx û xelekê xwe dugêsinî dikir. Her gava bi armanca çareseriyê dihat avêtin pirsgirêk mezintir dikirin. Herî zêde jî çandên li herêma Iraqê baş nîşan didan ku pêkanînên dewleta netewe çiqasî pirsgirêkan mezin dikin û çareser nakin. Ji bilî dewleta netewe jî amûrekî din di destê modernîteyê de tinebû. Piştî hilweşîna dewleta netewe jî rewşa derkeve holê ji kaos û anarşiyeke tîpîk wêdetir tiştekî din nîne.

Rewşa li Afganistanê ji ya li Iraqê ne cuda bû. Li wir jî piştî dewleta netewe amûreke amade ya li şûnê deynin tinebû. Ya rastî, piştî li tevahiya herêmê qalikê dewleta netewe şikiya rewşa derket holê dişibiya hevdu. Cîlaya dewleta netewe bi tenê kiribû ku mirov wê weke modern bibînin. Kengî ev cîla were jêbirin û kolan, rastiya derkeve holê pirsgirêkên çandî ne ku hezarên salan e, ketine ser hev û kom bûne. Rejîmên despotîk ên ji rêûresmê bi tenê bi zorê çand tepisandin. Bi vî awayî pêkan nîne ku ew van çandan tine bikin. Cîlaya modernîteyê gelekî seresere û tenik bû. Kengî hinekî biliviya wê bihata xwarê û tabloya rastî derketa holê. Hegemonya DYE'yê bi vî awayî diçû birinca Rewanê ji savara malê dibû. Hema hema bi temamî hegemonên modernîteyê di vê de asê diman. Darvekirina Saddam Huseyîn li Iraqê ji aliyê dewletdariya netewe ve dişibe darvekirina Louisê 16. di dema Şoreşa Franseyê de ku bi vê bûyerê re dawî li rejîmên monarşîk dihat. Çawa ku bi darvekirina Louisê 16. re rejîmên monarşîk careke din bi ser xwe ve nehatin û ketin serdema serberjêrçûyînê, bi darvekirina Saddam Huseyîn re jî rejîmên faşîst ên dewletên netewe bi awayekî careke din bi ser xwe ve neyên ketin serdema serberjêrçûyînê.

Tevî ku sîstema hegemonîk hêza xwe hemû bi kar anî, restorasyona rejîmên monarşîk li Ewrûpayê di demên 1815-1830'î de cih negirt, bi vî awayî xebatên jinûverestorekirina dewletên netewe yên li Iraq û Afganistanê jî bi ser nakevin: Ji ber ku bi tenê li Iraq û Afganistanê dewletên netewe ji hev de nakevin. Ji dewleta netewe Kirgizistanê ya li ser sînorê Çînê heta bi Fasa li peravên Okyanûsa Atlasê, ji dewletên netewe yên Yemen û Sûdanê heta bi dewletên netewe yên Bosna-Hersek heta bi dewletên netewe yên li Başûrê Qafqasyayê (yên li Bakur jî bi heman rengî ne) li cem tevahiya dewletên netewe heman krîz heye. Ji niha ve ti cudahiya Pakistanê ji Afganistanê nemaye. Libnan, Yemen û Sûdan timî dikelin. Misrê bi awayekî demokratîk hinekî xwe nerm kir bi hilweşînê re rûbirû bû. Cezayîr hê jî bi temamî ji şerê navxweyî rizgar nebûye. Tirkiyeya xwe weke girava aramiyê îlan kiriye, bi saya tevgerên taybet ên Gladîo'yê bi zorê li ser

piyan tê girtin. Hema bêje welatekî Rojhilata Navîn tineye ku lê pirsgirêk tinebe. DYE û hevgirtiyên xwe hemû eskerên xwe jî bixin herêmê nikarin krîzan çareser bikin û ji vê dûr in. Jixwe pirsgirêkên em behsa wan dikin, ne ew pirsgirêk in ku bi awayekî eskerî bêne çareserkirin. Kesên weke terorîstên Îslamî îlan dikin, ajanên wan in ku wan ew bi xwe afirandine. Li hemberî wan hêzek tineye ku bi awayekî eskerî pêre şer bikin. Belkî Îran heye. Lê eger li Îranê jî bidin wê hêzên qatbiqat zêdetir bi pirsgirêk derkevin holê.

Bi tevahî nîşaneyên der barê pêxîrtengiya Rojhilata Navîn de didin xuyakirin ku îhtîmaleke kêm e, dewletên netewe bi restorasyonê karibin gavê biavêjin. Ya rastî, piştî salên 1990'î ya hegemonya DYE'yê xwest bike, restorasyoneke dewleta netewe ya mîna restorasyona rejîmên monarşîk di navbera salên 1815-1830'î de bû. Lê restorasyona rejîmên monarşîk çawa cihê xwe negirt, restorasyona dewletên netewe nexasim li Rojhilata Navîn cih nagire. Dewletên netewe li welatên Yekîtiya Ewrûpayê derketin holê û jixwe krîza dawî ya welatên Yekîtiya Ewrûpayê ku her diçe kûr dibe, bi xwe krîzeke dewleta netewe ye. Eger Yekîtiya Ewrûpayê dixwaze ji krîzê bibihure, divê di dewleta netewe de veguherînên radîkal bike. Dewletên netewe heta serweriya xwe heyî biparêzin krîz jî wê kûrtir bibe. Lê Yekîtiya Ewrûpayê şêst sal in ku ji bo serweriya dewleta netewe bi sînor bike, hewl dida xwe bi pêş bixe. Em dibînin van hewldanan jî têrê nekiriye û ev jî globalbûna krîza dewleta netewe eşkere nîşan dide. Pirsgirêk êdî şêweyê avabûnê yên dewletên netewe ango modernîteya kapîtalîst nîne; pirsgirêk ew e, piştî krîzê wê çi çawa pêk bê. Pêxîrtengî û kaos ê bi çi û çawa çareser bibin? Eger em rewşê bişibînin rewşa piştî hilweşîna Împaratoriya Roma yan jî Împaratoriya Osmanî, em dikarin guftûgo bikin û li çareseriyan bipirsin, gelo li şûna dewletên netewe kîjan tîp rejîm, pêkhateyên siyasî û şêweyên jiyana civakî yên hevpar dikarin pêk bên.

Em ji bo karibin krîza dewleta netewe û piştî wê binirxînin, me xwest em guftûgoyên der barê modernîteya demokratîk de bikin. Li Rojhilata Navîn gelek bûyerên ji zû ve sînorên trajediyê derbas kirine û têne maneya felaketên mezin êdî bi gelan re (Ermenî, Suryanî, Helen, Cihû, Filistînî, Kurd, Tirk, Ereb, Afgan û hwd.) bi tenê bi sînor nînin, tevahiya jiyana civakî ya herêmê hejandine. Rejîmên dewleta netewe û modernîteya kapîtalîst ku bi xwe sedemên van felaket û trajediyên mezin in, êdî nikarin careke din xwe ji nû ve weke çareseriyê pêşkêş bikin. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov guftûgoyên modernîteyê zêde bike, ji bo derketina ji pêxîrtengiyê mirov modernîteya demokratîk û derfetên wê yên çareseriyê binirxîne.

## E- LI ROJHILATA NAVÎN TEWAZUNA DEWLETA NETEWE û PIRSGIRÊKA KURD

Di bin pirsgirêkên bingehîn ên aktuel ên Rojhilata Navîn de hûnandina dewletên netewe heye û pirsgirêka Kurd jî bi awayekî bingehîn ji ber vê hûnandinê ye. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de nexşeya siyasî ya Rojhilata Navîn bi awayekî hat hûnandin ji bo ku pirsgirêk bi kêmanî sedsalekê dewam bikin. Ji bo Ewrûpayê Peymana Versaillesê çi be, li Rojhilata Navîn jî Peymana Sykes-

Picot ew e. Peymana Versailles a bi rola 'Aştiya Dawî Li Aştiyê Anî' rabû rê li ber Şerê Cîhanê yê Duyemîn vekir. Peymana Sykes-Picot jî bi heman rolê rabû. Li şûna aştiya Osmanî, Rojhilata Navîn ber bi pêxîrtengiyeke şidandî û asêmayînê ve bir. Di dawiya şer de tevahiya dewletên netewe yên derketin holê, bûn organîzasyonên welê ku li hundir li dijî gelên xwe, li derve jî li dijî hevdu şer kirin. Maneya tesfiyekirina civaka ji rêûresmê şerê li dijî gelan bû. Maneya nexşeyên bi cedwelan hatibûn xêzkirin jî ew e, bi van nexşeyan bang li dewletên qelp dikin da ku li dijî hev şer bikin.

Bi tenê hûnandina Îsraîlê bi halê xwe yê heyî ji şerê sedsalî bihurî ye. Hê jî pêşbîniya wê nayê kirin ka wê hê çiqasî rê li ber şerên mezin veke. Libnana piçûk timî di nava şer de ye. Sûrî timî di nava rewşa awarte de ye, û bi Îsraîlê re şer dike. Jixwe dewleta Iraqê ji roja avabûna xwe ve di nava şerê hundir û derve de bû. Di vî warî de rewşeke cuda ya Îranê tineye. Mentiqê di avabûna tevahiya dewletên netewe yên li Rojhilata Navîn de pirsgirêkên heyî yên civakî çareser nake, pirsgirêkan zêdetir dike û ev dihêle ku dewletên netewe timî di rewşa rejîmên şerên hundir û derve de bimînin. Sedema bingehîn a vê yekê jî ew e, Îsraîl weke kakilê hêzên hegemonîk hatiye avakirin. Mirov heta Îsraîlê weke kakilê hegemonîk fêhm neke, mirov nikare fêhm bike ka tewazun an jî bêtewazuniya dewletên netewe li Rojhilata Navîn çawa hatiye hûnandin û avakirin. Bi awayekî herî eşkere hêmana ku vê îspat bike, pirsgirêka Kurd û parçebûna Kurdistanê ye.

Peymana Sykes-Picot (parvekirina Rojhilata Navîn di navbera Franse û Ingilistanê de) di heman demê de bingehê Peymana Sevrê ye. Peymana Sevrê parçekirina Anatolyayê û Mezopotamya Jor plan dike. Weke ku tê îddîakirin, Şerê Rizgariya Neteweyî bi temamî Sevr ji holê ranekiriye; hinekî bêtesîr kiriye. Peyman bi giranî hat bicihanîn. Komara mînîmal di çarçoveya Sevrê de hatiye qebûlkirin. Dîsa hiştina Mûsil-Kerkûkê ji Ingilîzan re encama Sevrê ye. Ango di dema modern a Kurdistanê de duyemîn parçebûna girîng (parçebûna yekemîn beriya destpêka dema modern bi Peymana Qesr-î Şîrîn 1639'an e) sedema sereke ya pirsgirêka Kurd e. Du dewletên netewe yên mînîmal ên li Iraq û Anatolyayê hatin avakirin, tên wê maneyê ku du çalakiyên şer in, gewde û bedena Kurd û Kurdistanê parçe kirine. Eger mirov bi vî awayî li dewleta netewe serwext nebe, mirov ne dikare parçebûna Kurdistanê û ne jî dikare evqasî dirêjajotin û bêçareserîhiştina pirsgirêka Kurd fêhm bike. Ji 1920'an ve, yanî ji roja ku hîmê dewleta Iraqê hat danîn û heta roja me ya îro, rejîma li ser Kurdan meşand bi tenê şerê nod salî bû. Ji bûyerên roja me ya îro diqewimin bi hêsanî mirov dikare tê derxe ku ev dewlet rejîmeke şer a li dijî civaka xwe jî bû. Eger em bi tenê di çarçoveya Kurdan de jî binêrin, dewleta netewe ya Tirkê Spî rejîmeke şerê taybet a heştêûpênc salan a gihişt heta bi qirkirinê meşand û ev êdî rastiyek e ku her kes lê mikur tê. Pevçûnên navxweyî yên rejîmê heta roja me ya îro ti carî kêm nebûne. Pirsgirêkên Kurdan pirsgirêkên xweber derketine holê nînin, bi plan hatine çêkirin; Rojhilata

Navîn bi pirsgirêkan xeniqandine û ev yek weke beşekî girîng ê ji bo rêvebirina wê bi plan û dewamî kirine.

Hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst bi qasî dused salan e ku Kurd berê bi Împaratoriya Osmanî û Îranê, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn jî bi dewletên netewe yên Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûrî dan pelixandin û divê mirov sedemên vê baş ji hev derxe. Di vê de ne bi tenê armancek belê gelek armanc hene. Armanca yekemîn ew e, Kurdan bi gelên Ereb, Tirk û Îranê yên tevahiya dîrokê bi hev re jiyane û di navbera wan de kêm zêde statuyeke rewa heye, berde hevdu, nakokiyên di navbera wan de kûr bike, statuya heyî xira bike, wan dahf bide nava tevlîheviyê û wan bixe rewşekê ku timî bi hev re di nava şer de bimînin. Armanca duyemîn ew e, bi tesfiyekirina Kurdan ji dewletên netewe yên Ermenî, Suryanî û Cihû re ku pîlan dikirin, welatên berfireh amade bikin. Bi vî awayî jî wê hem sê dewletên netewe yên bi rola tampon û xeleka navber rabûna û mutleq bi wan ve girêdayî pêk bianiyana hem jî wê Kurd bi cîranên wan ên Misilman, Xiristiyan û Cihû re dewamî di nava şer û pirsgirêkan de bihiştana û bi awayekî wê Rojhilata Navîn a kakil hewcedarî xwe bikirana. Bêguman wê ev hêzên hegemon ên modernîteya kapîtalîst Kurdên welatê wan hatiye parçekirin û bi kirinên gihiştine qirkirinê re rûbirû bûne ji bîr nekin û wê texsîr nekin car caran xwe weke meleka xelaskar nîşanî wan bidin. Dema em li bûyerên heta roja me ya îro dinêrin, em bi hêsanî dikarin bibêjin, ev peymanên 'aştiya dawî li aştiyê tîne' beşekî mezin ji wan bi cih hatine anîn.

Em bûyerên li Kurdistana Iraqê dikarin weke argumanên delîl in, ji bo van fikrên xwe nîşan bidin. Giregir û serokên Kurdan ên destpêkê ji Kurdên li Kurdistana Iraqa îro re pêşengî kirin, pêşî bi Osmaniyan, paşê bi rêveberiya Iraqê dan pelixandin. Ingilistanê bi xwe di vê de hêz bi kar anî. Ereb û Kurd timî di nava şer de girtin û bi vî awayî herdu alî jî bi xwe ve girêdan. Di vê navberê de bi soza welatekî serbixwe Suryanî bi begtiyên Kurdan, bi Bedirxan Beg, Bedirxan Beg jî bi Osmaniyan da pelixandin (salên 1840) û bi vî awayî hemû bi xwe ve girêdan. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Îsraîl weke hêza kakil a hegemonîk ket dewreyê. Îsraîlê berê Cihûyên Kurd ên li Iraqê ji xwe re kir esas, lê berî damezrandina dewleta Îsraîlê, bi burokratên Tirk ên li Anatolyayê re xwe sipart Cihûyên Tirk ên Sabetayî ku ji wan re 'çerxkirî' dihat gotin, dewleteke netewe ya Tirkê Spî (dîktatoriya CHP'ê) weke Pro-Îsraîlê ava kir û weke vê, pêkhateyeke stratejîk a duyemîn xwe sipartî Kurdan (bi awayekî bingehîn PDK) plan kir û xwest pêk bîne. Bêguman em nikarin pêkhateya siyasî ya Kurdan bi tenê bi hesabên hegemonîk ên derve girê bidin. Li vir xusûsa em dixwazin diyar bikin ew e, tewazuna dewletên netewe li Rojhilata Navîn ji aliyê hêzên hegemonîk ên modernîteyê ve tê pîlankirin û bicihanîn. Weke ku tê îddîakirin, îradeya diyarker hêzên tebeqeya jor ên li hundir nînin. Jixwe gotina pêşengiya bûrjûwaziya mîllî bi temamî gotineke tewş û pûç e. Hinek hêmanên bûrjûwaya radîkal û bûrjûwaya piçûk bi rola pêşengiyê radibin û ev jî nayê wê maneyê ew hêza diyarker a sîstemê ne. Mînak lîderên mîna M. Kemal, Cemal Ebdulnasir û Saddam Huseyîn ên derketine holê îspat nake ku ew sîstema dewleta

netewe diyar dikin. Hemin ji sîstemê tê ku rola van kesayetan di avakirina dewleta netewe de berevajî û berepaşkî bike. Berepaşkî kiriye jî. Heta rola kesên mîna Lenîn û Stalîn ên xwestin sîstema dewleta netewe ya Rûsyayê, bi awayê sipartî sosyalîzmê ava bikin, tevî ku heftê sal di ser re derbasbûne jî jê tê vê rola wan berepaşkî bike. Mirov heman xusûsan dikare ji bo Çîna Mao jî diyar bike. Li vir xusûsa bi girîngî em dixwazin bînin ziman ew e, mirov heta ji her aliyî ve ji paradîgmaya modernîteya kapîtalîst nebihure, wê hêza bingehîn a diyarker her modernîte û hêzên hegemon bin.

Bi derengî be jî mirov hûnandin û avakirina kakila dewleta netewe ya Kurd bi tenê dikare di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de rast fêhm bike. Nexasim kakila dewleta netewe ya Kurd û Kurdistanê di nava hesabên hegemonîk ên Îsraîlê li herêmê de bi roleke gelekî girîng radibe. Çawa ku dewleta netewe ya Tirk li Anatolyayê di derketina holê ya Îsraîlê de bi rola pêşeng (Pro-Îsraîl) rabûye, dewleta netewe ya Kurd jî di warê hesabên hegemonîk ên Îsraîlê li ser Îran, Iraq, Sûrî û Tirkiyê de bi roleke gelekî girîng radibe. Hêzên ku Îsraîl damezrandin hê ji salên 1945'an ve destek dan avakirina PDK'ê û ji salên 1960'î ve di ser Tirkiyê re bi awayekî berbiçav destek danê, ev jî bi hesabên stratejîk û hegemonîk ên li herêmê ve girêdayî ye. Ji salên 1990'î ve Kurdên bi Gladîo'yê re ketin nav hev û li ser bingehê tesfiyekirina PKK'ê Dewleta Federe ya Kurd pêk anîn li derveyî van hesabên hegemonîk, stratejîk nînin. Jixwe bi awayekî yekgirtî bi ser PKK'ê de hatin û ev jî vê rastiyê gelekî baş rave dike. Di salên 2000'î de yek ji armancên herî girîng ên pêngava Duyemîn Şerê Kendavê bi awayekî mayînde li Iraqê avakirina kakilê dewleta netewe ya Kurd bû. Hêzên biryara vê dan û pêk anîn, heman hêz in ku di sedsala dawî de Kurdistan parçe kirin û timî di nava sînorên tevkujiyê de hiştin. Hesabên sîstemê pêdiviya xwe bi çi hebin an jî çi ferz bikin, ew têne kirin. Di roja me ya îro de, kakilê dewleta netewe ya Kurd ji bo sîstema kapîtalîst bi kêmanî bi qasî Îsraîlê hêmanek e ku hewcedarî pê heye; di nava tewazuna hêzan û dewletên netewe de xwedî roleke stratejîk e ku heta dawiyê dest jê nabe. Bi giştî ji bo ewlekariya sîstemê û pêdiviya bi petrolê, bi taybetî jî ji bo ewlekariya Îsraîlê û hegemonya wê, dest ji kakila dewleta netewe ya Kurd bernadin, ji bo bihêzkirina wê çi hewce bike, hewl didin bikin. Bi vî awayî xelekeke girîng a di salên 1920'î de hatibû plankirin li sîstemê tê zêdekirin. Ji bo destpêka sîstemê girîngiya dewleta netewe ya Tirkê Spî çi be, ji bo temamkirina wê jî girîngiya dewleta netewe ya Kurdê Spî ew e.

Di vê mijarê de ji bo ku ez pêşiyê li şaşfêhmkirinekê bigirim hinek xusûs hene divê bi girîngî bînim ziman. Ji ber ku dewletên netewe bi mentiqê sîstemê hatine avakirin, divê mirov ji aliyê gelan ve negihîje wê encamê ku ne girîng in an ji sedî sed dijmin in. Berevajî divê mirov dewletên netewe weke saziyên gelekî girîng bibîne, nakokî û têkiliyên wan bi bernameya civaka demokratîk re bi rêkûpêk bike. Bernameyên civaka demokratîk armanca wan ew nîne ku dewletên netewe hilweşînin û li şûna wan ew bibin dewlet. Ji dewletên netewe dipên ku di çarçoveya lihevkirina destûra bingehîn de ji projeyên civaka demokratîk re rêzê bigirin. Ji bo

jiyaneke hevpar a di nava aştiyê de şertê pêşî ew e, divê projeyên civaka demokratîk û pêkanîna wan weke mafekî bingehîn ê destûra bingehîn were qebûlkirin. Ew ê hebûnên hevdu nas bikin û bixwazin ku ev weke hukmekî destûra bingehîn bê qebûlkirin.

Eşkere ye ku Kurd û Kurdistanê li Rojhilata Navîn a salên 2000'î hem di tewazuna dewleta netewe û hem jî di tewazuna civaka demokratîk de weke realîteyeke bi tesîr û dînamîk cihê xwe girtine. Hevgirtina antî-Kurd a ku Komara Tirkiyê pêşengiya wê dike û bi Îran û Sûrî re xwe lê rakişandiye zêde şensê xwe yê serketinê tineye. Lewma bi hesabên sîstema kapîtalîst re li hev nake. Di bingehê hewldaneke bi vî rengî ya hevgirtinê de hevkartiyeke bê Kurd û bê Kurdistan bi sîstemê re heye. Lê nexasim êdî pêkan nîne ku Îsraîl û DYE nêzîkatiyeke bi vî rengî qebûl bikin. Ev hevkartiya emperyalîzmê ya bê Kurd û bê Kurdistan a di navbera salên 1920-2000'î de hat meşandin êdî polîtîkayeke bê meşandin nîne. Jixwe dewleta netewe ya Kurd bi hevgirtina Iraqê hat avakirin û di demeke nêz de îhtîmaleke xurt e ku ji aliyê Îran, Sûrî û Tirkiyê ve bê naskirin. Lê zehmetî ew e, di berdêla vê naskirinê de tesfiyekirina PKK û KCK'ê tê ferzkirin. Ev jî daxwazeke pûç e. Êdî çarenûsa Kurd û Kurdistanê hem rastiya civaka demokratîk a KCK'ê, hem jî rastiya dewleta netewe ya hevgirtina bûrjûwa Kurd di zikhev de û li ser bingehê lihevkirineke diyar a qanûnî, hewl bidin diyar bikin. Di dîroka modern a Rojhilata Navîn de cara pêşî ye ku erka civaka demokratîk û erka dewleta netewe bi hev re rol digirin. Nexasim li Iraq, Afganistan û Îsraîl-Filistînê, û heta li Tirkiyê şerên diqewimin û xetimîna rê li ber vedikin, ji bo Kurdan di wan de dersên girîng hene. Ji bo nebin xwedî rabihuriya xwînrij a dewletên netewe ku xwedî sînorên hişk bûn, wê sîstemeke dualî bikin bingehê xwe ango sîstemeke xwe disipêre KCK'ê ya pala xwe dide modernîteya demokratîk û xwe disipêre dewleta netewe ya Kurd a Iraqê ya pala xwe dide modernîteya kapîtalîst. Li ser vê sîstema dualî wê li hev bikin. Bi vî awayî ji dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî jî ders ê bê girtin. Kurd û Kurdistan ê ne bibin Îsraîla duyemîn, ne jî wê bibin weke dewletên din ên netewe. Wê bibe mekan û hêzên pêşeng ên senteza modernîteyeke nû ya ku ji pirsgirêkên sereke dibihure, ew pirsgirêkên ku hemû di navê de bi qirika hev digirin.

**F- LI ROJHILATA NAVÎN ŞERÊN MODERNÎTEYÊ û ENCAMÊN MUHTEMEL**

Divê mirov li şerên dused salên dawî yên li Rojhilata Navîn rast serwext bibe. Beriya her tiştî divê mirov ji bîr neke ku şerê diqewime di çarçoveya hegemonya şaristaniyê de nîne, di çarçoveya çandî de ye. Şerê dawî yê hegemonya şaristaniyê bi Ewrûpayê re ango bi Rojava re piştî Qanûnî Siltan Silêman ketiye pêvajoya li gorî Ewrûpayê bi encam bibe. Pêvajoya heta sedsala 19. hegemonya sîstema şaristaniya navendî li gorî kapîtalîzma Ewrûpaya Rojava bi encam bû. Hegemonya welatên Ewrûpayê bi sedsala 19. re bi awayekî fizîkî bar kirin herêmê û li hemberî wan hêzên li ber hegemonya desthilatdariyê rabin tinebûn, hêzên civakî yên nedixwestin çanda modernîteya kapîtalîst qebûl bikin hebûn. Împaratoriyên Osmanî û Îranê weke hegemonyayên desthilatdariyê, ji wan nedihat bi welatên Ewrûpayê re şer bikin. Hewl didan li ser piyan bimînin. Ev jî bi hesabên erzan ên tewazunên desthilatdariyê dikirin. Lê çanda civakî, bi awayekî ji gelek herêmên mêtingeh ên li dinyayê cudatir, li şûna çanda modern a Ewrûpayê yekser qebûl bike, bi giranî li ber xwe dida. Ji ber vê hêza çandî bû ku herêm bi temamî nedibû mêtingeh. Nexasim Îslamiyet weke çanda serdest a ji rêûresmê, di vê demê de dibû kirdara çalak a berxwedanê. Li vir nuqteya divê mirov baş ji hev derxe ew e, Îslama li ber xwe dide, ne Îslama dewletperest û desthilatgir e, Îslama çanda civakî ye. Tevgerên Îslamî yên siyasî hebûn, lê di berdêla berjewendiyên diyar de bi hêsanî xwe nêzî hevkartiyê dikirin. Îslama timî li ber xwe da û weke şîpeke har herikî, Îslama rêûresmî ya civakî bû. Ji ber vê, gelekî girîng e ku mirov Îslama desthilatgir a ji rêûresmê ya ji sedsala 19. ve li ser navê Îslamê heta roja me ya îro hat meşandin û Îslama civakparêz a ji rêûresmê ji hev derxe.

Pirsa divê were kirin ev e, gelo şerê di navbera Îslama çandî û modernîteya kapîtalîst de şerekî bi çi awayî ye. Li gorî ku li naverastê şerê desthilatdariyê yê du hêzên hegemonîk tineye, şer di navbera çanda modernîteya kapîtalîst û çanda Îslamî ya ji rêûresmê de ye. Bêhtir şerekî modernîteyan di warê civakî de heye. Dema li Rojhilata Navîn mesele çand be, divê mirov wê bi tenê bi Îslamê bi sînor neke. Pêwîst e ku mirov bi dînên din ên Brahîmî ango bi Cihûtî û Xiristiyantiyê jî temam bike, heta derdîn an li derveyî dînên yekxwedayî bandorên dînî yên Şaman-Pagan û laîk ên bi maske hebûna xwe dewam dikin tevlî vê bike û bi awayekî yekpare binirxîne.

Qada ku çanda bingehîn a mirovatiya hemdem pêk aniye erdnîgariya Rojhilata Navîn e. Eger em çanda mirov a Homo Sapiens jî li vê zêde bikin, mirov dikare texmîn bike ku ji serdemên beriya dîrokê û heta bi sedsala 19. bi qasî sêsed hezar salî hertim herêma çanda bingehîn a mirovatî pê rabûye ev herêm e. Ya rastî, çanda modernîteya kapîtalîst, çanda hegemonîk a dused salên dawiyê ye. Divê mirov ne li bendê be ku çandeke di dused salên dawiyê de bûye navend, di demeke kin de çandeke sêsed hezar salî asîmîle bike. Berevajî divê mirov li bendê be ku şerê çandî wê demeke dirêj dewam bike û çanda xwecihî ya herêmê bi hêsanî wê teslîm nebe, heta

wê xwe li şerê hegemonîk ê çandî rakişîne. Lewma şerên herêmî yên roja me ya îro gelekî zêde bûne, mirov dikare weke dema şerên hegemonîk ên çandî yên modernîteyê şîrove bike. Ji ber vê, gelekî girîng e ku mirov şerên li asta jor bi qada desthilatdariyê têne terîfkirin bi awayekî cuda şîrove bike. Lewma mirov rabe ji vî alî ve şerên li Rojhilata Navîn di çarçoveyeke teng de bi paradîgmaya şerê neteweyî û çînî yê Rojavayî û bi şerên desthilatdarî û dewletê yên Îslama nerm a siyasî binirxîne, têrê nake. Bêguman ev aliyên şer hene. Şerên di vê çarçoveyê de bêhtir qadên desthilatdarî û dewletê eleqedar dikin. Lê rengê şeran ê ji van aliyên desthilatdariyê hemûyan dibihure heye û ev rengê şer girîng e. Jixwe şerên di çarçoveya desthilatdarî û dewletê de çiqasî berfireh bin û çiqasî demdirêj bin, xwedî wê hêzê nînin ku derkevin derveyî desthilatdariya hegemonîk. Li beramberî vê, karekterê şerê di asta modernîteyê de cuda ye û xwediyê wî wesfî ye ku ji modernîteya serdest dibihure.

**1- Li Rojhilata Navîn Çarenûsa Modernîteya Kapîtalîst**

Li gorî gotina pêşiyan a "Her gîha li ser koka xwe hêşîn dibe" çarenûsa modernîteya kapîtalîst ku sîstema dawî ya şaristaniya navendî ye, tevî hemû fikaran, îhtîmaleke xurt e ku şerên li Rojhilata Navîn diyar bike. Tevî ku di roja me ya îro de modernîteya kapîtalîst serdest e jî kapîtalîzm bi eslê xwe di dîroka mirovatiyê de timî marjînal maye û weke jirêderketinê hatiye dîtin. Li dijî xeta sereke ya mirovatiyê ye. Ji diyalektîka gerdûnî ya xwezayê re jî çep dikeve, jê vediqete yan jî dijber e. Mezinbûna kapîtalîzmê di sedsala 16. de û avakirina wê ya hegemonya global hinekî jî dişibe 'Çîroka Çil Heramiyan'. Cografya Rojavayê Ewrûpayê û çandên komên li wir gelekî ji çemê sereke yê şaristaniyê veqatiyabûn, şerên mezhebî yên cîhana Îslamiyet û Xiristiyantiyê, êrîşên hilweşîner ên mîna Moxolan û cîhanên sergirtî yên xanedaniyên li Çînê dewam dikirin nebûna, kapîtalîzmê li Ewrûpaya Rojava nikarîbû firsend bidîta û gav biavêta hegemonyayê. Divê mirov ji bîr neke ku ev gavavêtina hegemonîk li ser xeteke mîna Amsterdam-Londonê li seriyê herî rojava yê ku lê sê cografyayên mezin digihîjin hev, li giravokekê (Girava Brîtanyayê) kesî nedipa pêk hat. Elîteke sermaye û desthilatdariyê ya piçûk ku mîna mişextî giravê hatibe kirin, ji bo ji aliyê împaratoriyên li parzemîna xwe neyên daqurtandin, ket nava şerekî manûnemanê û di vî şerî de bi ser ket.

Vê elîtê di vî şerî de sê sîlehên mezin ên hatibûn nûkirin, pêk anîn. Ji sedsala 16. heta bi sedsala 19. û heta bi nîvê sedsala 20. ev hersê sîleh bi awayekî serketî hatin pêkanîn. Ev hersê sîleh jî sê hemanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst bûn. Ango meyla kara herî zêde ya sermayeyê ku her diçû dewamî dibû, birêxistinkirina desthilatdariyê weke dewleta netewe û îndustriyalîzma bi gavavêtina ji manîfakturê ber bi şoreşa pîşesaziyê ve dest pê kirîbû. Dinya ku di van dused salên dawiyê de bi van hersê hêmanan hat fetihkirin, bi rastî dinyayeke gelekî xerîb û veqetiyayî ye. Hemin ev ne sîstemeke xwedayî ya ji ezmên hatî ye û nabe jî. Em li vir behsa cîhana hêzeke hegemonîk dikin ku di dîrokê de potansiyeleke jirêderketî û xweveşartî ye, di terk û qelşên pênc

hezar salî yê sîstema şaristaniya navendî de, di dehlîzên wê yên bi dizî de timî weke gunehkar hatiye dîtin, ji aliyê mirovatiyê ve weke 'Çil Heramiyan' hukim lê hatiye birrîn. Li Ewrûpayê xwe girt û global bû, ji ber ku hersê sîleh bi kar anîn kujer bûn. Bi awayekî îdeolojîk ji bo hukim li xweza û civakê bike cîhana zanistî pêk aniye, înkara polîtîkayê be jî cîhana dewletên netewe û cîhana îndustriyalîzm û kara herî zêde ya civak û hawîrdor daqurtandine, ava kiriye, di qonaxa dawî de jî bi temamî qedandin an jî îflasa civak, ferd û hawîrdorê îfade dike. Ji salên 1970'î ve kapîtalîzma fînansê ya mohra xwe li hegemonyayê xist bi temamî sîstemek e ku bi xweza û civakê re li hev nake. Bi hejmarên ferazî an parçeyên kaxizan dilîzin û di rojekê de bi trîlyonan Dolarî bi dest dixin, bi herhalî ev têra xwe îspat dike ku ev sîstem, sîstemeke welê ye ku çil carî zêdetir ji 'Çil Heremiyan' heramîtir, dizektir û hovtir (kuştina fizîkî û manewî) e.

Her kes pêxîrtengiya dawî weke pêxîrtengiya ji ber avabûn û strukturelîya kapîtalîzmê dinirxîne. Ya rastî hewce nake ku mirov bibêje pêxîrtengiya dawî jî. Ji ber ku kapîtalîzm bi xwe pêxîrtengiya herî kujer a sîstema şaristaniyê ye ku dewamî û domdar bûye. Di pêncsed salên dawî yên hukimraniya xwe de bi şerên îmha û qirkirinê, bi talanên xeternak ên mêtingeriyê, bi mêtinkariya kedê, bi hilweşandina hawîrdorê û di encamê de bi qedandina ferd û civakê ya rê li ber vekir, xisletên xwe yên sereke bi zêdehî nîşan daye. Bi tenê bîlançoya şerên dawî yên sedsalê ji bîlançoyên şerên di dîroka tevahiya mirovatiyê de qatbiqat zêdetir e. Dema mirov van bîlançoyan li ber çavan bigire, mirov bi hêsanî dikare îddîa bike ku ev ne bi tenê karekterê sîstemê yê pêxîrtengiyê, lê belê karekterê wê yê kanserojen ê ji bo hawîrdor û civaka mirov jî nîşan dide. Ji ber ku ev xisletên sîstemê li navenda wê ya sereke û navenda wê ya global ji zû ve derketine holê, mirov dikare fêhm bike ka çima sîstem li navenda çanda dîrokî ya mirovatiyê li Rojhilata Navîn evqasî tengav dibe. Di sedsala dawî de rêxistiniya dewleta netewe ji bo rizgarkirina modernîteya kapîtalîst têrê nake. Gelekî eşkere derketiye holê ku li Rojhilata Navîn dewletadariya netewe ya mînîmalîst amûrê tehekumê yê modernîteya kapîtalîst e. Demekê li herêmê maneya walîtiyên Împaratoriya Romayê çi be, dewletên netewe yên roja me ya îro xwedî heman maneyê ne. Belkî jî rola wan a hevkartiyê ji ya waliyên Romayê bêhtir e, ji rêûresmên çandî yên herêmê dûr in, dema nêzîk jî dibin bi temamî di rewşeke nakok de ne. Hêmanên modernîteya kapîtalîst îndustriyalîzm û kara herî zêde, ne di wê rewşê de ne ku di çanda herêmê de karibin kûr bibin. Amûra wan a herî zêde bi kar tînin ango dewleta netewe weke li gelemperiya dinyayê li herêmê jî bi lez diferike, diheze. Amûra wan dewleta netewe di warê dewamkirina pêxîrtengiya heyî de bi kêr nayê. Hebûna dewletên netewe her ku diçe pêxîrtengiya heyî kûrtir dike.

Eger em rewşa dawî ya dewleta netewe li herêmê û li hemberî bûyerên muhtemel e biqewimin heyîna wê binirxînin, em ê karibin weha bibêjin:

**a-** Dewletdariya netewe ya Ereb, ji zû ve ji aliyê gelên xwe ve jî bûne nakokiya sereke ya ji wan hêrs bibin. Ji wan, dewleta Iraqê weke ya herî bi hêz xuya dikir, di rewşa heyî de ew bûye goristana dewletdariya netewe. Li şûna dewleta netewe ya xira bûye ya nû nayê avakirin û heye ku dabeşî sê dewletên netewe yên nû bibe û ev jî wê ne ku pirsgirêkan çareser bike, berevajî wê bêhtir giran bike û şer jî wê bigihin asta qirkirinê. Dewletdariya netewe ya Ereb-Şîî, Ereb-Sunnî û Kurd bi herhalî wê di sedsala 21'ê de li sahneyên herî xwînrij şahidiyê bikin. Dema mirov li rewşa heyî binêre û bi tevkujiya Helebçeyê ya di rabihuriya nêz de û tevkujiyên din ên mezhebî û etnîk hemûyan re bide ber hev, wê xeternakiya şerên dewletdariya netewe yên siberojê baştir bê fêhmkirin. Niha û siberojek heye ku gelekî dişibe bajarên dewlet ên di dema Sumeran de hev tine dikirin. Ez bawer dikim ku wê ne şaş be, mirov bibêje, ji Fasê heta bi Yemenê, ji Sûdanê heta bi Sûriyê û heta heta bi Libnanê wê rewşa heyî ya dewletên netewe yên Ereb hemûyan di siberojeke nêz de ji Iraqê ne cuda be. Bi awayê xuya dike, li dijî Îsraîlê şer dikin, lê bi rastî û bi awayekî berbiçav di rewşeke hevkar de ne ku hebûna Îsraîlê li ser piyan digirin. Ango hebûna wan bi hegemonya Îsraîlê mumkîn dibe. Belkî herî zêde dewletên netewe yên Ereb hewcedarî Îsraîlê ne.

Di cîhana Ereb de weke mîlliyetgiriyê Îslama siyasî, ji mîlliyetgiriya laîk û dewleta wê ya netewe bêhtir bi problem e. Ev mîlliyetgiriya ku xwe disipêre îstîsmarkirina Îslama çandî bi tenê dikare bi rola tevgera faşîst a dereng rabe. Çawa ku bi mînaka El Qaîdeyê jî hat dîtin, ji rêxistineke provakasyonê ya ku dewletên netewe wê timî weke paravan bi kar tînin, wêdetir naçin û ev jî hatiye îspatkirin. Çi yên berê bin û çi jî yên ji nû ve dixwazin ava bikin bin, dewletgiriya netewe ya Ereb li ser jiyana civakî û li hemberî rêûresma Îslamî ji rola kefenfiroşiyê wêdetir bi roleke din ranabe, û wê nikaribe rabe jî. Hêmanên din ên kapîtalîzmê saziyên îndustriyalîzmê û kara herî zêde jî rewşa wan ji dewletgiriya netewe baştir nîne. Îndustriyalîzm û kara ku xwe disipêrin petrolê û avakirina xaniyan çavkaniyên herî mezin ên bi problem ên paşerojê ne. Dema petrol biqede, bi hebûna bajarên mîna girêkan mezin dibin, dibe ku dema nêz a siberojê ji bo Ereban bibe mîna mehşereke bi rastî.

**b-** Dewletokên netewe yên Tirk bi şêweyên avabûna xwe ya mînîmalîst, çi ji aliyê DYE-YE ve bêne meşandin çi ji aliyê Rûsyayê ve, wê ti carî nikaribin bi rola berê ya desthilatdarî û dewletên bi koka xwe Tirk rabin û wê ji statuya eyaleteke sîstema pêve ne, wêdetir nikaribin biçin. Jixwe li gorî pêdiviyên herêmî yên hegemonyayên kapîtalîst û sosyalîzma pêkhatî hatine koordînekirin. Ji bo barê rabihuriyê yê bûye asteng ji holê rakin û ji bo pêşî li serîrakirina gel bigirin hatine wezîfedarkirin. Mirov dema li nod sal rabihuriya wan binêre, mirov ê bi hêsanî karibe bibêje, bi vê rola xwe rabûne. Mîna ku ji bo rola Tirkan a di hezar salên dawî de pê rabûne berepaş bikin hatine erkdarkirin. Tevahiya wan jî xwe li rola mînîmalîzebûnê, xwe li nava xwe digirin. Mîna ku ti berpirsiyariya wan ji bo çanda herêmê û gelên wan tinebe tevdigerin, heta li hemberî hev jî bi roleke erênî ranabin. Ev rewşa wan bi zêhniyet û jiyana dewletgir û mîlliyetgir a teng ku hînê wê

bûne, têkildar e. Bi vî halê xwe yê heyî, ew nikarin bibin siya wê rabihuriya gelekî rexne dikin an jî carinan dilê xwe dibijîninê jî. Di paşeroja nêz de ew dewleta netewe ye ku divê herî zêde reforme bibe.

Lê di van demên dawiyê de modela weke senteza Îslama Tirk dixin sahneyê, ji reformê zêdetir weke pêdiviya sîstema hegemonîk a bi qereqoleke pêş bi gewde dibe. Ji aliyê naverokê ve xwe venaguherînin di lihevrekişandina wan li efendiyên wan de şensê wan kêm e ku para xwe bigirin. Mîna Ereban in, hemû kom bibin bi qasî Îsraîlekê nakin û ji bilî girêdana bi hegemonya Îsraîlê ti şensê wan tineye. Çawa ku heyîna wan bi şertên derketina holê ya Îsraîlê ve girêdayî bû, di dema xwe ya dawî de jî çarenûsa wan bi hebûna Îsraîlê diyar bibe. Lê eger ji qalibên jiyanê û zêhniyetên xwe yên heyî nebihurin. Hêmanên din ên modernîteya kapîtalîst di nava xwe de jî zêde hêviyê bi mirovan re çênakin. Li Komara Tirkiyê nexasim îndustriyalîzma li ser petrol, gaz û hinek madenan tevî turîzm, otomobîl û tekstîlê hatiye avakirin, ji niha ve erdên mirov li ser wan dimînin kiriye mîna goristanê. Kara herî zêde ya çavkorî ekolojî û çanda dîrokî ya tejaneya Firat-Dîcleyê tine dike û hewl dide aqûbeta gelê Kurd ê li vê qadê dimîne bike mîna ya gelên Ermenî û Suryanî. Dewleta netewe ya Tirk yeqîn dike ku bi qirkirina dawî ya Kurdan wê ‘bi welat û milletê xwe yê yekparebûyî’ heta hetayê weke dewleteke netewe bimîne. Eşkere ye ku modernîte û dewletgiriya netewe ya Tirk (eger paradîgma xwe neguhere) di paşeroja nêz de, di serî de gelên Kurd û Tirk, wê ji bo gelên herêmê û çandên civakî ji kefenfiroşî û gorkolanê wêdetir bi roleke din ranebe.

**c-** Rewşa Îranê û dewletên netewe yên din bêhtir bi pirsgirêk e. Jixwe dewletdariya netewe ya Afganistan û Pakistanê bi awayekî xeternak ketine pêxîrtengiyê. Şerên sedsala dawî yên dewleta netewe belkî jî felaketeke ji bombeya atomê mezintir bi serê van gelan û çandan de aniye. Gelên behsa wan têne kirin, bi komplo, hilweşîn û reşkujiyên ti carî di dîroka xwe de nedîtine rûbirû dibin. Îran her kêlî dibe ku bi felaketa atomê re rûbirû bibe. Çanda Îranê ji serî ve di serî de çanda dewleta netewe bi modernîteya kapîtalîst re pev diçe. Li dijî hêmanên têne ferzkirin hemûyan li ber xwe dide. Şîatiya weke diyardeyeke bêhtir herêmî û dîrokî tê ferzkirin, ji niha ve ji aliyê gelên Îranê ve hatiye fêhmkirin ku mîlliyetgirî ye, çêkirineke modernîteya kapîtalîst e, û bi vê maskeyê Şoreşa Îslamî ya Îranê tê pûçkirin, lewma li ber wê radibin. Bûyerên li Afganistan û Pakistanê diqewimin jî cuda nînin. Tevî cambaziyên Hîzbullah, El Qaîde û Talîbanan jî ser rastiyê nayê girtin. Divê mirov ji bîr neke ku ev hersê saziyên bi maske jî ango Hîzbullah, El Qaîde û Talîban ji aliyê dewletên netewe yên xulam ve hatine damezrandin û niha jî li dijî efendiyên xwe yên hegemonîk DYE û Yekîtiya Ewrûpayê weke amûrên şantajê têne bikaranîn da ku ev dewletên netewe yên xulam karibin bêhtir parê bigirin. Ango ev amûrên tevkujî, reşkujî û komployan bi hev re ava kirine da ku pê hevdu terbiye bikin û ji bo ku para xwe bêhtir bikin li dijî hevdu bi kar tînin. Belkî jî di dîrokê de amûrên evqasî kirêt ên lîstikên komployan nehatine vedîtin. Bi van amûrên lîstikê yên komploger mîna bi darqîtik û pelê bilîzin, gel û çandên wan

kuştin. Eşkere ye ku bi van amûran ne li Rojhilata Navîn êdî lingê sîstemê cih digirin, ne jî dewletên netewe yên hevkarên wê ne, diedilin û îfleh dibin. Nexasim Îran, rêûresma xwe ya dewletê ku gelekî kevn e, bi kar tîne û xwedêgiravî yeqîn dike ku wê bi modernîteya kapîtalîst karibe, ya rastî îmajeke wisa dide û li bendê ye ku ji aliyê sîstemê ve bê qebûlkirin. Bi vî awayî bikaranîna dîrokê, bi herhalî şêweyekî têkçûnê yê herî çavkorî ye. Tevlîhevkirina modernîteyê evqasî bi rêûresma dîrokî û rêûresmê jî evqasî bi modernîteyê re bi herhalî mirov bi tenê dikare bi 'xasûkiya Ecem' rave bike. Ji ber van sedeman, heye ku paşeroja nêz a Rojhilata Navîn di ser Îranê re bi gewde bibe û şikil bigire. Bi rastî Îran di navenda sereke ya guftûgoyên modernîteyê de ye. Mîlliyetgiriya Şîa çiqasî berevajî bike jî guftûgoya îdeolojîk û polîtîk a li ser modernîteyê her biçe wê mezin bibe û dewam bike. Gelên Îranê modernîteya kapîtalîst ji gelên din bêhtir nas dikin û bi biryar xuya dikin ku stûyê xwe li ber wê xwar nekin. Mîlliyetgiriya Şîa ya heyî çiqasî antî-Îsraîlî, antî-Emerîkanî û antî-Rojavayîtiya sexte bike bila bike, bi awayekî demdirêj gelên Îranê wê li modernîteya li gorî xwe bigerin û ew ê nikaribe pêşiyê li vê lêgerîna wan bigire. Heta bi DYE û Îsraîlê re li hev bike jî wê nikaribe vê helwesta xwe ya bi maske veşêre. Di çanda Îranê de gera li heqîqetê bi hêz e. Herweha li Îranê rêûresmeke jiyana komî ya bi qasî dîrokê kevin heye. Lewma di paşeroja nêz a Îranê de heye ku em şerekî rastî yê modernîteyê bibînin. Ya rastî, Şoreşa Îslamî ya 1979'an şerekî modernîteyê bû, lê çeloxwarî kirin, ji rê derxistin. Gelên Îranê bi dersên ji vê şoreşê û demên dîrokê derxin, di paşeroja nêz de ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn bi şerên modernîteyê ku karibin rê li ber serdemeke nû vekin, bibin sedema bûyerên hêjayî dîroka xwe, hêjayî dîroka Rojhilata Navîn. Ji ber vê, guftûgoyên li ser modernîteya demokratîk û ezmûnên wê yên pratîk gelekî girîng in, û rênîşaner in.

**2- Di Pêxîrtengiya Rojhilata Navîn De Çareseriya Modernîteya Demokratîk**

Diyardeyên civakî nerm in. Di nava yên pirr pêxîrtengî de jî timî îhtîmalên çareseriyê yên pirralî hene. Pirs ew e, tesewirên çareserî xwe disipêrin wan têkiliya wan bi heqîqeta civakî re hene. Diyardeyên civakî mîna diyardeyeke fizîkî yan jî diyardeyeke kîmyawî bi qanûnan nayên pîvan û bi wan ve nayên girêdan. Ferdê xwedî heqîqet ji aliyê civaka xwe ve tê diyarkirin. Mirov nikare li ti ferd yan jî xwediyê heqîqetê serwext bibe heke mirov civakîbûna ew pêve girêdayî ji nedîtî ve were. Ji ber vê, herçiqasî sosyolojî zanista herî dereng bi pêş ketiye jî dîsa di serê wan zanistan de tê timûtim pêdiviya xwe bi xurtkirin û gihiştinê dibîne. Mirov heta civakan fêhm neke, der barê pirsgirêkên wan de nikare xwe bigihîne çareseriyên para wan a heqîqetê zêde. Ji bo mirov pêxîrtengiyên civakî jî fêhm bike, hê bêhtir pêdivî bi têgihiştina civakan a heqîqetê heye. Di kêliyên pêxîrtengiyê de civak ji hev de dikevin ango di van kêliyan de heqîqetên wan vediguherin. Pêxîrtengî bi agahiyên berê yên der barê civakê de – û bi pirranî ev agahî mîtolojîk, dînî û hozanî ne –ji hev nayê derxistin. Ji ber ku ji hev nayê derxistin, alternatîfên di çareseriyê de para wan zêde jî dernakevin holê. Di encamê de çiqasî heqîqetê bigire nava xwe wê ewqasî jî para çareseriyê diyar bike. Bi gotineke din, di çalakiya civakî de tişta serketinê diyar dike, hêza

heqîqetê ya wî tiştî ye. Heqîqet bi xwe jî di diyardeya civakê de para hêzên jiyanê û maneya wan îfade dike. Îfadeyên para wan a heqîqetê zêde jî li gorî temsîla hêza jiyanê û maneya wê ya di nava diyardeya civakê de diyar dibe.

Modernîteya kapîtalîst Rojhilata Navîn fetih kir û li gorî tehlîla dawî, ev ji serdestiya heqîqeta wê ya civakî li hemberî civakbûna Rojhilata Navîn e. Civaka Rojhilata Navîn li hemberî modernîteya kapîtalîst bûye civaka ji rêûresmê, lewma li hemberî heqîqetên modernîteyê êdî ti şensê nûnerên heqîqeta vê çandê yê serketinê pêkan nîne. Bi kurtî, li hemberî heqîqeta Rojava heqîqeta Rojhilat lawaz bû û neçarî têkçûnê bû. Mirov nikare têkçûnê bike malê tevahiya civakê. Yên têkçûn xwediyên fermî yên heqîqetê bûn ango desthilatdar û dewletdar bûn. Ji ber ku heqîqeta serdest heqîqeta wan temsîl dikir. Têkçûn di tevahiya jêrsazî û jorsaziyên sîstema dewletê de bû. Eger ên têkçûn di asta manûnemanê de li ber xwe nedin, temsîla heqîqeta nû êdî wê girêdayî hêza hegemonîk be. Ew êdî nikarin zêhniyeta civaka xwe û îradeya wê ya jiyanê diyar bikin. Ew êdî weke saziyên ajan û hevkarên hêzên hegemonîk di berdêla misogerkirina jiyana xwe de tenê dikarin xizmetê bikin û bi vê berpirsiyar in. Lê mîna gewdeyekî bêserî mayî gewdeyekî civakî li naverastê di cihê xwe de diperpite. Çawa ku me qala wê kir, bi vê perpitînê re yan wê birize, ji hev de bikeve di nava civakbûn û desthilatdariya nû ya modernîteyê de bihele tine bibe, yan jî wê ji ber karektera xwe ya nerm, bi gewdeyê xwe yê teslîm nabe wê bi zêhniyeteke azad xwe bigihîne biryara jiyaneke azad ango ji pêxîrtengiyê bi zêhniyeteke bêhtir azad derkeve û gav biavêje. Bêguman bi pêşengiya vê zêhniyeta nû gavavêtin, bi para heqîqeta wê ya nû ve girêdayî ye. Li şûna felsefe, huner, îdeolojî, zanist û hilberîna ekonomîk a fetha modernîteya kapîtalîst mumkîn kiriye, zanist, felsefe, huner, îdeolojî û ekonomiyeke hilberînê ya nû wê serketina vê gavavêtinê diyar bike. Ev jî tê maneya modernîteyeke nû. Ji civakeke rêûresmê ya têkçûyî gavavêtina ber bi civakeke diçe serketinê ango bi modernîteyeke alternatîf a ji modernîteya kapîtalîst dibihure rizgarbûna ji pêxîrtengiyê bi awayekî serketî pêk tê.

Civaka sosyalîzma pêkhatî bi sedema ku nikarîbû xwe bike modernîteyeke cuda ji hev de ket. Ji hersê hêmanên modernîteya kapîtalîst nebihurî. Jêbihurîn li aliyekî, kapîtalîzma burokratîk û hersê hêmanên wê zêde bi kar anîn. Di encamê de para heqîqetê ya avahiyên civakî yên ku wê çêkiribûn li hemberî para heqîqetê ya modernîteya kapîtalîst lîberal lawaz man, lewma têkçûn û ji hev de ketin. Li vir kapîtalîzma burokratîk li beramberî kapîtalîzma lîberal têk diçe. Kapîtalîzma burokratîk ne bi tenê nikarîbû xwe weke modernîteyeke cuda dîzayn bike, herwisa nikarîbû ji modernîteya kapîtalîst a lîberal bibihure û xwe weke modernîteyeke nû ya kapîtalîst pêk bîne. Tevgerên Îslamî yên dewletgir û desthilatgir ku mirov dikare wan weke tevgerên jirêderketî bi nav bike, bi para xwe ya heqîqetê ya paşvemayî ji sosyalîzma pêkhatî bêhtir îdeolojîk bûn, lê dîsa jî diyardeyên çeloxwarî bûn û ji têkçûnê rizgar nabin. Avahiyên civakî û îdeolojîk ên bêhtir li Misrê li Zanîngeha El Ezherê bi rêûresma Sunnî, li medreseyên li bajarê Qûmê yê Îranê bi rêûresma Şîa xwe modern nîşan didin, bi para xwe ya heqîqetê nêzî berniga modernîteya

kapîtalîst a lîberal jî nabin. Tevî ewqasî hewldan û berxwedanên wan, li dijî Îsraîlê ku kakilê hegemonîk ê modernîteya kapîtalîst a Rojava ye, hemû bibin yek jî dîsa dawiya wan bivênevê wê têkçûn be. Sedema vê jî ne sîlehên nukleer ên Îsraîlê ne û ne jî serdestiya wê ya teknolojîk e; li gorî tehlîla dawî, ji ber para wê ya heqîqetê ye. Para heqîqetê ya Îsraîlê bi rêxistin kiriye, qatbiqat ji ya yên li hemberî wê zêdetir e. Herçiqasî mirov guman nake ku ew dixwazin xwe weke cîhaneke cuda nîşan bidin jî lê ji bo cîhaneke cuda kengî bi para xwe ya heqîqetê ji cîhana modern a kapîtalîzmê bihurîn hingê wê karibin îdea temsîlê ya jiyaneke ango modernîteyeke civakî ya para wê ya heqîqetê zêdetir bikin. Eger ev nebe, îdeaya modernîteyeke cuda ji îdeayeke pûç wêdetir naçe. Eger bibe jî wê bibe varyanteke rêûresmê ya maskeya modern daye ber rûyê xwe. Bi kurtî, rêûresma çandî ya Îslamî weke modernîteyeke cuda nîşandan, ji mijûliya qelpezanên ji berhemên kevin berhemên qelp çêdikirin û diforitin wê cuda nebe. Nexasim roja me ya îro îdeaya desthilatdariya fermî ya Îranê di warê modernîteyê de bi rewşa heyî ji qelpezaniyê wêdetir maneyeke xwe nîne û şensê jiyanê nade.

Modernîteya demokratîk a ku me di parêznameya Îmraliyê de hewl da guftûgo bikin, li ber rohniya van rexneyan em dikarin bêhtir rast terîf bikin. Serê pêşî divê rexneya modernîteya demokratîk a sosyalîzma pêkhatî rast were fêhmkirin. Ev rexne ne redkirina sosyalîzmê ne, ne jî qebûlkirina wê bi awayekî dogmatîk in. Weke ezmûnekê ji hev derdixe û heqîqeta wê ya modernîteyê ya antî-kapîtalîst bi awayekî cewherî qebûl dike. Bi awayekî teorîk û pratîk antî-modernîzma sosyalîzma pêkhatî dinirxîne, ji şaşiyên wê dibihure û rastiyên wê bi awayekî cewherî qebûl dike. Çanda ji rêûresmê ya Rojhilata Navîn bi awayekî zanistî analîz dike û heqîqeta di wê de weke çavkaniya herî girîng rojane dike. Modernîteya demokratîk bi tenê utopyayeke der bar paşerojê de nîne. Pala xwe dide çandeke ji rêûresmê ya hezarê salan. Rastiya rojane ya vê çandê civaka heyî bi xwe ye. Ev civak çiqasî bêçare û bêçareserî hatibe hiştin jî dîsa rastiyek e. Ji ber ku rastî ye jî pareke wê ya girîng a heqîqetê heye. Analîzkirina wê, vê parê îfade bike. Divê mirov rêûresmê bi muhafezekariyê re tevlîhev neke. Muhafezekarî rêûresma civakê bi xwe nîne; ya rastî, nûneriya rêûresma serdest e, ya ku li hemberî lîberalîzmê hewl dide xwe bigire û têkçûyî ye. Modernîteya demokratîk a pala xwe nede rêûresmê, mirov nikare weke modernîteya demokratîk behsa wê bike. Rêûresma civakî rastiya dîrokî ya modernîteya demokratîk e. Çawa ku civaka bêdîrok nabe, modernîteya demokratîk a bêdîrok jî nabe.

Divê mirov rexneyên tevgerên ekolojîst û femînîst li modernîteya kapîtalîst girîng bibîne. Ekolojî jixwe weke zanista hawîrdorê ya bûye qurbana îndustriyalîzmê antî-kapîtalîst e; yek ji çavkaniyên bingehîn ên modernîteya demokratîk e ku dest jê nabe. Gavavêtina Femînîzmê tevî hemû kêmûkurtiyên xwe, bi qasî ku alîkariya heqîqeta jinê kiriye, hêja û bi nirx e. Modernîteya demokratîk bi xwe jî rastiya jinê analîz dike û xwe dike heqîqet. Tevî vê yekê, ji bo ku rexneya

femînîst û tevgera wê bike parçeyekî xwe yê dest jê nabe xwe nêzîkê wê dike. Belkî mirov bibêje parçe rast nîne; jina azad weke kirdara sereke ya jiyanê tevlî sîstema xwe dike.

Di çarçoveya şer û guftûgoyên modernîteyê de hêsan dibe ku mirov pêşbîniya çarenûsa modernîteya kapîtalîst di çanda Rojhilata Navîn de bike. Di tevahiya hewldanên me yên analîzê de xuya dibe ku ev çarenûs ê bi xwe diyar nebe. Kengî bi tesewira modernîteya alternatîf a îdeaya wê ya heqîqetê ji wê bi hêztir hebe wê karibe jê bibihure. Mirov vê jî bi rexneyên modernîteya demokratîk li hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst, bi rexneyên tevgerên femînîst, ekolojîst, çanda ji rêûresmê û sosyalîzma pêkhatî yên li wê kirin û nikarîbûn ji wê bibihurin, bikin yek û bi vî awayî mirov dikare hêza çareseriyê ya hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk nîşan bide. Mirov li gotinên di vê mijarê de hatine gotin hemûyan di çarçoveya rizgarbûna ji pêxîrtengiya civakî ya Rojhilata Navîn de bifikire, mirov ê karibe pêşbîniya çareseriya muhtemel bike.

**a-** Teoriya neteweya demokratîk hêmana sereke ya çareserker a modernîteya demokratîk e. Ji bilî teoriya neteweya demokratîk teoriyeke din nîne li dijî teoriya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst civaka mirovatiya gerdûnî mîna serjêkeran hûrûhûrî kirî, civakê ji nû ve bigihîne hev û di nava azadiyê de li cem hev bigire. Teoriyên din ên civakî li hemberî pirsgirêkên roja me ya îro ji roleke marjînal pêve nikarin bi roleke din rabin û maneyekê îfade bikin. Teoriyên lîberal ên kapîtalîst, li şûna ku nexweşiyên kanserolojîk ên ku kapîtalîzmê li serê mirovatiyê dewamî kirine çareser bike û civakê bigihîne tenduristiya wê, bi tenê bi dayîna hinek dermanan temenê nexweşê kansêrî piçekî din dikarin dirêj bikin. Bi tevahî çareseriyên ev teorî pêşniyar dikin, pirsgirêkan mîna çiyan mezin dikin û bi vî awayî temenê modernîteya kapîtalîst hinekî din dirêj dikin. Bûyerên di sedsala dawî ya Rojhilata Navîn de diqewimin, vî hukmê em didin piştrast dikin. Civaka Rojhilata Navîn tevahiya dîrokê, heta beriya bi deh hezar salan di nava yekparebûneke çandî de jiyanek ava kir û di nava agirê Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, ev jiyan ji aliyê hêzên modernîteya kapîtalîst ve bi awayê qesabekî hat hûrkirin û ji însafa cinawirên bi navê dewleta netewe re hat hiştin. Dewletên netewe bi awayekî herî berbiçav rewşa Levîethan îfade dikin ku di Pirtûka Pîroz de dewlet bi Levîethan re wekhev tê dîtin. Îcar ev dewleta netewe ya weke Levîathan tê dîtin bi derewên ji wan re polîtîka derve û hundir tê gotin rastiyan parçe dike û dadiqurtîne, ji vê jî wêdetir bi roleke din ranabe. Çanda civakî ya ketiye ser hev û ji aliyê dîrokî ve yekparebûneke mezin îfade dike, dabeşî parçeyan dikin, li ser maseya înkar û îmhayê radixin û ji vê re jî civaka neteweyî ya modern dibêjin. Çanda dîrokî û civakî çiqasî parçe kirin û bi vî awayî înkar û îmha kirin, xwe ewqasî serketî hesibandin. Dewletên netewe yên bi rola qesabên modernîteya kapîtalîst rabûn, çiqasî karîbûn îmha û înkara rabihuriyê bikin û li şûnê saziyên ajan ên sîstemê û zêhniyetên oryantalîst serwer bikin, xwe li hemberî efendiyên xwe ewqasî serketî û bextewar hesibandin. Ji aliyê çanda Rojhilata Navîn ve di sedsala dawî de dabeşbûnên dewleta netewe û pêkanînên ji wan re polîtîka derve û hundir

dihat gotin bi awayekî giştî tevgerên qirkirinê ne. Ji zêhniyetê heta bi cîhanên ekonomîk tişta hatiye kirin ew e, yekparebûna rastiyê hatiye parçekirin û xistine rewşekê ku hêmanên modernîteya kapîtalîst karibin wan bixwin û daqurtînin. Bi tenê ji bûyerên îro roj li Iraqê diqewimin em dikarin gelek tiştan hîn bibin û bi hêsanî em dikarin pê sedsala dawî binirxînin.

Teoriya neteweya demokratîk, beriya her tiştî hûnandina cîhana zêhnî ya rawestandina bi vî şêwazê qesab parçekirin û gurandina yekparebûna çandî ye ango hûnandina cîhana zêhnî ya rawestandina dewleta netewe û ji nû ve destpêkirina yekparebûnê ye. Teoriya neteweya demokratîk hewl dide cîhana çandî ya Rojhilata Navîn li bin têgîna Yekîtiya Neteweya Demokratîk yekpare bike û weke prensîb vê li pêş digire û bi nirx dibîne. Cîhana me ya çandî tevahiya serdemên dîrokê yên di wan de hat avakirin, bi tevahiya cihêrengiya xwe yekpare bû; divê ew weke alternatîfa modernîteya kapîtalîst, li bin vê têgînê were yekparekirin. Em li sedsala dawî binêrin: Rewş her ber bi parçebûnê ve beridiye. Qewmê Ereb bi tenê dabeşî bîstûdu dewletên netewe nebûye; her yek ji wan weke pro-dewleta netewe misêwa dabeşî bi sedan zêhniyetên bi hev re nakok, rêxistin, eşîr û mezhebên bi hev re dijber bûye. Armanca felsefeya lîberal jî di çarçoveya mêtingeriyê de ev e. Ferdperestiya kapîtalîst ji bo civakê atomîze bike xwedî potansiyeleke bêdawî ye. Lewma teoriya neteweya demokratîk li ser riya diçe ji nû ve yekparebûna demokratîk û azad, yekparetiya bingehîn a prensîbî îfade dike.

Ji ber ku me teoriya neteweya demokratîk di cildên din de analîz kiribû em ê li vir zêde li ser naveroka wê ranewestin. Bi kurtî, li gorî vê teoriyê ji bo netewebûyînê pêdivî bi têgihiştineke hişk a sînor nîne, li heman mekanan û heta li bajaran neteweyên cuda di nava yekparebûnên cihêreng de dikarin xwe bi têgihiştina neteweyekî bi jorkomên neteweyan ava bikin. Bi vî awayî komên neteweyî yên mezin û komên neteweyî yên piçûk ên ji bo sînoran şer dikin wê tevî hindikayiyan karibin di nava yekparebûneke neteweyî de bi awayekî wekhev, azad û demokratîk bimînin. Kengî bi tenê ev prensîb hat bicihanîn polîtîkayên sîstema hegemonîk ên ‘parçe bike-bi rêve bibe’ û ‘kîvroşk bazde, tajî bigire’ wê pûç bibin. Ev prensîb di warê bicihanîna aştiyê, wekheviyê û demokratîzekirinê de xwedî nirxekî ye, û kengî bi van aliyên xwe hat bicihanîn pêkanînên dewleta netewe yên gelac, şerûd, koleker, tebeqeker û despotîk faşîst wê pûç bike, bi vî awayî jî wê di warê çareseriyê de rola xwe ya serdest îspat bike. Mirov bi tenê dikare bi zêhniyeta neteweya demokratîk mîlliyetgiriya dewleta netewe ya tekperest û mutleqker rawestîne. Ne bi tenê dabeşbûn û parçebûnên bêdawî yên Ereban, ji bo ku parçebûn û dabeşbûnên bi heman rengî yên Tirkan jî bêne rawestandin prensîb û teoriya herî di cih de ye. Ji Balkanan heta bi Qafqasan, ji Asya Navîn heta bi Rojhilata Navîn Tirkên li gelek deverên dinyayê bi awayekî dabeşbûyî, parçebûyî û çavkorî li pey xwedayê dewleta netewe diçin, li ser bingehê zêhniyetên metafizîk û pozîtîvîst ên oryantalîst pev diçin, dikevin qirika hev, lê karin bi teoriya neteweya demokratîk ji van bibihurin û li ser prensîbên wekhevî, azadî û demokrasiyê bigihîjin hev. Potansiyela Îranê heye her kêlî parçe û dabeş bibe, lewma dewleta netewe ji bo wê weke

bombeyeke atomê ye ku di binê wê de hatiye danîn. Mîlliyetgiriya Şîa bi awayekî domdar dewletdariya netewe dijwartir dike û tevî cambaziyên wê yên modernîteyê hemûyan jî ev yek ê parçebûn û dabeşbûna Îranê ranewestîne, berevajî wê bêhtir bi lez bike. Teoriya neteweya demokratîk nexasim ji bo Îranê weke derman e ku divê rojane were bikaranîn. Çanda Îranê û gelê wê li dijî modernîteya kapîtalîst berxwedêr in, û bi tenê bi zêhniyeta neteweya demokratîk dikarin bigihîjin cîhana azadî, wekhevî û demokratîk a bi hesreta wê ne. Bi teoriya neteweya demokratîk Îran dikare reşkujî û komployên dewleta netewe yên bi hev didin şerkirin pûç bike û bigihîje aştiyeke bi rûmet.

Di roja me ya îro de yek ji felaketên herî mezin di warê asêmayîna dewleta netewe de li ser xeta Afganistan-Pakistanê pêk tê. Herweha bi vê ve girêdayî pirsgirêka Keşmîrê jî bi temamî ji ber dewletgiriya netewe ye. Pirsgirêkên Pakistan-Hindistanê, Pakistan-Bangladeşê ji ber heman zêhniyeta mîlliyetgir pêk hatine, hê jî pêk tên. Çareserî û aştiyên dewleta netewe li gorî xwezaya wê rê li ber şer û çaresernebûnê vedikin. Ev mînakên berbiçav jî vê rastiyê têra xwe rave dikin. Li Afganistanê xwestin modelên dewleta netewe yên hem komarger, hem monarşîk, hem jî sosyalîzma pêkhatî pêk bînin. Di encamê de civakeke Afganistanê ya jihevdeketî û nikare xwe dewam bike di nava şîddeta çavkorî ya ti prensîba wê nîne û çavsorbûyî de heye. Ji bilî têgîn û teoriya neteweya demokratîk ti zêhniyet û îrade nîne ku van koman ji nû ve bi rêkûpêk bike û bigihîne azadî û jiyaneke demokratîk. Pirsgirêkên civakî heta bi awayekî zêhnî ji hev neyên derxistin, bi awayê avabûnê çareser nabin. Zêhniyeta neteweya demokratîk ji Asya Navîn heta bi Hindistanê ji bo gel û çandên gelekî cihêreng çarçoveya yekparebûnê ya herî baş pêk tîne. Jixwe gel û çandên li van mekanan tevahiya dîrokê li bin banên siyasî yên hevpar ên mîna konfederal û împaratoriyan mane, îdeal jî nebe, bi vî awayî hebûn û xweseriyên xwe karîbûne biparêzin. Mîlliyetgirî çi bi awayekî laîk û çi bi awayekî dîndarî bibe, heta zêhniyeta dewleta netewe dewam bike, bivênevê civak ê bêhtir ji hev de bikevin û li dijî hev şer bikin. Wê Îslamiyeta îddîa dikin ku gelekî pêve girêdayî ne jî weke îdeolojiyeke terorê pêşkêş dikin û bi vî awayî vê rêûresmê jî gelekî neyênî dikin. Yekîtiyên neteweyî yên demokratîk çi qasî ku ji bo Îranê, divê ewqasî ji bo van cografyayên berfireh pêşî herêmî û bi wê re di zikhev de li nava Rojhilata Navîn bêne pêkanîn. Dewletên netewe yên mîna Pakistanê ji niha ve gelekî ji hev de dikevin û alternatîfa vê ya herî di cih de projeyeke Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a li nava Rojhilata Navîn e.

Têgîn û teoriya neteweya demokratîk ji bo rastiya kakila hegemonîk a dewleta netewe Îsraîlê jî bi roleke heyatî ya çareserker radibe. Ji bo paşerojê du rê li pêşiya Îsraîlê hene. Riya yekê, bi xeta xwe ya heyî ji bo hegemonya xwe dewam bike hingê wê timî şer bike û bibe împaratoriyeke herêmî. Çawa ku tê zanîn, ji Nîlê heta bi Firatê, heta jê jî wêdetir projeya Îsraîlê ya hegemonîk heye. Ev projeyek e ku piştî Împaratoriya Osmanî hatiye çêkirin. Herçiqasî di pêkanîna vê projeyê de gelekî gav hatibin avêtin jî di warê gihiştina wê ya armancê de hê jî kêm

e. Di demên dawiyê de Îran derdikeve pêşiya wê û Îran jî bi heman awayî xwedî hesabên hegemonîk e, û ev dike ku di navbera wan de nexweşî û tengezarî çêbibe. Di navbera wê û Tirkiyê de jî nexweşiyek heye, lê nayê zanîn ka ev çiqasî ciddî ye. Di vê qonaxê de mirov dibîne ku wê pêvajoyeke bi şer a hegemonya herêmî pêk bê. Bivênevê ev pirsgirêkên ji ber dewleta netewe derdikevin holê wê mezintir bibin; hesabên hegemonîk ên li beramberî hev bi xwe rê li ber van pirsgirêkan vedikin. Ji bo Îsraîlê û gelên Cihû riya duyemîn ew e, ji nava çembera dijminan a her tim xurt dibe dikare derkeve, tevlî projeya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk bibe û li ser vî bingehî ji bo gavavêtinê dikare bibe xwedî însiyatîf. Sermayeya maddî û entelektuel a li pişta Îsraîlê ji bo projeya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk dikare bi roleke girîng rabe. Bi vî awayî hem dikare xwe weke neteweyekî demokratîk bêhtir têkûz bike, hem jî dikare vê li nava Rojhilata Navîn di çarçoveya yekîtiya neteweyî ya demokratîk de pêk bîne, û pê bigihîje wê aştî û ewlekariya mayînde ya gelekî hewcedarî wê ye.

Felaketên herî mezin ên dewleta netewe rê li ber wan vekiriye, li Rojhilata Navîn der barê wan gelan de ye ku hewl dan wan qir bikin. Gelên Helen, Ermenî, Suryanî û Kurd ên li Anatolya û Mezopotamyayê zû ketin xefika mîlliyetgiriyê, tevî ku temsîla çandên xwecihî yên herî kevin ên dîrokê dikirin jî ezmûnên dused salên dawî yên dewleta netewe ew anîn ber tesfiyeyê. Mîlliyetgiriya neteweya serwer a bi awayekî çavsorî hewl da di nava sînorên hişk de civaka neteweyî ya homojen biafirîne ji bo van gelan bi awayekî rastî veguherî felaketeke mezin. Eger têgihiştina neteweperestiyê ya modernîteya kapîtalîst nebûya, ev felaket jî wê pêk nehatana. Kapîtalîzmê elîta Tirkê Spî afirand. Mirov nikare li bernameyên afirandina neteweyên homojen ji pêdiviya daneheva sermayeyê serbixwe bifikire. Ji aliyê kategorîk ve yên ji qirkirinê divê berpirsiyar bêne dîtin Tirk nînin, mîna li cem Elmanan, demekê yên ku li pey kapîtalîzma mîllî çûn komeke marjînal bûn. Di vê de, ne bi tenê para berpirsiyariyê ya mîlliyetgirên neteweya serwer e, di hişyarkirina cinawirê bi navê dewleta netewe de mîlliyetgirên neteweya bindest jî para wan a berpirsiyariyê heye. Li gorî ku careke din pêkan nîne, yên hatine îmhakirin ji nû ve bêne vejandin, bi tenê zêhniyeta neteweya demokratîk dikare yên mayî bi awayê wan ên hindikayî li ser piyan bigire. Mînak dema xwestibûn dewleta netewe ya Tirkê Spî li Stenbolê ferz bikin, ji bo tevahiya çandên dîrokî yên li bajêr fermana mirinê hatibû dayîn an jî terqîna wan hatibû xwendin. Eger bi temamî tesfiyekariya çandê pêk bê hingê dawiyê wê Stenboleke yekçand bimîne û ew jî faşîzma çandî bi xwe ye, û ne tiştekî din e. Lê eger li Stenbolê zêhniyeta neteweya demokratîk pêk bê, hingê bi awayekî eşkere Stenbol ê di nava dewlemendiya çanda dîrokî de be.

Mirov ji vî alî ve dikare li çandên Anatolya û Mezopotamyayê jî binêre. Bi tenê zêhniyeta neteweya demokratîk dikare tevahiya çandên dîrokî di nava aştî, wekhevî, azadî û demokrasiyê de li cem hev bigire. Her çand ê ji aliyekî ve xwe weke komeke neteweyî ya demokratîk ava bike, li aliyê din jî bi çandên din re ku di nava hev de ne, wê di asteke jor de bi yekîtiyeke neteweyî ya

demokratîk bijî. Piştî ku ji têgihiştina neteweyî ya tekperest bihurîn wê bi xwe hewce nebînin ku hevdu bihelînin. Li şûna vê, çawa ku di dîrokê de bûye, wê di nava yekparebûna çandî de bi hev re bin. Eşkere ye ku êdî Ermenî, Helen û Suryanî wê nikaribin ji xwe re sînorên dewleta netewe xêz bikin û neçar in hebûna xwe dewam bikin, lewma alternatîfa herî di cih de zêhniyeta yekîtiya neteweyî ya demokratîk û avakirina xweseriya demokratîk e. Bi derengî be jî modernîteya demokratîk ji bo tevahiya gel û çandên di heman pêvajoyan re derbas bûne penageheke zêhniyetê û xweseriya demokratîk jî modeleke ji nû ve bi gewdebûnê ye.

Li herêmê mîrateya dewlemend bi tenê ji hebûnên etnîk û neteweyî pêk nayê. Dîn û mezheb jî komên li guhereke berfireh in. Mezheb û dîn bi şêweyên ji rêûresm û modern bi rengên nû yên digirin pirsgirêkeke ciddî ya temsîlê ne. Dewletdariya netewe beşekî mezin ji wan jî tesfiye kir. Lê ji ber ku dewleta netewe bi xwe diheze, ev mîrateyên dewlemend ên çanda dîrokî bi tenê dikarin xwe di çarçoveya têgîn û teoriyên neteweya demokratîk de îfade bikin. Hem ji ber têgihiştinên wan ên zêhniyetê hem jî ji ber şêweyên wan ên avabûnê, neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk ji bo wan modela herî di cih de ye. Li dijî felaketa bi navê dewleta netewe, ji bo tevahiya qadên bi heman rengî yên civaka dîrokî, civaka neteweyî ya demokratîk garantiya jiyana aştiyane, wekhevî, azadî û demokratîk e.

Li Rojhilata Navîn dewletdariya netewe Kurd parçe kirin, li her parçeyî jî îmha û asîmîlasyonên cuda ferz kirin, lewma jî di vê tabloyê de rewşa Kurdan tam felaket e. Ne bi temamî dikarin bi fizîkî, ne jî dikarin bi çandî tesfiye bikin. Kurd mîna ruhberekî demeke dirêj li ber ruh dide, diperpite. Gelekî wisa ye ku hema bêje mîna wî li dinyayê tineye. Ne bi tenê ji aliyê zêhnî ve seqet bûye, ji aliyê beden û gewde ve jî hatiye parçekirin. Ji aliyê civakî ve jî rê li ber şêwazekî jiyanê yê birîndar vekirine. Ne jiyana ji rêûresmê maye, ne jiyana modern heye. Jixwe heta dema dawiyê jî mafê tercîhê ji destê wî hatibû stendin. Bêguman ev rewş ji ber dewletên netewe yên modernîteya kapîtalîst avakirî derdiket holê. Hewldanên Kurdan ên ji bo dewleteke netewe bi ser neketibûn. Lewma avakirina Kurdan a dewleteke netewe bi berjewendiyên modernîteya kapîtalîst re li hev nekiribû û di vî warî de şensê wan nemeşiyabû. Roja me ya îro, dewleta netewe ya li Kurdistana Iraqê dixwazin pêk bînin, ji nêz ve bi hesabên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst ve girêdayî ye. Dewleteke netewe ya Kurd a mînîmalîst dibe ku bi kêra sîstemê bê. Tehlûkeya wê ev e: Dema sîstem bibêje “Li gorî berjewendiyên me nîne” ji nû ve her kêlî dikare rê li ber tevkujî û qirkirinan veke. Min beşekî mezin ê parêznameya xwe ji diyardeya Kurd, pirsgirêka Kurd û çareseriya wê re veqetand. Rizgarbûna ji vê statuya xeternak an bêstatutiyê ku me bi kurtî ji nû ve da nasîn, eşkere ye ku bi tenê bi modela neteweya demokratîk dibe. Neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk weke zêhniyet û avabûn rê didin ku bêyî dewletên netewe yên heyî bêne hilweşandin, çawa ku li gelemperiya dinyayê jî tê dîtin, rêveberî bêne parvekirin û jiyana bi hev re pêk bê. Ji bo vê jî ya hewce rejîma destûra bingehîn a demokratîk e.

‘Komara Kurdistan a Serbixwe û Yekbûyî’ amentuya Kurdan e, û alternatîfa wê ‘Kurdistana Konfederal a Demokratîk’ e. Di çarçoveya vê alternatîfê de destê xwe nade sînorên heyî, berevajî sînorên heyî weke sedema Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn qebûl dike. Di nava vê modelê de gelek komên çand û gelan dikarin xwe weke yekîtiyên federe bi rêxistin bikin. Li heman xwecihî, li heman bajarî, her cure komên etnîk, dînî, mezhebî û cinsî dikarin di nava aştî, wekhevî, azadî û demokrasiyê de bi hev re bimînin. Kurdistana Konfederal a Demokratîk her ku modela xwe ya neteweya demokratîk pêk bîne, wê her parçeyê wê bi civakên cîran re jî karibe bi hêsanî yekîtiyên bi heman rengî pêk bîne. Eger em bifikirin ku pêkhateyên bi heman rengî li Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê çêbûne, hingê eşkere ye ku Kurdistana Konfederal a Demokratîk kakilê Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn e. Herdu diyarde şensê wan heye di zikhev de pêk bên. Jixwe yekparebûna civakî û dîrokî ya Rojhilata Navîn jî vê ferz dike û li gorî vê ye.

Li aliyê din, di van demên dawiyê de DYE dixwaze Projeya Rojhilata Navîn a Mezin bixe rojevê, lê ya rastî şensê vê projeyê zêde tineye. Jixwe ev proje xwe disipêre dewletên netewe. Gelek projeyên bi heman rengî Rojhilata Navîn xistine nava tevlîheviyê. Projeya dawiyê jî rewşên rê li ber wan vekirine cuda nînin. Heta mentiqê dewleta netewe neyê terikandin, ti proje nikare Rojhilata Navîn ji nava pêxîrtengiyên kûr û pirsgirêkan rizgar bike, ji şer û pevçûnan dûr bixe. Hem Yekîtiya Ereb û hem jî Rêxistina Konferansa Îslamî bi sedema ku bi heman mentiqê dewleta netewe seqet bûne, ti pirsgirêk çareser nekirine. Ji zêhniyet û şêweyê avabûnê yê heyî nebihurin şensê wan tine ti pirsgirêkê çareser bikin. Herweha li dijî DYE û hêza hegemon a xwecihî Îsraîlê hem Îran û hem jî Tirkiyê bi Hîzbûllah û El Qaîdeyê şerên serdestî û bandorzêdekirinê dimeşînin û ev pirsgirêkan bêhtir dikin ku nikaribin ji nav derkevin û ji vê jî wêdetir bi kêra tiştekî nayên. Hesabên wan ên ji bo para xwe zêde bikin, her kêlî dibe ku berevajî li wan vegerin. Bi tevahî van dekûdolabên berê û nû yên dewleta netewe Rojhilata Navîn xistin rewşeke darî çav. Bi navê “Em pirsgirêkan çareser dikin, em dîplomasiya sifir pirsgirêk dimeşînin” pirsgirêk bêhtir mezin bûne, ji navê nikarin derkevin û bûne mîna gulokeke lihevgeriyayî. Çawa ku me hewl da em nîşan bidin, ev rewşa Rojhilata Navîn eşkere ji ber dewleta netewe ye, û ji ber şêweyê avabûnê ye. Dîsa me bi heman awayî eşkere dabû xuyakirin ku ji bo derketina ji vê rewşa kaotîk, zêhniyeta neteweya demokratîk a modernîteya demokratîk û avahiya xweseriya demokratîk, paradîgma nû û modela herî di cih de ya wekhevîxwaz, azadîxwaz û demokratîk e. Modelek e ku riya aştî û ewlekariyeke mayînde nîşanî her kesî û her civakê dike.

**b-** Ekonomiya komin a demokratîk li hemberî meyla kara herî zêde ya kapîtalîzmê ku civak kiriye karker û koleyên bêkar, ji bo ji nû ve jiyaneke mirovane riya çareseriyê ye. Ekonomî diyardeyeke tevahiya dîrokê her tim bi awayekî komin hatiye pêkanîn. Ekonomiya bêyî komin nabe. Maneya peyva ekonomiyê bi xwe jî ‘qanûna komina malbatê’ ye. Ango weke malbat karûbarên

kominekê yên ji bo debarê ne. Şêwazê heyînê yê civakê bi tevahî bi awayê kominê ye. Di dîrokê de ekonomiyeke bi ferd destpêkirî tineye. Dîrok û civak ekonomiya taybet nas nakin û bi kêmanî bi qasî dewleta netewe cinawirek e ku kapîtalîzmê afirandiye. Ekonomiya taybet tevahiya dîrokê timî bi 'dizekiyê' re wekhev hatiye dîtin û marjînal hatiye hiştin. Bi mezinbûna modernîteya kapîtalîst re weke kategoriyeke nû derketiye bazarê. Bi awayekî mîna mişkekî timî di binê erdê de mayî û bûye mîna pisîkeke derketiye rûyê erdê û ketiye nava bazaran. Di dîrokê de yên ji bo ekonomiya taybet an sermayeyê beziyane timî weke dizek hatine dîtin û kirine ku neyên dîtin. Bi mezinbûna hegemonya kapîtalîst re ev mişkên bûne pisîk li ser bazaran serweriya xwe pêk anîn û bi rastî ji bo civaka mirov bûn felaket. Bi tespîta gelekî di cih de ya dîroknas Braudel, kapîtalîzm ne ekonomî ye, yekdestdarî ye ku bi armanca karê li ser bazarê serweriya xwe çêkiriye. Çi kesayetên taybet bin, çi jî yekdestdariyên dewletê bin, yên li ser ekonomiyê serweriya xwe pêk anîn, pirr baş serwext bûn ka çiqasî wê karibin kominê xira bikin ango rêxistiniya pêşî ya mirov a ji bo debarê têk bibin wê karibin dizekiya xwe bikin. Yekdestdariya taybet an yekdestdariya dewletê şêlandina ekonomiya komin e. Modernîteya kapîtalîst ji bo vê şêlandinê bike xwe dixe hezar û yek kiras û rengî û ev şêlandina wê hilweşandina bingehê kominê ango civakê ye. Bi tevahî nexweşî û krîzên ekonomîk bi jihevdeketin û hilweşîna ekonomiya komin a bingehê civakê dest pê dike. Dîroka kapîtalîzmê dîroka hilweşîna ekonomiya kominê ye. Encam ew e, felaketa herî mezin a civakî ya dîrokê pêk hatiye. Jihevdeketin û hilweşîna ekonomiyê, sedema rastî ya hilweşîn û jihevdeketina tevahiya qada civakî, exlaq û siyasetê ye. Jihevdeketina ekonomiyê, jihevdeketina civakî bi xwe ye. Di vê rewşê de li dawiyê bermahiyên bêkar, bêexlaq û bêpolîtîka dimînin. Yekdestdariya dewletdar û taybet a kapîtalîzmê ev e.

Ji ber vê ye, di çarsed salên dawiyê de li tevahiya dinyayê, nexasim di serdema kapîtal fînansê ya roja me ya îro de pêxîrtengiya ji ber avabûnê derketiye asta herî jor û pêk tê, di salekê de çarsed mîlyon mirov bêkar hiştine. Jihevdeketina di civaka Rojhilata Navîn de bêhtir balkêş e. Jihevdeketina pêncî salên dawî yên jiyana kominê, rê li ber bêkarmayîna topyekûn vekiriye. Civaka Rojhilata Navîn di ti dema dîrokê de evqasî ji hev de neketibû. Jixwe civaka Rojhilata Navîn hem ekonomiya komin pêşî pêk aniye, hem jî bi qonaxa hegemonîk a kapîtalîst li nava dinyayê jêre pêşengî kiriye. Pêxîrtengiya roja me ya îro ketiyê, bi têkçûna jiyana komin a ji sêsed hezar salî zêdetir bi aqlê xwe ava kirî re hevmane ye. Ji ber vê sedema dîrokî ye ku felaketeke topyekûn bi serê wê de tê. Encamên felaketa bi serê wê de tên, bi ti faleketa hov a di dîrokê de qewimiye mirov nikare bide ber hev. Ji ber ku di dema êrîşên hov de jî jiyana komin her bingeh bû. Kes nedifikirî û kesî nedianî bîra xwe ku destê xwe bidiyê. Hovîtiya kapîtalîzmê cara pêşî bi mentiqê xwe yê herî îblîswarî aqil kir ku jiyana komin ji hev derxe û ji hev de bixe. Di vê de jî bi ser ket. Encamên vê serketina wê jî şerên çarsed salên dawiyê, talanên mêtingeriyê, ji kolekirina civakê bi awayekî klasîk xirabtir kolekirina civakê bi heqdestiyê û ji vê bêrehmtir jî bêkarhiştina civakê ye; bi vî awayî civak yekparebûna xwe ya exlaqî û polîtîk ji dest dide; dewrûber û

hawîrdorê xira dike û tewazuna biyolojîk a dinyayê hildiweşîne; bin erdê vala dike, ser erdê qirêj û gemarî dike; ev jî felaket in ku bi serê avhewayê de tên.

Eşkere ye ku ji bilî ekonomiya kominal a modernîteya demokratîk, tedbîreke din nîne pêşî li encamên tehekumkar ên ekonomiya dewletdar û lîberal a modernîteya kapîtalîst bigire û ji heqê hilweşînên vê encamê derkeve. Divê mirov li ekonomiya komin weke vedîtin an doktrîneke nû nefikire. Ekonomiya komin planeke nû an projeyek jî nîne. Divê mirov wê weke şêwazekî heyînê yê civaka mirov an heqîeta wê ya bêyî wê nabe fêhm bike. Eger civak dixwaze li ser piyan bimîne û hebûna xwe dewam bike, divê û neçar e ku ekonomiya kominê bike bingehê xwe. Dema ku mirov dibêje neçar e yan jî divê wisa be, belkî ev gotinên şert qanûneke hişk îfade dikin. Lê ji ber ku bêyî ekonomî nabe û ev ekonomî jî bêyî komin nabe, li vir şertê divê û neçar e di cih de ye. Ne tenê li Rojhilata Navîn, li tevahiya dinyayê, eger em dixwazin jiyana civakî dewam bikin, divê em ekonomiya komin bikin sereke. Ez sereke dibêjim, ji ber ku em kapîtalîzma taybet û kapîtalîzma dewletê mîna bi kêrekê bibirrin nikarin qut bikin û biavêjin aliyekî. Mirov dikare weke berê wê marjînal bike û divê mirov kominê jî bike sereke.

Civaka Rojhilata Navîn bi qasî Ewrûpayê û herêmên din ên dinyayê bi kapîtalîzmê re li hev nîne. Ew qebûl nekiriye, wê xerîb dibîne û jê dûr disekine. Ji ber ku rehên wê yên komin xurt in. Hêmana ekonomîk a komin a modernîteya demokratîk a pala xwe daye teknolojî û zanista serdemê ne ku bi tenê bi bandorên rizîner, hilweşîner û tarûmarker ên kapîtalîzmê serî derdixe; ji bo jinûveavabûna tevahiya qadên civakî bingehekî qehîm datîne. Lê kapîtalîzmê di sedsala dawî de ferd ewqasî aware, bêkar û antî-civakî kirine, ji bo mirov wan ji nû ve hînî ekonomiya komin bike pêdivî bi şoreşeke rastî ya civakî heye. Ferdperestiya lîberal bi qasî nexweşiya kansêrê bi tehlûke ye. Eger mirov wê bi girîngî derman bike dikare tevlî jiyana komin bike. Di vê de zêhniyet û perwerdeya exlaqî bi roleke girîng radibin. Lê dema ku mirov ber bi ekonomiya kominal ve gavê biavêje, divê mirov ji bîr neke ku ev bêyî siyaseta demokratîk nabe û pêwîst e ku mirov pirr bi girîngî li vê serwext bibe û pêdiviyên wê bi cih bîne. Herweha nabe ku mirov aliyê wê yê exlaqî jî paşguh bike. Bi kurtî, ji bo jinûveavakirina ekonomiya komin pêdivî bi perwerdeyeke hişk a îdeolojîk, polîtîk û exlaqî heye.

Dema em dibêjin ekonomiya komin, divê mirov bi tenê çend qadan tenê fêhm neke, ji qada cotkariyê heta bi pîşesaziyê, ji xizmetan heta bi zanist û zenaetan gelek qadan fêhm bike. Ekonomiya komin sîstemek e, bi qasî li gund tê bipêşxistin, li bajar jî tê bipêşxistin. Heta ekonomiya gund-cotkariyê ya modernîteya kapîtalîst ew tine kir dikare bibe alternatîfa ekonomiya bajêr a bûye kansêr û ev jî bi tenê li dora ekonomiya komin ava dibe. Ekonomiya komin a hemdem bi giranî ekonomiyeke gund-bajar e. Divê mirov ekonomiya gund-bajar şaş fêhm neke. Ev nayê wê maneyê mirov gund bike bajar û ne jî ji bajar veguhere gund. Divê mirov ekonomiya gund-bajar weke unîteya hemdem a civaka kominal fêhm bike. Hemin di dîrokê de

meyla serdest bi karekterê gund-bajar bû. Gund û bajar bi awayekî nedurist ji hev veqetiyan û ev bi modernîteya kapîtalîst ve girêdayî ye. Tevahiya dîrokê di serî de li keviyên Firat, Dîcle, Nîl û Îndus-Pencabê, ekonomiyên li keviyên çeman giş kominal in. Jixwe ev ekonomiyên kominal in ku şaristanî mumkîn kirin. Kapîtalîzmê bi meyla kara herî zêde bi polîtîkayên bendavavakirinê, ne bi tenê ekonomiya bi gundan ve girêdayî hilweşand; erdên herî bi bereket, cureyên nebatan, cinsên heywanan û berhemên herî bedew ên arkeolojîk ên dinyayê daqurtand. Bi qasî îmhayên civakî îmhayên ekolojîk û arkeolojîk jî pêk anîn. Bi tenê ekonomiya komin a bi ser siyaseta demokratîk ve dikare pêşiyê li van hilweşînan hemûyan bigire.

Îdeolojiyên şoreşger û polîtîkayên wan pirr kêm behsa ekonomiya komin kirine. Nexasim sosyalîzma pêkhatî kapîtalîzma dewletê bi sosyalîzmê re wekhev kir û vê rê li ber felaketên mezin vekir. Ev nêzîkatiya sosyalîzma pêkatî bi qasî ku sosyalîzm rizand ekonomiya kominal jî ji fonksiyana wê ya rastî kir. Bi navê kolektîvîzmê desteka herî mezin bi kapîtalîzma dewletê daye kapîtalîzmê. Ekonomiya komin bi qasî ekonomiya taybet divê ekonomiya bi destê dewletê red bike, ya rastî tehekuma ekonomîk qebûl neke. Nexasim divê yekdestdariya dewletê weke kolektîvîzma komin a riziyayî bibîne û di her şert û mercî de li dijî wê têbikoşe. Herweha divê mirov van xusûsan jî baş zanibe: Kapîtalîzm jî ber bi roja me ya îro di pêvajoyeke wisa de ye, bi awayekî xwe vediguherîne kominên kapîtalîst ên ji şîrketên malan pêkhatî û ji aliyê CEO’yên profesyonel (Chief Executive Officer) ve têne birêvebirin. Dixwaze vê pêvajoyê di her qadê de bimeşîne. Divê mirov vê weke xefikeke girîng a kapîtalîzma lîberal bibîne. Kapîtalîzma xwe weke sîstema holdîng xistiye qalibên komin, herî zêde bi vî awayê xwe dijminê ekonomiya kominal û civakê ye. Kapîtalîzm bi awayê xuya dike, herçiqasî îddîa bike ku ji şêweyên berê yên civakî bihuriye jî texsîr nake xwe bi awayên civaka qebîleyê bi rêxistin dike. Bi awayekî klantî û qebîletiya modern dimeşîne. Ji ber ku civakê li ser yekeyên civaka kominal ango klan û qebîleyan pêk tînin, mezin dibe. Lê modernîteya kapîtalîst xwe bi awayekî cewherî li ser înkara şikilgirtina civakî dihûne û pêk tîne. Dema xwe pêk tîne jî texsîr nake qalibên berê li gorî xwe difesilîne.

Dewletgiriya netewe, ji ber ku xwe li gorî yekdestdariyên kapîtalîst bi gewde kiriye, naxwaze ekonomiya komin nas bike. Ya rastî, ew jî weke yekdestdariyê dixwaze li ser wê serweriya xwe çêke. Dewletgiriya netewe li Rojhilata Navîn jiyana kominal ji hev belav dike û bi îdeaya çêkirina civaka homojen radibe. Jiyana kominal û civaka cemaet li pêşiya xwe weke asteng dibîne. Civaka îdeal a dewletgiriya netewe girseyeke bêkêr e, ji tevahiya nasnameya dîrokî ya komin û cemaetê şuştî ye, bênasname û bêkesayet e, bûye civakeke kole mîna moriyan dixebite. Ya rastî, bi vî awayî ango civak bibe girseyeke bêkêr namîne, diqede. Fîlozofên mîna Nietzsche û Foucault dema gotin “Civak an mirov ji aliyê modernîteyê ve hat kuştin” dixwazin behsa vê rastiyê bikin. Kengî civaka bi kesayet, bi nasname û bi komin bê hilweşandin, civaka girse ya bêkêr a

bênasname û bêkesayet çêdibe ku ev civak xweserî moderníteya kapîtalîst e, û tîpa welatî ya dewletgiriya netewe ye.

Rêûresmên naveroka xwe ya dîrokî hene û di bingehê moderníteya demokratîk de ne hemû bi nirx in. Ji van ên sereke ekonomiyên piştgirî (zibare) û kominê bi rola yekeya bingehîn radibin. Ekonomiya komin yekeya bingehîn a neteweya demokratîk e. Çawa ku yekdestdariyên ekonomîk ên tehekumê yekeyên mêtinkariya ekonomîk ên bingehê dewleta netewe bin, yekeyên ekonomiya komin jî yekeyên jiyana ekonomîk ên bingehê neteweya demokratîk in. Neteweya demokratîk û moderníteya demokratîk li ser ekonomiya komin mezin dibin. Em hewce nabînin ku naveroka ekonomiya kominê zêde rave bikin. Ji komineke malbatê bigirin heta bi neteweyeke demokratîk, li gorî pêdiviyê mirov dikare ji aliyê hejmarê ve zêde û ji aliyê naverokê ve bêhejmar yekeyan ava bike. Kominên fabrîke û cotkariyê yên îdeal di serê van de tên. Dîsa kominên, çûnûhatinê, tenduristiyê, perwerdeyê û kooperatîfên bi gelek armancan ji wan tîpên kominan in ku li pêş tên. Ya girîng ne ew e ku pêşî komin bêne diyarkirin, ya girîng ew e, li gorî pêdivî û kêrhatinê her cure yekeyên kominal bi hejmar û naverokeke di cih de bê avakirin û ti ferd bê komin neyê hiştin. Neteweya demokratîk ew netewe ye ku endamên xwe hemûyan bi kominan bi rêxistin û erkdar dike. Ferdê bê komin pêkan nîne, û eger bibe jî ew nexweş ketiye û ketiye ber çerxa rizînê. Ferdên neteweya demokratîk, nexasim kadroyên wê yên avaker, wezîfeya wan a bingehîn ew e, ferdan hemûyan divê ji sedî sed bikin xebatkarên çalak ên yek an jî çend kominan.

Di roja me ya îro de komên Rojhilata Navîn ji nava pêxîrtengiyên giran ên di navê de ne, di serî de bi kominên ekonomîk di her qadê de bi qasî ku bibin komin karin gavê biavêjin. Bêyî kominan gavavêtin nabe. Rêûresmên dîrokî û çandî kengî bi jiyana kominal di nava aktualîteyê de cih bigirin wê karibin hebûna xwe dewam bikin. Rêûresm nayê teqlîdkirin, lê mirov pişta xwe nede rêûresmê jî nikare bijî. Lê rêûresm bi nirxên afirîner ên aktuel ku xwe nesipêrin înkara rêûresmê û teqlîda wê, jiyana dîrokî-civakî digihîje maneya xwe ya rastî. Di vê de rêûresma kominal a ekonomîk bi rola sereke radibe. Kominên ekonomîk ji bo tevahiya welatan dibin. Ji bo pêşîgirtina li bêkarî û jihevdeketina civakê, gavavêtina dema xebata kominal divê. Nexasim bi zêhniyeta komin a xwenûkirî û li ser bingehê rêxistiniya wê vegera li gund û cotkariyê XEBATA ŞOREŞGERÎ ya herî hêja ye. Şoreşgeriya rastî ew e, mirov jiyana kominal a heyîna me ya dîrokî pêk tîne, di serî de li qada ekonomîk divê li qadên civakê hemûyan bi cih bîne. Çawa ku federalîzma demokratîk û xweseriya demokratîk rêxistinî û bi sazîbûna jiyana polîtîk a neteweya demokratîk e, yekîneyên ekonomîk ên kominal jî bi sazîbûn û rêxistiniya jiyana ekonomîk e. Federasyona Yekîneyên Ekonomîk kominal di asta xwecihî, neteweyî û herêmî de bingehê ekonomîk ê Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a Rojhilata Navîn îfade dike. Kakilê hêza hegemonîk Îsraîlê bi yekîneyên ekonomîk ên bi navê Kîbbutzê yekeyên gelekî dişibin ekonomiya kominal pêk anîne û ev jî serdestiya ekonomiya kominal îspat dike. Eger dixwazin ji

hegemonyadariya dewleta netewe ya Îsraîlê bibihurin di qada ekonomîk de ji bilî gavavêtina ekonomiya kominal riyeke din nîne. Herweha rizgarbûna ji hegemonya kapîtalîst û her cure mêtinkariya wê ya yekdestdariyê bi ekonomiya nû ya kominal a bingehê maddî yê wekhevî, azadî û demokrasiyê ye, dibe.

Li Kurdistanê rêûresmên ekonomîk ên kominal bi zor û zehmetî be jî hê hewl didin li ser piyan bimînin, lê ji ber ku dewleta netewe civak hilweşand pêre girseyên mezin ên bêkaran çêbûn, koletiya bi heqdesteke kêm pêk hat û mirov li ser erdên xwe bûn rêncber, lewma ji bo kesên bi van sedeman maneya jiyanê û rûmeta xwe ji dest dane, jiyana ekonomîk kominal a nûkirî riya bi tenê ya rizgariyê ye. Mirov roja me ya îro li ser van erdên dîrok û civak bi kominî pêk hat, bi tenê dikare bi endustriya ekolojîk û ekonomiya kominal a neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk li dijî modernîteya kapîtalîst û dewletdariya wê ya netewe, talana îndustriyalîzma wê û xebatên wê yên hilweşîner ên li pey kara herî zêde, şoreşa herî mezin pêk bîne. Bi vî awayî di nava civakeke wekhev, azad û demokratîk de mirov dikare qadan bike cihên ewle, bi rûmet, delal û aştiyane.

**c-** Sê hêmanên modernîteya demokratîk hene û yek ji van hêmanên sereke li dijî îndustriyalîzma kapîtalîst îndustriya ekolojîk e. Mirov dikare îndustriyalîzmê weha bide naskirin, kapîtalîzm teknîkê ji bo meyla xwe ya kara herî zêde bi awayekî bêsînor bi kar tîne. Meyla kara herî zêde çawa ku dewlet weke amûrê desthilatdariya herî zêde bi awayê dewleta netewe ji nû ve bi rêxistin kir, gurçûpêçiya teknîkê ya bi armanca kara herî zêde jî bi awayê îndustriyalîzmê bi rêxistin kir. Tehlûkeya bingehîn a îndustriyalîzmê ew e, civaka cîhanek wê ya zindî û bi his heye vediguherîne goristana amûrên mekanîk û civakê dike robot. Eger îndustriyalîzm neyê bi sînorkirin, ti civak nikare cîhana xwe ya hestan bi awayekî durist dewam bike. Makînekirina civakê piştî qonaxeke diyar wê veguhere hilweşîna civakê. Aliyê kapîtalîzmê yê ji şer bêhtir bi tehlûke ew e, meyla wê heye îndustriyalîzmê timî herî mezin bike. Dinya ji niha ve bûye êsîrê amûrên ferazî û bajarên ji hawîrdorê qut. Îndustriyalîzm dike ku bajar mîna kansêrê zêde bibin. Bajar bûne cinawirên dinya me ya zindî dadiqurtînin. Bajarên şêniyên wan bi mîlyonan bi deh mîlyonan ti maneyek wan a civakî tineye û bi ti awayî hewcedarî bi hebûna bajarên bi vî rengî tineye, lewma bi awayekî kansêrwarî mezinbûna wan ji nexweşiyê bêhtir ti maneya xwe nîne.

Bi vê ve girêdayî, bi tenê qezayên rê li ber vedikin û mirina mirovan a di warê çûnûhatinê de ji niha ve ji bîlançoyên şeran bihuriye. Dîsa ji ber ku dengên nexweş derdixin, hewayê qirêj dikin û gewdeyê mirov têk dibin, ew êdî ji amûrên çûnûhatinê derketine. Herweha yek ji qada sereke ya îndustriyalîzmê amûrên ferazî, nivîskî û dîtînî ne ku têkiliya xwe bi heqîqetê re nemane û mirovatî hînî cîhaneke ferazî kirine. Ango kirine ku mirov bûne nexweşê wan û serê xwe ji ser wan ranakin. Girseyên ferdan ên têkiliya xwe ji civakê û heqîqetê qut, atomîzebûna civakê îfade dikin. Îndustriya amûrên şer û girseyên jihevdeketî û ji civakbûnê derketî, ji zû ve gihiştine wê

astê ku ji her alî ve civakê daqurtînin. Mirov weke ruhberekî bi hawîrdora xwe heye, tevî gelek ruhberên li dewrûbera xwe –nebat û daristan jî di nava vê de ne –ji aliyê îndustriyalîzmê ve di çarçoveyeke ekolojîk de tê daqurtandin. Bêguman li dijî teknîkên îndustriyalîzmê yên bûne amûrên hilweşandinê û modernîteya kapîtalîst a rê li ber wê vedike, nêzîkatiya modernîteya demokratîk bi temamî ekolojîk e. Îndustriya ne ekolojîk, bi kêmanî bi qasî kapîtalîzmê û dewleta netewe amûrê hilweşandina civakê ye. Hêmanên modernîteya demokratîk neteweya demokratîk û ekonomiya kominal ji bo bêne bicihanîn, bêguman nikarin ji teknîk û îndustiryê bêpar bimînin. Berevajî ev li ser modernîteyê û hêmanên wê ferz dike ku pêşketina zanist û teknolojiyê di îndustriyê de bi kar bînin. Maneya rastî ya îndustriyê ji bo civakê di vir de derdikeve holê. Îndustrî di nava yekparebûnê de çiqasî bi kêra civakê, xurtbûna wê ya exlaqî û polîtîk, pêşketina wê ya demokratîk û ekonomîk bê, ewqasî hêja ye. Bêguman destnîşankirina asta vê bikêrhatina îndustriyê yek ji wezîfeya sereke ya rêveberiya exlaqî û polîtîk e.

Civakên Rojhilata Navîn herçiqasî ji aliyê îndustriyalîzma kapîtalîzmê ve bi qasî welatên metropolan hilneweşiyabin jî ji ber xisletên hezar salan ên xirakirinê yên sîstema şaristaniya navendî û civaka neolîtîkê ya beriya wê, ji vî alî ve demeke dirêj bi hilweşînê re rûbirû mane. Ji ber ku ji pênc hezar salan zêdetir ji şaristaniya navendî re dergûşî kiriye, hilweşîn gelekî di asta jor de pêk hatiye. Li vê cografyayê gelek qad bêdaristan hatin hiştin û ev gelekî bi awayekî berfireh hatiye meşandin. Ev herêma ku demekê buhişta nebat û heywanan bû, niha dibe cehennema wan. Herêm di rewşeke welê de ye ku herî zêde pêdiviya wê bi jiyana ekolojîk heye. Îndustriyeke bi temamî ekolojîk dikare herêmê ji nû ve bigihîne ew rewşa wê ya berdar û bi bereket. Xisleteke wisa ya pirsgirêkên civakî heye: Li kîjan deverê pirsgirêk giran bûbin, li wir riyên çareseriyê jî ewqasî gihiştine, stewiyane. Mirov nikare li pirsgirêkên bêçareserî bifikire. Şert û mercên zeman û mekan ên lê pirsgirêk diberidin, şertên çareseriyê jî bi xwe re hildigirin. Mîna li gelemperiya dinyayê, li Rojhilata Navîn jî prensîba çareseriya ekolojîk, bi kêmanî bi qasî şoreşên siyasî girîngiya xwe ya çareseriyê çêbûye. Di vê mijarê de jî Îsraîl mînakên serketî pêşkêş dike. Serdestiya xwe ya zanistî û teknolojîk di îndustriya ekolojîk de bi kar tîne û li çolan çarçoveya jiyaneke cennetwarî pêk tîne. Li tevahiya welatên herêmê bi ekonomiya komin re îndustriyên ekolojîk ên werin bikaranîn, wê avabûna civakê bi awayekî azad, wekhev û karibe domdar bibe ji nû ve mumkîn bike. Hemin pêdiviya civakê bi van gelekî heye. Li şûna îndustriyalîzmê xweşhaliya ekolojîk pêdiviyeke rastî û li rêza pêş e. Welatên Ewrûpayê yên pêşketî dema îndustriya xwe ya ne ekolojîk dixwazin weke îndustriya ekolojîk bidin rûniştandin, tekstîl, otomobîl û turîzma wan tedarik bikin hingê ew ê van pirsgirêkên civakî bi tenê giran bikin. Kapîtalîzm bi vê riyê hêmanên hilweşînê yên mirovatiyê globalîze dike. Binesaziya teknîk a modernîteya demokratîk divê ekolojîk be. Bêyî înkara îndustriyalîzm û îndustriyê, ekonomiyeke ekolojîk kominal a bê bipêşxistin wê bibe hêza pêkhêner a jiyana neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk têkûz û yekpare dike.

Kurdistan weke welatekî lê dewletdariya netewe û îndustriyalîzma kapîtalîzmê herî kêm bi pêş ketiye, dikare vê rewşa xwe ji bo avakirina ekonomiya ekolojîk û kominal bi awayekî herî baş binirxîne. Di vî warî de rewşa xwe ya paşvemayî dikare veguherîne avantajê. Bi tevahî girseyên mirovan, girseyên bêkaran dikare di ekonomiya ekolojîk û kominal de bi rêxistin bike, welatê berê cennet bû dikare li ser riya şaristaniya demokratîk weke neteweya demokratîk ji nû ve ava bike. Ji bo vê hema bi tenê rûmet û eşqa ji bo jiyaneke li welatê azad û civaka demokratîk hebe bes e!

**G- LI ROJHILATA NAVÎN ŞOREŞA ZÊHNIYETÊ**

Modernîteya kapîtalîst bi awayê globalkirî, li Rojhilata Navîn jî pêşî bi zêhniyeta hegemonîk gav avêt. Hegemonyadariya zêhniyetê ya jêre oryantalîzm tê gotin koka wê heta bi beriya niha bi sedsalan diçe. Belkî jî digihîje heta belavbûna çanda Greko-Romen. Seferên Xaçperestan ên serdema navîn bi giranî şerên zêhniyetê bûn. Faktora sereke ya di mezinbûna Ewrûpaya Rojava de serdestiya wê ya di bîreweriya heqîqetê de ye. Wê ezmûna Rojhilat li gorî şertên xwe yên berbiçav fesilandiye û para vê jî di vê de heye. Serdemên Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê têgihiştina li heqîqetê ya Ewrûpaya Rojava li nava dinyayê serdest kir. Bi qasî ku xwe analîz kir, dinya analîz kir, nexasim jî Rojhilata Navîn analîz kir û ji hev derxist. Kapîtalîzm li gelek bûyerên erênî yên nû derketin holê xwedî derket û li ser têgihiştina li heqîqetê jî yekdestdariya xwe ava kir. Di serê sedsala 19. de yekdestdariya xwe ya li ser têgihiştina li heqîqetê ji zû ve ava kiribû. Bi serdestiya li ser têgihiştina li heqîqeta li Rojhilata Navîn dest pê kirî gav avêt. Serê pêşî mîsyoneran ji nû ve keşifkirina herêmê dan destpêkirin. Paşê têgihiştina seyah û lêkolînên zanyaran ên li herêmê weke ekoleke fikrê bi navê oryantalîzmê çêbû. Oryantalîzm, hegemonya zêhniyetê ya şaristaniya Ewrûpaya Rojava ye. Ji sedsala 19. û pêve, serxwebûna zêhniyetê ya Rojhilat ji dest çû. Fikrên oryantalîst serwer kirin. Elît û rewşenbîrên Rojhilatî jî ketin bin serweriya oryantalîzmê. Di serî de mîlliyetgirî, bi tevahî versiyonên fikrê yên lîberalîzmê zêhniyeta Rojhilat dagir kirin. Tevgerên nû yên Îslamî û tevgerên din ên fikra dînî jî di nava qalibên oryantalîst de çêbûn.

Tevgerên dewletdariya netewe yên bi sedsala 20. re pêk hatin, bi xwe saziyên ajan ên fikra oryantalîst bûn. Damezrînerên dewleta netewe weke ku gelek caran îddîa dikirin xwedî fikreke serxwebûnxwaziyê nebûn û nikarîbûn bibin jî. Fikra çepgir jî di navê de, li Rojhilata Navîn li ser bi tevahî formên fikrê yên di sedsala 20. de mohra oryantalîzmê hebû. Herçiqasî li ser navê civaknasiyê ji tevahiya fikran re ku dihatin fesilandin heqîqetên zanista gerdûnî bê gotin jî bi xwe hemû oryantalîst in. Ji ber ku oryantalîzm bêhtir nêzî heqîqetê ye, ji qalibên zêhnî yên berê bi hêztir e. Yên ku oryantalîzm rexne dikirin, para heqîqetê ya fikra wan li gorî ya oryantalîstan kêmtir bû û lewma bi ser nediketin. Mirov heman tiştî dikare ji elîtên desthilatdariya oryantalîstan re jî bibêje. Elîtên desthilatdariya oryantalîst, mînak elîtên weke Jon Tirk,

Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê hêza xwe li gorî zêhniyetên berê bêhtir ji zêhniyetên bi hêz ên oryantalîstan digirtin. Ev yek ji sedemên sereke bû ku ew hem di dema Meşrûtiyetê de hem jî di dema Komarê de di şerên desthilatdariyê de bi ser xistin. Divê mirov baş zanibe ku çavkaniya hêza li pişt mîlliyetgiriya Tirk oryantalîzma Rojava ye. Elîtên desthilatdariyê ji zû ve berê xwe ji Mekkeyê zîvirandibûn Parîsê û sedema vê ew bû, fikra oryantalîst riya bi hêzbûn û serketinê ji wan re vedikir. Bi avabûna dewleta netewe re fikra oryantalîst li cihê herî jor bi cih bû. Li ser tevahiya zêhniyetên din yekdestdariya xwe ava kir. Oryantalîzmê ne bi tenê di qada îdeolojîk de, di qada huner de jî yekdestdariya xwe ava kir. Exlaqê ji rêûresmê ji hev de xist û rê li ber qalibên etîk ên Rojava vekir.

Ji nîvê duyemîn ê sedsala 20. û pêve, çawa ku li gelemperiya dinyayê bû, li Rojhilata Navîn jî yekdestdariyên zêhniyetê heziyan. Şoreşa çandî ya di salên 1968'an de dest pê kirî di yekdestdariya oryantalîzmê de kun vekirin. Ji van salan re mirov dikare bibêje ew dem e ku zanistperestiya pozîtîvîst û îdeolojiya lîberal dest pê dikin serdestiya xwe ji dest didin. Bi awayekî bi lez jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî di sala 1990'î de, serweriya fikra pozîtîvîst a lîberal jî bêhtir hejand. Nexasim zanistperestiya civakî derbeke mezin xwar. Yekdestdariya zêhniyeta modernîteya kapîtalîst cara pêşî bû ku bi awayekî ciddî dihejiya. Gelek ekolên ji wan re postmodern dihat gotin derketin holê. Femînîzm, ekolojî, kulturalîzm û ekolên nû yên fikra çepgiriyê pêk hatin. Pêxîrtengiya ji avabûnê ya kapîtalîzmê ku di salên 1970'î de kûr bû, bi pêxîrtengiya zêhniyetê re pêk hat. Ev pêxîrtengiyeke welê bû ku her diçû bêhtir kûr dibû. Yekdestdariya fikra berê bi awayekî welê hilweşiya ku careke din wê nikarîbûya ava bibe. Oryantalîzma ku varyanteke îdeolojiya lîberal bû, ji vê hilweşînê para xwe girt. Serweriya fikrê der barê Rojhilat de parçe bû. Di serî de Gordon Childe, Samuel Krammer û Andre Gunder Frank, gelek fikirdaran rola Rojhilata Navîn weke sîstema şaristaniya navendî derxist holê û alîkariyeke hêja bi şoreşa fikrê re kirin. Çiqasî sînorên modernîteya kapîtalîst û pêşketina Rojhilat bi sîstema şaristaniya navendî ve girêdayî nîşan dan, Ronesanseke rastî ya fikrê pêk hat. Fikrên me yên der barê siyaseta demokratîk û modernîteya demokratîk de ku bi parêznameyan her ku çû kûr bûn û xelek bi xelek berfireh bûn, bêyî ku haya me jê hebe, bi rengekî fikrên van mirovan temam kirin. Nirxandinên der barê ji derketina holê ya sîstema şaristaniya navendî û heta bi rola wê ya di mezinbûna modernîteya kapîtalîst li Ewrûpaya Rojava de bi xetên sereke rast bûn.

Li dijî zêhniyeta lîberal û oryantalîst, bandora yekbûyî ya tevahiya van faktorên fikra şoreşgerî, ji salên 1990'î ve rê li ber şoreşeke zêhnî ya bi lez vekiribû. Li ser parêznameyan bandora şoreşên van zêhniyetan bi sînor be jî bi giranî bi beridîneke fikra serbixwe û rengê şoreşê pêk hatiye. Li Rojhilata Navîn şoreşeke zêhniyetê ya ji mezhebên lîberalîzmê yên hem navend û hem jî yên rastgir û çepgir rizgarbûyî û ji oryantalîzmê bihurî gelekî girîng e. Divê neyê jibîrkirin ku şoreşa zêhniyetê pêk neyê, ti şoreşa civakî bi awayekî mayînde pêk nayê. Varyanta dawî ya pênc cildên

parêznameya min, der barê şoreşa zêhniyeta li Rojhilata Navîn de mebesta me çi ye bi xetên sereke diyar dike. Li şûna dubarekirinê, divê destnîşan bikim ku pratîzekirin girîng e. Fikrên gelekî hêja, ango fikrên para wan a heqîqetê gelekî bi hêz jî dema neyên bicihanîn ti maneyê îfade nakin. Dinya alem hemû li ser şaşiyê yan jî li ser fikra para wê ya heqîqetê lawaz bi yek bin jî eger kesek bi tenê fikra para wê ya heqîqetê zêdetir temsîl bike, wê karibe li hemberî hemûyan bi awayekî serketî xwedî li wê fikrê derkeve û wê karibe wê fikrê bigihîne serketinê. Dîroka mirovatiyê bi mînakên vê yekê tijî ye. Ya rê li ber vê vedike, her tim hêza heqîqetan a serketinê ye. Fikrên heqîqetê îfade dikin pêkan e ku bêne tepisandin, bêne cezakirin, lê ti carî têk naçin.

Min û me di destpêkê de bi fikrên para wan a heqîqetê bi sînor dest pê kir. Her ku bi duristî me pratîk meşand, me para heqîqetê ya di fikrê de zêde kir. Dema ku me bi fikrên para wan a heqîqetê zêdebûyî pratîk meşand, bivênevê pratîkên bêhtir serketî pêk hatin. Encama sereke ya divê mirov bigihîjê ev e, heqîqeta mezintir û çalakiyên heyatî yên van heqîqetan rê li ber wan vekirî, dema hewce bike bi yek gotinê dest pê dikin. Mirov bi duristî bi gotinê ve girêdayî be, û hewl bide wê bi jiyanê re bike yek û ji vê hewldanê negere, bivênevê heqîqet ê mezin bibe û di nava civakê de xwe weke serketina jiyana azad nîşan bide. Civak diyardeyên welê ne, mîna erdên bi hesreta avê bi hesreta heqîqetê ne. Çiqasî ev hesret bigihîje miradê xwe, civak jî mîna erdên hêşîn bibin, wê jiyana azad û demokratîk nas bikin.

Zêhniyeta dêrê tevahiya serdema navîn xistibû serweriya xwe, modernîteya kapîtalîst bi saziyên zanîngehan ên alîgirê laîktiyê ev serweriya zêhniyetê şikand. Bi yekdestdariya li ser zanîngehan pêk anî, destketiyên zanistî, felsefî û hunerî yên serdema Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê kir malê xwe. Ji vî alî ve sedsala 19. di warê serweriya kapîtalîzmê li ser zanist, felsefe û hunerê de vebirrî bûye. Di dawiya sedsala 20. de li gorî pêxîrtengî û jihevdeketina di avabûna giştî ya sîstemê de, di vê serweriya bi qasî dused salî dewamkirî bi xwe de jî pêxîrtengî û jihevdeketin çêbûye. Li hemberî teknîkên zanistî yên bi felsefeyê têne pêk anîn, zanistê girîngiya xwe ya berê ji dest daye, bi xwe veguheriye teknîkên lêkolînê yên hejmara wan nayê zanîn, huner jî piştî serdema klasîk nirxa xwe ya ekolbûnê ji dest da û bû enqazeke îndustriyê ya daket asta metayeke hişk û çor. Di encamê de bûbûn amûrên erzan ên îndustriyalîzm, dewletgiriya netewe û kapîtalîzmê. Bi vî awayî huner, felsefe û zanistê fonksiyona xwe ya bingehîn ango lêkolîna li heqîqetê û îfadekirina wê ji dest dabûn. Mabest ji pêxîrtengiya zanist, felsefe û hunerê qabîliyeta wan a lêkolînkirina vê heqîqetê û îfadekirina wê ye.

Pêvajoyeke bi heman rengî li Rojhilata Navîn di sedsala 12. de bi serweriya dogmatîzma medreseya Îslamî li hemberî felsefe, zanist û hunerê pêk hatibû. Li Rojava pêxîrtengiya di warê zanist, felsefe û hunerê de bi bêqîmetbûna oryantalîzmê li Rojhilata Navîn manedar bû. Ji vî alî ve bûyereke erênî bû, lê bi sedema ku rê li ber şoreşa zêhniyetê ya alternatîf venekiribû rîskên

wê hebûn. Tevî ku li herêmê li dijî zêhniyeta hegemonîk, şêwazê jiyanê û hunerê wê hin pêşketinên bi sînor bûbin jî rê li ber şoreşeke bi kok venekiriye. Çawa ku di her qadê de dibe, pêxîrtengî di vê qadê de jî dewam dike. Rojhilata Navîn dikare rîskên vê pêxîrtengiyê derxistine holê veguherîne firsendan. Ji bo vê jî dikare şoreşa zanist, felsefe û hunerê ya li gorî hîmê dîrok û çanda xwe pêk bîne ku îlham û ber dide hêmanên modernîteya demokratîk neteweya demokratîk, ekonomiya bazara kominal û îndustriya ekolojîk; ango dikare serdemên xwe yên Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê pirr zêde û di zikhev de yanî bi şêwazekî şoreşgerî pêk bîne, pratîze bike. Di vê çarçoveyê de hewce nake ku Rojava teqlîd bike. Tevî ku mirov dikare destketiyên gerdûnî parve bike jî ya esas ew e, mirov afirêneriya dîrokî û mekanî ya xwe nîşan bide û şoreşa xwe bi xwe pêk bîne.

Şensekî Şoreşa Kurdistanê ya li gorî têgîn û teoriyên modernîteya demokratîk tê pêkanîn jî ew e, di dema pêxîrtengiya şêwazê zêhniyet û jiyanê yê modernîteya kapîtalîst de pêk tê. Di serî de Şoreşên Fransî û Rûsî, beşekî mezin şoreşên di sedsala 19. û 20. de ji wan şoreşan bûn ku nikarîbûn ji zêhniyet û şêwazê jiyanê yê modernîteya kapîtalîst bibihurin. Tevî hewldanên wan ên esîl û xeyalên wan ên ji bo alternatîfbûnê serketinên wan bi sînor bûn. Bêguman li pey xwe mîrateyeke hêja, destketiyên zêhniyetê yên hê jî para wan a heqîqetê gelekî zêde û nirxên etîk-estetîk ên jiyanê hiştin. Şoreşa Kurdistanê van destketiyên hêja yên jiyan û zêhniyetê dikare bi pratîka xwe re bike yek û şensê xwe baş binirxîne. Li dijî hêmanên modernîteya kapîtalîst kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyalîzma ferd û ferdperestiya bi dafikan barkirî, heqîqetê dadiqurtîne û bûye mîna cinawirekî çavsor ê gelekî zêde dixwe, neteweya demokratîk, ekonomiya kominal û îndustriya ekolojîk di zikhev de bêne meşandin û bibin şêwazekî jiyana civakî pêkan e ku ferdê demokratîk û sosyalîst pêk bê. Şoreşa Kurdistanê dikare şoreşa xwe ya zêhniyet, etîk û estetîkê gelekî kûr bike û bike malê ferd û bi vî awayî li nava gelên Rojhilata Navîn belav bike. Dikare bi şoreşa xwe alîkariyeke girîng bi çanda dîrokî ya Rojhilata Navîn re bike ku her tim xwe bi yekparetî û gerdûnîtî nîşan daye. Ji bo vê mirov dikare jiyanê bi xwe û her qada wê weke dibistanekê binirxîne. Ferd û gelên her tiştê xwe ji dest dane şensekî wan bi awayekî erênî jî ew e, nirxên şoreşî bi awayekî bi azadî, etîk û wekhevî barkirî dibînin, mîna bêhn li wan çikiya be hilmê dikişînin nava xwe û qebûl dikin. Bihêlin bila verşiya modernîteya kapîtalîst bi me nebe. Gelekî baş e ku bi me nebûye, yan jî pirr kêm bi me bûye. Ya herî bi heybet jî ew e, em li gorî xwezaya xwe ya civakî û bandora xwe ya ferdî, nirxên modernîteya demokratîk, neteweya wî ya demokratîk, şêwazê wê yê ekonomiya kominal û jiyana ekolojîk, zanista wê, felsefeya wê û hunerê wê bi awayekî azad, wekhev û demokratîk parve bikin û bikin malê civakê.

**ENCAM**

Dibe ku pêşkêşkirina parêznameya şexsekî di asta gerdûnî de mirovan matmayî bihêle û weke tiştekî zêde mezinkirî bê dîtin. Lê tişta ev parêzname dixwaze îspat bike jî ew e, gerdûnî û xwecihî bi hêsanî ji hev nayên cihêkirin. Bi diyardeyeke gelekî vemirî ya mîna Kurdan ku gelekî hatine jibîrkirin û di nava refên tozgirtî yên dîrokê de hatine hiştin, me gav avêt serhatiya xwe û pirsgirêka ji vê diyardeyê derketiyê holê nîşan daye ku çareserî bi tenê di asta gerdûnî de pêkan e. Mirov bi xwe hebûneke gerdûnî ye. Ji ber ku mirov hebûneke gerdûnî ye, bi tevahî raz û sirrên der barê gerdûnê de li cem mirov veşartî ne. Ev nayê wê maneyê, cudahî û nirxa tekîtî, xwecihî û kêliyê tineye. Berevajî gerdûnîtî bi beş û tekîtiyê pêkan e. Gerdûnîtî tevahiya hemû beş û tekan îfade dike. Di gerdûnê de her tekek û beşek beramberekî xwe heye. Li muqabilî vê jî di her tek û beşekî de şopeke gerdûnîtiyê heye. Pêvajoya jêre bûyîn tê gotin, fonksiyona diyalektîkî ya di navbera beşî û gerdûnî de ye.

Em tên û diçin gelekî serî li vê prensîba bingehîn a felsefeyê didin, ji ber ku Kurd yek ji wan diyardeyên dîrokî û civakî ye, gelekî zêde hatiye înkarkirin û îmhakirin. Yekdestdariya mêtinkarî û zordestiyê ya di mentiqê şaristaniya dewletdar de tevahiya dîrokê ji ser serê Kurdan ti carî kêm nebûye. Kurd weke mîrasgirê herî kevin ê civaka qebîleyê ya bi hemû heybeta xwe bi şoreşa neolîtîkê rabûye, ewqasî di vê serdema mirovatiyê de bist bûye, hema bêje şopên jiyana beriya bi panzdeh hezar salan hê jî li ser hene. Li aliyê din jî dikeve bin bandora hêzên hegemonîk ên global ên serdemê. Di vê çarçoveyê de wê weke ferd çi bi serê me bihata? Mumkîn bû ku em ji civakbûnê derketana? Em heta nebûna beş, xwecih, em ê çawa bibûna global? Me hê nû gavên xwe avêtibûn jiyanê, Kurdîtiyê weke zincîrekê lingên me girêdabûn. Derketina ji Kurdîtiyê belkî bibûya çareserî û mirov bi vî awayî bifikiriya. Lê di berdêla çi de? Hingê ji mirovbûnê wê çi di destê me de bimana? Pirsgirêka Kurd ne weke her pirsgirêka neteweyî bû, ne weke her pirsigrêkeke civakî bû jî. Eger weke Kurdîtî em behsa rengekî gelekî mêşmirî dikin, hingê em jî bi awayekî mîna hovan di çarçoveya marjînal de mehkûmê wê bûbûn. Cezayekî gelekî giran e ku mirov weke hovekî marjînal mehkûmê jiyanê bibe. Parastin çiqasî kûr û berfireh dibû mîna bîrekê mirov dikişand hundirê xwe û bi tenê bi vî awayî ji me dihat ku em xwe nas bikin. Li aliyekî di kûrahiya dîrokê de em li xwe digeriyan, li aliyê din jî di pêngavên serdemê, modernîteyê de ku pê parçeyên me yên mayî dadiqurtand, me pê hewl dida rastiya xwe nas bikin. Em ji ya xwe nedihatin xwarê û me dixwest em bibin ferdên mirov ên bi rûmet û vê jî weke wezîfeyekê li ser me ferz dikir ku em ji her alî ve heqîqetê keşif bikin. Wezîfeyeke bi vî rengî jî di çarçoveya gotina navdar a Hegel de em bi ser şopê xistin. Ma ne Hegel gotibû “Rastî Yekpare ye”.

Jiyana min a şexsî sedema parêznameya min e, parêznameya min jî ya jiyana min a şexsî ye. Ez ne weke her kesî, lê weke Kurdekî bi pirsgirêk neçarî jiyanê bûm û ev jî encama bi pirsgirêk a

diyardeya Kurd e. Ji bo mirov weke civak li ser piyan bimîne, divê mirov li dijî ferd û civaka bêpirsiyarî ya lîberalîzm hewl dide bi hêza xwe hemûyî pêk bîne, li ber xwe bide. Qutbûna ji civaka Kurd a ji hêza xweparastinê mehrûmkirî bi awayekî nîsbî bêhtir hêsan e. Jixwe çerxa ku civakê bi demê re qir dike ji bo bi awayekî hêsan qutbûn çêbibe şertên pêş hemû amade kirine. Lewma bêyî xatirxwestin jî qutbûna ji Kurdîtiyê pêkan e. Ji ber ku gelê bêparastin hêza wî ya lêpirsînê tineye encamên bi vî rengî yên malkambax derdikevin holê. Ji nava gelekî qutbûn evqasî bi awayekî xweber bi hêsanî pêk bê, mirov nikare ji wî gelî mîna civakên modern û civakên dewleta netewe li bendê be, xwedî li welat, ekonomî, jiyana azad û parastina nasnameyê derkeve. Bendewariyeke bi vî rengî tewş e. Emperyalîzm û mêtingerî timî bi pey ferd û civakên bêparastin dikevin. Bi hemû hêza xwe hewl didin ferd û civakên bêparastin çêkin. Di vê mijarê de dema dor tê Kurdan rewş bêhtir kambax û malwêranî ye. Kurdan ne bi tenê nikarîbûne xwedî li hebûna xwe ya civakî derkevin, nikarîbûne welatê xwe û azadiya xwe biparêzin, herweha ew xistine rewşekê ku ji xwe tirsiyane, ji xwe reviyane û ji ber xwe şerm kirine.

Diyardeya Kurd û rewşa wê ya problematîk bi gelek awayên bi heman rengî mirov dikare diyar bike. Ez gelek caran ji serhatiyên xwe û çîroka xwe mînakan didim û sedema vê jî ew e ku ez alîkariya vê wesifkirin û rengdanê bikim. Lê ev wesif û rengên wan ji ezman nehatin, bi destê mirovan bi xwe hatin afirandin. Kî ne, ev mirov, peyayên kîjan hêzan in? Bersiva van pirs û pirsgirêkan hemûyan wê yekparetiya rastiyê îspat bikira. Yên ez kirim êsîr bêguman ev hêz bûn. Hemû jî bi maske bûn. Yek ji wan jî weke xuya dikir nebû, nedibû ku weke xuya dikirin jî bibûna. Ji bo ku mirov li rastiya wan a sergirtî serwext bibûya hewcedarî bi xebateke mezin hebû. Ji bo min, gavavêtina nava van serhatiyan û dewamkirina wan, ji jiyana mirovên destpêkê yên li nava daristanan belkî bêhtir zor û zehmet bû. Ji ber ku mirovên modern ên xwe amade kiribûn hebûneke civakî tesfiye bikin, bi awayekî mirov nikare wan bi ti cinawir û hovên ti serdemê bide ber hev bi tehlûke bûn, bi pîlan bûn, bi rêxistinî bûn û xwediyê cihêwaziyekê bûn ku kuştin kiribûn huner û pê radibûn.

Eger min jiyan bi Kurdîtiyê re, Kurdîtî jî bi jiyanê re wekhev nedîtiya, min ê ti carî nikarîbûya civakbûneke rastî fêhm bikira. Pîvana bivênevê ya jiyaneke hevgirtî bi rastiya civakbûnê re têkildar e. Di dîroka modernîteya kapîtalîst de rola dane zanistên civakî ew e, qutbûna ji rastiya civakî rewa û heta weke pêşketinekê ferz dike. Li ser navê zanistê derbeke girîng a li civakbûnê tê xistin jî ev e. Dema di çarçoveya Kurdan de behsa vê yekê bê kirin, qutbûn bi rizgarbûnê re wekhev tê dîtin. Kurdan bi xwe qutbûna ji xwebûnê kiriye sedema rizgarbûna xwe. Dema mirov bibêje ti têkiliya min bi xwebûna min re nemaye, ev dikare mirov rehet û biste jî bike. Encama vê gavavêtinê jî ew e, heman kesên gav avêtine bi kîjan nasnameyên li wan rasthatî re bûbin yek, bi çavkorî û çavsorî li van nasnameyan xwedî derketine.

Em van sedeman hemûyan bi armanca diyarkirina beş û tektiya diyardeya Kurd diyar dikin. Em heta beş û tekîtiya Kurdîtiyê rast diyar nekin, em nikarin cihê wê di nava gerdûnîtiyê de jî diyar bikin. Em li binê dîrokê li deverên kûr li prototîpên diyardeya Kurd digerin da ku em xwecihtiya wê rast fêhm bikin. Ji ber ku em dizanin, bi tenê bi awayekî dîrokî mirov dikare li diyardeyên civakî serwext bibe, em vê lêkolînê dikin. Lê em çiqasî neçar man ku di tekîtî û xwecihtiyê de li Kurd bigerin, ewqasî jî em neçar man ku fêhm bikin di gerdûnîtiyê de jî xwedî maneyekê ye. Xwecihtî û xwesertî bi tena serê xwe hîç raveker nebûn. Ravekirineke temam a têrê bike bi tenê bi analîza rewşa wê ya di gerdûnîtiyê de pêkan dibû. Lewma me tevahiya dîrokê gerdûnîtiyên hukim li hemû xwecihtiyan kirî weke dîroka gerdûnî xist ber lêpirsîn û lêkolînê. Ravekirinên me yên der barê dîroka şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst de encamên vê lêkolînê bûn.

Mirov Kurdîtiyê bi tenê weke diyarde lêbikole, ji bo terîf û danasîna wê têrê nake. Ji ber ku aliyekî din ê meseleyê heye, ew jî çawabûna wê ye. Kurdîtî ji dema ku weke diyarde bi gewde bûye û vir ve pirr zêde bi pirsgirêk bûye û lewma jî Kurdîtî bêşens e. Şert û mercên jeopolîtîk jiyana bi pirsgirêk weke çarenûsê pê daye qebûlkirin. Me dît, di tevahiya serdemên dîrokê de ev bi vî rengî ye. (Me Kurdî halê xwe wer dî) Jixwe dema dor tê modernîteya kapîtalîst, pirsgirêk êdî ne bi tenê pirsgirêk in, bi temamî dibin qirkirin. Êdî guftûgo tê kirin, gelo wê karibe hebûna xwe biparêze yan na, heta wê hebe yan jî tinebe.

Mirov xwe bide ber Kurdîtiyeke pirsgirêkên wê û diyardeya wê ewqasî dîrokî û berfireh, tiştekî wisa ye, mîna ku mirov xwe bide ber barê çiyayekî. Me PKK û variyasyonên wê bi sedema xwe bidin ber vî barî kirin amûr û navcî. Hêsan nîne ku mirov xwe bide ber barên civakî. Hela ev bar di nava lep û pencên qirkirinê de bin, mirov dikare fêhm bike ku kesên bibin navcî û xelaskar hewldanên wan çiqasî di rîskeke mezin de ne. PKK û yên ji wê zêdebûn, hem xwecihtiya Kurd weke diyardeyeke bi pirsgirêk, hem jî di warê gerdûnîtiyê de li beramberî vê diyardeyê çi tê weke heqîqet îfade dikin. Xwe weke berdevkên sereke yên heqîqeta Kurd û çalakgerê wê îlan dikin. Êdî PKK û yên jê zêdebûn weke îfadeya diyarde û heqîqeta Kurd dest bi rêwîtiyeke diyalektîk kirin. Kengî diyarde-bîrewerî (heqîqet) bibe rastî pêvajoya em jêre dibêjin pêkhateya diyalektîk an jî tevgera rizgariyê bi xwe derdikeve holê.

Mirov dikare vegotin û çalakiya PKK'ê bi awayekî naskirin û gerdûnîbûna nasname û beşa Kurd terîf bike. Vegotin û çalakî ji bo diyardeya Kurd a gelekî bi krîz e, weke îdeaya çareseriyê û pratîka wê manedar dibe. Kengî modernîteya kapîtalîst bû hêza hegemonîk hingê gelek diyarde di nava civakê de bûn pirsgirêkên mezin; bi vegotin û çalakiyên bi heman rengî bersivên van hatin dayîn. Nexasim sosyalîzma pêkhatî, demokrasiya civakî û tevgerên rizgariya neteweyî tevgerên bi vî rengî ne. Ji modernîteya kapîtalîst hat ku van hersê tevgerên rizgarîxwaz ên wekhevî û azadiyê di nava hêmanên xwe de bihelîne. Hindek be jî PKK ji van hersê varyantên sosyalîzma zanistî bi tesîr bû. Lewma mirov dikarîbû li bendê be ya bi serê wan de hat bi serê

PKK'ê de jî bê. Kengî PKK'ê di warê îdeolojîk, polîtîk û eskerî de zor da derfetên çareseriyê pirsgirêkên bi wan re rûbirû bû bi yên van varyantan re wekhev bûn. PKK'ê pirsgirêkên bi vî rengî yên ji ber xeta xwe ya îdeolojîk û polîtîk, hewl da bi teorî û têgînên der barê modernîteya demokratîk de bibihure. Ji ber ku li nava dinyayê sosyalîzma pêkhatî ji hev de diket, qîmeta xwe nedima û ya bi serê neteweparêzî û demokrasiya civakî de hatibû bi serê PKK'ê de neyê gavavêtinên bi vî rengî yên îdeolojîk û polîtîk hewce dikir. Ji bo ku di nava hêmanên modernîteya kapîtalîst de nehele bivênevê diviyabû alternatîfa wê pêk bianiya.

Modernîteya demokratîk a alternatîf li hemberî sê hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst kara herî zêde, dewleta netewe û îndustriyalîzmê bi sîlehên xwe neteweya demokratîk, ekonomiya kominal û îndustriya eklojîk bi awayekî îdeal gav avêt. Eger têgînên modernîteyê nehatana guftûgokirin wê qutbûneke radîkal ji kapîtalîzmê çênebûya. Di serî de meylên sosyalîzma zanistî û anarşîst, gelek alternatîfên îdeolojîk ên rastgir û çepgir ku xwe antî-kapîtalîst dihesibandin, bi sedema ku nikarîbûn kapîtalîzmê weke modernîteya hegemonîk analîz bikin û ji wê bibihurin bi ser neketin. Lewma diviyabû mirov guftûgoyên li ser modernîteyê berfireh bike û bi vî awayî mirov ê karîbûya teorî û têgînên modernîteyên cuda ji nû ve manedar bike. Modernîteya demokratîk a me xwest em weke alternatîfekê biberidînin yek ji van paradîgmayên modernîteyên cuda ye. Bêguman gera li modernîteyên din jî pêkan bû. Serdestiya modernîteya demokratîk ew e, bi perspektîfa desthilatdarî û dewletdariyê li pirsgirêkan nanêre. Hem sîstemên şaristaniyê yên di dîrokê de di çarçoveya desthilatdarî û dewletê de çêbûn, hem jî nûnerê şaristaniyên dîrokî yê serdema me modernîteya kapîtalîst, bi perspektîfa desthilatdarî û dewletdariyê nêzî pirsgirêkên civakî dibin. Lê bi herhalî desthilatdarî û dewlet bi xwe çavkaniya wan pirsgirêkan in ku dixwazin bi riya şîddetê çareser bikin. Desthilatdarî û dewlet weke rêxistiniyên şîddetê çiqasî mezin bibin û dest werdin civakê, ewqasî pirsgirêkan mezin dikin, pêşde dibin û bêçareserî dihêlin. Tevahiya dîrokê ezmûnên şaristanî û modernîteyan bi bêhejmar mînakan îspat dikin ka hewldanên di vî warî de çiqasî pirsgirêkan diafirînin. Modernîteya demokratîk modelên çareseriya pirsgirêkan ên bi perspektîfa desthilatdarî û dewletê rexne kir û li ser alternatîfa çareseriyê ya navenda wê ne dewlet û ne desthilatdarî mitale kir. Di encama vê mitalekirinê de têgîna çareseriya demokratîk derket holê û beridî.

Lê ev têgîn têkiliya xwe bi têgîna 'demokratîkbûn û mafê mirovan' a lîberalîzmê re tineye, bi temamî berevajiyê wê îfade dike. Lîberalîzma ku xwest sosyalîzm û mafê ferd dejenere bike, li têgîna demokratîkbûn û mafê mirovan xwedî derket. Lîberalîzm bi xwe demokratîk nîne, lê kirasê demokratîk li xwe dike. Tevî ku dibe îdeolojiya wê sîstema ku mafê mirovan ji holê radike, weke parêzvanê sereke yê mafê mirovan xwe ber dide meydanê. Modernîteya demokratîk bi çareseriyên xwe yên demokratîk, bi teorî û têgînên xwe yên der barê wekhevî û azadiya mirov de hewldanên jirêderxistinê yên lîberalîzmê pûç dike û maskeyên li ber rûyê wê tîne xwarê.

Heman tiştî der barê diyarkirina mafê çarenûsî yê neteweyan de jî pêk tîne. Lîberalîzm îdeolojiya moderníteya kapîtalîst e. Sîstema kapîtalîst jî bi xwe pirsgirêka neteweyî derxistiye holê û lîberalîzm bi xwe berdevkiya vê sîstemê dike; ji bo çareseriya pirsgirêka neteweyî modelên desthilatdarî û dewletdariyê pêşniyar û ferz dike. Çawa ku meyla kara herî zêde daneheva sermayeyê zêde dike, modelên desthilatdar û dewletdar jî desthilatî û dewletan timî zêde dikin û dikin ku derketina ji nava pirsgirêkên neteweyî ne pêkan be. Li gorî vê modelê desthilatdariyên dewletê bi awayekî bêdawî tê zêdekirin û bi vî awayî dikare kîjan pirsgirêka neteweyî û hindikayiyan çareser bike. Ji dusedî zêdetir dewletên fermî yên heyî hene û li van dewletan beşên wan ên xwecihî û bi hezaran ên nû bêne zêdekirin wê çawa pirsgirêk bêne çareserkirin. Jixwe dewletên netewe û desthilatdarî yên bi awayekî daneheva sermayeyê ya bi sazî bûyî ne, çiqasî zêde dibin zordestî û mêtinkarî zêde dibe ango her cure pirsgirêka civakî û neteweyî zêde dibe. Rastiya desthilatdarî û dewletê ya serdema me vê nirxandinê têra xwe piştrast dike.

Moderníteya demokratîk di vê mijarê de weke encama çareseriya demokratîk nêzîkatiya xwe ya neteweya demokratîk nîşan da. Neteweya demokratîk netewebûyîneke welê ye, xwe nasipêre desthilatdarî û dewletê, gel xwe bi xwe dike netewe û polîtîka ji bo vê hewce jî pêk tîne. Ne bi tenê polîtîka, gel hewl dide îspat bike ku bêyî bibe desthilatdarî û dewlet, dikare bi saziyên xwe yên ekonomî, xweparastin, huqûq, dîplomasî, karûbarên civakî û xweseriya çandî netewebûyîna xwe pêk bîne û xwe weke neteweya demokratîk ava bike. Li gorî pîroza moderníteya kapîtalîst di serdema me de bi tenê şêweyekî dewletê pêkan e, ew jî dewleta netewe ye. Ya rastî ne weke ku her kes yeqîn dike ye, dewleta netewe ya lîberalîzmê laîk jî nîne. Berevajî, têgihiştina dewleta netewe ya xweserî serdema navîn bi şêweyekî modern bi neteweperestiyê hatiye cîlakirin; bi gotina Hegelî bi Şoreşa Franseyê re rewşa berbiçav a xwedê ye ku hatiye rûyê erdê. Hegelî bi vê şîroveya xwe hukmekî di cih de daye û gelekî rast e. Em cîla li ser rûyê dewleta netewe çiqasî jê bibin, em ê di binê wê de pûtên xwedayên serdema destpêkê û navîn bibînin. Em heta bi vî awayî rûyê rastî yê dewleta netewe nebînin, em ê nikaribin ti pirsgirêka civakî û neteweyî fêhm û çareser bikin. Moderníteya kapîtalîst bi şerên dewletdariya netewe yên çarsed salên dawiyê komên mirovan, komên etnîk û kategoriyên civakî yên cihêreng parçeparçe kirin û di nava gola xwînê de xeniqandin, lewma çareseriya neteweya demokratîk ji bo van civakên di nava çarsed salên dawiyê de ketine ber çerxa qirkirinê ya moderníteya kapîtalîst çareseriya pirsgirêka neteweyî ya herî aştiyane, azad, adil û bêyî xwînrijandinê ye.

Mirov ji bo îndustriyalîzma ku moderníteya kapîtalîst bi armanca herî zêde wê bi kar tîne jî heman tiştan bîne ziman. Rola îndustriyalîzmê di kara herî zêde de bingehê tevahiya pirsgirêkên civakî û neteweyî ye. Sedema yekane ya pirsgirêkên hawîrdorê ye. Li hemberî îndustriyalîzma bi tenê ji kara herî zêde û daneheva sermayeyê re xizmetê dike, dinya me nikarîbûye dused salan jî li ber xwe bide. Ji bo daneheva sermayeyê bi vî awayê xwe yê heyî dewam bike wê pêdivî bi

çend dinyayên din jî hebe. Jixwe dinya me li ber îflas û têkçûnê ye. Modernîteya demokratîk bi teorî û têgînên xwe yên ekonomiya komin û îndustriya ekolojîk li dijî harî û çavsoriyên modernîteya kapîtalîst a xwe disipêre kara herî zêde û îndustriyalîzmê, ji bo parastina ferd û civakê derfet û îmkanên herî baş ên sîstematîk pêşkêş dike. Mirov zanista polîtîka ekonomiya lîberal ku kara herî zêde û îndustriyalîzmê mîna dewleta netewe pîroz dike û weke heqîqeta bi tenê nîşan dide, rast rexne bike hingê mirov ê bibîne ev amûr tevî civakê hawîrdora wê jî hildiweşînin. Sosyalîzma zanistî îndustriyalîzm hîç rexne nekir, li kara herî zêde jî bi awirekî ekonomîk temaşe kir û li hemberî wê weke alternatîf ekonomiya dewletê danî û ev şaşiya wê ye. Ev bi awayekî lîberalîzma çepgir bû; çareseriya pirsgirêkên civakî ji desthilatdariya dewletê re hiştiye. Di encamê de bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re derket holê ku ekonomiya bi destê dewletê û îndustriyalîzm amûrên çareserkirina pirsgirêkên civakî nînin.

Modernîteya kapîtalîst xwe kir hegemonîk, weke rastiya bi tenê ferz û rewa kir û ev di bêtesîrkirina muxalifên wê hemûyan de bi roleke girîng rabû. Li şûna ku guftûgo di çarçoveya modernîteyê de bêne kirin, bi tenê bi aliyê daneheva sermayeyê bi sînor man. Bi giranî hêmanên modernîte jî hatin qebûlkirin. Nêzîkatiyên modernîteyê di helandina tevahiya muxalifan de diyarker bûn. Nêzîkatiya pirr modernîst a sosyalîzma pêkhatî sedema bingehîn a tesfiyeya wê bû. Modernîteya demokratîk ne bi tenê polîtîka ekonomiyê ya kapîtalîzmê, sîstematîka wê jî rexne dike. Weke sîstemeke hegemonîk têkiliya wê bi dîroka şaristaniyê re, guhertinên wê yên di diyardeya bajar, çîn û dewletê de kirî, li ser bingehê kîjan hêmanan modernîteyê xwe hûnandiye û bi tevahî wê rexne dike, rastiya wê derdixe holê. Modernîteya kapîtalîst bi hegemonya îdeolojîk a li ser zanist, felsefe û hunerê timî xwe rewa dike. Nava van qadên bingehîn ên zêhniyetê pûç dike, wan dike amûr û bi vî awayî zirara dide civakê mezin dibe. Zanist, felsefe û huner êdî amûrên ravekirina heqîqetê nînin. Weke amûrên bi temamî ketine xizmeta kapîtalîzmê, rola wan bi rewakirina sîstemê û bi dest ve anîna kara herî zêde bi têne bi sînor kirin; bi vî awayî ji cîhana serdema navîn bi tehlûketir bi dogmatîzmayan dixeniqin.

Rexneyên modernîteya demokratîk der barê qadên zêhniyetê de bi tenê bi çareserkirina dogmatîzma di van qadan de bi sînor namîne. Ji bo zanist, felsefe û huner di civakê de bi awayekî hêja bi rola xwe rabin pêşiyê li wan vedike. Jixwe modernîteya demokratîk bi xwe jî kengî modernîteya kapîtalîst ji aliyê zanistî, felsefî û hunerî ve rexne bike dikare xwe bi sazî bike, amûrên xwe yên têgînî çêke. Ji pêxîrtengiya cîhana zanîngeh û akademiyan a modernîteya kapîtalîst bi avakirina saziyên akademîk ên der barê her qada civakê û zanîngehên azad de bibihure û çareser bike. Hegemonya îdeolojîk a sîstemê çiqasî ji hev de bikeve, ewqasî jî pêşî li zêhniyeta modernîteya demokratîk vedibe. Ev jî ji nû ve pêşiyê li avabûna modernîteya demokratîk vedike.

Şoreşa Kurdistanê ya bi teorî û têgînên modernîteya demokratîk ji nû ve hatiye hûnandin, eger bi awayekî hêja pêşketina xwe ya pratîk dewam bike, wê ne bi tenê çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd pêk bîne; çareseriya xwecihî ya şoreşê wê di heman demê de bibe yekpare çareseriya herî tekûz a gerdûnî. Her şoreş di heman demê de xulaseya bi tevahî şoreşên rabihuriyê ye û tê wê maneyê ji wan bihuriye. Li gorî potansiyela xwe û hêzên li dijî wan têdikoşe divê Şoreşa Kurdistanê hem ji dîrokê hem jî ji modernîteyê hesab bipirse. Eger di vê çarçoveyê de hesabpirsînê bi awayekî serketî bike, wê alîkariya herî girîng bi gerdûnîtiyê re bike. Li ser riya gerdûnîbûnê Rojhilata Navîn rawestgeheke stratejîk e. Eger di roja me ya îro de wê şoreşeke cîhanê bibe, nîşane hemû didin xuyakirin ev ê di çarçoveya çanda Rojhilata navîn de bibe. Bandora şoreşên Ewrûpayê li Rûsya, Rojhilata Dûr, Emerîka Latîn û Efrîkayê ti carî ji modernîteyê nebihurîn. Heta pirraniya wan di xizmeta modernîteya kapîtalîst de bi rolên girîng rabûn. Bi rêbertiya 'Partiyên Kominîst' Şoreşên Rûs û Çînê di belavbûna modernîteya kapîtalîst li nava dinyayê de bi roleke girîng rabûn û dema ev rola wan li ber çavan bê girtin, hingê ya em dixwazin bibêjin wê baştir bê fêhmkirin. Şaxên şoreşên dinyayê yên di çarçoveya modernîteya kapîtalîst de li Rojhilata Navîn bi ser neketin. Bêguman di vê de pareke mezin a çanda herêmê hebû. Çanda modernîteyê nikare bi temamî çanda herêmê fetih bike. Ji ber ku berxwedaneke bi hêz a çandê heye. Ne bi tenê çanda Îslamî li ber xwe dide, ji çanda Îslamî wêdetir çanda herêmê ya ku mîrasgira tevahiya serdemên dîrokê ye, li ber xwe dide.

Berxwedan bi tena serê xwe têrê nake ku mirov hegemonya modern hilweşîne û alternatîfa wê pêk bîne. Ji bo avakirina modernîteya dijber hostetî divê. Di vê mijarê de Şoreşa Kurdistanê dikare ji wezîfeya avakirinê re pêşengiyê bike. Rewşa Kurdistanê di vî warî de ji her alî ve di cih de ye. Beriya her tiştî di nava sê neteweyên mezin ên herêmê de cih digire. Ji aliyê Ereb, Tirk û Îranê (Ecem) ve dor lê hatiye girtin. Jixwe van neteweyên navbihurî her yek ji wan parçeyekî Kurdistanê xistine bin serweriya dewleta xwe ya netewe. Herweha Kurdistan weke welat gel û çandên din ên qedîm di nava xwe de dihewîne. Di serî de Ermenî û Suryanî, Tirkmen, Ereb û hêmanên din ên çandî û neteweyî kêm zêde bi cihbûyî ne. Tevahiya dîrokê navenda xweparastin û derketina holê ya gelek dîn û mezheban e. Di serî de şoreşa mirov a Homo Sapiens a dîrokê ji şoreşên mezolîtîk, neolîtîk, koledariya antîk û serdema feodal re bi rola dergûşê rabûye. Di roja me ya îro de jî çarenûsa 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' ê modernîteya kapîtalîst wê karibe bi bûyerên li Kurdistanê diyar bibe.

Em dema van faktoran hemûyan li ber çavan bigirin, di çarçoveya modernîteya demokratîk de ji bo ku Şoreşa Kurdistanê nebe şoreşa demokratîk a Rojhilata Navîn zêde ti sedem namîne. Li pêşiya wê hinek asteng hebin jî bivênevê pêşketin ê bibe. Pirsgirêka Kurd li Kurdistanê di çarçoveya neteweya demokratîk de bê çareserkirin, wê li pêxîrtengiya dewleta netewe li Rojhilata Navîn û xetimîna bûye sedema wê, bandoreke mezin bike. Ji niha ve xuya dike ku li Tirkiyê, Iraq, Sûrî û Îranê pêxîrtengî, xetimîn û şerên dewletên netewe bûne sedema wan bi

tenê bi neteweya demokratîk çareser dibin û ji bilî vê riyek din gengaz xuya nake. Eger di dewleta netewe de israr dewam bike, ev tê wê maneyê pirsgirêk û şer ê dewam bikin. Eger wekî din dewletên netewe (mînak dewletên netewe yên Kurd û Filistînê) bêne avakirin ev dewlet ê alîkariya çareseriyê nekin, bi tenê wê li pirsgirêkên heyî yên nû zêde bikin. Eger tişta weke çareserî pêşkêş bikin hê bêhtir kapîtalîzm û îndustriyalîzm be, çawa ku li gelek guherên dinyayê tê dîtin, wê ev rewş bêhtir krîz, bêkarî, şer, talana hawîrdorê û qirêjbûna avhewayê be. Şoreşeke Kurdistanê ya ne bi tenê bi hêmana neteweya demokratîk a modernîteya demokratîk bi hêmanên wê yên din ango ekonomiya komin û îndustriya ekolojîk pêk bê û li ser mîrateya şoreşên rabihurî mezin bibe û ji wan jî bibihure, wê karibe bibe destpêkeke têkûz a şoreşên sedsala 21. û stûna navmalê.

Di çavkaniya pirsgirêkên civakên Rojhilata Navîn de desthilatdarî û dewletdariya zêde heye. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de her hêza ku bi armanca çareseriya pirsgirêkan derket holê, ji bilî ku xwe bisipêre bêhtir hêz û bidestxistina erka dewletê, çareyeke din nedît. Ji Împaratorê herî li serî heta bi mêrê malbatê her hêzê ji bo çareseriyê pêşî hêz bi kar anî û ev bû çoyê bi sêhr ê desthilatîbûn û dewletîbûnê. Şaristaniya Rojava şêweyên modern ê vê rêûresmê afirandin. Yeqîn kir ku bi cîlaya demokrasiyê desthilatî û dewlet ê demokratîze bibin an jî lîberalîzmê serî li vê sextekariyê da. Li Rojhilata Navîn a roja me ya îro hê jî pirsgirêkên sereke li ser bingehê desthilatîbûn û dewletîbûnê têne çareserkirin û hewl didin bi vî awayî çareser bikin. Mînak li Iraqê li şûna dewleteke netewe bi sê yan hê bêhtir dewletên netewe, li Filistînê ji niha bi sê dewletan, li Afganistanê bi qasî hejmara eşîran bi dewletokan hewl didin pirsgirêkan çareser bikin. Jixwe elîtên desthilatdarî û dewletê têra xwe bûne bar û li van ên nû bêne zêdekirin, wê ev bi tenê zordestî û mêtinkariyê zêdetir bike û ji vê pêve encameke din dernaxe holê. Ev jî tê wê maneyê pirsgirêkên civakî û şer ê zêde bibin. Şoreşa Kurdistanê çareseriya neteweya demokratîk bi rêveberiyên konfederal û avakirina otorîteya demokratîk bi sazî bike, ev model ê girêkên kor ên desthilatdariya hezarê salan a Rojhilata Navîn û nexweşiyên wê yên dewletdariyê karibe çareser bike û rê li ber veguherînên bi kok veke. Tişta ku çand û gelên Rojhilata Navîn pirr hewcedarî wê ne, otorîteya demokratîk e. Ji bilî vê, ceribandina hêzê û pêngavên çareseriyê yên xwe disipêrin erka dewletê, çawa ku me di mînakên wan ên heta niha ceribandî de dîtine, wê rê li ber jiyanekê vekin ku di bin pirsgirêkên giran ên civakî de bimîne.

Li Rojhilata Navîn bi navê jiyanê bi tenê nexweşî heye. Bi dewleta netewe ya di xwe de, pirsgirêk bi ber bayê ketin. Hegemonya Rojavayî kengî nikarîbû xwe li herêmê bi sazî bike, bi kêmanî bi dewletên netewe yên mînîmalîst karîbû bi sîstema xwe ve girê bide. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, vê rêbazê îflas kiriye, têk çûye. Saziyên di asta neteweya demokratîk de ku Şoreşa Kurdistanê wê wan pêk bîne û ava bike, wê karibin vê rêûresmê berevajî bigerînin. Li ser bingehê çandên hevpar ên di dîrokê de hatine parvekirin Şoreşa Kurdistanê wê karibe Yekîtiya Neteweyên Demokratîk pêk bîne. Divê mirov hêmanên demokratîk ên çanda Rojhilata Navîn

piçûk nebîne. Kevneşopiyên qebîle û eşîrê yên hê jî bi hêz in, rêûresmên dînî û cemaetî bi pîvan û saziyên netewebûyîna demokratîk re bi yek bin, pêkan e ku bibin hêza demokrasiyê. Divê mirov ji bîr neke ku desthilatdariya despotîk çiqasî ya bikaranînê be, bi kêmanî ewqasî jî pêdivî bi hewcedariya bi demokrasiyê heye û dikare pêk bê. Li her devera desthilatdarî bi hêz be li wir hêza potansiyel a demokrasiyê jî mezin e. Pirr eşkere derketiye holê, Rojhilata Navîn bi têgihiştinên heyî yên netewe û desthilatdariyê bi rêve naçe. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên neteweyî û herêmî ji niha ve divê ban û sîwana Yekîtiya Neteweyên Demokratîk bi lez bê avakirin. Li ber çavan e, ti dewlet bi tena serê xwe nikare bi pirsgirêkên mezin dibin serî derxe, lewma yên xwe nedin ber yekîtiyê û jê birevin, bêîddîa ne, û ev helwest bi xwe bi çaresernekirinê re yek e. Mirov nikare dewletbûyîna netewe ya Kurdistanê (li ser navê Kurdan) weke pêşketineke şoreşgerî binirxîne. Bi tenê wê li pirsgirêkên giran ên herêmê yeke din bê zêdekirin. Dewleta netewe ya Kurd a li Iraqê tê ceribandin, eger bi netewebûyîna demokratîk dor lê bê girtin û mirov karibe wê weke yêdekeke lihevhatinê ya pêvajoyê bihêle, hingê dikare li Kurdistanê û li nava Rojhilata Navîn bi roleke erênî rabe. Yan na divê mirov li bendê be ku rê veke li ber pirsgirêkên ji problematîka Îsraîl û Filistînê girantir.

Çareseriya modela neteweya demokratîk ferz dike, ne înkara dewletên netewe ye, bi çareseriya destûra bingehîn a demokratîk ve girêdayîmayîna wan ferz dike. Li Ewrûpaya Rojava zewaca dewlet û demokrasiyê yekane modela çareseriyê nîne. Berevajî, modelek e ku pirsgirêkên wê gelek in, û çareseriya van pirsgirêkan paşve dixe. Li Rojhilata Navîn modela ku divê bê ceribandin, çareseriya destûra bingehîn a demokratîk e; hebûn û xweseriya neteweya dewletê û neteweya demokratîk dike bingeha xwe. Ji bilî vê, modelên yekîtiyê yên derkevin holê wê ji Konferansa Îslamê û Yekîtiya Ereban (divê mirov Konseya Dewletên Tirkî jî li vê zêde bike) wêdetir neçin. Neteweyên li hundir bi sîstema destûra bingehîn a demokratîk ve girêdayî (li vir mabest ji netewe ew e, neteweya dewletê û neteweya demokratîk li hev dikin û ji vê netewe yan jî neteweya neteweyan pêk tê), di nava xwe de Yekîtiya Neteweyên Demokratîk pêk bînin, bêguman ev ê pêşketineke mezin be. Ev yek wê bi tenê aştiyeke mayînde pêk neyîne, bi yekîtiya girseyên bi tevahî ji bêkariyê xilasbûyî, û îndustriya ekolojîk û ekonomiya kominal wê bê maneya berhemdariyeke ekonomîk û Ronesanseke çandî jî. Di vê serdema teknolojî û agahiya heyî de ti kes nikare bêkarî, ekonomiya bêber û jiyana çandî ya hêvî jê nayê kirin weke çarenûsekê bibîne. Yên ku wisa bibînin an ji aliyê îdeolojîk ve çavên wan kor bûne yan jî bi hegemonya îdeolojîk a sîstemê radibin û rûdinên. Rojhilata Navîn, bi tenê li bin banê Yekîtiya Neteweyên Demokratîk dikare rola xwe ya gerdûnî ya di dîrokê de gelekî dirêj ajotiye bigire destê xwe û pê rabe. Çawa ku ez timî dibêjim, Kurd mîna rola xwe ya di dema şeveqa şaristaniyan de pê rabûn vê carê li ser bingehê şaristaniya demokratîk dikarin bi roleke bi heman rengî rabin. Potansiyela Şoreşa Kurdistanê û çareseriya neteweya demokratîk a Kurd ji bo vê her cure hêza (fizîkî û entelektuel a) pêdivî pê heye bi zêdeyî pêşkêş dike. Şoreşa

Kurdistanê ji her demê bêhtir Şoreşeke Rojhilata Navîn e. Netewebûyîna demokratîk a Kurd jî Yekîtiya Neteweyên Demokratîk a Rojhilata Navîn e.

Hingê Şoreşa Kurdistanê wê bi Yekîtiya Neteweyên Demokratîk ên Rojhilata Navîn gerdûnî bibe. Gelek yekeyên dewleta netewe yên modernîteya kapîtalîst weke Neteweyên Yekbûyî û gelek yekîtiyên herêmî (yekîtiyên dewleta netewe yên li Ewrûpa, Asya, Emerîka û Efrîkayê), ji roja hatine avakirin heta niha ji ti pirsgirêka herêmî û global re çare nedîtine. Ji ber ku dewleta netewe ji aliyê binyewî ve xetimiye û bi sedema kapasîteya wê ya ku pirsgirêkan mezin dike û wan paşve dixe, yekeyên Neteweyên Yekbûyî û yekîtiyên herêmî yên bi vî rengî jî di heman rewşê de ne. Li şûna van mînakên têkçûyî avakirina yekîtiyên nû û yekeyên ji yekeyên dewleta netewe bihurî pêdiviyek e ku divê dereng neyê xistin. Herçend pêdivî bi Yekîtiyên Neteweyî yên Demokratîk ên Herêmî heye, wekî din bi awayekî lezgîn pêdivî heye ku li şûna Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Neteweyên Demokratîk a Dinyayê bê pêkanîn. Ev yekîtiya ji dewletên netewe bihurî wê ji yekeyên neteweyî yên demokratîk pêk bê. Em çi herêmî, em çi global bifikirin, Yekîtiya Neteweyên Demokratîk ne bi tenê ji yekeyên dewletê, divê bi tevlîbûna rêxistinên civaka sivîl pêk bê. Aştiya dinyayê bi dewletên netewe yên ku çavkaniya şer in, pêk nayê. Di heman demê de bi saziyên modernîteyê yên ku çavkaniya krîzan in, xweşhalî çênabe. Mînakên heyî têra xwe vê rastiyê piştrast dikin. Çawa ku aştiya dinyayê bi neteweyên demokratîk dibe, pêdiviyên bingehîn û mafê xebatê yê gelên dinyayê jî ne bi yekdestdariyên fînansê yên li pey kara har û çavsorî diçin, lê bi yekîtiyên îndustriyê yên ekolojîk, ekonomiya ekolojîk û kominal dibe yên ku xebatê weke azadî dihesibînin û vê xebatê ji bo her kesî dixwazin.

Em pêxîrtengiya modernîteya kapîtalîst weke avabûn bi tenê ji aliyê ekonomîk, civakî û polîtîk ve nabînin; em bi vê re pêxîrtengiyeke bi kok û kûr a heqîqetê dibînin. Timî li gorî bûyerên têgihiştina li heqîqetê mirovatî beridiye. Kapîtalîzmê têgihiştina li heqîqetê ferazî kiriye û bi vê di dîroka mirovatiyê de rê li ber jiyana herî xirab, kirêt û şaş vekiriye. Li ser riya jiyana şaş jî jiyana RAST nabe. Li ser riya jiyana xirab û kirêt jî jiyana QENC û XWEŞIK nabe. Ji bo jiyanê ji şer û krîzan girantir felaketek heye ew jî ew e, mirov bi awayekî kolewarî bi qutiyên jiyanê yên ferazî girê didin û wan pê bi awayekî bi kok ji têgihiştina heqîqetê qut dikin; ango li ser riya jiyaneke xirab, kirêt û şaş a berê hatiye xêzkirin, mehkûmê jiyanê dikin. Guftûgoyên bi giştî li ser modernîteyê, bi taybetî jî li ser modernîteya demokratîk dikarin têgihiştina me ya li heqîqetê ji nû ve bi pêş bixin. Em ê karibin pê ji riyên şaş, kirêt û xirab ên ku jiyanên me têk dibin, qut bibin û bikevin ser riyên jiyanên rast, qenc û xweşik. Ji bo vê, em dikarin bi şoreşa modernîteya demokratîk, bi felsefeya civakî dibe, bi riya zanist û hunerê têgihiştina xwe ya li heqîqetê bi hêz bikin û jiyana rast, qenc û xweşik pêk bînin.

**GOTINA DAWÎ**

Di jiyana mirovekî de tişta herî hêja ew e, li heqîqeta rastiyên jiyana xwe serwext bibe. Gera li heqîqetê xebata herî hêja ya mirov e. Em bi kurtî bibêjin, mirov ew hebûn e ku heqîqetê mumkîn dike.

Dema min dest bi çîrok û serhatiya jiyana xwe kir, ez gurçûpêç nebûm. Gelekî zehmet e ku mirov di nava civakeke jihevdeketî û malbateke vê civakê ya ji hev de diket de weke zarok bê dinê û mezin bibe. Ji ber ku vê civakê rastiyên xwe ji dest dabûn û tiştekî bidaya zarokê xwe nemabû. Ya mayî cîhaneke zêhniyetê ya virtûvala bû ku li derewên bê sînor ên hukimranan vekirî bû. Ev zêhniyetên ku nikarîbûn li hemberî van zêhniyetan li ber xwe bidin, hema bêje li serê mirovan bela ne. Li civakên mêtingeh an ji mêtingehê wêdetir, piştî qonaxeke ne diyar an bi darê zorê yan jî bi razîkirinê mirov bi derewê dixapin. Cîhana hukimranan jî di vê mijarê de têra xwe xwedî ezmûn û tecrûbe ye. Baş zanin ku wê li ku û çawa derewên xwe bi awayê herî bi bandor bibêjin. Eger civak karibin ji vê bernigê derbas bibin, hingê pêvajoya jêre şoreş tê gotin dest pê dike. Bûyerên ne ji rêzê yên bi vî awayî her tim pêk tên.

Ez ji wan kesan im ku bernig mernigê, sekin meknê nas nakim li riya xwe dibezim diçim.

Keftûlefta min a di jiyanê de çi zû û çi dereng wê ez bi heqîqetên civakî re rûbirû bikirama. Beşên çîrok û serhatî yên parêznameyê, pirr bi sînor be jî li gorî deman rasthatina min a li heqîqetên civakî tînin ziman. Herweha min hewl da nîşan bidim ku min şopgeriya îdeolojîk û zanistî ya heqîqetê çawa kiriye. Min ev ravekirin hemû li dijî kê kirin? Li dijî kesên mirovatî û nasnameya min înkar kirin, dixwazin tine bikin, danûstendina gunehkarekî bi min re dikin û cezayên giran li min birrîn, min ev rave kirin. Wekî din jî li dijî wan kesan ku edaleta sîstemê li ser ferdên xwe pêk tînin û ji vê berpirsiyar in, ango li dijî DYE, YE, KT û hevkarên wê dikim.

Min di têkoşîna xwe ya li zindana servekirî de gotin û çalakiyên bi heybet dikirin, lê min di warê serwextbûna li heqîqetê de zêde firsend nedidît. Şert û mercên zindana li derve girtî, ji bo kesên pirsgirêkên wan mezin mamosteyekî xurt in. Lewma zindanên li derve girtî, ji qadên têkoşînê yên gotin û çalakiyê wêdetir ji bo kesên pirsgirêkên wan ên mezin heyî ew cih in ku serwextbûna li heqîqetê û têkoşîna wê bi xurtî û serketî lê tê kirin. Zindan ji bo ew kesên ku dozên wan ên mezin hene qadek e ku lê her roj ji bo keşfa heqîqetê têdikoşe û bi vê re heqîqetê bi dest dixe, xwe digihîne wê. Eger kêliyên zemên bi destketiyên heqîqetê tijî derbas bibin, hêja ye ku mirov xwe li jiyana di zindanê de ragire.

Sîstema hêza hegemonîk a modernîteya kapîtalîst a DYE û YE pêşengiya wê dikin ez anîm Îmraliyê. Ya ji vê jî girîngtir ew e, dema ev kir bi hêzên rewa û riyên huqûqî nekir, bi riyên ne huqûqî û ne rewa kir; bi rêxistina eskerî ya hevpar a sîstemê bi rêxistina ne qanûnî û ne nîzamî ya NATO'yê bi Gladîo'yê kir; bi operasyoneke mezin a rêxistina Gladîo'yê ez anîm Îmraliyê. Bi

awayê xuya dikir, hêzên Komara Tirkiyê ez bi operasyoneke serketî bê tesîr kiribûm, anîbûm Giravê. Dîmenê dixwestin nîşanî dinyayê bidin bi vî awayî pîlan kiribûn. Roja anîna min 15’ê Sibatê bû. Ev roj, roja 15’ê Sibata 1925’an e ku di wê rojê de komploya li dijî Şêx Seîd hat destpêkirin. Piştî Dadgeheke Giravê ya şanoyî, di 29’ê Hezîrana 1999’an de biryara darvekirinê hat dayîn. Di vê rojê de jî ango di 29’ê Hezîranê de Şêx Seîd û komeke hevalên wî hatibûn darvekirin. Eşkere bû ku heftûpênc sal bûn (li gorî sala 1999’an), operasyonên mezin ên înkar û tinekirinê li ser Kurdan bênavber dihatin meşandin. Bi YE û DYE’yê re di çarçoveya çavtirsandinê de li ser cezayê darvekirinê li hev kiribûn. Lê polîtîka hevpar a esas li ser li hev kiribûn, wê bi riya Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê ev cezayê darvekirinê pêk neanîna û di şexsê min de wê bi armanca tesfiyekirina tevgera şoreşgerî ya li derveyî kontrola wan, Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê û PKK’ê bi kar bianîna. Ev bi awayekî pirr bi dizî dikirin. Ji ber ku li hev kiribûn ku qaşo di ‘têkoşîna li dijî terorê’ de riyên rewa binpê bikin. Dixwestin Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê weke saziyeke formalîte bi kar bînin û bi vê pêkan bû ku ez jî parêznameyeke mezin pêşkêş bikim. Min hewl da vê bikim. Bi vê armancê min li pey hev parêzname nivîsîn. Bi vê parêznameya li ber destên we, min xwest diyar bikim ku heqîqetên bi pey wan ketibûm ez para bêhtir gihiştim wan. Herçiqasî bi xetên sereke be jî ez yeqîn dikim ku min heqîqetên der barê mirovatiyê, gelê me û têkoşîna me ya pêşeng de pêşkêş kirine.

Ji van parêznameyan hêviya min a huqûqî tineye û napêm. Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê di destpêkê de komplo veşart û bi vê nîşan da ku li gorî fermanên sîstemê tevdigere. Hê bi biryara wan a pêşî diyar bûbû ku bi pîvanên huqûqa bûrjûwayê be jî edalet ê tecelî neke, dad ê pêk neyê. Lê encamên siyasî yên vê parêznameyê gelekî girîng bûn. Der barê vê qadê de, ne ku bi tenê li bendê mam. Min hewl da hêza xwe ya mezin a gotin û çalakiyê, bi awayekî pirr bi sînor û bi riyên guman jê bê kirin, biceribînim. Bi vî awayî li ser riya heqîqet û siyasetê min bi piratîka zindanê ya duwanzdeh salên bihurîn azadiya zêhn û îradeyê bi ser xist. Ji bo têkoşîna azadiyê û hebûna gelê min û ji bo min a girîng ev bû. Li gorî vê qonaxa em gihiştinê, mirov dikare bibêje pîlanên gelekî berfireh ên komplogeran serketî nînin. Belkî jî cara pêşî ye ku der barê pirsa Kurd û Kurdan de xwe neçar dibînin ku ji polîtîkayên înkar û tinekirinê yên heştêûpênc salan dimeşînin (pêvajoya qirkirina çandî ya sergirtî), vegerin. Ev pêşketin û rewşeke girîng e. Pêvajoya Îmraliyê, ji bo ku îradeya dewletê bi vî awayî ji polîtîkayên berê vegere bi roleke girîng rabû.

Prensê Awusturyayê ji aliyê milliyetgirekî Sirp ve hat kuştin û Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê kir. Ez zêde mezin nakim, lê ji naverok û armancên li vê bûyerê barkiribûn zêdetir naverok û rolek li komploya li dijî min barkiribûn. Bi komployê ve girêdayî DYE û hevgirtiyên wê Rojhilata Navîn dagir kirin û mirov vê dagirkeriyê weke ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ bi nav bike, bawer dikim wê di destnîşankirina rewşê de zêdegavî nebe. Lê eger mirov di çarçoveya bûyer û encamên rê li ber wan vekirî de li rewşê binêre, mirov ê bi hêsanî karibe vê qonaxê weke bûyer û encamên wê bi ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ bi nav bike. Eger mirov tevgera li dijî min di vê çarçoveyê de

binirxîne mirov ê karibe maneya rastî bidiyê. Li beramberî ‘Şerê Cîhanê yê Yekemîn ê Sirbistanê’, ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ê Kurdistanê’ tê. Kurdistan ji aliyê jeopolîtîk û jeostratejîk ve li Rojhilata Navîn di warê destpêkirin, pêşdebirin û encamgirtina ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ de bi rola qadeke navendî radibe. Napolyon di sala 1798’an de ji bo dagirkeriya bi riya Misrê di asta stratejîk de îşaret bi girîngiya Kurdistan û Ermenistanê kiriye û ev jî nîşan dide ku ev rastî hatiye fêhmkirin. Piştî Napolyon Împaratoriya Ingilistanê xwest herêmê dagir bike û ji bo vê jî gava pêşî salên 1800’î li Başûrê Kurdistanê bi riya Silêmaniyê avêt. Weke encama vê yekê, serîrakirina pêşî ya Kurd a modern li Silêmaniyê ji eşîra Baban bi pêşengiya Ebdurrehman Paşa hat destpêkirin. Ingilîz ji bo Rojhilata Navîn dagir bikin û her cure bandorê lê bikin, herî zêde haya wan ji girîngiya stratejîk a Kurdistanê hebû. Hem ji bo polîtîkayên xwe yên der barê Împaratoriyên Osmanî û Îranê de, hem jî der barê Ermenî û Suryaniyan de texsîr nekirine û rola Kurdan ji bo armancên xwe yên stratejîk bi awayekî dijwar bi kar anîne. Hêzên ji bo armancên xwe bi kar anîne hemû têk çûne. Lê di nava van hêzan de ya herî zêde û bi awayekî dilêşane têk çû, Kurd bûn.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn Ingilistanê serê dagirkeriya li Rojhilata Navîn dikişand. Ji aliyê dagirkerî û pêkanîna serdestiyê ve Kurd û Kurdistan dîsa xwedî cihekî stratejîk bûn. Polîtîkaya Ingilistanê ya di salên 1920’î de li ser Kurd û Kurdistanê bi vî awayî pêk anî, xwest pê li Başûrê Îranê kontrola xwe zêde bike, rêveberiya Ereb a qelp li Iraqê hewceyî xwe bike û bi xwe ve girê bide, ji vê jî girîngtir Komara Tirkiyê ya bi pêşengiya Mistefa Kemal ê li ber radibû li ser xeteke mînîmalîst bigire (wê di nava wê de bihêle, nehêle li Rojhilata Navîn berfireh û belav bibe, ji qadên berê Osmaniyan lê hukim dikirin û Başûrê Kurdistanê dûr bigire). Ingilîzan di vê çarçoveyê de polîtîkayên xwe çêkirin û pêk anîn. Ev polîtîkayên li dijî Kurdan di çarçoveya Komara Tirkiyê de heta roja me ya îro hatin pêkanîn. Piştî salên 1920’an ji bo pêşî li armancên serdestiya ji rêûresmê yên serwerên Tirkan li Rojhilata Navîn bigirin, projeya komara mînîmalîst pirr bi hosteyî pêk anîn. Ji bo hegemonya Ingilistan, Îsraîl û DYE’yê weke xerca pêşî binesaziya hewce di çarçoveya pêkanîna Komara Tirkiyê de hat danîn. Bûrjûwaziya burokratîk a Tirk a Komara Tirkiyê bi bûrjûwaziya Cihû û Ingilîz re li ser erdên Anatolya û Mezopotamyayê li hev kirin û bi vî awayî Komara Tirkiyê hat avakirin. Di çarçoveya lihevkirinê de hersê hêz jî bi awayekî wekhev tevgeriyan. Eger mirov li vê lihevkirina di bingehê Komarê de serwext nebe, mirov nikare bûyerên paşê diqewimin ji hev derxe. Di sala 1926’an de hiştina Mûsil-Kerkûkê ji Ingilîzan re, di sala 1938’an de girtina Hatayê, darbeya 27’ê Gulana 1960’î, hişyarnameya 12’ê Adara 1971’ê, rejîma darbeya eskerî ya 1980’î, di sala 1993’an de kuştina Turgut Ozal, di navbera salên 1997-1998’an de pêvajoya darbeya postmodern, ji desthilatdariyê anîna xwar a Desteya Wezîran a Bulend Ecevît di sala 2002’an de û anîna AKP’ê ya desthilatdariyê di sala 2002’an de mirov di çarçoveya vê koalîsyona sêberî de li wan bifikire, mirov ê bêhtir bi awayekî rast li bûyerên girîng ên Komara Tirkiyê serwext bibe.

Min ji ber çi ev dîrokçe bi bîr xist. Ji ber ku rola dabûn Komara Tirkiyê êdî dihejiya û min xwest têkiliya vê bi komploya li dijî min re nîşan bidim. Ev Komara mînîmalîst rola wê, fonksiyona wê û naveroka wê li ser bingehekî hişk ê antî-Îslamîk, antî-Kurd û antî-kominîst hatibû programkirin û kê wê bihejanda û wê ji xeta wê derxista wê weke dijmin bihata qebûlkirin û di tinekirina wî de texsîr nekiribûna. Kî ji vê bernameyê bibihuriya wê bihata pelixandin. Şikandina berxwedana Kurd, tesfiyekirina muxalefetê, ketina NATO'yê, însiyatîfgirtina Gladîo'yê bi darbeyan, darvekirinên hatin kirin, reşkujiyên pêk hatin û provakasyonên li dijî tevgerên şoreşgerî li gorî vê programê hatine kirin. Em bi Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an re bi awayekî eşkeretir bi rastiya vê programê re rûbirû bûn. Di sala 1985'an de ji aliyê Elmanyayê ve li dijî PKK'ê kampanya antî-terorîst hat destpêkirin, di serê salên 1990'î de Serokê Fermandariya Giştî Dogan Gureş got "Ji bo em PKK û Tevgera Kurd bipelixînin Londonê lampeya kesk vêxist", Turgut Ozal niyet kir ku ji nû ve têkiliyên Kurd û Tirkan di nava aştiyê de bi rêkûpêk bike û bi vê re hat tesfiyekirin, piştî 1993'an seferên tinekirinê yên topyekûn li dijî Kurdan hatin destpêkirin, bi Başûrê Kurdistanê re operasyonên hevpar hatin meşandin, Necmettîn Erbakan ji serokwezaretiyê ve hat xistin, hewl dan Huseyin Kivrikoglu yê dihat payîn bibe Serokê Fermandariya Giştî bi reşkujiyê bikujin û di sala 1998'an de pêvajoya komploya li dijî min bi awayekî pratîkî ket qonaxeke nû. Ev bûyer û pêkanîn hemû di çarçoveya vê programê de (Komara mînîmalîst a ku vê koalîsyona sêber ew pêk anî) bi însiyatîfa Gladîo'yê meşiyan û mirov dikare van bûyer û pêkanînên para min û PKK'ê ketî destnîşan bike.

Min çawa gava xwe avêt Ewrûpayê Ingilistanê ez weke kesê nayê xwestin (persona non grata) îlan kir û dîsa ev di çarçoveya vê programê de dikir. Galtieri ku Şêwirmendê Taybet ê Serokê DYE'ye Clinton bû, dabû xuyakirin ku ez bi awayekî taybet bi fermana Serok Clinton hatime girtin, qada hewayî ya Ewrûpayê li balafira lê suwar bûbûm hatibû girtin, Îsraîlê ji Moskovê heta bi Kenyayê bi dijwarî ez şopandibûm û li Îmraliyê gelek pêkanînên ez bi wan re rûbirû bûm hemû di çarçoveya heman programê de hatin bicihanîn. Dadgeha mîzansenî ya li Îmraliyê, şert û mercên tecrîdê, hewldana çavtirsandinê bi dayîna cezayê darvekirinê, şerên psîkolojîk û bi awayekî rewa qebûlkirina komployê ji aliyê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê, damezrînerên rastî yên Komara Tirkiyê û ew damezrîner kî ne, her ku çû bi awayekî zelal nîşan dan. Ev rastiyên dîrokî yên min ji rabihuriya nêz mînak nîşan dan, belkî hinan razî neke. Lewma bi armanca yekparetiya parêznameyê hinekî din rohnî û zelal bike, divê ez sedemên rê li ber komployê vekirine, kesên berjewendiyên wan ketine tehlûkeyê û bûyerên rê li ber wan hatiye vekirin kitebikite bînim ziman da ku bi kêra îspatkirinê bên û mirov karibe ji wan hîn bibe.

Derketina holê ya PKK'ê bi projeya Ingilistanê ya dused salan a li ser Kurdan û Kurdistanê re li hev nedikir. Lihevnekirin bi gelek qadên îdeolojîk, polîtîk û stratejîk re eleqedar bû. Li gorî vê projeyê Ingilistan ê bi Kurd û Kurdistanê bilîsta û bi wan hêzên serwer ên cîranên Kurdistanê Tirk, Ereb û Îran-Ecem li gora dilê xwe ji nû ve dîzayn bikira. Kurd û Kurdistan ji aliyê van hersê

cîranên xwe ve hatibûn bêtesîrkirin. Ev rewşa bêtesîrkirî ya Kurdan û xwezaya wan a asî, ji bo meşandina van polîtîka û projeyan di cih de bû û rê didan ku ev polîtîka û proje bêne meşandin. Herweha li heman cografyayê ji sedsala 19. ve ji bo Ermenî, Suryanî û Cihûyan projeya damezrandina welatekî serbixwe gav bi gav pêşde dibirin. Ji bo van hersê milletan pêkanîna projeyan ji nêz ve Împaratoriya Ingilistanê eleqedar dikir. Herçiqasî xwestibûn avakirina welatekî bi Peymana Sevrê ji bo Kurdan bi proje bikin jî ev xwestekeke ji dil nebû. Bi awayekî ev para huşkirin û bêdengkirinê bû. Bi vî awayî Kurdistan tam kiribûn textekî kişikê û rola layiqî Kurdan jî dîtibûn piyontî bû. Lîstikeke bêrehm, lê lîstikeke rastî hatibû danîn. M. Kemal li derve bi Fransiyan û Rûsan, li hundir jî bi Kurdan re ji bo rizgariya neteweyî hevgirtibû û vê yekê derbeke girîng li projeya Ingilîztanê dabû. Lê Ingilistan ji ya xwe nehat xwarê. Bi têkiliyên di sala 1921'ê de bi rêveberiya M. Kemal re danî, di warê ber û rê dana guhertinên têkiliyan de zehmetî nekişand. Wê Cihûyên Sabetayî yên di nava Tevgera Jon Tirkan de bi rola pêşengiyê radibûn û Cihûyên Siyonîst ên alîgirê wê di projeya Komara nû de bi kar anîn. Bi vê koalîsyona sêber a em behsa wê dikin Komar hat pêkanîn. Ji bingehê hevgirtina şerê rizgariya neteweyî cuda li bin rejîmeke nû hat dîzaynkirin. Bi vî awayî, polîtîkaya wê ya hegemonîk a xweserî Rojhilata Navîn bi Komara mînîmalîst li ser bingehekî têkûz rûniştibû. Bûyereke ku em jêre şoreşa dijşoreşê bibêjin, bi vî awayî pêk hatibû.

Hevkartiya Ingilîz-Cihû ya xwe sipart Komarê li şûna hewldanên li Kurdistanê welatekî bibînin projeya welatavakirinê li Filistînê cih girt. Di bin destê Bolşevîkan de Ermenistana Piçûk hat avakirin, Ermeniyên li Anatolyayê hatin tesfiyekirin û li Mezopotamyayê jî heman aqûbet bi serê Suryaniyan de hat û van bûyeran kir ku Ingilîz di polîtîka xwe ya Kurd û Kurdistanê de hinek guhertinan bikin. Di berdêla Mûsil-Kerkûkê de, ango di berdêla Kurdistana Iraqa îro de Bakurê Kurdistanê bi temamî ji însafa rejîma Komara nû re hiştin. Ev bûyer ji bo Kurdan û Kurdistanê bûyereke kujer û stratejîk bû. Rejîmê di berdêla vê de bi tenê Mûsil-Kerkûk nedida, di berdêla parastina wê de heta dawiyê soza dilsoziyê û mayîna di nava yekîtiyê de dida. Ji bo vê jî hewce nake ku mirov diyardeyan ji nû ve yek bi yek rêz bike. Ya girîng ew e, encama vê hevgirtinê Kurdistana mirî û polîtîkaya Kurdên divê bêne kuştin bû. Bi ketina NATO'yê re berpirsiyariya vê polîtîkayê bi DYE û hevgirtiyên wê yên din re hat parvekirin. Jixwe hewce nake ku em bibêjin vê hevgirtinê Tirkên ummetgir, tevgerên azadîxwaz û wekhevîxwaz ên kedkarên Tirk kirin hedefa xwe.

Eşkere ye ku piştî evqas antî û dijberiyan zehmet nîne ku mirov rengê rejîmê destnîşan bike. Dema PKK derket holê haya wê ji vê statuyê tinebû. Bi giştî weke komeke piçûk di nava hêzên muxalif ên çepgir de heta bi salên 1980'î bi awayekî taybet bal nekişandibû ser xwe. Texmîn dihat kirin ku hin rêxistinên provakasyonê yên bi ser PDK'ê ve di kontrola Gladîo'yê de bi awayekî taybet êrîş dikirin. Heye ku di çarçoveya mîlliyegiriyê de PDK'ê xwe ji Kurdistanê berpirsiyar didît û dixwest tevgerên din bi sînor bike. Bi Darbeya Eskerî ya 12'ê Îlonê di

çarçoveya bûyerên hundir de bêyî cudahiya Kurd-Tirk, çepgir-rastgir, Elewî-Sunnî bikin, dixwestin hêzên li derveyî kontrolê hemûyan tesfiye bikin. Gladîo NATO di çarçoveya Tirkiyê de jî ji salên 1960'î ve kontrola xwe ya zêde dikir bi darbeya 12'ê Îlona 1980'î derxist asta herî jor. Lewma li pişt pîlana tesfiyeyê hêzên hevgirtinê hemû hebûn. Bi vî awayî rola Komarê ya ji dema damezrandinê ve hatibû dayîn bi hinek guhertinên piçûk bi awayekî esasî dewam dikir.

Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an di nava hesaban de tinebû. Ez di sala 1979'an de daketim qadên Rojhilata Navîn ên dijberên sîstemê û bêguman encamên vê çûna min hingê nedihatin texmîn kirin. Xwelihevrakişandina dawî ya hegemonîk a bi Yekîtiya Sovyetê re ji bo bipêşxistina Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê derfet û îmkanên xweş afirandibûn. Ji bo min ne zehmet bû ku ez vê rewşê bi kar bînim. Herçiqasî bi kêmanî û bi derengî be jî dema Pêngava 15'ê Tebaxê dest pê kir, ez jî di navê de, kesî nikarîbû pêşbîniya encamên wê bikira. Jixwe ev ne pêkan bû. Ji ber ku destwerdanên rojane her kêlî rê li ber bûyerên nû vedikirin. Dema pêngavê sala xwe temam kir, berevajî îddîayan, NATO'yê cara pêşî xala pêncan bi êrîşa bi destê Elmanyayê bi kar anî. Lê ev kirin, ne bi awayekî fermî û rewa, bi Gladîo'ya ne fermî û rewa hat kirin. Ji dema damezrandina Komarê ve (beriya wê jî heye), hêzên hegemonîk ên bandora xwe li ser jiyana polîtîk a Tirkiyê kêm nekirin, piştî salên 1950'î bi ketina Tirkiyê ya NATO'yê re, ev bandora xwe bihêztir kirin. Herweha Komara berê bi rola Proto-Îsraîlê rabû, piştî damezrandina fermî ya Îsraîlê li herêmê bû zewaca wê ya bi tenê. Têkiliyên wan ji hevgirtinê jî wêdetir di asta zewaceke ne rewa de bûn. Şêweyên hevpartiyê diguherîn, lê naveroka wê nediguherî. Polîtîka hêzên hegemonîk (Şûna Ingilîzan DYE'yê digirt, lê timî hevgirtiyên stratejîk man) piştî salên 1945'an der barê Kurdan de wisa bû; pêşî Kurdistana Iraqê bikirana otonomî û paşê jî weke dewleteke piçûk a netewe ava bikirana. Kurdên li parçeyên din ên Kurdistanê jî ji polîtîkayên înkar û tinekirinê yên hevkarên xwe yên dewletên netewe yên Îran, Ereb û Tirk re hiştibûn. Tevgera Kurd a Iraqê bi awayekî bingehîn ji sedsala 19. ve ji bo rola ji Kurdan re hatibû destnîşankirin bersiv dida û têrê dikir. Bi riya vê tevgerê bendewariyên xwe yên hem ji Îran û Tirkiyê, hem jî ji Iraq û Sûriyê karîbûn bidin hiskirin. Lewma heta ji wan dihat ew li ser piyan digirtin. Bi armancên bi heman rengî Îsraîlê jî palpiştiya vê tevgerê dikir. Carinan li gorî berjewendiyên xwe texsîr nedikir pêre xiyanet jî dikir. Ji lewra mirov di vê çarçoveyê de dikare mentiqê sîstemê fêhm bike ka çima Kurdên li parçeyên din weke miriyan dibîne.

Tevgera Azadiyê ya Kurd ku ji 1984'an ve mezin bû, polîtîkaya dused salên dawî ya li dijî Kurd têra xwe hejand. Ji wê demê û pêve şerekî ji aliyê kontrgerîlla ve bê meşandin hat destpêkirin. Di vê pêvajoyê de PDK jî bi kêmanî di kontrolê de dihat bikaranîn, carinan jî weke hêza kontrgerîlla bi xwe tevdigeriya. Saziya jêre JITEM dihat gotin di sala 1985'an de hat damezrandin ku di van salan de Gladîo ket nava tevgerê û ev bûyereke xweber nebû. JITEM milê Gladîo'yê yê şerê qirêj bû. Ev pêkhate gihişt astekê welê ku gef li artêşa Tirk a ji rêûresmê xwarin û ev jî bêyî Gladîo'yê evqasî mezin nedibû. Tesfiyekirina Tevgera Azadiyê ya Kurd a nû û hêza wê ya pêşeng

PKK’ê her ku çû bêhtir ket rojevê. Eger nehata tesfiyekirin pêkan bû ku pîlan, proje û kirinên dewleta netewe yên dused salên dawî yên sîstema hegemonîk derbên mezin bixwarana, derzên necebiriyana têde vebûna û valatiyên şûna wan nehatana tijîkirin çêbibûna. Sal li pey hev bihurîn û hat fêhmkirin ku tevger tesfiye nabe, lewma mekanîzmayên tampon xistin dewreyê. Ango polîtîkayên qamçî û şekir ên ku lîberalîzmê tevahiya dîrokê meşandine, xistin dewreyê. Nexasim bi zordestiya li ser PKK’ê ya bi destê Ewrûpayê re paralel komên alternatîf bêhtir xwedî kirin û hewl dan wan entegreyî sîstemê bikin. Di vê pêvajoyê de tevî kompleyên li dijî min, tevgerên psîkolojîk ên bi armanca hilhilandinê jî bi giranî xistin rojevê. Di nava PKK’ê de jî hem li zindanan hem jî bi riya PDK’ê gelek kom û kesên nerazîbûnên xwe bi dengekî bilind û tevgerên xwe yên dejenere zêde dikirin, kengî diketin tengasiyê yekser diçûn cem PDK’ê û dewletê, gelek tevgerên bêbextiyê meşandin. Hema bêje serê her salê kompleyeke mezin a navxweyî diket.

Xusûseke divê ez bi girîngî bînim ziman heye û ew jî ev e; ji salên 1990’î ve Inglistanê bi riya YNK’ê (Yekîtî Niştimanî Kurdistan a bi pêşengiya Celal Talabanî), Îsraîl-MOSSAD’ê jî bi riya PDK’ê dixwestin em xwe biavêjin wan û penahî wan bibin. Ji ber ku em bi rêzik û pîvan radibûn, û têkiliyên bi vî rengî ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve dihatin maneya têkçûnê, min rû neda wan. Nexasim li şerên di Îlon û Cotmeha sala 1992’an de û piştî şerên salên 2000’î li tevgera teslîmiyetê pêşî nehata girtin, tesfiyekariya topyekûn û hevkartiyê karîbû encam bigirta. Sîstemê deriyekî bi vî awayî hem bi riya PDK’ê û hem jî paşê bi riya YNK’ê vekirî hiştibû.

Di nava van şert û mercan de em û ez gihiştin Cotmeha 1998’an. Ya ji min li bendê bûn ew bû, ez xwe vekişînim çiyê. Lê me texmîn dikir ku li ser vê riyê gelek tedbîr girtine. Herweha derketina çiyê dihat wê maneyê ku wê her cure rêbazên tinekirinê yên eskerî biceribînin. Sîstemê ev yek erê kiribû. Fermandarê Hêzên Bejahiyê Atîlla Ateş di 18’ê Îlona 1998’an de li Kirikhanê bi awayekî eşkere gef li Sûrî xwarin û bi ketina dewrê ya lîderê hevkar ê Misrê Husnî Mubarek, ev gefxwarina wî gihişt encamê. Min jî pirr dixwest ez ji Sûrî derkevim. Lê timî min xwestibû ev yek di nava şert û mercên cuda de pêk bê. Herweha pozîsyon û rewşa min a li Sûrî ji bo Tevgera Azadiyê ya Kurd timî xwedî roleke ne ji rêzê bû. Lewma ez heta neçar nebûma, ne rast bû ku min dev ji vê rolê berdana. Ji ber ku çîrok û serhatiya min a derketina ji Sûrî û encamên wê têne zanîn ez ê dubare nekim. Piştî ku ez kirim bin çavan, tiştên dipan bi kurtî ev bûn;

**a)** Tevgera Kurd a Iraqê wê qadên xwe yên bandorê yên tengbûyî hem di warê lîdertî hem di warê tevgerê de ji nû ve bi hêz bikira û li tevahiya Kurdistanê belav bikira,

**b)** Li şûna PKK’ê û Tevgera Azadiyê ya jêre pêşengî dikir, wê hêzên alternatîf bihatana amadekirin û bicihkirin,

**c)** Li komên hevkar û teslîmiyetkar ên nava PKK’ê pêşî bihata vekirin.

Bi vî awayî wê pêkan bibûya ku tewazuna sîstemê ya di sîh salên dawî de li Kurdistanê xirabûyî ji nû ve bihata restorekirin. Di vê navberê de, di çarçoveya heman mentiqî de Tirkiye kirin namzeta endambûna Yekîtiya Ewrûpayê. Tevahiya van hewldanên ku sîstemê ji aliyê Kurdistanê û bi PKK'ê ve girêdayî dimeşand, her yek ji wan parçeyekî Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a DYE'yê bû. Min pêkanînên deh salên dawî yên projeyê weke qonaxa herî girîng a 'Şerê Cîhanê yê Sêyemîn' terîf kiribû. Ji bo serketina vê projeyê berê pêşî diviyabû ez bihatama tesfiyekirin. Di vê çarçoveyê de hewldana pêşî Clinton bi xwe kiribû. Ji sala 1992'an ve Clinton du caran ji bo vê hewldanê hatibû serdana Sûriyê. Di wê demê de Clinton ji çar saetan zêdetir hevdîtinên dûrûdirêj (hevdîtinên bi vî rengî kêm caran têne kirin) der barê min û PKK'ê de kirin. Gelek tevgerên dîplomatîk ên bi heman rengî hebûn. Bi kêmanî biqasî Saddam Huseyîn tesfiyekirina min an jî bêbandorkirina min di rojevê de bû û ev hêmanên ez pêşkêş dikim hemû têra xwe vê yekê îspat dikin. Di çarçoveya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de dewletoka netewe ya Kurd a li Kurdistana Iraqê hat avakirin encameke xwezayî ya van bûyer û hesabên hegemonîk ên dused salên dawî yên li herêmê ye. Bendewariya sîstemê ji vê ew e, weke ku çawa di demên bihurî de kiriye bi vê amûra nû dixwaze hem Kurdan hem jî hêzên cîran kontrol bike û kengî hewce kir bi awayekî eşkere mudaxele bike. Ji ber ku armancên wan bi vî rengî ne, ev nayê wê maneyê, pêkhate û dewleta netewe ya li Kurdistana Iraqê bi temamî bêqîmet û neyênî ye. Bi neteweya demokratîk a li Kurdistanê bê avakirin û KCK'ya jêre pêşengiyê bike, bi helwesta xwe ya lihevkirinê li Kurdistanê û dewletên netewe yên cîran ên Rojhilata Navîn hemûyan bivênevê wê rê li ber bûyerên erênî û girîng veke. Polîtîkayên înkar û tinekirinê yên ji rêûresmê ji niha ve bêkêr bûne.

Li Îmraliyê duwanzdeh salên min qediyan û ez dixwazim di salvegera 12. a pêvajoya jiyana Îmraliyê de bûyerên derketine holê li gorî hêzên pêwendîdar binirxînim. Di vê çarçoveyê de bi kurtî ez dikarim wisa bibêjim:

**a)** Ji aliyê hevgirtina DYE, Ingilistan û Îsraîlê ve ku li serê hegemonya kapîtalîst in, di çarçoveya bûyerên sêbera Sûrî-Îran-PKK'ê de bereyê PKK'ê hatiye bêtesîrkirin. Lê mirov nikare bibêje, bûyereke bi vî rengî wê bi kêra sîstemê bê. Ji ber ku bi awayekî taktîkî be jî li şûna PKK'ê Tirkiye hatiye danîn. Di çarçoveya dijberiya Kurd de be jî piştgirtina hev a Tirkiye-Sûrî-Îranê ji bo sîstema hegemonîk gelekî nexweş e; heta mirov dikare bibêje ji rewşa PKK'ê zêdetir ji sîstemê re li ber encamên bi tehlûke ye; nexasim ji aliyê Îsraîlê ve rewşeke ti carî neyê qebûlkirin îfade dike. Tirkiye ji bo qerta di destê xwe de xurt bike di nava vê piştgiriyê de cih girtiye. Tişta Tirkiye ji bloka DYE-Ingilistan-Îsraîlê dipê ew e, kontrola Kurdên Iraqê ji wê re bihêle, misoger bike ku wê bi pey serweriyeke xweserî yan jî serxwebûnê nekevin, dixwaze para wê ji rant û kurtêlên Rojhilata Navîn bê zêdekirin û Îranê bixe rewşa Iraqê. Eger mirov di çarçoveya polîtîkayên dused salên dawî yên sîstema hegemonîk de li van bendewariyan binêre, tiştên Tirkiye dipê realîst nînin. Tirkiye wê yan guh bide sîstemê, yan jî wê xwe ragire û qebûl bike ku polîtîkayên li ser

Iraq û Îranê têne meşandin wê li ser wê jî bêne pêkanîn. Guhdana wê ya sîstemê jî tê wê maneyê ku divê bi Kurdan re li hev bike, mesafeyekê deyne navbera têkiliyên xwe yên bi Sûrî û Îranê re jî. Na eger ji sîstemê qut bibe û di rojgarên cuda de ji xwe re li cih bigire yan jî cih çêke, ji sedî sed divê operasyoneke mîna ya li dijî Iraqê li dijî xwe jî li ber çavan bigire. Di rewşeke bi vî rengî de sîstem wê bi hêza xwe hemûyî destekê bide tevgera dewleta netewe ya Kurd û wê kakilê dewleta netewe ya li Iraqê berfireh bike. Û eger li herêmê Îsraîl-Rêveberiya Kurd a Iraqê-KCK bibin bereyek hingê mirov dikare li bendê be ku ev yek Rojhilata Navîn ber bi veguherînin mezin ve dahf bide. Tirkiye niha halîhazir li Arafê ye. Tercîheke zelal û vebirrî nake, polîtîkayeke bi tewazun a klasîk ji bo herdu aliyan dimeşîne. Sîstema hegemonîk nikare li Rojhilata Navîn paşve gavê biavêje. Eger biavêje, ji tesfiyeya Îsraîlê bigirin heta jiholêrabûna gelek dewletên Ereb ên mezin û piçûk bivênevê bûyerên dinyayê ji binî ve bihejînin wê biqewimin.

Dema em dibêjin ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ em van bûyerên muhtemel jî li ber çavan digirin. Sîlehên nukleer jî di navê de, sîlehên herî giran jî wê bêne bikaranîn. Bi herhalî encam ê ji rewşa Ewrûpayê ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn cudatir nebe, heta wê girantir be. Em dema bi bûyerên deh salên dawî re bidin ber hev, wê malkambaxî û malwêraniya bûyerên muhtemel bêhtir bê fêhmkirin. Eger sîstema hegemonîk li herêmê bimîne wê qîma xwe bi rewşa heyî neyîne. Weke her sîstema hegemonîk wê bixwaze serketî bibe. Ev jî wê bike ku Îran ji bandora xwe ya di çarçoveya Şîa’tiyê de dakeve û car din li rewşa xwe ya sernerm a dema Şahtiyê vegere. Rejîma Îranê vê rewşa muhtemel a em behsa wê dikin qebûl bike, hingê mirina wê û ev ê yek tişt be. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku wê hewldanên ji bo bandordanîna li ser herêmê zêde bibin. Qonaxeke nû ya ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn’ li derveyî  îhtîmalê nîne. Ev rewşa niha ya tewazunê ya bêbiryar nikare demeke dirêj dewam bike. Di hersê rewşan de jî weke cografya Kurdistan û ji aliyê hevgirtinê ve rewşa Kurdan stratejîk e. Xwedî rewşeke welê ye, li kîjan aliyê tewazunê cih bigire, wê karibe encamê li gorî wî alî kêrhatî bike yan jî bêkêr bike. Kurd û Kurdistan her tim di dîrokê de rola wan textê kişikê û piyon bû, ji niha û pêve dikarin ji vê rolê derkevin û bi rola kirdar rabin. Di vê de jî siyaseta bişopînin, hevgirtinên wan ên hundir û derve wê diyarker bin. Ezmûna min a jiyanê li Îmraliyê, ji bo bûyer ber bi vî alî ve biberidin para xwe ne kêm e. Ev yek, ji bo hêzên komploger ên sîstemê û Tirkiyê ji sedî sed neyênî bûye û ji bo hêzên lihevkirinê jî firsendeke girîng pêşkêş kiriye.

**b)** Piştgiriya Tirkiyê-Îran-Sûriyê herçiqasî bi navend antî-Kurd pêk bê jî encamên wê wê girîng bin. Ev piştgirî yekser bi anîna min a Îmraliyê ve girêdayî pêk hat. Bê sedem nayê îddîakirin ku Tirkiyê derketiye derveyî mîhwerê. Eger wê di nava sîstema hegemonîk a Rojavayî de bimîne, demeke dirêj nikare vê rewşa xwe dewam bike. Tişta Tirkiye ji piştgiriya sêberî dipê ew e, di berdêla hinek paşvegavavêtinan de wê piştgiriyê bi sîstemê ve entegre bike û ev rewş jî wê aqûbeta Îsraîlê li tehlûkeyan veke. Ne pêkan e ku tevgera Siyonîst vê rewşê qebûl bike. Berevajî, Îsraîl weke hevgirtiyê herî girîng ê sîstemê li herêmê û weke kakilê wê yê hegemonîk divê

bandora xwe her tim zêde bike. Ji sedî sed divê bandora Îran, Tirkiye û Sûriyê ya zêde dibe rawestîne û kêm bike. Di navbera Tirkiyê-Îran-Sûrî û Îsraîlê de bi awayekî xwelihevrakişandineke hegemonîk heye ku nav lê nehatiye kirin. Pozîsyona Îran û Sûrî ya antî-Îsraîl têra xwe diyar e. Herçiqasî bi armancên cuda be jî Tirkiye bikeve vê pozîsyonê, herçiqasî nexwaze jî wê şerê hegemonîk ê li herêmê sor û geş bike. Îhtîmaleke xurt e ku berevajî bendewariyên xwe bi encaman re rûbirû bibe.

Ev rewş ê li ser polîtîka hundir bandorê bike û her biçe tesîra wê zêde bibe. Heye ku hêzên rê li ber AKP'ê vekirin hevgirtina wan ji hev belav bibe û li şûna wan koalîsyoneke nû ya hêzên hundir pêk bê. Ji vî alî ve, bûyerên di nava CHP'ê de balê dikişînin. Ji aliyê pirsgirêka Kurd ve ku Tirkiye dahf daye vê rewşa bi nakok, dewleta Tirk li serê duriyan e. Tirkiye yan wê razî bibe pirsgirêka xwe ya Kurd bi awayekî aştiyane, hevgirtî û bi riya demokratîk a bi kêmanî li Xweseriya Demokratîk vekirî çareser bike; bi awayekî ev rewş tê wê maneyê di şertên cuda de bi bername û duristî ji nû ve li hevgirtina Rizgariya Neteweyî vedigere. Komara bi komployan ji rê hatî derxistin ji nû ve wê li rejîmeke demokrasî û netewebûyîna demokratîk vegere. Yan jî wê bêhtir bi Îran û Sûriyê ve bê girêdan û li dijî Kurdan şerekî girantir bike. Sûrî û Îran ê ji aliyê xwe ve li dijî Kurdan şer gurr nekin. Polîtîkayên xwe yên ji rêûresmê bêhtir bi lihevkirinê bimeşînin û giraniya şer wê bixin ser milê Tirkiyê. Eger Tirkiyê weke ku heta niha kiriye, bêhtir giraniya xwe bide şerê li Kurdistanê û zêdetir şer gurr bike, wê ti cudahiya wê ji Afganistan û Iraqê nemîne, belkî ji wan xirabtir jî bibe. Tişta Tirkiye bi sîlehê bike ji zû ve kiriye. Ji niha û pêve, bi tenê diyaloga polîtîk û demokratîk dikare bi kêra wê bê. Lê eger rêûresma gelekî bi kok a komploger û darbekar destûra vê yekê bide.

**c)** Birina min a Îmraliyê bûyerek e ku yekser berpirsiyariya Yekîtiya Ewrûpayê têde heye. Dema ez birim Îmraliyê û xistim girtîgeha wê ya taybet, kesa pêşî ez pêşwazî kirim rayedara Konseya Yekîtiya Ewrûpayê bû û ev jî vê rastiyê îfade dike. Li ser min bi Tirkiyê re li hev kiribûn. Di berdêla namzetiya endametiya Yekîtiya Ewrûpayê de û di serî de rakirina cezayê darvekirinê li ser guhertina gelek xalên qanûnê li hev kiribûn. Ji aliyê mafê mirovan û demokratîkbûyînê vê lihevkirinê kêm be jî rê li ber hinek bûyeran vekir. Tirkiyê piştî ku radestkirina min bi hegemonya Rojava da erêkirin bi wan re li hev kir. Lewma ez dema dibêjim, yekser ez birim Îmraliyê mebesta min ev lihevkirina wan e. Yekîtiya Ewrûpayê herweha di berdêla vê lihevkirinê de qebûl kir ku PKK'ê weke 'terorîst' îlan bike û ev bi awayekî pratîk bi cih anî. Valatiya derketa holê jî bi kes û komên alternatîf ên demeke dirêj xwedî dikir an jî dixwest bi kar bîne wê tijî bikirana. Di vê mijarê de bi Tirkiyê re nexasim bi riya Swêdê xebatên pirralî meşandibûn. Tevgera Kurd wê ji karektera wê ya şoreşgerî, demokratîk û azadîxwaz bihata şuştin, bi awayekî yekalî wê ew bidewisanda nava çarçoveya pêşdebirina mafê mirovan û demokratîkbûyînê. Ji bûyerên paşê qewimîn, me fêhm kir ku di vî warî de gelek amadekarî hatine kirin. Heye ku di vê mijarê de

ezmûnên lîberalîzma Ingilîz û pêşniyarên wê li ber çavan hatibin girtin. Dîsa em ji bûyeran fêhm dikin ku bi AKP'ê re di vê mijarê de gav avêtine hevgirtineke ku em bi naveroka wê zêde nizanin.

Tirkiye di çarçoveya têkiliyên Yekîtiya Ewrûpayê de bi armancên taktîkî nêzî mafê mirovan û demokratîkbûyînê dibû. Di nava xwe de reform nedikir. Li ser reformên ji sedî sed pêdiviya wê pê hebû bazar dikir. Ji bo vê jî hêzên komploger û darbekar weke çoyekî dema hewce bikin wê bêne bikaranîn, dihesiband. Tevî ku eşkere bû, ez bi komployê hatime bêtesîrkirin, Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê di vî warî de biryareke rast neda û ev jî hêman an jî xaleke din a girîng a lihevkirinê bû. Ingilistanê di vê mijarê de jî pêşengî dikir. Dadgerê Ingilîz ê li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê, ji bo biryar rast neyê dayîn, ango ji bo  îspat bike ku biryar li gorî huqûqa navneteweyî ye, pirr li ber xwe dabû, ji ya xwe nehatibû xwarê û ya xwe dabû qebûlkirin. Yekîtiya Ewrûpayê ji bo bêhtir Tirkiyê bi xwe ve girê bide û hewcedar bike, ez, PKK û Tevgera Azadiyê ya Kurd pirr xirab bi kar anî. Tirkiyê jî ji bo ku bi Yekîtiya Ewrûpayê re li hev bike, ez, PKK û Tevgera Azadiyê ya Kurd bi heman awayî pirr xirab bi kar anî. Polîtîkayên Kurd ên ji rêûresmê bi awayekî mîna wan xwest li ser tesfiyekirina min û PKK'ê pêk bînin. Hukmekî huqûqa xwe ya bûrjûwayê ku bi kêra min bê, bi duristî pêk neanîn. Li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê di vî warî de hê jî gelek îtîrazên hatine kirin dewam dikin. Tirkiyê xusûsên huqûqa xwe yên der barê min de bi awayekî eşkere binpê kirine, helwesta ku Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê wê li hemberî van rewşan nîşan bide bi meraq tê payîn.

Di lihevkirina Ewrûpa û Tirkiyê de mijarên din jî hene. Ji bo ku di mijara min, PKK û Kurdan de serbest tevbigere, Tirkiyê di berdêla vê serbestiyê de di pirsgirêkên Ermenistan, Qibris û Yewnanistanê de paşve gav avêt. Tirkiyê di çareserkirina van pirsgirêkan de sozên ciddî dan. Polîtîkayên ji rêûresmê yên Osmaniyan şopandin. Di berdêla vê de jî ji aliyên pêwendîdar xwest zexta xwe ya li ser PKK'ê zêde bikin, xebata wê ya serbest asteng bikin û bikin ku derdorên kêm be jî destekê didinê ji vê bigerin. Di vê mijarê de duwanzdeh sal in ku polîtîkayên sergerandinê hatin meşandin. Tirkiyê bi vî awayî yeqîn kir ku ez ê bi temamî hilweşim, PKK'ê ji hev belav bibe û hêviyên Kurdan jî ji wê nemînin.

**d)** Polîtîkayên Îmraliyê yên ku Tirkiye bi tena serê xwe pêk tîne hene. Divê mirov ji van polîtîkayan re bibêje Polîtîkayên Millî yên Îmraliyê. Tirkiyê anîna min a Îmraliyê weke Serketina Sakarya ya duyemîn hesibandibû. Nexasim beşê darbekar û komploger tesfiyeya min û PKK'ê weke 'Duyemîn Herba Yewnan a Li Rojhilat' mîtolojîk kiribû. Xisletên Kurdan a gelekî vebirrî û diyarker di dîroka Tirkan a hezar salî de cihê xwe hene, ji bîr kirin û ew xistin rewşa dijminên ji Yewnan û Ermeniyan bi tehlûketir. Ma ne difikirîn ku şerê çaryek sedsalî dimeşînin li ber serketinê ye. Lewma anîna min a Giravê bi hewayeke serketina millî pîroz kirin. Min dema pê li erda Giravê kir, ji kesên îfadeya min stendî re got: "We ez zevt nekirim, hêza we jî têra vê nake. Ez bi komployekê radestî we kirim û di demeke dirêj de wê ev yek bi kêra we jî neyê." Kesên

îfadeya min distendin xwînsar bûn û rasyonel nêzîk dibûn. Lê pêla şovenîst a di sîh salên dawî de hatibû afirandin her kes ji helwesteke rasyonel dûr dikir. Ji bo rewşê bikin firsendeke aştiyê ez gelekî bi nermî nêzî wan bûm. Ez yeqîn dikim ku di encama gelek civînan de xwe bi xwe bawer kirin ku ez êdî sist dibim, kevirê xwe datînim, teslîm dibim, PKK jî di rewşeke bi heman rengî de ye, bi îhtîmaleke xurt wê ji ber xwe ji hev belav bibe û bi vî awayî serîrakirina 29. jî bi dawî dibe, têk diçe. Herweha ji ber helwesta neyênî ya MHP'ê ku di nava koalîsyonê de cih digirt, rewş ber bi çareseriya aştiyane û demokratîk ve nemeşiya û neçû. Firsenda vê jî nehat dayîn.

Ev yek, ji aliyê sêbera DYE-Ingilistan-Îsraîlê ve jî nedihat xwestin. Berê jî gelek helwestên wan ên bi vî rengî yên ku pêşiyê li meseleyê bigirin, hebûn. Polîtîkayên 'kîvroşk baz de, tajî bigire' ku li ser Tirkiyê ferz dikirin, bi awayekî serketî dewam dikirin. Berpirsên Polîtîkayên Millî yên Îmraliyê vê carê xwe bi xwe bawer kiribûn ku di şexsê min de halê kîvroşkê nîne bireve û hêviya dikirin ku em ê xweber ji hev de bikevin. Ez yeqîn dikim eger ji Serokwezîr Bulent Ecevît re bihata hiştin wê li pêşiya çareseriyeke aştiyane nebûya asteng, lê ev firsend ji bo wî nehat dayîn. Ji ber ku piştre pîlanê dagirkirina Iraqê dihat. Ji bo hêzên ku Bulent Ecevît xistin û AKP amade kirin, çareseriyên aştiyane û demokratîk xeyaleke xam bû. Nexasim di demekê de ku mijareke mîna dagirkirina Iraqê di rojevê de bû, diviya di tevahiya vê pêvajoyê de û piştî wê ez girtî bimama. Ez yeqîn dikim ku hêzên Kurd ên Iraqê jî xwedî bendewariyeke bi heman rengî bûn. Qûşxane gindirîbû qapaxa xwe dîtibû.

Di dema hukûmetên AKP'ê de pêvajoya Îmraliyê gelekî xirab hat bikaranîn. Ji bo ku Kurdan di kontrolê de bigire, nexasim beşekî artêşê razî bû AKP'ya xwedî meyla Îslamî li hukûmetê bimîne. Lewma mehkûmiyeta min û tesfiyeya PKK'ê ji bo AKP'ê jî sedema hebûn û manê bû. Ji ber vê, her tişt kirin qurbana hesabên rojane. Ji bo çareseriya aştiyane û demokratîk ti gav nehatin avêtin. Sebir û xweragirtina me xirab hat bikaranîn. Tesfiyekariya 2002-2004'an hêvî da wan û bi vî awayî bi roleke neyênî rabû. AKP'ê Îslamiyet xist xizmeta mîlliyetgiriya Tirk û di vê de guh neda ti pîvana dînî û exlaqî, pêdiviyên wijdanî û baweriyê bi cih neanîn. Lewma bi hezaran ciwan mirin. Ji aliyê maddî û manewî ve gelek zirar û ziyan li dewletê bû. Aliyê bi tenê yê erênî ew bû, bi anîna min a Îmraliyê, beşê komploger-darbekar ê ji dema damezrandina Komarê ve di nava dewletê de cih girtibû, bi dijberên xwe re rabûn hev û di vê de cara pêşî komploger-darbekar têk çûn. Belkî di heştêûpênc salên dawî de bûyera herî girîng ev bû. Cara pêşî bû ku hêvî çêdibûn ku wê ber bi aştî û demokrasiyê ve gav bêne avêtin. Di vê de sebra min û parêznameyên min ên ji bo aştî û demokrasiyê bi roleke mezin rabûbûn. Cihê Kurdan di dîroka Tirkan de hêdî hêdî dihat fêhmkirin. Herweha tevî hemû hewldanên tesfiyeyê hatibû fêhmkirin ku PKK û Tevgera Azadiyê ya Kurd li ser bingehekî têkûz û qehîm e. Ev fêhmkirin û têgihiştin nû nebûn, mijarek bûn, hê ji dema Turgut Ozal ve xwe didan der. Lê cara pêşî bû ku ber bi polîtîkayekê ve diçûn. Ji bo ji nû ve sererastkirina têkiliyên Kurd û Tirkan fikrên min ên gelekî kevin hebûn. Min cara pêşî behsa jiyana bi hev re nedikir. Lê rastiyek bû ku min bi sebir û

parêznameyên xwe, hêmanên mirov ji wan piştrast û têkûz bi pêvajoya Îmraliyê re pêşkêş kirin. Di van salên dawiyê de diyalogên min bi hin rayedarên dewletê re ji bo dijberên darbe û komplogeran bûyer bêhtir erênî kirin.

Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, hukûmeta AKP'ê li dijî herdu meylên di nava dewletê de polîtîkaya tewazunê dimeşîne û bi vî awayî hewl dide xwe bi hêz û xurt bike. AKP heta demên dawiyê jî bi awayekî ji dil alîgirê çareseriyeke aştiyane û demokratîk nebû. Nexasim di pêvajoya dadgehkirina Ergenekonê de vê helwesta wê eşkere xwe da der. AKP hê jî xwe disipêre polîtîkaya tewazunê û nexasim bi dengê Kurdan pişta xwe germ dike û bi vî awayî ji xwe piştrast e, û lewma ji ya xwe nayê xwarê. Lê eger ew nêzîkatiya manedar a Kurdan ji bo aştî û demokrasiyê nebînin, heye ku ew ê jî bibin weke yên din. Lê AKP têra xwe xwedî tecrûbe û ezmûn e, lewma wê bi hêsanî ji rant û kurtêlxuriya Çareseriya Aştiyane û Demokratîk negere û timûtim tîne ziman ku li gorî wê dem bê ew ê di vê mijarê de texsîr neke însiyatîfê bixe destê xwe.

Di mijara pirsa Kurd de rejîma Komarê niha di vê demê de bi temamî li serê duriyan e. Yan wê bi li ser riya şerê darbekar-komploger dewam bike yan jî wê bikeve ser riya çareseriya aştiyeke bi rûmet û demokrasiyeke manedar. Hem di nava civakê de, hem jî di nava dewletê de li ser mijara herdu riyan her ku diçe alî bêhtir ji hev cihê dibin. Herçiqasî her ku diçe şensê aştî û demokrasiyê zêde dibe jî meyla darbekar-komploger a binyadeke wê ya xurt di dîrokê de heye, bi temamî ji rêbazên şerê taybet û tesfiyekariya topyekûn negeriyaye. Bi qasî liberhevdana aliyan, serketina têkoşîna Kurdan a ku bi siyaseta aştî û demokrasiyê bimeşînin jî wê her tiştî diyar bike.

**e)** Girtina min a li Îmraliyê li cem pirraniya gelê Kurd tam hewayeke şînê ya mîllî afirandibû. Ji ber ku Kurdan fikar dikirin ku hêviyên azadiyê yên ku wan di dema hemdem de xurt kiribû, bi pêvajoya Îmraliyê re tesfiye bibin. Bi temamî berxwedanên hemdem ên Kurd bi heman encamê re rûbirû bûbûn. Lewma 15'ê Sibatê weke 'Roja Reş' hat bibîranîn. Kengî bîranîna 15'ê Sibata 1925'an jî li vê zêde bû, ciddiyeta rewşê bêhtir dihat fêhmkirin. Di encama nerazîbûna ji 15'ê Sibatê de gelek şehadetên hêja çêbûn. Di serî de van şehadetan, berxwedanên her sal li dijî vê roja reş îspat dikirin ku wê destûr neyê dayîn, ev rabihurî careke din dubare bibe.

Her parçeyek bi awayekî cuda ji pêvajoyê bi tesîr bû. Kurdên Tirkiyê-Kurdistanê bi fikar û nîgeraniyeke mezin pêvajo pêşwazî kiribûn. Hewl didan pêşbîniya encama wê bikin. Min pêşniyar kiribû ku gerîlla xwe vekişînin Başûr û ev bi temamî nehatibû fêhmkirin û pêdiviyên wê tam bi cih nehatibûn anîn. Lê dilsoziya wan a bi pêşniyarê re, zehmetiyên li ser vê riyê pêre rûbirû bûn û şehadetên di vî warî de pêk hatin, manedar bûn. Herweha ji Ewrûpa û Çiyayê Qendîlê du kom bi peyama aştiyê hatin Tirkiyê û ev gavên hatin avêtin hêja bûn. Vekişîna gerîlla ya Başûrê Kurdistanê di nava panîkê de pêk nehat û gelê mayî jî moralî wî xira nebû. Wekî din

pêvajoya heta bi 2005'an bi zor û zehmetî meşiya. Tesfiyekariya 2002-2004'an ji komploya ji derve li ser tevgerê hat ferzkirin bêhtir derbeke giran li tevgerê da. Xiyanet di nava gel de nebû, di nava PKK'ê de pêk hat. Kesên demeke dirêj li ser pişta egîtên hêja hebûna xwe di nava tevgerê de dewam dikirin, bawer kirin ku tevger ê careke din nikaribe bi ser xwe ve bê û lewma xiyanet li ser vê tevgerê ferz kirin ku di dîrokê de xiyaneteke bi vî rengî kêm tê dîtin. Tevî vê xiyanetê û helwestên bêberpirsiyarî yên AKP'ê jî, xeta PKK û KCK'ê xwe veguherand û demeke nû îlan kir û ev jî bûyereke girîng bû. Ev bûyerek bû, dewlet û hukûmeta AKP'ê ne li bendê bûn. Vê rewşê riya diyalogê bi dewletê re vekir. Di vê demê de gavên HADEP û DTP'ê avêtin hêjayî bi bîrxistinê ne. Xwepêşandan û mîtîngên domdar ên gelê Kurd gelek bûyer di nava xwe de dihewandin. Di gelek şaredariyan de hilgirtina berpirsiyariyê bandora xwe nîşan dida.

Van bûyeran hemûyan têrê nekir ku hukûmeta AKP'ê ji bo aştiyeke hevgirtî û çareseriyeke demokratîk gavê biavêje. Polîtîka xwe ya tesfiyekirinê bêhtir bêdeng û kûr dewam kir. Xwe neda ber berpirsiyariya siyasî ya gavên dewletê bi riya diyalogê avêtî û guhertinên huqûqî nekirin. Berevajî, hemû qanûnên li dijî Tevgera Azadiya Kurd bêhtir şidandin. Di du salên dawiyê de gotina 'Pêşîlêvekirina Demokratîk' li zimanê xwe gerandin, cûtin û bi vê jî bi tenê rûyê xwe yê maskeya wî ketî xwarê, veşartin. Tevî hewldanên min, ên gel û yên PKK-KCK'ê yên bi niyeta baş hemûyan û ceribandinên agirbestên yekalî jî negeriya ji berhevkirina kurtêl, rant û hêzê ji bêçareseriyê. Li hemberî vê rewşê Kongreya Civaka Demokratîk KCD ku banê rêxistinên civaka sivîl e, dikare aliyê "Xweseriya Demokratîk" bi hêz bike.

Lê belê bi sedema ku AKP û partiyên din ên dewleta netewe ji xisletên bingehîn ên modela çareseriya demokratîk dûr bûn, ji aliyê zêhnî û pratîk ve jêre amade nebûn û heta rewşa wan a li pêşiyê asteng, bi awayekî neyênî bandor li pêvajoya dîrokî kir. Li pêvajoya diyalogê ya bi dewletê re bi awayekî siyasî xwedî derneketin. Bi vê ezmûn û tecrûbeyê eşkere bû, hem pêşîlêvekirina demokratîk, hem jî pêşîlêvekirina Kurd a parçeyek ji vê ye, eger bi ser neketibe di vê de berpirsê sereke ne dewlet e, lê belê olîgarşiya siyasî ye. Pêkhateyên olîgarşîk ên siyasî ku li pey rant û kurtêlên dewletê diçin, sedema bingehîn a xetimînê ne. Ev rewş ê ji nû ve Kurd û Tevgera Azadiyê ya Kurd anî serê duriyan. Bersivên ji bo peyamên hatine şandin bêne dayîn, yan wê li gorî çareseriyeke demokratîk –bi kêmanî naveroka wê Xweseriya Demokratîk be –a manedar û aştiyeke bi rûmet bin, yan jî gelekî di ser şerê asta wî nizm ê sîh salên dawiyê re wê pêvajoyeke şerekî xweparastinê bi awayekî berfireh û bi awayekî yekalî yê rêveberiya KCK'ê ve dest pê bike. Mirov bi tenê ji vê pêvajoyê re bibêje, wê bibe demeke nû ya şer, ev ê têrê neke. Bi qasî ku mirov ji nûçeyên di çapemeniyê de fêhm dike, amadekariyên PKK-KCK'ê wê bi Kurdistaneke nû ya xwe disipêre otorîteya demokratîk ango bi îlana Rêveberiya Kurdistana Xweser a Demokratîk bi encam bibe.

Rêveberiya Kurdistana Xweser a Demokratîk a ku wê li ser alî û şaxên neteweya demokratîk hemûyan were pêkanîn, wê rê li ber rewşeke cuda veke. Du otorîte wê çêbibin: Otorîteya dewleta netewe ya Tirk û otorîte yan jî Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Kurd. Eşkere ye ku wê pêvajoyeke gelekî tevlîhev derkeve holê. Rêveberiya xweser a xwe bisipêre xweparastinê bi hezaran biryarên yekalî bide û bi ewqasî rêxistinên pêk bîne, ji şerê Îsraîl-Filistînê girantir wê rê li ber encaman veke. Bi tenê bi aştiyeke ciddî û bi rûmet, bi qasî wê jî çareseriya Xweseriya Demokratîk a li ser bingehên qanûnî û destûrî ku wê bi riya hevdîtinên neyekalî, lê bi hevdîtinên dualî yên beramber pêk were, dikare pêşiyê li pêvajoyeke bi vî rengî ya muhtemel bigire. Eşkere ye ku hewldanên bi vî rengî yên yekparebûna Komarê di demokrasiyê de dibînin nabe ku zêde bêne derengxistin.  Rojên pêş yan wê li gorî ruhê dîrokî yên têkiliyên Kurd û Tirk bê reformekirin û bi nêzîkatiyên stratejîk ên ku bersivê bidin û li ser bingehê têkiliyên xuşk û biratî, yekparetî, azadî û yekîtiya wekheviyê wê çêbibin, yan jî kengî şensê yekîtiya azad neyê bikaranîn hingê pêvajoyeke her otorîte wê bi biryarên yekalî hewl bide bimeşîne dest pê bike û îhtîmaleke xurt e ku ev rewş ê her roja derbas bibe rê li ber bêhtir şer û jihevcihêbûnê veke.

Kurdên Iraqê yên niha, ji serê sedsala 19. ve ku hegemonya Ingilîz li kendavê mezin dibû weke komeke taybet kirin hedef. Bi riya wan xwestin bi awayekî pirr şidandî Kurdan û Kurdistanê kontrol bikin. Mîsyonerên Ingilîzan û ajanên wan, ji hiyerarşiya jor a eşîr û terîqetan komên elît çêkirin û xwestin wan bixin xizmeta xwe. Heta bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn vê rewşê wisa dewam kir. Em ji vê demê re dibêjin mîlliyetgiriya paşvemayî. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi destê PDK’ê xwestin heman polîtîkayan dewam bikin. Di vê qonaxê de tişta nû ew bû, bandora DYE û Îsraîlê her ku diçû zêde dibû. Ji sala 1960’î ve bi desteka DYE, Îsraîl û Îranê bi şêwazê serîrakirin û gerîlla xwe li otonomiyê rakişandin. Lê konjonktura navdewletî, lihevkirina Îran û Iraqê rê li ber tesfiyeya wan vekir. Piştî 1975’an weke du mil û şaxan têkiliyên xwe yên bi hêzên hegemonîk re xurt kirin û ber bi dewleta netewe ya federe ve gav avêtin. Armancên sêberiya hegemonya DYE-Ingilistan-Îsraîlê hevpar bûn: Xwestin rejîma Ereb a Iraqê tengav bikin û ji bo ku wê li dijî cîranên wê bi kar bînin xwestin weke qertekê di destê xwe de bigirin.

PKK piştî 1985’an ket nava tevgerê û vê yekê ew zivêr û nebiste kir. Li gelemperiya Kurdistanê otorîteya wan bi awayekî ciddî tengav bû. Ji ber ku xwe nêzî hevgirtinên modern, organîzasyonên hevpar ên tîpa kongreyan nekirin ev bi vî rengî bû. Vê kir ku hêz ji hev ne piştrast bin û hevrikiyê bikin. Li şerên ji rêûresmê yên PDK-YNK’ê şerên PKK-PDK û PKK-YNK’ê zêde bûn. Ji salên 1990’î ve ‘Hêza Çakûç’ li herêmê bi cih bû û li Tirkiyê têkiliyên xwe bi hêzên Gladîo-JITEM’ê re xweş kir û bi wan re hewl da PKK’ê tesfiye bike. Heta bi pêvajoya Îmraliyê gelek operasyonên hevpar kirin. YNK’ê, tevî ku xwe li navcîtiya PKK û Komara Tirkiyê rakişand jî ji hewldanên tesfiyekar jî negeriya. PDK’ê bi awayekî çalak di operasyonên eskerî de gelek caran cih girt û hewl da PKK’ê tesfiye bike. Bi pêvajoya Îmraliyê re di dilê xwe de bêhna xwe berdan, bi vê pêvajoyê re biste bûn û rehet bûn. Hinekan ji wan rizgarbûna ji min û PKK’ê bi awayekî weke

rizgarbûna ji Saddam fêhm kirin. Lê gel ne xwediyê heman baweriyê bû. Gel zanîbû ku PKK nebe, kesê qîmet nede lîder û rêxistinên Kurd ên Iraqê û wê şensê wan ê siyasetkirinê gelekî kêm be. Gel pêvajoya Îmraliyê bi fikar û metirsiyeke mezin pêşwazî kir. Em baş dizanin ku gelek kom û kesayetên welatparêz xwediyê van fikar û piştgiriyê ne.

Piştî salên 2000'î dagirkirina Iraqê bi qasî ku firsendên dîrokî didan, ewqasî jî rewşek afirandibû ku li tehlûkeyên nû vekirî bû. Rêveberiya Kurd a Herêmî gavek bû ku wê bihata avêtin. Lê naveroka wê ya demokratîk cihê guftûgoyê bû. Têkiliyên wê bi Komara Tirkiyê re der barê gelemperiya Kurdan de bi ti awayî bi pîvan nedibû. Lê her ku çû ji baskê Komara Tirkiyê yê darbekar û komploger qut bûn, bi baskê alîgirê aştî û lihevkirinê re têkiliyên xwe xurt kirin. Statuya Kerkûkê di vî warî de bi tesîr bû. Ji ber ku dîtin bi zorê nikarin PKK-KCK'ê li herêmê tesfiye bikin û ev yek wê bi kêra wan jî neyê, heye ku di nava hêzan de platformeke nû çêbibe. Ji ber ku Rêveberiya Kurd a Herêmî astengiyên qanûnî çêdike, xebatên ji bo civaka demokratîk û yekîtiyê zêde derfet û firsenda bipêşketinê nabînin. Reva gelek kesên ji pratîka PKK'ê ya herêmê berpirsiyar û xiyaneta wan di vê de bi tesîr e. Herweha bi sedema ku têgihiştinên rastgir ên jirêderketî li wir ji xwe re cih dibînin, pratîka xeta şoreşger derb xwariye. Lê dîsa jî ev herêm li Kurdistanê di warê pratîkbûnê de asta xwe bilind e, û lewma xebatên Partiya Çareseriya Demokratîk a Kurdistanê PÇDK'ê girîng dibin. Divê li dijî zêhniyeta dewleta netewe bi zêhniyeta neteweya demokratîk rabe, otorîteya Xweseriya Demokratîk xurt bike û tevlîbûna Kongreya Neteweyî ya Demokratîk yek ji erkên bingehîn e ku li pêşiya wê ye. Bi pêkhateyeke ku mirov dikare jêre platforma Kongreya Neteweyî ya Demokratîk KND bibêje, têkilî dikarin bibin xwediyê statuyekê. Konseya Rêveber a Kongre hilbijêre û Konseya Yekîneyên Xweparastinê ya bi awayekî yekkirina hêzên çekdarî îfade bike, dikarin di çarçoveya giştî ya Kurdan de têkiliyên derve û hundir bixin weznekê û bi rola îfadeyeke hevpar rabin. Bi vî awayî, wê hem aştiya navxweyî û qabîliyeta çareseriya demokratîk a nava Kurdan, hem jî di serî de cîranên wan wê bi hêzên derve re karibin têkiliyên dîplomatîk ên yekbûyî deynin.

Kurdên Îranê pêvajoya Îmraliyê bi şîneke kûr a mîllî pêşwazî kirin. Gelek şehîd dan. Destek û piştgiriya xwe nîşan dan. Bi pêkanîna PJAK'ê helwesta xwe bi sazî kirin. Bi pêkhateyên mîna PDK'ê û yên weke wê, hêviyên xwe yên şikestî bi PJAK'ê ji bo ji nû ve geş kirin û vejandinê ceribandin. Vê ceribandinê di qada neteweyî û navneteweyî de gelekî deng veda û destek dît. PJAK weke hêzeke bi bandor di bin banê KCK'ê de cihê xwe digire. Li ser xeta xweparastinê bi gelek şehîd û milîtanê xwe weke çavkaniya hêviyeke geş, hebûna xwe dewam dike. Bi mîrateya gel a erênî ya çandî-dîrokî û li ber rohniya têgîn û teoriyên modern ên demokratîk saziyên neteweyî yên demokratîk ên bêne pêkanîn wê ji bo Kurdistanê û Kurdên Îranê gavavêtineke şoreşgerî îfade bike. Di navbera rêûresma Îranê û modernîteyê de sentezeke mînak pêşkêş dike. Yekparetiya Îranê bi modernîteya demokratîk ve girêdayî, dike xwedî alternatîf û di vê de bi rola pêşeng radibe. Mîna agirê hertim li baniyên herî jor û qûntara çiyayên Zagrosan tevahiya dîroka

Îranê vêketî ma, pêngava PJAK-KCK’ê jî ji bo tevahiya herêmê û Îranê wê her rohnî û tînê bide. Statu û pozîsyona xwe weke yek ji hêzên têkûz ên Kongreya Neteweyî ya Demokratîk dewam bike.

Ji ber ku pêvajoya Îmraliyê 9’ê Cotmeha 1998’an piştî  derketina min a ji Sûrî pêk hat, Kurdên Sûrî ji ber komployê gelekî xemgîn û bi hêrs bûn. Nerazîbûna wan ji komployê mezin bû, şehîdên nû li şehîdên xwe zêde kirin. Ti carî dilsozî û girêdana xwe ji dest nedan, bêhtir bi hêz û xurt kirin. Min qederê bîst salên xwe li wir derbas kirin û di wê demê de destegîrên min ên herî mezin ji aliyê maddî û manewî ve ew bûn. Ji bilî alîkariya wan a maddî ya bê hed û hesab, bi hezaran keç û xortên xwe tevlî nava refan kirin û bi vî awayî bi roleke dîrokî rabûn. Ji hezaran zêdetir şehîdên wan çêbûn. Hê jî li gelemperiya Kurdistanê bi hezaran şervan û beşdarên xwe yên siyasî desteka xwe ya çalak dewam dikin. Kurdên Sûrî bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê bi roleke mîna PJAK’ê li Îranê û bi roleke mîna PÇDK’ê li Iraqê bi awayekî serketî radibin. Bi hezaran şehîdên xwe û bi sedan girtiyên xwe di warê siyaseta demokratîk û helwesta xweparastinê de mînakekî neqane ye. Kurdên Sûrî û Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD, yek ji hêzên beşdar ên li pêş ê Kongreya Neteweyî ya Demokratîk e. Li giştî Kurdistanê û di nava yekparebûna Kurdan de wê ji niha û pêve jî vebirrî bi awayekî serketî bi rola xwe rabin.

Hem di nava gelên Sûrî-Libnan-Filistînê de, hem jî di nava rêxistin û rêveberiyên dewletê de gelek dostaniyan me çêbûbûn. Awayê veqetîna me ew jî xemgîn kirin. Veqetîna me li gorî dilê wan jî nebû. Tevî ku kêmasiyên me li hemberî hevdu kirin hebûn jî têkiliyên dîrokî bûn ku bi giranî bi awayekî erênî pêk hatin. Ez hêvîdar im ku siberojê di platforma Yekîtiya Neteweyên Demokratîk ên Rojhilata Navîn de ji nû ve bi wan re piştgirî û yekparebûn pêk bê.

**LI SER JIYANA MIN A LI GIRTÎGEHA GIRAVA ÎMRALIYÊ**

Min heta niha di tevahiya parêznameyên xwe yên nivîskî û diyalogên xwe yên devkî de zêde behsa jiyana xwe ya şexsî nekir. Ji bilî pirsgirêkên giştî yên tenduristiyê û pirsgirêkên bi îdareya girtîgehê re, sîstem bi awayekî taybet min tecrîd dike û vê bi tenê li ser min pêk tîne. Min heta niha behsa vê nekir û min neanî ziman ku ez çawa li hemberî vê li ber xwe didim. Ez yeqîn dikim ku yek ji mijarên herî zêde kakûnî û meraqa wan tê kirin, ev e. Ango meraq tê kirin ka ez li hemberî vê tenêtî û sekantiya mutleq çawa li ber xwe didim. Ezmûna min a jiyanê di vî warî de cihê meraqê ye. Ez dema zarok bûm, yek ji dinyadîtiyê gund ku weke zana dihat qebûlkirin, hal û hereketên min şopandibûn û ez hê jî ji bîr nakim gotinek weha gotibû: “Lo li cihê xwe rûnê, ma di te de cîwa heye?” Çawa ku tê zanîn, cîwa elementek e ku diherike û di cihê xwe de nasekine. Ez jî kesekî wisa bi hereket bûm û di cihê xwe de nedisekinîm. Eger xwedayên mîtolojîk jî bifikiriyana bi herhalî wê nehata bîra wan ku min bi zinarên Îmraliyê ve girê bidin û bi cezayekî giran ceza bikin. Tevî vê jî min di hucreyeke yekkesî de duwanzdeh salên xwe temam kirin. Girava Îmraliyê di dîrokê de bi nav û deng e. Ji ber ku li vir rayedarên payebilind ên dewletê

hatine cezakirin. Avhaweya vir hem gelekî nedawî ye, hem jî gelekî hişk e. Ew xisleta wê heye ku binyeya mirov ji aliyê fizîkî ve têk bibe. Li vê rewşê odeya girtî ya tecrîdkirinê jî bê zêdekirin hingî bandora wê ya mirov bihilhilîne bêhtir dibe. Herweha di dema destpêkirina kalbûnê de ez anîm giravê. Demeke dirêj ez di kontrola Fermandariya Hêzên Taybet de girtim. Ez yeqîn dikim ku du salên dawiyê kontrola Wezareta Dadê heye. Ji bilî pirtûkek, rojnameyek, kovarek û radyoyeke yek kanalî derfetên min ên têkiliyê bi derve re tinene. Bêguman mehê carekê hevdîtinên nîv saetî yên bi xuşk û birayan re û bi bahaneya rewşa hewayê ya nexweş gelek caran pêk neyê jî hevdîtinên hefteyî yên bi parêzeran re cîhana min a têkilîdanînê pêk dianîn. Hemin ez van hêmanên têkiliyê piçûk nabînim, lê ji bo ku mirov xwe li ser piyan bigire têrê nakin. Li ser piyan mayîna min û nerizîna min, wê zêhn û îradeya min diyar bikirana.

Ez hê li derve bûm, min hem xwe bi tenê hiştibû hem jî min xwe ji tenêmayînê re amade kiribû. Min xwe ji têkiliya bi malbatê û xizmên nêz re ku mirovan gelekî hînî xwe dikin, heta ji têkiliya bi heval û hevriyan re gelekî mucered kiribû û di vî warî de tecrûbeyên min hebûn. Têkiliya bi jinê re tevî ku gelekî girîng bû jî qadeke têkiliyê bû, min ew jî gelekî mucered kiribû. Ez bi temamî berevajiyê Nazim Hîkmet bûm. Min ehd kiribû ku ez ê nebim xwedî zarok. Di dema lîseyê de min nivîseke kompozîsyonê nivîsandibû û mamoste ji bo wê deh pûan dabûn min. Sernivîsa wê gotara min wisa bû: “Tu ji bo min ew zarokî ku wê qet ji dayik nebe!” Ez yeqîn dikim ku bi vê nivîsê min xwestibû ez jiyanên zarokatiyê yên zehmet derbas dibûn, bînim ziman. Lê ev ezmûn û tecrûbe hemû jî têrê nakin ku hêza min a berxwedanê li Îmraliyê rave bikin.

Tiştekî din heye ku divê bînim ziman. Ew jî ev e, di pêvajoya Îmraliyê de komploya li ser min ferz kirin ewqasî dijwar bû ku bi qasî serê derziyê hêvî bi mirov re nedihiştin. Bi vê armancê cezayê darvekirinê û şerê psîkolojîk demeke dirêj di rojevê de hatin hiştin. Di rojên destpêkê de min bi xwe jî nikarîbû tesewir bikim ka ez ê çawa li ber xwe bidim. Ne gelek salên bihurîn, ez nedifikirîm salekê jî derbas bikim. Fikreke min a min di ber xwe de digot hebû, min digot: “Hûn ê çawa karibin bi mîlyonan kesî di odeyeke teng de bigirin!” Bi rastî weke Rêbertiya Neteweyî ya Kurd di dema şertên anîna zindanê de min xwe kiribû senteza bi mîlyonan kesî yan jî ez kiribûm vê rewşê. Gel jî bi vî rengî fêhm dikir. Mirov hîç nikarin ji malbat û zarokên xwe qut bibin, lê ez ê demeke dirêj û bi awayekî careke din hîç li wan venegerim çawa ji îradeya mîlyonan a yekbûyî qut bibûma! Ev îradeya bi mîlyonan a yekbûyî mirin li ber çavan girtibû û pêk hatibû. Nameyên ji gel ên çend rêz jî nedidan min. Heta niha ji bilî nameyên hevriyên li zindanê yên ku beşekî mezin nedan min û wan pirr kêmên wan ên di kontroleke hûrûkûr re derbas bûne û ji bilî çend îstîsnayan, hîç name nedane min. Min nikarîbû ez nameyan bişînim. Ev xusûs hemû belkî hinekî rewşa ku tecrîdê rê li ber vekiriye qismî rave bikin. Lê rewşa min aliyên xwe yên xweser hene. Ez ew kes im ku min bi Kurdan gelek gavên ji wan re cara pêşî bê gotin, dabûn avêtin. Ev gavavêtinên nîvcomayî hemû ji bo jiyaneke azad pêk bên bivênevê hewce bûn. Min bi her kesê ji gelê me, der barê her qada civakî de gava pêşî dabû avêtin, lê min nikarîbû wan bisipêrim dest

û şertên ewle. Li evîndarekî bifikirin: Ji bo evîndara xwe ya pêşî gav avêtiye, lê kêliya wê karibe wê himbêz bike destên wî li hewa dimînin. Di qadên civakî de gavavêtinên min ên ji bo azadiyê jî timî li hewa mane. Min xwe di qadên civakî yên azadiyê de bi awayekî helandibû. Ji 'min' zêde tiştek jî nemabû. Ji aliyê civakî ve pêvajoya zindanê di demeke wisa de dest pê kir.

Ya rastî, şertên derve, dewlet, îdare û girtîgeh bi xwe weke qesran jî hatibin amadekirin têrê nakin ku rave bikin bê ka ez çawa xwe li vê tecrîda xweserî xwe radigirim. Divê mirov di şert û mercan û nêzîkatiyên dewletê de li hêmanên sereke nepirse. Ya diyarker ew e, divê ez xwe ji bo şert û mercên tecrîdê îqna bikim. Diviyabû sedemên min ên wisa mezin hebûna ku min karîbûya xwe li tecrîdê ragirtana û herçiqasî tecrîd bûya jî diviyabû min îspat bikira ku mirov dikare bibe xwediyê jiyaneke mezin. Dema ez bi vê fikrê rabim, serê pêşî divê ez behsa du têgînên sereke bikim.

Ya pêşî, der barê statuya civakî ya Kurdan de ye. Ez wisa difikirîm: Ji bo ku ez jiyana azad bixwazim, divê civaka ez endamê wê me azad bibe. Ya rastî, bêyî azadbûna civakê azadbûna ferdî nedibû. Ji aliyê sosyolojîk ve azadiya ferd bi temamî bi asta azadiya civakê ve girêdayî ye. Dema ez li gorî vê feraziyê li rewşa Kurdan difikirîm, min wer fêhm dikir ku jiyana Kurdan ji zindaneke tipîtarî ya bi dîwaran dor lê hatiye girtin ti cudahiya xwe nîne. Ez vê fêhm û têgihiştina xwe bi vegotineke wêjeyî nayînim ziman, bi temamî weke heqîqeta rastiyê ya pêkhatî îfade dikim. Ya diduyan, ji bo bi awayekî tam serwextbûna li têgînê, hewcedarî bi girêdana pîvaneke exlaqî heye. Divê tu xwe serwext bikî ku jiyan ji sedî sed bi girêdana bi civakekê ve dibe. Yek ji têgihiştinên girîng ên ku modernîteyê ew afirandine û bi wan ferd razî kirine ew e, bêyî girêdana civakî ferd dikare bijî. Ev îqna vegotineke qelp e. Ya rastî, jiyaneke bi vî awayî tineye, lê weke rastiyeke ferazî ya hatiye çêkirin, didin qebûlkirin. Mirov ji vê pîvanê mehrûm bibe, ev tê wê maneyê ku exlaq jî ji hev de ketiye. Li vir heqîqet û exlaq di zikhev de ne. Kengî civaka exlaqî ji hev de ket û têkiliya wê bi têgihiştina exlaqî re qut bû, hingê ferdperestiya lîberal dikare pêk bê. Di serdema me de weke şêweyê jiyanê yê serdest tê pêşkêşkirin û ev rastiya wê îspat nake. Çawa ku sîstema kapîtalîst a ku ew berdevkiya wê dike bi tenê bi jihevdeketina civaka exlaqî û jidestdana têgihiştina li heqîqetê pêkan e. Li ser pirs û diyardeya Kurd min mitale kir û di encamê de li ser vê babetê min ev hukim da.

Divê mirov di jiyana min de aliyekî dualî baş fêhm bike. Ew jî reva ji Kurdîtiyê yan jî berevajiyê wê min berê xwe da Kurdîtiyê. Li gorî qirkirina çandî şert û mercên revê li her deverê hazir û nazir bûn. Her tim rev tê teşwîqkirin. Tam jî di vê nuqteyê de pîvana exlaqî dikeve dewreyê. Di berdêla rizgariya ferdî de reva ji civaka xwe çiqasî rast e, yan jî baş e? Min heta bi sala dawî ya zanîngehê xwend û ya rastî ev dihat wê maneyê ku min bi awayekî ferdî xwe xilas kiribû û ev yek misoger kiribû. Tam jî di vê demê de min dest bi Kurdîtiyê kir û vê jî vegera li pîvana exlaqî îfade dikir. Di çarçoveyeke sosyalîst de pêkan bû ku ev civak ne Kurd bûya, dibe ku civakeke din jî

bûya. Lê dîsa jî divê tu xwe ji sedî sed bi diyardeyeke civakî ve girê bidî da ku tu karibî bibî ferdekî bi exlaq. Eşkere dibû ku ez ê nebûma ferdekî bêexlaq. Ez li vir têgîna exlaq bi maneya etîk, ango bi maneya teoriya exlaq bi kar tînim. Naxwe ez li vir behsa exlagiriyeke paşvemayî nakim, mînak behsa kesekî tevahiya temenê xwe bi malbatekê ve yan jî bi komeke weke wê ve girêdayî dimîne nakim. Ji ber ku girêdana bi diyardeya Kurd û rewşa wê ya bi pirsgirêk ve bi tenê weke etîk bi exlaq dibe. Rewşa Kurdan a ji sedî sed koletî bû –ku hê jî bi vî rengî ye –ji sedî sed nehişt ku ez xeyal bikim “jiyana azad pêkan e”. Ez bi vê îqna bûm: Dinyayeke min tineye ku ez têde azad bijîm. Li vir min zindana derve û hundir gelekî da ber hev. Di encamê de ez pê hisiyam ku girtîbûna li derve ji bo ferd bêhtir bi tehlûke ye. Ferdekî Kurd xwe li derve azad bihesibîne û bijî, ev ê xwe xapandineke mezin be. Jiyaneke di bin xwe xapandin û derewê de derbas bibe, jiyanek e ku ji dest çûyiye, û xiyanet lê hatiye kirin. Encama min ji vê bi dest xistî ev e, ez li derve bi tenê bi şertekî dikarim bijîm, ango ez bîstûçar saetê rojê ji bo hebûn û azadiya Kurdan (di şertên kapîtalîzmê de ji bo kedkarên Tirk) têbikoşim pêkan e. Ji bo Kurdekî bi rûmet û bi exlaq, jiyan ji sedî sed bi têkoşîna bîstûçar saetên rojê yên ji bo hebûn û azadiyê pêkan e.

Min dema bi vê pîvanê jiyana xwe ya derve dipîva, min qebûl dikir ku ez bi exlaq rabûme. Di berdêla vê de kuştin an jî ketina zindanê li gorî xwezaya şer e. Li gorî ku jiyaneke bêyî şer sextekarî û bêrûmetî ye, kuştin an jî xweragirtina li zindanê li gorî xwezaya çalakiyê ye. Ez divê xwe li şert û mercên zindanê ragirim, ev li gorî sedema min a jiyanê ye. Çawa ku mirov nikare rûyê xwe ji têkoşîn, her şêweyê şer ê hebûn û azadiyê ba bide, divê mirov zindanê jî weke encam qebûl bike. Ji ber ku tu ji bo jiyana azad têdikoşî û bêyî wê jî nabe. Eger mijar Kurd be, û ew Kurd jî bawer bike ku sosyalîst e, û eger di bin fermana lîberalîzm, kapîtalîzm an jî fanatîzmeke dînî ya çeloxwarî de nebe, ji bilî şerê ji bo jiyaneke exlaqî û etîk, li derve ti tiştekî tu bikî û cîhaneke te ya tu lê bijî tineye. Dema ku min di çarçoveya vê têgînê de li jiyana hevalên di zindanê de temaşe kir, min dît ku bi awayekî gelekî ciddî xwe dixapînin. Bi wan dane bawerkirin an jî wan bi xwe daye bawerkirin ku li derve jiyaneke azad a mirov pê rabe heye. Jixwe dema mirov ji aliyê sosyolojîk ve rola zindanan analîz bike, mirov ê bibîne rola wan ew e, li cem mirov hêviyeke azadiyê ya qelp biafirînin. Di şertên modernîteyê de zindan bi girîngî li ser vî bingehî hatine avakirin. Dema mirov ji zindanê derketine, du rê li ber wan hebûn; yan bi sextekarî û derewê jiyan qebûl kirine. Di vê rewşê de, divê mirov hêviya jiyaneke şoreşgerî, exlaqî û bi rûmet ji wan neke, bendewariyên bi vî rengî tewş in, pûç in. Yan jî pratîka zindanê wê wan bistewîne, bigihîne. Bi vê gihiştinê wê têkoşîna xwe ya civakî bêhtir bi awayekî serketî bi cih bînin.

Girtîgeh malên islahkirinê nînin, ew mekan in ku li wan mirov erkên xwe yên exlaqî û îradî bi xurtî hîn dibin. Heman xusûs ji bo şervanên azadiyê yên derketinê serê çiyan jî di cih de ne. Mirov bibe gerîllayê azadiyê ev tê wê maneyê ku mirov di asta herî jor de erkên xwe yên exlaqî û polîtîk der barê civakbûyînê de bi cih tîne; bi bîrewerî û exlaqî li ser vê erkê ye; ji bo

azadbûyînê, erkên der barê xweparastinê de pêk tîne. Mirovê bibe gerîllayê azadiyê, ne ji bo ku bandora xwe ya ferdî zêde bike yan jî bibe desthilatdar, dibe gerîlla. Eger ne wisa be, ev ne şervantiya azadiyê ye, ev şervantiya ji bo desthilatdariyê ye. Yên bi vî awayî, derketina wan a çiyê û daketina wan exlaqî û civakî nîne. Jixwe yên bi vî awayî, kengî tiştên hêvî dikin nebînin, bi hêsanî xiyanetê dikin. Erkên xwe yên civakî li ti qadê bi cih nayînin. Tişta ez dixwazim bibêjim ev e:  Kesên hebûna wan di nava koletiya mutleq de, heta kesên ji hev belav dibin, li ku dibin bila bibin xisletên her deverê ji bo wan yek in. Bi awayekî hundir xirab e, derve baş e, kesê bi sîleh xirab e, kesê bê sîleh baş e, bi vî awayî kategorîzekirin hewldana esasî ya têkoşîna ji bo hebûn û azadiyê naguherîne. Jiyana mirov kengî azad bibe maneyeke xwe heye, naxwe li ku dibe bila bibe, ew der her tim zindaneke tarî ye.

Têgîna diduyan bi ya yekê ve girêdayî pêşketina têgihiştina li heqîqetê ye. Di zindanê de ji bo mirov karibe xwe ragire dermanê bi tenê bipêşxistina têgihiştina li heqîqetê ye. Bi awayekî giştî bi hêz têgihiştina li heqîqeta jiyanê tê wê maneyê mirov li bêhnika herî bi kêf û tahm serwext dibe, ya rastî li jiyanê serwext dibe. Eger mirov bi awayekî rast serwext bûbe çima dijî, li ku dibe bila bibe jiyan jêre ne pirsgirêk e. Lê jiyan hertim di nava şaşî û derewan de derbas bibe wê maneya xwe ji dest bide. Bi vî awayî wê diyardeya jêre rizîna jiyanê dibêjin derkeve holê. Bêkêfî, nerehetî, şer, dijûn encamên xwezayî yên jiyana riziyayî ne. Jiyana mirov ji bo kesên têgihiştina wan li heqîqetê pêşketî, bi temamî mûcîzeyek e. Jiyan bi xwe çavkaniyeke mezin a coş û heyecanê ye. Di jiyanê de maneya gerdûnê veşartî ye. Mirov çiqasî li vê razê hayil bibe, di zindanê de be jî pirsgirêka wî ya xweragirtina li jiyanê çênabe. Jixwe eger zindan ji bo azadiyê be, tişta li wir mezin bibe têgihiştina li heqîqetê ye. Jiyana bi têgihiştina li heqîqetê mezin bibe, êşên herî mezin jî dikare veguherîne şadî û bextewariyê.

Ji bo ez li diyarde û pirsgirêka Kurd serwext bibim, fêhm bikim û derfetên çareseriyê bihûnim Zindana Îmraliyê ji bo min tam bû qadek ku ez lê şerê heqîqetê bimeşînim. Li derve bêhtir gotin û çalakî xwedî hukim bûn, lê li zindanê mane bi hukim e. Fikrên ku min di parêznameyan de li ser felsefeya siyasetê bi awayekî berfireh û berbiçav anîne ziman, gelekî zor û zehmet e ku min li derve bianiya ziman. Ji bo têgihiştina li têgîna siyasetê bi xwe gelekî hewldan divê, têgihiştineke bi hêz a heqîqetê divê. Gotina min a “ez hûrûkûr hayil bûme, ez dogmatîkekî pozîtîvîst im”, têra xwe têkiliya xwe bi tecrîdê re heye û bi tecrîdê re pêkan bû ku ez vê gotinê bibêjim. Di şert û mercên tecrîdê de min bêhtir fêhm kir û serwext bûm ku têgînên cuda yên modernîteyê hene, bi awayên cûrbicûr avakirina modelên neteweyan pêkan in, herweha avahiyên civakî avahiyên bi destê mirovan hatine hûnandin in, û xwezayeke wan a nerm heye. Ji bo min nexasim gelekî girîng bû ku ez ji dewletgiriya netewe bibihurim. Ev têgîn ji bo min demeke dirêj pîvaneke Marksîst-Lenînîst-Stalînîst bû; bi rengê  dogmayekê bû ku diviyabû ti carî neyê guhertin. Dema min li ser xwezaya civakî, şaristanî û modernîteyê mitale kir, min dît ti têkiliya vê pîvanê bi sosyalîzmê re tineye û gelekî girîng e ku min ê bidîta, ev desthilatgiriyeke

zêde civakî ye, ji şaristaniya riziyayî ya bi çîn maye û bi destê kapîtalîzmê hatiye rewakirin. Lewma di redkirina wê de min dudilî nekir. Eger weke dihat gotin bi rastî wê sosyalîzma zanistî be, di vê mijarê de yên divê bên guhertin divê hosteyên sosyalîzma pêkhatî  ango Marks, Engels, Lenîn, Stalîn, Mao û Castro bin. Hosteyên navbihurî xwedî li têgîneke mîna kapîtalîzmê derketibûn, ev şaşiyeke mezin bû û zirareke mezin dabû doza sosyalîzmê.

Her ku min dît kapîtalîzma lîberal hegemonyayeke bi hêz a îdeolojîk e, min analîzên modernîteyê bêhtir bi hêz çêkirin. Min fêhm kir ku modernîteya demokratîk ne bi tenê pêkan e, ji modernîteya kapîtalîst hem rasttir e, hem jî hemdemtir e, û mirov dikare wê pêk bîne. Ji ber ku me nikarîbû em ji têgîna dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî bibihurin û weke rastiya bingehîn a modernîteyê lê serwext bûbûn, me nikarîbû em bifikirin ku neteweparêziyeke din, mînak neteweparêziya demokratîk pêkan e. Tişta te jêre netewe digot, ma diviyabû ji sedî sed dewletek wê hebûya! Madem Kurd jî neteweyek in, hingê divê ji sedî sed dewleteke wan jî hebe! Lê dema ez li ser diyardeyên civakî ponijîm, min dît ku netewe bi xwe rastiya herî wendabûyî ya çend sedsalên dawî ye, di bin bandoreke bi hêz a kapîtalîzmê de şikil girtiye û nexasim min fêhm kir ku modela dewleta netewe ji bo civakan qefeseke ji hesin e, ya ji bo civakan hêja têgîna azadî û civakbûyînê ye. Min çiqasî fêhm kir ku şerê ji bo dewleta netewe ji bo kapîtalîzmê ye ewqasî di felsefeya min a siyasetê de veguherînên mezin çêbûn. Têkoşîna ji bo neteweparêzî û çînîgiriya teng (herdu bi xwe mirov dibin heman cihî) di encamê de ji xurtkirina kapîtalîzmê wêdetir bi kêra tiştekî din nedihat. Min dît ku ez bi xwe qurbanê modernîteya kapîtalîst im. Her ku çû min dît, zanistên civakî yên modernîte ferz dike, ne zanist in, mîtolojiyên hemdem in, û vê jî bîrbirina min a dîrok û civakê bi hêz kir. Di têgihiştina min a heqîqetê de tam şoreşek çêbû. Her ku min dogma ji hev parçe kirin, min dîrok û civak bêhtir bi xweşî û heqîqetbarkirî nas kirin. Di vê demê de navê min li xwe kiribû li gorî vê yekê bû ango min ji xwe re digot ‘Nêçîrvanê Heqîqetê’. Gotina jiberkirî ya modernîteya kapîtalîst ‘kîvroşk bireve, tajî bigire’, min bi awayê xwe berevajî kiribû û weha digot “nêçîra modernîteya kapîtalîst bike.” Kengî têgihiştina li heqîqetê bi temamî bi pêş ket, hingê em der barê kîjan qada civakî de heta der barê qadên biyolojîk û fizîkî de bifikirin, bi awayekî em bi demên berê re nikaribin li ber hev bigirin, serdestiya maneyê xuya kir. Di şert û mercên zindanê de bi qasî ku min dixwest, min karîbû şoreşên heqîqetê yên rojane bikirana. Hewce nake ku ez bibêjim, hêza berxwedanê ya ku ev yek dide ti tişta din nikare bide.

Bihêzbûna têgihiştina li heqîqetê bandora xwe di warê pêşxistina çareseriyên pratîk de jî nîşan da. Zêhniyeta dewletdarî ya Tirk timî bi pîroztî û taybetî tê biwesifkirin. Dema rêveberî tê gotin timî dewlet tê bîra mirovan. Ev zêhniyet bi awayekî orjînal Sumerî ye, bi xwedatiyê re gelekî pevkeliyan e, timî derbasî nava çandên desthilatdariya Ereb û Îraniyan bûye. Di binyada têgîna yekxwedayî de diyardeyeke bi hêz a desthilatdariyê heye. Li cem Tirkan her ku elîtên desthilatdariyê pêk hatin, belkî jî versiyona çaremîn, pêncemîn a vê têgînê bi pêş xistin. Bêyî ku

maneya wê ya etîmolojîk zanibin, timî ji encamên wê bi tesîr bûne. Li cem Selçûqî û Osmaniyan tam bi korfêhmî hatiye meşandin, ya rastî kirasekî bêmane lê kirine. Wer li wan hatiye ku bi carekê ji bo desthilatdariyê bi dehan xuşk û bira, xizm darve kirine. Bi Komarê re kirasek li vê têgihiştinê kirine; ya rastî, têgihiştina dewleta netewe û serweriya neteweyî yên ku vedîtinên Ewrûpayê ne, weke ku ji wan girtin bi desthilatdariyê ve monte kirin. Bi vî awayî dewleta netewe ya Tirk bêhtir bû Levîathanekî bi tehlûke. Kê destê xwe bidayê dihat darvekirin. Dewleta netewe di nava pîrozên mutleq de yek ji yên sereke bû. Nexasim ev ji bo çîna burokratîk bi vî rengî bû. Pirsgirêka desthilatdarî û dewletê di dîroka xwe de bûbû pirsgirêka herî tevlîhev a civakî.

Li Îmraliyê ji têgînên herî zêde li ser wan ponijîm û min mitale kir desthilatdarî û dewlet in. Her ku min fêhm kir ev herdu têgîn bi roleke çawa di têkiliyên Kurd û Tirkan de rabûne, min pirr bi xurtî his kir ku ez divê çareseriyên pratîk ên berbiçav bibînim. Min xwe hewce his kir ku ez rêxistinkirina desthilatdarî û dewletê bi awayekî giştî û di têkiliyên Kurd û Tirkan de bi qasî hezar salan heta bi Hîtîtan lêbikolim. Her ku min fêhm kir di navbera çandên desthilatdarî û dewletê yên Mezopotamya û Anatolyayê de têkiliyeke xurt a jeopolîtîk û jeostratejîk heye, min kirasê vê têkiliyê li têkiliyên Kurd û Tirkan kir û min bi hêsanî dît ku rêbazeke aqilane nîne mirov desthilatdarî û dewletê ji hev dûr bibîne û ji hev cuda bike. Ji ber ku ev herdu têgîn ango desthilatdarî û dewlet li dijî demokrasiyê bûn, min ew qebûl nedikirin. Eger mirov rêveberiyê hemûyî bi destê hêzên desthilatdarî û dewletê ve berde ji bo civakê zirareke mezin bû û lewma girîngiya demokrasiyê baştir derdiket holê. Lê ji ber ku min fêhm kir înkarkirina desthilatdarî û dewletê bi awayekî anarşîstî di pratîkê de rê li ber bêçareseriyê vedike, herçiqasî ez tercîh nekim jî min pirr bi xurtî dît ku înkarkirina parvekirina desthilatdarî û dewletê li gorî rastiyên dîrokî nîne. Rêveberiya demokratîk tercîha me ya bingehîn bû. Lê eger mirov çandên desthilatdarî û dewletê yên tevahiya dîrokê tekanebûyî înkar bike û aliyên wan ên civakî yên heq fêhm neke, min dît ku mirov ê weke encam nikaribe xwe bigihîne pratîkên çareseriyê yên berbiçav ên têkûz û lewma min girîngiya têgînên desthilatdarî û dewletê yên hevpar baştir fêhm kir.

Tevahiya dîrokê di polîtîka û stratejiyên desthilatdarî û dewletê yên li Anatolya û Mezopotamyayê de danûstendin û têkilî zêde çêbûne û timûtim modelên hevpar hatine ceribandin. Di têkiliyên Kurd û Tirkan de jî tevahiya demên krîtîk modelên bi heman rengî hatine tercîhkirin. Ev model herî dawî di Şerê Rizgariya Neteweyî de hatibû ceribandin. Ez di parêznameyê de gelekî li ser vê babetê rawestiyam. Min ev model weke modeleke teorîk pêşkêş kir û ji bilî vê, veguherandina wê ya projeyeke çareseriyê wê ne bi tenê di têkiliyên Kurd û Tirkan de, lê li Rojhilata Navîn ji bo çareseriya pirsgirêkên asêmayî yên bi heman rengî jî qîmeteke xwe ya mezin hebe. Nexasim li dijî dogmatîzma pozîtîvîst a ku modernîteya kapîtalîst ferz dike hem bi rastiyên dîrokî re li hev e, hem jî ji bo çareseriyên pratîk xwedî hemanên nêzî îdealên her kesî ye. Li ber rohniya bûyerên dîrokî der barê desthilatdarî û dewletê de li ser

têgînên moderníteya demokratîk, neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk ponijîm. Mitalekirina min a der barê desthilatdarî û dewletê de ji bo fikirîna min a li ser têgînên moderníteya demokratîk, neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk bandoreke girîng kir. Rastiyeke din a dîrokî ew e, îstîsnayîbûna têgîna desthilatdariya navendî û pîvanbûyîna têgîna desthilatdariyên xwecihî. Di vê çarçoveyê de roja me ya îro têgîna dewleta netewe ya weke modela mutleq û bi tenê tê pêşkêşkirin, her ku têkiliya wê bi kapîtalîzmê re hat fêhmkirin û rastiya wê hat eşkerekirin, girîngiya çareseriyên xwecihî ji bo demokrasiyê baştir tê fêhmkirin.

Ji bo têkiliya di navbera şîddet û desthilatdariyê de jî gihiştibûm encamên bi heman rengî. Eşkere bû ku bi şîddetê desthilatdarbûn û netewebûyîn wê tercîha me nebûya. Ji bilî pêdiviyên xweparastinê, bi şîddetê bidestxistina avantajên civakî ti têkiliya xwe bi sosyalîzmê re tineye. Ji bilî xweparastinê bi tevahî şêweyên şîddetê bi tenê dikarin ji bo yekdestdariyên desthilatdarî û sermayeyê bin. Di vî warî de pêşketina têgînî, dikir ku mirov bi pîvan û manedar nêzî pirsa aştiyê bibe. Elîtên desthilatdarî û dewletê ji bo Kurdan û heta ji bo tevahî beşên di mêtinkarî û zordestiya xwe de digirin gotinên tewş ên weke ‘cihêkar’ û ‘terorîst’ bi kar tînin û ji bo ez van gotinên wan pûç bikim, ez bûbûm xwedî daneheveke gelekî dewlemend a têgîn û teoriyê. Li ser bingehê vê daneheva têgîn û teoriyê diyalogên me yên bi rayedarên dewletê re bêhtir berdar dibûn û rê li ber çareseriyên pratîk ên afirîner vedikirin. Çawa ku wê di beşên cûrbicûr ên parêznameyên min de bê dîtin, di gelek qadên civakî yên bi heman rengî de bi saya pêşketinên di warê têgihiştina li heqîqet û azadiya civakî de pêkan bû ku mirov çareseriyên teorîk û pratîk bi pêş bixe.

Ji bilî sedemên fizîkî yên rê li ber pirsgirêkên tenduristiyê vedikin, aliyekî jiyana Îmraliyê ku nikaribim xwe lê ragirim, tineye. Li gorî berê moral, bîrewerî û hêza îradeyê paşve neçûne; berevajî  bêhtir xwe parzûn kirine, dawerivandine, bi estetîkê xwe xwedî kirine û bi aliyê xweşikbûnê ve dewlemend bûne. Her ku mirov ravekirina heqîqetên civakî bi zanist, felsefe û estetîkê xurt dike, derfet û îmkanên jiyaneke rast, qenc û xweşik çêdibin. Li şûna ku ez ê bi mirovên moderníteya kapîtalîst ji rê derxistî, ji riya heqîqetê derxistî re bijîm, ez tercîh dikim heta niqrîska dawî bi tena serê xwe di hucreya xwe de bimînim.

Der barê jiyana min a li Îmraliyê de pirseke din a gelê me bersiva wê meraq dike ev e, heye ku ez ji zindanê derketim, ez ê li ku û çawa bijîm. Ez ew kes nînim bi pey xeyalan bikevim. Divê baş were zanîn ku ez xwedî şêwazekî jiyanê me, jêre rastiya şoreşgerî tê gotin. Ne jiyana min a piştî derketineke muhtemel, xeta min a jiyanê ya ji zarokatiyê ve dikare bersiva pirsên bi vî rengî baştir bide. Ez hînê di bin deh salî re bûm ‘serîrakirinên min ên pêşî’ li dijî otorîteya malbatê dest pê kirin. Ji bo vê mijarê delîlên girîng di van serîrakirinên min ên pêşî de hene. Ez hê ji wê demê ve isyankarekî bi tenê bûm. Min hewl da nerazîbûna xwe ya ji civaka gund û bajêr di parêznameya xwe de car caran di hinek beşan de bînim ziman. Kesên pêwendîdar dikarin têde

pirs û bersivên wan ên lê digerin bibînin. Ez divê pirr bi kurtî bînim ziman ku ji bo min jiyan kengî bi awayekî azad bibe pêkan e ku mirov bijî. Jiyana azad çi ye, û ne çi ye, min hewl da weke bingehê vê parêznameya xwe ya pênc cildan rave bikim. Jiyaneke ji aliyê civakbûyînê ve etîk, adil û polîtîk nebe, ew jiyanek e ku divê mirov nejî. Bi giştî şaristanî û bi taybetî jî modernîteya kapîtalîst, bi yekdestdariyên mêtinkarî û zordestiya îdeolojîk bi jiyanên tijî derew, bi demagojî û ferdî re jiyînê pêkan dikin û didin qebûlkirin. Bûyerên ji wan re pirsgirêka civakî tê gotin jî bi vî awayî derdikevin holê. Her kesê ji xwe re şoreşger dibêje, her çi em navê sosyalîst, navê azadîxwaz, demokrat an jî kominîst lê bikin divê li ber şêweyê jiyana serwer a demên modern û xwe disipêre şaristaniyên mêtinkarî û zordestiya çîn, desthilatdarî û bajêr a zêde rabe û nerazîbûna xwe ji wan diyar bike. Naxwe bi awayekî din şêwazê jiyanê adil, azad, demokratîk û civakî nabe; bi gotinek din jiyan nabe ku mirov karibe bijî. Lewma jiyan ê tijî derew, şaşî, xirabî û kirêtî bibe. Mirov ji şêwazekî bi vî rengî yê jiyanê re dikare bibêje; şêwazê jiyanê yê ne li ser bingehekî rast. Min tevahiya jiyana xwe ev şêwazê jiyanê ji xwe re bi pirsgirêk dît an jî ev şêwazê jiyanê yê jixwe bi pirsgirêk bû, qebûl nekir û divê hewldanên min ên gelekî mezin li dijî vî şêwazê jiyanê baş bên fêhmkirin. Naxwe ez ê ne weke kesayet û ne jî weke Rêbertî bême fêhmkirin. Kesên min fêhm nekin û tevlî kesayeta min û Rêbertiya min bibin û bixwazin jê sûdê werbigirin, heye ku gelekî hêvîşikestî bibin. Rastfêhmkirin û rasttevlîbûn pirsgirêkeke şexsî nîne civakî ye.

Di vê mijarê de pirseke din a bersiva wê gelekî tê meraqkirin şêwazê min ê jiyana bi jinê re ye. Jiyan bi jinê re çawa dibe? Min bersiva vê pirsê jî di cildan hemûyan de car caran da. Nexasim di şert û mercên modernîteyê de jiyan bi jinê re gelekî girîng e. Ev pirsgirêkeke welê ye, bi awayê em keçekê bixwazin, li keçekê bigerin û bixapînin, bi mala ‘giştî’ [kerxane] an bi mala ‘taybet’, bi pirrzarok an jî bêzarok çareser nabe. Ji bo mirov vê pirsgirêka stûna navmalê ya dil û mejiyê pirsgirêkên civakî ye çareser bike, divê bi awayekî bingehîn bi zanistî, felsefî, etîk û estetîk nêzî meseleyê bibe. Di serdema me de, ji bo hevjiyana azad bi jinê re di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de berpirsiyarî û hêzeke mezin a zanistî, felsefî, etîk û estetîk divê. Mirov heta statuya jinê ya di dîroka şaristaniyê de û di serdema modern de nizanibe û nebe xwedî wê hêzê ku karibe helwesteke etîk û estetîk nîşan bide, pêre kîjan bihevrebûnê biceribîne bila biceribîne, her jiyana bi wê re wê bi şaşîtî, bêexlaqtî û kirêtiyê bi encam bibe.

Ji bo mirov jiyanê têk nebe, şert e ku beriya her tiştî jiyana bi jinê re bi awayên rast, bi exlaq û estetîk (bi awayê xweşik) pêk bîne. Di şexsiyeta jinê de bi tevahî şêweyên koletiyê hatine ceribandin û pê dane qebûlkirin. Lewma ji bo mirov bibe mêrê rast, bi exlaq û xweşik şertê pêşî ew e, divê mirov vê nasnameya jinê ji hev derxe, bike hevrê û hevjînê doza azadî û wekheviyê. Eger rêzên parêznameya min rast bêne xwendin, wê baştir bê fêhmkirin ka çima ez girîngiyê didim şêweyê jiyanê yê bi vî rengî û weke pîvan ferz dikim. Exlaqê şaristaniyê yê di çarçoveya desthilatdariya modernîteyê de têkiliya cinsî ya cinsiyetparêz a bi maneya ‘min karê wê temam kir’ ferz dike (şêweyekî welê yê têkiliyê ye, têkiliya cinsî ya biyolojîk jî dejenere kiriye) û ev

şêwazê jiyanê yê paşvemayî bêexlaqî û kirêtiyeke mezin diafirîne. Eger şerê min ê mezin ku min li dijî vê meşandiye û encamên wê rast bêne fêhmkirin, jiyan ê bi jinê re bêhtir bi exlaq û xweşik bibe. Ji bo vê jî her mêr û jina ji berpirsiyariyê para xwe girtî, nexasim ji bo jin bi hêz û azad bibe, li tevahiya qadên civakî bibe xwediyê heman giraniyê divê pratîk û nêzîkatiyên zanistî, felsefî, etîk û estetîk hertim pêşde bibe û bi rêxistin bike, li zêhniyet û saziyên neteweya demokratîk bi cih bike. Çi li derve çi li hundir, çi di zikê dayikê de çi di dem û mekanekî li ezman de, jiyana mirov bi tenê bi azadî, wekhevî (bi cihêrengiyan) û demokrasiyê dibe. Li derveyî vê şêweyên jiyanê jirêderketî ne, ango bi nexweşî ne. Ji bo bikeve ser riyeke rast û têkûz bibe, şoreş jî di navê de divê bi gotin û çalakiyên cihêreng ên civakî têkoşîn bê kirin. Ji bo vê jî îrade û zêhniyeta etîk, estetîk, felsefî û zanistî bê pêkanîn.

Hingê di rewşeke gengaz a derketinê de ez li ku dibim bila bibim, di kîjan dem û dewranê de dibim bila bibim, ez ê ji bo civakbûyîna dixwazim bibim endamekî wê, ji bo Kurdan ku ev rastiya trajîk herî zêde bi serê wan de tê, ji bo netewebûyîna demokratîk a riya rizgarî û çareseriya wan e, ji bo Yekîtiya Neteweyên Demokratîk a riya rizgarî û çareseriya di serî de gelên cîran ên ku ew jî parçeyekî wan in, ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn, ji bo Yekîtiya Neteweyên Demokratîk a ku riya rizgarî û çareseriya gelên cîhanê ye ku ew jî beşekî wan in, pirr asayî ye ku ez ê heta dawiyê bi şêwazê xwe yê gotin û çalakiyê di nava têkoşînê de bim. Bi hêza zanistî, felsefî, etîk û estetîk a ku ev yek pêwîst dike kesayeta min a heqîqetê parake mezin bi dest xistiye, ez ê bi vê kesayeta xwe ya heqîqetê bimeşim, ez ê di jiyanê de bi ser bikevim û ez ê wê bi her kesî re parve bikim.

**21'ê Kanûna 2010'an**

**Abdullah ÖCALAN**

**Zindana Îmraliyê**

**JI SEROKATIYA DADGEHA MAFÊ MIROVAN A EWRÛPAYÊ RE**

**STRASBOURG / FRANSE**

Serok û endamên birêz ên dadgehê,

Di rojeva we de cûrbicûr dozên min hene. Der barê van dozan de parêznameyên ku parêzerên min pêşkêş kirine, hene. Ji bo van parêznameyan ez li benda biryara dadgeha we me. Komara Tirkiyê di çarçoveya statuya endametiya Yekîtiya Ewrûpayê de qanûnên xwe diguherîne û bi van guhertinan re hinek qanûn bi kêra min tên, lê Komara Tirkiyê van beşên bi kêra min tên tevlî demên berê dike û hewl dide wan bixe dijbertiya min, bi vî awayî bi pîvanên huqûqa gerdûnî û destûra xwe re li hev nake. Parêzname û îtîrazên min jî bêhtir di vê çarçoveyê de ne. Yek ji van mijarên huqûqî yên em behsa wan dikin der barê cezayê darvekirinê de ye. Kengî cezayê darvekirinê ji qanûnê hat derxistin bi qanûneke ku li destûrê zêde kir, hukmê cezayê darvekirinê veguherand cezayê 'muebbeda girankirî'. Lê ya rastî, kengî cezayê darvekirinê hat rakirin, diviyabû xala muebbediyê ya berê ku bi kêra min dihat, bihata pêkanîn. Ev jî di destûrê û qanûnan de pirr eşkere hatiye diyarkirin. Di serî de ev mijar, parêzerên min der barê gelek mijaran de ku kesayeta min kirine hedef û der barê gelek hukmên nû yên qanûnî de ku bi huqûqa gerdûnî û neteweyî re li hev nakin, li cem saziya we îttîraz kirine. Wekî din fikrên ez bînim ziman û li yên wan zêde bikim tinene. Bi tenê min hewl da bibêjim û balê bikişînim wê yekê ku ez jî dixwazim ku ya hewce û divê bê bicihanîn, bê kirin.

Duyemîn xusûsa girîng a ez dixwazim balê bikişîn ser ev e: Herçiqasî zehmet e ku careke din der barê wê de hukim bê dayîn jî biryara we ya der barê komployê de li hemberî bûyerên dîrokî, civakî û pratîkî ne rast bû, bi cewherê huqûqa Ewrûpayê re li hev nake û ji bo ku ez vê weke têbîniyekê ji dîrokê re bihêlim, min hewl da parêznameya xwe ya bi pênc cildan pêşkêş bikim, min cilda pêncan qedand û amade kir. Heta niha çar cild gihiştine ber destên we. Ez cilda pêncan weke deftereke stûr bi du daxwaznameyan di 22'ê Kanûna 2010'an de bi riya Mudîriyeta Zindana Tîpa F'ê ya Îmraliyê ji dest teslîm dikim û dişînim. Eger komîsyonên we yên pêwendîdar firsendê bibînin û lêbikolin, wê fêhm bikin ku ez li pey çi diçim û xwedî li doza çi derdikevim, herweha wê Kurdên di şexsê min de bûne hedef nas bikin û hîn bibin ku tevahiya dîrokê bi jiyaneke civakî rabûne û heta roja me ya îro tên û bi hêsanî wê bibînin ku di serdema modernîteyê de bi awayekî çandî têne qirkirin. Hem di pêvajoya Îmraliyê de, hem jî di pêvajoya beriya wê û piştî wê de, di girtina min de wê para Gladîo'yê ku artêşa veşartî ya NATO'yê ye, bi awayekî eşkere bibînin. Ne bi tenê li dijî min, hûn ê şerên Gladîo'yê yên di sîh salên dawî de li dijî Kurdan bi xwe bibînin. Bi qasî ku haya min jê heye, çi li welatên Ewrûpayê, çi li qadên şaxên wê hene, çalakiyên rêxistina Gladîo'yê dimeşîne li dijî huqûqa Yekîtiya Ewrûpayê ango Peymana Mafê Mirovan a Ewrûpayê ye. Dadgeha we di yekemîn biryara xwe ya mezin de ango ew biryara der barê nerewabûna girtinê de, li gorî min bi awayekî objektîf tevnegeriyaye. Ji ber ku bi riyeke

nehuqûqî, hem jî bi rêxistineke nerewa û bi komployê hatim girtin û ev ne li gorî huqûqa navneteweyî û huqûqa Yekîtiya Ewrûpayê ye. Beşekî mezin ji endamên we di bin bandora delegeyê Ingilîz de mane û biryar dane, lewma ne pêkan e ku ez vê biryara we qebûl bikim. Bi biryareke nû yan jî bi biryareke dawî sererastkirina vê şaşiyê berpirsiyariya we ye. Min bi tenê xwest balê bikişînim ser neheqiyê. Mîna serhatiya min û gelê min, gelek bûyerên bi heman rengî qewimîne. Li Anatolyayê û li Mezopotamyayê di dema nêz de serhatiyên Ermenî, Helen û Suryaniyan hê nû ne, û nehatine jibîrkirin. Dîplomasî û huqûqa dewletên netewe yên Ewrûpayê bi navê destekdana van gelan ew bi destê îmhayê ve berdane û ji serhatiya malwêran a van gelên xwedî çandên hezar salan, nexwestine xwe berpirsiyar qebûl bikin û bibînin. Dewleta netewe ya Tirk bi fen û fûtên dîplomasiyê yên mîna ava bin kayê bi berjewendiyên welatên Ewrûpayê re li hev kiriye û bi vî awayî hiştiye ku ev gelên qedîm di nava pelên dîrokê de bêne jibîrkirin. Ti encameke huqûqî bi dest nexistin. Heman rewş niha bi serê Kurdan de tê. Komplo di şexsê min de li gelê Kurd hatiye kirin, li huqûqa wî hatiye kirin. Komplo bûyereke wisa ji rêzê nîne, ji bo gelekî rengê xwe yê kujer heye. Nexasim helwestên Ingilistan, DYE û Îsraîlê yên li cem Tirkiyê di serketina komploya li dijî min de bi roleke diyarker rabûne. Min ev xusûs hemû di parêznameya xwe ya mezin û dawî de bi argumanên ampîrîk û teorîk têra xwe diyar kir û li vir min cara dawî xwest bi tenê balê bikişînim ser.

Serok û dadgerên birêz,

Ez careke din diyar dikim ku hem tecrîda taybet a li Zindana Îmraliyê li dijî kesayeta min tê meşandin, hem jî ew qanûnên min behsa wan kir ku Tirkiye ji bo bi huqûqa Ewrûpayê re li hev bike çêdike bi huqûqê bi xwe re li hev nakin. Konseyê jinûve dadgehkirin bi awayekî bi kêra min bê pêk neanî û ev jî li gorî biryara we ya yekê bû ango ez careke din diyar dikim ku ev jî li gorî biryara jinûve dadgehkirinê nebû. Konseya we biryareke bi vî rengî der barê ti kesî de nedaye û biryara we ya dibêje 'jinûve dadgehkirin hewce nake' neheqiyeke mezin e, û bi vî awayî hûn dibin destikê komployê. Qet nebe biryara xwe ya di vî warî de ji nû ve bi awayekî bi kêra min bê biguherin û bi vî awayî bikin ku mafê min ê 'jinûve dadgehkirin'ê pêk were, ez vê yekê bi girîngî diyar dikim û bi hurmeta xwe pêşkêş dikim.

**22'ê Kanûna 2010'an**

**Abdullah ÖCALAN**

**Hukim lê hatiye birrîn heta hetayî li zindanê bi cezayekî girankirî bimîne**

**(îmze)**